# HEZAR Û YEK ŞEV

CILD 9, 10, 11, 12

*Wergera ji Erebî*
**Menaf Osman**

**HEZAR Û YEK ŞEV (cild 9,10,11,12)**
Çîrokên Gelerî
**Navê Kitêbê Ya Orjînal:** Elf Lêyle we Lêyle
Weşan: Darul Mearîf, Misir, Kahîre, 2004

**Ji Erebî Wergera Kurmancî**: Menaf Osman

**Çîrok:** 08/22

**Gerînendeya Weşanê**
Eslîxan Yildirim

**Svererastkirin**
Serwet Deniz

**Berg**
J&J

**Rûpelsazî**
Dawûd Rêbiwar

**Çapa Yekemîn**
Weşanên Azad, 2023

**Çapxane**
Bizim Büro Matbaa Dağıtım Basım Yayımcılık San. Tic. Ltd. Şti. Sanayi
1. Cad. Sedef Sok. No: 6/1 İskitler Ankara
**Sertifika No:** 42488

**ISBN:** 978-625-99331-1-5

**NAVNÎŞAN**
AZAD YAYINEVİ
Viranşehir Mah.34330 Sk. No15 A/4
Mezitli/ Mersin
**Sertifika No:** 40407

**WEB:** www.wesanxaneyaazad.net

© ***Mafê wê parastî ye. Ji bilî danasînê bêyî destûr bi tu awayî nayê kopîkirin û nayê belavkirin.***

# HEZAR Û YEK ŞEV

CILD 9, 10, 11, 12

*Wergera ji Erebî*
**Menaf Osman**

AZAD

*Menaf Osman* (***Wergêr)***, *di sala 1965'an de li Hesekê hatiye dinyayê. Xwendina xwe ya seretayî, navîn û lîse li wir kuta kiriye. Piştre li Zanîngeha Şamê, Beşa Jeolojiyê xwendiye. Ji ber xebata xwe ya siyasî di sala 1993'yan de li Tirkiyeyê hatiye girtin û cezayê muebedê lê hatiye birîn. Niha jî li Girtîgeha Girtî ya Tîpa T a Akhisar/Manisa (T-Tipi Kapalı C. Evi-C/20 Akhisar/Manisa) de ye. Ji Frensî û Erebî wergerên wî hene, 7 roman û 2 kitêbê wî yê çîrokan hatine çapkirin; bi tevayî 13 berhemên wı hene. Romana wî ya bi navê* ***Girê Şêran*** *di 2017'an de hatiye qedexekirin. Wek piraya zarokên Serxetî û Binxetî, gelek çîrok di derbarê sînorê di hundirê welatê xwe de bihîstine û ev di berhemên wî de xwe didin der. Xebatên wî yê neçapkirî jî pir in. Heman demê hunermend e, wêneya jî xêz dike. Berga kitêba wî ya bi navê "SÎNOR" mînakek ji van xebata ye.*

***Berhemên Menaf Osman:***

***Girê Şêran*** *(roman), Weşanxaneya Aramê, 2003*
***Şînok*** *(çîrok), Weşanxaneya Lîsê, 2011*
***Namûsname*** *(roman), Weşanxaneya Aramê, 2012*
***Silava Bajariyan*** *(çîrok), Weşanxaneya Azad, 2013*
***Piling-Şoreşname-1*** *(roman), Weşanxaneya Arê, 2015*
*Sînor (roman), Weşanxaneya Aryenê, 2018*
***Hezar û Yek Şev-cild 1,2,3,4,*** *(Wergera ji Erebî-çîrok), Weşanxaneya Azad, 2018*
***Mîrê Monte Krîsto (Alexandre Dumas,*** *wergera ji Frensizî, roman), Weşanxaneya Azad*
***Helbestên Xezeblêhatî (Nizar Qebannî,*** *werger ji Erebî, helbest), Weşanxaneya Azad*
***Lênûska Leyla*** *(roman), Weşanxaneya Aramê, 2018*
***Cuhû - Sebareya Zindane 1*** *(roman), Weşanxaneya Sîtav, 2019*
***Sol*** *(Roman), Weşanxaneya Aryen, 2021*
***Hezar û Yek Şev-cild 5,6,7,8*** *(çîrok, werger ji Erebî), Weşanxaneya Azad, 2022*
***Hezar û Yek Şev-cild 9, 10, 11, 12*** *(çîrok, werger ji Erebî), Weşanxaneya Azad, 2023*

***Hin berhemên ku li bende çapê ne:***

***Antolojîya Ehmed Hilmî El-Qoxî El-Diyarbekirî****, Tîpguhêzî û berhevkirin*
***Baskên Şikestî*** *(roman-Cubran Xelîl Cubran), werger ji Erebî*
***Sêwî*** *(roman, Hektor Malot), werger ji Frensî*
***Belqîz****, (helbest-Nizar Qebbanî), werger ji Erebî*
***Çûkên Bêbask*** *(helbest-Mahmûd Derwîş) , werger ji Erebî*

# NAVEROK

PÊŞGOTIN ........................................................................................07

**HEZAR Û YEK ŞEV**

**CILD 9**

(DEWAMA ÇÎROKA KURÊ DANYAL/ÇÎROKA BELOQÎYA).............11
(ÇÎROKA XORTÊ DI NAVBERA HERDU GORAN DE RÛNIŞTÎ.......33
(DÛMAHIYA ÇÎROKA HASIB KERÎMIDÎN) ..........................................86
ÇÎROKA SENDÎBADÊ DERYAYÎ Û YÊ BARKÊŞ...................................97

**HEZAR Û YEK ŞEV**

**CILD 10**

DÛMAHÎYA ÇÎROKA SENDÎBADÊ DERYAYÎ Û BARKÊŞ ...............145
ÇÎROKA XELÎFE EBDULMELÎK BÎN MERWAN Û
QUMQUMÊN SULEYMANÎ..................................................................162
ÇÎROKA ŞEVDER KURÊ AMR Û HERDU BIRAYÊN WÎ ..................190
ÇÎROKA HARÛN REŞÎD Û KEÇA ŞAÎR................................................230
ÇÎROKA ESMAÎ Û HER SÊ KEÇIKAN..................................................233
ÇÎROKA CEMÎL BIN MÛEMER.............................................................236
ÇÎROKA HISÊNÊ TOLAZ.........................................................................243
ÇÎROKA EHMED DENEF, HESEN ŞOMAN Û ZEYNEBA DIZ ........247

**HEZAR Û YEK ŞEV**

**CILD 11**

ÇÎROKA ELÎ ZÎBEQÊ MISRÎ ...................................................................277
ÇÎROKA ŞAH MIHEMEDÊ BINSEBAÎK Û HESENÊ BAZIRGAN ..... 315

ÇÎROKA ŞAH ASIM BIN SEFWAN Û WEZÎRÊ WÎ FARIS BIN SALIH ........ 321
ÇÎROKA ŞÛRÊ ŞAHAN Û ZERÎYA ZÊRÎN ........ 333
ÇÎROKA HESENÊ ZÊRKER Û MIROVÊ MECÛSÎ ........ 374

**HEZAR Û YEK ŞEV**

**CILD 12**

ÇÎROKA HESENÊ ZÊRKER Û KEÇA ŞAHÊ CINAN ........ 397
ÇÎROKA MARÛFÊ KOŞKAR ........ 482
ÇÎROKA ÎSKENDERÊ ZULQERNEYN ........ 525
ÇÎROKA ENÛŞREWANÊ DADMEND ........ 526
ÇÎROKA MALIK BIN DÎNAR Û BENDEYÊ REŞ ........ 527
ÇÎROKA MIROVÊ SAÎDÎ Û JINA WÎ YA FRENGÎ ........ 529
ÇÎROKA MÎROVÊ BEXDAYÎ Û QERWAŞA WÎ ........ 533
ÇÎROKA XORTÊ DILDAR Û BRAHÎMÊ MÛSILÎ ........ 541
ÇÎROKA EBÛQÎR Û EBÛSÎR ........ 544
DÛMAHIYA ÇÎROKA MELÎK ŞEHRIYAR Û BIRÊ WÎ ŞAHZEMAN ........ 568
GOTINEKE DAWÎN Û SPASÎYEK JI WERGÊR ........ 571

**PÊVEK ........ 573**
- JI KITÊBA 1'EMÎN - HEZAR Û YEK ŞEV (CILD 1-2-3-4) ........ 573
  - NAVEROK ........ 575
  - PÊŞGOTINA WERGÊR (ya pirtûka 1emîn) ........ 577
  - JI WEŞANXANEYA AZAD (ya pirtûka 1emîn) ........ 583
- JI KITÊBA 2'YEMÎN - HEZAR Û YEK ŞEV (CILD 5-6-7-8) ........ 584
  - NAVEROK ........ 585
  - PÊŞGOTIN (ya pirtûka 2yemîn) ........ 589

# PÊŞGOTIN

Ev pirtûka 3yemîn ya HEZAR Û YEK ŞEVê ye, berê jî bi heman navî me 2 pirtûk çap kiribû. Di pirtûka yekemîn de cildê 1, 2, 3, 4 û di pirtûka duyemîn de cildê 5, 6, 7, 8 cih digirt; di vê pirtûkê de jî cildê 9, 10, 11, 12 heye. Yanî bi tevayî, berhema HEZAR Û YEK ŞEVê ji 12 cildan pêk tê û hezar û yek şev diqede.

Agahîyên gelemperî yê di derbarê vê berhema bi nav û deng de, di pêşgotîn û vegotinên wergêr yê pirtûkê berê de hatibûn îfadekirin. Wek ku tê zanîn, Menaf Osman ev berhem di zindanan de wergerandîye û keda gelek salan e. Menaf Osman di pêşgotin û nivîsên xwe yê ku di dawîya vê pirtûkê de, di beşa pêvekê de jî cih digre behsa vê xebatê û zehmetîyê wê ya di zindanê de kirîye. Ji bo ku bi serkeftin ev xebat qedandîye û kirîye ku ev berhema bêhempa di refên pirtûkxaneyên Kurdî de cih bigre, berî her tiştî em gelekî spasî Menaf Osman dikin. Wek ku me berê jî îfade kirîye, dosya destnivîs ji hepsê dihatin şandin, ji bo ev nivîs derbasî compîturê bibin gelek kesan alîkarî kirin; yek bi yek em spasî hemûyan dikin em dibêjin mala we gişa ava. Wekî din, di pirtûka duyemîn de, ji bo heqqê çapxaneyê Enstîtuya Kurdî ya Swîsreyê alîkarî kiribû, ji ber ku dema biryara alîkarîyê hate stendin mîzanpaj qedîyabû em niha vê didin xuyakirin û em gelekî spasî wan dikin.

Me di pêşgotinên berê de jî îfade kiribû, pirtûka bi navê "HEZAR EFSANE" bûye bingeh ji vê pirtûkê re, ev jî xebatek aryanî ye, îro ev nav di zimanê Kurdî û yê Farisî de jî tê bikaranîn. Weke gelek xebatên wêjeyî û çandî yê di dema Îslamê de, di vir de jî bandora çanda Aryanî pir hişkere ye, hem di çanda çîrokan de, hem di erdnîgarîya wan de. Lê bêgûman bi motîfên Îslamê gelek guhertin jî tê de çêbûne. Ev berhema ku ne ji alîyê nivîskarekî tenê ve hatiye nivîsandin, bi demê re, her herêm li gora xwe û felsefeya civata xwe hin tişt lê zêde kirine. Ez bixwe nizanim bê versîyonên din yê li pîyaseyên milletên din çawa ne, ev mijar bi serê xwe hewceyî lêkolînek

berfireh e ya ku bi salan dom bike. Le li gor vê xebata ku ji Erebî hatîye wergerandin, vegotin bi temamî li gor berjewendîya rêveberîya dewletên Îslamî têne xuyakirin û îfadeyên kêmxistina dînên din hene. Xuyaye, ji bo ku desthilatdarîya xwe bimeşînin, çîrok jî veguherandine û weke hedîsan, li gor berjewendiyên xwe şikil dane çîrokan jî… Ev mijar jî mijareke berfireh e, tenê min xwest ez balê bikşînim ser da ku dema hate xwendin mirov hay ji rewşê hebe…

Ji bo kesên ku pirtûkên berê bi dest wan nekeve zanibin bê di pirtûkên berê de çi hene, me di dawîya pirtûka duyemîn de pêvekek danîbû, di dawîya vê pirtûkê de jî pêvekek heye; di wan de wek danasîna pirtûkê berê pêşgotin û naverokê wan hene. Xwendevan bi riya van pêvekan, hindik be jî wê di derbarê vê berhemê de bi gelemperî bibin xwedî agahî.

Destpêka çîroka ewil ya vê pirtûkê (ya cilda 9emîn) di dawiya pirtûka 2yan de (cild 8) cih digre. Ji ber ku ev berhem ji 3 pirtûkan pêk tê û gelek çîrok bi hev ve girêdayî ne, yan berdewama hev in, bêgûman dema xwendevan ji pirtûka ewil dest bi xwendinê bikin wê baştir be. Me pirtûkên pêşî li ser înternetê bela kirine, loma bi rehetî û bê heq herkes dikare xwe bigihîne van berheman. Heman demê hin ji çîrokan ji alîyê Reşad Sorgul ve hatine xwendin û di youtubê de hatine belakirin, herkes dikare li wan guhdar jî bike. Ji bo van xebat û xizmeta ziman û çanda Kurdî em gelekî spasî Reşad Sorgul jî dikin.

Gerînendeya Weşanxaneya Azad
**Eslîxan Yildirim**

# HEZAR Û YEK ŞEV

## CILD 9

ŞEVA 485'AN

## (DEWAMA ÇÎROKA KURÊ DANYAL/ÇÎROKA BELOQÎYA)

*Şehrezadê got*:

Şahînşahê min ê gewre Şehreyarê bextewar; gava ku şahbanûya maran serpêhatîya Hasib Kerîmidîn bihîst, jê re got: Aram be û qet xeman nexwe, lewre ji xêrê pêve, li cem me tiştek nayê serê te. Lê ez ji te dixwazim, ku tu demekê li ba me bimînî, ji bo ku ez çîroka serpêhatîya xwe ji te re vebêjim û tu jî bibihîzî bê çi bûyerên sosret û ecêb bi serê min de hatine. Wî jî got: Ser seran, ser çavan, tu çawa dixwazî ez ê wisa tevbigerim.

Şahamaran got: Binêre Hasib, li welatê Misrê qralek ji Benî Îsraîl hebû, ku kurekî wî jî hebû bi navê Beloqîya. Qral bi xwe jî mirovekî zana, zanisthez û di rêya Xwedê de bû, îcar gava nexweş ket û hat ber mirinê, mezinên dewleta wî û rayedarên wî derketin cem wî, li dîwana wî kom bûn û silav lê kirin. Wî jî ji wan re got: Çûna min a ji vê dinyayê ber bi wê dinyayê ve nêzik bûye û tiştê min ê ku ez wesiyeta wî li we bikim, kurê min ê bi tenê ye. Ez dixwazim, ku hûn li Beloqîya miqate bin! Piştre eşheda xwe anî û çû ser dilovanîya Xwedê, wan jî ew şûştin, bi girseyî cenazeyê wî rakirin, ew veşartin û kurê wî Beloqîya jî li ser serê xwe kirin qral.

Beloqîya ji bo gelê xwe bû qralekî dadwer û qenc û bi adilî nêzî xelkê bû, alîkarî bi wan re kir û pirsgirêkên wan çareser kirin. Car ji caran jî Beloqîya diçû ser xezîneyên bavê xwe, ew vedikirin û li wan temaşe dikir. Carekê dîsa çû ser xezîneyekê, ew vekir, dît ku derîyek derket hemberî wî. Derî vekir û derbasî hundir bû, dît ku hêwaneke vala ye, stûneke mermer tê de ye û sindoqek ji zêr di hundire wê de ye. Ew jî vekir, dît ku pirtûkek tê de ye. Pirtûk vekir û xwend, dît ku pirtûk behsa mezyet û taybetmendîyên pêxember (silavên Xwedê li ser bin) dike. Ew pirtûk pir bandor lê kir û çend caran li ser hev xwend. Piştre gazî mezinên Benî Îsraîl û haxam û keşe û metranên wan kir, naveroka pirtûkê bi wan re parve kir û ji wan re got: Divê em meytê bavê min ji tirba wî derxin û bişewitînin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bedeng bû.*

## ŞEVA 486'AN

*Şehrezadê got*:

Gava ku Beloqîya ew gotin ji qewmê xwe re got, wan jî lê vegerandin û gotin: Çima tu yê wî bişewitînî? Beloqîya got: Ji ber ku wî ev pirtûk ji Tewratê û ji mishefa hezretî Îbrahîm derxistiye, xistiye sindoqekê û ji ber me gişan veşartiye, bêyî ku nîşanî kesî ji me bide.

Wan jî lê vegarand û got: Qralê me yê gewre û hêja! Bavê te, jixwe miriye û çûye ber destê Rebê xwe, tu yê çima wî ji gora wî derxî, em ji te tika dikin, wî ji gora wî dernexe û bila giyanê wî aciz nebe.

Beloqîya têgîhişt, ku Benî Îsraîl destûra wî tiştî nadin wî û rabû, çû cem diya xwe; jê re got: Dayêcan, min di nava xezîneyên bavê xwe de pirtûkek dît, ku behsa hatina pêxemberekî bi navê Mihemed dike û mezyetên wî vedibêje. Min pir jê hez kir û dilê min bi ser ve çû. Ez dixwazim herim li hemû welatan bigerim, hetanî ku ez lê rast bêm û wî bibînim; nexwe ez ê ji ber evîna wî bimirim.

Piştre rabû ser xwe, kincên qraltîyê ji ser xwe avetin û ebayekî ji rîs li xwe kir û ji diya xwe re got: Min ji bîr neke dayê û duayan ji min re bike. Diya wî got: Û piştî çûna te, em ê çawa bikin kure min? Beloqîya got: Êdî sebir bi min re nema û min emrê Xwe û te spart Xwedê.

Beloqîya ji malê derket û berê xwe da Şamê, bêyî ku kesî ji qewmê xwe agahdar bike. Meşîya û hey meşîya hetanî ku gihîşt qeraxa deryayê. Li wir keştîyek dît, çû lê siwar bû. Keştî bi rê ket, meşîya û nesekinî, hetanî ku gihîşt giravekê. Li wir sekinî, rêwî peya bûn, Beloqîya jî bi wan re daket; piştre ji wan veqetîya û çû li binê darekê rûnişt. Ponijî, xewê zora wî bir, raket. Gava ji xew rabû û bi ser hîşê xwe ve hat, ji bo ku here li keştîyê siwar bibe livîya, dît ku keştî bi rê ketîye û ji benderê jî dûr ketîye.

Beloqîya, li ser giravê girîya, dît ku tijî marên mezin û dirêj in, mîna darên xurmeyan pir xweşik in û hemû tev de bi navê Xwedê bang didin û selewatan li ser Muhemedê pêxember didin, di nava xiroş û îbadeteke bêtimtêl de! Beloqîya li hemberî vê dîmenê şaşwaz bû!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 487'AN

*Şehrezadê got*:

Beloqîya bi dîtina wan maran şaşwaz bû. Lê ew jî çawa ku çav li wî ketin, lê hatin hev, li dora wi xelekek çêkirin û jê re gotin: Tu kî yî, tu ji ku derê têyî, navê te çi ye û tu yê bi ku ve herî? Beloqîya got: Navê min Beloqîya ye, ez ji Benî Îsraîl im û ez li ser hezkirina Muhemedê pêxember ji malê derketim, bi hêvîya ku ez wî bibînim. Lê gelo hûn kî ne, ey afirîndeyên pîroz? Maran lê vegerandin û gotin: Em xelkên dojehê ne û Xwedayê gewre em afirandine. Ji bo ku em tolê ji kafiran rakin. Beloqîya got û hûn hatine vira çi? Maran gotin: Beloqîya, divê tu bizanibî, ku dojeh ji ber kela nava xwe salê du caran hulma xwe berdide; carekê di havînê de û carekê di zivistanê de. Vêca gava hulma xwe berdide, ji ber ku em hûrik in, em bi hilma wê re derdikevin derve, gava hulma xwe digire jî, em dîsa bi hulma wê re dikevin hundir.

Beloqîya got: Gelo di hundirê dojehê de marên ji we mezintir hene? Maran got: Ji ber ku em pir hurik in, em bi hulma wê re derdikevin, marin li dojehê hene, ku me di pozê xwe re davêjin, bêyî ku bi me bihesin jî. Beloqîya ji maran re got: Hûn navê Xwedê bi lêv dikin, selewatan li ser pêxemberê Xwedê Muhemed (silavên Xwedê lê bin) dixwînin, gelo hûn wî ji ku nas dikin? Maran gotin: Navê Muhemed li ser derîyê bihuştê nivîsandî ye û heger ne ji bo xatirê wî bûya, Xwedayê gewre ne bihuşt çêdikir ne agir ne asîman û ne jî erd. Xweda hemû afirînde ji bo xatirê Muhemed (Silavên Xwedê li ser bin) afirandine. Loma li her derê navê xwe û wî li gel hev bi kar anîye, ji ber vê yekê em jî ji hezretî Muhemed hez dikin.

Gava ku Beloqîya ev gotin ji devê wan bihîstin, hezkirina wî ya ji hezretî Muhemed zêdetir bû û daxwaza dîtina wî hîn geştir bû û meşîya, berê xwe da peravê. Gava gihîşt wir, dît ku keştîyek li benderê sekinîye. Ew jî bi rêwîyan re lê siwar bû û li gel wan bi rê ket, çû.

Keştîyê meşa xwe di avê de berdewam kir, hetanî ku gihîşt giraveke din. Li wir, ji keştîyê peya bû û bi qasî saetekê li ser bejahîya giravê gerîya, dît ku tijî marên biçûk û mezin in, ku nayên jimartin. Di nava wan maran de yeke spî mîna camê hebû û di nava sênîyeke zêrîn de rûniştî bû û ew sênî jî li ser pişta marekî pir mezin bû, ku mîna fîlekî bû. Ew mara hanê jî Şahmaran bû û ew mar ez bi xwe bûm, Hasib!

Hasib ji şaha maran ango Şahmaranê pirsî û got: Te û Beloqîya çi got ji hev re? Şahmaranê got: Gava min Beloqîya dît, min silavek dayê, wî jî silava

min vegerand. Min jê re got: Tu kî yî, tu li çi digerî, ji ku têyî û diçî ku? Got: Ez ji Benî Îsraîl im, navê min Beloqîya ye, ez hezkirîyê hezretî Muhemed im û li pey wî digerim, lewre min pirtûkên pîroz xwendine û di wan pirtûkan de ez li wesf û mezyetên wî rast hatime.

Piştre axaftina xwe berdewam kir û ji min pirsî, got: Tu çi yî, li çi digerî û ev marên li derdora te çi dikin? Min jê re got: Ey Beloqîya, ez şaha maran im û heger te Muhemed dît, silavên min lê bike. Piştre Beloqîya dîsa li keştîya xwe siwar bû û çû Qudsê. Îcar li Qudsê jî mirovekî pir zana hebû, ku endezyarî, stêrknasî, geometrî, kîmyazanî, gîhazanî û Încîl û Zebûr û mishefên Îbrahîm giş dixwendin û pirtûkek li gel wî hebû, ku tê de digot, kesê ku hungulîska mîrzayê me Suleyman têxe destê xwe, dê hemû ins û cin û teyr û tilûr û afirînde bikevin bin fermana wî û bi ya wî bikin. Di hinek pirtûkan de jî dîtibû, ku gava mîrzayê me Suleyman çûbû ser dilovanîya Xwedê û ew xistibûn tabûtê û ew di heft deryayan re derbas kiribûn jî, ew hungulîsk hîna jî di destê wî de bû û tu kesî ji ins û cinan nikaribû ew hungulîsk ji destê wî derxista û tu kesî ji xwedîyên keştîyan jî nikaribû biçûya wê devera ku ew lê…

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 488'AN

*Şehrezadê got*:

Şahmaranê vegotina serborîya xwe ji Hasib re berdewam kir: Îcar ew Efanê ku me behsa wî kir, di hinek pirtûkan de xwendibû û pê hesîyabû, ku di nava cureyên gîhayan de

gîhayek heye, ku heger yek wî biguvêşe, ava wî bigire û di binê nigê xwe bide, dê bikaribê li ser rûyê hemû deryayan bimeşe, bêyî ku binê nigên wî şil bibin. Lê belê tu kes nikare vê yekê pêk bîne, heger Şahmaran ne pê re be.

Vêca gava Beloqîya ket Qudsê, çû Beytil Meqdîs (mala pîroz) û li goşeyekî wê rûnişt, îbadet ji Xwedayê xwe re kir. Dema ku wî wisa ji xwe re îbadet dikir, Efan çû cem wî û silavek dayê, wî jî silava wî vegerand.

Dema Efan dît ku Beloqîya Tewratê dixwîne û îbadetê ji Xwedayê xwe re dike, xwe nêzî wî kir û jê pirsî, got: Mirovê hêja gelo navê te çi ye, tu ji ku têyî û berê te li ku ye? Wî jî got: Navê min Beloqîya ye, ez ji Misrê me û li pey hezretî Muhemed digerim.

Efan jê re got: Ka rabe ser xwe û were mala min, li cem min bibe mêvan! Beloqîya lê vegerand û got: Bila be, ser seran, ser çavan.

Efan bi destê Beloqîya girt, ew bir mala xwe, pir qîmeta wî girt. Piştre jê re got: Ka ji min re bibêje, bê te çawa Muhemed nas kir, ku te ew qasî jê hez kir û tu li ser van rêyan ketî pey wî?

Beloqîya çîroka xwe ji serî hetanî binî je re vegot û ta bi derzîyê ve kir. Îcar dema ku Efan serpêhatîya wî guhdar kir, şaşwaz bû, hindik mabû, ku ji ber ecêbmayînê hişê xwe wenda bike. Rabû jê re got: Ka min jî bibe cem Şahmaranê, ez ê jî te bibim cem Muhemed. Lewre zemanê hatina wî dûr e û heger em Şahmaranê bixin destê xwe, em ê wê bixin qefesekê û wê bibin çol û çiyayan, bikevin pey teşeyên gîhayan, yeko yeko wan nîşanî Şahmaranê bidin û ew ê jî wan gîhayan bi me bide naskirin û çi fêde tê de heye, ji me re rave bike. Di pirtûkên li gel min de, mijarek heye; dibêje, gîhayek heye, ku were kutan û guvaştin, av û dohnê wî were girtin û mirov di binê nigên xwe bide, mirov dikare li ser ava hemû deryayan bimeşe, bêyî ku binê nigê mirov şil bibe. Lê heger em Şahmaranê bigirin, ew ê wî gîhayî nîşanî me bide. Ku me gîha jî bi dest xist, em ê ava wî bigirin, li bin nigên xwe bidin û di ser heft deryayan re derbas bibin, herin ser gora hezretî Suleyman, hungulîska di destê wî de derînin û em ê bibin serwerên mîna wî û bigihîjin meqseda xwe. Piştre em ê herin derbasî tarîderyayê bibin û ji ava heyatê vexwin, da ku em derkevin derveyî hukmê mirinê û bi hezretî Muhemed re bicivin, werin gel hev.

Piştî ku Beloqîya ev gotina Efan guhdar kir, jê re got: Binêre Efan, ez ê te bibim cem Şahmaranê û cihê wê nîşanî te bidim lê tu jî xwedîyê soza xwe bî. Efan, pesend kir û soz da. Piştre rabû ser xwe, qefeseke hesinî çêkir û du qedeh jî anîn; yek tije mey kir, a din jî tije dew kir. Piştre ew û Beloqîya bi hev re ketin rê û şevûroj meşîyan hetanî ku xwe gihandin wê girava ku Şahmaran lê bû. Herdu bi hev re li giravê gerîyan û di pey re hatin li cihekî rawestîyan. Efan qefesa hesinî li wir danî û xefikek li ber veda.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 489’AN

*Şehrezade got*:

Efan xefikek li ber qefesê veda, herdu qedehên dew û meyê xistin hundirê qefesê, tê de danîn û xwe jê dûr xistin, bi qasî saetekê xwe ragirtin.

Şahmaran hat ba qefesê, xwe nêzî herdu qedehan kir û bi qasî saetekê li wan nêrî. Gava bêhna dew hat wê, ji sênîka zêrîn derket û ji ser pişta zîhayê mezin peya bû, daket erdê û çû derbasî hundirê qefesê bû û qedeha ku mey têde bû, vexwar. Meyê hişê wê ji serê wê bir û di xew re çû, raza. Efanê ku ji dûr ve çavdêrîya wê dikir, çawa dît ku Şahmaranê di xew re çû, hat ser qefesê û derîyê wê li ser Şahmaranê girt. Piştre wî û Beloqîya bi hev re rahiştin qefesê û dan rê, çûn.

Gava Şahmaran bi ser hişê xwe hat û ji xew şiyar bû, dît ku di qefeseke hesinî de ye û li ser serê mirovekî ye, ku Beloqîya jî li gel wî dimeşe. Bi zimanekî lomekar ji Beloqîya re got: Cezayê qencîya ku min bi te kir ev bû? Beloqîya lê vegerand û got: Metirse, em tu zerarê nadin te ey Şahmaran! Tenê em ji te dixwazin, ku tu gîhayekî nîşanî me bidî; gîhayekî ku gava mirov ava wî di binê nigê xwe dide, mirov dikare li ser ava hemû deryayan bimeşe. Beyî ku binê nigê mirov şil bibe. Heger te ew gîha nîşanî me da, em ê dîsa te vegerînin cihê te û te azad berdin. Wê jî got: Bila be.

Efan û Beloqîya Şahmaran bi xwe re birin û berê xwe dan çiya û beyaran, di nava gul û çîçek û gîhayan re meşîyan. Di ber kîjan gîhayî re derbas bibûna, bi emrê Xwedê ew gîha bi wan re diaxivî û fêdeyên ku tê de hebûn ji wan re digot. Ew dimeşîyan û gîhayan jî ji çep û rastê wan dengê xwe bilind dikirin, bi wan re diaxivîn. Meşa xwe wisa berdewam kirin hetanî ku gîhayek bi wan re axivî û got: Kesê ku min bikute, biguvêşe û ava min di nigên xwe bide, dê bikaribe li ser rûyê ava hemû deryayan bimeşe, beyî ku nigên wan şil bibin.

Çawa ku Efan ew gotin bihîstin, rawestîya, qefesa li ser serê xwe danî erdê û bi qasî ku têra wî û Beloqîya bike ji wî gîhayî çinî, kuta, guvaşt û ava wî derxist, xist du şûşeyan, devê wan girêda, ew li ba xwe hilanîn. Pîştre rahiştin qefesê û ketin ser rêya vegerê, bi şev û roj meşîyan, hetanî ku xwe gihandin girava Şahmaranê. Li wir devê qefesê vekirin û Şahmaran berdan. Şahmaran çawa ji qefesê derket, ji wan re got: Hûn ê çi bikin bi wê avê? Wan lê vegerand û got: Em dixwazin wê di binê nigên xwe bidin, ji bo ku em her heft deryayan derbas bikin, xwe bigihînin gora hezretî Suleyman û em hungulîska wî derxînin, bigirin cem xwe.

Şahmaranê got: Heyhat ku hûn bikaribin hungulîska wî bi dest bixin! Wan jî pirsîn: Çima em nikarin? Şahmaranê got: Ji ber ku Xwedayê gewre ew hungulîsk bi taybetî dîyarî mîrzayê me Suleyman kiribû û ji kesî din re nabe, vêca hûn û wê hungulîskê? Hilmek kişand û axaftina xwe berdewam

kir, got: Gîhayekî din hebû, heger we ew bianîya dê ji we re çêtir bûya. Lewre kesê ku ji wî gîhayî bixwe, nema dimre hetanî roja qiyametê. Ew gîhayê hanê ji we re çêtir bû, lewre evê hanê we nagihîne meqseda we. Gava ku herduyan ev gotin bihîstin, pir poşman bûn û bi rêya xwe de çûn.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 490'Î

*Şehrezadê got*:

Piştî ku Efan û Beloqîya bi rêya xwe de çûn, Şahmaran jî vegerîya nav leşkerên xwe, dît ku pergala wan xera bûye, leşkerên xurt qels bûne û yên qelsok jî mirine. Lê gava ku dîtin şahbanûya wan dîsa li wan vegerîyaye, li dora wê kom bûn û pir pê kefxweş û şa bûn; jê re gotin: Tu li ku bûyî û çi qewimî gelo?

Şahmaranê serpêhatîya xwe û Efan û Beloqîya ji wan re vegot û piştre leşkerên xwe giş komî ser hev kirin û berê xwe dan Çiyayê Qahf, lewre zivistana xwe li wir derbas dikir û havîna xwe jî li cihê ku Hasib Kerîmidin lê dîtibû.

Piştre Şahmaranê ji Hasib re got: Îcar çîroka serpêhatîya min ev bû û tiştên ku bi serê min de hatin jî ev bûn! Hasib pir ecebmayî ma û jê re got: Ez dixwazim ku tu leşkerekî xwe bidî rex min, da ku bide pêşîya min û min derxe ser rûyê erdê, bo ku ez herim cem nas û malbata xwe. Şahmaranê got: Çûna te ji vir ne gengaz e, hetanî ku zivistan neyê û tu bi me re neyêyî Çiyayê Qahf. Li wir tu yê bibînî, ku hemû gir û newal û dar û ber û teyr û tilûr hemû bi navê Xwedê diaxivin û jê re îbadetê dikin. Li wir tu yê ji xwe re li ew qas efrît û cin û ins temaşe bikî, ku bê hed û bê hisab in.

Hasib Kerîmidîn bi wê gotina wê xemgîn bû û dilê wî tijî kul û keder bûn. Piştre jê pirsî û got: Gelo Efan û Beloqîya bi ku ve çûn? Gelo wan her heft derya derbas kirin û xwe gihandin gora mîrzayê me Suleyman an na? Û heger xwe gihandibin gora wî, gelo karibûn hungulîska wî bibin an na?

Şahmaranê got: Piştî ku Efan û Beloqîya ji min veqetîyan, çûn ber avê û ava wî gîhayî di binê nigên xwe dan. Piştre di ser avê re meşîyan û derya bi derya geîyan, ji xwe re li ecêbên dinyayê temaşe kirin. Piştî ku her heft derya derbas kirin, çiyayêkî pir bilind derket peşîya wan, ku ji zumrudê kesk bû û kanîyek jê diherikî, ku bêhna miskê jê difurîya. Gava gihîştin wir, dilşa bûn û

gotin: Va ye em gihîştin meqseda xwe. Piştre pê de meşîyan, hetanî ku gihîştin girekî bilind. Bi wî de jî meşîyan, hetanî ku gihîştin şikeftekê, ku qubeyek li ser bû û ji dûr ve nûr jê dibarîya. Berê xwe dan wê şikeftê û çûn derbasî hundirê wê bûn, dîtin ku textekî ji zêr tê de vegirtî ye, ku bi gelek cureyên gewheran neqişandî ye û gelek kursî li dora wî rêzkirî ne, ku ji Xwedê pê vet u kes nikare wan bijimêre. Li wir dîtin, ku mîrzayê me Suleyman jî li ser wî textî raketî ye û kirasekî ji hevrîşimê kesk li ser wî ye, ku bi zêr û gewher û madenên giranbuha jî xemilandî bû. Destê wî yê rastê li ser singê wî bû û hungulîska wî jî di tilîya wî de bû. Şewqa hungulîska wî ji ya hemû gewherên li wir xurtir bû. Efan derbarê tiştinan de ji Beloqîya re hinek danasîn kirin, piştre lê zêde kir û got: A ji te re, tu jî vê beşa pirtûkê bixwîne û nesekine hetanî ku ez hungulîskê ji destê wî derxim! Di pey re jî ber bi text ve çû, hetanî ku xwe nêzî wî kir. Wê gavê, ji nişkê ve zîhayekî maran ji bin textê wî derket û qîrek da, ku ew dever giş ji ber dengê wî hejîya û çirûskên agir di devê wî re avêtin. Piştre wî zîhayî ji Efan re got: Heger tu bi şûn de neçî, ez ê te bikujim! Lê Efan bi karê xwe re mijûl bû, bêyî ku ji wî marê mezin bitirse. Mar, hulmek agirîn bi ser de berda, ku hindik mabû wê deverê gişî bişevitîne û jê re dubare kir, got: Heger tu bi şûn de neçî, ez ê te bişewitînim!

Bi wê hişyarîya mar re, Beloqîya ji şikeftê derket. Lê Efan dîsa guh neda hişyarîya mar û ber bi Suleyman ve çû, destê xwe dirêjî hungulîska wî kir. Gava ku bi hungulîskê girt û hewl da, ku ji destê wî derxîne, mar bi ser Efan de agir barand û ew kir qitikek arî.

Beloqîya jî wê kêlîkê şoq bû û ji ser hişê xwe çû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 491'Ê

*Şehrezadê got*:

Di wê navberê de, Xwedayê gewre ferman da cibrîl, bo ku bi lez dakeve erdê. Çawa daket, dît ku Beloqîya ji ser hişê xwe çûye, li erdê dirêj bûye û Efan ji ber hilma mar şewitîye, bûye arî. Cibrîl hat ber serê Beloqîya, ew şîyar kir, silavek lê da û jê pirsî, got: Tu ji ku hatîyî vê deverê?

Beloqîya, çîroka xwe ji serî hetanî binê jê re vegot û lê zêde kir, got: Tenê ji bo dîtina pêxemberê zemanan, Muhemed eleyhîselam ez hatim vê derê; lewre Efan ji min re got, ku ew ê di dawîya zeman de were şandin û

incex kesê heta wê çaxê bijîn, dê bikaribin wî bibînin û ev kes jî incex ava heyatê vexwin. Lê ji bo ku mirov ava heyatê vexwe jî, divê ku mirov hungulîska mîrzayê me Suleyman bi dest bixe, loma ez pêre hatim vê derê û ew bobelat bi serê wî de hat, şewitî û ez jê filitîm. Niha jî ez dixwazim tu ji min re bibêjî, bê hezretî Muhemed li ku ye? Cibrîl jê re got: Ey Beloqîya, rabe bi rêya xwe de here, zemanê hatina Muhemed hîna pir dûr e.

Çawa ku ew gotina xwe qedand, cibrîl dîsa bi ezmanan ket, bilind bû, çû. Beloqîya jî dest bi girî kir, li wî tiştê ku kir poşman bû û gotina Şahmaranê hat bîra wî, ku jê re gotibû, "Tu kes nikare wê hungulîskê ji destê wî bigire!" û pir lê ecêbmayî ma! Kûrekûr pê ket, dîsa girîya û ji serê gir xwe berjêr berda, daket û meşîya hetanî ku gihîşt qiraxa avê, li wir rûnişt û bi heyrangorî li wan çiya û derya û giravan nêrî, bêyî razên wan fêm bike!

*Li Şehrezadê bû sibe*, *wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû*.

## ŞEVA 492'YAN

*Şehrezade got*:

Beloqîya, wê şevê li wir raket û gava bû sibe, avgîha di binê nigên xwe da û dest bi meşa xwe ya di ser deryayê re kir. Li gel temaşekirina dimenên balkêş û ecêb ên di nava avê de bi şev û rojan meşa xwe berdewam kir. Piştî meşeke dûdirêj gihîşt giraveke pir xweş, ku mîna bihuştê bû. Beloqîya derket ser bejahîya wê giravê û li dîmenên newaze temaşe kir. Giraveke ew qasî balkêş bû, ku axa wê zeferan, kevirên wê yaqût û maden, hejikên wê yasemîn û rihan û şînkahîya wê ji şîndarên herî xweş bûn. Kanîyên wê bi ava zemzemê diherikîn, erda wê bi zilên şekir raxistî bû û dora wan giş bi nêrgiz, amber, binefş, sosin, le'l, sewsen û şimamokan rapêçayî bû. Di nava reng û mengan de dilîst. Teyr û tilûrên cur bi cur li ser şaxên daran dixwendin, li ser her meqamî. Ajalan jî bi kêf û şahî cirîd lê diavêtin, di nava aramîyeke bêtimtêl de, çi kar û xezal, çi pezkovî û keroşka bêmecal.

Beloqîya bi wan dîmenan şaşwaz bû û tê derxist, ku rêya xwe şaş kiriye, lewre rêya ku ew û Efan tê re hatibûn, ne ew bû. Hetanî êvarê di nava wê girava bihuştdîmen de gerîya û li spehîtîyên wê temaşe kir. Gava şev ket erdê jî, hilkişîya ser darekê, da ku li ser rakeve. Cihê xwe xweş kir û li ser xweşikbûna wê giravê ramîya, ket nava kûrahîyekê. Lê ji nişkê ve gumegum û şingeşing û reqereqek bi behrê ket, ew ji wan fikarên wî veqetand. Bala

xwe da behrê, dît ku ajalekî ecêb, weke dêwekî ji nav avê derket û bi dengekî ecêb qîrîya, bi wî dengê xwe hemû ajalên giravê aciz kirin.

Beloqîya ji ser wê darê bi şaşwazî li wî ajalê gewre temaşe dikir. Carekê dît, ku bi qefleyan ajalên cur bi cur ji nav behrê derdikevin û bir bi bir li pey wî dêwî tên. Ajalin jê bi rengên cur bi cur ku mîna cewheran dibiriqandin û şewq didan mîna çirayan.

Di nava katjimêrekê de, bê hed û hesab, jimareke mezin ji ajalan, derketin ser wê giravê. Gava hinekî din ber bi wî ve hatin û nêzikî wî bûn, Beloqîya dît ku ew ajal hemû şêr û piling û keftar û gur û hirç û xezal û hesp û ker in. Herî dawiyê jî, hemû ajalên bejahîyê li qiraxa giravê li gel ajalên deryayê kom bûn û bi hev re axivîn hetanî sibehê.

Sibehê gava rojê tîrêjên xwe avêtin ser rûyê erdê û dinya ronî bû, hemû ji hev bela bûn û her yek ji wan bi rêya xwe de çû. Beloqîya jî wê çaxê ji ser dara xwe daket jêr, meşîya hetanî ber qiraxa avê. Piştre binê nigên xwe don kir, avgîha tê da û dest bi meşa xwe ya di ser deryayê re kir. Bi şev û bi roj meşîya hetanî xwe gihand çiyayekî mezin û pir bilind, ku di binîya wî re jî newaleke bêbinî hebû. Vêca kevirên wê newalê jî meqnetîz bûn û ajalên wî jî ji şêr û piling û kîvroşkên bêjimar bûn.

Beloqîya, hilkişîya ser wî çiyayî û hetanî êvarê li wê derê gerîya. Gava roj çû ava jî, daket qiraxa deryayê, li wir xwe da ber kendalekî û rûnişt. Li wê deverê, hinek masîyên hişk î ku behr wan davêje wir dîtin û bi wan xurînîya xwe şikand, ber dilê xwe girt.

Hîna ew wisa rûniştî bû û ji xwe re masîyên hişk dixwarin, pilingekî gir û dirinde bi ser Beloqîya de hat û xwest ku wî bixwe. Dema Beloqîya çav li wê talûkeyê ket, avgiha di binê nigên xwe da û ket ser rûyê ava deryaya seyemîn, meşîya, çû ji ber piling revîya. Şeveke bi ba û bahoz bû û tarîyeke pir reş ku çavên mirov hittim dikir hebû.

Meşa xwe bê navber berdewam kir, hetanî ku gihîşt giraveke din. Derket ser bejahîya wê giravê û li ser gerîya, dît ku darin şîn û hinek hişk lê hene. Beloqîya çû ser darên şîn û li nav pel û şaxên wan gerîya, ber kom kirin û xwarin, birçîbûna nava xwe şikand. Piştre li seranserê giravê gerîya, li xweşikbûnên wê temaşe kir, pê kêfxweş bû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 493'YAN

*Şehrezadê got:*

Beloqîya hetanî êvarê li wê giravê gerîya û gava şev ket erdê, li wir raket. Sibehê dîsa rabû ser xwe û temaşekirina derdorê berdewam kir, hetanî êvar û roja din dîsa bi wî hawayî raçavkirinên xwe berdewam kir, hetanî deh rojan. Piştre dîsa çû qiraxa avê û bi wê avgîhaya efsûnî binê nigên xwe dohn kir û derbasî deryaya çaremîn bû, meşa xwe ya li ser avê berdewam kir, piştî rêwîtîyeke dirêj ku bi deh rojan kişand, xwe gihand giravekê ku axa wê ji qûma spî bû û ne şînkahî lê hebû ne jî dar û ber. Bi qasî saetekê lê gerîya, dît ku tenê teyrên dirinde tê de hene û hêlînên xwe di nava wê qûmê de çêkirine.

Piştre dîsa avgîha di binê nigên xwe da û li ser deryaya pêncemîn meşîya, rêwîtîya xwe berdewam kir, bi roj û şev hetanî ku gihîşt giraveke biçûk, ku çiya û axa wê mîna camê bûn. Di nava wê camê de jî rehên madenî hebûn, ku zêr jê dihat derxistin û şîndarin ecêb lê hebûn, ku di rêwîtîya xwe gişî de tiştexî wisa nedîtibû. Gul û çîçekên wê darê jî zerrengî bûn.

Beloqîya hetanî êvarê li ser wê giravê gerîya û li dîmenên wê temaşe kir. Gava tarî ket erdê û şevê baskên xwe avêtin ser giravê, gul û çîçekên wê jî mîna stêrkan şewq dan. Beloqîya li hemberî wê dîmenê şaşwaz bû û got: Beguman gul û çîçekên li vê giravê, ew pelên rokê yên ku hişk dibin û dikevin vir, ba jî li wan dide û wan di binê keviran de kom dike û ew jî di wir de dibin îksîr, mirov jî wê îksîrê dibin û zêr jê çêdikin.

Beloqîya li wê giravê raket û sibehê bi derketina tava rokê re binê nigên xwe dohn kir û da ser rûyê ava deryaya şeşan. Rêwîtîya xwe berdewam kir, bi şev û roj meşîya, heta ku gihîşt gîravekê. Derket ser bejahîya wê û bi qasî saetekê li ser gerîya, du çiya dîtin, ku ser wan tijî dar û ber bûn; fêkîyên wan daran jî mîna serê mirovan bûn, ku ji porê xwe ve daleqandî bin. Fêkîyên hinek daran jî mîna çûkan bûn, ku keskereng bûn û ji nigên xwe ve daleqandî bûn. Hinek ji darên wê giravê jî mina agir dadayî bûn û fêkîyên wan weke sebrê bûn, ku her cara dilopek ji wan fêkîyan bi ser kê de biketa, dişewitand. Fekîyên hinek daran jî digirîyan, ên hinekan dikenîyan û yên hinekan jî mehdedayî bûn.

Beloqîya pir şaşwaz û ecêbmayî mabû bi wan tiştên nedîtî. Meşa xwe berdewam kir, hetanî ku gihîşt qiraxa deryayê. Li wê derê şîndareke pir mezin dît. Xwe da bin sîya wê û li wir rûnişt, ma hetanî êvarê. Gava tarî ket erdê, Beloqîya çû ser darê û li ser afirîndeyên Yezdanê dilovan ramîya û ponijî.

Hîna ew di nava wê ponijandinê de bû, bala xwe dayê ku pêl bilind dibin û derya li hev dikeve. Piştre keçikên deryayê ji nav avê derketin û her yek ji wan jî cewherek di destê wan de bû, weke findekê şewq didan, diçirûsîn.

Hemû keçên deryayê bi hev re rûniştin, rabûn, lîstin, şa bûn û kêfa xwe kirin. Beloqîya jî li wan temaşe dikir û ji dîtina wan keçikan têr nedibû, kêf û şahîya xwe hetanî sibehê berdewam kirin û bi derketina tava rojê re, dîsa vegerîyan deryayê û ji ber çavan wenda bûn.

Gava keçik di nava avê de wenda bûn, Beloqîya jî ji ser darê daket erdê, binê nigên xwe dohn kir, avgîha tê da û xwe bera ser ava deryaya heftemîn da, bi rê ket û rêwîtîya xwe berdewam kir. Şev û roj meşîya, bi qasî du mehan, bêyî ku çav li giravekê, çiyayekî yan jî bejahîyakê bikeve. Beloqîya, di wê meşa dûdirêj de gelek êş û azar kişandin û ew qasî birçîbûn kişand, ku hema xwe çeng dikir masîyên nav avê, ew digirtin û xav xav dixwarin…

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 494'AN

*Şehrezadê got:*

Beloqîya, bi zor û zehmetîyeke mezin meşa xwe berdewam kir, hetanî xwe gihand giraveke bi dar û ber, ku kanî û cowar ji her derên wê diherikîn. Derket ser bejahîya giravê, pê de çû û li çep û rastê xwe temaşe kir, hetanî ku rastî dareke sêvan hat. Destê xwe dirêjî darê kir, ji bo ku sêvekê ji xwe re jêbike, bixwe. Lê hîna bi şaxê darê negirtibû, yekî ji ser darê gazî wî kir û jê re got: Heger tu destê xwe bavêjî vê darê û tiştekî jê bixwî, ez ê te bikim du perçe!

Beloqîya serê xwe ber bi jor ve rakir, lê mêzand, dît ku zilamekî dirêj, weke dêwekî ye; bejna wî bi dirêjahîya milên mirovên wê serdemê çil gaz hebû. Beloqîya jê pir tirsîya û ji wê darê dûr ket. Piştre jê re got: Çima tu nahêlî ku ez ji vê darê sêvan bixwim? Mirovê dêw got: Ji ber ku bapîrê te Adem, peymana ku bi Xwedayê xwe re danîbû, ji bîr kiribû û ji vê darê xwaribû. Beloqîya got: Tu kî yî, navê te çi ye û ev dar û ev girav ên kê ne? Dêw got: Navê min Şerahîya ye, ev dar û ev girav jî milkê qral Saxr in. Ez jî wekîlê wî û berpirsîyarê vê giravê me, ez alîkarîya wî dikim. Piştre wî bi xwe jî pirsek ji Beloqîya kir û got: Lê tu kî yî û tu ji ku hatiyî vir? Beloqîya ta bi derzîyê vekir û çîroka serborîya xwe ji serî hetanî binî jê re vegot. Şerahîya

jê re got: Metirse! Piştre hinek xwarin anî, danî ber wî. Beloqîya jî xwarina xwe xwar û piştre xatir jê xwest û rêya xwe berdewam kir.

Beloqîya bi qasî deh rojan di nava çiyayan û erdeke qûm re meşîya. Vêca hîna ew wisa dimeşîya, toz û ecaceke ku bi hewa diket, bala wî kişand. Berê xwe da wê ecacê û pêş de çû, li newaleke kûr qelibî, ku bi dirêjahîya meşa du mehan bû û dengê hîrehîr û qîrewîreke pir mezin jê dihat. Dema hinekî din jî ber bi wî dengî ve çû, dît ku bi hezaran mirov di paxila hev de ne, pev re şer dikin û xwîna ku ji wan dirije, mîna çemekî diherike, bi rê ve diçe. Waqewaqên wan mîna tav û birqan li hev vedigerîyan û di binê dolê de olan didan. Hemû çekdar bûn, di destên wan de rim û şûr û mertal diçirûsîn û virevira tîr û kevanan dihat. Beloqîya, pir tirsîya…

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 495'AN

*Şehrezadê got:*

Gava Beloqîya ew mirovên çekdar di nava wî şer û wê cenga giran de dîtin, pir tirsîya û nema dizanibû wê çi bike, çawa bike! Hîna ku ew di nava wê heyirînê de bû, wan ew dît û çawa ew dîtin, şûrên xwe danîn û şerê di navbera xwe de dan ravestandin. Piştre hinek ji wan hatin gel wî û gava ji nêz ve lê nêrîn, li dirûvê wî ecêbmayî man. Siwarek ji wan ber bi wî ve hat û jê re got, tu çi yî, tu ji ku yî û ji ku hatiyî, kê vira nîşanî te daye û tu yê bi ku ve biçî? Beloqîya lê vegerand û got: Ez însan im, ji neslê Adem im û ji ber hezkirna hezretî Muhemed ketime rê û li pey wî digerim. Lê min rê şaş kir û ez di vir re derketim. Siwar jê re got: Me hetanî niha ji neslê Adem tu kes li ser rûyê erdê nedîtîye! Hemû jiber dirûvê Beloqîya û axaftina wî, pir şaşwaz bûbûn.

Îcar Beloqîya ji wan pirsî û got: Hûn ji kîjan mexlûqatan in? Siwar got: Em cinî ne. Beloqîya got: Ey siwarê hêja, gelo ji ber çi we bi hev re şer dikir, malên wê li ku ne û navê vê erdê û vê newalê çi yê? Siwar got: War û malên me, erda spî ye. Lê her sal, em bi fermana Yezdanê gewre tên vê derê bi cinên kafir re şer dikin. Beloqîya got: Û kanî ew erda spî li ku ye? Siwar got: Bi dûrbûna meşa heftê û pênc salan li pişt Çiyayê Qahf dikeve. Ev erda vir jî jê re dibêjin, erda Şedad Bîn Ad û em hatine şerê wan dikin. Tu karê me jî nîn e, ji xeynî selawatan. Qralê me heye û ew jî bi navê qral Saxr e. Tu jî nikarî ji vir biçî, hetanî ku qralê me li te nenêre û li te temaşe neke.

Siwar û cinîyên pêre, Beloqîya dan kêleka xwe û berê xwe dan cem qralê xwe. Gava gihîştin waran, Beloqîya dît ku hejmareke bê hed û hesab ji çadir û konên mezin vegirtî ne. Hemû kon ji hevrîşimê kesk bûn, tenê konek ji wan ji hevrîşima sor bû, ku bi qasî hezar gazî fireh bû û stûnên wî ji zêr û zîv bûn, rîşikên wî jî ji hevrîşimê şîn bûn. Beloqîya, bi taybetî li wî konî behetî ma û bi heyrangorî lê temaşe kir. Siwarên cinî jî ew birin cem wî konî bi xwe; lewre ew konê qralê wan Saxr bû. Ew derbasî hundirê kon kirin û birin raserî qral Saxr. Beloqîya li qral nêrî, dît ku li ser textekî gewre ye yê ji zêrê sor ku bi durr û cewheran neqişandî bû. Li kêleka wî ya rastê hemû mîrên cinan rûniştî bûn û li kêleka wî ya çepê jî hekîm û zana û hemû karmendên dewletê yên payebilind.

Gava qral Saxr çav lê ket, ji leşkerên xwe xwest, ku wî derbasî dîwana wî bikin. Ew derbas kirin dîwana qral, Beloqîya ber bi qral ve çû, silavek lê da, erda bin nigên wî maçî kir û li benda axaftina qral sekinî ma. Qral ji xizmetkaran xwest, ku jê re kursîyekî bînin, wî li rex xwe bidin rûniştandin. Çûn jê re kursîyek anîn û ew li rex qralê xwe dan rûniştandin.

Qral Saxr ji Beloqîya pirsî, got: Tu çi yî? Beloqîya got: Ez ji Benî Îsraîl im. Qral got: Kanî serpêhatîya xwe ji min re vebêje, bê tu çawa hatiyî vir û çi bi serê te de hatiye? Beloqîya çîroka xwe ji serî hetanî binî jê re rêz kir. Qral Saxr li vê çîroka wî behetî ma!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 496'AN

*Şehrezadê got:*

Piştî ku Beloqîya serpêhatîya xwe ji qral re got, qral, li çîroka wî behetî ma. Piştre gazî xizmetkar û aşpêjan kir, got: Xwarinê ji me re bînin!

Xizmetkar û aşpêj rabûn ser xwe, bi dehan mîh û deve serjê kirin, goşt pijandin, sifre raxistin û sênîyên zêr û zîv û baxir kişandin, bi qasî hezar û pêncsed heb sênîyî hebû ku pêncî sênî ji wan serên mîhan li ser bûn û pêncî jî serên deveyan li ser bûn. Gava Beloqîya çav li wê dîmenê ket, li wê ecêba xwarinê şaşwaz û behetî bû! Beloqîya jî bi wan re, hemûçikan bi hev re xwarina xwe xwarin, hetanî têr bûn. Piştre sifreya xwarinê rakirin û fêkî danîn ber wan. Fêkîyên xwe jî xwarin û piştre selewat û zikra xwe kirin.

Gava Beloqîya bihîst, ku selewatan li ser Muhemed didin, şaşwaz bû

û ji qral Saxr pirsî, got: Gelo ez dikarim hinek pirsan ji te bikim? Qral got: Bike. Beloqîya got: Qralê gewre, hûn ji kê ne; hûn ji ku derê hezretî Muhemed nas dikin, ku hûn selewatan li ser wî dixwînin? Qral Saxr got: Ey Beloqîya; Yezdanê dilovan agir di ser heft qadan de afirandiye, ku hemû di ser hev re ne û di neqeba herdu qadan de mesafeyeke bi direjahîya meşa hezar salî heye. Navê qada yekê kir "dojeh", ew ji bo misilmanên gunehkar, ên ku tobe nekirine û mirine, amade kiriye. Navê qada duduyan jî kiriye "rivîn" û ew ji bo kafiran amade kiriye. Navê qada sisiyan kiriye "cehîm" û ew ji yecûc û mecûcan re amade kiriye. Navê qada çaran kiriye "sotîner" û ew ji qewmê îblîs re amade kiriye. Navê qada pêncan jî kiriye "kûrdojeh" û ew ji bo tarikselatan an nimêjnekiran amade kiriye. Navê qada şeşan kiriye "ardûgeh" û ew ji bo cihû û filehan amade kiriye û qada heftan jî navê wê kiriye "berkendal" û ew ji bo munafiqan amade kiriye.

Beloqîya got: Belkî dojeh qada herî hêsan e li gorî qadên din, ji ber ku qada herî jor e? Qral got: Ezabê wê qadê ji yên hemû qadên din hêsantir e. Dîsa hezar newalên agir tê de hene û di her newalekê de jî heftê hezar bajarên agir hene û di her bajarekî de jî heftê hezar kelehên ji agir hene; di her kelehêkê de jî heftê hezar malên ji agir û di her malê de jî heft hezar textên ji agir û di her textekî de jî heftê hezar cureyên ezab hene lê dîsa jî ezab û êşa wê ji qadên dîtirkê hêsantir e. Gava ku Beloqîya ev agahî ji qral bihîstin, ji ser hişê xwe çû û got rep li erdê ket.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 497'AN

*Şehrezadê got:*

Piştî ku Beloqîya bi ser hişê xwe hat, bû kûre kûra wî û girîya; piştre got: Ey qralê hêja, ka wê çawa be halê me? Qral Saxr got: "Metirse Beloqîya! Divê tu bizanibî, ku kesê ji hezretî Muhemed hez bike, agir pê de naçê û çi kesê ji miletê wî be, agir jê direve. Ê me jî Yezdan em ji agir afirandine. Afirîndeyên ku di destpêkê de di dojehê de xuliqandine, du leşkerên wî ne: Xelît û Melît in. Xelît di dirûvê şêr de xuliqand û Melît jî di dirûvê gur de. Gurê Melît mê bû û rengê wê deqdeqî bû. Xelît jî nêr bû û terîya wî mîna marekî bû lê terîya Melîtê di şiklê kîsoyekê de bû. Direjbûna terîya Xelît meşa bîst salan bû. Piştre Xwedê Teala ferman da, ku terîyên herduyan li hev bên pêçan û pev şa bibin. Pev şa bûn û ji herduyan mar û dûpişk çêbûn. Xwedayê gewre cihê

wan mar û dûpişkan di nava agir de çêkir, da ku kesên herin nav agir, êşa wan bikişînin. Ew mar û dûpişk jî li hev banîyan û pir bûn.

Piştre Yezdanê dilovan ferman da, ku terîya Xelît û Melît dîsa pev şa bibin. Herdu pev şa bûn û terîya Melît ji terîya Xelît ducanî bû. Gava ku za û hemla xwe danî, heft çêlikên nêr û heftên mê anî. Piştre gava ew çêlik mezin bûn, bi hev re zewicîn li gora daxwaza dê û bavê xwe, tenê yekî ji wan qebûl nekir û li hemberî gotina dê û bavê xwe derket. Ew jî mesîx bû û veguherî kurmikekî, ku ew îblîs bi xwe bû û dê Xweda ew lanet bikira. Ji ber ku ew nêzikî Xwedê bû, çû asîmanan û nêzî Xwedayê dilovan bi cih bû, bû serokê kesên nêzî Xweda, vêca gava Xwedayê gewre Adem (silava Xweda li ser wî be) xuliqand û ferman da îblîs, da ku jê re bikeve sicûdê, wî red kir û fermana Xweda nepejirand. Xwedayê gewre jî ji cem xwe bera wî da û lanet lê anî. Wî jî jin anî, şeytan jê re çêbûn, neslê wî li seranserê dinyayê belav bû. Îcar her şeşên ku bi ya dê û bavê xwe kiribûn û zewîcîbûn, cinên bawermend ji wan re çêbûn û em jî ji neslê wan in. Eslê me jî ev e, Beloqîya!”

Beloqîya, li wê gotina qral pir behetî ma. Lê zivirî û jê pirsî got: Ey qralê cinîyan, ez dixwazim, tu fermanê bidî leşkerekî xwe, ji bo min bigihîne welatê min! Qral Saxr jê re got: Ez nikarim karekî wisa bikim, ku Xwedayê me fermanê nede. Lê dîsa jî heger tu dixwazî ji cem me herî, ez dikarim hespekî ji hespên xwe ji te re bînim, te lê siwar bikim û fermanê bidim hespê, bo ku te bibe hetanî cihê ku ez jê re bibêjim. Cihê ku ez dikarim te bigihînimê jî, dawîya hukmê min e. Gava tu bigihîjî wê derê, dê hinek ji gelê qralekî bi navê Biraxîya te pêşiwaz bikin, lewre çawa hespê di bin te de bibînin, dê wî nas bikin û te ji ser pişta hespê deynin û hespa min ji min re bi şûn de bişînin. Tiştê ku ji destê min tê jî, ev e.

Gava Beloqîya ev gotina wî bihîst, girîya û ji qral re got: Tu çawa dikarî, çawan dixwazî, wisa bike.

Qral hespek xwest, xizmetkarên wî çûn hespek jê re anîn. Beloqîya li hespê siwar kirin û jê re gotin: Baldar be û ne ji ser pişta wê dakeve ne lê bide û ne jî bi ser de bîqîre! Heger tu yekê ji vana bikî, dê mala te xera bike. Qet têkil wê nebe û jê biqere, hetanî ku ew bi xwe raweste. Gava rawestîya, tu ji ser pişta wê peya bibe û bi rêya xwe de biçe. Beloqîya got: Bila, ez ê wisa bikim.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 498’AN

*Şehrezadê got:*

Beloqîya li hespê siwar kirin û ew bi rê xistin. Hesp, demeke dirêj di nava kon û çadiran re meşîya, hetanî ku gihîşt raserî metbaxa qral. Neqrîyên di metbexa qral de ew qasî mezin bûn, ku pir bala Beloqîya kişandibûn ser xwe. Di her neqrîyekê de goştê pêncî deveyî hebû û li ser agirekî gur bûn. Beloqîya pir ecêbmayî ma li wan neqrîyên li ser agir û awirên xwe ji wan qut nekir. Qral jî got qey pir birçî ye û çavên wî li goşt e. Emir da hespê, ew anî cem metbexê û du deveyên biraştî li pişt wî, li ser pişta hespê girêdan û careke din xatir jê xwestin û ew bi rê kirin. Beloqîya li ser pişta hespê meşa xwe berdewam kir, hetanî ku gihîşt sînorê hukmê qral Saxr. Li wê deverê hesp sekinî û Beloqîya jê peya bû, daket erdê. Toza ser kincên xwe daweşand û nêt kir ku bimeşe, bala xwe dayê, ku hinek mirov ber bi wî ve tên. Gava nêzikî wî bûn, hesp nas kirin; ew bi xwe re birin û Beloqîya jî dan tengala xwe û ew birin cem qralê xwe Biraxîya.

Gava Beloqîya derbasî cem qral Biraxîya bû, silavek dayê; wî jî silava wî lê vegerand. Beloqîya bala xwe dayê, ku qral Biraxîya di dîwaneke mezin de rûniştiye û li dora wî leheng û mîr û mîrek û leşkerên cinîyan rûniştine. Qral got: Wî nêzikî min bikin! Zilamên wî Beloqîya birin cem wî, qral jî ew li kêleka xwe da rûniştandin. Piştre ji xizmetkarên xwe re got: Xwarinê bînin!

Di wê navberê de Beloqîya awirên xwe li derdorê gerendin û dît ku rewşa Biraxîya jî mîna ya Saxr e. Di dilê xwe de got: “Nexwe hemû qralên cinîyan mîna hev in!”

Xwarin hat, Beloqîya jî bi wan re xwar, hetanî ku jê têr bû. Xwarin rakirin û fêkî anîn, danîn ber wan. Piştî ku fêkîyên xwe jî xwarin û spasîya xwe ji Xwedê re kirin, Biraxîya ji Beloqîya pirsî û got: Tu kengî ji cem qral Saxr veqetîyayî? Beloqîya got: Ji berîya du rojan ve. Biraxîya got: Gelo tu dizanî bê di nava van herdu rojan de te mesafeyeke çiqasî dirêj qut kiriye? Beloqîya got: Na. Biraxîya got: Bi qasî meşa heftê mehan tu meşîyayî. Lê belê wisa tê xuyakirin, gava ku tu nû li hespê siwar bûyî, tu tirsîyayî û hespê jî nas kiriye, ku tu mirov î û xwestiye, ku te ji ser pişta xwe bevêje, wan jî ev herdu deve li pişt te girêdane, da ku barê hespê giran bikin û te ji ser pişta xwe navêje!

Gava Beloqîya ev gotina qral bihîst, behêtî ma û spasîya Xwedayê xwe kir, ku bi saxî û selametî ew gihandibû wir. Qral Biraxîya axaftina xwe ber-

dewam kir û pirseke din ji Beloqîya kir; ka ji min re bibêje, bê çi bi serê te de hatîye, hetanî ku te xwe gihandîye vî welatî? Beloqîya, çîroka xwe ji serî hetanî binî jê re vegot. Qral Biraxîya li hemberî serpêhatîya wî şaşwaz û ecêbmayî ma! Beloqîya du mehan li cem qral Biraxîya ma.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 499'AN

*Şehrezadê got:*

Gava Hasib Kerîmidîn ev çîroka dûdirêj ji Şahmaranê bihîst, şaş û metal ma û jê pirsî, got: Ji kerema xwe xizmetkarekî xwe bide gel min, bila min derxîne ser rûyê erdê, da ku ez herim cem malbata xwe. Şamaranê got: Hasib, divê tu bizanibî, ku gava tu derkevî ser rûyê erdê û tu biçî cem malbata xwe; çawa ku tu biçî hemamê û serşûştina xwe biqedînî, ez ê bimirim! Yanî çûna te, dê bibe sebeba mirina min. Hasib got: Ez ji te re sond dixwim, ku heta temenê min hebe, ez naçim hemamê û serê xwe naşom. Heger xusul gerek bike jî, ez ê li malê xwe bişom. Şahmaranê got: Heger tu sed carî ji min re sond bixwî jî, ez ji te bawer nakim. Ev tişt jî dê nebe, lewre tu jî însan î û însan hemû bêbextîyê dikin, soz û peyman bi wan re nabe. Bavê we Adem bi xwe jî soz dabû Xwedê lê soza xwe negirt. Halbûkî Xwedê teala herîya wî baş strabû û çil rojan heyvan kiribû, piştî afirandina wî jî hiştibû ku hemû ferîşteyên wî jê re bikevin secdeyê lê wî ew soza xwe jî ji bîr kir.

Dema Hasib Kerîmidîn ev gotina wê bihîst, bêdeng bû û girîya. Girîyê wî deh rojan berdewam kir, piştre jê re got: Nexwe kanî ji min re bibêje, bê çi bi serê Beloqîya hat, piştî ku du mehan li cem qral Biraxîya ma? Şahmaranê got: Piştî mana du mehan, Beloqîya xatir jê xwest û bi rê ket, şev û roj meşîya, çol û beyar derbas kirin û xwe gihand çiyayekî bilind. Pêve hilperikî, çû serê çiyê, dît ku qralekî gewre û bi heybet li serê wî çiyayî rûniştiye û selewatan li ser pêxember dixwîne, di nav lepên wî de jî destnivîsek heye, ku tiştin spî û reş tê de nivîsîne û ew jî lê dinêre. Du baskên qral jî hebûn, ku yekî xwe davêt şerqê û yê din xwe davêt xerbê.

Beloqîya çû cem qral, silavek lê da, wî jî silava wî girt û xêrhatina wî kir, piştre ji Beloqîya pirsî û jê re got: Tu kî yî, tu ji ku têyî, diçî ku û navê te çi ye? Beloqîya got: Ez benî Adem im, ji Benî Îsraîl im û ji ber hezkirina pêxemberê me Muhemed ez ketime rê, lê digerim û navê min Beloqîya ye. Qral got: Çi bi serê te de hat, hetanî ku te xwe gihand vê erdê?

Beloqîya dîsa ta bi derzîyê ve kir û çîroka serpêhatîya xwe, ji serî hetanî binî jê re vegot.

Gava qral serpêhatîya wî bihîst, şaş û metal bû. Beloqîya vê carê ji qral pirsî û got: Ka tu jî ji min re bibêje, bê çi di kaxeza nav lepên te de heye, çi tê de nivîsandîye û navê te çi ye? Qral got: Ez Mîxaêl im û ez karmendê ku şev û rojê pergal dike. Hetanî roja qiyametê jî ev karê min berdewam e.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 500'Î

*Şehrezadê berdewam kir:*

Beloqîya bi wê gotina Mîxaêl û heybeta wî şaşwaz bû. Piştre xatir jê xwest û rêwîtîya xwe berdewam kir. Şevûroj meşîya, hetanî ku gihîşt mêrgeke fireh û mezin. Li nav mêrgê gerîya, dît ku heft kanî û heft rûbar tê de hene û tijî şîndarên cur be cur in. Li hemberî dîmena mêrgê ya ne ji rêzê şaşwaz û behetî ma. Di qiraxa mêrgê re gerîya, hetanî ku li şîndareke pir mezin rast hat, ku çar ferîşte jî li binîya wê rûniştî bûn. Beloqîya, ber bi wan ve çû û ji nêz ve li wan nêrî, dît ku yek ji wan di sûretê însanekî de ye, yê din sûretê tebayekî de, yê sisiyan di sûretê teyrekî de, yê çaran jî di sûretê gayekî de bû. Hemû jî bi zikra Xwedê ve mijûl dibûn û digotin: Xwedayê min, mîrzayê min, palpiştê min, hêvîya min, tu bi heqê pêxemberê xwe Mihemed kî, tu yê min bibexşînî û mexlûqên di sûretê min de gişan bibexşînî û di wan de bibihurî, tu yê hêzdarê dilovan ê dilovîn!

Beloqîya, di nava ecêbmayîneke mezin de ew ferîşte terk kirin û rêwîtîya xwe ya li wê mêrgê berdewam kir. Şev û roj meşîya, hetanî ku gihîşt çiyayekî pir bilind, ku ew Çiyayê Qahf bû. Çû serê çiyê û dît ku qralekî pir mezin li wir rûniştî ye û selewatan li ser pêxember dixwîne û bênavber xwe bi ser hev de ditewîne, diguvêşe û rast dike û dibêje: Silavên Xwedê li ser pêxemberê Xwedê Muhemed bin.

Di rewşeke wisa de Beloqîya giha cem wî û silavek dayê. Qral silava wî girt û jê re got: Tu çi yî, tu ji ku têyî, bi ku ve diçî û navê te çi ye? Beloqîya got: Ez benî Adem im, ji Benî Îsraîl im, navê min Beloqîya ye û ez rêwîyê lêgerîna hezretî Muhemed û hezkirîyê wî me. Lê belê min rêya xwe şaş kir û ez di vir re derketim. Piştre, serpêhatîya xwe giş bi hûrgulî jê re vegot.

Piştî Beloqîya çîroka serpêhatîya xwe bi hûrgulî ji qral re got, pirsa xwe jî

jê kir û got: Tu kî yî li serê vî çîyayî û tu li vir çi dikî? Qral got: Ey Beloqîya! Ev çiyayê hanê, Çiyayê Qahf e, ku li hawirdora dinyayê dizivire û ez jî li vir, qedera dinyayê gişî di destê xwe de digirim. Vêca gava ku Yezdanê dilovan bixwaze tiştekî bi dinyayê bike, mîna erdhejekê, xelarakirinekê, tofanekê, lehîyekê, şerekî yan jî xêr û xweşîyekê, ez wî karî dikim û fermana Yezdan pêk tînim.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 501'Ê

*Şehrezadê got:*

Qral, axaftina xwe berdewam kir û ji Beloqîya re got: Yanî hemû rehên jîyan û mirinê di destên min de ne, tu têgihîştî? Beloqîya got: Gelo Xwedayê gewre axeke din jî afirandîye, ji xeynî vî cihê tu lê, li Çiyayê Qahf? Qral got: Belê, Xweda erdeke spî mîna zîv afirandiye, ku ne serî jê re heye ne jî binî, pir fireh e. Ferîşte jî tê de bi cih kirine, ku xwarin û vexwarina wan giş bi zikir û dua û selewatan e. Her înê tên vira, li vî çiyayî li hev kom dibin û şev pê de dua ji Yezdan dikin hetanî sibehê. Xêra ku ji wan zikir û selewatan tê jî, ji gunehkarên şopdarên pêxember û hemû kesên ku roja înê xwe dişon re dikin dîyarî. Hetanî roja qiyametê jî vî karê xwe berdewam dikin.

Beloqîya pirseke din kir û got: Gelo Xwedayê gewre tu çiyayên din di pişt Çiyayê Qahf de çêkirine? Qral got: Belê, li pişt Çiyayê Qahf, çiyayek heye bi dirêjahîya meşa pêncsed salan e û ew ji bûzê ye. Ew e yê ku li ser rûyê erdê agirê dojehê sar kiriye. Heger ne ji wî çiyayî bûya, dê ji ber germa dojehê agir bi rûyê dinyayê biketa. Dîsa li pişt Çiyayê Qahf çil zevî hene, ku her zevîyek ji firehbûna rûyê erdê çil carî mezintir e. Hinek jê ji zêr in, hinek ji zîv in û hinek jê jî ji yaqût in. Û her zevîyek ji wan zevîyan jî rengekî wê yê cuda heye. Xwedê li her zeviyekê jî ferîşte bi cih kirine, ku ew jî tu karê wan tune, ji xeynî zikir û selewatên ku li ser pêxember dixwînin. Ew ferîşteyên li wir, ne Adem ne Hewa ne şevê û ne jî rojê nas nakin…

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 502'YAN

*Şehrezadê got:*

Qral axaftina xwe berdewam kir û ji Beloqîya re got: Erd bi xwe jî heft qad in û ev qad di ser hev re ne. Ev her heft qadên erdê jî li ser pişta ferîş-

teyekî ne, ku ji Xwedê pê ve tu kes nizane bê çiqasî mezin e. Di bin nigên wî ferîşteyî de jî latek heye, ku di mezinbûna xwe de bê hed û hesab e. Di binîya wî latî de jî, Xwedê teala nûrek çêkiriye û di binîya wê nûrê re jî hûtek çêkiriye û di binaya wî hûtî de deryayeke pir mezin çêkiriye. Yezdanê dilovan, tenê hezretî Îsa ji wî hûtî agahdar kiriye. Wî jî ji Xwedayê xwe re gotiye; "Ya Rebî kanî wî hûtî nîşanî min bide, da ku ez wî bibînim!" Xweda jî ew biriye ser wê deryaya hût tê de û jê re gotiye:" Binêre ya Îsa!" Wî jî li hût nêrîye lê ew nedîtiye. Lê hût di wê kêlîyê de mîna birûskê di ber hezretî Îsa re derbas bûye, ew jî ji ber hewla wî ji ser hişê xwe çûye û li erdê ketîye.

Gava bi ser xwe ve hatîye û hişê wî hatîye serê wî jî, Xwedê teala wehî ji Îsa re şandiye û jê re gotiye: "Ey Îsa, gelo te hût dît? Gelo te dît, bê çiqasî dirêj e û çiqasî pehn e? Îsa jî gotiye: "Xwedêyo, ez bi pîrozîya navê te kim, min ew nedîtîye lê gayek di ser bedena min re derbas bû, ku bi qasî meşa sê rojan direj bû û min têdernexist bê ew gayekî çawa bû!" Xweda jê re got: Ey Îsa, ew gayê ku tu behsa wî dikî, di ser te re derbas nebû, di ber te re derbas bû û dirêjahîya sê rojan jî, tenê dirêjahîya serê ga bû. Ez jî çil gayê mîna wîna di rojekê tenê de dixuliqînim. Îsa bi wê gotina Xweda pir şaşwaz û matmayî bû.

Beloqîya pirseke din ji qral kir û got: Xwedayê gewre, di binîya wê deryaya ku ew hût tê de, çi çêkir gelo? Qral got: Xwedayê gewre di binîya wê deryayê de hewayeke ji agir çêkiriye. Û di binîya wî agirî de jî marekî pir mezin çêkiriye, bi navê Feleq. Heger Feleq ji Xwedê netirsîya, dê her tiştê di ser xwe re daqurtanda; çi agir, çi ba, çi derya û hût û çi tiştên di ser wan re…

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 503'YAN

*Şehrezadê got:*

Qral vegotina xwe ji Beloqîya re berdewam kir; piştî ku Yezdanê dilovan ew mar afirand, di rêya wehîyê re jê re got: Ez dixwazim emanetekê deynim cem te, tu jî wê biparêze! Mar got: Tu çi bixwazî, ez ê wisa bikim. Yezdanê dilovan jê re got: Nexwe kanî devê xwe veke! Mar devê xwe vekir. Yezdan jî dojeh xist nava mar, di zikê wî de bi cih kir û jê re got: Vê dojehê di nava xwe de biparêze, hetanî roja qiyametê. Vêca gava roja qiyametê hat, dê Yezdan ji ferîşteyan bixwaze, ku zincîran jê re bînin û dê ji wan bixwaze ku wê dojehê bibin mehşerê. Li wê derê dê Yezdan emrê vekirana derîyên dojehê bide û dê peşkên agir di devê wê re bavêjin, ku her peşkek mîna çiyayekî ye.

Gava Beloqîya ew gotin ji wî qralî bihîstin, kûrekûr pê ket û girîya. Piştre xatir jê xwest û rêwîtîya xwe bi alîyê rojava ve berdewam kir û meşîya, hetanî ku rastî du zilaman hat, ku herdu li ber derîyekî mezin rûniştî bûn û derî jî xiliqandî bû. Gava nêzî wan bû, dît ku yek ji wan di dirûvê şêrekî de bû, yê din jî di dirûvê gayekî de bû. Beloqîya silav li wan kir, wan jî silava wî girtin. Piştre jê pirsîn û gotin: Tu çi yî, tu ji ku têyî û bi ku ve diçî?

Beloqîya got: Ez benî Adem im û ji Benî Îsraîl im; ez rêwîyê hezkirina Muhemed pêxember im û li pey wî digerim; lê min rêya xwe şaş kir û ez di vir re derketim. Piştre axaftina xwe bi pirsekê berdewam kir û ji wan re got: Lê gelo hûn çi ne û ev çi derîyê girtî ye, ku hûn li ber wî rûniştî ne? Herduyan lê vegerand û gotin: Em nobedar û zêrevanên vî derîyî ne û tu karê me tune, ji xeynî zikir û selawatên ku em li ser hezretî Muhemed dixwînin.

Beloqîya bi vê bersiva wan şaşwaz bû û dîsa ji wan pirsî, got: Gelo çi di pişt vî derîyî de heye? Gotin: Em nizanin. Beloqîya got: Ji bo xatirê Xwedê ka vî derîyî vekin, ez binêrim, bê çi di hundir de ye? Herduyan gotin: Em nikarin vî derîyî vekin û tu mexlûq jî nikarin vî derîyî vekin, tenê cibrîl eleyhiselam dikare veke.

Gava Beloqîya ev gotin ji wan bihîstin, lavayî û tika ji Xwedayê xwe kir û got: Ya Rebî li min were rehmê û bihêle ku cibrîlê pêbawer vî derîyî ji min re veke! Xwedê duaya wî pêk anî û ferman da cibrîl, ku dakeve ser rûyê erdê û wî derîyê hevgihandina herdu deryayan veke, da ku Beloqîya li hundirê wir binêre. Cibrîl daket cem Beloqîya û silav lê kir, piştre çû ber derî û ew vekir, ji Beloqîya re got: Derbas be êdî, Yezdan ferman daye min, ku ez derî ji te re vekim.

Beloqîya di derî re derbas bû û meşîya, cibrîl jî derî li pey wî girt.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 504'AN

*Şehrezadê got:*

Piştî ku Beloqîya di derî re derbas bû, dît ku deryayeke fireh û pir mezin di pişt wî derîyî de ye û ew derya dibe du beş, beşek ava wê şîrîn e û beşa din ava wê şor e. Li derdora wê deryayê jî du çiyayên yaqûta sor hebûn. Beloqîya meşîya, hetanî ku gihîşt cem wan herdu çiyayan, li wir dît, ku li ser wan çiyayan ferîşte hene û hemû di nava zikir û selawatan de ne. Beloqîya silavek li wan da, wan jî silava wî girtin. Beloqîya derbarê wê deryayê û wan

herdu çiyayan de ji wan pirsî. Ferîşteyan gotin: Ev der di binîya erş de ye û ev deryaya hanê, avê dide hemû deryayên li dinyayê. Yên ku vê avê pehr dikin û rê dikin ser rûyê erdê jî em in. Em ava şer dişînin erdê bixwê, ava şîrîn jî dişînin axa bêxwê. Yezdanê me ev herdu çiya jî çêkirine, ji bo ku avê biparêzin û karê me yê ku hetanî roja qiyametê dewam bike jî, ev e.

Di pey re ferîşteyan ji Beloqîya pirsîn û gotin: Tu ji ku têyî û berê te li ku ye? Beloqîya serpêhatîya xwe ji wan re got, ji serî hetanî binî. Piştre Beloqîya rêya xwe ji wan pirsî, wan jî got: Di ser rûyê ava vê deryayê re here!

Beloqîya avgîhaka xwe derxist, di binê lingên xwe da, xatir ji ferîşteyan xwest û li ser rûyê deryayê meşîya, şev û roj bê rawestan çû. Di rê de li xortekî delal rast hat, ku ew jî di ser ava derya re dimeşîya. Silavek lê da, wî jî silava wî vegerand. Beloqîya piştre xatir ji wî xwest û rêya xwe berdewam kir. Hinekî çû dît, ku çar ferîşte mîna birûskê li ser rûyê deryayê dimeşin. Beloqîya çû ser rêya wan, ew jî hatin lê sekinîn. Beloqîya silavek da wan û got: Ji bo xatirê Xwedê ez dixwazim hûn ji min re bibêjin, bê hûn kî ne, navên we çi ne, hûn ji ku tên û bi ku ve diçin? Yekî ji wan got: Navê min cibrîl e; yê din got: Navê min Mîxaêl e; yê sisiyan got: Navê min Îsrafîl e; yê çaran jî got: Navê min Îzraîl e; zîhayekî mezin li rojhilat derketiye, hezar bajar xera kiriye û niştecihên wan giş xwarine. Xwedayê me jî ferman daye, ku em herin wî bigirin û bavêjin dojehê.

Beloqîya şaşwaz û ecêbmayî ma lî wî karê wan. Piştre xatir ji wan jî xwest û rêwîtîya xwe berdewam kir. Şev û roj meşîya hetanî ku xwe gihand giravekê. Derket ser gîravê û bi qasî saetekê li ser gerîya…

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 505’AN

## ÇÎROKA XORTÊ DI NAVBERA HERDU GORAN DE RÛNIŞTÎ

*Şehrezadê got*:

Piştî gera saetekê li ser wê giravê, Beloqîya li ciwanekî rast hat, ku nûr ji rûyê wî dibarîya. Pir spehî û li hevhatî bû û di navbera du goran de rûniştî bû û di ber xwe de dinalîya. Beloqîya çû cem wî û silavek lê kir, wî jî silava wî lê vegerand. Beloqîya jê pirsî û got: Derdê te çi ye, navê te çi ye û ev çi tirb in, ku tu di navbera wan de rûniştiyî?

Xortê ciwan li Beloqîya zivirî û kûrîn pê ket, bi ser de girîya û hey girîya, hetanî ku kirasê wî ji hêsiran şil bû, piştre bersiv da pirsa wî û got: Wele birawo çîroka serpêhatîya min ecêb û xerîb e. Ez dixwazim ku tu li rex min rûnêyî û tu ji min re bibêjî, bê te di emrê xwe de çi dîtiye, çi hatiye serê te, çima tu hatiyî vir, tê bi ku ve biçî û navê te çi ye, piştre ez ê jî serpêhatîya xwe ji te re bibêjim?

Beloqîya li kêlaka xortê ciwan rûnişt û ta bi derzîyê ve kir, çîroka xwe ji serî hetanî binî jê re vegot: Çawa bavê wî mir û çiqas mîras jê re hişt. Çawa xezîne vekir û sindoq tê de dît, çawa mishef û pirtûka ku behsa hezretî Muhemed dikir tê de dît, çawa dilê wî bi hezretî Muhemed ve hat girêdan û çawa bû rêwî û ket pey lêgerîna wî, hetanî hatina wî ya wir. Hemû jê re bi hûrgilî got. Li dawîyê jî got: Çîroka min, bi giştî ev e û wê ji niha û pê ve çawa bibe, ez nizanim, Xwedê çêtir dizane.

Xortê ciwan, keserek veda û got: Feqîro ma qey te di jîyana xwe de çi dîtiye? Qey ev ên ku te behsa wan kir jî, tiştek in? Dê binêre yê min, min Mîrzayê me Suleyman di aramîyê de dît û min şahidîya gelek tiştên erjeng û ecêb kiriye, ku gelek tişt ji wan nayên gotin û nayên jimartin jî. Serpêhatîya min ecêb e û doza min xerîb e. De êdî li gel min rûnê, ji bo ku ez sebaba rûniştina xwe ya li vir ji te re bibêjim.

Gava ku Hasib Kerîmidîm ev gotin ji Şahmaranê bihîstin, şaşwaz bû û jê re got: Şahmaran, tu bi qedrê Xwedê kî, tu yê min berdî û tu yê leşkerekî xwe bidî kêleka min, ji bo ku min derxîne ser rûyê erdê! Ez ji te re sond dixwim, ku hetanî emrê min hebe, ez naçim hemamê!

Şahmaranê got: Ev tişt dê nebe û ez ji te bawer nakim. Dema ku Hasib ev gotin û ev bersiv ji wê bihîst, pir girîya û marên din jî ji bo wî pê re girîyan û hemû bûn ricakarên wî, li ber şahbanûya xwe gerîyan, ji bo ku wî berde û jê re gotin: Em dixwazin, ku tu yekê ji me pê re bişînî bo ku em wî derxînin ser rûyê erdê û bila ew jî sonda mezin ji te re bixwe, ku heta emrê wî hebe neçe hemamê.

Şaha maran ku navê wê Yemlîxa bû, gava ev daxwaza qewmê xwe bihîst, ber bi Hasib ve çû, ew da sondxwarin û ferman da marekê, ku pê re here, wî derxîne ser rûyê erdê.

Îcar dema ku mara pêşvan hat cem Hasib ji bo ku wî bibê, Hasib ji Şahmaranê re got: Ew çîroka wî xortê ku di navbera herdu goran de rûniştî yê ku Beloqîya lê rast hatibû, bû kul û ket dilê min, gelo berdewamîya wê çi

bû? Şahmaranê got: Piştî ku Beloqîya li cem wî rûnişt û serpêhatîya xwe jê re got, da ku ew jî ya xwe jê re bibêje…

*Li Şehrezadê bû sibê, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 506'AN

*Şehrezadê got:*

Îcar şahînşahê min ê gewre Şehreyar! Şahmaranê vegotina xwe berdewam kir û got: Xortê ciwan bersiv da Beloqîya û got: Wela birawo min hezretî Suleyman di gora wî de bi xwe dîtiye û gelek ecêbên din bi serê min de hatine. Bavê min Têxemûs bi xwe jî qralek bû; Qralê Kabûlê bû, li ser gelê Şehlan ku deh hezar pêlewanên wan hebûn û her pêlewanek ji wan jî serdarê sed bajar û sed keleh û sed sûran bû. Di bin destê wî de heft sultan hebûn, ku baca şerq û xerbê jê re dianîn ber destê wî. Qralekî dadwer û zana bû. Xwedayê gewre ew qas mal û milk û serwerî dabû wî lê ew kordunde bû û hêvî û li dinyayê daxwazeke wî ya bi tenê hebû, ku Xwedê kurekî bide wî, da ku piştî mirina wî wî mîrasî bigire û bibe serwerê welêt li şûna wî.

Stêrknas û falbînan li nav pirtûkan gerîyan û li bextê wî nêrîn, hekîm û zana jî li hev kom bûn û rojekê bavê min ji wan re got: Ka fala min vekin, bê gelo Xwedê teala dê kurekî bide min an na? Stêrknasan dîsa pirtûkên xwe vekirin, meş û gera peyk û gerestêrkan pîvan û piştre gotin wî: Ey qralê bextewar, bêguman dê kurek ji te re çêbibe û ew kur, misoger dê ji malbata qralê Xorasanê be.

Gava bavê min Têxemûs vê mizgînîyê ji devê wan dibihîze, pir şad û kêfxweş dibe û xelatin giranbuha li ser stêrknas û falbaz û hekîman belav dike, ew jî diçin malên xwe. Vêca wezîrekî bavê min Têxemûs hebû, ku pêlewanekî weke dêwekî bû, hezar siwarî pê nikaribû û navê wî Eynzara bû. Têxemûs jê re got: Ey wezîr, rabe xwe ji rêwîtîyê re amade bike, da ku herî welatê Xorasanê û keça qralê wê Behrewan ji min re bixwazî! Lewre stêrknasan fala min vekirine û tê de dîtine, ku heger ez jinekê ji malbata qralê Xorasanê bînim, dê Xwedê kurekî bide min.

Eynzarayê wezîr, di cî de rabû ser xwe, amadekarîyên rêwîtîyê kir û tevlî qefleyek siwar û pêlewan û leşker ji bajar derket, berê xwe da Xorasanê.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 507’AN

*Şehrezadê got:*

Piştî ku wezîrê wî bi rê ket, Têxemûs jî hezar û pêncsed barên hevrîşim û gewher û yaqût û lûlû û zêr û zîv amade kir, tevlî hemû pêdivîyên dawetê û giş li deve û qantiran bar kirin û li pey wezîrê xwe Eynzara xist rê û jê re nivîsand: Vê nameya hanê jî pêşkêşî qralê Xorasanê bike! Têxemûs, di nameya xwe de jî got: Silav û rêz li ser we bin, ey qral Behrewan! Ez dixwazim tu bizanibî, ku me hemû stêrknas û falbîn û hekîmên welatê xwe kom kirin, bo ku bextê min vekin û wan gotin, ku dê Xwedê teala kurekî bide min heger ez bi keça we re bizewicim. Vêca va ye ez wezîrê xwe Eynzara dişînim cem we, li gel karwanekî barkirî bi hemû pêdivîyên dawetê. Baş bizanibe, ku min di vê mijarê de wezîrê xwe kiriye wekîlê xwe û ez dixwazim, ku tu daxwaza wî pêk bînî, lewre daxwaza wî daxwaza min e. Sersarîyê meke û çi qencîya ku tu pê bikî, tu bi min dikî. Divê tu bizanibî, ku ez qralê Şehlanan im li Kabûlê û Xwedê mal û milkekî pir daye min. Heger ez bi keça te re bizewicim, dê milkê min û te bibe yek û her sal bi qasî pêdivîya te ez ê mal ji te re bişînim. Hemû daxwaz û meqseda min ev e, ne tiştekî din.

Wezîr Eynzara, rêwîtîya xwe berdewam kir, hetanî ku gihîştin nêzikî bajarê qral Behrewan û ji wir qasidek li pêşîya xwe şand, ji bo ku qral ji hatina xwe agahdar bike. Gava qral Behrewan hatina wezîrê Têxemûs bihîst, emîr û kizîr û wezîrên xwe amade kirin, ji bo pêşwazîkirina wî. Helbet ji bo wanx warin û vexwarin jî amade kirin û li gel êmê hesp û ajalan hemû bar kirin û şandin pêşîya karwanê Eynzara.

Karwanê pêşwazkaran jî ket rê û çû hetanî ku li karwanê wezîr Eynzara qelibîn. Li wir, barên xwe danîn, leşker peya bûn û hemûyan silav li hev kirin, xêrhatina hev kirin û piştre sifreya xwe raxistin, xwarina xwe xwarin û bi qasî deh rojan li wir man, bêhna xwe vedan. Piştre dîsa barên xwe bar kirin, li hespên xwe siwar bûn û ber bi bajêr ve rêwîtîya xwe berdewam kirin.

Di derbasbûna bajêr de, qral Behrewan ew pêşiwazî kirin, wezîrê Têxemûs himbêz kir, ew maçî kir û xêrhatina wî kir. Piştre bi hev re derbasî kelehê bûn. Wezîr Eynzara jî dîyarî û xelatên qralê xwe pêşkêşî qral Behrewan kirin û nameya Têxemûs jî da destê wî.

Behrewan name ji destê wî girt û vekir, xwend û têgihîşt, bê mijar û daxwaz çi ye. Gelek dilşa bû û bedena wî bi coş û peroşê tijî bû. Careke din xêrhatina wezîr kir û jê re got: Mizgînîyê didime te, bila dilê te aram be, wê

daxwaza te pêk were. Jixwe heger qral Têxemûs giyanê min jî bixwesta, min nedigot na!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 508'AN

*Şehrezadê got:*

Piştre qral Behrewan di cî de çû cem keç û jina xwe, mijar ji wan re got, ew agahdar kirin. Piştre bi meriv û mezinên karmendên xwe re jî şêwirî û fikra wan pirsî, hemûçikan gotin: Tu çawa dizanî, wisa bike. Ew jî vegerîya cem Eynzara û got: Daxwaza qralê te hat pêjirandin û tu pirsgirêk nîn in.

Eynzarayê wezîr bi qasî du mehan li ba qral Behrewan di mêvantîyê de ma, piştre jê re got: Heger tu daxwaza me pêk bînî, bi destûra te be, îcar em dixwazin vegerin welatê xwe!? Qral li wezîr vegerand û jê re got: Ser seran, ser çavan, bila be.

Piştre ji bo ku cihêza keça wî amade bikin û dawetê jî li dar bixin, ferman da. Amadekarî hemû hatin kirin û her tişt têkûz bû. Di pey re jî hemû wezîr û kizîr û mezinên dewlata wî lê kom bûn, keşe û rahib jî anîn û di nava dêlindêzeke gewre de mehra keça wî li qral Têxemûs birrîn.

Piştre qral Behrewan gelek dîyarî û xelat dan keça xwe, karwanê rêwîtîyê amade kir û ferman da xizmetkar û karmendan, bo ku kolanên bajêr gişan raxin û bixemilînin. Wan jî wisa kir, ferman pêk anîn. Piştre di nava şahîyeke cemawerî û mezin de karwanê bûkê bi rê ket û çû.

Hîna ku karwan bi rê de diçû, wezîr Eynzara qasidek derxist û li pêşîya xwe şand, ji bo ku mizgînîyê bide qral Têxemûs û wî ji hatina wan agahdar bike. Gava ku qasid gihîşt wir û qral agahdar kir, Têxemûs ferman da, ku zemawendeke gewre were lidarxistin.

Şahî û dawet hat lidarxistin û qral derbasî cem bûkê bû, pê re raket û hîna ku çend roj derbas nebûbûn, keçik ducanî bû. Piştî neh mehan jî jinikê hemla xwe danî û kurekî mîna heyvê jê re çêbû. Çawa ku qral Têxemûs bihîst, ku jina wî kurek anîye, gelekî şad û kêfxweş bû û daxwaz kir, ku hemû zana û hekîm û stêrknas werin dîwana wî. Gava ku hemû hatin dîwanê, qral ji wan re got: Ez ji we dixwazim, ku hûn li bextê vî kurikî binêrin, bê ka çi li pêşîya wî ye û dê çi bê serê wî!

Stêrknas û hekîman li pirtûkên xwe nêrîn, gava stêrk û peyk bi hev re pîvan, dîtin, ku bextê kurik vekirî ye û temenekî tijî xweşî û şahî li pêşîya wî ye. Tenê xerabîyek li pêşîya wî heye, ew jî di pazde salîya wî de dê derkeve pêşîya wî û heger bikaribe wî kelemî derbas bike, dê ew jî mîna bavê xwe bibe qralekî mezin û jê bihêztir jî.

Qral bi wê agahîyê pir kêfxweş bû û navê kurê xwe kir Canşah û ew radestî şîrdê û carîyeyan kir, ji bo ku wî baş xwedî bikin û lê miqate bin. Dayikên şîrdê û carîyeyan ew baş xwedî kirin û terbîyeyeke baş dan wî.

Gava temenê wî gihîşt pazdeh salan, bavê wî ew fêrî xwendina Încîlê kir, hunerên şer û cengê hemû pê dan hînkirin; siwarbûna hespan, seyd û nêçîr û şîkar, li gel hemû zanînên civatî. Bi wî hawayî, di nava heft salan de bû pêlewanekî mezin û zana. Bavê wî jî bi wan hunerên wî pir dilşa bû. Rojekê ji rojan qral ferman da leşker û zêrevanên xwe, ji wan re got: Xwe amade bikin, em ê derkevin şîkar û nêçîrê! Zêrevan û artêşa wî xwe amade kirin, ew û kurê xwe Canşah jî li hespên xwe siwar bûn, dan pêşîya artêşê û ketin rê. Çol û çiya û mêrg li hev xistin û sê rojan gerîyan. Di roja sisiyan de, Canşah xezalek dît û keys lê anî, bi pey wê ket. Xezal dibezîya û ew jî li pey diçû. Di wê navberê de çavên heft bendeyên qral li wî ketin û wan jî da dû şopa wî, li pey wî çûn. Ji ber ku hespên wan beza bûn, xwe gihandin Canşah û di qiraxa deryayê de hemû lê hatin hev, xezal tengav kirin. Wan dixwestin, ku wê bi saxî bigirin lê berîya ku wê bigirin, xezalê xwe avêt nava behrê û bi avê de çû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 509'AN

*Şehrezadê got:*

Xezal bi avê de çû lê keştîyek nêçîrvanan (masîvan) ew tengav kir û girt. Canşah û koleyên xwe jî ji hespên xwe peya bûn û çûn ser keştîyê, ew xezal girtin. Lê berîya ku dîsa vegerin ser bejahîyê, çavên Canşah li giraveke mezin ketin û ji zilamên xwe re got: Ez dixwazim, ku em herin wê giravê! Wan jî got: Ser seran, ser çavan û berê keştîyê dan wê giravê. Gihîşt wir, derketin ser bejahîya wê, hebekî temaşe kirin û piştre dîsa vegerîyan keştîya xwe û xezala wan jî bi wan re. Berê keştîya xwe bi şûn de zivirandin, da ku vegerin erda welatê xwe lê di rê de tarî ket erdê û rêya xwe şaş kirin, di deryayê de wenda bûn. Piştre bayekî xurt li wan rabû û keştîya wan kişand

nava behrê. Li wir razan, hetanî sibehê di keştîya xwe de man. Lê gava li wan bû sibe, rê nas nekirin û meşa xwe di deryayê de berdewam kirin, bêyî ku bizanibin bi ku ve diçin. Em wan li wir bihêlin û em vegerin ser rewşa qral Têxemûs, bavê Canşah.

Gava qral çavê xwe li kurê xwe gerand û ew nedît, her qefleyeke leşkerên xwe bi hêlekê de şand û ji wan xwest, ku li kurê wî bigerin. Her kes, li her derê gerîya, hetanî ku qefleyek leşker çû qiraxa behrê û xwedîyê keştîyê û hespên Canşah û koleyên pê re li ba wan dîtin. Pirsa Canşah û her şeş koleyên pê re ji wan kirin, xwedîyên keştîyê jî tiştê ku qewimîbû, ji wan re gotin. Wan jî hespên Canşah û bendeyên pê re li gel xwedîyên keştîyê hildan ba xwe û vegerîyan cem qral û bûyer jê re gotin.

Gava qral gotinên wan bihîstin û ji bûyerê agahdar bû, pir xemgîn bû û ji êşê dilê wî hat guvaştin, taca xwe ji serê xwe avêt, destê xwe gez kir, pir poşman bû û di cî de rabû ser xwe û gelek name nivîsandin û her yek ji wan şand ji giravekê re, ku gelek girav di behrê de hebûn. Piştre sed keştî anîn, leşker li wan kirin û ji wan re got: Hûn jî li behrê bigerin, belkî hûn kurê min Canşaj bibînin! Wî bi xwe jî leşkerên mayî dan dû xwe û di nava kul û kederan de vegerîya bajarê xwe…

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 510'AN

*Şehrezadê got:*

Bavê Canşah di nava kul û kederên giran de vegerîya malê û tişta ku qewimîbû, ji diya wî re jî got. Diya wî girîya, kazîn û balîn bi dilê wê ket, li çogên xwe da, porê xwe kişand, birîn di laşê xwe de vekirin lê hemû bê fêde bûn û layê wê lê venegerandin.

Em dê û bavê wî li wir bihêlin û em vegerin ser rewşa Canşah û her şeş bendeyên wî. Ew jî di nava behrê de wendayî man, ne wan xwe gihand bejahîyekê ne jî keştîyên ku di behrê de li wan digerîyan bi ser wan vebûn. Yê li wan digerîyan jî, piştî ku deh rojên lêgerînê qedandin, li qralê xwe vegerîyan û rewş ji wî re dîyar kirin.

Canşah û her şeş hevalên xwe li ber pêlên avê çûn û bayê ew li ber xwe birin, hetanî ku li giravekê rast hatin. Canşah û her şeş bendeyên xwe ji keştîyê peya bûn, daketin ser bejahîyê û ji xwe re gerîyan, hetanî ku li kanîyekê

qelibîn, ku di nîvê giravê de bû û zilamek jî li nêzikî wê rûniştî bû. Çûn cem wî, silavek lê kirin, wî jî silava wan girt. Lê zilam bi zimanekî ku dişibîya wîtînîya çûkan bi wan re diaxivî. Canşah li wî zimanî ecêbmayî ma. Di nava awirên wan ên behetîbûyînê de, zilam li çep û rastê xwe nêrî, piştre li ber çavên wan zilam bû du beş û her beşeke wî bi alîyekî de çû.

Hîna ku ew şaşwazîya wan derbas nebûbû, bala xwe danê, ku ji hawirdora wan zilamên nîvco bi ser wan de tên û li wan kom dibin. Ew nîvzilam ew qasî pir bûn, ku nedihatin jimartin. Hemû ji hêla çiyê ve dadiketin û berjêr ve dihatin hetanî ser kanîyê. Piştre hemû bi ser Canşah û bendeyên wî de hatin, ji bo ku wan bixwin. Lê wan zû xwe dan alî û ji wir reviyan. Lê belê xwe bi wan ve gihandin û sê heb bende xwarin; Canşah û her siyên din jî ji nav lepên wan filitîn. Wan xwe avêtin keştîyê û zû ji wir dûr ketin, revîyan. Bi şev û roj di deryayê de meşîyan, bêyî ku bizanibin bi ku ve diçin. Ji ber birçîbûnê xezala xwe serjêkirin û goştê wê xwarin, avêtin ber dilê xwe. Piştre bayekî din li wan rabû û ew avêtin cem giraveke din.

Li raserî giravê sekinîn û ew di ber çavan re derbas kirin, bala xwe danê, ku tijî dar û devî, av û çem in. Bîstan û fêkîyan li her derê xuya dikirin. Weke bihuştekê dîyar dikir. Canşah, bi wê dîmenê pir bandor bû û li bendeyan zivirî, ji wan pirsî, got: Kî ji we dikare here vê giravê ji nêz ve raçav bike û derbarê wê de agahîyan ji me re bîne? Yekî ji wan got: Ez dikarim herim raçav bikim û werim. Canşah jê re got: Wisa nabe! Ya baş ew e, ku hûn her sê biçin raçav bikin û ez ê jî li vir li benda vegera we di keştîyê de bim.

Canşah, her sê ji keştîyê daxistin, ew jî çûn ser bêjahîyê û meşîyan çûn keşfê.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 511'AN

*Şehrezadê got:*

Her sê bende derketin ser axa giravê û lê gerîyan. Çep û rast çûn û hatin, berjor ve derketin, berjêr ve daketin, li kesî rast nehatin. Ber bi nîvê wê ve çûn, di nîvê giravê de keleheke ji mermerê spî û malên ji cama zelal ji wan ve xuya kirin. Ber pê ve çûn, derbasî kelehê bûn, dîtin ku bîstanek di nîvê kelehê de ye, tijî darên fêkîyên şil û zuha ku nedihatin wesifdan.

Li kêleka bîstan jî lalezarên tijî gulên cur be cur ku bêhnên cenetê ji wan difûrîyan. Li ser şaxên wan daran çûkên rengo rengo, ku bênavber bi xwendin û wîtewît bûn. Di nava wan bîstan û lalezaran de jî goleke avê hebû, ku li kêleka eywaneke mezin û pir spehî bû. Di wê eywanê de jî rêzek kursî hebûn û di nîvê xeleka wan kursîyan de textek hebû, ku bi zêr, sorê yaqût û gewheran xemilandî bû.

Bende li dîmena wê kelehê û xweşikbûna wê ecêbmayî man. Çep û rast li nav kelehê gerîyan, serûbin kirin lê kesek tê de nedîtin. Herî dawîyê ji kelehê derketin û hatin li Canşah vegerîyan, ew ji wan tiştên ku dîtibûn agahdar kirin. Canşah ji wan re got: Misoger divê ez jî herim li vê kelehê temaşê bikim!

Canşah ji keştîyê peya bû û her sê bende jî dan tengala xwe û berê xwe da wê kelehê. Gihîştin kelehê, derbasî hundirê wê bûn, Canşah li hemberî dîmen û xweşikbûna wê şaşwaz bû. Li nav bîstan û bexçeyan gerîyan û ji fêkî û sewzên wê xwarin, hetanî ku li wan bû êvar.

Gava li wan bû êvar, çûn cem wan kursîyên rêzkirî. Canşah çû ser textê zêrîn ê ku di nîvê kursîyan de vegirtî bû. Çawa ku li ser text rûnişt jî, textê bavê wî û kes û karên wî hatin bîra wî. Li ser fîraqa wan hestîyar bû û kûrekûr pê ket, girîya; her sê bende jî pê re girîyan.

Hîna ku ew wisa di wî halî de bûn, qajewajek ji hêla deryayê hat. Berê xwe dan hêla wî dengî, bala xwe danê, ku kerîyekî meymûnan ber bi kelehê ve tê, mîna kulîyan pir in û nayên jimartin. Tu nabêjî ew girav û ew keleh a meymûnan bû. Îcar wan meymûnan jî gava li keştîya Canşah wan rast hatin, hûrhûrî kirin û bi xwe re anîn kelehê, cem Canşah.

Şahmaran li Hasib Kerîmidîn zivirî û jê re got: Ev hemû vegotina wî ciwanê ku di navbera herdu goran de rûniştî bû, bo Beloqîya digot. Hasib got: Û piştre Canşah çi kir, bi wan meymûnan re? Şahmaranê jê re got: Gava meymûn derbasî eywanê bûn û dîtin ku Canşah li ser text rûniştî ye û bendeyek li kêleka wî ya çepê, bendeyê din jî li kêleka rastê ye, tirs û xofeke mezin ket dilê wan, çend meymûn derbasî wir bûn û çûn ber textê ku Canşah li ser rûniştî bû, erda bin nigên wî maçî kirin, destê xwe danîn ser singa xwe û bi qasî saetekê, bêdeng li raserî wî sekinîn. Piştre qefleyek meymûnên din hatin, ku xezal bi wan re bûn. Ew serjê kirin, ew guran, nava wê derxistin, goştê wê ji hev xistin û biraştin; piştre xistin sênîyên zêr û zîv û anîn li ber wan danîn, gazî Canşah û bendeyên wî kirin, bo ku werin bixwin.

Canşah ji ser text daket, ew û her sê bendeyên xwe û meymûnên li wir, hemû li ser sifreyê rûniştin û xwarin, heta ku têr xwarin. Piştre meymûnan sifre rakirin û fêkî anîn, li ber wan danîn. Ew jî xwarin û spasîya xwe ji Xwedayê xwe re kirin.

Di pey re, Canşah bi zimanê liv û îşaretê ji meymûnan pirsî, got: Rewş çi ye û ev cihê kê ye? Meymûnan bi heman zimanî bersiv danê û gotin: Ev cih ê mîrzayê me Suleyman Bin Dawid bû. Ew salê carekê dihat vir, lê temaşe dikir, bêhna xwe berdida û diçû…

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 512'AN

*Şehrezadê got:*

Meymûnan ji Canşah re got: Binêre sultanê me, ji îro û pê de êdî tu qralê me yî û em ê jî di xizmeta te de bin; tu çi fermanê bidî me, em ê pêk bînin. Piştre, hemû tev de rabûn, yeko yeko çûn erda bin nigên Canşah ramûsan û derketin, çûn. Canşah li ser textê xwe, bendeyên wî jî li ser kursîyên xwe raketin, hetanî sebehê.

Bi derketina rojê re her çar wezîrên meymûnan û leşkerên xwe derbasî hundir bûn û rêz birêz li pey hev sekinîn, bi awayekî pergalî. Wezîr çûn cem Canşah û bi zimanê îşartê jê xwestin, ku bi dadwerî wan bi rê ve bibe. Piştre hinek meymûn bi ser hev de qîrîyan û di pey wê re hinek ji meymûnan çûn ber qralê xwe Canşah, ji bo ku xizmeta wî bikin.

Di pey re qefleyek meymûnên din derbasî wir bûn, ku kûçikên mezin mîna hespan bi wan re bûn û di stûyê her kûçikekî de jî hefsarek hebû. Canşah li hemberî dirûvên wan kûçikan behetî ma. Wezîrên meymûnan bi zimanê îşaretê ji Canşah xwestin, ku li kûçikekî ji wan siwar bibe û bi wan re bimeşe. Canşah û her sê bendeyên xwe, li kûçikan siwar bûn, meymûn jî bi wan re siwar bûn û hemû tev de meşîyan, ji kelehê derketin. Meşa xwe wisa berdewam kirin, hetanî ku gihîştin qiraxa behrê. Li wê derê, çavên Canşah li textikên keştîya wan a şikestî ketin; li wezîrên meymûnan zivirî û jê re got: Kanî ew keştîya li vir? Meymûnan got: Qralê gewre, gava em pê hesîyan ku hûn hatine giravê û hûn ê bibin sultanê me, em tirsîyan, dema ku em werin cem we, hûn ji ber me birevin. Loma me jî keştîya we şikand, ji bo ku em pêşîya reva we bigirin.

Gava Canşah ev gotin bihîstin, li bendeyên xwe zivirî û ji wan re got: Nexwe tu rê li ber me neman, ku em ji cem van meymûnan birevin lê dîsa jî em ê bêhna xwe fireh bikin, lewre Xwedê mezin e û hêvî jê qut nabe.

Piştre meşa xwe berdewam kirin, hetanî ku gihîştin qiraxa çemekî. Li hêla din a çem, çiyayekî bilind hebû. Canşah li wî çiyayî mêze kir, dît ku serê çiyê tijî gorîl in. Li meymûnan zivirî û ji wan pirsî, got: Ev gorîl çi ne û kî ne? Meymûnan got: Qralê gewre, ev gorîl, dijminên me ne, em hatine şerê wan bikin.

Canşah li wan gorîlan behetî ma; lewre hemû li hespan siwar bûbûn û serê hinekan ji wan mîna yên çêlekan bû û yên hinekên din mîna yên deveyan bûn.

Çawa ku gorîlan artêşa meymûnan dîtin, êrîşî ser wan kirin û hatin ji kêleka çem a dîtirkê kevir avêtin wan, ku mîna beştan bûn. Di demeke kurt de di navbera herdu alîyan de şer û cengeke mezin qewimî. Îcar gava Canşah dît, ku meymûn di şer de têk diçin, bi ser bendeyên xwe de qîrîya û ji wan re got: Mertalên xwe hildin û bi tîr û kevanan êrîşî wan bikin!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 513'AN

*Şehrezadê got:*

Dema ku Canşah ew ferman da bendeyên xwe, her sêyan tîr û kevanên xwe derxistin û mîna baranê tîr bi ser wan de barandin, mala gorîlan xera kirin, ew têk birin. Gorîlên mayî jî filtî filtî bi şûn de revîyan, çûn. Meymûnan Canşah di çem re derbas kirin, wan jî artêşa xwe giş di avê re derbas kirin û bera dû gorîlan dan, gelekên din ji wan kuştin, kêmek ji wan revîyan û xwe bi xelasê xistin. Canşah û meymûnan jî meşa xwe berdewam kirin, hetanî ku gihîştin serê wî çiyayê bilind. Li ser lûtkeya çiyê, Canşah kevirekî mermer dît, ku li ser nivîsandibû: "Ey kesê ku derbasî vê erdê bibe! Binêr, tu yê bibî sultanê meymûnan û dê xelasîya te ji destê wan tune be. Tenê du rêyên zor li ber te hene, bo ku tu bikaribî xwe ji destê wan rizgar bikî: Ya ewil, ku bi rêya rojhilatê çiyê ve herî. Dirêjahîya vê rêyê sê mehên meşê ne. Tu yê di nava gorîl û teba û ajalên dirinde û efrîtan re derbas bibî, piştre tu yê bigihîjî deryaya ku gerdûnê gişî dorpêç dike. Rêya din jî di rojavayê çiyê re diçe û dirêjahîya wê çar mehên meşê ne. Di serê rê de dola gêrikan heye,

gava tu gihîştî wir û tu derbasî dolê bûyî, li xwe miqate be û xwe ji wan gêrikan biparêze. Piştre tu dê bigihîjî çiyayekî bilind, ku mîna agir pêketî ye. Bi meşa deh rojan mirov digihîje wî çiyayî. Li dawîyê jî tu yê bigihîjî çemekî bi xumexum û gupegup, ku mîna birqê diherike. Lê, her roja şemîyê ew çem zuha dibe û li kêleka wî çemî bajarekî cihûyan heye, ku misilmanek tenê jî tê de nîn e. Li vê erda hanê, tenê ew bajar heye. Bila di bîra te de be; hetanî ku tu li ba meymûnan bî, wê meymûn zora gorîlan bibin. Ev nivîsa hanê jî hezretî Suleyman Bin Dawid nivîsandîye!"

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 514'AN

*Şehrezadê got:*

Gava Canşah ew nivîsa li ser wî mermerî xwend, bêhêvî bû, qolinc ketin nava wî, bû kûrekûra wî, girîya û hêsir barandin. Piştre li bendeyên xwe zivirî û ew ji naveroka wê nivîsê agahdar kirin. Piştre dîsa li kûçikên xwe siwar bûn, meymûn jî hemû siwar bûn û bi kêfxweşîya serkeftinê ketin ser rêya vegerê, hatin keleha xwe.

Canşah, bi qasî sal û nîvekê li wê kelehê ma û sultantî ji meymûnan re kir. Rojekê ferman da leşkerên meymûnan, bo ku xwe amade bikin û pê re derkevin şikar û nêçîrê. Leşkerên meymûnan hemû siwar bûn, Canşah û bendeyên xwe jî siwar bûn û berê xwe dan çol û beyaran, li nêçîrê gerîyan. Gera xwe wisa berdewam kirin, hetanî ku gihîştin dola gêrikan ku ew nîşaneyeke wê nivîsa ku Canşah ew xwendibû, bû! Fermana rawestinê da, hemû li wir peya bûn, xwarin, vexwarin û bi qasî sê rojan jî bêhna xwe berdan.

Şevekê ji şevan, Canşah gazî her sê bendeyên xwe kir, ew xewle kirin û ji wan re got: Ez dixwazim, ku em ber bi dola gêrikan ve birevin û herin wî bajarê cihûyan, belkî Xwedayê gewre rêyeke xelasîyê nîşanî me bide. Bendeyan gotin: Em ji fermanên we re amade ne!

Piştî ku şev ket erdê û hinek jê bihurî, Canşah û Bendeyên xwe rabûn ser xwe, şûr û mertalên xwe girêdan, xencer û kevanên xwe xistin ber xwe û ketin ser rê, bê navber meşîyan hetanî ku bû sibe û roj li wan hilat.

Sibehê gava meymûn ji xew rabûn û Canşah û Bendeyên wî li gel xwe nedîtin, têgihîştin, ku reviyane. Meymûn bûn du beş; beşek bi hêla rojhi-

lat ve çû, beşa din jî bi hêla rojava de çû, ketin pey Canşah û bendeyan. Beşa ku ber bi dola gêrikan ve çûbû, çav li Canşah û Bendeyên wî ketin û ew dîtin. Bi lez ketin pey wan û xwe bi wan ve gihandin. Êrîşî ser wan kirin û xwestin ku wan bikujin lê ji nişkan ve gêrikên girs li pêşîya wan derketin, ku her gêrîyek bi qasî kûçikan bû û mîna kulîyan ref bi ref ji bin erdê derdiketin û weke bendekê li pêşîya meymûnan disekinîn, şer û ceng dikirin.

Gêrikan gelek meymûn kuştin, gelek ji wan jî hatin kuştin lê di encamê de ew bi ser ketin. Gêrikan kîjan meymûn digirtin, di cî de ew perçe perçe dikirin. Meymûnan jî çawa ku gêrikek dixistin nava xwe, ew dikirin du perçe şerê meymûn û gêrikan pir giran derbas bû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 515'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku gêrik bi ser ketin, Canşah û her sê bendeyên xwe ber bi hundirê dola gêrikan ve revîyan û çûn. Lê çawa bû sibeh, meymûnan ew şopandin, bi ser wan vebûn û hatin ser li serê wan sekinîn. Gava ku çavên Canşah li wan ket, bi ser bendeyên xwe de qîrîya û ji wan re got: Hûn çi sekinîne, bi şûran li wan bidin!

Bendeyan şûrên xwe kişandin û çep û rast li wan dan, serên wan ji ser milên wan firandin, qefleya pêşîyê hemû li erdê rast kirin, ew kirin term. Piştre meymûnekî gir ku lapûşkên wî weke diranên fîlan bûn, bi ser wan de hat û bendeyê ewil ji erdê bilind kir û li erdê da, weke ku kevirekî li erdê bide, Ew parî parî kir. Meymûnin din jî di hawara wan de hatin û li ser serê Canşah û herdu bendeyên wî şer giran bû. Canşah ber bi jêra newalê ve revîya, ku çemekî mezin di wir re derbas dibû. Li qiraxa çem jî gêrikeke pir gir û mezin hebû, çawa dît, ku Canşah bi ser de tê, tevdîra xwe girt lê di heman kêlîyê de bendeyê ku gihabû cem wê, şûrek li newqa wê da, ew kir du felqe. Gêrikên din jî çawa dîtin ku Şahbanûya wan hat kuştin, hemûçikan bi hev re êrîşî ser wî bendeyî kirin û ew kuştin.

Hîna ku Canşah û bendeyê xwe yê mayî di wê rewşê de bûn, meymûn bi ser wan de hatin, xwe bi wan ve gihandin. Canşah kincên xwe ji xwe kirin û xwe avêt nava ava çem, avjenî kir û bi hêla din ve çû. Bendeyê wî jî çav li wî ket, wî jî xwe avêt avê û li pey wî çû. Hetanî bi nîvê avê de çûn lê betilîn.

Di wê navberê de Canşah bala xwe dayê ku dareke mezin li wî alîyê avê ye û şaxekî wê tê hetanî nîvê avê, di ser serê wî re dirêj dibe. Destê xwe avêt wî şaxî û bi xêra wê darê derket ser bejahîyê. Lê bende pê re negihîşt, ku xwe bi darê bigire, li ber pêlên avê çû û li bin guhên tehtan ket, perçe perçe bû. Canşah bi tena serê xwe ma li ser wê bejahîyê. Kincên xwe guvaştin, li ber rojê raxistin, bo ku zuha bibin. Şerê giran ê ku di navbera gêrik û meymûnan de qewîmîbû, bi dawî bû û meymûn vegerîyan welatê xwe.

Canşah ê ku li wê çolistanê bi tena serê xwe mabû, dest bi girî kir û li çogên xwe da, dilê xwe kewand bi êşa bêçaretîyê. Piştî ku hebekî aram bû û bi ser xwe ve hat, rabû ser xwe; çû, ket şikeftekê û tê de bi cî bû; ji bo ku tirsa tenêtîya xwe bişikêne. Demekê bi şûn de jî di xew re çû, raket, hetanî sibehê. Bi ronahîya sibehê re, dîsa ket rê û meşîya. Bi roj û şev bê rawestan meşîya. Gîhayê çolê xwar, ava çeman vexwar lê meşa xwe nesekinand, hetanî ku xwe gihand wî çiyayê mîna agir pêketî. Bi wî çiyayî de jî çû hetanî ku gihîşt wî çemê mezin î ku hefteyê carekê di roja şemîyê de zuha dibû. Hetanî bi qiraxa çem çû, bala xwe dayê, ku ew bajarê cihûyan ê bi tenê jî, li wî alîyê çêm xuya dike. Li ber çem rûnişt, hetanî ku şemî hat û çem zuha bû. Gava çem zuha bû, Canşah jî çem derbas kir û berê xwe da wî bajarê cihûyan. Çû nava bajêr, lê gerîya, kes nedît. Hinekî din bi nava bajêr de çû, hetanî ku li derîyekî vekirî qelibî. Derbasî hundir bû, bala xwe dayê ku kesên di malê de hemû bêdeng rûniştî ne û naaxivin. Canşah ji wan re got: Ez mirovekî xerîb im û ez birçî me! Wan jî bi îşaretê bersiv dayê û jê re gotin: Bixwe, vexwe û nepeyive! Ew jî li gel wan rûnişt; xwar, vexwar û wê şevê li cem wan raket.

Gava bû sibe, xwedîyê malê xêrhatina wî kir û qedrê wî girt û jê re got: Tu ji ku têyî û berê te li ku ye? Canşah bi wê lêpirsîn û xêrhatina ew ê cihû pir hestiyar bû û girîya. Piştre çîroka serpêhatîya xwe jê re vegot û ew ji welatê bavê xwe agahdar kir. Mirovê cihû ecêbmayî ma û jê re got: Me welatê we yê bi vî navî qet nebihîstiye lê me ji karwanên ticaretê dibihîst, ku behsa welatekî bi navê Yemenê dikirin.

Canşah ji mirovê cihû re got: Ev welatê ku taciran ji we re behsa wî kiriye, gelo çiqasî ji vir dûr e? Ê cihû got: Bi qasî ku taciran digot, meşa du sal û sê mehan ji vir dûr e. Canşah got: Gelo ew karwanê ticaretê dê kengî were vira? Ê cihû got: Sala pêşîya me. . .

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 516’AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku yê cihû got ‘sala pêşîya me’, Canşah girîya û kûrekûr pê ket, pir xemgîn bû li ser rewşa xwe; li ser her şeş bendeyên xwe yên ku ew di şer de wenda kirin; li ser dê û bavê xwe û dûrketina ji wan û ew qas bobelatên ku di rê de hatin serê wî.

Mirovê cihû jê re got: Negirî ciwano û li cem me bimîne, hetanî ku karwan were; em ê te bi karwan re bişînin welatê te. Canşah bi wê gotina yê cihû aram bû û li gel wan ma, bi wan re jîya. Her roj li nava bajêr digerîya û lê temaşe dikir. Piştî du mehan, rojekê dîsa weke adetê xwe, li nav bajêr digerîya, bala xwe dayê, ku zilamek gazî dike û dibêje: Li hemberî karê ku ji sibehê hetanî nîvroyê ji min re bike, kî dixwaze hezar dînarî û carîyeyeke pir xweşik û lihevhatî bigire? Û tu kesî bersiv nedayê! Canşah di dilê xwe de ji xwe re got: “Heger ev karê ew dixwaze ne xeternak bûya, ji bo karekî ji sibehê hetanî nîvroyê hezar dînar û carîyeyeke spehî nedida mirov?!” Piştre ber bi bangekêş ve çû û jê re got: Ez dixwazim vî karê te gotî, bikim! Bangekêş bi destê Canşah girt û ew bir mala tacirê xwedîyê kar. Gava derbasî mala tacir bûn, Canşah dît, ku maleke pir mezin û gelekî xweş e. Xwedîyê malê, tacirê cihû jî li ser kursîyekî ebenosî rûniştî bû. Bangekêş çû raserî wî sekinî û jê re got: Mîrzayê min, ev sê meh in ku ez li sûkê bang dikim û kesî bersiva min neda ji xeynî vî ciwanî!

Gava ku tacir gotina bangekêş bihîst, bi Canşah ve rabû, xêrhatina wî kir û ew bir odeyeke pir xweş û gazî bendeyên xwe kir, got xwarinê bînin. Bendeyan sifre raxistin û xwarinên cur bi cur li ber wî danîn. Wî û tacir bi hev re xwar û di dawîyê de jî bi hev re destên xwe şûştin. Piştre şerab jî ji wan re anîn, ew jî vexwarin û di pey re tacir çû tûrikekî ku hezar dînar tê de bû û carîyeyeke pir xweşik jê re anî û got: A ji te re ev mal û ev carîye, di ber karê ku tu yê bikî de.

Canşah, tûrikê dînaran ji destê wî girt û carîyeya xwe jî li kêleka xwe da rûniştandin. Tacir jê re got: Sibê tu yê dest bi kar bikî û rabû ji cem wî derket, çû. Canşah jî wê şevê di wê odeyê de bi carîyeya xwe re raket.

Roja dîtir, sibehê rabû çû hemamê. Tacir jî ji bendeyên xwe re got: Bedlek kincên ji hevrîşim, ên giranbuha jê re bibin. Bendeyan gotina Mîrzayê xwe pêk anîn û bedlek kincên hevrîşim jê re birin hemamê û li benda wî man, heta ku derket. Piştre bedlê kincan lê kirin û ew dîsa anîn malê.

Tacir ji bendeyên xwe xwest, ku çeng û ûd û meşrebê bînin hundir. Wan jî çûn muzîkjen û stranbêj û amûren muzîkê anîn û meyeke xweş jî pê re pêşkêşî wan kirin. Hemûçikan bi hevre kêf û laqirdî kirin, lîstin, dengê çeng û ûdê guhdar kirin û hetanî nîvê şevê vexwarin, sermest bûn. Piştre tacir rabû, çû cem jinên xwe, Canşah jî bi carîyeya xwe re ma hetanî sibehê. Piştre çû hemamê û di vegerê de, tacir hat jê re got: Ez dixwazim ku êdî dest bi karê xwe bikî! Canşah got: Ser seran, ser çavan.

Tacir ji bendeyên xwe xwest, ku du qantiran bînin. Bende çûn, du qantir anîn. Ew li yekê siwar bû û ji Canşah xwest, ku ew jî li ya din siwar bibe; ew jî lê siwar bû û da dû tacir, herdu meşîyan, ji bajêr derketin û hetanî nîvroyê jî meşa xwe berdewam kirin. Nîvrokî gihîştin cem çiyayekî bilind, ku serê wî digihîşt zikê asîmanan. Li wir, tacir ji qantirê peya bû û ji Canşah jî xwest ku ew jî peya bibe. Canşah jî ji qantira xwe peya bû. Tacir kêrek da Canşah û jê re got: Ka vê qantirê serjê bike! Canşah zend û bendên xwe badan û çû werîs avêt her çar nigên qantirê, girêda û ew avêt erdê û rahişt kêrê, da ser stûyê wê, ew serjê kir, gura, her çar nigên wê jê kirin, serê wê veqetand û ew kir komek goşt. Tacir jê re got: Kanî zikê wê jî veke û bikeve hundirê wê, da ku ez zikê wê li ser te bigirim, bidirûm û tu jî bi qasî saetekê tê de bimînî. Di nava wê saetê de tu çi bibînî, tu yê ji min re bibêje!

Canşah zikê qantirê vekir û ket hundirê wê. Tacir jî çermê wê dîsa lê anî hev û li ser wî dirût û ew li wir hişt û ji wir dûr ket.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 517'AN

*Şehrezadê got:*

Piştî ku tacir zikê qantirê dirût û ji wir dûrket, bi saetekê, teyrekî pir mezin daket ser cendekê wê qantirê. Lapûşkên xwe lê anîn hev û ew bi hewa xist, bir ser serê çiya û li wir hewl da, ku wê bixwe. Lê Canşah pê derxist û berîya teyr wî bixwe, zikê qantirê çirand û jê derket. Teyr jî bi dîtina wî cefilî û ji ser cendek firîya, çû. Canşah rabû ser nigan û li derdora xwe mêzand, dît ku çep û rastê wî tijî cendekên mirovên mirî ne û gelek ji wan jî li ber germa rokê hişk bûne. Li hemberî wê dîmenê Canşah pir tirsîya û di dilê xwe de got: "La hewle wela quwete îla bîlah. (Hêz û qawet hemû bi Xwedê ye.)" Piştre li jêra çiyê nêrî, dît ku tacir li jêr e û lê dinêre.

Gava tacir dît, ku Canşah li wî dinêre, gazî wî kir û jê re got: Bi qasî du sed kevirî, ji cem xwe rake û ji min re bavêje! Canşah du sed kevir ji cem xwe jê re avêtin, ku hemû ji yaqût, zeberced û gewhêren giranbuha bûn. Piştre Canşah gazî tacir kir û jê re got: Ka rêya daketinê nîşanî min bide, ez ê careke din keviran ji te re bavêjim! Lê tacir bersiva wî neda, kevirên xwe yên giranbuha hemû li qantira xwe kirin, ew jî lê siwar bû û pişta xwe dayê, çû. Canşah jî bi tena serê xwe ma li ser lûtkeya wî çiyayî û di nava tirsê de kir hewar û gazî lê tu kes pê ve nehat. Ew jî girîya, li çogên xwe da û sê rojan li ser wî çiyayî ma, bêyî ku bizanibe wê çi bike. Roja çaran, rabû ser xwe û bi pehnahîya çiyê de meşîya. Piştî du mehan ji meşeke zor û zehmet xwe gihand dawîya lûtkeyê û dît, ku ji dûr ve newaleke tijî dar û ber û fêkî xuya dike. Hilmeke kûr kişand û bi wê dîmena hêvîdar pir kêfxweş bû. Berê xwe da wê newalê û meşa xwe berdewam kir, hetanî ku gihîşt wê newalê. Xwe bi newalê de berda û çavên xwe li derdorê gerandin, hetanî ku li qesreke mezin û bilind rast hat. Ber bi qesrê ve çû, nêzikî wê bû, dît ku kalekî rûbinûr di devê derîyê wê de sekinîye û gopalekî ji yaqût di destê wî de ye. Canşah çû cem wî û silavek dayê. Zilamê kal jî silava wî girt û jê re got: Kerem bike, rûnê kurê min!

Canşah, çû li kêleka wî rûnişt. Kalepîr jê pirsî, got: Tu ji ku derê hatiyî ser vê erda ku benî Adimekî pê lê nekiriye û tu bi ku ve diçî?

Gava ku kalepîr axivî, Canşah ji ber wê êşa ku kişandibû pir hestiyar bû û girîya û hey girîya. Hindik mabû ku girî wî bifetisîne. Kalepîr jê re got: Bes e kurê min, dev ji girî berde, te dilê min pir êşand!

Kalepîr rabû ser xwe, çû jê re hinek xwarin û vexwarin anî, danî ber wî û jê re got: Bixwe! Canşah xwar û vexwar, piştre spasîya Xwedayê xwe kir û bêhna wî hat ber wî. Wê gavê kalepîr dîsa pirsa xwe jê kir û got: Kurê min, ez ji te dixwazim, ku tu serpêhatîya xwe ji min re rave bikî û bibêjî, bê çi bi serê te hatiye?

Canşah, ji serî hetanî binî çîroka serpêhatîya xwe jê re vegot. Kalepîrê zilaman li hemberî wê rewşa wî pir behetî ma û şaşwaz bû. Canşah got: Ez dixwazim ku tu ji min re bibêjî, bê ev newal a kê ye û kî di vê qesra mezin de rûdinê? Kalepîr got: Kurê min, ev newal û ev qesr û hemû tiştên tê de jî yên mîrzayê me Suleyman Bin Dawid in. Ez jî Şêx Nasr im, qralê teyr û tilûran û li ber vê qesrê wekîlê mîrzayê me me...

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 518'AN

*Şehrezadê got:*

Îcar Şahînşahê min ê bextewar, qralê teyr û tilûran Şêx Nasr ji Canşah re got: Çawa ku min ji te re got, mîrzayê me Suleyman ez kirim wekîlê xwe li ber vê qesrê û ez fêrî ziman û mentiqê teyran kirime. Her sal, teyr tên vê qesrê, mêze dikin û dîsa bi şûn de diçin. seba mana min a vir jî, ev e.

Gava Canşah ev gotina Şêx Nasr bihîst, bi ser de girîya û jê re got: Bavocan, ez ê çawa û bo çi rêyê bikaribim herim welatê xwe? Şêx Nasr jê re got: Binêre kurê min, niha tu nêzikî Çiyayê Qahf î û tu rê li pêşîya te tune ne, ku tu xwe bigihînî welatê xwe. Tenê tu dikarî xwe ragirî, hetanî ku teyr werin vira û ez jî wesîyeta te li yekî ji wan bikim, bo ku te bigihîne welatê te. De êdî li vir be û li cem min bixwe, vexwe û li dîmenên xwezayê temaşe bike, hetanî ku teyr werin.

Canşah, li cem Şêx Nasr ma û êdî her roj ji xwe re li newalê gerîya, temaşe kir, fêkî xwar û meşîya, lîst. Demeke dirêj di nava xweşî û şahîyê de ma, hetanî ku wextê hatina teyran hat.

Gava Şêx Nasr pê hesîya ku teyr hatine, rabû ser xwe û çû ji Canşah re got: A ji te re ev mifteyên hanê û here bikeve odeyên qesrê, yeko yeko lê bigere û li tiştên tê de temaşe bike, ji xeynî felan odeyê. Derbasî wê odeyê tenê nebe, li yên mayî gişan bigere. Lê baldar be, heger tu derbasî wê odeyê jî bibî, dê rêya xêrê li ber te bê girtin. Vê hişyarîya min ji bîr meke!

Şêx Nasr ew hişyarîya xwe kir û rabû çû pêşiwazîya teyran. Gava teyr û tilûran Şêx Nasr dîtin, yeko yeko çûn destên wî ramûsan û hezkirinên xwe pêşkêşî wî kirin. Îcar em şêx û teyrikên wî li wir bihêlin û em vegerin ser rewşa Canşah.

Canşah jî ketibû qesrê û odeyên wê yeko yeko vedikirin, li wan temaşe dikir. Herî dawîyê, hat ber wê odeya ku şêx jê re gotibû, nekevê. Li derîyê wê nêrî, dît ku xilqeke zêr li ber e. Di dilê xwe de got: "Misoger e, ku odeya herî xweşik a di qesrê de ev e. Gelo çi tê de heye, ku şêx ji min xwest, ku ez nekevimê? Bêguman divê ez bikevim vê odeyê jî, jixwe çi li ser enîya mirov nivîsandî be, ew tê serê mirov!"

Piştre destê xwe avêt mifteyan, xilqa derî vekir û derbasî hundir bû...

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 519'AN

*Şehrezadê got*:

Çawa ku Canşah derbasî hundir bû, bala xwe dayê, ku goleke mezin di nava wê de ye û li kêleka golê jî qesreke biçûk heye, ku ji zêr û zîv û camê hatiye avakirim û şibakeyên wê ji yaqût; mermerê wê ji zebercedên kesk û zumrud û belxeş û gewherên neqişandî hatine lêkirin. Di nava wê qesrê de jî şirşirkeke avê hebû, ji zêr bû û li derdora wê şirşirkê jî ajal û teyr û tilûrên ku ji zêr û zîv hatibûn çêkirin û avê di devên wan re davêt, hebûn. Gava ku ba lê dida û li guhên wan dixist, zîqezîq û çîkeçîk bi wan diket, her yekê bi zimanê xwe dikir wîtewît. Li kêleka şirşirka avê jî dikek hebû û li ser dikê textekî ji çadireke biçûk ji hevrîşimê kesk ê bi madenên giranbuha neqişandî, li ser ferehîya pêncî gazî vegirtî bû, li ser nivîneke taybet a di rengê nivîna hezretî Suleyman de.

Canşah hinekî din jî li wir gerîya, dît ku li dora qesrê jî bax û bîstanekî mezin heye, ku hemû darên fêkîyan tê de ne û gelek çem û rûbar jî di nav re diherikin. Li rexekî din jî hemû reng û bêhnên gulan hebûn; ji rihan û nesrîn û qurnefîlan. Çawa ku sira bayê li wan dida, şaxên daran li bin guhên hev diketin û bêhnên xweş tevlihev dibûn, mirov mest dikirin. Cureyên darên fêkî û gulan ew qasî pir bûn, ku hiş di serê mirov de nedihiştin.

Canşah li hemberî wê dîmena bihuştî matmayî ma, ku dikir nedikir nikaribû çavên xwe lê bigirta û awirên xwe jê qut bikira. Demeke dirêj li wan dîmenên ne ji rêzê temaşe kirin. Piştre bala xwe dayê, ku kevirên gola avê jî ji gewher û zumrud û madenên giranbuha ne.

Canşah, di nava sermestî û şaşwazîyeke mezin de meş û gera xwe berdewam kir, hetanî ku derbasî hundirê wê qesrê jî bû û çû ser wî textê ku li ser dika li ber şirşirka avê vegirtî bû; ket bin çadira hevrîşimî û tê de raket, di xew re çû. Qasekê bi şûn de şiyar bû û rabû ser xwe, meşa xwe hetanî derîyê qesrê berdewam kir û li wir rûnişt.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 520'AN

*Şehrezadê got:*

Hîna ku Canşah li devê derîyê qesrê rûniştî bû û ji xwe re li wê dîmena efsûnî temaşe dikir, bala xwe dayê, ku sê kevok ji hewa daketin û li ber golê

danîn û bi qasî saetekê li qiraxa avê lîstin. Piştre kincên xwe yên ji perîyan di ser xwe re anîn û sê keçên mîna sê heyvan ji nava wan perîkan derketin, ku li ser rûyê erdê keç mîna wan xweşik tune bûn. Her sêyan xwe avêtin nav ava golê û bi ken û laqirdîyan henek bi hev kirin û di nav avê de lîstin. Pir xweşik û lihevhatî bûn, nedihatin wesifdan. Demeke din bi şûn de ji nav avê derketin û li nav bax û bîstan gerîyan.

Canşah ji ber spehîbûna wan dîn û har bûbû û ji çavên xwe bawer nedikir, lewre keçikên wisa qet nedîtibûn û bawer nedikir, ku tiştekî wisa li ser rûyê erdê hebe jî. Rabû ser xwe û ber bi wan ve çû, hetanî ku gihîşt cem wan. Silavek li wan kir û ji wan pirsî, got: Xatûnino, hûn jî ku ne û hûn kî ne? Biçûka wan got: Em ji cem Xwedê hatine vir, bo ku em ji xwe re hinekî li vir bigerin û bêhna xwe berdin.

Canşah helîya li ber axaftina wê û jê re got: Xatûna min, tu bi xatirê Xwedê kî, li min were rehmê û şensekî bide min! Wê got: Dev ji van gotinan berde û bi rêya xwe de here!

Canşah li hemberî van gotinên wê girîya û êşeke mezin kişand. Kufekuf pê ket, kesereke kûr berda û got:

ripîrût û servekirî bû ew di nava baxan de
bisk û gulî ber ba diçûn min gote wê nav çi ye
gote min ez im agir ez im atêş şewat çi ye
min gilî kir û gazin gotin wê gote min ew çi ye

Gava keçikan ev helbesta wî bihîstin, kenîyan, tinazên xwe pê kirin, strîn û ji xwe re lîstin. Canşah jî çû ji wan re fêkî û şerab anî, danî ber wan; wan jî xwar û vexwar û bi Canşah re raketin hetanî sibehê.

Gava bû sibeh, her sê keçik rabûn ser xwe, kincên xwe yên perîkan li xwe kirin, mîna berê dîsa ketin dirûvên kevokan û baskên xwe li hev dan, bi hewa ketin, bi rêya xwe de firîyan çûn. Canşah jî li wan dinêrî û bergirîya êşa dilê xwe dikir, lewre piştî ku her sê kevok hinekî din bilind bûn, bi temamî ji ber çavên wî ketin, wenda bûn û vê yekê ew dîn û har dikir, hişê wî ji serî dibir. Herî dawîyê jî qîreke ecêb da û got rep û li erdê ket, ji ser hişê xwe çû.

Şêx Nasrê ku çûbû dîtina teyran, ji wan re got: Kurekî min ê biçûk heye, qederê ew avêtîye vira û ji welatê wî dûr xistiye, ez dixwazim ku hûn wî bi xwe re bibin, bigihînin welatê wî. Wan jî got: Ser seran, ser çavan. Pişt-

re şêx Nasr vegerîya, li Canşah gerîya lê hetanî ku nehat ber derîyê odeya ku jê re gotibû wê veneke, ew nedît û derîyê wê vekirî dît! Tê derxist, bê Canşah li ku ye û çawa derbasî hundir bû, ew di devê derîyê qesra zêrîn de, li bin darekê, dirêjkirî dît. Gava dît, ku ji ser hişê xwe çûye, hinek ava gulan anî bi ser çavên wî de kir, çavên xwe vekirin û bi ser hişê xwe ve hat.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 521'Ê

*Şehrezadê got:*

Gava Canşah bi ser hişê xwe ve hat, Şêx Nasr jê re got: Kurê min, ma min ji te re negot vê odeyê veneke û derbasî hundirê wê nebe? Le belê ka ji min re bibêje, bê te çi tê de dît û çi bi serê te de hat, ku tu wisa ji ser hişê xwe çûyî?

Canşah çi kiribû, çi dîtibû, çi qewimîbû, ji serî hetanî binî jê re rave kir û bi taybetî jî çîroka xwe û her sê horîyan bi hûrgulî jê re vegot.

Dema ku Şêx Nasr ew gotinên wî bihîstin, jê re got: Kurê min, ev keçên ku tu behsa wan dikî, cinî ne, salê carekê tên vira, hinekî ji xwe re dilîzin, bêhna xwe derdixin, dimînin heyanî esrê, piştre dîsa vedigerin welatê xwe, Canşah got: Welatê wan li ku ye? Şêx Nasr got: Wele kurê min ez jî nizanim, bê welatê wan li ku ye.

Destê xwe danî ser milê wî û axaftina xwe berdewam kir, got: De ka rabe, xwe komî ser hev bike, da ku ez te bi teyran re bişînim welatê te; ev eşqa ku tu behs dikî jî, ji bîr bike, tiştek jê dernakeve!

Canşah bi vê gotina şêx pir aciz bû û qîreke ecêb da, piştre dîsa li erdê ket û ji ser hişê xwe çû. Gava ku dîsa bi ser hişê xwe ve hat û şiyar bû; ji şêx re got: Bavocan, hetanî ku ez careke din van keçan nebînim, ez naxwazim herim welatê xwe. Ez li vir bimirim jî ez naxwazim herim. Salê carekê tenê jî rûyê dîlbera xwe bibînim, besî min e.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 522'YAN

*Şehrezadê got:*

Canşah keserek kûr kişand û bi helbestkî got:

xwezî aşopa dîlber li derîyê min nedaba
xwezî ew xiyalê wê li ber çavan neketa
belkî dilêm nesojîya hêsir jî nebaryana
êşa dil û cergên min ew qasî kûr nebûya

Piştre kûrîn pê ket girîya, xwe avêt ber nigê Şêx Nasr, bi ser de girîya û got: Bi min re dilovan be, bo ku Xwedê jî dilovanîyê bi te re bike; ez dexîlê te me, tu yê alîkarîyê bi min re bikî! Şêx Nasr jê re got: Kurê min weleh ez van keçikan nas nakim û ez nizanim bê ew ji ku ne jî. Lê madem ku tu dil ketiye yekê ji wan, li gel min bimîne, hetanî sala bê, vî çaxî. Jixwe ew salê carekê û di heman rojê de tên vira. Vêca gava hatin û kincên xwe ji xwe kirin û bo ku avjenîyê bikin ketin golê, tu kincên a ku tu jê hez dikî, hilde ba xwe û veşêre. Dema ku ji avê derket û hat gel te, bi zimanekî şêrîn ji te re got: “Birawo ka kincên min bide min, ji bo ku ez wan li xwe bikim û xwe pê bistirînim!” tu nedê. Heger tu kincên wê bidiyê, tu yê qet negihîjî armancên xwe. Lewre keçik çawa kincên xwe bigire, dê wan li xwe bike û here welatê xwe û tu jî qet nema wê dibînî. Lewma, divê tu kincên wê di bin çengê xwe de veşêrî û bimînî heta ku ez ji hevdîtina teyran vegerim. Ez ê we li hev bînim û te û wê bi hev re bişînim welatê te. Tiştê ku ez bikaribim ji te re bikim, ev tenê ye, kurê min!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 523’YAN

*Şehrezadê got:*

Gava Canşah ew gotina Şêx Nasr bihîst, dilê wî aram bû û careke din bi ser xwe ve hat, xwe komî ser hev kir, hedana wî hat û li cem Şêx Nasr ma hetanî ya dinî salê û dest pê kir, rojên xwe yek bi yek jimartin û li benda vegera teyran ma. Gava ew roj hat, Şêx Nasr jê re got: Bi wê şîreta min bike û ji bîr nekî, ku kincên keçikê veşêrî. Va ye ez jî diçim hevdîtina teyran! Canşah got: Bila be bavocan!

Şêx Nasr rabû çû gel teyran, Canşah jî berê xwe da baxê kêleka golê û xwe di bin darekê de veşart. Rojekê, duduyan, sisiyan li wir ma lê keçik nehatin. Qeliqî û dilê wî êşîya, xemgîn bû û bi xwe re li ser wî halê xwe girîya. Girîya û hey girîya, hetanî ku ji halê xwe ket û di xew re çû. Piştî demekê

dîsa bi ser xwe ve hat, şiyar bû. Çavên xwe li derdorê gerandin, geh li asîmanan, geh li bejahîyê, geh jî li ava golê nêrî, bi hêvîyeke kulek awirên xwe li wan deran gerandin, heta ku dît, ji hewa sê kevok daketin ber avê. Dilê wî lêda û evîna wî zindî bû! Her sê kevokan derdora xwe baş raçav kirin û gava dîtin, ku kesek tune ye, kincên xwe ji xwe kirin û ketin golê, bi avê lîstin, kêf û laqirdî kirin û bêhna xwe berdan. Piştre ya mezin ji herduyên din re got: Xwişkino, ez ditirsim, ku hinekan xwe di vê qesrê de veşartibe! Keça navîn lê vegerand û got: Lê ev qesra hanê ji dema hezretî Suleyman û hetanî niha vala ye û kes derbasî wê nebûye! Ya biçûk kenîya û got: Heger kesek di vê qesrê de hebe jî, ji min pê ve, kesî ji we nabe!

Hersê keçikan lîsk û henekên xwe berdewam kirin û dîsa li golê vegerîyan, ketin avê, avjenî kirin û ber bi nîvê golê ve çûn, ji kincên xwe dûr ketin. Wê gavê Canşah ji cihê xwe rabû û weke birqê xwe dada kincên keça biçûk, ku navê wê Şemsê bû, ew xistin bin çengên xwe û veşartin.

Wextê ku çavên her sê keçikan bi Canşah ket, dilên wan ricifîn û ji ber wî xwe bi avê sitirandin. Piştre hêdî hêdî û bitirs ber bi wî ve hatin û li qiraxa golê sekinîn, bêyî ku ji nav avê derkevin. Her sêyan ji nêz ve li rûyê Canşah mêzandin, dîtin ku mîna heyvê ye! Jê re gotin: Tu kî yî û tu çawa hatiyî vir û çima te kincên Şemsê xatûn birine? Canşah got: Hinekî din vir de werin, nêzî min bibin, ez ê çîroka xwe ji we re vebêjim û we agahdar bikim, bê çi bi serê min hatiye û çawa ez we nas dikim! Şemsê jê re got: Mîrzayê min, delalîyê ber dilê min û nûra çavên min! Kanî wan kincên min bide min, bo ku ez xwe bi wan bistirînim û werim cem te?

Canşah jê re got: Şahbanûya hemû rindan, ez nikarim kincên te bidim te û xwe bi evîna te bikujim. Hetanî ku qralê balindeyan Şêx Nasr neyê vir, ez nikarim kincên te bidim te. Şemsê got: Heger tu kincên min nadî min, nexwe hebekî xwe bi şûn de bide, da ku herdu xwişkên min werin kincên xwe li xwe bikin û tiştekî bidin min, da ku ez xwe bisitirînim! Canşah got: Bila be, ser seran, ser çavan. Pişta xwe da wan û ber bi qesrê ve dûr çû, derbasî hundir bû.

Şemsê û herdu xwişkên xwe jî ji nav avê derketin. Piştre Şemsê ber bi qesrê ve çû, derbasî hundir bû û mîna heyvekê şewq da. Dît ku Canşah li ser text e. Weke xezalekê meşîya, çû cem wî, silavek lê kir, li nêzikî wî rûnişt û jê re got: Xweşiko, rindo! Te xwe jî kuşt, te ez jî kuştim lê ka ji min re bibêje, bê derdê te çi ye?

Gava Canşah ev gotin ji devê wê bihîstin, ji kêfan girîya û hêsir barandin, hetanî ku kincên xwe şil kirin. Gava Şemsê dît, ku ew evîndarê wê ye, rabû ser lingan, bi destê wî girt û ew li kêleka xwe da rûniştandin. Bi zendika xwe hêsirên wî paqij kirin û jê re got: Rindikê min, dev ji girî berde û ka çîroka serpêhatîya xwe ji min re bibêje!

Canşah çîroka xwe ji serî hetanî binî jê re got.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 524'AN

*Şehrezadê got:*

Vêca şahînşahê min ê bextewar, gava Şemsê xan çîroka Canşah guhdar kir, jê re got: Mîrzayê min, heger dilê te ketibe min, wê çaxê kanî kincên min bide min, ez wan li xwe bikim, da ku ez û xwişkên xwe herin malê, dê û bavê xwe jê agahdar bikin û piştre dîsa li te vegerim û bi te re bêm welatê te!

Canşah girîya, kûrekûr pê ket û jê re got: Qey ji te re helal e, ku tu bi zilimkarîyê min bikujî? Şemsê got: Mîrzayê min, bi kîjan zilmê û çima ez ê te bikujim? Wî lê vegerand û got: Tu çawa kincên xwe li xwe bikî û ji cem min herî, ez ê di cî de bimirim.

Şemsê, bi vê gotina wî kenîya û jê re got: Di vê mijarê de bila dilê te aram be û bawerîya te di cî de be. Bêguman ez ê bi te re bizewicim, êdî şikê ji nava xwe bavêje! Bi wê gotina xwe re jî xwe bi ser de tewand, ew maçî kir, piştre ew himbêz kir. Ji dev û lêvan hevdu ramûsan, ji rûçik û hinarikan û bi qasî katjimêrekê bi hev şa bûn, piştre ji hev û du veqetîyan û li ser text rûniştin.

Xwişka mezin çû nav bîstan, hinek fêkî û hinek gul çinîn û ji wan re bir, danî ber wan. Wan jî xwar û vexwarin; ken û laqirdîyên xwe kirin, wensa xwe bi hev anîn û dilên xwe rihet kirin.

Şemsê li rûyê wî yê xweşik û spehî nêrî, li bejn û bala wî mêze kir û bi dilbijokî jê re got: Dildarê min, evîna ber dilê min; êdî ez qet nema ji te vediqetim, hetanî mirinê!

Canşah bi vê gotina wê pir kêfxweş bû, bêhna wî fireh bû, rûyê bişirî, dilê wî aram bû. Bi coş û kelecan bi hev re lîstin û bi hevdu şabûn. Tam di wê navberê de Şêx Nasr ji hevdîtina balindeyan vegerîya û derbasî cem wan bû. Hemû ji ber wî rabûn, xêrhatina wî kirin û destên wî maçî kirin. Şêx jî bixêrhatina wan kir û ji wan re got: Rûnên! Ew jî rûniştin. Şêx Nasr ji Şemsê re got:

Ev xortê hanê pir pir ji te hez dike û ji malmezinan e, kurê qralan e, bavê wî serdarê Kabûlê ye. Vêca tu bi Xwedê kî qedrê wî zanibe û lê miqate be, xortekî nestêle ye! Şemsê got: Bila be kalocan! Pê re jî destê wî maçî kir û ji ber rabû.

Şêx Nasr jê re got: Heger tu bi gotina xwe re rast bî, jê re sond bixwe, ku tu yê pê re dilsoz bî, hetanî dawîya temenê xwe û qet bêbextîyan pê re nekî! Şemsê sond xwar, ku dê hetanî mirinê pê re dilsoz be û dê tu caran xayîntîyê pê re neke. Piştre berdewam kir û ji şêx re got: Misoger ez ê pê re bizewicim û ez qet jê venaqetim.

Şêx Nasr ji sonda wê bawer kir û li Canşah zivirî, jê re got: Spas ji Yezdanê dilovan re ku hûn gihandin hev! Canşah pir kêfxweş bû û ew û Şemsê bi qasî sê mehên din li cem wî man, di nava xweşî û şahîyê de.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 525'AN

*Şehrezadê got:*

Piştî sê mehan ji mana wan a li cem Şêx Nasr, Şemsê ji Canşah re got: Ez dixwazim ku em herin welatê te û li wir bizewicin û bi cî bibin! Canşah got: Bila be xatûn, ser seran, ser çavan. Piştre rabû çû cem şêx, pê şêwirî û jê re got: Em dixwazin herin welatê xwe û li wir bi cih bibin! Şêx jê re got: Baş e, here welatê xwe û haydarê wê be, lê miqate be. Wî jî got: Ser seran, ser çavan.

Şemsê kincên xwe ji Canşah xwestin û ji şêx re got: Ka ji wî re bibêje, bila kincên min bide min, da ku ez wan li xwe bikim. Şêx Nasr ji Canşah re got kincên wê bidê, wî jî dayê. Şemsê kincên xwe li xwe kirin û ji Canşah re got: Li pişta min siwar bibe, çavên xwe bigire û guhên xwe jî asê bike, bila dengê girîneka felekê neyê te. Li ser pişta min jî, herdu destên xwe bavêje perîkên mim, xwe baş bigire, da ku tu nekevî.

Canşah bi gotina wê kir û li ser pişta wê siwar bû, xwe bi perîkên wê girt, ji bo ku nekeve. Şemsê da xwe û bifirê lê şêx ew da rawestandin û jê re got: Ez ditirsim, ku hûn rêya xwe şaş bikin, ka ez ji te re bajarê Kabûlê baş bidim zanîn, ji bo ku tu rê şaş nekî. Şemsê sekinî, wî jî Kabûl baş pê da naskirin. Şemsê jî spasîya wî kir, xatir jê xwest û xatir ji herdu xwişkên xwe jî xwest û ji wan re got: Silavan li dê û bavên min bikin û wan ji rewşa min û Canşah agahdar bikin.

Pişt re baskên xwe li hev dan û di cî de bi hewa ket, firîya û mîna ba û birûskê bi zikê asîmanan de çû. Piştî çûna wan, herdu xwişkên wê jî firîyan, çûn cem dê û bavê wê, ew ji rewşa wan agahdar kirin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 526'AN

*Şehrezadê got:*

Şemsê fira xwe ji nîvroyê hetanî esrê berdewam kir û Canşah jî li ser pişta wê bû. Esirkî di ser newalekê re çûn, ku hemû av û dar û ber bû. Ji Canşah re got: Ez dibêjim, em îşev li nava van dehl û daran bigerin, di nava revekan de bimînin, hinekî bêhna xwe berdin, wê baştir be! Canşah got: Tu çawa dixwazî, wisa bike.

Şemsê ji hewa berjêr bû, xwe berî wê newalê da, li erdê danî. Canşah ji ser pişta wê daket, herdu çavên wê ramûsan û herdu çûn, li kêleka çem rûniştin, bi qasî katjimêrekê li xwezaya wir temaşe kirin. Piştre rabûn meşîyan û di nava şîndarên fêkîyan de gerîyan, hem temaşe kirin hem jî têra xwe fêkî xwarin û li dawîyê jî hatin li binê darekê pal dan, raketin hetanî sibehê. Sibehê çawa ku rabûn, Şemsê ji Canşah re got: Xwe bavêje ser pişta min!

Canşah li ser pişta wê siwar bû, Şemsê jî firek da xwe û bi hewa ket, bilind bû û çû û çû; ji sibehê hetanî nîvroyê firîya. Nîvrokî hinek ji wan nîşaneyên ku Şêx Nasr jê re behsa wan kiribû, li ber çavên wê ketin. Wê çaxê xwe berjêr berda û li nava mêrgeke şîn daket, ku tijî kanî û xezal û darên fêkîyan bû. Çawa ku daket erdê, Canşah jî ji ser pişta wê peya bû. Şemsê lê zivirî û jê re got: Dilê min û nûra herdu çavên min, gelo tu dizanî em çiqasî hatine? Canşah got: Na. Wê lê vegerand û got: Em mesafeya meşa sêsed mehan hatine! Canşah got: Şikir ji Xwedê re ku em bi selametî hatine!

Herdu rûniştin, lîstin, kêfa xwe kirin, xwarin, vexwarin û ketin nava henek û laqirdîyan. Hîna ku ew di nava wê kêfê de bûn, bala xwe danê, ku du bende ber bi wan ve tên. Yek ji wan, ew bendeyê dema ku Canşah li keştîyê siwar bûbû û bi deryayê ve çûbû, li cem hespan mabû; yê din jî bendeyê ku pê re derketibû nêçîrê. Çawa ku Canşah dîtin, herduyan jî di cî de ew nas kirin û hatin silav lê kirin, jê re gotin: Bi destûra te be, em ê herin bavê te agahdar bikin û mizgînîya hatina te bidinê! Canşah got: Herin mizgînîyê bidin bavê min û jê re bibêjin, bila ji me re konan bîne, em ê jî li vir bêhna

xwe vedin û heft rojan li vir bimînin, heta ku ew bi karwanekî mezin werin me ji vir bibin û bi dêlendizeke mezin me bibin bajêr.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 527'AN

*Şehrezadê got:*

Herdu bende di cî de li hespên xwe siwar bûn û çûn, mizgînîya xêrê dan bavê wî, gotin kurê te vegerîyaye. Qral Têxemûs bi wê mizgînîyê pir kêfxweş bû û ji wan re got: Hûn dibêjin, kurê min hatiye? Wan jî dubare kirin û gotin: Rast e, kurê te yê wendayî vegerîyaye û niha li Mêrga Keranî ye.

Qral Têxemûs ji guhên xwe bawer nekir û careke din bi wan da dubarekirin. Ji kêfan hindik mabû ku perên wî çêbibin û bifire. Dilê wî ew kêfxweşîya mezin nema rakir, got rep li erdê ket, ji ser hişê xwe çû. Demekê bi şûn de, dîsa bi ser hişê xwe ve hat, li ser wê mizgînîya wan herdu bende xelat kirin û dîyarîyên giranbuha da wan û ji wan re got: Vî malî û vê xelatê bigirin, di ber wê mizgînîya we de, lew ku we derew jî li min kiribe. Bendeyan gotin: Em derewan nakin, qasek berê em li cem wî bûn û me destên wî maçî kirin; wî em şandin û got herin konan ji me re bînin û em ê jî heft rojan li vir bin, heta ku mîr û emîr û kizîrên dewletê werin pêşiwazîya me.

Qral Têxemûs ji wan re got: Rewşa kurê min çawa ye? Wan got: Kurê te baş e û horîyek pê re ye, mirov dibêje qey ji bihuştê derketîye. Gava qral ev gotin ji wan bihîstin, ferman da, ku dahol û zirne were lidarxistin û qasid bi her derên bajar ve şandin, ji bo ku mizgînîyê bidin dîya Canşah, mîr û emîran, jinên wan û hemû karmendên dewletê. Piştre ferman da leşker û xizmetkaran ji bo ku karwanekî mezim amade bikin, da ku berê xwe bidin Mêrga Keranî.

Hîna ku Canşah û Şemsê li kêleka çem rûniştî bûn, bala xwe danê, ku artêşa bavê wî bi ser wan de tê. Canşah û Şemsê rabûn ser xwe û ber bi wan ve çûn. Gava nêzikî wan bû, leşkeran ew nas kirin; hemû ji hespên xwe peya bûn, silav lê kirin û destê wî ramûsan, yek bi yek tê derbas bûn, hetanî ku bavê wî hat. Çawa çav li kurê xwe ket, xwe ji ser pişta hespê avêt ser wî, ew himbêz kir û bi ser de girîya, hêsir rijandin, hetanî ku haş bû û coş û kelecana wî daket. Piştre dîsa li hespên xwe siwar bûn, leşkeran jî dan kêlekên wan û meşîyan hetanî ku gihîştin ser çem. Li wê derê hemû ji hespên xwe peya bûn. Leşkeran kon vegirtin, pez û dewar serjê kirin, şahîyeke mezin

li dar xistin, al bilind kirin, li def û daholan dan, qedeh li hev xistin û deng dan zirne û bilûran.

Qral Têxemûs fermaneke din da xulaman, ku ji bo Şemsê xanê konekî taybet ê ji hevrîşimê sor vegirin û bi dîbacan raxînin. Wan jî di cî de fermana qral pêk anîn û Şemsê xan tê de bi cih kirin. Ew jî rabû ser xwe, kincên xwe yên ji perîkan danîn, kincên din li xwe kirin û di hundirê kon de rûnişt. Hîna ku nû rûniştibû, bala xwe dayê, ku Canşah û bavê xwe yê qral, derbasî cem wê bûne! Rabû ser xwe, erda bin nigê qral maçî kir. Qral rûnişt û kurê xwe li alîyê rastê, Şemsê xanê jî alîyê xwe yê çepê da rûniştandin û xêrhatina wê kir. Piştre li kurê xwe zivirî û jê re got: Ka ji min re bibêje, bê çi bi serê te hat, divê dema derbasbûyî de?

Canşah, çîroka serpêhatîya xwe ji serî hetanî binî jê re vegot û bi hûrgulî rave kir. Bavê wî bi wê çîrokê pir hestiyar û matmayî bû, piştre li Şemsê xanê zivirî û jê re got: Spasî ji Xwedê re ku hişt tu bi ser bikevî û tu min û kurê min bigihînî hev! Xêra herî mezin a ku te bi me kir jî, ev bû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 528'AN

*Şehrezadê got:*

Piştî ku qral spasîya xwe ji Şemsê xan re anî ziman, jê re got: Lê ez dixwazim, ku tu tiştekî ji min bixwazî û ez ji te re bikim, da ku ez rihet bibim! Şemsê xan jê re got: Ez dixwazim, ku tu qesrekê ji min re bidî avakirin, ku di nava bax û bîstanekî de be û av jî di binîya wê re biherike! Qral got: Bila be.

Hîna ku ew wisa ji xwe re diaxivîn, dîya Canşah jî hat û li dû wê hemû jinên emîr û wezîran, mezin û kizîran. Canşah rabû ser xwe û çû pêşîya diya xwe û ew himbêz kir û bi qasî saetekê gilî û gazinên xwe li hev kirin, hesreta bêrîkirinê şikandin, piştre jî derbasî konê Canşah bûn û li wê derê rûniştin, derdên xwe bi hev re parve kirin. Di wê navberê de çend jinên pêşevan hatin ber devê kon, ku Şemsê xan jî bi wan re bû û gazî kirin, gotin diya Canşah: Şemsê xan hatiye silaveke li we bide û destê we ramûse…

Bi vê gotina wan jinan re diya Canşah rabû ser xwe û li ser nigan ew pêşwazî kir; xêrhatina wê kir, hal û wextê wê pirsî û bi qasî saetekê pê re guftûgo kir. Piştre herdu rabûn ser xwe û jinên mîr û wezîr û kizîran jî bi wan re, hemû tev de meşîyan û hatin konê Şemsê xan, derbasî hundir bûn û li wir rûniştin, civata xwe gerandin.

Qral Têxemûs û kesên pê re bi qasî deh rojan li wir man, di nava civat û şahîyê de. Pir kêfxweş bûbû bi vegera kurê xwe û ji bo wê yekê jî gelek xêr û xêrat, gelek xelat û dîyarî li ser xelkê belav kirin û ji bo her kesî şahîyeke mezin li wê derê li dar xist. Piştî wan deh rojên pîrozîyê, ferman da artêşa xwe, ku vegere bajêr. Hemûçikan amedekarîyên xwe kirin, barên xwe bar kirin û li hespê xwe siwar bûn, wezîr û kizîran dan kêleka qral û berê xwe dan bajarê xwe.

Piştî ku ketin bajêr, bajar hemû xemilandin. Kolan hemû vegerandin qadên şahî û pîrozbahîyê, kêf û şahîyeke hîn mezintir hat lidarxistin. Diya Canşah û Şemsê xan jî derbasî qesrê bûn û her der hat xemilandin, xwarin û vexwarin li ser her kesî hat belavkirin û kesek bi tenê ji wê şahîyê bêpar nehat hiştin. Wê kêf û şahîyê bi wî hawayî deh rojan berdewam kir, ji her kesî bêtir Şemsê xan bi wê dîmenê şad û bexyewar bû.

Qral Têxemûs jî gazî endezyar, avakar û zanayên kar kir û ferman da wan, ku bi lez di nava wî bîstanî de qesrekê bidin avakirin. Wan jî got: Ser seran, ser çavan û bi lez rabûn dest bi karê xwe kirin. Canşah jî çawa bihîst, ku dê qesrek ji Şemsê re were avakarin, emir da hosteyan û ji wan xwest, ku du stûnên mermer bînin û nava yekî ji wan vala bikin, wî bikin mîna sindoqekê. Wan jî di cî de emrê wî pêk anîn. Canşah jî ew stûn xist esasê qesrê û ji wan re got: Êdî li ser wî esasî ava bikin. Wan jî wisa kir û li gora wê qesir ava kirin.

Piştî ku avakirina qesrê qedîya û ew bi merş û kulavan raxistin, di nava wî bîstanî de û di ser wê ava ku di bin re diherikî, bû qesreke pir xweşik. Di pey re jî daweta wan li dar xistin û di nava şahîyeke mezinde ew zewicandin û di wê qesrê de bi cî kirin. Lê çawa Şemsê xan derbasî wê qesrê bû, bêhna kincên xwe yên ji perîkan kir...

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 529'AN

*Şehrezadê got:*

Çawa ku Şemsê xanê bêhna kincên xwe yên ji perîkan kir, pê derxist, ku di wê qesrê de ne û cihê wan nas kir. Lê ji bo ku wan derxe, ecele nekir û xwe ragirt hetanî nîvê şevê, piştî ku Canşah raket û ket xewa giran, ew rabû ser xwe û çû jêra qesrê, di ber wê stûna mermer de erd kola, gihîşt stûnê, risasa ku bi ser devê kuna hundirê stûnê de helandibûn rakir, kincên xwe jê

derxist û ew li xwe kirin, piştre jî firîya û çû li ser banê qesrê rûnişt. Piştre gazî wan kir û got: Ez dixwazim, ku hûn herin Canşah bînin, ji bo ku ez xatir jê bixwazim!

Xizmetkar çûn cem Canşah, ew şiyar kirin û daxwaza Şemsê xan jê re gotin. Canşah rabû bi lez çû, dît ku Şemsê li ser qesrê ye û di nava kincên xwe yên perikî de ye. Gazî wê kir û jê re got: Te çawa tiştekî wisa kiriye? Şemsê got: Evîndarê min, ronîya çavên min û delalîyê ber dilê min! Bi navê Xwedê ez pir ji te hez dikim û ez pir jî kêfxweş bûm, ku min tu anî welatê te û tu gihandî nav kesûkarên te û dê û bavê te nas kir. Vêca heger tu jî ew qasî ji min hez dikî, were keleha Cewher Teknî, tu yê min li wir bibînî.

Şemsê gotina xwe qedand û di cî de bi hewa ket, firîya, çû welatê xwe, cem mala bavê xwe. Canşah jî di cî de qidûmên wî şikestin û got rep li erdê ket, ji ser hişê xwe çû. Xizmetkar bi lez çûn cem bavê wî, ew ji rewşê agahdar kirin. Bavê wî jî siwar bû û bi lez xwe pê ve gihand, hat ser wî, dît ku kurê wî li erdê dirêjkirî ye û ji ser hişê xwe çûye. Dizanibû bê kurê wî çiqasî ji Şemsê hez dikir. Li ser wî girîya û hinek gulav li ser rûyê wî kir, Canşah bi ser hişê xwe ve hat û çavên xwe vekirin; dît ku bavê wî di ser serê wî re ye, ji ber çûna jina xwe dîsa dest bi girî kir. Bavê wî jê re got: Çi bi te hatiye kurê min? Canşah got: Bavocan, Şemsê xanê ji cinîyan e û ez pir jê hez dikim. Kincekî wê li cem min bûn, ku ne bi wî bûya nikaribû bifirîya. Min jî ew kinc xistibûn hundirê stûneke ji mermer û piştî ku min devê kunê bi risasê girt, di binê qesrê de bi cih kiribû. Wê jî çûye esas kolaye, kincên xwe ji wir derxistiye, li xwe kiriye û firîyaye, çûye ser qesrê. Berîya ku ji wir bifire û here, gazî min kir û ji min re got: Ez pir ji te hez dikim û min tu gihandî welatê te, nav dost û nasên te û te dê û bavê xwe jî dît. Heger tu jî ev qasî ji min hez dikî, were keleha Cewher Teknî û piştre firîya çû bi rêya xwe de. Qral Têxemûs ji kurê xwe re got: Xeman mexwe û kulan nexe dilê xwe kurê min. Ez ê tacir, gerok û geştyaran gişan kom bikim û derbarê wê kelehê de agahîyan ji wan bixwazim. Heger me ew nas kir bê li ku ye, em ê biçin wir, malbata wê bibînin û wê ji te re bixwazin. Em ji Xwedê hêvî dikin, ku wê bidin te.

Piştre, Qral Têxemûs di cî de rabû, çû her çar wezîrên xwe kom kirin û ji wan re got: Herin çiqas tacir, geştiyar û rêwîhez di bajêr de hebin, wan kom bikin û ji wan bipirsin bê ka derbarê keleha Cewher Teknî de agahîyên kê ji wan hene. Kî ji wan bikaribe wê kelehê nîşanî me bide, ez ê pêncî hezar dînarî bidime wî.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 530'Î

*Şehrezadê got:*

Bi wê gotina qral re hemûçkan got: Ser seran, ser çavan û di cî de rabûn ser xwe, fermana qral pêk anîn; hemû tacir û gerok û geştyarên bajêr kom kirin û pirsa keleha Cewher Teknî ji wan pirsîn lê kesî ji wan derbarê wê kelehê de bi tu tiştî nizanibû. Vegerîyan cem qral û rewş jê re ragihandin. Qral Têxemûs fermaneke nû da û ji her çar wezîrên xwe re got: Herin çiqas keçên spehî û carîyeyên xweşik hebin, ji Canşah re bînin; çiqas muzîkjen, neyzen, stranbêj û falbînên ku li cem qralan peyde nabin, hemûyan kom bikin, belkî wensa wî bi wan bê û Şemsê xanê ji bîr bike.

Wezîran çûn ew daxwaza wî jî pêk anîn. Lê qral li benda encamê nesekinî û rabû gelek casûs û agahdêrker şandin hemû herêm û welat û giravan, da ku li keleha Cewher Teknî bipirsin û agahîyekê derbarê wê de bînin. Casûs çûn û bi qasî du mehan li her derê gerîyan û li kelehê pirsîn lê kesî ji wan tu agahî bi dest nexist. Vegerîyan qralê xwe ji vê yekê agahdar kirin. Qral pir xemgîn bû û girîya. Rabû çû cem kurê xwe; dît ku hemû jin û carîyeyên spehî li dora wî rûniştî ne, keçên dengbêj û muzîkjen jî li gel wî ne lê ew guh nade yekê ji wan û di nava xemgînîya xwe de ye. Qral jê re got: Kurê min, çi ji destê min hat, min ew kir lê min derbarê wê kelehê de tu agahî bi dest nexistin û va ye min ji te re keçên ji wê xweşiktir anîne!

Gava ku Canşah ew gotin ji bavê xwe bihîstin, kûrînî pê ket, girîya û bi helbestî got:

> sebir nemaye evîn jî daîm muqîm e
> çogşikestî laşê êşbar her seqîm e
> gelo heye me hevgehînek bi Şemsê re carek
> gelo heye Şemsê bo me dîsa evîndarek

Têxemûs, cara ewil di heyata xwe de xwe pir bêhêz û bêçare dît. Nema dizanibû wê çawa bike, çilo bike. Hetanî çend rojan berê jî, hêz û qudreta xwe bêsînor didît. Lê êdî xwe pir lawaz his dikir û di nava kul û kederan de fetisî mabû.

Vêca di demên borî de dijminahî di navbera Têxemûs û qralê Hindistanê de hebû û hîna jî berdewam dikir. Ji ber ku Têxemûs êrîşî ser qralê Hindistanê kiribû, gelek zilamên wî kuştibûn û malê wî talan kiribû. Qralê Hindistanê ku navê wî Kefîd bû, xwedîyê artêşeke çeleng bû û hezar pê-

lewanên wî hebûn, ku her pêlewanekî serdarîya hezar êlî dikir, ku di her êlekê de jî çar hezar faris hebûn. Çar wezîr li ber destê Kefîd bûn û di binîya wî re jî gelek sultan û melîk û artêşên mezin hebûn. Kefîd, serwerîya xwe li ser hezar bajarî dimeşand, ku di her bajarekî de jî hezar keleh hebûn. Bêguman Kefîd qralekî hêzdar, bisaw û xwedî navekî mezin bû, ku dinyayê gişî bihîstibû û hesabê wî dikir.

Îcar gava melîk û qralê Hindê Kefîd bihîst ku qral Têxemûs bi dildarîya kurê xwe de ketiye û desthilatdarîya xwe û milkê xwe daye kêlekekê û leşkerên wî qels bûne, ji hev belav bûne û ew jî tengav bûye; gazî hemû wezîr û kizîr û mezinên karmendên dewleta xwe kir û ji wan re got: Qey we ji bîr kiriye, ku qral Têxemûs êrîşî ser me kiribû. Gelek leşkerên me kuştibû û mal û milkên me talan kiribûn û ji gişî xerabtir jî bav û birayê min kuştibûn û kes ji we tune ye, ku di wê êrîşa wî de merivekî wî nehatibe kuştin. Niha jî ez dibihîzim, ku ew bi pirsgirêkên kurê xwe Canşah re mijûl dibe û leşkerên wî bêhêz û belawela bûne. Yanî ev roj pir guncav e, ji bo ku em heyfa xwe jê hilînin. De êdî xwe amade bikin û amûrên şer û cengê li hev kom bikin. Divê em giş yek bin û bi yek derbê re bigirin ser, wî û kurê wî bikujin û welatê wî bixîn destê xwe!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 531'Ê

*Şehrezadê got:*

Kefîd, qralê Hindistanê fermana şer û cengê da artêşa xwe û ji wan re got: Hemû amûr û pêdiviyên şer amade bikin, tevdîrên xwe gişan bigirin û sistîtîyê di tu tiştî de nekin, bila hemû hêz û leşker ji êrîşê re amade bin, em ê bigirin ser welatê Têxemûs, em ê wî û kurê wî bikujin û welatê wî gişî bixin destê xwe.

Serkirde û serleşkerên artêşê gişan gotin: Ser seran, ser çavan û her kesî dest bi amadekarîyên şer kir, çek û hespên xwe amade kirin û giş li hev kom bûn, dahola cengê lêda, komên leşkeran ji şerq û xerbê bi ser hev de hatin û di nava sê mehan de artêş giş gihîşt ser hev û amade bû. Ala û senceqên xwe bilind kirin, qral Kefîd serê artêşa xwe kişand û berê wê da welatê Têxemûs. Çawa ku gihîştin wir û dora Kabûlê girtin, dest bi şer kirin, biçûk û mezin, xelkê wê giş dane ber xwe, ew kuştin, serjê kirin û mal û milkên wan talan kirin.

Gava ku xebera êrîşa Kefîd gihîşt Têxemûs, pir hêrs bû û gazî wezîr û kizîr û mezinên dewleta xwe kir û ji mîr û emîran re got: Qral Kefîd bi artêşa xwe ve ket nav erda welatê me, şer û ceng li hemberî me daye destpêkirin û li gorî saloxên ku hatine destê me, leşkerekî pir giran bi xwe re anîye, ku nayê jimartin. Îcar hûn çi dibêjin? Emîr û serkirdeyên wî gotin: Ey qralê dem û dewranan, bi ya me be, hema em derkevin pêşîya wî, pê re şer bikin û wî ji erdê xwe derxin! Qral Têxemûs got: Xwe ji şer û cengê re amade bikin!

Dahola cengê lêda, bangewaziya şer hat kirin û ji çep û rastê welat leşker bi ser hev de kom bû. Her kesî şûr û mertalê xwe, tîr û kevanên xwe hilda, mîxfera xwe xist serê xwe û li hespa xwe siwar bû. Di nava çend rojan de artêşa Têxemûs gihîşt ser hev. Alayên xwe bilind kirin û dan dû qralê xwe, berê xwe dan enîya şer. Gava ku nêzikî artêşa Kefîd bûn, li derdora Kabûlê, Têxemûs artêşa xwe li dola Zehranê sekinand û nameyek ji Kefîd re nîvisand, xist destê qasidekî û jê re şand. Qral Têxemûs di nameya xwe de got: "Bi qasî ku em agahdar bûne, te karê rêbir û bêsinc û sakûleyan kiriye. Heger tu qralekî kurê qralan bûyayî, te ev karên xerab nedikir û tu nedihatî welatê min, te mirovên bêguneh nedikuşt û te ew talan nedikirin. Heger berîya hatina te ez agahdar bibûma, min ê pêşîya te bigirta û min nedihişt, ku tu zilmeke wisa mezin li gelê min bikî. Lê dîsa jî ger tu bi şûn de vegerî û dev ji şer berdî, dê baş bibe lê ger tu bi şûn de neçî, li himberî min derkeve meydana şer û cengê, em binêrin kî berx e kî beran e!"

Gava ku Têxemûs ew nameya xwe bi qasidekî re şand, çend heb casûs jî dan kêleka wî, ji bo ku derbarê artêşa dijmin de agahîyan jê re bînin.

Qasid name bir û çû. Gava nêzî wan bû, kon û çadirên ji etles vegirtî ji wî ve xuya kirin. Li ber wan jî alin ji hevrîşimê sor bû, ku di nîvê hemûçikan de vegirtî bû û gelek leşker li dora wê bûn. Wî jî berê xwe da wî konî û hat cem wî. Lê pirsî, jê re gotin, ev konê Qralê me Kefîd e. Qasîd li binê kon nêrî, dît ku qral Kefîd di nîvê kon de, li ser kursîyekî ku bi cewheran rapêçayî ye, rûniştî ye û hemû mîr û emîr û serkirdeyên dewleta wî jî li dorê rûniştî ne.

Gava ku leşker û zêrevanên qral ew dîtin, nameya di destê xwe de nîşanî wan da. Name ji destê wî girtin û ew birin cem qral. Qral name vekir, xwend û têgihîşt. Piştre rahişt pênûsa xwe û bersiva wê nivîsand, got: "Divê qral Têxemûs bizanibe, ku misoger em ê tola xwe hilinîn; malên we xera bikin. Sibê li meydana şer em ê hevdu bibînin û ez ê nîşanî te bidim, bê şer çi ye!" di pey re mohr kir û da destê qasidê Têxemûs.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 532’YAN

*Şehrezadê got:*

Qasidê qral Têxemûs rahişt bersiva nameya qralê xwe û bi şûn de vegerîya. Hat cem qralê xwe û bejna xwe li ber tewand, erda bin nigê wî maçî kir û nameya qral Kefîd, da wî. Piştre tiştên ku bi çavên xwe dîtibûn, jî jê re anî ziman û got: Qralê min ê gewre, leşker û lehengên ku li ber çavên me ketin, bê hed û bê hesab bûn; ne pêşîya wan, ne jî dawiya wan xuya dikir.

Qral name vekir û xwend. Gava dît bê Kefîd çi jê re gotiye, pir hêrs bû û qehirî. Ferman da wezîrê xwe Eynzara û jê re got: Hezar siwarî bi xwe re bibe û di nîvê şevê de êrîşî ser wan bike, hemûyan bikuje! Eynzara got: Ser seran, ser çavan, qralê min!

Eynzara hezar fêris û siwarên neqane dan kêleka xwe û berê xwe da biryargeha artêşa qral Kefîd. Tu nabêjî di heman demê de, qral Kefîd jî fermanek dabû wezîrê xwe Xetrefan, bo ku pênc hezar farisî bigire û here ser leşkerê qral Têxemûs û wan tune bike. Wî jî pênc hezar siwarên neqane dabûn kêleka xwe û berê xwe da leşkerên Têxemûs. Herdu wezîr jî bêyî ku hayê wan ji hev hebe, ber bi hev dihatin. Nîvê şevê, di nîvê rê de hêzên herdu wezîran rastî hev hatin û li hev qelibîn. Gazî hev kirin, bi ser hev de qîrîyan û di pey re şerekî giran di navbeyna herduyan de rûda û hetanî sibehê jî berdewam kir.

Bi ronahîya sibehê re wezîrê qral Kefîd û hêzên xwe reviyan, bi şûn de bazdan, vegerîyan cem qralê xwe. Qral Kefîd pir hêrs bû û ji wan re got: Çi bi we hat, ku we serkêşên xwe giş wenda kirin? Lêşkerên wî serê xwe bera ber xwe dan û gotin: Ey qralê gewre û bextewar! Gava wezîr xetrefan ferman da û em bi rê ketin, êvar bû. Nîvê şevê em gihîştin nîvê rê û wezîrê Têxemûs û artêşa xwe bi gelek siwarên leheng em li wir pêşwazî kirin û li kêleka dola Zehranê li me dan. Me hew dît, ku em ketine nava wan. Dîsa jî hetanî sibehê me bi mêranî bi wan re şer kir. Di şer de gelek leşker hatin kuştin. Wezîr Eynzara bi ser fîlên me de dihat, di rûyê wan de diqîrîya û li wan didan, fîl jî dicefilîn, bi şûn de dizivirîn, direviyan û pê li siwarên me dikirin, ew diperçiqandin û diçûn. Ji ber toz û xubarê kesî kes nedidît û xwîn jî mîna avê diherikî. Heger em nereviyana, wê qirra ne bihata.

Qral Kefîd bi vê gotina wan aciztir bû û bi hêrs got: Xwelî li serê we be! Xezaba Mîtra bi ser we de bibare, ma ez çi bibêjim ji we re!

Eynzara jî vegerîya cem qralê xwe Têxemûs û encama şer jê re ragihand. Qral serkeftina wî pîroz kir û kêfxweşîya xwe anî ziman û got: Ez bi we şanaz dibim. Piştre fermana lidarxistina şahîyekê da û serkeftina wan pîroz kirin. Di wî şerî de du sed siwarên wan ên çeleng hatibûn kuştin.

Qral Kefîd jî xwe amade dikir, ji bo ku heyfê hilîne, leşkerên xwe amede kirin û ew daxistin meydanê, sef bi sef rêz kirin. Bi giştî pazde sef bû û di her sefekê de deh hezar siwar hebû. Bi wî re sêsed pêlewanên çeleng hebûn, ku her yek ji wan mîna şêrekî bû û li ser fîlekî siwar bû. Hemû jî ji nava şervan û cengawerên herî wêrek hatibûn hilbijartin. Piştre ala û nîşan û senceqên xwe hildan, qedeh li hev xistin, dahola cengê lêda û mêrxas û egîdan xwe dan pêş, ji mirinê re meydan xwendin.

Qral Têxemûs jî fermanên amadekarîya şer dan, leşkerên xwe li meydanê sef bi sef li hev kom kirin, ku bi temamî deh sef bûn û di her sefekê de deh hezar siwar hebû. Li herdu kêlekên wî jî sed heb pêlewanên cengawer hebûn, ku her yek weke dêwekî bû. Îcar çawa ku sefên leşker sererast bûn, mêrxas û egîdan nav di xwe dan, xwe dan pêş û herdu artêş mîna du pêlên ava deryayê li bin guhê hev ketin, şingeşinga şûr û mertalan gihîşt azmanê heftan. Erd ji pîkola hespan teng bûbû, ezman bi dengê hîrehîra wan tijî bûbû, ji ber teperepa simên wan erd û asîman li hev ketibûn û ilora toza ku ji ber wan dipengizî. Şer û cengeke giran di navbera herdu artêşan de rûda û hetanî êvarê berdewam kir. Gava şev ket erdê, şer rawestîya û leşker vegerîyan malên xwe.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 533'YAN

*Şehrezadê got:*

Piştî ku herdu artêş ji hev veqetîyan, çûn malên xwe, qral Kefîd leşkerên xwe raçav kirin, ew hejmartin, dît ku pênc hezar ji wan wenda kiriye. Pir hêrs bû û goştê devê xwe cût ji qehran.

Qral Têxemûs jî leşkerên xwe jimartin û dît ku sê hezar siwarên xwe yên çeleng di şer de wenda kiriye. Ew jî pir hêrs bû û qehirî.

Roja dîtirkê, dîsa herdu artêş daketin meydana şer û sef bi sef ketin rêzê. Qral Kefîd careke din derket pêşîya artêşa xwe, angaşta misogerîya serkeftinê anî ziman û bi ser leşkerên xwe deqîrîya, ji wan re got: Gelo kes di nav we de

heye, ku dakeve meydana şer û cengê û rêya serkeftinê ji me re veke? Lehengekî bi navê Berkîk, li ser pişta fîlê xwe, xwe da pêş, got: “Ez” û ji ser pişta fîl daket, çû erda bin nigê qralê xwe maçî kir û îzin jê xwest, bo ku dakeve meydanê. Qral destûr dayê, ew jî dîsa li fîlê xwe siwar bû, daket tirada şer û gazî dijminên xwe kir, got: Gelo di nav we de kesekî ku bi min re şer bike heye?

Gava qral Têxemûs banga wî pêlewanê bi heybet bihîst, li leşkerên xwe zivirî û ji wan re got: Wê kî ji we li hemberî vî fêrisî dakeve meydana şer? Bi vê pirsa qral re, siwarê hespekê ji sefa pêş derket, hat raserî qralê xwe, erda bin nigê wî maçî kir û destûr jê xwest, bo dakeve meydan şer. Gava ku qral destûr dayê, berê xwe da meydana şer û derket hemberî Berkîk. Gava nêzî wî bû, Berkîk jê re got: Navê te çi ye û tu kî yî, ku tu tinazê xwe bi min dikî û bi tena serê xwe tu derdikevî hemberî min? Wî jî singa xwe nepixand û got: Ez Xedenfer kurê Kehîl im! Berkîk got: Hîna ez li welatê xwe bûm, min navê te bihîstibû, ka dakeve meydanê, da ku em nas bikin, mêrxas kî ye!

Çawa ku Xedenfer ew gotina wî bihîst, rima xwe kişand û bi ser de çû. Berkîk jî şûrê xwe ji kalanê wî derxist û êrîşî ser wî kir. Derba ewil lêda lê şûr li mixfera Xedenfer ket û zirar jê nedît. Di êrîşa duduyan de Xedenfer rima xwe tê werkir û di goştê fîlê Berkîk de çikiland. Tam di wê kêlîyê de siwarek ji paş ve lê qîrîya û got: Tu kî yî, ku tu birayê min dikujî? Û tîrek avêt Xedenfer, li ranê wî da. Xedenfer şûrê xwe rakir û lê da, ew di nîvî de kir du qet. Siwar ji ser pişta hespê xwe de hat xwarê û di nava xwîna xwe de ma. Pê re jî Xedenfer bi şûn de bazda, çû cem qralê xwe Têxemûs.

Qral Kefîd bangek li artêşa xwe kir û got: Bi hev re dakevin meydanê û van siwaran mîna gîha li erdê rast bikin! Qral Têxemûs jî heman ferman da artêşa xwe û herdu artêş dîsa daketin meydana şer û mîna melkemotan ketin pêxila hev. Hespan bi ser hev de kirin hîrehîr, mêrxasan tehn li hev dan û bi ser hev de qîrîyan, şûr ji kalanên xwe kişîyan û leşker sef bi sef li hev ketin, mîna ku çiya li hev kevin. Tirsonek reviyan ji derbên şûr û riman, şingeşinga şûr û mertalan gihîşt ezmanê heftan û bi sedan, wê rojê bi hezaran mêrxasên cengê di nav xwîna xwe de vegevizîn.

Êvarkî qral Têxemûs leşkerên xwe jimartin, dît ku di şer de pênc hezar farisên wî yên neqane hatine kuştin û çar alayên wî şikestine. Gelekî hêrs bû û kulma xwe li erdê da. Qral Kefîd jî leşkerên xwe venêrandin û dît ku di şer de şêş hezar siwarên wî hatine kuştin û neh alayên wî şikestine. Herdu qralan li hev kirin, ku sê rojan navberê bidinê û şer rawestînin.

Qral Kefîd nameyek ji qral Faqûn re nîvisand û alîkarî jê xwest. Lewre herdu ji alîyê jinan ve dibûn merivên hev. Faqûn çawa ew nameya Kefîd girt û xwend, artêşa xwe di cî de kom kir û berê xwe da meydana şer…

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 534'AN

*Şehrezadê got:*

Têxemûs di konê xwe de rûniştî bû û li ser tevdîrên şer diramiya, gava ku zêrevanekî wî ket hundirê kon û got: Qralê min, toz û ecacek ji dûr ve xuya dike, ku hetanî bi ber perên ezmanan bilind bûye. Têxemûs di cî de komek leşker peywirdar kir û ew şandin venêrandina wê ecacê. Koma leşkeran çûn û demek bi şûn de vegerîyan û gotin: Qralê gewre, me bi qasî saetekê venêran kir, ew toz û ecac ji hev ferikî û di bin wê de heft alayên siwarî xuya kirin, ku di her alayakê de sê hezar leşker hebûn, hemû diçûn cem qral Kefîd. Qral Têxemûs tê derxist, ku dijminê wî alîkarî ji hinekan xwestiye, ew jî li ser tevdîrin nû fikirî.

Qral Faqûn û leşkerên xwe, çawa gihîştin cem qral Kefîd, çû hizûra wî, silav lê kir û jê re got: Rewşa te û rewşa şer çawa ye? Qral Kefîd got: Tu jî dizanî, ku qral Têxemûs dijminê min e; kujerê bira û bavê min e. Ez jî hatime pê re şer dikim û tola xwe jê hiltînim. Qral Faqûn got: Her bijî ji te re û destê Mîtra li pişta te be! Qral Kefîd bi helwesta Faqûn pir kêfxweş bû û pir qedrê wî girt.

Îcar em vegerin ser rewşa Canşah. Ew jî bi qasî du mehan di nava wê qeyrana derûnî de ma, bêyî ku derbasî cem carîyeyekê bibe an serîyekî li bavê xwe bide. Lê gava dît, ku bavê wî jî di nava wan du mehan de qet lê nepirsî, qelaq pê re çêbû û ji hinek zêrevanên xwe pirsî, got: Gelo bavê min çima nayê vira? Ew jî mecbûr man, ku wî ji şerê ku di neqeba wan û qral Kefîd de derketiye, agahdar bikin. Canşah ji wan re got: Ka hespê ji min re bînin, ez ê herim cem bavê xwe, tevlî şer bibim! Wan jî di cî de hespê wî jê re anîn. Ew jî lê siwar bû û di dilê xwe de ji xwe re got: "A baş ew e, ku ez kesî bi xwe re mijûl nekim û ez herim wî bajarê cihûyan. Heger min xwe gihand wir, ez ê bikaribim xwe bigihînim wî tacirê ku cara din ez bi hezar dînarî û carîyeyekê şixulandim. Belkî piştî wê, Xwedê teala rêyeke xêrê ji min re veke!

Canşah meşîya û leşkerên wî jî dan dû wî. Xelkê jî got: Canşah berê xwe da şer û cengê, di hewara bavê xwe de çû. Heta êvarê meşîyan û xwe gihandin mêrgeke şîn û xweş. Bêhnvedanek dan meşa xwe û wê şevê li wir raketin. Piştî ku Canşah bi wan ewle bû, ku leşkerên wî giş raketine, bê deng rabû ser xwe, xwe girêda, li hespê xwe siwar bû û xwe ji wan vedizî, çû û berê xwe da rêya Bexdayê; lewre hîna di bîra wî de bû, ku cihûyên wî bajarî gotibûn salê carekê karwanekî ticaretê ji Bexdayê tê cem me. Loma wî ji xwe re got: Heger min xwe gihand Bexdayê, ez ê bi karwanekî taciran re herim wî bajarê cihûyan." û biryara xwe jî li gora wê da.

Roja dîtir bi sibehê re gava leşkerên wî ji xew rabûn û mîrê xwe Canşah li gel xwe nedîtin, şaşwaz û behetî bûn! Çep û rast çûn, li her derê lê gerîyan lê ew nedîtin. Çûn cem bavê wî û bûyer jê re vegotin, ew agahdar kirin. Qral Têxemûs bi vê agahîyê pir hêrs bû û agir ji ber devê wî çû, taca ser serê xwe avêt û got: Min kurê xwe wenda kir û dijmin jî di raserî min de ye, la hewle û la quwete îla bîlah! Wezîr û kizîrên wî jê re gotin: Bêhna xwe fire bike qralê me, sebir xêrê ji mirov re tîne...

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 535'AN

*Şehrezadê got:*

Piştî ku qral Têxemûs kurê xwe wenda kir, ji jîyanê jî, ji şer û cengê jî sar bû. Leşker û artêşa xwe bi şûn de kişand û çû ket bajarê xwe, derîyên wê giş li ser xwe girtin, sûr û bircên wê asê kirin û ji ber Kefîd reviya. Kefîdê ku bi ser ketibû jî, êdî her meh bi ser bajêr de digirt, doza şer û cengê li wan dikir; heft roj û heft şevan ew di dorpêçê de dihiştin û piştre dîsa leşkerên xwe kom dikirin û vedigerîya çadirên xwe, da ku birîndarên xwe derman bikin û hêza xwe dîsa komî ser hev bikin. Mirovên bajêr jî, bi tamîra cihên xerabe yên sûran ve mijûl dibûn, çekên xwe çêdikirin û mencenîqên xwe sererast dikirin. Herdu hêlan jî qet nizanibû, ku ew şerê wan dê heft salên din jî bi wî hawayî, berdewam bike!

Canşahê ku hem ji jina xwe û hem jî ji bavê xwe veqetîyabû, pir xemgîn, dilbirîn û derdnak bûbû, xew li çavên wî herimîbû. Meşa xwe berdewam dikir, çol û beyar diqetandin û her ku digihîşt bajêr û bajarokekî li keleha Cewher Teknî dipirsî lê kesî tu bersiv nedidayê. Ji kê dipirsî, wan jê re digot: Me qet keleheke bi navekî wisa nebihîstiye. Lê gava rojekê li karwanekî rast

hat û ew bajarê cihûyan ji wan pirsî, jê re gotin: Ew bajar li hêla rojhilat e. Vê mehê bi me re were, em ê te bigihînin bajarê Şemûn û ji wir jî em ê herin bajarê Xewarizmê. Jixwe ew bajarê cihûyan jî nêzikî Xwarizmê ye; di navbera me û wê de, hîna mesafeya meşa sal û sê mehan heye.

Canşah bi ya wan kir, bêhna xwe fireh kir û meşa xwe bi wî karwanî re berdewam kir. Destpêkê gihîştin bajarê Merzeqan. Gava derbasî wî bajarî bûn, Canşah li kê rast hat, li keleha Cewher Teknî pirsî lê kesî tu agahî nedayê. Kerwan, rêwîtîya xwe berdewam kir û gihîşt Hindistanê. Li wir jî Canşah li kê rast hat, pirsa keleha Cewher Teknî ji wan kir. Lê kesî derbarê wê kelehê de bi tiştekî nizanibû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 536'AN

*Şehrezadê got:*

Meşa Canşah bi wî karwanî re, tijî êş û zordarî û birçîbûn û tîbûn bû lê dîsa jî bi sebirkêşî meşa xwe berdewam kir, hetanî ku gihîştin bajarê Şemûn. Li wir jî keleha Cewher Teknî ji her kesî pirsî. Lê gişan gotin: Me keleheke bi wî navî nebihîstiye. Ji wir jî rêwîtîya xwe berdewam kirin û hatin bajarê Xewarizmê. Ew bajarê cihûyan ji xelkê wê pirsî, wan jî rê û nîşanên bajêr jê re gotin. Bi rojan û bi şevan meşîya, hetanî ku gihîşt ew cihê ku ji meymûnan reviyabû. Piştre rêwîtîya xwe dîsa berdewam kir, hetanî gihîşt ber wî çemê ku li kêleka bajarê cihûyan bû. Li qiraxa avê rûnişt û ma li benda hatina roja şemîyê, da ku ava çem biçike û tê re derbasî wî alîyê çem bibe, here bajêr.

Roja şemîyê hat û bi emrê Xwedê çem zuha bû. Wî jî lêxist, derbas bû, çû bajêr û nesekinî hetanî ku negihîşt mala wî tacirê cihû yê ku cara din jî çûbû cem wî. Derbasî hundir bû û silavek lê da; wî xweşhalî û xêrhatina wî kir. Piştre xwarin û vexwarin danîn ber û jê re got: Demeke dirêj e, ku tu nebedî bûbûyî, gelo hetanî niha tu li ku bûyî?

Canşah got: Ez li warê Xwedayê gewre bûm.

Wê şevê li cem wan raza, roja din, daket nav sûkê, gerîya, bala xwe dayê, ku yek gazî dike û dibêje: “Xelkino, bajarîno! Kî ji we dixwaze karekî bike, bi hezar dînarî û carîyeyeke sipehî? Karê ku hûn ê bikin jî, tenê nîvroj e!” Canşah jê re got: Ez dixwazim li cem te bişixulim! Bangêşker gote wî: Bide dû min! Canşah da dû wî û çû mala wî tacirê cihû yê ku berê jî çûbû

cem. Bangêşker ji tacir re got: Ê ku dixwaze bixebite ev e, mîrzayê min! Tacir, xêrhatina Canşah kir, bi destê wî girt, ew bir alîyê malê û xwarin û vexwarin li ber wî danî. Canşah jî têra xwe xwar û vexwar. Tacir, dînar û carîyeyeke spehî pêşkêşî wî kir û rabû ser xwe, çû. Canşah jî wê şevê bi carîyeya xwe re raket. Roja dîtirkê, hezar dînar û carîyeya xwe bir cem cihûyê ku destpêkê hatibû cem, li ba wî danî û piştre dîsa vegerîya cem tacirê ku dê li cem wî bixebitîya. Tacirê cihû jî mîna cara berê, dîsa du qantir anîn, ew li yekê, Canşah li yekê siwar bû û bi rêyekê de meşîyan hetanî ku gihîştin çiyayekî pir bilind. Tacir, kêrek û werîsek derxîst, avêt ber Canşah û jê re got: Vê qantirê bavêje erdê û wê serjê bike! Canşah ew avêt erdê, ew serjê kir, çermê wê di ser re anî û nigên wê jê kirin. Piştre zikê wê jî vekir û serî jêkir. Tacir jê re got: Bikeve zikê wê, ez ê zikê wê li ser te bidirûm, te çi di hundirê wê de dît, tu yê paşê ji min re bibejî. Jixwe karê ku tu bikî jî ev e!

Canşah ket zikê qantirê, tacir jî zikê wê li ser dirût û dûrî qantirê ket, xwe li cihekî veşart. Piştî saetekê teyrekî pir mezin, weke dêwekî hat, daket ser laşê qantirê û bi lapûşkên xwe ew hilda, bir, ber bi perên ezmanan ve bir, dûre li ser lûtkeya çiyayekî bilind danî. Li wê derê teyr, hewl da ku meytê qantirê bixwe. Canşah pê hesîya, berîya ku ew bixwe, wî zikê qantirê bi kêrê çirand û jê derket. Bi derketina wî re teyr cefilî, firîya, çû. Canşah li derdora xwe nêrî, awirên xwe berjêr ve daxistin, dît ku tacirê cihû li wir e û mîna çûkekî biçûçik xuya dike. Jê re got: Tu çi dixwazî? Tacir got: Ji wan kevirên li dora xwe hinekan ji min re bavêje, ez ê rêya daketinê nîşanî te bidim! Canşah got: Ma qey ne tu bûyî yê ku berîya pênc salan te wiha û wiha bi serê min kir û te hişt, ku ez ew qas êş û azar û birçîbûnê bikişînim!? Tew va ye dîsa te ez anîm vir, ji bo ku tu min bidî kuştin! Bi navê Xwedê ez tu tiştî ji te re navêjim!

Canşah ew gotina xwe temam kir û ket ser rêya xwe ya berê û berê xwe da cem qralê teyr û tilûran Şêx Nasr.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 537'AN

*Şehrezadê got:*

Canşahê dilbiêş û pir xemgîn bi şev û roj meşîya, ji bo ku zû xwe bigihîne mirad û meqsedê. Birçî bibûya gîhayê çolê û fêkîyên daran dixwar, tî bibûya jî ji ava çeman vedixwar. Bi rojan û şevan rêwîtîya xwe berdewam kir, hetanî ku xwe gihand qesra hezretî Suleyman. Çû, dît, ku şêx Nasr dîsa

li devê derîyê qesrê ye. Silav lê kir, destê wî maçî kir û li halê wî pirsî. Şêx jî xêrhatina wî kir û jê re got: Te xêr e, kurê min, çima tu dîsa di van deran re derketî? Jixwe tu û Şemsê xan bi dilekî xweş çûbûn?

Canşah bi ser de girîya û çîroka xwe û Şemsê jê re got: Çawa çûn welatê xwe, çawa bi hev re zewicîn û çawa ew û Şemsê ji hev vegetîyan. Di dawîyê de jî got: Gava ku Şemsê bi hewa ket, çû, ji min re got: Heger tu ji min hez dikî, bi dû min de were keleha Cewher Teknî.

Şêx Nasr li wê gotina wî ecêbmayî ma û jê re got: Wele kurê min ez bi serê mîrzayê me Suleyman kim, min ev nav qet nebihîstiye û ez nizanim bê ev keleh li ku ye. Canşah got: Îcar ez ê çawa bikim û ez ji wir hatime hetanî vir, bi hêvîya ku ez agirê dilê xwe vemirînim? Şêx jê re got: Bêhna xwe fireh bike, hetanî ku çûk û teyr û tilûr werin, li vir kom bibin, ez ê pirsa wê kelehê ji wan bikim, belkî hinek ji wan zanibin.

Bi vê gotina Şêx re, bêhna Canşah hat ber wî û hebekî aram bû. Derbasî qesrê bû û çû hundirê wê odeya ku gola avê tê de bû û her sê keç li wir dîtibûn, li nav bîstan gerîya û li dora qesra zêrîn çû û hat. Rojên xwe li wir derbas kirin. Rojekê gava ku mîna her roj li qiraxa golê rûniştî bû, Şêx Nasr hat gel wî û jê re got: Kurê min van rojan dê teyr û tilûr werin!

Canşah bi wê agahîyê pir kêfxweş bû. Çend rojên din bi şûn de teyr hatin; nifş bi nifş, cur bi cur hatin cem Şêx Nasr û destê wî maçî kirin, silav lê kirin. Kîjan hat û Canşah pirsa keleha Cewher Teknî jê kir lê gişan gotin: Me keleheke bi vî navî qet nebihîstiye. Canşah kedernak bû û girîya, hetanî ku ji ser hişê xwe çû. Şêx Nasr gazî teyrekî mezin kir û jê re got: Vî xortî bibe bajarê Kabûlê! Rê û nîşaneyên bajêr û herêmê ji teyr re gotin û peywira wî baş pê da naskirin. Teyr got: Ser seran, ser çavan.

Gava Canşah bi ser hişê xwe ve hat, şêx rêya vegerê nîşanî wî jî da û ew li ser pişta teyr siwar kir. Teyr ji Canşah re got: Li xwe miqate be, tu bi telkî nebî û nekevî, guhên xwe jî baş bigire, da ku fîzîna ba û xumexuma deryayan zirarê nede te! Piştre baskên xwe li hev dan û bi hewa ket, firîya. Şev û rojekê çû û li cem qralê wehşan Şah Bedrî daket erdê û ji Canşah re got: Me rêya xwe şaş kir. Lê dîsa jî hewl da xwe, ku bifire û rêya xwe berdwam bike. Canşah ji teyr re got: Tu bi rêya xwe de here û min li vê derê bihêle! Ez dixwazim li vir bimirim an jî xwe bigihînim welatê xwe.

Teyr ew li cem qralê wehşan, Şah Bedrî hişt û çû bi rêya xwe de. Şah Bedrî ji Canşah pirsî û got: Tu kî yî, tu ji ku têyî û te çawa ev teyrê bêhawe

peyda kir? Canşah serpêhatîya xwe ji serî hetanî binî jê re vegot. Şah Bedrî behetîma li vê çîroka wî û jê re got: Bi serê Suleyman, ev keleha ku tu behsa wê dikî, ez nas nakim. Lê kî derbarê wê de agahîyekê bide me, em ê wî xelat bikin û te jî bişînin wir.

Canşah girîya, hêsir barandin û xwe li benda fereca xêrê ragirt. Rojekê qralê wehşan hat gel wî û jê re got: Rabe kurê min, rabe û tiştê di van nexşeyan de ji ber bike, da ku gava wehş werin vir, tu pirsa wê kelehê ji wan bikî.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 538'AN

*Şehrezadê got:*

Qralê wehşan Şah Bedrî ji Canşah re got: Kul û xeman mekişîne kurê min, wisa xuya dike, ku tu poşman bûyî, ku tu bi wî teyrî re neçûyî û te rêya xwe berdewam nekiriye. Lê ez ji te dixwazim, ku tu aram bî, lewre birayekî min ê bi navê Şemax heye ku ji ber serhildêrîya xwe hatibû girtin û li cem Mîrzayê me Suleyman di zindanê de mabû; mezintirînê cinîyan e û serwerîya gişan dike, loma dibe ku ew xwedî agahî be derbarê wê kelehê de. Ez ê niha te bişînim cem wî.

Şah Bedrî nameyek ji birayê xwe re nîvisand, bo ku alîkarîya Canşah bike û ew li ser pişta wehşekî kir, name jî da destê wî û ew rê kir cem birayê xwe Şemax.

Wehş bi rojan û bi şevan meşîya, hetanî xwe gihand cem qralê cinîyan Şemax. Hîna ku negihîştibû cem wî, Canşah ji ser pişta xwe danî û bi meşê çû hizûra qral Şemax, erda bin nigê wî maçî kir û nameya birayê wî, qralê wehşan da destê wî. Şemax name xwend, têgihîşt û bi germahî xêrhatina Canşah kir û jê re got: Bi Xwedê kurê min, di heyata xwe de min bi navê vê kelehê nebihîstiye!

Canşah kedernak bû û girîya. Qral Şemax jê re got: Kanî ji min re bibêje, bê tu kî yî, navê te çi ye, tu ji ku têyî û tu yê herî ku? Canşah çîroka serpêhatîya xwe ji serî hetanî binî jê re got. Şemax behetî ma û jê re got: Kurê min, ez texmîn nakim, ku Mîrzayê me Suleyman tu carî keleheke wisa bihîstibe û ew dîtibe. Lê belê ez papazekî li çiyê nas dikim, ku pir temendirêj e û hemû wehş û dirinde û ajal û teyr û tilûr û cinî ketine bin serwerîya wî û hetanî niha jî ew nivîskên pîroz ji melîkên cinan re dixwîne, da ku bi ya wî bikin, lew ku ew

naxwazin jî. Lewre pîroziyên ku li ser wan dixwîne û efsûna ku li dar dixe, pir xurt e. Min jî carekê serî hildabû li hemberî Mîrzayê me Suleyman û wî jî ez xistibûm zindanê. Wê çaxê jî ji vî keşîşî pê ve kesî zora min nebiribû, bi sêrbazî û efsûn û xap û rîpên xwe. Ez demekê di xizmeta wî de jî mam û ez baş dizanim, ku ew li hemû herêm û welat û erdnîgarîyên ser rûyê erdê gerîyaye û hemû rê û rêçik, keleh û sûr, bajar û gundan nas dike û ez texmîn nakim, ku tu dever ji ber wî veşartî hebin. Ez ê niha te bişînim cem wî, belkî ew vê kelehê nîşanî te bide, lewre her kes ji tirsan dikeve bin xizmeta wî û ji bo wê yekê jî wî ji xwe re gopalek çêkiriye, ku ji sê perçeyan e. Wî gopalê xwe di axê de diçikilîne û li ser perçeyê ewil dixwîne, şîr û mast jê dide der. Piştre li ser perçeyê din dixwîne, genim û ceh jê dide der. Hemûyî digire, gopalê xwe ji erdê derdixe û diçe dêra xwe, ku jê re dibêjin Dêra Elmas. Vêca ev keşîşê hanê, sêrbazekî mezin e û çi tiştên ecayîb hebin, ji destê xwe vedertîne. Bi rastî keşeyekî fenek û û pir zîrek e. Navê wî Yexmûs e û her kes pir jê ditirse. Misoger divê ez te li gel teyrekî pir mezin û çarbaskî bişînim cem wî.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 539'AN

*Şehrezadê got:*

Qral Şemax, Canşah li ser pişta teyrekî çarbaskî kir, ku nigên wî mîna yên fîlan qelew bûn lê di salê de tenê du caran difirîya. Jixwe Temşûnê alîkarê Şemax, her carê diçû du camûs ji alîyê Îraqê dianîn, ew perçe dikirin û bi awayekî rojane dida wî teyrî. Gava Şemax ew li ser pişta teyr siwar kir, ji teyr xwest, ku Canşah bibe cem Yexmûsê keşe. Teyr ew bir û şev û roj firîya, hetanî ku ew gihand Çiyayê Qela ku Dêr Elmas li wir bû. Canşah li cem Dêrê ji ser pişta teyr peya bû. Li dêrê nêrî, dît ku keşe di hundir de îbadeta xwe dike. Canşah derbasî hundir bû, çû cem wî, erda bin nigê wî maçî kir û li ber wî sekinî. Keşe çawa ku ew dît, jê re got: Tu bi xêr hatî kurê min; ey xerîbê welatan û rêwîyê jidûrhatî, gelo çima tu hatiyî vira?

Canşah girîya û ta bi derzîyê ve kir, çîroka xwe ji serî hetanî binî jê re vegot. Keşe bi vê çîroka wî şaşwaz bû û jê re got: Kurê min, bawer bike di heyata xwe de min navê vê kelehê nebihîstiye, li gel ku hîna di serdema pêxemberê me Nûh de jî ez hebûm û di wê serdemê de jî, di serdema hezretî Suleyman de jî ez serwerê wehş û cin û teyran bûm. Ez texmîn nakim, ku Hezretî Suleyman jî navê vê kelehê bihîstibe. Lê belê dîsa jî hebekî bêhna

xwe fireh bike kurê min. Bila hemû Teyr û tilûr û wehş û cinî û alîkarên wan bên, ez pirsa kelehê ji wan bikim, belkî hinek ji wan pê zanibin û agahîyan derbarê wê de bidin me, ku bibe derman ji birîna te re.

Canşah, demekê li cem keşe ma. Rojekê gava li cem wî rûniştî bû, bala xwe dayê, ku Teyr û tilûr û teba û cinî hemû li pey hev tên dêrê û rêya xwe bi keşe dixin, destê wî maçî dikin û diçin. Pê re jî Canşah û keşe, keleha Cewher Teknî ji wan pirsîn. Bi dorê hatin lê yekî ji wan, negot min bihîstiye û ew dîtiye; hemûçikan gotin: Me ne ev keleh dîtiye û ne jî navê wê bihîstiye. Kûrînî bi Canşah ket, girîya û xwe avêt Xwedê, dua kirin, ku lê were rehmê. Wê kêlîyê teyrekî ku li dawiyê mabû hat û got: Keşeyê dilovan, warê me li Çiyayê Camînî, li pişt Çiyayê Qahf e, di nava berîyeke mezin de, wê çaxê ez û birayên xwe çêlîk bûn, dê û bavê me jî diçûn nêçîrê û xwarin ji me re dianîn. Carekê çûn û heft rojan bi ser me de nehatin. Em jî pir birçî bûn. Di roja heştan de hatin û bi ser me de girîyan. Me got, çima hûn ew qasî dereng man? Gotin wele hebûnekî agirî em revandin û em birin keleha Cewher Teknî, cem qral Şehlan. Çawa ku qral em dîtin, xwest ku me bikuje. Me jê re got, çêlîkên me li mal in, li hêvîya me ne. Wî jî em azad kirin. Vêca heger dê û bavê min hîna sax bûna, dê cihê kelehê nîşanî me bidana.

Gava Canşah ev gotin bihîstin, girîya û hey girîya, piştre ji keşe re got. Ez ji te dixwazim, ku tu bihêlî ew teyr, min bigihîne nêzî hêlîna dê û bavê xwe, li Çiyayê Camînî yê li pişt Çiyayê Qahf! Keşe ji teyr re got: Teyrocan, ez ji te dixwazim ku tu vî xortî bibî cihê ku ew dixwaze û ji te re çi bibêje, tu bi ya wî bikî! Teyr ji keşe re got: Ser serê min!

Teyr, Canşah li ser pişta xwe kir û bi hewa ket, firîya, çû. Bi roj û şevan firîya, hetanî ku xwe gihand Çiyayê Camînî. Li wê derê ew ji ser pişta xwe danî, hinekî bêhna xwe berda, piştre dîsa ew li ser pişta xwe kir û firîya, bi qasî du rojan rêya xwe berdewam kir, heta ku xwe gihand hêlîna dê û bavê xwe ya kevn.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 540'Î

*Şehrezadê got:*

Li cihê hêlîna bavê xwe daket erdê û ji Canşah re got: Ev e, ew hêlîna ku em tê de mezin bûn! Canşah girîya, fişkefişk bi bêvila wî ket û ji teyr re got:

Ez ji te dixwazim, ku tu min li ser pişta xwe bikî û bi hêla ku dê û bavê te diçûn xwarin ji we re dianîn de bibî. Teyr ew li serpişta xwe kir û firîya, çû. Heft şev û heşt rojan çû hetanî ku ew gihand çiyayekî bilind. Li wir daket erdê û ew ji ser pişta xwe danî, jê re got: Ji vir û pê de ez tu deverê nema nas dikim. Li wir rûniştî man û piştî demekê Canşah di xew re çû, raket. Gava ji xew şiyar bû û bi ser hişê ve hat, dît ku şewqek ji dûrahî ve zikê ezmanan dadigire. Ew qasî tûj dibiriqand, ku nizanibû ew şewqa kelehekê ye; hem jî ew keleha ku ew lê digere. Li gel ku di neqeba wî û wê kelehê de meşa du mehan mesafe hebû jî, ew keleha ki ji yaqûtê sor û malên wê ji zêrê zer hatibûn avakirin û bi madenên giranbuha hezar burc jê re hatibûn lêkirin, pir nêzik xuya dikir. Ji ber ku ji cewher û elementên giranbuha hatibû avakirin, navê wê kiribû keleha Cewher Teknî. Melîkê wê kelehê jî, melîk Şehlan, bavê wan her sê keçikan bi xwe bû.

Em Canşah li wir bihêlin û em vegerim ser rewşa Şemsê xan: Ew jî çawa ku ji cem mala Canşah reviya û hat malê, çîroka serpêhatîya xwe ji dê û bavê xwe re got. Ew ger û geştyarîya ku li ser rûyê erdê kiribû, ew ecêbên ku li wan rast hatibû, hezkirina wê û Canşah ji hev re, hemû ji wan re rave kirin. Gava ku dê û bavê wê ew gotin jê bihîstin; jê re gotin: Gerek te lê wisa nekira û Xwedê jî ne razî ye ji vê helwesta te.

Pişt re bavê wê qral Şehlan, ev çîrok ji xelkê xwe re jî got û ji wan xwest, ku gava însanekî li ku bibînin, wî bînin cem wî. Şemsê bi xwe jî tiştê di dilê xwe de bi diya xwe re par ve kiribû û gotibû; Canşahê dildarê min e û li ser min dîn dibe. Misoger dê rojekê were vir. Lewre gava ez bi hewa ketim, min jê re got, heger tu ji min hez dikî, were keleha Cewher Teknî.

Îcar gava Canşah çav li wî tiştê biroqankî ket, berê xwe dayê û ber bi wî ve meşîya. Di wê navberê de Şemsê xan jî xizmetkarekî xwe bi alîyê Çiyayê Qedmûs ve şandibû karekî. Hîna ku xizmetkarê wê wisa ji xwe re dimeşîya, bala xwe dayê, ku însanek ji wê ve tê. Çû cem wî û silavek lê kir. Canşah jê tirsîya lê silava wî girt û bersiv dayê. Xizmetkar jê re got: Navê te çi ye? Wî got: Navê min Canşah e, berê ez dil ketibûm jineke cinî ya bi navê Şemsê, min pir jê hez kiribû û ew li cem xwe girtibû, lewre jineke pir spehî û rind bû. Lê piştî ku derbasî qesra bavê min bû, reviya, çû…

Canşah serpêhatîya xwe giş ji xizmetkarê cinî re got û girîya, hêsîr rijandin. Dilê yê cinî pê şewitî û jê re got: Megrî êdî tu gihîştî miradê xwe, lewre Şemsê xan bi xwe jî pir ji te hez dike û wê dê û bavê xwe jî ji wê eşqa di neqaba we de agahdar kiriye û hemû mirovên di kelehê de ji te hez dikin.

Piştre yê cinî ew li ser milê xwe kir û ew bir keleha Cewher Teknî. Peyamnêran di cî de mizgînî dan qral Şehlan û Şemsê xanê, gotin va ye Canşah hatiye. Gava mizgînî gihîşt wan, pir dilşa û kêfxweş bûn. Qral Şehlan ferman da, got: Bila her kes derkeve pêşwazî û xêrhatina Canşah. Ew bo xwe jî rabû ser xwe, li gel hemû alîkar û karmend û efrît û serhildêran çû pêşwaziya wî.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 541'Ê

*Şehrezadê got:*

Çawa ku Şehlan Canşah dît, ew himbêz kir û ramûsa. Wî jî destê qral maçî kirin. Qral Şehlan ê bavê Şemsê, dîyarîyên giranbuha dan Canşah: Hevrîşimê rengereng ê bi zêr û cewheran xemilandî lê kir, tacek da serê wî, ku tu qralên însan, tacên wilo qet nedane serê xwe û hespekî gir ji hespên melîkên cinîyan jî dîyarî wî kir. Canşah li hespê xwe siwar bû, alîkarên wî jî dan kêlekên wî û li gel qral û mezinên cinan meşîyan, hatin ber derîyê qesrê, li wir peya bûn. Canşah jî li gel qral di wê qesrê de bi cî bû. Canşah li hemberî spehîbûna wê qesra ku hundirê wê giş bi dur û cewher û madenên giranbuha hatibû xemilandin, şaşwaz û devjihev ma.

Qral Şehlan ew li ser text, li kêleka xwe da rûniştandin û ji xizmetkaran xwest, ku sifreyê raxînin. Xwarin danîn, xwarin, vexwarin û destên xwe şûştin. Piştre diya Şemsê xanê hat, silav lê kir, xêrhatina wî kir û jê re got: Spas ji Yezdan re ku tu gihandî armanca te, piştî ked û tehbeke mezin û çavên te xew dîtin piştî xewherimîna mehan! Piştre çû keça xwe Şemsê anî cem wî. Gava ku Şemsê xanê çav li Canşah ket, ji dê û bavê xwe ket ber fedîyê û serê xwe berî ber xwe da û silav lê kir, xêrhatina wî kir. Di pey re herdu xwişkên wê jî hatin, silav lê kirin û destên wî maçî kirin. Dayika Şemsê jê re got: Derbas bûyî be û çavên te ronî bin, kurê min. Heger Şemsê ji bo xatirê me şaşîtîyek bi te re kiribe jî, wê bibexşîne û lê negire.

Dema ku Canşah ew gotin ji devê diya wê bihîstin, pir hestîyar bû, qîrek da û ji ser hişê xwe çû. Ava misk û gulan li ser rûyê wî reşandin, dîsa bi ser hişê xwe ve hat û li Şemsê xanê zivirî, jê re got: Hemd ji Xwedê re ku ez gihandim mirazê min û agirê di dilê min de vemirand. Şemsê xanê got: Xwedê te ji agir bisitirîne Canşah lê ez dixwazim, ku tu ji min re bibêjî, bê çi bi serê te de hat, piştî ku ez ji te veqetîyam û tu çawa hatî vê derê, li gel ku

pirranîya ciniya bi xwe jî vê kelehê nas nakin û me li hemberî hemû qralan jî serî hildaye, ne kes vê derê nas dike û ne jî rêya vir dizanin.

Canşah tiştên ku piştî wê qewimîbûn hemû yeko yeko jê re gotin, şerê bavê wî bi qral Kefîd re, reva wî ya ji malê û hatina zor û zehmet hemû bi lêv kirin û got: Ev hemû, ji bo xatirê te bûn, Şemsê xan! Bavê Şemsê li Canşah zivirî û jê re got: Va ye, tu gihîştî mirazê xwe û em jî Şemsê dikin dîyarî, didin te. Canşah bi vê biryara qral pir kêfxweş bû û destê wî ramûsa, spasîya xwe pêşkêşî wî kir. Qral got. Xwedê hez bike, meha pêşîya me em ê dawetê li dar bixin û te pê re bizewicînin, piştre tu yê wê bi xwe re bibî welatê xwe. Di çûna te de em ê hezar xizmetkarî jî bidin gel te, ku qelsê wan bi tena serê xwe dikare here Kefîd bikuje, di kêlîyekê tenê de. Her sal jî em ê qafîleyekê ji xizmetkaran ji te re bişînin, bo ku tu dijminên xwe têk bibî…

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 542'YAN

*Şehrezadê got:*

Qral Şehlan li ser textê xwe rûnişt û ferman da alîkarên xwe, ku dawet û şahîyeke pir mezin li dar bixin, bajêr gişî bixemilînin û heft şevan dahol û zirneyê lê bidin. Wan jî got: Ser seran, ser çavan! Piştre rabûn dest bi amadekarîyan kirin, xeml û xêzeke giran ji bûkê re li dar xistin, ku hazirkirina wê du mehan ajot. Daweteke ew qasî mezin û giran ji Şemsê re li dar xistin, ku di dîrokê de nehatibû kirin. Canşah derbasî cem bûkê bû û xewna xwe ya salan pêk anî. Wisa jî berdewam kirin û bi qasî du salan di nava xweşî, şahî û aramiyeke bêtimtêl de jîyan.

Rojekê Canşah ji Şemsê re got: Bavê te soz dabû me, ku me bişîne welatê bavê min û em salekê li wir bimînin, salekê jî li vir? Şemsê xanê got: Bila be, ez ê ji bavê xwe re bibêjim û bînim bîra wî. Çawa bu êvar û şev ket erdê, derbasî cem bavê xwe bû û tiştê ku Canşah gotibû, jê re anî ziman. Bavê wê got: Bila be keça min, ez ê we bişînim. Lê hetanî serê mehê xwe ragirin, da ku ez xizmetkar û zêrevanan ji we re amade bikim. Şemsê xanê jî rabû, çû ew peyam da Canşah û herduyan xwe ragirtin hetanî serê mehê.

Gava serê mehê hat, amadekarî jî têkûz bûn û qral Şehlan ferman da. Textekî mezin ji zêrê sor ê bi durr û cewheran xemilandî ji wan re amade kirin û konek avêtin ser, ku mirov fedî dikir lê binêre, ji ber spehîbûna wî. Canşah û Şemsê xan li ser wî text rûniştin û çar xizmetkaran jî rahiştê, her yekî ji

alîyekî ve ew hilda, ji erdê rakirin. Şemsê xan xatir ji dê û xwişk û nasên xwe xwest, Canşah jî wisa. Piştre bavê wê jî siwar bû, da kêleka wan û tevlî leşker û zêrevan û xizmetkaran meşîyan. Hetanî nîvroyê jî bi wan re meşîyan. Piştre xizmetkaran textê Canşah û Şemsê danîn, ew jî peya bûn, xatir ji hev xwestin û cara dawîn qral Şehlan tembiya keça xwe li Canşah kir û ji zêrevan û leşkeran jî xwest, ku li herduyan miqate bin. Piştre ew vegerîya û wan jî rêya xwe berdewam kir. Bavê Şemsê sêsed carîyeyên xweşik û jêhatî dabûn wê û sêsed bende ji ewladên cinan jî dabûn Canşah, ji bo ku xizmeta wan bikin. Hemû tev de li wî textî siwar bûbûn, her çar xizmetkarên ku text hilgirtibûn jî, bi ezmanan ketibûn, text bi firê dibirin. Bi her fira rojekê, bi qasî meşa sêsed mehî diçûn. Deh rojan li ser hev ew firîna xwe wisa berdewam kirin. Di roja yazdehan de gihîştin wir. Di nava xizmetkaran de yekî ku welatê Kabûlê nas dikir, hebû. Loma çawa ku gihîştin wê derê, wî nas kir.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 543'YAN

*Şehrezadê got:*

Xizmetkaran têxtê Canşah û Şemsê xan li Kabûla qral Têxemûs daxistin erdê. Vêca tu nabêjî di dema derbasbûyî de qral Têxemûs li hemberî dijminên xwe di şer de têk çûbû û bi şûn de vegerîyabû hundirê Kabûlê û derîyên sûrên bajêr giş li ser xwe û gelê xwe girtibû. Qral Kefîd ê dijmin jî dorpêç li ser bajêr danîbû û bêhn li wan çikandibû.

Gava Şemsê xanê qral Têxemûs û welatê wî di wî halî de dît, ferman da zêrevanên xwe yên cinî, ku leşkerên Kefîd bikujin û dorpêça li ser bajêr rakin. Ji wan re got: Gişan bikujin, yekî jî nehêlin! Lê Canşah ji zêrevanekî xwest, ku qral Kefîd bi tenê ji nav wan sax bihêle û wî bîne cem wî. Zêrevanê ku navê wî Qereteş bû, got: Ser serê min, ser çavên min, ez ê wî destgîr bikim û bînim ber destê te!

Zêrevanên cinî hemû li wî textî siwar bûn, bi hewa ketin û çûn li cihekî nêzikî leşkerên Kefîd danîn û xwe li wir ragirtin, hetanî ku tarî ket erdê û nîvê şevê hat. Di derengî şevê de êrîşî ser leşkerên Kefîd kirin û ew dan ber şûr û riman, qira wan anîn. Her cinîyekî neh deh leşker bi hev re dikuştin; ew ji ser pişta fîlan dianîn xwarê. Serê wan di nav lepên xwe de diperçiqandin, mîna ku kêzikan biperçiqînin. Qereteş jî bi lez xwe gihandibû konê Kefîd. Çawa derbasî hundirê çadirê bû, dît ku qral li ser nivînê rûniştî ye. Zêrevan di cî de

bi qerpika stûyê wî girt û bi hewa ket, ew bi xwe re bir cem Canşah, li ser textê wî danî û destên wî girêdan. Qîrewîra qral bû, nizanibû çi bi serê wî hatiye.

Em wan li wir bihêlin û em vegerin ser rewşa qral Têxemûs. Wî jî çawa ku kurê xwe li raserî xwe dît, şaş û metal bû û di heman demê de pir şad û bextewar bû, ku hindik mabû ji kêfan baskên wî çêbibin û bifîre. Qîrek da û di cihê xwe de ket, ji ser hişê xwe çû. Ava gulan li ser rûyê wî reşandin, careke din hişyar bû û bi ser xwe ve hat. Rabû ser xwe, kurê xwe himbêz kir, ew maçî kir û ji kelecana zêde girîya. Helbet wê gavê, hîna hayê wî jê tune bû, ku zêrevanên cinî leşkerên dijminê wî dikujin û qîra wan tînin, wan perçe perçe dikin. Piştre Şemsê xanê hat cem wî, destê wî ramûsa û jê re got: Bavocan, ka derkeve ser qesrê û temaşe bike bi leşkerên bavê min çawa bi dijminên we re şer dikin!

Qral Têxemûs derket ser banê qesrê gel Canşah û Şemsê xan û her sêyan bi hev re şer temaşe kirin, dîtin bê çawa zêrevanên cinîyan leşkerên Kefîd û artêşa wî ketûber dane ber xwe û mîna ku bi melkesê wan ji erdê rêş bikin, wan ji dora bajêr didin alî. Ew ecêbên fîlan tevlî siwarên wan çawa bi ser hev de dihatin guvaştin û cendekên wan ber bi perên ezmanan ve difirîyan; çawa leşkerên Kefîd qefle bi qefle ji ber bayê rimên zêrevanan dipengizîn, mîna qirşikên ku li ber bayê herin, li ber çavên Têxemûs hemû dîmenin ecêb bûn, ku tiştekî wisa nikaribû baniya xewna xwe jî!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 544'AN

*Şehrezadê got:*

Qral Têxemûs ji ser banê qesrê şer û ceng temaşe dikir, qral Kefîd jî li ser text ji alîyê wan cengawerên cinîyan ve kuştina wan fêrisên xwe temaşe dikir û bê navber li ser wan digirîya û hêsir dibarandin. Wê cenga giran du rojan berdewam kir û di encamê de hemû leşkerên Kefîd hatin kuştin.

Canşah ji zêrevanan xwest, ku wî textî bibin li ber qesra bavê wî deynin. Wan jî fermana wî pêk anîn û text birin li ber qesrê danîn. Qral Têxemûs ji zêrevanekî bi navê Şemewal xwest, ku qral Kefîd zincîr bike û wî bibe, bavêje birca reş. Wî jî rabû, wisa kir û Kefîd xist birca reş.

Qral Têxemûs û civata xwe qedehên xwe li hev xistin, bi vexwarina meyê serkeftina xwe pîroz kirin û qasidek jî şand cem diya Canşah ji bo ku

mizgînîya hatina kurê wê bidinê û di heman demê de jî mizgînîya serkeftina wan a di cengê de.

Gava diya Canşah ew peyamên xweş girtin, pir kêfxweş û şanaz bû. Piştre siwar bû û hat qesrê, cem kurê xwe. Çawa ku çav lê ket, xwe çeng kire wî, ew himbêz kir û ji coş û kelecana zêde ji ser hişê xwe çû, li erdê ket. Ava gulan li ser rûyê wê kirin, dîsa bi ser hişê xwe ve hat û ji kêfan girîya.

Dema ku Şemsê Xanê bihîst, ku xesûya wê hatîye, çû silav lê kir, herduyan hevdu himbêz kirin û bi qasî saetekê kul û derdên xwe bi hev re par ve kirin.

Qral Têxemûs, ferman da ji bo ku derîyên bajar werin vekirin û qasidên xwe şandin hemû bajar û welatan ji bo ku mizgînîya serkeftinê û hatina kurê xwe bide wan. Çawa ku mizgînî belav bû, agahî gihîşt qral û melîkên derdorê, ji çar hêlên dinyayê xelat û dîyarî û entîkeyên giranbuha bi ser wî de barîyan.

Piştî wê bi çend rojekê, Şemsê xanê çû cem xezûrê xwe Têxemûs û jê xwest, ku li qral Kefîd were rehmê, tê bibihure û wî bişîne welatê wî. Şemsê xanê ji qral re got: Wî berde, bila here welatê xwe û heger careke din dîsa xerabiyek jê derket, ez ê fermanê bidim, wê xizmetkarekî min here, di cî de wî destgîr bike û bîne ber destê te.

Qral Têxemûs got: Ser seran ser çavan. Piştre gazî Şemewal kir û jê xwest ku qral Kefîd bîne cem wî. Şemewal çû Kefîd zincîrkirî anî, danî pêşberî qral Têxemûs. Kefîd serê xwe li ber danî û erda bin nigê wî maçî kir. Têxemûs ji Şemewal xwest, ku qeyd û zincîrên wî veke. Piştre ew li hespeke kulek siwar kirin û berîya ku wî bi rê bixin, qral Têxemûs jê re got: Şahbanû Şemsê xan ji min xwest, ku ez li te werim rehmê, va ye ez jî te berdidim, de êdî here welatê xwe. Lê baş bizanibe, heger tu wan karên xwe yên xerab dîsa bikî, dê şahbanû cinîyekî xwe bi dû te de bişîne û wê ew te bigire, bîne ber destê min.

Qral Kefîd, di rewşeke pir xerab de, berê xwe da welatê xwe û çû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 545'AN

*Şehrezadê got:*

Çawa ku me şeva borî jî got, qral Kefîd di rewşeke pêrîşan de çû welatê xwe. Canşah û Şemsê xanê jî li gel dê û bavê xwe di nava şahî û xweşîyê de û bi dilsozî jîyiyan.

Ev vegotina hanê hemû ya wî xortê ku di neqeba du goran de rûniştî bû û ji Beloqîya re digot. Xortê ciwan berdewam kir û ji Beloqîya re got: Ew Canşahê ku min serpêhatîya wî ji te re got jî, ez bi xwe me keko!

Beloqîya şaşwaz û behetî bû li hember vê çîrokê û ji Canşah re got: Tu bi Xwedê kî birawo, ji min re rave bike, ku çîroka van herdu goran çi ye? Tu çima di navbera wan de rûniştiyî? Û sebeba ku tu digirî çi ye?

Canşah lê vegerand û got: Birawo, weke ku min ji te re got, em di nava jîyaneke xweş û bêtimtêl de bûn, şahî û çêja jîyana me nayê gotin. Em salekê li welatê xwe Kabûlê bûn û sala dîtir jî em keleha Cewher Teknî bûn. Meşa me tune bû, çûn û hatina me giş li ser wî textî bû, xizmetkaran bi firê em dibirin û dianîn. Beloqîya got: Canşah birawo, çiqas mesafe di navbera welatê we û keleha Cewher Teknî de hebû? Canşah got: Me bi firrê rojê meşa sih mehî derbas dikir û di deh rojan de em digihîştin kelehê. Em du salan bi wî hawayî çûn û hatin. Carekê dîsa mîna her car, me bi textê xwe rêwîtî dikir û em hatin li vê derê daketin erdê, ji bo ku em ji xwe re li xwezaya giravê temaşe bikin. Em li qiraxa çem rûniştin, me xwar û vexwar û bêhna xwe vekir. Şemsê xanê got: Ez dixwazim xwe di vî çemî de bişom. Piştre rabû kincên xwe ji xwe kirin, carîyeyan jî mîna wê kir û daketin nava çem avjenî kirin. Ez jî bi kêleka çem de meşîyam û min ew li wir hiştin, bo ku ji xwe re di nav avê de bilîzin. Wê gavê ji nişkê ve semasîyekî deryayî û gir xwe avêtê, herdu nigên wê jêkirin. Wê jî kir qîrîn û di heman kêlîyê de di cî de ket û mir. Carîye jî di cî de ji çem derketin û bazdan, ketin konê ser text. Hinek ji carîyeyan jî meytê wê rakirin û anîn ser text. Çawa ku min meytê wê di wî halî de dît, ez ji ser hişê xwe çûm û li erdê ketim.

Av li ser çavên min kirin, ez bi ser hişê xwe ve hatim û gelekî li ser wê girîyam. Piştre min ji xizmetçî û zêrevanan xwest, ku cenazeyê wê bibin cem dê û bavê wê û wan ji bûyerê agahdar bikin. Çûn, ew birin, dê û bavê wê agahdar kirin. Piştî demeke kurt, min bala xwe dayê, ku dê û bavê wê ew anîne vir. Li vir şûştin, kefen kirin û li vir veşartin. Piştî ku me gişan bi hev re şîna wê li dar xist, ji min xwestin, ku ez bi wan re herim welatê wan. Min ji bavê wê re got: Ez tika ji te dikim, ku tu li kêleka gora wê gorekê ji min re jî bikolî, da ku dema ez mirim, min li kêleka wê veşêrin. Qral Şehlan, daxwaza min bi xizmetkarekî xwe da çêkirin û çûn, ez li vir hiştim bi tenê, ji xwe re dinalim û dikalim. Çîroka rûniştina min a di navbera herdu goran de jî ev e…

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 546'AN

*Şehrezadê got:*

Gava Beloqîya ew gotin bihîstin, bi şaşwazî ji Canşah re got: Qaşo min jî digot, belkî ez mirovekî gerîyayî me û min gelek deverên dinyayê dîtine lê belê weleh gava min ev serpêhatîya te guhdar kir, ez têgihîştim, ku min tu deverên cuda zêde nedîtine û zor û zehmetîyên ku min dîtibûn jî, min ew ji bîr kirin. Lê belê birayê delal, ez ji te dixwazim, ku tu xêrekê bi min bikî û rêya xelasîyê nîşanî min bidî. Canşah rêya xelasîyê nîşanî wî da, wî jî xatir jê xwest û bi rêya xwe de çû.

Îcar Şahmaranê ev çîroka hanê hemû ji Hasib Kerîmidîn re digot. Hasib jê pirsî û got: Tu çawa fêrî van agahîyan bûyî? Şahmaranê got: Binêre Hasib hîna ji berîya bîst û pênc salan, min mareke pir mezin şandibû Misrê û min nameyeke silavdayînê dabû wê, ji bo ku li wir bide Beloqîya, jixwe keçeke wê ya bi navê Şimûx li wir hebû. Wê jî rahişt nameya min û berê xwe da Misrê, çû. Gava gihîşt Misrê, li Beloqîya pirsî, xelkê ew bir cem wî. Wê jî silavek lê kir û name dayê. Beloqîya name xwend û têgihîşt û ji marê re got: Ez dixwazim bi te re bêm cem Şahmaranê. Wê jî ew anî cem min. Gava hat cem min, ji min re got: Ez dixwazim ku wî gîhayê ku piştî kutanê tête guvaştin û vexwarin û bi vexwarina ava wî re jî mirov ne pîr dibe ne dimire û ne jî nexweş dikeve, ji min re bîne. Min jî jê re got: Ez wî gîhayî ji te re naynim, hetanî ku tu ji min re nebêjî, bê çi bi serê te de hat, piştî ku em ji hevdu veqetîyan û tu û Efan çûn ser gora hezretî Suleyman? Li hemberî wî şertê min, Beloqîya jî mecbûr ma, ku serpêhatîya xwe ji serî hetanî binî ji min re vebêje. Serpêhatîya Canşah ji min re got.

Hasib ji Şahmaranê re got: Ey şaha maran, ka ji min re bibêje, bê çi bi serê Beloqîya hat, piştî vegera wî ya Misrê?

Şahmaranê got: Piştî ku Beloqîya ji Canşah veqetîya, meşîya û hey meşîya, bi deh rojan meşîya, hetanî ku gihîşt ser deryayeke mezin. Li wê derê avgîhaya guvaştî di binê nigên xwe da û li ser rûyê avê meşîya, hetanî ku gihîşt giraveke bi dar û ber, bi av û fêkî û bi qasî bihuştê xweş. Li nava wê giravê gerîya û li darekê rast hat, ku mezinbûna wê nedihat ziman û pelên wê mîna babirkên keştîyan bûn. Li binê darê jî sifreyeke xwarinê raxistî bû, ku hemû cureyên xwarinê li ser bûn. Li ser darê jî teyrekî ecêb û xerîb ê ji lûlû û zumrudê kesk hebû; nigên wî ji zîv; nikulê wî ji yaqûtê sor û perîyên

wî ji madenên giranbuha bûn. Wî teyrî bê navber selewat li ser pêxemberê Xwedê dixwendin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 547'AN

*Şehrezadê got:*

Îcar gava Beloqîya ew teyrê hanê dît, jê pirsî û got: Tu kî yî û çi karê te li vir heye? Teyr got: Ez teyrê bihuştê me. Birayê ezîz, divê tu bizanibî ku Xwedayê gewre Adem ji bihuştê derxist û çar pel dan wî, ji bo ku xwe bi wan bisitirîne lê ew her çar pel ji destê wî ketin erdê. Yek ji wanan kurmikê ew xwar û ew bû hevrîşim; a din xezalan ew xwar û bû misk; a sisyan mêşan ew xwar û bû hingiv; a çaran jî li Hindistanê ket erdê û bû buhar. Ez jî li seranserê erdê gerîyam û di encamê de Xweda ev der da min, ez jî lê bi cih bûm. Her êvara înê, hemû ewlîyayên li ser rûyê erdê tên vir, serdana vir dikin, di mazûbanîya Xweda da li vir dixwin, vedixwin hetanî ya dinî rojê û piştre sifreya xwarinê radibe, diçe bihuştê; her în ev seramonî dubare dibe, bê kêmanî.

Beloqîya jî rûnişt, xwar, vexwar û spasîya Xwedayê xwe kir. Tam di wê kêlîyê de Xizir hat cem wî û silavek lê kir. Wî jî silava wî lê vegerand û rabû ser xwe, ji bo ku here. Teyr jê re got: Beloqîya, meçe û di hizûra hezretî Xizir de rûnê! Beloqîya rûnişt, Xizir jê re got: Çîroka xwe ji min re vebêje û derdê xwe bîne ziman? Beloqîya serpêhatîya xwe bi hûrgulî jê re vegot, ji serî hetanî hatina wî ya wir. Piştre lê zêde kir û ji Xizir pirsî: Mîrzayê min, gelo rêya ku ji vir diçe hetanî Misrê çiqasî dirêj e? Xizir got: Meşa not û pênc salan e.

Gava Beloqîya ew gotin ji devê wî bihîst, girîya û xwe avêt ber nigên Xizir, destê wî maçî kir û lava jê kir, got: Min ji vê xerîbîyê rizgar bike û bila xêra te li cem Xwedê be; lewre ez pir bê mecal û bê çare me! Xizir got: Dua ji Xwedê re bike, bo ku ez te bigihînim Misrê, berîya ku tu bimirî!

Beloqîya girîya, hêsîr rijandin û xwe avêt Xwedayê gewre û jê xwest, ku Xoceyê Xizir wî bigihîne cem ehlê wî.

Xizir ji Beloqîya re got: De êdî serê xwe rake, Xwedê duaya te qebûl kir û îlhama ku ez te pê bigihînim wir da min. De ka êdî bi laşê min bigire û herdu çavên xwe bigire, ez ê te bibim Misrê!

Beloqîya xwe li milên xoceyê Xizir girt û çavên xwe girtin. Xoceyê Xizir jî gavek avêt û ji Beloqîya re got: Ka îcar çavên xwe veke! Beloqîya çavên xwe vekir û dît, ku ew li ber derîyê mala xwe ye! Li xwe zivirî, jî bo ku xatir ji Xocayê Xizir bixwaze lê ew nedît.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 548'AN

*Şehrezadê got:*

Beloqîya derbasî mala xwe bû û çawa ku diya wî çav lê ket, qîrînîyek ecêb pê ket û di cî de li erdê ket, ji ser hişê xwe çû. Av li ser çavên wê kirin, dîsa bi ser hişê xwe ve hat û bi bêrîkirineke mezin, bi coş û kelecaneke bêtimtêl kurê xwe himbêz kir û ew maçî kir. Ji kêfan digirîya û hêsir dibarandin. Beloqîya jî geh digirîya, geh dikenîya.

Kes û karên wî, dost û hevalên wî lê kom bûn û kêfxweşîya xwe anîn ziman, destxweşîya wî kirin, bi saxî û selameta wî. Peyama vegera wî ya malê li seranserê welat belav bû û ji çar hêlan dîyarî û xelatên giranbuha bi ser de barîyan. Şahî hatin lidarxiatin, zîqînî bi zirneyan ket û her kes bi vegera Beloqîya dilxweş bû, wî jî tiştên ku di wê rêwîtîya ecêb û erjeng de hatibûn serê wî, ji wan re vedigot û xelkên guhdar jî, bi kul û êş ew guhdar dikirin.

## (DÛMAHIYA ÇÎROKA HASIB KERÎMIDÎN)

Vêca Şahmaranê ev hemû ji Hasib Kerîmidîn re digot. Hasib şaşwaz bû û ecêbmayî ma li wê çîrokê. Pir girîya û hêsir rijandin, piştre ji Şahmaranê re got: Ez jî dixwazim vegerim welatê xwe! Şahmaranê got: Hasib, ez ditirsim, ku gava tu vegerî welatê xwe, tu peyamana di neqeba me de xera bikî û tu biçî hemamê? Hasib careke din jê re sondek giran xwar, ku heta emrê wî hebe, dê neçe hemamê. Şahmaranê ferman da marekê û jê re got: Hasib Kerîmidîn derxe ser rûyê erdê!

Mara peywirdar Hasib bi xwe re bir û ji cihekî bir cihekî din, hetanî ku ew di devê bîrekê re derxist ser rûyê erdê. Hasib jî meşa xwe ji wir berdewam kir û êvarkî gihîşt malê. Gava li derî da, roj di zerdika xwe de bû, li ber ava bû. Diya wî derî jê re vekir û dît, ku kurê wê li ser nigan li raserî wê ye!

Ji kêfan qîrîn pê ket, girîya û xwe bi ser kurê xwe de avêt, ew himbêz û maçî kir. Di wê navberê de, deng çû jina wî, ew jî pê ve derket û di nava şaşwazîyeke erjeng de çav lê ket. Bi kelecaneke mezin pê ve çû, destên wî maçî kirin û pir dilxweş û şa bû, bi hatina wî.

Hasib derbasî hundir bû, rûnişt û malî jî giş li derdora wî rûniştin. Wî jî pirsa êzingvanên hevalên xwe kir, ên ku ew di bîrê de hiştibûn û çûbûn. Diya wî jê re got: Êzingvan hatin û gotin guran kurê te li newalê xwariye û niha jî hemû bûne tacir, xwedî mal û milk û dikan. Her roj jî xwarin û vexwarinê ji me re tînin. Rewşa wan ev e! Hasib ji diya xwe re got: Sibê, here ji wan re bibêje Hasib Kerîmidîn hatiye, werin xêrhatina wî bikin û li hal û wextê wî bipirsin!

Roja dîtir, sibehê diya wî çû li ser malên êzingvanan gerîya û yeko yeko ew agahdar kirin û ji wan xwest, ku werin silavekê lê bikin. Çawa ku êzingvanan ew agahî girtin, rûyê gişan guherî û ji diya wî re gotin: Ser seran, ser çavan û her yekî ji wan jî bedlek kincên ji hevrîşimê bi zêr xemilandî dan diya wî û jê re gotin: Van kincan bide kurê xwe, bila li xwe bike, sibê em ê werin ser dana wî!

Diya Hasib got: Bila be û bi şûn de vegerîya cem kurê xwe, ew ji encamê agahdar kir û kincên ku dîyarî kiribûn jî, dane wî.

Îcar em Hasib Kerîmidîn û diya wî li vir bihêlin û em vegerin ser rewşa êzingvanên hevalên wî…

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 549'AN

*Şehrezadê got:*

Êzingvanên hevalên wî ku êdî gelek ji wan jî bûbûn tacir û dikandar, hemû li hevdu civiyan û ji hev re gotin: Îcar em çi bikin? Yekî got: Divê her yek ji me nîvê mal û milkê xwe bide wî. Yên mayî jî hemû tevlî wê nêrînê bûn û hemû bi hev re rabûn, her yekî ji wan nîvê malê xwe bir û çûn cem Hasib, silav lê kirin, destê wî maçî kirin û malên ku bi xwe re anîbûn dan wî û jê re gotin: Ev hemû bi saya serê te bû û va ye stûyê me jî li ber kêra te ye!

Hasib teklîfa wan qebûl kir, di wan de bihurî û ji wan re got: Tiştê çû nedin dû, hemû qedera Xwedê bû û qeder herdem di ser daxwazê re ye, loma her tişt li gora dilê mirov nabe.

Wan jî got: Nexwe ka rabe em bi hev re li bajêr bigerin û bi hev re jî biçin hemamê! Hasib got: Min sond xwariye, ku ez hetanî dawiya emrê xwe jî neçim hemamê. Wan jî got: Nexwe ka rabe em herin malên me û li cem me bibe mêvan? Hasib got: Bila be, ez ê bi kêfxweşî bêm.

Hasib vexwendina wan qebûl kir û rojê çû mala yekî ji wan û li cem wî bû mêvan. Bi qasî heft rojan wisa berdewam kir, hemûçkan qedr û qîmeta wî pir girtin û xwarinên pir xweş dan ber wî, lewre hemû pir maldar bûbûn. Di wê navberê de hemû tacirên bajêr jî lê hatin hev û bi dilînî û mereqeke mezin çîroka serpêhatîyên wî guhdar kirin.

Demeke din jî wisa berdewam kir, hetanî ku rojekê daket nava bajêr û ji xwe re li sûkê gerîya û di ber hemamekê re derbas bû. Xwedîyê hemamê çawa ku çav lê ket, xêrhatina wî kir û ew himbêz kir, jê re got: Kerem bike hemama min, da ku te baş lûfik bikim, bişom û piştre jî ziyafetekê pêşkêşî te bikim! Hasib got: Min sond xwariye ku hetanî dawiya emrê xwe, ez derbasî hemamê nebim. Xwedîyê hemamê bi destê wî girt, kişkişand û got: Her sê jinên min ji min berdayî bin, tu yê derbasî hemama min bibî!

Hasib Kerîmidîn heyirî ma, nizanibû wê çawa bike! Xwedîyê hemamê berdewam kir û got: Birawo qey tu dixwazî ku zarokên min giş sêwî bimînin û dayikên wan ji min bêne berdan?

Gava ku deng ji Hasib derneket û di cihê xwe de sekinî ma, xwedîyê hemamê xwe bi ser de avêt û bi bergerî got: Ez tikan ji te dikim derbasî hemamê bibe û bila gunehê sonda te di stûyê min de be! Bi vê gotina hemamvan re hemû karkerên hemamê jî lê kom bûn, ji xwe re û me re kincên wî di ser re anîn û ew derbasî hemamê kirin. Çawa derbas bû, li ber dîwêr rûnişt û av bi ser xwe de kir, bîst zilam ber bi wî ve hatin û jê re gotin: Ka rabe ser xwe, tu dijminê sultan î! Pê re jî yek ji wan di cî de çû cem wezîrê sultan û ew ji mijarê agahdar kir. Wezîr jî di cî de rabû ser xwe, şêst xizmetkar dan gel xwe û hatin hemamê, cem Hasib Kerîmidîn. Wezîr silav lê kir, xêrhatina wî kir, di ber şûştina wî de sed dînar da xwedîyê hemamê û jê xwest ku hespekî ji Hasib re bîne. Hespek jê re anîn. Hasib lê siwar bû, wezîr û zilamên xwe jî siwar bûn û ew bi xwe re birin qesra sultan.

Hemû derbasî qesrê bûn, rûniştin. Xizmetkaran sifreya xwarinê raxistin û sênî bi sênî xwarinên cur bi cur anîn li ber wan danîn. Hemûçikan xwarin xwar û vexwarin, destên xwe şûştin û dîsa piştax we dan balîfan û rûniştin. Wezîr du xelat dan Hasib, her yek ji wan bi buhayê pênc hezar

dînarî bû. Piştre jê re got: Mizgînîya me li te, ku Xwedayê gewre mîna rehmekê tu bi ser me de şandiye, da ku tu ji me re bibî derman. Lewre sultanê me bi cûzamê ketiye û li ber mirinê ye. Pirtûkên di destên me de jî dibêjin, ku başbûna ji vê nexweşînê dê li ser destê te be.

Hasib şaş û heyirî ma li ber vê rewşa wan! Lê dîsa jî bi ya wezîr kir û pê re rabû, li gel mezinên dewletê meşîyan, çûn û di heft derîyan re derbas bûn, heta ku gihîştin dîwana sultan; ku sultanê eceman bû û navê wî Kerzedan bû û qralê heft welatan bû; serwerîya sed sultanên din dikir, ku hemû li ser kursîyên zêrîn rûdiniştin û di bin destê her yekî ji wan de deh hezar pêlewan hebûn, ku di bin destê her pêlewanekî de jî sed cîgir û sed celadên şûr lidest hebûn.

Qralê gewre û nexweş paldayî bû û di nava pêşgîran de pêçayî bû, dikir gazî û nalîn ji ber êşa nexweşîna xwe. Gava ku Hasib çav li wê dîmena bi heybet ket, aqilê wî şaş û metal bû, bejna xwe li ber tewand, erda bin nigê wî maçî kir û dua jê re kirin. Wezîrê mezin ê ku navê wî Şemhûr bû, pê ve hat, xêrhatina wî kir û ew bir li kêleka qral; li ser kursîyekî da rûniştandin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 550'YÎ

*Şehrezadê got:*

Piştre, xizmetkaran fêkî û şerab anîn, danîn ber wan. Xwarin û vexwarin, piştre wezîrê gewre Şemhûr rabû ser xwe, civat jî giş bi rêzdarî pê re rabû. Şemhûr ber bi Hasib ve çû û jê re got: Em hemû di xizmeta te de ne û tu çi ji me bixwazî jî em ê ji te re bînin, bidine te lew ku tu nîvê milkê me jî bixwaze. Ji ber ku em baş dizanin, ku dê başbûna qralê me li ser destê te be.

Piştre çû bi destê wî girt û ew bir cem qral Kerzedan. Hasib pêşgîr ji ser çavên wî da alî û lê nêrî, dît ku nexweşîna qral pir lê giran bûye û her derê wî kotî bûye. Behetî ma, nizanibû wê çi bibêje! Wezîr Şemhûr xwe dirêjî destê Hasib kir, ew maçî kir û jê re got: Em ji te dixwazin, ku tu vî qralê me derman bikî û wî ji nexweşînê pak bikî, tu çi bixwazî jî em ê bidin te. Daxwaza me ji te ev e.

Hasib got: Rast e ku ez kurê Daniyal, pêxemberê Xwedê me lê di vê mijarê de tu zanîna min nîn e. Ez sih rojî di karê bijîkîyê de mam lê min tiştek jê fêm nekir. Xwezîka min tiştek bizanibûya û min bikaribûya alîkarîya qralê we bikira!

Wezîr got: Zêde dirêj neke û mazeretan nede pêş, lewre em baş dizanin, ku heger em bijîşk û hekîmên dinyayê gişan komî ser hev bikin jî, ji te pê ve tu kes nikare qralê me baş bike. Hasib got: Ez ê çawa wî ji vê nexweşîyê baş bikim û ez nizanim êşa wî ji ber çi ye û dermanê wî çi ye? Wezîr got: Dermanê qral li ba te ye. Hasib got: Min dermanê wî bizanibûya, min ê ew derman bikira. Wezîr got: Tu baş dizanî ku dermanê wî li ba Şahmaranê ye û te ew dîtiye û tu cihê wê jî baş dizanî, lewre tu li cem wê bûyî.

Hasib nû têgihîşt, ku sebeba vê yekê çûna wî ya hemamê ye. Pir poşman bû lê êdî poşmantîyê fêde nedikir. Hasib got: Ez ê çawa wî derman bikim û ez cihê Şahmaranê nas nakim û hetanî niha min navê wê jî nebihîstiye? Wezîr got: Înkar neke, lewre delîlê min heye, ku tu wê nas dikî û tu du salan li gel wê mayî! Hasib got: Ez wê nas nakim û ancex niha min ji devê we navê wê bihîstiye.

Wezîr Şemhûr çû pirtûkek anî, vekir, xwend û piştre got: Di vir de dibêje, zilamek çûye cem Şahmaranê, du salan li gel wê maye û piştre hatiye, derketiye ser rûyê erdê û heger ev zilam here hemamê, dê zikê wî reş bibe. Û di pey re li Hasib zivirî û jê re got: Kanî li zikê xwe binêre! Hasib li zikê xwe nêrî, dît ku reş bûye. Ji wan re got: Ji roja ku ez ji diya xwe re çêbûme, zikê min reş e.

Wezîr got: Her hemameke di bajêr de, min sê kole şandibûnê û min ji wan xwest, ku kîngê yekî zikreş bibînin, min agahdar bikin. Vêca tu çawa derbasî hemamê bûyî, bendeyên min zikê te yê reş dîtin û ez agahdar kirim. Em jî pir bêsebir bûn li bendî wê roja ku em te bibînin. Vêca em tenê ji te dixwazin, ku tu wî cihê ku tu ji bin erdê derketî, nîşanî me bidî, piştre tu bi rêya xwe de, em bi rêya xwe de. Lewre em dikarin Şahmaranê bigirin û kesê ku wî karî bike di nav me de heye.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 551'Ê

*Şehrezadê got:*

Bi wê gotina wezîr re, Hasib Kerîmidîn careke li çûna xwe ya hemamê din polî poşman bû lê êdî her tişt bê fêde bû. Lewre hemû wezîr û kizîr û mîr û emîr li ser serê wî kom bûbûn û pêkûtî lê kirin, ji bo ku cihê Şahmaranê nîşanî wan bide. Wî jî her car digot: "Ne ez dizanim ne jî min tiştekî

wilo dîtiye!” lê di encamê de wezîr gazî celadê xwe kir û jê xwest, ku kincên Hasib jê bike. Piştre jê xwest, ku baş û dijwar lê bide. Celad li Hasib da hetanî ku hat ber mirinê. Wê gavê wezîr careke din axivî û jê re got: Delîl li cem me heye, ku tu Şahmaranê nas dikî, îcar çima tu înkar dikî? Cihê ku tu jê derketî ser rûyê erdê nîşanî me bide û piştre ji me dûr bikeve. Em ê bikaribin wê bigirin û tu zirar nagihîje te!

Gava ku Hasib li hemberî vê gotina wî bêdeng bû, wezîr zimanê xwe pê re şêrîn kir, ber dilê wî girt û kincekî ku bi zêr û cewher xemilandî bû, dîyarî wî kir û ew haş kir. Di encamê de Hasib qebûl kir û got: Cihê ku ez tê re derketime ser rûyê erdê, ez ê wî nîşanî we bidim. Wezîr pir kêfxweş bû û di cî de ferman da leşkeran, got: Xwe amade bikin, em ê derkevin derve!

Wezîr û emîr û kizîrên xwe hemû li hespên xwe siwar bûn, Hasib jî li hespekê siwar kirin, leşker jî dan dû xwe û ji bajêr derketin Meşîyan û hey meşîyan hetanî ku gihîştin çiyê. Hasib da pêşîya wan û ew derbasî şikeftê kirin. Girîya, xemgîn bû, dilê wî êşîya lê dîsa jî meşa xwe berdewam kir, da pêşîya wan û ew birin ser wê bîra ku jê derketibû. Wezîr Şemhûrê ku efsûnger û falbînekî navdar û derûnas bû, li ser devê bîrê rûnişt, buxûr dada, sond xwar, qurban dan, pif kirê û himehim pê ket. Piştre xwendina duduyan xwend û careke din pif kirê, himhimand; dûre xwendina sisyan jî xwend û herî dawîyê lê zêde kir û bi dengekî bilind got: De êdî derkeve şaha maran! Derkeve Şahmaran!

Bi vê gazîya wî re ji nişkê ve ava bîrê çikiya, derîyekî mezin tê de vebû û dengekî ecêb jê derket, ku mirov di got qey dengê birqê bû û bîr jî pê re hedimî; lewre her kesê li wir pê re li erdê ket û ji ser hişê xwe çû û hinek ji wan jî mirin. Di heman demê de mareke pir mezin wek fîlekî ji bîrê derket, ku agir ji dev û çavan dibarîya. Li ser pişta wê jî sênîyeke ji zêrê sor hebû, ku bi yaqût û cewheran hûnayî bû û bi dur û madenan xemilandî bû. Di nava sênîyê de jî mareke biçûk hebû, ku rûyê wê weke yê însanan bû û şewq jê dibarîya, hundir ronî dikir. Axaftina însanan dikir û zimanê wê pir fesîh bû. Şahmaran bi xwe bû. Li çep û rastê xwe nêrî, çavên wê li Hasib ketin, jê re got: Ka ew soz û peymana ku te bi min re dabû û te gotibû, ez naçim hemamê? Lê belê xuya ye, ku reva ji qederê ne gengaz e û çi li ser enîya mirov nivîsandî be, misoger ew tê serê mirov. Wisa xuya dike, ku mirina min jî li ser destê te ye, lewre Xwedê ev biryar daye, ku ez werim kuştin û qralê kotî ji nexweşîna xwe rizgar bibe.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 552'YAN

*Şehrezadê got:*

Kûrekûr bi Şahmaranê ket û girîya û hey girîya; Hasib jî bi girîyê wê re girîya. Şemhûrê wezîr jî çawa çav li Şahmaranê ket, destê xwe dirêjî wê kir, ji bo ku wê bigire. Şahmaranê jê re got: Destê xwe bi şûn de bikişîne lanetîyo! Nexwe ez ê hulmekê bi ser te de berdim û te bikim komek arî! Piştre bi Hasib de qîrîya û jê re got: Were cem min û bi destê xwe min hilde û min bibe, bixe wê sênîka bi we re û min hilde ser serê xwe û wisa bibe, lewre ji ezel ve qedera min ew e, ku ez li ser destê te bimrim û reva min ji vê yekê nîn e; tiştek ji destê te jî nayê!

Hasib rahişt wê, ew xist sênîkê û danî ser serê xwe, bîr jî dîsa vegerîya rewşa xwe ya berê. Piştre hemû bi hev re ketin ser rêya vegerê û berê xwe dan bajêr. Di rê de Şahmaranê bi dizî ji Hasib re got: Guhdar bike Hasib, ez ê şîretekê li te bikim, lew ku te soza xwe bi min re negirtibe û te ev bêbêxtîya mezin bi min re kiriye jî.

Hasib bi fedîkarî got: Bêje Şaha Maran, qewêtî û daxwazên xwe jî ji min re bibêje! Şahmaranê got: Gava tu bigihîjî mala wezîr, dê ji te re bibêje Şahmaranê serjê bike û wê bike sê perçe. Tu wisa neke û jê re bibêje, ez nizanim serjêkirinê bikim, da ku ew bi destê xwe min serjê bike û bi qasî ku dixwaze jî min parî parî bike. Vêca gava ew min serjê bike, laşê min parî parî bike, dê qasidek ji cem qralê wan Kerzedan were cem wî û jê bixwaze ku ew here cem qral. Ew jî berîya ku here cem qral, dê goştê min têxe beroşeke paxir û wê deyne ser tifikê û ji te re jî bibêje: "Agir bide binê hetanî ku kefa goşt were der. Gava ku kef bi ser ket, wê kefê bixe şûşeyekê û paşê vexwe, da ku êş di canê te de nemînin. Piştre dîsa bikelîne, hetanî ku kefa duduyan jî bi ser bikeve, piştre wê kefê jî bigire û bixe şûşeyeke din û wê ji min re bihêle, da ku ez vexwim û nexweşîya min here." Û dê du şûşeyan bide te û here cem qralê xwe. Lê tu kefa ewilî ji wî re bihêle û ya duduyan vexwe. A ewil jî bixe şûşeyê û li cem xwe bihêle, hetanî ku ew vegere. Gava hat û ji te xwest; tu wê bide wî, bila ew vexwe û tu yê bibînî, bê wê çi bi serê wî...

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 553'YAN

*Şehrezadê got:*

Şahmaranê di berdewamiya şîreta xwe de, ji Hasib re got: Piştî ku te şûşeya pêşîn da wî, şûşeya duduyan tu vexwe, da ku dilê te bibe wargeha hemû zanînan. Piştre goştê pijîyayî bixe sênîyeke ji paxir û bibe bide qral, da ku ew bixwe. Gava ku qral ew goşt xwar, destmalekê bavêje ser rûyê wî, wî hetanî nîvroyê binixumîne. Nîvrokî jî hinek mey bide wî bila vexwe, bi îzna Xwedê dê baş bibe û ji wê nexweşîna xwe rizgar bibe. Vê şîreta min di bîra xwe de bigire û qet ji bîr neke!

Hemûçikan meşa xwe bi hev re berdewam kirin, hetanî ku gihîştin mala wezîr. Li ber devê derî, wezîr ji Hasib re got: Bi min re derbasî hundir bibe! Ew û wezîr bi hev re derbasî hundir bûn, leşker û mirovên mayî jî ji hev ferikîn, her kes çû mala xwe.

Gava Hasib sênîya ku Şahmaran tê de bû ji ser serê xwe danî, wezîr jê re got: Şahmaranê serjê bike! Hasib got: Ez nizanim serjê bikim û di temenê xwe gişî de min carekê tenê jî tiştek serjê nekiriye. Îcar heger tu pir dixwazî, tu bi xwe wê serjê bike! Wezîr Şemhûr got: Baş e, ez ê wê serjê bikim. Û pê re jî rabû ser xwe, rahişt sênîkê û çû Şahmarana tê de serjê kir. Gava Hasib çav li wê dîmenê ket, girîya û hêsir ji çavên wî hatin xwarê. Lê Şehmûr kenîya û jê re got: Mirovê debeng, tu çawa li ser marekê digirî!

Şemhûr Şahmaran hûr kir û goştê wê xist beroşeke ji paxir û beroş danî ser agir û li ber rûnişt, ma li hêvîya ku goşt bipije. Hîna ku ew wisa li ber beroşê rûniştî bû, xizmetkarek ji cem qral hat cem wî û jê re got: Qiral vê kêlîyê te dixwaze! Wezîr got: Bila be, va ez têm. Piştre rabû ser xwe, çû du şûşe anîn û ji Hasib re got: Êzingan bide bin agir, hetanî ku kefa ewil pêkeve. Gava ku kef da, wê di ser re bigire û bixe şûşeyekê ji vanan û xwe li bendê ragire, hetanî ku ew kef sar bibe. Gava sar bû, tu wê vexwe, da ku laşê te xurtir bibe û tu ji hemû nexweşînan rizgar bibî. Piştre gava careke din kef bi ser ket, wê jî di ser re bigire û bixe şûşeya mayî û ji min re hilîne, hetanî ku ez ji cem qral vegerim û ez wê vexwim. Lewre êşek di ewkê min de heye, ez dixwazim ji wê êşê pak bibim.

Wezîr Şemhûr, piştî ku tembiya xwe li Hasib kir, rabû ser xwe, berê xwe da cem qral. Hasib jî êzing dan bin beroşê, agir gur kir, hetanî ku kefa ewil bi ser goşt ket. Kefa ser goşt girt û ew xist şûşeya duyemîn û li cem xwe hilanî. Piştre agirê bin beroşê xweş kir û li hêvîyê ma, hetanî ku kefa duduyan jî bi ser ket. Ew kef jî di ser re girt û ew xist şûşeya ewil, da ku ew vexwe. Dema ku goşt pijîya jî, ew ji ser agir danî û ma li hêvîya vegera wezîr.

Çawa ku wezîr ji cem qral vegerîya, ji Hasib re got: Te çi kir? Hasib got: Karê ku te gotibû, min ew hemû pêk anîn. Wezîr lê vegerand û got: Te bi şûşeya ewilî çi kir? Hasib got: çawa ku te got, qasek berê min ew vexwar. Wezîr got: Lê ez bala xwe didimê, ku laşê te qet nehatiye guhertin? Hasib jê re got: Çawa nehatiye guhertin, ji serê min hetanî binê nigên min dişewite, çawa ku agir pê ketibe.

Wezîrê fenekar mijar ji Hasib veşart û jê re got: Kanî wê şûşeya duyemîn bîne, ez tiştê tê de vexwim, belkî ev nexweşîya ewkê min derbas bibe!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 554'AN

*Şehrezadê got:*

Wezîr Şemhûr şûşeya ewil vexwar, lê ji wî werê ku ew şûşeya duduyan vedixwe. Hîna ku hemû neqedandibû, şûşe ji destê wî de ket û di cî de nepixî û laşê wî hemû werimî. Yanî bîra ku wî ji birayê xwe re kola, ew tê wer bû. Vêca gava Hasib çav li wê dîmenê ket, movikên laşê wî giş sist bûn û tirsîya, ku şûşeya duduyan a ku ji xwe re hilanîbû vexwe. Lê piştre şîreta Şahmaranê hat bîra wî û ji xwe re got: "Heger tiştekî nebaş di vê şûşeya duduyan de hebûya, wezîr ew ji xwe re nedixwest!" Piştre berdewam kir, got: Tewkelîya min bi Xwedê û şûşe bi ser xwe de kir, ew vexwar. Çawa ku vexwar, Xwedayê gewre kanîyên hemû ilm û zanînan di dilê wî de vekir, dilşahî û bextewarîyeke mezin pê re çêbû. Goştê ku di beroşê de bû xist sênîyeke paxir, ew danî ser serê xwe û ji mala wezîr derket. Berê xwe da zikê asîmanan, kûrahîya heft tebeqayan dît, tevlî erşê gewre û gera felekan li dora hev. Xwedayê gewre kûrdîtineke wisa dijwar dabûyê, ku hemû liv û gera stêrkan, zanîna derya û bêjahîyê, feleknasî û hemû cureyên pîvanasîyê, girtina heyv û rojê û hemû zanîstên din, ji wî ve keşif bûbûn û têgihîştibû. Çavên xwe berjêr ve daxistin, li erdê nêrî; bala xwe dayê, ku cewhera hemû dar û beran, hemû revek û nebatan, hemû maden û anasiran bi hemû fêde û zirarên xwe ji wî ve keşif bûne û di bîra wî de zivirîye sîmyazanî, xwezanasî, bijîşknasî û serfa zêr û zîvê.

Di nava wê rewşa balkêş û erjeng de meşa xwe berdewam kir, hetanî ku gihîşt qesra qral Kerzedan. Derbasî hundir bû, bejna xwe li ber qral tewand û erda ber nigên wî maçî kir, got: Bila serê te sax be, wezîrê te Şemhûr mir!

Qral hem pir hêrs bû, hem jî pir xemgîn û dilêş bû li ser wezîrê xwe. Li ser wî girîya, hemû wezîr û kizîr û mîr û emîrên li dora wî rûniştî jî pê re girîyan. Qral Kerzedan got: Hetanî çend kêlîyan berîya niha jî wezîrê min li vir bû û tu nexweşînên wî tune bûn û ma di vê kêlîyê de mir gelo?

Hasib mijar jê re rave kir û got: Piştî ku ew şûşe vexwar, zikê wî bû mîna hebanekê, laşê wî giş werimî û mir.

Qral ji kûrahiya dilê xwe li ser wezîrê xwe êşîya. Piştre ji Hasib re got: Îcar wê çi bi serê min bê, piştî Şemhûr? Hasib lê vegerand û got: Qet mitalan meke ey qralê gewre! Ez ê te derman bikim û di nava sê rojan de, ez ê bikim, ku şopa nexweşînê di laşê te de nemîne!

Qral bi vê gotina Hasib aram bû û mehdê wî vebû. Hilmeke kûr kişand û ji Hasib re got: Dermankirina min meh û salan jî bajo ne xema min e. Tenê ez dixwazim ku rojek were û ez ji vê nexweşînê rizgar bibim.

Hasib sênîka di dest xwe de bir, danî ber qral û perçeyek ji goştê Şahmaranê da wî, pê da xwarin. Piştre destmalek avêt ser çavên wî, ew nixumand û li kêleka wî rûnişt, jê xwest ku rakeve, ji nîvroyê hetanî êvarê, da ku goşt bihele û di laşê wî gişî de bigere.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 555'AN

*Şehrezadê got:*

Êvarkî, Hasib qral ji xew rakir, hinek mey da wî û jê xwest, ku dîsa rakeve hetanî sibehê. Gava ku şeveqê lêda û roj derket, Hasib perçeyekî din ji wî goştî da qral, pê da xwarin û dîsa jê xwest, ku rakeve. Piştre dîsa mey dayê û dîsa ew da razandin û bi heman rêbazê berdewam kir, hetanî ku ew goşt hemû dayê. Di roja sisiyan de ji serî hetanî binê lingan qemûşka çermê qral avêt û xweydanê di laşê wî re avêt. Pê re jî rihet bû, bi ser xwe ve hat û bi giştî ji wê nexweşîna xwe rizgar bû, şopa wê jî di laşê wî de nema.

Qral ji Hasib re got: Îcar divê ez herim hemamê. Hasib ew bir hemamê, laşê wî baş şûşt, hetanî ku bû mîna zîvekî biroqankî, piştre ew derxist, anî dîwana wî. Kincên wî yên herî spehî lê kirin û êdî vegerîya qralê berê yê berîya nexweşînê û dîsa li ser textê xwe rûnişt, Hasib jî li kêleka xwe da rûniştandin. Di pey re jî ji xizmetkaran xwest, ku sifreya xwarinê raxin.

Xizmetkaran xwarin anîn, li ber wan danîn. Wan jî têr xwar û di pey re destên xwe şûştin. Di pey re jî mey û şeraba xwe vexwarin û derbasî civata dîwanê bûn. Wezîr û kizîr û hemû serkirdeyên dewletê yeko yeko derbas bûn dîwanê û cihê xwe girtin. Hemûçkan kêfxweşîya xwe bi rihetbûna qral a ji wê nexweşîna xedar anîn ziman û dua jê re kirin, ji bo temenekî dirêj û tenduristîyeke têkûz. Di pey re şahî û bi vê mûnasebetê pîrozbahîyeke mezin li bajêr gişî hat lidarxistin û bajar giş hat xemilandin, def û zirneyan lêdan û qurban hatin serjêkirin.

Qralê ku dîwana xwe giş komî ser hev kiribû û pîrozbahî qebûl dikirin, li civata xwe zivirî û ji wan re got: Gelî wezîr û mîr û Emîr û serkirdeyan! Va ev e, Hasib Kerîmidînê ku ez ji vê belaya nexweşînê rizgar kirime. Kesê ku ji wî hez bike, ji min hez dike û kesê ku bi ya wî bike, bi ya min dike!

Kesên ku di dîwanê de rûniştî bûn, gişan bîet ji Hasib re kir û gotin: Fermana qralê me li ser seran û li ser çavan e, em ê her dem di rêya Hasib û di bin fermana wî de bim! Piştre yeko yeko rabûn ser xwe û çûn destê Hasib ramûsan, serwezîritîya wî û peywira wî lê pîroz kirin. Qral jî xeftanekî ku bi zêrê sor û durr û cewheran hatibû hûnandin dîyarî wî kir, ku buhayê her cewherekê ji wan cewheran pênc hezar dînar bû. Sêsed bende, Sêsed jinên rûheyv û sêsed carîyeyên hebeşî dan wî, li gel pêncsed qantirên bi mal barkirî û têra wî jî mîh, bizin, çêlek, gamêş û ajalên din. Di pey re jî ji hemû karmendên dewletê û xelkê xwe xwest, ku peywira wî lê pîroz bikim.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 556'AN

*Şehrezadê got:*

Piştre Hasib Kerîmidîn li hespê xwe siwar bû, hemû mîr û emîr û wezîr jî pê re siwar bûn û çûn qesra ku qral jê re terxan kiribû; çû li ser kursîya xwe rûnişt. Hemû mîr û emîr û leşker jî ketin rêzê û hatin yeko yeko destê wî maçî kirin, pêywira wî lê pîroz kirin û hemû ketin bin xizmeta wî û pir kêfxweş bûn, bi serwezîrtîya wî. Piştre kes û kar û nasên wî hatin pîrozbahîya wî û kêfxweşîya xwe anîn ziman.

Gava lê ewle bû, ku her tişt ketiye destê wî, rabû ser xwe, li hespa xwe siwar bû, hemû mîr û emîr û serkirde û leşker dan kêleka xwe û çû qesra Şemhûr. Çi tiştê ku tê de hebû, rakir, bir mala xwe û di pey re derîyê malê girt û ew mohr kir.

Hasibê ku berê xwendin û nivîsandina wî tune bû, êdî bûbû desthilatdarekî gewre û zana, ku êdî bi her tişt dizanibû û bi emrê Xwedê ji her tiştî serwext bûbû. Li çar hêlên cîhanê di kîmiya, sîmya, stêrknasî, endezyarî, bijîşkî, keştînasî, derûnasî û zanînên din de navê wî û navê zanîna wî derketibû.

Rojekê ji diya xwe re got: Dayêcan, bavê min zanistekî mezin bû, gelo wî tu pirtûk ji min re nehiştine?

Gava diya wî ev gotin jê bihîstin, çû ew sindoqa xwe anî û ew her pênc rûpelên ku ji nava wan pirtûkên binavbûyî rizgar bûbûn, derxistin, dan destê wî û jê re got: Ji van pênc rûpelan pê ve, bavê te tu pirtûk ji te re nehiştine.

Hasib, tiştê ku di wan rûpelan de bû xwend, piştre li diya xwe zivirî û jê re got: Dayêcan, ev rûpel beşek e ji pirtûkekê, kanî yên mayî li ku ne? Diya wî got: Bavê te li gel hemû pirtûkên xwe di keştîyekê de li ser deryayê rêwîtîyek dikir. Lê mixabin keştîya wî têkçû û pirtûkên wî giş binav bûn lê Xwedê ew rizgar kir û ji wan pirtûkên wî gişan ev pênc rûpel tenê man. Gava ji rêwîtîyê vegerîya malê, ez ducanî bûm û tu di zikê min de bûyî. Wî jî ji min re got: Belkî tu kurekî bînî, van rûpelan li ba xwe hilîne û roja ku mîrasê min jê re hiştiye, ji te pirsî: Van rûpelan bide wî û jê re bibêje, bavê te, ji vana pê ve tiştek ji te re nehiştiye. Va ye ez jî wan didime te. Hasib Kerîmidîn bi wan zanînên xwe yên bêsînor, di nava jîyaneke dewlemend û bextewar de jiya bi dilxweşî, hetanî ku xerabkarê jîyana bextewar û fesadê hezkirîyan bi ser de hat û her tişt lê xera kir.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 557’AN

## ÇÎROKA SENDÎBADÊ DERYAYÎ Û YÊ BARKÊŞ

*Şehrezadê got:*

Şahînşahê min ê gewre Şehreyarê bextewar ! Tê gotin, ku di zemanê xelîfe Harûn Reşîd de, li bajarê Bexdayê mirovek hebû, navê wî Sendîbadê Barkêş bû. Mirovekî xizan bû û barê ticareta wî li ser serê wî bû. Carekê di rojeke havînê ya germ de, barekî giran da ser milê xwe û di bin wî barî de xweydan da û betilî. Îcar gava di ber derîyê tacirekî re derbas bû û dît, ku sîwaneke hênik û binê wê rêşkirî li wir heye; barê xwe danî ser pêlika ber derî, da ku hinekî bêhna xwe vede. Bi bayê henîk re hilmeke ku gizrînok di

laşê wî de çêdikir, ji wî derîyî ve bi ser de dihat. Çawa ku ew bêhna xweş hatê, ew jî li ser wê pêlikê rûnişt û ew hilma xweş kişand nava xwe. Di wê navberê de dengin cur bi cur ji hundir hatin wî; awaz û newayên ku dil xweş dikirin, helbestên watedar, dengê wîtewîta çûkên kenarya, zerdelokan, bilbilan, şalûlan û gelek çûkên din. Wan dengan û wan bêhnên xweş ew gêj û mest kirin. Hinekî din ber bi derî ve çû û li hundirê hewşê nêrî; dît ku bîstan û baxekî mezin di hundir de ye û nava bax tijî xulam û bend û qerwaş û xizmetkarên bê hed û hîsab, ku di mala qral û sultanan de jî peyda nedibûn!

Di wê navberê de, bêhna xwarin û meyên cur bi cur ji hundir fûrîya û bi ser de hat, ew ji ser hişê wî bir. Destên xwe ber bi asîmanan ve kir û got: Subhan ji te re ey aferînerê gewre; yê ku li gora kêfa xwe dide hinekan, bê hed û bê hîsab! Xwedêyo, ez lêborîna xwe ji te dixwazim, ji ber gunehên xwe, ji ber gunehkarîya xwe. Lewre derketina li hemberî te ne gengaz e û desthilatdarîya rasteqînî di destê te de ye, tu çawa dixwazî, wisa dikî; teqdîr a te ye. Tu bixwazî tu mirov maldar dikî, tu nexwazî jî tu mirov hêjar dijî. Dilê te bixwaze tu mirov şanaz dikî, nexwazî jî tu mirov rezîl dikî. Vîn vîna te ye û kar karê te ye, ma kî dikare têkilî karê te bibe! Subhan ji wê hêz û tevdîra te ya bêsînor re; subhan ji wê serwerîya te ya bêstûn re! Tu çawa dixwazî, wisa jî dikî. Va ye te xwestiye û bi elba mezin te daye xwedîyê vê malê jî; çiqas xwarinên xweş, bêhnên xweş, vexwarinên xweş hebin, te daye wî û yên mîna min jî te ew tî û birçî hiştine li ber derîyan! Gelo çi hîkmet û raz di van biryarên te de heye?

Tu Xwedayê me gişan î lê te hinek ji me di bin barê giran de û di nava xweydanê de tî û birçî hiştine û hinek jî mîna xwedîyê vê malê di nava xweşî û şahî û hebûneke bêsînor de hiştine. Hinek ser bilind û hinek jî stûxwar û perîşan. Gelo çi hikmet di vî karê te de heye? Piştre bi helbestî derdê xwe anî ziman û bêdeng bû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 558'AN

*Şehrezadê got:*

Çawa ku Sendîbadê Barkêş dua û lavayîyên xwe qedandin, da xwe ku dîsa barê xwe hilgire û rêya xwe berdewam bike lê berîya ku rabe, kurikekî rûgeş û lihevhatî, di nava kincên spehî de ji derî derket û hat bi destê wî girt û jê re got: Ka rabe derbasî hundir bibe, mîrzayê min dixwaze bi te re biaxive!

Destpêkê qebûl nekir û hewl da ku derbasî hundir nebe lê nikaribû û mecbûr ma, ku barê xwe bide bin sitarekê û bi kurik re derbasî hundir bibe. Gava derbas bû, dît ku maleke mezin û bi heybet e. Tijî gul û şîndarên fêkîyên cur bi cur; sêv û porteqal û hinar û dêlîyên tirîyê reş û sor. Di nîvê baxçe de jî civateke mezin lidarxistî bû, li gel dengbêj û muzîkjen û amûrên reng bi reng, carîyeyên pir spehî, yên spî, yên reş, yên esmer û bejn zirav û qamxweş ku hemû jî di nava pergaleke têkûz de bûn û di nava civate de jî mirovekî rêzdar û bi heybet rûniştî bû, ku spîbûn ketibû cênîkên wî û giranîyeke din didayê. Nûr ji rûyê wî dibarîya û şanazî bi xwe re diteyîsand derdora xwe.

Sendîbadê Barkêş behetî ma li hemberî wê dîmena li ber çavên wî. Di dilê xwe de got: “Bi navê Xwedê ev der cihekî ji welatê cinîyan e yan jî qesreke sultan û qralan e!” Bi pîvan tevgerîya û bi rêzdarî silav li wan kir û duayên qencîyê ji wan re kir; erda bin nigên wan maçî kir û stûxwar li raserî wan sekinî di nava xiroşîyeke kûr de, çawa ku li ser nimêjê be.

Mirovê di nîvê malê de rûniştî, ku weke xwedîyê malê dihat xuyakirin, gazî Sendîbadê Barkêş kir, ew li nêzî xwe da rûniştandin, bi zimanekî şêrîn xêrhatina wî kir û pê re mijûl bû, li hal û wextê wî pirsî. Piştre ji xizmetkaran xwest, ku xwarineke xweş jê re bînin, anîn û danîn ber wî. Sendîbad jî got: “Bismîlah!” û ket ser xwarinê. Xwar û hey xwar, heta ku têr xwar. Got: Şikir ji Xwedê re! Û rabû destê xwe şûşt û spasdarîya xwedîyê malê kir, ji ber comerdîya wî.

Xwedîyê malê jê re got: Careke din tu bi xêr hatî û dema te xweş be! Gelo navê te çi ye û tu çi karî dikî? Wî jî lê vegerand û got: Mîrzayê hêja, navê min Sendîbad e û ez karê barkêşîyê dikim, barên xelkê li ser serê xwe dikim û ji wan re dibim. Mîrzayê gewre bişirî û jê re got: Nexwe em hevenavên hev in! Navê min jî Sendîbad e û xelk ji min re dibêje Sendîbadê Deryayî lê belê ez ji te dixwazim, ku tu wan risteyên xwe yên ku te li ber derîyê min digotin, ji min re dûbare bikî?

Barkêş şerm kir û ket ber fedîyê, jê re got: Tu bi Xwedê kî mîrzayê min li min negirî û di min bibore, lewre ez pir betilîbûm, bê av û bê nan bûm û tu jî dizanî, ku kêmdiravî û kêmderfetî mirov fêrî kêmterbiye û bêedebîyê dike. Sendîbadê Deryayî got: Şerm neke û bibêje, lewre tu bûyî birayê min êdî, jixwe çawa te ew helbest got, min ew eciband.

Sendîbadê Barkêş, bi zimanekî şermoke be jî got:

bi hezaran hejarên dilbiêş hene di şubhetê min
maldarên mîna vî zilamî jî wisa pir kêm in
êşa laşê min her zêde dibe tim bê rawestan
ji ber ku bar her girantir e roj di pey rojan
mirovên wisa bextewar her şad in heta'b akam
ne bar li ser pişta wan mîna min ne jî westan
bi şanazî her di nava şahîyê de ne heta hetan
bi xweşxwarin û meyxur û xweşbêhn û ava gulan
halbûkî em giş yek in û ji heman dilopa xwînêreng
ez jî weke wî mirov im ew jî weke min hevseng
çima dengê wî xweş tê wisa û ez jî her bêdeng
çima ev qasî mezin e ferqa di neqeba me de girîng
çima ew her meyxweşê vedixwe ez jî avşorkereng
derewan nakim li te Xwedêyo lew hemû rastî ye ev
pir zana û hekîm î tu gişî baş dizanî wisa tev

Sendîbadê Deryayî helbesta wî eciband û jê re got: Barkêşê hêja, çîroka serpêhatîya min jî pir ecêb û erjeng e, ez ê bi hûrgulî wê ji te re vebêjim…

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 559'AN

*Şehrezadê got:*

Sendîbadê Deryayî berdewam kir û ji barkêş re got. Berîya ku ez bigihîjim vê hebûn û vê bextewarîyê, ez jî di rêyên zor û zehmet re derbas bûm û min êşin mezin kişandin. Lewre pir bobelat bi serê min de hatin û ez bi hêsanî ji wan rizgar nebûm. Min ked û vîn û helwesteke xurt nîşan da, hetanî ku min ew qonax derbas kir. Di wê qonaxê de min heft rêwîtî kirin, ku di her rêwîtîyekê de tiştin bi serê min de hatine, nayên gotin û aqil li ber wan disekine. Ew giş jî di qedera min de nîvisandî bûn û ne gengaz e, ku mirov ji qedera xwe bireve.

Sendîbadê Deryayî çavên xwe li ser civata xwe gerand û berdewam kir, got: Gelî berêzanên delal! Bavê min tacirekî mezin, mirovekî bi nav û deng bû. Mal û milkê wî pir bû, bi qasî ku neyê jimartin. Gava ku mir, ez hîna biçûk bûm. Gava ez mezin bûm jî, min destê xwe danî ser gişî û min jê xwar û vexwar, bê hed û hîsab. Min kincên herî biha û xweşik li xwe kirin û

ciwanên hevalên xwe li dora xwe kom kirin û her dem di nava kêf û sefayê de min jîyana xwe berdewam kir. Min digo belkî dê jîyana min her wisa berdewam bike. Lê hetanî ku min rastî dît û hişê min hat serê min, ne tiştek ji malê min ma û ne jî ew kêf û şahîya ku ez tê de.

Gava ku tunebûnê mîna hûtekî ez daqurtandim, di nava şaşwazî û behetîmayîneke dijwar de hişê min hat serê min. Pê re jî çîrokeke ku min berê bihîstibû, çîroka Mîrzayê me Suleyman Bin Dawid hate bîra min. Gotineke wî hebû digot: "Sisê ji sisêyan çêtir in: Roja mirinê ji roja çêbûnê çêtir e, kûçikekî sax çêtir e ji şêrekî mirî û gor jî ji hejarîyê çêtir e!"

Ez jî rabûm ser xwe û çi tiştê di destê min de mabû ji kinc û rayêx û esasên hundir, min ew hemû kom kirin û ew birin firotin. Piştre min mal û erdê xwe jî firot û bi giştî sê hezar dînar kom kir, wê gavê gotina helbestkarekî hat bîra min, ku digot:

bi qasî ked û xebatê pêş ve diçe însan
şevên bêxew û bê hedar diborin ewanan
bêtirs dikevin deryayan daxwazkarê durran
bê ceng û cîdal mirov qet nagihîje lûtkan
kesê pir binêre û qet nexebite
temenê xwe gişî bi xwezîyan derbas dike

Min jî ji xwe re encamek ji wê gotinê derxist û ez rabûm ser xwe, min bi wan dirav û dînarên xwe ji xwe re caw û malên ticaretê kirrî û min xwe amade kir, ji bo rêwîtîyeke deryayî. Lewre min hemû talûkeyên rêwîtîyeke wisa dan ber çavên xwe.

Min karê xwe kir û li gel hinek tacirên din ez çûm Besrayê û ji wir me malê xwe li keştîyekê kir, bar kir û em bi deryayê ve çûn. Me rêya xwe bi gelek giravan xist, em ji yekê derbasî ya din bûn û şev û roj em di deryayê de meşîyan. Em gihîştin ku derê jî, me malê xwe firot û li şûna wî malekî din kirrî û rêwîtîya xwe jî berdewam kir. Carinan jî me malên xwe pev diguhertin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 560'Î

*Şehrezadê got:*

Sendîbadê Deryayî vegotina serpêhatîya xwe berdewam kir: Me rêwîtî û ticareta xwe berdewam kir, hetanî ku em gihîştin giraveke şîn û xweş ku

mîna bihuştekê bû. Qeptanê keştîyê xwe da qiraxên giravê, giranîyên xwe bi avê de berdan û werîsên xwe bi çengelan avêtin bejahîyê, girêdan. Em giş ji keştîyê daketin û derbasî ser bejahîyê bûn; me cihê xwe xweş kir û agir dada, xwe germ kir. Piştre her yek ji me bi karekî ve mijûl bû. Hinekan xwarin çêdikir, hinekan kinc dişûştin, hinekan temaşeyî wan dîmenên xwezayê dikirin, ku ez bi xwe jî yek ji wan bûm. Rêwî hemû bi xwarin û vexwarinê daketibûn, li kêfa xwe dinêrîn, ez jî li der û dora giravê digerîyam, min li wê bihuştê temaşe dikir.

Carekê ji nişkê ve qeptanê keştîyê qîrîya û got: Rêwîyên hêja û delal, ji kerema xwe vegerin keştîya xwe û dîsa bi lez û bez siwar bibin, da ku jîyanên xwe rizgar bikin, lewre ev devera ku hûn li ser in, ne girav e û ne jî erd e lê belê masîyeke pir mezin e û di nîvê deryayê de sekinîye! Gava ku demeke dirêj di ser sekna wê re bihurîye, ax û qûm li ser kom bûyê, gîha û dar li ser şîn bûne û di nava salên dirêj de, zivirîye giravekê. Lê gava we agir li ser dada, laşê wê germ bû û ji cihê xwe liviya. Heger hûn pir zû ji ser pişta wê danekevin, dê we di avê wer bike û kes ji we nafilite, de êdî zû bilivin!

Çawa ku rêwî û taciran ew gotina qeptan bihîstin, bi lez û bez ber bi keştîyê ve bazdan û her tiştê xwe li pey xwe hiştin, bêyî ku li pişt xwe jî binêrin. Lê dîsa jî her kes pê re negihîşt, ku li keştîyê siwar bibe, lewre masîya gewre livîya û berjêr ve noqî avê bû, ber bi zikê deryayê ve çû, nebedî bû. Pê re jî pêlên avê bi qasî çiyayan rabûn, di nava himehimeke ecêb de li bin guhê hev ketin û hemû kesên ku li ser pişta masî mabûn, bi xwe re binav kirin, ku ez bi xwe jî yek ji wan bûm. Ez jî binav bûbûm lê Xwedê ez rigar kirim û perçeyek dep ji min re şand. Ew dep bi xwe jî hewdikê ku rêwîyan kincên xwe tê de dişûştin bû. Ji tirsa ruhê xwe, min bi wî depî girt, ez lê siwar bûm û bi nigan jî min xwe pêş de da, mîna ku ez bêrikan bi kar bînim.

Qeptan jî babirkên keştîyê vekirin û bi rê ket, bêyî ku li rêwîyên mayî bipirse ango li wan bigere. Min jî li çûna keştîyê nêrî, hetanî ku ji ber çavên min ket û ez gihîştim wê bawerîyê, ku êdî xelasî ji min re nemaye. Lê dîsa jî min hêvîya xwe parast û depê xwe berneda. Şev bi ser min de hat û hîna jî ez di wê rewşê de bûm. Şev û rojeke din jî ez di heman rewşê de mam. Pêlên deryayê û bayê jî alîkarîya min kirin, ez şiyam ku xwe bigihînim qiraxa giraveke bilind î ku darên wê yên bilind, mîna sîwanên mezin bi ser avê de ditewiyan. Min bi şaxên yekê ji wan girt û bi xêra wê xwe ji mirinê xelas kir, xwe gihand ser axa giravê. Lê çawa ku min nigên xwe danîn ser axê, ez nû lê hay bûm, ku nigên min bi xwîn in û şopa diranên masîyan tê de heye. Masî-

yan goştê min xwaribûn û ez pê nehesîyabûm, ji tirs û kerb û kul û kederan. Min ji êşan weke meytekî xwe avêt erdê, pê re jî ez ji ser hişê xwe çûm.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 561'Ê

*Şehrezadê got:*

Sendîbad vegotina serpêhatîya xwe berdewam kir û got: Ez di wî halî de mam, hetanî ya dinî rojê, gava rok derket û tava wê da min, ez bi ser xwe ve hatim û ez lê hay bûm, ku ez li giravê me û herdu nigên min werimî ne. Dilbikul û di nava xemgînîyeke mezin de ez rabûm ser xwe û bi zorê meşîyam. Geh li ser çogan, geh bi zikişkê min meşa xwe berdewam kir, hetanî ku ez li kanîyekê û darên fêkîyan qelibîm. Jixwe ew girav tijî kanî û darên fêkîyan bû. Min jî têra xwe fêkî xwar û zikê xwe bi wan dagirt, birçîbûna xwe têk bir. Çend roj û çend şevên din jî bi wî hawayî min berdewam kir, heta ku ez hinekî bi ser xwe ve hatim û birînên min baş bûn. Êdî bi hêsanî ez ji xwe re li dora giravê digerîyam û min li wan şîndarên spehî temaşe dikir, ez bi spehîbûna wan şanaz dibûm. Piştre min ji wan daran gopalek jî ji xwe re çêkir û êdî min xwe dida ser, ez bi saya wî hîn hêsantir dimeşîyam.

Min wisa jîyana xwe berdewam kir, heta rojekê gava ku ez li qiraxa giravê dimeşîyam û min dît, ku ji dûr ve reşikek tê. Destpêkê min got qey dirindeyek, ajalek an jî wehşekî deryayê ye. Ez ber bi wî ve çûm û min awirên xwe ji ser wî qut nekirin. Piştre min dît, ku hespekî gir û bi heybet e, li kêleka avê girêdayî ye. Ez hinekî din jî ber bi wî ve çûm, min bala xwe dayê, ku qîrek li min kir, ku erd ji ber dengê wî hejîya. Ez pir tirsîyam û min nêt kir, ku ez vegerim. Lê di wê kêlîyê de mirovek ji bin erdê derket, ber bi min ve hat û li min qîrîya, got: Tu kî yî, tu ji ku hatiyî û tu çawa gihîştiyî vê deverê? Min jê re got: Mîrzayê min ez mirovekî biyan im. Ez di keştîyekê de bûm û li gel rêwîyin din binav bûm, xeriqîm. Lê Xwedê di hewara min de hat û depek ji min re şand, ez lê siwar bûm û bi xêra pêlên avê û bayê ez di vir re derketim û ji mirinê xelas bûm.

Gava ew gotina min bihîst, hat bi destê min girt û ji min re got: Bi min re were! Û ez bi xwe re birim, ez xistim binerdekê. Li wir, ez derbasî hêwaneke mezin kirim û di odeyekê de ez dam rûniştandin. Piştre, çû hinek xwarin ji min re anî. Jixwe ez pir birçû bûm. Min têra xwe xwar, heta ku bêhna min hat ber min û ez bi ser xwe ve hatim.

Rewşa min û tiştên ku bi serê min de hatibûn ji min pirsî, min jî serpêhatîya xwe ji serî hetanî binî jê re vegot. Şaşwaz û ecêbmayî ma li wê çîroka min. Qasekî bi şûn de min jî jê re got: Mîrzayê min, tu bi Xwedê kî, heger bêedebîyek ji min derkeve, li min negire lê ez mereq dikim û ez dixwazim tu ji min re bibêjî, bê tu kî yî û çima tu di vê hêwana bin erdê de yî û çima te ew hesp li qiraxa avê girêdaye?

Zilam bersiva min da û got: Em seyîsên qral Mehrecan in û em belawela ne li seranserê vê giravê. Hemû hespên qral di bin destên me de ne û her meh gava ku heyv hiltê, em hemû hespên mê tînin vê giravê û em wan li qiraxa avê girêdidin, em jî xwe di van cihên bin erdê de vedişêrin, da ku kes me nebîne. Hespên deryayê jî bêhna van hespên me dikin û yek ji wan li pey wê bêhnê tê ser bejahîyê û gava ku kesî nebîne, diçe ser hespa me, wê gon dide. Piştre ji ser pişta wê dadikeve û dixwaze wê bi xwe re bibe. Vêca hêrs dibe û bi nigan lê dide, dike hîrehîr deng derdixe, em jî têdigihîjin, ku hespa me gon daye, em ji bin erdê derdikevin û pê ve diçin, ew jî ji me ditirse û dîsa bi şûn de diçe nav deryayê. Bi wî hawayî hespa me ji wî tov digire û piştre mehînekê tîne, ku buhayê wê nayê gotin. Lewre tu hespên mîna wan li ser rûyê erdê tune ne. A niha jî wextê derketina hespên deryayî ye, Xwedê hez ke, dê ew jî pêk bê û ez ê te bi xwe re bibim cem qral Mehrecan.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 562'YAN

*Şehrezadê got:*

Sendîbadê Deryayî vegotina serpêhatîya xwe berdewam kir, got: Seyîsê qral Mehrecan ravekirina xwe berdewam kir û ji min re got: Jixwe heger tu rastî min nehatayî, te tu kes li vê derê nedidît û tu yê bêxwedî li vê derê bimirayî, bêyî ku hayê kesî ji te çêbibe. Lê belê ez ê te bi xelasê bixim û bibim sebeb, ku careke din tu vegerî welatê xwe.

Li hemberî vê nêzikahîya seyîs, min spasîya wî kir û dua jê re kirin. Hîna ku em wisa diaxivîn, me dît, ku pêlin ecêb bi deryayê ketin û hesp ji nav ava wê derket û qîreke ecêb da, ku girav hemû ji ber hejîya. Piştre xwe avêt ser hespa seyîs a girêdayî û ew gon da. Di pey re jî ji ser pişta wê peya bû û xwest ku wê bi xwe re bibe lê nikaribû. Stûyê wê gez kir, lotik avêtinê û bi ser de qîrîya, kir hîrehîr. Seyîs şûr û cunehek xist destê xwe û ji bin erdê derket û gazî hevalên xwe yên din kir, ji wan re got: Herin hespê, herin hespê!

Û bi şûrê xwe li mertal da, deng derxist. Seyîsên hevalên wî jî bi dengê wî re derketin û bi riman çûn ser. Hespê deryayî tirsîya, cefilî û bi şûn de vegerîya nav behrê, mîna gamêşekî binav bû û ji ber çavan ket, wenda bû. Ez û seyîs jî di cihê xwe de rûniştin. Piştî demekê, hevalên wî yên din jî hatin, ku her yek ji wan hespek pê re bû. Gava ez li cem wî dîtin, li min pirsîn, min jî çîroka serpêhatîya xwe ji wan re jî vegot û ew agahdar kirin. Rûniştin, sifreya xwarinê raxistin û gazî min jî kirin. Min bi wan re xwar, bi wan re vexwar. Di pey re hemû rabûn, li hespên xwe siwar bûn, ez jî li yekî kirim û ketin rê.

Me rêwîtîya xwe berdewam kir, hetanî ku em gihîştin bajarê qral Mehrecan. Piştre em çûn qesra wî, ew hemû derbasî cem wî bûn û ew ji rewşa min jî agahdar kirin. Qral ez xwestim, wan jî ez derbasî cem wî kirim. Min silavek lê kir, wî jî silava min girt û bi germahî xêrhatina min kir û li rewş û halê min pirsî. Min jî çîroka xwe ji serî hetanî binî jê re got û ecêbên ku ez li wan rast hatibûm, anîn ziman. Qral behetî û ecêbmayî ma li hemberî wê çîroka min. Piştre ji min re got: Bextê te vekirî bûye kurê min, nexwe tu ji ev qas talûkeyan rizgar nedibûyî. Derbasbûyî be û şikir ji Xweda re ku tu bi selametî gihandî vê derê.

Pir qîmeta min girt, hemû rengên alîkarîyê bi min re kir, ez nêzî xwe kirim û bi zimanekî şêrîn û xweş, ber dilê min girt. Di encamê de jî ez kirim xebatkarekî xwe û karekî nivîskarîyê di benderê de da min. Êdî min hemû keştîyên ku ji deryayê dihatin wê benderê, di lênûska xwe de tomar dikirin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 563'YAN

*Şehrezadê got:*

Sendîbad berdewam kir: Ez bûm xebatkarê qral Mehrecan û jê re xebitîm. Wî jî qencî bi min kir û di her mijarê de alîkarîya min kir; kincên baş li min kirin û qedrekî baş jî da min, ku êdî ji bo xatirê min û bi rîcakarîya min alîkarîya gelek mirovan jî dikir.

Ez demeke dirêj li ba wî mam. Her car jî ez diçûm benderê, min ji rêwî û qeptan û keştîvanan nûçe û agahîyên derbarê Bexdayê de dipirsî, bi hêvîya ku ez li yekî ji Bexdayê rast bêm û ez pê re herim, vegerim welatê xwe. Lê ez li kesî rast nehatim û min tu agahî jî negirtin. Hin bi hin ez li xerîbîyê aciz dibûm û bêhêvîtî bi min re çêdibû.

Ew rewşa min, demeke din jî bi wî hawayî berdewam kir, di nava êşa bêrîkirineke kûr de. Hetanî rojekê ku ez derbasî cem qral Mehrecan bûm û min dît, ku çend heb mirovên Hindistanî li gel wî ne. Min silavek li wan kir, wan jî silava min girtin, xêrhatina min kirin û pirsa welatê min kirin. Min welatê xwe ji wan re got û li wan pirsî. Gotin em xelkin cuda ne û bîr û bawerîyên me jî cuda ne. Çîna herî rûmetdar di nav me de spasdar in, ku ew pir adil in û tehdeyê li kesî nakin. Çîneke me ya din jî Brahman in, ku ew qet meyê venaxwin û gelekî bextverî, kêfhez û xwedî deve û hesp û ajal in. Bi kurtahî ji min re gotin, ku Hindî vediqetin heftê û du hozan. Ev rewşeke pir balkêş bû ji bo min.

Di qraltîya Mehrecan de gelek girav hebûn. Yek ji wan, navê wê Kabel bû, ku şev pê de gumeguma def û daholan jê kêm nedibû. Rêwîyên ku diçûn û dihatin, bi hûrgilî behsa wê dikirin. Li wî welatî, min masîyek dît, ku dirêjahîya wê du sed gaz bû. Masîyek jî rûyê wê mîna yê bûm bû. Ya rast, di wê rêwîtîya xwe de min ew qas tiştên ecêb dîtin, ku ez wan gişan bînim ziman, dê pir dirêj bibe.

Rojekê dîsa mîna adeta xwe ya rojane ez li qiraxa peravê digerîyam û gopalê min di destê min de bû, min bala xwe dayê, ku keştîyeke mezin ber bi benderê ve tê û gelek tacir tê de ne. Ez çûm pêşîya wê, ew jî li benderê sekinî û hesinê xwe avêt bejahîyê, babirkên xwe daxistin û hemû rêwî jê peyabûn û hêdî hêdî barên xwe danîn, min jî hemû tişt tomar dikir. Herî dawîyê, min ji qeptan re got: Tiştek di keştîyê de ma? Got: Belê, mîrzayê min. Barek di hundirê keştîyê de maye, ku xwedîyê wî di rê de binav bû û li giraveke dîtirkê fetisî. Vêca me nêt e, ku em malê wî bifiroşin, heqê wî bigirin û bibin ji malbata wî ya li Bexdayê, bajarê aştîyê.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 564'AN

*Şehrezadê got:*

Sendîbad vegotina serpêhatîya xwe berdewam kir: Gava qeptan ew gotin got, bi kelecanî min jê pirsî: Gelo navê wî zilamê xwedîyê wî malî çi bû? Qeptan got: Navê wî Sendîbadê Deryayî bû û di deryayê de fetisî. Bi vê gotina wî re min hîn baştir lê temaşe kir û min ew nas kir. Piştre ez qîrîyam û min jê re got: Qeptancan, qey te ez nas nekirim? Ez im, Sendîbadê xwedîyê wî malê li ba te; yê ku em tev de li wê giravê daketin û gava masîya ku em

li ser pişta wê bûn livîya, te gazî me kir û te em hişyar kirin lê em hemû pê re negihîştin, ku vegerin keştîyê û yên mayî binav bûn, xeriqîn. Lê wê çaxê, Xwedê teala li min hat rehmê û depek ji min re şand, ez bi xelasê xistim. Lewre ez li wî depî siwar bûm, min nigên xwe weke bêrikan li avê dan û bayê jî alîkarîya min kir, ez gihandim seyîsên qral Mehrecan; wan jî ez anîm vira; ez derbasî cem qral kirim, min jî çîroka xwe jê re got. Wî jî xêr û qencî bi min kirin û ez li cem xwe kirim nivîskarê benderê, ku êdî her roj weke niha ez malên taciran qeyd û tomar dikim. Ew malê li ba te jî, malê min e.

Qeptan got: La hewle wela quwete îla bîlah, êdî nema bawerî bi kesî dibe! Min jê re got: Ev çi gotin in qeptan û tu bi guhê xwe dibihîzî, bê ez ji te re çi dibêjim? Qeptan got: Jixwe te bihîst, ku min got xwedîyê mal binav bûye, fetisîye; tu jî dixwazî ku malê wî ji xwe re bibî, bi heramî û bêyî ku heqê te tê de hebe. Lewre me bi çavên serê xwe dît, ku ew û gelek rêwîyên din binav bûn û fetisîn, çûn. Îcar çawa dikarî angaşt bikî, ku ew mal ê te ye?

Min jê re got: Qeptan, li çîroka min guhdar bike, têbigihîje, tu yê rastîya gotina min bibînî. Derewkarî meziyeta munafiqan e.

Piştre, min ta bi derziyê ve kir û careke din ji serî hetanî binî, çîroka derketina xwe ya ji Bexdayê vegot, hetanî hatina min a wê girava ku em tê de binav bûn. Bi taybetî jî tiştên ku di navbera min û wî de qewimîbûn, min ew bi hûrgulî jê re anîn ziman.

Wê gavê qeptan jî, hemû tacirên pê re jî ez nas kirim û destxweşîya min kirin, ku ez bi selametî rizgar bûme. Hemûçikan gotin: Me qet bawer nedikir, ku tu rizgar bûyî, ji wê bobelatê. Lê wisa xuya dike, ku Xwedê temenekî nû daye te.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 565'AN

*Şehrezadê got:*

Sendîbadê Deryayî berdewam kir û got: Piştî ku qeptan ez nas kirim, malên min ên ticaretê da min. Min li wan nêrî, min dît, ku navê min li ser wan e û hemû têkûz in, tu kêmanî di wan de tune ye. Min perçeyê herî giranbuha ji nav malê xwe derxist û li gel rêwîyên din ên ku di rahiştinê de alîkarîya min kirin, berê xwe da cem qral Mehrecan; min ew dîyarî wî kir û jê re got: Keştîya ku ez tê de bûm, ev bû û va ye malê min jî bê kêmanî li

min vegerîyaye. Qral bi wê agahîyê hem şaşwaz û behetî ma hem jî kêfxweş û aram bû. Lewre rastî û duristîya min derket holê û ew jî baş têgihîşt, ku hemû tiştên min jê re gotibûn, rast bûn û xîlaf di wan de tune bû. Loma hîn bêtir ji min hez kir û wî jî li hemberî wê dîyarîya min, dîyarî û xelateke baş da min.

Di pey re min ew malê xwe yê ticaretê firot û min gelek dirav jê qezenc kirin. Bi wan diravan min gelek tiştên ku ez ticaretê bi wan bikim jî, li wî bajarî kirîn û tevlî hemû malê xwe yê din li keştîyê bar kir û dema wextê çûna wê hat, ez çûm cem qral, min spasdarîya wî kir, li ser malovanî û xêr û qencîyên ku bi min re kirin û destûra çûnê jê xwest, bo ku ez vegerim welatê xwe, cem kes û karên xwe. Min xatir jê xwest û ez li keştîya xwe siwar bûm, min berê xwe da Bexdê. Keştîya me bi şev û roj rêwîtîya xwe berdewam kir, hetanî ku em gihîştin Besrayê. Li wir em ji keştîyê peya bûn û em çend rojan li wir man, me bêhna xwe derxist. Pir kêfa min hat, ku em vegerîyabûn welatê xwe. Piştre min berê xwe da Bexdayê, warê aştîyê. Li gel hemû barê xwe yê ticaretê yê giranbuha ez hatim taxa xwe û bi kelecanî û dilşahîyeke ku nayê tarîfkirin derbasî mala xwe bûm. Hemû malbat û nasên min, destxweşîya min kirin û bi kêfxweşîyeke mezin ez pêşwazî kirim.

Malê min pir bûbû û destê min xurt bûbû êdî. Min ji xwe re gelek xizmetkar, xulam, carîye, bende û seray kirrîn; gelek mal û milk û dikan ketin destê min. Pê re jî gelek dost û heval û hogirên min çêbûn û êdî ez ji berê jî maldartir û mezintir bûm û min hemû êş û zor û zehmetîyên kişandî, hemû êşên xurbetê û bobelatên ku di rêwîtîyê de bi serê min de hatibûn, ji bîr kirin. Ez ketim nava xêr û xweşîyê; nava çêj û kêfxweşîya xwarin û vexwarin û jîyaneke piralî, ku sûretek ji bihuştê bi xwe bû.

Va ye hîna jî ez di nava heman jîyanê de dijîm. Ev hemû encamên rêwîtîya min a yekemîn bûn. Sibe jî, Xwedê hez bike ez ê ji we re behsa rêwîtîya xwe ya duyemîn bikim, lewre min ji we re behsa heft rêwîtîyên xwe kiribû.

Piştre Sendîbadê Deryayî şîva Sendîbadê Barkêş dayê, weke bexşîş jî sed misqal zêr da destê wî û jê re got: Te îro wensa me anî, bila ev jî heqê te be. Barkêş jî spasîya wî kir, bexşîşa xwe girt û bi rêya xwe de çû. Li ser serpêhatîya wî hevenavê xwe yê maldar pir bi ponijîn bû û bi şaşwazî li ser difikirî. Wê şevê li mala xwe raket û çawa bû sibe, dîsa vegerîya mala Sendîbadê Deryayî û derbasî cem wî bû. Wî jî bi germahî pêşwaziya mêvanê xwe

kir, qedr û qîmeta wî girt û ew li kêleka xwe da rûniştandin. Gava ku heval û hogirên wî yên din jî hatin û civata wî temam bû, xwarin û vexwarin da ber wan…

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 566'AN

*Şehrezadê got:*

Piştî ku hemûçkan xwarina xwe xwar û mey û şeraba xwe vexwarin, kêfa wan hat cih û aramî ket nava wan. Sendîbadê Deryayî got: Hevalno, hogirno, birano! Çawa ku duh jî min ji we re got, ez di nava kêf û şahîya jîyaneke bextewar û dewlemend de bûm. Lê rojekê agirek di nava min de pêket û min bêrîya gerîyana welat û giravên biyan kir û min biryar da, ku dîsa derkevim rêwîtî û ticaretê. Min beşek ji diravên xwe dan bi malên ticaretê û êşyayên xwe giş bar kirin, ew birin benderê. Li wir ez li keştîyeke nû û baş rast hatim, ku mezin bû, babirkên wê ji cawekî qewîn bûn û xebatkarên wê jî pir bûn. Min barê xwe li wê keştîyê bar kir û bi rojê em ketin rê.

Rêwîtîya me pir dirêj kir; em ji deryayekê derbasî deryayeke din bûn, ji giravekê derbasî giraveke din bûn û çi cihê ku em lê disekinîn jî, tacir û bazirgan û xerîdar û firoşkar û karmendên dewletan em pêşwazî dikirin, me malên xwe pev diguhertin, difirotin, dikirrîn, bi deyn didan û dîsa rêya xwe berdewam dikir. Carekê em li giravekê rast hatin, ku mîna bihuştekê bû. Dar û şîndar û fêkîyên wê, av û kanî û rûbarên wê, çûk û teyrik û ajalên wê cur bi cur û bê hed û hîsab bûn. Lê ne şênî lê hebûn ne jî agir. Em giş lê peya bûn û di nava mestdarîyekê de me li wan dîmenên xwezayê temaşe kir û bêhna gul û çîçekan kişand nava xwe.

Demek bi şûn de ez ji gerê hebekî westîyam, min dev ji hevalên xwe berda û ez li ser devê kanîyeke avê rûniştim, min tûrikê zadê xwe danî ber xwe û xwarin û vexwarina xwe jê derxist û hewl da, ku ez xurînîya xwe bişkînim. Kanîyeke ku derdora wê giş dar û ber bûn û li şaxan wîtewîta çûkan bû. Di pey xwarinê re min hebekî pal da û guh da ser wan awazên çûkan û xurexura ava herikî, li ber sira bê. Laşê min girnijî, ez xilmaş bûm û bê hemdê xwe ez di xew re çûm. Li ber wî bayê xweş û wan bêhnên ku laşê min movik bi movik dagir dikirin, ez ketim xeweke kûr û pir dereng ez bi ser xwe ve hatim, şiyar bûm. Min li dora xwe nêrî, min dît, ku ez bi tikî tenê mame li ser wê giravê. Keştîya me çûbû û ez hatibûm jibîrkirin; ne qeptan

li min pirsîbû ne jî rêwî haydar bûbûn ji nebedîbûna min. Bi lez û bez ez li çep û rastê xwe gerîyam lê bê fêde bû, tu kes, tu evdê benderuh li wê giravê tune bûn. Ser dilê min tehl bû, giranîya westinandinekê girt ser laşê min, wê kêlîkê ez di bin êşa wan kul û xemên ku ez rapêçabûm de herifîm. Poşmanî û xemgînî di nava min de tîr bûbû û hilm li min çikandibû. Êdî ez nema dikaribûm li cihekî rûnêm jî. Tenêtîyê tirseke mezin xistibû dilê min û bêhêvîtîyeke mezin bi min re çêkiribû.

Piştî çûnûhatineke bêwate; ez hilkişîyam ser dareke pir bilind û min derdora xwe raçav kir. Tiştekî cuda xuya nedikir, ji xeynî azmanekî şîn, şîndar û çûkên cur bi cur û girav û qûmên spîçolkî. Piştî raçavkirineke dûdirêj, qubeke spî ya ku ji dûr ve xuya dikir, bala min kişand. Pir mezin û mîna ecêbekê bilind xuya dikir. Ez ji ser darê daketim û min berê xwe da wê, ez meşîyam, hetanî ku ez gihîştm balê. Min temaşe kir, ku qubeyeke spî, girover û pir bilind e. Lê tu derî û şibake tê de xuya nedikirin. Ez li dora wî zivirîm, min bala xwe dayê, ku kuneke bi qasî serê derziyê jî tê de tune ye. Ji ber ku pir şayik bû, ez nikaribûm pê ve jî helkişim. Ez li dorê zivirîm, min dirêjahîya giroverka wê pîva, bi qasî pêncî gavî derket. Ez li çareyekê digerîyam, ku ez derbasî hundirê wê bibim û wê şevê xwe tê de bistirînim. Lewre roj li ber ava bû. Lê hîna ku ez wisa difikirîm, min bala xwe dayê ku ji nişkê ve şewqa rokê ji ser min hat girtin û sî ket ser erdê gişî! Min got qey ewrekî pêşîya tîrêjên rojê girt lê dinya havîn bû. Gava min bi mereq serê xwe rakir û li alîyê rokê nêrî, min dît, ku teyrekî erjeng û ecêbxulqet, herdu baskên xwe yên mezin vekirine û ketiye pêşîya rokê, tav li ser giravê gişî girtîye! Tiştekî pir ecêb bû, ku nediket xewna mirov. Dev û çavên min ji hev man, li hemberî dîmena wî teyrê ecêbxulqet…

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 567'AN

*Şehrezadê got:*

Sendîbadê Deryayî vegotina rêwîtîya xwe ya duduyan berdewam kir û got: Wê gavê çîrokeke ku rêwî û geştyaran ji min re gotibû, hat bîra min. Wan digotin, ku li hinek giravan teyrekî pir pir mezin heye, jê re dibêjin, "rex". Ew teyr fîlan ji çêlîkên xwe re dibe û wan pê mezin dike. Wê çaxê ez nû têgihîştim, ku qubeya spî ya ez li ber sekinîme hêka rexê bi xwe ye. Ez behetî mam, li hemberî wan afirandinên Xwedê!

Hîna ku ez di nava wê şaşwazîyê de bûm, min bala xwe dayê, ku ew teyr daket û li ser wê qubeyê mexel hat, ew kir himbêza xwe û herdu baskên xwe lê anîn hev, herdu nigên xwe jî bi paş de dan ser erdê û li ser raket. Wê kêlîkê, hema di cî de min kofîya xwe vekir, li ser dirêjahîyê ew li hev pêça, kir mîna werîsekî û ew baş li newqa xwe girêda. Piştre ez çûm ber nigên teyr û min herdu guhkên kofîya xwe li nigên wî girêdan û asê kir, bêyî ku ez wî bi xwe bihesînim. Di dilê xwe de jî min got: Belkî ev teyr min bigihîne devereke abad, an jî bajarekî. Çûna bi vî teyrî re çêtir e ji mana li vê giravê.

Wê şevê xew bi çavên min neket, ji tirsa ku ew bifire û ez di xew de bim. Çawa ku şeveqê lêda û tîrêjên rojê dinya ronî kirin, teyrê rex ji ser hêka xwe rabû, qîreke mezin da, ku erd pê re hejîya û bi hewa ket, firîya, bilind bû û hey bilind bû, hetanî ku gihîşt azmanê heftan. Piştre berjêr ve daket û li ser cihekî pir bilind danî. Çawa ku nigên wî gihîştin erdê, bi lez û bez min xwe ji nigên wî vekir, berîya ku bi min bihese û di bin tilîyeke xwe de min biperçiqîne. Gava min kofîya xwe ji nigê wî vekir, ez bi lez jê dûr ketim û hebekî berjêr daketim. Piştre min bala xwe dayê, ku teyr jî tiştek ji ser rûyê erdê xist nava lapûşkên xwe û dîsa firîya, bi hewa ket, bilind bû û ber bi deryayê ve çû. Ez lê behetî mam. Lê min meşa xwe berdewam kir û derdora xwe raçav kir, min bala xwe dayê, ku ez li cihekî bilind im, ku lûtkeya wî nayê xuyakirin û tu kes jî nikare hilkişe serê wî. Di binya min re jî newaleke pir kûr xuya dikir. Min lome li xwe kirin û min ji xwe re got: Xwezîka ez li wê giravê bimama, dê ji min re çêtir bûya, ji vê dera ripî rût û zuha. Bi kêmanî li wê derê fêkîyekî ku ez bixwim û aveke ku ez vexwim hebû. Min e çi bikira, çawa bikira li vî cihê ku ne darek lê hebû, ne jî fêkî û avek! La hewle wela quwete îla bîlah, gelo her ku ez ji musîbetekê xelas bibim, dê yeke din were serê min!

Min hebekî nav di xwe da û ez rabûm ser xwe meşîyam, hebekî bi wê newalê de çûm. Min bala xwe dayê, ku kevîrên wê jî elmasê ku maden û cewheran, sênî û darqurman pê kun dikin e. Kevirekî ew qasî hişk û sert e, ku ne hesin û ne jî tu kevir jê dixwin. Ji ber wê jî tu kesî nikaribû tiştekî jê bibirre jî. Tenê bi kevirê risasî dihat şikandin. Vêca ew newal tijî mar bûn, ku her yek ji wan mîna dareke xurmeyan bû. Ew qasî gir û mezin bûn, fîlek bi ser yekê ji wan de biçûya, ew dadiqurtand. Taybetîya wan jî ew bû, ku bişev derdiketin û bi roj xwe vedişartin, ji ber tirsa teyra rex, ku dihat ew direvandin. Min kir nekir, min sebeba wê yekê jî fêm nekir. Min careke din lome li xwe kirin, ez poşman bûm li ser hatina xwe ya wê derê û min di dilê xwe de ji xwe re got: "Xuya ye, ku tu li mirina xwe digerî!"

Êvar hat, şev ket erdê, ez jî bi tirs li cihekî gerîyam, ku ez bikaribim xwe lê bistirînim, hetanî sibehê. Ji ber tirsa wan maran, min tîbûn û birçîbûna xwe ji bîr kiribû û derdê min ê sereke, mabû xweparastina ji maran. Piştî lêgerîneke dûdirêj ez li şikeftekê rast hatim, ku devê wê teng bû. Ez ketim hundirê wê û kevirekî ku li wir bû jî, min ew da ber derîyê wê, girt û min ji xwe re got: "Êdî ciyê min ewle bû û ez bi aramî dikarim hetanî sibehê rakevim. Gava bû sibe jî Xwedê mezin e…

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 568'AN

*Şehrezadê got:*

Sendîbad vegotina rêwîtîya xwe berdewam kir û got: Piştre min li derdora xwe nêrî û min dît, ku mareke pir mezin di ber devê şikeftê de li ser hêkên xwe razayî ye. Mûyên laşê min rabûn, tirs û saweke bêsînor ket nava min, ziravê min qetîya. Min di dilê xwe de got, êdî mirina min hat, min tewkelîya xwe bi Xwedê anî û xwe spart qederê. Ne xew bi çavên min ket ne jî hedana min hat, mîna ku ez li ser strîyan bim, ez çarçav û çarguh mam hetanî sibehê. Gava ku tîrêjên şewqa rojê di qiraxên derî re dan hundir, min kevir ji ber derîyê şikeftê da alî û ez bi lez derketim derve. Ji bêxewîyê ez mîna serxweşan bûm, serê min dilewlihî vî alî wî alî. Tirs û birçîbûn û tîbûn û germahîya havinê li ser bêxewîyê zêde bûbû, qidûm bi min re nemabûn.

Hîna ku ez di nava wê perîşanîyê de bûm, min dît ku perçeyek goşt li ber min ket! Kesek jî li dora min tune bû. Ez behetî mam li vê bûyêrê lê piştî hizirîneke kurt, çîrokeke kevn hat bîra min, ku rêwî û geştyarên kevn pir behsa wê kiribûn. Wan geştyaran digotin, ku di zemanên berê de ji ber ku tu kes nikaribû bihata vî çîyayê elmasan, tacirên wê serdemê rêbazên hîlekarîyê pêk dianîn, ji bo ku xwe bigihînin elmasan: Pez û dewar serjêdikirin, diguran, goştê wan ji hev dixistin; dikirin perçe perçe û ji serê çiyê berjêr davêtin, hîna ku terr e, da ku bigindirin û kevirkên elmasê pê ve bizeliqin. Gava ku hetanî nîvro li ber rokê dimîne jî, goşt hişk dibe û kevirkê elmasê di nava xwe de digire. Nîvrokî jî teyrên rex û yên dîtir dihatin, ew perçeyên goşt bi lapûşkên xwe digirtin û hildidan, dibirin serê çiyê. Li wê derê tacir bi wan ve diçûn, ew difirandin û kevirên bi wan goştan ve zeliqî, ji xwe re dibirin û goşt ji teyran re dihiştin. Li gorî ku digotin, tu kesî nikaribû xwe bigihanda kevirên elmas, heger ne bi vê rêbazê bûya.

Îcar gava çavên min li perçeyê goşt ket, ew çîrok hat bîra min. Loma çawa ku min ew dît, min rahişt goşt û kevirên ku pê ve zeliqî bûn, jê girtin û ew xistin bêrîka xwe. Piştre ez li wir gerîyam û min gelek kevirên elmasî yên din jî rakirin, min ew xistin berîk û bernavteng û navkofîya xwe û min li ser piştê palda, ew perçeyê goşt jî danî ser singa xwe û xwe pê ve girêda. Demek bi şûn de, teyrekî ecêb daket ser min û lapûşkên xwe avêt wî goştî û bi hewa ket, bilind bû, ez jî pê ve girêdayî. Piştre teyr çû ser serê wî çiyayî û daket erdê, hewl da ku goştê xwe bixwe. Lê ji nîşkê ve teqereqek ji pişt wî hat, hişt ku teyr bicefile. Teyr tirsîya û firîya, min jî bi lez xwe ji wî goştî vekir û xwe da alîyekî. Kincên min hemû lewitîbûn, ez di nav xwîna wê beratê de mabûm. Di wê navberê de tacirê ku ew teqereq derxistibû û teyr dabû firandin jî derket holê û ber bi wî perçeyê goşt ve hat. Gava ez li nêzî wir dîtim, tirsîya û hinekî lerizî. Lê bi min re nepeyivî û çû cem wî goştî, ew li hev qulipand, lê tiştek pê ve nedît. Bi dengekî bilind qîrîya û got: Wax û hey wax ji vî bextê min ! Neûzû bîlah û la hewle!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû*

## ŞEVA 569'AN

*Şehrezadê got:*

Sendîbadê Deryayî vegotina rêwîtîya xwe ya duduyan berdewam kir û got: Zilam bi dilekî şikestî poşmanîya xwe dianî ziman û digot: Ev çi hal e, malik li min xerabû!? Gava ez ber bi wî ve çûm, li min zivirî û ji min re got: Tu kî yî û tu hatiyî vir çi? Min lê vegerand û got: Metirse û aram be, ez însan im û ez mirovekî baş im. Ez jî tacir bûm û serpêhatîyeke min î ecêb heye. Ez ê agahîyên xweş bidime te û tê fêdê ji min bibînî, lewre gelek kevirên elmas bi min re hene û ez ê têra te bidim te. Kevirekî bi tenê ji van elmasên bi min re, ji hemû sermayeya te giranbuhatir e. Loma ez dibêjim bila dilê te rihet be û metirse.

Gava zilam ew gotin ji min bihîstin, rûyê wî vebû, spasîya min kir, dua ji min re kirin û bi min re ket sohbetê. Di wê navberê de dengê me çû hevalên wî û ew jî li ser dengê me hatin wir û li min vehewiyan. Wan jî goştê xwe avêtibûn û li pey wî hatibûn wê derê. Hemûçikan destxweşîya min kir li ser saxî û selametîya min û kêfxweşîya xwe anîn ziman, ez jî bi xwe re birim. Min jî rêwîtî û serpêhatîyên xwe ji wan re gotin, zor û zehmetîyên ku min ew bi rê de kişandibûn ji wan re anî ziman.

Piştre min hinek elmas dan wî zilamê ku min xwe bi goştê wî girtibû, wî jî careke dim spasîya min kir û kêfxweşîya xwe anî ziman, ji min re got: Bi navê Xwedê tu ji nû ve hatiyî dinyayê, lewre tu kes berîya te negihîştiye vê derê û xwe xelas nekiriye. Lê Xwedê tu xelas kirî û şikir ji wî re.

Piştre li cihekî baş sekinîn, em tev de li wir raketin, di nava aramî û kêfxweşîyeke bêtimtêl de. Ez gelekî dilxweş û dilşa bûbûm, ku bi saxî û selametî ez ji newala maran rizgar bûbûm û ez gihîştibûm warekî abad.

Roja dîtir, em rabûn ser xwe û dîsa meşîyan û hey meşîyan, hetanî ku em gihîştin giraveke pir mezin, ku pir xweş bû û darên kafûrê tê de hebûn. Li ber sîya her darekê ji wan, mirovekî dikaribû xwe pal bida. Yê ku bixwesta kafûrê ji wan daran bi dest bixe jî, dikaribû qurmê darê ji jor ve bi dirêşkê kun bike û ava ku jê were bigire û bike mûm. Ew jî hinguvê wan daran tê hesêb. Lê piştî ku ava wê tê girtin, dar bi temamî hişk dibe, dibe êzing.

Li wê giravê dewarekî balkêş jî hebû, jê re digotin gergedan û xelkên wê deverê ew mîna çêlek û gamêşan xwedî dikirin. Lê gewdeyê wan ji yê deveyan jî girtir bû. Gîha dixwe û di nîvê serê wî de qiloçekî wî yê bi tenê heye, ku bi qasî deh gazan dirêj e. Sûretê wî jî dişibe sûretê însanan.

Cureyekî çêlekan jî li wê giravê hebû. Lê dewarê herî girîng gergeden bû. Deryavan, rêwî û geştyarên çiyayan digotin, ku gergedan fîlekî mezin radike ser qiloçê xwe, bêyî ku xema wî be jî. Pê re diçêre û digere, bêyî ku tê derxîne. Gava fîl li ser qiloçê wî dimire, ji ber germê dohnê wî dihele û bi ser serê wî de tê xwarê, dikeve çavên wî û gergedan kor dike. Ew jî bi wê korîtîya xwe, li qiraxa peravê rûdinê, teyrên rex jî tên, lapûşkên xwe davêjinê û wî dibin ji zarokên xwe re. Ya rast min gelek cureyên dewaran ên mîna gamêşan dîtin, ku li cem me nayên naskirin.

Li wê giravê, min hinek ji wan elmasên xwe bi dînar û derheman firotin û min gelek tiştên ticaretê ji wir kirrîn. Piştre min rêwîtîya xwe bi wan taciran re berdewam kir û em ji welatekî derbasî welatekî din bûn, ji bajarekî derbasî bajarekî din bûn û me kirrîn û firotina xwe jî hey berdewam kir, hetanî ku em gihîştin bajarê Besrayê. Em çend rojekî li wir man, piştre em vegerîyan Bexdayê.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 570'YÎ

*Şehrezadê got:*

Sendîbadê Deryayî vegotina xwe berdewam kir û got: Em derbasî Bexdayê bûn û ez hatim mala xwe. Li gel ew qas kevirên elmas û ew qas malên ticaretê û diravin bêsînor. malbat û dost û nasên min hemû li min vehewiyan, bi kêfxweşî xêrhatina min kirin, bi min şa bûn. Min jî dîyarî û xelat li ser gişan belav kirin. Careke din ez ketim nav xêr û xweşîyê û jîyaneke çêjdar û bextewar. Min xwar û vexwar, li kêfa xwe nêrî û êş û azarên berê ji bîr kirin. Sibê jî bi xêr û selamet, ez ê behsa çîroka rêwîtîya xwe ya sisiyan ji we re bikim.

Sendîbadê Barkêş jî tê de, hemû kesên di civata wî de, li vê serpêhatîya Sendîbadê Deryayî ecêbmayî man. Di pey re hemûçkan şîva xwe xwarin, şeraba xwe vexwarin û li kêfa xwe meyzandin. Sendîbadê Deryayî sed misqal zêr, weke bexşîş da Sendîbadê Barkêş. Wî jî rahişt bexşîşa xwe û rabû ser xwe, çû mala xwe, di nava matmayîneke ecêb a li hemberî vê serpêhatîya hanê de, piştî ku gelek dua jê re kirin û destxweşîya wî kir, ku ji wan talûkeyan xelas bûye.

Roja dîtirkê, çawa ku roj derket û dinya ronî bû, Sendîbadê Barkêş dîsa rabû ser xwe û çawa ku jê hatibû xwestin, dîsa berê xwe da dîwana Sendîbadê Deryayî. Derbasî cem wî bû, silavek da wî û civata wî û li rex wî rûnişt. Sendîbadê Deryayî jî xêrhatina wî bi germahî kir û pê re mijûl bû. Gava civata wî temam bû, taştê da ber wan, hemûçkan bi hev re xwar û vexwar, kêf û şahîya xwe kirin û di dawîyê de Sendîbadê Deryayî got: Birano, dostino, hogirino! Çîroka serpêhatîya rêwîtîya min a sisiyan ew qasî erjeng û ecêb e, ku di seranserê dîrokê de, tiştekî wisa nehatiye dîtin. vêca weke ku duh jî min da xuyakirin; piştî ku ez ji rêwîtîya duduyan vegerîyam û bi saxî û selametî ez gihîştm malê, li gel wî malî û wan diravan min jîyaneke pir xweş û bextewar da avakirin. Lê piştî demekê, dîsa ez aciz bûm û min bêrîya seyaran û geştê kir. Gera herî baş jî ticaret û bazirgantî bû.

Rojekê ez rabûm, min nîvê diravên xwe dan bi caw û kulav û merş û alavên ticaretê, min barek ji xwe re amade kir û li gel çend hevalên xwe ez li keştîyeke mezin siwar bûm û me dest bi rêwîtîyeke dûdirêj kir. Em bi şev û roj meşîyan, ji deryayekê ber bi deryayeke din ve, ji giravekê ber bi giraveke din ve, ji bajarekî ber bi bajarekî din ve çûn. Em biçûna ku derê, li kîjan benderê bisekinîyana me malê xwe difirot, malekî nû ji xwe re dikirî, ser bi ser dida, an jî pev diguhert.

Carekê li nêzikî giravekê bayê şerqî li me rabû, pêlên ava deryayê bûn mîna çiyan û bi ser me de hatin. Qeptanê me, bi lez û bez keştî ber bi giravê de ajot û bextê me vekirî derket, bi saxî û selametî me xwe gihand perava

ku çend keştîyên din jî li wir bûn. Lê çawa ku em gihîştin wir û hîna ku em ji keştîyê peya nebûbûn, me dît, ku qefleyek rêbirên deryayî li ser serê me kom bûne. Tirseke ecêb ket nava me, lewre me baş dizanibû, bê karê rêbiran çi ye; mîna her carê dê em giş bikuştina û malên me ji xwe re bibirina. Lê ew rêbir baş derketin, tenê em şêlandin û bi saxî em li wê giravê berdan û çûn. Me her tiştê xwe wenda kiribû lê dîsa jî em bextewar bûn, ku canê me ji nav lepên wan qorsanan filitîbû.

Em ji xwe re li wê giravê digerîyan, gava em birçî dibûn, me fêkî û şokil û gîhayên wê dixwarin; gava em tî dibûn jî, me ji kanîyên wê vedixwar. Piştî demekê em li avahîyekê rast hatin, ku di nîvê giravê de bû. Me xwe lê girt, em çûn balê, me dît, ku qesreke mezin e û sûreke bilind li dora wê ye. Derîyekî wê yê dualî û mezin hebû, vekirî bû. Em di derî re derbas bûn, me dît hewşeke mezin û li çarmedora qesrê gelek derî hene. Di zikê wê de jî dikeke bilind hebû, ku gelek beroşên mezin û niqrî pê ve daleqandî bûn û li derdora wê hestîyên belawela. Lê tu kesî jî li wir xuya nedikir. Em li wê dîmenê pir behetî man lê dîsa jî em di hewşa qesrê de rûniştin, ji ber ku em pir westîyabûn, di cî de em di xew re çûn.

Ber êvarekî bi lerza erda bin me re, em ji xew rabûn û bi ser xwe ve hatin. Pê re jî dengekî bilind û balkêş ji ezmanan hat, em kerr kirin. Di heman kêlîyê de jî ji jora qesrê mirovekî wekî dêwekî bi ser me de hat, sîfetheywan bû, yekî reş û bi qasî dareke xurmeyan dirêj bû. Herdu çavên wî mîna du kozên agir bûn. Lêvên wî pir mezin û mîna yên deveyan bi ser singa wî de xilîyabûn. Neynûkên wî mîna lapûşkên şêran bûn û singa wî mîna çiyayekî bênav bû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê ji gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 571'Ê

*Şehrezadê got:*

Sendîbadê Deryayî vegotina serpêhatîya rêwîtîya xwe ya sêyemîn berdewam kir û got: Çawa em çav li wî dêwî ketin, ji tirsanan hişê me ji serê me çû! Em bûbûn mîna qurmê daran û zimanê me hatibû birrîn.

Çawa ku ji qesrê daket xwarê, çû li ser dikê rûnişt. Piştre hat cem me û ji nav gişan bi destê min girt. Ez ji erdê hildam, mîna ku qirşikekî hilde. Tilîyên xwe li laşê min pelandin, mîna qesabekî ku goştê dermaleyekê bikê-

le, giranîya min kêla. Lê wisa xuya kir, ku laşê min ê ku ji ber kul û derdan lawaz bûbû, pir bêgoşt dît, ez berdam û ji hevalên min destê xwe avêt yekî din. Destê xwe di ser laşê wî re jî bir û anî, ew jî hejar dît, ew berda û rahişt yekî din. Lê ew jî ne ecibandin, rahişt yekî din û wisa pê de çû, hetanî ku gihîşt qeptanê me yê pir qelew. Gava dît, ku nav milên wî pehn e û goştê wî pir e, ew eciband. Bi herdu destan ew avêt erdê, serzik dirêj kir, nigên wî li ser stûyê wî girêdan û şîşek dirêj anî, di devê wî re kir, di qûna wî re derxist. Piştre agirek dada û şîşa ku qeptanê me tê re derbas kiribû, da ser agir, ew bi cih kir û şîş zivirand, hetanî ku ew baş birajt. Piştre ji ser agir rakir, danî ber xwe û mîna ku mirîşkekê ji hev bixe, ew giş ji hev xist û bi neynûkên xwe goştê wî perçe perçe kir, xwar û hestîyên mayî jî avêtin kêleka xwe.

Piştî ku têr xwar, li ser dikê xwe avet erdê, palda û di xew re çû. Xirexira wî mîna ajaleke ku were serjêkirin bû. Raketî ma hetanî şeveqê û bi sibehê re rabû ser xwe, bi rêya xwe de çû.

Gava me bawer kir, ku ew dûrî me ketiye, em li hev vehewîyan, me gilî û gazinên xwe bi hev kirin û em li ser giyanê xwe yê di talûkeyê de girîyan. Me ji hev re got: Xwezîka em di deryayê de bifetisîyana an meymûnan em bixwarina, çêtir bû ji şewata di nav agir de! Mirina herî pîs ev e lê Xwedê çawa dixwaze û qedera me çi be, dê wisa bibe. Tu çare û xelasî bêyî Xwedê nabe! Em ê giş di şîşê re werin derbaskirin û pijandin û tu kes jî bi me nahese! Xelasîya me nîn e ji vê derê!

Piştre em rabûn ser xwe, ji wir derketin û em çûn li her derê giravê gerîyan, da em cihekî xweveşartinê tê de bibînin lê me nedît û zû li me bû êvar. Ji mecbûrî, em dîsa vegerîyan qesrê, lewre em pir tirsîyabûm. Piştî ku em rûniştin bi demeke kurt, me dît ku qîrîneke ecêb hat û erda bin me hejîya. Pê re jî ew dêwê reş bi ser me de hat û dîsa mîna roja borî yeko yeko em kêlandin, li goştê me nêrî û kesê ku ew eciband, ew li ber xwe danî, xwar û çû li ser dikê palda, raket.

Bi şev pê de kir xirexir û razayî ma, hetanî sibehê û gava bû sibe jî, dîsa rabû bi rêya xwe de çû. Em jî dîsa li hev kom bûn, bi hev şêwirîn û me ji hev re got: Em xwe bavêjin behrê, çêtir e ji me re, ku em bi vî awayê hovane werin biraştin.

Di wê navberê de yekî got: Heger hûn ê bi ya min bikin, werin em bi xap û rîpan wî bikûjin û em xwe jê xelas bikin. Min jî got: Birano, heger em mecbûr bin wî bikujin, ka destpêkê em ji van depan kelekekê çêkin û

di qiraxa avê de amadekirî bihêlin, piştre jî em bi hîlebazî wî bikujin û di cî de herin li keleka xwe siwar bibin, herin. Heger em nikaribin wî bikujin jî, em dikarin li keleka xwe siwar bibin û herin, ji pijandina li ser agir çêtir e. Jixwe ku em bi avê de herin jî, em ê şehîd bibin û çêtir e ji vê rewşa kambax!

Hemûçkan bi hev re gotin: Fikra herî rast ev e. Me li ser wê fikrê li hev kir û di cî de me dest bi amadekarîyên xwe kir. Me dep û textên wir hemû derxistin, birin ber qiraxa deryayê û me ew li hev xistin, kelekek çêkir û li wir girêda. Me hinek xwarin û av jî xistê û em vegerîyan qesrê.

Çawa ku êvar hat, gumîn bi erdê ket, hejîya û ew zilamê reş ê mîna hûtekî hat. Dîsa em yeko yeko di ber çavan re derbas kirin û yek ji me neqand, ew di şîşa xwe re derbas kir û ew avêt ser agir, pijand û xwar.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEV 572'YAN

*Şehrezadê got:*

Sendîbadê Deryayî vegotina serpêhatîya rêwîtîya xwe ya sisyan berdewam kir û got: Dêwê reş piştî ku têr xwar, dîsa mîna her car li ser dikê palda, raket û dest bi xirexirê kir, ket xeweke kûr. Em jî rabûn me du şîşên hesinî li ser agir sor kirin û me rahişt wan, bir di herdu çavên wî re kirin û me xwe da ser wan bi hemû hêza xwe. Herdu çavên wî peqiyan û qîrîneke ecêb pê ket, ku em giş ji tirsa wî lerizîn. Dêwê reş rabû ser xwe, li me gerîya, çep û rast çû û hat, hewl da ku xwe bigihîne me, lê çavên wî rijîyabûn û kor bû, dîsa jî em ditirsîyan, ku xwe bigihîne me. Lê belê demek bi şûn de, di derî re derket û bi qîr û hewar ji me dûr ket. Demekê bi şûn de jî dîsa bi şûn de hat û jineke mîna wî gir û ecêb jî pê re bû. Dirûvê wê ji yê wî jî dirindetir bû. Çawa ku em çav li herduyan ketin, tirseke mezin girt ser me û em ziravqetî bûn. Bi lez em rabûn ser xwe, me xwe gihand qiraxa avê û xwe avêt ser keleka xwe û em bi deryayê de çûn. Ew herdu jî li pey me hatin û kevirin pir mezin avêtin me, mîna ku tepiskan bavêjin. Piranîya me bi wan keviran hatin kuştin, tenê ez û du hevalên xwe em ji mirinê rizgar bûn û me keleka xwe ajot hetanî ku em gihîştin giraveke din.

Me xwe da peravê, keleka xwe bi tehtekê ve girêda û em her sê daketin ser bejahîya wê giravê û li ser gerîyan, hetanî ku şev hat. Em ji xwe re hinekî raketin lê bi fizînîya marekî pir mezin em ji xew rabûn û dîna ku me dît,

mar hevalekî me daqurtandibû hetanî bi qirikê. Çend kêlîyan bi şûn de, beşa bedena wî ya mayî jî daqurtand û qirçeqirça hestîyên parsûyên wî jî di zikê mar de hat me. Piştre, giran giran berjêr daket û ji me dûr ket. Em li ser hevalê xwe pir xemgîn bûn û ji alîyekî din ve jî em şaş û behetî man, li mezinahîya wî marî. Tirseke mezin ket nava me û me herduyan ji hev re got: Qaşo em pir kêfxweş bûbûn, ku me xwe ji wî dêwê reş xelas kir lê ev bobelata hanê ji wê birajtinê jî xerabtir e. Dilxweşîya me jî di qirika me de ma. Ev çi ecêb in û ev çi hal e? Tu hêz û xelasî bêyî Xwedê nabe lê em ê çawa xwe ji vê bobelatê xelas bikin gelo?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 573'YAN

*Şehrezadê got:*

Sendîbadê Deryayî vegotina bûyerên rêwîtîya xwe ya sisiyan berdewam kir û got: Em ji xwe re li wê giravê gerîyan, me ji fêkiyên wê xwar, ji ava wê vexwar û gava bû êvar jî, me xwe da bin dareke mezin, em rûniştin, me bêhna xwe veda. Gava tarî kete erdê jî, em hilkişîyan ser darê û li wir raketin. Lê tirsê xewa me direvand.

Derengî şevê ew zîhayê weke ecêbekê dîsa xuya kir, li wan deran çû û hat, piştre berê xwe da dara ku em li ser bûn û hat hevalê min daqurtand. Destpêkê ew hetanî milan daqurtand, piştre ew hemû dabeliand û xwe li darê gerand, qirçeqirça parsûyên wî di zikê wê de hate min. Piştre xwe ji ser darê berjêr berda, li ber çavên min ên behetîmayî.

Gava roj hilat û dinya ronî bû, bi zor û heft beleyan ez ji ser darê daketim xwarê; lewre tu ferqa min ji mirîyekî nemabû û ez pir xemgin û bêhal bûbûm, çogên min şikestibûn ji ber tirsa zêde. Min dixwest, ku ez xwe bavêjim behrê û ji wî halî rizgar bibim. Lê destê min li giyanê min nedigerîya, lewre giyanê mirov pir şêrîn e bi mirov.

Bi demdirêjî ez li ser çareyekê fikirîm, piştre ez rabûm, min gelek textên mezin berhev kirin û yek ji wan bi pehnahî bi herdu nigên xwe ve girêda, yeke din bi heman şêweyî bi kêleka xwe ya çepê ve, yek bi kêleka rastê ve, yek bi ser zikê xwe ve, yek li ser dirêjahîya pişta xwe, yeke din ji bo pehnahî bi serê xwe ve û herduyên mayî jî bi milên xwe ve girêdan, asê kirin. Bi wî hawayî jî ez li erdê dirêjkirî mam.

Gava ku şev hat û tarî ket erdê, zîha hat, fişînî pê ket, mîna her carê berê xwe da min, bi ser min de hat. Hewl da ku min dabelihîne lê nikaribû. Ji tirsa ez ziravqetîyayî bûbûm, qidûmên min nema dişixulîn. Lewre zîha mîna ecêbekê bû, devê xwe mîna kewarekê vekiribû û li dora min diçû û dihat. Geh nêz dibû, geh dûr diket û her car jî hewl dida, ku min dabelihîne. Lê her car textên bi min ve girêdayî ber wê digirtin û rê nedidanê ku xwe bigihîne min. Hetanî ku şeveqa rojê lêda jî, wê hewldanên xwe berdewam kirin, lê bi ser neket û gava dinya ronî bû, bi şûn de kişîya, di nava hêrseke mezin de çû.

Min xwe ji textikan vekir, ez rabûm ser xwe lê hîna jî ez di hukmê mirîyan de bûm, ez bi ser xwe ve nehatibûm. Dîsa jî min hêza xwe komî ser hev kir û ez li giravê gerîyam, bi hêvîya ku ez rêyeke xelasîyê ji xwe re bibînim. Ez heta bi dawiya giravê çûm. Carekê min bala xwe dayê, ku keştîyek di deryayê de xuya dike. Kelecaneke bêtimtêl ez girtim û bi lez min rahişt şaxekî daran, ew hilda jor û ber bi wan ve li ba kir, pê re jî ez gîrîyam û min hewl da, ku dengê xwe bigihînim wan. Gava ku dengê qîrekê ji cem wan jî hat, min tê derxist, ku wan ez dîtimê, ango bi kêmanî dengê min kirine û bersivê didin min. Piştre gava keştîyê bergeha xwe guhert û ber bi min ve hat, guman bi min re neman, ku wan ez dîtime. Hatin qiraxa avê, bi min ve hatin û ez rakirim, bi xwe re birim.

Li rewşa min, li hal û wextê min pirsîn; min çîroka xwe bi hûrgulî jî wan re vegot û ew ji serpêhatîya xwe agahdar kirin. Li wê çîroka min û ew qasî êşên ku min kişandibûn Şaşwaz û behetî man. Kinc li min kirin, laşê min sitirandin û xwarin dan min, heta ku min têr xwar û ez dîsa bi ser xwe ve hatim û xwîn di rehên min de gerîya. Mîna mirîyekî ku ji nû ve ruh pê ve were, ez careke din hatim dinyayê. Min spasîya wan û Xwedayê xwe kir, ku ez ji wê kabûsa kujêr rizgar bûbûm.

Ba xweş dihat û keştîya me xweş bi rê ve diçû. Me rêya xwe di deryayê de berdewam kir, hetanî ku em gihîştin giravekê, ku jê re digotin Girava Selahîte. Li wir, qeptanê me keştîya xwe bir ber peravê û sekinand.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVS 574'AN

*Şehrezadê got:*

Sendîbadê Deryayî vegotina rêwîtîya xwe berdewam kir û got: Em li Girava Selahîte sekinîn û ji keştîyê peya bûn. Taciran malên xwe derxistin

û her kesî ji xwe re kirrîn û firotin kir. Qeptan jî li min zivirî û ji min re got: Guh bide min û li min guhdar bike! Tu mirovekî hejar û belengaz î, te gelek êş û azar kişandin û bi erzanî tu ji mirineke pir pîs xelas bûyî. Ez dixwazim alîkarîya te bikim û te bigihînim welatê te, ji bo ku tu timî ji min re dua bikî!

Min lê vegerand û jê re got: Belê, ez jî wê dixwazim. Bêguman ez ê gelek duayan ji te re bikim. Wî got: Tacirek bi me re bû, di rê de wenda bû û malê wî yê ticaretê bi me re ma. Em nizanin bê çi bi serê wî de hat û me tu agahî jî jê negirt. Vêca dixwazim malê wî bi emanetî radestî te bikim, tu malê wî bibe û li vê derê bifiroşe, diravên ku jê werin jî li ba xwe bigire. Em ê heqê tehba te jî bidin te, qismê ku neyê firotin jî, wî bi xwe re werîne Bexdayê. Li wê derê, em ê li nas û malbata wî bipirsin, em ê malê mayî û heqê yê firotî bidin wan, bila xêra me be. Îcar ka te got çi? Tu dikarî malê wî teslîm bigirî û bibî wir bifiroşî? Min lê vegerand û got: Bila be, li ser serê min, li ser çavên min. Helbet dê xêra mezin a te be, mîrzayê min! Piştre min spadarîya xwe jî jê re anî ziman û jê re dua kirin. Wî jî ferman da barkêş û keştîkaran, çûn ew mal ji keştîyê derxistin, anîn. Defterdarê keştîyê ji qeptan re got: Mîrzayê min, em wî malê hanê li ser navê kîjan bazîrganî tomar bikin? Qeptan got: Li ser navê Sendîbadê Deryayî binîvisîne; ew ê ku bi me re bû, li giravê xeriqî, çû û me tu agahî jê negirt. Bila ev feqîre hanê malê wî bifiroşe, em ê jî heqê wî bidinê û tiştê mayî û diravên wî bi xwe re vegerînin Bexdayê heger me Sendîbad dît, em ê bidin wî û heger me nedît jî, em ê radestî malbata wî bikin. Defterdar got: Fikra herî baş û gotina herî rast ev bi xwe ye!

Gava min navê xwe ji devê qeptan bihîst, ez kelecanî bûm û min jê re got: Mîrzayê min, wele ew Sendîbadê ku tu behsa wî dikî, ez bi xwe me. Yê ku bi wan rêwîyên din re noqavî bû, ez bûm. Wê çaxê qorsanan em dîl girtibûn û em avêtibûn giravekê, malên me jî giş biribûn. Me digot qey, hemû av û av çûn, nexwe va ye we dîsa ew keştî dîtiye û eşyayên me tê de dîtine!

Min bi kelecanî digot, lê zilam guh jî li min nekir. Min hebekî bêhna xwe fire kir, ez mam li bendê, ku hemû bazirgan û rêwî ji keştîyê dakevin û malê xwe daxînin. Piştre ez dîsa çûm cem qeptan û min jê re got: Mîrzayê min, gelo tu dizanî bê dirûvên xwedîyê vî malê ku ez ê bifiroşim çawa bûn? Got: Ez tu tiştî derbarê wî de nizanim, tenê ez dizanim, ku ew bazirganekî ji Bexdayê bû û navê wî Sendîbadê Deryayî bû.

Bi dengekî bilind ez qîrîyam û min jê re got: Qeptanê hêja, mirovê qenc û dilpak! Sendîbadê Deryayî ez im û di rêwîtîya din de jî ez bi were bûm. Wê

çaxê jî we ez li giravekê ji bîr kiribûm û hûn çûbûn, ez jî di xew de mabûm. Ev malê hanê yê min e û hemû tacirên elmasê min nas dikin, lewre gişan ez li wî çiyayî dîtibûm. Hemû jî dê şehdebûnê bidin, ku ez Sendîbad im…

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 575'AN

*Şehrezadê got:*

Sendîbadê Deryayî vegotina serpêhatîya rêwîtîya xwe ya sisiyan berdewam kir û got: Gava ku hemû rêwî û tacir û bazirganan ew gotinên min bihîstin, hinekan ji wan ez piştrast kirim, hinekan jî ez derewandim. Di wê navberê de bazirganekî ji wan çawa bihîst, ku ez behsa newala elmasan dikim, hat gel min û li hevalên xwe zivirî, ji wan re got: Hevalino, hogirino! Tê bîra we gava min ji we re behsa rêwîtîya xwe ya herî erjeng û ecêb a ber bi newala elmasan ve kiribû û min jî weke her kesî goştê dermaleya xwe avêtibû wir û mîna her car ber bi jêr ve gindirandibû û min dîtibû, ku mirovek bi wî goştî ve girêdayî di nava lapûşkên teyrê rex de hatiye çiyê lê we ji min bawer nekiribû û we ez derewîn derxistibûm? Wan jî gotin: Belê, belê tê bîra me, ku te behsa tiştekî wilo kiribû û me ji te bawer nekiribû. Bazirgan axaftina xwe berdewam kir û got: Ew zilamê ku xwe bi goştê min ve girtibû, ev zilamê hanê bi xwe ye. Ewî wê çaxê gelek kevirên elmas ên giranbuha jî dabûn min. Min jî ew bi xwe re biribû hetanî Besrayê, ji wir jî me xatir ji hev xwestibû, ew çûbû Bexdayê û em jî çûbûn malên xwe. Va ye camêr xwe da nasandin û got, navê min Sendîbadê Deryayî ye û çîroka xwe û gemîya me ya wê çaxê jî ji me re rave kir, de êdî çima hûn jê bawer nakin? Ez di wê bawerîyê de me, ku lihevrasthatina me ya vira jî nîşaneyeke rasgotina min bû, ku Xweda dixwest nîşanî we bide, da hûn bizanibin, bê min çiqasî ji we re rast gotiye.

Gava qeptanê keştîyê gotinên wî bazirganî bihîstin, rabû ser xwe, hat raserî min û bi qasî saetekê bi dûdirêjî li min mêzand, piştre got: Nîşaneyên malê te yên ticaretê çi ne? Min lê vegerand û got: Nîşaneyên malê min ev in, ev in û tiştê ku li Besrayê di navbera min û wî de derbas bûbû, bi hûrgulî anî ziman.

Bi wê bersiva min re, ew jî li naskirina min ewle bû û dilê wî ket cî. Xwe çeng kir min, ez hembêz û maç kirim, destxweşîya min bi xelasîya min a ji wan talûkeyan û paşê got: Rewşa te balkêş e û çîroka serpêhatîya te jî ecêb

e lê dîsa jî spas ji Xwedê re ku tu bi xelasê xistî, careke din em gihandin hev û malê te yê wenda jî li te vegerand.

Min malê xwe da ber bazarê û bi buhayekî baş firot û ez pir pê kêfxweş bûm, ku careke din bi saxî û selametî ez ê bikaribim vegerim malê.

Me hem rêwîtîya xwe hem jî kirrîn û firotina xwe berdewam kir, hetanî ku em gihîştin welatên pişta deryayê. Me gelek derya, gelek girav dîtin û em li gelek tiştên ecêb û erjeng û balkêş jî rast hatin. Di nava wan tiştên balkêş de, masîyeke weke çêlekê hebû, ku di deryayê de em lê qelibîn û ajalekî din î mîna kerê. Teyrikek jî hebû, ku ji sedefên avê derdiket û li ser avê hêlîna xwe çêdikir, ji binî ve bi alîyê bejahîyê de nediçû.

Bayê li gora dilê me lêda û me jî meşa xwe di avê de bi hêsanî berdewam dikir. Di encamê de em dîsa vegerîyan Besrayê û bi saxî û selametî em ji keştîya xwe peya bûn. Em çend rojekî li Besrayê man, piştre me berê xwe da Bexdayê, ez hatim taxa xwe û çûm malê, nava dost û merivên xwe. Hemûyan bi dilekî germ ez pêşwazî kirim û bi vegera min û bi saxî û selametîya min pir kêfxweş bûn, ez jî pir kêfxweş û dilşa bûm, bi vegera welatê xwe, vegera nav dost û hogir û merivên xwe. Min xelat li wan belav kirin, dîyarî dan dost û merivan û gelek xêr û sedeqe li ser sêwî, astengdar, bî û extîyaran belav kirin.

Jîyana min dîsa di nava hebûneke mezin û maldar de têr û tijî berdewam kir, di nava dost û hogiran de, di nava xwarin û vexwarin û muzîk û kêf û şahîyeke pir xweş de.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 576'AN

*Şehrezadê got:*

Sendîbadê Deryayî vegotina serpêhatîya xwe berdewam kir û got: Di nava wê jîyana xweş û bextewar de, min ew zor û zehmetîyên ku kişandibûn, hemû ji bîr kirin. Lewra ji hêla diravî ve jî min ji wê rêwîtîyê qezenceke mezin girt. Sibê jî, ez ê serpêhatîya rêwîtîya xwe ya çaran ji we re bibêjim, ku ew ji her sê rêwîtîyên borî jî erjengtir û ecêbtir in.

Piştre ferman da xizmetkarên xwe, ku bexşîşekê bi qasî sed misqal zêr, bidin Sendîbadê Barkêş û sifreyê raxin, şîva êvarê jî ji mêvanan re bînin. Xwarin danîn, hemûçkan xwarin, vexwarin û piştre rabûn, çûn malên xwe.

Sendîbadê Barkêş jî xwarina xwe xwar, rahişt bexşîşa xwe û di nava behetî û mestmayîneke kûr de vegerîya mala xwe. Wê şevê li mala xwe raket û bi şeveqa sibehê re, dîsa rabû ser xwe, nimêja sibehê kir, amadekarîyên xwe kuta kirin û dîsa berê xwe da qesra Sendîbadê Deryayî. Çû, derbasî cem wî bû, bi rêzdarî silavek lê kir û li benda bersiva wî ma. Sendîbadê Deryayî jî bi germahî ew pêşwazî kir, silava wî girt û ew li cem xwe da rûniştandin. Pê re gûftûgo kir, heta ku civata mayî jî hat û dîwan gerîya. Weke her car dîsa taştê anîn û sifre li ber wan raxistin. Hemûçkan, xwarin, vexwarin, destên xwe şûştin û li kêfa xwe nêrîn. Piştre Sendîbadê Deryayî çavên xwe li ser wan gerand û çîroka serpêhatîya rêwîtîya xwe ya çaran ji wan re vegot û pê de çû:

Îcar çawa ku cara borî jî min ji we re behs kir; piştî ku ez ketim nava wê kêf û xweşî û bextewarîyê, min hemû êş û janên xwe yên berê ji bîr kirin. Lê piştî demekê ez ji wê jîyanê sar bûm û careke din daxwaza ger û bazirganîyê bi min re çêbû û hedana min nehat. Ez rabûm min gelek tişt kirrîn û barekî pir giran ji bo ticaretê amade kir, min gelek malên giranbuha kirrîn. Piştre min hemû malên xwe bar kirin û ez çûm Besrayê. Bi mezinên bazirganên Besrayê re ez hatim cem hev, me li ser rêhevaltîyê li hev kir, ji xwe re keştîyek mezin girt, barên xwe lê kirin û em bi rê ketin, ber bi deryayê ve. Ji giravekê ber bi giraveke din ve, ji deryayekê ber bi deryayeke din ve me rêwîtî û bazirganîya xwe baş derbas kir. Lê rojekê ji rojan, ba berê xwe guhert û rêveçûna me xist xetereyê. Qeptanê me ji bilindahîya pêlên avê tirsîya, keştî di nîvê deryayê de sekinand, da ku binav nebe. Me jî destên xwe ber bi asîmanan ve kirin û me ji xwe re dua kirin, ku tiştek bi me neyê. Lê demekê bi şûn de ba zivirî, bahoz û bablîsokeke ecêb ku di cî de babirkên keştîya me qetandin û textikên wê perçe perçe kirin, em jî hemû pê re binav bûn û mal û milkê me jî giş bi avê de çû. Min jî mîna gelek rêwî û bazirganên din, bi qasî nîv rojê avjenî kir. Lê piştre ez pir betilîm û min dev ji xwe berda. Lê Xwedê teala li min hat rehmê û depekî mezin ji depên keştîyê ji min re şand. Ez û çend hevalên xwe yên rêwî lê siwar bûn û me nigên xwe mîna bêrikan li avê dan û rêya xwe berdewam kir.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 577'AN

*Şehrezadê got:*

Sendîbadê Deryayî vegotina çîroka serpêhatîya rêwîtîya xwe ya çaran berdewam kir û got: Bi qasî roj û şevekê me wisa berdewam kir; em li ser pişta wî depî man û bi lêdana nigan me hewl da, ku em bi pêş de herin. Ba û pêlên avê jî alîkarîya me dikirin. Roja ditirkê ba rabû, pêlên deryayê bilind bûn, em li ber xwe birin û em avêtin giravekê. Ji ber birçîbûn û tîbûn û bêxewî û westînê, qidûm di me de nemabû, em ketibûn hukmê mirîyan.

Gava em piçekî bi ser xwe ve hatin, em rabûn ser xwe û hinekî li derdora giravê gerîyan, me dît, ku dar û berên wê, gîha û fêkiyên wê pir in. Me ji wan fêkiyan xwar, ji kanîyan av vexwar û wê şevê li peravê raketin. Bi sibehê re, em dîsa rabûn ser xwe û li çep û rastê xwe gerîyan, çavên me li avahîyekê ket, ji dûr ve xuya kir. Me jî berê xwe da wê avahîyê û em ber bi wê ve çûn. Em li ber derîyê wê rawestîyan, me xwe ragirt. Demek bi şûn de me dît, ku qefleyek kesên tazî jê derketin û bêyî ku bi me re biaxivin, em destgîr kirin û birin cem qralê xwe. Qral ji me xwest, ku em rûnên, em jî rûniştin. Xwarinek ji me re anîn, ku di heyata xwe de min ew nedîtibû. Dilê min qet neçû wê xwarinê û min destê xwe jî pê nekir. Lê hevalên min gişan ew xwarin xwarin û pê re jî çavên wan mîna yên dînan çûn nava serê wan û weke ku har bûbin, bi çar lepan ketin ser wê xwarinê û xwarin û hey xwarin. Her ku dixwarin çawa ku birçîtir bibin, bi daxwazeke xurtir êrîşî ser xwarinê dikirin û rewşa wan jî pê re diguherî, mîna ku dîn bibin. Piştre, çûn ji wan re donê nêrgîlê anîn, hem dan wan hem jî di laşên wan dan.

Hemû hevalên min jî, piştî ku ew don vexwarin, bi temamî guherîn, çavên wan hewl bûn û dîsa êrîşî ser xwarinê kirin. Ez li wê rewşa wan behetî mam û dilê min li ser wan pir êşîya. Ji bo xwe jî ez pir tirsîyam, lewre min nizanibû, bê ew kesên tazî dê çi bi serê min de bînin. Gava ku dem derbas bû û ez bi hûrgulî li ser wan fikirîm, ez fêr bûm, ku ew qewmekî mecûsî ne û qralê wan xûlekî mirovxur bû. Kî bihata welatê wan, kî di wir re derbas bibûya ango lê rast bihatina, ew dianîn cem qralê xwe, ew xwarin didanê û ew don dikirin, da ku nava wan fireh bibe û hîn zêde xwarinê bixwin, hişê wan ji serê wan here û bibin mîna deve û dewarên dermalê tenê, qelew bibin. Gava ku baş goşt digirtin û qelew dibûn jî, ew serjê dikirin, dibiraştin û didan qralê xwe. Xelkên wî qralî jî goştê însanan dixwar lê wan nedibiraşt, xavî dixwarin. Ez ji bo xwe jî pir tirsîyam, li ser hevalên xwe yên ku êdî hayê wan jî ji wan nemabû, ku bûne dermale jî. Hemû hevalên min bûbûn weke dewaran, yekî şivantîya wan dikir, her roj mîna dewaran ew dibirin çêrê û êvarê vedigerandin. Ez jî ji tirsan; ji kul û derdan bûbûm hestî û çerm, hezhizî bûbûm.

Gava wan ez di wî halî de dîtim, ez dam kêlekê û ez ji bîr kirim. Ne kesî li min pirsî ne jî bi min ve mijûl bû. Rojekê, çawa ku min fersenda revê dît, ez ji wir derketim û li giravê gerîyam, bi hêvîya ku ez rêyeke revê ji xwe re bibînim. Ez hetanî sibehê meşîyam û bi tava serê sibehê re hemû deşt û berî û çiyayên derdorê ji min ve xuya bûn, hetanî êvarê jî min çavdêrîya xwe berdewam kir.

Roja dîtirkê jî min ger û çavdêrîya xwe berdewam kir, min bala xwe dayê, ku ji dûr ve sîwaneyên tiştinan xuya dikin. Bi tirs be jî ez ber bi wan ve çûm lê her ku ez diçûm, mîna ku ji min birevin, hîn dûrtir diketin. Ber êvarê, min xwe gihand cem wan. Tirsa tiştên ku bi serê min de hatibûn, li çogên min dabû. Bi gavên lerzek ez bi wan ve çûm û min ji nêz ve li wan nêrî, min bala xwe dayê, ku hinek mirov in, bîberan kom dikin.

Çawa ku çav li min ketin, li dora min vehewiyan û ji min re gotin: Tu kî yî û tu ji ku hatiyî vira? Min got: Xelkino, wele ez mirovekî xerîb û belengaz im. Piştre êşên ku min kişandibûn, bobelatên ku hatibûn serê min, rêwîtîya min î tijî zor û zehmetî û hemû serpêhatîya xwe, ji serî hetanî binî, min ji wan re vegot.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 578'AN

*Şehrezadê got:*

Sendîbadê Deryayî vegotina çîroka rêwîtîya xwe ya çaran berdewam kir û got: Gava min çîroka xwe ji wan re got, hemû şaşwaz û behetî man û gotin: Tu çawa hatîyî vê giravê û çawa te xwe ji nav lepên wan reşikan rizgar kiriye, lewre ew mirov, xelkekî mirovxwir in û kes ji nav lepên wan xelas nabe? Min çîroka xwe û wan ji wan re rave kir û anî zîman, bê çawa xwarin danîn ber me û çawa yê min, min xwarina wan nexwar û ez ji wê xefika wan rizgar bûm. Wan jî li ser wê zanebûna min, ez pîroz kirim û ez li cem xwe ragirtim, heta ku karê xwe qedandin. Piştre, xwarin ji min re anîn, min têr xwar, lewre ez pir birçî bûm. Bi qasî saetekê jî min bêhna xwe vekir, piştre rabûn ez bi xwe re birim, li keştîyekê siwar kirim û ez bi xwe re birim girava xwe. Di pey re jî ez birim cem qralê xwe. Min silavek lê kir, wî jî silava min girt û bi germahî xêrhatina min kir, qedrê min girt. Dûre rewşa min pirsî; min jî çîroka rêwîtîya xwe jê re vegot, ji roja derketina ji Bexdayê û hetanî

hatina min a cem wî. Ew û hemû kesên di dîwana wî de li wê serpêhatîya min pir behetî man.

Piştre ji min xwest, ku ez rûnêm û ji xizmetkaran jî xwest, ku xwarinê bînin. Ez li cem rûniştim, xizmetkaran xwarin anîn, li ber min danîn, min jî têra xwe xwar û di pey re destên xwe şûşt, spasdarîya qral û Xwedayê xwe kir. Di pey re ez ji cem qral derketim, li nava bajarê wan gerîyam, min ji xwe re lê temaşê kir. Bajarekî xweş û mezin bû. Xwarinên wê pir bûn, sûkên wê fireh bûn, malên kirrîn û firotinê pir û cur bi cur bûn, xerîdar jî hew qasî pir bûn. Pir kêfxweş û dilşa bûm, bi hatina wî bajarî. Wensa min bi xelkê wir hat, min ji wan hez kir, wan jî ji biçûkan hetanî mezinan pir qedrê min girtin û ji min hez kirin. Balkêş bû, ku hemû niştecihên wir, ji biçûkan hetanî temendirêjan bê zîn li hespan siwar dibûn û vê yekê bala min kişand. Rojekê min ji qral pirsî û got: Ezbenî çima tu hespa zîn nakî, siwarbûna hespan zînkirî pir rihetir û xweştir e û hêzê jî dide mirov? Qral got: Îcar zîn çi ye, di temenê xwe de me tiştekî wisa nedîtiye! Min jê re got: Tu destûrê didî min, ku ez zînekê ji hespê te re çêbikim? Got: Çêbike! Min got: Hinek çerm û textik lazim in, te ferman bida xizmetkaran, pêdivî pêk bianiyana dê baş bibûya? Wî jî ferman da û hemû tiştên ku min xwestin, ji min re anîn.

Min gazî bazirganekî jêhatî kir, ew li kêleka xwe da rûniştandin, ji bo ku ew jî fêrî vê pîşeyê bibe û min dest bi çêkirina zînekî kir. Min hirîyek anî, ew neqişand û navikek amade kir. Piştre çerm di ser re derbas kir û ew şayik kir. Piştre min xêzên dirûnê lê dan û gazî hesinkarekî kir, min jê xwest, ku rikabeke baş çêbike û min şêweya çêkirinê jî nîşanî wî da. Hesinkar rikab çêkir, min jî hesînê wê di avê de sar kir, bi qesdîrê spî kir û benekî hevrîşimî jê re çêkir û ew pê ve girêda. Piştre ez bi xwe çûm tewla hespên qral û min yekî neqane ji nav wan derxist, anî. Min zîn li ser piştê kir, girêda, gema wî xist devan û rişmeya wî girêda, ew amade kir û piştre min ew pêşkêşî qral kir. Wî jî ew pir eciband, spasîya min kir û lê siwar bû. Zîna hespê xwe pir eciband û di ber wî karê min de heqdesteke baş da min.

Gava ku wezîrê wî pê hesîya, wî jî zînek ji min xwest; min yek ji wî re jî çêkir. Lê di pey re her kes pê hesîya û agahî gihîşt hemû mîr û emîr û karmendên dewletê. Wan jî zîn xwestin, min ji wan re jî çêkir. Min gelek tacir û hesinkar fêrî çêkirina zîn û rikaban kirin û me dest pê kir ji hemû kesên ku dixwazin re zîn çêkirin û me firotina wa kir. Min ji wî karî malekî pir kom kir. Xelkê jî pir ji min hez kir û qedrê min girt. Li cem qral jî cihekî min î cihê

hebû û hemû karmendên dewletê jî bi heman şêweyî nêzî min dibûn. Ez jî di nava xêr û xweşî û jîyaneke bextewar de bûm, tu derdên min tune bûn.

Rojekê gava ku ez li cem qral rûniştî bûm, ji min re got: Binêre kurê min, êdî tu bûyî delalîyê ber dilê me, tu bûyî yekî ji me, bêyî te nema sebra me tê û em naxwazin, ku tu ji welatê me here. Ez dixwazim bibêjim, ku divê tu gotina min neşikênî û tu bi ya min bikî! Min jê re got: Tu çi ji min dixwazî, qralê hêja? Lewre ez qet naxwazim ji rêya te derkevim, ji ber ku ez deyndarê we me û xêra we li ser min heye! Qral got: Ez dixwazim te bi jineke spehî, xweşik, dilpak û xwedî mal re bizewicînim û tu jî bibe hemwelatîyekî me û li vir, di qesra min de bi cih bibe. Îcar gotina min neşikêne û bi ya min bike!

Gava min ev gotin û daxwaza wî bihîst, ez ketim ber fedîyê û min bersiva wî neda, ez bêdeng mam. Wî ji min re got: Çima tu bersivê nadî kurê min? Min got: Ezbenî biryara te ye û kirin a min e. Rabû di cî de gazî şahidan kir û ez bi jineke xweşik û birûmet re zewicandim, ku xwedî mal û xwedî husneke mezin bû, gelek mal û milk û qonaxên wê hebûn.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 579'AN

*Şehrezadê got:*

Sendîbadê Deryayî vegotina serpêhatîya xwe berdewam kir û got: Piştî qral ez bi wê jina spehî û maldar re dam zewicandin, maleke mezin bi qasî qonaxekê jî da min û hejmarek ji xizmetkar, xulam, navmalî, qerwaş û ciwanik jî dan min. Êdî ez bûm xwedî jin û xwedî mal û xwedî hebûneke mezin û jîyaneke bextewar a ku bi destê kesî nediket. Di nava wê xêr û bêr û şahîyê de êdî min hemû êşên xwe ji bîr kirin û min ji xwe re got: Gava ez herim welatê xwe jî, ez ê jina xwe jî, hemû hebûna xwe jî bi xwe re bibim wir, Xwedê jî çi ji min re nîvisandibe betal nabe.

Bi derbasbûna rojan re, min ji jina xwe pir hez kir, wê jî ji min pir hez kir û evîneke kûr û piralî di navbeyna me de çêbû, ku çêjeke pir xweş û cuda da jîyana me ya xweş. Roj û mehên me bi wî hawayî derbas bûn. Rojekê jina cîranê min çû ser dilovanîya Xwedê, ez jî çûm serxweşîya wî, min ber dilê wî girt û got bila serê te sax be. Min bala xwe dayê, ku rewşa cîranê min pir xerab e, dilşikestî û dilbikul e, êş ji rûyê wî dinisile. Min jî xwest ku ez hîn

bêtir bêhna wî berdim û ber dilê wî xweş bikim, min jê re got: Dilê xwe xweş bike, hîna temenê te heye û dê Xwedê yeke ku şûna wê bigire, bide te! Kûrekûr pê ket, girîya û got: Dosto ez ê çawa bi jineke din re bizewicim û rojek tenê ji temenê min re maye? Min jî got: Birawo hişê xwe bîne serê xwe û behsa bedbînîyên wisa xerab neke, devê xwe bi xêrê veke camêr, tu hîna li ser xwe yî û tenduristya te baş e. Wî li min vegerand û got: Wisa neke birawo, sibê tu yê bi xwe min binax bikî! Min got: Ew çawa ye îcar? Wî got: Birayê hêja, sibê dê min jî bixin gora wê û pê re bidefinînin, lewre adetên welatê me wisan e; mêr bimire jina wî pê re vedişêrin, jin bimire mêrê wê pê re vedişêrin, da ku kes ji wan piştî yê/a din çêja jîyanê nebîne. Min jê re got: Bi navê Xwedê ev adeta we pir xerab e û tu kes nikare pê.

Hîna ku em wisa diaxivîn, xwecihîyên bajar hatin sersaxîya wî û hewl dan, ku bi duayan ber dilê wî xweş bikin. Piştre laşê jina wî ya mirî şûştin û li gorî adetên xwe cenazeyê wê ji definkirinê re amade kirin. Tabûtek anîn, cenazeyê wê tê de bi cî kirin, rahiştinê û berê xwe dan derveyî bajêr, li qûntara çiyayekî di kêleka deryayê de, kevirekî mezin rakirin, kuneke girover mîna devê bîrekê derket holê. Meytê jinikê avêtin wê bîrê. Piştre mêrê wê anîn, ew jî hinda sînga bi werîsekî girêdan, kûzekî avê û heft nan jî dan destê wî û ew li pey jina wî berdan wê bîrê. Piştre gazî wî kirin û jê re gotin: Xwe ji werîsê xwe veke! Zilam, xwe vekir; wan jî werîs kişandin û ew ecêba keviran dîsa kişandin ser devê bîrê û bi şûn de vegerîyan, çûn malên xwe.

Wê çaxê min ji xwe re got: “Bi navê Xwedê mirina herî xerab ev mirin bi xwe ye!” Rabû ez çûm cem qral û min jê re got: Ezbenî hûn çawa zindîyan bi mirîyan re vedişêrin li vê derê? Qral got: Ev adeta welatê me ye: Gava ku mêr dimire jina wî pê re vedişêrin û gava ku jin bimire mêrê wê pê re vedişêrin, da ku ne di jîyanê de û ne jî di mirinê de ji hev veneqetin. Ev adeteke me yî pir kevn e. Min jê re got: Qralê gewre gelo gava ku zilamekî mîna min xerîb be jî, hûn wî bi jina wî re vedişêrin? Got: Belê, çawa ku te dît, em wî jî bi jina wî re vedişêrin.

Gava min ev gotina wî bihîst, kuleke giran mîna çiyayekî xwe bera ser dilê min da û qirika min bi tehlîyê tijî bû, dilê min bi min şewîtî, min aqilê xwe xwar, ez dîn bûm ji tirsa ku jima min bimire û min jî bi saxî pê re bidin veşartin. Lê piştre min dilê xwe xweş kir û min ji xwe re got: “Belkî ez berîya wê bimirim!” heger wisa bibe, ji xwe mirov nizane bê di pey mirov re çi dibe.

Bi wî hawayî min xwe xapand û sebra xwe bi tiştin cuda cuda anî û tirsa xwe bi xwe da jibîrkirin. Lê demeke din bi şûn de, jina min nexweş ket û çend rojekî di pey re jî jîyana xwe ji dest da, çû ser dilovanîya Xwedê.

Ji bo sersaxîya min û jina min, mirov li min kom bûn, sersaxî ji malbata jina min re xwestin û ber dilê wan girtin. Piştre jinek hat, meytê jina min şûşt, kincên wê yên herî xweşik lê kirin, morîk û zêr û cewherên wê xistin stûyê wê, bazin û xirxalên wê xistin dest û nigên wê û ew xistin tabûtê. Piştre rahiştin tabûta wê û birin wî cihê di qûntara çiyê de, kevirê ser devê bîrê rakirin û ew avêtin wê bîrê.

Piştre hemû dost û nasên min, li gel malbata jina min, li min hatin hev, da ku ez jî pê re dakevim gorê. Min çiqasî kir qîrîn û ji wan re got: Ez zilamekî xerîb im û ez nikarim li gora adetên we tevbigerim, wan guh neda min, çawa ku dengê min nebihîzin, bi çeplên min girtin û bi zorê ez bi werîsekî girêdam. Heft nan û kûzekî avê jî bi min ve girêdan û ez dahijtim binê wê bîrê. Piştre gazî min kirin û ji min xwestin, ku ez werîsê xwe vekim. Lê min venekir. Wan jî werîs li pey min avêtin û devê bîrê girtin, çûn. Ez li derdora xwe zivirîm, min bala xwe dayê, ku ew bîr, di binîya wî çiyayî de devê şikefteke pir mezin e.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 580'YÎ

*Şehrezadê got:*

Sendîbadê Deryayî vegotina serpêhatîya rêwîtîya xwe ya çaran berdewam kir û got: Piştî ku min çavdêrîyeke baş kir, min bala xwe dayê, ku şikeft tijî laşên mirîyan e û bêhneke genî, pir nexweş jê tê. Min lome li xwe kirin û ji xwe re got: Çi bi serê te were jî, heqê te ye!

Êdî min şev û roj jî nema ji hev derdixistin û nanê xwe jî piço piço dixwar, xwe birçî dihişt, ji bo ku nanên min xelas nebin û min ava xwe jî dilop bi dilop vedixwar, ji bo ku neqede. Piştre carekê min lome li xwe kirin û min ji xwe re got: "La hewle û la quwete îla bîlah! Qey çi bi min hatibû ku ez li vî bajarî zewicîm? Çima her ku ji musîbetê rizgar dibim, ez dikevim yeke din? Bi Xwedê mirina herî xerab ev mirin bi xwe ye. Xwezîka ez di deryayê de bifetisîyama, an jî li çiyayan bihatima kuştin, ji vê mirina hanê çêtir bû!"

Min lome li xwe kirin, gilî û gazincên xwe bi xwe kirin, hetanî ku ez di

nava wan hestîyên mirîyan de di xew re çûm. Min dua û lavayîyên xwe ji Xwedayê xwe kirin û daxwaza mirineke çêtir jê kir.

Ez wisa mam hetanî ku hestîyên min ji tîna û birçîna lerizîn. Ez rabûm, li qûn rûniştim, min destê xwe avêt nanê xwe û hinek jê xwar. Piştre min qurtek av jî bi ser de vexwar û ez rabûm ser xwe, meşîyam û li kêleka şikeftê çûm û hatim. Wê kêlîkê min dît, ku terk di ber dîwarên şikeftê de hene û pir jî fire ne. Lê belê gelek meyt û hestî li wir hebûn. Min dûrî mirîyên nû, di kêleka dîwêr de ji xwe re cihek çêkir û ez di wir de raketim.

Roj û şevên ku min ew ji hev dernedixistin, di ser min re derbas bûn, hetanî ku nan û ava min hat ber qedandinê. Lê dîsa jî min pir hindik xwar û vexwar, ji bo ku ez rojên xwe zêdetir bikim.

Rojekê, ez wisa kûr kûr li ser wê rewşa xwe difikirîm, bê gava zadê min biqede ez ê bikaribim çi bikim û çi nekim, min bala xwe dayê, ku kevirek di cihê xwe de hejîya û şewqekê di ber re da der. Min ji xwe re got: Gelo ev çi ye? Di pey re min bala xwe dayê, ku devê bîrê hatiye vekirin û mirov di ser devê wê re sekinîne û meytê zilamekî dadixînin jêrê, li gel jineke zindî ku diqîre û bi gilî û gazin li xwe dide. Av û nan jî bi jinikê re hebû û min ew didît lê wê ez nedidîtim.

Xelkên ku cenaze û jina wî bera bîrê dan, devê wê girtin û bi şûn de çûn. Min jî bi bêdengî jin raçav dikir û ew dişopand. Wê gavê ez rabûm ser xwe, min hestîyê çîma mirîyekî hilda destê xwe û ez çûm ber bi jinikê ve, min go şelp li serê wê da. Jinik gêj bû û li erdê ket. Ez bi ser de çûm û min çend derbên din jî li ser hev li serê wê dan, hetanî ku mir. Jineke bi xeml û xêz bû û gelek zêr û cewher li ser hebûn. Min hemû ji ser rakirin, tevlî nan û ava wê û ez dîsa çûm ew cihê ku min di kêleka şikeftê de ji xwe re çêkiribû, ji bo razanê.

Min nan û ava xwe dîsa piço piço xwar û vexwar, da ku ez bikaribim temenê xwe dirêj bikim û zû ji birçîna nemirim. Min demeke dirêj bi wî hawayî di wê şikeftê de derbas kir. Her car min kesên ku sax dihatin veşartin, dikuştin û xwe bi nan û ava wan xwedî dikir.

Rojekê bi dengê xirtexirteke ku ji kêleka şikeftê dihat, ez ji xew şiyar bûm û veciniqîm, min ji xwe re got: “Gelo ev çi ye?” Piştre, ez rabûm, min rahişt hestîyê mirîyekî û ez ber bi cihê wî dengî ve çûm. Çawa ku wî pêjna min kir, reviya. Min da dû, min dît, ku heywanek e! Ez ketim pey wî hetanî bi dawîya şikeftê. Li wê derê kuneke piçûk î ku şewqeke qels tê re xuya dikir, bi ber çavên min ket û bala min kişand! Ew şewq geh diçû, geh dihat. Ez ber

bi wê ve çûm, min bala xwe dayê, ku ez ber bi wê ve diçim, ew ronî pirtir dibe. Ez têgihîştim, ku kunek di wê şikeftê de heye. Min di dilê xwe de ji xwe re got: "Misoger dê ev kun derîyê cihekî din be; ya dê bi ser şikefteke din ve vebe, yan jî dê bi ser derve de vebe!"

Ez li ser mijarê hûr û kûr fikirîm, piştre ez ber bi ronîyê ve çûm. Ez gihîştim ser wê, min bala xwe dayê, ku kuneke ajalên dirinde ye, ew vekirine ji bo ku werin laşê mirîyan bixwin û herin…

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 581'Ê

*Şehrezadê got:*

Sendîbadê Deryayî vegotina serpêhatîya xwe berdewam kir û got: Çawa ku min ew kuna ku derdikeve derve dît, bêhna min hat ber min û aramiyek bêtimtêl ket nava min, mîna ku ez ji nû ve hatibim dinyayê, ango piştî mirina xwe ez careke din vejîyabim û sax bûbim. Hetanî ku ez di wê qulê re derneketim derve û careke din çavên min li wî azmanê şîn neket jî, min digot qey ez di xewnê de me û min ji çavê xwe bawer nedikir.

Çawa ez derketim, min bala xwe dayê, ku ez li kêleka deryayê me, di qûntara çiyayekî bilind de. Çiya, di neqeba du behran de bû û di neqeba bajar û giraveke din de bû, ku tu kes nikaribû bihata wir. Pir kêfa min bi wê yekê hat û min spasîya Xwedayê xwe kir, li ser vê înayeta wî.

Piştre ez dîsa di heman kunê re vegerîyam hundirê şikeftê, min hemû nanê xwe yê komkirî xwar û ava xwe vexwar, ji bo ku ez bi ser xwe ve bêm. Di pey re jî min kimcin nû ji ser mirîyan rakirin, ew li xwe kirin û gelek bazin û xirxalên zêr û zîv û zincîrên tijî gewher û dur û lûlû û madenên giranbuha bi xwe re rakirin û ew di wê kunê re derxistin derve. Ez jî li kêleka behrê rûniştim, mam li hêvîya ku keştîyek di wir re derbas bibe.

Êdî karê min mabû ew; her car ez di wê kunê re diçûm hundirê şikeftê, kesên ku bi mirîyan re zindî dihatin veşartin hebûna, min ew dikuştin, nan û ava wan ji ser wan radikir, xwe pê dida jîyîn, zêr û zîvên li ser wan jî min derdixistin derveyî şikeftê û li wir kom dikirin. Her roj bi derketina rojê re jî ez diçûm li kêleka avê rûdiniştim û dimam li hêvîya hatina keştîyekê. Min demeke dirêj bi wî hawayî derbas kir.

Rojekê, dîsa ez li pala wî çiyayî, li qiraxa behrê rûniştî bûm û ji xwe re

li ser rewşa xwe diponijîm. Ji nişka ve min li asoyê nêrî û çavên min li keştîyekê ketin, ku di raserî min re derbas dibû. Bi kelecaneke mezin ez rabûm ser xwe, min kincekî mirîyan ê spî bi serê gopalekî ve kir û ew li ba kir, ji wan re hejand û bi dengekî bilind jî min kir qîr û hewar.

Xwedê teala wisa ji min re li hev anî, hişt ku ew min bibînin. Keştî ber bi min ve hatin û gava gihîştin nêzî peravê, kelekek ber bi min ve şandin, ku çend deryavan tê de bûn. Hatin qiraxa bejahîyê û ez rakirim, bi xwe re birim keştîya xwe. Kêfa min pir pir hat, ku piştî ew qas bobelat ez dîsa gihîştibûm nav mirovin baş û di ser rêya xelasîyê de bûm, hem jî li gel ew qas zêr û zîv û durr û cewherên ku min di paşilên xwe de veşartibûn!

Gelek şev, gelek roj di ser me re derbas bûn û hîn jî me rêwîtîya xwe berdewam dikir, ji giravekê ber bi yeke din ve, ji deryayekê ber bi deryayeke din ve. Di seran serê wê rêwîtîyê de jî, her car mana min a di wê gor-şikefta ku ez li gel jina xwe ya mirî dimam, di nava wan meytan de dihat bîra min û min dikir, ku ez aqile xwe bixwim. Lê gava ku piştî rêwîtîyeke dûdirêj me xwe gihand Besrayê, min hilmeke kûr kişand û spasîya Xwedayê gewre kir, ku bi saxî û selametî ez gihandim wir. Ez çend rojekî li wir mam, min hebekî bêhna xwe veda û piştre jî min berê xwe da Bexdayê, ez hatim warê xwe, ez hatim taxa xwe, hatim mala xwe, nava dost û yarên xwe.

Dost û hogiran ez bi kêfxweşîyeke bêtimtêl pêşwazî kirim. Bi germahî xêrhatina min kirin û ez pîroz kirim li ser vegera min a bi saxî û selametî.

Min jî gelek mal û dirav bi xwe re anîbûn, min gelek ji wan kir dîyarî û li ser nasên xwe belav kirin, hinek jî kir sedeqe û li ser hejar û bî û astengdar û muhtacan belav kir. Bi wê yekê, pir kêfa min hat û aramiyeke mezin ket nava min, ez bextewar kirim.

Careke din ez li şevbuhêrk û civatên dost û hogiran vegerîyabûm û di nava kêf û seyran û muzîk û xwarin û vexwarinê, min jîyana bextewar berdewam dikir. Helbet balkêşîyên vê rêwîtîya min hebûn lê bawer bikin, ku tu rêwîtî mîna rêwîtîya min a pêncan balkêş û erjeng nebû. Bi xêr û selamet, heger hûn sibê jî werin vira, ez ê ji we re behsa serpêhatîyên xwe yên ku di rêwîtîya pêncan de qewimîne bikim. Wê çaxê hûn ê bibînin, bê çi tiştên ecêb di dinyayê de hene.

Piştre ferman da xizmetkaran, ku sifreya şîvê raxin û xwarine bînin. Ji xeznedarê xwe jî xwest ku sed misqal zêr weke bexşîş bide Sendîbadê Barkêş. Şîva xwe xwarin, mey û şeraba xwe vexwarin û her kesî rabû berê

xwe da mala xwe. Sendîbadê Barkêş jî rahişt sed misqal zêrê xwe, spasîya xwe pêşkêşî mîrzayê xwe kir û vegerîya mala xwe, di nava aramî û bextewarîyeke balkêş de. Pir behetî mabû li wê serpêhatîya mîrzayê xwe Sendîbadê Deryayî.

Sendîbadê Barkêş, wê şevê li mala xwe raket û roja din bi derketina rojê re rabû ser xwe, kar û barê xwe kir û berî da civata Sendîbadê Deryayî. Derbasî dîwana wî bû, silavek dayê. Wî jî silava wî girt, bi germahî xêrhatina wî kir, ew li cem xwe da rûniştandin û ma li bendê, ku civata wî temam bibe.

Gava ku hemû hatin dîwanê û civat temam bû, xizmetkaran sifre raxistin, taştê danîn. Hemûyan xwarina xwe xwarin, şeraba xwe vexwarin, li kêfa xwe nêrîn, guftûgo kirin û di pey re dor hat ser mazûbanê wan, Sendîbadê Deryayî dest bi axaftinê kir û got:

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 582'YAN

*Şehrezadê got:*

Sendîbadê Deryayî awirên xwe li ser civata xwe gerandin û got: Gelî dost û hogiran! Çawa ku duh jî min ji we re got, piştî vegera min a ji rêwîtîya çaran, min di nava kêf û xweşîyê de xwe wenda kir. Lê piştî demekê dîsa min bêrîya ger û geştyarî û bazirganîyê kir, lewre temahîya dirav û zêran jî ez ber bi wir ve dikişandim. Min nêt kir, ku ez careke din bikevim rê û berê xwe bidim welatên giravên deryayî.

Ez rabûm ser xwe, min tişt û miştên ticaretê kirîn, barên xwe girêdan û amadekarîyên rêwîtîya pêncan kir. Min malê xwe bar kir û ez ji Bexdayê çûm Besrayê. Li wê derê min keştîyeke mezin û qewîn ji xwe re kirrî, qeptanek kirê kir û gelek bende û xulam jî girtin û barê xwe lê siwar kirin. Hinek tacirên din jî hatin, xwestin bi min re bên, wan jî barên xwe xistin keştîyê û kiriya xwe dan min. Piştî ku em giş amade bûn, min ji qeptan xwest, ku bi rê bikeve. Qeptan keştî bi rê xist û em bi deryayê ve çûn.

Em ji deryayekê derbasî deryayeke din bûn, ji giravekê derbasî giraveke din bûn û me rêwîtîya xwe berdewam kir di nava ger û geşt û ticaret û temaşekirina xwezayê de. Rojekê em gihîştin giraveke ji însanan xalî. Li her dera wê kavil hebûn lê tu kes tê de tune bû. Îcar dema ku em lê gerîyan, em li qubeyeke spî û mezin rast hatin. Em derketin ser wê, me lê nêrî ku hêke-

ke rexê ye. Lê ji ber ku hinek hevalên me yên tacir tê dernexistibûn û nas nekiribûn, ku hêka rexê ye, kevir lêdabûn, ew jî şikest û aveke mezin jê der bû. Piştre nigên çêlîkekê tê re dan der, wan jî bi nigên wê girtin, kişandin û çêlîk jê derxistin û ew serjê kirin, goştekî pir jê derxistin. Ez jî wê gavê di keştîyê de bûm û hayê min jê tune bû, bê çi dikin. Lê gava yekî ji min re got: "Mîrzayê min hela lê mêze bike, ew qubeya spî ya ku te digot hêka teyrê rex e, di çi halî de ye?"Min nû dît, ku hevalên min wê hêkê dişikênin. Çiqasî ku min li wan kir gazî û got hêka wî neşikênin, dê teyrê rexê keştîya me bişikêne û malê li me xera bike jî, kesî guh neda min û hey weke xwe kirin.

Hîna ku ew di wî halî de bûn û goştê ferxika teyr didane ser hev, min bala xwe dayê, ku tava rojê ji ser me hat girtin, çawa ku ewr ketibe ber tavê. Hîna ku me serê xwe ranekiribû, li wî ewrî nenêrîbû, me dît, ku rex ji hawa ve berjêr daket ser hêka xwe û dît bê çi bi hêka wî kirine. Wê kêlîyê çawa ku har bûbe, ber bi keştîya me ve hat û hîrehîreke ecêb pê ket, bi ser me de qîrîya, çend kêlî bi şûn de, hevala wî jî hat û herdu bi qîrîn û hewar di ser me re çûn û hatin, Ferqa qîrîna dengê wan û birûskê ji hev tune bû. Her ku dikirin qîrîn, erd ji ber dengê wan dihejîya.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 583'YAN

*Şehrezadê got:*

Sendîbadê Deryayî vegotina rêwîtîya xwe berdewam kir û got: Gava me dît ku teyrê rexê û hevala xwe ketin pey me û bi ser me de diqîrin, min ji qeptan xwest, ku werîsên keştîyê veke û di cî de bi rê bikeve, da ku em xwe bi xelasê xin. Tacir û rêwî hemû, bi lêz û bez siwar bûn, qeptan jî babirkên keştîyê vekirin, werîsên wê kişandin û bi deryayê ve vebû, bi rê ket. Gava em hinekî bi deryayê de çûn, herdu rexan dev ji me berdan û bi qasî saetekê ji ber çavên me ketin. Em jî pir bi lez diçûn, ji bo ku em zû ji eqarê wan derkevin û şopa xwe wenda bikin. Lê piştî demekê me bala xwe dayê, ku dîsa herdu di pey me de û vê carê her yekî ji wan kevirekî bi qasî çiyayekî hildaye nav lapûşkên xwe û ber bi me ve tên. Teyrekî ji wan kevirê xwe bi ser me de berda lê qeptan pir bi lez çivek da xwe, bi zor û heft belayan be jî, keştî ji ber wî kevirî xelas bû. Kevirê ku bi qasî çiyayêkî ket ber keştîyê, gumîn bi behrê xist, pêlên mîna çiyayan bi avê xistin. Keştîya me mîna ku

bifire, bi hewa ket û daket lê Xwedê em sitirandin. Lê belê hîna me hilma xwe negirtibû û dilê xwe bi xelasîya xwe xweş nekiribû, teyrê dîtirkê kevirê xwe bi ser me de berda û kevir hat li paşîya keştîyê ket, ew ji hev belawela kir, tiştek di keştîyê de nehişt, em giş binav kirin. Ji ber ku ruh şêrîn e, min hewl da, ku ez xwe xelas bikim, Xwedê jî ji min re li hev anî û ez li depekî keştîyê rast hatim. Min xwe avêt ser, ez lê siwar bûm û bi herdu nigan min av tehfand û ew mîna bêrikan bi kar anî û li gora ba û pêlan ez pêş de çûm.

Şensê me baş bû, ku keştîya me li nêzikî giravekê têk çûbû; qedera Xwedê û pêlên avê jî ez avêtim wê giravê. Gava ez derketim ser erda giravê, ez bêhnçikiyayî bûbûm û ji hal de ketibûm, hêl di min de nemabû. Westîn, tîbûn û birçîbûn û tirsa mirinê hemû li min hatibûn hev û ez biribûm ber mirinê. Min li kêleka avê xwe palda û bi qasî saetekê xwe tevneda, hetanî ku bêhna min hate ber min. Piştî ku min xwe komî ser hev kir û ez hebekî bi ser xwe ve hatim, hêdî hêdî ez rabûm ser xwe û li wan deran meşîyam.

Piştî geryanekê, min tê derxist, ku ew girav mîna bihuştekê ye. Her der tijî darên fêkîyan, şînkahî û gul û çîçek û çem û rûbar bûn. Wîtewîta çûkên reng bi reng û dengê wan ê xweş, mirov mest dikir. Tew mirov nikare behsa bêhnên çîçek û gulan bike, bê çiqasî cuda cuda û xweş bûn. Berê berê min têr fêkî xwar û birçîbûna xwe şikand, piştre jî ez çûm ser kanîyê, min têra xwe av vexwar.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 584'AN

*Şehrezadê got:*

Sendîbadê Deryayî vegotina çîroka rêwîtîya xwe berdewam kir û got: Hetanî êvarê ez li wê giravê gerîyam lê min kes lê nedît û dengê tu kesî nekir. Gava ku şev hat û dinya tarî bû, min xwe da bin darekê û pal da, ji ber ku ez pir betilîbûm, di cî de ez di xew re çûm û hetanî sibehê jî ez şiyar nebûm.

Roja din, sibehê, ez rabûm ser xwe û dîsa li wan deran gerîyam. Gava ez hatim ser kanîyeke avê, min dît, ku kalekî tazî li ber ava çem rûniştiye û tenê çend pelên daran bi pêşîya xwe de berdane. Min ji xwe re got, ku belkî ew kal kesekî ku ji keştîyê rizgar bûye ye. Ez çûm cem wî, min silav lê kir, wî bi îşaretê silava min girt û nepeyivî. Min jê re got: Kalo tu çima li vir rûniştî

yî? Bi xemgînî serê xwe bir û anî û bi destê xwe îşaret da min, ji min xwest, ku ez wî di avê re derbas bikim. Min di dilê xwe de got, ez ê wî bibim wî alîyê avê û ji xwe re xêrê bikim.

Ez ber bi wî ve çûm, min rahiştê û ew danî ser stûyê xwe, piştre jî min ew di avê re derbas kir, bir cihê ku wî dixwest û min jê re got: Bi hêdîka dakeve! Lê wî herdu nigên xwe li stûyê min anîn hev û daneket. Min li nigên wî yê reş nêrî, min bala xwe dayê ku çermên wan mîna yê gamêşekî ye. Ez tirsîyam û min xwest ku ez wî ji ser milên xwe bavêjim erdê. Lê wî nigên xwe li qirika min anîn hev, mîna devê şêrekî û ez fetisandim, bêhn li min çikand, ber çavên min reş bû, ez ji ser hişê xwe çûm û li erdê ketim, weke mirîyekî. Nigên xwe sist kirin, bêhna min berda û li pişta min da heta ku ez pir êşandim. Ez pir betilîbûm jî lê ji mecbûrî ez di bin wî de rabûm ser xwe û dîsa meşîyam. Wî jî bi destê xwe îşaret da min, ku ez derbasî nav darên fêkîyan bibim. Ez çûm nava wan daran, lewre ez mecbûr bûm, ku bi ya wî bikim. Gava min bi ya wî nedikir, derbin li min didan ku ji derbên qamçiyan jî xedartir bûn, agir bi canê min dixistin. Loma wî çi îşaret bida min, ez li gora wî tevdigerîyam, bêyî ku ez dereng jî bikevim. Lewre gava ez dereng diketim jî li min dida, çawa ku ez êsîrê ber destê wî bim.

Em ketibûn nava darên fêkîyan, wî dixwar û vedixwar û bir ser min de dirît û dimîziya, bêyî ku peya bibe. Bi şev û roj li ser milên min bû û qet danediket erdê. Heta gava ku dixwest rakeve jî, nigên xwe li qirika min dianîn hev, piço piço radiket û piştre jî radibû li min dixist. Loma ez jî bi lez pê ve radibûm û min daxwazên wî di cî de pêk dianîn. Ez pir poşman bûm, ku dilê min lê hat rehmê û min rahişt wî, ew di avê re derbas kir. Min di dilê xwe de ji xwe re got: “Min xêrek bi vî zilamî kir, li min zivirî xerabîyê, êdî tobe be ku careke din ez xêrekê bi kesî bikim!”

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 585’AN

*Şehrezadê got:*

Sendîbadê Deryayî vegotina serpêhatîya rêwîtîya xwe berdewam kir û got: Piştî kirina wê xêra ku ew bela giş bi serê min de anîn, min sond xwar, ku êdî hetanî mirinê ez qenciyê bi kesî nekim. A rast min dixwest, ku ez bimirim û ji wê ezîyetê rizgar bibim.

Demeke din jî min bi wî hawayî berdewam kir, hetanî rojekê ku vegerîya cihê xwe yê destpêkê û min kundir li wir dîtin, ku yek ji wan hişk bûbû. Min nava wî derxist, bû mîna beroşekê. Ez çûm cem mêwên tirî, min hundirê wî tijî kir, devê wî girt û ew li ber rokê danî û çend rojekî xwe li bendê ragirt, hetanî ku baş meya û meyek baş jê derket. Piştre êdî her roj min jê vedixwar, ji bo ku ez kul û derdên xwe û derdê wî şeytanê ku li serê min bûbû bar, ji bîr bikim û hebekî jî hêz û qewetê jê bigirim.

Vêca rojekê gava wî belayî dît, ku ez vedixwim, bi îşareta destan ji min pirsî, got: Ev çi ye? Min jê re got: Tiştekî baş e, bêhna mirov fire dike û dilê mirov xweş dike. Û min ew bir li nava daran gerand. Serxweşîyeke sivik bi min re çêbûbû, ku pir kêfa min anî û wê kêlîyê min stranek jî got li gel coş û kêfê. Gava wî ez di wî halî de dîtim, bi îşareta destan kundir ji min xwest. Tirsek bi min re çêbû, ji ber vê daxwaza wî lê dîsa jî min kundir da destê wî. Tiştê tê de mabû, hemû vexwar û kundir avêt erdê. Piştre mest bû û serxweşîyek pê re çêbû, kêfa wî hat cî û êdî li ser milê min xwe hejand. Piştre bi temamî ji ser xwe çû, dest û nigên wî sist bûn, laşê wî mîna pembo sist bû, li çep û rast çû û hat. Berîya ku ew ji ser milên min bikeve erdê, min ew danî û li erdê dirêj kir.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 586'AN

*Şehrezadê got:*

Sendîbadê Deryayî berdewam kir; çawa min kalê nalet ji ser stûyê xwe avêt erdê, min ji xwe re got: “Gelo bi rastî jî ez ji wê belayê rizgar bûme?” Ez tirsîyam, ku bi ser hişê xwe ve bê û dîsa malikê li min xera bike. Loma bi lez min xwe dirêj kir kevirekî mezin û ji hewa ve bi ser serê wî de berda. Serê wî perçiqî û di cî de mir. Rehma Xwedê di ser re biqevize!

Êdî bi dilekî rihet û bê tirs, ez li giravê gerîyam û çûm perava deryayê, li nava dar û şîndaran gerîyam. Her ku ez birçî dibûm, min ji fêkiyên wan daran dixwar û her ku ez tî dibûm jî, min ji kanîyan av vedixwar, piştre jî ez vedigerîyam peravê min çavdêrîya deryayê dikir, bi hêvîya ku keştîyek di wir re derbas bibe. Min demeke xwe wisa derbas kir.

Rojekê, dîsa gava ku ez li wê peravê rûniştî bûm û bi xemgînî li ser malbata xwe, li ser dost û hogirên xwe bi bêrîkirin difikirîm, min dît, ku ji

dûr ve keştîyek xuya dike, di nava pêl û mijdûmana deryayê de. Keştî ber bi wê giravê ve dihat. Hat, hat hetanî li ber peravê sekinî û rêwîyên wê jê peya bûn, derketin ser bejahîyê. Ez ber bi wan ve çûm. Çawa ku wan ez dîtim, hemû li dora min kom bûn, li hal û wextê min pirsîn û xwestin ku sebeba mana min a li wê giravê fêr bibin. Min serpêhatîya xwe û tiştên ku bi serê min de hatibûn ji wan re gotin. Pir behetî man û xemgîn bûn, ji ber wan êşên ku min kişandibûn. Piştre gotin: Ew kalê ku li ser milê te siwar bûye, şêxê deryayê bûye û tu kesî xwe ji nav lepên wî rizgar nekiriye, ji xeynî te. Êdî spasîya Xwedayê xwe bike, ku tu ji nav lepên wî rizgar kiriye.

Di pey re, hinek xwarin ji min re anîn. Piştî ku min têr xwar û hebekî bi ser xwe ve hatim, hinek kincên nû jî ji min re anîn; min ew li xwe kirin û careke din ez bûm mîna mirovan.

Piştre ez bi xwe re birim, li keştîya xwe siwar kirim û em bi hev re ketin rê. Piştî rêwîtîya çend roj û çend şevan, em li bajarekî giravî rast hatin, ku pir bilind bû û berê malên wê gişan li behrê dinêrî. Li gora ku digotin, ew girav, girava meymûnan bû û her ku şev dihat, niştecihên wî bajarî hemû ji bajêr derdiketin û şeva xwe di kelek û keştîyên xwe de; di nava behrê de derbas dikirin, ji tirsa meymûnên ku xwe bi şev, ji ciyê xwe bi ser wan de berdidan.

Keştîya me li wî bajarî sekinî, ez jî mîna gelek rêwîyam daketim û min ji xwe re li wî bajarî temaşe kir. Hingî bajarekî balkêş û erjeng bû, min çûna keştîya xwe ji destê xwe berda û wan jî ez li wir ji bîr kirim. Ez pir poşman bûm, ku ez li wir daketim û êşeke mezin xwe bera ser dilê min da, giranîyeke mezin bi min re çêbû. Careke din hevalên min hatin bîra min, çîroka min a borî ya bi meymûnan re hat bîra min û ez rûniştim ji xwe re girîyam…

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 587'AN

*Şehrezadê got:*

Sendîbadê Deryayî vegotina serpêhatîya xwe berdewam kir û got: Hîna ku ez wisa bi ser halê xwe de digirîyam, yekî ji wî bajarî hat gel min û ji min re got: Begê min, wisa xuya dike ku tu xerîbê van deran î? Min jê re got: Belê, wisa ye; ez xerîbekî belengaz im, keştîya ku min rêwîtî tê de dikir, çû û ez li dû xwe hiştim. Zilam got: Rabe bi me re li kelekê siwar bibe, da

ku em herin; êvarê, gava şev dikeve erdê, meymûn xwe berî bajêr didin, wê malike li te xera bikin. Min got: Baş e, ez bi we re têm.

Di cî de ez rabûm ser xwe û bi wan re li kelekê siwar bûm. Em bi avê de çûn, hetanî ku em bi qasî mîlekê dûrî peravê ketin. Wê şevê, em tev li wir raketin. Gava bû sibe, dîsa bi kelekê vegerîyan bajêr û her kes çû kar û xebata xwe. Gava bû êvar, dîsa li kelekê siwar bûn, ji bajêr derketin. Demeke dirêj min jî wisa bi wan re berdewam kir.

Meymûn, bi rojê derdiketin derveyî bajêr, li nav bîstan û çiyayan fêkîyên daran dixwarin, li wir diman û bi şev jî xwe berî bajêr didan û mirovên ku tê de mabûn dixwarin, ew dikuştin. Ev bajarê hanê li kenarê welatê Sûdanê bû. Tiştê herî balkêş, ku min derbarê wî bajarî de bihîst; mirovekî ku bi me re di kelekê de bû, ji min re behs kir û got: Mîrzayê min tu xerîbê vî bajarî yî, gelo karekî ku bikaribî ji xwe re bikî heye? Min got: Na weleh birayê min tu kar di dest min de tune ye û ez nizanim tu pîşeyê pêk bînim. Ez bi xwe bazirgan im û malekî min î pir hebû, min pê ticaret dikir lê mixabin ku keştîya me şikest, binav bû û hemû rêwîyên wê fetisîn. Ez jî Xwedê ji min re çêkir, ez li depekî rast hatim û bi xêra wî ez bi xelasê ketim.

Zilam ji min re got: Ez ê tûrikekî bidim te, wî ti jî kevirên zelet bike û li gel mirovên bajêr here, wan ji xwe re bifiroşe, belkî tu bikarîbî hinek dirav bidî ser hev û bi wî hawayî tu bikaribî biçî welatê xwe.

Min bi ya wî zilamî kir, rahişt tûrikê xwe û ez pê re derketim derveyî bajêr…

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 588'AN

*Şehrezadê got:*

Sendîbadê Deryayî berdewam kir: Piştî ku em ji bajêr derketin û em gihîştin cihê wan kevirên ku wî zilamî behs kiribû, min jî mîna wan ew kevirên zelet kom kirin û ew avêtin binê tûrikê xwe. Wê gavê, zilam ez bi çend kesên din dam naskirin, tembiya min li wan kir û ji wan re got: Ev zilam xerîb e, wî bi xwe re bibin û wî fêrî komkirina van keviran bikin, bila xêra mirîyê we be. Belkî ev belengazê hanê çend derhemekan ji xwe re kom bike û pê biçe welatê xwe. Wan jî got: Ser seran, ser çavan û ez bi xwe re birim, bi dilgermî alîkarîya min kirin.

Em hem dimeşîyan û hem jî me kevir kom dikirin. Carekê em gihîştin newaleke fireh, ku tijî darên pir bilind bûn, ku tu kes nikaribû hilkişîya ser wan. Di newalê de gelek meymûn jî hebûn, çawa em dîtin, bi qurmên daran ve hilperikîn, çûn ser wan. Hevalên min ên kar jî dest pê kirin, kevirên ku di tûrikên xwe de kom kiribûn, avêtin wan meymûnan. Meymûnan jî bi heman şêweyî fêkiyên daran jê kirin û avêtin me. Gava min li wan fêkîyan nêrî, min dît ku gûza Hindistanê ye.

Gava ez fêr bûm, bê me ew kevir ji bo çi kom kirine, min jî ji xwe re dareke mezin î ku gelek meymûn li ser hebûn, hilbijart û min kevir avêtin meymûnên li ser wê; wan jî gûz jê kirin û avêtin min. Min çiqasî kevir zêde davêtin wan, wan jî weke baranê gûz bi ser min de dibarandin. Gava ku kevirên min qedîyan, min jî mîna xelkê gûzên xwe kom kirin, min bala xwe dayê, ku qedereke mezin ji gûzan li ba min kom bûye.

Her kesî bi qasî ku hêza wî digihîştê rahiştê û dîsa em vegerîyan bajêr. Ez jî çûm cem zilamê xwe yê ku ez şandibûm vî karî û min hemû gûzên xwe dan ber wî. Zilam ji min re got: A ji te re, ev mifteya hanê û wan gûzên xwe bixe vî cihê ku ez ê nîşanî te bidim. Tiştê zêde ma, her dem bixe wir û wan bibe li sûkê bifiroşe û diravên xwe hilîne. Êdî her roj bi xelkê re here wê newalê, gûzan bîne û ji xwe re bifiroşe. Te çi jê qezenc kir jî, li cem xwe kom bike, belkî di dema pêş de tu bikaribî pê vegerî welatê xwe. Min jî spasîya wî kir, ji ber wê qencîya wî û jê re got: Xwedê xêra te binîvisîne.

Min bi ya wî zilami kir û êdî her roj ez diçûm gûzan, bi qasî ku min dikaribû, min gûz dianîn û difirotin û diravên wan li cem xwe kom dikir. Mirovên ku bi min re dihatin jî, pir qedrê min digirtin, alîkarîya min dikirin û dara herî baş nîşanî min didan, da ku ez ji wan pirtir kom bikim.

Hetanî demekê, min ev karê xwe wisa berdewam kir. Min gelek gûz kom kirin, gelek firotin û gelek dirav jî qezenc kirin. Di heman demê de min gelek tişt kirrîn jî. Dilê min bibijîya çi, min ew dikirrî. Êdî kêfa min dîsa li min vegerîyabû û hêvîyên min çêbûbûn.

Rojekê min dît, ku keştîyek hatiye li perava bajêr sekinîye û tacirên wê kirrîn û firotinê dikin, hinek jî malên xwe ser bi ser didin bi gûzên Hindiatanê û tiştin din. Ez çûm cem xwedîyê xwe û min jê re got: Va ye keştîyek hatiye vir û ez dixwazim herim welatê xwe. Wî jî got, tu çawa dizanî, wisa bike. Min xatir jê xwest û spasîya wî kir, ji ber qencîyên wî û ez çûm min qeptanê keştîyê dît, pê re li hev kir û barên xwe dan barkirin û em ketin rê.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

# HEZAR Û YEK ŞEV

## CILD 10

ŞEVA 589’AN

## DÛMAHÎYA ÇÎROKA SENDÎBADÊ DERYAYÎ Û BARKÊŞ

*Şehrezadê got:*

Şahînşahê min ê gewre û bextewar, şehreyarê ezîz! Vêca gava Sendîbad ji girava meymûnan derket û li keştîyê siwar bû, têra xwe gûzên Hindê û hemû kel û pelên xwe yên din jî bi xwe re bar kir û peymanek bi qeptanê wê re çêkir û ketin rê. Sendîbad, derbarê vê rêwîtîya xwe de axivî û ji civata xwe re got: Me rêwîtîya xwe bi wê keştîyê berdewam kir û em ji giravekê derbasî giraveke din bûn, ji deryayekê derbasî deryayeke din bûn, hetanî ku em gihîştin Besrayê. Li wê derê ez ji keştîyê peya bûm û demeke kurt lê mam. Piştre min berê xwe da Bexdayê. Ez hatim taxa xwe û ji wîr jî min berê xwe da mala xwe. Malbat, dost û nasên min pir kêfxweş bûn bi vegera min, hemûkan xêrhatina min kirin, bi saxî û selametîyê ez pîroz kirim û li dora min kom bûn. Min jî dîyarî û xelat li ser dost û mirovan belav kirin, kesên tazî bi cil kirin, kesên birçî têr kirin û gelek sedeqe û xêr li ser jar û feqîran belav kirin, lewre Xwedê teala bi elba mezin dabû min û malê min çarqat pirtir kiribû.

Ew êş û zor û zehmetîyên ku min dîtibûn, ji bîra min çûn û dîsa ez vegerîyam civat û şevbuhêrkên xwe yên berê; ez vegerîyam jîyana xwe ya xweş û bextewar. Belkî hûn vê rêwîtîya min a pêncemîn pir ecêb û erjeng bibînin lê bêhna xwe fireh bikin hetanî sibê, da ku hûn derbarê rêwîtîya min a şeşan de tiştên hîn ecêbtir bibihîzin, ku ez ê sibehê ji we re bibêjim.

Di pey re sifreya xwe raxistin, sênîyên xwarinên reng bi reng rêz kirin, hemûkan şîva xwe xwarin. Gava ku qedandin jî, destên xwe şûştin û rabûn ser xwe, her kesî berî da mala xwe. Sendîbad jî ji xeznedarê xwe xwest, ku sed mîsqal zêr bide hevenavê wî yê barkêş û xweşhalîya xwe ya ji bo hatina wî anî ziman. Sendîbadê Barkêş jî spasîya wî kir, rahişt zêrên xwe û di nava heyrangorîyeke mezin de vegerîya mala xwe.

Barkêş, wê şevê li mala xwe raket. Bi şeveqê re rabû ser xwe, nimêja xwe ya sibehê kir û dîsa berê xwe da mala Sendîbadê Deryayî. Derbasî hundir bû, bi rêzdarî silavek dayê, wî jî silava wî girt û ew li cem xwe da rûniştandin, pê re sohbet kir û li hal û wextê wi pirsî, hetanî ku mirov hemû hatin û civata wî gerîya.

Dema ku her kes hat, sifre raxistin, taştêya xwe xwarin, şeraba xwe vexwarin, kêf û zewqa xwe kirin, li muzîkê guhdar kirin, kul û derdên ser

dilê xwe avêtin û piştre Sendîbadê Deryayî dest bi vegotina serpêhatîyên xwe yên rêwîtîya şeşan kir û ji wan re got:

Dostên hêja, birayên delal û birûmet! Piştî ku ez ji rêwîtîya pêncan vegerîyam û min ew êş zehmetîyên ku bi rê de kişandibûn ji bîr kirin û ez ketim nava xweşî û şahîyê, demeke dirêj min jîyaneke bê kul û derd derbas kir, ez aciz bûm. Lê zewq û kêf û şahîyê ez rapêçabûm û ez pir sist bûbûm.

Rojekê qefleyek bazirganên ku xwe ji rêwîtîyekê re amade kiribûn, hatin cem min, Serdana min kirin. Gava min ew kelecan û coşa rêwîtîyê bi wan re dît, ez jî kelecanî bûm û kurmê gerê û rêwîtîyê ez daxdixandim, daxwazeke mezin bi min re çêkir. Min biryar da, ku ez malekî firotinê amade bikim û dest bi rêwîtîyêke din bikim. Min barekî ticaretê amade kir û ez ji Bexdayê çûm Besrayê. Li wir, min dît ku keştîyek ji rêwîtîyê re amade ye û gelek tacir û bazirgan li ser pişta wê ne. Ez jî tevlî wan bûm û min barê xwe jî li keştîyê kir û bi selametî em ketin rê, bi deryayê de çûn.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 590'Î

*Şehrezadê berdewam kir:*

Sendîbadê Deryayî vegotina serpêhatîya xwe berdewam kir û got: Rêwîtîya me di deryayê de dirêj kir, em ji giravakê çûn giraveke din, ji bajarekî çûn bajarekî din û her cihê ku em gihîştinê jî, me kirrîn û firotina xwe lê kir, dirav qezenc kirin û me têra xwe jî li mirovên wan deran û li welatên wan temaşe kir.

Rojekê gava dîsa em di rê de bûn, me dît ku ji nişka ve qeptanê keştîyê kir qîrîn û kir hawar, kofîya serê xwe avêt, li rûyê xwe da û riha xwe kişkişand, ji ser hişê xwe çû û berjêr ve ber bi binî keştîyê ve gindirî. Rêwî hemû li ser serê wî kom bûn û jê re gotin: "Çi qewimîye mîrzayê delal?"

Qeptan got: "Mixabin me rêya xwe şaş kiriye û em ji deryaya xwe derketine, em ketine deryayeke din, ku em rêyên wê nas nakin. Vêca heger Xwedê rêyeke xelasîyê nede ber me, em ê giş bimirin û herin. De êdî duayan bikin, bo ku Xwedê me ji vê tengasîyê rizgar bike!"

Piştre bi lez hilkişîya ser bircê û hewl da, ku bavanên keştîyê daxîne lê ba lê qulipî û bahozeke ecêb rabû û keştî berjor ve rakir ser qûna wê. Qirçeqirç bi textên keştîyê ketin, qeptan ji ser bircê daket û got: "Xwedê teala

alîkarê me be lê wele em giş têkçûn û dawîya me hat û êdî tu rêyên xelasê jî li pêşîya me neman!”

Her kes bi ser halê xwe de girîya, hêvî qut bûn û xatir ji hev xwestin, berîya ku canê xwe bidin. Di nava wê xirecirê de ji nişka ve girgiravokek derket pêşîya me û keştîya me bi ser de lewlihî, hemû ji hev ket, perçe perçe bû. Bazirgan û rêwî hemû di deryayê wer bûn, hinek ji wan xeriqîn û hinekan jî xwe avêt ser wî girî, ku ez jî yek ji wan bûm.

Gava em li wî girî zivirîn, me bala xwe dayê, ku ew giraveke xweş e û derdora wê tijî keştîyên şikestî ne. Pêlên ava behrê jî bê navber eşyayên ku di wan keştîyan de bûn, davêtin qiraxên giravê, ku her tişt di nava wan de hebû, ji xwarin û marin û kinc û mincan bigire hetanî bi gelek tiştên giranbuha, her tişt di nava wan de peyde dibû. Aqilê mirov lê dima heyirî, bê çawa avê ew qas tişt avêtin ser bejahîyê.

Gava ez derketim ser giravê û li ser gerîyam, min bala xwe dayê, ku kanîyêke aveke xweş jê diherike, ku ji bin serê wî girî derdikeve û di hêla wî ya din re dertê û bi nav giravê de diçe.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 591’Ê

*Şehrezadê got:*

Sendîbad vegotina serpêhatîya xwe berdewam kir û got: Rêwîyên ku xelas bûbûn,

hemû derketin ser giravê û li ser wê belav bûn. Li hemberî ew qas kelûpel û eşyayên ticaretê yên ku li qiraxa giravê kom bûbûn û gihîştibûn ser hev, mîna dînan şaşwaz û matmayî man!

Di rêya herka ava ku ji wê kanîyê dihat de gelek cureyên gewher û yaqûtan hebûn. Lal û mercanên milûkî mîna kevirkan di binî avê de xuya dikirin. A rast binî çem hemû bi wan madanên giranbuha û gewheran dibiriqî. Balkêş bû, ku darikên Çînî û yên Qemarî jî li wê derê hebûn, hem jî bi cureyê xwe yê herî baş ve.

Li wê giravê kanîyeke din jî hebû, di cihokeke cuda ya li kêleka çemê avê re embera xam diherikî. Ew ember ji ber germa rojê wek mûmê dihelîya û ber bi kêleka giravê ve dadiket, diket behrê. Masî û ajalên behrê jî ew dadiqurtandin û di zikê xwe de digirtin. Piştre li nava avê vedigerîyan û

ew di devê xwe re davêtin. Embera ku ji devê wan derdiket, di nava avê de dicemidî, hişk dibû û bi ser avê diket. Rêwî û bazirgan jî diçin wan dibin, difiroşin. Lê ew embera xam î ku ji wê kanîyê diherikî û bi erdê ve hişk dibû, gava ku tava rojê didayê, dihelîya, diçû û li şûna wê bêhneke xweş dima, ku li seranserê wê newalê belav dibû, mîna bêhna miskê. Gava ku roj ji ser diçû, dîsa dicemidî û di cihê xwe de hişk dibû. Lê ew dola ku embera xam tê de bû, kesî nikaribû xwe bigihandayê. Lewre derdora wê giş çiya bû û rêya çûnê tê de tune bû. Kesî nikaribû bi wî çiyayî ve hilkişe.

Me gera xwe ya li giravê di nava şaşwazî û heyrangoriyeke mezin de berdewam kir û me ji xwe re li wan ecêban temaşe kir. Car ji caran tirseke mezin jî bi me re çêdibû, lewre tiştên ku li wir bûn, nedihatin wesifdan.

Me hinek qût û zad ji xwe re da hev û em li kêlekeke giravê man, me rojê carekê tenê xwarin dixwar, ji bo ku em qûtê xwe zû neqedînin û birçî nemînin.

Em demekê li wir man lê xwarina me zû qedîya û birçîbûn û nexweşîn mîna gur ketin nava me, kesê ku dimira jî, me ew dişûşt, di nav qerpalekî de dipêça û vedişart. Her ku diçû xwarina me kêmtir dibû û her ku xwarin kêmtir dibû, hinekên din ji me dimirin. Piştî demekê hevalên min hemû mirin û ez bi tenê li ser wê giravê mam. Xwarina min jî pir hindik mabû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 592'YAN

*Şehrezadê berdewam kir:*

Sendîbad vegotina rêwîtîya xwe ya şeşan berdewam kir û got: Piştî demeke kurt ez rabûm ser xwe, min li kêleka wê giravê koncaleke kûr kola û ji xwe re got: "Gava ku ez lawaz bûm û min hîs kir, ku mirina min nêz bûye, ez ê bikevim vê tirbê û ji xwe re tê de bimirim. Wê ba jî qûm û tozê bavêje ser min û bi wî hawayî ez ê jî binax bibim, bêm definandin.

Êdî ez li wê rêwîtîya xwe pir poşman bûbûm û min lanet li wê bêaqilîya xwe barandin, ku min dev ji mala xwe, dev ji bajar û warê xwe, dev ji xwedî û kes û kasên xwe berda û ez hatim hetanî van deran, piştî ew qas bobelatên ku di rêwîtîya yekê, duduyan, sisiyan, çaran û pêncan de hatin serê min. Di her rêwîtîyekê de bi dehan mûsîbet hatibûn serê min û her carê jî Xwedê ez xelas kiribûm û bi selametî ez vegerîyabûm mala xwe, nava dost û yarên

xwe. Her carê jî qaşo min tobe dikir û min ji xwe re digot, careke din ez nema diçim van rêwîtîyan. Jixwe tu pêdivîya min bi ticaretê jî tune bû û malê min pir bû û min çiqas pir zirar bikira jî, hetanî dawîya emrê min, nediqedîya.

Lê dîsa jî min tobeya xwe negirt, ders ji wan serpêhatîyên xwe negirt û ez di van deran re derketim.

Qaseke din bi şûn de, fikrek hat bîra min û min ji xwe re got: "Hebe tune be, divê serîyek û binîyek ji vê avê re hebe! Bêguman divê ava vî çemî here welatekî abad û erdekî jînwar û rêya herî baş ew e, ku ez rabim ji xwe re qeyîkeke biçûk û yekkesî çêbikim, bavêjim ser vê avê û ez lê siwar bibim, herim û herim hetanî cihê ku ev av digihîjê. Heger min rêyeke xelasîyê ji xwe re dît, jixwe ez ê herim û heger min rêyek nedît jî, ez ê ji xwe re di nava vî çemî de bimirim, çêtir e ji vê derê.

Piştre min nav di xwe da û ez rabûm, min ji wan deran hinek text û darên Çînî û Qemarî kom kirin û min ew bi hev ve girêdan, qeyîkek ji wan çêkir, bi firehîyeke ji ya wê avê tengtir. Piştre min gelek ji wan cewher û mercan û lûlû û madenên giranbuha lê bar kirin. Min xwarina xwe ya mayî jî lê bar kir û ez jî lê siwar bûm û min du text mîna du bêran li herdu alîyên qeyîkê bi kar anîn û min pişta xwe da felekê, berê xwe da oxirê û ez bi avê de çûm.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 593'YAN

*Şehrezadê got:*

Sendîbad vegotina serpêhatîya rêwîtîya xwe berdewam kir: Ez di wî çemî de meşîyam, min rêya xwe berdewam kir û ji xwe re got: "Gelo wê çi bi serê min bê!"

Min di wî çemî de meşa xwe bi qeyîkê berdewam kir, hetanî ku ez gihîştim binîya çiya. Di wir de ava çem di binî çiyê re derbas dibû, çawa ku ez ketim binî çiyê, dinya li min tarî bû, min nema pêşîya xwe dît. Piştî demekê xeweke giran girt ser min, lewre ez pir westîyayî bûm.

Li ser pişta wê qeyîkê bê hemdê xwe ez di xew re çûm. Piştî ku ez ketim xewê, qeyîk çiqasî bi avê re çû ez nizanim. Lê gava ez şiyar bûm û min çavên xwe vekirin, min bala xwe dayê, ku tarî bi dawî bûye û ez derketime

ronahîyê. Min çavên xwe li dora xwe gerandin, min dît, ku ez li cihekî fire me, dora min tijî Hindî û Hebeşî ne û qeyîka min jî li kêleka çem, dûrî min girêdayî ye.

Gava dîtin, ku ez ji xew şiyar bûme, bi min ve rabûn û bi zimanê xwe bi min re axivîn, min jî tiştek ji wan fêm nekir. A rast hîna jî min digot qey xewn e û ez di xew de me. Vêca gava ew axivîn û min bersiv neda wan, yek ji wan ber bi min ve hat û bi zimanekî erebî yê fesîh axivî, ji min re got: Silav li te be birayê me; gelo tu kî yî , tu ji ku de hatiyî û sebeba ku tu hatiyî vir çi ye? Yê me em cotkar û gundî ne, em hatin vê derê ji bo ku em erd û ajalên xwe avbidin, me dît, ku tu di qeyîkê de raketiyî. Me jî qeyîk sekinand, ew li ba xwe girêda, ji bo ku tiştek bi serê te neyê, vêca ka ji me re bibêje, bê çima û ji bo çi tu hatiyî vir? Min jê re got: Tu bi Xwedê kî mîrzayê min, hinek xwarin ji min re bînin, ez dikim ji birçînan bimirim. Piştre çi pirsên te hebin, ji min bike.

Bi lez çû ji min re xwarin û vexwarin anî; min jî xwar, hetanî ku ez têr bûm û min bêhna xwe berda, tirsa ji ser xwe avêt. Pê re jî ruhê min dîsa li min vegerîya û ez bi ser xwe ve hatim. Ez pir kêfxweş bûm, ku ez ji wê talûkeya mezin rizgar bûm û hatim nava wan camêran, ji ber wê yekê min şikra xwe ji Xwedê re kir. Piştre min serpêhatîya xwe ji serî hetanî binî ji wan re got û herî dawîyê min çawa xwe avêt wî çemî û ez bi ser wan de hatim.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 594'AN

*Şehrezadê berdewam kir:*

Sendîbad vegotina çîroka serpêhatîya xwe berdewam kir û got: Vêca piştî ku min çîroka xwe bi hûrgilî ji wan re got; ew jî bi hev şêwirîn û ji hev re gotin; "Divê em wî bibin cem qralê xwe, da ku serborîya xwe ji wî re bibêje!" Rabû ez û qeyîka min, tevlî zêr û zîv û cewher û yaqûtên tê de birin, derbasî cem qralê xwe kirin û tiştê ku qewimîbû, jê re gotin, ew agahdar kirin.

Qral xêrhatina min kir, li hal û wextê min pirsî; min jî ta bi derziyê ve kir û serpêhatîya xwe ji serî hetanî binî jê re rêz kir. Li çîroka min pir behitî ma û got: "Derbasbûyî be, şikir ji Xwedê re ku tu bi selametî rizgar bûyî!" Ez jî rabûm, min qelek gewher û mercan û embera xam û darik û madenên giranbuha ji qeyîkê derxistin û ew ji qral re kirin dîyarî.

Qral ew dîyarîyên min giş qebûl kirin û qedrê min girt, nirxekî mezin da min û ez li cem xwe kirim mêvan. Hemû wezîr û gizîrên qral jî bi min re rabûn û rûniştin, hewaltî bi min re kirin û gişan jî qedrekî mezin dan min. Êdî ez mabûm li gel qral û ez nema jê vediqetîyam. Her kesê ku dihat wê giravê, dihat cem min, derbarê welatê min de gelek pirs ji min dikirin; min jî pirsên derbarê welatên wan de ji wan dikirin û agahîyên di wê derbarê de ji wan digirtin.

Rojekê qralê wan jî derbarê hukm û desthilatdarîya xelîfe ya li welatê me û rewşa bajarê Bexdayê de gelek pirs ji min kirin. Min jî ew agahdar kir û jê re rave kir, bê xelîfeyê me çiqasî bi dadwerî serwerîya xwe dimeşîne û pirsgirêkên gelê xwe çareser dike. Li wê yekê ecêbmayî ma û ji min re got: Bi navê Xwedê xelîfeyê we xwedî hişmendî ye û aqilane tevdigere, xelkê xwe razî dike û te jî hişt ku ez hez bikim. Lema ez dixwazim, dîyarîyekê ji bo wî amade bikim û bi te re jê re bişînim. Min jî got: Ser serê min, ser çavên min ezbenî, ez ê bi dilxwazî dîyarîya te jê re bibim û jê re bibêjim, ku tu sozdar û hezkirîyekî wî yî.

Demeke din jî ez li cem wî qralî mam, di nava xweşî û şahîyê de. Qral pir comerd bû û ji min re qet texsîr nedikir. Vê yekê wisa berdewam kir, hetanî rojekê gava ku ez rûniştî bûm û deng hat min, ku qefleyek bazirganên wê giravê xwe amade kirine û keştîyek ji xwe re eyar kirine, ji bo ku ber bi Basrayê ve derkevin rêwîtîyêkê. Wê çaxê min ji xwe re got, bi navê Xwedê ji vê fersendê çêtir nîn e, ku ez bi van camêran re herim û vegerim welatê xwe!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 595'AN

*Şehrezadê got:*

Sendîbad berdewam kir û got: Îcar bi lez û bez ez rabûm ser xwe, min amadekarîyên xwe kirin û ez çûm min destê qral maçî kir, raz û miraza xwe jê re got û min xwest, ku izna min bide, bo ku ez bi wê qafîleya bazirganan re herim welatê xwe, lewre min gelekî bêrîya kes û karên xwe kiriye. Qral ji min re got: Biryar a te ye, ger tu bixwazî li vir bimînî jî, cihê te li ser çavên me heye û wensa me jî bi te tê. Min jî got: Mîrzayê min, te ez di nava qencîya xwe de fetisandime lê belê min pir bêrîya nas û hezkirîyên xwe kiriye, bêrîya jin û zarokên xwe kiriye!

Gava ku qral ji biryara min agahdar bû, gazî bazirganên ku keştî amade kiribûn kir, tembîya min li wan kir, heqê rêya min jî wî da, gelek dîyarî û mal da min û dîyarîya ku ji xelîfeyê me Harûn Reşîd re jî amade kiribû, teslîmî min kir, ji bo ku ez bi xwe re bibim Bexdayê. Piştre min xatir ji qral xwest û ez çûm cem dost û hogirên ku bi ser min de dihatin, min xatirê xwe ji wan jî xwest û ez bi bazirganan re li keştîyê siwar bûm, em ketin rê û me tewkelîya xwe bi Xwedê anî, pişta xwe da felekê, berê xwe da oxirê, em meşîyan.

Ba xweş dihat û li gorî dilê me lêdida, keştîya me baş bi rê ve çû, em ji behrekê derbasî behreke din bûn, ji giravakê çûn giraveke din, hetanî ku bi xêr û selamet em gihîştin bajarê Besrayê. Li wir, ez ji keştîyê peya bûm, min malên xwe yên barkirî danîn û ez çend şevan li Besrayê mam, hetanî ku ez bi ser xwe ve hatim û ji tehba rê xelas bûm. Piştre min dîsa xwe amade kir û berê xwe da bajarê aştîyê, Bexdaya rengîn. Ez çûm cem xelîfe Harûn Reşîd û min emanetên wî radestî wî kirin û çîroka serpêhatîya rêwîtîya xwe ji serî hetanî binî, hemû jê re got. Piştre ez çûm malê, min malên xwe hemû rakirin kîleran, da ku piştre ez wan bifiroşim. Dost û hogirên min li min hatin hev, hatin serdana min, destxweşîya min kirin. Min jî gelek dîyarî û xelat li ser dost û mirovên xwe, xêr û sedeqe li ser jar û yetîman belav kirin û dema xwe bi zarokên xwe re derbas kir.

Demekê bi şûn de, xelîfe gazî min kir û ji min pirsî, got: Sebaba wan dîyarîyan çi bû û ew dîyarî ji cem kê hatibûn? Min jê re got: Êmîrê bawermendan, welehî ez jî nizanim navê wî bajarî û rêya ku diçe wir jî nas nakim lê belê gava keştîya me têkçû, ez derketim ser giravekê, min qeyîkek ji xwe re çêkir û ez bi ava çemekî de çûm, ew çem jî di bin çiyayekî re derbas bû û ez gihandim wî bajarî, cem wî qralê ku ew dîyarî ji te re şandine... Û min çîroka xwe hemû Jê re got, bê min çawa qala wî ji qral re kir û çawa qral bi dadwerîya wî bandor bû û jê hez kir û biryar da, ku dîyarîyan jê re bişîne.

Harûn Reşîd li vê çîrokê pir behetî ma û ji dîroknûsan xwest, ku vê serpêhatîya min binivîsin û destnivîsê bixin sindoqan, biparêzin, ku ji cîlên pêşîya me re bibe ders û îbret. Piştre wî jî xelatek da min û pir qedrê min girt.

Dîsa ez bi qasî cara borî li Bexdayê mam. Dîsa min ew êş û azarên ku di rêwîtîyê de kişandibûn hemû jî bîr kirin û min xwe di nava kêf û xweşî û şahîyê de wenda kir. Tiştê ku rêwîtîya min a şeşan de hat serê min, ev bû birano; vêca heger Xwedê hez bike û iznê bide me, sibê ez ê ji we re behsa

rêwîtîya xwe ya heftan bikim, ku ew rêwîtîya herî erjeng û balkêş e, di nava hemû rêwîtîyên min de.

Piştre ferman da xizmetkar û xulaman, ji bo ku şîvê bînin. Sifre danîn, hemûçkan xwarin û vexwarin û rabûn çûn malên xwe. Sendîbadê Deryayî jî ferman da xeznedarê xwe, ku sed mîsqal zêr bide Sendîbadê Barkêş.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 596'AN

*Şehrezadê got:*

Şahînşahê min ê gewre û mehrîban! Îcar gava Sendîbadê Deryayî çîroka serpêhatîya xwe ya rêwîtîya şeşan qedand û her kes çû mala xwe, Sendîbadê Barkêş jî rahişt sed mîsqal zêrê xwe û çû malê. Wê şevê li malê raket, sibehê rabû destnimêj girt, nimêja xwe ya sibehê kir û bi derketina rojê re dîsa berê xwe da qonaxa Sendîbadê Deryayî. Li wir jî gava ku mêvan hemû hatin û civat temam bû. Sendîbadê Deryayî dest bi vegotina çîroka serpêhatîya xwe ya heftan kir û got: Gelî civatvanên xêrê, gelî dost û hevalan; çawa ku duh jî min ji we re anî ziman, ez demeke dirêj di nava xweşî û şahî û xêr û bêrê de jîyam, di nava şevburhêrkên rengîn de min li kêf û zewqa xwe nêrî, hetanî ku ez aciz bûm û min dîsa bêrîya ger û rêwîtîyên deryayê kir. Wê çaxê min biryar da, ku careke din ez barekî ticaretê amade bikim û di nav derya û giravan de rêwîtîyeke din bikim.

Min gelek cawo û qumaş û kelûpelên ticaretê kirrîn, min ew dan ser hev û ew ji Bexdayê birin Besrayê. Li wê derê, min bala xwe dayê, ku komek bazirgan li hev civîyane û ji bo rêwîtîyê keştîyek amade kirine. Ez jî tevlî wan bûm û min barê xwe li keştîyê kir û li ser berket û tewkela Xwedê em bi selametî ketin rê. Ba xweş dihat û li gorî dilê qeptanê me lêdida, loma em xweş bi rê ve çûn û bi hêsanî ji deryayekê derbasî deryayeke din bûn, bêyî ku kelem li pêşîya me derkevin. Kêfa me gişan li cî bû û her kes di nava şahî û bextewarîyê de bû, me guftûgo bi hev re dikirin û di nava xwe de rêwîtî û bazirgantî dikir. Lê carekê ji nişka ve li pêşîya me ba û bahozeke ecêb rabû û pê re jî baranekê jî lêkir, ku em û barên me giş şil kirin, di nava avê de hiştin. Em tirsîyan, ku malên me yên ticaretê giş bi şilîyê re xera bibin, me kulav û telîs avêtin ser wan û me xwe avêt bextê Xwedayê xwe û me dua jê kirin, ku saxî û selametîyê bi ser me de bîne û malên me ji telefbûnê biparêze.

Qeptanê me jî newqa xwe bi kemerê girêda, zend û bendên xwe hildan û bi stûna bavan ve hilkişîya ser bircê û çep û rastê xwe raçav kirin. Piştre li me nêrî û bi lepan li ser çavên xwe da, riha xwe kişkişand û qajeqaj pê ket, qîrîya. Me jê re got: Qeptan, çi qewimîye, çi heye? Wî li me vegerand û got: "Xelasîyê ji Xwedê bixwazin, hev û du helal bikin, di hevdu biborin û li ser halê xwe bigirîn, lewre bayê zora me biriye û em avêtine dawîya dinyayê, nava deryayeke besînor!"

Piştre ji bircê daket jêrê û çû sindoqa xwe vekir, tûrikekî ji pembo jê derxist, ew vekir û axeke mîna xwelîyê jê derxist, av pê de kir, ew şil kir û hinekî bêhna xwe lê fire kir. Piştre ew bêhn kir û pirtûkeke biçûk ji sindoqê derxist, xwend û piştre got: Rêwîyên hêja û delal! Ev pirtûka hanê dibêje, ku çi kesê derbasî vê derê bûye, bê ser û şûn çûye û tu kes jê rizgar nebûye. Ji vê herem û erdnîgarîyê re dibêjin, "Erdnîgarîya qralan."

Ji ber ku tirba mewlayê me hezretî Suleyman kurê Dawid tê de ye. Silava Xwedê li ser herduyan be û gelek mar û zîhayên ecêb û pir mezin tê de hene, bê ya star! Her keştîya ku derbasî vir dibe, hûtek lê derdikeve û wê dadiqurtîne, dixe nava xwe, tevlî hemû barê wê.

Vê gotina qeptan em giş matmayî kirin û em li wê çîroka wî behetî man! Lê hîna ku qeptan axaftina xwe berdewam dikir, keştîya me bi hewa ket û daket xwarê. Pê re jî dengê qîrînekê hat me, ku mîna şerqeşerqa ewran bû. Em jê tirsîyan û qidûmên me şikestin, em bûn mîna meytan, di cihê xwe de hişk bûn û êdî me bawer kir, ku dawîya me hatiye. Tam di wê kêlîyê de, me bala xwe dayê, ku hûtekî weke çiyayekî, ji pêş ve ber bi keştîyê ve tê. Ji tirsana qidûm bi me ve nema, me dest pê kir, em li ser halê xwe girîyan û hey girîyan û me xwe ji mirinê re amade kir û li wî hûtê weke ecêbekî nêrî. Tam di wê kêlîkê de me bala xwe dayê, ku hûtekî din mîna wî mezin û dirinde di ber wî re derket û ew jî ber bi me ve hat.

Wê çaxê me gişan xatir ji hev xwest, li hev helal kir û em li ser ruhên xwe girîyan. Lê hîna ku wi girîyê me berdewam dikir, hûtê sisiyan jî li rex herduyên din xuya kir û xwe bi pêş de da, devê xwe vekir, ji bo ku keştîyê dabelihîne. Lê wê kêlîkê bahozeke ecêb ji nişkê ve rabû, pêlên avê bi xwe re rakirin, ketin bin keştîya me û avêtin ser kevirgiraveke tehtînî, keştî li ser tehtan ket, perçe bû, hemû ji hev belav bû, her textekî wê bi alîyekî ve çû. Helbet em hemû rêwî û barên xwe jî, ketin behrê, bi avê de çûn.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 597'AN

*Şehrezadê got, Sendîbadê Behrî berdewam kir û got:*

Vêca çawa ku keştîya me perçe perçe bû, ez noqî avê bûm, min kincên li ser xwe hemû avêtin û tenê binkiraskek li ser xwe hişt. Piştre bi avjenîyê min xwe gihand textekî keştîyê û destê xwe avêtê, ez hilkişîyam ser û lê siwar bûm, min ew zeft kir û berneda. Bager û pêlên avê jî ez bir û anîm, ez rakirim û daxistim, çawa ku bi min bilîze mîna gogekê. Ez jî di nava tîbûn û birçîbûn û westan û tirseke bêsînor de bûm, min lome li xwe dikirin, bê çawa û çima ez bi rêwîtîyeke wisa derketibûm, min ew ehmeqîtî kiribû. Wê çaxê min ji xwe re got: "Ey Sendîbadê Deryayî, piştî ev qas cerebeyên ku tu ji zor û zehmetî, piştî ev qas serpêhatîyên tijî talûke û rûbirûketina bi mirinê re qey te hîna jî dersek ji xwe re dernexistiye, ku tu tobe nakî!? Çima her ku tu tobe dikî jî, tu xwe ji bîr dikî û derewan li xwe dikî, dîsa derdikevî rêwîtîya deryayê? Çima ew qas zor û zehmetî têrê nake ku hişê te bîne serê te?"

Ev jî qedera min bû, ku ez ji temahîyê têr nedibûm. Hal bû mal û milkê min ew qasî pir bû, ku min bi ser xwe de jî bikira xelas nedibû. Lê êdî hişê min hat serê min û wê çaxê min ji xwe re sond xwar û got: Vê carê ez tobeyeke nesûh dikim, ku êdî piştî vê rêwîtîyê ez qet nema bazirgantîyê dikim û dernakevim rêwîtîyan. Ez ê her dem vê rêwîtîyê û vê tobeya xwe di hişê xwe de bigirim û ez qet wê ji bîr nakim! Piştre min xwe avêt bextê ewlîya û pêxemberan, ez girîyam û min ji Xwedayê xwe re dua kir, ku vê carê jî min rizgar bike. Di pey re min ew rojên xweş ji jîyana xwe anîn bîra xwe û hewl da, ku ez ber dilê xwe bigirim.

Ez du roj û du şevan sax di wî halî de mam, hetanî ku ez gihîştim giraveke şîn û bi dar û ber. Ez derketim ser giravê, min bala xwe dayê, ku çem û kanî li her derê hene û seranserê giravê dar û berên cur bi cur in. Min ji ber û fêkîyên wan daran xwar û ji ava kanîya jî têr vexwar, heta ku ruhê min li min vegerîya û dîsa ez bi ser xwe ve hatim, bêhna min hat ber min û careke din hêza min li min vegerîya.

Ez li nava giravê gerîyam, min bala xwe dayê, ku li hêla din î giravê çemekî mezin heye, ku ava wî pir xweş e lê belê ava pir bi hêz û bi şida diherikî. Çawa ku çavên min li wê avê ketin, ew çemê cara borî hat bîra min û min ji xwe re got, herhal a baş ew e, ku dîsa ez ji xwe re qeyîkekê çêbikim û dîsa bi heman rêbazê ez xwe bi ava çem de berdem, belkî ez bi xelasê kevim. Heger vê carê jî ez bi xelasê ketim, ez ê tobeyeke nesûh ji xwe re bikim û

careke din ez nema bazirganî û rêwîtîya deryayê dikim; heger ez têk çûm û min mirina xwe dît jî, ez ê ji vê êş û eziyetê xelas bibim.

Ez rabûm, min têra xwe text û dep kom kirin, hinek darên bilind jî li wir hebûn, ku şaxokên wan mîna werîsan bûn, min depên qeyîkê bi wan şaxokan girêdan, qêyika xwe amade kir û min ji xwe re got, ma hêvîya min Xwedê û xewnên nîvê rojê û min qeyîka xwe daxist nav avê, ez lê siwar bûm û min qeyîka xwe li ber avê berda. Rojekê, duduyan, sisiyan, ez bi wê avê de çûm, geh raketî geh şiyar, bêyî ku ez bizanibim bê ez bi ku ve diçim û bêyî ku ez li tiştekî xwarinê rast bêm. Tenê ava vexwarinê hebû, ew jî ava wî çemî bû, ji ber westan û birçîbûnê ez gêj bûbûm, mîna ferxikeke tirsonek min nizanibû ez ê çi bikim, çawa bikim?

Gava ez gihîştim qûntara çiyayêkî û min bala xwe dayê, ku ava wî çemî di bin wî çiyayî re diçe, ziravê min qetîya ji tirsan û ew cara dîtir hat bîra min. Min hewl da, ku ez qeyîkê bidim rawestandin lê hêza herka avê zora min bir û qeyîk bi xwe re kişand wê serdaba binîya çiyê. Min ji xwe re got, êdî felata te nema û lahewle wela quwete îlabîlah, min destê xwe ji jîyanê şûşt.

Qeyîka min demekê bi avê re meşîya û piştre min dît, ku ez di cihekî ronahî û fire re derketime, ku newaleke pehn e û tijî dar û ber e; di nîvê newalê re jî çemek diherike, bi xurexur û gumegum mîna bahozê, qeyîka min di nava heman avê re rêya xwe berjêr ve berdewam kir, bi lezeke ecêb ku tirseke mezin dixist nav dilê min. Min dikir nedikir, min nikaribû qeyîka xwe bida rawestandin û ne jî min dikaribû xwe bavêta ser bejahîyê.

Wê avê ez bi xwe re birim, hetanî ku ez gihandim hinda bajarekî mezin û xweşik, ku pir bi rêkûpêk xuya dikir û avahîyên wî jî balkêş bûn bi spehîbûna xwe, xelkê wê jî pir bû û çawa dîtin, ku ez di wê qeyîkê de li ber avê diçim, torek avêtin ser min, bi werîsan ez ji nava wê avê derxistim.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 598'AN

*Şehrezadê got:*

Sendîbadê Deryayî vegotina serpêhatîya rêwîtîya xwe ya dawîn berdewam kir û got: Îcar çawa ku çavên wan li min ketin, tora xwe avêtin ser qeyîkê û ew ji navê hildan, kişandin nav xwe. Ez jî weke meytekî li nava wan ketim, lewre hal di min de nemabû ji ber birçîbûn, westan û bêxewiyê û

tirsê. Ji nava wan pîrkalekî gir ez pêşwazî kirim û bi germahî xêrhatina min kir, kincin xweşik avêtin ser min, ez sitirandim û piştre bi destê min girt, ez birim hemamê, xwarin û vexwarinên xwe dan ber min û bêhnên xweş bi ser min de kirin.

Piştre, ez birim mala xwe û ez derbasî hundir kirim. Hemû kufletê malê bi hatina min kêfxweş bû û ez li cihekî xweş dam rûniştandin. Di pey re min spasîya Xwedayê xwe kir, ku vê carê jî ez ji mirinê xelas kirim.

Piştî xwarinê, xulaman ava germ anîn, min destên xwe şûştin; qerwaşan jî pêşgîr anîn, min dest û devê xwe bi wan zuha kir. Di pey re jî zilamê kalemêr rabû li kêleka mala xwe xanîyek ji bo mayîna min vala kir û ji xulam û qerwaşên xwe xwest, ku li ber destên min jî xizmetê bikin û mala min paqij bikin, pêdivîyên min pêk bîninin, wan jî soz da ku bikin.

Ez sê rojan di wê mala mêvantîyê de mam. Her roj xwarin û vexwarinên xweş ji min re dianîn, bêhnên xweş bi min de dikirin û mal paqij dikirin. Min jî li xew û rehetîya xwe dinêrî û bi wî hawayî ez bi ser xwe ve hatim, hêza min dîsa li min vegerîya û aramî ket dilê min.

Di roja çaran de kalo hat cem min û ji min re got: Derbasbûyî be kurê min, va tu bi ser xwe ve hatiyî! Gelo êdî tu dikarî bi min re werî peravê û bi min re dakevî sûkê, tişt miştina bifiroşe, hinek dirav bi dest bixe û bi wan ji xwe re ticaretê bike? Ez hinekî bêdeng mam û min ji xwe re got: "Tiştekî ku bifiroşim bi min re tune ye, gelo çima vê gotinê dike?"

Hîna ku ez neaxivîbûm, kalo got: Kurê min mitalan meke û rabe em herin sûkê û heger yekî buhayekî baş, li gora delê te di malê te de da, bifiroşe û diravên xwe bigire. Heger ne li gora dilê te be jî, malê xwe li cem xwe bigire û bihêle, heta ku tu li xirîdarekî pêwîst rast bêyî!

Ez dîsa li ser mijarê ramiyam û min ji xwe re got: "Bi ya wî bike û pê re here sûkê, da tu bibînî bê ew malê ku tu yê wî bifiroşî çi ye?" Rabû min jê re got: Bila be apocan, tu çawa dixwazî ez ê wisa bikim, xêr û berket di gotina te de heye! Ez pê re çûm sûkê, qiraxa avê. Min bala xwe dayê, ku wî çû qeyîka min vekir û gazî delal kir, ji bo ku li ser wê bang bike û wê bide ber bazarê.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 599'AN

*Şehrazadê got:*

Sendîbadê Deryayî berdewam kir: Bangêr, qeyîka min a ji darên sendalê da ber bazarê û gazî kir taciran. Taciran buhayê ewil lê birîn û piştre li hevdu zêde kirin, hetanî ku buhayê wê gihîşt hezar dînarî. Gava ku lihevzêdekirin sekinî, kalo li min zivirî û got: Binêre kurê min, di rojên weha de malê te incex bi vî buhayî diçe. Îcar tu dixwazî bifiroşe yan jî tu yê sebir bikî û ez ê wê di nav malên xwe de ji te re hilînim, heta ku wextê buhabûnê wê were û em dûre bifiroşin? Min jî got: Tu çawa dizanî wisa bike! Kalo got: Heger ez sed dînarên zêrîn di ser wî buhayê taciran re bidim te, tu yê wê bifiroşî min? Min got: Ez difiroşim te. Kalo ferman da xulamên xwe, got: Vê qeyîkê bibin, bavêjin embara min!

Xulaman beşt û darên qeyîkê rakirin embarê û em jî vegerîyan malê. Kalo dînarên min li ber çavên min yeko yeko hejmartin, hemû xistin tûrikan, tûrik jî xistin sindoqeke hesinî, derîyê wê xiliqand û mifteya wê da min.

Demeke din bi şûn de, kalo ji min re got: Kurê min, ez ê tiştekî ji te bixwazim, ku tu vê daxwaza min neşikîne! Min jê re got: Daxwaza te çi ye kalocan? Got: Çawa ku tu jî dibînî, ez pir kal bûme û kurên min tune ne. Keçeke min î biçûk tenê heye, ew jî maldar û spehî ye, ez dixwazim te bi wê re bizewicînim û tu jî li vê derê, li welatê me bi cih bibî. Ez ê hemû mal û milkên xwe bidim te û tu yê jî şûna min bigirî.

Ez bêdeng mam, min bersiva wî neda. Wî berdewam kir û got: Bi ya min bike kurê min, ez xêra te dixwazim. Heger tu bi ya min bikî, ez ê keça xwe bi te re bizewicînim, tu yê jî mîna kurê min bî û wê hemû mal û milkê min bibe yê tê. Gava tu bixwazî rêwîtîyê bikî û herî welatê xwe jî, kes li himberî te dernakeve. Ev hemû malê te ye û tu çawa dixwazî wî wisa bişuxulîne, biryar a te ye.

Min jê re got: Bi Xwedê kalocan ez bûme mîna kurê te. Hetanî niha min gelek êş û azar û talûke derbas kirine û tu fikir û zanîn bi min re nemaye. Îcar biryar a te ye û tu çi bixwazî ez ê bi ya te bikim.

Wê çaxê, kalo ji xulamên xwe re got: Herin gazî qazî û şahidan bikin, bila bên!

Xulaman çûn gazî kirin, qazî û şahid hatin; kalo jî keça xwe li min mehr kir, xwarineke xweş da çêkirin û şahîyeke mezin li dar xist, her kes

vexwend ser xwarinê. Piştre ez derbasî cem bûke bûm, min bala xwe dayê, ku bi bejn û bala xwe keçeke pir spehî û lihevhatî ye. Kincên wê jî pir xweşik bûn û gelek gewher, yaqut, mercan û morî li ser bûn, ku buhayê wan bi sed hezarên dînaran bû.

Min û keçikê me pir ji hev hez kir û evîna wê ket dilê min. Em jîyaneke bextewar bi hev re jîyan û demek bi şûn de gava bavê min çû ser dilovanîya xwe, me ew veşart û şîna wî bi hev re kişand. Piştre min dest danî ser hemû mal û milkê wî, xulam û qerwaşên wî jî bûn yên min û taciran jî ez kirim serbazirganê xwe, ji ber ku ew bi xwe jî serbazirganê wan bû û tu kesî nikaribû bêyî izna wî tiştek bistenda, lewre ew şêxê wan bû. Ez jî ketibûm dewsa wî.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 600'Î

*Şehrezadê got:*

Sendîbad berdewam kir: Piştî ku ez ketim şûna xezûrê xwe û ez bûm serbazirgan; danûstandinên min bi xelkê wê giravê re pir bûn û di nava demeke kurt de min ferq kir, ku adetên ecêb li ba wan hene! Niştecihên bajêr giş, di serê her mehê de baskên wan çêdibûn, difirîyan û ber bi perên asîmanan ve diketin. Ji jin û zarokan pê ve tu kes di bajêr de nedima. Min di dilê xwe de ji xwe re got: "Serê meha bê, ez ê ji yekî bixwazim ku min jî bi xwe re be, da ku ez bibînim bê bi ku ve diçin û çi dikin?"

Gava ku serê meha din hat, dîsa rengê wan bajarîyan hat guhertin. Ez çûm cem yekî, min jê re got: Tu bi qedrê Xwedê kî, min jî bi xwe re bibe, da ku ez hebekî ji xwe re bigerim û temaşe bikim. Wî got: Ev daxwaza te, tiştekî ne gengaz e, ku ez wê pêk bînim! Lê dîsa jî min dev jê berneda, ez li ber gerîyam û min hîle lê kirin, hetanî ku daxwaza min erê kir û min xwe avêt ser milê wî û ew jî bi hewa ket, firîya. Bêyî xebera jina xwe ez ji malê derketibûm û min agahî neda xulam û qerwaşan jî, loma hayê kesî ji çûna min tune bû.

Zilam fira xwe berdewam kir û ez jî li ser milên wî bûm. Carekê gava gihîşt lûtkeya bilindahîyeke ezman, ji qubeya gerdûnê dengê tesbîha ferîşteyan hat. Ez behetî mam û min got: "Subhan ji Xwedayê alemîn re! " Lê hîna ku min tesbîha xwe neqedandibû, agirek ji ezmanan bi ser me de barî-

ya, hindik mabû ku me bişewitîne. Zilamê ez li ser pişta wî, hemû bajarîyên din jî giş bi hev re daketin ser çiyayekî bilind, ez avêtim wir û ew dîsa bi hewa ketin çûn; min dîsa lome li xwe û li wê bêaqilîya xwe kir û got: Lahewle wela quwet îlabîlah, her ku ez ji talûkeyekê rizgar dibim, ez diçim dikevim talûkeyeke din de!

Ez li ser wî çiyayî mam, min nizanibû ez ê bi ku ve herim. Carekê min bala xwe dayê, ku du zarokên mîna du heyvan spehî di ber min re diçin û her yek ji wan darikekî zêrîn di destê wan de ye, hêla xwe didin ser û dimeşin. Ez çûm cem wan, min silavek li wan kir. Wan jî silava min girtin û gotin silava Xwedê li ser te be jî. Min ji wan re got: Gelo hûn kî ne û ji ku ne? Gotin: Em bendeyên Xwedê teala ne. Piştre darekî zêrîn ji wan herdu darikan dan min û bi rêya xwe de çûn, ez li wir hiştim.

Min hêla xwe da ser wî darikê zêrîn, ez ber bi serê çiyê ve hilkişîyam û ji xwe re li ser wan herdu kurikan ramîyam. Di wê navberê de min dît, ku marek li pêşîya min derket, ku zilamek di devê wî de bû û hewl dida ku nîvê mayîn ji bedana wî jî dabelihîne. Zilam ê ku ji navika wî û berjor ve hîna li der be bû, gazi dikir û di got: Ê ku min xelas bike, dê Xwedê teala wî ji hemû belayan xelas bike. Ez bi ser mar de çûm û bi wî darikê zêrîn min li serê wî da.çawa min li serî da, mar jî zilam ji devê xwe avêt.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 601'Ê

*Şehrezadê got:*

Sendîbad berdewam kir: Çawa ku min li mar da û zilam ji devê wî filitî, hat cem min û bi spasdarî got: Madem ku xelasîya min li ser destê te bû, ez ê li vî çiyayî hevalê te bim û qet nema ji te vediqetim. Min jê re got: Ser serê min û ser çavê min û me li wî çiyayî meşa xwe berdewam kir.

Hîna ku em wisa ji xwe re dimeşîyan, min bala xwe dayê, ku komeke însan ber bi me ve tên , yê ku ez li ser milên xwe kiribûm û ez bi ezmanan ve biribûm jî di nava wan de bû. Ez çûm cem wî, min lêborîna xwe jê xwest û ber dilê wî xwêş kir, piştre jî min jê re got: Dosto, ma mirov wisa bi dostê xwe dike? Zilam got: Tu bû yê ku te em avêtin talûkeyê bi wê tesbîha xwe. Min lê vegerand û got: Li min negire, weleh min bi vê meseleyê nizanibû lê belê êdî qet nema diaxivim, heger tu min bi xwe re bibî?

Zilam di min bihurî û bi şertê ku ez qet behsa Xwedê nekim û tesbîhan nexwînim, ez li ser pişta xwe kirim û mîna cara ewilî dîsa firîya, bi hewa ket, ez birim malê, cem jina min. Çawa ku jina min çav li min ket, hilma wê hat berê, pir kêfxweş bû, ku ez bi saxî û selametî vegerîyam malê û ji min re got: Baldar be û bi vî qewmî re nede û nestîne, evana birayên şeytan in, zikrê nizanin û Xwedê nas nakin. Min jê pirsî û got: Nexwe bavê te çawa bi wan re dida û distend? Got, bavê min ne ji wan bû û mîna wan nedikir. Heger niha tu bi ya min bikî jî, madem ku bavê min mir û çû, ka tu jî mal û milkê me gişî bifiroşe û were em herin welatê te, nav mirov û nasên te. Ez ê jî bi te re bêm, lewre piştî çûna dê û bavê xwe ez jî nema dixwazim li vî bajarî bimînim.

Wê gavê, min dest pê kir û malê xezûrê xwe perçe perçe firot, pê re jî min çavên xwe li yekî gerandin, ku ji wî bajarî here û ez jî pê re herim. Piştî ku min hemû mal û milkên xwe firot bi çend rojan, min agahî girt, ku komek bazirgan keştîyekê amade dikin, ji bo ku rêwîtîyekê bikin. Gelek dep kirîn û ji xwe re keştîyek çêkirin, min jî ji xwe re cihek tê de kirê kir û kiriya xwe pêşîn da. Gava ku roja rêwîtîyê hat jî, li gel hemû rêwîyên din ez û jina xwe em li keştîyê siwar bûn û em ketin rê. Bayê li gora me lêda, em ji deryayekê derketin, ketin deriyayeke din û ji giravakê çûn giraveke din û di encama rêwîtîyeke dûr û dirêj de me xwe gihand bajarê Besrayê, bêyî ku kelemek li pêşîya me derkeve.

Ez çend rojekî li Besrayê mam, piştre min keştîyek kirê kir, ez û jina xwe em lê siwar bûn, me barên xwe jî lê kirin û em hatin Bexdayê. Em hatin taxa xwe û derbasî malê, nav malbat û kes û karên xwe bûn. Hemûçkan bi kêfxweşîyeke mezin em pêşwazî kirin. Min dirav û zêr û zîvên xwe, tişt û miştên ticaretê hemû rakirin embaran.

Bi qasî ku malbata min hesibandibû, ew rêwîtîya min a dawîn bi tena serê xwe bîst û heft salan kişandibû. Loma di vê rêwîtîya dawîn de hêvî ji min qut kiribûn û çawa dîtin, ku ez vegerîyam, şaş û metal bûn. Gava min serpêhatîya xwe ya di wê rêwîtîyê de ji wan re got jî, pir behetî man û destxweşîya min kirin, ku ez bi saxî vegerîyame.

Min jî li ber destê Xwedê tobe kir, ku êdî ez careke din neçim bazirgantîyê nekim û nebim rêwîyê derya û bejahîyê bi temamî. Lewre ev rêwîtîya min a heftan û dawîn daxwaza rêwîtîyeke nû bi min re nehiştibû û min nedixwest jî. Min spasîyên xwe ji Xwedê re jî kir, ku dilê min qewîn kir û

hişt ku ez li ser gotina xwe bim û tobeya xwe neşikînim, li welatê xwe, li nav kes û karên xwe bimînin. Vêca Sendîbadê Barkêş, tu jî bibihîze, bê çi bi serê min de hatiye û min jî çi qas kişandiye!

Herdu Sendîbad û civata xwe giş, man di nava şahî û xweşîyê de hetanî ku Bekoyê ewan li wan rabû, ew ji hev belav kirin û qesr û qonaxên wan wêran kirin, ew şandin tirb û qubûran. Îcar subhan ji wî re, ku ew tenê her jîndar e, namire!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 602'YAN

## ÇÎROKA XELÎFE EBDULMELÎK BÎN MERWAN Û QUMQUMÊN SULEYMANÎ

*Şehrezadê got:*

Şahînşahê min î gewre, şehreyarê bextewar û dilovan! Tê gotin, ku di demên borî de û di zemanê kevn de, li şamê qralek hebû, navê wî Ebdulmelîk Bin Merwan bû. Dibêjin, rojekê ew û mezinên dewleta xwe ji wezîr û gizîr û sultan û emîran, li hev rûniştinbûn û di nav xwe de behsa dîroka gelên borî dikirin. Behsa dîroka mîrzayê me Suleyman Bin Dawid dikirin. Silavên Xwedê li ser herduyan bin. Bê çawa Xwedayê gewre hukm û ins û cin û teyr û tilûr û ajal hemû xistin bin destên wî û bi elba mezin dayê. Ew qas mal û milk û desthilatdarî dayê, ku tiştekî wisa neda tu kesî. Hezretî Suleyman ew qasî hêzdar bû, ku cinên ji agir û şeytan û îblîs jî di qumqumên paxirî de êsîr digirtin û risas diheland bi ser devê qumquman de berdida û bi hungulîsa xwe mohr dikir.

Yekî ji civatgeran xwe avêt nav axaftinê û pê de çû, got: Tê gotin, ku carekê zilamek li gel qefleyek rêwî li keştîyekê siwar bû û berî da welatê Hindistanê. Di deryayê de çûn û hey çûn, hetanî ku bayê ew di erdeke Xwedê re derxistin. Vêca gava li wir peya bûn, şev bû û roja din çawa ku dinya ronî bû, bala xwe danê, ku her der şîkeft in, tijî mirovên reş û tazî ne, ku hemû mîna ajalên dirinde ne û qralê wan jî ji wan e. Ji qralê wan pê ve jî tu kesî ji wan nizanibû bi erebî biaxive. Vêca çawa ku ew jî çav li keştîyê ketin, qefleyek ji wan tevlî qral, çûn cem wan, xêrhatina wan kirin, li hal û wextê wan pirsîn. Rêwîyên di keştîyê de jî spasîya wan kirin û li ola wan pirsîn. Her yek ji wan

li ser oleke cuda bû, gotin: Kesî musulman di nav we de heye? Reşikan gotin: Em nizanin hûn behsa çi dikin û tu agahîya me di vê mijarê de nîn e. Qralê wan jî got: Hetanî niha tu kes ji zarokên Adem nehatiye cem me.

Reşikan malovanîya rêwiyên di keştîyê de kirin û goştê teyr û wehş û masîyan dan ber wan, lewre ji wê pê ve, tu xwarineke din li cem wan tune bû. Piştî ku rêwîyan xwarina xwe qedandin, daketin nav wî bajarî, ji bo ku ji xwe re temaşe bikin. Hîna ku wisa ji xwe re dimeşîyan, Bala xwe danê ku masivanekî tora xwe avêtiye deryayê û dikişîne, ji bo ku hinek masîyan ji xwe re bigire. Lê di şûna masîyan de qumqumekî ji paxir pê ve derket, ku devê wî bi hungulîska hezretî Suleyman mohrkirî bû. Masîvan qumqum ji nav torê derxist û li erdê xist, şikand. Dixaneke şînerengî jê derket û bi hewa ve hilkişîya. Pê re jî dengek derket, digot: “Tobe ey peyxemberê Xwedê, tobe!” û di heman demê de jî ew dixan zivirî mirovekî ecêb û bêhawe, ku nayê wesifdan! Serê wî digiha ber perê çiyê, û nigên wî li ber qeraxa behrê bû. Lê zêde nema, ji ber çavan wenda bû, nebedî bû. Li hemberî wê dîmena ecêb û erjeng, hemû rêwî behetî û şaşwaz mabûn lê mirovên bajêr ên reşik hemû bêxem bûn û qet guh jî li wê dîmemê nedikirin. Yek ji wan rêwîyan vegerîya cem qralê reşikan û ew mesele ji wî pirsî. Qral got: Ew mirovê bêhawe yên ku ji wan qumquman derkevin, cinên ku hezretî silêman ji wan diqehirî û ew dixistin wan qumquman û bi risasê ser wan gigirt, piştre jî bi hungulîska xwe mohr dikir û ew davêtin binî behrê. Ji wê çaxê ve di binî deryayê de ne û her ku masîvan torên xwe davêjin masiyan, carinan hinek ji wan jî pê re tên. Vêca gava masîvan wan dişikînin û cin jê derdikevin, ji wan werê ku hezretî Silêman hîna jî sax e, tobeya xwe li ber destê wî dikin û dibêjin, “Tobe ey peyxemberê Xwedê, tobe!”

Emîrê bawermendam Ebdulmelîk Bin Merwan li himber vê agahîyê ecêbmayî ma û got: Subhan ji wî re, ku ev qas hukum û qudret daye Silêman û ew kiriye qralekî ew qasî gewre!

Vêca hozanê navdar Nabixe El-Zubyanî jî di wê civata xelîfe de amade bû, ji Emîrê bawermendan re got: Ew bêjerê ku ew çîrok gotiye, rast gotiye. Peyitandina vê yekê jî, ew çarîna Hekîm e:

> ji bo Suleyman jî Xwedê teala got
> bibe serwan û zana nebe serqot
> qedrê wan bigre kesê li pey te tê
> zindan bike hetaheta kesê ku nayê

Lewre kesê ku li himberî wî derdiket, ew dixistin qumquman, derî li ser wan digirt û ew davêtin binî behran. Emîrê bawermendan ew yek pir girîng dît û got: Bi Xwedê ez jî dixwazim qumqumekî wisa bibînim!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 603'YAN

*Şehrezadê got:*

Îcar gava ku emîrê bawermendan got ez qumqumekî wisa dixwazim, Talib Bin Sûheyl jê re got: Emîrê bawermendan tu ji vê derê jî dikarî wî bi dest bixî. Ji Birayê xwe Evdulezîz Bin Merwan bixwaze, bila ji Mûsa Bin Nesîr re binivîse û jê bixwaze, ku qumqumekî ji welatên rojava bîne, lewra ew dikarin ji wê derê xwe bi keştîyê bigihînin wî çiyayê ku me behsa wî kir, ew çiya jî dikeve bin desthilatdarîya wî bi xwe de.

Xelîfe Ebdulmelîk Bin Merwan serê xwe jê re hejand û got: Tu rast dibêjî Talib, gotina te ket serê min û ez ji te dixwazim, ku tu qasidê min bî, yê ku dê here cem Mûsa Bin Nesîr. Ala spî li gel te ye û çiqas mal û erka ku tu bixwazî jî ez ê wê bidim destê te. Berpirsîyarîya mala te jî bila di stûyê min de be.

Talib got: Ser seran, ser çavan emîrê bawermendan, ez ê herim. Evdilmelîk got: Li ser bereketa Xwedê û bi alîkarîya wî here, bila rêya te vekirî be.

Piştre ferman da nivîskarê xwe, ji bo ku li ser heman mijarê nameyekê ji birayê xwe û wekîlê Misrê Ebdulezîz re û yekê jî ji Mûsa Bin Nesîr, wekîlê xwe yê welatê Mexrîbê re binivîse, da ku ew bi xwe li ser mijarê raweste, kurê xwe bi demkî li şûna xwe erkdar bike û ew jî têra xwe mal û zilaman hilde gel xwe û bikeve pey qumqumên Suleymanî, bêyî ku dereng bixe an mehneyekê ji xwe re bibîne.

Gava ku herdu name hatin nivîsandin, xelîfe herdu jî mohr kirin û ew radestî Talib Bîn Suheyl kirin û hinek pasevan jî dan rex wî, da ku di rê de pê re alîkar bin.

Talib jî di cî de rabû ser xwe û berê xwe da Misirê.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 604'AN

*Şehrezadê got:*

Talib Bin Sûheyl û zilamên xwe ji Şamê derketin û berê xwe dan Misrê. Gava gihan wir, emîrê Misrê ew pêşwazî kirin, bi rêzdarî qedr û qîmeteke mezin ji wan re girt, ew li mala xwe kirin mêvan. Pişt da wan, wî rêzanî jî ew gihandin cem emîr Mûsa Bin Nesir. Emîr Mûsa jî bi coş û kelecaneke mezin ew pêşwazî kirin û bi comerdî malovanîya wan kir. Talib nameya xelîfe dayê, wî jî name vekir, xwend, piştre name danî ser serê xwe û got: Fermana emîrê bawermendan ser serê min e, ser çavên min e.

Di pey wê re Emîr Mûsa gazî mezin û giregirên dewleta xwe kir û bi wan şêwirî, got: Ka hûn çi dibêjin? Wan jî got: Emîrê gewre, heger tu bixwazî ku yek riya wî çiyayî nîşanî te bide, gazî Şêx Ebdulsemed Bin Ebdilqudûsê Sumûdî bike. Ew, zilamekî zana û gerîyayî ye, çûye her derê û hatiye, deşt û çiya, behr û derya hemû li hew xistine, hemû ecêbên gerdûnê dîtine û tîştê nedîtibe jî bihîstîye. Wîna bibînê, ew ê rêya ku tu dixwazî nîşanî te bide.

Emîr Mûsa jî bi ya wî kir û ferman da bo ku wî Şêxî bînin, pasevanên wî çûn, di cî de Şêx Ebdilsemed anîn cem emîr. Emîr Mûsa jê re got: Emîrê bawermendan Ebdilmelîk Bin Merwan fermanek ji me re şandiye, dibêje ji filan derê ji min re qumqumekî Suleymanî bînin û ez wê derê nas nakim. Lê ji min re hat gotin, ku tu wê deverê dinasî û agahîyên te di wê derbarê de hene, gelo tu dixwazî vê fermana emîrê bawermendan pêk bînî?

Şêx got: Emîrê hêja, rêya wê derê pir asê û çetîn e, çûna wir jî gelekî zor û zehmet e. Mîr got: Ji vir hetanî wir, çiqasî dikişîne? Şêx got: Rêwîtîya du salan çûyîn e û ya du salan jî veger e. Lê mesele ne tenê zeman e, zor û zehmetî û talûkeyên wê jî pir û tu jî zilamekî mucahîd î û welatê me di sînorê dijminan de ye; dibe ku krîstiyan çûna te ya rêwîtîyê bibihîzin û vê yekê ji xwe re weke fersend bi kar bînin û êrîşî ser me bikin. Lema ya baş ew e, ku berîya ku tu bikevî rê, tu li şûna xwe wekîlekî deynî.

Emîr got: Bila be. Kurê xwe Harûn li şûna xwe kir wekîl, ew erkdar kir û ji leşkeran xwest, ku ji fermana wî dernekevin û her dem bi ya wî bikin. Ji xwe kurê wî Harûn jî mêrekî çeleng û pir wêrek bû. Şêx Ebdilsemed anî bîra emîr, ku tiştê xelîfe ji wan dixwaze, di hukmê meşa çar mehan de ye, li kêleka deryayê ye û erdnîgarîya wê deverê hemû newal û çiya ne, ti jî dar û daristan in, her derê wê kanî û çem û rûbar in. Piştre berdewam kir û got: Lê belkî bi xêr û pîroziya we wekîlê emîrê bawermendan Xwedê teala karê me hêsan bike û rêya me veke!

Emîr Mûsa jê re got: Gelo tu dizanî bê kîjan milûk û qralan berîya me pê

li axa wê heremê kiriye? Şêx Ebdilsemed got: Belê Wekîlê emîrê bawermendan, ev herêm, di bin desthilatdarîya qralê Îskenderîyê Daranê romî de ye.

Karwanê xwe yê rêwîtîyê amade kirin û ketin rê, meşîyan hetanî ku gihîştin qesrê. Şêx got: Ev qesra han îbreteke ji bo her kesên ku dixwazin îbretê bigirin, ka em hinekî din nêzîkî wê bibin! Emîr Mûsa û zilamên xwe, dan pey şêx û çûn, hetanî ku gihîştin ber derîyê qesrê. Bala xwe danê, ku stûnên wê pir dirêj û qalind in û pêlikên wê hene; di her pêlikekê de du çavîkên dirêjik hene, ku hemû ji mermerên rengîn in. Hemû dîwar û banê qesrê jî bi zêr û zîv û madenên giranbuha neqişandibûn, li ser derîyê wê jî nivîseke bi zimanê yewnanî hebû. Şêx Ebdilsemed ji emîr re got: Ez vê nivîsê ji te re bixwînim, emîrê min? Emîr got: Xwedê xêra te binîvisîne rebî, wele ev hemû bi xêra te ye; kanî bi xêra xwe ji me re bixwîne?

Şêx helbesta li ser derî nîvisandî xwend û got:

qewmekî ku xwe nîşan dane bi vê afirandinê
tiştê ku li ser pev ketine girîyê kafiran pê tê
agahdarê her tiştî jî ev qesr e ne şûr û tîr
li ser axê xweş gihane hev ew wisa bûne mîr
lê berberîyê ew ji hev belav kirine yek bi yek
hatine kuştin binax bûne mirine yek bi yek

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 605'AN

Şehrezadê got:

Gava şêx Ebdilsemed ew helbest xwend, Emîr Mûsa girîya û hey girîya, hetanî ku ji ser xwe çû. Gava bi ser xwe ve hat, got: La îlahe îlalah, ew e yê mayî û nemir! Piştre bi heyrangorî derbasî hundirê qesrê bû. Hundir, tijî peyker û wêne û nîgarên pir balkêş û spehî bûn, emîr li wan ecêbmayî ma. Gava li ser derîyekî din nivîseke din derket himberî mîr, dîsa gazî şêx kir, got: Şêx Ebdulsemed, ji kerema xwe were vê nivîsê ji me re bixwîne!

Şêx hat, pêş de çû ber derî û nivîs xwend:

çiqase rêwî hatin û ketin bin van qubeyan
çiqase çûn û çiqase jê ketin nava mirîyan
kom kirin ew qase mal û li hev û du par kirin

paş de jî çûn ew bêyî ku li pey xwe binêrin
temaşe kin bê felekê çi bi serê wan kiriye
binêrin bê gişan çawa her tişt li du xwe hiştiye
sereta çawa kêf û şahî kirine wan bi aramî
paşê jî çawa bûne xwarina kurmên bêdiranî
navber dabûne meşê qaşo bo bêhnê vedin
lê zû çû ji destê wan giyan û mal û beden

Di pêy helbestê re Emîr Mûsa dîsa kûrînî pê ket û girîya. Rûyê wî zer bû, dinya li ber çavên wî tarî bû û got: Em ji bo armanceke gewre hatine afirandin!

Piştre li hemû beşên qesrê gerîyan, dîtin ku vikîvala ye û tu kes tê de nîn e. Bêhna zemanekî kevnar û tenêtîyeke kujer ji dîwarên kevirîn û mermerê sar dihat. Qubeyeke pir mezin di nîvê qesrê de hebû, ku nêzikî çarsed gorî li hawirdora wê rêzkirî bûn û li ser wan ev helbest hatibû nivîsandin:

te çend caran êrîş kiriye û çend kes kuştine
tu çiqasî gerîyayî te çend zindî dîtine
te çiqasî xwariye gelo û çiqasî vexwariye
çiqas xweşdeng guhdar kirine çiqas bihîstine
gelo çend keleh û berbend li pêşîya te derketine
di dawiyê de jî tu negihîştî arama rûniştinê
lêpirsîna xwe bike êdî berîya hatina mirinê
qasekî bi şûn de wê bi ser te de bibare tûrab
tu mirî yî êdî keko ketiyî bin axa bê av

Emîr û zilamên xwe dîsa girîyan. Piştre hat ber qubeya ku heşt derîyên wê hebûn, hemû ji textên sendel hatibûn çêkirin û bi bizmarên zêr hatibûn lihevxistin û bi cewher û zîv jî hatibûn neqişkirin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 606'AN

*Şehrezadê got:*

Li ser derîyê ewil, ev helbest hatibû nivîsandin:

mal û milkê li pey min maye ne ji comerdî ye
ne ji kerem û îhsana min e ew ji ber qederê ye
sereta di nava xweşîyeke domdar de şanaz bûm
weke şêran diparast min ez her dem serbilind bûm
pîvazeke xwe jî min nedida kesî ez destgirtî bûm
lê Xweda hemû bi şûn de girt û ez jî her jar bûm
qedera mirov mirineke lezgîn be wê çawa dereng be
çi fêdeya leşkerên wî jê re heye ku ew debeng be
çi fêdeya dost û cîranan heye ku mirov tenê be
çi fêdeya salan heye ku temen yek rêwîtî be
û çi fêdeya cejnê heye ku mirin tomarkirî be
tê çi bikî ku bi şeveqê re werin li derîyê te bidin
tê çi bikî ger barkêş û koling li pey kefen werin
tê çi bikî li himberî Yezdan ger guneh werin
qet neyê xapandin bi dunyayê binêr bê ew çi dibe
daîm li kiriyarên wê meyze ke tu qet xafil nebe

Gava mîr ev helbest guhdar kir, dîsa kûrînî pê ket, girîya heta ku ji ser hişê xwe çû. Gava bi ser xwe ve hat, rabû ser xwe, derbasî hundirê qubeyê bû û dît, ku goreke pir dirêj tê de ye û lewheyeke ji hesinê çînê jî di ser re ye. Şêx Ebdilsemed ber bi wê lewheyê ve çû, bala xwe dayê, ku nivîsa hanê li ser e:

“Bi navê Yezdanê daîm û abadîn û cawîdan, bi navê Yezdanê nezayî û nedizê, bi navê Yezdanê bêkes û kûs û bi tena serê xwe, bi navê Yezdanê mezin û ceberût, bi navê ew zindîyê nemir î ku pêwîstîya wî bi tu kesî nîn e! Gava min dît, ku xerabî ketiye welatê me û bayê mirinê li me daye, em di nav de fetisandine, min gazî katibekî kir û min jê xwest, ku van helbest û şîretan, li ser derî û gor û lewheyan binîvisîne. Lewre artêşeke min a mezin a ji hezar siwarên neqane bû, ku hemû leheng wêrek û bêtirs bûn; bi rim û mertal bûn; bi şûrên hesinî û zend û bendên badayî bûn; mîr ferman da wan, bo ku mertal û cewşenên xwe li xwe kin, şûr û rimên xwe rakin, li hespên xwe yên paqijnijad siwar bibin û xwe ji şer û cenga giran re amade bikin. Gava ku hukmê Xwedayê gewre ji bo me hat dayîn jî, min ji wan re got: Leşkerno, şerkerno, lehengino! Gelo hûn dikarin ber vê fermana îlahî ya ku derbarê min de derketiye bigirin? Leşkeran nikaribûn pêşîya wî

hukmî bigirin. Min ji wan re got: Ka herin hemû malê min bînin, ku malê min di hezar bîran de bû, di her bîrekê de jî hezar qentar ji zêrên sor hebû û di nava wan de gelek cureyên durr û gewher û zeberced hebûn û bi qasî wan jî zîv û zexîreyeke ku li ba hemû qralên dinyayê tene bû, hebû. Çûn hemû anîn ber destên min, min ji wan re got: Gelo hûn dikarin bi vî malê hanê gişî, min ji mirinê xelas bikin û rojekê tenê ji min re bikirin ji jîyanê? Nikaribûn wê jî bikin û di encamê de hemû bûn musulman, lewre di qedera wan de wisa nîvisandî bû.

Vêca ey ziyaretçiyê vî cihî, ji xwe re îbretê bigire ji bûyer û qewimînên dîrokê û neyê xapandin bi xeml û xêza vê dinyaya derewîn, lewre ew pir durû, bêbext û çêkirî ye; ne jidil e û dizîyê ji dizan didize, weke kabûsên xewnrojkan e, an jî mîna leylana ku tu li pey wê bazdidî û destê te qet nagihêje avê. Şeytan rûyê wê ji me re dixemilîne, bo ku me pê bixapîne hetanî roja mirinê. Hokerên sereke yên vê dinyayê ew in, êdî bawerîyê pê neyne û guhê xwe nede ser wê, lewre ew her dem bêbextîyê bi bawermendên xwe re dike. Pê li xefika wê neke, nekeve tora wê û bi dûvikê wê negire. Lewre ez bûm xwediyê çar hezar hespên sor û bi hezar keçên qralan re zewicîm, ku hemû bakîr û nûhatî, mîna heyvên li çardehan bûn û ji wana hezar kur ji min re çêbûn, ku mîna hezar şêrên dirinde bûn. Ez hezar salî jîyam di nava şahî û bextewarîyeke bêtimtêl de û min mal û milkek komî ser hev kir, ku hemû qralên dinyayê nikaribûn kom bikirina. Min digot qet dawîya wê xweşîyê nayê lê ji nişka ve xerabkarê xweşî û şahîyê bi ser me de hat, malik li me xera kir, em ji hevdu belawela kirin û tenê kavil li şûna me hiştin. Heger tu bixwazî navê min bizanibî jî, navê min Koş Bin Şeddad Bin Ad ê mezin e.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 607'AN

*Şehrezadê got:*

Emîr û zilamên xwe gera xwe li nava qesrê berdewam kirin. Li navbirên wê gerîyan, hêmanên, odeyên civatgerînê û gelek beşên din. Li navbireke ku li ser wê: "Qralekî bi du çavên baş û hezar qralên kor, li ser maseyê xwarin xwarin û hemû jî mirî ne, di goran de dinivin." nivîsandî bû, maseyeke kevirî û bi çar nigan dîtin. Li ber wê sekinîn, Emîr Mûsa ew nivîs jî li cem xwe nivîsand û ji qesrê derketin, çûn, bêyî tiştekî bi xwe re bibin, ji xeynî sênîyên ser wê maseyê.

Şêx Ebdilsemed da pêş, Emîr Mûsa û pasevanên wî ji dan dû wî û rêwîtîya xwe berdewam kirin. Piştî meşa sê rojan, gihîştin çariyanekê ku peykerê siwarekî yê ji paxir lê çikandî bû û di destê wî de jî rimek, di serê rimê de jî tûjikeke biroqankî hebû, ku çirûska wê çavên mirov kor dikir. Li ser peyker ew nivîsa hanê bala wan kişand: “Ey rêwîyê vê rêya dirêj! Heger tu li rêya bajarê paxir digerî, destê vî siwarî bifirikîne, ew ê xweber bizivire û bergeha te nîşanî te bide. Tu jî bêtirs di wê rêyê re here û mitalan neke, ew rê, dê te bigihîne bajarê paxir.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 608’AN

*Şehrezadê got:*

Îcar şahînşahê min ê bextawar, Emîr Mûsa destê wî siwarî firkand, dest xweberî zivirî û bergeha rêya ku dê tê re biçe, nîşanî wî da. Wî û zilamên xwe jî dan ser wê rêyê û meşa xwe berdewam kirin û di nava roj û şevekê de pir xweş çûn, lewre rê pir baş bû.

Rojekê gava ku bi rê de diçûn, li stûnekê rast hatin, ku ji kevirê reş bû û mirovekî reş û dirêj jî di nava wî de, hetanî bi newqê di erdê de çikilandî bû. Du bask û çar destên wî hebûn ku du dest ji wan mîna yên mirovan bûn û herduyên mayîn mîna lepên tîmsahan bûn, her yek ji wan bi du lapûşkan bûn. Porê wî jî mîna terîya hespan bû. Herdu çavên wî mîna koza (pizot) agir diçirisand û çavekî wî yê sisiyan jî hebû, di nîvê enîya wî de bû û mîna çavên pilingan, agir jê diçû. Bê navber diqîrîya, lavelava wî bû, digot: Subhan ji wî Xwedayê min re, ku ew hukum li min biriye û ez di nava vî ezabî de hiştime hetanî roja qiyametê! Emîr Mûsa û qafîleya xwe gişan bi baldarî li wî zilamî nêrîn, şaşwaz û behetî bûn, di cî de jê dûr ketin, revîyan. Emîr gazî şêx Ebdilsemed kir û jê pirsî, got: Ev çi ye? Şêx got: Ez jî nizanim bê çi ye! Emîr got: Nêzî wî bibe û je bipirse, belkî tiştekî bibêje û tu jî tiştekî jê fêm bikî. Emîr got: Jê netirsin, jixwe halê wî besî wî ye.

Şêx ber bi wî ve çû û jê re got: Navê te çi ye, tu kî yî û çima tu di vî halî de yî? Wî jî lê vegerand û got: Ez efrîtekî cinî me û navê min Dahiş kurê Ehmeş e. Ez ji hestîyên xwe ve li vir girêdayî me bi qudreta Xwedê, ez cezayê xwe dikişînim.

Emîr Mûsa ji şêx re got: Jê bipirse bê çi sebeba girêdana wî ya bi vê stûnê ve ye? Şêx pirsî, Efrît got: Çîroka min ecêb e. Hinek zarokên îblîs

hebûn, pûtekî wan ê bêhnxweş û rengsor hebû, ku ji wî berpirsîyar bûn. Qralekî deryayê jî ji wî pûtî re îbadet dikir û pê bawer bû. Hêza wî qralî jî hebû û bi hezaran leşkerên cinî di bin fermandariya wî de bûn. Hemû bi şûr û rim bûn û timî amade bûn di bin emrê wî de lê di heman demê de ew cinî bi min ve jî girêdayî bûn û ji gotina min dernediketin. Hemûçkan jî li himberî hezretî Suleyman Bin Dawid serî hildabûn û li hemberî wî derketibûn. Ez jî diketim nava pût û min ferman didane wan. Vêca keça wî qralê deryayê jî li hemberî wî pûtî pir diket xiroşê û îbadet dikir. Keçik jî pir xweşik û lihevhatî bû, tu kes mîna wê spehî tune bûn. Min jî pesnê wê da li ber hezretî Suleyman. Wî jî xeber şand ji bavê wê re, got: Keça xwe bi min re bizewicîne û wî pûtê xwe bişikîne, eşheda xwe bîne, bibêje laîlahe îlalah û Suleyman nebîyulah. Heger tu vê yekê bikî, em û tu dibin weke hev lê heger te nekir û tu li hemberî fermana min derketî, ez ê artêşeke ew qasî mezin bi ser te de bişînim, ku tu qet nikaribî bi wan. Vêca bersiva xwe amade bike û kefenê xwe li xwe bike, ez ê artêşekê bi ser te de bişînim, ku erd û ezman ji ber wan biheje.

Gava ku qasidê Suleyman pêxember ev gotin jê re gotin, qral serî hilda, zirt û fortên xwe da û pozê xwe bilind kir.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 609'AN

*Şehrezadê got:*

Qralê deryayê li himberî hezretî Suleyman serî hilda û wezîrên xwe kom kirin, ji wan re got: Derbarê vê fermana Suleyman Bin Dawid de Ka hûn çi dibêjin,? Wan jî got: Ey Qralê gewre û giran, qey Suleyman dikare tiştekî bi te bike û tu di nîvê deryayê de yî? Ew bi ser te de we re jî, nikare bi te, jixwe efrîtên cinî bi te re ne û alîkarîya te dikin, di mijara pût de jî dê alîkarîyê bidin te, ya baş ew e, ku tu bi Xwedayê xwe bişêwirî û tu binêrî bê ew çi dibêje. Heger ji te re got şerê wî bike, tu jî bike, heger got na, ji xwe tu jî neke.

Qral di cî de rabû ser xwe û çû, derbasî cem pûtê xwe bû, piştî ku gazî dost û merivên xwe kir û qurbanên xwe serjêkirin, çogên xwe li ber şikandin û bi helbestî ji pûtên xwe re got:

Xwedê ya ez kole û qedirnasê te me
lê Suleyman dixwaze te hilweşîne
ez jî serkeftinê ji te dixwazim e
li bendî emr û fermanên te me

Gava ku qral wisa got, ji ber nezanî û kêmhişîya xwe ez jî ketim hundirê pût, min di dewsa pût de û ji ber nezanî û kêmhişîya xwe, min di dewsa pût de bersiv da û got:

ez bixwe qet ji wî natirsim
lewre ez bi her tiştî dizanim
ger ew wisa bixwaze şerê min
bi lez ez ê jê re bibim dijminan
û di cî de bistînim ez ê rewan

Vêca gava wî ew bersiva min bihîst, dilê, wî xurtir bû û biryar da, ku şerê Suleyman bike. Çawa ku qasidê Suleyman vegerîya cem wî ji bo ku cewabê jê bigire, têra wî lêda, bi ser de rabû têra wî sixêf jê re dan û ew bi şûn de şand, da ku ji Suleyman re bibêje: Qey nefsa te ya xerab temahîya min kiriye, ku tu van gotinên beradayî ji min re dişînî? De êdî ya tu bi ser min de were, yan ez bi ser te de têm, da ku em bibînin bê kî berx e, kî beran e!

Qasidê Suleyman lê vegerîya, bersiva qral jê re got û tiştên ku bi serê wî de anîbûn jî jê re gotin, ew ji her tiştî agahdar kir.

Îcar gava pêxemberê Xwedê ew gotin ji qasidê xwe bihîstin, weke çiyayekî rabû ser xwe û bi hêrs artêşa xwe kom kir, leşkerên xwe yên cin û ins û teyr û ajalên dirinde hemû dan ser hev û ji wezîrê xwe Demiryat, qralê cinan xwest ku hemû cinên serhildêr jî ji hemû deveran komî ser hev bike, da ku ew jî tevlî şer bibin. Demiryat bi qasî hezar hezar şeytanî jî jê re kom kir. Asif kurê Berxiya jî artêşa xwe ya ji însanan jî kom kir, ku ew jî hezar hezar heb hebûn.

Hezretî Suleyman çek û sîleh li ser hemû şervanên xwe belav kir, hemû siwar bûn, çi cin çi îns çi ajal giş bi hev re li merşeke firek siwar bûn, teyr û tilûr jî di ser wan re firiyan, ajalên din jî di binîya wan re meşîyan û weke kulî bi ser girava wî qralî de girtin. Leşkerên Suleyman bûbûn ax û ser ruyê erdê giş girtibûn.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 610'AN

*Şehrezadê got:*

Îcar efrît vegotina xwe berdewam kir û got: Gava ku nebî Suleyman bi artêşên xwe ve daket ser girava qral, agah jê re şand û got: Va ez hatim, de êdî mirina xwe bide sekinandin û bikeve bin emrê min, fermana min pêk bîn, pûtê xwe hilweşîn, keça xwe bide min û were ser rêya Xwedayê bi tenê, tu û gelên xwe bêjin ji Xwedê pê ve tu Xweda nîn in, ez şahid im, ku Suleyman pêxemberê Xwedê ye. Heger tu wisa bikî, tu yê di nava ewlehî û aştîyê de jîyana xwe berdewam bikî lê heger tu wan pêk neynî, tu keleh û tevdîrên te, te jê ji nav lepên min xelas nakin. Lewre Xwedê teala ba jî xistiye bin emrê min, ez ê fermanê bidime wê, wê merşa ku artêşa min li ser e, bîne li ser serê te deyne.

Qral çawa ku ew gotin ji qasidê Suleyman bihîst, jê re got: Ez nakevim bin emrê wî û ez tu daxwazên wî jî pêk naynim. Here jê re bibêje, va ye ez bi ser wî de têm!

Qasidê Suleyman hat cem wî û peyma qral je re ragihand.

Qral jî fermana şer da û ji seranserê welatê xwe ji cin û efrîtan bi qasî hezar hezar* hebî leşker kom kirin. Ji giravên derorê û

*Di dema nîvisandina Hezar û Yek Şevê de, hejmara “miliyon” bi kar nedihat, li şûna wê “hezar hezar” bi kar dihat.

Ji çiyayan jî gelek şeytan û ciniyên serhildêr tevlî artêşa wî bûn. Qîral jî embarên xwe yên çek û cebilxaneyê vekirin û ew li ser artêşê belav kirin.

Nebî Suleyman jî artêşa xwe ji şer û cengê re amade kir, wehş û ajalên dirinde kirin du beş; yek da alîyê rastê û beşa din da alîyê çepê, ji teyr û tilûran jî xwest, ku li ser giravan bin û dema şer dest pê kir, nikulên xwe li çavên wan bidin, ji dirindeyan jî xwest ku hespên wan ji hev perçe perçe bikin. Hemûçkan jî gotin ser seran, ser çavan, pêxemberê Xwedê!

Di pey re jî nebî Suleyman ji xwe re textekî ji mermer li wê derê vegirt, ku hemû bi zêr û zîv neqişandî bû û nivîna xwe ya ji perîkên çûkan li ser danî, ew li ser rûnişt û gazî wezîrê xwe Asif Bin Biraxya kir, ew danî hêla xwe ya rastê û wezîrê xwe Demiryat danî alîyê çepê; qralên însanan danîn hêla rastê û yên cinan jî danîn hêla çepê. Mar û wehş û dûpişk û ajalên dîtir jî danîn pêşîya xwe û bi wî hawayî êrîşî ser me kirin.

Li ser dirêjahîya erdeke fireh em pê re ketin şer û bi qasî du rojan me li ber xwe da. Lê di roja sisiyan de belaya herî mezin bi serê me de hat, qedera ku Xwedê li ser enîya me nivîsîbû pêk hat. Di nava me de yên ku di destpêkê de êrîşî Suleyman kirin, ez û leşkerên xwe bûn. Wê kêlîyê min ji leşkerên xwe re gotibû: Hûn di cihê xwe de bimînin, hetanî ku ez meydanê ji Demiryat re bixwînim, pê re şer bikim, piştre hûn li wan bidin. Vêca çawa Demiryat bi ser min de hat, min bala xwe dayê, ku ew mîna çiyayekî ye, agir û pêtên wî bi rivînên xwe digihên ber perên asîman û dûmana ku bi ser dikeve, bi ewran re dibe yek. Çawa wî tîreke agirê xwe avêt min, zora agirê min bir. Pê re qîreke ew qasî ecêb da, ku min got, belkî erd û ezman li me hatin hev û em daqurtandin.

Leşkerên me û wî ketin pêxêla hev û bi yek carê êrîşî ser hev kirin, bi ser hev de qîrîyan, agir û dûman bi hewa ket û êdî hindik mabû, ku dil biqetin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 611'AN

*Şehrezadê got:*

Di neqeba herdu alîyan de şerekî giran û bêhempa dest pê kir. Teyr û tilûran ji ezmanan ve êrîş dikir, wehşên dirinde ji alîyê bejahîyê ve, ez û leşkerên xwe jî bi Demiyat û leşkerên wî re şer de bûn. Me hevdu perîşan kir, zilamên min jî betilîn, ên wî jî. Lê di encamê de leşkerên min bi bin ketin û êlên min revîyan. Nebiyê Xwedê Suleyman jî qîrek da leşkerên xwe û ez nîşanî wan dam, got: Vî hovê pîsê mirdar bibin. Însan bi însan re cinan bi cinan re şer kirin û di encamê de em bi bin ketin û em giş bûn êsîr û ketin destê Suleyman. Lewre dirindeyên wî dora me girtibûn, çûk û teyrên wî jî di ser me re bûn, geh bi lapûşkan geh bi nikulan çavên me derdixistin, dirindeyan hespên me perçe perçe dikirin, ew dixwarin. Gelek însan serê wan firyabû û mîna qurmên daran di erdê de çikilandî mabûn. Carekê min firset dît, ez ji destê Demiryat reviyam lê ew bi dû min ket û sih rojî bera dû min da, heta ku dîsa ez girtim û piştre ez ketim vî halî, çawa ku hûn dibînin.

Emîr Mûsa jê re got: Rêya ku me bibe bajarê paxir kîjan e? Efrît rê nîşanî wan da, ew jî ketin ser wê rêyê û meşa xwe berdewam kirin, hetanî ku gihîştin wî bajarî. Lê dîtin ku di neqeba wan û bajêr de bîst û pênc derî hene lê nizanibûn rê bibirina ser yekî tenê jî. Emîr Mûsa li Talib zivirî û jê re got:

Em ê çawa derbasî vî bajarî bibin? Bêguman divê em rê bibin ser derîyekî wê, ji bo ku em derbasî hundir bibin. Talib got: Xwedê ji te razîyo, ka em sê çar rojan bêhna xwe berdin, tehba ser xwe bavêjin, piştre Xwedê bê erê, em ê çareyekê jê re bibînin.

Ji bo bêhnvedanê hemû li wir daketin. Emîr Mûsa ji yek ji xulamên xwe re got: Li deveyekî siwar bibe û li hawirdora sûra bajêr bigere, belkî tu cihê derîyekî bibînî, an jî cihê qesra ku lê daketine. Ew xulamê han yekî din jî da kêleka xwe, li deveyekî siwar bûn û du roj û du şevan bê navber li dora bajêr gerîyan. Di roja sisiyan de di nava şaşwazîyeke mezin de dîsa hat gihîşt cem emîrê xwe û jê re got: Mîrzayê min, di sûra dora bajêr de devera herî nizim ev e; bilindahîya cihê mayîn, nayê wesifdan!

Emîr Mûsa, şêx Ebdilsemed û Talib Bin Sûheyl hildan kêleka xwe û çûn ser çiyayê herî bilind ê miqabilî bajêr û di ser re. Gava derketin ser wî çiyayî û ji jor ve li bajêr nêrîn, heyran û behetî man, li wan qesr û qonaxên wê yên bilind, ew qubeyên wê yên bişewq, ew darûberên fêkîyan, ew çem û kanîyên wê û ew avadanîya wê ya bêtimtil. Lê mixabin ew bajêrê xweş bi wan sûrên xwe yên bilind ji mirov û niştecihan vikîvala bû. Sikak û kolanên wî giş vala û bêdeng bûn, tenê kûkû kûkûya bûman tê de dihat.

Li ser wê rewşa bajêr Emîr Mûsa pir xemgîn bû û di ber xwe de got: Subhan ji wî afirînerê hêzdar re ku tu dem û dewran pê nikarin û ew tenê li cihê xwe sabit e!

Hîna ku wî wisa ji xwe re dua dikirin, awirên wî li heft lewheyên mermerî ketin û spîbûna wan şewq dida. Ber bi wan ve çûn û ji nêzîk ve lê meyizand, dit ku her heft lewhe jî bi nivîsan xemilandî ne. Ji şêx Ebdilsemed xwest, ku wan nivîsan jê re bixwîne. Şêx bi pêş de çû, ji nêz ve li wan nêrî, dît ku nivîsin yûnanî ne, ji bo kesê xwedî hiş behsa şîret, îbret û agahan dike.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 612'AN

*Şehrezadê got:*

Di lewheya ewil de bi zimanê yûnanî ew hatibû nivîsandin: "Pirsgirêk û mijarek li ber te ye, ku bi salan e te ew paşguh kiriye; qey tu nizanî, ku mirin li hêvîya te ye û di demeke kin de tu yê pê şa bibî? Berî ku tu derbasî Remsk bibî, ji xwe bipirse, bêje: Ka qralê vî welatî yê ku mirov tepeser diki-

rin û serkêşîya artêşên serkeftî dikir? Xwedê teala xerabkarê malan, ê xweşî û şahîyê bi ser wan de şand, ew hemû kuştin û giş ji ferehîya qesr û qonaxan derbasî tengahîya goran bûn."

Di binîya wan gotinan de jî bi helbestî ev hatibû nivîsandin:

kanî qral û temendirêjên ser rûyê gerdûn
her tişt li pey xwe hiştin û giş tev de çûn
li gora karê xwe hîç bûn rehîneyên goran
hûrhûrî bûn arî dîsa li axê vegerîyan
kanî ew qasê leşker kanî fêdeya wan
kanî ew malên ku kiribûn bi salan
fermana Xweda pir bi lez hate ser wan
tu kes xelas nebû ji ber emrê Xwedan

Bi xwendina van helbestan Emîr Mûsa girîya û rondik ji çavên wî hatin xwarê, piştre got: Bi navê Xwedê ji zuhd û teqwayê çêtir tiştek nîn e! Di pey re gazî kir katiban û ji wan xwest, ku wê nivîsa li ser lewheya ewil li cem xwe tomar bikin.

Emîr Mûsa çû ber lewheya duduyan û ji şêx Ebdilsemed xwest, ku nivîsa li ser wê jê re wergerîne. Şêx got: Nivîs dibêje: Gelo çi te bi xwe ve mijûl kir û nehişt, ku mirin bê bîra te ey binî Adem? Çi hişt ku tu ji ser xwe here, qey te nizanibû, ku dinya digere û bi dorê ye? Qey te nizanibû ku mana li vê dinê demkî ye û dê her kes ber bi axîretê ve here? Ka ew şahên ku Îraq ava kirin û baskên xwe avêtin ser çar hêlên cîhanê? Kanî ew ên ku Esfehan û xorasan ava kirin? Bangewaziya mirinê ji wan re çû, hemû jî li pey wê çûn û tu tiştên ku ava kiribûn ji wan re nebû şefîê mirinê.

Şêx hilmek girt û berdewam kir: Ev beytên jêrîn jî bi helbestî ne:

kanî ew avakar û avadanên van qesran
ode bi ode çêkirin û ew dane ber xemlan
leq bi leq kom kirin wan leşkerên giran
lê hemû têk çûn li ber fermana Xwedan
kanî ew kesra, ew sûr û kelehên giran
hemû çûn li şûna wan ma kavilistan

Emîr Mûsa dîsa girîya û got: Welehî em ji bo mijareke girîng hatine afirandin. Piştre ji katiban xwest, ku wê nivîsê jî tomar bikin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 613’AN

*Şehrezadê got:*

Emîr Mûsa û zilamên xwe çûn li her lewheya sisiyan sekinîn, şêx jê wergerand: Ey kurê Adem guh bide min! Tu bi dinîyê ve mijûl bûyî û te Xwedayê xwe ji bîr kiriye û roj bi roj temenê te jî ber bi dawîyê ve diçe lê dîsa jî tu bê xem î. Êdî xwe amade bike ji roja civanê re, ji hevdîtina bi Xwedayê xwe re.

kanî sazûmankarê Hind û Sindê
ka ew gewretirîn hakimê erdê
ew cebar û kujerê Hebeş û zincîyan
ew ê ku serî rakir li ber zatê Xwedan
wî piçek rehetî jî nedît di gorê da
kurmikan laşê wî xwar di axê da
pir pir zîrek û zanayê şer bû ew
dîsa jî rizgar nebû ji mirinê ew

Emîr Mûsa careke din girîya, hêsir barandin û ber bi lewheya çaran ve çû. Şêx nivîsa li ser wê jê re wergerand: Ey kurê Adem! Xwedayê te timî demê dide te û roj bi roj temenê te dirêj dike. Lê tu qet şiyar nabî ji xewa şêrîn û xweşîyên dinyayê? Ma qey wî ji te re got, ku tu qet namirî? Qet neyê xapandin bi şev û rojên kêf û şahîyê û baş bizanibe, ku mirinê xefik li pêşîya te vedaye û her an dibe ku bi te vede! Haydar be ji êrîşên wî û xwe jê re amade bike. Nebêje temenê min ji min tête dizîn û xweşîyên dinyayê ji destê min direvin û nekeve pey wan. Gotina mezinê Xwedayan guhdar bike û baş fêm bike, ku ew dinya demkî ye, mîna mala pîrê ji benikên lawaz hatiye hûnandin.

gelo ka ew ê ku şaristanî ava kir
ka ew ê ku sûr li sûran bilind kir
kanî niştecihên van qesr û qonaxan
çima nîn e li pey wan pêjna tu saxan
di goran de ne giş li bendî hesaban
tenê Xwedê baqî ye lê bike silavan

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 614'AN

*Şehrezadê got:*

Emîr Mûsa dîsa girîya, hêsir barandin û bi lez ji ser serê wî çiyayî daket, piştî ku sûretekî dinyayê li ber çavên wî sêwirî, ku cara ewilî bû, didît. Hat cem leşkerên xwe û dîsa bi hevdu şêwirîn li ser rêbazekê bo derbasbûna wî bajarî. Piştre Emîr Mûsa ji Talib Bin Sûheyl û zilamên xwe yên aqilmend re got: Gelo em ê çawa derbasî vî bajarî bibin û ji xwe re li wan ecêb û tiştên seyr û erjeng temaşe bikin. Heta belkî em tiştin giranbuha tê de bibînin, ku em wan bibin ji emîrê bawermendan re û ber dilê wî xweş bikin, xwe jî nêzikî wî bikin? Talib Bin Sûheyl got: Xwedê temenê mîrê me dirêj tir bike, heger tu bi ya min bikî, ka em ji xwe re nêrdewanekê çêbikin û em hilkişin ser sûrê, belkî ji hundir ve em bikaribin xwe bigihînin derîyekî? Emîr got: Fikra herî baş ew e, çima berê nehatibû bîra me!

Vegerîyan cem xerat û hesinkaran û ji wan xwest beştan rast bikin û nêrdewaneke bi hesin rapêçayî çêbikin. Ew jî mehekê sax pê ve mijûl bûn, li ser wê xebitîn û ew baş qewîn çêkirin. Hemû leşker û xulam lê hatin hev û mil dan mil hetanî ku ew rakirin û spartin sûrê. Bejna nêrdewanê tam li gora bejna sûrê çêbûbû. Emîr Mûsa bi kêfxweşî got: Kî ji we dikare bi nêrdewanê ve hilkişe, here ser sûrê û li ser bigere, ji bo ku cihekî daketinê tê re bibîne û li me vegere, me agahdar bike, bê çawa derî vedibe?

Yekî ji wan got: Ez dikarim hilkişim mîrzayê min!

Emîr Mûsa jê re got: Nexwe tu hilkişe, Xwedê te bisitirîne û hêzê bide te. Zilam bi nêrdewanê ve hilkişîya, heta ku giha ser sûrê. Piştre rabû ser lingan û li bajêr nêrî, dûre gîrîya, li çepikan da û got: Tu çi qasî spehî û xweşik î! Pê re jî xwe çeng kir wî alîyê sûrê û şelpîn jê hat, li erdê ket hûrî hûrî bû. Emîr Mûsa got: Ev biaqilê wan bû wisa kir, de êdî dînê wan dê çawa bike?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 615'AN

*Şehrezadê got:*

Emîr Mûsa got: Heger biaqilê wan wisa tevgerîyabe, Xwedê dizane bê yên mayîn dê çawa tewbigerin! Ew jî wisa bikin, kes ji me namîne û êdî em nema dikarin daxwaza emîrê bawermendan jî pêk bînin. Ka rabin em

herin, tu pêdivîya me bi vî bajarî nîn e! Hinek ji leşkeran li ber wî gerîyan û gotin, belkî hinekên xwînsartir û girantir di nav me de hebin, ka em şensekî bidin wan jî?

Zilamekî din çû, yekî din çû, yekî din çû û wisa berdewam kirin, hetanî ku dozdeh zilamên wan di Sûrê wer bûn û hemûçkan jî heman tişt digot û xwe bi alîyê din ve davêt. Şêx Ebdilsemed got: Wisa xuya dike, ku ev kar karê min e û ne ez bim, em encamê nagirin. Emîr Mûsa got: Tu meke û ne gengaz e ku ez bihêlim tu hilkişî ser vê sûra bilind. Lewre ger tiştek bi te bê, em ê giş têk herin, ji ber ku rêzanê me yê bi tenê tu yî. Şêx lê vegerand û got: Kesê ku dîtiye û ceribandiye, ne weke kesê ecemî ye. Xwedê hez ke, dê ew yek li ser destê min çêbibe! Hemû leşker û aqilmend jî di van nêrînên wî de bûn yek. Şêx Ebdilsemed rabû ser xwe, dest û milên xwe hilatin, nav di xwe da, got: Bismîllah û bi nêrdewanê ve hilkişîya. Pê re jî ayet ji Quranê dixwendin û duayên serkeftinê ji Xwedayê xwe re dikirin. Gava ku gihîşt ser pişta Sûrê, rabû ser lingan, li bajar temaşe kir û li çepikan da. Lê hevalên wî giş, di cî de pê de qîrîyan û gotin: Meke şêx, tu jî meke û xwe ji wir navêje erdê. Bi Xwedê heger tu herî, em ê giş herin.

Şêx Ebdilsemed kenîya û li sûrê rûnişt û bi qasî saetekê, dirêj dirêj Quran xwend û dua kirin. Piştre rabû ser xwe û bi dengekî bilind ji jor ve axivî û got: Ey Emîrê hêja,bila dilê we aram be, Xwedê alîkarîya min kir, hêz da min û bi xêra wî min xefika şeytanê lanetlêhatî vala derxist. Emîr Mûsa got: Te çi dît şêx? Şêx got: Ez çawa gihîştim ser sûrê, min deh jinên mîna deh heyvan dîtin, ku gazî min dikirin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 616’AN

*Şehrezadê got:*

Şêx Ebdilsemed vegotina xwe berdewam kir: Her deh jinan gazî min dikir û jêr jî ji min re mîna behrê xuya dikir. Destpêkê min jî xwest, ku ez xwe berjêr berdim, mîna hevalên xwe. Lê gava min meytên wan li jêrê dîtin, min xwe girt û çend ayet ji Qurana pîroz xwendin. Bi wê efsûna wan xera bû û dev ji min berdan, çûn. Bêguman xwediyên vî bajarî ev efsûn û xap çêkirine, ji bo kî bixwaze were bajêr û dest deyne ser, bikeve vê xefika wan û bi şûn de bireve. Va ye meytên hevalên me jî li jêr in.

Piştre, şêx li ser sûrê meşîya û çû hetanî ku gihîşt herdu bircên ji paxir. Dît ku du derîyên ji zêr li ber wan in, ne xilq bi wan ve hene û ne jî nîşaneyên vekirinê. Şêx li ber derîyekî sekinî û lê meyzand. Dît ku di nîvê derî de nîgara siwarekî ji paxir heye, ku destekî wî dirêjkirî ye, çawa ku tiştekî nîşanî mirov bide û li ser kefa destê wî jî nivîsek heye. Şêx ew nivîsa hanê xwend. Nivîsê digot: Bizmarê di nafika siwar de dozdeh caran bifirikîne, dê derî vebe!

Şêx careke din bi hûrgilî li siwar nêrî, dît ku bizmarekî asê di nafika wî de heye. Ew dozdeh caran firikand, derî di cî de vebû lê bi vebûna wî re dengekî ecêb jê derket, mîna dengê birqê. Şêx Ebdilsemedê giryayî, mirovekî pir zana û kamil bû, bi hemû zimanan dizanibû û dikarîbû hemû şêweyên destnivîsan jî bixwenda. Bi hêdîka di derî re derbas bû û ket navbireke dirêj û bi derenceyekê re xwe berjêr ve berda. Li jêr ket hêwaneke mezin, ku hawirdorên wê tijî kursîyên spehî bûn, li ser wan jî meytên rûniştî hebûn, ku hîna xûdeyên wan di serê wan de bûn, şûr û mertalên wan di destên wan de bûn, tîr û kevanên wan bi milên wan ve bûn, çawa ku hîna jî di şer de bin. Du heb stûnên hesinî jî li pişt derî bûn, li gel gelek beşt û text û amûrên din ên asêkirinê û xilqên ku li ber derî bûn.

Şêx Ebdilsemed ji xwe re got: “Bi dibêtîyeke mezin wê mifteyên van kilîtan di berîka yekî ji vana de be!” Bi hûrgilî hemû di ber çavan re derbas kirin, herî dawiyê jî awirên wî li ser yekî sekinîn, ku ew extiyarê wan dihat xuyakirin. Di dilê xwe de ji xwe re got: “Hebe tune be mifteyên derî li cem vî ne, lewre wisa xuya dike, ku ew derîyê bajêr e û ev pasevanên vir jî di bin destê wî de ne!” Hinekî din ber bi wî ve çû, destê xwe avêtê, kincên wî hildan, mifteyan di bin de xuya kirin, bi newqa wî ve girêdayî bûn. Şêx pir kêfxweş bû û hindik mabû, ku baskên wî çêbibin.

Şêx rahişt mifteyan û çû ber derî...

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 617’AN

*Şehrezadê got:*

Şêx Ebdilsemed kilîdên derî yek bi yek vekirin, piştek ji ber kişand, stûnên hesin û text ji ber dan alî û derî kişand. Çawa kişand, derî vebû lê dengekî ecêb mîna yê birqê derxist! Şêx eşheda xwe anî û bû “Allahûekber!”ên wî! Dengê wî çû hevalên wî, wan jî pê re dest bi tekbîran kirin û bi

dengê şêx gelekî kêfxweş bûn. Emîr Mûsa jî bi wê yekê gelekî kêfxweş bû, ku şêx hîna sax dît û derîyê kelehê li ber xwe vekirî dît. Gelekî spasîya wî jî kir li ser vî karê giring ê ku pê rabûbû. Çawa ku derî vebû, leşker, pasevan û xulam jî hêdî hêdî derbasî hundir bûn. Lê Emîr Mûsa li wan kir gazî û got: Em hemû bi hev re û di heman cihî re derbas bibin, ji bo ewlehîya me nebaş e, bi kêmanî em nîvî bi nîvî derbas bibin, piştre bila nîvê mayî jî were! Destpêkê nîvî derbas bûn, piştre jî nîvê mayî. Li wî alîyê sûrê, dîtin ku meytê hevalên wan li wir in, ew veşartin. Piştre derbas bûn, çûn nav sûka bajêr, dîtin ku çi sûkeke mezin û bi heybet li ber wan e!

Hemû di hundirê hev de bû û dikanên wan hîna vekirî bûn, mêzînên wan daliqandî bûn, paxir sef bi sef bû. Xan û embar tijî bûn, hemû şûrên wan kişandî bûn. Mertal û cewşen, tîr û kevanên wan dalaqandî bûn, zincîr û bazinê ji zêr, zîv, gewher û yaqût hemû di dikanan de raxistî bûn, tacir û bazirganên wan jî hemû di cihê xwe de miribûn, çermên wan hişk bûbûn, hestîyên wan tê re derketibûn û bûbûn îbret ji îbretxwazan re! Li çar heb sûkên serbixwe jî nêrîn, ku dikanên wan giş tijî mal û eşya bûn, dev ji wir berdan û çûn sûka herîr, bala xwe danê, ku hemû cureyên hevreşîmê sor û spî û dibac di dikanan de rêzkirî ne û dikandar jî di cihê xwe de mirî ne. Ji wê derê, berê xwe dan sûka zêr û cewheran, li wir jî dîtin, ku dikan tijî yaqût û mercan û lûlû ne û xwediyên wan jî tê de mirî ne. Dev ji wir jî berdan û çûn sûka serafan. Li wir jî dîtin, ku dikanên wan tijî zîv û zêr in lê serraf bi xwe, hemû di nav kincên hewrîşimî de mirî ne. Dev ji wan jî berdan û çûn sûka etaran, bala xwe danê, ku dikanên wan jî tijî misk û ember û kafûr û hemû cureyên bêhnê ne. Xwediyên wan dikanan jî hemû di cihê xwe de mirî bûn.

Gava ku ji sûka etaran derketin û çûn, dîtin ku li nêzîkî wê derê qesreke neqişandî û pir xweşik heye. Derbasî qesrê bûn, bala xwe danê, ku hundir tijî alên vekirî, şûrên ji kalanên xwe kişandî, mertalên daliqandî, zincîrên zêr û zîv, xûdeyên bi zêrê sor rapêçayî, û tîr û kevan in. Di eywana qesrê de jî dikek ji acê bi zêr neqişandî hebû, ku doşekên hewrîşimî li ser raxistî bûn û zilamin jî li ser dirêjkirî bûn, ku çermê wan bi hestîyên wan ve hişk bûbû, çawa ku ji birçînan miribin.

Emîr Mûsa ecêbmayî di cihê xwe de sekinî, li wê ezamet û ihtîşama qesrê nêrî, bi heyrangorîyeke mezin û subhan ji Rebê xwe re xwend, selewat dan. Li çêkirinê û spehîbûna avakirina wê qesrê behetî mabû. Hemû dîwarên wê bi lacewerdê kesk û neqişandî bûn û ev helbest jî li ser nivîsandî bû:

baş binêre li vê dîmenê rêwîyo ev bêveger e
bi baldarî meyze ke lê berîya ku tu here
ne bexîl bî comerd be bi mêvanê xwe re
jîyaneke ne domdar e keko rojekê dê here
meyze ke li wan kesên ku qesrên xwe xemilandine
hemû tev jî girtî û êsîrên wan malên xwe ne
qesr û qonax û malkomkirin karekî pûç e
kesî bi diravan xwe rizgar nekiriye ji sûc e
çiqase xeyal kom kiribûn van mirovan
lê hemû giş bi avê de çûn xelk jî çûn goran

Bi vê helbestê re, Emîr Mûsa dîsa girîya, hêsir barandin, hetanî ku ji ser hîşê xwe çû. Piştre gava bi ser xwe ve hat, ji katiban xwest, ku wê helbestê li cem xwe tomar bikin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 618'AN

*Şehrezadê got:*

Emîr Mûsa gera xwe di wê qesrê de berdewam kir û hat cihekî fireh û mezin, ku çar dikên rûniştinê tê de hebûn; pir bilind û rengîn bûn û bi zêr û zîv neqişandî bûn, di nava wan de jî ji mermer avpîjeneke mezin hebû û ser wê jî bi çadireke hevrîşimî hatibû girtin. Ber bi her dikeke rûniştinê de jî fiskiyeke (avpîjokek) biçûktir hebû û di binîya her yekê ji wan de jî hawizek hebû, ku dîwarên wan jî ji mermerê neqişandî bûn, ava ku ber bi wan ve deherikî jî, di binîya dika rûniştinê re diçû. Bi wî hawayî dibûn çar av û her çar av diherikîn goleke mezin a ku bi mermerên rengorengo çêkiribûn.

Emîr Mûsa ji şêx Ebdilsemed re got: Kanî me derbasî vê dîwanê bike! Şêx da pêşîya wan û derbasî dika rûniştê ya ewil bûn. Bala xwe danê, ku ew der tijî zêr, zîv lûlû, gewher, yaqût û gelek madenên giranbuha ne. Li gel wan jî, gelek sindoqên hewrîşimê sor û zer û spî hebûn. Ji wê derê, derbasî dika meclîsa duduyan bûn, bala xwe danê, ku tijî sindoq in. Yek ji sindoqan vekirin, dîtin ku tijî çek û amûrên şer in, ji xûdeyên zêrîn, mertalên dawidî û şûrên hindî hetanî bi rim û cunehên xwarizmî û gelek amûrên din ên cengê, ku nedihatin jimartin, ji wir derbasî dika rûniştê ya sisyan bûn, bala xwe

danê, ku tijî sindoqên xiliqandî ne û perdeyên neqişandî bi ser wan de dakirine. Yek ji wan sindoqan vekirin, dîtin ku mişt e bi çekên neqişkirî û xemilandî bi zêr û zîv û gewheran. Herî dawiyê derbasî dika rûniştê ya çaran bûn, bala xwe danê, ku tijî sindoqên dagirtî bi sênî, beroş, tas û hemû edewatên xwarinê û vexwarinê yên ji zêr û zîv, qedehên bi lûlû rapêçayî, yên bi eqîq û durran hûnayî û gelekên din ên cur bi cur û ji madenên giranbuha. Her leşkerekî, her yekî ji wan, çi jê re lazim bû, rahîşt wî û wisa ji wir derketin.

Gava nêt kirin, ku ji wê eywanê derkevin, deriyekî ku di nîvê qesrê de bû, bala wan kişand. Derîyekî mezin, di hev derbasbûyî û ji ebenos û ac û sacê bû, bi şerîtin zêr jî neqişandî bû û perdeyeke ji hevrîşimê neqişandî bi ser de berdayî bû. Xilqin ji zîvekî spî li ser bûn, ku incex bi hîleyan vedibûn, ne bi mifteyan. Şêx Ebdilsemed pê ve çû, bi zanîn û wêrektî û zîrektîya xwe ew vekir û di wî derîyî re derbasî navbirekê bûn, ku ji mermeran hatibû çêkirin û li ser herdu hêlên wê jî nîgarên gelek ajalên dirinde û teyr û tilûran bi zêrê sor û zîvê spî hatibûn çêkirin. Çavên wan jî hemû ji durr û yaqût bûn, mirov mest dikirin gava mirov li wan dinêrî.

Gava hinekî din bi pêş de çûn, di wê navbirekê de, rastî hêwanekê hatin, ku ew jî bi mermerê neqişandî bi gewheran, hatibû çêkirin. Meşa xwe ji wir jî berdewam kirin û vê carê rastî hêwaneke din î xweşik hatin, ku her kesî bi heyrangorîyeke mezin lê temaşe kir. Te digot qey avek di neqebê de diherike û heger mirov pê lê bike, mirov dê bişemite. Loma Emîr Mûsa got: Tiştekî bavêjin ser, piştre em tê re derbas bibin, dê çêtir be. Leşkerên wî fermana wî pêk anîn, ew jî tê re derbas bûn. Gava ku di wir re bihurîn, derbasî hêwaneke din bûn, ku bi keviran hatibû lêkirin û zêrê sor hatibû rapêçandin. Ji wir jî derbasî qubeyeke pir mezin bûn, ku di heyata xwe de kesî ji wan tiştekî wilo nedîtibû. Di hundirê wê qubeyê de qubeyeke din hebû, ku bi mermeran hatibû avakirin û hawirdora wê şibake bûn. Çarçoveyên wan şibakeyan bi zumrudan hatibû perçinandin. Di hundirê wê de jî çadireke hevrîşimî vegirtî bû, li ser stûnên ji zêrê sor. Di bin wê çadirê de jî çûkin hebûn, ku nigên wan ji zumrudê kesk bûn û di bin nigên her yekî ji wan çûkan de jî torek ji lûlûyê terr hebû, ku ew jî di ser avpîjokekê re bû û li ser avpîjokê jî textekî bi durr û gewher û yaqûtan perçînkirî hebû. Li ser wî textî jî nivîneke ji hevrîşim û li ser nivînê jî jinek hebû, ku weke rokê dibiriqand, ku tu kesî jineke mîna wê xweşik nedîtibû. Li ser laşê wê jî, kincekî ji lûlûyê ter û li ser serî jî taceke ji zêrê sor û toqeke ji gewher hebû. Di stûyê wê de jî gerdaniyeke ji gewher û li newqa wê jî kemereke bi zêr û zîv neqi-

şandî hebû . Li herdu kêlekên wê jî du cewher hebûn, ku mîna rokê şewq didan. Sekna wê jî bi wan wisa xuya dikir, ku çawa çavên wê li ser wan be.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 619'AN

*Şehrezadê got:*

Îcar gava Emîr Mûsa çav li wê jinê ket, behetî ma li wê spehî bûna wê û bi herdu hinarkên wê yên sor û porê wê yê reş pir bandor bû. Mirov bi wê dîmena wê digot belkî sax e, ne mirî ye, mîr jî wisa fêm kir û jê re got: Silava Xwedê li ser te be carîyeya hêja! Talib Bin Sûheyl lê vegerand û ji mîr re got: Xwedê alîkarê te be, mîrê min! Ev jinik mirî ye û bê giyan e, îcar wê çawa bersivê bide te?

Piştre Talib Bin Sûheyl mijar ji mîr re rave kir û got: Emîrê min; ev dîmeneke sazkirî ye û bi zanebûn hatiye amadekirin. Pîştî ku ev jinik miriye, herdu çavên wê derxistine, zîbeq xistine binî û çavên wê dîsa li cihê wan vegerandine, loma wîsa dibiriqînin, çawa ku mijankên xwe ji mirov re bikutkutîne. Emîr Mûsa got: Subhan ji wî re! Talib vegotina xwe berdewam kir: Nivîna ku ew li ser e jî, du çavînk di bin de hene, di her çavînkekê de jî bendeyek heye, yek ji wan spî ye, yê din reş e. Di destê yekî ji wan de amûreke ji pola heye û di destê yê din de jî gewhereke ku mirov kor dike, heye. Di navbera destên herdu bendeyan de jî lewheyeke zêrîn heye, ka bila şêx Ebdilsemed nivîsa li ser wê ji me re bixwîne?

Şêx nîvîs xwend û wergerand: Bi navê Yezdanê dilovan û mehrîban. Spas ji Xwedê re ku mirov afirandine. Ew e Xwedanê Xwedanan û sebebê hemû encaman; ew e baqîyê bê zewal, qadirê zulcelal, ew e serwerê gerdûn, di dest wî de ye qeder û yekûn. Ey kurê Adem! Çima tu ew qasî nezan û cahilê hêvîyê yî û tu ew qasî jî ji mirinê be xeber û bê agah î? Qey tu nizanî ku mirin ji bo te ye û menzîla ruhê te her dem bisînor e? Îcar tu jî xwe amade bike ji çûnê re, lewre zemanê koça te hatiye û gelekî nêzik bûye. Li derdora xwe binêre û ji xwe bipirse: Kanî Adem, bavê mirovan gişan? Kanî Nûh û qewmê wî? Kanî kesra, qeyser û hemû giregirên qralên din? Kanî qralên Îraq û Hindistanê? Kanî qralên çarmedorên cîhanê û ew qas lehengên cebar? Hemûçkan bar kirin, çûn malên xwe vala hiştin û ji dost û welatên xwe dûr ketin. Kanî ew qas milûkên ecem û ereban? Hemû mirin, bûn xwarina ajal û kurmikan. Kanî

ew qas mîr û wezîr û mîrzade û giregirên bi nav û deng? Hemû mirin. Kanî Qarûn û Haman; kanî Şedad Bin Ad; kanî Kenan û zul-ewtad? Hemû têkçûn û malên wan vala man, kesî qûtekî xwe ji bo qiyametê bi dest nexist. Îcar xwe amade bikin ji bo bersivandina pirsên Xwedayê gewre!

Ey kurê Adem! Heger tu min nas nakî, ez xwe bi te didim nasandin: Ez Tirmizî keça qralê qralan, ê ku dadwerî li welat saz kir û milkê xwe mezin kir, hetanî ku ser rûyê erdê giş girt. Milkê tu kesî bi qasî yê min çênebû. Min dadwerî di nava xalkê de saz kir, xêr û bêr anî welat û xelat û hediye li her kesî belav kirin. Bi salan di nava xweşî û şahîyê de ez jiyam. Min bende û qerwaş azad kirin û jîyana her kesî xweş kir, bi qasî ku her kes ji min memnûn bibe. Hetanî ku felaket bi ser me de hatin û heft salan li ser hev, dilopeke baranê bi tenê jî bi ser me de nebarîya.

Gîhayekî şîn bi tenê jî li ser rûyê erdê nema. Wê çaxê min malekî mezin ji xezîneyê derxist, bi ritilan pîva û da destê kesên pêbawer û min ji wan xwest, ku herin li hemû welatên dinyayê bigerin, da ku hinek qût ji me re bînin. Lê tiştek nedîtin. Piştî demeke dirêj destvala li me vegerîyan, me jî hemû erzaqê di destê xwe de qedandibû. Wê çaxê, me gişan malên xwe yê veşartî derxistin pêş çavan, me derîyên sûra bajarê xwe girtin û me xwe spart Xwedayê xwe, em man li benda qedera xwe. Piştre em giş mirin -çawa ku hûn dibînin- û tiştê ku me ew bi salan kom kiribûn jî, me ew li dû xwe hiştin û me ji vê dinyê koç kir, em çûn.

Ev in agahîyên derbarê me de û encam jî jixwe hemû li ber çavên we ye.

Li jêra lewheyê, nivîsê bi helbestî berdewam dikir:

sêwîko bes kom bike û bide ser hev
mal û milkê hemû pûş e qet nede ser hev
va tu jî rêwî yî bo pûç e qet nîn e tu tew
diyar e ku dunyahez î tu gelekî bi daxwaz
berîya te jî gelekan şopandin ev şêwaz
wan jî kom kirin zêr û zîv bê rê û rêbaz
ne mirin di bîra wan de ne jî qeder
bi hêz û artêş ewan dajote ser her der
dikuştin digirtin talan dikirin her der
gelek mal û dol hiştin ewan li pey xwe
lê hemû bê fêde bû ji bo wana bi xwe
dilşikestî çûn gorê hemû bi tena serê xwe

Gava ku emîr ew gotin bihîstin, girîya û got: Teqwa û bawerî, serê her tiştî ye û rêça heqîqetê ye; mirin jî pîvaneke sereke ye ji bo bîr û bawerîya mirov.

Şêx wergera nivîsa ser lew heyê berdewam kir û got: Îbretê bigirin ji ewên ku li pêşîya we binax bûn û vegerin ser rêya heqîyê. Qey hûn nabînin bê çawa kalbûn tê û berê mirov dide gorê? Qey hûn bangewaziya porê xwe yê spî nabihîzin? Şiyar bin di vê hêlê de û her dem amade bin ji çûnê re!

Ey kurê Adem, çima dilê te ew qasî hişk e û dûrî rûyê Xwedayê xwe ye? Tu nabêjî ka ew qas mîr û emîr û wezîrên berê? Çima tu îbretê ji wan nagirî û nabêjî ka ew qralên çînê yên hêzdar û biheybet? Kanî ew anîyên ku Şeddat Bin Ad ew ava kiribûn? Û Umer Bin Nemrûd ê ku serî li ber Xwedê rakir? Kanî ew Ferqûn ê ku Xwedê înkar kir û meydan jê re xwend? Hemû têkçûn li himberî mirinê û kes ji wan nema; ne mêr ne jin, ne zarok ne mezin, qira hemûçkan het û şopek jî li dû wan nema.

Ey ew kasê ku hetanî vir hatiye û ev rewşa me dîtiye! Baş bizanibe, ku pesindanî bi dinyayê nabe; lewre dinya bêbext e, xapînok e û malwêran e. Xweska bi wî yê ku hayê wî ji gunehên wî heye û ji Xwedayê xwe ditirse û bi dilnizmî danûstendinê bi xelkê re dike, alikarî û hevkarîya wan dike, nan û ava jar û feqîran dide wan û xêr û xêratan dike. Çi kesê ku were vî bajarê me û derbasî hundir bibe, bi izna Xwedê, çiqas mal dixwaze, bila ew qasî bi xwe re bibe. Lê bila tiştekî ji ser bedana min nebe, lew re laşê min disitirînin. Xwedê alîkarê wî û wî bisitirîne ji xerabiyan. Bila ev şîreta min be ji wî re û emaneta min be ji bo wî. Ez hêvîdar im, ku tu yê her tim parastî bî ji xerabîyê. Silav û rêz

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 620'AN

*Şehrezadê got:*

Emîr Mûsa, gava ku ew gotin bihîstin, dîsa girîya hetanî ku ji ser hişê xwe çû. Gava bi ser xwe ve hat, tiştê ku dîtibû û yê ku hatibû xwendin, hemû li cem xwe tomar kir; piştre ji zilamên xwe re got: Têran bînin û bi van zêr, zîv cewher û sênî û entîkeyan dagirin.

Talib Bin Sûheyl ji Emîr Mûsa re got: Emîrê min, ma em ê vê jinika han wisa di vî halî de bihêlin, bêyî ku em wê bi xwe re bibin? Halbukî tiş-

tekî weke wê li ser rûyê erdê peyde nabe û buhayê wê nayê pîvan! Hediye û dîyarîya herî baş ev e, ku em wê pêşkêşî xelîfe bikin, dê qîmeteke me ya baş li cem wî çêbibe?

Emîr Mûsa got: Qey te nebihîst, bê jinikê çi wesîyet kiriye di vê lewheya ku hat xwendin de; bi taybetî jî gotibû, ev emaneta min e di stuyê we de û em jî ne kesin bêbext in, ku xayîntîyê bi emanetê re bikin!

Wezîrê wî Talib got: Ji bo wan gotinan tu van zêr û cewheran li vir dihêlî û jinik mirî ye , qey wê mirî çi bikin ji xeml û xêza zindîyan û çû fêdaya wan tê de heye? Kincekî pembo besî wê ye, ji bo ku em wê pê bistirînin, ên mayî heqê me ye, em ê bêtir fêdeyê jê bibînin! Pê re ber bi nêrdewanê ve çû, bi pêlikên wê ve hilkişîya, da ku tiştên li ser jinikê bîne. Lê çawa ku gihîşt hinda herdu bendeyan, yekî ji wan ji paş be li pişta wî da û yê din jî şûrê di destê xwe de li stûyê wî da, serê wî firand, serî û laş bi hev re gindirîn jêr û li erdê bû term.

Emîr Mûsa got: Rehma Xwedê ne li te be û cihê te ezab be rebî! Ma qey ev qas mal û cewher ne besî te bû? Lê bêguman temahî mala xwediyê xwe xera dike!

Piştre ferman da leşkeran, got: Wan têrên zêr û madenan bar kin û piştre derîyê wê derê dîsa mîna berê bigirin. Barê dirav û zêran bar kirin, derî jî mîna berê girtin û dîsa rêwîtîya xwe berdewam kirin, çûn hetanî ku gihîştin ser çiyayekî ku li deryayê dinêrî û mişt şikeft bûn. Di wan şikeftan de jî xelkin reşik hebû, ku kumên dirêjik li serê wan bûn û kemer di newqa wan de bû, ji ber ku kesî ji wan bi zimanê leşkeran nizanibû, hemû di cî de revîyan, zarok û jinên xwe jî di devê şikeftan de li dû xwe hiştin.

Emîr Mûsa ji Şêx Ebdilsemed re got: Ey Şêx Ebdilsemed, ev qewmê hanê kî ne? Şêx got: Ev daxwazkarên emîrê bawermendan in.

Li wir sekinîn, barên xwe danîn, konên xwe vegirtin lê dîsa jî dilê wan aram nebû, hetanî ku qralê reşikan nehat cem wan û bi zimanê erebî bi wan re neaxivî . Qralê wan tenê bi erebî dizanibû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 621'Ê

*Şehrezadê got:*

Gava ku konê xwe vegirtin û barê xwe danîn, qralê reşikan ji çiyê daket cem wan û bi erebî silav li Emîr Mûsa kir. Wî jî bi germahî silava wî girt û jê pirsî, got: Beguman hûn ji cinan in, loma hûn bi tena serê xwe ne li ser vî çiyayî û dûrî xelkê? Qral got: Na wele em jî ademî ne ji dola zarokên ham, kurê Nûh silavên Xwedê lê bin. Ev deryaya hanê jî navê wê Kerker e.

Emîr Mûsa got: Lê hûn çawa pê hesîyan e û tu qasid û pêxemberên Xwedê nehatine van deveran? Wî got: Emîrê hêja, zilamekî ku şewqa wî dide erd û ezman, her car ji nav ava vê behrê derdikeve û bi dengekî bilind gazî dike, ku dûr û nêzik hemû jê dibihîzin; dibêje: Ey zarokên Ham! Fedî bikin ji ber ew ê ku dibîne û nayê dîtin û bêjin: La îlahe îlalah, Muhemeden resûlulah! Vêca ez jî Ebûl Ebbas im. Berê me ji hevdu re îbadet dikir lê piştre em vegerîyan ser rêya rast û me îbadeta Xwedayê heq kir. Di vê mijarê de fêrî gotinên rast jî bûne.

Emîr Mûsa got: Kîjan gotin? Qralê reşikan got: Ji Xwedayê bi tenê pê ve, tu Xweda tune ne û tu şirîk û heval û hogirên wî jî tune ne, bi tena serê xwe ye. Ew e serwerê her tiştî, hemd û sena ji wî re. Ew ê yê diafirîne, yê dikuje û hêza wî digihêje her tiştî. Em bi van gotinan xwe nêzî Xwedayê xwe dikin, ji wan gotinan pê ve, em tiştekî din nizanin. Her şeva înê em nûrekê li ser rûyê erdê dibînin û em dengekî dibihîzin, dibêje: PÎROZ E, SILAVDÊR E EW XWEDAYÊ RUH Û FERÎŞTEYAN! SUBHAN JI WÎ RE, HER TIŞT BI VÎNA WÎ DIBE, TIŞTEK BÊYÎ WÎ NABE! HEMÛ XÊR Û XWEŞÎ JI BA XWEDÊ NE, HEMÛ QENCÎ JI BA WÎ NE! HÊZ Û QEWETA ME GIŞAN JI BA WÎ YE!

Emîr Mûsa jê re got: Em jî xelkên xelîfe û qralê Îslamê Ebdulmelîk Bin Merwan in, em bo wan qumqumên hezretî Suleyman hatine vir. Tê gotin, ku ew qumqumên ku cin tê de êsîrgirtî ne, di binî vê deryaya we de ne. Qralê me, ji me xwestiyê, ku em çend qumquman ji wanan jê re bibin.

Qralê reşikan jê re got: Ser seran, ser çavan, em ê daxwaza we pêk bînin. Di pey re goştê masîyan ji wan re anîn, qedr û qîmeta wan girtin û ji xewasên xwe xwest, ku xwe bera binî behrê bidin û hinek qumqumên Suleymanî derxin.

Xewasan xwe bera bin avê dan û dozdeh qumqum ji wan re derxistin. Emîr Mûsa, Şêx Ebdilsemed û hemû leşker, pir kêfxweş bûn, ku piştî ew qas tehb û westan daxwaza xelîfeyê xwe pêk anîne.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 622’YAN

*Şehrezadê got:*

Emîr Mûsa dîyarîyin gelek xweşik û balkêş pêşkêşî qralê reşikan kir û gelekî spasîya wî kir. Qralê reşikan jî dîyarîyeke pir taybet ji entîkeyên behrê pêşkêşî Emîr Mûsa kir, ku dişibiya mirovan û dirûvên însanan pê diket. Piştre got: Di mêvantîya we ya her sê rojên derbasbûyî de me goştê vî masîyî da we!

Emîr Mûsa got: Misoger divê em çend heban ji vana jî ji xelîfeyê xwe re bibin, lewre dê ev masî ji qumquman jî bêtir ber dilê wî bigirin. Qral jî hinek ji wan masîyan jî da wan. Xatir ji wan xwestin û piştre barên xwe bar kirin û ketin rêya vegerê.

Bi şev û roj meşîyan, hetanî ku xwe gihandin Şamê û derbasî qesra Emîrê bawermendan Bin Merwan bûn. Emîr Mûsa, serpêhatîya rêwîtîya xwe ji serî hetanî binî û bi hûrgilî ji xelîfe re got. Çi bi serê wan de hatibû, çi dîtibûn, çi xwendibûn û herî dawîyê mijara Talib Bin Sûheyl jî, hemû jê re rave kir.

Emîrê bawermendan got: Xwezîka ez jî bi we re bûma û tiştê we dîtî, min jî dîtibûya. Piştre rahişt qumquman û ew yeko yeko vekirin. Şeytan jî yeko yeko ji wan derdiketin û digotin: Tobe ey pêxemberê Xwedê, tobe! Tobe be, em tu caran nema li wî karê xerab vedigerin!

Ebdilmelîk Bin Merwan li wê yekê ecêbmayî ma!

Ew masîyên bi navê “keçikên behrê” yên ku qralê reşikan ew dabûn wan jî, xistin hawizên avê yên ku ji depan çêkiribûn. Lê ji ber germê, hemû mirin.

Emîrê bawermendan ew têrên zêr û zîv û gewheran jî bi wekhevî li ser hemû musulmanan belav kir.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 623’YAN

*Şehrezadê got:*

Piştî ku emîrê bawermendan ew mal li ser musulmanan belav kir, got: Xwedê teala ev qas mal neda tu kesî, bi qasî ku da Suleyman Bin Dawid -silavên Xwedê li wî bin-!

Piştre Emîr Mûsa ji xelîfe xwest, ku li ser welatê wî kurê wî li şûna wî bike emîr, da ku ew jî here Qudsa Şerîf û li wir îbadetê bike. Xelîfe, kurê wî li şûna wî kir emîr, ew jî çû Qudsê û li wê derê çû ser dilovanîya xwe. Ev jî dûmahîya çîroka bajarê paxir bû, bi izna Xwedê qedîya.

## ÇÎROKA ŞEVDER KURÊ AMR Û HERDU BIRAYÊN WÎ

*Şehrezadê got:*

Tê gotin, ku tacirekî bi navê Amr hebû, ku sê zarokên wî hebûn. Navê yê mezin Salim bû, yê biçûk Şevder û yê navîn jî Selîm bû. Amr, her sê zarokên xwe xwedî kirin, hetanî ku mezin bûn û bûn zilam. Lê belê wî ji Şevder bêtir hez dikir û vê yekê dihişt, ku herdu birayên wî yên din dexesîya wî bikin û ji Şevder aciz bibin. Piştre bavê wan pê derxist, ku herdu kurên wî ji kurê wî yê dîtir, Şevder aciz in û tirsîya ku piştî wefata wî, ji ber destê herdu birayên wî yên dîtir serê Şevder têkeve tengasîyê; lewre temenê wî pir pêşde çûbû û bûbû extiyarekî hezhizî, ku her an dibû ku ezraîl li derîyê wî bide.

Rojekê gazî çend heb merivên xwe kir, çend sondxwarîyên ji hêla qazî ve jî anîn mala xwe û çend heb zana û maqûlên civatê jî vexwendin cem xwe, hemû li hev kom kirin û ji xulamên xwe re got: Herin hemû mal û cawên min bînin vir! Xulam çûn, hemû malê wî jê re anîn. Ew jî li civatê zivirî û ji wan re got: Camêrno hûn hekem bin û li gora şerîetê vî malê min bikin çar beşên weke hev! Ew jî rabûn malên wî kirin çar beşên wek hev. Beşek ji xwe re hişt û her sê beşên din bi wekhevî li her sê kurên xwe belav kir û got: Malê min giş ev bû û min ew di nav we de par ve kir. Êdî ne tiştekî we li cem min maye û ne jî tiştekî yekî ji we, li cem ê din maye. Vêca gava ez bimrim jî divê tu pirsgirêk di neqeba we de dernekeve. Lewre ev pehra ji min re mayî, piştî mirina min, dê ji jina min re bimîne, da ku ew jî mihtacî kesî nebe.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 624'AN

*Şehrezadê got:*

Piştî wê malparvekirinê bi demeke kurt Amr mir. Çawa ku zilam mir, kurên wî nerazîbûnên xwe nîşan dan û her yekî ji wan hinek malê din ji

Şevder xwest û jê re gotin: Malê bavê me li cem te ye, behra me bide me! Hevdu dan mahkemeyan, musulmanên ku di dema parvekirina mal de amade bûn, hatin ketin nav wan û şehdebûna xwe dan, tiştê ku dizanibûn û dîtibûn, anîn ziman. Qazî ew ji ber hev xistin û pêşîya wan girt lê Şevder hinek ji malê xwe wenda kir, herdu birayên din jî hinek ji malên xwe wenda kirin, ji ber wê pevçûnê.

Herdu birayan, demekê dev ji yê sisyan berdan. Lê piştre, careke din xap û rîp lê kirin û çûn li cem serdaran doz lê vekirin. Vê carê jî hinek ji malê xwe wenda kirin. Lê dîsa jî nesekinîn û her carê gilîyê wî li cem zalimekî din kirin, da ku eziyetê bidinê. Her car jî hinek dirav û malên din di wê rêyê de xerc kirin û malê wan kêmtir bû, hetanî ku tiştek bi wan ve nema û malê xwe giş li ser wan gilîkirinan kirin, ê din jî bi heman awayî mecbûr ma, ku malê xwe ji bo parastina xwe xerc bike, heta ku malê wî jî qedîya û her sê bira jî jar û feqîr bûn.

Piştre Selîm û Salim çûn cem diya xwe, malê wê jî stendin, ew xapandin û ji malê bera wê dan. Ew jî macbûr ma, ku biçe cem kurê xwe Şevder û jê re bibêje, ku herdu birayên te weha û weha kirin bi min, hemû û malê min birin. Di pey re nifir li herduyan kir û ji Xwedê xwest, ku malikê li wan xera bike. Şevder jê re got: Dayêcan nifiran li wan neke, jixwe wê Xwedê teala cezayê karê wan bide wan. Hingî ku herduyan gilîyê min kirin û me hevdu li dadgehan bir û anî, me malê xwe giş li ser kir û em her sê jî feqîr ketin, di nava xelkê de jî rezîl û riswa bûn, me tu fêde ji vê rê û rêbazê nedît, tew me malê xwe giş li ser kir. Loma nekeve bendewarîyê, ku ez herim ji bo te gilîyên wan bikim. Ev ne gengaz e. A baş ew e, ku tu li cem min bimînî. Ez ê jî nanê xwe bidim te û tu jî duayan bikî, ku Xwedê rizqê me ji me re bişîne û ji wan herdu birayên min bigere, bila Xwedê cezayê wan bide wan.

Şevder li ber diya xwe gerîya, dilê wê xweş kir û li dawîyê jî ew razî kir, ku li cem wî bimîne, wî jî rahişt torekê û geh çû ser behrê, geh çû ser birkê, ji xwe re nêçîra masîyan kir. Her roj diçû cihekî din, çi devera ku av lê hebûya, diçû wir. Rojinan deh, rojinan bîst, rojinan jî sih derhem qezenc dikir û hemû ji bo diya xwe xerc dikir, xwarin û vexwarina baş dikirî û derhemên xwe giş di wê de xerc dikir. Ne pîşeyeke kirîn û firotinê ne ticaret û ne jî karekî din bi destê herdu birayên wî ve nedihat, loma herdu jî bûbûn sakûleyên sikakan û rêbirên beradayî, ji dizî û xerabiyê pê ve tiştek bi destên wan ve nedihat. Tazî û birçî, dihatin cem diya xwe û xwarin jê dixwestin. Ji

ber ku dilê diya wan pir tenik bû, di wan de borî û her car nanek, xwarinek dida wan. Carinan jî xwarin datanî ber wan, digot: Zû bixwin û rabin herin, berîya ku birayê we Şevder were û we li vir bibîne. Heger we bibîne, dê dilê wî ji min bişikê û ez ê bihetikim. Wan jî dixwarin û rabûn diçûn.

Rojekê dîsa hatin cem diya xwe, derbasî hundir bûn. Diya wan şîvek ji wan re amade kir û da ber wan, da ku bixwin. Lê tam di wê kêlîyê de, birê wan Şevder ket hundir. Diya wî ket ber şermê û ji wî fedî kir, tirsîya ku bixeyide. Loma ji şermê serê xwe bera ber xwe da. Lê Şevder bi herdu birayên xwe re bişirî û bi devlikenî ji wan re got: Hûn bi xêr hatine birano! Dema we baş be, gelo xêr e, ku hûn di vê roja pîroz de hatine serdana min? Pê re jî herdu himbêz kirin, ew maçî kirin û axaftina xwe berdewam kir, got: Ez ditirsîyam, ku hûn bêrîya min û diya xwe nekin û hûn neyên me nebînin?

Herduyan jî lê vegerandin û gotin: Birawo wele me bêrîya te kiribû lê ji ber wê nexweşîya ku di neqeba me de qewimîbû, em ketibûn ber şermê û me fedî dikir, ku em bêne vir. Lê belê em li ser wan kirinên xwe pir poşman bûn û me nas kir, ku karekî şeytanî ye û qencîya me tenê li gel te û diya me ye.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 625'AN

*Şehrezadê got:*

Diya Şevder pir kêfxweş bû û jê re got: Xwedê rûyê te spî kir û xêra te pirtir kir, kurê min! Şevder jî li herdu birayên xwe zivirî û ji wan re got: Hûn bi xêr hatin û ser serê min hatin. Hûn jî li cem min bimînîn û şikir ji Xwedê re ku halê min xweş e, em ê bi hev re bijîn.

Bi wî hawayî, ji nû ve li hev hatin û herdu jî li cem wan bi cih bûn û êdî hemû bi hev re jîyan. Roja duduyan, taştêya xwe pev re kirin.

Piştre Şevder rahişt tora xwe û berê xwe da derîyê Fatih. Herdu birayên wî jî ji malê derketin, çûn. Nîvrokî vegerîyan malê, diya wan firavîna wan da ber wan. Êvarê jî birayê wan Şevder hat, goşt û sewze bi xwere anî. Hemûçkan şîva xwe bi hev re xwarin.

Jîyana xwe bi wî hawayî hetanî mehekê bi hev re berdewam kirin. Her roj Şevder diçû seyda masîyan, nêçîra xwe difirot, diravên ku bi dest dixistin jî, radestî diya xwe dikir, da ku mesrafa malê û ya birayên wî bide. Herdu birayên wî jî, tenê dixwarin û li kêfa xwe dinêrîn.

Rojekê Şevder rahişt tora xwe û çû ser deryayê, tor avêt avê, piştre tora xwe kişand lê vala derket. Careke din tora xwe avêt lê dîsa vala derket. Şevder ji xwe re got: "Xuya ye ku masî li vir tune ne!" Rahişt tora xwe û çû cihekî din û dîsa tor avêt lê dîsa vala derket. Ji wir jî çû cihekî din lê li wir jî tişt negirt. Cihguhertina xwe hetanî sibehê jî berdewam kir lê dîsa tu encam negirt. Di dilê xwe de got: Ecêb û seyr e! Gelo masîyan gişan dev ji behrê berdane an sebebeke din heye?

Tora xwe avêt ser pişta xwe û dilbikul bi şûn de vegerîya. Di rê de tenê kul û xemên herdu birayên wî yên birçî û diya wî di bîra wî de bûn. Nizanibû wê çawa wan xwedî bike. Çû li ber firenekê sekinî, dît ku her kes di rêzê de sekinîye, derhemên wan di destên wan de, li bendî stendina nan in. Sekna wî ya bêhêvî bala nanpêj kişand. Nanpêj jê re got: Tu bi xêr hatî Şevder, qey peydivîya te bi nan heye? Şevder deng nekir. Nanpêj got: Heger derhem bi te re tune bin, têra xwe nan bibe, bila deynê min li te bimîne. Şevder got: Nexwe kanî deh nîvan bide min! Nanpêj got: A ji te re deh nîvên din jî, tu jî sibe ji min re bi bîstan masîyan bîne! Şevder got: Ser seran, ser çavan. Rahişt nanê xwe û çû bi wan deh nîvan jî goşt û sewze kirî û berê xwe da malê. Di dilê xwe de got: "Hetanî sibê Xwedê mezin e!"

Hat malê, diya wî şîvek ji wan re çêkir, bi hev re xwarin û bi dilekî xweş raketin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 626'AN

*Şêhrezadê got:*

Roja dîtirkê, Şevder dîsa rabû, rahişt tora xwe. Diya wî jê re got: Li gel birayên xwe taştê bixwe û here kurê min? Wî got: Tu bi wan re bixwe, ez naxwazim ji kar dereng bikevim. Tora xwe avêt ser milê xwe û di derî re derket çû, berê xwe da behrê. Mîna her car çend caran tora xwe avêt û kişand lê tu masî negertin! Cihê xwe guhert û dîsa tor avêt; dîsa cihê xwe guhert û hey guhert, hetanî esir cih guhert lê dîsa fêde nekir û masîyekî tenê jî negirt. Tora xwe avêt ser milê xwe û bi dilekî şikestî ket ser rêya vegerê. Di serî de mecbûr bû, ku rêya xwe bi firinê xîne û nan bigire, nexwe nikaribû biçûya malê. Gava ku gihîşt cem firinê, nanpêj têra wî nan dayê û deh nîvên zîvîn jî da destê wî û jê re got: Vanan bigire, bibe malê û deynê îro jî bixe ser

ê duh. Şevder xwest, ku lêborîna xwe jê bixwaze lê nanpêj got: Qet hewce nake, heger te masî girtibûna, jixwe wê bi te re xuya bikirina lê te tiştek negirtiye û gunehê te tune ye. Heger sibê jî te tiştek negirt, dîsa were ji cem min mesref û nanê xwe bigire û fedî meke ciwamêr!

Roja sisiyan jî masî negirtin û dîsa çû cem nanpêj hem nanê xwe yê rojane girt, hem jî deh nîvên zîvîn girt û çû bi wan goşt û sewze kirî û piştre çû malê. Heft rojan bi wî hawayî berdewam kir. Piştre di dilê xwe de ji xwe re got: "Ez ê îro herim ser Birka Qarûn, şensê xwe li wir biceribînim!" Rabû çû wê derê lê hîna ku tora xwe neavêtibû birkê, zilamekî Mexribî yî ku li qantireke xemilandî siwar bû û di nava kincin spehî û balkêş de bû, ber bi wî ve hat. Mîna maqûlan ji qantira xwe peya bû û jê re got: Silav li ser te bin, Şevderê kurê Amr!

Şevder got: Silav li ser te bin jî mîrzayê min! Mirovê Mexrîbî jê re got: Binêr Şevder, daxwazeke min ji te heye. Heger tu wê pêk bînî, tu yê bibî dost û hogirê min, tu yê pêdivîyên min pêk bînî û xêr û qencîyeke baş ji min bibînî! Şevder got: Û daxwaza te çi ye mîrzayê min, hela tu daxwaza xwe bibêjî, misoger ez ê ji te re pêk bînim, bila qet guman bi te re çênebin? Mexrîbî got: Nexwe fatîheyê bixwîne, me li hev kir! Herduyan fatîheyek xwend, piştre mirovê Mexrîbî benin hevrîşimî derxist, da destê wî û jê re got: Bi van benan, min baş girêbide û min bavêje vê birka avê. Hinekî xwe li min ragire û piştre gava te dît, ku min destên xwe bilind kirin û ew ji avê derxistin, tu di cî de tora xwe bavêje ser min û bi lez min bikişîne lê heger te dît, ku min nigên xwe di avê re derxistine, nas bike ku ez mirî me, min bihêle û qantira min bi xwe re bibe, here sûka bazirganan, li wê derê tu yê bazirganekî cihû yê bi navê Şemîye bibînî. Qantirê bide wî, ew ê jî sed dînarî bide te. Dînarên xwe bigire û here lê raza min veşêre û ji kesî re nebêje.

Şevder zilamê Mexrîbî bi benan girêda û ew dehfand, ew di birkê wer kir. Zilam binav bû, wî jî bi qasî saetekê xwe li bendê ragirt. Carekê ji nişka ve herdu nigên zilam bi ser avê ketin. Şevder dev jê berda, li qantira wî siwar bû, çû sûka bazirganan. Li cihê ku jê re gotibû, bazirganê cihû li ser kursîya xwe rûniştî dît. Çû cem wî, yê cihû çawa çav li qantirê ket, got: Temahîya wî serê wî xwar! Piştre qantir ji destê wî girt û sed dînar da dest û jê xwest, ku sir û razên wan veşêre.

Şevder rahişt dînarên xwe û çû cem nanpêj, dînarek da wî û jê re got: Hem deynê te ye hem jî niha nan bide min! Nanpêj nanê wî dayê û jê re got:

Hîna heqê nanê du rojên din jî tê de maye, bila hayê te jê hebe, ez ê paşê bidim te.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 627'AN

*Şehrezadê got:*

Piştî ku Şevder deynên nanpêj danê, derbasî cem goştfiroş bû, dînarek da wî jî, hinek goşt jê kirrî û got: Bila yê mayî jî li cem te bimîne, ji bo rojên pêşîya me. Piştre çû cem sewzefiroş, ji wir jî pêdivîyên xwe hildan û çû malê, dît ku herdu birayên wî daxwaza xwarinê li diya wî dikin, ew jî ji wan re dibêje: Bêhna xwe fire bikin kurên min, tiştek li ba min tune lê we bîrayê we tiştekî ji we re bîne.

Şevder derbasî cem wan bû, nan û xwarin da ber wan û got: A ji we re, bixwin! Herdu mîna du gayan ketin ser nan. Şevder, zêrên mayîn jî dan diya xwe û jê re got: Ev jî bila li gel te bin dayê, her ku birayên min hatin û ez ne li mal bim, ji van diravan bide wan, bila pê xwarinê bikirin.

Roja dîtirkê, Şevder dîsa rabû ser xwe, rahişt tora xwe û berê xwe da Birka Qarûn. Gava gihîşt wir, hîna ku tora xwe navêtibû, bala xwe dayê, ku Mexrîbîyekî din ber bi wî ve tê û ew jî mîna yê duh, di nava kincin xweşik de û li ser pişta qantireke xemilandî ye, mîna maqûlan e. Têreke bi du çavîkan li ser qantira wî hebû û di her çavîyekê de çenteyek hebû. Çawa gihîşt cem wî, jê re got: Silavên Xwedê li ser te bin Şevder! Wî jî got: Silav li ser te bin jî mîrzayê min!

Zilam jê pirsî: Duh Mexrîbîyekî din ê mîna li ser qantireke weke vê hat cem te gelo? Şevder tirsîya, înkar kir û got: Min tu kes nedîtiye! Xwest, ku pêşîya pirsên "Bi ku ve çû?", "Çawa fetisî?" bigire, lewre heger jê re bigota fetisîye, belkî ew sûcdar bikira û bigota te ew fetisandiye jî. Yê Mexrîbî got: Feqîro, ew ê ku hatibû, birayê min bû. Şevder got: Xebera min ji tiştekî tune ye. Zilam got: Ma qey wî ji te re negot, min girêbide û min bavêje birkê, heger destên min bi ser avê ketin, tora xwe bavêje ser min û bi lez min bikişîne û heger nigên min derketin, qantirê bibe û here cem bazirganê cihû Şemîye, ew ê sed dînarî bide te? Û ji ber ku herdu nigên wî bi ser avê ketin, te qantir bir cem Şemîye û sed dînar jê girt?

Şevder got: Madem tu gişî dizanî, çima tu ji min dipirsî?

Zilam got: Daxwaza min ew e, ku heman tiştî ji min re jî bikî. Piştre benên hevrîşimî ji xurcika xwe derxistin, dan destê wî û jê re got: Min girêbide û min bavêje vê birkê! Heger tiştê hatî serê birayê min, hat serê min jî, qantirê bibe û here cem bazirganê cihû û sed dînarî jê bistîne.

Şevder jê re got: Pêşde were! Ew girêda û di birka avê wer kir. Piştî xwe ragirtina saetekê, bala xwe dayê, ku herdu nigên wî bi ser avê ketin. Şevder ji xwe re got: Ew jî fetisî! Xwedê hez bike, dê rojê yek were, ez ê wî girêbidim û ew ê jî bifetise. Ez ê jî serê yekî sed dînarî bigirim!

Bi serê qantirê girt û çû cem bazirganê cihû. Çawa ku yê cihû qantir dît, ji Şevder re got: Ew jî mir? Şevder got: Bila serê te sax be! Ê cihû got: Cezayê temakaran ev e! Piştre sed dînar da wî û qantir ji dest girt.

Şevder berê xwe da malê û çû ew dînar hemû dan diya xwe. Diya wî got: Te ev ji ku anîne kurê min? Şevder çîrok ji serî hetanî binî jê re got. Diya wî got: Edî bes biçe ser Birka Qarûn kurê min, ez li ser te ditirsim, ku ev mirovên Mexrîbî tiştekî bi te bikin.

Şevder got: Dayêcan, ez li gora daxwaza wan tevdigerim, ma wê çi bibe? Ev karekî baş e û ez rojê sed dînarî jê qezenc dikim û zû jî vedigerim malê. Bi Xwedê hetanî ku ew Mexrîbî werin wir, ez ê jî herim ser Birka Qarûn!

Roja sisiyan jî çû ser Birka Qarûn û li wir sekinî. Qasekê bi şûn de, bala xwe dayê, ku zilamekî Mexrîbî li ser qantireke xemilandî ye û ber bi wî ve tê. Mexrîbîyê vê carê ji herduyên din jî maqûltir û maldartir xuya dikir. Çawa gihîşt cem wî, jê re got: Silavên Xwedê li ser te bin, ey Şevderê kurê Amr!

Şevder silava wî girt û di dilê xwe de got: “Çawa ev Mexrîbî hemû wisa min nas dikin?”

Zilam jê re got: Gelo tu kesên Mexrîbî bi vir de hatin? Şevder got: Dudu hatin. Zilam got: Bi ku ve çûn? Şevder got: Min ew girêdan û ew avêtin vê birkê, tê de fetisîn, niha jî dora te ye!

Zilam kenîya û jê re got: Feqîro! Her zindiyek li benda roja xwe ye. Piştre ji qantirê peya bû û axaftina xwe berdewam kir, got: Şevder, te çi bi herduyên din kiribû, heman tiştî bi min jî bike, di pey re benên hevrîşimî ji xurcika xwe derxistin, dan wî.

Şevder got: Kanî xwe bizivirîne, da ku ez destên te gîrêbidim, lewre ez dereng ketime û dema min hindik maye! Piştre destên wî girêdan û ew dehfand, ew di avê wer kir û ma li bendî wî. Qasekê bi şûn de, mirovê Mexrîbî

destên xwe di avê derxistin. Şevder bi lez tora xwe bi ser de avêt û ew kişand; bala xwe dayê ku di her destekî wî de masîyekî sor ê weke mercanê heye.

Zilam jê re got: Kanî wan cewdikên avê yên di xurcikê de veke! Şevder devê cewdikan vekir, wî jî her masîyek ji wan, xist cewdikekî û devê wan dîsa girêda. Piştre Şevder himbêz kir û ji hinarikên rûyê wî ve ew maçî kir û jê re got: Xwedê te ji hemû rengên xerabiyê bistirîne. Bi Xwedê ne ji te bûya û heger te tora xwe navêtibûya ser min, te ez nekişandibûma, hetanî ku ez bifetisîyama jî min ew masî bernedidan û ez ê di bin avê de bimama û di dawîyê de jî bifetisîyama!

Şevder got: Tu bi qedrê Xwedê bikî mîrzayê min, tu yê çîroka wan herdu mexrîbîyan, wan herdu masîyan û wî bazirganê cihû ji min re bibêjî!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû*

## ŞEVA 628'AN

*Şehrezadê got:*

Li himberî wê pirsa Şevder, zilam got: Binêre Şevder! Ew herdu zilamên ku fetisîn, birayên min bûn. Navê yekî Evdilselam bû, yê din Evdilehed, ez jî Evdirehîm im. Ê cihû jî birayê min e û navê wî Evdisemed e. Ew jî ne cihû ye lê belê li ser mezhebê Malikî ye û musulman e. Wî em fêrî efsûn û remzan kirine; fêrî vekirina xezîne û razan kirine. Em jî ketine xizmeta cin û efrîtên serhildêr û em nexweşan derman dikin. Em çar bira ne û navê bavê me Ebdilwedûd e. Gava ew mir, mîrasekî mezin li dû xwe ji me re hişt. Me hemû mal û milkê bavê xwe di nav xwe de pehr kir lê gava em hatin ser parvekirina pirtûkxaneya wî, me li hev nekir, li ser pirtûka bi navê "Çîrokên Pêşîyan", ku pirtûkên mîna wê nîn in li ser rûyê erdê û pir buha ye. Lewre sir û raza hemû xezîne û gencîneyan tê de ye û mifteyên wan razan jî tê de ne. Bavê me bi wê pirtûkê dixebitî, me jî zanînên wê ji ber dikirin, bi qasî ku me dikaribû. Armanca me gişan ew bû, ku em fêrî hemû agahîyên ku tê de ne, bibin. Vêca gava em li ser wê pirtûkê pevketin, şêxê bavê min ê ku ew mezin kiribû û ew fêrî efsûnê kiribû, hat civata me, bo ku navbeykarîyê bike. Navê wî şêxî jî Ebtenê kahin bû. Rabû ji me re got: Ka wê pirtûkê bînin. Me pirtûk dayê. Got: Hûn hemû zarokên min in û ne gengaz e, ku ez tehdê li kesî ji we bikim.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 629'AN

*Şehrezadê got:*

Mirovê mexrîbî vegotina serborîya xwe û bavê xwe ji Şevder re berdewam kir û got: Şêx Ebtenê kahin got hûn weke kurên min in û ez nikarim neheqiyê li kesî ji we bikim. Kî ji we dixwaze bila niha rabe pirtûkê bibe û rêya dîtina xezîneya Şemerdel bibîne û ji min re giroverka felekê, kildankê, hungulîskê û şûr bîne û bê. Efrîtekî bi navê Birûska Kujer di xizmeta wê hungulîskê de ye û kesê ku wê hungulîskê bi dest bixe, tu qral û sultan nikarin pê. Heger bixwaze bi wê hungulîskê dinyayê gişî bixe destê xwe jî, dikare bike. Şûr jî xwedî hêzeke ew qasî xurt e, ku heger tu wî bi ser artêşekê de jî bihejînî, dê artêş giş ji ber te bireve. Heger bi hejandinekê tu jê re bibêjî artêşê gişî bikuje, dê birqeke ji agir ji devê wî derkeve û artêşê gişî bikuje. Giroverka felekê jî çekeke bêhempa ye û bi destê tu kesî nakeve. Yê ku wê bi dest bixe, dikare di wê giroverkê re li hemû welatê dinyayê binêre û çavdêrîya wan bike. Berê wê bide kîjan alîyî, welatên li wê hêlê tê re xuya dikin. Ew jî di cihê xwe de rûniştî, dikare hemûçkan temaşe bike. Kî li ku derê ye, çi dike çi nake, hemû tê re xuya dike. Gava ku ji hinekan, ango ji bajarekî biqehere jî, dikare berê giroverkê bide rokê û wî bajarî bişewitîne. Kildanka ku min behsa wê kir jî, tiştekî pir seyr e. Kesê ku çavên xwe bi wê kildankê kil bikin, dikarin hemû xezîneyên li ser rûyê erdê veşartî, bibînin. Vêca şertê min jî ji we re ev e: Kî ji we bikaribe xwe bigihîne wê xezîneyê û wan her çar mûcîzeyan jê derxîne, ji min re bîne, dê ev pirtûk jî ji wî re be. Me jî ew şert qebûl kir, wî jî got: Lê zarokno, divê hûn bizanibin, ku ev kenz û xezîneya Şemerdel di bin destê zarokên qral de ye û bavê we ji min re got, ku wî carekê hewl da, ku wê xezîneyê veke lê bi ser neket û zarokên qral jî ji ber wî revîyane û ketine binî birkeke avê li Misrê, ku navê wê Birka Qarûn bûye. Ew jî li pey wan çûye Misrê lê nikaribûye bigire. Ji ber ku binî birkê û dîwarên wê giş şayîtokî bûne.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû*

## ŞEVA 630'Î

*Şehrezadê got:*

Ebten ê kahin axaftina xwe ji her çar birayan re berdewam kir û got: Vêca gava bavê we bi bin ketiye û nikaribûye xezîneya Şemerdel ji destê zarokên

qralê sor derxe, vegerîya cem min û gilî û gazinên xwe bi min kirin, alîkarîya min xwest. Min jî jê re remlek vekir û lê nêrî, min cihê xezîneyê tesbît kir û min bala xwe dayê, ku ew xezîne incex li ser destê ciwanekî Misrî yê bi navê Şevder kurê Amr were vekirin. Yanî ew dê bibe sebaba girtina zarokên qralê sor, ên ku xwe di Birka Qarûn de veşartine. Min baş tê derxist, ku incex li ser wê birkê mirov rastî Şevder bê. Bidestxistina zarokên qral ên di binî birkê de jî, incex dê bi destgirêdana Şevder gengaz bibe. Kî destên xwe bi Şevder bide girêdan û dakeve binî wê birkê, ya dê bikaribe zarokan bigire, yan jî dê bifetise û herdu nigên wî bi ser avê kevin. Heger zarokan bigire û destên xwe derxe ser avê jî, divê bi tora Şevder were rizgarkirin, nexwe dê nikaribe bi tena serê xwe yan jî bi alîkarîya hineke din ji wîr derkeve.

Gava me ev gotin ji şêxê bavê xwe bihîstin, ez û du birayên xwe me biryar da, ku herin li xezîneyê bigerin, birayê me yê di şiklê cihûyan de jî got: Ê min ez têkilî nabim û tiştekî jî naxwazim. Rabû me pê re li hev kir, ku em di kincê cihûyan de pê re herin Misrê. Ji bo ku gava yek ji me di birkê de bimire, ew qantirê ji destê te bigire û sed dînarî bide te. Îcar gava birayê me yê ewil hat cem te û xwe bera binî birkê da, zarokên qralê sor ew kuştin. Ê duduyan jî kuştin lê bi min nikaribûn û min ew herdu zeft kirin.

Şevder got: Kanî ew ên ku te zeft kirin, ew girtin? Wî got: Qey te nedît bê çawa min ew xistin cewdikên avê û derî li ser wan girt? Şevder got: Lê ew masî bûn? Zilamê Mexrîbî got: Ew ne masî bûn lê belê efrîtên di dirûvên masîyan de bûn!! Lê belê Şevdercan, divê tu bizanibî, ku dîsa jî vekirina vê xezîneyê dê li ser destê te be. Vêca tu qebûl dikî, ku tu bi min re werî bajarê Fas û Miknas, da ku tu xezîneyê vekî û çi bixwazî, ez ê wî bidim te? Jixwe êdî tu birayê min î bi izna Xwedê û piştre jî tu yê dîsa li malbata xwe vegerî lê vê carê bi maldarî.

Şevder got: Mîrzayê min, dê û birayên min di stûyê min de ne û çavên wan li destên min dinêrin...

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 631'Ê

*Şehrezadê got:*

Şevder got; dê û herdu birayên min di stûyê min de ne, ez bi te re bêm wir, wê kî li wan binêre? Zilamê Mexrîbî got: Ev mehne ne, heger meqseda

te mesrefa wan be, em ê hezar dînarî bidin te, da ku tu wî bidî diya xwe, bo ku ji xwe re xerc bikin, hetanî ku tu vegerî; jixwe di nava çar mehan de tu yê vegerî mala xwe.

Çawa ku Şevder “hezar dînar” bihîst, got: Mîrzayê min kanî hezar dînarî bide min, em wî bidin diya min, ez ê bi te re bêm! Zilam hezar dînar dayê, wî rahiştê û çû cem diya xwe û bazara ku bi yê Mexrîbî re kiribû, jê re anî ziman û got: Vî hezar dînarî bigire, wî li xwe û li herdu birayên min xerc bike, ez ê jî bi zilamê Mexrîbî re biçim ber bi rojava ve û çar mehên din bi şûn de ez ê vegerim malê, li gel mal û sermayeyeke mezin. De êdî tu jî ji min re duayan bike, dayêcan!

Diya wî got: Weke kurê min ez ê pir bêrîya te bikim û ez gelekî li ser te ditirsim jî. Şevder got: Dayêcan Xwedê mezin e û ev zilamê Mexrîbî mirovekî baş e... Piçekî jî bi hestîyarî axaftina xwe berdewam kir û dilê wê bi xwe şewitand. Diya wî got: Nexwe pê re here kurê min; Xwedê dilê wî bi ser te ve bajo!

Xatir ji hevdu xwestin, Şevder ji malê derket û dîsa çû cem ê Mexrîbî, ku navê wî Evdirehîm bû. Zilam jê re got: Tu bi diya xwe şêwirî? Şevder got: Belê,ez pê şêwirîm û wê jî dua ji min re kirin. Evdirehîm got: Li pişt min siwar bibe. Şevder, li pişt wî, li qantirê siwar bû û herdu ji nîvroyê ve ketin rê. Esirkî, Şevder birçî bû û tiştekî ku bixwe, li cem Evdirehîm nedît. Jê pirsî, got: Mîrzayê min, wisa xuya dike, ku te ji bîr kir, ku tiştekî xwarinê bi xwe re bînî? Evdirehîm got: Qey tu birçî bûyî? Şevder got: Belê.

Evdirehîm qantir sekinand, herdu jê peya bûn; piştre li Şevder zivirî û jê pirsî, got: Tu bi Xwedê kî, ji min re bibêje, bê dilê te diçe çi? Şevder got: Nan û penêr. Evdirehîm got: Belengazo, nan û penêr ne li gorî meqamê te ye, xwarineke xweş li gora meqamê xwe bixwaze! Şevder got: Niha, ji bo min her tişt xweş e. Evdirehîm got: Tu ji ferxikên qebiraştî hez dikî? Got: Belê. Evdirehîm pirsî: Tu birinca bi hungiv hez dikî? Tu ji filan rengî hez dikî? Tu ji filan û bêvanî hez dikî? Û wisa pê de çû, hetanî ku bîst û çar rengên xwarinê jê re jimartin. Şevder di dilê xwe de ji xwe re got: “Qey ev zilam dîn e? Ma wê ew qas xwarin ji ku bîne û ne metbex li vir heye, ne jî malek?” Zilam got: Ev qas besî te ne? Şevder got: Wisa xuya dike, tu dilê min dibijînî hemû xwarinan û tu tu tiştî jî ji min re nayînî?

Evdirehîm Mexrîbî got: Tu bi xêr hatî Şevder! Pê re jî destê xwe xist xurcika xwe û sênîyeke zêr jê derxist, ku tijî kebab bû. Piştre bîst û sê carên

din jî destê xwe xist xurcikê û di her carê de cureyek ji wan xwarinên ku anîbûn ziman jê derxist, heta ku bîst û çar xwarin temam bûn.

Şevder behetî ma û got: Mîrzayê min qey hinek di vê xurcika te de hene, ku xwarinê dipijînin? Evdirehîm Mexrîbî kenîya û got: Xizmetkarekî min li vî karî dinêre û heger serê saetekê tu hezar rengî ji xwarinê bixwazî jî, wê ji te re bîne, hem jî di heman kêlîyê de.

Şevder got: Çi xurcikek baş û qenc e!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 632'YAN

*Şehrezadê got:*

Şevder got: Ev xurcika hanê çi xêra Xwedê ye! Piştre bi hev re xwarin û vexwarin, hetanî ku têr bûn. Tiştê mayî jî di sênîkan de hiştin lê sênîk hemû xweberî vala bûn û ketin xurcikê. Piştre misînê avê derxist, herduyan destnimêja xwe girtin, nimêja esirê kirin û misînê xwe dîsa li xurcikê vegerandin, eşyayên xwe giş tevdagirtin û dîsa li qantira xwe siwar bûn. Evdirehîm li Şevder zivirî û jê pirsî: Gelo tu dizanî bê ji Misirê hetanî vir, me çiqas rê qut kiriye. Şevder got: Na wele ez nizanim. Wî got: Me meşa mehekê qut kiriye. Şevder got: Ew çawa? Wî got: Ev qantira hanê efrîtekî cinî ye, meşa salekê di rojekê de qut dike lê ji bo xatirê te hêdî meşîya.

Meşa xwe ber bi welatê rojava, Mexrîbî ve berdewam kirin. Gava li wan bû êvar, şîva xwe ji xurcikê derxistin; gava li wan bû sibe jî taştiya xwe jê derxistin û bi wî hawayî meşa xwe çar roj û çar şevan berdewam kirin. Herdem hetanî nîvê şevê dimeşîyan û ji nîvê şevê. Dilê Şevder jî diçû çi, ji Evdirehîm dixwest, wî ji xurcikê derdixist û dida wî. Roja pêncan gihîştin Fasê û Miknasê. Gava ku derbasî bajêr bûn, Şevder bala xwe dayê ku kî rastî Evdirehîmê Mexrîbî tê, silavê lê dike û destên wî maçî dike! Wisa berdewam kirin, hetanî ku hatin ber malekê û li derîyê wê dan. Derî vebû û keçeke weke heyvê xuya kir. Zilamê Mexrîbî jê re got: Rehmê, keça min qesrê ji me re veke! Wê jî got: Ser seran, ser çavan bavocan.

Keçikê xwe hejand û da pêşîya wan, çû derî ji wan re vekir. Şevder di dilê xwe de got: "Hebe nebe ev keça xweşik, keça qral e!" Keçikê aqilê wî ji serê wî bir. Zilam rahişt xurcika ser qantirê û li keçikê zivirî, jê re got: De yê te, tu îcar here, Xwedê te bihêle û mirazê te bike.

Di wê navberê de erd qelişî, qantir di qelşê re çû, wenda bû û erd dîsa gihîşt hev, weke berê bû. Şevder matmayî got: Ya star! Xwedê hevza me kir, ku em li ser pişta wê hatin parastin! Ê Mexrîbî got: Şevder, ecêbmayî nemîne, min ji te re got, ku qantir efrît e. De îcar ka em derkevin, herin qesrê!

Gava ku ketin hundir, Şevder li himberî heybeta wê qesrê şaşwaz û behetî ma. Li himberî wan xalî û merş û kulav û sicadeyên raxistî û ew qas cewher û madenên giranbuha yên daliqandî û yên ku her der bi wan xemilandî bûn, devê wî ji hev mabû!

Piştî ku rûniştin, zilam ji keçikê re got: Rehmê, kanî filan buxçikê bîne! Keçik rabû, buxçik anî, danî ber destên bavê xwe. Wî jî buxçik vekir û kirasek jê derxist, ku bi buhayê hezar dînarî bû û ji Şevder re got: Careke din tu bi xêr hatî Şevder, kanî vî kirasî li xwe bike! Şevder ew kirasê xweşik li xwe kir û bû mîna qralekî ereban.

Zilam destê xwe avêt xurcikê û sênîkên tîjî xwarinên rengo rengo jê derxistin, heta ku çil sênî çêbû. Piştre jê re got: Kerem bike ser xwarinê ezbenî û li qisûra me nenêre.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 633'YAN

*Şehrezadê got:*

Evdirehîmê Mexrîbî Şevder vexwend ser sifreyê û jê re got: Ezbenî li qisûra me nenêre, lewre em nizanin bê tu ji kîjan xwarinan hez dikî, ji kîjanan hez nakî. Lê hema dilê te biçe kîjan xwarinê, wê ji me bixwaze, em ê di cî de û bê derengî bînin ber destê te. Şevder got: Wele mîrzayê min ez ji hemû xwarinan hez dikim, tiştekî ku ez jê hez nekim, tune ye. Îcar hema ji min nepirse û çi tê bîra te wî bîne, ez jî peywira min tenê xwarin e!

Şevder di wê qesrê de bi wî hawayî bîst roj derbas kirin. Her roj kincekî nû li xwe dikir, xwarin jî bi hemû rengên xwe ji xurcikê derdiketin û zilamê Mexrîbî ne goşt dikirî ne jî xwarineke din. Her tişt ji xurcikê derdixist, hetanî bi fêkî û sewzeyan hemû ji wir derdixist.

Di roja bîst û yekê de, zilamê Mexrîbî jê re got: Şevder rabe em herin, îro roja vekirina xezîneya Şemerdel e.

Şevder rabû, pê re çû. Herdu bi hev re meşîyan, hetanî ku ji bajêr derketin. Piştre Şevder li qantirekê, Mexrîbî li qantireke din siwar bû û meşa xwe ber-

dewam kirin, hetanî nîvroyê. Nîvrokî gihîştin ser çemekî ku ava wî diherikî, Evdirehîm daket û ji Şevder xwest, ku ew jî dakeve. Piştre berê xwe da bendeyan, bi destê xwe îşaret da wan û ji wan re got: Rabin karê xwe bikin!

Herdu rabûn, her yekî ji wan bi serê qantirekê girt û çûn lê her yek ji wan di rêyeke cuda re çû. Piştî demekê dîsa bi şûn de vegerîyan lê vê carê qantirên wan barkirî bûn; yekî konek anîbû, di cî de ew vegirt, ê din doşek û lihêf û balîf anîbûn, di cî de ew di binî kon de raxistin. Piştre dîsa çûn û qasekê bi şûn de dîsa vegerîyan. Yekî ji wan ew herdu cewdikên ku masîyên sor tê bûn anîbûn, ê din jî xurcik anîbû.

Zilamê Mexrîbî got: Şevder were rûnê! Şevder hat li cem rûnişt, wî jî sênîkên xwarinê li pey hev ji xurcikê derxistin û danîn ber. Herduyan bi hev re xwarin xwarin. Piştre yê Mexrîbî herdu cewdik anîn, danîn ber xwe û li ser wan xwend. Demekê bi şûn de, dengek ji hundirê cewdikan bilind bû û got: "Em li ber destê te amade ne ji fermana te re, ey kahin û pêşbînê cîhanê li me were rehmê!" Herdu masîyên di cewdikan de lave jê dikirin û hewara xwe tê didan lê yê Mexrîbî jî hey li ser wan dixwend. Herî dawîyê herdu cewdik perçe perçe bûn û bi hewa ketin, li şûna wan du heb lavekar derketin, ku xwe davêtin bextê wî û bênavber digotin: Ey kahin û pêşbînê cîhanê, tu dixwazî çi bi me bikî? Zilam got: Ez ê we bişewitînim, heger hûn soz û peymanê nedin min, ku hûn ê xezîneya Şemerdel vekin!

Herduyan got: Em sozê didin te lê bi şertekî: Heger tu Şevderê kurê Amr ê masîvan bînî, em ê xezîneyê ji te re vekin. Lewre ne di rûye şevder de be xezîne venabe û tu kes jî nikare derbasî hundirê wê bibe ji wî pê ve! Zilamê Mexrîbî got: Ew ciwamêrê ku hûn behsa wî dikin, niha li vir e, we dibîne û li we guhdar dike! Herduyan soz û peyman dan zilam, wî jî ew berdan.

Di pey wê re hinek qesele û zik, hinek lewheyên eqîqên sor derxistin, danîn ser zilan û hinek pizotên koza agir danîn bin û pif kirê, agir pêxist û bixûr anîn; piştre ji Şevder re got: Ez ê niha li ser bixwînim û bixûrê berdim. Lê gava ku ez li ser dixwînim, ez nikarim pê re biaxivim, loma ez ji niha ve dixwazim ji te re bibêjîm, bê tu yê çawa tevbigirî, da ku tu bigihîjî encamê:

Çawa ku ez li ser bixwînim û bixûran berdim, dê ava çem biçike û dê derîyekî zêrîn li pêşîya te derkeve, bi qasî derîyê sûra bajêr, ku du xelekên madenê tê de hene. Here ber derî û hêdîka, carekê tenê lê bide. Piştre xwe hinekî ragire û dûra dîsa lê bide lê vê carê bişidatir. Piştre dîsa xwe ragire û dûre ji herdu carên pêşîn jî xurtir sê caran li ser hev lê bide, wê çaxê wê

dengek bê te; dibeje: Kî li derîyê xezîneyan dide, bêyî ku remz û sembolan zanibe? Tu jî bibêje, ez Şevderê masîvan im, kurê Amr im. Pê re jî dê derî ji te re vebe û kesek derkeve himberî te, ku şûrekî tazî di destê wî de ye û ji te re dibêje: Heger tu ew zilam bi xwe bî, kanî stûyê xwe ji min re dirêj bike, da ku ez serê te bifirînim. Tu jî netirse û stûyê xwe jê re dirêj bike, jixwe çawa ku ew destê xwe rake û şûr li stûyê te bixe, ew ê, di cî de li erdê bikeve û wê meytê wî bêruh li ber te dirêj bibe. Ji derba wî tu zirar nagihîje te lê heger tu bi ya wî nekî, dê te bikuje.

Vêca gava te efsûna wî betal kir û tu derbasî hundir bûyî, wê derîyekî din li hemberî te derkeve. Li wî derîyî jî bide, dê siwarekî ku li hespê siwar e li hemberî te derkeve, ku rimeke dirêj li ser milê wî ye. Wê ji te re bibêje, kê tu gihandiye vî cihê ku ne ins derbasî wî dibin ne jî can? Pê re jî dê rima xwe li te bihejîne. Tu singa xwe jê re veke, ew jî çawa li te bide, dê were kuştin û meytê wî li erdê rast bibe. Lê belê heger tu bi ya wî nekî, ew dê te bikuje.

Piştre li derîyê sisiyan bide, dê zilamek li hemberî te derkeve, ku tîr û kevanê wî di destê wî de ye. Tu jî metirse û sînga xwe jê re veke , lewre ew çawa li te bide, dê bêruh li ber nigên te bikeve erdê. Lê heger tu bi ya wî nekî, dê te bikuje.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 634'AN

*Şehrezadê got:*

Evdirehîmê Mexrîbî ji Şevder re got: Piştre tu yê li derîyê çaran bidî, wê derî vebe û şêrekî mîna ecêbekî êrîşî ser te bike, devê xwe veke, çawa ku bixwaze te bixwe. Lê tu qet jê netirse û jê nereve. Gava ku gihîşt te, tu destê xwe bidê, bila gez bike, çawa ku gez kir, wê bê rep û li erdê bikeve û bimire. Piştre li derîyê pêncan bide û derbas bibe, dê bedeyekî reşik li himberî te derkeve û ji te re bibêje, tu kî yî? Tu jî jê re bibêje: Ez Şevder im. Wê ew jî ji te re bibêje, heger tu ew bî, here derîyê şeşan veke. Bi pêş de here, bêje ya îsa ji Mûsa re bibêje, bila derî veke! Wê derî vebe, tu jî derbas bibe, tu yê bibînî, ku du mar di devê derî de ne. Yek li hêla çepê ye, yên din jî li hêla rastê ye û herduyan devê xwe vekiriye û êrîşî ser te dikin. Di cî de herdu destên xwe dirêjî wan bike, dê destên te gez bikin û di cî de bimirin lê heger tu ji wan birevî, wê te bikujin. Dûre li derîyê heftan bide, wê derî vebe û diya te der-

keve ji te re bêje, ez diya te me, min şîr daye te û tu di himbêza xwe de mezin kiriye, heqê te tune ye ku tu min tazî bikî! Tu jî jê re bibêje, heger tu kincên xwe ji xwe nekî, ez ê te bikujim? Li kêleka xwe ya rastê binêre, tu yê şûrekî bi dîwêr ve daliqandî bibînî, rahêje wî şûrî, hilde û jê re bibêje, kincên xwe ji xwe bike! Ew ê pir li ber te bigere û hewl bide, ku te bixapîne lê tu qet xwe sist neke û bi ser de here, heta ku kincên xwe ji xwe bike.

Wê çaxê, wê her tişt çareser bibe û efsûna pêşîya te xera bibe û raz hemû eşkere bibin, tu yê jî aram û ewle bibî. Derbasî hundir bibe, tu yê bibînî, ku hundir tijî xezîneyên zêr û mercan in. Tu guh mede tu tiştî; di zikê xezîneyê de odeyeke ku perde bi ser derîyê wê de berdayî ye, heye, here wê perdeyê hilde, tu yê bibînî, ku Şemerdelê kahin û pêşbîn, li ser textekî zêrîn raketî ye û tiştekî mîna heyvê girover jî, li ser serê wî ye, dibiriqîne. Ew giroverka hanê giroverka felekê ye. Hungulîsk jî di destê wî de ye û şûr jî di ber wî de ye, kildank jî bi zincîrekê ve girêdayî ye û di stûyê wî de ye. Wan her çar tiştên pîroz û giranbuha bîne û haydar be, ku tu yekê tenê jî ji bîr nekî. Baldar be, da ku tu şaşîtîyekê neke û felaketekê bi serê xwe de neyîne. Tiştê ku min ji te re gotin, wan yeko yeko pêk bîne. Herî dawîyê, her tişt dîsa jê re dubare kir, sêbare kir, çarbare kir, hetanî ku Şevder got: Ma kî dikare ev qas şert pêk bîne û bi serkeftinê di ev qas azmûnan re derbas bibe? Mexrîbî jê re got: Şevder, ji wan tiştan metirse, ew hemû sîlwet in, ne ruh in.

Piştî ku Evdirehîmê Mexrîbî dilê wî baş xist cî û ew baş kir, Şevder got: Baş e, tewkelîya me bi Xwedê be.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 635'AN

*Şehrezadê got:*

Piştî ku Şevder qebûl kir, Evdirehîmê Mexrîbî dest bi xwendinê kir û buxûr dada. Demek bi şûn de, ava çem miçiqî û binîya çem ziha bû, derîyê xezîneyê xuya kir. Şevder çû ber derî û lê da. Dengek ji hundir hat, got: Kî li derîyê xezîneyê dide û nizane remz û sembolan çareser bike? Wî jî got: Ez Şevderê kurê Amr im, derî ji min re veke. Derî vebû û zilamekî ku şûrekî tazî di destê wî de bû, derket û jê re got: Ka stûyê xwe ji min re dirêj bike, ez serê te jê bikim! Şevder stûyê xwe jê re dirêj kir, wî jî şûrê lê da û pê re li erdê ket, vezelîya û bû term. Bi wî hawayî derîyê duduyan, sisiyan, çaran,

pêncan û şeşan jî derbas kir, di derîyê heftan de diya wî derket hemberî wî û jê re got: Min şîr daye te û mezin keriye, heqê min li ser te heye, tu kurê min î û min tu neh mehan di nava xwe de rakiriye, tu nikarî min tazî bikî! Şevder jê re got: Kincên xwe ji xwe bike. Diya wî got: Tu kurê min î, tu çawa tiştekî wisa ji min dixwazî? Şevder rahişt şûrê ku bi dîwêr ve daliqandî bû, lê hejand û got: Yan tu yê kincên xwe ji xwe bikî yan jî bi vî şûrî ez ê serê te bifirînim. Xirecira di navbera wan de berdewam kir lê gava ku Şevder giranîya xwe da ser, jinikê kincên ser danîn û got: Wile kurê min tu rêz û hurmet bi te re nemaye. Şevder hîn bêtir bi ser de çû, hinek kincên din jî danîn û tenê binkiraskê wê lê ma. Ji Şevder re got: Kurê min qey dilê te ji kevir e, ku tu dixwazî min şilfîtazî bikî û min bihetikînî, ma qey ev ne heram e? Şevder got: Tu rast dibejî, kincên mayîn ji xwe meke!

Çavan ku wî ew gotin got, jinik gîriya û got: “Evê han derewan dike! ” û bi yek carê re hemû li ser serê wî kom bûn û têra wî lêdan, ew perîşan kirin û di derî re dehfandin, ew avêtin derve. Derîyê xezîneyê hat girtin û bû mîna berê. Zilamê Mexrîbî jî bi lez xwe pê ve gihand û ew ji rêya avê derxist, xelas kir.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 636'AN

*Şehrezadê got:*

Piştî ku Evdirehîmê Mexrîbî Şevder ji rêya avê derxist, li ser wî xwend, hetanî ku bi ser hişê xwe ve hat. Çawa ku çavê xwe vekir, ê Mexrîbî jê re got: Te çi şaşîtî kir, ku ev bobelat bi serê te de hat, feqîro?

Şevder got: Min derî yek bi yek derbas kirin, hetanî ku ez gihîştim cem diya xwe. Min û wê me pir li ber hev da, heta ku kincên xwe yeko yeko ji xwe kirin û binkirask tenê lê ma. Wê gavê ji min re got, min nehetikîne, tu yê çawa min tazî bikî û deverên heram ji laşê min eşkere bikî, ma qey ne guneh e? Dilê min şewitî û min ew binkirask jê nekir. Ew jî di cî de qîriya û got ev şaşîtîyan dike lê bidin. Komek însan li min hatin hev, ku ez nizanim ji ku derketin û têra min li min dan, hetanî ku ez hatim ber mirinê. Piştre ez dehfandim derve û jê pê de nema tiştek tê bîra min, bê çî qewimî.

Ê Mexrîbî got: Ma min ji te re negot şaşîtîyan meke û ji rêya gotinên min dernekeve! Binêre heger wê ew binkirask jî ji xwe bikira, dê niha karê

me bi dawî bibûya û em ê bigihîştina encamê. Lê niha divê tu heta sala bê vê çaxê li gel min bimînî û di vê rojê bi xwe de, incex em ê bikaribin careke din şensê xwe biceribînin.

Ê Mexrîbî gazî herdu bendeyan kir, bi lez û bez kon vekirin, kelûpel dan ser hev, ew bar kirin û çûn ji çavan wenda bûn. Qasekê bi şûn de, dîsa vegerîyan û herdu qantir bi şûn de anîn. Her yek ji wan li qantirekê siwar bû û dîsa vegerîya bajarê Fasê.

Şevder saleke din li cem wî ma, di nav kêf û xweşîyê de. Rojê sê caran xwarin û vexwarinên xweş mîna yên qralan xwarin û her rojê kincekî spehî û giranbuha li xwe kir. Gava ku sala wî qedîya û dîsa ew roj hat, ê Mexrîbî jê re got: Ev roj roja me ye, ka rabe em herin! Şevder pê re rabû, herduyan dan tengala hev û meşîyan, hetanî ku ji bajêr derketin. Li wê derê, dîsa herdu bende li gel herdu qantiran li hêvîya wan sekinîbûn. Her yek ji wan li qantirekê siwar bû û berê xwe dan xezîneyê, meşîyan, çûn hetanî ku gihîştin qiraxa wî çemî. Li wir herdu bendeyan di cî de ji wan re kon vegirtin, ew raxistin û nivîn tê de danîn, xwarina xwe xwarin. Piştre yê Mexrîbî dîsa mîna cara ewilî zil û lewheyên xwe derxistin, ew danîn ser hev û agir dada, buxûr berda û ji Şevder re got: Şevder ez dixwazim wesîyetekê li te bikim? Wî jî got: Mîrzayê min heger tu bikaribî wê xezîneyê ji bîr bikî, ez ê bikaribim wesîyeta te ji bîr bikim! Zilam got: Nexwe te wesîyeta min ji bîr nekiriye? Wî got: Na. Zilam got: Giyanê xwe baş biparêze û ji bîr neke, ku ew jinik ne diya te ye; ew xapek e di sûretê diya te de ye û armanca wê ew e, ku te bixe şaşîtîyê. Ya din jî divê tu bizanibî heger cara din tu bi saxî filitî bî jî, heger tu şaşîtîyê bikî vê carê wê te bikujin! Şevder got: Heger vê carê min şaşîtî kir, heqê wan heye, ku min bişewitînin!

Ê Mexrîbî dest pê kir xwend û buxûr dada. Çem miçiqî û derîyê di binî çem de derket holê, Şevder çû li derîyan hemûçkan da û efsûna gişan yeko yeko betal kir, hetanî ku di derîyê heftan de rastî diya xwe hat. Diya wî jê re got: Tu bi xêr hatî kurê min! Wî got: Ez di ku re bûme kurê te lanetlêhatîyê? De zû kincên xwe di ser xwe re bîne! Jinik li ber gerîya, kincên xwe perçe bi perçe ji xwe kirin û hewl da, ku wî bixapîne. Gava binkirask tenê li ser ma, sekinî. Şevder got: Wî jî ji xwe bike lanetlêhatîyê! Jinikê ew jî di ser xwe re anî û pê re jî zivirî reşkavalekî bêruh û li erdê ket. Ew jî derbasî hundir bû û dît ku hundir tijî zêr û zîv û gewher e. Guhên xwe qet neda tu tiştî û rasterast çû odeya Şemerdelê kahin, perde ji ber da alî. Bala xwe dayê ku xeleka

felekê li ser serê wî dibiriqîne, mîna heyvekê. Şûr û hungulîsk di destên wî de û kildank jî di stûyê wî de bû. Rahişt gişan û ji wir derket.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 637'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku Şevder rahişt her çar pîrozîyan û ji wir derket, daholekê lê da û hemû xizmetkar bi hev re qîrîyan û gotin: Xwedê te bi wî qismetî şa bike Şevder!

Lêdana daholê berdewam kir, hetanî ku Şevder bi temamî ji xezîneyê derket û gihîşt cem ê Mexrîbî. Evdirehîmê Mexrîbî jî xwendin qedand, buxûr sekinand û pê ve rabû, ew himbêz kir. Şevder jî her çar pîrozîyên giranbuha teslîmî wî kirin.

Evdirehîm gazî herdu bendeyan kir, wan jî di cî de kon danîn, kelûpel hemû tevdagirtin, birin û li gel herdu qantiran di cî de bi şûn de vegerîyan. Her yek ji wan li qantirekê siwar bûn û bi şûn de vegerîyan bajarê Fasê. Derbasî qesra xwe bûn, ê Mexrîbî xurcika xwe danî ber xwe û sênîkên xwarinên cur bi cur li pey hev jê derxistin, şîveke zengîn li ber Şevder danî û jê re got: De kanî bixwe, Şevder birawo!

Têra xwe xwarin û vexwarin, piştre Evdirehîm jê re got: Şevder, birawo tu ji bo xatirê me hatî vir û te dev ji karê xwe, dev ji malbata xwe berda û ji bo me te ev tab dît. Niha em bûn deyndarên te û divê tu jî tiştekî ji me bixwazî. Xwedê teala daye te û em jî dibin sebeb, de êdî fedî neke û bixwaze, ev heqê te ye!

Şevder got: Mîrzayê min, daxwaza min û te ji Xwedê ev e, ku tu wê xurcika xwe bidî min! Zilam xurcik dayê û jê re got: Bigire, ev heqê te ye û te çiyî din jî bixwesta, me yê bida te. Ev xurcik ji bo xwarin û vexwarinê baş e lê tu gelekî bi me re tehbîyayî û em mecbûr in te bi saxî û selametî vegerînin welatê te jî. Em ê xurcikeke din jî bidin te, ji zêr û zîv û cewheran, bila ew jî bi te re bibe alîkar, ji bo ku tu bibî tacir, xwedî kar û pîşê; da ku tu muhtacî kesî nebî û bi hêsanî malbata xwe xwedî bikî, bêyî ku tu devê xwe li ber kesî xwar bikî. Danûstendina bi vê xurcika xwarinê re pir hêsan e; hema destê xwe bavêjê û di dilê xwe de bêje: Bi heqê wî, yê xwediyê hemû navên gewre, ez ji te dixwazim ey xulamê vê xurcikê, ji min re filan xwarinê bîne, ew ê di cî de ji te re bîne.

Piştre gazî bendeyekî kir, qantirek jê re anî û xurcikeke din jî danî ser, çavîyeke wê tijî zêr kir û çavîya din jî tijî gewher û madenên giranbuha kir. Dûre got: De êdî lê siwar bibe û bila bende jî bide pêşîya te, ew rê nas dike, wê te bibe ber derîyê mala te. Gava tu gihîştî malê, herdu xurçikan hilde û qantirê bide bende, ew dê wê ji me re bîne lê haydar be, sira xwe ji kesî re nebêje. De êdî here, destê Xwedê û pêxemberan li pişta te be.

Şevder got: Xwedê xêra te pirtir bike û halê te xweş bike rebî, xatir jê xwest, li qantira xwe siwar bû, da pey bende û ket ser rê, berê xwe da welatê xwe, şev û roj meşîyan, di roja sisiyan de, gava di ber qesrekê re derbas bûn, çavên Şevder li diya wî ketin. Diya wî li ber dîwarê qesrê rûniştî bû, destê xwe vekiribû, digot: "Ji bo xatirê Xwedê, derhemekê bidin min!" Pars dikir. Hişê wî ji serî çû, ji qantirê peya bû û xwe avêt ser diya xwe, ew himbêz kir; diya wî jî girîya. Diya xwe li qantirê kir, da dû û çûn malê. Herdu xurcikên xwe ji ser qantirê rakirin û ew bi şûn de da bende. Jixwe qantir û bende, herdu efrît bûn, şûnde çûn.

Şevder bi wê rewşa parsektîya diya xwe pir êşîyabû û dilê wî şikestibû. Çawa ku derbasî hundir bûn, ji diya xwe re got: Gelo birayên min sax in, dayêcan? Diya wî got: Sax in. Wî got: Nexwe çima tu li ser rêyan parsê dikî? Got: Ji ber bîrçîbûnê kurê min. Şevder got: Berîya ku ez herim min hezar dînar dabû te û berîya wê jî min du sed dînar dabû te! Diya wî got: Birayên te ez xapandim û ew zêr ji min stendin, çûn.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 638'AN

*Şehrezadê got:*

Vêca Şahînşahê min ê bextewar! Gava Şevder li herdu birayên xwe pirsî, diya wî jê re got: Herduyan ez xapandim, gotin ka wan zêran bide me, em ê tiştekî bikirin: Piştre jî bera min dan. Ez jî ji birçîna mecbûr mam, ku ez herim ber derîyê xelkê, parsê bikim. Şevder got: Derbasbûyî be dayêcan, va ye êdî ez hatim, bila dilê te rihet be û xeman mexwe! Ev xurcika hanê tijî zêr û zîv û cewher in, êdî mineta kesî li me tune ye.

Diya wî got: Kurê min, tu mirovekî dilsoz û bextewar î. Xwedê ji te razî be, karê te li hev bîne û bi elba mezin bide te. De ka rabe ji min re xwarinekê, tiştekî amade bike kurê min, weleh ez ji birçîna mirim! Şevder kenîya

û got: Ser serê min, ser çavê min dayêcan! Tenê ji min bixwaze; bêje bê te kîjan xwarin divê, ez ê di cî de ji te re amede bikim; jixwe ne hewce ye ku ez herim tiştekî bikirrim û bipijînim jî? Diya wî got: Ka kurê min, ez tiştekî di destên te de nabînim? Şevder got: Hemû cureyên xwarin û vexwarinê di xurcika min de ne. Diya wî got: Hema çi hebe wê ber dilê min bigire, kurê min. Wî got: Rast e, wilo ye. Gava ku tiştek tune be, mirov bi her tiştî razî ye. Lê gava ku xwarin hebe, dilê mirov diçe xwarinên xweş; ê min jî her tişt li gel min heye, êdî li gora dilê xwe bixwaze!

Diya wî got: Kurê min, hema nanekî germ û hinek penêr bîne!

Şevder got: Ev çi ye dayêcan; ew layiqî asta te ye!

Diya wî got: Nexwe tu çêtir dizanî bê çi layiqî min e. Tu çawa dizanî, wisa bike. Şevder got: Xwarina layiqî te; goştê sor, mirîşkên biraştî, birinca bi bîber, dolmikên xirtik û mimbaran, berxên heşandî, kunefeya bi gûzan, qedayif û peqlawe ne.

Ji diya wî werê, ku kurê wê henekên xwe pê dike, matmayî jê re got: Çi bi te hatiye kurê min, qey tu ne li ser hişê xwe yî ango tu dîn bûyî? Şevder got: Ji ku derê tu dizanî, ku ez dîn bûme, dayêcan? Diya wî got: Ji ber ku tu behsa tiştên herî buha dikî û hêza te nagihîjê, ku tu wan bikirî...

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 639'AN

*Şehrezadê got:*

Diya Şevder gotina xwe berdewam kir: Û heger tu bikaribî wan xwarinan bikirî jî, wê kî bipijîne? Şevder got: Bi Xwedê ez ê wan xwarinan gişan a niha bidim te! Wê jî got: Ez jî li benda te me! Şevder got: Ji kerema xwe wê xurcika hanê bide min! Diya wî, xurcik da dest lê wê bi xwe jî nêrî û dît, ku vala ye. Şevder destê xwe xist xurcikê û sênîkên wan xwarinên ku gotibûn, yeko yeko jê derxistin û li ber diya xwe danîn. Diya wî got: Kurê min, xurcik pir biçûk û vala bû, îcar ev qas sênî û xwarin ji ku derketin? Şevder got: Binêr dayê, wî mirovê Mexrîbî ev xurcik da min. Xurcik efsûnkirî ye û xulamekî cinî di hundirê wê de heye, gava mirov tiştekî jê dixwaze, mirov destê xwe dixe hundirê wê û jê re dibêje, "Bo xatirê navên pîroz ka filan xwarinê bide min!", ew jî di cî de tîne. Diya wî got: Ka ez jî destê xwe biximê û tiştekî jê bixwazim? Şevder got: Destê xwe bixê! Diya wî destê xwe xist

xurcikê û got: Bi heqê navên pîroz ka mirîşkeke heşandî bide min! Sênî di cî de ket destê wê, sênîya xwe derxist, dît ku bi rastî jî mirîşkeke heşandî ye, piştre nan û gelek tiştên din jî xwest, ew jî ketin destên wê.

Şevder got: Dayêcan, piştî ku têr têr xwar, xwarina mayîn li sênîyên din vegerîne, dûre van sênîkan bixe xurcikê. Wê jî wisa kir û sênîkên vala li xurcikê vegerandin. Li dawiyê Şevder jê re got: Dayêcan bila ev xurcik li cem te be û tu kengî dixwazî jê bixwe û bide herdu birayên min jî û sedeqeyan jê belav bike, li ser hemû feqîran lê vê sir û raza me veşêre û ji kesîre nebêje.

Herdu birayên wî jî di demeke kurt de ji zarokên taxê fêr bûn, ku birayê wan vegerîyaye malê. Lewre ji wan re gotin: Birayê te li ser pişta qantirekê û di nava kincin giranbuha de bû, li pey bendeyekî berê xwe dabû malê. Wan jî ji hev re gotin, xwezika me ew bêbextî li diya xwe nekiribûya, niha dê birayê me ji wê meseleyê agahdar bike û em ê li himberî birayê xwe rezîl bibin. Lê piştre yekî ji wan got: Diya me diltenik û dilbirehm e, gilîyê me li cem birayê me nake û heger jê re bibêje jî, birayê me efûkar û bexşîner e, ger em lêborîna xwe jê bixwazin, dê di me de bibihure.

Berê xwe dan malê, herdu ji bîrçîna lawaz û hejar bûbûn. Çawa ketin hundir, birayê wan Şevder bi wan ve rabû, bi germahî ew himbêz kirin û ji wan re got: Rûnên û bixwin! Herdu li sifreyê rûniştin û xwarin û hey xwarin hetanî ku têr bûn. Şevder ji wan re got: Xwarina mayîn li ser feqîran belav bikin. Wan jî gotin: Birawo wê jî bihêle em paşîvan ji xwe re bixwin! Şevder got: Li paşîvan, ez ê xwarineke pirtir ji we re amade bikim.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 640'Î

*Şehrezadê got:*

Piştî ku herdu birayên Şevder têr xwarin û xwarina mayîn jî li ser hejar û belengazan belav kirin, Şevder ji diya xwe re got: Wan sênîkên vala li xurcikê vegerîne. Gava êvar hat û bû dema şîvê jî, Şevder çil çûre xwarin ji xurcikê derxist û sifreyeke xwarinê ya mezin li erdê danî. Ew û diya xwe û herdu birayên xwe li ser sifreyê rûniştin, heta ku têr xwarin. Piştre ji diya xwe re got: Wê xwarina mayî li ser feqîr û hejaran belav bikin dayêcan! Ew xwarina mayî jî belav kirin û gava eşa hat, Şevder, ji wan re ji xurcikê şêrînahî derxist, tiştê ji ber wan ma jî li ser cîran û feqîran belav kirin. Roja

dîtirkê, taştêyeke pir xweş ji wan re amade kir. Bi qasî deh rojan, wisa berdewam kirin.

Rojekê Salim ji Selîm re got: Gelo sebeba vê yekê çi ye? Birayê me sibe, nîvro, êvarê ji me re cur bi cur xwarinên xweş derdixe û her ku eşa tê jî şêrînahîyên xweş dide me. Her car jî tiştê ku ji ber me dimîne li ser feqîr û hejaran belav dike, mîna qral û sultanan. Ev qas mal û bextewarî hemû jê re ji ku hat û em nabînin ku wî rojekê tiştek kirîye yan jî agirek pêxistiye. Jixwe ne aşxane ne jî aşvanê wî heye? Selîm lê vegerand û got: Ez jî nizanim lê gelo tu dizanî bê kî dikare rastîya vê meseleyê ji me re bibêje? Salim got: Ji diya me pê ve, tu kes nikare rastîya vê meseleyê ji me re bibêje.

Herduyan bi hev re hîle û fenek ji diya xwe re amade kirin û di rojeke ku birayê wan ne li mal bû de, bi dora diya xwe ketin û jê re gotin: Dayêcan em birçî ne! Wê jî got: Qet meraq nekin, ez ê niha xwarinekê ji we re amade bikim. Çû hêwanê, destê xwe xist xurcik û ji xulamê xurcikê xwarinin germ xwestin, rahiştê, bir, danî ber wan. Wan jî got: Dayêcan, ev xwarin germ e û te ne agirek pêxist, ne jî xwarinek pijand? Diya wan got: Min ew ji xurcikê derxist. Wan jî gotin: Îcar ev xurcik tiştekî çawa ye? Wê got: Hûn razan digirin? Wan got: Jixwe em razan digirin dayêcan lê kanî ji me re jî bibêje bê çawa çêdibe? Diya wan, rêbaza derxistina xwarinê ji xurcik nîşanî wan da û ew fêr kirin. Êdî wan jî destê xwe davêt xurcikê û xwarina ku dixwestin, ji xwe re derdixistin, bêyî ku hayê birayê wan jê hebe.

Piştî ku sira xurcikê fêm kirin, rojekê Selîm ji Salim re got: Birawo heta kengî em ê mîna xulamên ber destê Şevder bin û xwarina xwe ji ber destê wî bixwin? Çima em fenekê lê nakin û vê xurcika hanê ji xwe re nabin?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 641'Ê

*Şehrezadê got:*

Gava ku Selîm got, ka em fenekê li Şevder bikin û em vê xurcikê ji xwe re bibin, Salim got: Çawa? Sêlîm got: A baş ew e, ku em birayê xwe bifiroşin serdarê Behra Siwês! Salim got: Em ê çawa bikaribin wî bifiroşin? Selîm got: Ez û tu, em ê biçim cem serdarê Behra Siwês, em ê wî û du pasevanên wî vexwînin mala me ser şîve. Ez çi ji Şevder re bêjim, tu jî şehdebûna min bide û min piştrast bike. Gava şev dereng ket jî, ez ê yê mayî nîşanî te bidim.

Bi wî hawayî herduyan li hev kir, li ser firotina birayê xwe û rabûn çûn mala serdarê Behra Siwêsê, jê re gotin: Ey serdarê hêja, em bi daxwazekê hatine cem te lê wê ev daxwaza me kêfa te jî bîne. Serdar got: Xêr e înşelah? Herduyan got : Em herdu bira ne û birayekî me yê sisiyan heye, pir bêxêr û çors e. Bavê me mir û me her sêyan mîrasê wî di nava xwe de parve kir. Wî pehra xwe li ser fesad û fisûqê xerc kir û gava ku feqîr ket, beleya xwe di me da û dest pê kir, çû gilîyê me li cem zaliman kir û got, herdu birayên min, malê min û bavê min xwerine. Me jî xwe û rastî parast. Lê gilîyên wî berdewam kirin û parastina me jî berdewam kir, heta ku me her sêyan jî malê xwe giş li ser kir. Lê hîna jî dev ji me bernedaye û em li ser xwe ditirsin. Loma me xwest em wî bifiroşin te, tu yê jî wî di keştîyên xwe de bi koletî ji xwe re bixebitînî.

Serdar ji wan re got: Gelo hûn dikarin bi fenekê wî bînin hetanî vira? Hûn wî bînin hetanî vir, ez ê jî wî bişînim Behra Siwêsê. Herduyan gotin: Em nikarin wî bînin vir . Lê heger tu û du zilamên xwe werin mêvantîya me, di dema razanê de em ê her pênc lê bibin yek, devê wî girêbidin, wî derdest bikin û bi şev wî ji malê derxin. Piştre tu çi pê dikî, tu çêtir dizanî. Serdar got: Bila be, hûn ê wî bi çil dînarî bidin? Gotin: Belê. Hûn jî piştî nimeja eşayê werin filan taxê, wê yek ji me li hêvîya we be.

Herdu vegerîyan malê û di wextê eşayê de, yek ji wan çû serê kaşeya kolanê, li bendî wan ma. Piştî nimêjê ew jî hatin û hevdu dîtin. Bi hev re hatin malê, derbasî hundir bûn. Gava Şevder ew dîtin, xêrhatina wan kir û got: Hûn ser seran hatine, ser çavan! Ew dan rûniştandin, li hal û wextê wan pirsî û guftûgo bi wan re kir, bêyî ku hayê wî ji hîleyê hebe. Piştre ji diya xwe xwest, ku şîvê ji wan re bîne. Wê jî xwarin li ser xwarinê ji xurcikê derxist û danî ber wan. Şevder kîjan xwarin dixwest, wê jî ew xwarin dianî ber wan, hetanî ku çil cureyên xwarinê temam bûn. Têra xwe xwarin û ji wan werê, ku ew xwarin giş Salim dide ber wan. Piştî ku şêranî jî xwarin û wext dereng ket, xwestin ku rakevin. Ew jî, Şevder jî, hemû raketin. Piştre hevdu şiyar kirin, hemû bûn yek û her pêncan bi hev re girtin ser Şevder, destpêkê devê wî girêdan, ji bo ku deng dernexîne. Piştre dest û nigên wî girêdan û di tarîya baskên şevê de ji malê derketin û Şevder jî bi xwe re birin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 642’YAN

*Şehrezadê got:*

Piştî ku Şevder di tarîka şevê de ji mala wî derxistin, ew birin siwêsê, qeyd û zincîr li nigên. Wî dan û ew avêtin nav êsîr û bendeyan; ew jî bêdeng di nava wan de xebitî, bêyî ku îtirazekê jî ji xwediyê xwe re bike.

Em Şevder li wir bihêlin û em vegerin ser herdu birayên wî. Ew jî çawa ku bû sibe, çûn cem diya xwe û jê re gotin: Ka birayê me Şevder li ku ye, qey ji xew ranebûye? Diya wan got: Herin, wî ji xew rakin! Wan jî got: Qey li ku raketiye? Diya wan got: Li gel mêvanan raketiye. Wan jî got: Nexwe hîna ku em di xew de bûne, ew jî bi mêvanan re çûye! Wisa xuya dike, ku tama ger û rêwîtîyê ketiye bin zimanê birayê me û xwestîye, ku here li xezîneyeke din bigire, lewre me bihîst, ku gava bi Mexrîbîyan re diaxivî, wan jê re digot: Em ê te bi xwe re bibin û xezîneyê ji te re vekin. Diya wan bi kelecanî pirsî: Qey bi Mexrîbîyan re civîya? Wan jî got: Ma ne ew ên ku mêvanên me bûn, ew bûn! Diya wan got: Belkî bi wan re çûbe lê înşelah wê Xwedê rêya rast nîşanî wî bide, wî bextewar bike û di nava xêr û bêrê de li me vegerîne! Piştre li ser girîya û pir xemgîn bû, ji ber çûyîna wî.

Herdu kurên wê hêrs bûn û jê re gotin: Lanetîyê tu ev qasî li ser wî diêşêyî û ev qasî jê hez dikî lê bi çûyîna me tu li ser me xemgîn nabî û bi hatina me jî tu kêfxweş nabî, ma qey em jî ne zarokên te ne, mîna Şevder? Diya wan got: Hûn jî kurên min in lê hûn bêhawe û cirnexweş in û tu xêr ji we nedîtiye. Ji gava ku bavê we çûye ser dilovanîya Xwedê, min xêr û qencîyek tenê jî ji we nedîtiye. Lê Şevder, gelek xêr û qencîyên baş bi min kirine û qedrê min pir girtiye. Loma heqê min heye, ku ez li ser wî bigirîm û bi çûyîna wî xemgîn bibim, lewre qencîya wî li ser min û we tevde heye.

Gava ew gotin ji diya xwe bihîstin, sixêf jê re dan, têra wê lêdan û ketin hundir, li xurcikê gerîyan, heta ku dîtin. Piştre li xurcika zêr û cewheran gerîyan, ew jî dîtin. Ji diya xwe re gotin: Ev malê bavê me ye! Wê got: Na weke ew malê birayê we Şevder e û wî ew mal ji welatê Mexrîbîyan anî. Wan jî got: Tu derwan dikî, ev malê bavê me ye û ji niha û pê de jî êdî yê me ye.

Mal hemû li hevdu par kirin lê li ser xurcika efsûnê li hev nekirin û ketin pêxêla hev; Selîm got, ez ê wê bibim, Salîm got ez ê wê ji xwe re bibim û dubendî ket neqeba wan. Diya wan ket navberê û ji wan re got: Kurên min, we xurcika zêr û cewheran li hev pehr kir lê ew xurcika hanê nayê

dabeşkirin û pir jî giranbuha ye. Heger hûn wê biqetînîn û bikin du perçe, wê efûna wê xera bibe. Vê xurcikê li cem min bihêlin wê çêtir be. Kengî hûn bixwazin, ez ê timî ji we re xwarinê jê derxim. Ez ê bi gepekê tenê razî bibim û heger hûn potikekî li min bikin, ez ê minetdarê we bim. Hûn ê bi wan zêran ji xwe re kar û bazirganîyê bikin, hûn kurên min in û ez jî diya we me, em ê bi vî hawayî pevre bijîn, hetanî ku fereca Xwedê li me vebe, belkî birayê we jî were û hûn qencîyeke din ji destên wî bibînin.

Lê herduyan qebûl nekir û xwe rakişandin hev, pev ketin, bi ser hev de rabûn, gelek gotin ji hev re kirin, ew şeva xwe giş bi qajewajê derbas kirin.

Îcar pasevanekî qral ku wê şevê li cem cîranekî wan mêvan bû, dengê pevçûna wan giş bihîst û di taqa negeba xwe û wan de guhdarîya wan kir û mijar ji serî hetanî binî fêm kir.

Gava bû sibe, pasevanê qral derbasî cem wî bû, ku navê wî Şemsed Dewle bû û qralê hemû Misrê bû û çîroka wê bêbextiya ku herdu birayan kiribûn, jê re vegot û gilîyê wan li cem wî kir. Qral di cî de şand dû wan û ew anîn dan ber îşkence û lêdanê, zêde li ber xwe nedan û zû li xwe mikur hatin û her tişt gotin. Qral herdu xurcik ji wan stendin û ew herdu jî avêtin zindanê. Carîyeyên xwe jî da cem diya Şevder, da ku pêdivîyên wê yên rojane pêk bînin.

Em herdu birayên wî li vir bihêlin û em vegerin ser Şevder. Ew jî bi qasî salekê di keştîya serdarê Behra Siwêsê de bi koletî xebitî. Rojekê bayekî ecêb li keştîyê rabû, pêlên avê çep û rast lêdan, keştî li tehtekî qelibandin û ew hûrhûrî kirin. Her kes binav bû, fetisî, mir, tenê Şevder bi saxî xwe gihand bejahîyê û ji wir ket rê, meşîya û meşîya heta ku xwe gihand wehayeke ereban. Xelkên wir li hal û wextê wî pirsîn, wî jî ji wan re got, ku berê di keştîyekê de dixebitî û dûmahîya serpêhatîya xwe ji wan re rave kir. Wê gavê li wê wehayê tacirekî Cideyî bi bandor bû û dilê wî pê şewitî, jê re got: Ey xortê Misrî, tu dixwazî li gel min bixebitî? Ez ê kinc û xwarina te bidim te û te bi xwe re bibim Cideyê. Şevder ew yek qebûl kir, ket xizmeta wî bazirganî, pê re çû Cideyê. Bazirgan pir qîmet dayê û qedrê wî girt. Piştî demekê bazirgan çû hecê û şêvder jî bi xwe re bir Mekeyê. Îcar gava ku Şevder Kevirê Reş tewaf dikir, ji nişka ve çavên wî li wî xwediyê wî yê Mexrîbî Evdirehîm ketin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 643'YAN

*Şehrezadê got:*

Gava ku Evdirehîm jî şevder dît, çû cem wî, silav lê kir û rewşa wî pirsî. Şevder girîya û tiştê ku hatibû serê wî, jê re anî ziman. Evdirehîmê Mexrîbî ew bir mala xwe, kincin xweşik lê kirin û qedr û qîmeteke mezin dayê. Piştre remla xwe vekir û li herdu birayên wî yên zalim gerîya, bala xwe dayê, ku ketine zindanê. Rabû jê re got: Binêre Şevder, Xwedê ji wan re nehişt û wa ye niha di zindana qralê Misrê de ne lê careke din tu bi xêr hatîyî, înşelah wê hatina te ya hecê rêyake xêrê ji te re veke. Şevder got: Mîrzayê min, iznê bidê min, ez ê herim ji wî bazirganê ku ez pê re hatim vir, xatirê xwe bixwazim. Mexrîbî got: Here xatirê xwe bixwaze û zû were vira, divê mirov xatirê nan û xwê bigire.

Şevder çû cem xwediyê xwe yê bazirgan, lêborîna xwe jê xwest û ji bo wê qencîya ku pê kiribû, spasîya wî kir û pê de çû, got: Bi izna te be, ez ê herim cem birayekî xwe, min ew dît. Bazirgan got: Here gazî wî bike, bila were vira, em ê ji bo wî sifreyeke şahîyê li dar bixin. Şevder got: Hewce nake, ew jî maldarekî mezin e û gelek xulam ji bo wî dixebitin. Bazirgan bîst dînar dan wî û jê re got: Tiştekî te di stûyê min de nema, Xwedê alîkarê te be û rêya te vekirî be. Şevder xatir jê xwest û ji cem wî derket. Bi rê de li feqîrekî rast hat, ew bîst dînar dan destê wî, meşa xwe berdewam kir, çû cem Evdirehîmê Mexrîbî. Li cem wî ma, hetanî ku heca xwe qedand.

Gava ku heca xwe qedand, Evdirehîmê Mexrîbî ew hungulîska ku wî bi xwe ji xezîneya Şemerdel derxistibû lê vegerand, da wî û jê re got: Ev hungulîska hanê wê hemû mirazên te pêk bîne. Navê xizmetkarê wê Birûsk e, çi ji te re lazim bibe, ew ê ji te re pêk bîne. Tu çawa hungulîska xwe bifirikînî, wê Birûsk bê raber te; tu jî pêdivîyên xwe jê bixwaze, ew ê di cî de pêk bîne. Binêre, ez ê niha li ber çavên te biceribînim. Evdirehîm hungulîsk firikand, xizmetkar di cî de derket holê û got: Bêje mîrzayê min, tu çi ji min dixwazî, ez kîjan qralî, kîjan serdarî bikujim gelo?

Evdirehîmê Mexrîbî got: Ey Birûsk...

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 644'AN

*Şehrezadê got:*

Evdirehîmê Mexrîbî ji xizmetkarê hungulîskê re got: Ey Birsûk, ji îro û pêde êdî wê Şevder Mîrza xwedanê te be. Êdî lê miqate be! Piştre li Şevder zivirî û axaftina xwe berdewam kir, got: Çawa ku min ji te re got, hungulîskê bifirikîne, ew ê bê raberî te. Tu çi dixwazî jê bixwaze, ew ê di cî de pêk bîne û qet li hemberî te dernekeve. Êdî here welatê xwe û li hungulîska xwe jî miqate be û ji bîr neke, ku qîmeta wê nayê hesêb. Lewre bi hêza wê, tu dikarî hemû dijminên xwe têk bibî.

Şevder spasîya wî kir û got: Bi izna te be, îcar ez ê herim welatê xwe! Evdirehîm got: Hungulîskê bifirikîne û li xizmetkar siwar bibe, here. Ger tu jê re bibêjî, îro min bigihîne malê, ew ê îro te bigihîne malê.

Şevder xatirê xwe ji Evdirehîm xwest û hungulîska xwe firikand. Xizmetkarê wî di cî de hat ber wî û got: Bixwaze mîrzayê min, ez ji xizmetê re amade me? Şevder jê re got: Min îro bigihîne Misrê! Xizmetkar got: Ser seran ser çavan. Ew li ser pişta xwe kir û firîya çû. Nîvê şevê ew gihand Misirê û ew bir li ber derîyê mala wî danî û çû.

Şevder derbasî malê bû, diya wî pê ve rabû, ji kêfan hêsir barandin û ew himbêz kir, li hal û wextê wî pirsî. Piştre çi bi serê herdu birayên wî hatibû, jê re got; ew agahdar kir, bê çawa lêdan û herdu xurcik jê stendin û çawa qral bi wan hesîya, ew avêtin hepsê.

Şevder bi wê rewşê êşîya û ji diya xwe re got: Xeman mexwe yadê, ez ê a niha her tiştî çareser bikim û herdu birayên xwe ji hepsê derxim, bînim vir. Hungulîska xwe firikand, Birsûk di cih de hat hember wî û got: Daxwaza xwe bibêje mîrzayê min, ez amade me? Şevder got: Ez dixwazim ku tu niha herî herdu birayên min ji zindana qral Şemsed Dewle derxînî, wan bînî vira!

Birûsk di cî de ket bin erdê û çû di bin zindanê re derket. Selîm û Salim jî, wê gavê her kêlî di nava tengasîyeke mezin de, di nava êş û azareke mezin de bûn, hêvîya mirinê ji Xwedayê xwe dikirin, bo ku ji wê rewşa xerab xelas bibin; yekî ji yê din re digot: Ev êş û azara hanê pir dewam kir, gelo em ê kengî bimirin û jê xelas bibin?

Hîna ku ew di nava wan fikaran de bûn, bala xwe danê, ku ji nişka ve erd qelişî û Birûsk jê derket, bi qerpika stûyê herduyan girt û dîsa ket bin erdê, ew bi xwe re birin, ji tirsan herdu jî jiser hişê xwe çûn û gava careke

din bi ser xwe ve hatin, bala xwe danê, ku li malê ne, dê û birayê wan Şevder jî li rex wan in!

Şevder ji wan re got: Derbasbûyî be birano, qey we ez ji bîr kirime? Herduyan rûyên xwe bera ber xwe dan û bû kûrekûra wan, girîyan. Şevder got: Megirîn, şeytan û temahkarîya we hûn anîn vê radeyê lê belê we çawa ez firotim? Lê belê Yûsûf jî li ber çavên min e; yê wî, birayên wî tiştekî hîn xerabtir pê kiribûn û ew avêtibûn bîrê...

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 645'AN

*Şehrezadê got:*

Şevder ji herdu birayên xwe re got: We çawa ew neheqî li min kir û ew bobelat bi serê min de anî? De ka tobe bikin, belkî Xwedayê dilovan we bibexşîne; lewre ez di we bihurîme û tu doza min li we nemaye.

Şevder, bi zimanekî xweş ber dilên wan girt, heta ku haş bûn. Piştre serpêhatîya xwe ji wan re rave kir, bê çawa û çiqas êş û azar kişandiye, hetanî ku careke din li şêxê xwe yê Mexrîbî Evdirehîm rast hatiye û ew hungulîska efsûnî daye wî, çîrok û hunerên hungulîskê jî ji wan re gotin. Wan jî vegerand û got: Birawo, vê carê jî li me negire û di qisûra me bibihure û cezayê ku tu pêwîst bibînî jî, li me bibire, êdî me dev ji wê rêya xerab berda.

Şevder got: Tiştek nabe lê ka ji min re bibêjin, bê qral Şemsed Dewle çi bi serê we kiriye? Herduyan got: Li me da, em tehdît kirin û herdu xurcik ji me stendin, piştre em avêtin zindanê.

Şevder got: Meraq nekin, ez ê her tiştî çareser bikim. Hungulîska xwe firikand, Birsûk hat ber wî û got: Fermanê bide mîrzayê min? Gava ku herduyan Birûsk dîtin, pir tirsîyan û gotin belkî wê jî xizmetkar re bibêje wan bikuje, rabûn, xwe dan pişt diya xwe, xwe avêtin dexîlê wê û jê re gotin: Dayê em di bextê te de ne, me bisitrîne û li me were rehmê! Diya wan got: Metirsin lawro, metirsin; birayê we tiştekî bi we nake.

Şevder ji Birsûk re got: Ez ji te dixwazim, ku tu herî hemû zêrên di xizaneya qral de me, bînî vir. Çiqas cewher û madenên giranbuha hene, wan jî bîne û tiştekî nehêle. Herdu xurcikên ku ji birayên min stendibû jî bîne. Birûsk got: Ser seran, ser çavan û di cî de çû, hemû tiştên di xezîneya qral de anî û ji Şevder re got: Mîrzayê min, min hemû malê qral anî.

Şevder ji diya xwe xwest ku zêr û cewheran biparêze. Piştre xurcika efsûnî danî ber xwe, xwarin jê derxist û pê re jî ji Birsûk re got: Ez ji te dixwazim, ku tu îşev ji me re qesreke bilind û xweş çêbikî, wê bi ava zêr bixemilînî û bi merş û nivînin giranbuha raxînî û ez dixwazim ku tu van karan gişan bi şeveqê re biqedînî! Birûsk got: Ser seran, ser çavan; piştre di zikê erdê de çû û ji ber çavan wenda bû. Şevder û dê û birayên xwe jî li dora sifreya xwe kom bûn, têr xwarin û vexwarin û di pey re jî raketin.

Birûskê xizmetkar jî hemû cin û efrîtên xwe li xwe civandinbûn û bi lez qesir lê dikirin. Hinekan kevir dibirrîn, hineka lêdikirin, hinekan spî dikirin, hinekan dineqişandin û hinekan jî radixistin. Bi lêdana tîrêjên şeveqê re, avakirina qesrê bi temamî qedandin. Birûsk çû cem mîrzayê xwe û jê re got: Mîrzayê min, qesra te kuta bû, li benda te ye. Heger tu bixwazî, were lê binêre.

Ew û diya xwe û birayên xwe, hemû bi hev re çûn, lê nêrîn, bala xwe danê, ku qesreke pir xweşik û bêtimtêl e, hiş û aqilê mirov dîsekinîne! Şevder, bi qesra xwe ya ku li ser devê rê bû pir kêfxweş bû û tiştek jî nekelifîbû, li ser wê ji diya xwe re got: Tu bi vê qesrê qayil dibî, ku tu tê de rûnêyî? Diya wî got: Çawa na kurê min; bi kêfxweşî tê de rûnişt û ji kurê xwe re dua kirin.

Şevder dîsa hungulîska xwe firkand, Birsûk li ber wî sekinî, got: Fermanê bide mîrzayê min. Şevder got: Here çil qerwaşî bîne, ku spî û spehî bin, çilê din jî bila reş bin. Çil bende û çil xizmetkarî jî bîne! Birûsk got: Ser seran, ser çavan û di cî de çû welatê Hindistanê, Sindê û welatê Eceman. Çil heb alîkarê xwe jî bi xwe re biribûn. Li wan welatan gerîyan û çi keçeke spehî ket ber wan, ew revandin, anîn qesra wî.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 646'AN

*Şehrezadê got:*

Di encamê de Birûsk û hevalên xwe yên cinî, çil qerwaş, çil bende û çil xizmetkar anîn qesrê. Şevder ji Birsûk re got: Here ji bo her yekê/î ji wan kinc û lîbasin xweşik û giranbuha bîne. Birûsk got: Ew jî hatin. Şevder got: Kincin xweşik ji bo min û diya min jî bîne! Ew jî anîn. Hemûçkan kincên xwe yên nû li xwe kirin. Şevder ji qerwaş û bendeyan re got: Ev xatûna we ye! Hemûçkan di cî de destê diya wî maçî kirin û serê xwe jê re tewandin; bendeyan jî destê

wî maçî kirin. Piştre kincên giranbuha li herdu birayên xwe jî kir. Êdî ew bûbû mîna qralan û birayên wî jî bûbûn mîna wezîran. Mala wan jî pir mezin û fire bû; herdu birayên wî û qerwaşên wî li alîyekî radizan, ew û diya xwe jî di qesrê de diman. Her yek ji wan, weke sultanekî bû êdî.

Îcar em werin ser xeznedarê qral Şemsed Dewle. Gava ji bo hinek pêdivîyan çû xezîneyê, bala xwe dayê, ku vîkî vala ye û tiştek tê de tune ye. Şaşwaz û matmayî ma, qîrek da û ji ser hişê xwe çû, li erdê ket. Gava dîsa bi ser hişê xwe ve hat jî, rabû ser xwe, derîyê xezîneyê vekirî hişt û bazda, çû cem qral û jê re got: Emîrê emîran, ez mecbûr im te agahdar bikim, ku xezîne îşev hatiye valakirin!

Qral got: Te çi bi malê min kiriye, ku xezîne vala bûye? Xeznedar got: Min tiştek bi malê te nekiriye û ez nizanim çawa vala bûye jî. Şeva borî ez çûm hundir, min dît, ku xezîne tijî û îro ez çûm, min dît ku vikîvala bûye û derî jî girtî bû; ne hatiye şikandin ne jî zordarî lê hatiye kirin û diz derbasî hundir bûne!

Qral got: Herdu xurcikên tê de jî çûne? Xeznedar got: Belê, herdu xurcik jî çûne. Wê kêlîkê, aqilê sultan ji serî firîya!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 647'AN

*Şehrezadê got:*

Hîna ku qral di wê şoka agahîya ku xeznedar dabû wî de bû, pasevanê wî yê ku berê agahîya pevçûna Selîm û Salim jê re anîbû, ket hundir û jê re got: Ya qralê zemanan, şeva borî, ji êvarê hetanî sibehê, min çavdêrîya avahîyekê kir, ku nû çêdikirin lê bi sibehê re qedîya û çawa tava rojê derket, min bala xwe dayê, ku qesreke pir mezin û pir spehî ye, li tu derê min qesrên wisa nedîtine. Min lê pirsî, min got ev qesra kê ye? Gotin Şevder li gel mal û milkekî mezin vegerîyaye malê û ev qesr daye avakirin. Hinekan jî gotin, gelek bende, xizmetkar û qerwaşên wî hene û bûye mîna sultanekî, herdu birayên xwe ji zindanê rizgar kirine.

Sultan got: Zû herin li zindanê binêrin! Çûn li zindanê nêrîn, Selîm û Salim nedîtin û vegerîyan ew agahî dan qral. Qral got: Min reqîbê xwe dît: Ê ku Selîm û Salim ji zindanê derxistiye, xezîneya min jî vala kiriye! Wezîrê wî pirsî: Ew ê ku tu behsa wî dikî, kî ye gelo? Qral got: Birayê wan Şevder e. Yê

ku herdu xurcik birine jî ew e. De êdî rabe pêncî pasevanî bişîne pey wî, bila wî û herdu birayên wî bigirin, bînin û mal û milkên wan jî mohr bikin, ez ê hemûyan darve bikim . Qral pir hêrs bûbû û agir ji çavên wî dida der; dubare ji wezîrê xwe re got: Zû rabe here wan bîne vira, da ku ez wan bikujim!

Wezîr got: Bêhna xwe fireh bike û nelezîne qralê min, Xwedê teala jî dibêje xêr di sebrê de heye û ecele karê şeytan e. Însanê me gunehkar be jî, divê em dilbirehm bin. Jixwe kesê ku qesreke wisa mezin û spehî di şevekê tenê de çêbike – çawa ku dibêjin – ne mirovekî ji rêzê ye û ez ditirsim, ku serê qralê min bi vî Şevderî re bikeve belayê. Vêca hebekî bêhna xwe fireh bike, hetanî ku ez rastîyê fêm bikim û fêr bibim, bê çi qewimîye. Piştre jixwe tiştê ku tu dixwazî, em ê bi serê wî de bînin.

Qral got: Nexwe tu çi dibêjî, çare çi ye? Wezîr got: Emîrekî bişîne pey wî, biezimîne cem xwe û bi dilekî xweş lê bi pirs, pê re mijûl bibe û bi zanebûn hêza wî biteqilîne. Heger hêza wî pir be, hîleyê lê bike lê heger hêza wî hindik be, wî bigire û tu çi dixwazî, pê bike. Qral got: Nexwe emîrekî bişîne pey wî û wî vexwîne cem me.

Wezîr, emîrekî bi navê Osman şand dû Şevder, bo ku jê re bibêje, qralê me dixwaze ku tu li cem wî bibî mêvan û bêyî Şevder bi şûn de venegere qesrê. Vêca ew emîr jî mirovekî pozbilind, qure û ehmeq bû. Ew û pêncî pasevanên xwe çû ber qesra Şevder. Xizmetkarekî Şevder jî li pêşîya qesrê, li ser kursîyekî rûniştî bû, qet guh neda hatina Osman û zilamên wî, mîna ku berê wan ne li wî be, yan jî kesek li wir tune be! Heta gava Osman gihîit cem wî jî, xizmetkar ji ber wî ranebû, çawa ku kes nehatibe cem wî...

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 648'AN

*Şehrezadê got:*

Gava Osman gihîşt cem qesrê, ji xizmetkar re got: Ey bende, kanî mîrzayê te li ku ye? Wî got: Li qesrê ye. Xizmetkar bêyî ku xwe rast bike jî, bersiva wî da. Osman hêrs bû, bi ser de rabû û jê re got: Ey bendeyê bêmirês û bêoxir, qey tu fedî nakî, ku tu wisa nîvpaldayî bi min re diaxivî mîna jinan! Xizmetkar got: Bi rêya xwe de here û zêde neaxive!

Bi vê gotina dawîn re, Osman har bû, gurzê xwe hilda ji bo ku li xizmetkar bide, lewre nizanibû, ku ew cinî ye. Îcar gava xizmetkar dît, ku Os-

man gurz lê kişandiye û bi ser de tê, pê ve rabû, gurzê wî ji dest girt û çar derbe li ser hev lê dan. Dema ku her pêncî zilamên wî ew rewşa emîrê xwe dîtin, li zora wan çû, şûrên xwe kişandin û bi ser de çûn, ku wî bikujin. Wî jî ji wan re got: Kûçikno qey hûn şûran li min dikişînin? Û weke pilingekî xwe çeng kir wan û bi wî gurzî ket nava wan, dev û pozê gişan di nava xwînê de hişt; hemûçik bi şûn de revîyan û çûn.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 649'AN

*Şehrezadê got:*

Emîr Osman û her pêncî pasevanên xwe, polîpoşman û bi awayekî binketî û perîşan, bi şûn de revîyan cem qralê xwe. Serê wan di ber wan de, di nava şermeke mezin de tiştê ku bi serê wan de hatibû, ji qral re gotin. Emîr Osman di axaftina xwe de got: Qralê zemanan, gava ez gihîştim ber derî û min xizmetkarek li wir dît, ku bi pozbilindî li ser kursîyekî zêrîn rûniştî ye, ez şaşwaz bûm. Vêca çawa wî ez dîtim, li şûna ku ji ber min rabe ser xwe, xwe da ser kêlekekê û palda, heqaret li min kir. Ez pê re dipeyivîm, wî paldayî bersiva min dida. Ez pir hêrs bûm, min nema xwe girt, min gurzê xwe ji ber xwe kişand, ji bo ku ez lê bidim. Lê wî gurz ji destê min girt û li min û pasevanên min da, em giş avêtin erdê, me pê nikaribû û em mecbûr man, ji ber wî birevin.

Qral hêrs bû û got: Bi sed zilamî bi ser de herin! Bi sed zilamî bi ser wî xizmetkarî de çûn, li wan rabû û bi gurz li wan da, heta ku giş ji ber wî revîyan, ew jî dîsa li ser kursîyê xwe rûnişt. Ew her sed zilam jî vegerîyan cem qral û ew agahdar kirin, jê re gotin: Ey qralê zemanan, em jê tirsîyan û ji ber wî revîyan! Qral ji wezîrê xwe re got: Ez ji te dixwazim, ku tu bi xwe li gel pêncsed zilamî herî û wî xizmetkarî, xwediyê wî Şevder û herdu birayên wî bînî vira!

Wezîr got: Ey qralê zemanan, pêdivîya min bi leşkeran nîn e, ez ê bi tena serê xwe û bê çek herim. Qral got: Tu çawa dizanî wisa bike û here. Wezîr çekên xwe danîn, kincin spî li xwe kirin, tizbîyek xist destê xwe û hêdî hêdî meşîya, bi tena serê xwe çû, gihîşt cem qesra Şevder, dît ku xizmetkarek li ber derî rûniştî ye. Bi edep û dilnizmî çû li kêleka wî rûnişt û jê re got: Silav li ser te bin! Wî jî lê vegerand û got: Li ser te bin jî ey insî, tu çi dixwazî?

Gava ku wezîr gotina “ey insî” ji devê wî bihîst, têgihîşt ku ew cinî ye. Ji tirsan ricifî û jê re got: Gelo mîrzayê te Şevder li vir e? Got: Belê, di qesrê de ye. Wezîr got: Here jê re bibêje, qral Şemsed Dewle te vedixwîne cem xwe û silavan li te dike û dibeje, ez ê şanaz bibim, ku ew were mêvantîya min. Xizmetkar got: Li vir be, heta ku ez herim pê bişêwirim û bêm.

Wezîr, xwe li ber derî ragirtr, xizmetkarê cinî jî çû hundirê qesrê û ji Şevder re got: Qral, emîrekî xwe bi pêncî pasevanî ve şand, min li wan da revîyan, çûn. Piştre bi sed pasevanî hatin, min dîsa li wan da, dîsa revîyan. Piştre bi dused pasevanî hatin, min dîsa li wan da. Niha jî wezîrê xwe bi tenê û bê çek şandiye dûv te, dibêje bila bê mêvantîya min, îcar tu çi dibêjî?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 650’YÎ

*Şehrezadê got:*

Gava Şevder ew agahî girtin, ji xizmetkarê xwe re got: Here, wî bîne vira. Xizmetkar ji qesrê daket ber derî û ji wezîr re got: Were tu bi mîrzayê min re biaxive! Wî jî got: Ser seran û berjor ve derket, çû cem Şevder; dît ku mîna qral û sultanan li ser doşekekê rûniştiye, ku li cem qralan jî peyde nabe, şaş û metal ma li himberî wê raxistin û wan neqşên di hunder de. Wezîr, xwe li himberî wî mîna parsekekî his kir. Loma, çawa çû cem wî, bejna xwe li ber tewand, erd maçî kir û dua jê re kirin, got: Ezbenî ezîzê te qral Şemsed Dewle silavan ji te re dişîne, sifreyek ji te re amade kiriye, te vedixwîne cem xwe bi mêvantî, ji ber ku pir bêrîya te û dîtina rûyê te yê nûranî kiriye. Gelo tu xatirê wî naşikênî û tu yê werî?

Şevder got: Madem ku ew ezîzê min e û wî bêrîya min kiriye, bila ew were mêvantîya min! Wezîr got: Ser çavan. Şevder hungulîska xwe firikand, xizmetkarê wî hat hemberî wî. Şevder jê re got: Here kincekî herî xweşik ji min re bîne! Xizmetkar çû, ew anî. Şevder ew kinc da wezîr û jê re got: De ka van kincan li xwe bike û here wê peyama min bide qralê xwe! Wezîr bi wî kincî ji qesrê daket, ku di heyata xwe de kincekî wisa giranbuha li xwe nekiribû. Çû cem qral, ew ji rewşa Şevder û qesra wî agahdar kir û pêde çû, got: Şevder te vedixwîne cem xwe! Qral qîrek da leşkeran û got: Rabin, em diçin! Hemû rabûn ser xwe. Qral got: Li hespên xwe siwar bibin: Û kanî hespê min jî bînin, em diçin cem Şevder!

Qral li hespê xwe siwar bû, leşker û wezîrên xwe dan dû xwe û berî da qesra Şevder. Şevder jî ji xizmetkarê xwe yê cinî re gotibû, gazî hevalên xwe yên cinî bike, bila giş bikevin sîfetê însanan û mîna leşkeran li ber derî bisekinin, ji bo ku qral wan bibîne û ji wan bitirse, çogên wî bilerizin, da ku bizanibe desthilatdarîya min ji ya wî xurtir e. Loma, xizmetkar jî du sed hevalên xwe yên cinî anîbûn cem xwe û ew xistibûn sîfetên leşkerên çekdar, ku çekên wan pir balkêş û buha bûn û bejna gişan jî dirêj û bi heybet bûn.

## ŞEVA 651'AN

*Şehrezadê got:*

Gava qral û leşkerên xwe hatin ber derîyê Şevder û ew leşkerên sert û bi heybet li wir dîtin, ji wan tirsîya û bi wê tirsê derbasî hundir bû, çû cem Şevder; dît ku di dîwanekê de rûniştî ye, ku mîr û sultan jî ne mîna wî ne! Silav lê kir û li ber destên wî sekînî lê Şevder ne pê ve rabû, ne guh dayê û ne jî cihekî rûniştinê nîşanî wî da. Ew li ser nigan hişt, bêyî ku tu qedr û qîmetê bide wî. Tirseke mezin ket dilê qral û êdî ne dikaribû rûnê û ne jî bi şûn de vegere, here. Di dilê xwe de ji xwe re got: "Heger ji min bitirsîya, bi vî hawayî nêzî min nedibû; Heta belkî xerabîyekê jî bi min bike, ji ber wê xerabîya ku min bi herdu birayên wî kir!"

Şevder jê re got: Ey qralê zemanan! Kesên mîna we, çawa zilmê li xelkê dikin û dest datînin ser malên wan? Qral got: Mîrzayê min, li min negire, temahîyê ez gihandim wê radeyê û ew qedera hanê hat serê min, jixwe ku guneh û sûc tune bûna, rehmet û lêborîn jî çênedibû; ez lêborîna xwe ji te dixwazim. Di berdewamîya axaftina xwe de jî bi helbestî got:

> ey nijadesîlê dilbirehm û lêborîner
> neke wina loman li min ev e qeder
> ger zalim bî tu em ê te bidin efûkirin

Bi wî hawayî qral bi dilnizmî li ber Şevder gerîya û pê de çû, heta ku Şevder jê re got: Xwedê tu efû kirî, ka were rûnê!

Qral rûnişt, Şevder jî ebaya aştîyê avêt ser milan û ji herdu birayên xwe xwest, ku sifreya xwarinê ji wan re amade bikin. Hemûçkan têra xwe xwarin û vexwarin. Piştre Şevder, her yekî ji wan kincekî spehî li wan kir û qedrê gişan girt. Di dawîya şevbuherkê de ji qral îzin xwest û tevlî leşkerên xwe, rabû ser xwe, çû.

Di rojên pey wê re jî êdî qral her roj dihat cem Şevder û civat li cem wî digerand. Navbera wan pir xweş bû, pev şêrîn bûn û êdî qral, timî dîwana xwe li cem Şevder li dar dixist. Piştî demekê, qral û wezîrê xwe bi tena serê xwe hatin cem hev, pev şêwirîn. Qral ji wezîrê xwe re got: Ez ditirsim, ku Şevder min bikuje û qraltîya min ji destê min derxîne! Wezîrê wî got: Ezbenî di vê mijara jidestderxistina qralîyetê de qet metirse, lewre rewşa ku ew tê de ye, ji rewşa qralekî çêtir e. Qralbûn ji bo Şevder, astketinek e. Lê heger tu ditirsî, ku te bikuje, bi rihetî tu dikarî pêşîya vê bigirî: Keçeke te yî spehî heye, bide wî, pê re bizewicîne, tu û wî hûn ê bibin yek.

Qral got: Nexwe tu navbeynkarê me be û vî karî eyar bike! Wezîr got: Wê çaxê wî biezimîne cem xwe, em li dîwanê şevbuhêrkekê bi hev re derbas bikin. Bila keça te jî xwe bixemîlîne û di ber derîyê dîwanê re derbas bibe. Çawa ku wê bîbîne, dê dil bikevê. Wê çaxê ez ê xwe bi ser de xûz bikim û jê re bibêjim, ew keçik keça te ye û pê re bikevim nava axaftinê, çawa ku hayê te bi xwe ji tiştekî tune be, heta ku wê ji te bixwaze. Gava ku bi hev re zewicîn jî, jixwe hûn ê bibin yek û êdî tirsa ku ew te bikuje jî li holê namîne, jixwe heger ku ew bimire jî, tu yê malekî pir ji wî mîras bigirî.

Qral got: Tu rast dibejî. Şevder bi mêvantî vexwendin cem xwe û xwarineke xweş jê re çêkirin, danîn ber wî, wezîr û gizîr û mezinên dewletê jî pê re li ser xwarinê rûniştin, ketin nava sohbeteke kûr û dirêj. Qral jî berê ji jina xwe re gotibû, keça me baş bixemîlîne û wê di ber derîyê dîwanê re bibihurîne, jina wî wisa kir û keçik di ber derî re derbas kir. Şevder jî çawa çav li husn û cemala wê ket, ahînek pê ket û gurmegurm bi dilê wî ket. Lewre keçik pir xweşik bû, mîna heyveke li çardan bû. Bedena Şevder giş lerizî, rûyê wî zer bû û agirê eşqeke bêtimtêl di nava xwe de his kir, ku nikaribû pêşî lê bigirta.

Wezîr lê hay bû, xwe bi ser de tewand û hêdîka jê re got: Xêr e ezbenî, xuya ye ku êşek bi te re peyde bûye? Şevder got: Wezîr can, ev keçik keça kê ye? Vê keçikê dil ji min bir û aqil di serê min de nehişt. Wezîr got: Ev keça ezîzê te ye; keça qral e. Heger te ew ecibandibe, ez dikarim pê re biaxivim, ji bo ku wê bi te re bizewicîne? Şevder got: Pê re biaxive û tu çi ji min bixwazî, ez ê wî bidim te. Qral jî çi bixwaze, ez ê wî bidim wî, bo ku em bibin dost û merivên hev. Wezîr got: Misoger ez ê vê daxwaza te pêk bînim.

Piştre wezîr çû, bi dizî bi qral re axivî û jê re got: Ey qralê zemanan! Şevder dixwaze bi te re mervantîyê bike û ew li ber min gerîya, ji bo ku ez ji

te re bibêjim û tu keça xwe bidî wî. Ji bo keça xwe Asîya xatûn tu qelenekî çiqasî giran jê bixwazî jî, dê bide te.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 652'YAN

*Şehrezadê got:*

Gava qral ew gotina wezîr bihîst, jê re got: Qelenê wê jixwe min girtiye û keça min carîyeya ber destê wî ye, bi qebûlkirina wî em şanaz dibin.

Wê şevê raketin û roja din bi sibehê re qral dîwana xwe li dar xist; bi amedebûna şexê Îslamê û Şevder, hemû karmend û xelkên bajêr hatin dîwanê. Şevder keça qral Asyaxan di hizûra gişan de ji xwe re xwest û mehra wê birrîn. Ji bo qelen jî, gotin "hatiye dayîn" û Şevder ew xurcika ku tijî zêr û gewher bû, ji malê xwest û weke qelenê jinê, ew da bavê wê. Şahîya zemawendê hat lidarxistin, gurmîn bi daholan ket, pîzepîz bi zirneyan ket û daweteke mezin hat lidarxistin, ku kêf û şahîya wê li hemû bajêr belav bû.

Piştî zewaca wan, Şevder û qral bûn merivên hev; bûn yek dest û pir ji hevdu hez kirin; demeke dirêj bi hev re man. Piştre qral mir û leşkeran ji Şevder xwestin, ku ew li ser serê wan bibe qral lê wî qebûl nekir. Gava ku leşkeran di wê daxwaza xwe de pir israr kirin, Şevder jî îqna bû û qebûl kir, li ser serê wan bû sultan û li ser gora qral Şemsed Dewle mizgeftek da avakirin û komeleyeke xêrwaziyê jî li ser navê wî bi rê xist, da tevgêrkirin. Ji ber ku gora qral li taxa Bendaqîn bû, ew mizgeft û ew komele jî li wir avakirin lê ew bi xwe li taxa Yemanîyê rûdinişt û gava ku bû sultan, taxê jî navê wî girt û êdî bû taxa Şevderîye. Êdî navenda qralîyeta wî ew der bû û herdu birayên xwe jî ji xwe re kiribûn wezîr.

Rojekê Salim ji Selîm re got: Birawo, em ê heta kengî di vî halî de bin? Ma qey em ê temenê xwe gîşî di xizmet û koletîya Şevder de derbas bikin? Hetanî ku Şevder sax be, ne kêf û şahî ne jî bextewarîyek ji me re heye? Selîm got: Em ê çi bikin heta ku em bikaribin wî bikujin û xurcik û hungulîskê jê bistînin? A rast tu ji min jêhatîtir î, rê û rêbazekê ji me re bibîne, ku em bikaribin wî bikujin. Salim got: Heger ez rêbazeke kuştina wî bibînim, tu yê pê razî bibî, ku ez bibim sultan li şûn wî û tu jî bibî wezîrê destê rastê û bila hungulîsk jî di destê te de be? Selîm got: Belê. Herduyan li ser kuştina wî li hev kirin û çûn cem Şevder, jê re gotin: Birawo, divê tu werî

mala me jî, da ku em bi te şanaz bibin. Ka tu jî carekê were li cem me bibe mêvan û xwarina me bixwe, bila xatirê me jî li cem te hebe.

Herdu jî gelekî li ber Şevder gerîyan û dilê wî bi xwe şewitandin, heta ku qebûl kir û got: Baş e, ez ê werim mêvantîya we lê li mala kîjanî ji we?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 653'YAN

*Şehrezadê got:*

Salim li Şevder vegerand û got: Destpêkê were mala min û piştre jî derbasî mala birayê min Selîm bibe, şevbuhêrka xwe li wir biqedîne. Şevder got: Baş e û bi Salim re çû mala wî, li cem wî bû mêvan. Jê re xwarin amade kirin û anîn ber wî, wî jî xwarina ku jehr tê de bû, xwar û pê mir. Salim rabû ku hungulîskê ji destê wî derxîne lê hungulîsk derneket. Wî, tilîya ku hungulîsk tê de bû, bi kêrê jêkir û hungulîsk firikand. Xizmetkarê cinî hat hember wî û got: Bêje ezbenî, ez amade me li ber destê te! Salim jê re got: Vî birayê min ê din jî bikuje û herduyan bibe bavêje pêşîya leşkeran. Xizmetkarê cinî Selîm jî kuşt û rahişt cendekê wî û Şevder û ew birin, avêtin pêşîya mezinên leşkeran, ku hemûçik li ser sifreya xwarinê rûniştî bûn, xwarin dixwarin. Gava ku çav li meytên Şevder û Selîm ketin, ji yê cinî tirsîyan û dev ji xwarinê berdan û jê re gotin: Kê bi qral û wezîrê me wisa kiriye? Cinî got: Birayê wan Salim wisa kir...

Hîna ku xizmetkarê wî ew gotina xwe temam nekiribû, Salim hat cem wan û ji wan re got: Leşkerno! Vexwin, bixwin û li kêfa xwe binêrin. Min hungulîsk ji birayê xwe Şevder girt û evê li pêşîya we jî xizmetkarê min ê cinî ye. Min ferman da wî, ku birayê min Selîm jî bikuje, da ku li ser desthilatdarîyê nekeve qirika min û pevçûn di neqeba me de dernekeve. Lewre ew bêbextekî mezin e û ez jê ditirsîyam, ku xayîntîyê bi min re bike. Niha jî ez bûme sultan li ser serê we. Heger hûn qebûl nekin jî, ez ê fermanê bidim xizmetkarê cinî, wê we hemûyan bikuje.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 654'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku Salim ew gotin ji leşkeran got, wan jî bersiv da û gotin: Em sultantîya te qebûl dikin û em ê di bin emrê te de bin.

Salim fermana definkirina herdu birayên xwe da û dîwan gerand. Piştî ku cenaze binax kirin, veşartin, xelk hemû hatin dîwana wî û qraltî lê pîroz kirin. Piştre Salim got: Ez dixwazim bi jinbira xwe Asyayê re bizewicim. Qazî got, bila li gorî şerîetê sê meh di ser re derbas bibin, piştre. Wî got: Ez şerîet merîetê nas nakim û divê ez îşev derbasî cem wê bibim! Mehra wî lê birrîn û çû derbasî cem jinbira xwe bû. Asya bi rûgeşî ew pêşwazî kir û ava ku jehr xistibûyê da wî, ew kuşt. Piştre hungulîsk ji tilîya wî derxist û ew şikand, ji bo nekeve destê kesî din û xurcik jî qetand, ji bo kes jê nexwe. piştre şand dû şêxê Îslamê, ew agahdar kir û jê re got: Jixwe re qralekî din hilbijêrin!

Çîroka Şevder jî bi vî hawayî qedîya.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 655'AN

## ÇÎROKA HIND KEÇA NÛMAN

*Şehrezadê ji Şehreyar re got:*

Şahînşahê min ê bextewar! Tê gotin, ku Hind keça Nûman xweşiktirîn keça zemanê xwe bû. Hingî ku xelkê pesnê xweşikbûna wê da, walîyê Bexdayê Heca Bin Yusuf El Heqefî çû ew ji xwe re xwest. Malekî pir li ser kir, pê re zewicî û dused hezar derhem jî weke qelen li ser xwe nîvisand.

Piştî ku derbasî cem wê bû û demeke dirêj pê re jiya, êdî hêdî hêdî navber da çûna cem wê, her çend rojekê carekê çû cem wê. Rojekê gava derbasî odeya wê bû, bala xwe dayê, ku li ber eynikê rûniştîye, li xwe dinêre û dibêje:

> xezalek eraba me ez Hinda ciwan
> rewendiyek im ji sulaleya hespan
> tenê qantirek veder bûye ji me gişan
> ger hespekî bînim ez im dura behran
> ger qantirekî bînim xwelî li seran

Bêyî ku xwe nîşanî wê bide û wê bi xwe bihesîne, bi şûn de vegerîya û çû, xwest wê berde. Li şûna xwe Evdilahê Tahir kir wekîl û ew şand cem wê,

ji bo ku wê berde. Evdillah çû cem û jê re got: Hecac bavê Mihemed ji te re dibêje, ez ê dused hezar dînarên mayî ji qelenê wê bidim wê û wê berdim. Va ye ew dused hezar derhem jî bi min re şandiye, lewre ez wekîlê wî me.

Hindê jê re got: Binêre kurê Tahir, bi navê dema ku ez pê re mam de, rojekê tenê jî ez pê kêfxweş nebûm û ez baş dizanim, ku ez jê veqetim jî ez ê qet poşman nebim. Îcar ez jî vî dused hezar derhemî weke mizgînîyê didim te, ku te ev xebera xweş da min û ez agahdar bûm, ku ez ji wî kûçikê Mala Teqîf xelas bûme.

Piştre xebera xweşikbûna wê çû ji xelîfeyê Emewî Ebdilmelîk Bin Merwan re. Hingî ku xelkê pesnê bejn û bala wê ya lihevhatî û çavên wê yên şêrînawir dan, dilê wî bijiyayê û şand pey wê ew ji xwe re xwest.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 656'AN

*Şehrezadê got:*

Îcar gava Ebdilmelîk Bin Merwan xwest wê ji xwe re bixwaze û xeber jê re şand, Hindê bersiva wî bi nivîsekî da û got: Mezinbûn a Xwedayê dilovan e, silav û rêz li ser pêxemberê wî Mûhemed eleyhîsselam."Ey emîrê bawermendan; divê tu bizanibî, ku seh kodik alastiye!" Gava ku ev bersiva wê çû ji xelîfe Ebdilmelîk re û wê jî xwend, kenîya û jê re nivîsand û got: "Gava ku kûçikekî kodikek alast, wê bi heft avan bişo, yek jê bila bi axa sor be. Cihê gemarê jî baş paqij bike."

Gava ku Hind ew nivîsa wî xwend, nema dikaribû li hemberî wî derkeve. Jê re nîvisand û got: "Silav li ser pêxemberê me û emîrê bawermendan. Tenê bi şertekî ez dikarim peymanê bi te re çêbikim; heger tu bibêjî ew şert çi ye? Ez ê bibêjim, bila Hecac xwas û bi wan kincên xwe bide pêşîya xêlîya min û min ji vir bîne welatê te!"

Gava ku xelîfe ew nivîsa Hindê xwend, bi dengekî bilind kenîya û hey kenîya û fermanek ji Hecac re şand, bo ku wî şertê Hindê pêk bîne. Dema ku Hecac fermanameya xelîfe girt û xwend, li hember derneket û fermana wî pêk anî; ji Hindê re şand ji bo ku hodeca xwe amade bike û xêlîyên wê ber bi Şamê ve bixin rê.

Piştî ku kerwan hemû amade bû, her kes siwar bû û Hind jî li hodeca xwe siwar bû ji bo ku bikevin rê, Hecac ji hespê xwe peya bû, bi rişmeya

deveya wê girt û xwas ket rê, berê kerwan da Şamê. Hind jî li gel carîyeyên xwe pê kenîya û henekên xwe pê kir. Piştre ji arîkara xwe re got: Ka perdeya dora hodecê bide alî, ji bo ku ez û wî rû bi rû hevdu bibînin.

Gava perde rabû, Hindê lê nêrî û pê kenîya. Hecac got:

> baş dikenî tu niha wisa xuya ye
> dibe ku rojekê te bi tenê berdim weha ye
> hetanî sibehê tê bigirî û bêje çi ba ye

Hindê jî bersiva wî weha da û got:

> mirin were jî qet ne xema me ye
> mal û zêç û zarok karê bêfêde ye
> tiştê girîng pakirina birînê ye

Hindê di wê helwesta xwe de berdewam dikir û henek bi Hecac kir, hetanî ku gihîştin Şamê. Gava gihîştin wir, Hindê dînarek ji destê xwe berda erdê û gazî kir Hecac, got: Serkêşê devaya min, hela meyze derhemek ji destê min ket erdê! Hecac li wan deran nêrî, ji dînarekî pê ve tiştek li erdê nedît. Jê re got: Ev dînar ji te ketiye, ne derhem e! Hindê got: Derhem e! Wî got: Dînar e! Û da destê wê. Hindê got: Şikir ji Xwedê re, ku li şûna derhemekî dînarek da me!

Piştre Hecac ew derbasî cem xelîfe kir. Hind pir kêfxweş bûbû, ku bi xelîfe re zewicîbû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 657'AN

## ÇÎROKA HARÛN REŞÎD Û KEÇA ŞAÎR

*Şehrezadê got:*

Şahînşahê min ê gewre û bextewar! Tê gotin, ku carekê xelîfe Harûn Reşîd, wezîrê wî Caferê Bermekî û hinekên din ji parazvanên wî di gereke nav bajêr de bûn. Gava di ber kanîyeke avê re derbas bûn, bala xwe danê keçên avkêş li ser kanîyê ne. Ji bo ku tasek av vexwin, çûn cem wan. Keçikekê ji wan berê xwe da xelîfe û got:

bila sîya te wir de here bi leza garanê
zû here ji ser cihê min dema razanê
da ku vemre di dil de agirê dîlanê
gemara destan paqij ke ji cihê paldanê
her bi hêvîya dîtineke te me wey cîranê
rê jê re heye gelo em dîsa rabin dîlanê

Xelîfe pir pê kêfxweş bû û keçik eciband.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 658'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku xelîfe ew helbest ji devê wê keçikê bihîst, eciband û bi zimanê wê yê xweş û spehîbûna wê jê re got: Ey keça ciwamêran, ev gotinên te bûn ango te ew ji hinekan girtibûn? Keçikê got: Na weke gotinên min in. Xelîfe Harûn Reşîd got: Heger bi rastî jî gotinên te bin, ka wateyê bigire û gotinan biguherîne! Keçikê dest pê kir û got:

sîya xwe bide alî ji ser min gava xilmaş dibim
da ku aram be dil û ji narê rizgar bibim
berde gemara destan ji bo ku ez azad bibim
heye li bo te gelo dîsa civanek da ez şa bibim

Xelîfe got ewa dîtir dizî ye. Keçikê got: Na helbesta min e. Xelîfe got: Nexwe ka wateyê biparêze û gotina dîsa biguherîne? Keçikê got:

bila dev ji min berde di xew de sîya te
da ku haş bibe laş ji êşê û vemire arê te
li hev dizivire gemar li ser nivînek bê xew
gelo heye dîdareke din li gel canê bedew

Xelîfe got: Ev jî dizî ye. Keçikê got: Na wele helbesta min e. Xelîfe got: Heger a te be, wateyê biparêze û gotinan biguherîne? Keçikê got:

sîya xwe bide alî ji ser cêxewa min pir
da ku aram bibe dil xelas be ji nar û agir

li hev dizivire gemara destan li ser serîr
gelo heye civanekî nû li gel bedra mûnîr

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 659'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku keçikê helbesta xwe bi wî şiklê dawîn jî hûna, Harûn Reşîd jê re got: Tu li ku dera vê taxê rûdinêyî? Mala me li nava taxê ye û stûnek li ser e. Xelîfe nas kir, ku ew keça mezinê taxê ye. Keçikê axaftina xwe berdewam kir û got: Û tu ji kîjan gavanê dewaran î? Xelîfe got: Ji serê darê û bera herî stewyayî. Keçik têgihişt, bê kî ye û hema di cî de bejna xwe li ber tewand, erda bin nigên wî maçî kir û got: Xwedê bi te re be, Xwedê alîkarê te ya emîrê bawermendan! Piştre li gel keçên ereban çû.

Xelîfe li Cafer zivirî û jê re got: Misoger divê ez pê re bizewicim!

Cafer çû cem bavê wê û jê re got: Emîrê bawermendan keça te ji xwe re dixwaze! Zilam got: Ser seran, ser çavan. Ez ê wê weke dîyarîyekê bidim emîrê bawermendan! Piştre, di cî de rabû ser xwe, keça xwe xemiland, amade kir û bir, da wî. Xelîfe bi keçikê re zewicî, gelek mal û milk da bavê wê û ew ji bo wî bû jina herî şêrîn li ber dilê wî.

Piştre bavê wê çû ser dilovanîya Xwedê û xeber çû ji xelîfe re. Gava Harûn Reşîd xebara wefata wî girt, xemgîn bû û çû derbasî cem wê bû. Çawa ku jinik çav li xemgînîya wî ket, her tişt fêm kir û di cî de rabû çû hucreya xwe; hemû kincên xwe di ser xwe re anîn, li şûna wan hinek reş li xwe kirin û şînî kişand. Jê pirsîn gotin sebeb çi ye? Wê got: Bavê min miriye û ez jî şîna wî dikişînim. Çûn xelîfe ji vê mijarê agahdar kirin, xelîfe rabû, hat cem wê û jê pirsî, got: Kê agahî da te, ku bavê te çûye ser dilovanîya Xwedê? Jina wî got: Elametên rûyê te, emîrê bawermendan! Xelîfe got: Ew çawa? Wê got: Ji gava ku ez bi te re me, min tu carî tu di wî halî de nedîtibûyî, ew cara ewil bû ku min tu di wî halî de dîtî. Ji ber ku bavê min temendirêj bû, ez tenê li ser wî ditirsîyam. Bila serê te sax be emîrê bawermendan!

Herdu çavên xelîfe tijî hêsir bûn. Sersaxî jê re xwest û demekê jî şînî li ser bavê wê kişand. Piştre jî li pey wî çû; rehma Xwedê li hemûyan be.

## ÇÎROKA ESMAÎ Û HER SÊ KEÇIKAN

Û tê gotin, ku emîrê bawermendan Harûn Reşîd, carekê xewa wî lê herimî, kir nekir xewa wî nehat. Ji nav nivînê rabû û ode bi ode di qesrê de gerîya, ji bo ku bêhna xwe berde. Lê xewherimîna wî lê berdewam kir û hin bi hin di nava wî de zivirî qelaqê. Çawa ku bû sibe, gazî kir xizmetkarê xwe û jê re got: Esmaî bîne cem min! Xizmetkar fermana xelîfe ji dergevanan re ragihand, wan jî çû di cî de Esmaî anîn qesrê. Xeber dan xelîfe, wî jî got: Bila derbas bibe cem min! Xêrhatina wî kir, ew li kêleka xwe da rûniştandin û jê re got: Ey Esmaî, ez ji te dixwazim, ku tu ji min re behsa baştirîn agahîyên ku te derbarê helbestên jinan de bihîstine bikî!

Esmaî got: Ser seran, ser çavan emîrê bawermendan. Di vê mijarê de min gelek tişt bihîstine lê min tenê sê helbestên ku sê keçikan gotine, ecibandine.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

### ŞEVA 660'Î

*Şehrezadê got:*

Esmaî got: Emîrê Bawermendan, gava ku ez li Besrayê dijiyam, rojekê, dinya li min germ bû. Ez ji xwe re li sîyeke hênik gerîyam, min nedît. Ez li derdorê gerîyam, min li çep û rast nêrî, çavên min li dikeke raxistî ketin, ku bersî û rêşkirî bû. Şibakeyek jî bi ser de vekirî bû, ku bêhna miskê jê dihat. Ez çûm ser wê dikê, min li wir xwe palda. Qasek bi şûn de, dengekî şêrîn ji wê şibakê hat min, digot: Xwişkino! Madem ku em ji xwe re wensa xwe bi hev tînin û diaxivin, ka em sêsed dînarî deynin holê û bila her yek ji me çend rist helbest bêje, ya kê xweş be bila ew dînar ji wê re bin.

Herdu xwişkên wê jî gotin: Bila be xwişkêcan!

Mezina her sê xwişkan got:

> ecêb e ku di xew de ket nava nivîna min
> bi roj bûya ger ne xwezayî bû ji bo min

Xwişka navîn jî got:

> tenê xeyalê wî di xew de hate serdana min
> min gote wî bi xêr hatî tu rewansazê min

A biçûk jî got:

bi şev hate serdana min ew ezîz
germ kir paşila min ew ê dilzîz
feda be her tişt bi te ey şahê dildiz

Min jî di dilê xwe de got, heger spehîbûneke helbestê hebe, ew jî ev e! Û ez rabûm ser xwe, ji bo ku ez herim.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 661'Ê

*Şehrezadê got:*

Esmaî ji ser dikê daket, ji bo ku here lê di wê kêlîyê de derîyê hemberî wî vebû û keçek derket, jê re got: Şêxê min, ji kerema xwe dîsa li ser dikê rûnê. Ez dîsa rûniştim, wê jî kaxezek da destê min, min lê nihêrî, min dît, ku destnîvîseke pir xweşik, rast û têkûz e. Hêyên wê vekirî bûn, wawên wê girover û elîfên wê rast bûn.

Keçikê ji min re got: Şêxê min, em sê xwişk in, li hev rûniştine pêşbaziya helbestan dikin. Me sêsed dînar kiriye xelat û danîye holê. Helbesta kê ji me xweştir be, dê ew dînar ji wê re bin û me tu kirî hekem di nav xwe de. Daxwaza ji te ew e, ku tu bibêjî bê helbesta kê xweş bû!

Min jê re got: Kanî kaxez û pênûsekê bîne!

Keçik çû hundir, qasekê ma û bi şûn de vegerîya, kaxez û pênûs da destê min. Min careke din çavek li ser her sê helbestên wan gerand û dest pê kir, nivîsand:

ez qala sê xwişkan dikim heger wê ders be
kesê ceribandibe dizane ne ku qîl û qal be
sê bakir di vê şeveqa sibê de pêşbaz in
dil û hinav di nava agir de şanaz in
xelk hemû di xew de ne yê wan bi gazin
bêdeng li hev civîyane ew dûrî cîranan
sir û razên xwe ji hev re dibêjin ewanan
helbest ji xwe re kirine lîstika pêşbazan
gotin û pêt rêz dikin bi zarekî şêrîn
dibişirîn hevokên wan geh geh disêwirîn

ji ser lêvên sorşekirî hemû digindirîn
ya mezin dest pê kir û gote min hêmin
ecêb ku di xew de ket nava nivîna min
bi roj bûya ger ne xwezayî bû ew ji bo min
ya navîn li ser kir û got guh bidin min
tenê xeyalê wî di xew de hat serdana min
min gote wî bi xêr hat tu rewansazê min
ya biçûk kete pêş û bersiv da bi dengê rêz
Bi şev hate serdana min ew canê ezîz
germ kir wî paşil bi bêhne dilzîz
feda be her tişt ji boy te ey şahê dildiz
gava dane min hukum ewan bi lavan
min dane ber hev her sê zar bi kêlan
piştre pesend kir ji nav wan a biçûkan
xweştirîn helbest ew e layiqî xelatan

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 662'YAN

*Şehrezadê got:*

Esmaî vegotina çîroka xwe ji Harûn Reşîd re berdewam kir û pê de çû, got: Piştî ku min ew helbest nivîsand, min kaxez da destê keçikê. Wê jî rahişt kaxez û bi derenceyê ve hilkişîya, çû hundir. Piştre ji nişka ve dengê çepik û reqseke bêhawe hat, ku kêfxweşîya wan diyar dikir. Ez jî rabûm ser xwe, min got karê min qedîya û min hewl da, ku ez ji ser dikê dakevim, herim. Lê dengê keçikê li pey min hat, got: Bisekine, neçe ey Esmaî! Min jê re got: Tu ji ku dizanî ku ez Esmaî me? Got: Şêxê min, çiqasî ku navê te ji me veşartî be jî, em ristên te nas dikin. Rabû ez dîsa rûniştim. Qasek bi şûn de min dît, ku derî vebû û ew keça ewil tê re derket, sênîyek fêkî û yeke şêrînahî ji di destên wê de.

Min hinek fêkî, hinek şêrînahî xwar; piştre jî spasîya wan kir li ser comerdî û mêvanperweriya wan û min da xwe, ku ez rabim, herim. Lê keça dîtir di wê kêlîkê de gazî min kir û got: Bisekine ey Esmaî! Min serê xwe rakir lê nêrî, min dît ku misteke sor dibiriqîne, mîna heyvê. Sêsed dînar li ser destan bû, got: Min ew qezenc kiribûn û ez wan dîyarî te dikim, ji ber wê hikmet û zanîna te!

Emîrê bawermendan Harûn Reşîd ji Esmaî re got: Te çima helbesta keça biçûk pesend kir û hilbijart? Esmaî got: Emîrê bawermendan, Xwedê temenê te dirêj bike! Binihêre, ya mezin gotibû, "Ecêb e ku di xew de ket nav nivîna min". Ev bûyereke neqewimî ye û şertekî ve girêdayî ye, dibe ku qet neqewime jî. A navê gotibû: "Tenê xeyalê wî di xew de hate serdana min". Lê ya biçûk gotibû: "Bi şev hate serdana min ew canê ezîz, germ kir wî paşil bi bêhneke dilzîz, feda be her tişt ji boy te ey şahê dildiz". Û ev pevşabûneke rasteqîn û ew qasî heqîqî ye, ku her tişt kiriye fedaya wî û her tiştê xwe nake fedaya tu kesî, ku mirov wî ji xwe çêtir nebîne û jê hez neke.

Harûn Reşîd got: Dest û devê te derdan nebîne ey Esmaî! Te rast got, te xweş got û ew jî sêsed dînarên din ji te re, di ber vê çîroka te de.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 663'YAN

## ÇÎROKA CEMÎL BIN MÛEMER

*Şehrezadê ji Şehreyar re got:*

Şahînşahê min ê bextewar û gewre! Mesrûrê xizmetkar got, ku şevekê dîsa xewa emîrê bawermendan Harûn Reşîd lê herimî û rabû ji min re got: Ey Mesrûr! Ji wan helbestkaran kî li ber derî heye? Ez derketim hêwanê, min dît, ku Cemîl Bin Mûemer li wir e. Min jê re got: Emîrê bawermendan gazî te dike. Wî jî got: Ser seran, ser çavan û rabû ser xwe, bi min re derbasî cem xelîfe bû. Silava xîlafetê lê kir, wî jî silava wî girt û jê xwest ku rûnê. Piştre jê re got: Cemîl, gelo çîrokin balkêş û erjeng li ba te hene? Cemîl got: Belê. Emîrê bawermendan lê gelo tu ji kîjanan hez dikî: Yên ku min êşa wan kişandiye ango yên ku min bi wan bihîstiye? Harûn Reşîd got: Ên ku tê êşa wan kişandiye û dîtiye ji min re bibêje. Cemîl got: Nexwe cihê xwe baş xweş bike û herdu guhên xwe bide min emîrê bawermendan! Harûn Reşîd, balîfek ji hevrîşimê sor î bi zêr neqişandî û bi periyên hêştirmeyan dagirtî da bin çonga xwe yek jî xist bin çêngê xwe û got: De ka bêje Cemîl?

Cemîl got: Min di asta dînbûnê de ji keçekê hez dikir û car ji caran ez diçûm ba wê...

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 664'AN

*Şehrezadê got:*

Cemîl vegotina serpêhatîya xwe ji Harûn Reşîd re berdewam kir: Ev keçik dildara min bû û êdî bêyî wê sebra min nedihat. Lê rojekê ji ber kêmbûna çêrê, ehlên wê bar kirin û ji wî warî çûn. Min nema ew dît û her ku diçû, bêrîkirina wê agir dixist nava min û qelaqeke mezin bi min re çêdikir. Mîna ku ez tîyê çolê bim û ew ava zemzemê be, ez ber bi xwe ve dikişandim. Şevekê ji şevan, bêrîya wê ez êsîr girtim û hejandim. Ez jî rabûm, min girêda, kar û barê rêwîtîyê kir; kofiya xwe da serê xwe, şûrê xwe xist ber xwe, rima xwe rakir û ez li devaya xwe siwar bûm, ketim rê; min da pey wê. Ez pir bi lez diçûm, mîna yekî ku ruhê xwe wenda kiribe û lê bigere. Şeveke reş û tarî bû, lê bêtirs ez bi çiyayan ve hildikişîyam, min li ber dengê zûrezûra guran û gurmijîna şêran û hirehira wehş û berazan xwe bera binî newalan dida, ku ji her aliyî ve dihat. Hiş di serê min de nemabû, dilê min di serhildanê de bû û devê min bê navber navê xwe tanî ziman.

Hîna ku ez wisa diçûm, xeweke giran girt ser çavên min û mijankên min nema ji ser hev rabûn. Êdî ez xilmaş bûbûm û di xew re çûbûm. Deveya min jî ji rê derketibû û diçû. Carekê ji nişkê ve tiştekî hişk li serê min ket û ez ji xew şiyar kirim. Bi tirseke mezin ez ji xewê veciniqîm, şiyar bûm; min dît, ku dora min tijî dar û ber û av û çîkçîka çûkan e. Şaxên şîndaran mîna gulîyên hûnayî, hemû di nava hev re derbas bûbûn û rê nedidan. Ez ji deveya xwe peya bûm, min bi rişma wê girt û hewl da, ku ez ji nava wê tora şîndaran derkevim.

Bi zor û heft belayan min xwe ji nava wê daristanê xelas kir û ez derketim ser erdeke rast. Min kurtanê deveyê sererast kir, ez dîsa lê siwar bûm lê êdî min nizanibû ez ê bi kîjan alîyî de herim û çi li pêşîya min e! Min destê xwe ji çavên xwe re kir sîper û awirên xwe li derdorê gerandin, min şewqa agirekî dît, ku ji dûr ve diçirisand. Hema min berê deveya xwe da wî agirî û ez rast çûm, hetanî ku ez gihîştim wir. Min bala xwe dayê, ku konek li wir vegirtî ye, rimek li ber çikilandî ye, hesp û deveyek li ser piya ye û dewarên din jî li derdorê diçêrin. Min di dilê xwe de got: Dibe ku hinek di vî konî de hebin! Lewre li wê berîyê ji wan pê ve tu kesî li wir xuya nedikir. Ez çûm ber kon û min got: Silav li we be, ey xelkên di kon de! Ciwanekî nozdeh salî ji kon derket, ku mîna heyvekê şewq dida û weke şêrekî wêrek xuya dikir. Ji min re got: Silava Xwedê li ser te be jî, birayê ereb. Ez texmîn dikim, ku

te riya xwe şaş kiriye? Min got: Wisa ye û ez ji te dixwazim, ku tu riya min nîşanî min bidî!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 665'AN

*Şehrezadê got:*

Cemîl vegotina serpêhatîya xwe berdewam kir: Gava min ew pirs jê kir, ciwan ji min re got: Bi Xwedê birayê ereb, ev warê me, herêma şêr û piling û ajalên dirinde ye, şev tarî ye û dinya sar e; tu ewlehîya te tune ye, ku tu li van deran bigerî. Lewre her kêlî, dibe ku wehşekî dirinde li te rast bê û te perçe perçe bike. De êdî peya bibe, were cem me, bi xêr û xweşî û hetanî sibê jî Xwedê mezin e, ez ê rê nîşanî te bidim.

Ez ji deveya xwe daketim, min ji rişmê ve ew girêda, barê ser pişta wê danî û ez li cem wî ciwanî bûm mêvan. Ez rûniştim, bi qasî saetekê min bêhna xwe berda, min bala xwe dayê, ku xorto mîhek serjê kiriye, agirek dadaye û goşt ji hev xistiye jî! Ket bin kon û qaseke din derket, hat, nan û xwê jî di destê wî de. Xwê bi ser qetên goşt de kir, ew biraştin û dan ber min. Di ber re jî her tim keser vedidan û digirîya. Carekê fişkefişkek pê ket, girîya û got:

> ji laşekî sar û çavin zuha pê ve tiştek tê de nema
> movikek tenê di laş de nema ku negirt seqem û serma
> agir di dil de ye lê ew bêdeng e diherikin hêsrên wî
> dilê kafiran pê dişewite ne xweziya min bi wî

Îcar emîrê bawermendan, bi wê helbesta wî min tê derxist, ku ciwan evîndar û aşiq e; jixwe aşiq aşiqan nas dikin; kesê ku êşa wê kişandine hevdu nas dikin. Min jî di dilê xwe de ji xwe re got: "Gelo ez derdê xwe ji wî bipirsim an na?" Min ew pirs di hişê xwe de bir û anî û ji xwe re got: "Ez ê çawa daxwazekê jê bikim û ez di mala wî de me?" Wijdanê min qebûl nekir. Min dev ji wê pirsê berda û têra xwe goşt xwar. Gava me xwarina xwe qedand, ciwan rabû çû binî kon, teştek paqij, misînekî avê û destmaleke hevrîşim î ku kenarên wê bi zêrê sor xemilandî bûn anî, li gel şerbikekî ava gulan. Ez behetî mam li wê zerafet û nazikbûna wî, lewre min tiştekî wisa li cem koçeran qet nedîtibû!

Me destê xwe şûşt û bi qasî saetekê sohbet kir. Piştre ew rabû çû bin kon û perdeyek ji hevrîşimê sor di neqeba cihê min û xwe de kişand, ew çû alîyê xwe û ji min re jî got: Birayê ereb, tu jî derbasî alîyê xwe bibe, here ser cihê xwe. Tu jî îşev pir betilîyî û rêya te dûr e. Ez derbasî alîyê xwe bûm, min bala xwe dayê, ku nivînek ji hevrîşimê sor raxistiye! Min kincên xwe di ser xwe re anîn û ez şevekê li wir raketim, ku di temenê xwe gişî de min xeweke wisa xweş nekiribû!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 666'AN

*Şehrezadê got:*

Cemîl, ji Harûn Reşîd re vegotina serpêhatîya xwe berdewam kir û got: Şev pê de ez li ser derdê wî ciwanî fikirîm û wisa di xew re çûbûm. Lê derengî şevê ez bi dengê pistepistekê şiyar bûm, min bala xwe dayê, ku dengekî tenik û şêrîn ji alîyê wî tê. Gava min hinek ji perdeya neqeba xwe û wî da alî, min bala dayê ku keçeke pir delal û spehî li kêleka wî ye. Herdu digirîyan, gilî û gazinên xwe bi hev dikirin, êşa eşq û fîraqê û bêrîkirina hevdu dianîn ziman. Min ji xwe re got: "Gelo ev keçika hanê kî ye?" Lewre ji wî xortî pê ve, min kesekî din li wir nedîtibû. Loma min ji xwe re got, "Hebe nebe ev keçeke cinî ye, dil ketiye vî xortî û li vê derê hevdu bi tenê dîtine û fersenda hevdîtine bi dest xistine. Lê gava min bi hûrgilî li rûyê wê nêrî, min tê derxist, ku insî ye û keçeke ereban e, ne cinî ye. Rûyê wê ew qasî xweşik bû, ku di binî kon de mîna heyvekê şewq dida.

Gava ez têgihîştim, ku ew keçik evîndara wî ye, xîreta evîndaran hat bîra min, min perdeya navbera me dîsa berda û serê xwe xist bin lihêfê, ez hetanî sibehê raketim. Bi şeveqê re ez rabûm, min cilûbergên xwe li xwe kirin, nimêja xwe kir û ji xort re got: Birayê ereb, gelo tu dikarî îcar rêya min nîşanî min bidî? Li min nêrî û got: Bêhna xwe fireh bike lawê ereban, mêvantî sê roj in û ez ne ew ê ku berî sê rojan destûrê bide te me.

Ez sê rojan li cem wî mam.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 667'AN

*Şehrezadê got:*

Cemîl vegotina serpêhatîya xwe berdewam kir: Roja çaran rêya pirsan vebû, em li hev rûniştin, bi hev re axivîn. Min navê wî, esl û feslê wî jê pirsî, got: Ez ji Benî Ûzre me, navê min filan e, apê min filan e! Min bala xwe dayê, ku ew kurê apê min e û ji mala herî bi nav û deng e ji Benî Ûzre. Rabû min jê re got: Pismam, tu çima hatiyî vê çola hanê û bi tena serê xwe di nava vê zehmetîyê de dijî û te dev ji wê maldarî û xweşîya bav û kalan berdaye? Te çawa dev ji ew qas bende û qerwaşên xwe berdaye û tu bi tena serê xwe mayî li vê çola Xwedê?

Xort ji min re got: Binihêre pismam, rastîya min ew e, ku min ji dotmameke xwe hez dikir û ez li ser wê dîn dibûm, beyî wê qet hedana min nedihat. Herî dawîyê ez çûm, ku wê ji apê xwe bixwazim lê apê min qebûl nekir û ew da mêrekî din ji Benî Ûzre. Zilam pê re zewicî û ew ji hêla me bir hêla xwe, warê wan dûrî me bû û min pir bêrîya wê dikir. Herî dawîyê min bala xwe dayê, ku bêyî dîtina wê debara min nayê û heger wisa dewam bike, ez ê hişê xwe wenda bikim. Rabû min dev ji êl û malbat û dost û hogirên xwe berda, hemû mal û dewlemendiya xwe li pey xwe hişt û ez hatim vê çolê, di vî konî de bi cih bûm.

Min jê re got: Û warê wan li ku ye? Got: Li devereke nêzikî vî çiyayî ye. Ew jî her şev, piştî ku her kes dikeve temara xewê û şev bêdeng dibe, xwe ji nav malan vedidize û tê vê derê. Ez jî qasekî bi dîtina wê şa dibim û çend gotinan pê re parve dikim, ew jî bi min re dike. Jîyana min ev e, her şev ez saetekê wensa xwe pê tînim û wisa berdewam dikim, heta bê ka Xwedê çawa dike, çilo dike.

Îcar emîrê bawermendan, gava pismamê min ew agahî dan min û ez ji rastîya wî ya sotîner agahdar bûm, ez bûm heyranê wî, min dexesîya wî kir, li ser wê wêrekî û dilsoziya wî. Min jê re got: Pismam, gelo tu dixwazî ku rêyeke çareserîyê bidim pêşîya te, belkî ma hêvî Xwedê, ku tu bi xelasê bikevî û bigihîjî miradê xwe? Wî got: Bêje pismam! Min got: Gava şev hat û keçik jî hat, wê li deveya min siwar bike, deveya min pir xweş bi rê ve diçe – tu jî li hespê xwe siwar bibe û ez jî li deveyekê ji van deveyên din siwar bibim û li pey we bêm. Di nava şevekê de em ê çol û beyaran derba bikin û ji vir dûr bikevin û tu yê jî bigihîjî miradê xwe, delalîya ber dilê xwe. Ez ê jî

her dem alîkarîya te bikim, bi mal û canê xwe, bi şûr û mertalê xwe û erdên Xwedê jî fire ne.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 668'AN

*Şehrezadê got:*

Cemîl ji pismamê xwe re got, dotmama xwe bigire û bi bireve, here warekî dûr, ez ê jî hetanî mirinê alîkarê te bim. Pismamê wî got: Divê destpêkê, ez bi wê bişêwirim pismam; lewre ew aqilmendeke baş e û hişê dikişîne, jineke têgihiştî ye.

Cemîl got: Gava şev dereng ket û wextê hatina wê nêzik bû, kelecana pismamê min jî zêde bû û ket bendewarîyê. Lê wext derbas bû û dotmama wî nehat. Wê çaxê pismamê min ji kon derket, berê xwe da bayê, ku ji hêla warên wan ve dihat û got:

bayê ciwanîyê dîyarîyan tîne ji dilê dotan
bêhna dildaran tê ji te ey bayê dilan
gelo dizanî tu wê kengî bê maşûqa dilan

Piştre dîsa vegerîya binî kon, bi qasî saeteke din xwe ragirt. Dûre girîya û ji min re got: Wa pismamo! Wisa xuya dike, ku îşev tiştek bi serê dotmama min hatiye, an jî kelemek li pêşîya wê derketiye? Piştre berdewam kir û got: Tu li vir bî, heta ku ez herim xeberekê bînim û bêm.

Piştre rahişt şûr û mertalên xwe û çû bi qasî saetekê ji ber çavan ket. Saetekê bi şûn de vegerîya û tiştek di nav destên wî de bû. Bi ser min de qîrîya, bi lez ez pê ve rabûm, ji min re got: Pismam, tu dizanî bê çi qewimîye? Min got: Na wele ez nizanim. Wî got: Ez çûm û bi mirina dotmama xwe re rû bi rû hatim!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 669'AN

*Şehrezadê got:*

Cemîl vegotina serpêhatîya xwe berdewam kir: Xwîn di rûyê pismamê min de nemabû. Digot û digirîya: Ez îşev li meytê dotmama xwe qelibîm.

Tu nabêjî di rêya hatina cem min de şêrek lê rast tê û wê perçe perçe dike! Hetanî ez gihîştim ser, ev ji wê mabû! Tiştê ku li ser destên wî bû, nîşanî min dida. Kincên keçikê û çend hestîyên wê bi tenê ji ber şêr filitîbûn. Pir girîya, piştre hestîyên keçikê û kincên wê danîn erdê, ji min re got: Ji vir neçe, ez têm û bi şûn de vegerîya ber bi çiyê ve. Piştî saetekê dîsa hat û serê şêrekî di destê wî de bû. Av ji min xwest, min av jê re bir. Serê şêr danî erdê û av li devê wî kir, ew şûşt, piştre ew maçî kir û bi ser de girîya. Gava ku êşê ew êsîr girt, bi dengekî ku xemgînî jê dinisilî got:

ey şêrê pozbilind hat
êdî zemanê fîraqê hat
nema dibînim êdî ez xeten

Piştre li min vegerîya û ji min re got: Tu bi Xwedê kî û tu heqê mervantîya me kî pismam, vê wesîyeta min pêk bînî; lewre çend saetên din ez ê di nav destên te de bimirim. Gava ez mirim, min bişo û tevlî van hestîyên dotmama min, min kefen û binax bike . Me herduyan bixe heman gorê û li ser kêla gora me van ristan binîvîse:

jîyan şad û çoş bû li ser pişta vê erdê
li gel hev bûn em hetanî duh bi navê Xwedê
felekê em dûr xistin ji hev di vê erdê de
êdî kefen em gihandin hev di zikê wê de

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 670'YÎ

*Şehrezadê got:*

Cemîl, vegotina serpêhatîya xwe ji Harûn Reşîd re berdewam kir: Piştî ku wesîyeta xwe li min kir, gelekî girîya û çû ket bin kon. Piştî saetekê derket, keser vedidan û bi zorê hilma xwe dikişand. Piştî ku çend hilmên qutqutkî kişandin, ket erdê û jîyana xwe ji dest da. Dilê min hat guvaştin û ez pir li ser êşîyam. Hindik mabû, ku ez li dû wî û herim, ji ber wê êş û xemgînîya ku di nava min de kom bûbû.

Piştre, ez rabûm, min ew şûşt, kefen kir û hestîyên ji dotmama wî mayî li gel kincên wê, hemû pê re pêçan û xistin heman gorê. Piştre min wesîyeta wî ya dawîn jî pêk anî û ew helbesta wî li kêla gorê nivîsand û piştre ez

çûm. Hetanî du salan jî, car ji caran ez diçûm ser gora wan. Çîroka ku min dixwest ez bêjim jî, ev bû emîrê bawermendan!

Harûn Reşîd, çîroka wî eciband û xelatek baş da Cemîl.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 671'Ê

## ÇÎROKA HISÊNÊ TOLAZ

*Şehrezadê got:*

Şahînşahê min ê gewre û bextewar! Tê gotin, ku rojekê xewa Harûn Reşîd lê herimî, wî jî rabû qasidek şand pey Esmaî û Hisênê Tolaz, herdu anîn cem xwe û ji wan re got: Kanî serpêhatîyên xwe ji min re bibêjin; Hisên hema tu dest pê bike!

Hisên got: Emîrê Bawermendan; carekê ez çûm Besrayê û min bi helbestekê pesnê Mihemed Bin Selman ê Rûbayî da. Rojekê ez ji malê derketim, di rê de germeke ecêb ez girtim, hilma min çikand. Ez çûm ber derîyekî mezin, ji bo ku ez avekê vexwim. Keçeke rûkederî di derî re derket, kurtikekî gulrengî lêbû, ku sorahîya wî zora sorbûna hinarikên wê dibir û di bin kurtikê wê de du pêsîrên nûhatî serî rakiribûn, morîkeke ji zêrê sor jî di gerdena wê de dilîst û biskek mîna sebencê bi ser enîya wê de dadiket. Du birhûyên mîna du kevanan, di binîya wan re du çavên belek î şewqdar, pozekî lihevhatî, lêvin weke lûlû û diranin mîna durran li ser bûn. Pir xwînşêrîn û dilpak, çingeçinga xirxalên nigên wê bû, mirov dikir heyranê meşa xwe. Û wan kulîmekên ku bi rîtma meşa wê bi teqil dihejîyan. Îcar Xwedê wê bisitirîne emîrê bawermendan, ez ber bi wê ve çûm, ji bo ku ez silavekê lê bidim, min bala xwe dayê, ku sikak û hêwan û hundir hemû bi bêhna miskê mişt in. Min silav lê kir, bi zimanekî nefsbiçûk silava min vegerand û bi dilekî xemîn û sotîner min jê re got: Xatûna min, ez kalekî biyanî me û germahîyê ez ji tîna kuştime, gelo tu dikarî bi xêra dê û bavan şerbikek av bidî min? Got: Dev ji min berde kalo, ez têkilî av û xwarinê nabim.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 672'YAN

*Şehrezadê got:*

Hisênê Tolaz vegotina serpêhatîya xwe ji Harûn Reşîd re berdewam kir: Gava ku keçikê got ez bi xwarin û vexwarinê re mijûl nabim, min jê re got: Çima, sebeb çi ye xatûna min? Wê got: Ez evîndara zalimê xwe me û daxwazkara kesê ku min nexwaze. Li gel vê jî, ez bi çavdêrîkirina çavdêran peywirdar im!

Min jê re got: Xatûna min qey kesî ku tu wî bixwazî û ew te nexwaze li ser rûyê vê erdê heye? Got: Heye, bi saya serê kemala spêhîbûn, lihevhatin û kamilbûna wî. Min jê re got: Nexwe tu çima li vê navbirê disekinî? Got: Ev rêya wî ye û niha jî wextê derbasbûna wî ya di vir re ye. Min jê re got: Xatûna min, gelo carekê ji caran hûn li cihekî hatin cem hev û hûn bi hev re axivîn, ku tu ev qasî bêrîya wî dikî? Hilmeke kûr bi keserekê re berda, hêsirên çavên wê weke siya ku bikeve ser gulê, bi ser hinarikên wê de hatin xwarê û got:

em mîna du şaxên darekê bûn li daristan
me bêhnên xweş dikişandin bê êş û jan
kesekî ev şax ji yê din birrî bi dasan
xwezî bi yê ku bêrîya yekê bo yê din dizan

Min got: Xatûncan û evîna te ji vî xortî re gihîşt ku? Got: Gava ez rojê li ser dîwarê mala wan dibînim, ez dibêm qey ew e! Gava ku carekê ez wî bi dizîkan dibînim jî, xwîn û can ji laşê min derdikeve û ez behetî dimînim, mîna serxweşan; ez hefteyekê duduyan bêhiş dimînim.

Min jê re got: Li qisûrê nenêre lê ez behetî dimînim li keçeke mîna te, ku ew qasî hejar û bêgoşt e, di erda Besrayê de? Wê got: Wele berîya ku ez dil bikevim vî xortî, ez bi bedeneke Kamil û pir delalî di nava xweşî û şahîyeke mezin de dijiyam.

Min got: Tiştekî erjeng û çi hişt ku hûn ji hev qut bibin? Got: Felekê em ji hev qut kirin, çîroka min û wî direj û ecêb e: Di rojeke Newrozê de, min hinek carîye û keç vexwendin malê, ku yek ji wan Seyran bû, ku carîyeyeke pir buha bû û gelekî ji min hez dikir. Çawa ku ket hundir, xwe bi ser mîn de avêt, ez himbêz kirim û ez dam ber maçan, hindik mabû, ku min bixwe, piştre gava em herdu bi tenê man, me mey danî ber xwe, me got em hinekî ji xwe re vexwin, hetanî ku xwarin amade bibe û kêfa me bigihîje lûtkeyê. Bi vexwarina meyê re jî me henek û laqirdî li hev dikirin û bi hev re dilîstin. Ji ber ku me li hevdu mûm dikir, destên me jî tev li lîskê dibûn û me hevdu

davêt erdê. Geh ew li ser min bû, geh ez li ser wê bûm. Lê carekê bi henekî destê wê çû ser çogên min û delinga min hat xwarê, ez di nav legên wê de berşewala mam. Tam di wê kêlikê de ew jî ket hundir û em di wî halî de dîtin. Pir hêrs bû û bi xeyd bi şûn de çû, mîna hespekî erebî dikir kufekuf û hilma xwe di pozê xwe re berdida û diçû. Dengê kufekufa wî dihat min. Vêca şêxê min, ev sî sal e ku ez lêborîna xwe jê dixwazim û li ber wî digerim, ji bo ku dilê wî xweş bikim lê ew li rûyê min jî nanêre! Ne herfekê ji min re dinivîse û bersiva nameyên min dide ne bi min re diaxive ne guh dide gotineke min!

Min jê pirsî û got: Gelo ew ereb e yan ecem e? Got: Ji mezinên Besrayê ye. Min got: Kal e yan ciwan e? Bi awirin darêzker û tijî heqaret, li min nihêrî û got: Tu debeng î! Ew mîna heyveke li çardehan e, xortekî nûhatî ye, tu kêmanîya wî tune ji xeynî sarbûna wî ya ji min.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 673'YAN

*Şehrezadê got:*

Hisên vegotina serpêhatîya xwe berdewam kir û got: Tam di wê kêlîyê de, min jê re got: Navê wî çi ye? Got: Tu yê çi bikî ji navê wî? Min got: Belkî hunerên min hebin, ku ez navbera we xweş bikim û we li hev bînim! Wê got: Ne pirsgirêk e! Got: Navê wî Damra kurê Maxra ye û wek Bavê Comerdîyê tê naskirin. Qesra wî jî li Merîd e.

Piştre gazî kesên di hundir de kir û got: Pênûs û lênûskê bînin! Zend û bendên xwe yê spî li ba kirin û bi besmeleyê dest bi nivîsa xwe kir, got: Mîrzayê min, heger min bi duayan dest bi nameya xwe nekiribe, ne ji ber ku ez duayan nakim, na! Lê heger ku duayên min bihatina qebûlkirin, jixwe te dev ji min bernedida, lewra bi hezar hezar caran min dua kirin, ji bo ku tu dev ji min bernedî, lê te dev ji min berda û tu çûyî. Lê dîsa jî ev kêmanîya min e, nexwe hewce nedikir, ku ez vê nameyê ji te re binivîsim, lewre ez dizanim, ku tu yê bersivê nedî vê xatûnê. Mîrzayê min... Awirên min li pey te dihatin, gava ku tu derbasî navbirê dibûyî û te silavek dida nefseke mirî! Gelo tu dikarî nameyeke ku bi xeta destê te hatiye nivîsandin, bikî nesîbê wê, ji bo xatirê wan şevbuhêrkên ku we di demeke bihurî de bi hev re derbas dikirin, ku di bîra te de ne jî! Mîrzayê min! Qey ez evîndareke gunehkar

im? Heger di vê mijarê de tu bersiva min bidî, ez ê spasdara te û Xwedayê xwe bim. Silav û rêz.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 674'AN

*Şehrezadê got:*

Hisên Tolaz vegotina serpêhatîya xwe berdewam kir: Keçikê nameya xwe nivîsand û da min. Min rahişt nameyê û ez çûm meqamê Mihemed Bin Selman; min bala xwe dayê, ku civata wî gerîyaye û dîwana wî tijî mîr û emîr û wezîr in. Di nava gişan de xortekî ku ji gişan spehîtir û lihevhatîtir bala min kişand. Emîr Mihemed jî ew danîbû kêleka xwe ya din. Min li wî xortî pirsî, gotin Damara kurê Maxra ye. Min di dilê xwe de ji xwe re got: "Ew rebena hanê ne neheq e!" Piştre ez rabûm, çûm taxa Mûrîd û li ber derîyê Damra sekinîm, mam li hêvîya wî. Qasek bi şûn de, min bala xwe dayê, ku bi siwarî hat. Min çeng kir pêşîya wî, bi gelek dua û bergerînê min ew name da destê wî. Name vekir, xwend û têgihîşt. Piştre ji min re got: Şêxê min, me ew bi yeke din guhert! Tu dixwazî ya dîtir bibînî? Min got: Belê. Gazî jinekê kir, min bala xwe dayê, ku jineke pêsîrrep bi meşeke lezgîn û bêxem ji wê ve tê!

Damra, ew nameya keçikê da wê û jê re got: Ka vê nameyê bixwîne û bersiva wê bide vî kalî! Çawa name xwend, rûyê jinikê zer bû û têgihîşt, bê mijar çi ye. Li min nêrî û got: Xwedê te efû bike, ji ber vî karê ku tu pê hatîyî!

Min nigên xwe bi dû xwe ve kişandin û ez polîpoşman bi şûn de vegerîyam cem keçikê. Min destûr xwest û ez derbas bûm, ji min re got: Çi li dû te heye? Min got: Jarîtî, perîşantî û bêhêvîtî! Wê got: Xwe aciz neke, ne xem e. Piştre ferman da xizmetkarê xwe, rabû pêncsed dînar da min. Ez jî çûm û piştî çend rojan ez dîsa di wir re derbas bûm, min dît, ku gelek siwar û xulam li ber derîyê wê ne. Ez hatim cem wan, min dît, ku zilamên Damra ne, hatine li ber keçikê digerin ji bo ku wê bibin û ew jî bênavber dibêje: Bi navê Xwedê ez careke din li rûyê wî nanihêrim û pê re naaxivim! Wê çaxê ez pir kêfxweş bûm û min ji Xwedayê xwe re spas kir, ku Damra xistiye wî halî.

Gava min xwe nêzî wê kir û ez çûm cem, nameyek nîşanî min da, ku tê de dihat gotin: "Xatûna min, Xwedê kir ku te di rastîyê de wisa israr kir û te rûyê bêbext û derewîn û zikreşan derxist holê. Piştî ev qas zilma ku min li

te kirî, xwezika te ez efû bikirima û te lêborîna min qebûl bikira! Bêbext û kujera min û te ew bû û mixabin ez jî ketim dafikê. Lê êdî min sond xwar û Xwedê jî şahidê min e, ku ji te pê ve tu bijareyên min nîn in. Xwedê alîkar be. Silav û rêz."

Piştre ew dîyarîyên ku Damra bi nameyê re jê re şandibûn jî nîşanî min dan. Pir tiştên entîke û giranbuha bûn, ku buhayê wan digihîşt sî hezar dînarî. Piştre, min dît, ku ew Damra pev re zewicîne.

Harûn Reşîd lê vegerand û got: Heger wî li pêşîya min nexista, wê karekî min î din bi wê re hebûya!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 675'AN

## ÇÎROKA EHMED DENEF, HESEN ŞOMAN Û ZEYNEBA DÎZ

*Şehrezadê ji Şehreyar re got:*

Şahînşahê min ê gewre û bextwar! Tê gotin, ku di dema xîlafeta Harûn Reşîd de, zilamek hebû, navê wî Ehmed Denef bû, yê din jî Hesen Şoman bû. Herdu jî fenek û hîlebaz bûn û gelek karên ecêb dikirin. Ji ber wê yekê, Harûn Reşîd rutbeyek da Ehmed Denef, ew kir serdarê pasevanên hêla rastê û yek da Hesen Şoman jî, ew kir serdarê serbazên hêla çepê û mehmizeke bi hezar dînarî ji herduyan re jî birrî.

Her yek ji wan çil zilamên wan hebûn di bin emrên wan de. Derekên bejahîyê jî di bin destê Ehmed Denef de bûn. Herdu siwar bûn, serbazên xwe jî dan dû xwe û hemû bi walîyê Bexdayê re derketin kolanan û li nava bajêr gerîyan. Bangêşkar jî fermana emîrê bawermendan bi dengekî bilind ji xelkê Bexdayê re dixwend û digot: Xelîfeyê me dibêje, ji Ehmed Denef û Hesen Şoman pê ve tu serdar di Bexdayê de tune ne! Divê gotina wan were guhdar kirin û her kes bi rêzdarî nêzî wan bibe.

Îcar li bajêr pîrejaneke xapînok a bi navê Delîla hebû, ku keçeke wê jî bi navê Zeyneb hebû, diz bû; loma bi navê Zeyneba diz dihat naskirin. Veca wan jî dengê bangeşer bihîstin û têgihîştin, ku Ehmed Denef û Hesen Şoman bûne serdarê asayîşê.

Zeynebê ji diya xwe re got: Binihêre dayêcan, wa ye Ehmed Denef ji Misrê hat qewirandin û hat vira, li Bexdayê gelek post girtin, herî dawîyê jî

va bûye serdarê asayîşê yê hêla rastê û ew sergurrîyê Hesen Şoman jî bûye serdarê hêla çepê û êdî li ser sifreyên şîv û firavînan rûdinên û mehmiza her yekî ji wan jî hezar dînar e. Em jî di vê malê de asê mane, ne postekne diravekî me heye û ne kes li me dipirse, ne jî rêzdarîyêk ji me re digire!

Mêre Delîlayê jî, berê serkirdeyê asayîşa Bexdayê bû, her meh hezar dînar ji xelîfe distend. Gava mir jî, du keç û jineke bî li pey xwe hişt. Keçeke wî mêr kiribû û kurek jê re çêbûbû, navê wî kiribûn Ehmedê ku hatiye dîtin. Keça dîtir jî Zeyneba diz bû.

Delîlaya bî jî, fenek û hîlebazeke jêhatî bû, gelek marîfetên wê hebûn. Bi zimanê xwe yê xweş dikaribû mar ji qulê derxista. Îblîs û şeytan bi xwe ji wê dielimîn fen û fîtan. Mêrê wê jî li cem xelîfe pêşbînîtî dikir û fal vedikirin. Mehmiza wî jî hezar dînar bû û kevokên ku name û nivîs dibirin û dianîn, xwedî dikirin. Jixwe hemû rengên teyr û tilûran li cem xelîfe hebûn, her rengek ji bo karekî cuda dihat bikaranîn. Îcar Zeynebê ji diya xwe re got: Ka hinek hîle û fîtan bike li Bexdayê, belkî em mehmiza bavê xwe bistînin!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 676'AN

*Şehrezadê got:*

Gava Zeynebê wisa got, diya wê got: Keça min, bi serê te yê delalî, ezê lîstikan li Bexdayê bilîzim, ji yên Ehmed Denef û Hesen Şoman jî xurtir! Piştre rabû ser xwe, rûpoşek da serçavê xwe, kincin hirî yên feqîran li xwe kirin, bi ser de jî kirasekî ku hetanî kapokê dadiket û qutikekî hirî jî bi ser de. Şohîyek jî li nava xwe girêda, rahişt misînekî û ew hetanî bi qirikê ti jî av kir, sê dînar danîn ser devê wî û devê misîn bi lûfikekî pêça. Bi qasî giranîya barekî êzingan jî pîvaneke kêlanê jî bi xwe re rakir, aleke ku şerîtên zer û sor pê ve, xist destê xwe û derket derve. Di kolanê û bû, "Alah, Alah"a wê, girîya û bang kir. Zimanê wê selewat li ser Xwedê û pêxember dixwendin, dilê wê jî malovanîya şeytan û îblîsan dikir, civîn bi wan re li dar dixist.

Sikak bi sikak gerîya hetanî ku xwe gihand sikakeke rêşkirî, bi mermeran raxistî û şûştî û paqij. Di wê sikakê de çav li derîyekî ket, ku dikek ji mermer li pêşîya wî bû û dergevanekî Mexrîbî jî li ber sekinîbû. Ew derîyê mala serokê asayîşa xelîfe bû, xwediyê mal û milk û çandinîyeke mezin bû. Jê re digotin Hesenê Rêxerab, ku ev nav bi xwe ji ber wê meziyeta wî ya sereke lê kiribûn, ku berîya biaxive li mirovan dida!

Hesen bi keçeke xweşik re zewicîbû. Wê ji wî, wî jî ji wê hez dikir û hîna ji roja ewil ve, jina wî sond pê dabû xwarin, ku jineke din neyne ser wê û şevekê tenê jî li derveyî malê ranekeve. Mêrê wê wisa tevgerîyabû û li ser sonda xwe mabû, heta rojekê gava Hesen derket dîwana xelîfe û dît, ku her mîrê tê dîwanê, kurek an jî du kurên xwe bi xwe re anîne wir! Di nav wan emîran de ew tenê kordûnde bû. Dilê wî pê şewitî û gava çû hemamê, di eynikê de li rûyê xwe nêrî û dît, ku di riha wî de mûyên spî ji yên reş pirtir bûne! Di dilê xwe de got: "Gelo ew Xwedayê ku bavê min stend, kurekî nade min?" Piştre, bi hêrs derbasî cem jina xwe bû û jê re got: Xwe ji ber min bide alî, ji roja ku çavên min bi te ketine, min xêr nedîtiye! Jina wî got: Ev çima?

Hesen got: Di roja ewil de ji zewaca me, te sond bi min da xwarin, ku ez hewîyê neynim ser te û îro min dît, her emîrekî zarokekî xwe bi xwe re anîbû dîwanê, di nav wan de ez tenê kordunde bûm. Mirin hat bîra min û te jî ne kurek da min ne jî keçek. Zilam jî incex gava bibe bavê zarokan dibe zilam. Hêrsa min ji ber wê ye, ku tu zarokan nayînî!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 677'AN

*Şehrezadê got:*

Gava Hesenê Rêxerab ew gotin ji jina xwe re gotin, jina wî lê vegerand û got: Xwedê min bistirîne! Min mala xwe xera kir, ji ber derman û kutana hirîyê, yê min tu gunehê min di vê yekê de nîn e, gunehê mezin ê te ye; tu wekî qantirekî bêkêr î û tu xêr di ewka te de tune ye! Hesen got: Vê carê ez ji vê rêwîtîyê vegerim, ez ê hewîyekî bînim ser te! Wê jî got: Hêvîya min bi Xwedê ye, ne bi kesekî din. Bi vê gotina wê re, Hesen ji malê derket û çû. Herdu jî li rabirdûya xwe poşman bûbûn.

Tam di wê kêlîka ku mêrê wê ji malê derket de wê jî di şibakeya xwe re li derve nihêrî, di nava wê xeml û xêza xwe de, ku mîna ya bûkan pir û cur bi cur bû. Di wê kêlîyê de Delîla jî li ber derî bû û çavên wê li wê şibakeyê bûn, di cî de jinik dît û teqînek bi dilê wê ket; di nava xwe de ji xwe re got: "Delîla! Destê xwe sivik bigire û vê jinikê ji mala wê derxîne, wan zêr û cewheran jê bike û hemûçkan ji xwe re bibe!"

Delîla çû binîya şibakeyê û dest bi qîrînê kir, got: "Ji bo xatirê Xwedê, ji bo xatirê Xwedê!" Gava jinikê lê nêrî û ew di nava kincên hirî û spî de dît,

pir pê bandor bû, lewre mîna sofî û ehlên Xwedê xuya dikir. Delîla jî hey gazî dikir û digot: “Li dora min kom bibin, ey welîyên Xwedê!” “Ji bo xatirê Xwedê alîkarîyê bikin!”

Jinên malên wê sikakê gişan, serê xwe di şibakeyan re derxistin û bi heyrangorî li wê jinepîra ku şewq jê dibarîya, temaşe kirin! Xatûna jina Hesen girîya û ji qerwaşa xwe re got: Here, dakeve jêrê, destê dergevanê Ebû Elî maçî bike û jê re bibêje, bila wê pîrejina ehla Xwedê bîne hundir, da ku em pê teberik bibin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 678’AN

*Şehrezadê got:*

Carîye daket jêrê û ji dergevan re got: Xatûna min got bila wê sofiya hanê berde hundir, belkî xêra wê bigihîje me jî. Dergevan got: Bila be û çû destê pîrejina sofî maçî kir. Lê jinikê destê xwe bi şûn de kişand, nehişt ku maçî bike û jê re got: Dûrî min bikeve, ji bo ku destnimêja min neşikê. Xuya ye, ku tu belengezekî bêçare û bindest î, Xwedê te ji vê bindestîyê xelas bike, Bavê Elî!

Bi rastî jî Bavê Elî yê dergevan tengav bû û sê meh bûn, ku heqdestê xwe ji emîr Hesen negirtibû û nizanibû wê çawa xwe ji wî emîrî xelas bike. Ji pîrê re got: Dayêcan kanî qurtek av ji wê teberika di misînê xwe de bide min, belkî Xwedê tengasîyên min çareser bike!

Pîrejinê misînê xwe ji ser milê xwe danî û li hewa zivirand, hejand heta ku lûtikê ser devê wî rabû û her sê dînar ji ser wî pekiyan erdê. Dergevan ew dînar dîtin û çû rahişt wan. Di dilê xwe de got: “Ev pîrejin hem sofî hem şêx e hem jî perçeyek ji Xwedê tê de heye. Pêşbîner e û keramet pê re hene, razan keşif dike. Heger ne yeke wisa bûya, wê çawa bizanibûya, ku ez di tengasîyê de me û pêdivîya min pir bi diravan heye!” Piştre çû ew dînar xistin destê pîrejinê û jê re got: Bigire dayêcan, ev her sê dînar ji devê misînê te ketin! Pîrê got: Wan ji min dûr bixe, ez bi dirav û dinyayê ve mijûl nabim! Bila ji te re bin, belkî bêhna te pê derkeve û şûna deynê te yê li emîr bigire!” Dergevan got: “Bêguman ev lutfa Xwedê ye, bi ser min de daketiye!”

Qerwaşê bi destê pîrê girt û ew bir jor, cem xatûna xwe.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 679'AN

*Şehrezadê got:*

Qerwaşê destê pîrejinê maçî kir û derxist cem xatûna xwe. Delîlaya ku di qilifê wê pîrejinê de derketibû jorê, çawa çav li xatûnê ket, xezîneyeke zêr û zîv û mercan û cewheran li ber çavên wê sêwirî! Lewre xatûn, ji serî heta pêyan di nava zêran de xemilandî bû.

Xêrhartina pîrê kir û derstê wê maçî kir. Pîrê got: Keça min, tenê ji bo ku hinek şîretan li te bikim hatime vir! Xatûnê bi kêfxweşî xwarin da ber wê, pîrê got: Keça min, ez timî bi rojî me û salê pênc rojan tenê difitirim. Gava ez difitirim jî, ez xwarinên bihuştê tenê dixwim! Giran giran hilmek kişand, dûre berdewam kir û got: Keça min, tu dilbikul û kedernak xuya dikî, xêr e înşelah, çi derdê te heye?

Xatûnê got: Dayêcan, gava ez nû zewicîm, min mêrê xwe da sondê, ku hewîyê neyîne ser min û bi keseke din re nezewice. Piştî ev qas sal, niha çav li zarokan ketiye û dilê wî dixwaze, ku zarokên wî jî hebin, hatiye ji min re dibêje, tu zarokan nayînî! Min jî jê re got, tu qantir î û zarok ji te çênabin. Hêrs bû, derket û got, piştî ku ez ji vê rêwîtîyê vegerim, ez ê hewîyekê bînem ser te. Ez jî ditirsim ku min berde û bi jineke din re bizewice. Lewre mirovekî pir maldar e û heger zarokên wî ji jina din çêbibin, dê hemû malê wî ji wî zarokî re here û tiştek di destê min de namîne.

Pîrê jê re got: Keça min qey tu ker û kor î, ku te Şêx Ebîl Hemlat nebihîstiye? Kîjan deyndarê ku hebe, diçe ba wî, deynê xwe diqedîne, kîjan jina bêzarok hebe, diçe cem wî, hemle dibe û zarok jê re çêdibin. Tu jî here cem wî, xwe bavêje dergahê wî, qurbanekê serjê bike; belkî gava mêrê te ji rêwîtîyê vegere, bi te re rakeve. Wê çaxê tu yê ducanî bibî û zarokekî jê re bînî. Nêr be mê be, misoger wê Şêx Hemlat zarokekê bide te.

Xatûn rabû ser xwe, kincên herî xweşik li xwe kirin û xeml û xêza xwe ya giranbuha hemû li xwe kir û ji qerwaşa xwe re got: Çavekî bavêje derdorê û li malê miqate be ha!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 680'YÎ

*Şehrezadê got:*

Gava Xatûn daket jêr û li pey pîrê di derî re derket, dergevan Bavê Elî jê re got: Tu bi ku ve diçî xatûna min? Got: Ez diçim serdana Şêx Ebîl Hemlat. Dergevan got: Rojiya salane ji min re jî lazim e, xatûna min. Ev sofiya hanê ji ewlîyayan e û kerametên wê hene; pêşbîn e, razên sererd û binerdê dizane. Beyî ku ez jê bixwazim sê dînar dan min û tê derxist, ku ez di tengahîyê de me.

Pîrê di derî re derket, jina Hesenê Rêxerab jî da pey wê û çû, pîrê jê re got: "Dilaram be keça min, înşelah piştî ku tu herî cem şêx, tu yê hemil bigirî. Wê zarok ji te re çebibin û wê mêrê te jî ji te hez bike, bi saya serê vî şêxî!" Xatûnê lê vegerand û got: Bêguman ez ê herim cem wî şêxî dayêcan! Pîrê di dilê xwe de got: "Ez ê wê bixapînim û vê xeml û xêza wê gişî jê bidizim!" Piştre bi dengekî nazdar jê re got: Keça min, tu li dû min were û bi qasî ku tu min winda nekî dûrî min be, ji ber ku barê min giran e. Her kes barê xwe davêje ser pişta min û gava ku xêrekê dikin jî, didine min, destên min maçî dikin, lewre divê derdora min hinekî vekirî be.

Xatûnê xwe jê dûr xist û li pey wê meşîya. Xwe gihand sûka bazirganan, ku qîreqîra delalan û çingeçinga xirxalan bû. Pîrê çû rêya xwe bi dikana kurê tacirekî xist, ku jê re digotin Seyid Hesen. Xortekî lihevhatî û nûgihayî bû. Li raserî dikana wî sekinî û xatûn jî li wir da sekinandin. Çawa ku çavên ciwan li wê xatûnê ketin, xwînek germ di laşê wî de gerîya.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 681'Ê

*Şehrezadê got:*

Padîşahê qedirbilind, ji min re hatîye gotin ku pîrê ji Xatûnê re wiha gotîye: Li raserî vê dikanê rûnê, hetanî ku ez herim û werim! Xatûnê bi ya wê kir û li wir rûnişt. Pîrê jî çû cem wî xortê ciwan, silavek dayê û jê re got: Gelo Seyîd Hesen kurê Hesenê Bazirgan tu yî? Cîwan got: Belê, ez im. Lê tu navê min ji ku dizanî? Pîre got: Xwedîxêran ji min re got. Ev xatûna hanê jî keça min e. Rehmetîyê bavê wê jî tacirek bû, mir û mal û milkên xwe giş ji wê re hiştin. Aqilmend jî dibêjin, ji bo zewaca keça xwe seferber bibin, ne ji bo zewaca kurê xwe. Îcar ev rebena keça min jî, di emrê xwe de ji malê derneketiye û ev cara ewil e, ku ji malê derdikeve. Şeva borî min xewnek dît û razeke wê li ber çavên min vebû, min ji xeybê îşaretek girt, ku divê ez te bi wê re bizewicînim. Vêca heger tu feqîr bî jî, ez ê sermayeyekê bidim te, da ku li şûna yekê, tu du dikanan vekî.

Kurê tacir di dilê xwe de got: Min bûkek ji Xwedayê xwe dixwest, wî hem mal û hem jî karek ji min re şand!“ Piştre bi dengekî bilind axaftina xwe berdewam kir û ji pîrê re got: Dayêcan, Xwedê ji te razî be, weleh tu pir xweş diaxivî. Diya min jî dixwest, ku min bizewicîne lê min qebûl nedikir û min digot, ku ez bûkê bi çavên xwe nebînim, ez nazewicim!” Pîrê berdewam kir: “Rabe, bide pey min û were, ez ê wê tazî nîşanî te bidim!”

Xortê ciwan rabû ser xwe û da pey wê, çû. Di dilê xwe de got: “Ka ez hezar dînarî bi xwe re bibim, belkî bi rê de lazim bibe, ji bo kirîna tiştinan. ”

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 682’YAN

*Şehrezadê got:*

Gava ku Seyid Hesenê ciwan da dû pîrê, pîrê jê re got: Xwe dûrî wê bigire û were lê wê ji ber çavên xwe wenda neke! Ciwan jî wisa kir û mesafe di neqeba xwe û keçikê de vekir. Pîrê di dilê xwe de ji xwe re got: “Kurik dikana xwe girt û li dû min hat, îcar ez ê wan bibim ji bo ku wan herduyan jî tazî bikim!”

Pîrê meşîya, xatûn li pey wê û kurik jî li pey xatûnê. Çû heta ku gihîşt hinda boyaxkerekî kinc û cawan, ku hosteyekî bi navê Hecî Mihemed ê weke dêwekî tê de dixebitî. Mirovek yekderb bû û ji xwarina hejîr û hinaran hez dikir. Li tepika derîyê wî da, bi çingînîya tepikê re, serê xwe rakir, li hêla derî nihêrî, awirên wî li xort û xatûnê ketin. Pîrê derbasî cem wî bû, silav lê kir û jê re got: Hecî Mihemed tu yî? Wî got: Belê, ez im, tu çi dixwazî? Pîrê got: Xwedîxêran navê te ji min re gotin. Ev keça spehî dota min e û xort jî kurê min e. Bi êş û zehmetîyeke mezin min ew mezin kirin û ew gihandin vî temenî û malê dinyê li ser wan kir. Maleke me ya mezin heye, hêleke wê hezhizî, me stûnek da binî. Endezyar jî ji min re got, dibe ku bi ser we de bikeve; here bi qasî mehekê di xanîyekî din de bimîne, heta ku em wê ji nû ve saz û têkûz bikin, piştre lê vegere. Ez derketim li cihekî gerîyam, xwedîxêran jî ez şandim cem te. Vêca ez dixwazim, ku kur û keça min li ba te bimînin, heta ku xanîyê me têkûz bibe.

Boyaxker di nava xwe de ji xwe re got: “Tu birçîyê nanê tisî bûyî, goştê biraştî ji te re hatiye!” Li pîrê vegerîya û got: Raste, ku malek, hêwanek û mêvanxaneyeke min heye lê min beşek jê ji mêvan û cotkaran re veqetandiye, beşek jî ji mêvanên payebilind re!

Pîrê got: “Kurê min, jixwe hemû mehekê nakişîne û em ê vegerin xanîyê xwe. Em kesin xerîb û bêçare ne, hema cihê mêvanan bide me, bila bi me û te be. Heger mêvanên te hatin jî, bila bên cem me, bi me re bixwin, bi me re rakevin, li ser serê me cihê wan heye!”

Hecî Mihemed sê mifte danê; yeke mezin, yeke biçûk û yeke xwar. Piştre jê re got: Ev mifeya mezin a malê ye, ya biçûk jî ya hêwanê ye û ya xwar jî ya mêvanxaneyê ye. Pîrê rahişt her sê mifteyan û ket rê; Xatûn jî li dû wê û xort jî li dû xatûnê. Gava gihîşt sikaka ku zilam jê re destnîşan kiribû, mala wî dît. Derî vekir û derbasî hêwanê bû, keçik jî li dû wê hat. Pîrê got: Keça min ev mala Şex Ebîl Hemlat e. Lê ka em herin mêvanxaneyê, tu li wir xwe veke heta ku ez werim gazî te bikim. Keçik di mêvanxaneyê de rûnişt, ew jî li hêwanê ma, gava xort hat cem wê, pîrê jê re got: Tu li vir rûnê, hetanî ku ez keça xwe ji te re bînim, da ku tu lê binihêrî.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 683’YAN

*Şehrezadê got:*

Pîrê xort li hêwanê bi cih kir û vegerîya cem xatûnê. Xatûnê jê re got: Berî ku xelk werin û qelebalixî li vir çêbibe, ez dixwazim derbasî cem şêx bibim. Pîrê got: Keça min ez li ser te ditirsim. Xatûnê got: Ji ber çi? Pîrê got: Ciwanekî dînik li vir heye, havîn û zivistanan ji hevdu nas nake, timî tazî ye û mirîdekî şêx e. Vêca gava xatûn û şahbanû derbasî cem şêx dibin, ew sêwlek êrîşî ser wan dike û çi zêr di guh û poz û stûyên wan de hebin, direvîne, kincên wan dikişkişîne, diqetîne! Vêca ya baş ew e, tu jî vê xeml û xêza xwe ya zêrîn û van kincên giranbuha ji xwe deyne, ez wan biparezim û wisa here cem Şêx, çêtir e.

Xatûnê bi ya pîrê kir, her tişt di ser xwe re anî, xist nav destên pîrê û tena binkirask û delingê tenê ma. Pîrê got: Ez ê van gişan deynim ser stargeha şêx, da ku berket têkevê!

Pîrê rahişt wan kincên xatûnê û ew birin, di bin derencê de veşartin. Piştre çû, derbasî cem xort bû, bala xwe dayê ku kurik li hêvîya keçikê ye. Kurik pir bêsebir bûbû, ji pîrê re got: Kanî min ê li keça te binêrîya? Pîrê bi herdu destan li sînga xwe da û perê xwe kişand. Xortê ciwan got: Çi bi te hatiye?

Pîrê got: Xwedê mala cîranê bêbext xera bike, Xwedê mala zikreşan wêran bike! Gava dîtin, ku tu bi min re hatiyî malê, gotin ev xort kî ye, min got, min ew ji keça xwe re xwestiye. Wan zikreşîya te kirine û çûne ji keça min re gotine, qey kes nemabû, ku diya te çûye yekî ku bi xwe de dimîze ji te re xwestiye. Min jî jê re sond xwar, ku ez ê te tazî nîşanî wê bidim, ji bo ku ez derewa wan zikreşan derxînim holê.

Xort zendikên xwe hildan, zendên xwe nîşanî wê da. Pîrê lê nihêrî, ku zendên wî spî dikin. Xwe bi ser de xûz kir û jê re got: Mitalan meke, ez ê çawa te tazî nîşanî wê bidim, ez ê wê jî tazî nîşanî te bidim. Xortê ciwan got: Here gazî wê bike, bila were li min binihêre! Pê re jî kurikê samurî, kêr û qilinsûwe û hemû kincên xwe yên giranbuha di ser xwe re anîn, hezar dînarê xwe jî xist berîka kirasê xwe û hemû dan ser hev û da destê pîrê, pîrê got: Ez ê wan ji te re rakim û ew birin, danîn ser kincên keçikê û rahişt gişan, ew di buxçika xwe de bi cih kirin û danî wir. Piştî ku herdu derî li ser wan xiliqandin, vegerîya, rahişt buxçika xwe û ji wir derket, bi rêya xwe de çû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 684'AN

*Şehrezadê got:*

Pîrê çû, buxçika xwe danî cem ê etar û vegerîya cem Hecî Mihemedê Boyaxker; bala xwe dayê, ku zilam li hêvîya wê ye. Boyaxker got: Înşelah mala min li gora dilê we bû û we ew eciband? Pîrê got: Berka Xwedê lê be, pir baş bû, va ez diçim barkêşan bînim, da ku kelûpel û nivînên me bibin wir. Zarokên min jî pir bêrîya xwarineke bigoşt kirine, bi xêra xwe vî dînarî bigire, here xwarineke bigoşt ji wan re bibe û tu jî bi wan re bixwe.

Boyaxker got: Û kî li dikanê binêre, pêdivîyên xelkê jî pir in? Pîrê got: Kurê te dikare lê mêze bike. Boyaxker got: Wisa dibe û rabû ser xwe, rahişt miqilkekê û çend sênîyan û çû bo ku xwarinê çêbike.

Piştî ku Boyaxker derket çû, pîrê çû cem etar, buxçika eşîyayê xwe anî û dîsa vegerîya dikana boyaxê, ji kurik re got: Li dû bavê xwe here, ez ê li vir, li benda we bim, heta ku hûn vegerin. Kurik got: Bila be pîrê û rabû ser xwe, çû, piştî ku kurik çû, pîrê dikan hemû da ser hev û çi tiştê giranbuha tê de hebûn ji caw û cilan, giş komî ser hev kirin. Li sikakê nihêrî, bala xwe dayê ku barkêşek bi kerê xwe ve di wir re derbas dibe. Gazî wî kir û jê re

got: Were vir! Barkêş, mirovekî weke dêwekî bû; hat gel wê, pîrê jê re got: Tu kurê min ê boyaxker nas dikî? Got: Belê. Pîrê got: Feqîro îflas kiriye û gelek deyn lê mane. Her ku tê girtin, em wî berdidin, îcar me got em îflaskirina wî bidin îspatkirin. Ez ê van cawan gişan bibim ji xwediyên wan re û ez dixwazim, ku tu wî kerê xwe bi kirê bidî min. Vî dînarî bigire, bila kiriya kerê te be û gava ez çûm, tu jî van denên boyaxê gişan bişikîne, meqsed gava qazî hat raçavkirinê, bila tiştekî di dikanê de nebîne!

Barkêş got: Helbet ez ê bikim, qencîya boyaxker gelek li ser min heye. Di barkirinê de jî alîkarîya pîrê kir, hemû eşyayên wê li ser kerê kirin. Pîrê bi hefsarê kerê girt û çû mala xwe. Derbasî hundir bû, li keça xwe rast hat. Zeynebê got: Dilê min bi ser te ve bû dayêcan, gelo te çi lîstik li serê kê gerand? Diya wê got: Min çar lîstik li serê çar kesan gerandin: Kurê tacir, jina serdarê asayîşê, boyaxker û barkêş. Min hemû malên wan li kerê kir û ji te re anî vir.

Zeynebê got: Dayêcan, wele tu nema dikarî di nava sûkê re derbas bibî, piştî ku te xeml û xêza jina serdar şêland, kurê tacir tazî kir û cawên xelkê ji dikana boyaxker anîn li ser pişta kerê barkêş! Diya wê got: Keça min, bi serê te yê delalî ji vê kerê pê ve, ez hesabê tu kesî nakim, lewre ev ker tenê min nas dike.

Boyaxker ku xwarina goşt amade kir û da destê kurê xwe û ew şand malê, bi şûn de vegerîya dikana xwe û dît, ku dikana wî vikîvala ye û barkêş di hundir de denên boyaxê dişikîne. Bi ser de qîrîya û got bisekine kuro, tu çi dikî? Barkêş sekinî û bi şûn de zivirî, ji boyaxker re got: Derbas bûyî be hostayê min, min bihîst, ku te îflas kiriye û qazî dest danîye ser malê te, welehî dilê min bi ser te ve ye.

Boyaxker got: Kê ji te re wisa gotiye? Barkêş got: Diya te got û ji min xwest, ku ez van denên boyaxê jî bikişînim, da ku gava keşîf were, tiştekî di dikanê de nebînin! Boyaxker şaşwaz bû û di nava dilêşeke dijwar de qîrîya got: Xwedênehiştο bi salan e ku diya min miriye! Û bi kulman li sînga xwe da û berdewam kir: Te malê min û malê xelkê bi avê de berdaye, debengê Xwedê!

Barkêş girîya û got: Kerê min! Kerê min çû! Ka kerê min ji diya xwe bistîne! Herdu ketin pêxêla hev û barkêş bênavber digot: Kera min bîne, Boyaxker jî digot: Ka wê jina pîr bîne vira!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 685'AN

*Şehrezadê got:*

Barkêş û boyaxker ketin pêxêla hev, bi berstika hev girtin û hevdu kişkişandin, bi ser hev de qîrîyan û doz li hevdu kirin. Xelk hemû li ser serê wan kom bû û navberî kirin, ew ji hev veqetandin. Yekî ji nav wan ji boyaxker re got: Mihemedê hoste, gelo mesele çi ye? Barkêş got: Ez ê çîrokê ji we re bêjim û hûn hekem bin, di neqeba me de. Piştre tiştê ku qewimîbû ji serî hetanî binî ji wan re got û lê zêde kir û got: Ez dibêm wî, fen li min kiriye, ji bo ku kurê min nebedî bike, lewre ji min re got, ku diya wî miriye.

Xelkê ji boyaxker re got: Mihemedê hoste bêguman tu vê pîrejinê nas dikî, lewre te dikana xwe spartiye wê û tu çûyî. Boyaxker got: Ez wê nas nakim lê îro ew û kur û keça xwe bûn kirêcî di mala min de. Yekî din ji nav xelkê qîriya û got: Bi namûs bi şeref, berpirsîyarîya kera vî barkêşî di stûyê boyaxker de ye. Lewre wî dikana xwe nesparta wê jinikê, barkêş jî lê ewle nedibû û kerê xwe nedida wê. Yekî din jî got: Hoste Mihmed, madem ku te mala xwe bi kirê daye wê, divê tu herî kerê wî jê re bînî!

Piştre li hev kirin û hemû tev de bi hev re çûn mala boyaxker. Kurê tacir Seyid Hesen jî di hewanê de li benda pîre bû, ji bo ku keça xwe bîne û nîşanî wî bide. Xatûna jina serdar jî li hêvîya pîrê bû, ku izna derbasbûna cem şêx jê re bîne. Gava dît, ku nehat, ew rabû ser xwe, pê ve çû lê dît ku kurê têcir li hêwanê ye ne ew, gava ku kurê tacir çav lê ket, jê re got: Were hundir! Kanî diya te ya ku wê tu bidayî min? Xatûnê got: Diya min miriye lê gelo kurê wê yê dînik tu yî? Kurik got: Ew ne diya min e. Lê wisa xuya dike, ku ev jinik diz bû, fen li min kir û kincên min ji min şêlandin, tevlî hezar dînarên min! Hişê xatûnê jî nû hat serê wê û got: Nexwe wêna ez jî şêlandime. Qaşo ez bi xwe re anîbûm vir, ji bo ku ez serdana Şêx Ebîl Hemlat bikim. Kincên min, xeml û xêza min hemû birin. Kurê tacir ji xatûnê re got: Ez kincên xwe jî, hezar dînarê xwe jî ji te dixwazim; hemû ji bin serê te derket! Xatûnê jî got: A ku zêr û gewherên min birin, diya te bû û ez eşyayên xwe gişan ji te dixwazim!

Tam di wê kêlîyê de boyaxker derbasî cem wan bû û dît, ku herdu tazî ne. Ji wan re got: Ka ji min re bibêjin, bê diya we li ku ye? Xatûnê serpêhatîya xwe ji serî hetanî binî jê re vegot. Piştre kurê tacir jî ya xwe got. Boyaxker ji wan re got: Nexwe ev jinik diz û hîlebaz e. Ka rabin ji mala min derkevin, ji bo ku ez derî bixilqînim? Wan jî gotin: Şerm e, ku em bi cilan bikevin mala te û tazî jê derkevin?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 686'AN

*Şehrezadê got:*

Gava kurê tacir ew tehn li boyaxker da û gote wî şerm e ji te re, ku kesên bi kinc û cil derbasî mala te bûne, wan tazî ji malê derxî; boyaxker hat rayê, kincin dan wî, kinc dan xatûnê û ew gihand mala wê jî. Gotinên wî ji jinikê re hebûn lê ew hiştin hetanî vegera mêrê wê ya ji rêwîtîyê.

Boyaxker, piştre çû dikana xwe girt û ji kurê tacir re got: Ka bi min re were, em herin li vê jina diz û fenek bigerin, wê bigirin û wê bibin teslîmî walî bikin. Kurê tacir pê re çû, xwediyê kerê jî da dû wan û çûn cem walî, gilîyê wê jinika fenek li cem wî kirin. Walî got: Mesele çi ye? Her sêyan mesele ji walî re bi berfirehî vekirin. Walî got: Kîjan jinik be, herin wê bînin, ez ê bihêlim, ku li sûcê xwe mikur were! Ew çûn bi pey wê jinikê ketin û li nava bajêr gerîyan.

Delîlaya fenek û diz ji keça xwe Zeynebê re got: Keça min, ez dixwazim dek û dolabeke din bînim serê hinekan? Keça wê got: Yadê ez ditirsim li ser te! Diya wê got: Ez weke fûla li erdê ketî me, ne agir dikare bi min ne jî av! Piştre rabû ser xwe, kincên xizmetkaran li xwe kirin û çawa ku derkeve nêçîrê derket derve. Di sikakê re çû ku raxistî bû û gelek cawên pêşkêşkirî tê de hebûn, çirayek jî bi dîwêr ve daliqandîbû. Li ber maleke mezin dengê defê û dengê stranan jî dihat. Li wê derê jineke ku kurikek li ser milê wê bû, bala Delîlayê kişand. Lewre kincin bi zîv neqişandî li kurik bûn, li ser serê wî terbûşekî bi lûlû xemilandî û toqeke ji zêrê sor jî di stûyê wî de bû. Ew kurik kurê şahbenderê tacirên Bexdayê bû, mal jî mala wî bû. Keçeke wî jî hebû, ku hatibû xwestin û wê şevê nîşana wê li dar dixistin. Ew jina ku kurik danîbû ser milên xwe jî, jina şahbenderê taciran bû û gelek jinên din jî li cem wê hebûn, jinên stranbêj û muzîkjen jî hebûn. Her ku jinik diçû û dihat, her ku bi derenceyê ve hildikişîya û dadiket, kurik jî li ser milan dilewlihî. Herî dawîyê gazî qerwaşekê kir û jê re got: mîrzayê xwe hilde, bibe, pê re bilîze, heta ku civat belav bibe.

Delîlaya pîr, pêş de çû hewşê, dît ku kurik li ser milên qerwaşê ye. Jê re got: Xatûna te şahîya çi li dar xistiye gelo? Qerwaşê got: Li gel stranbêjan e, bi şêrînahîya keça xwe şa dibe! Delîla di dilê xwe de ji xwe re got: "Ey Delîla, dolaba herî karber ew e, ku tu vî kurikî ji vê qerwaşê bidizî, bibî!"

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 687'AN

*Şehrezadê got:*

Delîla pîr û jêhatî ew dek û dolab di serê xwe de saz kir û burqeyeke biçûk î zer ji berîka xwe derxist, ku dişibiya dînarekî. Qerwaşa ku rahiştibû kurik jî, pir cahil û xeşîm bû. Delîla jê re got: Vî dînarî bigire û here cem xatûna xwe, jê re bibêje, Umul xêr pir kêfxweş e bi vê nîşana we, qencîya we jî li ser xwe ji bîr nekiriye û roja dawetê bi xêr û selamet ew û keça xwe dê werin û gelek mesrefê jî bikin.

Qerwaşê got: Dayêcan, ew kurikê mîrzayê min her ku diya xwe dibîne, jê venaqete û ez naxwazim wisa herim cem xatûna xwe. Delîla got: Ka wî kurikî bide min, bila li cem min be, hetanî tu herî û werî! Qerwaşê kurik da wê û burqe ji destê wê girt û çû cem xatûna xwe. Delîla rahişt lawik û derket sikakê, zêr û zîv cewherên li ser kurik rakirin û ji xwe re got: "Ma qey eva ku te li vê qerwaşa hanê kir jî, dolab bû? Dek û dolaba mezin ew e, ku tu vî kurikî bikî rehîn û çend weqî zêr di ber de bigirî!"

Delîla rahişt lawik û berê xwe da sûka zêrkeran. Li wê derê zêrkirekî cihû dît, ku qefeseke tijî zêr û cewher li ber wî bû. Di dilê xwe de ji xwe re got: "Jêhatîbûn ew e, ku feneke mezin li vîyê cihû bikî!" Ê cihû jî kurik di destê wê de dît û nas kir, ku kurê şahbenderê tacirên Bexdayê ye, ji ber ku ew jî maldarekî mezin bû û ew nas dikir. Dexesî ji cîranê xwe dikir û nedixwest, ku Delîla here kirîn û firotinê ji cem wî bike. Loma di cî de bi Delîla ve rabû û jê re got: Tu çi dixwazî xatûna min? Delîlayê bi navê wî gazî wî kir û got: Hoste Ezra tu yî gelo? Wî jî got: Belê. Delîlayê got: Ev kurê şahbênderê Bexdayê ye û xwişkeke vî kurikî heye, îro hatiye xwestin û nîşana wê li dar dixin. Keçik jî pêdivîya wê bi hinek xeml û xêzê heye. Ezrayê hoste got: Ser seran, ser çavan! Delîla got: Ka du heb xirxalên zêr, du guharên ji lûlû, gerdenî û hungulîskekê bide me, ez ê gişan bibim, bi xwediyên wê bişêwirim, em ê bi qasî hezar dînarî jê bigirin û yên din jî li te vegerînin. Bila ev kurik jî li ba te be, heta ku ez herim û werim! Ezrayê cihû got: Tu çawa dixwazî, xatûna min!

Delîlayê kurik danî cem Ezra, rahişt wan zêran û çû malê: Keça wê jê re got: Te îro çi kir, dayêcan? Delîlayê got: Min îro şahbenderê tacirên Bexdayê revand, kincên wî jê kirin, piştre ez çûm cem zêrkerekî cihû, min bi hezar dînarî zêr û cewher jê stendin û li şûna wan, kurik danî cem wî û ez hatim malê. Keça wê got: Îcar tu nema dikarî qet bigerî di nava bajêr de.

Qerwaş jî çû cem xatûna xwe û jê re got: Xatûna min, Umul xêr silavan li te dike, dibêje, em kêfxweş bûne bi vê şahîya nîşanê û di roja dawetê de ew û keça xwe dê werin û dîyarîyên xwe wê çaxê bînin, pêşkêşî wan bikin! Xatûna wê bi şaşwazî got: Û kanî mîrzayê te li ku ye? Qerwaşê got: Ji tirsa ku dîsa bi te ve bizeliqe, min ew li cem wê hişt. Xatûnê jê re got: Here mîrzayê xwe bîne! Qerwaş bi dû kurik de çû, ne ew dît ne jî pîrejina ku navê xwe kiribû Umul xêr. Qîrîn pê ket û wêlewêla wê şahî zivirand şînîyê.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 688'AN

*Şehrezadê got:*

Bi qîrînîya qerwaşê re û belavbûna wê xebera girîng re di nava hemû şahîkêşan de şahîya şêrînahîyê bi yekcarî zivirî şînîyê û her kes xemgîn bû. Bavê kurik, şahbenderê taciran hat, jina wî bûyer jê re anî ziman. Ew jî di cî de derket, li kurê xwe gerîya, hemû tacir û nasên wî jî, her kesî ji hêla xwe ve dest bi lêgerînê kir, hetanî ku kurik li cem zêrkerê cihû tazî dîtin. Bavê kurik bi dîtina wî ew qasî kêfxweş bûbû, ku gava ew tazî dît, rahiştê û nehat bîra wî, ku bipirse, bê çima tazî ye! Zêrkerê cihû jî, gava dît ku bavê wî, wî dibe, bêyî ku heqê zêran bide, gazî wî kir û got: Tu wisa bikî, ez ê gilîyê te li cem xelîfe bikim!

Şahê taciran hêrs bû û got: Çi bi te hatiye cihû? Zêrker got: Pîrê hat bi buhayê hezar dînarî zêr û mercan ji keça te re kirîn û birin. Ev kurik weke rehîne li ba min dananîbûya, min zêr nedidanê û heger min baş nizanibûya, ku ev kurik ê te ye jî , min nedidayê! Tacir got: Pêdivîya keça min bi zêran tune ye û kanî kincên kurê min jî bide min! Zêrkerê cihû qîrîya û got: Hewar e, musulmanino, hewar e!

Tam di wê kêlîyê de, boyaxker, kurê tacir û xwediyê kerê di wir re derketin û ji yê cihû re gotin: Çi bûye, tu çima diqîrî? Zilamê cihû, tiştê ku bi serê wî de hatibû, ji wan re got. Wan jî got: Ev jinika ku tu behsa wê dikî diz û fenek e, hîle li me jî kir û malê me bir. Hemûkan, tiştê ku bi serê wan de hatibû jê re gotin. Şahbenderê taciran got: Heger wisa be, ez dev ji daxwaza kincên kurê xwe berdidim. Lê heger pîrejin were girtin, ez ê kincên wî ji wê bixwazim. Piştre kurê xwe bir û çû cem diya wî, ji nû ve pê kêfxweş bûn.

Ê cihû jî ji her siyan pirsî, got: Hûn bi ku ve diçin? Gotin: Em ê li wê

pîra diz û fenek bigerin. Ê cihû got: Min jî bi xwe re bibin? Ew jî bi xwe re birin. Ê cihû got: Kesî ku wê nas dike di nav we de heye? Xwediyê kerê got: Ez wê nas dikim. Ê cihû got: Heger em giş bi hev re lê bigerin, dibe ku berîya em wê bibînim, ew fersenda revê bibîne û xwe ji nav lepên me xelas bike. Lê heger em ji çar hêlan ve û her yek me ji alîyê xwe ve em lê bigerin, em ê wê biqefêlin. Ka em her yek ji hêlekê ve herin û li cem dikana Berberê Mexrîbî, Hecî Mesûd bigihîjin hev!

Her yek ji wan ji hêlekê ve ket rê û lê gerîyan. Tu nabêjî ew jî di wê kêlîyê de derketibû nêçîreke din! Xwediyê kerê ew dît û nas kir. Pê ve çû, ew girt û got: Malxerabê tu hîn jî şêlandinê dikî? Pîra Delîla got: Tu çawa yî, çi dikî? Zilam got: Ka kerê min bîne! Pîrê got: Wî waweylê kurê min, tu kerê xwe dixwazî yan eşyayên xelkê? Got: Ez kerê xwe dixwazim! Pîrê got: Min kerê te danî cem Berberê Mexrîbî, ka dûr bisekine, da ku ez herim jê re bibêjim, bila kera te bide te.

Delîla çû cem Berberê Mexrîbî, destê wî maçî kir û bi ser de girîya. Berber got: Xêr e pîrê? Wê got: Li yê dera han sekinî binêre kurê min! Berê nexweş bû, qaşo hat dermankirin lê êdî hişê xwe xwariye û keran xwedî dike. Radibe, rûdinê, dibêje, “Kera min!” Hekîmekî ji min re got, dîn bûye û êdî rihet nabe, heta ku du diranên wî yên kursîyan neyên kişandin û çenên wî neyên kewandin. Vêca a ji te re dînarek, gazî wî bike, jê re bibêje, va ye kerê te li cem min e û diranên wî rake. Berber rahişt dînarî û got: Rojîya Remezanê li min bide heger ez kerê wî nexim kefa destê wî!

Du heb karkerên ber destê wî hebûn. Berber ji yekî ji wan re got: Du bizmaran di agir de sor bike û piştre qazî xwediyê kerê bike! Di wê navberê de pîrejin Delîla jî bi rêya xwe de çûbû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 689’AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku xwediyê kerê hat cem berber, berber jê re got: Feqîro, kera te li cem min e, were wê bibe! Bi şeref bi namûs, ez ê bixim destê te!

Berber ew bir, xist odeyeke tarî û ji nişkê ve pîhnek lêda, ew li erdê kir term. Piştre, bi çepilên wî girtin, ew birin, dest û nigên wî girêdan, du diranên wî rakirin û çenên wî kewandin, piştre ew berdan.

Xwediyê kerê rabû ser xwe û ji Berberê Mexrîbî re got: Te çima wilo bi serê min kir? Wî got: Diya te ji min re got, ku te hişê xwe xwariye, tu nexweş ketiyî û êdî bênavber te gotiye, "kera min, kera min!" Sibê, nîvro, êvarê te gotiye kera min, va ye min jî kera te xistiye destê te!

Xwediyê kerê got: Lê baş bizanibe ku wê Xwedê cezayê te bide te, ji ber zilma ku te li min kiriye! Ê Mexrîbî got: Diya te ji min re got, wisa bike. Piştre çîrok ji serî hetanî binî jê re got. Xwediyê kerê got: Xwedê mala wê xera bike, piştre xwe rakişand wî jî û herdu pev ketin, ji dikanê dûr ketin, gava ku dev ji hev berdan û Berberê Mexrîbî vegerîya dikana xwe, bala xwe dayê, ku tiştek di dikana wî de nemaye! Pîra Delîla, her tiştê wî biribû û çûbû cem keça xwe Zeynebê, dek û dolabên ku nû li dar xistibûn jê re gotin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 690'Î

*Şehrezadê got:*

Gava Berberê Mexrîbî dît, ku dikana wî hatiye şêlandin, bi qerpika stûyê xwediyê kerê girt û jê re got: Ka diya xwe bîne! Wî jî got: Ev ne diya min e, dizeke bêhawe ye, fen li min û gelek mirovên din kir û em giş şêlandin, kera min jî bir...

Di wê navberê de boyaxker, zêrkerê cihû û kurê tacir jî gihîştin cem wan û dîtin, ku berber û xwediyê kerê di qirika hev de ne û çena xwediyê kerê daxdayî ye. Jê pirsîn, çi bi te hatiye? Çîroka xwe û Berberê Mexrîbî ji wan re got. Wan jî got: Ev jinik diz û hîlekareke mezin e, em giş şêlandine û hemûçkan çîrokên xwe ji wan re gotin. Berber dikana xwe girt û ew jî bi yên din re çû cem walî, jê re gotin: Em ji vê bobelata ku bi serê me de hatiye, tenê te berpirsîyar dibînin! Walî got: Gelo çend heb pîrejin di bajarê me de hene, kes ji we nizane?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 691'Ê

*Şehrezadê got:*

Gava ew pirs kir, xwediyê kerê got: Ez wê jinikê nas dikim, heger tu tenê deh heb zilamên xwe bide me, em ê wê zeft bikin! Walî deh zilam dan wan.

Xwediyê kerê ew dan dû xwe û derket nava bajêr, ên din jî li pey wan çûn. Li her derê gerîyan, carekê ji nişka ve, bala xwe danê ku pîrê ji wê ve tê. Ew girtin û birin cem walî. Hatin meqamê walî, li binîya şibakeya qesra wî sekinîn û li bendê man ku walî ji qesrê derkeve. Ji ber ku şev dereng ketibû û zilamên walî bê xew bûn, hemû di xew re çûn. Pîrê jî xwe li xew danî, xwediyê kerê û hevalên wî yên din jî raketin. Wê çaxê pîrê xwe ji wan vedizî û çû ket hêla heremê ya qesra walî. Destê jina walî maçî kir û jê pirsî, got: Ka walî li ku ye? Jina wî got: Walî raketî ye, tu çi jê dixwazî? Pîrê got: Mêrê min bendeyan difiroşe, heft heb ji wan dane min, ji bo ku ez wan bifiroşim, lewre ew rêwî ye niha û ne li vir e. Ez bi walî re axivîm, wî her pênc ji xwe re veqetandin, bi hezar û dused dînarî û ji min re got, wan bigihîne mala min, va ye min jî anînê vir.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 692'YAN

*Şehrezadê got:*

Ji ber ku ji berê de walî, hezar dînar dabû jina xwe û jê re gotibû: Van diravan li cem xwe bigire, em ê bi wana ji xwe re bendeyan bikirin, çawa ku pîrê ew galegal jê re kirin, gotina mêrê wê hat bîra wê û ji pîrê re got: Ka bendeyên ku te ew anîne, li ku ne? Pîrê got: Wa niha, li binîya vê şibakeya te raketî ne! Jina walî çû, di şibakeyê re li derve nêrî, dît ku kincên bendeyan li zilamê Mexrîbî ye û kurê tacir jî di dirûvê bendeyan de ye, boyaxker, ê cihû û xwediyê kerê jî, ne dûrî wan bûn, hemû di qilixê bendeyan de bûn.

Jina walî got: Qey ev bende ji hezar dînarî buhatir in? Piştre sindoqa xwe vekir û hezar dînar da pîrê, piştre jê re got: Xwe ragire hetanî ku walî ji xew rabe, dê herdused dînarên mayî jî bide te. Pîrê got: Xatûna min hema bila ew dusedên mayî bibe xatirê van şerabên ku te dan min. Lê kanî te ez di derî re derxistima, dê baş bûya. Jina walî ew di derîyê paş re derxist û perdeyên derî dîsa berdan.

Pîrê çû cem keça xwe Zeynebê, keça wê got: Dayê te vê carê çi kir? Pîrê got: Keça min, min lîstikek li serê walî gerand û min hezar dînar ji jina wî stend, li himberî pênc bendeyên ku min firotin wan. Xwediyê kerê, boyaxker, berber, kurê tacir û zêrkerê cihû! Min ew giş kirin bendeyên walî û min diravên heqê wan jî girt. Lê keça min, tiştê xerab ew e, ku xwediyê kerê min nas dike!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 693'YAN

*Şehrezadê got:*

Gava Delîlayê ew hîleyên xwe yên nû ji keça xwe re got, keça wê lê vegerand û got: Êdî bes e û li mala xwe rûnê dayêcan, carek, dudu, sisê li hev tê û cerê avê naşike lê vê carê dibe ku bişikê!

Walî jî, çawa ku ji xew rabû; jina wî jê re got: Ez bi wan her pênc bendeyên ku te ew ji pîrê kirîne pir kêfxweş bûm! Walî got: Kîjan bende? Jina wî bi şaşwazî got: Tu çima ji min vedişêrî, înşelah wê hemû mîna te bibin xwediyên postan! Mêrê wê jî şaşwaz bû û got: Bi serê te yê delalî min tu bende nekirîne. Kê ji te re gotiye gelo? Jina wî got: Pîra delal got, a ku te pênc bendeyên wê ji me re veqetandibûn û soz dabû, ku tu hezar û dused dînarî heqê wan bidî. Walî got: Te heqê wan jî da pîrê? Got: Belê min da û min her pênc bende bi çavên serê xwe dîtin. Kincên li ser yekî ji wan bi tenê, buhayê wî bi qasî hezar dînarî ye. Min pasevan şandin cem wan, ji bo ku bi wan ve mijûl bibin û min ji wan xwest, ku bi qencî nêzî wan bibin.

Walî daket jêrê.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 694'AN

*Şehrezadê got:*

Gava walî daket jêrê, li zêrkerê cihû, Berberê Mexrîbî, kurê tacir, xwediyê kerê û boyaxker rast hat. Ji pasevanan re got: Kanî her pênc bendeyên ku me ew bi hezar dînarî ji pîrê kirîne? Pasevanan got: Me tu bende li vir nedîtine, ji xeynî van her pêncan, ku pîra dizek girtibûn û anîbûn vira. Em giş li ber derî raketibûn, wê jî xwe ji me vedizîbû û çûbû herema jinan a qesrê. Piştre carîye hat, got: Her pêncên ku pîrê anîne vir, hûn in? Me jî got belê!

Walî got: Bi navê Xwedê hîleya herî mezin ev e! Her pênc zilaman jî ji walî re gotin: Em malên xwe ji te dixwazin! Walî got: Xwediya we hûn bi hezar dînarî firotin min û hûn bendeyên min in êdî! Wan jî got: Em mirovin azad in û em nayên firotin. Em ê herin gilîyê xwe li cem xelîfe bikin, bila ew me li hev bîne! Walî got: Ne hûn bûna, pîrê rêya mala min dernedixist, we ew anî cem min û ez ê jî we bifiroşim koçerên ereban, ez ê serê yekî dused dînarî ji wan bixwazim.

Hîna ew di nava wê xirecira xwe de bûn, emîr Hesenê Rêxerab ji rêwîtîya xwe vegerîya malê û dît ku jina wî tazî ye! Jê pirsî, jina wî çîroka xwe ji serî hetanî binî jê re vegot. Wî jî got: Berpirsîyarê vî karî û dijminê min walî bi xwe ye!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 695'AN

*Şehrezadê got:*

Emîr Hesenê Rêxerab got, "Berpirsîyarê vî karî walî ye." Û rabû ser xwe, berî da cem walî . Çû cem wî û jê re got: Tu iznê didî pîrejinan ku di nava bajêr de bigerin û xelkê bişêlînin, malê wan ji wan bidizin? Ev berpirsîyarîya te ye û ez tiştên jina xwe ji te dixwazim! Piştre ji her pêncan re got: Derdê we çi ye? Çi tiştê ku bi serê wan de hatibû, jê re gotin. Emîr Hesen got: Hûn mazlûm in û heqê we hatiye xwarin. Piştre li walî zivirî û jê re got: Çi heqê te li wan heye, ku te ew girtine, xistine zindanê? Walî got: Pîrejina dizek mala min nas nedikir û di rêya wan re xwe gihand mala min û zêrîn min dizîn, hezar dînarê min bir, miqabilî van her pêncan.

Her pêncan got: Ya Emîr Hesen, tu wekîlê me yî di vê dehwê de! Walî ji emîr re got: Tiştên ku ji jina te hatine dizîn, di stûyê min de ne. Lê gelo kî ji we wê jinikê nas dike? Hemûçkan gotin: Em nas dikin û tu tenê deh pasevanan bidî me, em ê wê biqefêlin. Walî deh pasevan dan wan. Xwediyê kerê ji wan re got: Bidin dû min, ez wan çavên wê yên şînik baş nas dikim.

Pasevanan dan dû û ketin nava bajêr, di demeke kurt de lê rast hatin û pîrê girtin, berê wê dan mala walî. Çawa ku walî çav lê ket, jê re got: Ka eşyayên xelkê li ku ne? Delîlayê got: Ne min dîtiye ne ji min biriye! Walî ji zindancî re got: Wê bibe, bixe zindanê, hetanî sibehê. Zindancî got: Ne ez wê dibim ne jî dixim zindanê. Dibe ku dek û dolabekê li serê min jî bike û bireve, ez ê bibim berpirsîyar!

Walî li hespê xwe siwar bû, pîrê û pasevan giş dan pey xwe û çû qiraxa Dicleyê û ji celadê xwe re got: Wê ji porê wê de daliqîne! Celad got: Ser seran, ser çavan emîrê min! Bi çepilên pîrê girt, ew bi dû xwe ve kişandin û berê wê da cihê daliqandinê, her deh pasevan jî li pey çûn. Walî jî bi şûn de vegerîya mala xwe.

Gava tarî ket erdê, koçerekî ereban bihîst, ku yek ji hevalê xwe re dibêje: Şikir ji Xwedê re ku tu bi selametî vegerîyayî, gelo tu li ku mabûyî hetanî

niha?Ê din jî lê vedigerîne û dibêje: Ez li Bexdayê bûm û min zulabîya bi hunguv xwar!

Gava yê koçer ew tişt bihîst, di dilê xwe de got: Bi emrê Xwedê min ev xwarin nexwariye, bi soz û peyman be, ez ê derbasî bajêr bibim û zulabîyê bixwim! Li hespê xwe siwar bû û berê xwe da derîyê bajêr. Bi rê de jî, bê navber ji xwe re digot: Xwarina zulabîyeyê xweş e, bi şeref û namûs ez ê zulabîyê bixwim!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 696'AN

*Şehrezadê got:*

Koçer li ser pişta hespa xwe diçû û ji xwe re digot: Ez ê herim Bexdayê zulabîyeyê bixwim, zulabîye xweş e! Ez ê zulabîyeya bi hunguv bixwim! Ez ji zulabîyeyê pê ve tiştekî din naxwim! Wisa got, heta ku gihîşt hinda derîyê bajêr; cihê ku Delîla lê daliqandî bû. Gava gihîşt cem wê, dengê wî çû Delîlayê, wê jî hewara xwe di wî da û got: Hawar e, min xelas ke, ey şêxê ereban. Ez di bextê te de me, min xelas bike! Koçerê ereban jê pirsî: Ji ber çi wisa tu xistin vê çarmixê û tu ji porê te daliqandine? Delîlayê got: Rikeberekî min hebû, zulabîyefiroş bû. Gava ez li cem wî sekinîm ji bo ku ez zulabiye jê bikirim, min tif kir erdê, bê hemdê min tifa min çû ser zulabîyeyê. Wî jî çû gilîyê min li cem hakim kir. Hakim jî biryara çarmixkirinê da û got hûn ê deh ritil zûlabîye bidin ber, heger gişî nexwe, hûn ê wê ji çarmixê danexînin. Ez jî nikarim şêrînahîyê bixwim.

Koçer jê re got: Ka bide min, ez ê li şûna te bixwim? Ji xwe ez jî tenê ji bo xwarina zulabîyeyê diçim Bexdayê? Delîlayê got: Ê ku wê bixwe, divê li şûna min daliqandî be!

Koçerê kawik bawer kir û çû dest û nigên wê vekirin, ew ji çarmixê daxist û piştî ku kincên wê li xwe kirin, xwe li şûna wê girêda. Delîla jî kincên wî li xwe kirin, şaşika xwe girêda û li hespê wî siwar bû, çû malê, cem keça xwe. Zeynebê, çawa çav lê ket, got: Ev çi hal e, dayêcan? Delîla got: Ez hatibûm girtin û ez xistibûm çarmixê. Lê gava bû şev û koçerek hat, ku derbasî bajêr bibe, min xwe xelas kir. Piştre çîroka xwe û yê koçer jê re got.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 697'AN

*Şehrezadê got:*

Em Delîlayê û keça wê li wir bihêlin û em vegerin ser pasevanan. Bi sibehê re yek ji wan bi xwe ve hat, şiyar bû û rabû dît, ku ro derketiye. Hevalên xwe giş ji xew şiyar kirin. Yekî ji wan serê xwe rakir û li Delîlayê kir gazî, got: Delîla! Koçerê ereban li şûna wê bersiv da û got: Welehî şev pê de, min xwarin nexwariye! Gelo we zulabîyeya bi hunguv anî? Pasevan şaşwaz bûn, li hev nihêrîn û ji hev re gotin: Ev zilamekî koçer e, çi îşê wî heye di çarmixê de? Piştre jê pirsîn, gotin: Koçer, kanî Delîla li ku ye û kê ew vekiriye? Koçer got: Min ew vekir ji bo ku ez wê zulabîyeya bi hunguv bixwim, lewre dilê wê ranake ku şêrînahîyê bixwe.

Tê derxistin, ku koçer ji halê Delîlayê bêagah e û fêm kirin, ku ew pîrêjin bi aqilê wî lîstiye û dolabek li serê wî gerandiye. Ji hev re gotin: Gelo em birevin û canê xwe xelas bikin an em li benda qedera xwe bin? Lê hîna ku negihîştibûn biryarekê, walî bi ser wan de hat, li gel her pênc kesên ku Delîlayê ew şêlandibûn. Walî ji pasevanan re got: Ka Delîlayê vekin, bînin vira! Koçerê daliqandî got: Şev pê de min nan nexwariye, gelo we zulabîye anî?

Walî bi şaşwazî berê da çarmixê û dît, ku li şûna Delîlayê koçerek daliqandî ye. Li pasevanan zivirî, got: Ev çi ye? Wan jî xwe avêtin walî, got: Em di bextê te de ne, mîrzayê me!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 698'AN

*Şehrezadê got:*

Gava pasevanan xwe avêtin bextê wî, walî ji wan re got: Ka ji min re bibêjin, bê çi qewimîye? Wan jî got: Jixwe şev pê de em bi we re bûn, em pir betilîbûn. Me jî got, jixwe Delîla di çarmixê de ye, tiştek nabe; em di xew re çûn. Gava em şiyar bûn jî, me dît, ku li şûna wê ev koçerê hanê daliqandî ye. Mesele ev bû û stûyê me jî li ber şûrê te ye! Walî got: Lawo hûn dizanin, ku ev jinik bêbexteke hîlekar e, we çawa wisa kiriye? Xwedê we bistirîne û hew, ka rabin vî koçerî ji çarmixê daxînin!

Pasevanan koçer ji çarmixê daxistin, koçer bi duhêlên walî girt û li ber gerîya, got: Xwedê qewetê bide te, ez kincên xwe jî, hespê xwe jî ji te dixwa-

zim? Walî jê re got. Walî behetî ma û jê re got: Ev jinik şêlekareke bêhawe ye û hayê min ji hespê te tune ye.

Her pêncên din jî ji walî re gotin: Em eşyayên xwe ji te dixwazin! Lewre me jinik girtibû û ew radestî te kiribû. Niha em û tu, em ê herin ber destên xelîfe, bila ew bibe dadwer û hekem di navbera me de! Di wê navberê de emîr Hesenê Rêxerab jî derketibû dîwanê û li cem xelîfe bû. Tam di wê kêlîyê de bala xwe dayê ku koçer û her pêncên din dane pey walî û ketine dîwanê û dibêjin: Em bêguneh in!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 699'AN

*Şehrezadê got:*

Zilamê koçer û her pêncên din ên ku hatibûn şêlandin, gotin: Em bêguneh in û zilm li me bûye! Xelîfe got: Kê zilm li we kiriye? Yekî ji wan xwe da pêş û tiştê ku bi serê wan de hatibû, jê re gotin. Di pey re walî axivî û got: Emîrê bawermendan, jinikê ez xapandim û ev her pênc mirov bi hezar dînarî firotin min, li gel ku ew ne bende bûn.

Xelîfe got: Aram bin; çiyî kê çûbe, ez ê lê vegerînim. Piştre li Emîr Ehmed zivirî û jê re got: Serdar Ehmed! Wî jî got: Libê ez xulam! Emîrê bawermendan got: Ez peywirê didim te; here wê pîrejinê bîne vira!

Emîr Ehmed got: Misoger ez ê wê bînim vira, emîrê bawermendan!

Xelîfe, zilamê koçer û her pêncan din jî li cem xwe girtin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 700'Î

*Şehrezadê got:*

Gava xelîfe peywira derdestkirina Delîlayê da wî, Ehmed Denef jî zilamên xwe da dora xwe û daket hêwanê, bi wan şêwirî, got: Çend pîrejinên weke wê di bajêr de hene û em ê çawa û bi çi hawayî bikaribin wê bigirin? Yekî ji wan, ku navê wî Elî Cemel bû, ji Ehmed Denef re got: Hûn çima bi Hesen Şoman dişêwirin û li ser çi pê dişêwirin? Qey ew jî emîrekî mezin e?

Hesen Şoman ji cihê xwe pengizî û bi hêrs got: Elî Cemel, qey ez pir biçûk im li ber çavên te? Bi navê Xwedayê gewre ez vê carê bi we re nayêm!

Xeyîdî û rabû ser xwe, çû. Ehmed Denef li zilamên xwe zivirî û ji wan re got: Xortino rabin ser xwe û her deh heb ji we berê xwe bidin taxekê û li Delîlayê bigerin!

Elî Cemel rabû ser xwe, deh pasevan dan dû xwe û berê xwe da taxekê, yên mayîn jî li deh taxên din belav bûn. Hemûçkan jî civan bi hev re dan, gotin em ê li filan sikakê bigihên hev.

Xebera lêgerîna wan di cî de li bajêr belav bû û hat gotin, ku Ehmed Denef û zilamên xwe peywira girtina Delîlaya şêlankar girtine ser xwe û di nava bajêr de digerin. Ev agahî gihîşt guhên Delîlayê û keça wê jî. Zeynebê ji diya xwe re got: Dayêcan heger tu jêhatî bî, tu yê dek û dolabekê bînî serê Ehmed Denef jî? Diya wî lê vegerand got: Keça min ne ji Hesen Şoman be, ez ji kesî natirsim! Keça wê got: Nexwe bila vê carê Ehmed Denef û her çil zilamên wî li min bin. Sond û peyman be, ez ê kincên her çil û yek zilamî di ser wan re bînim!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 701'Ê

*Şehrezadê got:*

Zeynebê ew sond xwar û rabû ser xwe, kincin xweşik û biroqankî li xwe kirin, xeml û xêza xwe girêda û çû cem etarekî, ku dikana wî bi du deriyan bû, silav lê kir, dînarek dayê û jê re got: Vî dînarî bigire heqê şêrînahîya dikana xwe û wê bide min hetanî êvarê! Etar, mifteyên dikanê dan Zeynebê û çû mala xwe.

Zeynebê jî hinek merş, ber û doşek li kerê barkêş û hespa koçer kir û ew birin, dikan bi wan raxist û li her goşeyekî sifreyeke xwarinê amade kir, li gel mey û şerabê. Wê jî rûyê xwe vekir û wisa li devê derî sekinî. Piştî demekê Elî Cemel û zilamên xwe hatin cem. Wê jî destê wî ramûsa. Elî bala xwe dayê, ku keçeke xweşik û lihevhatî ye. Jê hez kir û jê re got: Tu daxwazên te hene? Zeynebê got: Gelo tu Ehmed Denef î? Wî got: Na lê ez ji zilamên wî me û navê min Elî Cemel e. Zeynebê got: Hûn bi ku ve diçin? Elî got: Em li pîrejeneke diz û şêlankar digerin, ku mal û eşyayên xelkê biriye û em dixwazin wê bigirin. Lê belê tu kî yî û tu li vir çi dikî? Zeynebê got: Ez ji Mûsilê me û bavê min meyxurek bû, mir û malekî pir ji min re hişt. Ji tirsa emîr û desthilatdaran ez hatim vî bajarî û min ji xelkê xwest ku min biparêzin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 702’YAN

*Şehrezadê got:*

Gava keçikê wisa got, Elî Cemel lê vegerand û got: Ne Ehmed Denef be, tu kes nikare te biparêz e. Înşelah îro tu yê wî bibînî! Zeynebê got: Nexwe ji bo xatirê min, werin hundir, gepek nan bixwin û qurtek ava min vexwin! Wan jî qebûl kirin û derbasî hundir bûn. Li ser sifreya xwarinê rûniştin, xwarin û vexwarin, heta ku serxweş ketin. Zeynebê benc jî xist nav şeraba wan, hemû benc kirin. Piştre kincên wan di ser wan re anîn. Gava ku pasevanên din jî hatin, wilo li serê wan jî kir û kincên wan jî di ser wan re anîn. Ehmed Denef jî lêgerîna xwe berdewam kir, hetanî ku hat li Zeynebê rast hat. Zeynebê di cî de destên wî maçî kir. Ehmed lê nihêrî û ji keçikê hez kir. Zeynebê got: Gelo tu serdar Ehmed Denef î? Got: Belê lê tu kî yî? Zeynebê got: Ez xerîb im, ez ji Mûsilê me, min ev meyxane ji xwe re vekiriye lê walî qanûnek ji min re derxistiye, dibêje ez ê te biparêzim. Lê tiştê ku dê walî bibe, bila ji te re be, çêtir e.

Ehmed Denef got: Tiştekî nede walî. Tu bi xêr hatî, ser çavan hatî!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 703’YAN

*Şehrezadê got:*

Gava ku Ehmed Denef wisa got, keçikê spasîya wî kir û ew vexwend hundir, ji bo ku xwarinekê bixwe, meyekê vexwe. Ehmed derbasî hundir bû. Keçikê ew bir ser sifreya xwarinê û mey da ber wî, heta ku serxweş ket û bencê bandora xwe li ser kir, ji ser hişê xwe çû. Zeynebê, kincên wî jî di ser re anîn û li gel hemû kincên din, ew li hespê koçer û kera barkêş kirin û berî da malê.

Gava Elî Cemel bi ser hişê xwe ve hat û ji bin bandora bencê derket, bala xwe dayê, ku tazî ye. Li derdora xwe nêrî , dît ku serdarê wan Ehmed Denef jî di nav de, her çil hevalên wî jî mîna wî tazî ne û kincên wan ên pasevanîyê ne li ser wan in. Dijbenc da hemûçikan û ew ji xewê rakirin. Gişan li xwe nihêrî, li tazîbûna xwe behetî man. Ehmed Denef got: Xortino, ev çi hal e, ku em tê de ne? Em li wê qehpikê digerîyan, ji bo ku em wê bigirin lê wê em xistin xefika xwe! Xwedê dizane bê wê çiqasî kêfa Hesen Şoman bê bi vê rewşa me! Lê dîsa jî em xwe ragirin, hetanî ku tarî bikeve erdê, piştre em herin, çêtir e!

Lê belê Hesen Şoman jî ketibû pey wan û li wan digerîya. Hîna ku wî wisa li wan dipirsî, bala xwe dayê ku hemû ji wê ve tên û hemû tazî ne! Bi helbestî stra û got:

mirov cure bi cure ne di dirûvên xwe de
di şikil û şemalê xwe de jî balkêşe ne
mêr û mêrik jî ji hev û du pir cuda ne
hinek ji wan stêrk in hinek jî jinan e

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 704'AN

*Şehrezadê got:*

Hesen Şoman ji wan re got: Kê bi we de anîye? Wan got: Em ketin pey pîrekê, ji bo ku em wê bigirin lê keçeke ciwan em giş tazî kirin! Hesen Şoman ji wan re got: Baş bû, ku wilo bi serê we kir! Wan got: Qey tu wê nas dikî Hesen? Hesen got: Ez wê û pîrejinê herduyan jî nas dikim. Gotin: Em ê çi ji xelîfe re bibêjin? Hesen Şoman got: Ehmed Denef, here cem wî û kemera xwe li pêş wî veke. Heger ji te re got te çima ew destgîr nekiriye? Bêje ez wê nas nakim, peywirê bide Hesen Şoman, bila ew here wê bigire. Heger peywir da min, ji xwe ez ê herim wê bigirim.

Gava bû sibe, Ehmed û zilamên xwe çûn pêşberî xelîfe Harûn Reşîd, erda bin nigên wî maçî kirin. Xelîfe got: Serdar Ehmed, kanî ew pîra şêlankar? Ehmed kemera xwe vekir, şûrê xwe ji ber xwe danî. Xelîfe got: Ev çima tu wilo dikî? Got: Ji ber ku ez wê nas nakim, tu Hesen Şoman peywirdar bikî, dê çêtir be. Ew, wê û keça wê herduyan jî nas dike, jinik van dek û dolaban ne ji bo ku tiştên xelkê bibe, dike, na. Ew tenê dixwaze Jêhatîbûna xwe nîşanî me bide, da ku tu mehmiza mêrê wê ji wê re texsîs bikî û yekî jî ji keça wê re. Vêca heger tu Hesen Şoman peywirdar bikî û qedera wê bi destê wî ve berdî, ew ê bikaribe wê û keça wê ji te re bîne.

Xelîfe got: Bi tirba bav û kalê min, heger ew tiştên xelkê li wan vegerîne, ew ê di bin emrê te de be Hesen! Hesen Şoman got: Heger tu canê wê bibexşînî, ez ê wê ji te re bînim ezbenî? Xelîfe got: Emrê wê di destê te de! Pê re jî destmala emanê da wî.

Hesen Şoman, çû cem Delîlayê û ji ber derî li wê qîrîya, got: Delîla! Lê

li şûna wê, keça wê bersiv da Hesen. Hesen got: Ka diya te? Zeynebê got: Li vir e! Hesen got: Jê re bibêje bila wan tiştên xelkê bîne û bi min re were, em herin pêşberî xelîfe. Va ye min destmala ewlehî û saxlamiya can jê re anîye û heger bi xweşî neyê jî, bila piştre lomeyan li min neke.

Delîla ji malê derket, malên xelkê yên ku şêlandibûn li wî vegerand, ew li ser pişta kerê û hesp bar kirin, destmala ewlehîyê jî bi stûyê xwe vekir.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 705'AN

*Şehrezadê got:*

Hesen Şoman ji Delîlayê re got: Te eşyayên xelkê hemû anîne lê te kincên serdarê min Ehmed Denef û her çil zilamên wî neanîye? Delîlayê got: Bi navê Xwedê min ew tazî nekirine! Hesen got: Ez ji vê yekê bawer dikim lê ew dek û dolaba keça te Zeynebê bû û min jî ev qencî bi te kir!

Bi hev re çûn dîwana xelîfe Harûn Reşîd. Hesen Şoman pêş de çû û tiştên ku Delîlayê ji xelkê şêlandibûn, yeko yeko nîşanî xelîfe dan. Piştre, Delîla jî bir ber destê wî. Gava xelîfe çav lê ket, got: Wê di nav xwîna wê de bifetisînin!

Hesen Şoman got: Ez dexîlê te me emîrê bawermendan, te ew dabû xatirê min? Delîlayê jî got: Ez di bextê Hesen Şoman de!

Hesen Şoman çû destê xelîfe maçî kir û got: Ez lêborîna xwe dixwazim emîrê bawermendan lê te sozê emanê ji bo wê dabû û niha ew di bin baskên dilovanîya te de ye!

Xelîfe got: Pîrê, virde were, navê te çi bû? Wê jî got: Navê min Delîla ye.

Xelîfe got: Tu feneka hîlekariyê yî loma xelkê navê te kiriye Delîlaya fenek! Hilmeke kûr kişand, piştre berdewam kir: Te çima ev qas dek û dolab li serê xelkê gerandin û te serê me êşand?

Delîlayê got: Mixabin meqseda min ji vî karî ne êşandina dilê we bû, ne jî ji bo ku ez malê xelkê ji wan bidizim û ji xwe re xerc bikim. Lê belê min dek û dolabên Ehmed Denef û Hesen Şoman bihîstibû, bê çi bi serê xelkê Bexdayê kirine, min got ez jî mîna wan bikim, belkî ez jî postekî wekî yê wan ji xelîfe bigirim! Jixwe min êşyayên her kesî li wan vegerandine û zerar li kesî nebûye.

Xwediyê kerê rabû ser xwe û got: Şer'a Xwedê di neqeba min û wê de heye; lewre ne tenê kera min biribû, ew Berberê Mexrîbî bera ser serê min da û du diranên min jî rakirin, hetta çena min jî kewand.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 706'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku xwediyê kerê ew mexdûrîyeta xwe anî ziman, xelîfe ferman da xeznedar, ji bo ku sed dînarî bide wî û sed dînarî jî bide Berberê Mexrîbî û jê re got: Bi wî sed dînarî dikana xwe sererast bike. Ji bo boyaxker jî du sed dînar veqetand û ji wî re jî got: Tu jî dikana xwe tamîr bike.

Hemûyan duayên qencîyê ji xelîfe re kirin û xêr û xweşî û temenekî dirêj jê re xwestin û çûn. Ê koçer jî hespê xwe, kincên xwe birin û got: Êdî derbasbûna Bexdayê li min heram be, xwarina zulabîyê jî li min heram be!

Çîroka Delîlaya fenek jî ev bû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

# HEZAR Û YEK ŞEV

## CILD 11

## ŞEVA 707'AN

# ÇÎROKA ELÎ ZÎBEQÊ MISRÎ

*Şehrezadê ji Şehreyar re got:*

Şahînşahê min ê bextewar! Di şevên borî de me behsa şêlankera Bexdayê ya bi nav û deng Delîlayê û keça wê kir. Îcar em werin ser çîroka Elîyê Misrî, ku di nav xelkê de bi navê Elî Zîbeq dihat naskirin. Pir zîrek, jêhatî û bêhawe bû. Nedihat zeftê.

Wê çaxê sersedê asayîşa Misrê, Selahê Misrî bû. Ew û çil heb pasevanên xwe ketibûn pey Elî û xefik li pey xefikê li pêşîya wî vedidan, ji bo ku wî bigirin. Lê ew weke avê di nav tilîyên wan re derbas dibû, diçû, xwe bi xelasê dixist. Mîna zîbeqê bû, qet nedihat zevtê, loma xelkê ew nav lê kiribû û jê re digotin, Elî Zîbeq.

Rojekê ji rojan bêhna Elî Zîbeq teng bû, kufekuf pê ket û bi wî halê xwe derbasî cem çeteyên xwe bû. Dema ku mirovên wî ew di wî halî de dîtin, yekî ji wan jê re got: Xêr e ezbenî, çi qewimîye? Heger bêhna te teng bûbe, dakeve nav kolanên Misirê fetlekê li xwe bide, wê bêhna te fireh bibe.

Elî rabû, daket nav kolanên Misrê, li nav sikakên wê gerîya lê bêhna wî fireh nebû. Tew bi wê gerê re çawa ku kul û derdên wî zêdetir bûbin, tengavtir bû. Tam di wê kêlîyê de çavên wî li meyxaneyekê ketin. Di dilê xwe de ji xwe re got: A baş ew e, ku ez derbasî vir bibim û têra xwe vexwim, heta ku bêhna min were ber min!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 708'AN

*Şehrezadê got:*

Elîyê Misrî derbasî meyxaneyê bû, bala xwe dayê, ku heft komikên meyxuran di hundir de rûniştî ne. Çû cem xwedîyê meyxaneyê, jê re got: Ê min ez dixwazim bi tena serê xwe rûnêm!

Xwedîyê meyxaneyê cihek jê re veqetand, têra wî mey û fêkî danî ber. Wî jî vexwar û hey vexwar, heta ku serxweş ket, kul û derdên wî giş ji hişê wî derketin. Rabû ji meyxaneyê derket û li kolanên Misrê gerîya û hey gerîya heta ku gihîşt Derba Sor û kolan ji bajarîyan xalî bûn; hemûçkan xwe ji ber wî dan alî, lewre tirs û heybeta wî li ser her kesî hebû.

Carekê li xwe zivirî û çavên wî li meyfiroşekî ketin, ku bê rawestan bang dikir û digot: Xwedê ji we razîno, ne ji destê min be, ava mewîjan venexwin; ne dîdara we be, neçin civanên tu kesî; tenê kesên hişmend di serê civatan de rûdinên!

Elî gazî wî kir û jê re got: Kanî şerbikek mey bide min! meyfiroş lê mêze kir, şerbikek dagirt û da destê wî. Elî lê nihêrî, şerbik hejand û di pey re jî rijand erdê. Meyfiroş jê re got: Qey tu venaxwî? Elî got: Ji min re dagire! Meyfiroş şerbikek jê re dagirt û da destê wî. Elî vexwar û dînarek dayê. Meyfiroş lê mêzand û got: Li xwe miqate be ciwano, biçûkên hinekan mezinên hinekên din in!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 709'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku meyfiroş ev gotin anîn ziman, Elî hêrs bû, bi ser ve rabû, bi guhkê xeftanê wî girt, kişkişand û xencera xwe lê kişand, çawa ku tê gotin:

> xencera xwe lê bide ji kesî qet metirse
> tirs û metirsîya te tenê bila ji Xweda be
> ji bêsincîyê dûr keve tu nebe nemerd
> mêr û çeleng be tu her demê comerd

Û ji meyfiroş re got: Kalo ji min re tiştin biaqil bibêje! Hîzê te giş çiqas buha be jî, sê derheman nagire. Herdu şerbikên ku min ew rijandin jî, ne bi buhayê ritilek av in? Meyfiroş got: Belê, wisa ye. Elî got: Min jî dînarekî sax da te, îcar çima tu devê xwe xwar dikî; qey te kesî ji min mêrtir û camêrtir dîtiye? Meyfiroş got: Min kesên ji te mêrtir û camêrtir dîtine û hetanî ku dayîk zarokan bînin dunyayê, wê kesên mêrtir û wêrektir jî derên. Elî got: Te kî ji min mêrtir û wêrektir û comerdtir dîtiye?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 710'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku Elî jê re wisa got, meyfiroş got: Di vê mijarê de serpêhatîyeke min heye, ez ê ji te re bibêjim. Rehmetîyê bavê min mezinê meyfiroşên Şe-

rabiyeya Misirê bû. Gava ku çû ber dilovanîya Xwedê, ji min re pênc deve, du dikan, qantirek û malek hişt. Jixwe kesê jar û feqîr maldar nabe. Gava ku maldar bibe jî, dimire. Min jî ji xwe re got, a baş ew e, ku ez herim Hîcazê. Min bi qasî pêncsed dînarî deyn kir û ez çûm. Lê li hecê hemû ji destê min çû, min wenda kir. Min di dilê xwe de ji, xwe re got: "Heger ez vegerim Misrê, wê deyndarên min hemû li min vegerin, min bifetisînin!" Rabû min ji Hîcazê berê xwe da Şamê û ji wir jî ez çûm Helebê. Ji Helebê jî ez çûm Bexdayê û li wir min li mezinê meyfiroşan pirsî. Xelkê cihê wî nîşanî min da. Ez derbasî cem wî bûm û mim fatîhayek xwend. Ciwamêr pirsa rewşa min kir. Min çîroka xwe ji serî hetanî binî jê re got. Rabû ez birim dikanekê. Ji bo ku ez meyfiroşîyê bikim, hîzek, kûzek, şerbikek da min. Min jî tewkelîya xwe bi Xwedê anî û ez rabûm, min dest bi karê xwe kir. Ez li bajêr gerîyam, min şerbikek da yekî, ji bo ku vexwe. Ji min re got, min tiştek nexwariye, heta ku ez bi ser de tiştekî vexwim; lewre îro çikûsekî ku du tepsî xwarin di destê wî de bûn, di ber min re derbas bû. Min got, kanî tiştekî bide min, ez bixwim, da ez karibim tiştekî bi ser de vexwim. Lê neda min. Îcar here hetanî ku ez tiştekî bixwim, piştre kûzek mey bide min. Ez çûm cem yekî din. Wî jî got, Xwedê bide te. Heta nîvroyê ez mam di wî halî de û kesî tiştek neda min. Min jî ji xwe re got, xwezî ez nehatima Bexdayê!

Tam di wê kêlîyê de min bala xwe dayê, ku hinek kes di wir re bazdidin, diçin. Min jî da dû wan; ez çûm, min bala xwe dayê, ku qefleyek kesên hemcil (hemkinc) di nava merasîmeke biheybet de, durêzî dimeşin! Min ji yekî ji wan pirsî: Ev mirovên di nava xencer, şûr û mertalan de kî ne? Got: Ev pasevanên sersed Ehmed Denef in.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 711'AN

*Şehrezadê got:*

Meyfiroş vegotina serpêhatîya xwe ji Elîyê Misrî re berdewam kir û got: Dema ku wî got, zilamên Ehmed Denef in, min got: Û rutbeya wî çi ye? Got: Sersedê dîwanê, sersedê Bexdayê, derekên gundan jî bi wî ve girêdayî ne û xelîfe mehmizeke bi qasî hezar dînaran dide wî. Niha jî ji dîwanê ber bi baregeha xwe ve diçin.

Di wê navberê de çavên Ehmed Denef li min ketin û ji min re got: Ka şerbikek mey bide min. Min yek dagirt, dayê. Wî jî şerbik hejand û paşê ri-

jand. Min dîsa jê re dagirt, dîsa rijand. Cara sisiyan dîsa rijand lê cara çaran wî jî mîna te vexwar û ji min re got: Tu ji ku yî? Min jê re got: Ez ji Misirê me. Got: Xwedê te bihêle, emrê te dirêj bike û gelê misirê bisitirîne. Gelo sebebê hatina te ya vir çi ye? Min çîroka xwe jê re got û min pê da zanîn, ku ez deyndar im, ji ber deyndaran revîyame. Wî jî got: Tu bi ser çavan re hatiyî û pênc dînar dan min. Pê re jî ji pasevanên xwe re got: Xêrê pê bikin! Her yekî ji wan dînarek dan min. Piştre got: Hetanî ku tu li Bexdayê bî, em ê ji cem te vexwin û ew qas xêr bi te bikin.

Êdî her car min serî li wan dida û ji her kesî xêr bi min de dibarîyan. Piştî demekê min qezenca xwe jimart, min dît, ku bûye hezar dînar. Min di dilê xwe de ji xwe re got: "Êdî çûna welat maqûltir e!" Ez çûm baregaha wî, min destê wî maçî kir. Got: Tu çi dixwazî? Min got:

mana xerîban li ser her erdê Xwedê
weke mana qesrên avakirî li ser bayê
kengî ba rabe xanîyên wan tên xwarê
loma xerîbê me biryar daye here malê

Û min berdewam kir, got: Karwanek diçe Misirê, ez jî dixwazim pê re herim cem malbata xwe, nava dost û hogirên xwe, lewre min pir bêrîya welatê xwe kiriye. Sed dînar û qantirek da min û got: Dixwazim emanetekî bi te re bişînim Misrê, gelo tu xelkê wê derê nas dikî? Min got: Belê.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 712'AN

*Şehrezadê got:*

Meyfiroş serpêhatîya xwe berdewam kir û ji Elîyê Misrî re got: Gava ku min jê re got belê, wî nameyek da destê min û ji min re got: Vê nameyê bibe bide Elî Zîbeqê Misrî û jê re bibêje, mezinê te silavan li te dike û niha ew li cem xelîfe ye! Min name ji destê wî girt û ez çûm Misrê. Xwedîyên deynan li min kom bûn. Min deynên wan dan wan û dîsa dest bi meyfiroşîyê kir. Lê ji ber ku min biryargeha wî nas nedikir, min nameya Elîyê Misrî negihandê.

Elî jê re got: Xeman nexwe kalocan, ez Elî Zîbeqê Misrî me, zilamê Ehmed Denef ê herî dilsoz im; ka wê nameya wî bide min. Meyfiroş name dayê; Elî name xwend, bala xwe dayê, ku ev çend riste tê de nivîsandî bûn:

nameyekê ji te re dişînim ez ey qencê qencan
li ser kaxezeke reşbelek li ser pêlên bayan
ger ku ne baskokirî bûma ez ê jî bi fir bihatima
li ser baskên bêrîyê bi lez û bez bihatima

Di berdewmîya wê de jî Ehmed Denef digot: Silav li kurê min ê mezin Elîyê Misrî! Ez dixwazim te agahdar bikim, ku min selahê Misrî şopand û dehfik li ber danîn, hetanî ku min ew anî zevtê û ew binax kir. Çeteyên wî jî ketin bin emrê min. Ku di nava wan de çeteyê herî navdar Elî Cemal e. Niha ez ketime dîwana xelîfe û ez bûme sersedê asayîşa bajarê Bexdayê. Derekên gundan jî di bin emrê min de ne. Vêca heger tu hîna li ser a xwe bî, were Bexdayê. Belkî tu roleke xwe li vir bilîzî û bikevî dîwana xelîfe yan jî nêzî wî bibî, da ku mehmizekê bide te û cihekî ji te re veqetîne. Meqseda min ev bû. Silav û rêz.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 713'AN

*Şehrezadê got:*

Elî Zîbeq piştî ku ew name xwend, ew ramûsa, danî ser serê xwe û weke mizgînî jî deh dînar dan meyfiroş. Piştre berê xwe da wargeha xwe. Ciwan û sîpeyên xwe agahdar kirin. Ji wan re got: Ez ji we dixwazim, ku hûn pişta hev bigirin û alîkarîya hev bikin! Hinek dirav û diyarî jî li ser wan belav kirin û rabû ser xwe, kincin pêwîst li xwe kirin, tebûşek (kumekî dirêjik) da serê xwe, hewî pêdivîyên rêwîtîyê dan ser hev û barê xwe girêda. Lê berîya ku bi rê bikeve, alîkarê wî jê re got: Tu diçî û embara me vala bûye? Elîyê Misrî got: Gava ku ez bigihîjim Şamê, ez ê têra we ji we re bişînim.

piştre ket ser rê û berê xwe da şamê. Di rê de kerwanek dît, ku şahbenderê bazirganan jî di nav wan de bû û çil bazirganên din jî pê re bûn, ku barên hemûçkan barkirî bûn, ên şahbender bi tenê hîna li erdê bûn. Wî jî ji çend ciwanên nûhatî re digot: "Werin alîkarîya min bikin." Wan jî sixêf jê re didan û alîkarîya wî nedikirin. Elî di dilê xwe de ji xwe re got: "A baş ew e, ku ez bi serbazirgan re rêwîtîyê bikim." Lewre ew jî nûhatî, lihevhatî bû û hîna mûyek jî bi laşê wî ve tune bû. Çû cem şahbenderê bazirganan, silav lê kir. Wî jî silava wî girt û got: Tu çi dixwazî? Elî got: Apocan ez bala

xwe didimê ku barê te yê çil qantiran e û kesekî ku alîkarîya te bike, tune ye. Çima te kesek bi xwe re neanî? Zilam got: Wele karê min, min du sîpe kirê kirin, cilûberg li wan kirin û her yek ji wan jî sed dînar xist berîka wan, ji bo ku alîkarîya min bikin. Hetanî bi xanê jî bi min re hatin, alîkarîya min kirin lê piştre revîyan çûn. Elî pirsî: Hûn diçin ku derê? Zilam got: Ez diçim Helebê. Elî got: Rêya me yek e, ez ê alîkarîya te bikim! Elî alîkarîya wî kir, barên wî bar kirin û ketin rê

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 714'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku şahbenderê bazirganan bi alîkarîya Elî barên xwe bar kirin û ketin rê, sersedê kerwan pir kêfxweş bû û di dilê xwe de got: "Ciwanekî pir spehî û xweşik e!" Çavên xwe berdanê û ma li benda êvarê, êvarê kerwan sekinî; barên xwe danîn, xwarin, vexwarin û ji bo ku rakevin, paldan. Sersed Elî li kêleka xwe bi cih kir û xwe li xewê danî. Elî bêdeng ji cîyê xwe rabû, çû li ber sîwana şahbenderê bazirganan palda raket. Di wê navberê de sersedê kerwan xwe quliband alîyê din, ji bo ku Elî bigire hembêza xwe lê ew nedît. Di dilê xwe de got: "Dibe ku civana wî bi yekî din re hebe, wî hatibe ew biribe! Lê ew kî be jî, ez ji wî pêşdetir im û divê ez îşev wî himbêz bikim." Lê Elî li ber sîwana şahbender ma, hetanî berê sibehê û piştre hat li cihê xwe yê berê raket. Gava ku sersedê kerwan ji xew rabû û ew li kêleka xwe dît, ji xwe re got: "Heger ez jê bipirsim û bibêjim tu li ku bûyî, wê dev ji min berde û here."

Elî ew wisa xapandin û di wê lîstika xwe de berdewam kir, hetanî ku gihîştin şikefteke di nava daristanekê de û şêrekî ecêb tê de hebû. Çi kerwanê ku di wir re biçûya, pişka xwe davêtin, pişk li kê biketa, ew davêtin ber wî şêrî. Wan jî pişka xwe avêt, pişk hat û li şahbenderê bazirganan ket! Gava ku hatin rastî wê şikeftê jî, bala xwe danê, ku şêr li ser rê ye, rêya wan birîye, li bendê ye, ku yekî ji kerwan bixwe. Şahbender pir tirsîya, xemgîn bû û ji sersedê kerwan re got: Xwedê mala te û vê rêwîtîya ku di bin berpirsîyarîya te de pêk hat, xera bike! Lê êdî wesîyeta min ew e, ku piştî mirina min tu vî malê min bidî kurê min!

Elî Zîbeq pê ve çû û got: Seba vê yekê çi ye?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 715'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku taciran çîroka wî şêrî û rêderbaskirinê jê re gotin, Elîyê Misrî ji wan re got: Çawa û çima hûn ji ber pisîkekî bejî direvin? Wî ji min re bihêlin, ez ê wî bikujim!

Sersedê kerwan çû mesele ji şahbenderê bazirganan re got, wî jî lê vegerand û got: Heger ew wî şêrî bikuje, ez ê hezar dînarî bidim wî!

Elî Zîbeqê Misrî rabû ser xwe, ebayê xwe ji ser xwe avêt, terbûşê xwe danî û bedena xwe ya di nava pola de pêçayî nîşanî gişan da. Zincîreke ji pola hilda destê xwe, bişkoka wê firikand û bi ser şêr de çû. Gava ku li pêşîya wî sekinî û weke tavê bi ser de qîrîya, şêr êrîşî ser wî kir. Lê Elî Zîbeq şûrê xwe li nava çavên wî xist û serê wî kir du perçe. Sersed û şahbender jî lê dinihêrîn. Elî ji sersed re got: Metirse apocan! Wî jî got: Kuro ez ne zarok im, lawo!

Şahbender di cî de pê re rabû, ew himbêz kir û ji nava çavên wî ve ew maçî kir û hezar dînar da wî. Bazirgan û tacirên din jî, her yekî ji wan bîst dînar dan Elî. Wî jî dînarên xwe giş danîn ba şahbenderê bazirganan û wê şevê raketin. Bi sibehê re berê xwe dan Bexdayê. Dema ku gihîştin daristana şêran û dola sehan, rêbirekî bedewî dîtin, ku êlek pê re bû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 716'AN

*Şehrezadê got:*

Çawa ku rêbirê bedewî bi êla xwe ve derket pêşîya wan, her bazirganek bi alîyekî ve revîya, mîna noka ku tu li kevir bidî, her yek bi hêlekê ve pengizî. Şahbenderê bazirganan got: Hey wax, malê min hemû çû! Bi hindikan li kabokên xwe da. Lê hîna ku hawara xwe bi lêv nekiribû, Elî bi şûr û mertalê xwe mîna şêrekî da ser rêbir. Hespekî bedewî xist destê xwe, lê siwar bû, rima xwe jî kişand û ji rêbir re got: Ka ji min re dakeve tirada hespê! Pê re zingilên xwe hejandin, kir çingeçing, kir ku hespê rêbir bicefile û di wê navberê de bi lez derbek li rima wî da, rima wî şikand û derba dîtirkê jî li stûyê wî da, li ber çavên hemûyan serê wî firand. Êla rêbir hemû lê hat hev û bi hêrseke mezin bi ser de hatin. Lê Elî halan xwend û got: "Alahû ekber!" û wek dêwekî bi ser gişan de çû. Hemû ketin panîkê û bi şûn de revîyan. Elî serê rêbirê bedewî di

serê rimê de çikiland û mîna alayekê bilind kir. Hemû bazirganan dirav û diyarî dan wî û piştre rêwîtîya xwe ber bi Bexdayê ve berdewam kirin. Gava ku gihîştin Bexdayê, Elîyê Misrî diravên xwe ji şahbender xwest, wî dayê.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 717'AN

*Şehrezadê got:*

Çawa ku şeva borî jî me got, Elîyê Misrî diravên xwe ji şahbenderê bazirganan xwest, wî jî dayê. Elî çû cem sersedê kerwan. Ew dînarên xwe jî giş dan wî û jê re got: Gava ku tu vegerîyayî Misirê, li baregeha me bipirse û van dînaran bide serdarê çeteyên me û jê re bibêje, Elîyê Misrî ji we re şandiye.

Wê şevê li derveyî Bexdayê raketin. Gava ku bû sibe, derbasî bajêr bûn. Elî li baregeha Ehmed Denef pirsî lê kesî nîşanî wî neda. Wî jî ger û meşa xwe ya nav bajêr dewam kir, heta ku gihîşt qadeke pir mezin, ku zarok lê dileyîstin. Elîyê Misrî di dilê xwe de ji xwe re got: "Agahîya herî rast ji zarokan tê girtin!" Gazî şîranîfiroşekî ku di wir re derbas dibû, kir. Hinek şîranî jê kirî û ji bo ku agahîyekê ji wan bigire, ew zarok bangî ser şîranîyê kirin. Lê ciwanekî bi navê Ehmed Sêwî, pêşîya wan girt, bera gişan da û ew bi tenê çû cem Elî û jê re got: Tu çi dixwazî?

Elîyê Misrî jê re got: Kurikek bi min re hebû, mir. Piştre min ew di xewnê de dît, şîranî ji min dixwest. Îcar min jî hinek şîranî kiriye, ez dixwazim wê li hemû zarokan belav bikim! Bi wê gotina xwe re jî, perçeyek şîranî dirêjî Ehmedê Sêwî kir.

Ehmed rahişt perçeyê şîranîyê, lê mêzand, dît ku dînarek pê ve zeliqandî ye. Bi bertek ji Elî re got: Ji vir here, şermût û xwefiroş li cem min tune ne! Elî got: Hişê xwe bixe serê xwe kurê min, ez tenê kiriya te didim te, ji bo ku tu rê nîşanî min bidî, ne ji bo tiştekî din. Min ev bajar giş li hev xist, ji bo ku yek baregeha Ehmed Denef nîşanî min bide. Kesî nîşanî min neda. Vêca tu mala wî nîşanî min bide û wî dînarî jî weke heqê xwe bigire!

Ehmedê Sêwî got: Temam, nexwe ez ê li pêşîya te bibezim û tu jî li dû min were, kîngê em gihîştin hinda baregeha wî , ez ê buxurkekî bavêjim derîyê wî, tu yê jî nas bikî! Sîpe da pêşîya wî, bazda, wî jî da dû wî û çû heta ku kurik rahişt buxurkekî û li derîyekî da.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 718'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku buxurk li derî da, Elîyê Misrî baregeha Ehmed Denef nas kir û hewl da, ku kurik bigire, ji bo ku wî zêrî jê bistîne lê bi ser neket û mecbûr ma, ku xwe pê re nerm bike. Jê re got: Here bira ew zêr jî xatirê zîrekbûn û jêhatîbûna te be. Xwedê hez ke û ez li cem xelîfe bibim serpasevanek, ez ê te jî bikim pasevanê xwe! Kurik bi rêya xwe de çû, wî jî li derî da.

Ehmed Denefê ku serdarê asayîşa hemû bajêr bû, ji alîkarê xwe re got: Derî veke, ew lêdana Elî Zîbeqê Misrî ye! Alîkarê wî derî vekir. Elî derbasî hundir bû, silav li Ehmed Denef kir, wî jî silava wî girt û bi germahîyeke mezin ew pêşwazî û hembêz kir. Silav li her çil pasevanên wî jî kir, wan jî bi germahî silava wî girtin û ew pêşwazî kirin.

Ehmed Denef kincên nû li Elî kirin û jê re got: Gava ku xelîfe ez kirim sersedê asayîşê û kinc li zilamên min kirin, min ev ji te re hilanî û li cem xwe hişt hetanî roja îro.

Piştre ew di hundirê odeyê de da rûniştandin. Sifreya şîvê raxistin û xwarinên xweş rêz kirin. Hemûçkan xwarin, vexwarin û hetanî sibehê serxweş ketin. Gava ku bû sibeh Ehmed Denef ji Elîyê Misrî re got: Baldar be û qet dernekeve li nava Bexdayê negere, di hundir de rûniştî bimîne.

Elîyê Misrî got: Nexwe ez çima hatim vir? Qey ji bo rûniştinê ez hatime vira? Jixwe ji bo ku ez bigerim û li Bexdayê temaşe bikim, ez hatime. Ehmed Denef got: Biaqil be kurê min û baş bizanibe, ku Bexda ne mîna Misrê ye. Bexda cihê navenda xîlafetê ye. Dek û dolab tê de pir in û fenek û hîlebaz û şêlanker ew qasî tê de pir bûne, mîna kuvarkan li her derê derketine.

Elîyê Misrî sê rojan di hundir de rûniştî ma. Roja çaran Ehmed Denef hat, jê re got: Ji bo ku mehmizekê ji te re girêbide, ez dixwazim te nêzî xelîfe bikim.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 719'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku Ehmed Denef ew teklîf ji Elî re kir, Elî got: Nelezîne û kengî wextê wê bê, tu bikî, dê hîn çêtir be! Ehmed jî wisa kir.

Rojekê ji rojan gava ku dîsa Elî di odeya xwe de rûniştî bû, kul û keder pê re çêbûn û bêhna wî teng bû. Di dilê xwe de ji xwe re got: “Derkeve nava bajêr, ji xwe re li Bexdayê bigere, wê bêhna te fireh bibe!” Rabû ser xwe û derket derve. Li nava kolan û sikakên Bexdayê gerîya, heta ku gihîşt nîvê sûkê. Li wê derê derbasî xwaringehekê bû. Xwarina xwe xwar û ji bo ku destê xwe bişo derket. Bala xwe dayê, ku çil bendeyên bi kurk û eba û polayên ser milan bîste bîst dimeşin û Delîlaya şêlanker jî li ser pişta hespekî li dû wan diçe. Xudeyeke ku bi zêr boyaxkirî bû, li serê wê bû. Hêkeke ji pola û zerdiyeke li gora wê jî pê ve daliqîyayî bû.

Delîla wê kêlîyê ji dîwana xelîfe dihat û berê wê li xanê bû. Lê çawa ku awirên wê Elîyê Misrî ketin, bala wê kişand û bi bejn û bala wî, ew şiband Ehmed Denef. Eyn wek wî ebayekî bi qeseb lê bû. Şerîtên ji pola û kurk jî li ser bûn. Wêrekî û mêranîya wî di çavên wî de dida der û şehdebûn li ser wî didan, ku bê çi mêrxasekî zilaman e!

Delîla çû xanê û bi keça xwe Zeynebê re civîya û jê re got: Ka wî textê remlê bîne! Zeynebê text ji diya xwe re anî, wê jî remla xwe avêt. Navê Elîyê Misrî derket pêşîya wê û pê derxist, ku bextê wî ji yê wê û keça wê vekirîtir e û dê rojek were, ew ê li pêşîya herduyan bixe!

Keça wê jê re got: Dayêcan qey di remla te de tiştek derket? Delîlayê got: Îro min xortek dît, ku dirûvê Ehmed Denef pê diket. Ez ditirsim, ku bibihîze, ku te Ehmed Denef û her çil zilamên wî tazî kiriye, were xanê û dek û dolabekê bi serê me de bîne, ji bo ku tola mezinê xwe û her çil zilamên wî hilîne. Ez texmîn dikim, ku ew li baregeha Ehmed Denef disekine.

Zeynebê got: Ev çi ye dayêcan, wisa xuya dike, ku tu hesabekî jê re dikî! Piştre kincên xwe yên herî xweşik li xwe kirin û derket derve.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 720’Î

*Şehrezadê got:*

Zeyneba dekbaz daket nava Bexdayê û li kolanan gerîya. Kesên ku çav lê diketin jî, çav berdidanê û li dorê digerîyan; wê jî soz dida wan û li soza xwe xwedî dernediket; li wan guhdar dikir û bêdeng dima. Ji sikakekê derbasî yeke din dibû, ji kolanekê diçû kolaneke din û ji sûkekê diçû sûkeke din, hetanî ku rastî Elîyê Misrî hat. Ji qazî ve milê xwe li yê wî xist û li pişt

xwe zivirî, jê re got: Xwedê mirov ji nezerê biparêze! Elî got: Tu çiqasî xweşik î, gelo tu ya kê yî? Zeynebê got: A kundirê mîna te me! Elî pirsî: Tu azib î yan bimêr î? Wê got: Ez bimêr im. Elî jê re got: Li cem min an li cem te? Wê bersiv da û got: Ez keça bazirganekî me. Mêrê min jî bazirgan e û di heyata xwe de ez carekê tenê ji malê derketime, ew jî îro ye. Ji ber ku min xwarin çêkir û dilê min neçûyê, gava ez derketim û min tu dîtî jî, dilê min ket te! Vêca gelo tu yê xatirê min bigirî û tu yê werî gepek nan li cem min bixwî? Elî got: Kesê ku were vexwendin, divê here!

Zeyneb meşîya, wî jî da dû wê, meşîya û ji sikakê derbasî sikakeke din bû. Di meşê de ji xwe re got: "Tu çawa wisa dikî û tu dizanî kesê ku li xerîbîyê zînayê bike, binkeftî vedigere mala xwe. A baş ew bû, ku bi zimanekî xweş wê ji ser xwe bide alî!" Elî jê re got: A ji te re vî dînarî bigire û bila bimîne careke din! Zeynebê got: Bi wî Xwedayê mezin tu neçûyî, heta ku tu neyê mala min û nebî mêvanê min

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 721'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku Zeynebê wisa israr kir, Elî da dû wê û li pey çû, heta ku gihîştin ber malekê, ku derîyê wê bilind bû. Zeynebê jê re got: Derî veke! Elî got: Ka mifteya wî? Zeynebê got: Mifteya wî wenda bûye. Elî got: Kî derîyê malê bê mifte veke, sûc e û li cem qazî cezayekî wî heye û ez jî bê mifte nikarim vekim!

Zeynebê rûpoşa xwe danî, Elî bi hesteke xurt li rûyê wê yê spehî nihêrt. Zeynebê rûpoşa xwe bi ser xilqeyê de kir, navê Mûsa li ser xwend û bê mifte ew vekir! Derbasî hundir bû, ew jî li pey wê çû. Li hundir şûr û çekên ji pola hebûn, bala wî kişandin. Zeynebê rûpoşa xwe avêt û li kêleka wî rûnişt. Elî di dilê xwe de ji xwe re got: "Qedera te çi be li gora wê tevbigere!" û xwe bi ser de tewand, ji bo ku maçekê jê bigire. Keçikê got: Xwe ragire birçî nabe!

Zeynebê çû sifreya xwarinê anî, li ber wî danî. Bi hev re xwarin û vexwarin. Piştre keçik rabû, çû misînê avê ji bîrê dagirt û hat li destê wî kir. Pişitre ji nişka ve bi kulman li singa xwe da û got: Wîîî waweylê! Hungulîskeke mêrê min a ji yaqût hebû, ku kiribû rehîne û pêncsed dînar li ser kişandibû, di destê min de bû, fireh dihat lê min bi momê teng kiribû û gava

ku min dewl berda bîrê, pê re ket! Ji kerema xwe pişta xwe bide min, ji bo ku ez xwe tazî bikim û bikevim bîrê, wê hungulîskê bînim!

Elî got: Ez li vir bim, şerm e, ku tu dakevî bîrê. Bêguman ez ê dakevim bîrê. Kincên xwe ji xwe kirin, werîsek bi nava xwe ve girêda û Zeynebê ew berî bîrê da. Ava bîrê pir bû lê Zeynebê jê re got: Jixwe av hindik e, hema pişta xwe veke, ji bo ku tu rihetir lê bigerî. Wî jî wisa kir û daket nav avê, av bi ser ket. Wê jî rûpoşa xwe avêt ser çavên xwe û rahişt kincên wî û wisa ji wir derket, çû cem diya xwe.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 722'YAN

*Şehrezadê got:*

Zeynebê Elîyê Misrî di bîrê de hişt û çû cem diya xwe, jê re got: Min Elî tazî kir û ew xist bîra mala Emîr Hesen. Ez texmîn nakim, ku karibe xwe jê xelas bike!

Emîr Hesenê ku wê gavê li dîwana Xelîfe bû, çawa ku vegerîya malê, bala xwe dayê ku derîyê mala wî vekirî ye. Ji seyîsê xwe re got: Te çima kilîda derî nexiliqandiye? Seyîs got: Ezbenî wele min bi destê xwe xiliqandibû. Emîr got: Bi serê min dizek ketiye mala min! Derbasî hundir bû, çavên xwe li çep û rastê gerandin, tiştek nedît; pêjna kesî jî nekir. Ji seyîsê xwe re got: Misînê min dagire, ez ê destmêja xwe bigirim! Seyîs rahişt dewlê, bera bîrê da. Lê gava ku dewl kişand. Tê derxist, ku dewl giran e. Xwe bi ser devê bîrê de tewand û li dewla xwe nêrî. Bala xwe dayê, ku tiştek tê de ye. Matmayî û bi tirs dewla xwe berda û qîrîya, got: Ezbenî efrîtek di bîra me de ye!

Emîr Hesen jê re got: Here gazî çar melayan bike, bila werin Quranê li ser bixwînin, da ku efrît ji bîrê derkeve, here! Seyîs çû çar mela anîn. Emîr Hesen ji wan re got: Dora vê bîrê bigirin û Quranê li ser bixwînin, da ku efrît here!

Melayan Qurana xwe xwendin, seyîs û bende jî dîsa dewla xwe berî binî bîrê dan û kişandin. Bala xwe danê ku dewla wan giran tê.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 723'YAN

*Şehrezadê got:*

Seyîs û bendeyê emîr, dewla xwe kişandin. Tu nabêjî Elîyê Misrî xwe tê de veşartiye û ji bo ku vê carê kes wî nebîne, hetanî ku nehat jorê, xwe tevneda. Lê çawa ku gihîşt devê bîrê, ji nişka ve xwe ji dewlê çem kir û ket nava melayan. Ew jî ketin panîkê û bi kulman li hevdu dan, gotin: "Efrît, efrîîît!"

Emîr Hesen bala xwe dayê, ku xortekî insî ye û qet naşibe efrîtan. Jê re got: Qey tu diz î? Çima tu ketiyî bîrê. Elî got: Ez di xew de bûm, şeytan bi min kenîya, min jî xwe avêt Çemê Dîcleyê, ji bo ku ez xwe ji cenabetê tahir bikim lê avê ez bi vir de kişandim û ez di bin erdê re hatim, di vir re derketim!

Emîr Hesen jê re got: Rastîyê bibêje, ji te re çêtir e! Elî çîroka xwe ji serî hetanî binî jê re got. Emîr Hesen jî potikin kevn lê kirin, ew di derî re derxist û berî wî da.

Elî berê xwe da baregeha Ehmed Denef û çû. Hemû tiştên ku bi serê wî de hatibûn, jê re got. Ehmed jê re got: Ma min ji te re negot li Bexdayê keçin xapînok hene, ku henekên xwe bi zilamên herî biaqil dikin? Elî Cemel jî bi ser de çû û got: Tu bi heqê navê Xwedê bikî, ji min re bibêjî, tu çawa serkêşê jêhatîyên Misrê yî û keçeke nûhatî te dixapîne?

Elî Misrî pir poşman û xemgîn bû, ku bi serê xwe tevgerîyabû. Ehmed Denef bedlek kincên nû lê kir. Hesen Şoman jî hat kêlekê jê pirsî û got: Tu wê keçikê nas dikî? Elî got: Na. Hesen Şoman got: Nexwe ev keçik Zeyneba keça Delîlaya dekbaz a nobedara xana xelîfe ye, gelo tu neketibî dehfika wê? Elî got: Belê wele ez ketim xefika wê. Hesen Şoman got: Elîcan vê keçikê kincên mezinê te Ehmed Denef û her çil zilamên wî ji wan kirine. Elî got: Ev şerm û fedî ye ji bo we! Hesen Şoman got: Û meqseda te çi ye, tu dixwazî çi bibêjî? Elî got: Meqseda min ew e, ku ez pê re bizewicim. Hesen got: Ev xewneke ku pêk nayê, dev jê berde!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 724'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku Hesen Şoman wisa got, Elî lê vegerand û got: Nexwe rêyekê nîşanî min bide, ku ez bikaribim pê re bizewicim. Hesen Şoman got: Heger tu avê ji destê min vexwî, bi xêr û ser çavan hatî, tu yê bigihîjî mirazê xwe. Elî got: Min qebûl e, ez ê di rêya te de bim. Hesen Şoman got: Nexwe ka rabe,

kincên xwe ji ser xwe bike! Elî kincên xwe di ser xwe re anîn. Hesen Şoman jî beroşek danî ser agir û tiştek tê de keland, ku mîna ziftê bû. Piştre ew zift di laşê wî da, hetanî ku bû mîna zencîyan. Dohnek di rûyê wî da û firikand. çavên wî jî bi kilekî sor kil dan û kincên xizmetkaran lê kirin, sifreyeke servîskirina meyê û yeke kebaban jî jê re anî û got: Di xana Delîla û keça wê de bendeyekî aşpêj heye. Tu niha şibîyayî wî; tenê goşt û sewze ji te kêm maye. Îcar bi xweşkahî here cem wî aşpêjî, silavê lê bike û jê re bibêje; demeke dirêj e, ku em bi hev re neçûne xwarina bûzayê, ew ê jî bibêje, ez meşxûl im, firavîna çil bendeyî, şîva wan, xwarindana kûçikan, xwarina Delîlayê, xwarina keça wê Zeynebê hemû di stûyê min de ne, ez nikarim xwe tevbidim. Tu jî jê re bibêje, were em bi hev re kebaban bixwîn û meyê vexwin. Piştre bikeve hêwanê, pê re vexwe, wî serxweş bike û jê bipirse, bê ka çend cure xwarinan çêdike, çi dide kûçikan, xwarineke çawa ji Delîla û keça wê re çêdike, cihê mifteya çavîkan li ku ye. Ji ber ku serxweş e, ew ê bersiva gişan bide te. Piştre wî benc bike, kincên wî di ser re bîne û li xwe bike, kêran jî bike ber xwe, selika sewzeyan hilde û here sûkê, goşt û sewzeyan bikire û vegere, bikeve metbexê, xwarinê çêke û rahêjê, here, derbasî cem Delîlayê bibe. Ji bîr neke, ku tu bencê bixî xwarinan gişan. Piştî ku tu hemûçkan benc bikî, kincên gişan ji wan bike û bîne. Heger tu dixwazî bi Zeynebê re bizewicî jî, em dikarin çil teyrên ku nameyan hildigirin, bi te re bişînin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 725'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku Hesen Şoman şîreta dawîn lê kir û pê de, Elîyê Misrî ket rê û çû, dît ku bendeyê aşpêj li wir e. Silav lê kir û jê re got: Ji zû ve em bi hev re neçûne xwarina bûzayê. Aşpêj got: Ez bi xwarina bende û kûçikan re pir meşxûl im! Elî ew bir hêwanê, pê re xwar û vexwar, heta ku ji ser hişê xwe çû û serxweş ket. Cureyên xwarinên ku çêdike, jê pirsîn, wî jî got. Her roj ez pênc cure xwarinan çêdikim. Duh cureyekî şeşan ji min xwestin û jê re dibêjin, "zerde" û cureyê heftan jî ku jê re dibêjin, "heba hinarê". Elî jê re got: Û li gora kîjan rêzê tu xwarinê ji wan re dibî? Aşpêj got: Destpêkê ez xwarina Zeynebê jê re dibim, piştre ya diya wê û piştre ya her çil bendeyî û herî dawîyê jî ya kûçikan ji wan re dibim. Ez her yekî ji wan, têra wan goşt ji wan re dibim. Jixwe bi kêmanî serê yekî ritilek diçe.

Elîyê Misrî derbarê mîqdar, çawanî û şiklê amûr û xwarinan de gelek pirsên din jî jê kirin û bersiv jê girtin. Piştre ew benc kir, kincên wî di ser re anîn, li xwe kirin û rahişt selikê, berê xwe da sûkê, ji bo ku goşt û sewzwyan bikire.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 726'AN

*Şehrezadê got:*

Elîyê Misrî çawa ku aşpêj benc kir, rahişt kêrên wî, ew xistin ber kemera xwe û rahişt selikê, berê xwe da sûkê; têra pêdivîyan goşt û sewze kirîn û vegerîya xanê. Dît ku Delîla hundir û derve raçav dike û her çil bendeyên çekdar jî li wê derê ne! Nav di xwe da û hewl da, ku ji nava xwe bera tirsê bide. Lê çawa ku çavên Delîlayê lê ketin, ew nas kir û jê re got: Bi şûn de here ey serokê dizan, qey tu dixwazî di vê xanê de hîleyan li min bikî! Elîyê Misrî yê ku xwe xistibû sûretê zencîyan, li Delîlayê zivirî û jê re got: Tu çi dibêjî serdergevana me? Delîlayê got: Te bi wî bendeyê aşpêj çi kir û te ew bi ku ve şand? Elî got: Qey ji min pê ve kesî din aşpêj heye? Delîla bi ser de çû û got: Nexwe tu derewan li min dikî Elî Zîbeqê Misrî! Elî xwe li nezaîyê danî û bi zimanê bendeyan got: Misrî spî ne an reş in, ez nema xizmetê dikim!

Bendeyekî bi navê Malik jê re got: Çima çi qewimîye pismamo? Delîla li wan zivirî û got: Ev ne pismamê we ye, ev Elî Zîbeqê Misrî ye û wisa xuya dike, ku wî kurapê we benc kiriye yan jî kuştiye! Bendeyan gişan gotin: Ev pismamê me Sadelayê aşpêj e. Delîla got: Ev ne pismamê we ye, ev Elîyê Misrî ye û çermê xwe boyax kiriye! Elî got: Elî kî ye, ez Sadela me! Delîlayê got: Donê ceribandinê li cem min heye û çû dohn anî di zenda wî da û firikand lê rengê reş jê neçû: Bendeyan gotin: Wî berde, bila here ji me re xwarinê çêbike.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 727'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku bendeyan wisa gotin, Delîlayê li wan vegerand û got: Heger bi rastî jî pismamê we be, gerek bizanibe, bê we duh çi jê xwestibû û divê

bizanibe, bê rojê çend cure xwarin ji we re çêdike? Bendeyan ew pirs jê kir, Elî got: Nîsk, birinc, şorbeya yexnî, ava gulan û liba hinarê. Êvarê jî heman xwarin. Bendeyan gotin: Rast got. Delîlayê got: Pê re herin, heger metbex û çavîkên mûnê nas bike, ew pismamê we ye! Heger nas nekir, wî bikujin.

Vêca tu nabêjî aşpêj di hundir de pisîkek kedî kiriye û her ku ew bixwaze derbasî metbexê bibe, pisîk di devê derîyê metbexê de disekine û çawa ku ew tê, xwe davêje ser milê wî. Vêca Elî çawa ber bi metbexê ve çû, wê pisîkê xwe avêt ser milê wî. Elî jî pisîk danî erdê, pisîk li pêşîya wî meşîya û çû di devê derîyê metbexê de sekinî. Elî çû, rahişt mifteyan, bala xwe dayê, ku sûretê perîyekî li ser yekê ji wan e. Nas kir, ku ew mifteya metbexê ye. Bi wê derî vekir û derbasî hundir bû û selika xwe li wir danî. Pisîk li pêşîya wî meşîya, wî jî da dû, heta ku gihîşt ber çavîkên mûnê. Li koma mifteyan nêrî, dît ku yek ji wan bidohn e, nas kir, ku ew mifteya çavîkên mûnê ye, pê derî vekir. Bendeyan ji Delîlayê re got: Heger yekî xerîb bûya, metbex û çavîkên mûnê nas nedikirin, mifteyên wan jî nas nedikirin. Ev pismamê me Sadela ye!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 728'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku bendeyan wisa gotin, Delîlayê got: Ne wisa ye û ev fêlbaz we dixapîne. Rêya metbexê bi pisîkê nas kir û mifte jî bi rûbirûkirinê ji hev derxistin û ew tişt ji ber çavên min nafilitin!

Elî xwarina xwe amade kir û beşek jê bir ji zeynebê re. Gava ku derbasî cem wê bû, hemû kinc di mala wê de dîtin. Piştre daket jêrê û vegerîya metbexê û beşeke din ji xwarinê bir ji Delîlayê re. Di pey re xwarina bendeyan jî ji wan re bir. Di pey re xwarina kûçikan jî da ber wan. Di pey re gava ku êvar hat, şîv jî bi heman awayî da gişan û benc xist nav xwarina gişan. Lê ya kûçikan jehr xist nav xwarina wan û ew kuştin. Piştre derket jorê. Çû hemû kincên di mala Zeynebê de derxistin. Kevokên ku name hildidan jî bi xwe re birin. Derîyê xanê jî vekirî hişt û derket çû baregeha Ehmed Denef, cem Hesen Şoman. Çawa ku Hesen ew dît, jê re got: Te çi kir? Elîyê Misrî çi kiribû, ji serî hetanî binî jê re rêz kir. Hesen Şoman spasîya wî kir, piştre kincên wî jê kirin, gihayek keland û ew pê şûşt, ji wê reşahîyê paqij kir, vegerîya Elîyê berê.

Piştre Elî dîsa vegerîya xanê, çû cem bendeyê aşpêj, kincên wî lê kirin û ew şiyar kir, ji bin bandora bencê derxist û vegerîya baregeha xwe. Aşpêj jî çû sûkê, goşt û sewze kirî û vegerîya xanê.

Em Elî Zîbeq li wir bihêlin û em vegerin ser rewşa Delîla û Zeynebê…

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 729'AN

*Şehrezadê got:*

Roja dîtirkê bi şeveqê re, gava bazirganekî ku cîranê Delîlayê bû, ji mala xwe derket û berê xwe da cem wê, bala xwe dayê, ku derîyê xanê vekirî ye. Derbasî hundir bû, dît ku kûçik mirî ne û her çil bendeyên wê benckirî ne, derbasî odeya Delîlayê bû. Dît ku ew jî benckirî ye û kaxezek di stûyê wê de ye. Dijbencek li ber serê wê hebû, rahişt wê dijbencê û da ber pozê wê. Delîla bi ser hişê xwe ve hat, çavên xwe vekirin, got: Ez li ku me? Tacir got: Ez hatim, min dît, ku derîyê xanê vekirî ye, hûn hemû benckirî ne û kûçik mirî ne.

Delîlayê rahişt wî kaxizê di stûyê xwe de û xwend, piştre jî got: Ê ku ev kar kiriye, bêguman Elîyê Misrî ye! Piştre rabû ser xwe, dijbenc da ber pozê Zeynebê û her çil bendeyên xwe, hemû ji xewê şiyar kirin û ji keça xwe re got: Min ji te re negot, dê Elîyê Misrî heyfa mezinê xwe Ehmed Denef ji me hilîne? Li bendeyan zivirî û axaftina xwe berdewam kir, got: Min ji we re negot, ku ew ne pismamê we Sadela ye, Elîyê Misrî ye? Vê mijarê veşarî bihêlin û ji kesî re behsa wê nekin! Di pey re jî li Zeynebê zivirî û got: Min deh carî ji te re got, wê Elîyê Misrî heyfa xwe ji te hilîne. Heger te lê wisa nekiribûya, belkî wî jî ev tişt neanîya serê me! A rast wî dikaribû tiştin xerabtir jî bianîyana serê me lê Xwedê jê razî be, ew tenê kir. Belkî dixwaze, ku hezkirinek di neqerba me de hebe, loma wisa tevgerîyabe.

Delîla rabû ser xwe, kincên jinan li xwe kirin, desmalek li dora stûyê xwe gerand û berê xwe da baregeha Ehmed Denef. Îcar di wê navberê de tu nabêjî gava ku Elîyê Misrî jî li gel wan kincan û her çil kevokên namebir derbasî baregehê bûbû, Hesen Şoman heqê wan çil kevokan dabû wî û hemû serjêkiribûn, dabûn biraştin û dabû pêşîya zilamên xwe. Hîna ku ew di ser xwarinê de bûn, dengê lêdana derî hat. Ehmed Denef got: Ev lêdana hanê lêdana Delîlayê ye, ka rabin derî vekin! Derî vekirin, Delîla derbasî hundir bû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 730'Î

*Şehrezadê got:*

Çawa ku Delîla derbasî hundir bû, Hesen Şoman jê re got: Çi kir ku tu werî vira, ey pîrheboka bêyom? Ma ne tu û birayê xwe Zîreqê masîvan bûbûn yek?

Delîlayê got: Tu mafdar î, serkêşê hêja, ez gunehkar im û stûyê min li ber şûrê te ye. Lê belê ez dixwazim, fêr bibim, bê ew ciwanê ku ev dek û dolab bi serê me de anî, kî ye?

Ehmed Denef got: Ew ciwanekî min ê serkêş e.

Delîlayê got: Tu bi qedrê Xwedê bikî, jê re bibêje, bila kevoka min a namebir bide min û bila ew qencîya te jî li min bi deyn be!

Hesen Şoman got: Elîyo lawo Xwedê cezayê xwe bide te! Çima te ew kevok biraştin? Elî got: Min nizanibû, ku ew kevok ên nameşandinê ne! Ehmed Denef got: Serpasevanê hêja, kanî pehra wê jê re bîne. Hesen Şoman perçeyek ji wî goştê kevokan ê biraştî dayê. Delîlayê perçeyê goşt avêt devê xwe, cût û got: Ev ne goştê kevoka namebir e, ez goştê wê nas dikim, bêhna miskê jê tê.

Hesen Şoman lê vegerand û got: Heger tu bixwazî wê kevokê bi şûn de bigirî, daxwaza Elîyê Misrî pêk bîne! Delîlayê got: Çi daxwaz e? Hesen got: Wî bi keça xwe re bide zewicandin. Delîlayê got: Ez ê jî vê yekê bixwazim.

Hesen Şoman ji Elî re got: Nexwe rabe, kevoka wê bide wê. Elî rabû, kevoka wê dayê. Delîlayê çawa ku kevoka xwe hilda himbêza xwe, rûyê wê geş bû, çawa ku jîyana wê lê vegerîyabe. Hesen Şoman jê re got: De ka êdî bersiveke zelaltir bide me.

Delîlayê got: Heger ku dixwaze bi keça min re bizewice, divê tiştekî zîrektir bike û di azmûneke zortir re derbas bibe, lewre ew tiştê ku bi serê min de anî, zîrekî tê de tune bû. Jêhatîbûna rasteqîn ew e, ku here Zeynebê ji xalê wê Zerîq bixwaze, lewre ew wekîlê wê ye û her roj gazî dike, dibêje: "Ritilek masî bi du derheman!" û tûrikekî ku du hezar dînar tê de hene, bi dikana xwe ve daliqandiye, ji bo ku mîna xelat bide kesê serketî.

Bi wê gotina wê re hemû rabûn ser xwe û gotin: Ev çi gotin e, çermût!?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 731’AN

*Şehrezadê got:*

Li hemberî wê gotina Delîlayê, gişan bi hev re gotin: Ev çi gotin e, çermûta pîrebok, qey tu dixwazî birayê me Elîyê Misrî bidî kuştin?

Delîla rabû ser xwe û vegerîya xanê, cem keça xwe Zeynebê û jê re got: Elîyê Misrî tu ji min xwestî! Keçik bi wê agahîyê pir kêfxweş bû, lewre ji Elî hez dikir. Piştre pirsî û got: Çawa çêbû? Diya wê mesele jê re vegot û pê de çû: Lê min şertek avêt ber wî, ku here te ji xalê te Zîrêq bixwaze û bi wî hawayî min berê wî da talûkeyê!

Îcar em vegerin ser Elîyê Misrî; Wî jî ji derdora xwe pirsî û got: Ev Zîrêq kî ye û çi dike? Wan jî got: Ew serokê ciwanên Îraqê gişî bû, ku hindik mabû destê xwe bavêje stêrkan, serê çiyayan bigire dest û kil ji çavan derxîne! Tu kes mîna wî zîrek, jêhatî û fenekar tune ye lê belê niha dev ji wî karî berdaye û tobe kiriye. Ji xwe re dikaneke biçûk vekiriye û masîvanîyê dike. Du hezar dînar ji masîvantîyê kom kiriye, xistiye tûrikekî û li hundirê dikana xwe ew bi darekî ve daliqandiye û zengilin pê ve girêdane, bi awayekî ku her derî vebibe, zengil lêbidin û her car bang dike û dibêje. Ka hûn li ku ne ey hemû zîrek, jêhatî, fenekar û dolabgerên Misir û Îraqê, ey xezalên Ecemistanê werin bibin! Zîrêqê masîvan tûrikekî zêran bi dikana xwe ve daliqandiye û gazî we jêhatîyan dike, kî ji we dikare vî tûrikî bibe, bila ew tûrik ji wî re be!

Helbet tamahkar jî pir in û xort diçin ku wî tûrikê zêran bidizin lê tu kes nikare. Ji ber ku wî du nanên risasî xistin bin herdu lingên xwe û her dem wan diqelîne, agir di bin wan de dike. Vêca gava ku tamahkarek diçe, ku wî tûrikî bîne, nanekî risasî yê ji wan herdu nanan, li ser çavên wî dide, wî dikuje. Îcar Xwedê neke, tu jî bikevî tora wî, felata te ji destê wî tune ye! Tu nikarî pê re bikevî pêşbaziyê û tu pêdivîya te pê tune ye, ku tu bi Zeynebê re bizewicî. Însanê ku dev ji tiştekî berde, bêyî wî jî dijî.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 732’YAN

*Şehrezadê got:*

Hesen Şoman û hemû kesên pê re şîret li Elî kirin, ji bo ku dev ji zewaca bi Zeynebê re berde. Lê wî got: Sosret e, ku hûn tiştekî wisa ji min dixwa-

zin. Bi her sê navên Xwedê, wê sekn û hedan li min tune be, heta ku ez neçim wî tûrikê zêran ji dikana Zîrêq nedizim! Kanê hela ji min re kincên keçekê bînin! Çûn jê re kincên keçekê anîn, wî jî rabû ew li xwe kirin û di meşê de xwe mîna qazan lewliband, rûpoşek jî avêt ser çavên xwe û ket dirûvê keçeke ciwan. Berxikek jî serjê kir, xwîna wî hilda cem xwe, rovîyên wî derxistin, paqij kirin û ew tijî xwîn kirin, li ser rahnê xwe girêdan û kincên xwe bi ser de berdan. Ji berkurka çûkan jî ji xwe re du pêsîr çêkirin û ew bi şîr dagirtin, li ser singa xwe girêdan û pembû xist navbera wan û laşê xwe. Fotoyeke qalind jî li ser zikê xwe girêda û êdî kesê ku lê binihêrîya, dê bigota jineke ducanî ye. Berê xwe da sûkê. Bi rê de li barkêşekî xwedîyê kerê rast hat, dînarek dayê û li kera wî siwar bû û berê xwe da dikana Zîrêq.

Zîrêq di dikanê de masî diqelandin. Gava ku gihîştin nêzî wî, tûrikê zêran ê bi dikanê ve daliqandî jî ji Elî ve xuya kir. Ji barkêş re got: Ev çi bêhn e? Barkêş got: Bêhna masîyên Zîrêq e. Elî got: Ez jineke ducanî me û bêhna masîyan min aciz dike, here ji min re masîyekî biraştî bîne!

Barkêş çû cem Zîrêq û jê re got: Êdî bêhna dikana te bi ser jinên ducanî ve jî diçe…

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 733'YAN

*Şehrezadê got:*

Barkêş ji Zîrêq re got: Behna masîyên te êdî bi ser jinên ducanî ve difûre û bala wan dikişîne! Jina Hesenê Rêxerab bi min re ye û ducanî ye. Pitika wê xwe di zikê wê livandiye. Kanî masîyekî biraştî bide min, ez jê re bibim, ji bo ku liva pitika wê bisekine.

Zîrêq got: Ya star! Xwedê me ji vê roja hanê bistirîne! Piştre rahişt masîyekî, ji bo ku jê re bibirêje lê agirê wî vemirî. Ew jî rabû ser xwe çû, ku dîsa agirê xwe pêxe. Di wê navberê de Elîyê Misrî jî li ser pişta kerê bû û lê dinêrî. Hêla xwe da ser rovîyên tijî xwîn û ew peqandin. Xwîn ji nav şeqên wî hat xwarê û bû qajeqaja wî, got: Ax pitikê min çû! Ax pişta min!

Barkêş çawa lê zivirî, dît ku xwîn ji nav şeqên wî tê, got: Xêr e, çi bi te hatiye, xatûna min? Elîyê ku di qilixê jina ciwan de bû, got: Pitikê min ji ber min çû! Zîrêq jî hat, lê nihêrî, dît ku xwîn jê diherike, bi tirs revîya, bi şûn de çû dikana xwe. Barkêş hêrs bû, bi ser Zîrêq de çû û got: Xwedê belaya

xwe bide te, Zîrêq! Berê jinika ciwan ji ber çûye û tu ketiyî derdê dikana xwe. Lê baş bizanibe, ku tu bi mêrê wê re naçî serî! Te çima bêhna masîyan fûrand û te perçeyek goştê masîyan neda min, ku ez bidim wê û nava dilê wê bidime sekinandin. Piştre Jinik li wir hişt û kerê xwe bir û çû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 734'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku barkêş kerê xwe bir, ji wir çû û Zîrêq jî ket hundirê dikanê, xwe tê de veşart. Elî rabû ser xwe û destê xwe avêt tûrikê zêran lê di cî de xuşexuş bi zêran ket, çingeçing bi zengilan ket û Zîrêq bi şûn de vegerîya, ji Elî re got: Hîlebazê feneker, tu dixwazî dek û dolaban li serê min bigerînî, ha! Te xwe xistiye şiklê jinekê lê va ye rastîya te derket holê! Pê re jî rahişt nanikê risasê, pê ket lêda. Lê Elî xwe ji ber da alî û derba wî vala çû. Destê xwe avêt risaseke din, ji bo ku tê werbike lê mirovên ku li wan deran kom bûbûn, ketin navberê û jê re gotin: Ya wî tûrikê dînaran ji wir daxîne û me ji vê belaya xwe rizgar bike û ya jî ji vir here! Zîrêq got, daxwaza we li ser serê min, li ser çavên min e, ez ê tûrik daxînim.

Mirov ji hev belav bûn. Elîyê Misrî jî vegerîya baregeha Ehmed Denef. Hesen Şoman jê re got: Ka te çi kir, çi nekir? Tiştê ku bi serê wî de hatibû, jê re got. Piştre kincên jinan ji xwe kirin û ji Hesen Şoman re got: Kanî kincên seyîsekî ji min re bînin!

Jê re anîn wî jî li xwe kirin, rahişt sênîyekê û pênc derheman û berê xwe da dikana Zîrêqê masîvan. Çawa ku gihîşt wir, Zîrêq jê re got: Tu çi dixwazî hoste? Elî derhemên di destê xwe de nîşanî wî dan. Zîrêq xwest ku ji masîyên ser tepsîyê bide wî lê Elî got: Ne masîyê nûqelandî be, ez nabim! Zîrêq masîyekî nû danî ser agir lê agir vemirî. Çû ku agir pêxe. Elî fersend dît û destê xwe avêt tûrikê dînaran lê dîsa xişexiş bi wan ket û çingeçing bi zengilan ket. Zîrêq di cî de pê hesîya û got: Lîstika te ji serî de diyar bû, lew ku tu di sûretê seyîs de jî hatî, ji destavêtina te ya sênîkê û derheman, min tu nas kirî!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 735'AN

*Şehrezadê got:*

Piştî ku Zîrêq bi ser Elî de qîrîya, destê xwe avêt sênîya risasê û tê werkir. Lê sênîyê hedefa xwe negirt û çû li sifreya tijî goştê nûbiraştî ket, ew şikand. Goştê tê de jî tevlî rûnê xwe, bi ser milê qadî de hat xwarê –ku wê kêlîyê li wir bû- û hinek ji wî goştî jî ket berîka wî û germahîya goşt li hêtên wî da, qîrîya û got: Ax kêlekên min! Tu çiqasî bêhawe yî, qurmiçîyo! Kê ev tişt bi serê min de anî? Mirovên derdorê gotin: Ezbenî vî sêwîyê hanê kevirek avêt, li sênîya goşt ket, goşt pekîya. Qey ew jî qedera Xwedê bû!

Lê piştî ku lê zivirîn û dîtin, ku sênîka risasê li goşt ketiye, gotin: Wele yê ku ev bûyer kiriye, Zîrêqê masîvan e. Û bi ser de ranbûn jê re gotin: Ev kar e, ku tu dikî Zîrêq, êdî wî tûrikê zêran ji wir daxîne û vê belayê ji stûyê me derxîne! Zîrêq got: Înşelah ez ê wî daxînim.

Di nava wê qirecirê de Elîyê Misrî jî fersenda revê dît, xwe bi xelasê xist û vegerîya baregeha Ehmed Denef. Çawa ku derbasî hundir bû, hevalên wî jê re gotin: Kanî tûrikê dînaran? Elî, tiştê ku qewimîbû, ji wan re vegot. Wan jî got: Te ji sisiyan duduyê zîrekî û jêhatîbûna xwe wenda kir!

Elîyê Misrî cilên seyîsîyê ji ser xwe avêtin û kincên bazirganekî li xwe kirin. Derket, çû, bi rê de li lîstikvanekî maran rast hat, ku tûrekî maran û boxçikeke eşyayan pê re bû. Elî jê re got: Tu bi Xwedê kî, tu werî mala min û van marên xwe nîşanî zarokên min bidî, bide lîstin û heqê xwe bigire!

Zilam rahişt tûrikê xwe yê maran û pê re çû. Elî ew bir baregehê û li wir ew benc kir, kincên wî di ser re anîn, li xwe kirin û çû cem Zîrêqê masîvan. Gava ku gihîşt ber dikana wî, li pîpîkê da. Zîrêq jê re got: Ji vir here Xwedê rizqekî bide te! Lê Elî di cî de marên di tûr de derxistin û avêtin ber wî. Zîrêqê ku ji maran ditirsîya, di cî de bi şûn de revîya. Elî jî mar kom kirin, ew xistin tûr û destê xwe dirêjî tûrikê dînaran kir. Lê çawa ku tûrik hejîya, xuşexuş bi dînaran û çingeçing bi zengilan ketk. Zîrêq di cî de pê hesîya û got: Hîna jî tu dixwazî dek û dolaban li serê min bigerînî û te çûye xwe kiriye lîstikvanê maran! Pê re jî destê xwe avêt nanika risasî û tê werkir. Wê gavê leşker û seyîsek di wir re derbas dibûn. Risas jî çû li serê seyîs ket û ew li erdê dirêj kir.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 736'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku leşker dît, ku seyîsê wî li erdê ket, ji kesên dora xwe pirsî, got: Kê lê da? Wan jî got: Wisa xuya dike, ku ji ban de kevirek bi ser wî de ket. Lê gava ku hemû lê hatin hev û çûn ser wî, dîtin ku ew nanika risasê lêketiye. Tê derxistin, ku Zîrêq lê daye. Hemû bi ser ve rabûn û gotin: Wî tûrikê dînaran ji wir daxîne! Zîrêq li wan vegerand û got: Înşelah ez ê îşev ji wir daxînim.

Elî wisa berdewam kir û heft hîle û lîstikên din jî li Zîrêq kirin. Lê dîsa jî nikaribû wî tûrikê dînaran ji wir bibe. Çû kincêb sêrbazê xwedîyê maran dayê û hinek dirav jî danê û vegerîya dikana Zîrêq, bi dizî li wî guhdar kir, bala xwe dayê, ku Zîrêq dibêje: Heger ez tûrik li vir bihêlim, dê were dizîn, a baş ew e, ku ez wî bi xwe re bibim malê.

Di peyre Zîrêq rabû ser xwe, tûrikê dînaran ji wir daxist, ew xist paşila xwe û berê xwe da malê. Elî jî ket pey wî û ew şopand. Li nêzî mala xwe, Zîrêq bala xwe dayê, ku di mala cîranê wî de dawetek li dar ketiye. Di dilê xwe de ji xwe re got: "A baş ew e, ku ez herim malê, tûrikê xwe yê zêran deynim cem jina xwe, kincên xwe biguherînim û piştre werim dawetê!" Zîrêq bi qerwaşeke reşik a ji qerwaşên wezîrê Harûn Reşîd, Caferê Bermekî re zewicîbû û kurekî wî jî jê çêbûbû, navê wî kiribû Abdulah û her carê soz dida jina xwe û digot, ez ê vî kurikî bi van dînarên di tûrik de hem sinet bikim û hem jî bizewicînim.

Zîrêq bi mirûzekî tehl derbasî mala xwe bû. Jina wî jê re got: Xêr e, çima tu wisa bêmirûz û mehdedayî yî? Zîrêq got: Hîlebaz û şêlankerek li serê min bûye bela û ew bû heft car ku dek û dolaban li serê min digerîne, ji bo ku wî tûrikê dînaran bibe. Lê hîna jî bi ser neketiye. Jinikê got: Ka bide min, bila li cem min be. Ez ê wî veşêrim, heta ku em daweta kurê xwe pê bikin. Zîrêq tûrik ji paşila xwe derxist û da jina xwe.

Elîyê ku bi dizîka ketibû hundir, xwe li goşeyekî veşartibû û bi dizî li wan temaşe dikir û li wan guhdar dikir.

Zîrêq kincên xwe guhertin, ji jina xwe re got: Diya Abdulah, li wî tûrikê dînaran miqate be, va ez jî diçim dawetê! Jina wî got: Ji xwe re saetekê rakeve, hinekî bêhna xwe vede, piştre here!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 737'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku jina wî wisa got, Zîrêq palda û di xew re çû. Elîyê dekbaz jî bi dizî û li ser serê tilîyan meşîya, xwe gihand tûrikê dînaran; rahiştê û bi lez ji hundir derket, çû mala ku dawet lê bû û li şahîyê temaşe kir.

Zîrêq jî di xewna xwe de dît, ku teyrek tûrikê wî yê dînaran dibe. Bi tirs ji xewê veciniqî û gazî jina xwe kir, got: Dayîka Abdulah, zû rabe li tûrik binihêre, bê di cihê xwe de ye yan na? Jinik rabû ser xwe, lê nihêrî ku tûrik ne di cihê xwe de ye! Bi kulman li rûyê xwe da û qîrîya, got: Li min rûreşê! Xwedê tu dayîka Abdulah bistirînî! Kuro mêro wele wî sêrbazî tûrik biriye! Zîrêq got: Heye tune ye, ew bênamûsê Elî ye. Ji wî pê ve tu kes nikare wî tûrikî ji mala min bidize, di demekê de ku ez jî di malê de me! Lê ez ê herim, tûrikê xwe jê bistînim. Jina wî jê re got: Misoger, divê ku tu tûrikê dînaran jê bistînî, nexwe ez derîyê malê ji te re venakim!

Zîrêq çû mala ku dawet lê bû û Elîyê hîlebaz li wir dît. Di dilê xwe de got: "Wê niha here baregeha Ehmed Denef." Û rabû ser xwe, berê xwe da wargeha Ehmed Denef. Berîya wî xwe gihand wir. Çû ser ban û di wir re xwe berda hundir; bala xwe dayê, ku hemû di xew de ne. Di heman demê de dît, ku Elî jî tê wê derê. Çû li ber derî sekinî, ji hundir ve xwe li benda wî ragirt. Gava ku Elî li derî da, Zîrêq ji pişt derî ve gazî wî kir û got: Kî li derî dide? Wî got: Elîyê Misrî. Zîrêq got: Te tûrik anî?

Ji Elî we rê ku Hesen Şoman e, wisa jê dipirse, lê vegerand û got: Min tûrik anîye, ka derî ji min re veke. Zîrêq got: Heta ku ez tûrik nebînim, ez derî ji te re venakim. Lewre min û mezinê te Ehmed Denef, me bi hev re sond xwariye û me bi hev re şert girtiye. Elî got: Nexwe ka destê xwe di bin derî re dirêj bike. Gava ku destê xwe di bin derî re dirêj kir, Elî tûrikê dînaran da destê wî. Wî jî tûrik bir û cihê ku tê re ketibû hundir, di heman cihî re jî derket, çû wê mala ku dawet lê bû û bi dilekî rihet li şahîyê temaşe kir.

Elî jî gava ku dît, derî venabe, bêhna wî teng bû, bi şid li derî da, hemû kesên di hundir de şiyar bûn, pê derxistin, ku Elîyê Misrî ye. Hesen Şoman jê re derî vekir û got: Ka te tûrik anî? Elî hêrs bû û got: Bes henekan bi min bike, ma min di bin derî re neda te!? Hesen got: Welehî min negirtiye û wisa xuya dike, ku Zîrêqê masîvan biriye. Elî got: Wî biribe jî ew ji ber destên min xelas nabe. Ez diçim, ku tûrik bînim.

Elîyê Misrî bi şûn de çû cihê dawetê, bala xwe dayê, ku yê defvan qîr dike û dibêje, şabaş ji bavê Abdulah re! Aqûbeta wê li serê kurê te be! Elî ji xwe re got: Aqûbet li serê min e!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 738'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku Elî Zîrêq li cihê dawetê dît, bi kêf çû mala wî û di ser banê malê re xwe berî hundir da, dît ku jina wî raketiye. Ew benc kir û kincên wê di ser re anîn, ew li xwe kirin û kurikê wê xist odeya wê û li wan deran gerîya, selikeke ku kulîçeyên eydê tê de bûn, dît. Di dilê xwe de got: "Çi mirovekî çikûs e!"

Di wê navberê de Zîrêq jî vegerîya malê û li derî da. Elî bi hawayê jina wî kir û got: Kî li ber derî ye? Wî got: Ez im, bavê Abdulah! Elî got: Tu dizanî min sond xwaribû, ez derî ji te re venakim, hetanî ku tu tûrikê dînaran neyînî! Zîrêq got: Min ew anîye. Elî got: Ka ez bibînim, piştre ez ê derî vekim. Got, ka di jêra derî re bigire! Elî di jêra derî re destê xwe avêt tûrik, ew girt, bir û çû kurê wî benc kir, jinik ji bencê şiyar kir û di rêya ku tê re hatibû re çû. Berê xwe da baregeha Ehmed Denef. Kurik û selika kulîçeyan jî bi xwe re bir.

Elî gihîşt wir, derî jê re vekirin, tûrik nîşanî wan da; hemû pê kêfxweş bûn û spasîya wî kirin. Wî jî kulîçe dan wan û ji Hesen Şoman re got: Ew kurik lawê Zîrêq e, wî li cem xwe veşêre! Kurik birin veşartin û berxek serjê kirin, goştê wî pijandin, piştre jî ew pêçan û kirin mîna meytekî, danîn wê derê.

Zîrêq jî li ber derî aciz bû û bi bêhntengî li derî da. Jina wî pê ve rabû û ji pişt derî got: Te tûrik anî? Ne min gava din ew di bin derî re da te? Jinikê got, min tiştek ji destê te negirtiye! Zîrêq got: Bi navê Xwedê wî bêjîyê Elî hatiye, ji destê min girtiye, biriye! Piştre li hundir gerîya, dît ku kurê wî jî, selika kulîçeyan jî nexuyaye. Qîrîn pê ket, got: Wax lawo! Jina wî jî li singa xwe da û got, ka em herin gilîyê wî li cem wezîr bikin!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 739'AN

*Şehrezadê got:*

Jina wî got: Ez ê herim gilîyê te û wî li cem wezîr bikim. Wî sêrbazî kurê min kuşt û tu bûyî sedema vê yekê! Zîrêq got: Metirse, misoger ez ê kurê me ji nav lepên wî xelas bikim! Piştre desmalek li dora stûyê xwe girêda û berê xwe da baregeha Ehmed Denef. Hesen Şomab jê re derî vekir û jê pirsî, got: Ji bo çi tu hatiyî vir?

Zîrêq got: Ka ji Elîyê Misrî re bibêjin, bila kurê min bide min û tûrikê zêran jê re be. Hesen Şoman li Elî zivirî û jê re got: Xwedê bela xwe bide te Elîyo! Çima te ji me re negot, ew lawik kurê wî ye?

Zîrêq bitirs got: Çima qey çi bi serê wî de hatiye? Hesen Şoman got: Me mewîj danê, pê behecî û mir! Piştre destê xwe avêt goştê pêçayî û da destê wî, got: Ev jî meytê wî! Zîrêq nalîya û got: Wax lawo, wax! Îcar ez ê ji dayîka wî re çi bibêjim?

Zîrêq rabû kefenê di destê xwe de vekir, dît ku goştê berxekî biraştî ye! Hilmeke kûr kişand û got: Te kirî mala min xera bikira, Elî!

Kurê wî jê re anîn, danê. Ehmed Denef jê re got: Te tûrikê zêran daliqandibû, te digot, kî bibe, ji wî re ye! Elîyê Misrî jî ew wek şertê zewaca bi keça xwîşka te Delîlayê re ji wir girt û anî. Êdî şertê zewaca wan bi cih hat. Zîrêq got: Min qebûl kir êdî. Ehmed got: Em wê ji Elîyê Misrî re dixwazin. Zîrêq got: Ez ê jî wisa bixwazim. Zîrêq kurê xwe û tûrikê zêran girt. Hesen Şoman got: Nexwe te ew qebûl kir? Wî jî got: Ez wî qebûl dikim, bi şertê ku qelenê wê bide! Lewre keçikê sond xwariye, ku destê kesî bi sing û berê wê nabe, heta ku xeml û xêza Heyvê, keça Ezrayê cihû jê re neyîne!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 740'Î

*Şehrezadê got:*

Gava ku Zîrêq ew şertê nû avêt ber wî, Elî got: Heger ez îşev xeml û xêza Heyvê neyînim, êdî heqê min di xwestina Zeynebê de namîne! Hesen Şoman û hevalên wî yên din gotin: Elî heger tu hîleyekê lê bikî, tu yê werî kuştin! Elî got: Sebeb çi ye? Wan jî got: Ezrayê cihû sêrbazekî dekbaz û bêbextekî mezin e; cinan bi kar tîne û qesreke wî li derveyî welat heye, ku dîwarên wê ji zêr in û kuleyên wê jî zîv in. Ew qesra wî jî, tenê gava ku tê de rûniştî be, xuya dike û

çi gava ku jê derkeve, qesir jî ji ber çavan nebedî dibe, nema xuya dike. Navê keça wî Heyv e û xeml û xêza wê ji defîneyekê derxistiye, jê re anîye. Her carê wê xeml û xêza wê datîne ser sênîyeke zêrîn û şibakeyên qesra xwe vedike, dibêje: Ey diz û hîlebaz û dekbazên Misir û Îraqê û welatê eceman! Kî bikaribe vê xeml û xêzê bibe, dê ji wî re be! Gelek xort û ciwanan xwe lê ceribandin lê kes bi ser neket û wî jî ew hemû efsûn kirin, zivirandin meymûn û keran. Elî got: Bêguman ez ê wê xeml û xêzê bînim, li Zeynebê bikim.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 741'AN

*Şehrezadê got:*

Elî got, çi dibe bila bibe, ez ê wê xeml û xêzê li keça Delîlayê bikim. Û rabû ser xwe, berê xwe da dikana yê cihû; bala xwe dayê, ku mirovekî çors û zivir e, mêzînek li ber wî ye û li pêşîyê jî kodikên zêr û zîv û cewheran heye û qantireke wî jî li ber derî ye. Hinekî çavdêrîya wî kir, demekê bi şûn de bala xwe dayê, ku zilamê cihû rabû, dikana xwe girt, zêr û zîvên xwe xist du tûrikan, di xurcikê de bi cih kirin û xurcika xwe avêt ser pişta qantirê, lê siwar bû û meşîya hetanî ku ji bajêr derket. Elîyê Misrî jî li pey wî bû û haya wî jê tune bû.

Piştre mirovê cihû li cihekî sekinî, tûrikek ji berîka xwe derxist, hinek ax ji wî tûrikî derxist, li ser xwend û bi hewa de belav kir. Toza wê axê di cî de zivirî qesreke pir xweşik, ku timtêl jê re tune bûn! Elî li hemberî wê dîmena efsûnî şaşwaz û behetî mabû!

Mirovê cihû hîna li ser pişta qantira xwe bû. Qantira wî meşîya û mîna însanekî hêdî hêdî bi pêlikên qesrê ve hilkişîya. Dûre ji ser pişta wê peya bû, xurcika xwe ji ser pişta wê hilanî, qantir jî di cî de nebedî bû, ji ber çavan winda bû. Elî nû pê derxist, ku qantira wî jî cinî bû.

Mirovê cihû di qesra xwe de rûnişt, Elî jî ji pişt derî ve lê temaşe dikir. Mirovê cihû rabû ser xwe, şibakeyek vekir, zilekî ji zêr hilda destê xwe û sênîyeke zêrînî bi zincîrên zêrînî girêda, xeml û xêza keça xwe danî ser wê, ew di şibakeyê re dirêj kir û qîrîya, got: Ey dekbaz û jêhatîyên Misrê! Ey ciwanên Îraqê û ey xezalên welatê eceman! Kî ji we bikaribe vê xeml û xêza keça min bibe, bila jî we re be

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 742'YAN

*Şehrezadê got:*

Piştî wê qîr û gazîya xwe, mirovê cihû rûnişt û efsûnek çêkir, sifreya xwarinê hat ber wî. Têr xwar, sifre ji ber xwe ve rabû û çû. Efsûneke din çêkir, meya wî hat ber wî, têra xwe vexwar. Li hemberî wê dîmenê, Elî ji xwe re got: "Heta ku ew serxweş nekeve, ez nikarim wê tepsîyê û wê xeml û xêzê jê bidizim!"

Piştî ku mirovê cihû têr mey vexwar, Elî jî ji pişt wî ve û bi dizîka ber bi wî ve çû û şerîta pola ji destê wî kişand. Mirovê cihû di cî de li pişt xwe zivirî û efsûn li ser wî xwend, ji destê xwe re got: Bibe şûr! Pê re şûr ket destê wî. Destê Elî yê çepê bi hewa ket, sekinî ma, yê rastê jî wilo bû û herî dawîyê lingê wî yê rastê jî bi hewa ket. Elî ma li ser lingekî bi tenê. Piştre dîsa li ser Elî xwend û ew ji wê efsûnê rizgar kir, Elî dîsa bû weke berê. Di pey re mirovê cihû remla xwe avêt, navê Elî Zîbeqê Misrî jê re kifş bû. Lê zivirî û jê re got: Virde were, tu kî yî û li çi digerî? Elî got: Ez Elîyê Misrî me, ji zilamên Ehmed Denef im, min keça Delîlaya fenekar jê xwest, wan jî weke qelen, xeml û xêza keça te ji min xwestin. Vêca heger tu bidî min, bi xêr û selamet em ê ji hev veqetin.

Mirovê cihû jê re got: Tu mirina xwe bibînî, tu xeml û xêza keça min nabînî! Gelekan xwestin, ku bi dek û dolaban vê xeml û xêzê bibin lê kes ji wan bi ser neket û heger tu bixwazî, şîretekê ji min bibihîzî, were xwe radestî min bike, ji te re çêtir e. Lewre ew kesên ku ev tişt ji te xwestine jî, xwestine ku tu werî kuştin. Jixwe heger di remlê de bextê te ji yê min vekirîtir nebûya, min ê serê te bifiranda. Elî pir kêfxweş bû, gava bihîst ku di remla wî de bextê wî ji yê cihû vekirîtir derketiye. Li mirovê cihû vegerand û got: Divê ez wê xeml û xêzê bibim!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 743'YAN

*Şehrezadê got:*

Gava ku Elîyê Misrî wilo got, mirovê cihû jê pirsî: Daxwaz û meqseda hatina te ev e û veger jê nîn e gelo? Elî got: Belê. Zilamê cihû tasek derxist, ew tije av kir, li ser xwend, efsûn lê gerand û got: Wî bike ker! Piştre av li ser Elî reşand, di cî de ew zivirand kerekî guhdirêj, bi sim û çar piyan. Bi efsûnê

dîwarek jî li dora wî lêkir û ew tê de bi cih kir. Êdî Elî ketibû dirûvê kerekî û dizirîya. Mirovê cihû jî meya xwe vexwar û serxweş ket, heta sibehê.

Gava ku bû sibe, mirovê cihû ji Elî re got: Ez ê îro li te siwar bibim, bila qantira min bêhna xwe berde! Piştre rabû ew xeml û xêz ji ser tepsîyê daxist, ew û tepsî û zincîr û zil hemû xistin sindoqê û li ser xwend. Piştre rabû ser xwe, xurcika xwe avêt ser pişta Elî, ku êdî di sûretê kerekî de bû û lê siwar bû, da rê. Qesra wî jî di cî de nebedî bû û ji ber çavan wenda bû.

Mirovê cihû hat dikana xwe, ji kerê xwe peya bû, xurcik ji ser hilanî û ew girêda. Tûrikên zêr û zîv li ber xwe vala kirin û ew xistin rêzê. Elî jî girêdayî bû, her tişt didît û dibihîst lê nikaribû biaxive.

Di wê navberê de kurê tacirekî hat dikana mirovê cihû, ku gelek qede û bela bi serê wî de hatibûn û mecbûr mabû, bazinên jina xwe bifiroşe. Bazin dan destê cihû û jê re got: Ka heqê wan bazinan bide min, ji bo ku ez ji xwe re kerekî bikirim!

Ê cihû jê re got: Tu kerekî bikirî, tu yê çi barî lê bikî? Got: Ez ê avê lê bikim, bifiroşim û xwe pê xwedî bikim. Ê cihû got: Nexwe vî kerê min ji xwe re bibe. Zilam got: Bila be.

Ê cihû Elî firot wî zilamî û ji heqê wan bazinan tiştê mayî jî lê vegerand, dayê. Kurê tacir bi hefsarê Elî girt û ew bir mala xwe.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 744'AN

*Şehrezadê got:*

Kurê tacir Elî bi xwe re bir malê û jê werê ku ker e. Elî di dilê xwe de got: Kîngê ku kurtanê text danî ser pişta min û cewdikên avê li ser bi cih kirin, bi saetan ez dam meşandin, dê mala min xera bibe!

Kurê tacir ê ku êdî avfiroşî dikir, çawa ku kerê xwe anî malê, jina wî rabû ser xwe, êm da ber wî. Lê Elî bi serê xwe lê da û jinik gêrî erdê kir û xwe çem kir ser wê, bi devê xwe ew gez kir û ewkê xwe di nav şeqên wê re kir. Qajewaj bi jinikê ket, cîran bi hawara wê de hatin, li Elî dan û ew ji ser singê wê rakirin.

Gava ku mêrê wê hat, vegerîya malê, jina wî jê re got: Ya min berde û yan jî vî kerî li xwedîyê wî vegerîne! Zilam got: Çima, çi qewimîye? Jina wî lê

vegerand û got: Ev kerê hanê, şeytanek e di dirûvê kerê de ye, lewre xwe avêt ser min û heger cîran di hawara min de nehatina, dê ya xerab bi min bikira!

Avfiroş rabû ser xwe, bi hefsarê wî girt û dîsa ew bir cem ê cihû, jê re got: Kerê xwe bi şûn de bigire û diravên min, bide min.

Ê cihû got: Ew çima? Avfiroş got: Wî kerî karê xerab bi jina min kir. Ê cihû diravên avfiroş lê vegerandin û kerê xwe bi şûn de girt.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 745'AN

*Şehrezadê got:*

Piştî ku avfiroş ji cem wî çû, mirovê cihû li Elî zivirî û jê re got: Bêoxirê bêxîret! Nexwe te xerabî kiriye, ji bo ku zilam te li min vegerîne ha? Lê madem ku te qebûl kiriye, ku tu bibî ker, ez ê bihêlim, ku tu di nava xelkê gişî de rezîl û riswa bibî.

Mirovê cihû lê siwar bû, ket rê û çû, hetanî ku ji bajêr derket. Çengek ax ji tûrikê xwe derxist, li ser xwend û bi hewa de avêt, ew zivirand qesra xwe ya berê. Derbasî hundir bû, zil û zincîr û sênîka xwe drxist. Bi şibakê ve daliqand, xeml û xêza keça xwe danî ser sênîkê û bang kir, got: Ey dekbaz û sêrbazên Misrê! Ey mêrxas û ciwanên Îraqê û ey xezal û ahûyên Ecemistanê! Kî ji we bikaribe vê xeml û xêzê bibe, bila jê re be!

Piştre weke cara berê dîsa efsûnek çêkir, sifreya xwarinê hat ber wî. Têr xwar û pê de sifre xweberî rabû, çû. Piştre efsûneke din çêkir, sifreya meyê hat ber wî. Têra xwe vexwar, hetanî ku serxweş ket. Paşê taseke avê anî, li ser xwend û bi ser kerê de reşand, got: Vegere xulqê xwe yê berê! Elî dîsa vegerîya dirûvê xwe yê berê û wek berê bû însan. Yê cihû jê re got: Elî şîreta min qebûl bike û xwe ji agirê min biparêze. Tu pêdivîya te bi zewaca bi Zeynebê re tune ye! Ev kar ne hêsan e, dev ji tumahîyê berde. Nexwe ez ê dîsa efsûnekê li serê te bigerînim û ez ê te bikim hirç, meymûn û ez ê te bavêjim pişt Çiyayê Qehf!

Elîyê Misrî jê re got: Ey Ezra, min biryar daye, ku ez xeml û xêza keça te bibim û misoger divê ez wê bibim. Vêca neke, ku ez te bikujim! Mirovê cihû got: Ey Elî wisa xuya dike, ku tu mîna gûzekê yî û heta ku tu neyê şikandin, tu nayê xwarin! Pê re jî rahişt taseke avê, li ser xwend û bi ser wî de kir, got: Bikeve dirûvê hirçekî! Di cî de zivirî hirçekî. Ezra jî di cî de toqek xist stûyê wî, hefsarek

pê ve kir û devê wî girêda, singekî hesinî jî jê re kuta û ew pê ve girêda. Xwarina ku ji ber mabû, da ber û ava ku di binî qedeha wî de mabû, bi ser de kir.

Gava ku bû sibe, Ezrayê cihû rabû ser xwe, tepsî û xemla keça xwe ya li ser wê daxist, tevlî zil û zincîran di sindoqê de bi cih kir, efsûnek li ser hirçê xwe gerand, ew da dû xwe û berê xwe da dikana xwe.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 746'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku gihîşt dikana xwe, Ezra li cihê xwe rûnişt, zêr û zîvên xwe li ber xwe vala kirin. Zincîra hirçê bi dikanê ve girêda û vegerîya ser karê xwe. Elî jî di dirûvê hirçê de li wir ma, li her tiştî guhdar kir, temaşe kir, bêyî ku bikaribe biaxive.

Di wê navberê de bazirganek hat dikanê û ji Ezrayê cihû re got: Hosta tu vî hirçî difiroşî min? Dotmameke min ku di heman demê de jina min e jî, çûye ser hekîmekî û hekîm jê re gotiye, divê tu goştê hirçekî bixwî û dohnê wî di xwe bidî, ji bo ku tu ji nexweşîna xwe sax bibî!

Mirovê cihû bi wê teklîfa wî bazirganî pir kêfxweş bû û di dilê xwe de ji xwe re got: Ez ê wî bifiroşim vî zilamî, bila here wî serjê bike, ji bo ku em jê xelas bibin. Li yê bazirgan zivirî û got: Hema bila ji te re diyarîya min be!

Bazirgan bi hefsarê wî girt û ew bi xwe re bir cem qesabekî, jê re got: Kêrên xwe bîne û bide dû min! Qesab rahişt alavên xwe û da dû wî bazirganî, heta ku gihîştin mala wî. Li wê derê qesab ew girêda, kêrên xwe sûtandin, ew tûj kirin û xwest, ku wî serjê bike!

Gava ku Elî çav li wê niyeta qesab ket, xwe ji nav lepên wî derxist û bi hewa ket, firîya û çû û çû, hetanî ku gihîşt qesra Ezrayê Cihû. Tu nabêjî Ezra jî çawa ku hirçê xwe daye bazirgan, vegerîyaye qesra xwe, keça wî jê pirsîye, wî jî çîrok jê re gotiye. Wê jî ji bavê xwe xwestiye, ku cinekî bişîne pey Elî, bo ku wî bîne û lê binêrin, bê ka bi rastî jî ew Elîyê Misrî ye yan yekî din e. Bavê wê jî cinîyek li pey şandiye û ew ji nav lepên qesab revandîye, anîye qesrê, bêyî ku haya wî jê hebe.

Çawa ku hat, Ezra tasika xwe derxist, tijî av kir û li ser xwend. Piştre li ser wî reşand û got: Vegere sûretê xwe yê berê! Elîyê Misrî dîsa vegerîya sûretê xwe yê însanî yê berê.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 747'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku Elî vegerîya dirûvê berê û çavên Heyvê pê ketin, kizîn bi dilê wê ket. Şaş û heyrangorî ma li hemberî xweşikbûn û lihevhatina wî ya bitimtêl. Evîn û eşqa wî bi yek carî di dilkê wê de cî girt û eşqa wê jî di dilê wî de cî girt. Heyvê ji Elî re got: Bêoxiro çima tu hatiyî bi pey xeml û xêza min ketiyî û te xwe xistiye vî halî! Elî got: Ji bo ku ez bi Zeyneba dizek re bizewicim, min ev şertê xalê wê Zîrêq qebûl kir.

Heyvê got: Gelek ciwanên din jî mîna te ketin dehfika bavê min, bi armanca ku xemla min bibin lê yekî bi tenê jî ji wan bi ser neket. Tu jî bi ya min dikî, dev ji temahîyê berde! Elî got: Divê ez xeml û xêza te bibim û heger bavê te wê nede min, ez ê wî bikujim.

Ezrayê cihû ji keça xwe re got: Li vî ketîyê hanê binihêre keça min, çawa xwe dixe talûkeyê! Piştre li Elî zivirî û axaftina xwe ya pê re berdewam kir: Baş e, nexwe ez ê te bikim kûçik! Tasika xwe tijî av kir, li ser xwend û bi ser de reşand, got: Bikeve sûretê kûçikê! Elî di cî de zivirî kûçikekî. Ezra û keça xwe Heyv jî, meya xwe vexwarin, hetanî ku serxweş ketin.

Roja din sibehê Ezra rabû ser xwe, zêrên xwe giş dan ser hev, li qantira xwe siwar bû, kûçikê xwe jî efsûn kir û ew da dû xwe, bir. Di rê de di ber dikana firoşkarekî re derbas bû. Firoşkar pêşîya kûçikê wî girt, ew bir cem xwe, derbasî hundir kir, pê leyîst. Ezra jî bi derengî lê hay bû, ku kûçikê wî ne li pey wî ye. Lê gerîya lê ew nedît.

Firoşkar kûçik bi xwe re bir malê. Gava ku derbasî hundir bû û keça wî çav lê ket, di cî de rûpoşa xwe da ber rûyê xwe û ji bavê xwe re got: Ev çi ye, bavocan, çawa tu zilamên xerîb derbasî mala me dikî?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 748'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku keçê lome li bavê xwe kir, firoşkar got: Keça min ev kûçik e, ne kesekî xerîb e! Qîza wî got: Ev Elîyê Misrî ye lê Ezrayê cihû ew efsûn kiriye

û ew xistiye dirûvê kûçikekî! Firoşkar li kûçik zivirî, jê pirsî û got: Tu Elîyê Misrî yî? Kûçik serê xwe hejand, got erê. Bavê keçikê lê vegerîya û jê pirsî, got: Ê cihû çima ew efsûn kiriye? Keça wî got: Ji ber ku Elî çûbû cem wî, ji bo ku xeml û xêza keça wî jê bidize yan jî jê bistîne. Lê ez dikarim wî ji vê efsûnê xelas bikim! Bavê got: Heger bi meqseda xêrê be, niha wextê karekî wisa ye.

Keça wî got: Heger qebûl bike, ku bi min re bizewice, ez ê wî xelas bikim. Elî di cî de bersiv dayê û serê xwe bi erênî hejand. Keçikê rahişt tasikekê, tijî av kir, li ser xwend û efsûn gerand lê hîna ku bi ser Elî de nekiribû, qîreke bilind di hundir de olan da, guh dagirtin. Tas ji destê keçikê ket û ew jî li hêla deng zivirî, dît, ya ku diqîre, qerwaşa bavê wê ye. Qerwaş pê de çû û got: Xatûna min ka ew peymana ku me bi hevdu re dabû? Qey te ji bîr kiriye, ku min tu hînî efsûnê kirî? Te soz dabû min, ku tu tiştî bêyî min nekî û gava ku tu bizewivî jî, ew mêr kî be, dê bi min û te be. Şevekê li ba min be û şevekê li ba te. Keçikê bersiv da wê û got: Rast e!

Gava ku firoşkar ev gotin ji qerwaşa xwe bihîstin, ji keça xwe re got: Û kê ev qerwaş hînî efsûnê kir? Keçikê got: Bavocan wê ez fêrî vî karî kirim, kê ew fêrî wê kiriye, ew çêtir dizane, ji wê bipirse!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 749'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku keçikê ev destnîşan kir, qerwaşê got: Ezbenî gava ku ez di xizmeta Ezrayê cihû de bûm, dema ku efsûn çêdikir û li ser avê û axê dixwend, min bi dizî lê guhdar dikir û ew dişopand. Bi wî awayî ez jî hino hino fêrî efsûngerîyê bûm û min hunera zanîna derûnî bi dest xist. Rojekê Ezra serxweş ket û ji min xwest, ku ez herim ser nivîna wî. Lê min qebûl nekir û min jê re got: Ez nahêlim destê te bi min bibe, hetanî ku tu nebî misliman. Lê belê wî jî ew şertê min qebûl nekir û bi ser min de hat. Min jê re got: Ez ê gilîyê te li cem siltan bikim. Rabû dev ji min berda û piştre ez firotim te. Piştre gava ku ez hatim vir, min xatûna xwe fêrî efsûngerîyê kir, bi şertê ku tiştekî bê şêwra min neke û kesê ku bi wê re bizewice, bi min re jî bizewice û em wî di nava xwe de parve bikin; şevekê li ba min be, şevekê jî li ba wê!

Piştre qerwaşê destê xwe avêt tasikê, ew tijî av kir û li ser wê xwend, efsûn gerand û piştî ku av bi kûçik de kir, jê re got: Vegere sûretê xwe yê berê

û bibe însan. Elî, veguherî bû Elîyê berê. Firoşkar silav lê kir, xêrhatin tê da û sebeba wê rewşa wî jê pirsî. Elî her tişt bi hûrgilî jê re anî ziman.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 750'YÎ

*Şehrezadê got:*

Piştî ku Elî çîroka xwe jê re got, firoşkar jê re got: Gelo keça min û qerwaşa min besî te ne? Elî got: Bêyî Zeynebê qet nabe.

Tam di wê kêlîyê de hinekan li derî xist. Qerwaş çû ber derî û pirsî, got: Kî li ber derî ye? Got: Ez Heyvê me, keça Ezrayê cihû me, gelo Elîyê Misrî li gel we ye? Keça firoşkar hêrs bû û pê de qîrîya, got: Ey keça mêrikê cihû, heger li cem me be jî, tu yê çi pê bikî? Pê re jî bi qerwaşê de qîrîya, jê re got: Derî jê re veke! Qerwaşê derî vekir, ew derbasî hundir bû. Çawa ku ew û Elî rû bi rû bûn, Elî jê re got: Keça sehan tu hatiyî vira çi!

Heyvê got: Eşhedû enlaîlahe îlalah we enne Muhemeden resûlilah! Êdî ez jî bûme misilman. Lê ka ji min re bibêje, bê gelo di ola îslamê de zilam keçan dixwazin an xort keçan dixwazin? Elî lê vegerand û got: Zilam jinan li xwe mehr dikin. Heyvê got: Ez jî hatime, ku xwe li te bidim mehrkirin û qelenê te jî xeml û xêza xwe gişî, tevlî zincîr û tepsîyên zêr û totikê bavê xwe, dijminê te û Xwedê!

Bi wê gotina xwe re serê bavê xwe yê jêkirî, avêt ber wî û pê de çû got: Ev e serê dijminê te û dijminê Xwedê! Sebeba ku min bavê xwe kuşt jî, ev bû: Di xew de yekî ji min re digot, bibe misliman. Ez jî bûm misliman û gava ku ez şiyar bûm, min ji wî xwest, ku bibe misliman lê qebûl nekir. Rabû min ew benc kir û piştre jî min ew kuşt.

Elî rahişt wan tiştên ku Heyvê anîbûn û ji firoşkar re got: Sibê em ê li cem xelîfe hevdu bibînin, ji bo ku ez bi keça te û qerwaşa te re bizewicim û rabû çû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 751'AN

*Şehrezadê got:*

Elîyê Misrî bi firoşkar re civanek diyar kir û bi kêf ji wir derket, berê xwe da baregeha Ehmed Denef. Tevlî wê xeml û xêza Heyvê û zêr û yaqûtên

wê. Di rê de li helawfiroşekî rast hat, ku destên xwe li hev dixistin û bi lomekarî, di nava neçarîyê de digot: La hewle wela qewete îlabîlah! Keda xelkê heram bûye û hemû di tiştên qelp de diçe. Tu bi Xwedê bikî were li tehma vê helawa min binihêre! Elî rahişt hinek helaw, ji destê wî girt û xwar. Ji ber ku benc di helawê de hebû, Elî di cî de ji ser hişê xwe çû. Helawfiroş jî hemû zêr û zîv û xemla di destê wî de bir, xist sindoqa xwe ya helawê. Devê wê girt, ew danî ser milê xwe û çû.

Lê hîna ku ew wisa diçû, qadîyekî gazî wî kir û got: Helawfiroş!! Were vira! Çû cem wî, sekinî, binkeya sindoqa xwe danî, helawa xwe li ser bi cih kir û got: Tu çi dixwazî? Qadî got: Helaw û loqiman dixwazim! Firoşkar du perçe danê, qadî li tama wan nêrî, piştre got: Ev helaw qelp e û baş nehatiye çêkirin! Piştre destê xwe xist berîka xwe, hinek helaw û loqim jê derxistin û da firoşkar, jê re got: Li çêja vê şêranîyê binihêre û li gora wê helawê çêke!

Helawfiroş, ji bo ku li tehma wê binihêre, ew şêranî ji destê wî girt û xwar. Lê belê ji ber ku benc tê de hebû, helawfiroş di cî de ji ser hişê xwe çû. Qadî jî rahişt sindoqan, helawfiroş jî xist binkeya wê û giş avêtin ser milê xwe û berî da baregeha Ehmed Denef. Lewre yê ku xwe xistibû qilixê qadî, Hesen Şoman bi xwe bû. Lewre dema ku Elî dereng ketibû û venegerîyabû, Ehmed Denef hemû zilamên xwe kom kiribûn û ji wan re gotibû: Xortino, rabin derkevin û li birayê xwe Elî bigerin! Ew jî rabûbûn ser xwe, her yekî xwe kiribûn qilixê hinekan û li nava bajêr gerîyabûn. Hesen Şoman jî qeftanê qadîyekî li xwe kiribû, şaşikeke dabû serê xwe û daketibû nava bajêr, Dema ku Ehmedê sêwî di şiklê helawfiroşekî de dîtibû, ew di cî de nas kiribû û bi wî hawayê ku me got, ew benc kiribû û bi xwe re biribû baregehê. Her çil hevalên wî yên din jî ger û lêgerîna xwe di nava bajêr de berdewam kirin, ku yek ji wan jî Elî Cemel bû.

Dema ku Elî Cemel di kolanekê re derbas dibû, bala xwe dayê, ku komeke xelkê li dora yekî paldayî kom bûye. Çû cem wan. Bala xwe dayê, ku yê di nava wan de Elîyê Misrî ye û benckirî li erdê vezelîyayî ye! Ew ji xewa wî ya serxweşîyê şiyar kir. Elîyê Misrî çavên xwe vekirin, dît ku mirov li dora wî kom bûne û Elî Cemel li kêleka wî ye. Jê pirsî got: Ez li ku me? Elî Cemel lê vegerand û got: Ez û hevalên xwe li te digerîyan û me dît, ku tu li vir benckirî yî lê em nizanin, ku kê tu benc kiriye. Elîyê Misrî got: Yekî helawfiroş ez benc kirim û tiştên li ser min rakirin, birin lê bi ku de çû gelo?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 752’YAN

*Şehrezadê got:*

Elî Cemel got: Em nizanin, bê bi ku ve çûye, lewre me kes nedîtiye lê ka rabe em herin baregeha xwe! Elî rabû bi wan re çû; hemû bi hev re derbasî baregehê bûn û çûn cem Ehmed Denef. Silav lê kirin. Wî jî silava wan girt û got: Elî, ka te xeml û xêza heyvê bi xwe re anî?

Elîyê Misrî got: Min ew jî, serê yê cihû jî û gelek tiştên din jî bi xwe re anîn lê helawfiroş li min rast hat, ez benc kirim û hemû ji min stendin, birin. Çîroka xwe bi hûrgilî jê re rave kir û got: Heger min ew helawfiroş bidîta, min ê ew ceza bikira…

Hîna ku ew gotina wî di devê wî de bû, Hesen Şoman ket hundir û got: Elî, ka te ew emanet anîn? Elî got: Min ew emanet jî, serê Ezrayê cihû jî anî lê helawfiroşek li min rast hat, ez benc kirim, hemû ji destê min girtin û çû. Lê ez nizanim, bê ew bi ku ve çû, nexwe min ê ew bikuşta! Gelo tu dizanî bê ew zilam bi ku ve çûye? Hesen Şoman got: Ez cihê wî nas dikim û bi şûn de vegerîya, helawfiroşê benckirî û pêçayî anî, danî ber wî û bi dijbencê ew şiyar kir. Çawa ku helawfiroş çavên xwe vekirin, dît ku ew li hemberî Elîyê Misrî û Ehmed Denef e û çil çeteyên wan jî li dora wî ne. Ji tirsan hişê wî ji serê wî çû û got: Ez li ku me, kê ez girtime?

Hesen Şoman jê re got: Min tu girtî! Elîyê Misrî lê zêde kir û got: Bêbexto, tu çawa van tiştan bi serê min de tînî! Destê xwe avêt xencera xwe û hewl da ku wî serjê bike, lê Hesen Şoman ew da rawestandin û ji Elî re got: Destê xwe ji ser stûyê wî rake. Ew zavayê te ye. Elî şaşwaz bû, zavayê çi? Hesen Şoman got: Ev Ehmedê Sêwî ye. Kurê xwîşka Zeynebê ye. Elîyê Misrî bi ser helawfiroş de qîrîya û got: Te çima ev tişt kir, sêwîyo? Ehmedê Sêwî got: Pîrika min Delîla ferman da min û ez jî mecbûr mam, ku bikim.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 753’YAN

*Şehrezadê got:*

Gava ku Ehmedê Sêwî pîrika xwe destnîşan kir, Elî pirsa xwe berdewam kir: Û pîrika Delîla çima ev ferman da te? Sêwî got: Zîrêqê masîvan hat cem pîrika min û jê re got: Elîyê misrî xortekî zana, jêhatî û dekbazekî

dijwar e; misoger wê Ezrayê cihû bikuje û xeml û xêza keça wî bîne. Li ser vê gotina wî, pîrika min gazî min kir û ji min re got, Ehmed tu Elîyê Misrî nas dikî, min jî got belê ez wî nas dikim û gava ku nû hatibû Bexdayê, min baregeha Ehmed Denef nîşanî wî dabû. Rabû ji min re got: Here feqekê li ber vede, heger wî xeml û xêz û zêr anîbin, hîleyekê lê bike û wan jê bistîne û were. Ez jî çûm li nava bajêr gerîyam, heta ku min helawfiroşek dît, min deh dînar dan wî û min kinc û dezgeha şêranîyê û amûrên wê jê stendin û piştre jî tiştê ku qewimî tu dizanî.

Elîyê misrî ji Ehmedê Sêwî re got: Here cem pîrika xwe Delîla û Zîrêqê masîvan, ji wan re bibêje Elîyê Misrî xeml û xêza keça Ezrayê cihû û serê Ezra bi xwe jî anîye, bila sibê min li dîwana Xelîfe bibînin, ji bo ku ez qelenê Zeynebê bidim wan.

Ehmed Denef jî bi vê pêşketinê kêfxweş bû û pesnê Elî da, got: Hêvîya me gişan tu yî, Elîcan.

Roja din bi sibehê re Elîyê Misrî rahişt xeml û xêza Heyvê, tevlî sênî û zincîrên zêr, serê Ezra jî xist serê rima xwe û li gel apê xwe Ehmed Denef û zilamên wî derket dîwana xelîfe, erda bin nigên wî maçî kir û bi rêzdarî silav lê kir.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 754'AN

*Şehrezadê got:*

Xelîfe li Ehmed Denef û civata wî nihêrî, bi wê sekna xwe ya mêrane herî zêde Elîyê Misrî bala wî kişand ser xwe! Xelîfe li Elî pirsî, bê ew kî ye, ne kî ye, Ehmed Denef got: Emîrê bawermendan, ev serkêşê xort û ciwanên Misrê, Elîyê Misrî ye. Di heman demê de ew şagirtê min ê sereke ye.

Xelîfe careke din lê mêzand, bala xwe dayê, ku wêrekî û mêrxasî ji çavên wî dibarin. Li gel wê sekn û wan awirên xwe, mîna sembola lehengîyê bi xwe bû. Xelîfe bi heyrangorî li Elî dinihêrî. Ew jî di wê kêlîkê de rabû ser xwe, serê cihû yê jêkirî avêt ber lingên xelîfe û jê re got: Emîrê bawermendan, ew jî serê dijminê te ye! Xelîfe got: Serê kê ye? Elî got: Serê Ezrayê cihû ye. Xelîfe pirsî: Kê ew kuşt? Elîyê Misrî, serpêhatîya xwe û tiştên ku qewimîbûn, ji serî hetanî binî, jê re got.

Xelîfe got: Ez texmîn nakim, ku te ew kuştibe, lewre ew sêrbaz û efsûn-

gerekî mezin bû. Elî got: Emîrê bawermendan, Xwedê teala ji min re li hev anî û min ew kuşt.

Xelîfe walîyê xwe şand qesra yê cihû, walî dît, ku bedena wî ya bê serî li wir e. Ew xistin tabûtekê û anîn ber destê xelîfe. Xelîfe got: Wî bişewitînin. Laşê wî rakirin, birin, ji bo ku bişewitînin û tam di wê kêlîkê de keça Ezra, Heyvê ket dîwanê û hat hizûra xelîfe, erda bin nigê wî maçî kir û jê re got: Ez Heyv im, keça Ezra me û ez bûme misilman.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 755'AN

*Şehrezadê got:*

Heyvê xwe bi xelîfe da nasandin û li ber destê xelîfe mislimantîya xwe careke din dubare kir û pê de çû, gotina xwe berdewam kir. Ez tikan ji we dikim, bi ser Elîyê Misrî de herin, bila bi min re bizewice. Ez emîrê bawermendan ji xwe re dikim wekîl û xwedan.

Xelîfe qesra Ezra diyarî Elî kir û jê re got: Daxwazeke te ji min heye? Elîyê Misrî got: Ez dixwazim li ser merş û berên te rûnêm û xwarineke te bixwim. Xelîfe jê re got: Elî, çeteyên te hene? Elî got: Çil heb çeteyên min ên ciwan hene lê hemû li Misrê ne. Xelîfe got: Xeberê ji wan re bişîne, bila hemû werin vira. Lê gelo baregeheke te li vir heye? Elî got: Na. Hesen Şoman got: Ez barehgeha xwe bi hemû tiştên ku tê de ve diyarî elî dikim, emîrê bawermendan. Xelîfe got, Hesen Şoman, baregeha te bila ji te re be.

Piştre gazî xeznedar kir û ferman dayê, ku deh hezar dînarî bide berpirsîyarê avadanîyê, ku ji bo çeteyên Elîyê Misrî baregeheke bi çil hêwan û çil odeyî lêbikin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 756'AN

*Şehrezadê got:*

Di peyre xelîfe dîsa li Elîyê Misrî zivirî û jê re got: Wekî din, tiştekî ku tu wî ji min bixwazî heye? Elî got: Ey emîrê bawermendan, ez dixwazim tu fişarê li Delîlaya dekbaz bikî ji bo ku keça xwe Zeynebê bide min û xeml û xêza keça cihû weke qelen qebûl bike.

Xelîfe got, Delîlayê jî pejirand û keça xwe da Elî; ew lê mehr kir û ew zêr û zîv û xeml û xêza keça cihû jî weke qelenê wê qebûl kir. Di peyre mehra keça firoşkar, qerwaşa wî û ya Heyvê jî lê birîn û mehmizek jî jê re veqetandin. Li gel firavîn û şîveke rojane, qerwaşek û xizmetkarek û dergevanek jî. Xelîfe dawetek ji Elîyê Misrî re li dar xist, ku sih rojan ajot. Elîyê Misrî peyamek ji çeteyên xwe yên li Misrê re şand. Bûyer û tiştên ku pê re qewimîbûn û comerdîya ku xelîfe bi ser wî de barandibû, hemû ji wan re anî ziman û di dawîya peyama xwe de jî got: Misoger divê hûn zû werin, ji bo ku hûn bigihîjin ser şahîya min, lewre ez bi çar jinan re zewicîme.

Piştî demeke kurt, çil çeteyên wî jî ji Misrê hatin û şahîya mezin li dar xistin. Piştre Elî ew hemû di baregeha xwe de bi cih kirin, qedrekî mezin ji wan re girt û ew derxistin hizûra xelîfe.

Xelîfe jî ew li dîwana xwe qebûl kirin, kincên fermî yên asayîşê li ser wan belav kirin, kincekî fermî li Zeynebê jî kir û diyarî li ser gişan belav kirin.

Gava ku Elî derbasî ser nivîna Zeynebê bû, bala xwe dayê, ku dureke destnedayî ye û guleke ku nequrifîye, di spehîbûna xwe de keçeke bêtimtêl e. Her sê jinên wî yên dinê jî ji hevdu xweşiktir û zîrektir bûn.

Piştre rojekê di şevbuhêrkê de xelîfe ji Elî xwest, ku serpêhatîya xwe ji serî hetanî binî jê re bibêje, wî jî ta bi derzîyê ve kir û hemû bi hûrgilî jê re vegot. Xelîfe ji weqenivîsan (bûyernivîsan) xwest, ku wê serpêhatîya Elîyê Misrî binivîsînin, ji bo ku ji xelkê re bibe ders û neyê jibîrkirin.

Elî Zîbeqê Misrî û jinên xwe di nava xweşî û şahîyeke bêtimtêl de jîyan, heta ku xerabkarê malan û civatan bi ser wan de hat û xwedê çêtir dizane.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

### ŞEVA 757'AN

## ÇÎROKA ŞAH MIHEMEDÊ BINSEBAÎK Û HESENÊ BAZIRGAN

*Şehrezadê ji Şehreyar re got:*

Vêca şahînşahê min ê gewre û bextîyar; tê gotin ku di dem û dewranên berê de şahekî eceman hebû bi navê şah Mihemedê Binsebaîk, ku welatê Xorasanê bi rê ve dibir û her sal êrîşek dibir ser welatên kafiran ên li Hind û

Sind û Sîn û welatên wî alîyê çemî. Şahekî dadwer, comerd û wêrek bû. Îcar wî şahî jî ji şevbuhêrk, çîrok, serpêhatî, helbest, dûrik, biwêj û çîrçîrokan hez dikir. Û çîrokeke sosret û balkêş li ba kê hebûya û biçûya cem wî, jê re bigota, qedr û qîmeta wî digirt, hezar dînar didayê, ji şaşikê hetanî çaroxan, ew bi cil û kinc dikir, hediye bi ser wan de dibarandin û herî dawîyê jî ew li hespekî zînkirî siwar dikirin û ew bi şûn de dişandin.

Rojekê zilamekî kal hat cem wî şahî û çîrokeke balkêş û erjeng jê re got. Şah bi wê çîroka wî pir kêfxweş bû û li gel hezar dînarê Xorasanî xelateke giranbuha û hespekî zînkirî dayê. Xeber û peyama vê yekê jî di nava hemû welatan de belav bû û dengekî mezin da.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 758'AN

*Şehrezadê got:*

Vêca wezîrekî zikreş û dexesokî li cem wî şahî hebû, ku ji tu kesî hez nedikir, ne ji feqîran ne ji maldaran, ji tu mirovan hez nedikir. Her ku yek dihat cem şah û xelatek, tiştek ji destê wî digirt, zikreşîya wî dikir û ji şah re digot: Ev nêzîkahîya te wê malê te biqedîne û mala te xera bike! Lê şah guh nedida gotinên wî û hey bi ya xwe dikir û diyarî li ser kesên zana, çîrokbêj û helbestkar belav dikirin.

Hesenê bazirgan jî, mirovekî comerd, zana aqilmend û hozanekî mezin bû. Gava ku şah navê wî bihîst, şand dû wî. Hesen hat dîwana şah, şah jê re got: Hesenê Bazirgan, gava ku min xwest, ku ez te vexwînim cem xwe, wezîrê min li hemberî min derket. Jixwe her tim li hemberî min derdikeve, gava ku diyarî û xelatan li ser şaîr, hozan çîrokbêj û zanyaran belav dikim. Îcar niha ez ji te dixwazim, ku tu çîrokeke xweş û balkêş ji min re bibêjî, ku berê kesî nebihîstibe. Heger ez çîroka te biecibînim, ez ê welatekî mezin bidim te, bi keleh û sûrên wê ve û ez ê te bikim mezintirîn wezîrê xwe yê ku welat gişî bi rê ve bibe û her dem li kêleka min a rastê rûnê. Lê heger tu nikaribî çîrokeke wisa li gorî dilê min ji min re bibêjî jî, ez ê hemû mal û milkê te ji te bistînim û ji vî welatî bera te bidim.

Hesenê Bazirgan got: Ser seran, ser çavan, şahê min ê gewre û mihrîban. Lê ezbenî ez jî dixwazim, ku mohleta salekê bidî min, xwe li min ragirî,

piştre ez ê çîrokekê ji te re bibêjim, ku tu kesî nebihîstibe û çîrokeke xweş, mîna wê nehatiye gotin di dîrokê de.

Şah got: Ez moleta salekê didime te. Piştre xeftanek jê re kir diyarî, avêt ser milên wî, lê kir û pê de çû, got: Salekê sax li mala xwe be, ne siwar bibe, ne here derekê û ne jî xwe tevbide, heta ku tu çîroka xwe amade bikî. Kengî te ew daxwaza min pêk anî, ji niha ve ez mizgînîyê didim te, ku ez wê soza xwe pêk bînim û xêran bi ser te de bibarînim. Û heger tu pêk neyînî jî, ne tu ji me yî û ne jî em ji te ne!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 759'AN

*Şehrezadê got:*

Hesenê bazirgan erda bin nigê şah maçî kir û derket, çû ji nava bendeyên xwe pênc hebên zana, hişmend, xwende, nivîskar û wêjevan hilbijartin û serê her yekî ji wan pênc hezar dînar da wan û ji wan re got: Min hûn hetanî niha ji bo vê rojê xwedî kirin. De êdî alîkarîyê bidin min, ji bo ku hûn min ji nav lepên şah rizgar bikin! Yekî ji wan got: Tu ji me çi dixwazî, ezbenî? Ruhê me di rêya te de ye. Tu çi bibêjî em ê bikin.

Hesenê Bazirgan ji wan re got: Ez dixwazim ku her yek ji we here herêmekê û di wan herêman de li hemû mirovên zana, wêjevan, hozan, çîrokbêj û serpêhatîbêjan bigerin, bi wan re bidin û bistînin, li çîroka Şûrê Şahan bigerin, wê binivîsin û ji min re bînin, werin. Heger we ew li gel hinekan hazir dît jî, buhayê wê çi dibe bila bibe, çiqas zêr û zîv bixwaze, bidin wî û wê ji min re bînin. Lew ku hezar dînarî ji we bixwaze. Têrê nekir jî, tiştê bi we re bidin wî û werin, ez ê tiştê mayî bidim wî. Kî ji we vê çîrokê ji min re bîne, ez ê xelata herî giran, diyarîya herî xweşik bidim wî û ez ê wî bikim ezîzê ber dilê xwe.

Piştre jî peywir li ser wan belav kir, ji yekî re got: Here welatê Hind û Sindê, ji yê din re got: Here welatê Sînê, welatê eceman û herêmên dedora wê. Ji yekî re jî got: Here welatê mexrîbê û erdnîgarîya dedora wê, ji yekî re jî got: Here welatê pişt çem û ji yên mayîn re jî got: Herin welatê pişt deryayê.

piştre jî ji wan re dua kir û got: Herin êdî bila rêya we vekirî be. Zana bin û di pêkanîna daxwaza min de dereng nekevin. Qet sist nekevin û xwe ji ber fedekarîyê nedin alî, lew ku giyanê we tê de here.

Her pênc ketin ser rêyan û berê xwe dan wan welatên ku ji wan re hatibû diyarkirin. Û bê rawestan li nav wan welatan gerîyan û hey gerîyan. Piştî ku dema wan hat ber qedînê, bêhna Hesenê Bazirgan teng bû: Tev gava ku çar heb ji wan destvala vegerîyan û jê re gotin, wele me bajar û welat giş li hev xistin lê em li wê çîroka ku te dixwest rast nehatin, hat ber teqînê!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 760'Î

*Şehrezadê got:*

Çar bendeyên Hesenê Bazirgan destvala vegerîyabûn û bêhna wî pir teng kiribûn. Lê bendeyê pêncan gelek welat û bajar li hev xistin û herî dawîyê vegerîya Şamê, çû bajarê Dîmeşqê û dît, ku bajarekî xweş e, bi dar û ber e, pirav û pirbaxçe ye. Şev û rojên wê ji hev xweştir in. Di nava aramî û bextewarîyê de xewnên reş dibîne. Bi rojan lê ma û li daxwaza mîrzayê xwe gerîya lê belê lê rast nehat. Xwest ku ji wê derê derkeve û berê xwe bide welatekî din. Lê tam di wê kêlîkê de bala xwe dayê, ku ciwanek bi lez diçe, diterpile û guhkên kirasê xwe bi dû xwe de dikişîne. Gazî wî kir û jê re got: Tu bi ku ve diçî û çima tu wisa derdnak î?

Ê ciwan got: Şêxekî birûmet li vir heye, di vê kêlîyê de li ser kursîyekî rûdinê, çîrokên pir balkêş û erjeng dibêje, ku tu kesî nebihîstiye. Ez jî dilezînim, ji bo ku ez cihekî nêzikî wî ji xwe re bigirim. Lewre gelek kes tên guhdarkirina wî û cî ji mirov re namîne. Rabû wî got: Min jî bi xwe re bibe. Ê ciwan jê re got: Nexwe tu jî bilezîne! Ber xwe girt û wî jî pê re lezand, heta ku gihîştin cihê wî şêxê kal î ku di nava xelkê de li ser kursîyekî rûniştibû û ji wan re diaxivî. Herdu çûn li nêzikî wî rûniştin û wan jî li axaftina wî guhdar kir.

Gava ku roj çû ava û mirovên dora wî rabûn, ji hev ferikîn, her yek ji wan çû mala xwe û şêxê kal bi tenê ma. Bendeyê Hesenê bazirgan çû cem wî û silav dayê, wî jî silava wî girt.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 761'AN

*Şehrezadê got:*

Piştî ku şêxê kal silava wî bi germahî girt, bendeyê Hesenê bazirgan jê re got: Ez benî tu kalekî dinyadîtî, baş û hişmendkar î, axaftina te jî pir

xweş e û ez di xwazim di mijarekê de pirsekê ji te bikim. Şêx got: Pirsa xwe bike. Bendeyê Hesenê bazirgan got: Gelo çîroka Şûrê Şahan û Xweşiktirîna Xweşikan li ba te heye?

Şêx got: Te ew nav ji kê bihîstiye û kê ji te re gotiye? Bendeyê Hesen got: Min ji kesî nebihîstiye û ez ji welatekî dûr hatime, li vê çîrokê digerim. Tu heqê wê çiqasî dixwazî, ez wî bidim te. Vêca heger li cem te hebe, bi xêra xwe û bavê xwe, wê bide min. Bila sedeqeya serê te be. Ya rastî heger di ber vê çîrokê de tu ruhê min jî bixwazî, ez ê bidim te.

Şêxê kal jê re got: Meraq neke û bila dilê te aram be, ez ê wê bidim te. Lê ev ne tiştekî ku mirov li ser rêyan pê bipeyîve ye. Ez vê çîrokê nadim tu kesî. Bende got: Ezbenî wê bide min û tu çi dixwazî, ez wî bidim te!

Şêxê kal got: Heger tu vê çîrokê dixwazî, sed dînarî bide min û ez ê jî wê bidim te lê bi pênc şertan!

Gava ku bendeyê Hesenê bazirgan têgihîşt ku çîrok li cem wî ye û dê bide wî, pir şad û bextewar bû!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 762'YAN

*Şehrezadê got:*

Bendeyê Hesenê bazirgan ji şêxê kal re got: Ez ê heqê çîrokê sed dînarî bidim te û deh dînaran jî wek bexşîş di ser re bidim te û bi şertên ku tu dixwazî, ez ê wê bibim. Şêx got: Here sed dînarî bîne û çîroka xwe bibe. Bende di cî de rabû ser xwe, destê şêx ramûsa û bi kêfeke mezin çû malê, rahişt sed û deh dînaran, ew xistin tûrikekî û li ber serê xwe danî. Çawa ku bû sibe, rabû ser xwe, kincên xwe li xwe kirin, rahişt tûrikê dînaran û berê xwe da cem şêx, Hat, bala xwe dayê, ku şêx li ber derîyê xwe rûniştî ye. Silav lêw kir şêx silava wî girt. Sed û deh dînar danê. Şêx jî ji destê wî girt û rabû derbasî mala xwe bû. Bende jî li pey wî çû hundir. Şêx ew li cihekî da rûniştandin, pênûs û lênûsk da destê wî û pirtûkek jî danî ber û jê re got: Çîroka ku tu lê digerî, di vê pirtûkê de ye, ji xwe re binivîse û ji ber bigire.

Bendeyê Hesenê bazirgan li ber rûnişt û çîroka Şûrê Şahan ji ber wê pirtûkê nivîsand, hetanî ku qedand. Piştre ji şêx re xwend û bi wî da sererastkirin.

Piştre şêxê kal jê re got: Binêre kurê min, şertê min ê ewilî ev e, ku tu vê çîrokê li kêleka rêyan nexwînî. Şertên din jî ew in, ku tu li cem jin û qerwaşan nexwînî û ne jî li cem bende û bêhişan û ne jî li cem zarokan. Divê tu wê li cem şah û siltan û qral û mîr û emîran bixwînî, li cem zanyar û hişmendan.

Wî jî ew şertên wî hemû qebûl kirin û xatir jê xwest, ket ser rêya vegerê.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 763'YAN

*Şehrezadê got:*

Bendeyê Hesenê bazirgan ew qas bi kêf û coş bû, ku bê rawestan dimeşîya û qet nedixwest, ku navberekê jî bide meşa xwe. Loma pir zû gihîşt welatê xwe Xorasanê û çû çîrok radestî mîrzayê xwe Hesenê bazirgan kir. Wî jî çîrok bi xeta destê xwe ji nû ve nivîsand. Çû, derket raberî şah, jê re got: Şahê min ê gewre û bextewar! Min çîrokin ji te re anîne, ku ku li ser rûyê vê erdê ne kesî ew bihîstine û ne jî çîrokin di timtêla wan de hatine gotin.

Şah çawa ku ew gotin ji devê Hesenê bazirgan bihîst, di heman kêlîyê de ferman da û got: Bila hemû mîrên biaqil, zanayên sincmend, wêjevan û hozan û hişmendên xwedî wijdan werin dîwana min! Di demeke kin de hemû hatin dîwana şah û li hev kom bûn. Hesenê bazirgan jî di nava wan de rûnişt û di hizûra şah de çîrok ji wan re xwend. Gava ku lê guhdar kirin, şah û hemû guhdarên li wir şaşwaz û ecêbmayî man li xweşbûna wê çîroka balkêş. Hemûçkan zêr û zîv û gewher bi ser de barandin. Şah jî bedlek kincên xwe yên herî baş lê kir û bajarekî mezin tevlî sûr û keleh û gundên wî dan Hesenê bazirgan û ew wek mezintirîn wezîrê xwe destnîşan kir û li kêleka xwe ya rastê da rûniştandin. Fermanek jî da nivîskaran, ji bo ku wê çîrokê bi ava zêr binivîsin û têxin xizaneya wî ya taybet.

Êdî her ku bêhna şah teng dibû, gazî Hesenê Bazirgan dikir, ji bo ku wê çîrokê jê re bixwîne.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 764’AN

## ÇÎROKA ŞAH ASIM BIN SEFWAN Û WEZÎRÊ WÎ FARIS BIN SALIH

*Şehrezadê got:*

Tê gotin, ku di dem û dewranên berê de şahek li Misrê hebû, navê wî Asim Bin Sefwan bû. Şahekî biheybet, comerd û qelenderekî gewre bû. Gelek welat û bajar û sûr û keleh û artêş di bin destê wî de bûn. Wezîrekî wî jî hebû bi navê Faris Bin Salih. Ew şah û hemû xelkê xwe atêşperest bûn. Bîr û bawerîya xwe bi rojê dianîn.

Vêca ev şah kal bûbû, bêhêz bûbû. Temenê wî gihîştibû sed û heştê salî û hîna jî kordunde bû, zarokên wî tune bûn. Ji ber wê yekê jî xemgîn û şev û roj di nava kul û kederan de bû.

Rojekê gava ku di dîwanê de li ser textê xwe rûniştî bû, mîna her car dîsa mîr û emîr, wezîr û gizîr hemû yeko yeko derbasî cem wî bûn û her yekî ku derbas bû jî, bi destê kurekî xwe girtibû. Vê dîmenê bala şah kişand, dîsa kordundebûna wî hat bîra wî û ji ber wê rewşa xwe pir xemgîn bû. Di dilê xwe de got: “Hemû kêfxweş û şad in, bi zarokên xwe û ez jî bi vê kalbûna xwe hîna di nava vê tenêtîya kujer de me! Sibê ez bimirim jî wê ev text, ev mal û ev milk hemû bi xelkê bimîne, tu fêdeya van zêr, zîv û cewheran jî nagihîje min, ez ê bêm jibîrkirin, mîna ku ez nehatibim vê dinyayê.”

Şah asim serê xwe xist ber xwe û di nava van fikar û metirsîyan de kûr bû û pê de çû, heta ku girî û nalînê ew rapêça û waxewax pê ket. Wezîrê wî Faris sebirdar nêz dibû û xwe radigirt. Lê gava ku qîrîn û nalîna wî dîwan dagirt, nema xwe girt, ji şahê xwe re got: Heger tu sebeba vê yekê ji min re nebêjî, ez ê xwe li ber çavên te bikujim!

Bi wê tehdîda wezîr re, şah Asim serê xwe rakir, hêsirên xwe paqij kirin û ji wezîrê xwe re got: Ey wezîrê şîretvan, dev ji min berde, jixwe kul û derdên min besî min in! Wezîr got: Şahê gewre û mihrîban, sebeba vî girîyê te çi ye? Sebeba wê ji min re bibêje, belkî li ser destê min Xwedayê gewre derîyê xêrê ji te re veke!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 765'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku wezîrê wî wisa got, şah lê vegerand û got: Wezîrcan, ev girîyê min ne li ser mal û milkê dinyayê ye, ne jî li ser tiştekî din e. Lê tu jî dibînî, ku ez bûme kalepîrekî hezhizî û temenê min hatiye sed û heştê salî lê ne kurek ji min re çêbû û ne jî keçek. Gava ku ez bimirim jî, wê min veşêrin û piştre ez ê werim jibîrkirin, ne sûretekî min dimîne ne jî navekî min. Wê hinek xerîb werin li ser vî textê min rûnên û dest deynin ser hemû hebûna min a madî û manewî.

Wezîr jê re got: Ey şahê zemanan, ez bi sed salan ji te mezintir im û ez jî mîna te kordunde me, ne kurekî min heye ne jî keçeke min. Ez jî timî di nava kul û derdan de me û ez nizanim ez ê çi bikim. Gelo rêyek ji vî derdê me re heye? Ya rast min agahîyek derbarê Suleyman Bin Dawid de girtiye, ku xwedanekî wî yê mezin û hêzdar heye, qeweta wî digihîje hemû tiştan. Gelo ez diyarîyekê jê re bibim û herim xwe lê bigirim, ji bo ku bikeve navberê û ji Xwedayê xwe bixwaze, ku her yekî ji me kurekî bide me. Şah jê re got: Here cem Suleyman, bila daxwaza me bigihîne Xwedayê xwe.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 766'AN

*Şehrezadê got:*

Wezîr rabû karê xwe kir û berê xwe da cem Suleyman Bin Dawid. Di wê navberê de Xwedê teala wehîyek ji pêxemberê xwe Suleyman Bin Dawid re şand û jê re got: Ey Suleyman! Şahê Misrê wezîrê xwe şandiye cem te, li gel gelek diyarî û hedîyeyan. Tu jî wezîrê xwe Asef Binruxya bişîne pêşîya wî, bila wî bi rêzdarî pêşwazî bike. Gava ku hat ber destê te jî, jê re bibêje şahê te tu şandiye cem min, ji bo filan tiştî û daxwaza te jî filan tişt e, heger tu bawerîya xwe bi Xwedayê min bînî, wê daxwazên te pêk bên!

Çawa ku hezretî Suleyman ew wehî girt, di cî de ji wezîrê xwe Asif Binruxya re got: Xwe amade bike, li gel çend karmendan here pêşîya wezîrê şahê Misrê, wezîr Faris bi coş û rêzdarî wî pêşwazî bike, di seraya mêvandarîyê de.

Wezîr Suleyman Asif di cî de rabû ser xwe, amadekarîyên xwe kirin, xwarin û vexwarinên herî baş bi xwe re birin û li gel qefleyek karmend çû

pêşîya wezîr Faris. Bi germahîyeke mezin ew pêşwazî kir, qedr û qîmeta wî girt, xwarin û vexwarina herî xweş li ber wan danîn û gotin: Hûn bi xêr û xweşî hatine. Li ser seran û li ser çavan hatin, xwarina xwe bixwin, Xwedê hez bike wê daxwazên we pêk bên. Êdî bila dilê we aram be û giyanê we rihet be.

Wezîr Faris di dilê xwe de ji xwe re got: Gelo kê ew ji sebeba hatina me û daxwazên me agahdar kirine?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 767'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku mazûvanê wî wisa got, wezîr Faris lê vegerand û got: Ezbenî kê agahî daye we, derbarê mebesta hatina me de? Asif got: Mîrzayê min Suleyman em agahdar kirin. Faris got: Û kê mîrzayê we Suleyman agahfdar kir, ji meqseda me? Asif got: Xwedanê erd û asîmanan, Xwedanê hemû zindîyan ew agahdar kir. Faris got: Bêguman wê ev Xweda Xwedayekî pir mezin û hêzdar be! Asif got: Qey hûn xiroşê jê re nakin û bawerîya we pê nayê?

Wezîrê şahê Misrê, Faris got: Bawerîya me bi rojê tê û em ji wê re dikevin xiroşê. Asif lê vegerand û got: Ey wezîr Faris, roj jî ji gerestêrkeke ji gerestêrkên ku Xweda ew afirandine û ne gengaz e, ku ew bibe xweda -haşa! roj carinan dertê, carinan jî diçe ava, wenda dibe lê Xwedayê me herdem heye, wenda nabe û hêza wî digihîje her tiştî.

Piştre rabûn ji mêvanxaneyê derketin û berê xwe dan qesra şah Suleyman Bin Dawid. Di wê navberê de şah Suleyman jî ferman dabû hemû leşkerên xwe. Ji ins û cin û hemû ajalan ku sef bi sef têkevin rêzê, ji bo pêşwazîkirina wezîrê şahê Misrê. Hemû fîl, piling, şêr û wehşên deryayê, cur bi cur li ser du rêzan ketin rêzê. Hemû cin jî bi awayekî pêşdarî ku li ber çavan bên xuyakirin, ketin rêzê. Dîmeneke pir bi heybet derxistin holê. Hemû teyr û tilûran jî baskên xwe vekirin, di ser wan re ji wan re bûn sîwan û di nava xwe de bi hemû zimanan stran gotin.

Gava ku wezîrê şahê Misrê Faris û şandeya xwe gihîştin wir, tirsîyan ku di nava wê dêlindêzê re bimeşin. Asifê wezîr ji wan re got: Derbas bibin û di nava merasîmê de qet netirsin, hemû bendeyên hezretî Suleyman in, zirara wan nagihîje we.

Asif bi xwe jî ket nava wan û meşîya. Hemû endamên şandeya Misrê jî pê re meşîyan lê hîna jî bi tirs û saw bûn. Di encamê de rêûresma pêşwazî-

kirinê qedîya û şande derbasî qesra hezretî Suleyman bû, ew li mêvanxaneyê bi cih kirin, qedr û qîmeta wan girtin, xwarineke xweş dan ber wan û di pey re ew derbasî meqamê Suleyman Bin Dawid kirin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 768'AN

*Şehrezadê got:*

Gava şandeya Misrê derbasî cem Suleyman Bin Dawid bû, xwestin ku erda bin nigê wî ramûsin lê Suleyman nehişt û ji wan re got: Divê mirov ji Xwedayê xwe pê ve li hemberî tu kesî serê xwe netewîne. Kî ji we dixwaze li ser nigan bisekine, bila bisekine, kî dixwaze rûnê jî bila rûnê lê bila tu kes nekeve bin xizmeta min.

Wezîr Faris û hinek ji şandeya wî rûniştin, hinek ji wan jî li ser nigan man, ku ew biçûkên wan bûn. Di pey re xwarin û vexwarin danîn ber wan. Hemûçkan têr xwar û vexwar. Wê gavê şah Suleyman nû ji wezîrê Misrê pirsî, bê daxwaza wî çi ye û axaftina xwe berdewam kir, got: Metirse û fedî neke, hûn ji bo çi hatibin, ez ê daxwaza we pêk bînim. Lewre ez dizanim ku şahê Misrê Asim tu şandiye cem min, ji bo ku ez ji Xwedayê xwe bixwazim, ku kurekî bide te û wî. Ji ber ku hûn herdu jî kal û pîr bûne û hîna jî kordunde ne. Ne kurên we hene ne jî keçên we. Rojekê gava ku şahê we li dîwana xwe rûniştiye û hemû mîr û emîr û wezîrên wî yeko yeko derbasî dîwanê bûne û her yekî ji wan zarokekî xwe jî bi xwe re anîye wir, kul û kedereke mezin ketiye nava wî, pir xemgîn bûye û ji xwe re gotiye: Gava ku ez bimirim, wê kî were ser textê min û dest deyne ser ev qas mal û milkê min? Elbet wê yekî xerîb dest deyne ser gişî û dê navê min were jibîrkirin. Mîna ku ez qet çênebûbim. Bi wî awayî ketiye nav behra kul û derdan û li ser pir ponijîye, hetanî ku girîyaye û hêsiran di çavên wî re avêtine, kûrekûr pê ketiye, bûye qîrîn û nalîna wî û êdî te nema debar kiriye û te jê re gotiye, yan ji min re bibêje bê derdê te çi ye yan jî ez ê li ber çavên te xwe bikujim.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 769'AN

*Şehrezadê got:*

Piştî ku nebî Suleyman texmîna sebeba hatina wezîrê şahê misrê bi

wî şeklî jê re got, jê pirsî û got: Ev tiştên ku min ji te re gotin, rast in an na? Wezîr Faris matmayî û behetî mabû, li hemberî vê zanebûna nebî Suleyman. Bi kelecaneke mezin axivî û ji nebî Suleyman re got: Pêxemberê Xwedê! Gava ku ez û şahê xwe vê mijarê di nava xwe de diaxivîn, tu kes li cem me tune bû, me tu kes jî ji mijarê agahdar nekir, vêca tu bi Xwedê bikî ji min re bibêjî, bê kê tu agahdar kirî?

Suleyman Bin Dawid got: Xwedayê min ez agahdar kirim. Lewre ew e, yê ku dizane çi di dilan de veşartî ye û awirên xayîn ji kîjan çavan derdikevin!

Wê gavê Farisê wezîr got: Bêguman ev Xwedayê ku tu behsa wî dikî, Xwedayekî pir gewre, hêzdar, comerd û bexşîner e; dikare her tiştî bike.

Piştî wê gotina xwe wezîr faris û şandeya xwe giş derbasî ola rast, ola Suleyman Bin Dawid bûn.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 770'YÎ

*Şehrezadê got:*

Piştî ku wezîr faris û endamên şandeya wî giş derbasî ser ola hezretî Suleyman bûn. Hezretî Suleyman jê re got: Te gelek diyarî û cewher û yaqût û tiştên giranbuha ji min re anîne, ne wisa? Wezîr got: Erê. Suleyman got, min diyarîyên we giş qebûl kirin û ez jî wan didim te, bila ji te re bin. Çend rojekî li mêvanxaneya me bimînin û hebekî bêhna xwe berdin, bila dilê we aram be. Bi xêr û silamet ez ê sibê daxwaza we pêk bînim, bi izna xwedayê me gişan, afirînerê erd û ezmanan.

Hemû çûn li mêvanxaneyê raketin û roja din, wezîr Faris çû cem nebî Suleyman û jê re got: Ya pêxemberê Xwedê, te goribû, ez ê daxwaza we pêk bînim. Suleyman jê re got: Ey wezîr, gava ku tu vegerîyayî malê û te şahê xwe Asim dît, herdu bi hev re derkevin derve û herin serê filan darê û bêdeng li ser rûnên. Piştî nîvroyê di navbera herdu nimêjan de û gava ku dinya pir germ dibe, dakevin binîya darê û çavdêrîya derdora xwe bikin. Hûn ê bibînin, ku dê du ziyayên maran ji wir derdikevin, serê yekî mîna serê meymûnan e û serê yê din jî mîna serê efrîtekî ye. Hûn çawa wan bibînin, tîrên xwe di wan werkin, wan bikujin û bi qasî bihustekî ji hêla serî de û bihustekê jî ji hêla terîyê ve jêbikin û goştê mayî jî bipijînin û wî goştî bidin

jinên xwe, bila bixwin. Hûn jî wê êvarê bi wan re rakevin. Bi izna Xwedê dê herdu jî bi kuran ducanî bibin.

Piştre hezretî Suleyman hungulîskek, şûrek û boxçikek ku du qeftan tê de bûn, ku bi gewheran xemilandî bûn, da wan. Li wezîr Faris zivirî û jê re got: Vêca gava ku zarokên we mezin bibin, bibin zilam, her yekî ji wan qeftanekî ji wan qeftanan bidin wan. De va ye êdî daxwaza te pêk hat, bi izna Xwedayê dilovan û êdî tu dikarî vegerî welatê xwe bi xêr û selamet

Hezretî Suleyman hilmek kişand û berdewam kir. Divê tu zû vegerî malê, lewre şah Asim bi bêsebrî li hêvîya te ye û çavên wî şev û roj li rêya vegera te ne.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 771'AN

*Şehrezadê got:*

Roja dîtirkê wezîr Faris izna çûnê ji hezretî Suleyman xwest, herdu destên wî maçî kirin, xatir jê xwest û bi coş û şahî ew û hevalên xwe ketin rêya vegerê. Ji ber ku daxwaza wî pêk hatibû, kêfa wî li cî bû û dilê wî pir aram bû. Bi roj û şev meşîyan, bêyî ku navberê bidinê meşê, hetanî ku gihîştin welatê xwe, Misrê. Hinek xizmetkarên xwe, li pêşîya xwe şandin cem şah, ji bo ku mizgînîya xêrê û vegera wan bidin wî.

Gava ku şah asim bihîst, ku wezîrê wî bi saxî û selametî vegerîyaye û daxwaza wan pêk hatiye, ew, karmend û leşkerên wî tevde pir kêfxweş bûn. Nigên wan erd nedigirtin. Bi lez û bez derketin pêşwazîya wan.

Gava ku şah û wezîrê xwe li hev rast hatin, wezîr ji hespa xwe peya bû, çû erda bin nigê şahê xwe ramûsa û mizgînî dayê, ku daxwaza wî pêk hatiye. Jê xwest ku ew jî were ser ola hezretî Suleyman. Şah Asim jî ola xwe guhert û hat ser ola Suleyman Bin Dawid û ji wezîrê xwe re got: Here mala xwe, îşev bêhna xwe berde û hefteya li pêşîya me jî hem bêhna xwe berde hem here hemamê xwe bişo û westana rêwîtîyê ji ser xwe bavêje. Piştre were cem min, ez ê tiştekî ji te re bibêjim.

Wezîr rabû ser xwe, erda bin nigê wî maçî kir û çû mala xwe. Heşt rojan bêhna xwe veda, piştra dîsa berê xwe da dîwana şah, çû li cem rûnişt û çîroka xwe û nebû Suleyman bi berferehî jê re got. Piştre jê re got: Ka rabe em bi hev re herin hetanî cihekî.

Şah û wezîrê xwe herdu rabûn, her yekê jî wan tîr û kevanek rakir û bi tena serê xwe çûn, ser wê dara ku hezretî Suleyman ji wan re tarîf kiribû. Hetanî esirê li ser darê man, paşê daketin binî wê û li derdorê çavdêrî kirin, bala xwe danê ku du ziyayên maran ji bin qurmên darê derketin. Du marên spehî bûn û toqin zêrîn di stûyê wan de bûn. Şah Asim pir ji wan hez kir û ji wezîr re got: Wezîrcan, ev herdu mar jî bi toqên zêrîn in, çi tiştekî ecêb e! Ka em wan bigirin, wan bixin qefesan û ji xwe re li wan temaşe bikin.

Wezîr got: Ezbenî Xwedê teala ev mar ji me re şandine ji bo marîfet û fêdekarîya me, de ka êdî tu tîra xwe bavêje yekî û ez ê jî bavêjim yekî. Herduyan tîrên xwe avêtin û herduyan jî lêda. Herdu mar kuştin. Bihustek ji serî de û bihustek jî ji terîyê ve jêkirin û yê mayî jî birin malê. Li qesra şah gazî aşpêjan kirin û ew goştê maran teslîmî wan kirin û ji wan xwestin, ku baş bipijînin. Aşpêjan ew goşt xweş pehtin, biharat bi ser de kirin û xistin du sênîkan û anîn li ber destê şah û wezîrê wî danîn.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 772'YAN

*Şehrezadê got:*

Gava ku aşpêjan herdu sênîkên goştê pijandî danîn ber wan, şah rahişt sênîkekê, wezîrê wî jî rahişt ya din û ew birin dan jinên xwe û wê şevê bi jinên xwe re raketin. Bi vîna Xwedê û hêza wî, wê şevê herdu jinên wan jî ducanî bûn. Lê herduyan jî bi rastiya meseleyê nizanibûn. Xiltexilta di dilê şah de sê mehan berdewam kir. Di wan sê mehan de, şah heroj ji xwe re digot: "Gelo bi rastî jî wê jina min ducanî bibe û kurekî ji min re bîne?"

Piştî sê mehan, rojekê ji rojan, gava ku jina wî rûniştî bû, pitikê wê di zikê wê de livîya û wê jî tê derxist, ku ducanî bûye. Lewre mehdê wê xera bû û êşên wê çêbûn. Gazî serxizmetkarê xwe kir û jê re got: Here cem şah û ew li ku dibe bila bibe, jê re bibêje, ey şahê dewr û zemanan, mizgînîya min li te be, xatûna min ducanî bûye û pitika wê di zikê wê de livîyaye.

Serxizmetkar bi lez rabû çû cem şahê xwe, bala xwe dayê, ku bi tena serê xwe ye û destê xwe daye ber rûyê xwe, di nava fikaran de diponije. Bejna xwe li ber tewand, erda bin nigê wî maçî kir û mizgînî dayê.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 773'YAN

*Şehrezadê got:*

Gava ku şah Asim ew xebera xweş ji devê xizmetkarê xwe bihîst, ji guhên xwe bawer nekir! Ji kêfan rabû ser nigan û çû dest û enîya xizmetkarê xwe maçî kir û xiftanê xwe ji xwe kir, li wî kir, da wî. Dûre li kesên rûniştî zivirî û got: Kî ji we ji min hez dike, tiştekî bidin vî xizmetkarî! Hemûçkan alîkarî pê re kirin. Hinekan ji wan dirav danê, hinekan zêr û gewher hinekan jî hesp û deve yan jî sewalin din; hinekan erd û bax û baxçe dan wî xizmetkarî.

Di wê navberê de wezîrê wî Faris jî hat, derbasî dîwana wî bû û jê re got: Ey şahê dem û dewranan! Qasek berê ez bi tena serê xwe li malê rûniştî bûm û di nava kul û kederên xwe dekûr kûr diponijîm. Min ji xwe re got: Gelo xatûna min ducanî bûye an na? Di wê kêlîyê de xulamekî min hat cem min û mizgînî da min, got, jina te xatûn ducanî bûye û pitikê wê di zikê wê de dilive, rengê wê xera bûye û hemû elametên hemlê li ser xuya dikin! Ji kêfan hema çi li ser min hebû, min hemû dan wî û hezar dînar jî di ser re da û ew kir serxulamê xwe.

Piştî vê xebera xweş a din, şah Asim ji wezîrê xwe re got; Xwedê teala li me hat rehmê, em bexşandin, rêya ola rast nîşanî me da û em ji nav tarîtîyê derxistin, em gihandin ronahîyê û piştî vî temenê dirêj, zurîyetek jî da me, loma ez jî dixwazim, di vê roja xweş û watedar de ji kul û derdên mirovên derdnak re bibim derman û şahîyê bigihînim nav dilê wan jî! Wezîr got: Tu çi dixwazî, çawa dixwazî, wisa bike!

Şah gotê: Nexwe rabe hemû kesên di zindanan de berde, deynên deyndaran bide, gunehên gunehkaran bibexşîne û sê salan sax bacê ji gel nestîne. Li ber sûrên bajêr metbexeke pir mezin çêbike, aşpêjan tê de bi cih bike û hemû rengên beroş û niqrîyan bide ber destên wan. Bila bi şev û roj xwarinên cur be cur çêbikin, ji bo hemû xelkê bajêr û xelkê li derdora bajêr, dûr an nêzik, kî di vir re derbas bibe, bila ji wê xwarinê bixwin û bibin malên xwe, pê şa bibin. Ji xulaman re bibêje, bila bajêr gişî bixemilînin, dikandarî jî şev û roj dikanên xwe vekirî bihêlin, hetanî heft rojan

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 774'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku şah Asim ev ferman da wezîrê xwe, di cî de rabû ser xwe û ew fermanên wî pêk anîn. Seranserê bajêr bi sûr û bircên wî ve hemû xemilandin. Her kesî kinc û bergên xweşik li xwe kirin, şahîyeke dîrokî li dar xistin, xwarin û vexwarin li her kesî belav kirin. Di nava xêr û bêreke bêtimtêl de ku berdewam kir, heta ku jina şah welidî, di dawiya neh mehên hemla xwe de û kurek anî dinyayê, ku weke heyveke li çardehan bû. Şah navê wî kurê xwe kir Şûrê Şahan. Jina wezîr jî di heman rojê de hemla xwe danî û kurekî spehî jê re çêbû, wek çirayekê şewqdar bû. Wezîr jî navê kurê xwe kir zend.

Gava ku herdu zarok mezin bûn û ber bi ciwanîya xwe ve çûn, bala her kesî kişandin ser xwe. Her ku şah Asim li wan dinihêrî, pir kêfxweş û bextewar dibû. Gava ku herduyan bîstsalîya xwe kuta kirin, şah gazî wezîrê xwe kir û jê re got: Wezîrcan, tiştek ketiye bîra min, berîya ku ez wê pêk bînim, ez dixwazim bi te bişêwirim.

Wezîr lê vegerand û got: Çi ketibe bîra te, bike ezbenî, fikrên te pîroz in! Şah axaftina xwe berdewam kir û got: Wezîrcan, ez pir mezin û kal bûme, ji ber wê jî ez dixwazim xwe vekişînim koşeyekî, ji bo ku ez ji Xwedayê xwe re xiroşê bikim. Û ez şahîtî û desthilatdarîya xwe bispêrim kurê xwe, Şûrê Şahan. Lewre ew jî kamil bûye, di hiş û zanîn û edeb û mêrxasîya xwe de. Êdî xortekî şêrîn, kişîner û xwedî qalibekî giran e, baş dizane xelkê bi rê ve bibe, tu çi dibêjî?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 775'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku şah wisa got, wezîrê wî lê vegerand û got: Fikir û ramana herî baş ew e, ezbenî! Û heger ku tu yê wilo bikî, ez jî dixwazim weke te bikim û kurê xwe Zend li şûna xwe bikim wezîr. Lewre ew jî xortekî zana ye, ji hêla kesayetê ve jî qalibekî baş girtiye. Wê gavê dê herdu welat bi rê ve bibin û em ê jî ji wan re alîkar bin, rêya rast nîşanî wan bidin.

Şah Asim ji wezîrê xwe re got: Nexwe ji bo hemû war û wargehan, hemî sûr û kelehan, hemû bajarên di bin destê me de nameyan binivîsîne û ji hemû mîr û emîrên wan deran bixwaze, bila di filan rojê de werin vira û li Qada Fîl amade bin!

Wezîr Faris di cî de rabû ser xwe, name nivîsandin, qasid derxistin û ji

hemû mîr û karmend û xwedîyên keleh, sûr û bajaran re şand, ew agahdar kirin, ku di filan rojê de li heman cihî bicivin.

Gava ku ew roj hat jî, şah Asim ji xulam û xizmetkaran xwest, ku li nîvê heman qadê qubeyekê vegirin, der û dorê gişî bixemilînin û bi awayekî têkûz textê şah ê ku tenê di cejnan de li serê rûdinê, vegirin. Ew jî di cî de rabûn, ew fermanên wî pêk anîn. Emîr û wezîr û gizîr û hemû rêveberên welat, li gel leşker û xizmetkar û xulaman giş amade bûn.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 776'AN

*Şehrezadê got:*

Dema ku her kes amade bû û hazirî qedîyan, şah Asim ferman da, ku navê Xwedê were xwendin. Ji bo ku her kes rabe ser xwe û di meydanê de amade bibe. Navê Xwedê hat xwendin, emîr û wezîr û rêveberên keleh û sûr û herêman daketin meydanê, mîna her carê ketin xizmeta şah û her yekî li gorî pileya xwe di rêzê de cî girt. Piştre jî li gor payeya xwe hinek rûniştin û hinek li ser nigan man. Piştî ku xelk hemû li hev kom bû, şah ferman da, ku sifre were raxistin û xwarin were danîn. Xulaman ferman pêk anîn; her kesî têra xwe xwar, vexwar û ji şah re dua kirin. Şah ji serxulamê xwe xwest, ku bangî xelkê bike, ji bo ku kes neçe. Serxulam gazî kir û ji xelkê xwest ku tu kes ji wir neçe, da ku li axaftina şah guhdar bikin. Piştre perde rakirin û şah ji xelkê re axivî, got: Heçî ku ji min hez dike, bila bimîne û li axaftina min guhdar bike!

Piştî ku hemû tirsên xwe li dû xwe hiştin, mirov di nava aramîyê de dîsa hemû li cihê xwe rûniştin. Şah rabû ser nigan û ji wan xwest, ku tu kes ji cihê xwe ranebe. Piştre axivî û got: Gelî emîr, gizîr û serdaran, gelî biçûk û mezinan! Hûn jî dizanin, ku ev welat û ev postê şahîtîyê, min ji bav û kalên xwe mîras girtiye, ne wisa? Hemûçkan gotin: Belê! Em hemû bi vê dizanin. Şah axaftina xwe berdewam kir: Ez û we hemûyan ji rojê re diketin xiroşê û me bîr û bawerîya xwe bi agir dianî, hetanî demeke nêzik. Lê êdî Xwedayê gewre bawerîya rast ji me re şand û em ji nav zilûmatan derxistin, em xistin nava ronahîyê û rêya ola rast nîşanî me da. Êdî divê em giş bidin ser vê rêya rast. Ez jî bûme pîrekalekî mezin û hezhizîme. Êdî ez dixwazim li koşeyekî rûnêm û ji Xwedayê xwe re îbadetê bikim, da ku gunehên xwe yên

berê bidim efûkirin û kurê xwe Şûrê Şahan li şûna xwe bikim desthilatdar û şahê welat. Hûn jî baş dizanin, bê ev kurê min xortekî çiqas zana, jêhatî û aqilmend e, dadwer û mêrxas e. Loma ez dixwazim ku ez di vê kêlîyê de textê xwe dûrî wî bikim û li şûna xwe wî bikim şahê welat. Îcar di vê mijarê de hûn çi dibêjin? Hemû bi hev re rabûn û bejna xwe li ber wî tewandin û jê re gotin: Gotin û fermana te her tim li ser serê me ye, li ser çavên me ye, şahê me yê dilovan. Tu yî xwedan û parêzvanê me û tu çi bibêjî, ji bo me derbasdar e. Tu bendeyekî xwe jî li ser serê me bikî hikumdar, em ê qebûl bikin. Îcar çawa em yekî wek kurê te Şûrê Şahan qebûl nakin! Me ew qebûl e û dê her dem cihê wî li ser serê me hebe!

Û bi vê gotina wan re şah Asim Bin Sefwan ji ser textê xwe rabû û kurê xwe li şûna xwe da rûniştandin. Taca şahîtîyê jî ji ser serê xwe rakir, danî ser serê wî û pişteka şahîtîyê jî li newqa wî girêda û li tenişta kurê xwe rûnişt. Wezîr û mîr û gizîr û hemû karmendên dewletê jî rabûn ser xwe, hatin erda bin nigê wî ramûsan, destên wî maçî kirin û li ber destê wî sekinîn û di nava xwe de ji hev re gotin: Şahîtî layîqî wî ye û ji her kesî bêtir jî wî heq kiriye, ku li ser text rûnê. Piştre hemûyan bi hev re jê re dua kirin û hêvîya serkeftinê anîn ziman. Şûrê Şahan jî zêr û zîv li ser xelkê gişî belav kir.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 777'AN

*Şehrezadê got:*

Piştî ku xelkê gişî textê şahîtîyê li Şûrê Şahan pîroz kir û dua jê re kirin û piştî ku wî jî zêr û zîv wek diyarî li ser her kesî belav kir; wezîr Faris jî rabû ser xwe, erda bin nigê şah maçî kir, piştre jî li civatê zivirî û ji wan re got: Ey emîr û karmend û mezinên dewletê yên rêzdar! Hûn jî dizanin, ku wezîrtîya min ji şahîtîya şah Asim jî kevnartir e û wa ye wî niha textê xwe spart kurê xwe û tac xist serê wî. Ez jî postê wezîrtîya xwe didim destê kurê xwe Zend. Lewre ew jî êdî xortekî zana, comerd, wêrek û hêja ye. Dê bikaribe bi awayekî çêtir wezîrtîyê ji şah Şûrê Şahan re bike.

Piştî wê gotina xwe, wezîr Faris rabû ser xwe, şaşika wezîrtîyê ji serê xwe derxist, xist serê kurê xwe û pênûs û murekeba wezaretê jî danî ber wî. Xizmetkar û mîr û gizîran di nava xwe de gotin: Camêro ji her kesî bêtir wezîrtî heq dikir.

Di pey re şah Asim û wezîr Faris rabûn ser xwe, xezîne vekirin û diyarîyên giranbuha bi her cureyên xwe ve li ser emîr û gizîr û mezinên dewletê belav kirin, di pey re jî li ser xelkê gişî belav kirin û ji bo herduyan jî mehmiz hat diyarkirin. Şah bi navê Şûrê Şahan û wezîr jî bi navê Zendê kurê Faris hat binavkirin û ji bo wan merasîmên nû hatin lidarxistin. Mirovên ku hatibûn jî, hefteyekê sax li bajêr man, şahî li dar xistin, kêfa xwe kirin û piştre her kes çû mala xwe.

Piştre şah Asim kurê xwe Şûrê Şahan û kurê wezîrê xwe da gel xwe, bi hev re çûn qesrê, gazî xeznedar kir, jêre got: Here şûr, hungulîsk û boxçikê bîne! Di pey re jî li Şûrê Şahan û Zend vegerîya, ji wan re got: Kurên min, ka hûn herdu jî werin û her yek ji we ji xwe re diyarîyekê ji van diyarîyan hilbijêrin!

Destpêkê Şûrê Şahan destê xwe dirêjî wan kir, rahişt hungulîsk û boxçikê; Zend jî destê xwe avêt şûr û mihînê, piştre destê şah Asim maçî kirin û çûn malên xwe.

Şûrê Şahan boxçika xwe venekir û lê jî nenihêrî, avêt ber serê textê xwe yê razanê û ji bo razanê li gel Zend palda. Ji biçûkanîya xwe ve herdu wek du birayan mezin bûbûn û li ser heman textê razanê bi hev re jî radiketin.

Nîvê şevê Şûrê Şahan ji xew şiyar bû û dît, ku ew boxçik hîna li ber serê wî ye û mûmên li dora nivîna wan pêketî ne. Ji nişka ve tiştek ket bîra wî û ji xwe re got: "Gelo çi di vê boxçikê de ye, ku bavê min ew daye me?"

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 778'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku ew tişt ket bîra Şûrê Şahan, bi mereqdarîyewke mezin rahişt boxçikê û mûmeke pêketî, Zend di xew de hişt û ji ser textê razanê daket, boxçik danî ber xwe û ew vekir û lê nihêrî, dît ku qeftanekî giranbuha û neqişandî tê de ye. Gava ku qeftanê pêçayî ji hev vekir, nas kir, ku karê cinan e. Ji hundirê qeftan ve li ser betanê piştê, sûretê keçikekê bi zêr neqişandî bû. Ew qasî spehî bû, ku bi gotinan nedihat pesinandin. Hişê wî ji serê wî bir û ew dîn û har kir. Dil ket sûretê wê keçikê, ji eşqê mest bû. Li rûyê xwe da û girîya, heta ku ji ser hişê xwe ve çû û li erdê ket.

Zend pê hesîya, ji xewê şiyar bû, hat li ber serê wî rûnişt, ew şiyar kir û

jê re gotr: Ez hem wezîr û hem jî birayê te me û em bi hev re mezin bûne, îcar ku tu derd û razên xwe ji min re nebêjî, tu yê ji kê re bibêjî? Lê deng ji Şûrê Şahan derneket. Zend li ber wî gerîya, xwe avêt bextê wî û bi deh caran erda bin nigê wî maçî kir lê deng ji Şûrê Şahan derneket û berê xwe jî neda wî, tenê girîyê xwe berdewam kir.

Gava ku Zend pê re betilî û ji wê rewşa wî bêzar bû, rabû ser xwe, çû rahişt şûrê xwe, li ber wî sekinî, kezîyên porê xwe vekirin û bi ser singa xwe de berdan û jê re got: Binêre birawo, heger tu yê di vî halî de bimînî, ez nema dikarim li te binêrim û dilê min ranake, ez ê xwe bikujim, ji bo ku ez te di vî halî de nebînim!

Bi wê gotina Zend re Şûrê Şahan nû serê xwe rakir, li wezîrê xwe Zend nihêrî û jê re got: Birawo, wele min fedî kir, ku ji te re bibêjim û niha jî ez fedî dikim. Zend got: Tu bi qedrê XWedayê dilovan ê mehrîban bikî û bi xatirê pêxemberê wî bikî, tu yê fedî nekî û tu yê ji min re bibêjî, bê çi qewimîye û çi bi serê te hatiye? Jixwe ez bira û bende û wezîr û şîretkarê te me, çawa tu ji min re nabêjî?

Wê gavê Şûrê Şahan gazî wî kir û jê re got: Were li vî sûretî binêre! Zend çû cem wî û bi qasî saetekê bi hûrgilî li wî sûretî nihêrî. Bala xwe dayê ku bi lûlû û mercanan nivîsek di ser sûret re ye, tê de dibêje, “Ev sûretê xweşik ê keça Şemax kurê Şarox e; şahê Babîlê ye û ji cinîyan bawermend in, ên ku li bajarê Babîlê disekinin; di nava bîstan û baxçeyê Îrem ê kurê Ad ê mezin de dijîn.”

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 779’AN

## ÇÎROKA ŞÛRÊ ŞAHAN Û ZERÎYA ZÊRÎN

*Şehrezadê got:*

Dema ku wezîr Zend ew nivîsa li ser wî qeftanî xwend, ji şah Şûrê Şahan re got: Birawo, tu dizanî bê ev sûret ê kê ye? Şûrê Şahan got: Na wele ez nizanim, bê sûretê kê ye. Zend bi destê wî girt û jê re got: Nexwe were nêz bibe û vê nivîsa ku li ser taca wê ye, bixwîne. Şûrê Şahan hat, nivîsa ku li ser taca keçikê bû, xwend û têgihîşt bê ew kî ye. Çawa ku têgihîşt, axîneke ji dil pê ket û got: Ax!

Zend lê zivirî û got: Biracan, heke xwedîya vî wêneyî keçeke rasteqîn be û navê wê Zerîya Zêrîn be û hebûneke wê li ruyê erdê hebe –ku wisa ye- wê çaxê tu qet meraq neke û dev ji girî berde. Lewre ez ê di cî de herim wê ji te re bixwazim û tu yê jî bigihîjî miradê xwe. De êdî tu bi xatirê xwedê bikî, vî girîyê xwe bide sekinandin û sibehê gava ku roj derket û karmendên dewletê hatin dîwana te, ji wan bixwaze bila gazî hemû tacir, bazirgan, geştîyar, gerok û parsekan bikin, li ber destê te kom bikin û vî bajarê Babîlê ji wan bipirse, belkî ma hêvî Xwedê û hinek tiştekî derbarê wî bajarî de bizanibin û rêya Bîstanê Îrem nîşanî me bide.

Roja dîtirkê Şûrê Şahan çû dîwanê û li ser textê xwe rûnişt. Lê bê navber jî xeftanê li ser xwe maçî dikir, ji ber ku êdî kêlîyekê tenê jî debara wî bêyî wê nedibû. Wezîr û mîr û emîr û leşker û karmendên dewletê hemû hatin, li ber destê wî sekinîn; şah ji wezîrê xwe Zend re got: Ka ji wan re bibêje derûnîya şah xera bûye û ji ber nexweşînê şeva borî raneketiye. Wezîr rabû ser xwe û tiştê ku şah Şûrê Şahan jê re gotibû, ji wan re got.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 780'YÎ

*Şehrezadê got:*

Gava ku wezîr rewşa şah Şûrê Şahan ji civatê re ragihand, şah Asim bi wê agahîyê pir êşîya. Di cî de gazî hekîm û loqmanan kir û ew derbasî cem kurê xwe kirin. Hekîman lê nihêrtin, ew muayene kirin û ji bo wî derman nivîsandin. Şirûbên ku dê vexwariya, jê re diyar kirin. Wê dermankirina wî sê mehan berdewam kir lê encam negirt. Şah Asim bi ser hekîman de rabû, hêrs bû û ji wan re got: Kûçikino, qey hûn nikarin kurê min derman bikin! Heger hûn nikaribin wî derman bikin, ez ê niha li vir we gişan bikujim! Mezinê wan got: Ey şahê dem û dewranan, tu jî dizanî, ku em xerîban jî derman dikin, îcar em ê çawa mirovekî mîna kurê te hêja derman nekin ango sistanîyê di dermankirina wî de bikin! Lê belê kurê te bi nexweşîneke giran ketiye û heger tu bixwazî, em dikarin ji te re bibêjin û mijarê vekin!

Şah Asim israr kir û got: Nexwe ka ji min re bibêjin, bê nexweşîna kurê min çi ye? Serhekîm jê re got: Kurê te niha evîndar e û dil ketiye keçeke, ku rêya em xwe bigihînin wê, niha tune ye! Şah Asim got: Hûn ji ku fêr bûne, ku kurê min evîndar e? Eşq ji ku gihîşt kurê min? Hekîman got: Ji birayê wî wezîr Zend bipirse, ew bi rewşa wî baş dizane.

Şah Asim rabû ser xwe, çû odeya xelwetê û gazî Zend kir, jê re got: Bi rastî ji min re bibêje, bê nexweşîna birayê te çi ye? Zend got: Ez bi rastîya nexweşîna wî nizanim.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 781'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku Zend got, ez bi rastîya nexweşîna Şûrê Şahan nizanim. Şah Asim gazî celadê xwe kir û jê re got: Zend bibe, çavên wî girêbide û şûr li stûyê wî bide, serê wî bifirîne!

Zend pir tirsîya xwe avêt bextê şah û got: Ey şahê dem û dewranan, bext bidî min ez ê rastîyê bibêjim! Şah got: Bext ji te re û de ka êdî rastîyê bibêje. Zend got: A rast, kurê te aşiq e û evîndar e! Şah got: Û evîndara wî kî ye? Zend got: Keça şahekî cinan e, ku sûretê wê li ser betanê qeftanê ku hezretî Suleyman ji bo we kiribû diyarî ye, ew qeftanê di boxçikê de

Dema ku şah ew gotin ji Zend bihîstin, di cî de rabû ser xwe û çû cem kurê xwe Şûrê Şahan, jê re got: Kurê min, çi bi serê te hatiye û ew sûretê ku tu bûyî evîndarê xwedîyê wê kî ye?

Şûrê Şahan got: Bavocan, wele min ji te fedî kir, ku ez ji te re bibêjim û min nikaribû ji kesî din re jî behs bikira lê êdî va ye, tu fêrî rastîyê bûyî û êdî tu yê çawa min derman bikî, tu dizanî? Bavê wî jê re got: Û tu çareyê di ku de û di çi de dibînî? Piştre bêyî ku li benda bersiva wî bimîne, berdewam kir û got: Heger ew jî ji însanan bûya, keça kê bûya jî, me yê tevdîrek, rêyek jê re bidîta lê ew ji cinan e, ma kî dikare xwe bigihîne wê. Vêca xwe komî ser hev bike kurê min û rabe ser xwe, li hespa xwe siwar bibe û ji xwe re here seyd û nêçîrê, dê bêhna te derkeve.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 782'YAN

*Şehrezadê got:*

Bavê Şûrê Şahan şîretên xwe berdewam kirin û pê de çû, got: Belê kurê min, ji xwe re li kêf û zewqa xwe binihêre, bilîze, bixwe, vexwe û kul û derdan ji ser xwe bavêje, ez ê ji te re sed keçan ji keçên şah û sultanan bînim,

ma wê çi pêdivîya te bi keçên cin û perîyan hebe, ku ew ne ji cisnê me ne û hêza tu kesî nagihîje wan!

Kurê wî Şûrê Şahan got: Ez ji wê pê ve tu kesî naxwazim û ez dev jê bernadim! Bavê wî bi lomekarî got: Nexwe em ê çawa bikin, kurê min? Şûrê Şahan got: Hemû geştîyar, rêwî, gerok û bazirganan kom bike, ka ku em ji wan bipirsin. Belkî hinek ji wan bajarê Babîlê nas bikin û rêya Bîstanê Îrem nîşanî me bidin.

Şah Asim ferman da karmendên dewletê, ku hemû bazirgan, tacir, geştîyar û gerokên welat, qeptan û dervanên behran li qesrê kom bikin. Gava ku giş hatin, şah bajarê Babîlê û Bîstanê Îrem ji wan pirsî lê ne kesî ji wan nas kir û ne jî agahîyek der heqê wê de da. Gava ku civat belav bû, yekî ji wan got: Ey şahê dem û dewranan, heger tu bixwazî agahîyên derbarê wî bajarî de bigirî, here welatê Çînê. Çîn bajarekî mezin e, dibe ku hinek ji wan di vê mijarê de xwedî agahî bin.

Şûrê Şahan ji bavê xwe re got: Bavocan, ji min re kerwanekî amade bike, ez ê herim welatê çînê! Bavê wî got: Kurê min, tu li ser textê şahîtîyê bimîne û kar û barê welat û xelkê xwe bi rê ve bibe, ez ê herim Çînê û nasekî Babîlê bibînim! Şûrê Şahan got: Bavocan, ev kar min têkildar dike û ancax ez ji heq derkevim. Vêca heger tu iznê bidî min, ez dixwazim bi rê bikevim û demekê li derveyî welat bimînim! Heger min şopeke wê dît, baş e û heger min nedît jî, wê rêwîtî bêhna min derxîne û dilê min aram bike. Û heger Xwedê ez sitirandim û tiştek bi min nehat, jixwe ez ê bi saxî û selametî vegerim malê.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 783'YAN

*Şehrezadê got:*

Piştî wê helwesta wî, bavê wî bala xwe dayê, ku kurê wî ji ya xwe danakeve. Tu rê li pêşîya wî nemabûn, ji xeynî ku alîkarîya wî bike. Rabû izna çûnê da wî û çil keştî ji bo rêwîtîya wî dan amadekirin, li gel bîst hezar bende û xulaman. Dîsa têra wî mal û gewher û amûrên şer danê û jê re got: De êdî oxira te ya xêrê be kurê min, bi xêr û selamet here û were!

Av û xwarin jî têra xwe li keştîyan kirin, çek û cebilxane bi xwe re rakirin. Di dawîyê de jî xatir ji dê û bavê xwe xwest, ew û birayê xwe Zend ketin rê û çûn û hey çûn, heta ku gihîştin Çînê, Gava ku çînîyan bihîstin, çil keş-

tîyên tijî zilam û leşker û çek ber bi wan ve tên, gotin, belkî dijminên wan in û bi ser wan de girtine. Bi lez û bez derîyên bajarê xwe girtin û mencenîqên xwe amade dikirin. Dema ku ev agahî ji Şûrê Şahan re çû, du bendeyên xwe yên taybet şandin cem şahê Çînê, ji bo ku jê re bibêjin, kurê şah Asim, Şûrê Şahan bi mêvantî hatiye bajarê we, ji bo ger û seyranê, ne ji bo ku şerê we bike, heger hûn wî qebûl bikin, dê derbasî bajêr bibe û heger hûn wî qebûl nekin, ne we û ne jî bajarê we aciz dike, wê di cî de derbas bibe, here!

Dema ku herdu bende çûn cem şahê Çînê û ew peyama şahê xwe ji wî re gotin, derîyên bajarê Çînê ji wan re vekirin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 784'AN

*Şehrezadê got:*

Piştî wê peyama Şûrê Şahan, şahê Çînê Qaw Fwa derîyên bajarê xwe ji wî û artêşa wî re vekir. Lewre wî şah Asim nas dikir û dostanîya wan bi hev re hebû. Ji ber wê jî pêşwazîya Şûrê Şahan bi coş û germahîyeke mezin kirin û ew bi xwe jî derket pêşîya wan û ferman da xulam û bendeyan, ji bo ku ji mêvanên xwe re ziyafeteke baş amade bikin.

Şah Qaw Fwa bi coş şah Şûrê Şahan himbêz kir û jê re got: Tu bi ser seran û ser çavan hatiyî welatê min! Ez jî bendeyê te bavê te û bajarê min di xizmeta we de ye. Tu çi bixwazî, ez ê pêk bînim. Qaw Fwa, qedr û qîmetê mêvanên xwe baş girt, cihê manê da wan, xwarin û vexwarina herî baş da ber wan û hemû daxwazên wan pêk anîn. Şûrê Şahan û wezîrê xwe Zend, qedeh li hev xistin, kêfa xwe kirin, li qeraxên deryayê gerîyan, têra xwe temaşe kirin û bi qasî çil rojî li wir man, di nava mêvantîyeke bêtimtêl de. Di pey wî çil rojî re Qaw Fwa ji Şûrê Şahan re got: Îcar rewşa te çawa ye birazê, te welatê me eciband? Şûrê Şahan got: Xwedê hebûna we pirtir bike û vî welatî herdem bi te şanaz bike.

Qaw Fwa got: Ez texmîn dikim ku tu ji bo tiştekî hatiyî vira, gelo daxwaza te çi ye? Ez dixwazim pêk bînim. Şûrê Şahan jê re got: Çîroka min jî ecêb e! Ez dil ketime keçekê, ku min bi tenê sûretê wê dîtiye.

Dilê şahê Çînê pê şewitî û li ser halê wî girîya. Piştre serê xwe rakir û jê re got: Û tu niha çi ji min dixwazî?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 785'AN

*Şehrezadê got:*

Şûrê Şahan ji Qaw Fwa re got: Ez ji te dixwazim, ku tu temamê rêwîker, geştîyar, bazirgan û qeptanên deryayê li vir kom bikî, ji bo ku ez xwedîya vî sûretî ji wan bipirsim, belkî hinek ji wan xwedî agahî bin û tiştekî derbarê wê û welatê wê de ji min re bibêjin.

Şah Qaw Fwa ji cîgir û wezîr û karmendên xwe xwest, ku hemû geştîyar û gerok û qeptanên di welat de li wir kom bikin. Wan jî çûn hemû kom kirin û anîn ber destê wî. Şûrê Şahan, bajarê Babîlê û Bîstanê Îremê ji wan pirsî lê tu kesî bersiva wî neda. Şûrê Şahan matmayî û bêçare ma.

Bi derengî be jî, yekî deryavan rabû ser xwe, axivî û got: Şahê berêz, heger tu bixwazî agahîyan derbarê Babîlê de bigirî, divê tu herî giravên Hindistanê.

Wê gavê Şûrê Şahan ferman da wezîr û karmendên xwe, ji wan re got: Keştîyên me ji rêwîtîyê re amade bikin! Wan jî keştî amade kirin, av û erzaqên xwe lê bar kirin û herî dawîyê jî şah Şûrê Şahan û wezîrê xwe Zend xatir ji Qaw Fwa û civata wî xwestin û li keştîyên xwe siwar bûn, ketin rê. Rêwîtîya xwe ya di behrê de bi qasî çar mehan baş derbas kirin, ji ber ku ba xweş bû. Lê di roja piştî wan çar mehan de bayekî ecêb li wan rabû û tofaneke ecêb li wan rabû, ku keştîyên wan giş li bin guhên hev xistin. Hemû şikandin tevlî qeyîkan jî û hemû binav bûn. Tenê Şûrê Şahan û çend bendeyên xwe di qeyîkekê de filitîn, piştî ku ba sekinî, pêlên avê daketin û roj derket.

Şûrê Şahan çavên xwe vekirin, dît, ku ew û çend bende di qeyîkekê de ne û li derdora wan tiştek tune ye, ji xeynî ava behrê û azmanekî şîn! Ji bendeyên xwe re got: Kanî ew qas keştî û qeyîkên me û kanî birayê min zend? Bendeyan gotin: Şahê dem û dewranan, wele ji me pê ve tiştek nemaye, hemû binav bûn û ji masîyan re bûn êm!

Şûrê Şahan qîreke ecêb da û got: La hewle wela quwete îlahbîlah! Û bi hindikan li rûyê xwe da û xwest ku ew jî xwe bavêje nav avê. Lê bendeyan pêşîya wî girtin, nehiştin ku xwe bavêje behrê û jê re gotin: Şahê gewre, ma çi fêdeya mirinê heye û mirina te dê kîjanî ji wan vegerîne! Te wisa bi serê xwe kir û heger te bi ya bavê xwe bikira, tiştek ji van gişan nedihat serê te. Lê wisa xuya ye, ku hemû di qedera te de ji berê de nivîsandî bûn!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 786'AN

*Şehrezadê got:*

Bendeyên wî nehiştin ku Şûrê Şahan xwe bavêje avê û jê re gotin: Ev hemû ji berê de di qedera te de hatine nivîsandin. Lewre di dema çêbûna te de jî falbîn û stêrkzanan ji bavê te re gotibûn, wê ev kurê te zor û zehmetîyên mezin derbas bike, di jîyana xwe de. Lewre ji sebrê pê ve tu çare li pêşîya me tune ye, heta ku Xwedê rêyekê li pêşîya me veke!

Wê çaxê Şûrê Şahan got; La hewle wela quwete îlabîlah! Wisa xuya ye, ku em nikarin ji qedera xwe birevin! Piştre ket nava fikarên kûr û bi helbestî got:

şaşwaz û heyîrî mame bê Xwedê çi dixwaze ji min
ne diyar e ji ku tê her tijî tasewas e ew dilê min
sebirdar im her dê were zanîn ku sebirkêşê sebirkêşan im ez
sebrek jandar e ev ji agir û pêtan bêhtir dişewitim ez
ne ku çare ye ev rê û rêbaz ji bo vê bobelata serê min
lê belê rêya sereke bawerîya bi Xwedê ye ew e wekîlê min

Piştre di nava fikaran de kûrtir bû, hêsir ji çavan hatin xwarê û herî dawîyê jî bi wî halê xwe di xew re çû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 787'AN

*Şehrezadê got:*

Şûrê Şahan bi qasî saetekê di xew re çû û piştre şiyar bû, ji bendeyên xwe re got: Ka xwarinekê ji min re bînin! Bendeyan jê re xwarin û vexwarin anîn, danîn ber wî. Piştî ku têr xwar û vexwar, sifre ji ber wî rakirin. Qeyîka wan jî di behrê de her bi rê ve diçû lê bi ku ve diçûn, wan jî nizanibûn. Ba ji ku ve bihata, pêlan bi ku ve lêbidana, qeyîka wan jî bi wir ve diçû. Bi rojan meşa xwe di deryayê de bi wî hawayî berdewam kirin. Hetanî ku zad û qûtê wan qedîya. Lê dîsa jî ji meşê pê ve tiştek ji destê wan nedihat. Her ku diçû tîbûn û birçîbûnê ew bêhêz dixistin, ku ji ser hişê xwe çûn û qidûm di çakên wan de neman. Êdî metirsî û qeleqeke ecêb di nava gişan de peyde bûbû û nizanibûn wê çi bikin. Tam di wê kêlîyê de ji dûr ve giravekê ji wan ve xuya

kir. Berê bayê jî li wir bû, ew dan ber xwe û birin, hetanî ku gihîştin wê giravê. Li peraveke wê qeyîka xwe girêdan, yek tê de hiştin û yên din hemû jê peya bûn û li nava giravê gerîyan. Bala xwe danê ku giraveke şîn e, bi dar û ber e û ji hemû rengên gul û çîçek û fêkîyan lê hene. Têra xwe fêkî xwarin. Piştre li şexsekî rast hatin, ku perçeyek kincê reş xistibû bin xwe û li ser tehtekî rûniştibû û qefleyek ji zencîyan jî di xizmeta wî de bûn.

Ew qefleya zencîyan hatin, Şûrê Şahan û bendeyên wî birin cem qralê xwe, ew li ber destê wî dan sekinandin û jê re gotin: Me ev çûk di nava daristanê de dîtin! Qralê wan reşikan jî wê kêlîyê birçî bû. Hema du heb bendeyên Şûrê Şahan birin û goştê wan biraştin, xwarin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 788'AN

*Şehrezadê got:*

Dema ku qralê zencîyan du heb bendeyên Şûrê Şahan biraştin û ew xwarin, li ser xwe pir tirsîya û bi helbestî stra, got:

> bûyer û bobelat têne bi serê min de bê hesab
> geh wekhev in geh cuda ne geh dijbêrin ev ezab
> cur bi cur in kul û derdên min qey nîn e şerab

Gava ku qralê reşikan ev helbesta wî bihîst, ji pasevanên xwe re got: Dengê wan çûkan pir xweş e û awazên ku ji devê wan derdikevin, mirovan mest dikin. Min dengê van çûkan pir eciband, ez ji we dixwazim, ku hûn wan yeko yeko bixin qefesan.

Pasevanên qral rabûn, her yek ji wan xistin qefesekê û ew li ber serê qral daliqandin, da ku li dengê wan guhdar bike. Êdî şûrê Şahan û hemû bendeyên xwe di qefesan de dihatin girtin û reşikan jî xwarin û vexwarina wan dida wan. Ew jî saetekê digirîyan, yekê dikenîyan, yekê diaxivîn û yekê bêdeng diman.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 789'AN

*Şehrezadê got:*

Qralê reşikan pir şad û bextewar dibû, bi guhdarkirina dengê Şûrê Şahan û bendeyên wî, ku li ber çavên wî çûk bûn. Wan jî di nav wan qefesan de jîyana xwe berdewam dikir. Vêca keçeke wî qralî hebû, ku li giraveke din bi mêr bû. Rojekê bihîst, ku çûkên dengxweş li cem bavê wê hene. Qasidin şandin cem bavê xwe û çend heb ji wan çûkan jê xwestin. Bavê wê jî, Şûrê Şahan û sê heb bendeyên wî di nava qefesan de jê re şandin.

Gava ku qasidên wê lê vegerîyan, li gel wan her çar çûkan qefes danîn ber wê. Keça qral bi hûrgilî û baldarî li wan nihêrî, piştre ji xulamên xwe xwest, ku wan li ber serê wê dalqînin. Xulaman jî her çar qefes li ber serê wê daliqandin.

Şûrê Şahan şaşwaz û behetî mabû, li wê rewşa ku tê de bû. Kûr û dûr fikirî, rojên rabirdûyê yên ku ew di nava şahî û bextewarîyê de derbas dikirin, dihatin bîra wî, kizîn bi dilê wî diket. Her sê bendeyên wî jî, bê navber digirîyan. Keça qral jî digot qey ew ji xwe re distirên, bi wî dengê wan şa dibû.

Ji adeta keça wî qralî bû, gava ku hinek ji Misrê yan jî ji devereke din jê re dianîn û wê ew diecibandin, qedrê wan digirt û ji wan hez dikir. Vêca Xwedê teala ji Şûrê Şahan re li hev anî, ku keçikê ji wî jî hez kir. Lewre xortekî pir spehî û lihevhatî bû. Loma ji xizmetkarên xwe xwest, ku baş li wan binihêrin û qedrê wan bigirin.

Rojekê keçikê ew xewle kir û ji Şûrê Şahan xwest, ku pê re rakeve lê wî ew daxwaza wê red kir û jê re got: Xatûna min, ez mirovekî xerîb im, dildareke min heye, ku ez aşiqî wê me û ji wê pê ve ez bi kesî re ranakevim.

Keçik bi dilnazî li dora wî çû û hat, belaya xwe tê da û hewl da ku wî bikişîne nav tora daxwaz û arezûya xwe lê bi ser neket û Şûrê Şahan nehişt ku ew nêzî wî bibe, bi tu şiklan. Vê helwesta wî keçik aciz kir û hişt ku hêrsa wê çêbibe li hemberî wî û bendeyên wî. Rabû weke ceza ew kirin xizmeta xwe û ji wan xwest, ku av û ardû bikişînin. Wan jî ew karên wê kirin û çar salan bi wî hawayî berdewam kirin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 790'Î

*Şehrezadê got:*

Piştî çar salan ji wê xizmeta zor û zehmet, Şûrê Şahan nema xwe girt, qasidek şand cem keça qral û jê xwest ku êdî wan berde, ji bo ku ji wê ezî-

yetê rizgar bibin û bi rêya xwe de herin. Keça qral gazî wî kir û jê re got: Heger tu daxwaza min pêk bînî, ez ê te berdim û te ji wê ezîyetê rizgar bikim. Tu yê jî bi, saxî û selametî herî welatê xwe… Keçikê gelek tiştên din jî jê re gotin û hewl da ku dilê wî nerm bike lê kir û nekir Şûrê Şahan ji ser ya xwe de daneket û qebûl nekir, ku pê re rakeve. Keçik pir hêrs bû û careke din bera wî da ji cem xwe û ew da wan karên giran

Şûrê Şahan di nav wan karên giran de ma, xelkê wê giravê jî, ew weke çûkên keça qral dinasîn û kesî newêribî tehdahîyek li wan bikira yan jî têkilî wan bibûya. Keçikê jî êdî nema zêde guh dida wan û baş dizanibû, ku li ser wê giravê tiştek bi wan nayê. Sê çar rojan ew nedîtina jî, nema meraqa wan dikir. Ew jî bi dilê xwe diçûn û dihatin, li hawirdora giravê digerîyan, ji bo ku ji keçikê re êzingan kom bikin. Pênc salên din jî bi wî hawayî berdewam kirin.

Rojekê ji rojan, Şûrê Şahan û bendeyên xwe li qeraxa avê li gel hev rûniştin û li ser rewşa ku tê de bûn, ketin nîqaşê. Wê nîqaşa wan, dê û bav û birayê wî anîn bîra wî, jîyana wî ya bextewar a berê li ber çavên wî sêwirî û birînên wî yên ku qemûşk girtibûn, dîsa der bûn; êş û jana nava wî dîsa gur kir, hêsir ji çavên wî hatin xwarê.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 791'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku Şûrê Şahan girîya, bendeyên wî jî pê re girîyan û piştre jê re gotin: Ey şahê dem û dewranan, heta kîngê tu yê bigirî û tu jî dizanî, ku tu fêdeya girî ji vê mijarê re tune ye. Lewre Xwedê teala ev tişt di qedera me de nivîsîye û kes nikare ji qedera xwe bireve. Tu jî dizanî, ku ji sebrê pê ve tu tişt li pêşîya me tune ye. Xwedê ev bela bi serê me de anîye û yê ku vê belayê ji serê me bibe jî, ew e.

Şûrê Şahan ji wan re got: Birawo, em ê çawa xwe ji vê lanetê rizgar bikin? Wisa xuya dike, ku xelasa me jê tune ye. Heger Xwedê teala rêyeke xelasîyê nede ber me. Lê rêbazek hatiye bîra min, ez dibêjim, em dikarin bi wê rêbazê xwe ji vê lanetê rizgar bikin.

Bendeyan got: Ey şahê dem û dewranan, em çawa ji vê giravê derkevin, derdor tijî xûl û cinên ku mirovan dixwin in? Em herin ku derê em ê li wan

biqelibin. Ew ê jî yan me bixwin yan bigirin û dîsa vegerînin cihê berê. Wê çaxê jî wê hêrsa keça qral hîn dijwartir bibe, li hemberî me.

Şûrê Şahan got: Mereq nekin û netirsin, ez ê rêbazekê bibînim, belkî Xwedê teala me gişan ji vê dojehê rizgar bike. Bendeyan pirsîn: Çawa? Wî got: Em ê van darên dirêj bibirin û ji qaşilên wan jî werîsan çêbikin, wan pê girêbidin, ji xwe re kelekekê çêbikin, bavêjin deryayê û wê tijî fêkî bikin, bêrikan çêbikin û em ê lê siwar bibin, belkî em bi xelasê kevin. Ger Xwedê bayekî baş ji me re bişîne û me bavêje peravên Hindistanê, dê xelasîya me were.

Bendeyan gotin, ev fikir û ramaneke baş e û dilxweşîyeke mezin bi wan re çêbû, li gel hêvîya xelasê. Di cî de rabûn ser xwe û dest bi birîna daran kirin û ji qaşilên wan jî werîs hûnandin. Mehekê sax ew karê xwe berdewam kirin, bê navber. Her êvar jî hinek êzing bi xwe re dibirin ji metbexa keça qral re, ji bo ku tu gumanê ji wan neke.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 792'YAN

*Şehrezadê got:*

Piştî mehekê ji xebata giran, kelekeke bi qasî keştîyekê ji xwe re avakirin û ew daxistin nav deryayê û bi werîsekî ew girêdan, li peravekê. Piştre ew tijî av û fêkî kirin û di roıja dawîn de xwe bi dizî amade kirin û bêyî ku kesî bi xwe bihesînin, li keleka xwe siwar bûn, bêrên xwe kişandin û bi behrê de çûn.

Çar mehan meşa xwe bi vî hawayî berdewam kirin, di behrê de, bêyî ku bizanibin bi ku ve diçin. Piştî çar mehan av û xwarina wan qedîya û qet bi wan re nema. Ji nişka ve kef bi behrê ket û pêlên avê bi hewa ketin, mîna çiyayan. Cirnîsekî mîna ecêbekî lepekî xwe dirêjî keştîya wan kir, bendeyek bir û ew avêt zelûma xwe, ew daqurtand.

Dema ku Şûrê Şahan çav li wê dîmenê ket, êşeke dijwar ket dilê wî û bi saetan li ser wî bendeyê xwe girîya. Êdî ew û bendeyekî bi tenê mabûn. Herdu bi tirs ji cihê wî cirnisî dûr ketin û careke din meşa xwe berdewam kirin, heta ku rojekê ji rojan çiyayekî bilind derket pêşîya wan, ku mîna wêneyekî bi zikê ezman ve daliqandî xuya dikir. Pişt re girava ku çiya li ser bû, xuya kir û kêfa wan hat, ji nû ve xwîn di laşê wan de gerîya. Bi hêvîyeke nû bêrên

xwe li avê dan û berê xwe dan wê giravê. Di wan kêlîyan de careke din pêlên avê rabûn û cirnis careke din serê xwe rakir, lepê xwe avêt bendeyê wî yê mayî, ew jî daqurtand. Êdî şûrê Şahan bi tenê mabû. Bi zor û heft belayan xwe gihand giravê û derket ser bejahîya wê. Bi wî çiyayî ve hilkişîya, çû serê gir û li derdora xwe nihêrî, daristanek dît. Berê xwe da wê daristanê û di nava daran re meşîya, heta ku li fêkîyan rast hat. Têra xwe fêkî xwar. Piştre dît, ku bi qasî bîst meymûnan li ser wan daran in. Her meymûnek bi qasî qantirekê bû. Tirseke mezin xistin nava wî. Meymûn ji ser daran daketin û ew dorpêç kirin. Dûre hinan ji wan dan pêşîya wî û bi îşaretan jê xwestin, ku bide dû wan. Wî jî da pey wan û çûn, hetanî ku gihîştin keleheke bilind û xweşik. Derbasî wê kelehê bûn. Şûrê Şahan bala xwe dayê, ku tijî zêr, zîv, cewher û madenên giranbuha ne, ku nayên pesindan. Xortekî zirav û dirêj jî li wir bû, ku mû bi laşê wî ve tune bûn. Çawa ku Şûrê Şahan çav lê ket, hedanek ket nava wî û wensa wî pê hat.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 793'YAN

*Şehrezadê got:*

Çawa ku Şûrê Şahan çav li wî xortî ket, hedana wî hat û tirsa nava wî vemirî. Tu nabêjî di wê kelehê de ew xort bi xwe jî bi tena serê xwe ye. Çawa ku çav li Şûrê Şahan ket, ew pir eciband û kêfa wî jê re hat. Jê re got: Navê te çi ye? Tu ji kîjan welatî yî û te çawa xwe gihandîye vira? Tiştekî ji min veneşêre û her tiştî ji min re bibêje!

Şûrê Şahan lê vegerand û got: Bi Xwedê ez bi daxwaza xwe nehatime vira û meqseda min jî ne vira bû. Ez cih bi cih ji xwe re digerim, da ku ez bigihîjim daxwaza xwe yan jî devereke ku ez lê bimirim.

Xortê zirav li meymûnekê zivirî û îşaret da wî, meymûn jî çû derket û piştî saetekê bi şûn de vegerîya, li gel gelek meymûnên din ên bi pêşmalkên hevrîşîmî girêdayî û di destê wan de jî sênîkên xwarin û vexwarinê. Sifreya xwarinê raxistin û bi qasî sed sênîyên zîv û zêr li ser danîn, ku xwarinên cur bi cur tê de bûn. Piştre hemû meymûn li ber destê wî xortî sekinî man, mîna xizmetkarên ku li ber destê şahê xwe bin.

Dûre xort îşaretek da wan, hemû meymûn rûniştin, tenê yên di xizmetê de li ser nigan man, li ber destê wî xortî. Piştî ku têr xwarin û vexwarin, sifre

rakirin û ji wan re teşt û misînên zêr anîn, ji bo ku destên xwe bişon. Dûre jî bi qasî çil şerbikên meyê ji wan re anîn. Têra xwe vexwarin, kêfa xwe kirin, wextekî baş derbas kirin, bi temaşekirina reqsa meymûnan. Di nava wê hengameya kêfê de Şûrê Şahan bi xwe jî derd û kulên xwe ji bîr kirin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 794'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku êvar hat û tarî ket erdê, mûmdank pêxistin, ku hemû ji zêr û zîv bûn û sepetên fêkîyan anîn, li ber wan li pey hev rêz kirin. Hemûçkan têr fêkî xwarin û piştre gava ku wextê razênê hat jî, doşekên xwe danîn û ji xwe re raketin. Roja dinê xortê zirav bi sibehê re mîna her car rabû ser xwe û çû Şûrê Şahan jî ji xew şiyar kir, jê re got: Ka serê xwe di şibakê re derxîne û bibîne, bê çi li derve heye. Şûrê Şahan nêrî, bala xwe dayê, ku erd û ezman bûye meymûn! Ne pêşîya wan xuya dikir û ne jî dawîya wan; ew qas meymûn li hev kom bûbûn, ku ji Xwedê pê ve tu kesî nikaribû ew bijimartina. Deşt û berî tijî meymûn bûbûn. Şûrê Şahan li xort zivirî û jê re got: Vê sibeha hanê ev qas meymûn çima li vir kom bûne? Xort lê vegerand û got: Ev adeta wan e, hemû meymûnên di vê giravê de li vir kom bûne. Hinek ji wan meşa du sê rojan hatine. Her roja şemîyê li vir kom dibin û li benda min dimînin, heta ku ez ji xewê rabim û di vê şibakê re serê xwe ji wan re dirêj bikim. Wê gavê erda li ber min maçî dikin û ji hev belav dibin, her kes diçe ser karê xwe.

Xort rabû serê xwe di şibakê re derxist. Meymûnan jî çawa ku ew dîtin, erd maçî kirin û her yekî berê xwe da karê xwe, ji hev belav bûn.

Şûrê Şahan mehekê sax li ber wê şibakeyê rûnişt, li derve temaşe kir. Piştre izna çûnê ji xortê zirav xwest. Ji bo ku biçe, xort îzin dayê û gazî sed dused meymûnî kir, ji bo ku bi wî re herin û di rêwîtîya wî de alîkarîya wî bikin. Meymûn pê re çûn, heft rojan meşîyan, heta ku gihîştin dawîya rêzegiravên xwe û piştre vegerîyan cihê xwe. Şûrê Şahan jî rêwîtîya xwe bi tenê berdewam kir. Çol û beyar qut kirin, çiya û zinar derbas kirin, geh birçî ma û geh jî pelên daran û giha xwar, geh tî bû û geh ava kanîyan vexwar, geh betilî û nig pê ve neman, ku bimeşe û geh bi lez çû. Wê meşa zor û zehmet çar mehan sax berdewam kir. Pir poşman bû, ku ji cem wî xortî veqetîya û

ket rê. Heta ku xwest bi şûn de lê vegere lê ji nişka ve rewrewkin li ber çavên wî çêbûn, dît ku sîwaneyek ber bi wî ve tê. Di dilê xwe de ji xwe re got: "Gelo ev sîya bajarekî reş e yan tiştekî din e?"

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 795'AN

*Şehrezadê got:*

Şûrê Şahan ji wê reşahîyê tirsîya lê dîsa jî bi şûn de venegerîya û di dilê xwe de got: "Çi dibe bila bibe, dîsa jî divê ez binêrim, ev sîlwet a çi ye!" û ber bi wê ve çû. Gava ku gihîşt nêzî wê, dît ku qesreke weke ecêbekê ye û li ser hîmin qewîn hatiye lêkirin. Tu nabêjî ew qesr, qesra ku kurê Nûh (Silavên Xwedê li wî bin) Yafes ava kiriye ye. Xwedê teala di Qurana xwe ya pîroz de jî behsa heman qesrê kiriye û gotiye, "Bîreke bêkêr û qesreke li ser nigan." Şûrê Şahan çû di devê derîyê qesrê de rûnişt û ji xwe re got: "Gelo ji şah û emîran kî di hundirê vê qesrê de ye? Gelo hundirê wê çawa ye? Xelkê wê ji insan in an ji cinan in? Gelo wê kî rastîya vê qesrê ji min re bibêje."

Bi qasî saetekê di nava van fikir û xeyalên xwe de çû û hat, ma li benda liv û tevgerekê lê tu kes neçû û nehat. Rabû ser xwe û ew bi serê xwe derbasî hundirê qesrê bû. Heft hêwan derbas kirin, dîsa jî li kesî rast nehat. Piştî wan heft hêwanan, li hêla rastê, rastî sê derîyan hat, ku yekî perde pê de kirî li pêşîya wan hebû û wî jî çû xwe li wî derîyî girt. Perde bi destê xwe da alî û derbas bû, bala xwe dayê, ku hêwaneke pir mezin û bi hevrîşim raxistî ye. Di zikê wê de jî textekî ji zêr hebû û keçeke weke heyvekê jî li ser wî textî rûniştî bû. Kincên keybanûyan lê bûn û mîna keçeke ku di şeva daweta xwe de be, di nava xeml û xêzeke bêtimtêl de dibiriqand. Li jêra textê wê jî sifreyek raxistî bû, ku bêtirî çil rengên xwarinên xweş di sênîyên zêr û zîv de li ser danandî bûn.

Şûrê Şahan çawa ku ew dît, xwe lê girt û silavek da wê. Wê jî silava wî girt û jê pirsî: Tu ji insanan î yan ji cinan î? Ewî got: Ez ji bijarteyên insanan im, ez kurê şahekî me. Keçikê got: Va ye xwarin li ber te ye, ka destpêkê bixwe û piştre çîroka xwe ji serî hetanî binî ji min re vebêje, da ku ez bizanibim, bê tu çawa gihîştiyî vira.

Şûrê Şahan li ser sifreya xwarinê rûnişt, lewre pir birçî bû û têra xwe xwar û vexwar. Dûre destên xwe şûştin û derket ser textê wê û li kêleka ke-

çikê rûniştin. Keçikê got: Navê te çi ye û tu ji ku hatiyî? Wî got: Ez Şûrê Şahan im û çîroka min pir dirêj e.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 796'AN

*Şehrezadê got:*

Keçikê pirsa xwe dubare kir û got: Tu ji ku yî? Tu çima hati,yî vira û meqseda te çi ye? Şûrê Şahan got: Ka tu ji min re bibêje, bê navê te çi ye? Kê tu anîye vira û çima tu bi tena serê xwe li ser vî textî yî?

Keçikê got: Navê min Dewlet Xatûn e, ez keça şahê Hindistanê me û bavê min li bajarê Serendîbê rûdinê. Bîstanekî bavê min heye, ku pir xweşik û pir mezin e, ku di seranserê welat de bîstanekî mîna wî tune ye. Vêca rojekê ji rojan, ez û çend qerwaşên xwe ketin nava wî bîstanî û ji xwe re gerîyan hetanî ku em çûn ser goleke avê û di nava wî bîstanî de bû û pir mezin bû. Em ji xwe re ketin nav avê û em bi hev re leyîstin. Lê carekê ji nişka ve hew min dît, tiştekî mîna ewrekî tenik bi ser min de daket û ez ji nava qerwaşan revandim, birim. Ez bi hewa xistibûm û bê navber ji min re digot: "Dewlet Xatûn, metirse û bila dilê te aram be!"

Bi firê ez birim û piştî demeke kurt ez li vê qesrê daxistim erdê û di cî de zivirî xortekî spehî, lihevhatî û cilpaqij. Ji min re got: Tu min nas dikî? Min jî jê re got: Na ezbenî, ez te nas nakim. Wî berdewam kir û got: Ez kurê Şahê Şîn im, bavê min cinî ye, li Keleha Qulzum dimîne û di bin destên wî de şeşsed hezar cinên firek û yên soberîkar hene. Rojekê ez rêwî bûm û gava ku ez di rêya xwe de diçûm, ez li te rast hatim, evîna te ket dilê min, min jî tu ji nava qerwaşên te revandî û min tu anîyî vê qesrê, ku ew mala min e û tu kes nikare xwe bigihînê, ne ji insan ne ji cinan. Lewra meşa ji Hindistanê hetanî vira, meşa sed û bîst salan e. Êdî qet nexe bîra xwe, ku tu rojekê ji rojan dê û bavê xwe bibînî. Li vê derê li cem min, dilaram û rihet rûnê. Çi pêdivîyên te hebin jî, ez ê wan ji te re bînim.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 797'AN

*Şehrezadê got:*

Keçikê vegotina çîroka xwe ji Şûrê Şahan re berdewam kir: Piştre ez hembêz û maç kirim. Axaftina xwe berdewam kir, got: Li vê derê rûnê û ji tiştekî netirse. Piştre dev ji min berda û çû bi qasî saetekê ma, dûre bi şûn de hat û ev sifre, text, doşek, perde û zînet hemû anîn lê li cem min nema. Tenê rojên sêşeman tê, dixwe, vedixwe, min hembêz û maçî dike û dîsa diçe. Hetanî niha jî tiştek bi min nekiriye û ez hîna keç im, mîna berê. Bavê min Taca Şahan heta roja îro jî, ne agahîyek ji min re şand ne ez li şopeke wî rast hatim. Çîroka min ev e lê gelo çîroka te çawa ye?

Şûrê Şahan got: Çîrok û serpêhatîya min pir dirêj e, ez ditirsim, ku vegotina wê pir zeman bixwe û ew cinîyê mêrê te bi ser me de were. Keçikê got: Berîya ku tu derbasî cem min bibî bi saetekê derket, çû, heta sêşema bê nayê. Vêca rûnê û bila dilê te aram be, çîroka xwe jî bi hûrgilî û bi berfirehî ji min re bibêje.

Şûrê Şahan serpêhatîya xwe ji serî de jê re got. Gava ku gihîşt Zerîya Zêrîn û behsa wê jê re kir, herdu çavên wê tijî hêsir bûn, kelogirî bû û got: Çima te gumanên min vala derxistin, ey Zerîya Zêrîn! Ax ji destê Zerîya Zêrîn û ji destê dewranê! Qey ez nayêm bîra te û tu nabêjî xwîşka min Dewlet Xatûn bi ku ve çû?

Girîyê xwe berdewam kir, hêsir barandin û pir xemgîn bû. Ji ber ku Zerîya Zêrîn ew ji bîr kiribû. Şûrê Şahan jê re got: Dewlet Xatûn, tu insî yî û ew cinî ye, îcar çawa hûn dibin xwîşkên hev?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 798'AN

*Şehrezadê got:*

Dewlet xatûnê ji Şûrê Şahan re got: Em xwîşkên hev ên şîr in û ew jî çîroka wê heye. Lewre dema ku diya min min tîne dinyayê, di nav bîstan de ye. Di heman demê de weke lihevrasthatinekê diya Zerîya Zêrîn jî li nav bîstan e û di heman kêlîyan de diwelide, wê tîne dinyayê. Çend heb qerwaşên xwe dişîne cem diya min, hinek xwarin û pêdivîyên zayînê jê dixwaze. Diya min jî pêdivîyên wê jê re dişîne û wê diezimîne cem xwe. Ew jî radihêje Zerîya Zêrîn û tê cem diya min û bi qasî du mehan li cem diya min dimîne. Di wan du mehan de, diya min şîr dide Zerîya Zêrîn û bi wî hawayî em dibin xwîşkên hev. Piştî wan herdu mehan diya wê tiştekî dide

diya min, jê re dibêje: “Kengê pêdivîya te bi min çêbû, gazî min bike, ez ê bêm nava bîstan.” û xatir jê dixwaze, diçe welatê xwe. Îcar diya wê her sal dihat cem me, Zerîya Zêrîn jî bi xwe re dianî, hinekî diman, piştre vedigerîyan welatê xwe.

Îcar Şûrê Şahan niha ez li cem diya xwe bûma, li welatê xwe bûma û tu bihatayî cem me, mîna her car min ê hîle li diya xwe bikira û tu bigihandayî miradê te.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 799’AN

*Şehrezadê got:*

Dewlet Xatûnê ji Şûrê Şahan re got: Hehger ez li malê li cem diya xwe bûma, min ê miradê te pêk bianîya lê li vê derê hayê wan ji min tune ye û tu agahîya min jî ji wan tune ye û mixabin ez jî nikarim tiştekî bikim. Heger bizanibûna ku ez li vir im, wê bikaribûna ez rizgar bikirima. Lê êdî qedera min maye di destê Xwedê de, ma ez dikarim çi bikim?

Şûrê Şahan lê vegerand û got: Ka rabe bi min re were, em ji vir birevin, Xwedê me bibe ku derê em herin wê derê. Keçikê got: Em nikarin birevin. Ji ber ku em salekê jî bimeşin jî ew melûnê han dikare di saetekê de xwe bigihîne me û me bikuje. Şûrê Şahan got: Nexwe ez ê xwe di cihekî de veşêrim û gava ku hat, ez ê şûrekî lêbidim, wî bikujim. Keçikê got: Heta ku tu ruhê wî nekujî, tu nikarî bedena wî bikujî. Şûrê Şsahan got: Ruhê wî li ku derê ye? Keçikê got min gelek caran jê pirsî û gelekî jî israr kir lê bersiv neda min. Heta carekê gava ku min pir israr kir, hêrs bû, qeherî û ji min re got: Tu çima pirsa ruhê min ji min dikî? Sebeb çi ye? Min jî jê re got: Hatimo, ji te pê ve tu kesî min nemaye, ez qurban! Heta ku ez sax bim, ez ê ruhê te hembêz bikim û di himbêza ruhê te de bimînim, loma ez dixwazim, ruhê te bibînim û wî di nîvê çavê xwe de bi cih bikim. Lewre bê ruhê te tu wate ji jîyana min re namîne, ji ber wê ez dixwazim ruhê te bibînim!

Piştî wê gotina min, ji min re got: Gava ku ez hatime dinyayê, falbîn û stêrnasan gotiye, wê kuştina te li ser destê yekî/e insî be, yekî ji şahên wan be. Min jî ruhê xwe bir, ew xist qutîkekê û ew qutîk jî xist nava heft qutîkan, piştre ew jî xist nava heft sindoqan û ew sindoq jî xistin nava tabûtekî ji mermer û noqî bin ava vê deryaya li kêleka me kir. Ji ber ku ew

hêla avê pir dûrî insanan e, kes nikare xwe bigihîne vir. Ev jî bila sir û raza neqeba me be.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 800'Î

*Şehrezadê got:*

Dewlet Xatûnê vegotina serpêhatîya xwe ji Şûrê Şahan re berdewam kir: Ji min re got, bila ev raza neqeba me be. Min jî jê re got: Jixwe ji xeynî te kesekî ku were cem min tune ye, îcar ez ê ji kê re behs bikim! Halbûkî te ruhê xwe xistiye cihekî ew qasî asê, ku tu kes nikare xwe bigihînê, îcar çawa wê yekî insî xwe bigihînê? Tiştekî ne gengaz e. Lê em ferz bikin, ku Xwedê neke tiştekî ku falbînan gotiye, pêk jî were, ma kî ji insanan dikare xwe bigihîne vir? Wî jî got: Yekî ku hungulîska Suleyman Bin Dawid pê re be, dibe ku karibe xwe bigihîne vir û hngulîska xwe deyne ser rûyê avê û bêje: "Bi heqê navên pîroz, ruhê filan kesî ji min re derxîne!" wê tabûta ruhê min derkeve û ew ê jî mermer û sindoq û qutîkan bişikêne û çûkê ruhê min jê derxîne û wî bifetisîne.

Gava ku keçikê wilo got, Şûrê Şahan bi coş qîrîya û got: Nexwe ew kurê şahan ê ku cinî behsa wî dike, ez im. Lewre hungulîska Suleyman Bin Dawid va ye, di destê min de ye! De êdî zû rabe, em herin qeraxa behrê!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 801'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku Şûrê Şahan ji Dewlet Xatûnê re got, rabe min bibe wê perava ku tu behs dikî, da ku em bibînin, da ew cinî rast dibêje yan derewan dike. Keçik rabû, da pêşîya wî û herduyan berê xwe dan ser behrê. Dema ku hatin wê devera ku wê digot, Dewlet Xatûn li qeraxa avê sekinî û Şûrê Şahan jî ket nava avê û pê de çû. Li cihekî sekinî, destê xwe danî ser rûyê avê û got: Bi heqê vê hungulîskê nav û tilsimên wê yê pîroz û bi heqê pêxemberê Xwedê, Suleyman Bin Dawid (Silavên Xwedê lê bin) ez dixwazim, ku tu ruhê kurê Şahê Şîn ê Cinî derxî!

Bi wê gotina wî re ava behrê kelîya, pêlên avê bilind bûn û tabûta mermer a xortê cinî derket ser ruyê avê. Şûrê Şahan rahiştê û ew ji avê derxist.

Piştre li tehtan da, ew şikand, sidoq jê derxistin, ew jî şikandin, qutîkên hundirê wan derxistin û qutîkên di hundirê hev de jî yeko yeko şikandin û çûk ji qutîka dawîn derxist. Berê xwe dan qesrê û çûn li ser textê xwe rûniştin. Di cî de ecac û bahozek rabû û çûkekî ecêb ji nav derket û qîrîya got: Min nekuje kurê şahan, min nekuje û min bike bendeyê xwe, tu çi bixwazî ez ê ji te re pêk bînim.

Dewlet Xatûnê ji Şûrê Şahan re got: Cinî hat, de êdî wê çûkê bikuje, ji bo ku ew melûn derbasî qesrê nebe û çûkê ji destê te nerevîne û te nekuje. Jixwe te bikuje, wê min jî bikuje!

Şûrê Şahan çûk fetisand û cinî bi xwe jî pê re mir û li erdê ket, bû komek xwelî. Dewlet Xatûnê got: Em ji nav lepên wî melûnî rizgar bûn, îcar em çawa bikin gelo?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 802'YAN

*Şehrezadê got:*

Dema ku Dewlet Xatûnê ew pirs jê kir, Şûrê Şahan got: Wê Xwedê teala rêyekê bide ber me. Wî em di vê azmûnê re derbas kirine û wê ew alîkarîya me bike, ji bo xelasê jî.

Piştre Şûrê Şahan rabû ser xwe û bi qasî neh deh derîyên qesrê ji ber xistin, ku hemû jî textê sendelê bûn û tijî bizmarên zêr û zîv bûn. Hinek şerîtên ji hevrîşim û benên ji qinebê jî anîn û derî hemû dan ber hev û bi hev ve girêdan. Piştre Dewlet Xatûnê jî alîkarîya wî kir û keleka ku çêkiribûn, birin ser behrê û avêtin nava avê, werîsê wê jî bi darên li qeraxa avê ve girêdan û di pey re dîsa vegerîyan qesrê. Hemû perçeyên zîv û zêr, hemû yaqût û gewherên li wir komî ser hev kirin û çi tiştên di qesrê de hebûn, yên ku sivik û buha bûn, rakirin û ew birin, xistin keleka xwe. Têra xwe xwarin û av jî rakirin û ew û ew jî lê siwar bûn, tewkelîya xw bi Xwedê anîn û werîsên xwe vekirin, bêrên xwe li avê dan û ketin rê, bi behrê de çûn. Bi qasî çar mehan bi behrê de meşîyan, heta ku qûtê wan qedîya. Gava ku nan û ava wan xelas bû, tengav bûn û kul û derdên wan pir bûn. Lave ji Xwedayê xwe kirin, ku rê û çareserîyekê nîşanî wan bide.

Îcar di meşê de Şûrê Şahan û dewlet Xatûnê di dema xewê de şûr dixistin neqeba xwe û pişta xwe didan hev. Gava bi ser de diqulibî, şûr diket

navbera wan. Vêca şevekê dîsa gava wisa pişta xwe dabûn hev û Şûrê Şahan raketî bû, dewlet Xatûn şiyar bû, keleka wan çû ber benderekê û nêzî bejahîyê bû. Li wê benderê jî keştî hebûn. Dewlet Xatûnê li hêla wan keştîyan nihêrî, bala xwe dayê, ku qeptanek bi serqeptan re diaxive, pê derxist, ku ew bender bendera bajarekî ye.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 803'YAN

*Şehrezadê got:*

Gava ku Dewlet Xatûnê têgihîşt ku ew bender ya bajarekî ye, pir şa û kêfxweş bû û bi coş Şûrê Şahan ji xewê şiyar kir û jê re got: Rabe ji serqeptanê vir bipirse, bê ev bender a kîjan bajarî ye û navê şahê vî bajarî çi ye?

Serqeptan bi hêrs lê vegerand û got: Ey rûkundirê rihgijokî, madem tu ne navê vê benderê dizanî û ne jî navê vî bajarî, tu çawa hatî vira? Şûrê Şahan got: Ez xerîb im û ez siwarî keştîyeke ticaretê bûm lê keştîya me şikest û bi hemû rêwîyan ve binav bû. Min tenê xwe bi textekî girt û ez rizgar bûm, hatim, heta ku di vir re derketim û min pirsek ji te kir, ma pirs jî eyb e?!

Serqeptan got: Ev bendera hanê, bendera Kemîna Deryayê ye û navê vî bajarî jî, Amarîyê ye. Çawa ku ev deng çû Dewlet Xatûnê, kêfa wê hat û dilê wê bi coş lêda, got: Şikir ji Xwedê re! Şûrê Şahan jî lê zivirî û got: Çi ye, xêr e? Dewlet Xatûnê got: Ez mizgînîya xelasîyê didim te, şahê vî bajarî apê min e!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 804'AN

*Şehrezadê got:*

Dewlet Xatûnê ji Şûrê Şahan re got: Hele ji serqeptan bipirse. Bêje gelo sultanê vî bajarî gewretirîn şahê şahan e? Şûr ew pirsa xatûnê jê kir. Serqeptan hêrs bû û bi dengekî bilind jê re got: Tu dibêjî ez xerîb im û di emrê xwe de nehatime vir, îcar tu çawa şahê vî bajarî nas dikî?

Bi vê pirsa wî ya dawîn re Dewlet Xatûnê serqeptan nas kir, ku navê wî Mûînedîn bû û serqeptanê kewştîyên bavê wê bû. Ew jî bi wendebûna wê re derketibû lê digerîya û hatibû hetanî wî bajarê apê wê û ji Şûrê Şahan re got: Jê re bibêje, ey serqeptan Mûînedîn, were bi xatûna xwe re biaxive!

Şûrê Şahan gazî wî kir û ew gotina wê jê re got: Serqeptan qehirî û hêrs bû, lê vegerand û got: Sehê heram, tu ji ku min nas dikî!

Piştre li keştîvanên xwe zivirî û ji hinekan ji wan re got: Ka şiveke hêzeran bidin min, ez ê herim serê vî bêoxirî bipelixînim! Şiva hêzeran ji destê keştîvan girt û berê xwe da keleka Şûrê Şahan. Gava ku gihîşt cem kelekê û li wan tiştên pir xweşik nihêrî, devê wî ji hev ma. Awirên xwe li ser gerandin û bi çavê kirînê lê nihêrî, Dewlet Xatûna ku mîna heyvekê diçirisand, nas kir û bi şaşwazî got: Kî li cem te ye? Şûrê Şahan got: Keçeke bi navê Dewlet Xatûn e! Bi vê gotina wî re serqeptan ji ser hişê xwe çû, got rep û li erdê ket.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 805'AN

*Şehrezadê got:*

Serqeptan xatûna xwe nas kir û ji ber şoqa şahîya xwe ji ser hişê xwe çû. Dema ku bi ser hişê xwe ve hat û rabû ser xwe jî, bi lez ji keştîyê peya bû û ber bi bajar de bazda, çû ber qesra şah û ji dergevan re got, ji min re destûrê ji şah bixwaze, ji bo ku ez derbasî cem wî bibim!

Dergevan derbasî cem şah bû û jê re got: Serqeptanê te Mûînedîn dixwaze were mizgînîyekê bide te! Şah detûra wî da, Mûînedîn derbas bû, erda ber nigên wî maçî kir û jê re got: Şahê min ê dilovan, mizgînîya min li te, keça birayê te, Dewlet Xatûn hatiye vir, gihîştiye bajêr û bi xêr û selamet e. Xortekî wek heyvê jî li gel wê ye!

Gava ku şah ev agahîya xweş a derbarê keça birayê xwe de girt, pir kêfxweş û şad bû. Mizgînîya serqeptan da wî û di cî de ferman da karmendên xwe, ku bajar bixemilînin, ji ber vê bûyerê û çend leşker û karmend şandin dû wê jî. Ew û Şûrê Şahan anîn dîwana wî. Silaveke germ li wan kir û xêrhatina wan kir. Piştre qasidek şand cem birayê xwe û ew agahdar kir, bi dîtina keça wî û selameta wê.

Bavê wê Taca Şahan jî çawa ku ew xebera xweş bihîst, leşker û karmendên xwe civandin, amadekarîya xwe kirin û ketin rê. Berê xwe da bajarê birayê xwe, gewretirînê şahan. Gava ku gihîşt wir, keça xwe dît, bi bêrîkirineke mezin ew himbêz kir. Taca Şahan bi qasî hefteyekê di mêvantîya birayê xwe de ma. Piştre keça xwe û Şûrê Şahan bi xwe re rakirin û dîsa vegerîyan paytexta xwe Serendîbê.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 806'AN

*Şehrezadê got:*

Dema ku vegerîyan Serendîbê, Dewlet Xatûnê û diya xwe ji nû ve gihîştin hev, piştî veqetîneke pir bi êş têra xwe herdu maçî kirin, himbêz kirin. Wê rojê şahîyeke ew qas mezin li dar xistin, ku tu kesî şahîyên wisa nedîtibûn.

Taca Şahan, qedrê Şûrê Şahan girt û jê re got: Te qencîyeke mezin bi min û keça min kir, ku ez nikarim vê qencîya te li te vegerînîm. Lê belê ez dixwazim, ku tu li şûna min rûnêyî, li ser vî textê şahîtîya Hindistanê û tu vî welatî bi rê ve bibî, Lewre ez dixwazim, ne tenê şahîtîya xwe, hemû xezîne, bende, qerwaş û mal û milkên xwe wekî diyarî bidim te.

Bi vê gotina şah re, Şûrê Şahan rabû ser xwe, erda bin nigê wî maçî kir, spasîya xwe jê re kir û got: Ey şahê dem û dewranan! Ez wan diyarîyên te hemûçkan qebûl dikim û ez bi xwe jî wan dîsa diyarî te dikim. Lewre ez ne mal û milk û xezîneyan dixwazim ne jî şahîtîya welatan. Ez tenê ji Xwedayê xwe dixwazim, ku min bigihîne meqseda min.

Şahê Hindistanê lê vegerand û got: Xezîneya min giş li ber destê te ye ey Şûrê Şahan, tu çiqasî dixwazî, bibe bêyî ku tu bi min bişêwirî! Xwedê xêra te binivîsîne û qencîya te li te vegerîne!

Şûrê Şahan got: Xwedê destê şahê me xurtir û maldartir bike lê tu daxwaza mal bi min re tune ye. Tenê ez dixwazim ji xwe re li vî bajarî bigerim û li kolanên wê temaşe bikim.

Taca Şahan ferman da xizmetkarên xwe, ji bo ku hespekî baş jê re bînin û zînekî baş bavêjin ser pişta wî, rişmeyeke baş bixin stûyê wî.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 807'AN

*Şehrezadê got:*

Çawa ku hespek jê re amade kirin, Şûrê Şahan lê siwar bû û di nav kolanên bajêr de gerîya, çi tiştê balkêş ê ku derket pêşîya wî, ji xwe re lê temaşe kir. Hîna ku ew wisa ji xwe re li nava sûkê digerîya, xortekî ku qeftanê xwe dabû ber bazarê, bala wî kişand. Xort pir dişibîya bira û wezîrê wî Zend. Qeftanek di destê xwe de girtibû û dixwest, ku bi pazdeh dînaran bifiroşe.

Ber bi wî ve çû, bi hûrgilî lê nihêrî, bala xwe dayê, ku ew bi xwe ye. Tenê perîşan xuya dikir. Ji ber zor û zehmetîyên rêwîtîyeke ku di rûyê wî de xuya dikir û rengê wî hatibû guhertin. Lê belê dîsa dilê wî baş neketibû cî, bê ka bi rastî jî ew e yan na. Ji alîkarên kêleka xwe xwest, ku wî bibin cem wî û wî li wê derê ragirin, hetanî ku ew vegere malê. Wan jî çûn ew girtin û ew birin zindanê, gotin belkî bendeyekî wî yê revîyayî be.

Şûrê Şahan jî piştî geşt û seyraneke li nava bajêr, vegerîya qesra xwe û birayê xwe ji bîr kir. Xizmetkaran jî ew nanîn bîra wî. Zend jî di zindanê de ma û gava ku roja dîtirkê mîna her carê girtîyên zindanê birin karê lêkirinê, Zend jî bi wan re birin. Zend jî bi zindanîyan re xebitî, bi qasî mehekê û ket halekî xerab. Kincên wî peritîbûn û di nava gemarê de mabû. Şaşwaz û bêçare bû. Bi navber ji xwe dipirsî: Sebeba girtina min çi ye gelo?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 808'AN

*Şehrezadê got:*

Zend di nava wê zorî û zehmetîyê de bû, bêyî ku sebeba wê bizanibe. Şûrê Şahan jî di nava kêf û şahîyê de bû û bi derdora xwe re mijûl dibû.

Rojekê gava wisa mîna her car rûniştî bû, ji nişka ve birayê wî Zend hat bîra wî û ji wan xizmetkarên ku ew biribûn zindanê pirsî, got: Ka ew xortê ku wê roja hanê min ji we re got, wî bînin malê? Xizmetkar behetî man û gotin: "Qey te negotibû, wî bigirin, bibin zindanê?" Şûrê Şahan bi hêrs got: Min ji we re gotibû wî bibin qesra min, min negotibû wî bibin hepsê! De rabin, zû herin wî bînin!

Çûn ew anîn, Zend hîn girtî bû. Li wê derê qeyd û zincîrên wî vekirin û birin ber destê Şûrê Şahan, jê pirsî û got: Tu ji kîjan welatî yî, xorto? Wî got ez ji Misrê me û navê min Zend e û ez kurê Farisê wezîr im.

Çawa ku Şûrê Şahan ev gotin ji devê wî bihîstin, ji ser textê xwe rabû, xwe çeng kir himbêza wî, destên xwe lê pêçan, ji kêfa dilê xwe re girîya û got: Birayê min Zend! Şikir ji Xwedê re ku hîna tu sax î û şikir ji Xwedê re ku va ye dîsa em gihandin hev! Ez jî birayê te Şûrê Şahan im, kurê şah Asim im!

Bi wê gotina wî re Zend jî ew nas kir û careke din bi germahîya bêrîkirineke mezin hevdu maçî kirin û bi hev re girîyan, hêsrên wan tevlihev bûn. Mirovên li dora wan jî behetîmayî li wan dinihêrîn.

Şûrê Şahan ferman da xizmetkaran û ji wan re got: Zend bibin hemamê, wî baş bişon û piştre kincin giranbuha û spehî lê bikin û wî bînin vira! Wan jî çûn fermana wî pêk anîn û ew anîn ser text, li kêleka wî dan rûniştandin.

Gava ku saloxa wê mizgînîya xweş ji Taca Şahan re çû, ew jî pir pê kêfxweş bû û hat cem wan, li kêleka wan rûnişt û her sê bi hev re ketin nava guftûgoyeke hûr û dûr, serpêhatîyên xwe bi berfirehî ji wî re gotin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 809'AN

*Şehrezadê got:*

Di nava wê guftûgoya wan de Zend ji birayê xwe Şûrê Şahan re got: Gava ku keştîya me şiikest û binav bû, ez û çend bendeyan, me xwe bi texteyekî mezin ve girt û em lê siwar bûn. Bi qasî mehekê em li ser pişta wî textî man û bayê ji cîyekî em avêtin cihekî din, hetanî ku Xwedê ji me re li hev anî û em avêtin ser giravekê. Em ketin nava daran û me ji fêkîyên wê xwar, hetanî ku em têr bûn, lewre em pir birçî bûbûn. Hîna ku em di nava wê mijûlahîyê de bûn, me dît ku ji nişka ve mirovinê wek efrîtan dora me girtine û êrîşî ser me dikin û xwe davêjin ser pişta me, li me siwar dibin! Rabû me ji hev re got: Wisa xuya dike, ku vana dê me bixwin jî! Xwedê alîkarê me be!

Li gel ku ew bi qasî dused mirovan bûn, dîsa jî me ji hev re got: Heger em wan serxweş bixin, em ê bikaribin wan bikujin û zora wan bibin. Me dest pê kir û totikên serîyan tijî mey kir û da wan. Wan got: Ev tehl e! Me got: Hûn çawa dibêjin, ku ev tehl e? Yê ku wisa bibêje û deh caran jê venexwe, wê di heman rojê de bimire! Ew jî ji mirinê tirsîyan û ji me re gotin: Kanî deh caran bidin me! Gava ku deh caran vexwarin, serxweş ketin, sistopisto bûn, ji hêza xwe ketin. Me jî bi destê wan girt, ew kişkişandin cihekî. Piştre jî me hejikên dêlîyên tirî li dora wan kom kirin, hinek jî avêtin ser wan û me agir berda wan û em li bendê man, bê çi bi serê wan bê.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 810'AN

*Şehrezadê got:*

Zend vegotina serpêhatîya xwe berdewam kir û got: Îcar me agir pêxist û em bi şûn de vekişîyan, me ji dûr ve li wan efrîtan nêrî. Piştî ku agir vemirî, em çûn ser wan, me dît ku hemû bûne xwelî. Me spasîyên xwe ji Xwedê re pêşkêş kir, ku em ji wê talûkeyê rizgar kirin.

Piştre me da qeraxa peravê û em ji hev û din belav bûn. Ez û du heb bende, me meşa xwe berdewam kir, hetanî ku em gihîştin nava daristanekê û em li darên fêkîyan rast hatin. Em bi xwarina fêkîyan mijûl bûn û ji nişka ve me dît, ku mirovekî dirêj, bi rih û du guhên dirêj û bi du çavên ku agir ji wan diçû, derket pêşîya me. Piştre me fêm kir, ku ew ne bi tenê ye û hinekên din jî pê re hene, kerîyek pez dane pêşîya xwe û pez diçêrînin. Çawa ku em dîtin, Kêfa wî hat û rûyê wî geş bû, mîna ku mizgînîyek girtibe, got: Hûn bi xêr hatin, ser seran hatin, ser çavan hatin, kerem bikin, werin cem min, ji bo ku ez ji we re mihekê serjê bikim! Me jî got: Cihê te li ku ye gelo? Got: Nêzikî vî çiyayî ye, hema ber pê de herin, hûn ê şikeftekê bibînin, herin bikevin wê şikeftê, jixwe gelek mêvanên din jî li wir in, ew jî mîna we ne, li ba wan rûnên, hetanî ku ez xwarinê amade bikim.

Me jî got qey rast dibêje. Em bi wî alîyî de çûn û em ketin şikeftê. Me dît, ku mêvanên li wir hemî kor in.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 811'AN

*Şehrezadê got:*

Zend vegotina serpêhatîya xwe berdewam kir: Em ketin şikeftê, me dît, ku mêvanên li wê derê hemû kor in. Em çawa çûn cem wan, yekî ji wan got: Ez nexweş im, yekî digot: Ez jihevketî me. Me jî got: Sebebê vê jihevketina we çi ye û hûn kî ne? Me got, em mêvan in. Wan got: Kê hûn xistin destê van melûnan? Xwedê we ji destê zaliman bisitirîne! Evê ku hûn girtine, efrîtek e, goştê mirovan dixwe. Wî em kor kirine, ji bo ku goştê me bixwe.

Rabû me ji wan re got: Wî efrîtî hûn çawa kor kirin? Wan got: Wê niha we jî kor bikin, mîna me! Me got: Çawa? Gotin: Wê ji we re tasikên çeqilmastê bîne û bibêje, hûn rêwî ne û pir westîyane, ka vê çeqilmastê vexwin, ji bo ku hûn bi ser xwe ve bên. Îcar heger hûn wî mastî vexwin, wê weke me li we bê.

Wê çaxê min di dilê xwe de ji xwe re got: "Ez hîleyekê nekim, xerlasîya

min tune ye!” Rabû, min koncalek di erdê de kola û ez li ber wê rûniştim. Saetekê bi şûnde ew efrîtê melûn hat, derbasî cem me bû û tasikên çeqilmastê jî di destê wî de bûn. Her yekî ji me tasikek çeqilmast da me û ji me re got: Hûn ji rêyeke dûr de hatine û hûn pir westîyayî ne, vê çeqilmastê vexwin, ji bo ku hûn tîbûna xwe bişikênin û hebekî bi ser xwe ve bên. Di, vê navberê de jî wê goştê mihê were biraştin.

Min rahişt tasika xwe û ew bir ber devê xwe lê min ew ber bi jêr ve rijand wê koncala ber xwe.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 812'AN

*Şehrezadê got:*

Zend vegotina serpêhatîya xwe ji Şûrê Şahan û şahê Hindistanê Taca Şahan re berdewam kir û got: Min tasika xwe rijand kortala ber xwe û ser wê girt. Piştre min destê xwe avêt çavên xwe û min qîr kir, got: “Ax çavên min çûn, ez kor bûm!” û bû wêlewêla min, ez girîyam û min li xwe da. Ew jî dikenîya û digot: Netirse!” Lê herdu hevalên min çeqilmasta xwe vexwarin û kor bûn.

Çawa ku ew ji hundirê şikeftê derket, ez çûm cem wî zilamê ku şîreta ewil li me kiribû û min jê pirsî, got: Gelo mirov çawa dikare bi vî zilamî re here serî? Zilam got: Li wê kewara di ser me re binêre, şûrek tê de heye, rahêje wî şûrî û gava ku hat, şûrekî li newqa wî bide, wê di cî de bimire.

Ez çûm, min ew şûr ji kewarê derxist û gava ku li me vegerîya, min şûrek li newqa wî da, ew kir du qetan. Efrît bi min de qîrîya û got: Mago, madem te dixwest ku tu min bikujî, hema te derbeke din jî li min bida!

Min da xwe ku ez derbeke din jî lê bidim lê wî şîretvanê min ê ewilî gazî min kir û got: Cara duduyan lê nede, heger tu derba duduyan lê bidî, wê dîsa bi ser xwe ve bê û dê me gişan bikuje!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 813'AN

*Şehrezadê got:*

Zend berdewam kir: Gava ku wî şîretvanê min wisa got, min derba duduyan lêneda û efrît jî mir. Şîretvan got: De ka rabe derîyê şikeftê ji me re veke û rê bide me, em herin, belkî em ji vê dojehê rizgar bibin û Xwedê alîkarîya me bike! Min lê vegerand û got: Metirse, êdî talûke ji ser me rabûye!

Piştre em rabûn ser xwe, me hinek fêkî û xwarin ji wê giravê kom kir û em çûn, li keştîyê siwar bûn û me xwe bi ber bayê ve berda. Sê rojan meşa me baş berdewam kir lê paşê berê bayê guherî, ewrên tarî li hev kom bûn, şewqa rojê girtin û firtoneyek rabû, bêje ya star! Her ku me dît, bayê keştîya me li bin guhê tehtekî di bin avê de xist, keştî şikest û ji hev belawela bû lê Xwedê ji min re li hev anî, ku textekî keştîyê ket destê min û ez lê siwar bûm û bi ketina bayê re jî min du rojan meşa xwe ya di avê de berdewam kir, hetanî ku ez gihîştim bejahîyê, bi saxî û selametîyê. Di pey re jî ez hatim vî bajarî û ez bûm xerîbekî bi tenê, feqîr û belengaz, min nizanibû, ku ez ê çi bikim, çawa bikim. Ez westîyayî, birçî û jihevketî daketim sûka bajêr. Min ew qeftanê xwe ji xwe kir û ji xwe re got: "Ez ê wî bifiroşim û bi heqê wî pêdivîyên xwe pêk bînim, heta ku ka wê Xwedê çawa bike" Îcar min qeftan xist destê xwe û da ber bazarê. Mirov jî li, min hatin hev û xirîdaran buhayê wî li hevdu zêde kirin, hetanî ku tu hatî û te emir da xulamên xwe, ku min bibin qesrê. Lê wan ez birim zindanê û te jî ez ji bîr kirim, hetanî ku ez dîsa hatim bîra te û te ez ji wir xelas kirim. Şikir ji Xwedê re ku em bi saxî û selametî, careke din gihîştin hev.

Gava ku Şûrê Şahan û bavê Dewlet Xatûnê, Taca Şahan ev serpêhatîya Zend guhdar kirin, pir şaşwaz û ecêbmayî man. Di heman demê de pir kêfxweş û şad jî bûn, bi xelasîya wî.

Bavê Dewlet Xatûnê, Taca Şahan cihekî pir xweş ji Şûrê Şahan û Zend re veqetand û Dewlet Xatûn jî êdî bi hêsanî dihat cem Şûrê Şahan û spasdarîya xwe nîşanî wî dida, ji ber wê qencîya ku pê kiribû û nedihat jibîrkirin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 814'AN

*Şehrezadê got:*

Rojekê Dewlet Xatûnê dîsa çû serdana Şûrê Şahan, Zend jê re got: Şahbanûya gewre, tiştê ku ji te tê xwestin, ew e ku tu alîkarîya wî bikî, ji bo ku bigihîje meqseda xwe. Wê jî lê vegerand û got: Belê ez ê alîkarîya wî bikim,

ji bo ku bigihîje meqseda xwe û înşelah dê bi ser bikeve! Li Şûrê Şahan zivirî û axaftina xwe berdewam kir: Bila dilê te aram be, misoger tu yê bigihîjî miradê xwe!

Îcar em vegerin ser Zerîya Zêrîn. Wê jî bihîst ku xwîşka wê Dewlet Xatûn vegerîyaye mala bavê xwe, bi saxî û selametî. Di dilê xwe de ji xwe re got: “Bêguman divê ez herim serdana wê û dilxweşîyekê jê re bixwazim, piştî wê bobelata ku bi serê wê de hat!” Xeml û xêza xwe li xwe kir û rabû çû cem wê. Şahbanû Dewlet Xatûnê bi germahî ew pêşwazî kir. Hevdu hembêz kirin û bi bêrîkirin hevdu maçî kirin. Piştre li hev rûniştin û ketin nav sohbetê. Zerîya Zêrîn ji Dewlet Xatûnê re got: Çi bi serê te hat, li wê xerîbîyê? Dewlet Xatûnê got: Xwîşkêcan qet nepirse, tenê Xwedê dizane bê afirîndeyên wî çiqas êş û ezab dikişînin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 815’AN

*Şehrezadê got:*

Dewlet Xatûnê got, mepirse lê Zerîya Zêrîn got: Ew çawa? Dewlet Xatûnê berdewam kir: Xwîşkêcan, ez di qesra kurê Şahê Şîn de bûm û pê de çû, çîroka xwe ji serî hetanî binî jê re got. Çi hatibû serê wê, çiqas zor û zehmetî kişandibûn, hatina Şûrê Şahan a qesrê û wî çawa kurê Şahê Şîn kuştibû, çawa derî ji ber qesrê kiribûn û kelek çêkiribûn, lê siwar bûbûn û bi çi hawayî vegerîyabû malê, hemû bi hûrgilî jê re vegotin. Herî dawîyê jî lê zêde kir û got: A rast min dixwest ku ez eslê çîrokê ji te re bibêjim lê ez ji te fedî dikim. Zerîya Zêrîn got: Çima tu ji min fedî dikî, jixwe tu xwîşka min î, hevala ber dilê min î û gelek razên me di nava hev de hene û ez baş dizanim, ku tu ji xêrê pê ve tiştekî ji min re naxwazî, îcar çima tu yê ji min fedî bikî, ka ji min re bibêje bê çi li ba te heye, tiştekî ji min veneşêrî!

Dewlet Xatûnê jê re got: Bavê te sûretekî te dabû neqişandin, li ser wî qeftanê ku ji Suleyman Bin Dawid re şandibû lê Suleyman bêyî ku wî qeftanî veke, ew diyarî şahê Misrê Asim Bin Sefwan kiribû. Şahê Misrê jî bêyî ku veke, ew qeftan dabû kurê xwe. Kurê wî, Şûrê Şahan jî gava ku qeftan vekiribû, ji bo ku li xwe bike, sûretê te yê li ser neqişandî dîtibû û dil ketibû te.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 816'AN

*Şehrezadê got:*

Dewlet Xatûnê axaftina xwe ya ji bo Zerîya Zêrîn berdewam kir û got: Şûrê Şahan dil ket wî sûretê te û eşqa te agirek xist nava wî ku êdî debara wî ji ber nema û rabû ser xwe, dev ji dê û bavê xwe, dev ji mal û warê xwe berda û ket pey te. Li çol û beyaran, li derya û okyanûsan gerîya, zor û zehmetîyên bê hawe dîtin û bi deh caran bi mirinê re rû bi rû ma, ji bo xatirê te.

Rûyê Zerîya Zêrîn sor bû, ji ber şermê. Xwe komî ser hev kir û got: Ev tiştekî ne gengaz e. Lewre ins û cin li hev nakin. Xwezaya wan ne yek e! Dewlet Xatûnê jê re pesnê Şûrê Şahan da, bê çiqasî xortekî leheng û mêrxas e, çiqasî spehî û lihevhatî ye. Çîrokên pêlewanîya wî giş jê re rêz kirin û di dawîyê de jî got: Xwîşkêcan, tu bi qedrê Xwedê bikî û ji bo xatirê min, bi gotineke bi tenê be jî pê re biaxive.

Zerîya Zêrîn got: Mixabin, ez van gotinên te ne guhdar dikim û ne jî bi ya te dikim û pê re diaxivim! Çawa ew gotinên Dewlet Xatûnê qet guhdar nekiribin, tiştek ji hezkirina Şûrê Şahan neketibû dilê wê. Dewlet Xatûn dîsa li ber wê gerîya, jê rica kir, xwe avêt dexîlê wê, nigên wê maçî kirin û jê re got: Zerîya Zêrîn, tu bi heqê şîrê di neqeba me de bikî, bi heqê wê neqşa li ser Suleyman kî, tu yê vê daxwaza min pêk bînî, lewre ku hîna ez li qesra kurê Şahê Şîn bûm, min soz dabûyê ku ez ê we bînim cem hev.

Dewlet Xatûn bê navber girîya û xwe avêt dexîlê Zerîya Zêrîn, dest û nigên wê maçî kirin û jê xwest, ku carekê bi tenê be jî, here wî bibîne û rûyê xwe nîşanî wî bide. Wê gavê dilê wê pê şewitî, nerm bû û got: Temam ji bo xatirê te, ez ê carekê bi tenê werim hevdîtina wî!

Ji kêfan re bask bi dewlet Xatûnê re çêbûn, dest û nigên Zerîya Zêrîn Maçî kir û di cî de çû qesra mezin a di nav bîstan û baxçeyan de amade kir û ji carîye û qerwaşan xwest, ku her derê bi beran raxin û textekî ji zêr vegirin, qedeh û lalîkên meyê rêz bikin û hemû hazirîyan kuta bikin. Piştre rabû çû cem Şûrê Şahan û wezîrê wî Zend û mizgînî dayê, jê re got: Tu û birayê xwe rabin, herin nav bîstan û derbasî qesra min a li wir bibin û xwe ji ber çavên xelkê veşêrin, bila kes we nebîne, hetanî ku ez û Zerîya Zêrîn tên wir.

Şûrê Şahan û Zend rabûn ser xwe û berê xwe dan wê qesra ku Dewlet Xatûnê ew ji wan re destnîşan kiribû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 817'AN

*Şehrezadê got:*

Şûrê Şahan û Zend çûn qesra li nav bîstan û derbasî hundir bûn, bala xwe danê, ku her der bi hevrîşimê zêrneqişandî raxistî ye û textekî zêrîn jî di nava qesrê de hatiye vegirtin. Bi doşek, lihêf û balîfên rûhevrîşîmî hatine amadekirin û sifreya xwarin û vexwarinê jî li ber wî hatiye danîn.

Bi qasî saetekê derbas bû, kes nehat. Sûretê evîndara Şûrê Şahan hat bîra wî. Bêrîyê ew dexdixand, bêhn lê teng kir. Rabû ser xwe meşîya, heta ku ji hêwana qesrê derket. Birayê wî li pey çû, Şûrê Şahan got: Birawo, tu li cihê xwe rûnê, ranebe û li pey min neyê, hetanî ku ez ji te re nebêjim.

Zend li cihê xwe rûnişt, Şûrê Şahan jî meşa xwe berdewam kir, heta ku ji qesrê derket û derbasî nav bîstan bû. Meya eşqê ew serxweş xistibû, aqil û sewda pê re nehiştibû. Bi dengbêjî helbestên evînê di ber xwe de digotin û hewl dida ku xwe haş bike.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 818'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku Şûrê Şahan ji qesrê derket û dereng ket, bi şûn de venegerîya, birayê wî Zend da dû wî û çû nav bîstan, li wî gerîya, dît ku di nava mestbûneke giyanî de distirê û dibêje:

> bi navê Xwedê û ew ê ku sûretê fatir dixwîne
> Ji xeynî te di nava dil û hinavê min de tu kes nîn e

Zend çû cem birayê xwe, herdu bi hev re li nava bîstan gerîyan. Hem temaşe kirin hem jî fêkîyên cur bi cur avêtin zelûma xwe.

Em vegerin ser Dewlet Xatûnê û xwîşka wê Zerîya Zêrîn. Ew jî rabûn ser xwe hatin wê qesrê, di nava xeml û xêzeke bêtimtêl de. Derbasî hundir bûn. Dewlet Xatûnê bala xwe dayê, ku xulam û qerwaşan fermana wê xweş pêk anîne û qesra wê baş raxistine û her tişt bi têkûzî amade kirine. Textê ku ji bo rûniştina Zerîya Zêrîn amade kiribûn, pir bi şewq bû, diçirisî. Li kêleka text jî şibakeyek hebû, ji bo ku di wir re li nav bîstan binihêre.

Zerîya Zêrîn li ser textê xwe rûnişt, qerwaşan jî xwarinên xweş anîn, dan

ber wan. Dewlet Xatûnê bi destê xwe xwarin da xwîşka xwe, hetanî ku têr xwar. Piştre şîranî xwestin. Qerwaşan ew jî ji wan re anîn. Têra xwe şîranî jî xwarin û piştre destên xwe şûştin. Şerbikên meyê û qedeh li ber wan rêz kirin. Dewlet Xatûnê bi destê xwe mey berda qedehan û da xwîşka xwe Zerîya Zêrîn.

Di wê navberê de Zerîya Zêrîn çend caran di şibakê re li li nav bîstan nihêrî, Şûrê Şahan ê di nava darên fêkîyan de digerîya, bala wê kişand. Lewre di nav wan kêlîyan de Şûrê Şahan hem digerîya û hem jî helbest ji birayê xwe Zend re dixwend, bi dengekî pir hestîyar hêsir pê re dibarandin, mîna baranê.

Gava ku Zerîya Zêrîn çav li wê dîmena wî ket, hesteke mezin ket nava wê û axînek pêket.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 819'AN

*Şehrezadê got:*

Zerîya Zêrîn li Dewlet Xatûnê zivirî û di nava dûmana wî hişê xwe yê serxweş û mest de got: Xwîşkêcan, ew xortê ku bi wê mestbûna xwe li nav bîstan digere, kî ye? Dewlet Xatûnê got: Tu destûrê didî, ku em gazî wî bikin, ji bo ku were cem me û em wî ji nêz ve bibînin? Wê jî got: Heger tu bikaribî, wî bîne vir!

Dewlet Xatûn çû ber şibakeyê, gazî wî kir û got: Kurê Şahan, tu dikarî bi wê delalîya xwe derkevî jorê û werî hetanî cem me? Şûrê Şahan dengê Dewlet Xatûnê nas kir, bi qesrê ve hilkişîya jorê. Çawa ku gihîşt dîwanê û çavên wî li Zerîya Zêran ketin, ji ser hişê xwe çû, termê wî li erdê dirêj bû. Dewlet Xatûnê hinek ji ava gulan bi ser rûyê wî de reşand, ew bi ser hişê wî ve anî. Rabû ser xwe, erda bin nigê Zerîya Zêrîn ramûsa, keçik li husn û cemala wî ya lihevhatî matmayî ma.

Dewlet Xatûnê li Zerîya Zêrîn zivirî û jê re got: Şahbanûya min, ev Şûrê Şahan e, yê ku li ser destê wî Xwedê ez xelas kirim û ew e yê ku hezar bobelat bi serê wî de hatin, ji bo te û min ji te xwest ku dîdarekê bidî wî!

Zerîya Zêrîn rabû ser xwe, kenîya û got: Kî dikare sozê xwe pêk bîne, heta ku ew xortê hanê pêk bîne? Dilsozî bi kesên ins re nîn e!

Şûrê Şahan lê vegerand û got: Şahbanûya gewre, her kes ne mîna hev e, navnîşana dilsoziyê ez im û bêbextî li cem min peyde nabe!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 820'Î

*Şehrezadê got:*

Şûrê Şahan ew gotina xwe got û di pey re girîya û bi helbestî berdewam kir:

ey delaltirîn delala dilan dilovan bi min re
dilovan be bi dildarê vê efsûngera cinî re
bi heqê wî eqîq û wî elmasê li ser lêvên sor
geran meke tu bi hîcranê barê vî laşê ilor
daxwaza min ji te ew bû tenê dîd û wîsal
teqdîr jî dê her ya te be lew ku biborin mah û sal

Piştre dîsa girîya, herstîyar bû, ji kûrahîya dilê xwe û hat kewandin bi agirê evînê. Ji dil qîrîya û got:

silav li te be silava dildarekî hebîb
deynê merdan li merdan deyn e ez im hebîb
silav li te be û dêma te her daîm be dildar
li seranserê meclîs û civatan her tu bî mijar
li ser te bi xîret im neşêm bibêjim ew nav
dildar bi ser dildar ve diçe weke ax û av
ava xwe nebire ji ser axa evîna min
xemgînî wî dikuje melûl dibe dilê min
şivantîya stêrkan dikim êdî ez kanî wîdad
dirêj bûne şevên min ji jana evîna bêdad
sebr û hedana min nemaye bêçare me ez
êdî ez ê çi bibêjim gelo, çi bipirsim ji te ez

Hilmeke kûr kişand û dîsa berdewam kir, bi xemgînî got:

meqseda min ne kesa din bû ji xeynî te keybanû
lew ku bi ser neketibim ez hîna nedabe min te canû
nîn e tu kes mîna te bi vê cemal û bi vê delalê
meyla dil her li ser te ye ne li ser kesa din bi alê
ne gengaz e ku ji bîr bikim qet ez vê evînê
min temam giş tê de daye heye gelo dermanê birînê

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 821’AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku Şûrê Şahan ev helbesta xwe jî xwend û bi şûn de dîsa pir girîya û hêsir barandin. Zerîya Zêrîn jê re got: Ey kurê şah! Ez ditirsim heger ez bi giştî xwe bidim te, ez hezkirin û evînê di te de nebînim. Lewre qencîya mirovan hindik e û bêbextîya wan pir e. Divê tu bizanibî ku mîrzayê me Suleyman Bin Dawid jî (Silavên Xwedê lê bin) bi evîndarî Belqis bir lê gava ku yeke ji wê çêtir dît, dev ji wê berda.

Şûrê Şahan got: Çavên min, giyana min! Xwedê teala hemû insî mîna hev çênekirine. Heger Xwedê bêje erê, ez ê li ser soza xwe bim û ez ê li ber nigên te bimirim. Xwedê şahid û wekîlê vê gotina min e û tu yê jî vê yekê bibînî!

Zerîya Zêrîn jê re got: Aram be, rûnê û li gora usûla dînê xwe sond bixwe, da ku em sozê bidin hev, ku em bêbextîyê bi hev re nekin, kî ji me bêbextîyê bi yê/a din re bike, bila Xwedê heyfa wî/ê jê hilîne.

Bi wê gotina wê re Şûrê Şahan li rex wê rûnişt û herduyan destên xwe danîn ser destên hev.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 822’YAN

*Şehrezadê got:*

Piştî ku herduyan destên xwe danîn ser destên hev, herduyan jî sond xwar, ku kes ji wan yekî din hilnebijêre, ne ji insanan û ne jî ji cinan. Di pey re jî hevdu himbêz kirin û girîyan, ji ber şîdeta firaqê, Şûrê Şahan pir hestîyar û coş bû, bi wê sozdarîyê re û bi kelecanî got:

gerîyam ez li ber coş û peroşa vê îştiyaqê
girîyam ez ji ber kelecana dil li gel firaqê
kul û derdê min zêde bûn di pey we re
destê min jî pir kin e di merivantîya we de
di firehîyê de rastî wenda dibin car bi car
sebreke bê dawî lazim e lê kanî sebirdar
gelo wê Xwedê bigihîne hev me li vê dinê

Piştî ku ji hev re sond xwarin û hevpeymana xwe pêk anîn, Şûrê Şahan rabû ser xwe, derket derve û bi nav bîstan de meşîya. Piştre Zerîya Zêrîn jî rabû ser xwe û di nava bîstan de derket meşê. Qerwaşa wê jî rahişt hinek xwarin û şerbikekî meyê û da kêleka wê, pê re çû. Bi qasî saetekê meşîyan, di encamê de rastî Şûrê Şahan hatin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 823'YAN

*Şehrezadê got:*

Gava ku li hev rast hatin, silav dan hev û li gel hev rûniştin, bi hev re xwarin û vexwarin, li gel sohbeteke germ. Zerîya Zêrîn got: Ey kurê şah! Gava ku tu derbasî bîstanê Îrem bûyî, tu yê li wir konekî vegirtî bibînî. Kon ji etlesê sor e û betana wî jî hevrîşimê kesk e. Bê tirs derbasî hundirê kon bibe, tu yê li wê derê pîrejineke ku li ser textekî zêrîn ê ku bi dur û gewheran darijandî ye, rûniştî ye. Di nav sinc û rêzdarîyeke giran de silavê lê bike. Li alîyê text binihêre, tu yê di bin de şimikên zêrîn bibînî. Rahêje wan herdu şimikên zêrîn ramûse, wan deyne ser serê xwe û piştre jî wan bixe bin çengê xwe yê rastê. Bêdeng li raserî wê pîrejinê bisekine û serê xwe bera ber xwe bide. Gava ku ji te pirsî, got: Tu ji ku hatiyî û tu çawa gihîştiyî vir û kê rê nîşanî te daye, ji bo çi te rahiştîye wê şimikê? Tu bersivê nede û xwe ragire, hetanî ku qerwaşa min derbasî hundir bibe û ew li şûna te biaxive, li ber bigere û dilê wê nerm bike û pêşîya bertekên wê bigire. Belkî ma Xwedê ku dilê wê bi te bişewite û daxwaza te qebûl bike.

Di pey re gazî qerwaşa xwe kir, got: Mercanê, were vira! Mercanê hat cem, wê jî berdewam kir: Ji bo xatirê hezkirina me, ez ji te dixwazim, ku tu pêdivîyeke min pêk bînî îro û tu xwe ji ber nedî alî. Heger tu vê daxwaza min pêk bînî, ji îro ve tu azad î û tu yê herdem ezîza ber dilê min bî. Lewre ez vê raza xwe ji te bi tenê re dibêjim û divê tu wê biparêzî: Qerwaşê got: Xatûna min, nûra herdu çavên min, pêdivîya xwe bibêje, ez ê di cî de pêk bînim!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 824'AN

*Şehrezadê got:*

Gava kıu Mercanê wisa got, xatûna wê gotina xwe berdewam kir: Ez ji te dixwazim, ku tu vî insî li ser milê xwe bikî û tu wî bigihînî bîstanê Îrem, cem bapîra min û tu wî derbasî bin konê wê bikî û wî biparêzî. Gava ku tu û wî ketin bin kon û wî çû rahişt şimikan û bi rêzdarî li hemberî pîrika min sekinî û pîrê jê pirsî got: Tu kî yî, tu ji ku derê hatiyî, kê tu gihandiyî vira û ji bo çi tu van şimikan dibî? Di cî de tu xwe bide pêş û jê re bibêje, xatûna min, min ew anîye vira û ev xort kurê şahê Misrê ye, ew e yê ku çûye qesra abadanî û kurê Şahê Şîn li wir kuştiye û Dewlet Xatûn ji nav lepên wî rizgar kiriye û ew biriye radestî bavê wê kiriye. Min ew anîye vira, ji bo ku ew bi xwe vê mizgînîya xwe bide te û xelatekê ji te wergire. Piştre jê re bibêje: Tu bi Xwedê kî xatûna min, ev xortê hanê ne spehî ye?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 825'AN

*Şehrezadê got:*

Zerîya Zêrîn axaftina xwe berdewam kir û ji qerwaşa xwe re got: Gava ku te jê re got, ev xort ne spehî ye? Ew ê bibêje, "Belê." Wê çaxê tu jî jê re bibêje, xatûna min ev xortekî wêrek, birûmet û xwedî namûs e. Serdar û şahê misrê ye, hemû mezîyetên qenc tê de hene. Gava ku ji te re got: Daxwaza wî çi ye? Tu bibêje: Xatûna min silavan li te dike û dibêje ma hetanî kengî ez ê keçeke azib bim û di malê de rûniştî bim? Bêje wê, salên dirêj derbas dibin di ser re, gelo ji bo çi hûn wê nadin mêran û hîna ku hûn sax in, hûn wê nazewicînin, mîna keçên xelkê? Gava ku wê got: Ma em ê çawa wê bizewicînin, heger wê hinek nas kiribin û dilê wan ketibe hev, bila me jê agahdar bike, tiştê ku bi destê me ve bê, em texsîr nakin. Tu bibêje: We dixwest ku hûn wê bidin mîrzayê me Suleyman Bin Dawid û ji bo vê yekê jî we sûretê wê li qeftanekî neqişandibû û şandibû ji wî re. Lê wî ew qeftan diyarî şahê Misrê kiribû, bêyî ku lê jî binihêre. Şahê Misrê ew qeftan dabû kurê xwe û gava ku kurê wî sûretê wê li ser qeftan dibîne, dil dikeve wê û radibe ser xwe, dev ji dê û bavê, dev ji post û welatê xwe berdide û bi dinyayê dikeve, diteriqe, dikeve pey wê lê digere, welat bi welat, girav bi girav, derya bi derya diçe, bi deh caran bobelat bi serê wî de tên û kefenê xwe diçirîne, ji bo xatirê wê û herî dawîyê jî xwe digihîne wê. Qerwaşa Zerîya Zêrîn Şûrê Şahan li ser milê xwe kir û jê re got: Çavên xwe bigire! Şûrê Şahan çavên xwe girtin, Mercanê jî bi hewa ket, firîya û di nava saetekê de ew gihand

bîstanê Îrem. Jê re got: Çavên xwe veke, kurê şah! Şûrê Şahan çavên xwe vekirin, dît ku di nava bihuştekê de ye. Konê bapîra Zerîya Zêrîn jî li ber wî bû. Mercanê jê re got: Derbasî kon bibe, ezbenî.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 826'AN

*Şehrezadê got:*

Derbasî hundir bibe. Şûrê Şahan navê Xwedê bi lêv kir û derbasî hundir bû. Çavên xwe li hundirê kon gerandin, awirên wî li ser textê zêrîn sekinîn, ku pîrê li ser rûniştî bû. Awirên xwe berjêr daxistin, çav li şimikên zêr ket. Rahişt herdu şimikan, ew maçî kirin, danîn ser serê xwe û piştre jî ew xistin bin cengê xwe yê rastê û bi rêzdarîyeke giran li hemberî wê sekinî. Pîrê jê re got: Tu kî yî? Tu ji ku derê yî? Tu ji ku derê hatî vir, kê rê nîşanî te daye? Te çima rahişt wan şimikan û te ew maçî kirin? Kengê te tiştek ji min xwestiye û min gotiye na?

Wê kêlîkê mercan derbasî hundir bû, bi rêzdarî silav lê kir û piştre jî ew tiştên ku Zerîya Zêrîn jê re gotibûn, anîbû ziman. Gava ku pîrê ew gotin ji devê wê bihîstin, hêrs bû, bi ser de qîrîya û got: Çawa zewac û peyman di navbera ins û cinan de çêdibe!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 827'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku pîrê hêrs bû û got, zewaca ins û cinan bi hev re nabe, Şûrê Şahan lê vegerand û got: Ez sozê didim te jî, ez ê kurê te bim û li ser hezkirina te bimirim. Ev jî peymana min e, ez soz didim, ku ez ê peymana xwe ve girêdayî bim û ez ê bêbextîyê nekim. Sond û peyman be, ku ez li keseke din nanihêrim û Xwedê hez bike, tu yê bi xwe jî rastîya min bibînî!

Bapîra Zerîya Zêrîn serê xwe bera ber xwe da, bi qasî saetekê ponijî, piştre serê xwe rakir û got: Xortê delal! Gelo tu yê dilsoz bî bi sond û peymana xwe re? Şûrê Şahan got: Belê bi heqê navê wî Xwedayê ku erd rast kiriye û ezman bilind kiriye, ez ê dilsozê soza xwe bim.

Wê gavê pîrê got: Ez ê daxwaza te pêk bînim. Lê niha here ji xwe re li nava bîstan bigere, fêkîyên wî bixwe û temaşe bike, hetanî ku ez bişînim pey kurê xwe Şehyal û ez di vê mijarê de pê re biaxivim, wî îqna bikim. Qet mereqan neke, înşelah wê ya xêrê bibe. Lewre kurê min bi ya min dike û li hemberî min dernakeve. Ez ê keça wî bi te re bizewicînim. Di vê mijarê de dilaram be û bawerîya xwe bi min bîne. Zerîya Zêrîn dê bibe jina Şûrê Şahan!

Gava ku Şûrê Şahan ev gotin ji pîrê bihîstin, pir kêfxweş bû. Spasîya wê kir, dest û nigên wê ramûsandin û ji cem wê derket, çû li nava bîstan gerîya. Pîrê jî li Mercanê zivirî û jê re got: Tu jî here li kurê min Şehyal bigere, binêre li kîjan welatî be, wî bîne vira!

Mercanê çû lê gerîya, ew dît û bi xwe re anî cem dîya wî.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 828'AN

*Şehrezadê got:*

Mercanê çû Şehyal anî cem diya wî. Şûrê Şahan jî jixwe li nav bîstan digerîya û temaşe dikir. Di wê navberê de pênc cinîyên Şahê Şîn ew dîtin û di nava xwe de gotin: Çi îşê vî li vir heye û kê ew anîye vir? Gelo ne wî kurê Şahê Şîn kuştibû? Ka em pirsina jê bikin, wî bixapînin û hinek agahîyan jê bigirin.

Çûn cem wî û jê re gotin: Xortê delal, te pir xweş kir, ku te kurê Şahê Şîn kuşt û te Dewlet Xatûn ji nav lepên wî rizgar kir. Ew zilam mirovekî xedar û zalim bû, heger te ew ji nav lepên wî xelas nekira, heta bi hetayê xelas nedibû ew reben. Lê te çawa ew kuşt?

Şûrê Şahan li wan nihêrî û got: Min ew bi vê hungulîskê kuşt û hungulîska di tilîya xwe de nîşanî wan da. Ew jî di mijarê de zelal bûn û nas kirin, ku wî kuştiye. Duduyan bi herdu destên wî, duduyan jî bi herdu nigên wî girtin û yê din jî devê wî girt, ji bo ku bang neke û qewmê Şah Şehyal pê nehese, neyên wî ji nav lepên wan rizgar nekin. Piştre rahiştinê û firîyan, bi hewa ketin û ew birin cem şahê xwe, li ber destê wî danîn û jê re gotin: Ey şahê dem û dewranan va ye me kujerê kurê te ji te re anî. Şahê wan got: Ka li ku ye? Gotin: Evê li ber destê te ye şahê me.

Şahê Şîn ji Şûrê Şahan re got: Çima te nûra çavê min, kezeba canê min kuşt, bê sûc û bê sebeb, ku tu tehdahîya wî negihiştibû te? Şûrê Şahan got: Belê, min ew kuşt. Zarokên şah û qralan direvandin, ew ji dê û bavên wan

qut dikirin û ew dibirin qesra abadanî, li wir tehde li wan dikir û ew li wê derê bi tenê digirtin. Min jî ew bi vê hungulîskê kuşt, her kes jê xelas kir. Înşelah niha di nav agir de ye.

Wê gavê şik û guman bi Şahê Şîn re nema, ku ew kujerê kurê wî.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 829'AN

*Şehrezadê got:*

Şahê Şîn nas kir ku Şûrê Şahan kujerê kurê wî ye û di wê xalê de êdî tu guman pê re neman. Gazî wezîrê xwe kir û jê re got: Ev xortê hanê kujerê kurê min e, gelo tu dibêjî, em çi pê bikin? Em wî bi awayekî dirindeyî wî bikujin ango îşkence û azareke bêtimtêl pê bikin?

Wezîrê mezin got: Endamekî laşê wî jê bike. Yekî din got: Her roj lêdaneke giran lê bike. Yekî din got, wî di nîvî re bike du qet. Yekî dîtirkê got: Hemû tilîyên wî jêbike û agir bi wan ve deyne, wan bişewitîne. Yekî mayîn got: Wî bixe çarmîxê û daliqîne. Kî ku diaxivî li gor fikra xwe awayekî kuştin û lêdan û îşkenceyê pêşnîyaz dikir. Bi tenê emirek ji wan tevan cuda axivî, ew jî mirovekî zana û xwedî azmûn bû. Bi ehwalên dinyayê dizanibû, jê re got: Ey şahê dem û dewranan, ez ê gotinekê bibêjim lê jixwe biryar a te ye!

Zilam serwerê welatekî bû û ji berê ve jî şah her dem bi gotina wî dikir û bi fikra wî ewle bû. Lê dîsa jî metirsîya wî hebû, ku şah bi ya wî neke û zirarekê bidê. Lewre berîya ku fikra xwe aşkere bike, ji şah re got: Şahê min, heger tu di vê mijarê de fikra min dixwazî, ez dixwazim, ku ji niha ve tu emanê bidî min. Bi vê pirsa xwe re jî, rabû ser xwe û çû erda bin nigê wî maçî kir. Şah jê re got: Fikra xwe diyar bike, kes nikare destê xwe bide te!

Zilam got: Şahê gewre, heger tu vî xortî bikujî, ew yek dê karekî şaş be, lewre ew di destê te de ye, esîrê te ye û tu ji jîyana wî berpirsîyar î. Jixwe kengî be jî, tu çi dixwazî, tu dikarî pê bikî. Loma ya baş ew e, ku tu xwe lê ragirî, lewre ew xort derbasî Bîstanê Îremê jî bûye û bi Zerîya Zêrîn re zewicîye, ku ew jî keça Şehyal e. Lewre ew jî bûye yekî ji malbata Şah Şehyal. Zilamên te jî ew li wir girtine û anîne vira. Wî jî ne xwe ji wan veşartiye û ne jî ji we. Vêca gava ku tu wî bikujî, dê Şah Şehyal jî bi pey tola wî bikeve û wê bibe dijminê te û artêşa xwe bi ser te de bişîne. Hêza te jî tune, ku tu li hemberî artêşa wî bisekinî.

Şahê Şîn, ev şîreta wî rast dît û ferman da, ku Şûrê Şahan bavêjin zin-

danê û ew avêtin binî zindanekê. Em wî di zindanê de bihêlin û em vegerin ser rewşa bapîra Zerîya Zêrîn.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 830'Î

*Şehrezadê got:*

Îcar bapîra Zerîya Zêrîn jî gava ku bi kurê xwe Şehyal re civîya û li ser zewaca keça wî û Şûrê Şahan li hev kirin, gazî qerwaşa xwe Mercane kir û ew şand pey Şûrê Şahan, ji bo ku wî bîne ûr û mizgînê bide wî. Mercane li nav bîstan gerîya lê ew nedît. Vegerîya cem pîrê û ew ji rewşê agahdar kir. Pîrê çend heb bende şandin cem nobedarên bîstan û ji wan agahî xwest. Wan jî got: Me dît, li bin darekê rûniştî bû. Gava ku pênc heb ji qewmê Şahê Şîn çûn cem wî û pê re axivîn, piştre ew girêdan, devê wî girtin û rahiştinê, ew bi xwe re birin, firîyan, çûn.

Gava ku pîrê ew gotin bihîstin, pir pê êşîya, gelekî hêrs bû, rabû ser piyan û ji kurê xwe re got: Tu çito şah î û çend heb çeteyên Şahê Şîn tên nava bîstanê te, mêvanê te dibin û diçin, bêyî ku ji te bitirsin û tu hîna li ser nigan î? Di saxiya te de divê tu kes nikaribe tehdahîyê li me bike!

Şah Şehyal got: Dayê can, evê insî kurê Şahê Şîn kuştiye, ku ew jî weke me cinî ye, wî jî ew zeft kiriye û biriye, îcar ez ê çawa dijminahîya wî bikim, ji bo yekî insî!

Diya wî jê re got: Here cem wî û mêvanê me jê bixwaze. Heger hîna sax be û wî radestî te bike, wî bîne û were. Lê heger ew kuştibe, Şahê Şîn bi saxî bigire û ji min re bîne. Jin û zarokên wî û hemû alîgirên wî jî bîne vir, da ku ez bi destê xwe serjê bikim û mala wan xera bikim. Heger tu wisa nekî, ez ne şîrê xwe li te helal dikim ne jî keda ku min tu pê mezin kirî!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 831'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku diya wî jê re wisa got, Şah Şehyal rabû ser xwe û ferman da artêşa xwe, ku pê re rabin, ji bo ku daxwaza diya xwe pêk bîne. Û xatirê wê û hezkirîyên wê li erdê nehêle.

Şehyal, artêşa xwe da dû xwe û ket rê. Çû, çû, heta ku gihîşt war û welatê Şahê Şîn. Herdu artêş ketin pêxila hevdu û di neqeba wan de şerekî giran qewimî. Lê artêşa Şahê Şîn Têk çû, ew û zarokên xwe û hemû mezinên dewleta wî esîr ketin destê artêşa Şah Şehyal.

Dest û nigên hemûçkan girêdan û ew birin raberî Şah Şehyal, Şah Şehyal ji Şahê Şîn re got: Şîno, kanî ew insîyê mêvanê min li ku ye? Şahê Şîn got: Ey Şehyal! Tu cinî yî û ez cinî me, çawa tu ji bo insîyekî ku kurê min kuştiye, tu van kiryaran bi min dikî? Û tu jî dizanî ku wî kurê min, kezeba min kuştiye! Te çawa xwîna ew qas cinîyan rijand ji bo insîyekî?

Şah Şehyal lê vegerand û got: Dev ji van gotinan berde û heger Şûrê Şahan sax be, wî bîne vir, ez ê te û zarokên te berdim. Lê heger te ew kuştibe, ez ê we tevan bikujim. Şahê Şîn got: Şahê gewre, qey tu wî kesê insî di ser kurê min re digirî? Şehyal got: Kurê te zalim bû, keç û kurên xelkê direvandin, hinek keçên şahan dibirin qesra abadanî, fisûx û ficûr bi wan dikir.

Şahê Şîn got: Şûrê Şahan sax e û li cem min e lê divê tu neqeba me çêbikî! Şehyal ew li hev anîn, neqeba wan xweş kir û di navbera wan de peymanek danî. Di pey re jî herdu xelat kirin, kincên xwe li wan kirin û ew ezimandin cem xwe, ji wan re mazûbanîyeke xweş kir, xwarinên xweş danî ber wan. Şahê Şîn û leşkerên wî sê rojan bi mêvantî li cem xwe girt. Piştre jî Şûrê Şahan bir cem diya xwe ya pîr. Diya wî bi selametiya Şûrê Şahan pir kêfxweş bû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 832'YAN

*Şehrezadê got:*

Şah Şehyal ji husn û cemala Şûrê Şahan pir bandor bûbû. Ew li cem xwe dabû rûniştandin û pê re diaxivî. Şûrê Şahan çîroka serpêhatîya xwe ji serî hetanî binî bi hûrgilî jê re got, nemaze jî çîroka xwe û Zerîya Zêrîn.

Şah Şehyal li diya xwe ya pîr zivirî û jê re got: Dayêcan, madem tu û wê herdu jî bi Şûrê Şahan razî ne, hûn zewaca wan dixwazin, ser seran û ser çavan. Jixwe tu jî dizanî, ku ez tu caran li hemberî te derneketime. De êdî rabe, wî bi xwe re bibe Serendîbê û li wê derê daweteke mezin û şahîyeke xweş li dar bixin, ji bo vî xortê ku ev qas zor û zehmetî kişandiye, ji bo ku bigihîje keça me.

Pîrê rabû ser xwe, qerwaşên xwe kom kirin, Şûrê Şahan jî hilgirt cem xwe û bi firê çûn serendîbê. Derbasî bîstanê diya Dewlet Xatûnê bûn û çûn bin konê wan, ku Zerîya Zêrîn li cem wan bû. Pîrê çîroka Şahê Şîn û Şûrê Şahan ji wan re rave kir, hemû bi rizgarbûna Şûrê Şahan ya ji mirinê û vegera wî ya li gel pîrê pir kêfxweş bûn.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 833'YAN

*Şehrezadê got:*

Piştre Şûrê Şahan çû cem şahê Hindistanê Taca Şahan û jê re got: Şahê gewre û dilovan, ez dixwazim tiştekî ji te bixwazim lê ez ditirsim, ku tu daxwaza min red bikî! Taca Şahan got: Bi xwedê heger tu ruhê min jî bixwazî, ez nabêjim na. Şûrê Şahan got: Ez dixwazim ku tu keça xwe Dewlet Xatûnê li birayê min Zend mehr bikî, ji bo ku em giş bibin zarokên te.

Taca Şahan got: Ser seran ser çavan. Roja dîtirkê hemû mezinên dewleta xwe li hev kom kirin û di hizûra wan de mehra keça xwe li Zend birî û şahîyeke mezin li dar xistin. Bajar giş xemilandin, xêr û bêr li xelkê belav kirin û hemû mezinên dewletê di nava xelat û diyarîyan de hiştin. Bi wî hawayî Şûrê Şahan û birayê wî yê wezîr Zend, di heman şevê de derbasî cem jina xwe bûn.

Şûrê Şahan çil rojan sax ji cem Zerîya Zêran derneket, heta ku jê têr bû. Rojekê jina wî jê re got: Tu hesreta tiştekî din bi te re maye gelo? Şûrê Şahan got: Na wele tiştek tune ye, tenê min dixwest ku ez dê û bavê xwe yên li Misrê bibînim, bê ka rewşa wan çi ye.

Zerîya Zêrîn ferman da çend heb xulamên xwe û ji wan xwest ku wî û Zend bigihînin Misrê, cem dê û bavên wan. Xulaman ew birin wir, wan jî dê û bavên xwe dîtin û bi qasî hefteyekê li gel wan man.

Piştî ku hefteyeke wan li Misrê qedîya, herdu yan jî xatir ji dê û bavên xwe xwestin û dîsa li ser pişta xulamên Zerîya Zêrîn, bi firê vegerîyan Serendîbê, cem jinên xwe, Ji wê û pê de jî, her ku bêrîya dê û bavên xwe dikirin, bi heman rêbazê çûn serdana wan.

Şûrê Şahan û Zerîya Zêrîn jîyaneke pir xweş, jîyaneke tijî û dagirtî bi bextewarîyê pev re derbas kirin. Zend û Dewlet Xatûnê jî, jîyaneke bi heman şêweyî pev re derbas kirin, hetanî ku xerakirê xweşîyê û veqetînerê hezkirîyan bi ser wan de hat.

Subhan ji ew ê bêmirin re, ku mirin danîye pêşîya her zindîyî û jê re kiriye qeder û çarenûseke jêveneger.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 834'AN

## ÇÎROKA HESENÊ ZÊRKER Û MIROVÊ MECÛSÎ

*Şehrezadê got:*

Şahînşahê min ê gewre û bextewar! Tê gotin, ku di dewraneke berê û di zemanekî kevn de li Besrayê bazirganek hebû, ku du kurên wî hebûn û û gelek mal û milkên wî yê bêhed û bêhesab hebû. Lê rojekê ew bazirgan bi emrê Xwedê mir û ew maldarîya xwe giş li dû xwe hişt. Herdu kurên wî, laşê wî binax kirin û malê wî bi wekhevî di neqeba xwe de parve kirin. Her yekî pehra xwe bir û ji xwe re dikan vekirin. Yek ji wan bû zêrker û yê din jî bû paxircî.

Rojekê ji rojan gava ku yê zêrker li dikana xwe rûniştî bû, zilamekî biyanî yê ku li nav sûkê digerîya, di ber dikana wî re çû, lê sekinî, lê temaşe kir, karê wî eciband, derbasî cem wî bû. Serê xwe hejand û jê re got: Welehî tu zêrkerekî baş û hêja yî! Wî li zêrên zêrker temaşe kir. Zêrkerê ku navê wî Hesen bû jî, ji xwe re li pirtûkeke kevn dinihêrî û dixwend. Gelek mirovên din jî diçûn û dihatin lê disekinîn û ew temaşe dikirin. Lewra bejn û başla Hesen a lihevhatî û spehîbûna wî ya bêtimtêl bala gelekan dikişand.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 835'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku wextê esrê hat û dikan ji xelkê vala bû, wî zilamê ecem ji Hesen re got: Kurê min, xuya ye ku tu ciwanekî hêja yî û ez jî mirovekî kordunde me, ne kurên min hene ne jî keç. Di vê dinyayê gişî de tu kes mîna min nizane vê pîşeya zêrkerîyê pêk bîne û gelek mirovan ji min xwestin, ku ez vê pîşeyê fêrî wan bikim lê min qebûl nekir. Niha jî dil dixwaze, ku ez te bikim kurê xwe, vê pîşeyê fêrî te bikim û te ji vê feqîrîyê xelas bikim, da ku tu ji çakûç û komir û agir û westanê jî rizgar bibî.

Hesen got: Tu yê kîngê min fêrî hunerên vê pîşeyê bikî? Zilam got: Sibê ez ê werim cem te û ez ê nîşanî te bidim, bê çawa zêr ji paxir çêdibe. Hesen rabû ser xwe, xatir ji mirovê ecem xwest û bi kêf çû malê, derbasî cem diya xwe bû, silav lê kir û mîna serxweş û mestan li ser sifreya xwarinê rûnişt. Diya wî bi şaşwazî jê pirsî, got: Te xêr e, kurê min? Baldar be û guh nede gotinên xelkê, bi taybetî jî gotinên eceman. Lewre ew xwedîyê karên qelp in û pir jî xapînok in. Zanînên kîmyayê li gel wan hene û bi saya wê xelkê dixapînin, diravên wan ji wan dişêlînin.

Hesen got: Dayêcan, em kesin hejar in û tiştekî me yê ku mirov çavên xwe berdinê tune ye. Îcar wê kî çima me bixapîne? Ew zilamê hanê jî ecem e lê weke şêxekî salih û diltenik xuya dike.

Diya wî hêrs bû lê deng nekir. Hesen jî şev pê de di nava kelecanê de ma, ji ber wê gotina mirovê ecem û sozdayîna wî. Hetanî sibê jî xew bi çavên wî nebû, ji kêfan.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 836'AN

*Şehrezadê got:*

Çawa bû sibe, Hesenê zêrker rabû ser xwe, rahişt mifteyên xwe û çû dikana xwe vekir. Qasekê bi şûn de jî ew zilamê ecem hat balê. Hesen ji ber rabû, hewl da destê wî ramûse lê wî nehişt û jê re got: Hesen, kurê min, ka rabe kûrê dade û pif bikê amade bike!

Hesen rabû komir avêt kura xwe û agir pê ve danî. Piştre pif kir pifikê û agir gur kir. Zilam got: Kurê min, paxir li cem te heye? Hesen got: Sênîyeke şikestî li ba min heye. Zilam got: Ka wê sênîyê perçe perçe bike! Hesen wisa kir, perçeyên sênîyê xistin kodika mezin, danî ser kûreyê û bi pifikê agirê bin wê gur kir, hetanî ku paxir helîya, bû weke avê.

Zilamê ecem destê xwe avêt kofîya xwe, kaxizekî pêçayî jê derxist û hinek ji hûrika di nav de li ser kodika paxir reşand. Ew tiştê ku lê reşand wek kîlê zer bû û bi tenê bi qasî nîv derhemê bû. Ji Hesen re got: Pif bike ser pifikê! Hesen li gor daxwaza wî tevgerîya, hetanî ku qalibê zer jê derket.

Hesen bi şaşwazî û heyrangorîyeke mezin li wê encama weke mucîzeyê dinihêrî û ji çavên xwe bawer nedikir! Aqilê wî ev yek nedigirt. Lê kêfa wî pir dihat û hindik mabû, ku baskên wî çêbibin. Rahişt mivredê û li qalibê

zêr da, dît ku zêrekî xwerû û sade ye! Ji kêfan nema dilê wî erd digirtin. Xwe bi ser destê yê ecem de xûz kir, ku ramûse lê wî nehişt û ew qalibê zêr dayê, jê re got: Here sûkê, vî zêrî bifiroşe, zû heqê wî bigire û bi kesî re neaxive!

Hesen daket sûkê, qalibê zêr da destê delal, ji bo ku bifiroşe. Delal ew bi mivredê xurand, dît ku zêrê xwerû ye. Zêr xist bazarê, buhayê wî bi deh hezar dînarî dest pê kir lê xirîdaran li hev zêde kirin, hetanî ku gihîşt pazdeh hezar dînarî. Hesen dînarên xwe girtin û çû mala xwe. Çîroka xwe û yê ecem ji diya xwe re got, bê çawa zêr çêkiriye.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 837'AN

*Şehrezadê got:*

Hesen ji diya xwe re rave kir, bê çawa ew zilamê ecem paxir zivirand zêr û di dawîyê de jî got: Ez jî fêrî vê hunerê bûm! Diya wî hêrs bû got: Hêz û qewet hemû ji ba Xwedê ye û tiştekî din lê zêde nekir. Hesen jî rahişt hawinekî paxir û çû cem ecemê ku li dikana wî rûniştî bû, danî ber wî. Zilam got: Ev çi ye, kurê min? Tu dixwazî bi vî hawinî çi bikî? Hesen got: Em ê wî li ser agir bihelînin û wî bikin zêr. Zilam kenîya û jê re got: Kurê min qey tu dîn î, ku tu dixwazî di rojekê de du qalibên zêr bifiroşî? Qey tu nizanî, ku mirov ji me bikevin gumanan û wê ruhê me tê de here? Binihêre kurê min, min ew huner fêrî te kir lê divê tu salê carekê tenê çêbikî û ew besî te ye.

Hesen got: Tu rast dibêjî mîrzayê min. Û çû li ber kûreya xwe rûnişt, komir avêtê, agir pêxist û kodik danî serê. Mirovê ecem got: Tu dixwazî çi bikî kurê min? Hesen got: Min fêrî vê hunerê bike.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 838'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku Hesen jê re got, vê hunerê fêrî min jî bike, mirovê ecem kenîya û got: Ya Rebî hemû hêz û qewet ji ba te ye! Kurê min, tu kêmaqil î û tu ji karekî wisa re nabî! Qey tu ji xwe napirsî, bê wê çawa xortekî di temenê te de karekî wisa li sûkê û li ser rêyan fêr bibe? Heger em li vir karekî wisa bikin, wê xelk bibêje, ku em kîmyayê bi kar tînin û wê agahî here guhê

desthilatdaran jî, ew ê jî ruhê me bistînin. Vêca kurê min, heger tu dixwazî fêrî vê hunerê bibî, bi min re were mala min û ez ê bikaribim li wê derê vê hunerê fêrî te bikim.

Hesen rabû ser xwe, dikan girt û da pey mirovê ecem, da ku here mala wî. Lê di rê de hişyarîyên diya wî hatin bîra wî, guman pê re çêbûn. Hezar hesab di hişê xwe de kir û sekinî, serê xwe bera ber xwe da. Mirovê ecem lê zivirî, dît ku sekinîye û serê wî di ber wî de ye. Kenîya û jê re got: Qey tu dîn î? Ez ê çawa bi nêteke baş nêzî te bibim û tu di dilê xwe de difikirî, ku ez ê li te bidim? Heger tu ditirsî werî mala min, ez ê bi te re werim mala we û ez ê li wir te fêrî vê hunerê bikim.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 839'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku mirovê ecem jê re wisa got, Hesen got: Bila be, ka em herin mala me! Mirovê ecem got: Nexwe ka bide pêşîya min! Hesen da pêşîyê, wî jî da dû wî, meşîyan û çûn mala wî. Hatin ber derîyê malê, Hesen çû hundir, ji diya xwe re got, ku mirovê ecem bi xwe re anîye malê û niha li ber derî ye. Diya wî hundir ji wan re raxist, her tişt amade kir û mal ji wan re hişt, derket çû. Hesen mirovê ecem vexwend hundirê malê, ew da rûniştandin û rahişt selikekê, çû sûkê tiştin xwarinê anîn û hat, danî ber wî û jê re got: Bixwe mîrzayê min! Da ku nan û xwê di neqeba me de çêbibe, lewre kesê ku bêbextîyê bi nan û xwê re dike, Xwedê wî efû nake.

Mirovê ecem kenîya û got: Tu rast dibêjî kurê min lê kî bi qîmeta nan û xwê dizane? Herdu bi hev re li ser sifreyê rûniştin û têra xwe xwarin. Piştre zilam got: Kurê min Hesen, ka rabe ji min re hinek şîranî bîne! Hesen rabû çû sûkê, deh serî şîranî anî û danî ber mirovê ecem û ew jî li kêlekê rûnişt, bi hev re xwarin. Mirovê ecem got: Kurê min, Xwedê ji te razî be, tu mirovekî dilsoz î, dostanî bi kesên mîna te re dibe, razên mirov jî incex di destên yên mîna te de tên parastin. De ka êdî aletan bîne, ji bo ku ez wê hunerê nîşanî te bidim.

Çawa ku mirovê ecem ew gotin, gotin, Hesen mîna xezalekê ji cihê xwe pengizî, rabû çû dikanê, alavên xebatê anîn û hat, danîn ber destên wî. Zilam jî kaxezekî pêçayî ji ber kofîya serê xwe derxist û got: Binihêre Hesen,

bi heqê vî nanî û vê xwêya ku te da min, heger tu li ber dilê min ji kurê min ne şîrîntir bûyayî, min ev huner nîşanî te nedida!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 840'Î

*Şehrezadê got:*

Mirovê ecem ji hesen re got: Her bi qasî kurê min tu li ber dilê min ne delalî bûyayî, min raza vê hunerê ji te re nedigot. Vêca baş bi baldarî temaşe bike, lewre ji vê îksîra di nav kaxez de pê ve derman li cem min nemaye. Loma divê tu baş binihêrî, bê ez çi çiqasî û çawa tevlihev dikim. Bi giştî divê tu deh ritil paxir tevlî nîv derhema vî dermanî bikî, wê her deh ritil bibe zêrê safî. Niha di nava vî kaxezî de ji vî dermanî sê weqîyên Misrî heye. Gava ku qedîya, ez ê ji te re hinekî din çêbikim.

Hesen rahişt kaxiz vekir û lê nihêrî, dît ku tiştekî hûrik û zer tê de ye, ku ji ya ewil jî hûrtir bû. Hesen jê re got: Mîrzayê min navê vî dermanî çi ye û ji çi çêdibe? Li hemberî temahîya wî mirovê ecem kenîya û jê re got: Tu pirsa çi dikî? Bêdeng bixebite û nepeyîve!

Mirovê ecem taseke paxirî perçe perçe kir, avêt ser agir, ew di kodikê de heland û hinek ji wî dermanî avêt ser, bi pifikê pif kirê û tevda, piştre ji ser agir rakir, sar kir, ew paxir hemû zivirî zêrê xwerû. Li hemberî wê dîmenê careke din devê Hesen ji hev ma û ji kêfan baskên wî çêbûn. Bi qalibê zêr ve ket û xwe ji bîr kir, çawa ku serxweş ketibe. Mirovê ecem jî movikek benc ji ber kofîya serê xwe derxist, ew hûr kir û xist nava şîranîyê. Piştre jê re got: Hesen êdî tu bûyî mîna kurê min, hezkirina te di dilê min de meyîya û keçeke min heye, ez dixwazim wê li te mehr bikim!

Hesen got: Ez xulamê kurê te me, tu çi xêrê bi min bikî, wê li cem Xwedê were nivîsandin. Zilam got: Baş e kurê min, nexwe bêhna xwe fireh bike, Xwedê hez bike, wê her tişt sererast bibe û li gora dilê te bi pêş de here! Pê re jî ew gepa şîranîyê da wî. Hesen şîranî ji destê wî girt û destê wî maçî kir, bêyî ku bizanibe çi li pêşîyê ye. Çawa ku ew gepa şîranîyê avêt zelûma xwe û daqurtand, gewdeyê wî li erdê rast bû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 841'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku Hesen ji ser hişê xwe çû û li erdê bû term, mirovê ecem pir kêfxweş bû û got: Bi salan bû, ku ez li te digerîyam û va ye min tu bi dest xistî! Piştre bi lez rabû ser xwe, newqa xwe şidand û sindoqek dudu vala kirin. Dûre dest û nigên Hesen girêdan û ew di sindoqê de bi cih kir. Zêr û zîv û tiştên ku di malê de hebûn jî hemû kom kirin û xistin sindoqa din. Devê herdu sindoqan girêdan û bi lez çû ji sûkê barkêşek anî û herdu sindoq rakirin, ew birin li keştîyê kirin, ku ji berê ve li peravê hatibû sekinandin, ji bo wî bi xwe. Piştî ku sindoq bar kirin, mirovê ecem di cî de li qeptanê keştîyê kir qîrîn û got: Zû bilivin û me bigihînin miradê me!

Bi wê fermana wî re qeptan jî bi ser keştîvanan de qîrîya û got: Bavanan hildin û werîsan vekin! Pê re jî keştî livîya û li ber bayê çû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 842'YAN

*Şehrezadê got:*

Em wî mirovê ecem û keştîya wî di eryayê de bihêlin û em vegerin ser rewşa diya Hesen. Diya Hesen hetanî eşayê jî xwe ragirt lê tu deng ji Hesen nehat û kes jî li şûna xwe neşand cem wê, ku agahîyekê bide wê. Ji ber ku ji serî de guman pê re hebûn, ew bêdengîya kurê wê qelaq xist nava wê. Rabû ser xwe û hat malê, dît ku derîyê wan vekirî ye. Derbasî hundir bû, tu kes li hundir nedît. Herdu sindoqên wan jî ne xuya bûn. Mal, zêr û zîvê wan jî ne li holê bûn û ev hemû bes bûn ji bo ku bizanibe, bobelatek bi serê kurê wê de hatiye! Di cî de hawar pê ket, li rûyê xwe da, porê xwe kişand û got: Kezeba dayîka xwe lawo! Dil û hinavê dayîka xwe lawo, hemû hebûna me lawo!

Diya Hesen hetanî sibehê jî girîya, kalîya, nalîya û li xwe da. Sibehê cîranên wê lê hatin hev û kurê wê ji wê pirsîn. Wê jî çîroka wî mirovê ecem ji wan re got. Jixwe êdî hêvîya wê nemabû, ku careke din wî bibîne. Loma wek serxweşan di hundir de diçû û dihat, digerîya û dikir hawar. Hîna ku ew wisa li hundir digerîya, du rêzik nivîsên li ser dîwar bala wê kişandin. Lê nizanibû, ku bixwenda. Çû gazî zanayekî kir. Wî jê re xwend û got: Ev nivîs wiha dibêje:

sîwêneya şeva me diçe ava bi tîrêjên rojê re
sehera siberoja me jî li pey diçe bi xewê re
gava em digihên dûmahîya van nîqaşên xwe
ezmanê şînzer rût xuya dike gor jî dûr e

Gava ku diya Hesen ev gotin bihîstin, qîrîya û got: Belê kurê min, belê mala vikî vala ye û gor jî pir dûr e.

Cîranan destûra xwe xwestin û rabûn çûn malên xwe û jê re dua kirin, ji bo ku Xwedê tala wê û kurê wê bigihîne hev.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 843'YAN

*Şehrezadê got:*

Girîyê diya Hesen şev û roj dewam kir. Bêyî kurê wê hedana wê nedihat. Herî dawîyê ji bo ku sebra xwe pê bîne û êşa nav dilê xwe kêm bike, di nava malê de ji kurê xwe re tirbek çêkir, navê wî û dîroka nebedîbûna wî li ser kêlê nivîsand û li ber rûnişt, nema ji ber rabû. Êdî sebra wê ew gora wî bû. Diçû û dihat destê xwe di ser re dibir û dianî, çawa ku ew gor Hesenê wê bi xwe be. Şev û rojên xwe giş bi wê gorê re derbas dikirin.

Em diya wî li wir bihêlin û em vegerin ser Hesen bi xwe. Mirovê ecem ê ku Hesen biribû, mecûsî bû û dijminê mislimanan bû. Keys li kîjan mislimanî bianîya, ew dikuşt. miroveki bêbext, dijwar û bêwijdan bû. Navê wî jî Behrem bû. Xelkê jê re digot Behremê Mecûsî. Her sal yekî misilman dibir, ew serjê dikir, dikir qurban. Hesen jî bi wê armancê revandibû û ew dibir ateşkedeyê. Keştîya wan bişev jî meşa xwe berdewam kir û bi sibehê re xwe gihandin benderê.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 844'AN

*Şehrezadê got:*

Roja dîtirkê Berhemê Mecûsî û zilamên xwe pêdivîyên xwe ji benderê girtin û berê keştîya xwe dan ava deryayê, meşa xwe dîsa berdewam kirin. Di rê de Behrem ji xulamên xwe re got: Ka wê sindoqa ku Hesen tê de ye, ji min re bînin vir! Çûn sindoq jê re anîn. Sindoq vekirin, Hesen jê derxis-

tin. Behremê Mecûsî tozek xist pozê wî û pif kirê. Hesen pişkîya, vereşîya, benca nava xwe avêt û çavên xwe vekirin, li derdora xwe nihêrî, dît ku di na va behrê de ye! Piştre tê derxist ku di hundirê keştîyekê de ye û fam kir, ku ew melûnê ecem xap û rîp lê kirine û metirsîya ku diya wî jê re anîbû ziman, bi serê wî de hatiye. Di dilê xwe de got: Xwedêyo ji te re malûm e û tu bi her tiştî dizanî! Hêz û qewet hemû bi te ye û vegera me gişan wê li cem te be. Xwedayo sebr û metanetê bide min, da ku ez bikaribim xwe ji ji van bobelatan rizgar bikim û bi rûyekî spî derkevim raberî te!

Piştre li mirovê xwe yê ecem zivirî û bi zimanekî şîrîn got: Bavocan, te çi bi min kiriye, ka ew nan û xwêya di navbera me de û kanî ew soz û peymanên me bi hev re dabûn? Behrem awirin tûj dan wî û jê re got: Kûçikê heram, ma ez nan û xwê nas dikim qey û min nehsed û not û neh ciwanên mîna te kuştine û bi te ve jî wê bibe hezar!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 845'AN

*Şehrezadê got:*

Axaftina nermik û şîrîn jî fêde nekir û bi wê gotina dawîn a mirovê ecem, Hesen têgihîşt bê berê qedera wî li ku ye! Ecemê mecûsî Behrem ji xulaman re got: Dest û nigên wî vekin! Det û nigên wî vekirin û hinek av jî danê. Bêhna Hesen hebekî hat ber wî lê wî baş dizanibû ku dê were kuştin.

Behremê Mecûsî kenîya û jê re got. Bi heqê agir û rojê, bi heqê sî û germê, tu qet nediketî tora min û tu nedihatî zevtê heger agir alîkarî neda min. Lê spas ji wî re ku tu xistî tora min û êdî qurbaneke min jî çêbû, ku ez bidime wî, da ku ji min razî bibe.

Hesen lê vergerand û got: Te xayîntî bi nan û xwê re kir! Behrem di cî de destê xwe rakir û kulmek li serê wî xist, kir ku Hesen bi serdevkî bikeve erdê û ji ser hişê xwe here. Hêsirên ku bi ser hinarikên wî de hatin xwarê jî, rijîyan erdê. Demeke dirêj wisa ma, bêyî ku bi ser xwe ve bê.

Piştre Behremê Mecûsî ji xulaman re got: Agirekî pêxin! Hesen got: Tu yê çi bikî ji agir? Behrem got: Agir xwedanê tîrêj û şewqê ye, ew ronahîyê li dinyayê tevî belav dike û perdeyên reştarîyê diqetîne. Loma ez xiroş û îbadetê ji wî re dikim. Heger tu jî werî ser vê bawerîyê, ez ê nîvê malê xwe bidim te û keça xwe jî li te mehr bikim!

Hesen pê de qîrîya û got: Wax, wax, wax! Nexwe tu mecûsî yî û tu agir-peresteKî kafir î, ne Xwedayê gewre nas dikî ne jî afirînerê şev û rojê. Ev jî musîbeteke mezin e ji bo hemû olan.

Bi wê gotina Hesen re Behrem pir hêrs bû û jê re got: Sehê ereban, qey tu bi ya min nakî û tu nayêyî ser ola min!

Hesen bi ya wî nekir. Behrem rabû ser xwe, ji agir re ket xiroşê. Piştre ji xulaman xwest, ku Hesen serdevkî bavêjin erdê. Wî jî rahişt qayîşekê û ket ser piştê, lêda û hey lêda, hetanî ku xwînê di kêlekên wî re avêt.

Hesen jî her bi gazî û hawar bû, diqîrîya, dinalîya û dikir hawar. Lê tu kes nedihat alîkarîya wî û kesî ew ji nav lepên wî zalimî rizgar jî nedikir. Di encamê de hêsir barandin, tewkelîya xwe bi Xwedayê xwe kir û sebir û vîndarî jê xwest.

Piştre Behremê Mecûsî ji xulamên xwe xwest, ku wî ji erdê rakin û wî bidin rûniştandin û hinek xwarin û vexwarinê jê re bînin. Xulaman ferma-na wî pêk anîn lê Hesen ne xwarina wan xwar û ne jî ava wan vexwar.

Behremê Mecûsî şev û roj li Hesen dida û ew îşkence dikir. Hesen jî gilî û gazinên xwe li ba Xwedayê xwe dikir û dev ji sebrê bernedida, bêhna xwe fireh dikir, bi hêvîya ku Xwedayê wî rêyekê bide ber wî. Rêwîtîya keştîyê pir dirêj kir û ew îşkence û lêdana ku li Hesen dibû, sê mehan berdewam kir. Her ku diçû jî, Behremê Mecûsî pê re dijwartir dibû.

Sê mehan bi şûn de rojekê Xwedê teala bayekî ecêb bi ser wan de şand, ewr li hev gerîyan û bû tarî, pêlên behrê rabûn û dîn bûn. Keştî jî mîna pêlîstokekê çû û hat, li ser rûyê wê ava hêrs bûyî. Piştre pistepistek di nava qeptan û keştîvanan de gerîya û hemû gihîştin wê bawerîyê, ku ew bobelat giş ji rûyê wê zilm û wê îşkenceya ku bê sebeb li wî ciwanê bêguneh dihat kirin, bû. Hemû bi hev re li hemberî yê mecûsî derketin û xulamên wî giş kuştin. Dema ku zilamên wî hatin kuştin, Behremê Mecûsî li ser xwe pir tirsîya û têgihîşt, ku dê wî jî bikujin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 846'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku Behremê Mecûsî tirsîya, ku dê keştîvan wî jî bikujin, Hesen berda, kincên gemarî jê kirin û hinekên nû lê kirin, pê re li hev hat û soz

dayê, ku wî fêrî wê pîşe û hunera zêrçêkirinê bike û wî dîsa vegerîne welatê wî. Dûre pê de çû û axaftina xwe berdewam kir, jê re got: Li qisûra min nenihêre kurê min, ew xerabîya ku min bi te kir, hemû ji bo pîvandina bîr û bawerî û sebra te bû. Jixwe tu jî baş dizanî, ku her tişt di destê Xwedê de ye û em jî bendeyên wî ne.

Hesen got: Piştî ew qas tiştên ku qewimîn, ez ê çawa bi te bawer bibim? Behrem got: Kurê min Xwedê qedera me li ser enîya me diyar kiriye û heger guneh tune bûna, tu wateya lêborîn û efûyê jî nedima. Jixwe tu jî dizanî ku sifeta sereke ya Xwedayê me "xefûr û rehîm" e, yanê lêborîner û dilovan e.

Qeptan û xebatkarên keştîyê hemû bi vê gotina Behremê Mecûsî pir kêfxweş bûn. Hesen jî pê bêhnfireh bû û ji nû ve aramî ket dilê wî. Spasîyên xwe ji qeptan û zilamên wî re pêşkêş kir û ji bo xwedayê xwe jî hemd û şikir kir. Ba û bahoz jî bêdeng bû û pêlên avê daketin, behr jî aram bû, rêwîtîya xwe bi hêsanî berdewam kirin.

Di wê navberê de Hesen ji Behrem re got: Gelo em bi ku ve diçin? Behrem got: Kurê min, berê me li çiyayê ewrîn e. Ew çiyayê ku em wê îksîra xwe ya ji bo çêkirina zêr jê tînin. Bi vê axaftina xwe re Behrem bi agir û rojê sond xwar, ku tu tiştekî veşarî li gel wî nemaye, ku jê re nebêje. Hesen kêfxweş û dilaram bû, bi vê gotina wî û êdî pê re xwar û vexwar, pê re raket, pê re rabû û rûnişt, mîna cara berê. Wê rêwîtîya wan sê mehên dinê jî berdewam kir. Piştre keştîyê xwe da ber peravekê, ku qeraxên wê giş bixurkên reş, spî, şîn û zer bûn. Gelek rengên din jî di nav de hebûn. Gava ku keştî li wir sekinî, Behrem rabû ser xwe û got: Hesen rabe ser xwe, em gihîştin armanca xwe!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 847'AN

*Şehrezadê got:*

Çawa ku Behrem wisa got, Hesen rabû û pê re daket. Behrem ji qeptan xwest, ku çavdêrê eşyayên wî be û wisa ji keştîyê daket. Hesen jî da dû. Bi qasî ku ji ber çavan bikeve, dûrî keştîyê çûn. Piştre Behremê Mecûsî rûnişt û daholeke paxirî ji berîka xwe derxist li gel tezeneyeke bi hevrîşim û zêr neqişandî û dest pê kir, lêda û li ser xwend. Piştî ku lêdana daholê qedand, toz û ecacekeke mezin ji hêla berîyê rabû û ber bi hewa ve bilind bû. Hesen behetî ma û ji wî tirsîya. Pir poşman bû, ku dîsa qinyata xwe pê anîye û pê

re daketîye. Tirsê laşê wî giş dagir kir, mehdê wî zer bû û Behremê Mecûsî jî tê derxist. Xwest, ku wî aram bike, jê re got: Çi bi te hatiye, kurê min? De binihêr, bi heqê agir û rojê tu tiştekî ku tu jê bitirsî nîn e û heger bêyî navê te pêdivîya min bihata cî, min tu li keştîyê jî siwar nedikirî! De êdî aram be, ji xêrê pêve tiştek tune ye û ev toza ku radibe jî, toza tiştekî ku em lê siwar bibin, ber bi me ve tê. Bi xêra wê em ê vê berîyê gişî bi hêsanî derbas bikin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 848'AN

*Şehrezadê got:*

Piştî ku Behremê Mecûsî ev gotin gotin, bi qederekê ew toz bûn sê heb, piştre sê bûraq ji bin derketin û hatin cem wan sekinîn. Behrem li yekê û Hesen li yekê siwar bû, xwarina xwe li ya din kirin û wek bayê bi rê ketin, çûn. Piştî heft rojan gihîştin mêrgeke şîn û fire, li wir daketin. Qubeyek li wir hebû, çûn li binî wê qubeyê rûniştin, bêhna xwe berdan, xwarin û vexwarina xwe li wir xwarin. Di wê navberê de tiştek bi ber çavên Hesen ket. Ji Behrem pirsî û got: Ev çi ye, apocan? Behrem got: Ew qesr e. Hesen got: Em neçin li hundirê wê bêhna xwe venedin, ne çêtir e? Behremê Mecûsî şaşwaz bû û jê re got: Vê yekê ji hişê xwe derxîne, ew qesra dijminê min e û çîrokeke min û wî bi hev re heye, ez nikarim niha ji te re bibêjim.

Behrem dîsa dahola xwe ya paxirî derxist, lêda, her sê bûraq hatin cem wan. Dîsa her yek ji wan li yekê siwar bû û erzaqên xwe li ya din kirin û heft rojên din jî meşîyan. Roja heştan Behremê Mecûsî ji Hesen pirsî û got: Tu çi dibînî? Hesen got: Ez mij û ewrekî dibînim, di neqeba şerq û xerbê de.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 849'AN

*Şehrezadê got:*

Behremê Mecûsî pirsa xwe berdewam kir û got: Ev tiştê ku tu dibînî, ne mij e ne jî ewr e, Hesen. Ew tiştê ku tu dibînî, çiyayekî mezin e. Ewr û xumama li ser jî, ji ber bilindahîya wî ye. Û ev çiya meqseda min e. Lewre pêdivîya me li ser wî ye û min tu ji bo vê yekê bi xwe re anîyî vir, da ku bi destê xwe vê haceta min pêk bînî!

Dilê Hesen şikest, bi van gotinan û ji jîyanê bêhêvî bû. Piştre ji zilamê mecûsî re got: Tu bi heqê bîr û bawerîya xwe bikî, ji bo bidestxistina kîjan pêdivîyê te ez anîme vira! Behrem got: Ew hunera kîmyaya zêrçêkirinê bi gihayekî çêdibe, ku bi tenê li wî cihê ku ew ewr û xumama di ser re diçe, çêdibe. Ew cihê hanê jî li ser vî çiyayî ye. Vêca heger me hinek ji wî gihayê li ser bi dest xist, ez ê hunera vê pîşeyê nîşanî te bidim.

Hesen ji tirsan mecbûr ma, ku bibêje: Bila be, mîrzayê min. Lê belê hêvîya wî bi tevahî şikest, êdî pir poşman bûbû, ku ji dê û kes û karên xwe veqetîyabû û li şîreta diya xwe guhdar nekiribû.

Dîsa meşa xwe berdewam kirin, heta ku gihîştin wî çiyayî. Li jêra wî sekinîn û li jorê nihêrîn. Hesen li ser wî çiyayî qesrek dît.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 850'YÎ

*Şehrezadê got:*

Gava ku Hesen çav bi wê qesrê ket, ji Behrem pirsî, got: Ev çi qesr e? Behrem got: Ew mala cin û efrît û şeytanan e.

Behrem ji bûraqa xwe daket û ji Hesen xwest ku ew jî peya bibe. Piştre çû bi serê wî girt nav destên xwe, enîya wî maçî kir û jê re got: Ez careke din lêborîna xwe ji te dixwazim, ji ber wan xerabîyên ku berê min ew bi te kirin. Lê di derketina vê qesrê de ez ê te biparêzim, tu qet meraq neke. Lê belê divê tu jî di tu mijarê de bêbextîyê bi min re nekî. Îksîra ku tu bînî, em ê di nav xwe de bi wekhevî parve bikin. Hesen got: Bila be, ser seran, ser çavan.

Behremê Mecûsî tûrik derxist û hawênek jê deranî. Hinek genim berî hawênê da û ew tê de kuta, hûr hûr kir, hetanî ku bû ard. Piştre av berda ser, ew stra, kir hevîr û sê qursik jê çêkirin. Agirek dada û ew qursik li ser biraştin. Piştre dîsa dahola paxirî derxist û lêda, her sê bûraq dîsa hatin. Yek ji nava wan hilbijart û ew serjê kir. Çermê wî gura, dûre jî li Hesen zivirî, jê re got: Binihêre kurê min û baş li min guhdar bike, şîretên min bixe serê xwe! Hesen got: Ez guhdar im! Behrem got: Têkeve nava çermê vî ajalî, ez çerm li te bînim hev û wî dîsa bidirûm, bikim mîna berê û te li vir deynim. Demek bi şûn de wê teyrên rexê bên te rakin û te bibin serê wî çiyayî. Gava ku te tê derxist tu li cihekî danîye, tu bi kêrê çermê ajal biçirîne û derkeve. Wê teyr ji te bitirse û here. Tu jî ji jor ve li min binihêre, ez ê ji te re bibêjim bê jê û pê de tu yê çawa bikî!

Her sê qursikên ku amade kiribûn, li gel cewdikekî avê, kêrek jî xist nav çermê bûraq. Çerm anî hev û baş dirût. Piştre rabû ser xwe û çû ji wir dûr ket. Teyrê rexê jî hat, rahiştê û bi hewa ket, çû serê çiyê û ew li wir danî. Gava ku Hesen tê derxist, ku teyr ew danîye erdê, kêra xwe li çerm da, ew çirand û jê derket.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 851'AN

*Şehrezadê got:*

Hesen ji nav çermê wî ajalî derket û ji jor ve gazî Behremê Mecûsî kir, pê re axivî. Behrem bi dengê wî kêfxweş bû. Bi dengekî bilind lê vegerand û jê re got: Bi paşve here û te çi dît, ji min re bibêje! Hesen bi paş de çû, li darên hişk û hejikan rast hat. Gazî wî kir û ew ji wan agahdar kir. Behrem got: Tiştê ku em lê digerin jî ew e. Lewre em wan daran di kîmyayê de bi kar tînin. Ji wan hejik û daran şeş gurzan çêbike û wan ji min re bavêje. Hesen şeş gurz çêkirin û jê re avêtin. Gava ku her şeş gurz gihîştin ber destê Behremê Mecûsî, pê de qîrîya û jê re got: Tiştê ku ez li pey wî hatibûm, min ew bi dest xist, de êdî tu qûndeyê heram tu çawa dixwazî wisa bike. Tu dixwazî li wir bimîne, tu dixwazî xwe berjêr ve bavêje û perçe perçe bibe! Piştre dev jê berda û bi rêya xwe de çû. Hesen bêhêvî bû û ji xwe re got: La hewle û la quwete îlah bîlah, vî kûçikî dîsa bêbextî li min kir! Piştre rûnişt, di ber xwe de kelîya û nalîya!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 852'YAN

*Şehrezadê got:*

Hesen têgihîşt, ku mirina wî nêzik bûye. Rabû ser xwe, li çep û rastê xwe nihêrî, çavên xwe li derdora xwe gerandin. Piştre bi çiyê ve çû û meşîya, hetanî ku gihîşt alîyê din ê çiyê. Li wê hêla din bala xwe dayê, ku deryayeke şîn heye, ku pêlên wê dîn û har bûne, li bin guhê hev dikevin. Mîna ku çiya li hev bikevin û kefeke spî li şûna xwe dihiştin. Li ber wê dîmenê rûnişt, hinek ji Quranê xwend û ji Xwedayê xwe lave kir, ku rêyeke hêsan nîşanî wî bide. Çi rêya xelasîyê be çi rêya mirineke bêêş. Herî dawîyê nimêja cenaze jî li ser xwe kir û xwe avêt nava ava wê deryaya har. Bi emrê Xwedê pêlên ava wê deryayê

rahiştinê û ew bi saxî û selametî avêtin ser bejahîyekê. Rabû ser xwe, li wan deveran li tiştekî xwarinê gerîya. Di wê gera xwe de, carekê ji nişka ve dît, ku hatiye heman cihê ku ew û Behremê Mecûsî tê re derbas bûbûn.

Meşa xwe bi qasî saeteke din jî berdewam kir, bala xwe dayê, ku rastî qesreke bilind û ecêb hatiye. Baş lê mêzand, tê derxist û nas kir, ku heman qesra ku wî ew ji Behrem pirsîbû û Behrem jê re gotibû, ew qesra dijminê min e. Hesen di dilê xwe de ji xwe re got: "Çi dibe bila bibe, divê ez derbasî vê qesrê bibim. Belkî ez tê de rêyeke xelasîyê bibînim."

Çû ber qesrê, dît ku derîyê wê vekirî ye. Derbasî hundir bû, dît ku li hêwanê maseyek heye û du keçên mîna du heyvan jî li ser wê maseyê bi kişikê dilîzin. Çawa ku ew derbas bû, keçikekê ji wan serê xwe rakir lê nihêrî û ji kêfan qîrîya û got: Bi Xwedê hebe nebe ev yekî ademî ye û ez texmîn dikim, yê ku îsal Behrem ew bi xwe re anîye jî, ev e!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 853'YAN

*Şehrezadê got:*

Çawa ku Hesen gotina wê keçikê bihîst, hema di cî de xwe da ber destên wan û ji wê keçikê re got: Xatûna min, ez di bextê te de me! Ew feqîr û hejarê ku tu behsa wî dikî, ez im! Pê re jî girîya û hewadarîya wan xwest. Wê gavê keçika biçûk ji ya mezin re got: Xwîşka min tu şahid be li ser vê gotina min, ji îro û pê de wê ev xortê hanê birayê min be, di hizûra Xwedê de. Ev gotina min jî dê di navbera me de peyman be û êdî ji îro û pê de wê mirina min bi mirina wî re be, wê şîn û şahîya min jî bi şîn û şahîya wî re be.

Piştî wê gotina xwe jî di cî de pê ve rabû, ew himbêz û maçî kir, rahişt destê wî û ew bir odeyekê, xwîşka wê jî li pey wan çû. Kincên wî yên peritî di ser re anîn û kincên nû yên şahan lê kirin. Piştre jî xwarinên cur be cur li ber wî danîn û ew û xwîşka xwe jî pê re rûniştin û xwarin. Dûre jê re got: Kanî çîroka xwe û wî sehê facir û gunehkar, ji roja ku te ew dît û hetanî roja ku tu jê veqetîyayî, vebêje. Piştre em ê jî ji te re bibêjin, bê wî çi bi serê me de anîye ji bo ku gava careke din tu lê rast hatî, tu nema pê bêyî xapandin.

Gava ku Hesen ew gotin ji wan bihîstin û çav li wê helwesta wan a dostane ket, hişê wî lê vegerîya, hêvîyeke nû pê re çêbû û ji nû ve aramîyek ket nava wî. Bi wan re axivî, çîroka xwe û wî mirovê mecûsî ji serî hetanî

binî ji wan re got. Wan jî jê pirsî: Gelo te pirsa vê qesrê jî jê kir? Hesen got: Belê min jê pirsî û wî jî got, ev qesra şeytan û cin û efrîtan e, ez naxwazim behsa wan bikim.

Herdu keçik hêrs bûn û gotin: Nexwe wî kafirî em kirine şeytan û îblîs?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 854'AN

*Şehrezadê got:*

Hesen li wê pirsa keçikan vegerand û got: Belê. Biçûka wan a ku xwe kiribû xwîşka Hesen got: Bi navê Xwedê ez ê bi şewleke bêhawe wî bikujim û ez ê şopa wî paqij bikim ji ser rûyê vê erdê! Hesen got: Tu yê çawa xwe bigihînî wî, wî bikujî û ew sahirekî xedar e? Keçikê got: Ew li bîstanê Avadan dimîne û bêguman di demeke nêzik de ez ê wî bikujim.

Xwîşka wê lê vegerand û got: Hesen rast dibêje û hemû tiştên ku derbarê wî sehî de anîn ziman, di cihê xwe de bûn. Lê belê ka tu jî çîroka me û wî ji Hesen re bibêje, da ku wî baş nas bike û ji hişê wî dernekeve.

Keçika biçûk ji Hesen re got: Birayê min ê delal, em jî keçên şahan in û bavê me şahekî cinan ê mezin ê bi nav û deng e. Gelek leşker û xulam û efrîtên wî hene û Xwedê teala ji jinekê tenê heft keç danê. Hingî ku pozbilind bû û ji wan hez dikir, li ser wan bi xîret bû, nehişt ji wan yek bi tenê jî bizewice. Rojekê ji rojan wezîr û gizîr û mezinên xwe li dora xwe kom kirin û ji wan re got: Gelo hûn cihekî nas dikin, ku tu kes naçê, ne ji insanan û ne ji cinan. Cihekî ku dar û berên wî, av û fêkîyên wî pir bin? Wan jî jê re got: Tu yê li wî cihî çi bikî, şahê dem û dewranan? Bavê min got: Ez ê her heft keçên xwe li wir bi cih bikim. Wan jî got: Qesrek li çiyayê mij û ewran e, ew der li gora keçên te ye. Ew qesra hanê efrîtekî ji cinên serhildêr ên di dema Suleyman Bin Dawid (Silavên Xwedê li ser wî bin) de ava kiribû. Ji gava ku miriye ve ew qesra wî vala maye, ne cin ketinê ne jî ins. Ji ber ku ji her derê qut e û derdora wê jî tijî çem û dar û ber e. Bi taybetî jî ava wir ji berfê jî hîniktir e û kî jê vedixwe, ne cuzam ne gurîbûn û ne jî tu nexweşînên din pê re namînin.

Vêca gava ku bavê me ev yek bihîst, em şandin vê derê.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 855’AN

*Şehrezadê got:*

Keçikê ji Hesen re got: Gava ku bavê me ev qesr bihîst, em şandin vir, li gel qefleyek leşker û xulam û hemû pêdivîyên me yên din. Bavê me jî, çi gava ku dixwest bi rêyekê ve here, rêwîtîyekê bike, li daholê dixist, gelek hesp û leşker di cî de li ber wî amade dibûn. Wî jî hinek dineqandin, li wan siwar dibû û yên mayî bi şûn de dişandin. Çi gava ku bêrîya me dikir jî, hinek ji sêrbaz û efsûngerên xwe dişandin pey me, ewan dihat em dibirin cem wî. Me hesreta bêrîkirina xwe dişikand, wî jî wensa xwe bi me dianî, piştre em dîsa vedigerîyan vê derê.

Vêca ji gava ku em hatine vir, adetek me heye, ku em her car derdikevin nêçîr û şikarê. Lewre di vê berîya dora me de  gelek ajal û wehş û dirinde hene.

Her ku em derdikevin nêçîrê, em bi dorê nobetê digirîn û her carê du heb ji me li malê dimînin, ji bo ku em xwarinê çêbikin. Vêca îro jî dora nobetê hatibû ser min û vê xwîşka min.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 856’AN

*Şehrezadê got:*

Keçikê vegotina serpêhatîya xwe berdewam kir û got: Ji ber ku nobeta me bû, çawa ku her pênc xwîşkên me derketin, em rabûn ser xwe, me dest bi amadekirina xwarinê kir û me di nava xwe de got: “Xwezîka niha insek li ba me bûya, me wensa xwe pê bianîya!” û di pey re jî me dît, ku tu ketî hundir. Xwedê tu ji me re şandî û daxwaza me pêk anî. De êdî aram be, meraqan nexwe.

Hesen pir şad û bextewar bû, bi vê pêşketina ku di hişê wî re jî derbas nedibû. Di dilê xwe de got: Şikir ji Xwedê re ku ez ji mirinê xelas kirim!

Keçika ku bûbû xwîşka wî, bi dilnazî rahişt destê wî û ew bir odeyeke din a raxistî, bi ber û cilên giranbuha ku li tu cihan peyde nedibûn..

Saeteke din bi şûn de her pênc xwîşkên ku çûbûn nêçîr û şikarê jî vegerîyan malê. Xwîşka biçûk ew ji hatina Hesen û çîroka serpêhatîya wî agahdar kirin. Ew jî bi wê yekê pir kêfxweş bûn û derbasî odeya wî bûn,

silaveke germ lê kirin û destxweşîya wî kirin, ku ji mirinê rizgar bûye.

Hesen di nava xweşî, rihetî û bextewarîyeke bêtimtêl de li gel wan jîya, wensa xwe bi wan anî û êdî di çûn û hatina nêçîr û şikarê de jî tevlî wan dibû, çawa yekî ku ji malê be.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 857'AN

*Şehrezadê got:*

Hesen jîyana xwe wisa berdewam kir, bi wan keçan re heta ku birînên wî cebirîn, laşê wî xurt bû û goşt girt, bi xêra wê îkram û mêvanperwerîya bêsînor a ji wan didît. Lewre her heft mazûbanên wî bi ser de dimiriyan û pir jê hez dikirin. Her dem ew di nava qesrê de, di nava bîstan û baxçeyên dar û lalezaran de digerandin û bi hezkirineke xurt ew dorpêç dikirin. Hesen jî bi wan bêhna xwe derdixist û têra xwe ew cîhana tijî rindî û spehîbûn temaşe dikir. Êş û kul û derdên xwe hemû ji bîr dikirin. Keçik jî hemû pir pê kêfxweş dibûn.

Carekê xwîşka biçûk ji yên din re behsa Behremê Mecûsî kir, bê çawa ji wan re gotiye "Ev qesra şeytan û îblîsan e." Gava ku ev gotina Behrem bihîstin, hemûçkan sond xwarin, ku wî bikujin û heyfa xwe jê hilînin.

Gava ku ew sal derbas bû û dîsa wextê wî hat, Behremê Mecûsî vê carê jî xortekî misliman bi xwe re anî wir, ku mirov fedî dikir, ku lê binihêre, ji ber spehîbûna wî. Ew jî di nava qeyd û zincîran de bû, dest û nigên wî girêdayî û di bin îşkence û lêdanê de bû. Behrem weke cara din ew di binîya qesrê re derbas dikir. Wê gavê Hesen jî li jêra qesrê, li qeraxa çem, li bin daran rûniştî bû û ew dît. Çawa ku çavên wî lêketin jî, dilê wî lêda, êşeke sotîner û janeke dijwar ket nava wî.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 858'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku Hesen Behremê Mecûsî dît, destên xwe li hev dan û bazda cem keçikan, ji wan re got: Hûn bi qedrê Xwedê bikin xwîşkino, werin alî min bikin, em wî melûnê mecûsî bikujin. Va ye, hatiye ketiye nav lepên we

û ciwanekî misliman pê re ye, ku ji şewla wî diyar dike, ku kurekî maqûlan e. Wa ye bi awayekî hovane îşkence û azarê pê dike, ez dixwazim wî bikujim û bi wî hawayî hem heyfa xwe jê hilînim hem jî wî ciwanî rizgar bikim û rizamendiya Xwedayê xwe qezenc bikim. Bi saya serê we wê ew ciwan jî bikaribe vegere welatê xwe, nav malbat, dost û hogirên xwe û hûn ê jî xêr û sewaban qezenc bikin.

Her heft keçikan gotin: Ser seran, ser çavan Hesencan, em di bin emrê te û Xwedayê gewre de ne. Hemû rabûn ser xwe, kinc û amûrên şer li xwe kirin, şûr û mertalên xwe hildan, şûr û mertalekî baş dan Hesen jî, hespekî zînkirî jê re anîn û gişan berê xwe dan cihê ku Behremê Mecûsî lê bû. Hesen dabû pêşîyê, her heft keç jî li dû wî bûn. Dema ku Hesen gihîşt hinda wî, dît ku deveyek serjê kiriye, ew guraye û li mislimanê ciwan dide û zorê dide wî, ji bo ku têkeve nav eyarê deveyê.

Hesen ji paş ve û ji xafil ve bi ser de qîrîya û ew şaş û dîn kir, ew ji mêranîyê de xist. Piştre xwe pê ve gihand û jê re got: Destê xwe ji ser wî esîrî bikişîne, ey melûn û sehê kafir! Ey agirperest û şopdarê rêya xwar! Ey dijminê mislimanan!

Behrem bi tirs li pişt xwe zivirî, dît ku Hesen li pey wî ye! Bi bergerî jê re got: Wey kurê min, te çawa xwe xelas kir û tu ji wê derê daketî ser erdê?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 859'AN

*Şehrezadê got:*

Gava ku wî wisa got, Hesen jî got: Xwedê ez xelas kirim, ew Xwedayê ku dê ruhê te bi destê dijminê te bistîne! Di seranserê rêwîtîyê de te îşkence û azar li min kir, kafirê zendîq! Niha jî tu ketiyî nav lepên edaleta Xweda û xelasî ji te re nemaye. Ne bira ne dost ne jî tu soz û peyman nema dikarin te ji mirinê rizgar bikin! Te bi xwe digot, yê ku bi nan û xwê re bêbextîyê bike, wê Xwedê tolê jê hilîne. Te jî bêbextî bi nan û xwê re kir û va ye Xwedê tu xistiye nav lepên min!

Behremê Mecûsî axaftina xwe bi bergerî berdewam kir û jê re got: Bi Xwedê kurê min, tu li ber dilê min pir şîrîn î û ez weke nûra çavên xwe ji te hez dikim. Dil û hinavê min î tu!

Hesen bi ser de çû û şûrê xwe di singa wî de çikiland û di nava pişta wî

re derxist. Serê şûrê wî di piştê re sor biriqand, di kêlîkekê de can da û ruhê wî çû nava agirê dojehê, li wir bi cih bû.

Piştre Hesen rahişt wî tûrikê wî, ew vekir, mîrkutok û dahola paxirî jê derxist û lêda. Hespên bûraqî di cî de hatin cem wî. Dest û nigên wî ciwanî vekirin, ew li bûraqekî siwar kir, nan û ava wî jî li yekî din kir û jê re got: De êdî here, oxira te ya xêrê be!

Her heft keçik jî pir kêfxweş bûn bi wê lehengî û wêrekîya Hesen û ew pîroz kirin, li ser wî karê wî yê watedar û destxweşîya wî kirin, jê re gotin: Te dilê xwe kewand, tola xwe hilda û te agirê nava xwe vemirand, her bijî ji te re Hesen!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 860'Î

*Şehrezadê got:*

Piştî kuştina Behrem, Hesen û her heft keç dîsa vegerîyan qesrê û mîna berê jîyana xwe di nava kêf û şahîyê de derbas kirin. Bi xwarin û vexwarin û kêf û seyran. Çawa ku di bihuştê de be, dê û mirov û dost û hogirên xwe ji bîr kirin.

Rojekê ji singa berîyê tozek bi ser wan de hat, mîna ewrekî tarî mezin bû, ronahîya rojê hemû girt û dinya tarî kir. Keçikan ji Hesen re gotin: Rabe here, bikeve odeya xwe, xwe veşêre. Heger tu yê di odeyê de aciz bibî, here nav baxçe û bîstan, di nav mêwe û daran de xwe veşêre, tiştek bi te nayê.

Hesen rabû, çû odeya xwe û derîyê xwe ji hundir ve li ser xwe girt. Saetekê bi şûn de ew toz ji hev ferikî û artêşeke ecêb ji bin derket, ku mîna deryayê bû. Ev leşker hemû artêşa bavê keçikan bû. Loma her heft keçikan ew bi kêf û xweşî pêşwazî kirin û gelekî qedir û qîmet ji wan re girtin. Piştî mêvandarîya sê rojan, keçikan rewş û sebeba hatina wan ji wan pirsîn. Wan jî gotin: Em ji cem bavê we tên, em hatine dû we. Keçikan gotin: Û bavê me çi ji me dixwaze? Gotin: Daweta hinek şah û qralan heye, dixwaze ku hûn jî pê re herin wê dawet û şahîyê, da ku hûn ji xwe re temaşe bikin.

Her heft xwîşkan ji wan pirsîn: Em ê çiqasî, çend rojan dûrî vê qesra xwe bimînin? Leşkeran gotin: Dawet û şahî, li gel çûn û hatinê hemû du mehan dajo.

Keçik çûn derbasî cem Hesen bûn. Ew ji rewşê agahdar kirin û gotin: Jixwe mala me, mala te ye û ev der cihê te ye. Qet meraqan neke, bi xweşî û aramî jîyana xwe li vir berdewam bike, heta ku em vedigerin. Ha ji te re mifteyên qesrê û yên odeyên me, bila ew jî li gel te bin. Netirse, xemgîn nebe û bila tu metirsî bi te re çênebe. Lewre ev der pir ewle ye û tu kes nikare bi ser te de bê. Herî dawîyê jî xwîşka wî şiyarîyek jê re kir, got: Tu bi Xwedê bikî birawo derbasî vê odeya hanê nebe, jixwe ji te re lazim jî nabe! Piştre gişan xatir jê xwestin û li gel leşkerên bavê xwe çûn.

Hesen bi tenê ma di qesrê de. Hin bi hin bêhna wî teng bû û bêrîya wan kir. Bi çûna wan re kêf û şahîya di dilê wî de jî dev jê berda û li şûna wê kul û xem û derdan cî girt, xemgîn bû. Ew mezinahî û firehîya wê qesra gewre lê teng bûbû û nema sebra wî dihat.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 861'AN

*Şehrezadê got:*

Ji bo ku Hesen bêhntengîya xwe derbas bike û sebra xwe bîne, êdî bi tena serê xwe çû seyd û nêçîrê. Nêçîr dikir, serjê dikir û dianî malê û wî bi tenê dixwar. Lê dîsa jî aciz dibû û tengav dibû ji wê tenêtîyê.

Rojekê ji bo ku wê acizîya xwe ji ser xwe bavêje, rabû ser xwe, li temamê qesrê gerîya, derbasî odeyên her heft xwîşkan jî bû, ku tijî zêr û zîv û cewher û madenên giranbuha bûn, dîdarên xwe şaş û metel dikirin. Lê tu tiştî şûna wan nedigirt û tenêtîya wî bi dawî nedikir.

Carekê meraqa wê odeya ku jê re gotibûn, derîyê wê veneke, hişê wî giş dagir kir û kir û nekir, nema dikaribû xwe li hemberî wê meraqê bigire. Di dilê xwe de ji xwe re got: "Gelo çima xwîşka min gote min, qet nêzikî vî derîyî nebe û veneke? Misoger tiştekî ku naxwaze tu kes wî bibîne, tê de heye! Bi navê Xwedê, heger mirina min jî tê de hebe, ez ê li vê odeyê binihêrim."

Rahişt mifteya wî derîyî û rabû ser xwe, çû ew derî vekir û derbasî hundir bû. Bala xwe dayê, ku ne zêr û zîv û ne jî malekî giranbuha tê de hebû. Tenê di hundirê odeyê de derenceyeke kevirîn hebû, ber bi jor ve diçû. di derenceyê re ber bi jor ve hilkişîya û çû hetanî ku gihîşt ser banê qesrê. Di dilê xwe de ji xwe re got: "Gelo ev bû, tiştê ku xwîşka min dixwest wî ji ber min veşêre?"

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 862'YAN

*Şehrezadê got:*

Hesen ew pirs ji xwe kir lê tu bersiv ji pirsa xwe re nedît. Ji xwe re li ser banê qesrê gerîya û ji jor ve li rez û baxçe û bîstanan nihêrî. Li ew qas şîndarên bi çîçek û ber û fêkî; ew qas ajal û teyr û tilûrên ku di nav wan de digerîyan, nihêrî. Şaş û metel bû, li hemberî wan afirîndeyên Xwedayê gewre û got: "Subhan ji navê wî re ku ew qas zindî afirandine, di vê sipehîbûna hanê de!"

Çavên xwe li ser wê dîmena balkêş kilît kirin û ket nav ponijîneke kûr û dûr. Carekê ji nişkan ve dît, ku li hemberî wî deryayeke bi pêl û mewc li hev dikeve û çep û rast li dora qesrê digere, heta u gihîşt qesreke din, ku li ser çar nigan bû. Bala xwe dayê, ku textekî bi yaqût û zumrûd û belxeş û cewherên cur bi cur neqişandî di nava qesrê de ye. Ew text jî ji tûxleyên zêr û zîv û yaqût û zumrûdê kesk hatibû avakirin. Di wê qesrê de goleke avê hebû, ku sendeleke ji darên ned ên bêhnokî ku bi têlên zêrê sor û zumrûdê kesk hatibûn hûnandin û bi cureyên cewher û lûlûyan hatibûn neqişandin, ku her lûlûyek bi qasî hêkeke kevokan bû. Li kêleka wê golê jî textekî ji darên ned ên bêhnokî hatibû çêkirin û bi cewher û zêrên sor hatibû neqişandin û bi gelek cureyên madenên giranbuha û rengîn hatibû xemilandin, bi awayekî hevnêrikî. Derdora wî textî jî tijî teyr û tilûrên rengîn û xweşik bûn, ku bi hemû zimanan dikirin wîtewît, di nava newa û awazin mestegir de. Tu kes li ser rûyê vê dinyayê nebûbû xwedîyê qesreke wisa. Ne kesra û ne jî qeyserê Romê. Hesen şaş û metel bûbû, li hemberî dîmena wê qesrê!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

# HEZAR Û YEK ŞEV

# CILD 12

## ÇÎROKA HESENÊ ZÊRKER Û KEÇA ŞAHÊ CINAN

ŞEVA 863'YAN

*Şehrezade got*:

Hesen, di nava şaşwazî û behetimayîneke bêtimtêl de, bi heyrangorî li wê dîmena mestker temaşe kir. Ji ber ku destê wî ji wê dîmenê nedibû, li cihê xwe rûnişt, di nava coş û poroşeke bêsînor de bi baldarî û hûrgilî li wê dîmena bihuştî temaşe kir. Ew avahîya bi durr û yaqût û zeberced û madenên cur bi cur ên giranbuha hatibû avakirin, karê kê bû, gelo? Hêza kîjan şahî, kîjan qralî digihîşt tiştekî wilo? Kê dikaribû ew qas gulzar û baxçeyên tijî çûk û teyr û tilûr, bi wê spehîbûna bêhempa ava bikira? Bêguman ev hemû bi emrê Xwedayê gewre bûn. Lewre wan çûk û çivîk û hemû zindîyan pesnê Xweda tenê didan. Her yekî bi zimanekî cuda spasî û şanazîya xwe jê re dianî ziman, di her kêlî û her anê de.

Hîna ku ew wisa li ser mezinbûn û spehîbûna wê qesra ecêb diponijî û hewl dida, ku der barê wê de bigihîje zanîneke Xwedayî, bala xwe dayê, ku deh çûkên mezin, ji kûrahîya berîyê ber bi qesrê ve tên. Her ku nêzikî wî bûn, baştir xuya kirin û Hesen tê derxist, ku ev çûk di dirûvê kevokan de bin jî, ne kevok bûn, lewre pir mezin bûn û ne gengaz bû, kevokin ew qasî mezin bi qasî insanan hebin! Di dilê xwe de, ji xwe re got: "Misoger hatine, ku li ser gola qesrê avê vexwin!"

Hesen xwe baş veşart, ji bo ku ew teyrik wî nebînin. Her deh teyr, hatin xwe li ser dareke pir mezin danîn û bi dirêjahî derdora xwe raçav kirin. Hesen bala xwe dayê, ku hemû teyrik li dora girtirîn û spehîtirîna xwe kom bûne, çawa ku pê bişêwirin û li benda fermaneke wê bin. A herî gir jî, nikulê xwe li serê gişan dida, çawa ku bi ser wan de here û wan şiyar bike. Teyrikên din jî bi tirs, xwe ji ber derbên nikulê wê diparastin. Hesen jî matmayî li wan dinêrî. Teyrik, ji ser darê daketin erdê û her yekê lapûşkên xwe li çermê xwe dan, çirandin û ji nava perîkên xwe derketin! Gava ku ji nava wan kincên xwe derketin, devê Hesen ji hev ma! Lewre derket holê, ku her deh teyrik jî, deh keçikên nûhatî bûn, ku her yekê ji wan bi spehîbûna xwe, dihişt ku heyv ji ber şewqa xwe fedî bike! Kincên perîyan ji ser xwe avêtibûn lê hîna her yekê ji wan kincekî hevrêşimî yê tenik li ser wan bû. Li ser giha rûniştin û ketin nava henek û ken û laqirdîyan. Piştre ew kincên xwe jî di ser xwe re anîn û ketin nava golê, xwe şûştin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 864'AN

*Şehrezadê got*:

Her deh keçik, di nava ava gola qesrê de ji xwe re dilîstin, henek bi hev dikirin, av bi ser hev de dipijiqandin, mîna masîyan binav û serav dibûn. Tiştê balkêş ew bû, ku ya mezina wan, av bi ser gişan de direşand, ew binav dikirin lê yên dîtir newêrîbûn destên xwe dirêjî wê bikin. Çavên Hesen jî her li ser a mezin bûn û awirên wî ji ser wê ranedibûn.

Spehîbûna wê ew serxweş xistibû û dilê wî jê stendibû, hiş di serê wî de nehiştibû, wê çaxê tê derxist, ku xwîşka wî, ji ber wê yekê vekirina wî derîyî li wî qedexe kiribû!

Her ku li wê dinêrî, hîn bêtir agir bi nava wî diket û pêlên evîneke dijwar, laşê wî hemû didan ber xwe, ew dagir dikirin. Bejn û bala wê, husn û cemala wê ew qasî bêqisûr bû, ku Hesen tiştekî wisa di xewnan de jî nedîtibû! Bê navber li wî laşê ku mîna masîyeke spî binav û serav dibû, dinêrî û dixwest, ku ji çavên xwe bawer bike lê wisa xuya dikir, ku hetanî Hesen neçûya cem wan û dest neda wê hebûna nûranî, qinyata wî nedihat.

Eşq û evîna ya mezin ketibû dilê Hesen û agir bera nava wî dabû, Bêçare bû û haya wan keçikan jî jê tune bû, wê çawa bikira, çilo bikira ne diyar bû. Wê çiqasî xwe li ber rivînên wî agirê di nava xwe de bigirta jî, ne diyar bû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 865'AN

*Şehrezadê got:*

Keçik ji golê derketin û bejna her yekê ji wan mîna şûrekî tazî dibiriqand. Hesen jî li wan dinêrî, bi hêvîya ku agirê nava xwe bitemirîne. Lê wî çiqasî li wê spehîbûna wan dinêrî, agirê nava wi gurtir dibû. Bi taybetî jî ew keça mezin a ku bi nêrîna ewil re dilê wî jê dizîbû, bi xweşikbûna xwe ya tazî mala wî xera dikir. Çîmên wê, hêtên wê weke camê bûn, newqa wê jî mîna taseke zîv diçirûsand.

Her yekê ji wana kincek li xwe kir. Dildara Hesen jî kincekî zeytûnî girt ser xwe û bi wê spehîbûna xwe ya biheybet li dora xwe zivirî. Şewqa rojê ji ser rûçikê wê yê girover bi ser Hesen de teyisî, hişê wî bi temamî ji serê wî bir û di nava wehmeke hişber de nebedî bû, xwe wenda kir.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdêng bû.*

ŞEVA 866'AN

*Şehrezadê got:*

Keçikan di navbera xwe de kêf û henek dikirin. Hesen jî di deryaya eşqê de bergeha xwe wenda kiribû. Di dilê xwe de ji xwe re digot: "Bi navê Xwedê ji ber van keçikan, xwîşka min nedixwest ku ez wî derîyî vekim û ew ditirsîya, ku ez dilê xwe bidim yekê ji wan û dil bikevimê!" û awirên xwe ji ser a mezin ranekir. Hesen li hemberî spehîbûna wê ya bêtimtêl matmayî bûbû, ku devê wê mîna hungulîska Silêman, porê wê mîna şevên xemdar û bengînan, biskên wê mîna kevana remezanê; çavên wê jî bi yên xezalan re diaxivin. Pozê wê serbilind bû, diçirûsand û herdu hinarikên wê mîna gulqurmizan bûn. Du lêvên mercanî, diranên mîna lûlûyên di gerdena mermerî de rêzkirî, gerden bi xwe zîv bû, dişikande wê ew şewq, navikeke şayîtok û kulîmekin di nava govenda mestkêşan de bi hej û dîlan; Xwedêyo ev çi spehîbûn, çi bejn bû, çi bal? Hemû pîvanên wê gotina wî hozanê navdar derbas kiribûn, ku digot:

> Dibêjin gulên rêzkirî hene di nava bîstan de rind in
> lê ne gul mîna rûçikên min in ne jî şaxên wan bejn in
> ger bi rastî jî gulêd mîna min di wan bîstanan de hebin
> Nexwe çima têne gel min ev dildar çi dixwazin ji min

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 867'AN

*Şehrezadê got*:

Keçik ji xwe re dilîstin, Hesen jî hişmestî ew temaşe dikirin, bêyî ku tu tiştê din bê bîra wî. Av û xwarina xwe jî ji bîr kiribû. Esirkî mezina wan ji yên din re got: Keçên şahan, êvar bi ser me de hat û welatên me ji vir dûr in. Em jî ji vir têr bûn, de ka rabin, em herin welatêd xwe!

Yeko yeko rabûn ser xwe; kincên xwe yên perîyan li xwe kirin û careke din vegerîyan çûkên berê. Hemû bi hev re firîyan, dan pey a mezîn û çûn. Hesen xemgîn bû, dilê wî lê xist û hêsiran di çavên wî re avêt, xwest ku rabe ser xwe lê bi destê wî ve nehat. Hesen, di ber xwe de ponijî û got:

> kanî ew wefakarî kanî soz û peymana li pey we
> xewa min çû êdî qet nema tê ew piştî çûna we

mijangên min nema diçin ser hev piştî fîraqa we
aramî nema sekn û hedan nîn e li min piştî çûna we
car ji caran dil dibîne we di xew de pir kêfxweş
xwezî xewnên min giş rasteqîn bûna wisa xweş
besî min bûn ev xewn û asîk û maçên di xweş
belkî li wir levrasthatineke me çêbibûya lew di geş

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bedêng bû.*

## ŞEVA 868'AN

*Şehrezadê got*:

Wê eşq û evînê barê Hesen ew qasî giran kiribû ku êdî hêl û qawet tê de nemabû, dilşikestî rabû ser xwe, hêsirên xwe paqij kirin û hêdî hêdî ji ser banê qesrê daket. Bi zor û heft beleyan nigên wî pêlik zeft dikirin û rêya xwe didît. Bi çi halî be, xwe gihand odeya xwe, derbas hundir bû, derî li ser xwe girt û palda. Ne xwarin hat bîra wî ne jî vexwarin. Lewre di nava deryaya fikir û hestên xwe yên bêsînor de hîna avjenî dikir. Bi wî halê xwe kalîya û nalîya, hetanî sibehê.

Sibehê gava roj derket, derîyê odeya xwe vekir û dîsa di wê derenceyê re derket ser banê qesrê û çû li cihê xwe yê duh, li raserî heman dîmenê rûnişt û ji xwe re lê temaşe kir, hetanî ku şev hat û tarî ket erdê. Gava dît ku ew teyrikên wî nehatin, hêvîya wî vala derket, dilê wî şikest û kûrînî pê ket, girîya. Hêsir barandin, hetanî ku ji ser xwe çû. Dema ku bi ser hişê xwe ve hat jî, bi qûnkişkê bi rê ve çû û di derenceyê re berjêr daket hundirê qesrê. Dilê wî pir teng bû, şev lê gerîya, nema sebr û hedana wî hat. Dîsa girîya, hêsir barandin; kalîya û nalîya, heta ku lê bû sibe.

Gava rojê şewqa xwe avêt ser deşt û çiyayan, hewl da ku rabe ser xwe lê nikaribû. Ne dixwar ne vedixwar ne radiket û ne jî hedana wî dihat. Ne şevê bêhna wî derdixist ne jî rojê. Bêyî ku meyê vexwe bi evîn û eşqeke giran serxweş ketibû û çare jê re nedidîtin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bedêng bû.*

## ŞEVA 869'AN

*Şehrezadê got*:

Hesenê Zêrker di nava eşqeke mezin de bû, ku mîna bîreke bêbinî bû û di nava wê qesra mezin de jî bi tena serê xwe bû. Ne dost û hogirek li cem hebû, ku dilê wî xweş bike û ne jî kesekî/e ku wensa xwe pê bîne û kul û kederên xwe pê bide jibîrkirin.

Hîna ku ew li ser banê qesrê rûniştî bû û di nava wan fikir û ramanan de bû, bala xwe dayê, ku toz û dûmanek ji hêla berîyê ve ber bi wî ve tê. Texmîn kir ku, ew ên tên, xwedîyên qesrê bin; hema bi lez û bez rabû ser xwe û di pêlikan re daket jêrê, çû ket odeya xwe, xwe tê de veşart.

Qaseke din bi şûn de, leşker û pasevanên şah gihîştin wê derê û dora qesrê girtin. Her heft keçên Şah jî peyabûn û derbasî qesra xwe bûn. Hemûçkan tîr û kevan, şûr û mertalên xwe danîn, tenê xwîşka biçûk berîya ku amûrên cengê ji ser xwe deyne, çû odeya birayê xwe Hesen. Li odeyê nêrî, ew nedût. Çep û rast gerîya, hundir li hev xist. Dît ku di quncikekî de xwe veşartiye û halê wî ne tu hal e! Bedena wî hejar bûbû, rûyê wî zer bûbû xwîn tê de nemabû. Çavên wî di kûr de çûbûn xwarê, mîna ku koncal tê de vebûbin. Ji bêxwarin, bêxewî û girîn û nalînê mabû çerm û hestî. Eşq û evîna wê keçikê, roj bi roj ew helandibû. Îcar gava xwîşka wî ew di wî halê de dît, şaşwaz bû. Ji şaşwazîyê hindik mabû ku hişê xwe bixwe. Sebeba wê yekê jê pirsî û got: Birawo, kanî rastîya xwe ji min re bibêje, da ku ez çareyekê, rêyekê ji te re bibînim. Bi Xwedê serê min jî tê de here, ez vê rewşa te qebûl nakim!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 870'YÎ

*Şehrezadê got*:

Gava ku xwîşka wî wisa jê pirsî û gotina rastîyê jê xwest, Hesen girîya û got:

> evîndarekî ku evîna xwe wenda kiribe
> tenê jê re dimîne keder û dilekî xirabe
> rûzuha be jî ew, hundirê wî sar e weke bûzê

Dema ku xwîşka wî ew helbest ji devê wî bihîst, behetî ma li wê huner û zimanşîrînîya wî û têgihîşt, bê derdê wî çi ye. Jê pirsî, got: Birawo ev tişt

kengî û çawa qewimîye? Ez bala xwe didimê, ku tu bi helbestan diaxivî û hêsran pê re dirijînî, ji bo xatirê biratîya me û hezkirina di neqeba me de, rastîya mijarê vekirî ji min re bibêje. Razên xwe bi min re par ve bike. Bêje, bê çi çêbûye di dema çûna me de û li ser tu tiştî metirse; ma tu nabînî bê çi bi serê min hatiye, ji ber vê rewşa te?

Hesen keserek veda, birek hesrên din barandin û got; xwîşkêcan, ez ditirsim, ku tu alîkarîya min nekî û ez divê belayê de herim! Keçikê lê vegerand û got: Biracan, bi Xwedê ruhê min jî tê de here, ez dev ji te bernadim!

Bi vê gotina wê re Hesen tiştên ku piştî çûna wan qewimîbûn, jê re gotin. Vekirina wî derîyê ku gotibû veneke, derketina ser banê qesrê, dîtina wê keçika spehî û dilketina wê, hemû jê re gotin û bi bîra wê xist, ku deh rojên wî çêbûne, ku nan û av bi devê wî neketiye. Xew û razan jî bi çavên wî neketiye, ji ber eşqa wê keçikê.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 871'Ê

*Şehrezadê got*:

Hesen li ser êşa xwe girîya. Xwîşka wî li ser girîya. Dilê wê pê şewitî, rabû jê re got: Bila dilê te aram be birawo, qet meraqan mexwe. Ez ê xwe bavêjim talûkeyê, ji bo ku ez alîkarîya te bikim û heger ez bizanim wê ruhê min tê de here jî, ez bi şûn de venagerim, hetanî ku ez daxwaza te pêk neynim û pirsgirêka te çareser nekim. Lê ez ji te dixwazim, ku tu vê mijarê ji xwîşkên min veşêrî. Rewşa xwe li gel wan nedî diyarkirin, da ku ruhê me nekeve xetereyê û heger yekê ji wan mijara vekirina wî derîyî ji te pirsî, jê re bibêje, misoger min venekiriye û ne hewce ye, ku hûn pirseke wisa jî ji min bipirsin. Tenê ji wan re bibêje, piştî çûna we, dilê min li ser we meşxûl bû, min xem û mitala we dikir û min bêrîya we dikir, di tenêtiya xwe de!

Hesen got: Tiştê rast jî ev e, piştre enîya wê maçî kir. Bêhna wî hat ber wî, dilê wî hebekî aram bû û piştî wê tirsa ku bedena wî hejar û lawaz kiribû, hêvîyeke nû pê re çêbû. Di pey re tiştekî xwarinê ji xwîşka xwe xwest. Ew jî rabû ji cem Hesen derket û di nava xemgînîyeke balkêş de çû cem xwîşkên xwe. Çawa ku xwîşkên wê ew di wî halî de dîtin, sebeba wê xemgînîya wê jê pirsîn, wê jî got, ku dilê wê li ser birayê wê yê nexweş e, ku deh roj in, nesax e!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 872'YAN

*Şehrezadê got*:

Gava ku xwîşka Hesen vegerîya cem xwîşkên xwe û ji wan re got, Hesen nexweş e. Xwîşkên wê jê pirsîn û gotin: Nexweşîya wî ji ber çi ye gelo? Wê jî li wan vegerand û got: Ji ber bêrîkirina me wisa bi serê wî hatiye û ev deh roj in, ku ne xwarin xwariye ne jî xew bi çavan ketiye. Ew meha ku em dûrî wî mane, jê re bi qasî hezar salî dirêj hatiye. Ew jî ne neheq e, rebeno xerîb e û bi tena serê xwe maye. Belkî diya wî, kes û karên wî hatibin bîra wî, ku diya wî temen mezin e û heger ketibe bîra wî, ku ew pîra diya wî şev û roj li ser wî digirî û dinale, dê pir bê êşîyabe. Xwezîka me bi tenê nehişta, lewre hîna xortekî nûhatî û pir ciwan e. Me dikaribû wensa wî bianîya û ew bi tenê nehişta.

Dema ku xwîşkên wê ev gotin ji devê wê bihîstin, pir xemgîn bûn, dilên wan hat guvaştin, ji êşê hêsiran di çavên wan re avêt. Hemûçkan jê re gotin: Bi Xwedê tu û wî herdu jî mafdar in!

Her heft xwîşk ji qesrê derketin raberî leşker û pasevanan û ew bi şûn de şandin cem bavê xwe. Piştre, hemû bi hev re vegerîyan hundir. Çûn cem Hesen, silav lê kirin, hal û rewşa wî pirsîn û bi çavên xwe li wê bedena wî ya hejar û rûyê wî yê zerbûyî nêrîn. Pir hestiyar bûn, pê êşîyan, girîyê wan hat û li cem wî rûniştin. Bi gotinên xweş ber dilê wî girtin. Bi vegotina çîrokên xweş, li gel dîmenên balkêş ên ku wan di dawetê de dîtibûn, wensa wî anîn. Her heft xwîşk jî, bi qasî mehekê li gel wî, pê re man.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 873'YAN

*Şehrezadê got*:

Her heft xwîşk bi qasî mehekê li cem Hesen man. Pê re mijûl bûn, dilê wî xweş kirin, wensa wî anîn û hetanî ku ji wan hat, hewl dan, ku wî bi tenê nehêlin, ji bo ku bi ser xwe ve bê. Lê her ku diçû, nexweşîya Hesen lê girantir dibû û rewşa wî xerabtir dibû. Vê yekê jî bandoreke xerab li ser xwîşkan kir, dilê wan êşand û bi taybetî jî xwîşka biçûk. Lê belê ji wê pê ve tiştekî din ji destê wan nedihat.

Rojekê keçik jî aciz bûn û bêrîya nêçîr û şîkarê kirin. Rabûn ser xwe, amadekarîyên derketinê kirin û ji xwîşka xwe ya biçûk jî xwestin, ku ew jî

bi wan re bê lê wê got: Wele xwîşkino ez nikarim birayê xwe di vî halî de bihêlim û bi we re werim seydê. Ez ê li gel wi bimînim. Belkî pêdivîya wî bi min çêbibe yan jî karibim sebra wî bînim.

Xwîşkên wê bi vê helwesta wê ya esîlane û fedekarîya wê ya bêsînor pir şanaz bûn. Jê re gotin: Tu xêreke mezin bi vî ciwanê xerîb dikî û wê Xwedê vê xêra te li cem xwe binivisîne û li wê dinyayê jî tu yê werî xelatkirin. Piştre li hespên xwe siwar bûn, qûtê bîst rojan bi xwe re birin û çûn.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 874'AN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe ji Şehreyar re berdewam kir û got*:

Piştî ku her şeş xwîşk çûn nêçîrê û ji qesrê dûr ketin, keça biçûk çû cem Hesen û jê re got! Rabe birawo, ew cihê ku te digot, nîşanî min bide?

Hesen pir kêfxweş bû û bawer kir, ku dê êdî bigihîje armanca xwe û şikir ji Xwedayê xwe re kir. Piştre hewl da, ku rabe ser xwe û here cihê wan keçikan nîşanî wê bide lê hêza wî têrê nekir. Keçikê rahiştê, ew da ber himbêza xwe û di heman pêlikê re derket ser banê qesrê. Li wê derê, Hesen cihê wan deh kevokan nîşanî wê da, xwîşka wî jê re got: Brawo, ka ji min re wesfên wan bide, bê çawa bûn?

Hesen bi hurgilî jê re danasîna wan kir û bi taybetî mezina wan a ku dil ketibûyê. Keçikê di cî de tê derxist, bê birayê wê behsa kê dike. Bi vê gotina wî re rûyê wê guherî û mehdê wê zer bû. Hesen jê re got: Xwîşkêcan çima mehdê te zer bû û rûyê te guherî? Keçikê got: Biracan, divê tu bizanibî ku ev keçika te jê hez kiriye, keça şahê cinan ê herî gewre ye. Di destê bavê wê de jimareke bêhesab ji ins û cin û efsûnger û kahîn û peşbîn û alîgirên wî hene. Mal û milkê wî jî wisa ye, bê hed û bê hesab e û gelek welat û herêman bi rê ve dibe. Bavê min jî yek ji cîgirên wî ye. Arteşeke wî ya ew qasî mezin heye, ku tu kes nikare bi wî.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 875'AN

*Şehrezadê got*:

Xwîşka Hesen rewşa bavê dildara wî jê re rave kir û pê de çû, got: Ji

ber ku bavê wê ew qasî hêzdar û maldar e, li ser dirêjahî û pehnahîya meşa salekê welatekî fireh ji keçên xwe re veqetandiye, ji bo ku ji xwe re lê derkevin seyranê. Çemekî mezin jî li derdora wî welatî gerandiye, ji bo ku tu kes, ne ji cinan ne jî ji insan nikaribin nêzikî keçên wî bibin. Bi qasî bîst û pênc hezar keçên wî yên şerker hene, ku bi şûr û rimên kujer in û her yeke tenê ji wan dikare li hemberî hezar fêrisan li ber xwe bide. Di nava wan keçên wî de heftên wêrek û fêris hene, ku tu leheng newêre li hemberî wan derkeve û ew a ku te jê hez kiriye jî, mezina wan her heft keçan e. Di hemû rengên fen û fît û sihîrbazîyê de pir wêrek, zana û jêhatî ye.

Ew her neh keçên bi wê keça wî re jî, keçên taybet ên wezîr û gizîr û emîrên wî ne. Ew kincên perikî yên ku pê difirin jî, karê cinan in. Heger tu dixwazî wê bigirî û pê re bizewicî, li vê derê rûnê û li benda hatina wê bimîne, lewre her serê mehekê carekê tên vira.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 876'AN

*Şehrezadê got:*

Xwîşka Hesen jê re got: Xwe li vê derê veşêre û pir baldar be, tu neyê dîtin. Heger na, wê mala me xera bibe û em ê giş werin kuştin. Loma ez ji te dixwazim, ku tu baş li min guhdar bikî û tiştê ku ez ji te re dibêjim, tu qet ji bîr nekî! Çawa min ji te re got, bi awayekî ku tu wan bibînî û ew te nebînin, li cihekî nêzikî wan rûnê. Gava ku kincên xwe yên perikî ji xwe kirin, tu bala xwe bidî ser kincên a mezin a ku dilê te ketiye wê. Heger te kincên wê bi dest xistin, îş temam e. Lê pir baldar be. Keçik te nexapîne û ji te re nebêje, "Kanî kincên min li min vegerîne, jixwe va ye ez di nav lepên te de me!" Heger tu ji wê bawer bikî û tu kincên wê lê vegerînî, wê te bikuje û wê vê qesrê bi serê me de bîne xwarê, wê me gişan jî bikuje. Heta wê bavê me jî bikuje, loma divê tu pir baldarî bî. Îcar gava xwîşkên wê bibînin, ku kincên wê hatine dizîn, wê bifirin, herin û wê jî li şûna xwe bi tenê bihêlin. Wê çaxê, tu yê jî derbasî cem wê bibî û wê bigirî.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 877'AN

*Şehrezadê got*:

Xwîşka Hesen axaftina xwe berdewam kir û jê re got: Gava te ew girt û te ew himbêz kir, dê bibe ya te û hetanî ku ew kirasê wê yê perikî li ba te be, ew ê jî weke dîleke te di destê te de bimîne. Ne dikare bi derekê de here ne jî bifire here welatê xwe. Îcar gava te ew girt û pê de, rahêje wê û wê bîne odeya xwe. Lê kincên wê qet nîşanî wê nede. Hesen bi van gotinên xwîşka xwe aram bû û dilê wî ket cî. Hêvîya wî çêbû, ku dê bigihîje eşqa xwe, pê re jî êşa nava wî ferikî û rabû ser xwe, enîya xwîşka xwe maçî kir. Piştre jî herdu bi hev re ji ser banê qesrê daketin jêrê, çûn odeyên xwe. Hesen palda, vehesîya û seranserê şevê xeweke kûr raket.

Bi sibehê re dîsa rabû ser xwe, derî vekir û di pêlikê re derket ser banê qesrê. Li cihê xwe yê berê rûnişt û hetanî êvarê bergeha ku wê dildara wî jê bihata raçav kir. Di wê navberê de xwîşka wî jê re xwarin û vexwarin anî, kincên wî guhertin û paqij kir.

Hesen bi qasî mehekê wisa berdewam kir, çawa ku heyv ji nû ve derket, kelecaneke bêtimtêl laşê Hesen dagir kir. His kir, ku wê her deh keç dîsa werin. Lewre xwîşka wî jê re gotibû, ku êdî dema hatina wan hatiye.

Demek bi şûn de bala xwe dayê, ku mîna birûskê hatin. Wî jî di cî de xwe veşart û bi dizî ew şopandin. Dîsa mîna cara bihurî daketin qiraxa gole. Her yek ji wan çû cihekî û kirasê xwe yê perikî di ser xwe re anî, ji xwe kir. Dildara wî jî li cihekî nêzikî Hesen kincên xwe ji xwe kirin. Piştre çû bi xwîşkên xwe re ket avê. Hesen jî bi dizî rabû ser xwe û çû xwe gihand kincên wê yên perikî û ew anî, li cem xwe veşart.

Keçikan hetanî ber êvarê ji xwe re lîstin, kêf û laqirdî kirin û li dawîyê her kes çû kincên xwe li xwe kirin, ji bo ku herin. Lê dildara Hesen kincên xwe nedîtin û qajewaj pê ket, porê xwe kişand, li xwe da û kir hewar. Xwîşkên wê pê ve hatin, rewşa wê pirsîn, wê jî got; kincên min î perikî ne xuyan in!

Dilê gişan li ser wê êşîya û bi halê wê girîyan lê şev hatibû û ji çûnê pê ve tu çare di destê wan de tune bû. Çawa ku tarî ket erdê, ew li ser ban hiştin û firîyan çûn.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 878'AN

*Şehrezade got*:

Gava ku xwîşkên wê firîyan û çûn, dildara Hesen bi tenê ma. Kela girî ket qirikê, qîrîya û got! Ey ew ê ku kincên min birine û ez tazî hiştime, tu bi

qedrê Xwedê kî, kincên min li min vegerîne, ji bo ku ez eybên xwe veşêrim, xwe bisitirînim! Xwedê te bisitirîne!

Hesen di nava kelecaneke mezin de lê temaşe dikir û ew gotinên wê guhdar dikirin. Agirê eşqê di nava wî de gurtir bûbû û sebir pê re nehiştibû. Çawa ku ew gotin ji devê wê bihîstin, rabû ser xwe û weke şêrekî ku xwe çeng bike ser nêçîra xwe, xwe bi ser de avêt û ew zeft kir, girt. Piştre rahiştê, ew da ber himbêza xwe û daxist jêrê. Ew bir, xist odeya xwe û ebayek avêt ser wê. Keçik jî hîna digirîya û dev li destên wî dikir.

Hesen rabû ser xwe, derî li ser girt û çû cem xwîşka xwe, bi tiştê ku qewimîye ew agahdar kir û pê de çû, got, niha jî di odeya min de ye û hîna jî digirî!

Xwîşka wî rabû ser xwe, çû odeya wî û derbasî cem wê bû. Bala xwe dayê, ku pir xemgîn e û digirî. Erda ber destên wê maçî kir, bi rêzdarî silavek dayê û jê re got: Derbasbûyî be!

Dildara Hesen lê vegerand û got: Keça şahan, qey tu kes mîna we, xerabîyên wisa bi keçên qralan re dike? Û tu dizanî ku bavê min şahekî gewre ye, ku hemû şahên cinan jê ditirsin û hesabê wî dikin! Ew qas sihîrbaz, efsûnger, pêşbîn, şeytan, kahîn û serhildêrên wî hene, ku hêza tu kesî nagihîje wî, lewre ji Xwedê pê ve tu kes nizane bê jimara leşker û bendeyên wî çiqas e. Îcar wî zilamî di ku re xwe gihandiye me, ey keçên şahan?

Xwîşka Hesen jê re got: Ev insanê hanê dil ketiye te û ji te pir hez dike, tu nêtekê wî ya xerab jî nîn e, keça şahan.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 879'AN

*Şeheezadê got*:

Xwîşka Hesen bi bergerî axaftina xwe berdewam kir û got: Xatûna min, evê insî pir ji te hez dike û nêteke wî ya xerab tune ye, jixwe jin ji bo mêran hatine afirandin û heger wî ji te hez nekira, ji ber te nexweş nediket. Rebeno ji ber evîna te helîyabû û hindik mabû, ku ruhê xwe ji dest bide...

Xwîşka Hesen bi hurgilî û berfirehî tiştê ku bi serê Hesen de hatibû, jê re anî ziman û tiştên ku berê Hesen jê re anîbûn ziman, hemû jê re gotin. Bi van gotinan re tu hêvîyên rev û xelasê bi dildara Hesen re neman. Xwîşka Hesen

jî rabû ser xwe, çû jê re qatek kincên spehî û giranbuha anî û lê kir. Xwarin û vexwarinek jî anî, danî ber wê û pê re xwar. Bi zimanekî şîrîn dilê wê xweş kir, ew haş kir û li ber wê gerîya, hetanî ku ew nerm kir. Lê belê girîyê wê berdewam kir, hetanî berê sibehê. Bi şeveqê re girîyê wê jî bi dawî bû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 880'YÎ

*Şehrezadê got*:

Piştî ku dildara Hesen tê derxist, ku êdî xelasîya wê ji nav lepên Hesen tune ye, qedera xwe pejirand û ji xwîşka Hesen re got: Keça şahan, qey ev jî qedera min e, ku ez ji welatê xwe, ji dê û bavê xwe, ji xwîşk û dostên xwe qut bibim û bibim xerîba vî welatî. Êdî Xwedayê gewre çawa dixwaze, wê wisa bibe. Ez ê jî sebirdar û bêhnfireh bim.

Xwîşka Hesen jê re odeyek vala kir, ku di qesrê de ew odeya herî xweş bû û li gel wê ma, ji bo ku wensa wê bîne, bêhna wê berde û ber dilê wê xweş bike. Bi rastî jî wisa bû û di demeke kurt de bêhna wê hat ber wê, dilê wê xweş bû, kul û kederên xwe ji ser xwe avêtin û kenê wê lê vegerîya. Li ser lêvan kenê xwe vegirt, xerîbîya xwe ji ser xwe avêt û kula dê û bavê xwe ji bîr kir. Xwîşka Hesen çû cem wî û jê re got: Rabe here cem wê, dest û nigên wê maçî bike, ji bo ku navbera we çêbibe! Hesen bi ya wê kir û rabû çû odeya wê, dest û nigên wê ramûsan, enîya wê jî maçî kir û got: Mîrzaya qencan, giyana giyanan û nûra çavan! Bila dilê te rehet be, ez hatime vir, tenê ji bo ku ez bibim bendeyê te, hetanî roja qiyametê. Ev xwîşka min jî qerwaşa te ye. Meqseda min ew e, ku li gorî qewlê Xwedê û pêxember ez bi te re bizewicim û em tev de bi hev re herin Bexdayê, cem dêya min, ku tu dayîk mîna wê dilpak û dilnaz tune ne. Li wê derê ez ê ji te re bende û qerwaşan bikirim, ji bo ku xizmeta te bikin. Bexda jî bajarekî pir xweş û spehî ye, di dinyayê de tu bajar mîna wê xweşik nîn in. Xelkê Bexdayê jî mirov in pir baş û qenc in.

Hîna ku Hesen ji bo ku neqeba xwe û wê çebike, wisa pê re diaxivî û wê jî bêdeng ew guhdar dikir, derîyê qesrê hat lêdan. Hesen pê ve derket, bala xwe dayê, ku her şeş xwîşkên xwîşka wî ne, ji nêçîrê vegerîyane!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 881'Ê

*Şehrezadê got*:

Hesen bi vegera wan pir kêf xweş bû. Bi germahî û devlikenî ew peşwazî kirin û bi rêzdarî xêrhatina wan kir. Wan jî silav lê kirin, pir kêfxweş bûn, ku nexweşîya xwe derbas kiriyê û rabûye ser xwe. Piştre ji hespên xwe peya bûn, derbasî qesrê bûn û her yek ji wan derbasî odeya xwe bû. Kincên xwe yên gemarî di ser xwe re anîn, kincên nû li xwe kirin û bêhna xwe vedan.

Gelek xezal û çêlekên bejî û kevroşk û şêr nêçîr kiribûn, hinek ji wan dan ber kêrê, ew serjê kirin û hinek jî li cem xwe di qesrê de girtin. Karê serjêkirinê jî li ser pişta Hesen bû. Wî pişta xwe girêdabû û goştê wan ajalan ji hev perçe dikir. Keçikan jî bêhna xwe berdidan.

Gava ku ew karê wan jî qedîya, rabûn xwarinek ji xwe re çêkirin. Hesen jî çû cem wan, yeko yeko serê wan maçî kir û hezkirineke kûr nîşanî wan da. Keçikan jê re gotin: Xêr e birawo, te îro ji bo me hezkirineke zêde nîşanda û tu jî dizanî, ku em cinî ne û tu jî insî yî?

Hesen girîya û hêsrên wî weke baranê hatin xwarê. Keçik şaşwaz bûn û gotin: Xêr e keko, tu çima digirî?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 882'YAN

*Şehrezadê got*:

Gava keçikan ew gotin jê re gotin, Hesen girîya û hêsir barandin. Keçikan bi şaşwazî pirsîn, gotin: Te xêr e, çi heye, ku dihêle tu bigirî? Te îro bi vî girîyê xwe kedereke mezin xist dilê me. Gelo nebe ku te bêrîya diya xwe yan jî welatê xwe kiribe? Heger ji ber wê be, em ê di cî de te bigihînin welatê te, nav dost û hezkirîyen te?

Hesen ji wan re got: Bi Xwedê tu nêt bi min re tune ye, ku ez ji we veqetim! Wan jî got: Nexwe çi keder xistiye dilê te heta ku tu têkevî vî halî? Hesen fedî kir ku bibêje, evîna wê qizikê ye. Lewre ditirsîya ku pêşîya wî bigirin, loma bêdeng ma û raza xwe di dilê xwe de hişt.

Di wê navberê de xwîşka wî ket dewrê û ji xwîşkên xwe re got, Hesen teyrikek nêçîr kiriye, girtiye û ji we dixwaze, ku hûn di kedîkirina wê teyrikê de alîkarîya wî bikin!

Xwişkên wê li Hesen zivirîn û jê re gotin: Em giş li ber destê te ne, tenê ji me re meseleya xwe bibêje û tiştekî ji me veneşêre û êdî ji me re bihêle, em ê çareser bikin!

Hesen ji xwîşka xwe re got: Xwîşkêcan tu bi Xwedê kî, tu rewşa min ji wan re bibêjî, weleh ez fedî dikim, biaxivim.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 883'YAN

*Şehrezadê got*:

Gava Hesen ew daxwaz jê kir, xwîşka wî li her şeş xwîşkên xwe zivirî û ji wan re got: Gava ku em ji bo dawetê çûn welatê bavê xwe, ew feqîrê hanê jî di qesrê de bi tenê ma û tirsîya, ku hinek derbasî cem wî bibin. Jixwe hûn jî dizanin, ku hişê insanan sivik e, vêca ji ber wê tirsê, ew jî rabûye derîyê pêlika ku diçe ser ban vekiriye û derketiye ser qesrê, ji bo ku bêhna xwe berde. Li ser ban rûniştiye û ji xwe re li dîmena xwezayê temaşe kiriye. Li alîyê derîyê qesrê û li hêla newalê nihêrîye, ji ber tirsa ku hinek di derî re werin hundir. Di wê navberê de deh çûkên ku ber bi wî ve hatine bala wî kişandine. Teyrik hatine ser gola ser banê qesrê û wî jî ew raçav kirine. Herî zêde teyrika mezin di nav wan de bala wî kişandiye ser xwe, piştre teyrikan lapûşkên xwe xistine berstika xwe û kincên xwe yên ji perîkan çirandine, di ser xwe re anîne û ji hundirê her yekê ji wan keçeke mîna heyvekê derketiye. Piştre kincên xwe yên tenik jî ji xwe kirine û şilfî tazî ketine ava golê. Hesen jî li wan dinêre û bi çavên xwe dibîne, bê ya mezin ji wan çiqasî spehîtir e, çiqasî serdest û serkêş e, hemûçkan binav dike, avê bi ser wan de dipijiqîne û yên din qet nikarin têkilî wê jî bibin.

Ew keçik ji xwe re wisa lîstine, kêf û laqirdîyên xwe kirine, hetanî ber êvarê. Piştre ji avê derketine û dîsa kincên xwe li xwe kirine.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 884'AN

*Şehrezadê got*:

Xwîşka Hesen vegotina xwe berdewam kir û got: Îcar gava her deh keçikan kincên xwe yên perikî li xwe kirin û firîyan, çûn, agirê evîna wê

keça mezin di dilê Hesen de rivîn dide, wî dihelîne û poşman dibe, ku kincên wê keçikê jê nedizîne. Bi wî agirê evînê nexweş dikeve û li ser qesrê dimîne, danakeve jêr, bi hêvîya ku careke din ew keçik vegerin wir. Nema ne nan dixwe ne avê vedixwe. Xewa şevan lê diherime û hejar dibe, heta ku laşê wî dimîne hestî û çerm. Lê dîsa jî ji cihê xwe ranabe û çavdêrîya xwe berdewam dike, heta ku heyv dîsa derdikeve û ew keçik jî dîsa têne ser golê. Kincên xwe ji xwe dikin û dadikevin nav avê. Ji xwe re dilîzin, wê çaxê Hesen fersendê dibîne û diçe kincên keçika mezin didize. Lewre pê dizane, ku bêyî wan kincan nikare bifire. Hesen kincên wê vedişêre û xwe radigire, hetanî ku hemû difirin û ew tenê li şûna wan dimîne. Wê gavê ev jî diçe wê digire û wê ji ser banê qesrê dadixîne jêrê!

Xwîşkên wê gotina wê birrîn û jê pirsîn, gotin: Kanî ew keçik li ku ye? Xwîşka Hesen ji wan re got: Keçik niha li cem wî ye, di odeya wî de ye! Keçikan gotin: Keçeke çawa ye gelo? Xwîşka Hesen got: Keçeke ji heyva li çardan jî xweşiktir e. Rûyê wê mîna tavê ye û mehdê wê ji meyê jî şîrîntir e. Bejinzirav û çavkildayî ye. Rûyê wê mîna sorgulekê ye û singê wê jî weke cewherekê ye, memikên wê weke hinaran, rûçîkê wê mîna sêvan û newqa wê zirav e, mîna ya marekî ye. Herdu hêtên wê mîna du stûnên mermer in û bêhna miskê ji navika wê tê. Kulîmekin giran û navraneke ku tîna mirov dişikîne! Gava dikene, agir bi dilê mirov dixe lê bawer bikin, şair jî nikarin pesnê spehîbûna wê bidin.

Gava keçikan ew gotin ji devê xwîşka xwe bihîstin, ji meraqê kelecanî bûn û nema xwe girtin, jê re gotin: Ka rabe wê nîşanî me bide!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 885’AN

*Şehrezadê got*:

Dema keçikan xwestin, ku wê bibînin, Hesen rabû, da pêşî ya wan, çû derî vekir û derbasî cem dildara xwe bû. Keçik jî li pey wî derbasî hundir bûn û çawa çavên wan li husn û cemala wê ket, matmayî bejna xwe li ber tewandin û erda ber destên wê maçî kirin. Bi heyrangorîyeke mezin silav lê kirin û jê re gotin: Keça şahê gewre! Bawer bike, ger ku te xeyset û meziyetên vî xortê insî bihîstibûna û te bizanibûya bê çiqasî bi te ve hatiye girêdan, tu yê lê ecêbmayî bimayî! Keça maqûl û şahan, bawer bike, ku ev

xortekî dilsoz û sinckar e, ne ji bo kêfekê ketiye pey te lê belê ji bo ku bi helalî bi te re bizewice, xwe dike bi qurbana te û heger me bizanibûya, ku bêyî xortan debara keçikan tê, me nedihişt, ku ew jî tu daxwazan ji te bike. Halbûkî wî tu qasid jî neşandin cem te û ew bi xwe hat cem te. Ya rastîn me dê kincê te yên perikî jê bistendina lê wî çûye ew kinc şewîtandine…

Keçikan ew qanih kirin, ku bizewace û yek ji wan bû wekîla wê. Mehra wê li Hesen birrî, destên wan xist hev û ew li hev pîroz kirin. Piştre dawet û şahîyeke mezin ji wan re li dar xistin, li gora dawetên keçên şahan û bi kêfû xweşî ew derbasî cem hev kirin. Hesen pê şabû û hezkirina wî jê re hîn zêdetir bû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 886'AN

*Şehrezadê got*:

Eşq û evîna Hesen ji jina wî re kûrtir û xurtir bû. Coş û kelecaneke mezin nava wî dagirt, bask bi dilê wî ve çêbûn ji kêfan re, hindik mabû, ku bifirîya. Di nava wan hest û dilînîyên tîr de hizirî û got:

bejna te darrihan e çavên te jî reşbelek in
rûçikên te ji ava zêr in tîrêj her jê dibarin
ev awêneya te li ber çavên min her sîrac e
nîvê te yaqût e canê nîvê mayîn jî ac e
hinek ji laşê te misk e hinek jî xweşenber e
weke durrekê yî tu belkî jî hin çêtir e
dayika Hewa jî yeke mîna te qet ne anîye
ne jî li bihuşta baqî yeke mîna te heye
ger bixwazî tu bêguman tê min biêşînî
ger nexwazî jî misoger tê min bibexşînî
zagona evînê ev e û qîma min pê hatiye
ey nazenîna dil dilê min her li cem te ye
kî dikare xwe ragire raserî te ka kî heye

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 887'AN

*Şehrezadê got*:

Hesen ew helbesta hanê, di nava hestiyarî û mestbûneke bêtimtêl de got, ku agirê di nava wî de pê re dida der. Wê kêlîkê, keçikan jî li devê derî lê guhdar dikir. Ew bi xwe jî bi wê helbesta Hesen pir hestiyar bûn û dexesîya dildara wî kirin. Jê re gotin: Keça şahê gewre, tu dibînî bê evê insî çiqasî ji te hez dike? Binêre, mirov der barê evîna te de helbestan dibêje!

Dildara Hesen pir kêfxweş bû û bi wê helbesta wî dilê wê şa bû. Hesen jî, her ku diçû hîn bêtir jê hez dikir. Çil rojên din bi wî hawayî di nava evîn, aramî û şahîyeke gezgezokî de pê re ma. Keçikên xwîşkên wî jî rojane jê re diyarî û xelat pêşkêş dikirin û ji wî û jina wî re şahîyên cur be cur li dar dixistin. Bi wî hawayî, jina Hesen jî dê û bavê xwe ji bîr kir û pir kêfxweş bû, bi mana li wê derê.

Di şeva çilî de, Hesen di xewna xwe de dît ku diya wî nexweş û xemgîn e; rûyê wê zer bûyê, zehîf bûyê û halê wê pir guheriye.

Ew jî di nava wê xweşîyê de bû. Diya wî jî di xew de jê re digot: “Hesen lawo, tu çawa jîyaneke wisa bi kêf û şahî dijîyî û tu min ji bîr dikî? Binêre ji roja çûna te ve min qet tu ji bîr nekiriye û sûretê te herdem li ber çavên min e! Gelo wê rojek were, ku ez te li kêleka xwe bibînîm û careke din em bigihîjin hev, mîna rojên berê?

Gelo tu dizanî, ku piştî çûn û wendabûna te, min di hundirê malê de gorek ji te re çêkiriye, ji bo ku hetanî mirinê ez te ji bîr nekim?”

Di pey wê xewnê re Hesen ji xew şiyar bû û kûrekûr pê ket, girîya û hêsir barandin. Konê xemgînîyeke kûr û dijwar baskên xwe avêtin ser wî. Xew ji çavan da revandin. Êşeke bişewat xist dilê wî, nehişt ku hetanî sibê sebr û hedana wî bê. Gava bû sibe, xwîşkên wî dîsa mîna her car derbasî cem bûn. Bi kêf û xweşî rojbaşî dan wî lê bersiv jê negirtin. Sebeba wê yekê ji jina wî pirsin, wê jî ji wan re got: Ez niza nim. Keçikan gotin: Ka tu here ji wî bipirse bê çi heye? Jina wî çû cem û jê re got: Xêr e, çi qewimîye mîrzayê min? Hesen kesereke kûr veda û ew ji xewna xwe agahdar kir.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 888'AN

*Şehrezadê got*:

Piştî ki jina Hesen mijara xewnê jê fêr bû, mijar bi keçikan re par vekir. Gava xwîşkên wî bi wê xewna wî serwext bûn, dilê wan pê şewitî û jê re gotin: Helbet em naxwazin di çûna Bexdayê û dîtina diya te de pêşîya te bigirin. Heta em ê di çûnê de alîkarîya te bikin, bi şertê ku tu car ji caran serdana me bikî û em te bibînin. Bi kêmanî salê carekê were serdana me, wê bes be! Hesen got: Bila be, ser seran, ser çavan.

Xwîşkên wî di cî de rabûn ser xwe, jê re qût û pêdivîyên rê hemû amade kirin. Kincên bûkanîyê li jina wî kirin, xeml û xêza wê temam kirin. Hemû tiştên xweşik û giranbuha, zêr û zîv û yaqût û mercan dane ser hev û barê wan girêdan. Piştre li defa paxirî dan, hespê bûraq hatin. Bar hemû li wan kirin. Hesen û jina wî jî siwar kirin û bîst û pênc textên zêr, pêncî hebên zîv jî bi wan re bar kirin û ew jî bi wan re ketin rê. Sê rojan bi wan re meşîyan, ku di wan sê rojan de meşa sê mehan qut kirin. Piştre xatir ji wan xwestin, ew bi şûn de vegerîyan qesra xwe. Hesen û jina xwe jî rêya xwe berdewam kirin.

Hesen û jina xwe çol û beyar derbas kirin, çiya û deşt li pey xwe hiştin, çem û cobar qut kirin û di encamê de piştî rêwîtîyeke dûr û direj a ku bi rojan berdewam kir, bi xêr û selametî xwe gihandin bajarê Besrayê.

Hesen bi bêrîkirin û kelecaneke bêtimtêl hat li ber derîyê mala xwe sekinî. Ew û jina xwe ji bûraqan peya bûn û hat ku derî veke. Bala xwe dayê, ku ji hundir dengê girî û nalîna diya wî tê!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 889'AN

*Şehrezadê got*:

Diya Hesen bi dengekî tenik û tijî hesret û bêrî ji kezebê dinalîya. Gava dengê wê nalîna wê hat wî, ew jî girîya û hêsiran di çavên wî re dan der. Hesen bi şid li derî da. Diya wî got: Ew kî ye li derî dide? Hesen got: Veke tu yê bibînî, bê kî lê dide! Diya wî çawa derî vekir û çav li Hesen ket, xwirînek bi dilê wê ket, ji ser hişe xwe çû û li erdê ket. Hesen avek li ser çavên wê kir û pê re mijûl bû, heta ku dîsa bi ser xwe ve hat. Hesen ew himbêz û maçî kir. Wê jî ew himbêz kir û têra xwe ew maçî kir, heta ku dilê wê hênik bû

û hebekî haş bû. Piştre barên xwe jî derbasî hundir kirin. Jina Hesen jî bi heyrangorî li wî û diya wî dinêrî, ew temaşe dikirin. Lewre ji kêfan hindik mabû, ku baskên wan çêbibin. Diya Hesen, di nava wan hestên serhildêr de girîya û bi helbestî got:

wê çawa herin ser hev ew çavên tijî derd
wê çawa xew bikin li gel ew qase kul û derd
xwedî mal û xwedî navekî mezin bû ew
ji nişka ve bû xerîbê çolan û bi tenê ma ew
çûna wî bû agirek û ket nava dilê min
bêrî li ser bêrîyê bû çiyayek li ser dilê min
herî dawî tûşî wî jî bû bêrî kete dilê wî
gelo wê ew jî mikur neyê li bêrîya xwe û wê
lê rewşa wî di evînê de wisa diyarker e
xemgîn e kedernak e rûyê bihêsir şahid e

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 890'Î

*Şehrezadê got*:

Hesen û diya xwe ji bo ku hesreta sala bişkînin li hev rûniştin. Diya wî jê re got: Îcar ew meseleya te û mirovê ecem çawa bû, kurê min?

Hesen got: Ew ne ecem bû dayêcan, mecûsîyekî ateşperest bû. Bawerîya wî bi Xwedê tune bû. Piştre jê re behsa rêwîtîya xwe û wî kir. Çi bi serê wî kir, çawa ew xist nav eyarê deveyekê û eyar li ser wî dirût, çawa teyrê rex rahişt wî û ew bir, li serê çiyayekî danî, li serê wî çiyayî çi dîtibû, çi nedîtibû û çawa yê mecûsî ew xapandibû û piştî ku pêdivîya xwe pê qedandibû ew li wir hiştibû û çûbû. Piştre çawa wî xwe ji serê wî çiyayî avêtibû behrê û Xwedê ew sitirandibû, tiştek pê nehatibû û dûv re jî ew gihandibû qesra wan heft qîzikan û çawa bi yekê ji wan re bûbû bira û li cem wan rûniştibû, çawa yê mecûsî dîsa hatibû wir û wî jî ew kuştibû û herî dawîyê jî jê re behsa jina xwe ya cinî kir, bê çawa ew nêçîr kiribû û Xwedê ew bi hev şa kiribûn.

Diya wî gava ku ew çîroka wî bihîst, şawaz û matmayî bû û şikir ji Xwedayê xwe re kir, ku ew parast û bi saxî û selametî ew gihand mala wî. Piştre rabû ser xwe, çû li wan barên wî nêrî. Hesen ew ji wan jî agahdar kir.

Careke din pir kêfa diya wî hat û çû li cem jina wî rûnişt, pê re mijûl bû, li hal û wextê wê pirsî. Bi spehîbûn û zanîn û hişmendîya wê ya zêde şaş û metal bû. Pir kêfxweş bû, ku kurê wê jineke ew qasî zana û xweşik ji xwe re peyde kiriye. li Hesen zivirî û jê re got: Careke din derbasbûyî be kurê min, spas ji wî Xwedayî re ku bi saxî û selametî tu li me vegerandî.

Roja din, sibehê zû, diya wî daket sûkê. Çû ji bûka xwe re deh qat kincên spehî, giranbuha û cur bi cur kirîn. Ber û tej û xalîçeyên herî giran anîn, odeya wê pê raxist. Kincên nû li bûkê kirin, ber dilê wê xweş kir, wensa wê anî û dûv re çû cem Hesen, jê re got: Kurê min, bi ev qas malê hanê em nikarin li vî bajarî bijîn. Lewre tu jî dizanî, ku em kesin jar in û xelk me bi sîmyagerîyê tawanbar dike.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 891'Ê

*Şehrezadê got*:

Diya Hesen ji kurê xwe re got: A baş ew e, ku em herin Bexdayê, bajarê aştiyê, da ku em li ber sîya xelîfeyê umetê bin û tu jî, ji xwe re dikaneke bazirganîyê veke, kirîn û firotinê bike. Di rêya Xwedê de be, da ku herdem te bisitirîne.

Ev gotina diya wî ket serê wî û rastî tê de dît. Hesen di cî de ra bû ser xwe. Çû mala xwe firot. Çend deve anîn, malê xwe hemû li wan bar kir. Kelûpelên xwe dan hev. Dê û jina xwe jî li du deveyan siwar kir, tewkelîya xwe bi Xwedê anî û ket rê. Berê xwe da Bexdayê. Gava hat ser ava Dîcleyê, ji xwe re keştîyek kirê kir û rêya xwe bi keştîyê berdewam kir. Bayekî xweş dihat, keştîya wan jî baş bi avê de diçû. Di nava deh rojan de, xwe gihandin Bexdayê. Bi kêf derbasî bajêr bûn. Hesen di cî de çû sûkê. Ji xwe re depoyek kirê kir û barên xwe yên di keştîyê de hemû rakirin wê depoyê. Wê şevê li xanekê raza û roja din rabû ser xwe, kincên xwe guhertin û çû sûkê. Bala her kesî kişand ser xwe. Di cî de delalek çû cem û daxwaza wî pirsî? Hesen got: Ez maleke xweşik, spehî û fireh dixwazim. Delal çend malên ji hev spehîtir nîşanî wî dan. Hesen malek ji wan eciband, ku berê ya wezîrekî bû. Sed hezar dînar tê de da û ew mala hanê ji xwe re kirî. Piştre dîsa vegerîya xana ku lê daketibû û hemû kelûpelên xwe ji wir rakirin, birin xanîyê xwe yê nû. Piştre dîsa çû sûkê û çi tiştê ku ji malê kêm hebû kirî, anî, mala xwe

giş raxist, têkûz kir. Çend bende û xulam jî ji xwe re kirîn, ku yekî biçûk ji wan kir navmalîyê xwe, ji bo ku xizmeta hundir bike. Bi wî hawayî sê salan di nava xweşî û şahîyê de bi jina xwe re jîya û di wan her sê salan de Xwedê teala du kur dan wan. Navê yekî kirin Nasir, ê din jî kirin Mensûr.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 892'YAN

*Şehrezadê got*:

Di wê navberê de xwîşkên Hesen ên cinî hatin bira wî. Qencîya ku pê kiribûn, alîkarîya ku diviyabû qet ji bîra wî neçûbûya û ew soza ku dabû wan, hemû yeko yeko li ber çavên wî sêwirîn û hestiyar bû. Rabû ser xwe, daket sûka bajêr û ji bo wan qumaş û cawin pir taybet û balkeş, gelek entîkeyên bêtimtêl kirîn, ku li tu deverê peyde nedibûn, û vegerîya malê. Diya wî çawa çav li wan tiştan ket, sebeba kirîna wan jê pirsî? Hesen got: Min biryar da, ku ez herim serdana wan xwîşkên xwe yên delal bikim, ew ên ku qencîya herî mezîn bi min kirine û ez deyndarê wan im. Ez ê herim wan bibînim û di cî de jî vegerim, bi izna Xwedê. Diya wî lê vegerand û got: Kurê min, ji min dûr nekeve û min bi tenê nehêle! Hesen got, tu qet meraq neke dayêcan, ez ê pir zû vegerim. Lê divê tu baldar bî û çavên te li ser wê sindoqa ku min kincên jina xwe yên perikî tê de veşartine bin, da ku nebîne û wan li xwe neke, tevlî herdu zarokan neçe. Jixwe sindoq jî li vê derê, di bin erdê de ye. Divê tu pir baldar bî dayêcan. Nexwe ku jin û zarokên min herin û ez nema bi ser wan vebin, ez ê dîn bibim û di ber wan de bimirim, herim. Baldar be û qet behsa vê mijarê jî jê re neke. Lewre ew keça şahê cinan e, ku di nava cinan de tu şah mîna wî hêzdar tune ne. Ew bi xwe jî şahbanûya qewmê xwe ye, delalîka ber dilê bavê xwe ye û gelekî nefsmezin e. Tu bi xwe xizmeta wê bike û nehêle ku di derî re derkeve derve, ne jî di şibakan re binêre. Ez ji bayê êvaran jî li ser wê ditirsim. Heger tiştek bi serê wê bê, bêguman ez ê xwe li ser wê bidin kuştin!

Diya wî tirsîya û got: Xwedê neke kurê min. Devê xwe bi xêrê veke lawo, ev çi gotinin ji devê te derdikevin. A din jî, qey ez dînik im, ku tu van şîretan li min dikî. Bi dilekî aram here û were û tu yê bibinî, ku her tişt li gorî dilê te ye kurê min. Gava tu bi xêr û selamet vegerîyayî, tu yê wê bibînî û ew jî, wê ji te re behsa min bike, bê min çawa lê nêrîye. Lê belê dereng mekeve kurê min.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 893'YAN

*Şehrezadê got*:

Vêca tu nabêjî gava ku Hesen ew şîret û hişyarî ji diya xwe re dikirin, jina wî jî li wan guhdar dikir û haya wan jê tune bû. Hesen amadekarîyên xwe qedandin û dahola xwe ya paxirî derxist, lêda. Bûraqên wî di cî de amade bûn, hatin li ber wî sekinin. Hedîye û diyarîyên ku ji xwîşkên xwe re kirîbûn, li bîst heban kir, ew bar kirin û ew jî li yekê ji wan siwar bû. Xatir ji dê û jina xwe xwest. Çavên Nasir û Mensûr ramûsan. Şîreta ku li diya xwe kiribû, dîsa li ber guhê wê dubarê kir û ket rê. Rêwîtîya xwe şev û roj berdewam kir. Deşt û çiya, newal û çem, teht û lat derbas kirin û di nava deh roj û deh şevan de xwe gihand wir. Di roja yazdehan de li gel wan diyarî û hedîyeyên xwe derbasî qesrê bû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 894'AN

*Şehrezadê got*:

Çawa ku xwîşkên wî çav lê ketin, pir kêfxweş û şad bûn. Bi germahî xêrhatina wî kirin û spasîyên xwe ji Xwedê re pêşkêş kirin, ku bi saxî û selametî ew gihandiye cem wan. Xwîşka biçûk jî qesir ji hundir û derve ve xemiland. Hemûçkan diyarîyên xwe ji destê Hesen girtin û pirsa dê û jina wî jê kirin. Wî jî ew agahdar kirin û ji wan re got, ku ji jina wî du zarokên wî çêbûne, xwîşka wî ya biçûk bi wê xeberê pir şanaz û bextewar bû. Pê re jî bi helbestî qîrîya got:

Ji sermilkên axa we ez sira bayê dikşînim nava xwe
her ku bayê sibehan ji warê we ve dixerbilîne bi ser me de
û her car jê dipirsim ez kanî ew birayê me yê delalî
bawer bike herdem tu bûyî di nava dil û hinavan de

Hesen jî bi dîtina xwîşkên xwe pir kêfxweş bû. Rojên xwe yên xweş ên berê dîsa vejandin, bi wan re derket seyd û nêçîr û şikarê. Bi qasî sê mehan di nava xweşî û şahîyê de li cem xwîşkên xwe ma.

Em Hesen di nava wê kêf û xweşîyê de bihêlin û em vegerin ser rewşa dê û jin û zarokên wî. Piştî çûna Hesen, jina wî, du rojan bi bêdengî li gel

diya wî ma û roja sisiyan kelogirî bû û ji xesiwa xwe re got: Subhan ji Xwedê re, çawa ez sê salan li ba wî dimînim û carekê tenê jî ez naçim hemamê!?

Dilê xesiwa wê pê şewitî û jê re got: Keça min, em xerîbên vir in û mêrê te jî ne li vir e. Heger ew li vir bûya, dê xizmet ji te re bikira û daxwazên te pêk bianîyana. Lê ez kesî nas nakim û nikarim tiştekî wilo bikim. Niha ez ê rabim ji keça xwe re avê germ bikim û serê te di serşoka malê de bişom! Bûkê lê vegerand û got: Heger qerwaşek di şûna min de bûya û ev gotina we guhdar bikira, pê qayîl nedibû, ku li cem we bimîne û dê daketa sûkê! Helbet zilam mafdar in, ku wisa nêzikî jinan dibin; ji ber ku dexesî û xîret bi wan re pir e û aqilê wan ji wan re dibêje, ku heger dilê jinekê di tiştekî de hebe, tu kes tu hêz nikare pêşîya wê bigire. Loma nahêlin ku jinên wan ji malê derkevin, herin sûkê, herin hemamê yan jî cihekî din lê gerek tu jî wisa nefikirî!

Piştre bi ser xesiwa xwe de girîya, nifir li xwe kirin, nifir li xerîbîya xwe kirin û nalîya. Xesiwa wê hestiyar bû, dilê wê tenik bû, pê şewitî û pê derxist, ku hemû tiştê ku ew dibêje, dê pêk were.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 895'AN

*Şehrezadê got*:

Dilê diya Hesen bi jina wî şewiti û rabû ser xwe, jê re amadekarîyên çûna hemamê kir û pêdivîyên xwe bi xwe re rakirin û berê xwe dan hemamê. Çawa derbasî hundir bûn, kincên xwe ji xwe kirin. Çavên hemû jinên wir çûn ser jina Hesen û li hemberî wê xweşikbûna îlahî ya cara ewilî çavên wan pê diket, devê gişan ji hev ma û "Subhanelah subhanelah"ên wan bûn, bê navber li bedana wê temaşe dikirin, bêyî ku awirên xwe ji ser rakin! Îcar çi jinên ku li pey wan hatin hemamê jî, berê berê hatin lê temaşe kirin û di nava xwe de kirin pistepist, bi heyrangorî û dexesî qala wê kirin. Jin li dora wê kom bûn, heta ku cihê kesî di hemamê de nema.

Îcar rasthatinek çêbû, ku wê rojê qerwaşek ji qerwaşên xelîfe Harûnê Reşîd jî hat wê hemamê, ku navê wê Tuhfe bû. Gava ku Tuhfe li wê qelebalixê rast hat û dît ku nikare rêya xwe di nava wan re veke, bi pêş de here, ji jinekê pirsî. Wê jî jê re behsa jina Hesen kir. Tuhfe bi zorê be jî xwe gihand cem wê û li bejn û bala wê nêrî, şaş û ecêbmayî ma li spehîbûna wê. Di dilê

xwe de ji Xwedayê xwe re got: “Subhan ji te re, ku te keseke wisa xuliqandiye!” Ne xwe şûşt ne jî tiştekî din kir.  Di nava ecêbmayînekê de tenê ji xwe re lê temaşe kir, heta ku jina Hesen şûştina xwe qedand û rabû ser xwe, xwe zuha kir, kincên xwe li xwe kirin û derbasî ser xaliçeyê bû. Li wir rûnişt û balîf da ber pişta xwe. Hemû jinên li wir jî bi dexesîyeke jandar lê dinêrîn û xwezîya xwe bi wê dianîn.

Gava ku ew û xesiwa xwe rabûn ser xwe û ji hemamê derketin jî, Tuhfeyê da dû wan û li pey wan çû, heta ku mala wan nas kir. Piştre bi lez vegerîya qesra xelîfe û çû cem Zubeyde Xatûnê, erda ber destê wê maçî kir. Zubeyde xatûnê jê re got: Çima tu dereng ketî Tuhfe? Wê jî got: Xatûna min, min îro li hemamê spehîbûneke rebanî dît ku tiştekî wisa ne di nava jinan de ne jî di nava zilaman de peyde nabe. Ew qasî balkêş û taybet bû, ku min ji bîr kir, ku ez serê xwe jî bişom; bi tenê min li wê temaşe kir, heta ku rabû û çû. Sebeba derengketina min jî ew bû, xatûna min!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 896’AN

*Şehrezadê got*:

Zubeyde Xatûnê ji qerwaşa xwe re got: Tu behsa xweşikbûna çi û kê dikî Tuhfe? Qerwaşê got: Xatûna min, min li hemamê jineke ku du kurik pê re bûn dît. Spehîbûna wê nayê pesindan. Herdu kurikên wê jî mîna du heyvan bûn. Ez texmîn nakim, ku keseke din di wê xweşikbûnê de hebe, di dinyayê gişî de. Min li mêrê wê jî pirsî. Gotin, yekî tacir ê bi navê Hesenê Besrî ye. Gava ji hemamê derketin jî, ez li pey wan çûm hetanî ku min mala wan jî nas kir. Mala wan mala wezîrê berê ya ku derîyekî wê li avê dinêrî û derîyê din li bejahîyê. Îcar xatûna min, ez ditirsim, ku emîrê bawermendan bibihîze û ji rêya Xwedê derkeve, here mêrê wê bikuje û pê re bizewice!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 897’AN

*Şehrezadê got*:

Gava ku Tuhfeyê wisa got, Zubeyde xatûn hêrs bû, pê de xeyidî û got: Tu çi dibêjî Tuhfe; ma qey bû çi ku emîrê bawermendan ji bo xweşikbûna

wê ola xwe bi dinyayê bifiroşe û li hemberî şerîetê derkeve? Lê belê weleh divê ez vê jinê bibînim. Heger xweşikbûna wê ne weke vê gotina te be, ez ê serê te bifirrînim, qehpika şerûd! Ma bû çi, ku di nava her sêsed û şest qerwaşên emîrê bawermendan de yeke mîna wê xweşik tune ye!

Tuhfeyê got: Xatûna min, bi navê Xwedê ne tenê di Bexdayê de, di seranserê welatên ereb ûn eceman de jî yeke mîna wê xweşik tune ye û Xwedê yeke din mîna wê nexuliqandiye!

Wê gavê Zubeyde xatûnê gazî Mesrûr kir û jê re got: Mesrûr bi lez here wê mala wezîrê berê ya bi du derîyan û jina di wê malê de li gel herdu zarokên wê bîne vir û xesiwa wê jî. Baldar be û dereng mekeve!

Mesrûr got: Ser seran ser çavan û rabû çû. Gava gihîşt ber malê, li derî da û xwe ragirt. Diya Hesen hat derî jê re vekir û got; tu kî yî? Got: Ez Mesrûr im, xizmetkarê emîrê bawermendan im. Diya Hesen got: Daxwaza te çi ye? Mesrûr got: Zubeyde xatûn, keça El Qasim, jina emîrê bawermendan Harûn Reşîd, kurê Abas ê şeşemîn ê apê pêxemberê me Muhemed (Silavên Xwedê li wî bin.) gazî te dike, dibêje bila ew û bûka xwe û herdu kurên wê bên cem min. Lewre jinan jê re behsa bûka te û xweşikbûna wê kirine.

Diya Hesen got: Mesrûr, em kesin xerîb in û kurê min mêrê jinikê ne li vir e û wî ferman da, berîya ku here, got, ne tu ne jî jina min, ji malê dernekevin û neçin cem tu kesî. Ez ditirsim, ku Xwedê neke tiştek biqewime û piştre kurê min were, xwe bikuje. Îcar bi me re dilovan be û barê ku em nikaribin, ranehêjê nede ser pişta me, ez qurban! Mesrûr got; xatûna min, heger metirsîyek li ser we hebûya, min tiştekî wisa ji we nedixwest.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 898'AN

*Şehrezadê got*:

Mesrûr dilê diya Hesen xiste cî û jê re got: Tenê wê xatûna min Zubeyde li bûka te mêze bike û hew. Ez çawa we bibim, ez ê wisa jî we bînim, bi izna Xwedê.

Gava Mesrûr wisa got û pê de, tu mehne di destê diya Hesen de neman, ku bide pêş û neçe. Vegerîya hundirê malê, bûka xwe û zarokên wê amade kirin û ew dan dû xwe. Derketin, bi Mesrûr re çûn qesra xelîfe Harûn Reşîd. Li wê derê Mesrûr ew derxistin cem xatûna xwe Zubeyde. Diya Hesen û

bûka xwe ya sergirtî jî erda ber destên wê maçî kirin û jê re dua kirin, bi xweşîyê û temenekî dirêj...

Zubeyde xatûn ji jina Hesen re got: Qey tu rûpoşa xwe nadî alî, ji bo ku ez li rûyê te binihêrim? Jinikê erda ber destê wê maçî kir û bi şermekarî rûpoş ji ser rûyê xwe da alî. Rûyê wê yê mîna heyveke li çardehan bi şewq û şemala xwe diyar bû û hemû awirên Zubeyde xanimê bi ser xwe de kişandin, şewqa di çavên wê de hemû mêt û bi şûnde da. Hundirê qesrê hemû ronî kir! Zubeyde xatûn li hemberî wê xweşikbûna ku cara ewilî didît, mest û şaşwaz bûbû. Ne tenê Zubeyde xatûn jî, çi kesên ku di qesrê de hebûn û ew dîtin, li ber spehîbûna wê dîn bûn û zimanê wan nema gerîya.

Piştre Zubeyde xatûn rabû ew himbêz kir û ew li kêleka xwe, li ser text da rûniştandin û ferman da qerwaş û xulaman, ku qesrê bixemilînin û destekî ji kincên wê yên herî xweşik li gel gerdenîyeke bicewher jê re bînin. Xizmetkaran fermana wê pêk anîn û kincên ku dixwestin, anîn danîn ber destên wê.

Zubeyde xatûnê bi destên xwe ew kinc li jina Hesen kirin û gerdenîya xwe xist stûyê wê û careke din lê temaşe kir û got: Keça rind û spehî, xweşiktirîna hemû xweşikên dinyayê; îcar min bi van kincan tu ecibandî û te çavên min dagirtin! Ma qey kincên ji wan xweşiktir li ba te hene?

Jina Hesen lê vegerand û got; xatûna min, kincekî min ê ji perîkan heye, heger ez wî li xwe bikim, tu yê bi çavên xwe bibînî, ku ez di wî kincî de hîn xweşiktir im û kî bibîne jî, dê pir biecibîne û dê bi salan behsa wî bike.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 899'AN

*Sehrezade got*:

Gava jina Hesen behsa wî kincê xwe yê perikî kir, Zubeyde xatûnê got: Kanî ew kincê te li ku ye? Wê jî got: Li cen xesiwa min e, ji wê bixwaze, wê bîne. Zubeyde xatûn li xesiwa wê zivirî û jê re got: Dayêcan, tu bi Xwedê kî, ji bo xatirê min here wî kincê wê bîne, ji bo ku li xwe bike, da ku em bibînin, bê ew bi wî kincî çawa bibe; piştre jî wî kincî dîsa bigire û bibe!

Pîra diya Hesen ji Zubeyde xatûnê re got: Xatûna min ev jinik derewkar e, jê bawer meke. Ma kê dîtiye, ku kincen kesî perikî ne? Em giş dizanin, ku perîk, kincên teyr û tilûran in, ne yên insanan in! Bûka wê, berê xwe da

Zubeydeyê û jê re got: Xatûna min tu bi Xwedê kî jê bixwaze, kincê min ê ji perîkan di sindoqekê de ye û ew sindoq jî di bin dolaba malê de ye! Zubeyde xatûnê gerdenîyeke ji cewheran ku bi qasî xezîneyên Kesra buha bû, ji stûyê xwe derxist, da destê wê û ji diya Hesen re got: Dayêcan vê gerdenîyê bigire û ji bo xatirê min, here wî kincê wê bîne, bila li xwe bike û piştre dîsa bibe!

Diya Hesen jê re sond xwar, ku kincekî wisa nedîtiye û nizane bê li ku ye jî. Zubeyde bi ser de rabû, pê de qîrîya, mifteyên malê jê stendin û gazî Mesrûr kir, jê re got: Van mifteyan bigire û here mala wan, dolabê veke û sindoqa di binî de veşartî bîne û were!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 900'Î

*Şehrezadê got*:

Mesrûr mifte ji destê Zubeyde xatûnê girtin, got: Ser seran ser çavan û kete rê, çû. Pîra diya Hesen jî pê re rabû, çû. Bi girî û gazinc piştî ku li çûna hemamê poşman bû û têgihîşt ku bûka wê çûna hemamê weke plangerîyekê dabû pêşîya wê û ew jî ketibû xefikê.

Pîra diya Hesen bi Mesrûr re çû malê. Derîyê dolabê vekir, sindoq jê derxist, sindoq jî vekir, kincê perikî jê derxist, ew di nava foteyekê de peça û anî da Zubeyde xatûnê.

Zubeyde xatûnê rahişt wî kincî, uw vekir, lê nihêrî, li çêkirina wî û spehîbûna wî beheti ma. Ew maçî kir û da jina Hesen. Jê re got: Kincê te yê ji perîkan ev e?

Jina Hesen got: Belê xatûna min û destê xwe dirêj kirê, bi kêfeke mezin ew ji destê Zubeyde xatûnê girt. Ew di ber çavan re derbas kir. Bala xwe dayê, ku kincê wê têkûz e û tiştek jê ne kêm e, lewre perîyek tenê jî jê neketibû.

Bi coş û kelecaneke mezin kincê xwe yê perikî li xwe kir. Rahişt herdu zarokên xwe ew dan ber singê xwe û bi emrê Xwedê mîna teyrikekî sûrikî, bi rê ve çû! Zubeyde xatûn û hemû kesên li wir lê ecêbmayî man. Jina Hesen jî bi fir û gerîn çiv dan xwe, reqisî, lîst û li ber awirên gişan çû û hat û hişt, ku devê gişan ji hev bimîne. Piştre bi zimanekî fesîh ji derdora xwe pirsî, got: Gelo ev baş bû? Hemûçkan gotin: Pir xweşik û baş bû, xatûna xatûnan, tu çawa dikî, tu xweşik dikî!

Jina Hesen li wan zivirî û ji wan re got: “Li min binêrin, ez ê niha liv û tevgereke hîn xweşiktir bikim!” û bi wê gotina xwe re baskên xwe vekirin, li hev dan û tevlî zarokên xwe firîya, bi hewa ket, çû li ser qubeya gesrê danî. Hemû kesên ku li wê temaşe dikirin jî, bi baldarîyeke mezin lê nihêrîn û jê re gotin: Weleh ev hunereke pir xerîb û balkêş e, hetanî niha me qet ew neditibû!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 901'Ê

*Şehrezadê got*:

Piştî ku hemûçkan bi heyrangorî têra xwe lê temaşe kir, Zubeyde xatûnê gazî wê kir û jê re got: De ka îcar tu danakevî, dîsa nayêyî cem me, ji bo ku em ji dîtina te têr bibin, ey şahbanûya hemû spehîyên vê dinyayê? Subhan ji wî re ku ew qas spehîbûn û zimanê fesîh û zanebûn daye te!

Jina Hesen kenîya, berê xwe da xesiwa xwe û jê re got: Dayêcan, tu yê pir bêrîya min bikî. Heger kurê te Hesen hat û bêrîya min kir, heger xwest ku were min bibîne û li pey eşq û evîna xwe were, bila were giravên Weqwaqê, dê min li wir bibîne!

Piştre bi helbestî got:

Ey rêwîyê ji welatê xwe dûr û li xerîbîyê
va hezkirîyên te bi lez diçin direvin ji Bexdayê
ji te werê ku vir bihuşt e bo min li dil nayê
hemû tev kul û derd û kedera xwedêdayê
gava perîkincê min wenda bû berî çend salan
min qet duayek jî nekir ji Xweda û pêxemberan
te jî şîret li diya xwe kir bo parastina kincan
ez jî li odeya kêlekê cîrana we bûn bi goşan
min hemû şîretên te bihîstin bi yek caran
min dua kir ku xêrxwaz pirtir bibin ji xeraban
daxwaza çûna hemamê mehneyek bû ji bo min
bo ku çavên xelkê şaşwaz bibin bi dêma min
lewra jina Harûnê Reşîd jî mest bû bi dîna min
gava liv û fir û ew xweştevger dît li ba min
min gazî wê kir gotê ey xana xananê min

kanî destê alîkarîyê kanî ew perîkincê newaz
ger li ser min bûya ew kinc dê diyar ba awaz
dê serî hilda di qamê de hemû gul û gulnaz
ew perîliv ew gulbihar ew kevok û ew qaz
jina xelîfe her wisa ket pey kincê pîroz
ew deranî bi zorê ji dolab û sindoqa aloz
çawa min danî ser xwe ew libasê pir pîroz
vêket ew şewq û nûra Xwedayî dilaşê miroz
wisa min himbêz kir ew herdu firiştên hûrik
min baskê xwe li ba da bi hewa ketim nola teyrik
piştî ku min wesîyeta te kir li dayîka pîrik

Û piştre bi hewa ket li gel herdu kurên xwe berê xwe da welatê xwe.

Diya Hesen dîn û har bû li hemberî wê dîmenê û bi kulman li singê xwe da, hetanî ku ji ser hişê xwe çû. Gava ku bi ser xwe ve hat jî, Zubeyde xatûnê jê re got; pîra delal û rind, bawer bike min nizanibû, ku wê tiştekî wisa biqewime û heger te ez agahdar kiribûma, ez li hemberî te dernediketim. A niha ez nû pê hesîyam, ku bûka te ji cinên firok e. Heger min bizanibûya, ku ew yeke wisa ye, min qet nedihişt, ku wî kincê xwe li xwe bike û ne jî zarokên xwe bi xwe re bibe. Lê belê mijarê ji min re rave bike, ji bo ku ez baş têbigihîjim û di min bibore, ji bo heqê we li ser min nemîne?

Diya Hesen bê hêz û bê çare bû û ji têbihurandinê pê ve tiştek di destê wê de tune bû. Mijar jê re rave kir û got: Ez di te de dibihurim û heqê me li te helal be! Piştre ji qesra xelîfe derket û berê xwe da malê. Gava gihîşt mala xwe, dîsa li xwe xist, porê xwe kişand û bi qeremûşkan laşê xwe giş birîn kir, hetanî ku ji ser hişê xwe çû. Gava ku piştre dîsa bi ser hişê xwe ve hat, çavên xwe li hundir gerandin, bala xwe dayê, ku hundirekî vikî vala û bêdeng e. Pir bêrîya bûka xwe û herdu zarokên wî kir. Rabû di hundir de sê gor kolan. Sê tirb ji wan re çêkirin û li ber wan rûnişt, şev û roj li ser wan girîya.

Her ku vegera kurê wê derengtir diket, qelaqa wê zêdetir dibû û hîn bêtir bêrîya wî û jin û zarokên wî dikir.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 902'YAN

*Şehrezadê got*:

Em diya Hesen di nava wê êş û bendewarîyê de bihêlin û em vegerin ser rewşa kurê wê Hesen. Ew jî çawa gihîştibû cem xwîşkên xwe, xwîşkên wî sond xwaribûn, ku wî sê mehan li cem xwe bigirin. Piştî ku sê mehên wî qedîyan, jê re gelek diyarî û xelat amade kirin û barê pênc hespan zêr, ê pêncan zîv hazir kirin û têra wî qûtê rêwîtîyê jî barkirin û pê re derketin ji bo ku wî bi rê xin. Lê wî sond xwar û nehişt ku xwîşkên wî pê re werin. Hema li wir hemû himbêz kirin, xatir ji wan xwest, kelogirî bû, pir hestiyar bû, heta ku ji ser xwe çû. Piştre dîsa bi ser xwe ve hat û siwar bû, kete rê. Şev û roj meşîya, hetanî ku gihîşt Bexdayê, mala aştîyê, pîrozgeha xilafeta Ebasîyan. Helbet wî nizanibû bê çi li pey wî qewimîye. Bi wê nezanîyê derbasî malê bû û silav li dayîka xwe kir. Le hîna ji nêrîna ewil ve tê derxist, ku laşê diya wî helîyaye û lawaz bûye, ji ber girî û nalîn û fîganê. Ew qasî hejar û bêhal bûbû, ku nikaribû bersiva silava kurê xwe bide. Barên xwe danîn, bûraqên xwe bi şûn de şandin û derbasî odeya zarokên xwe bû. Li jina xwe gerîya lê tu şopeke wan nedît. Çû li dolabê nêrî, dît ku derîyê wê vekirî ye, sindoqa kincê jina wî jî dervekirî û vala ye li wê derê. Di cî de têgihîşt, ku jina wî kincê xwe yê perikî derxistiye û zarokên wî jî bi xwe re birine û çûye.

Dîsa li diya xwe vegerîya, bala xwe dayê, ku hebekî bi ser xwe ve hatiye. Jin û zarokên xwe jê pirsîn. Diya wî girîya û got: Kurê min Xwedê ji te re razî be û emrê te dirêj bike, va ye tirba her sêyan jî li vir e! Bi destê xwe gorên ku çêkiribûn, nîşanî wî dan. Gava ku Hesen ew gotin bihîstin, carîneke ecêb pê ket û li erdê ket, ji ser hisê xwe çû, ji sibê hetanî nîvroyê jî bi ser xwe ve nehat. Diya wî pir li ser êşîya û kul û xemên wê girantir bûn. Qaseke din bi şûn de, Hesen bi ser xwe ve hat û rabû dîsa girîya, li xwe da, kincên xwe qetandin û mîna gêjan li nava hundir çû û hat. Piştre bi helbestî got:

> xelkên berîya min jî êş û elema firaqê kişandine
> gelek ji wan jî bi vê êşê tawî bûne û mirine
> lê min nebihîstiye ku tu kes mîna min hinde
> dilê wî çirîyaye û parsûyên wî ketine hev de

Gava ku ew helbesta xwe qedand, şûrê xwe ji kalanê wî derxist û bi ser diya xwe de hat, jê re got: Heger tu rastîya meseleyê ji min re nebêjî, ez ê destpêkê serê te jêbikim û piştre jî xwe bikujim! Diya wî xwe avêt ber nigên

wî û jê re got: Wisa meke, ez ê rastîyê ji te re bibêjim! Hesen got; zû bibêje! Diya wî got: Şûrê xwe têxe kalanê wî û were rûnê, ez ê ji te re bibêjim!

Hesen şûrê xwe li kalanê wî vegerand û li kêleka diya xwe rûnişt. Wê jî jê re got: Kurê min, rojekê pir bi ser min de girîya, ji bo ku ez wê bibim hemamê. Ez jî tirsîyam, min got, ku ez wê nebim û tu werî, ew jî gilîyê min li cem te bike, tu yê pir bi min de bixeyidî... Diya wî çîrok hemû jê re got û herî dawîyê jî pê de çû û got: Bi Xwedê kurê min, heger Zubeyde xatûn bi min de nexeyidîya û mifteyên dolabê bi zorê ji min nestenda, ez bimirama jî, min ew kincê wê dernedixist û nedida wê. Û kurê min tu jî dizanî, ku destê xelîfe di ser me gişan re ye. Loma çawa ku kincê wê jê re anîn, rahiştê, ew maçî kir û lê nêrî, ku tiştek jê kêm bûye yan na. Gava dît ku tiştek jê kêm nebûye, kêfa wê hat, ew li xwe kir. Rahişt herdu zarokên xwe, ew li newqa xwe girêdan û bû teyrikek, li hundirê qesrê meşîya. Wan jî li husn û cemala wê dinêrî. Dûre ji nîşka ve firîya û çû li ser banê qesrê danî. Li min nêrî û got: Heger kurê te were û şevên firaqê lê dirêj bibin û bixwaze xwe bigihîne min, bila dev ji welatê xwe berde û were giravên Weqwaqê. Tiştê ku der barê te de got, ev bû, kurê min!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû*.

## ŞEVA 903’YAN

*Şehrezadê got*:

Gava Hesen ew serpêhatîya jina xwe ji devê diya xwe bihîst, di cî de xeriqî û ji ser xwe çû. Şev pê de jî bi ser xwe ve nehat. Berbanga sibehê di xew re çû û di xewê de dît ku jina wî xemgîn e û digirî. Ji nişka ve şiyar bû, ji xew veceniqî û qîrîya, rabû, got:

xeyalê te li ber çavên min e şev û roj
cihê wî nava dil e herdem tê de dikoj
ger ne’j xeyalê te bûya qet haş nedibûm
ger ne’j banga te bûya zû ve’z mirî bûm

Bi sibehê re girî û nalîna wî zêde bû. Xemgînîya didil de girantir bû, ji xwarin û vexwarinê hate birrîn û xewa şeva le herrimî. Mehekê sax di wî halî de ma. Piştî mehekê, hat bîra wî, ku here cem xwîşkên xwe û alîkarîyê ji wan bixwaze, ji bo ku wî bigihînin jina wî. Li dahola xwe ya paxirî da, bûraqên wî hatin. Ew li yekê siwar bû, pêncî barên diyarî û tişten Îraqê yên giranbuha

li yên din kir. Xatir ji diya xwest, tembîya malê lê kir û kete rê. Berê xwe da cem xwîşkên xwe. Gava gihîşt çiyayê mijê û derbasî qesra wan bû, gelekî kêfa xwîşkên wî hat, xêrhatina wî kirin û bi germahî ew pêşwazî kirin. Wî jî diyarîyên ku anîbûn, pêşkêşî wan kirin. Keçik hemû bi diyarîyan şa bûn, jê re gotin, gelo birê me çima vê carê ew qasî zû hatiye, ku hîna du meh di ser hatina wî ya ewil re derbas nebûne? Hesen mehne û behaneyên pûç dan pêş û ya xwe tê re nedît ku rastîyê ji wan re bibêje. Piştre ji bo ku bêhna xwe berde, derbasî odeya xwe bû û palda. Ji ber bêxewîya şevan, hinekî hênijî, di xew re çû û xewnek dît. Xewna wî li ser jina wî bû. Di cî de ji xew cefilî û qîrîya, xwîşka wî pê ve bezîya û hat ser wî. Dît ku paldayî ye û ji ser hişê xwe çûye, wê jî kir qîrîn û li xwe xist. Li ser dengê we, xwîşkên wê pê ve hatin û dîtin, ku Hesen li ber wê, li erdê dirêjkirî ye. Hemû lê hatin hev û li ser girîyan.

Gava Hesen bi ser xwe ve hat, xwîşkên wî jê pirsîn? Girîya û rastîya meseleya xwe ji wan re got. Pê xemgîn bûn û gotinên jina wî yên dawîn jê pirsîn. Wî jî ji wan re got: Berîya ku here, ji diya min re gotiye, heger pir bêrîya min bike û ji ber evîna min şevên firaqê lê dirêj bibin, xewa wî lê biherime û bixwaze were min bibîne, bila were giravên Weqwaqê.

Gava ew gotin ji devê wî bihîstin, gişan çav kirin hev, pev şewirîn û hemûçkan yeko yeko li xwîşka Hesen a biçûk nêrîn. Hesen jî li wan nêrî. Piştre gişan bi qasî saetekê serê xwe bera ber xwe dan, ponijîn. Piştre serê xwe rakirin û gotin: Hêz û qewet hemû ji ba Xwedê ye, ka tu jî destê xwe dirêjî asîmanan bike, heger destê te gihîşt asîmanan, dê bigihîje jina te jî!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 904'AN

*Şehrezadê got*:

Gava ku xwîşkên wî ew gotin jê re gotin, hêsirên Hesen mîna baranê ji çavan barîyan, kincên wî şil kirin. Ew girîya û xwîşkên wî jî bi girîyê wî re girîyan. Dilê wan pê şewitî, bi gotinên xweş ber dilê wî girtin û sebr û aramî jê xwestin, bi hêvîya ku dê careke din bigihîje jin û zarokên xwe. Herî dawîyê xwîşka wî ya biçûk hat cem wî û jê re got: Birawo bêhna xwe fireh bike û hêvîya xwe wenda neke, misoger tu yê bigihîjî meqseda xwe. Qey te nebihîstiye, ku bapîrên me dibêjin, "Bi sebrê mirov dibe melîkê Misrê!" Hinek jî dibêjin, sebir bi xwe mifteya rêya xelasîyê ye. De êdî tu jî dilê xwe

xurt bike, vîna xwe ava bike, da ka tu bi ser xwe ve bêyî. Girî û êş û xemgînî laşê mirov jî nexweş û bêhêz dixin. Aram be, li cem me bimîne û ez ê ji te re li rêyekê, li çareyekê bigerim, ku bi izna Xwedê te bigihînim jina te.

Hesen bi dilîneyeke kûr, helbestek hestiyar got û li kêleka xwîşka xwe rûnişt, pê re mijûl bû. Wê jî sebeba çûna jina wî jê pirsî. Hesen sebeba çûna wê jê re got. Xwîşka wî got: Bi Xwedê birawo min ê ji te re bigota, wî kincê wê bişewitîne, ji bo ku tu bi temamî rê li ber çûna wê bibirî lê min ji bîr kir. Şeytan ew bi min da jibîrkirin.

Xwîşka wî pê re mijûl bû, wensa wi anî û hewl da, ku wî haş bike. Lê evîn û bêrîkirina di dilê Hesen de nedihişt, ku kêlîyekê tenê jî aram bibe û hedana wî bê. Gava ku xwîşka wî ew raçav li ser kir, rabû çû cem xwîşkên xwe. Bi ser wan de girîya û xwe avêt bextê wan, dest û nigên wan maçî kir û alîkarî ji wan xwest, ji bo ku birayê wê bigihînin jin û zarokên wî, rê û rêbazekê jê re bibînin, ku wî bigihînin giravên Weqwaqê. Pir girîya û li ber wan gerîya, hetanî ku daxwaza wê qebûl kirin û jê re gotin: Dilê xwe aram bike, bi izna Xwedê be, em ê rêyekê jê re bibînin.

Hesen, bi qasî salekê li cem wan ma lê roja ku çavên wî hêsîr nebarandina tune bû. Îcar bi navê Ebdilqidûs apekî xwîşkên wî hebû, ku pir ji wan birazîkên xwe hez dikir û salê carekê dihat serdana wan. Lazimîyeke wan hebûya, pêk dianî. Vêca gava ku sala borî hatibû serdana wan, keçikên birayên wî jê re behsa çîroka Hesen û pirsgirêka wî kiribûn. Dîsa jê re behsa Hesen û çîroka wî ya bi Behremê mecûsî û çawanîya kuştina wî kiribûn. Ew jî bi kuştina ew ê mecûsî pir kêfxweş bûbû û palisqayeke ku hinek bixûr tê de bû, dabû keça mezin û jê re gotibû: Birazêcan, gava ku Xwedê neke xerabîyek bi serê te de bê, ango tiştek te berbend bike, vê bixûra bavêje nav agir û navê min bibêje. Ez ê di cî de werim, daxwaza te pêk bînim. Ev gotina hanê, sala borî jê re gotibû. Keçikê jî ji xwîşkeke xwe re got: Ev bû salek sax di ser çûna apê min re dibihure û hîn jî nehatiye serdana me, ka rabe wê bixûrê ji min re bîne û agirekî pêxe!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 905'AN

*Şehrezadê got*:

Gava xwîşka wê ya mezin jê re wisa got, keçik bi kêf rabû ser xwe, çû ji eta xwe re palisqeyê bixûrê anî û agirek li ber wê dada. Xwîşka mezin jî hi-

nek bixûr ji palisqe derxist, bi ser agir de reşand û navê apê xwe anî ziman. Çawa ku bixûr şewitî, dûman jê derket, toz û dûmaneke ecêb ji hêla newala pêşîya wan ve xuya kir. Saetek bi şûn de, ew toz û dûman ji hev ferikî û kalekî ku li fîlekî siwar bûbû û ber bi wan ve dihat, ji bin derket. Gava her heft xwîşkan lê nêrî, kalo bi destê xwe û nigê xwe îşaret da wan. Piştî saetekê jî gihîşt cem wan, ji fîlê xwe peya bû û derbasî cem wan bû. Hemûçkan ew himbêz kirin, destê wî maçî kirin û xêrhatina wî kirin!

Li hev rûniştin, rewşa, hev pirsin. Keçikan sebeba nehatina wî ya salane jê pirsîn. Wî jî got: Ez û jinapa we, em li hevdu rûniştibûn, bêhna bixûrê hat min, ez jî di cî de hatim cem we. De ka êdî daxwaza we çi be, ji min re bibêjin? Keçikan got: Apocan, me pir bêrîya te kiribû, lewre ev salek bû, ku çavên me bi te neketibûn! Ebdilqidûs got: Rastîya Xwedê ez ne vala bûm û min biryar dabû, ku ez sibê werim vir. Keçikan spasîyên xwe nîşan dan û pê re ketin sohbetê.

Carekê keça mezîn jê re got: Apocan, berê me ji te re behsa Hesenê Besrî yê ku Behremê mecûsî ew anîbû vir, karibû û me ji te re gotibû, bê çawa Hesen ew kuştibû. Dîsa me ji te re behsa dilketina wî ya keça şahê mezin û zewaca wî û wê kiribû. Belkî hîna jî tê bîra te, bê wî camêrî çiqas zorî û zehmetî kişandibûn, hetanî ku ew keçik girtibû û çûbû welatê xwe. Lewre me bi berfirehî ji te re behsa çîroka wî kiribû.

Apê wan got: Belê, belê tê bîra min, êdî piştî wê çawa bû, çilo bû?

Keçikê got: Keça şah pê re bêbextî kir û herdu zarokên wî yên ku ji wê çêbûbûn jî, bi xwe re birin û çû welatê xwe. Berîya ku here jî, ji diya Hesen re gotiye, heger ew bixwaze careke din min bibîne, bila were giraven Weqwaqê.

Apê keçikê serê xwe hejand, tilîya xwe gez kir, serê xwe bera ber xwe da û bi neynûkên xwe erd kelpitand. Piştre, li çep û rastê xwe nêrî, serê xwe hejand û Hesen jî bêyî ku wî bibine, bi dizî ew raçav dikir.

Keçikan ji apê xwe re gotin: Çima tu bersivekê nadî me, kezeba me peritî! Ebdilqidûs serê xwe ji wan re hejand û got: Keçên min, vî mirovî xwe pir westandiye, serê xwe xistiye belayeke mezin û ruhê xwe jî xistiye talûkeyê. Ji ber ku ew nikare here giravên Weqwaqê!

Wê gavê keçikan gazî Hesen kirin, ew jî hat cem wan. Destê şêx Ebdilqidûs maçî kir û silavek dayê. Ebdilqidûs jî bi hebûna wî kêfxweş bû û ew li kêleka xwe da rûniştandin. Keçikan gotin: Apocan ka rastîya gotina xwe ji wî re jî eşkere bike, bila birayê me agahdar bibe!

Ebdilqidûs li Hesen zivirî û jê re got: Kurê min, bes vê êşa giran bikişîne û dev jê berde. Lewre tu nikarî xwe bigihînî giravên Weqwaqê. Stêrkên gerok û cinên firok jî bi te re bin, tu nikarî xwe bigihînî wir. Ji ber ku di neqeba te û wan giravan de heft gelî, heft derya û heft çiyayên ecêb hene. Wê kî te bigihîne wir û kî dikare te bigihîne wir? Tu bi xatirê Xwedê kî, dev ji vê yekê berde û giyana xwe nexe talûkeyê!

Hesen girîya û hey girîya, hetanî ku ji ser hişê xwe çû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 906'AN

*Şehrezadê got*:

Gava ku Hesen ji ser hişê xwe çû, xwîşkên wî li dora wî hatin hev û ew jî li ser wî girîyan. Tew a biçûk bi kulman li ser çavên xwe da û kincên xwe qetandin. Ew qasî li xwe da ku, herî dawîyê ew jî ji ser hişê xwe çû.

Gava Şêx Ebdilqidûs çav li wê rewşa birazîkên xwe ket, dilê wî bi wan şewitî, ji wan re got: Temam, temam, hiş bin! Piştre li Hesen jî zivirî û je re got: Aram be û dilê xwe xweş bike, bi izna Xwedê, ez ê daxwaza te pêk bînim!

Hilmeke kûr kişand û axaftina xwe berdawam kir, got: De êdî rabe, xwe amade bike kurê min! Xwe girêde û bide dû min, em herin!

Hesen bi kêf rabû ser xwe, xwe girêda, xatir ji xwîşkên xwe xwest û da dû Şêx Ebdilqidûsê ku di cî de gazî fîlê xwe kir, lê siwar bû, Hesen jî avêt pişt xwe û kete rê. Sê roj û sê şevan, weke birqê û birûskê bi rê ve çûn, hetanî ku gihîştin çiyayekî şîn û pir mezin. Di wî çiyayî de şikefteke mezin hebû, ku derîyekî ji hesinê çînê li ber bû. Şêx Ebdilqidûs fîlê xwe li ber derîyê wê şikeftê sekinand. Bi destê Hesen girt, ew ji ser fîl peya kir. Piştre ew jî daket û çû li wî derîyî da. Derî vebû û bendeyekî reşikî ji hundir derket, ku di destekî wî de şûr û di destê din de jî mertalekî ji pola hebû. Laşê bende, reşekî şaytok û birqonekî bû. Mûyek tenê jî pê ve tune bû û mîna dêwekî gir xuya dikir. Çawa çav li şêx Ebdilqidûs ket, şûr û mertalê xwe avêt erdê û hat destê wî maçî kir. Ebdilqidûs jî bi destê Hesen girt û li gel bendeyê reşik ket şikeftê, bende jî derî li pey wan girt û asê kir.

Hesen bala xwe dayê, ku Şikefteke pir mezin e, dawîya wê xuya nake. Navbireke wê sikefte hebû. Tê re meşîyan, bi qasî mîlekê piştre gihîştin berî-

yeke mezin. Di pey re jî du derîyên mezin derketin pêşîya wan, ku ji paxirê zer bûn. Şêx Ebdilqidûs derîyek ji wan vekir, ket hundir, ew li dû xwe girt û ji Hesen re got: Tu li ber vî derîyî rûnê û xwe ragire! Qet hewl nede, ku tu wî vekî û derbasî hundir bibî. Li benda min bimîne, heta ku ez li te vegerim!

Ebdilqidûs çû, bi qasî saetekê ma. Piştre bi şûn de vegerîya û hespekî wekî bayê bi xwe re anî, da Hesen û jê re got: Lê siwar bibe! Piştre çû derîyê din vekir, berîyeke pir fireh derket pêşîya wan. Ji Hesen re got: Were di vî derîyî re derbas bibe! Herdu di wî derîyê duduyan re derbas bûn. Bi berîyê ve çûn. Piştre şêx Ebdilqidûs ji Hesen re got: A ji te re kurê min vê pirtûkê bigire û li ser pişta vî hespî here hetanî cihê ku ew te bigihînê. Gava te dît ku li ber şikefteke mîna vêna sekinî, tu ji ser pişta wî peya bibe û hefsarê wî bavêje ser devê şikeftê û pênc rojan xwe li wir ragire. Bêhna xwe teng neke. Lewre di roja şeşan de wê şêxekî reş ji şikeftê derkeve, ku rîha wî spî ye û hetanî navika wî dadikeve. Te çawa ew dît, destê wî maçî bike, bi guhikê kirasê wî bigire û di nav destên wî de bigirî û binale, hetanî ku li te were rehmê û pirsa daxwaza te ji te bike. Gava ji te pirsî û got: Derdê te çi ye? Tu vê nameyê bide destê wî. Ew ê jî wê nameyê ji destê te bigire. Bêyî ku bi te re biaxive, dê bi şûn de vegere hundirê şikefta xwe. Tu jî xwe tevnede û pênc rojên din li wir bimîne û xwe aciz neke. Roja şeşan wê bi xwe dîsa derkeve û ev tê wateya ku daxwaza te pêk hatiye. Lê heger li şûna wî, yek ji xulamên wî derkeve raserî te, nas bike, ew derketiye ku te bikuje. Vê baş bizanibe kurê min, çi kesê ku xwe avêtiye nava xetereyê, tê de çûye!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 907'AN

*Şehrezadê got*:

Ebdilqidûs di şîreta xwe ya dawîn de ji Hesen re got: Îcar heger tu li ser xwe ditirsî kurê min, xwe navêje nava agir lê heger tirs bi te re tune be, bi dû daxwaza xwe de here, jixwe min rê û rêbaz hemû ji te re eşkere kirin. Heger tu bixwazî li xwîşkên xwe vegerî jî, ev fîlê hanê amade ye, wê te bigihîne cem wan û ew jî dê te bigihînin welatê te, cem kes û karên te, cem dost û hogirên te. Û Xwedê xêreke çêtir bide te, ji vê keça ku tu bi dû wê ketiyî.

Hesen ji şêx re got: Ez ê çawa bikaribim bijîm, bêyî ku ez bigihêm evîna xwe? Bi navê Xwedê ez bi şûn de venagerim, hetanî ku ez negihîjim arman-

ca xwe û evîndara xwe nebînim! An ez ê xwe bigihînim we yan jî ez ê li mirina xwe rast bêm!

Dema ku Şêx Ebdilqidûs ev biryardarîya wî dît, tê derxist, ku Hesen bi şûn de venagere û tu gotin jî bandorê lê nakin. Lewre ji awirên wî diyar bû, ku tu teredut pê re tune ne. Dîsa axivî û jê re got: Kurê min, divê tu bizanibî, ku giravên Weqwaqê heft heb in û tijî leşker in. Ew leşker hemû jî, keçên bekar in! Xelkên giravên navîn şeytan, îblîs, sihîrbaz, serhildêr û gelek sakûleyên cur bi cur in. Kî dikeve axa wan, bi şûn de sax venagere. Hetanî niha kesekî ku çûbe nav wan û sax bi şûn de vegerîyabe, tune ye. Tu bi qedrê Xwedê kî, neçe wê derê û bi şûn de vegere cem dost û hogirên xwe. Lewre ev keça ku tu li pey we diçî, keça şahê van giravan gişan e! Tu yê çawa bikaribî xwe bigihînî wê? Li gotina min guhdar bike û neçe kurê min, belkî Xwedê yeke ji wê çêtir bike nesîbê te!

Hesen ji şêx re got: Mîrzayê min, bi navê Xwedê, heger ez di rêya wê de perçe perçe bibim jî, ez bi şûn de venagerim. Ne gengaz e, ku ez bi şûn de vegerim, bêyî ku ez jina xwe û zarokên xwe bibînim. Misoger ez ê herim giravên Weqwaqê û ez ê wan bînim û bêm! Şêx jê re got: Nexwe divê tu herî? Hesen got: Belê û ez dixwazim ku tu ji min re dua bikî, belkî Xwedê teala min û jina min bigihîne hev! Pê re jî girîya û di ber xwe de lorand.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 908'AN

*Şehrezadê got*:

Şêx Ebdilqidûs bergera xwe berdewam kir û ji Hesen re got: Kurê min, diyeke te heye, êşa mirina xwe pê nede jîyîn! Hesen lê vegerand û got: Mîrzayê min, sond û qesem be, ne li gel jina xwe be, ez li diya xwe jî venagerim. An ez ê li gel jina xwe û herdu zarokên xwe lê vegerim an jî ez ê mirina xwe bibînim.

Gava şêx baş têgihîşt, ku Hesen pir bi biryar e û elametên vegerê li ser wî nîn in, şîreten dawîn li ber guhên wî dubare kirin. Jê re dua kirin. Nameyek da destê wî û jê re got: Di vê nameyê de min wesîyeta te li Ebûrîş kurê Belqis kurê Mûyîn kiriye. Ew şêxê reş î rîspî ew e; mamoste û şêxê min e. Hemû ins û cin di bin serwerîya wî de ne û giş jê ditirsin. De êdî here û rêya te vekirî be kurê min! Rişmeya hespê xwe sist bike û here!

Hesen, rişmeya hespê xwe sist kir; hesp bi leza birqê bezîya, weke bayê

bi rê ve çû. Hesen deh rojan bi lezê çû, heta ku sîwêneyekî gir û ecêb derket pêşîya wî, ku weke tarîya şevê reş bû û neqeba şerq û xerbê digirt. Gava Hesen nêzî wî bû, hîrehîr bi hespê wî ket û bi wê hîrehîrê re weke axê hespin din lê kom bûn, ku bê hed û bê hesab bûn. Hemûçkan xwe bi hespê wî ve dixurandin, tê didan. Hesen tirsîya lê dîsa jî rêya xwe berdewam kir, hetanî ku gihîşt wê şikefta ku şêx Ebdilqidûs behsa wê jê re kiribû. Hespê wî, xwe berî ber derîyê wê şikeftê da û sekinî. Hesen jê peya bû û rişmeya wî danî ser zînê wî. Hesp derbasî hundir bû. Hesen jî li devê derî ma û xwe ragirt. Gotinên şêx hatin bîra wî, xwe bêçare hîs kir, nizanibû wê çawa bike.

Pênc roj û pênc şevan di nava xemgînî û bêçaretiyê de li ber wî derîyî sekinî ma. Dil bi kul û çav bi hêsir bû. Ji dost û hogirên xwe, ji welat û xelkê xwe veqetîyabû. Diya xwe ya extiyar bi tenê hiştibû û dahatûyeke nediyar li pêşîya wî bû. Nizanîbû wê çi bê serê wî.

Di roja şeşan de şêx Ebûrîş bi wî rîhê xwe yê spî û dirêj, bi wî çermê xwe yî reş û tarî, derket hemberî wî. Hesen çawa lê nêrî, bi xêra wesifdana şêx Ebdilqidûs ew nas kir. Hesen di cî de xwe çeng kir destê wî, ew maçî kir. Rûyê xwe di nigên wî da, bi guhikê kirasê wî yê reş girt, danî ser serê xwe û kûrekûr pê ket, mîna zarokekî sêwî girîya.

Şêx Ebûrîş jê re got: Daxwaza te çi ye, kurê min? Hesen, nameya ku Ebdilqidûs nivîsandibû, da destê wî, bêyî ku tişekî bibêje. Şêx jî name ji destê wî girt û bi şûn de vegerîya şikefta xwe, bêyî ku gotinekê tenê jî bibêje. Hesen dîsa di cihê xwe yê berê de li devê derî rûnişt, çawa ku Ebdilqidûs ew şîret kiribû. Pênc rojan xwe li wê derê ragirt, di nava êşa meraq û bendewarîya nediyar de. Ji ber dijwarîya eşqê û tirsa dahatûyeke agirîn digirîya, dinalîya!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 909'AN

*Şehrezadê got*:

Hîna ku Hesen ji xwe re wisa digirîya û dinalîya, şeveqê lêda û şêx Ebûrîş ji şikefta xwe derket. Lê vê carê bi kirasekî spî bû! Ji devê derî bi destan îşareta derbasbûnê da Hesen, ew bi kêf û şahîyeke bêtimtêl çû derbasî şikeftê bû! Şêx, bi destê wî girt û bir hundirê şikeftê. Coşeke mezin di laşê Hesen de gerîya û tê derxist, ku dê êdî daxwaza wî pêk bê.

Şêx bi qasî nîv rojê ew bi xwe re meşand û di encamê de gihîştin ber avahîyeke bikemer, ku derîyekî ji pola li ber bû. Şêx Ebûrîş derî vekir û Hesen jî bi xwe re derbasî hundir kir. Di navbireke kevirîn re derbas bûn, ku binka wê giş bi kevirên bi zêr neqişandî hatibû lêkirin. Navbir dirêj bû. Di dawîyê de gihîştin hewşeke pir fireh, ku dîwarên wê bi mermeran hatibû çêkirin û baxçeyekî mezin di nava wê de bû, ku hemû darên fêkî û gul û çîçekan bû. Ser wan şîndaran jî tijî çûk û teyrikên cur bi cur bûn, ku bi wîtewît û çîveçîv bûn. Di nava wê hewşê de jî çar eywanên li hemberî hev hebûn, ku di her eywanekê de meclîsek hebû û di nava her meclîsekê de jî avpîjek hebû. Li kêleka her avpîjekê jî şêrekî ji zêr hebû û di her meclîsekê de kursîyek hebû, ku şêxek li ser rûniştî bû. Di destê her yekî ji wan de nameyin hebûn. Li kêleka her yekî ji wan jî agirdankeke ku bixûr li ser bû, hebû û li dora her şêxekî ji wan jî komek suxte hebûn. Li şêxên xwe guhdar dikirin.

Gava ku şêx Ebûrîş û Hesen derbasî cem wan bûn, hemû bi wan ve rabûn û qedrê wan girtin. Şêx Ebûrîş ji wan her çar şêxan xwest, ku suxteyên xwe ji wir derxin. Wan jî ew derxistin û hatin li ber destê Ebûrîş rûniştin, rewşa Hesen jê pirsîn?

Ebûrîş, bi destan Hesen nîşanî wan da û ji Hesen re got: Rewşa xwe û tiştê ku bi serê te hatiye, ji serî hetanî binî ji wan re bibêje! Hesen girîya û serpêhatîya xwe ji wan re got. Çawa ku qedand, her çaran bi hevre gotin: Ew bû, yê ku Berhemê mecûsî ew bi xwe re biribû çiyayên mij û ewran, ew xistibû çermê deveyê û bi teyrên rexê re biribû serê çiyê?

Hesen got: Belê, ew ê ku hûn behsa wî dikin ez bûm!

Her çar şêxan berê xwe dan Şêx Ebûrîş û jê re gotin: Şêxê me, Berhemê mecûsî hîle lê kir û ew derxist ser wî çiyayî, gelo çi tiştên ecêb li ser wî çiyayî ditin û çawa karibû ji wir dakeve?

Ebûrîş ji Hesen re got: Tiştên ku te li ser serê wî çiyayî ditibûn, ji wan re bibêje? Hesen dîsa ta bi derzîyê ve kir û bi hurgilî tiştên ku li ser wî çiyayî dîtibûn û çawa ji wê derê daketibû, hemû ji wan re vegot. Tevlî çîroka kuştina Berhem û xayîntiya ku jina wî pê re kiribû û reva wê ya tevlî herdu zarokên wî, li gel hemû zorî, zehmetî û eşên ku kişandibûn.

Her çar şêx, li hemberî wê serpêhatîya Hesen behetî man û hatin ji Şêxê xwe Ebûrîş re gotin: Ey şêxê şêxan, ev ciwanê hanê belengaz û bêhêz e, qet alîkarîya wî neke di xelaskirina jin û zarokên wî de!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 910'AN

*Şehrezadê got*:

Gava wan ew daxwaza xwe anîn ziman, şêx Ebûrîş ji wan re got: Birano, ev mijareke girîng e û di vî temenê xwe yê dirêj de min nedîtiye, ku kesî ji bo hinekên din mirin daye ber çavên xwe. Hûn jî dizanin ku giravên Weqwaqê pir zor û zehmet in û çi kesê çûye wir, ruhê xwe feda kiriye. Helbet hûn hêz û qeweta wan jî dizanin û haya we jê heye, ku min sond xwariye, ku ez pê li axa wan nekim û bi wan re neyêm cem hev. Vêca wê ev xort çawa bigihîje mala şahê wan û kî dikare alîkarîya wî bike, wî bigihîne wir?

Wan jî lê vegerandin û gotin: Ey şêxê şêxan; ev xort di bin barê eşqê de herifûye, ruhê xwe avêtiye talûkeyê û nameyek ji destê şêxê birayê te Ebdilqidûs ji te re anîye. Loma divê di vê mijarê de tu alîkarîya wî bikî!

Bi wê gotina wan re Hesen jî rabû serxwe, nigên Ebûrîş maçî kirin, rahişt dawa kirasê wî, danî ser serê xwe û bi lavekarî jê re got: Ji bo xatirê Xwedê, min û zarokên min, min û jina min bigihîne hev û bila ruhê min derkeve! Û bi vê gotina xwe re girîya.

Her çar şêxên li wir jî pê re girîyan û ji şêxê xwe Ebûrîş re gotin: Xêrekê bi vî xortî bike, bila qencîyeke te lê be, ji bo xatirê destbirakê te şêx Ebdilqidûs!

Şêx Ebûrîş got! Ev xortê belengaz nizane bê wî berê xwe daye çi lê bi qasî hêza xwe, em ê alîkarîya wî bikin!

Bi vê gotina şêx Ebûrîş re, gelekî kêfa Hesen hat, rabû herdu destên wî û destên haziran yeko yeko maçî kir û alîkarî ji gişan xwest.

Wê gavê Ebûrîş rahişt pênûs û kaxezekî. Nameyek nivîsand. Mohr kir. Li gel nexşeyekê da Hesen, ku bixûr û agirdankek jî tê de hebûn û jê re got: Tu kengî ketî tengasîyekê, hinekî ji vê bixûrê bişewitîne û navê min li ser bixwîne, ez ê di cî de bi te ve bêm, te rizgar bikim!

Piştre ji her çar şêxan xwest, ku îfrîtekî ji cinên firok jê re bînin. Di cî de îfrît anîn wir. Şêx ji îfrît re got: Navê te çi ye? Îfrit got: Ez bendeyê te Dehneş Bin Feqtes im. Ebûrîş jê re got: Xwe nêzî min bike! Dehneş çû ber wî. Şêx devê xwe xist guhê wî û tiştek jê re got. Îfrît jî serê xwe hejand. Şêx ji Hesen re got: Kurê min, rabe li ser milê vî îfrîtê ku navê wî Dehneş e, siwar bibe!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 911'AN

*Şehrezadê got*:

Şêx Ebûrîş ji Hesen re got: Rabe li vî îfrîtî siwar bibe. Gava Dehneş firîya û tu bi asîmanan ve hilda û dengê "Subhanelah"ên melaîket û ferîşteyan hat te, tu "Subhanelah"an nekişîne, nexwe tu û wî, hûn ê herdu werin kuştin! Hesen got: Ez bi rê de qet naaxivim û gotineke tenê jî ji devê min dernakeve. Şêx jê re got: Binêre Hesen, gava bifire, wê di roja duduyan de bi şeveqê re te deyne ser erdeke spî û paqij, mîna kafûrê. Çawa tu danîyî wir, tu bi tena serê xwe bi qasî deh rojan bimeşe, heta ku tu bigihîjî derîyê bajêr. Gava tu gihîştî wir, derbasî bajêr bibe û li qralê wê derê bipirse. Dema te ew dît, silavê lê bike, destê wî maçî bike û vê nameyê bide wî. Ew ê jî îşaretan bide te, tu jî hewl bide, ku tu hemû îşaretên wî fêm bikî!

Hesen got: Bila be, ez ê wisa tevbigerim! Piştre rabû ser xwe. Şêx jî rabûn ser xwe, şîretên dawîn li îfrît kirin, bo ku li Hesen miqate be. Di pey re îfrît ew rakir ser milên xwe û ber bi perên asîmanan ve bi hewa ket. Piştî fira şev û rojekê, dengê "Subhanelah"ên ferîşteyên li asîmanan hat. Roja dîtirkê, sibehê, îfrît ew li ser wê axa spî danî û çû.

Gava Hesen dît ku ew li erdê ye û tu kes li dora wî tune ye, bi şev û roj bi qasî deh rojan meşîya û xwe gihand ber derîyê bajêr. Piştre di derî re derbasî bajêr bû û li qralê bajêr pirsî. Mirovan jê re gotin, navê qralê me Hesûn e, qralê erda kafûrê ye û artêşeke wî heye, ku dikare ser rûyê erdê gişî bi leşkeran dagire.

Hesen izna hevdîtinê ji qral Hesûn xwest û derbasî cem wî bû, erda bin nigên wî maçî kir û silav û rêzên xwe pêşkêşî wî kir. Qral jê re got: Tu çi dixwazî? Hesen name ji bin çengê xwe derxist, ew maçî kir û da destê wî. Qral rahişt nameyê û vekir, xwend. Piştre serê xwe hejand û ji karmendên xwe re got: Vî xortî bibin mala mêvantîyê!

Karmendan Hesen birin mala mevantiyê, sê rojan li wir ma; xwar, vexwar, raket, rabû û rûnişt. Ji xizmetkarekî pê ve tu kes li cem wî tune bû. Loma ew xizmetkar her car pê mijûl dibû, wensa wî dianî û pirs jê dikirin, bê ka çawa xwe gihandiye hetanî wir? Hesen jî serpêhatîya xwe giş jê re got. Roja çaran jî, xizmetkar ew dîsa bir cem qralê xwe.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 912'AN

*Şehrezadê got*:

Xizmetkar, Hesen bir ber destê qralê xwe. Qral jê re got: Hesen, tu hatiyî cem min û tu dixwazî derbasî giravên Weqwaqê bibî, çawa şêxên şêxan di nameya xwe de dibêje. Ez ê jî van rojan te bişînim wir lê belê kurê min, divê tu bizanibî, ku rêya te tijî talûke û zor û zehmetî ne. Divê tu bêhna xwe fireh bikî, înşelah ez ê rê û rêbazekê ji çûna te re peyde bikim. Mijara din jî ew e, ku hinek Deylemî jî li vir hene, dixwazin derbasî wan giravan bibin. Ev Deylemiyên ku ez behsa wan dikim, hemû leşker in, siwarî ne û bi şûr û mertal in lê belê dîsa jî rêyeke derbasbûnê hîna jî nedîtine. Dîsa jî ji bo xatirê şêxê şêxan Ebûrîş Bin Belqis Bin Maen, ez te bi şûn de venagerînim, ez ê daxwaza wî pêk bînim. Di demeke nêzik de wê keştîyin ji giravên Weqwaqê ber bi me ve bên. Gava ku hatin, ez ê te li yekê ji wan siwar bikim û ez ê tembîya te li qeptan û xebatkarên wê bikim, ji bo ku te bibin wir. Gava tu çûyî wir jî, kî ji te bipirse, ji wan re bibêje ez zavayê qral Hesûn im, xwedîyê erda kafûrê. Bi rê de jî, gava keştî gihîşt peravên giravên Weqwaqê û qeptanê wê ji te re got; dakeve, here! Ji keştîyê dakeve û li wan deran binêre, tu yê gelek holikan bibînî. Li her derê holik hene, tu jî here, ji xwe re li bin yekê ji wan rûnê. Çawa tarîya şevê bikeve erdê, tu yê bibînî, ku leşkerên jin tevlî kelûpelên xwe hatin wê derê û her yek ji wan ket holikekê. Wê çaxê tu jî destê xwe bavêje ya bin holika xwe û xwe bavêje bextê wê. Heger ew li te xwedî derket, jixwe wê daxwaze te pêk were û tu yê bigihîjî jina xwe. Lê ger li te xwedî dernekeve jî, felata te ji nav lepên wan nîn e. Divê tu bizanibî ku tu diçî talûkeyê û tiştekî ku ez ji te re bikim jî tune ye. De êdî Xwedê alîkarê te be.

Gava Hesen ew gotin ji qral bihîstin, girîya, hêsir barandin û li xwe da, hetanî ku ji ser hişê xwe çû. Gava ku bi ser hişê xwe ve hat jî, bi helbestî got:

kurtemuhleteke min her heye
ger kuta bibe ez dimrime
lê hetanî wê rojê her şer e
lew ku yê hemberî min şêr be

Piştre erda bin nigê qral maçî kir û jê re got: Qralê gewre, gelo çend roj mane, ku ew keştî werin? Qral got: Mehek maye, ku werin. Gava tên jî, du mehan li vir dimînin, ji bo ku malên xwe bifiroşin. Piştre vedigerin welatê xwe. Tu jî lez meke, lewre çûna te ne kêmî şeş mehan bi şûnde ye.

Qral ji Hesen xwest, ku here mala mêvantîyê û ji xulamên xwe jî xwest, ku hemû pêdivîyên wî ji xwarin û vexwarinê, ji kinc û mincan bibin cem wî. Xulaman fermana qral pêk anîn û her tiştên xweş û baş jê re birin.

Hesen mehekê di mala mêvanan de ma, keştîyên ku qral behsa wan kiribû jî, hatin. Qral, Hesen jî bi xwe re bir û li gel wezîr û mîr û gizîrên xwe derket pêşîya wan. Bala xwe dayê, ku keştîyeke pir pir mezin û xelkekî pir qelebalix tê de ye, ku ji Xwedê pê ve tu kes hejmara wan nizane! Keştî di nîvê deryayê de sekinîbû û qeyikan jî bê navber kelûpelên bazirganan dibirin û dianîn, ser bejahîyê.

Bazirganan malên xwe difirotin û malin din dikirîn, ji nû ve bar dikirin. Hesen jî li cem wan ma, hetanî ku karê xwe qedandin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 913'AN

*Şehrezadê got*:

Gava ku bazirganan karê xwe qedandin û sê roj ji rabûna keştîyê re man, qral gazî Hesen kir, ew anî qesrê û ji xulamên xwe re xwest, ku amadekarîyên rêwîtîya wî bikin, hemû pêdivîyên wî pêk bînin! Pir dirav jî danê û gazî qeptanê keştîyê kir, jê re got: Ev xortê hanê wê bi te re bê, wî li keştîya xwe siwar bike, bêyî ku tu kesî pê bihesînî, wî bigihîne giravên Weqwaqê û wî li wir deyne! Qeptan got: Ser seran û ser çavan. Qral şîret li Hesen jî kirin û jê re got: Di rê de, derbarê xwe de tu agahîyê nede tu kesî û çîroka xwe ji kesî re nebêje!

Hesen got: Ser seran, ser çavan. Piştre dua jê re kirin, bi temenekî dirêj û serkeftinên gewre li hemberî hemû dijmin û zikreşan. Spasîya wî kir û xatirê xwe jê xwest. Qral jî spasîya wî kir, rêwîtîyeke aram jê re hêvî kir û ew radestî qeptanê keştîyê kir.

Qeptan jî Hesen kir sindoqekê û ew li qeyikêkê siwar kir, berê wî da keştîyê, di demekê de ku hemû bazirgan bi barkirina malên xwe daketibûn. Piştre keştî ket rê û bi qasî deh rojan di avê de meşîya. Roja yazdehan gihîştin bejahîyê. Qeptan Hesen ji kestiyê peya kir û derbasî ser bejahîyê kir.

Hesen li derdora xwe nêrî, bala xwe dayê ku her der tijî holik in. Meşîya, çû hetanî ku li holikeke pir xweşik rast hat, ku ji derdora xwe pir cuda bû. Ket binî wê holikê û xwe tê de veşart. Çawa ku şev hat û tarî kete erdê,

jinên şervan bir bi bir hatin, mîna kulîyan. Hemû bi meşê dihatin, şûrên wan di destên wan de tazî bûn û bi cewşenên hûnayî rapêçandî bûn. Çawa kelûpêlen li wir dîtin, pê de ketin. Piştre ji bo ku bêhna xwe vedin, her yek ji wan çû li ser holikekê rûnişt. Yek ji wan jî li ser holika ku Hesen xwe di bin de veşartibû de rûnişt. Hesen di cî de rahişt guhikê kirasê wê, danî ser serê xwe û xwe bi ser de avêt, dest û nigên wê maçî kir û da girî.

Jinikê got: Ev çi ye! Rabe ser xwe, berî ku hinek te bibînin û werin te bikujin! Hesen ji binî holikê derket. Rabû ser xwe. Destên wê maçî kirin û got: Xatûna min, 'ez di bextê te de me' û dîsa dest bi girî kir û axaftina xwe berdewam kir, got: Xatûna min, li yekî were rehmê ku jin û zarokên xwe wenda kirine û ew jî ketiye pey wan. Dev ji kesûkarên xwe, dev ji dost û mirovên xwe berdaye û ruhê xwe avêtiye talûkeyê, ji bo ku xwe bigihîne wan. Li min were rehmê û bawer bike, tu yê ji ber vê xêrkarîyê herî bihuştê! Heger tu min qebûl nekî jî, bi kêmanî min bisitirîne, ji bo xatirê Xwedê û pîrozîyên wî!

Gava jinika bazirgan ew di wê rewşa perişan de dît, dilê wê pê şewitî û tê derxist, ku mirina xwe daye ber çavê xwe û hatiye wê derê. Ev jî dihat wê wateyê, ku ji bo mijareke pir giran hatiye wir. Hinekî ponijî û ji Hesen re got: Dilê xwe bixe cî û aram be, kurê min! Dîsa bikeve bin holikê û mîna berê xwe veşêre, hetanî şeva pêşîya me. Piştre jî Xwedê mezin ê!

Jinikê xatir ji Hesen xwest, ew jî vegerîya cihê xwe. Jinên şerker jî mûmên bi ned û ember pêxistin, hetanî sibehê. Çawa rojê tava xwe avêt û keştî ber bi bejahîyê ve vegerîyan; bazirganan jî malên xwe rakirin û danîn, firotin û kirrîn hetanî ku şev hat. Hesen jî hîna ji çavan dûr bû, di binî holikê de bi girîn û nalîn bû. Nizanibû wê çi bi serê wî bê.

Hîna ku ew di wî halî de bû, jina bazirgan bi ser de hat. Şûr û rim û cewşen û kemereke bi zêr neqişandî da dest wî û ji tirsa leşkeran çû. Lê Hesen tê derxist, ku wê bazirganê ew amûr jê re anîne, ji bo ku li xwe bike. Rabû ser xwe, ew cewşen li xwe kir, kemer li newqa xwe girêda, şûr xist ber xwe û rim jî xist destê xwe. Di cihê xwe de rûnişt û bê navber dua ji Xwedê re kirin, ji bo ku wî bisitirîne.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 914'AN

*Şehrezadê got*:

Hîna ku Hesen di wê rewşê de bû, bala xwe dayê, ku bi hezaran şewqên mûm û fanosan li hev kom bûn û bi hezaran leşker gihîştin hev, bûn şewqek tenê. Hesen jî xwe xist nava wan û bû yek ji wan, lewre hemû mîna wî girêdayî bûn.

Şeveqê, gava ro derket, hemû leşker li holikên xwe vegerîyan. Hesen jî di nav de, her kes derbasî holika xwe bû. Hesen jî derbasî holikekê bû. Çawa ket hondirê wê, bala xwe dayê, ku holika heman jina ku xwe dexîlê wê kiribû û xwe avêtibû bextê wê. Hesen şûr û rima xwe danî û cewşenê xwe jî ji xwe kir. Jinikê jî heman tişt kir. Hesen li xwedîya xwe nêrî, dît ku jineke çavşîn, pozmezin, rûbelek, birhûweşîyayî, diranşikestî, rûqermiçî, porsipî û devbigirêz e, mîna pîrhebokekê ye!

Gava jinika bazirgan li Hesen nêrî, ecêbmayî ma û di dilê xwe de ji xwe re got: “Ev çawa hetanî vir hatiye, bi kîjan keştîyê hatiye û çawa hatiye?” Û hewl da, ku rewşa wî fêm bike lê tênegihîşt.

Hesen, xwe bi ser nigên wê de avêt, rûyê xwe di nigê wê da û girîya, hetanî ku ji ser hişê xwe çû. Gava ku dîsa bi ser hişê xwe ve hat, bi guhikê kirasê jinikê girt, danî ser serê xwe û girîya, xwe avêt ber bextê wê.

Gava pîrejinê ew êş û jana wî, ew girî û nalîna dilê wî yê birîndar dit, dilê wê pê şewitî û jê re got: Qet metirse û aram be, kurê min! Piştre rewş û serpêhatîya wî jê pirsî. Wî jî çîroka xwe ji serî hetanî binî jê re vegot. Pîrê lê behetî ma û jê re got: Dilê xwe xweş bike, kurê min, êdî tu tirs li ser te nemaye û tu yê bigihîjî armanca xwe, bi izna Xwedê.

Hesen bi wê gotina wê pir dilxweş bû. Pîrê jî gazî hemû serleşkeran kir û ji wan xwest, ku werin li ber destê wê amade bibin, di wê roja dawîn a mehê de. Serleşker lê hatin hev. Pîrê ji wan re got: Bangêran derxin, bila li nav hemû leşkeran bigerin û ji wan re bibêjin, ku sibê zû amade bin û yeke bi tenê jî dereng nekeve! Hemûçkan gotin: Ser seran, ser çavan û li hemû leşkeran bang kirin, ku we şevê xwe ji bo çûnê amade bikin. Hesen jî kinc û amûrên leşkerîyê ji ser xwe dananîn. Bi sibehê re çawa ku leşker û artêş hemû ketin rê û çûn, xwedîya Hesenî ku navê wê Şewahî bû û jinan di nava xwe de jê re digotin, “dayika fenan”, ji Hesen re got: Ber bi min ve were, kurê min! Hesen nêzikî wê bû û çû li ber destên wê sekinî. Pîrê pê ve rabû û jê re got: Kurê min; ji bo çi te xwe avêtiye nava agir û tu hatiyî hetanî vir? Sebeb çi ye, ku te mirin daye ber çavên xwe, rastîyê ji min re bibêje û netirse. Lewre êdî te xwe avêtiye bextê min û min jî tu qebûl kiriye. Va ye tu jî dibînî,

bê ez çawa li te xwedî derdikevim û te diparêzim, heger tu rastîyê ji min re bibêjî, ez ê daxwaza te pêk bînim, lew ku ruhê min di vê rêyê de here. Divê tu baş bizanibî, ku ez nahêlim tu kes tehdeyekê li te bike û zerarekê bide te û ez ê te bi saxî û selametî bigihînim giravên Weqwaqê.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 915'AN

*Şehrezade got*:

Gava ku pîrê ew bawerîya xurt da Hesen, bawerîya wî jî pê hat û sebeba hatina xwe ji serî hetanî binî, bi hurgilî jê re got. Tebîeta teyrikî ya jina wî çawa ew xist xefikê, pê re zewicî û ew bir Bexdayê, li wir hişt heta ku du zarok jê re çebûn, çawa kirasê xwe yê perikî dîsa bi dest xist û herdu zarokên wî bir û çû. Hemû jê re li ber çavan raxistin, bêyî ku tiştekî jê veşêre.

Gava pîrê çîroka wî bi hûrgilî guhdar kir, serê xwe hejand û got: Subhan ji Xwedê re, ku tu bi saxî û selametî gihandî vir û tu anî cem min! Lewre ku tu li yeke din rast bihatayî, felata te tune bû, tu yê bihatayî kuştin. Lê belê nêta te ya baş, bêrî û hezkirina te ya ji jina te re, ji zarokên te re, bi selametî tu anîyî hetanî vir. Jixwe ku hezkirina te jê re ew qasî ne pir bûya, te xwe ji bo wê nedavêt nav vî agirî. Şikir ji Xwedê re, ku tu bi saxî û selametî hetanî vir hatî û êdî em jî mecbûr in, alîkarîya te bikin û te bigihînin daxwaza te. Lê belê kurê min, jina te ji giravên Weqwaqê li girava heftan e û mesafeya di neqeba me û wan de meşa salekê sax e, ji bo siwarên xurt û jêhatî di meşê de. Lewre em ê ji vir herin hetanî qiraxa çemekî, piştre em ê çiyayekî bi navê Waq derbas bikin. Dûre em ê erdê çûkan derbas bikin, ku ji ber wîtewîta wan, dê dengê me jî neçe hev; tew pirtepirta baskên wan, dê me ker bike, bi dengê xwe. Îcar ev navê “Waq” jî, ji darekê tê, ku şaxên wê weke serê însanan in. Gava ku roj derdikeve û şewqa xwe dide ser wan serîyan, hemû bi hev re diqîrin, di bêjin: “Waq, waq, waq! Subhan ji xuliqkarê xuliqkar re!”

Çawa ku ew dengê wan tê, mirov dizane, ku roj derketiye. Gava roj diçe ava jî wisa ye. Ne tu kes ji me dikare here wir û ne jî tu kes ji wan dikare were li ser vê erda me bijî. Di neqeba me û şahbanûya ku serwerîya wê axê dike de meşa mehekê sax haye, hemû jî erda bejî. Xelkên ku li wir dijîn hemû di bin destê wê şahbanûyê de ne. Hemû êl û eşîrên cin û şeytan û sihîrbaz û îblîsan jî di bin emrê wê de ne. Vêca heger tu ji wan bitirsî û tu

bixwazî biryara xwe ya çûnê biguherînî, ez dikarim hinekan bi te re bişînim, ji bo ku te bigihînin peravê, li keştîyekê siwar bikin û te bişînin welatê te. Lê na, heger tu dixwazî bi me re bimînî jî, ser seran, ser çavan bimîne, heta ku bi izna Xwedê tu bigihîjî armanca xwe, zarokên xwe bibînî! Hesen got: Ez bimirim jî ez naçim, hetanî ku ez jina xwe nebînim.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 916'AN

*Şehrezadê got*:

Gava Hesen biryardarîya xwe bi wî hawayî dubare kir, pîrejinê jê re got: Ev daxwaza te hêsan e, dilê xwe xweş bike, bi izna Xwedê tu yê bigihîjî jina xwe jî, zarokên xwe jî. Lê helbet divê ez şahbanûyê ji rewşa te agahdar bikim, ji bo ku alîkarîya te bike û te bigihîne meqseda te! Hesen pir dilxweş bû, destên wê ramûsan, dua jê re kirin û pir spasîya wê kir, li ser wê canêrîya wê. Pê re meşîya û ket nava fikir û ramanan û li ser pêşeroja xwe kûr bû.

Pîrê fermana meşê da û ji leşkeran xwest, ku li daholê bidin. Hesen jî li kêleka pîrê meşîya, herdu jî diponijîn û ketibûn nava deryaya fikir û ramanan. Lê Hesen teng dibû, sebra wî nedima û hêrs dibû. Pîrê jî herdem ew haş dikir, li ber wî digerîya, ber dilê wî xweş dikir û hewl dida, ku bêhna wî berde. Lê Hesen mîna serxweşan bû, şiyar nedibû û nizanibû çi li pêşîya wî ye. Di nava zor û zehmetîyeke mezin de, meşa xwe berdewam kirin, hetanî ku gihîştinn giravekê, ji giravên Weqwaqê, ku navê wê girava Çûkan bû.

Gava ketin nav axa wê giravê, çawa ku dinya li ser serê Hesen sero bino bûbe, ji ber dijwarîya dengên çûkan û perînîya baskên wan. Serêşeke ecêb pê girt, hişê wî bir; çavên wî kor bûn, guhên wî kerr bûn û pir tirsîya, ku mirina wî nêzik bûbe! Di dilê xwe de got: "Heger axa çivîkan û teyran wi sa be, wê axa wehşan û dirindeyan çawa be?"

Gava pîrê dît ku rewşa Hesen xerab e, jê re got: Kurê min, heger di girava yekê de halê te ev be, gelo di giravên dîtir de wê çawa be? Hesen xwe avêt Xwedê û hêz û qawet jê xwest, da ku bikaribe meşa xwe berdewam bike û xwe bigihîne meqseda xwe.

Meşa xwe berdewam kirin, axa çûk û teyran derbas kirin û ketin axa cinan. Gava derbasî wir bûn, Hesen pir tirsîya û li hatinê poşman bû. Dîsa xwe avêt Xwedayê xwe, lave jê kirin, ku têra wî hêz û qawet û bawerîyê bide

wî. Meşa xwe bi wan re berdewam kir, hetanî ku axa cinan derbas kirin û gihîştin perava çemekî. Li binîya çiyayekî pir bilind, li kêleka wî çemî konên xwe vegirtin û navber dan meşa xwe. Pîrê ji Hesen re li rex avê dikeke ji mermerê bi durr û cewheran, bi zêr û zîvan neqişandî saz kir. Hesen jî li ser rûnişt, refên leşkeran jî hemû bi pergalî, di nava merasîmeke biheybet de di ber wî re derbas bûn. Piştre leşkeran jî konê xwe vegirtin. Îstîrehet kirin, xwarin, vexwarin û bi dilekî aram raketin, ji ber ku êdî gihîştibûn welatê xwe. Hesen jî rûpoşek li serê xwe gerandibû, bi awayekî ku ji çavên wî pê ve tiştek ji rûyê wî xuya nedikir.

Di wê navberê de qefleyek keçik ber bi çem ve hat. Li ber avê sekinîn, kincên xwe ji xwe kirin. Hesen bala xwe da wan, ku hemû rûheyv in, porên wan jî mîna şevê reş in û navranên wan cur bi cur in; tenik, nepixî, lêvqalind, lêvtenik, pehnik, kumik û cur in cuda pir spehî. Hemû bi wê spenîbûna xwe ya bêtimtêl ketin avê, têra xwe lîstin û piştre her yek ji wan, mîna heyva ku ji nava tarîya şevê derkeve, ji nav çem derketin, bi wê tazîbûna xwe ya şewqdar.

Ev dîmen hemû plangerîya pîrê bû. Hesen li ser dika mermerî dabû rûniştandin û ferman dabû hemû leşkeran, ku qefle bi qefle werin, xwe tazî bikin û bikevin çem, xwe bişon, da ku Hesen wan bibîne û heger jina wî di nava wan de be, wê nas bike. Her ku qefleyek diçû û yeke din dihat, pîrê jê dipirsî, ka jina wî di naw wan de ye an na, wî jî digot: Na!

Herî dawîyê jineke din hat, ku sî keçên bekar di xizmeta wê de bûn. Hemûyan kincên xwe ji xwe kirin û ketin avê. Xatûna wan xwe li ser serê wan delalî dikir, henek bi gişan dikir, ew binav dikirin û bi wan dilîst.

Saetek bi şûn de, ji nav avê derketin û xatûn li cihekî rûnişt. Keçên ciwan jî pêşgir û destmalkên hevrîşmî dan destê wê, wê jî bi wan destmalan xwe zuha kir. Piştre xeml û xêz û kincên wê yên ku berhemên cinan bûn, pêşkêşî wê kirin. Wê jî rahişt kincan û ew li xwe kirin. Di pey re jî rabû ser xwe û li gel qerwaşên xwe di nava leşkeran de gerîya. Gava Hesen çav lê ket, kelecanekê ew girt û dilê wî lêda, lewre pir dişibîya jina wî.

Pîrejinê jê re got: Hesen, ev jina te ye? Hesen got: Na, xatûna min, bi serê te ev ne jina min e lê pir dişibe wê teyrika ku min ew li ser banê qesra xwîşkên xwe dît. Ev jî weke wê pir delalîyan li ser qerwaşên xwe dike! Pîrê got: Nexwe kanî ji min re wesfê wê bide? Hesen got: Jina min rûspehî û qamet elîf e, singbilind û hinarikên wê balkêş in; çavxezal, diranspî, ziman-

şîrîn, bejinzirav, çîmqelew û mîna şaxekî darê ye. Lêvsor, çavşîn û li ser rûçikê wê yê rastê şanek heye; şanek jî li ser zikê wê û yeke din di binîya navika wê de heye. Weke heyvê rûbinûr e, girover e, newqzirav û kulîmek giran e û girêza wê jî derman e, mîna ava bihuştê ye.

Pîrê got: Baş pesnê wê bide û bi hurgilî wê ji min re tarîf bike?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 917'AN

*Şehrezadê got*:

Gava ku pîrê ew daxwaz jê kir, Hesen got: Husn û cemala jina min piralî ye; rûgeş, çavbikil û qirikqaz e, hinarkên wê weke gulan, devê wê weke eqîqa hunglîska Suleyman Bin Dawid û diranên wê spî, mîna hebên birincê ne. Bedena wê ew qasî lihevhatî ye, ku ziman bêçare dimîne li hemberî wesifdana wê. Navrana wê xwedî hurmet e, weke textê xîlafetê… Hesen ji nişka ve kelogirî bû û avêt ser jina xwe, straneke bi şewat li ser got.

Dema ku Hesen hestiyar bû û girîya, pîrê serê xwe bera ber xwe da û bi qasî saetekê ponijî, di pey re serê xwe rakir, li Hesen nêrî û jê re got: Subhan ji wî Xwedayî re ku karê wî qet nayê fêmkirin! Belaya te tûşî min jî bû, Hesen! Xwezîka min tu nas nekiribûya, lewre ew jina ku te wesfê wê da, hat bîra min û min ew nas kir! Ew keça şahê mezin e; yê ku serwerîya hemû giravên Weqwaqê dike. De êdî çavên xwe baş veke û tevdîra xwe bigire! Heger tu hîna razayî bî, bi ser xwe ve were û hişê xwe bîne serê xwe, lewre tu qet nikarî xwe bigihînî wê. Heger tu xwe bigihînî wê jî, tu nikarî wê bi dest bixî, ji ber ku ferqa di neqeba te û wê de, bi qasî ferqa erd û asîman e. Êdî hîna ku veger gengaz e, bi şûn de vegere kurê. Min û xwe navêje nava agir. Min jî bi xwe re neşewitîne. Ez texmîn dikim, ku tu şensê te tê de tune ye. Êdî vegere mala xwe, nav dost û hogirên xwe û bila ruhê te bi avê de neçe. Diyar bû, ku pîrê li ser xwe jî, li ser wî jî tirsîyabû.

Gava Hesen ew gotinên pîrê bihîstin, gelekî girîya û li xwe da, hetanî ku ji ser hişê xwe çû. Pîrê av li ser rûyê wî reşand, hetanî ku dîsa bi ser xwe ve hat. Çawa bi ser xwe ve hat, dîsa dest bi girîn û nalînê kir. Bi wê gotina pîrê pir êşîyabû û pir jî bêhêvî bûbû. Ji pîrê re got: Keybanû û xatûna min, ez ê çawa bi şûn de vegerim, piştî min xwe gihand hetanî vir û ez bawer im, ku tu dikarî daxwaza min pêk bînî, lewre tu serkêşa leşkeran î û hemû gotin û fermanên te guhdar dikin!

Pîre got: Kurê min, tu çima ji xwe re keçekê ji van keçên xweşik naneqînî, ez ê wê bidim te, li şûna jina te, çêtir e ku tu bikevî destê şah û qralan û bobelat bên serê te! Tu bi Xwedê kî, gotina min guhdar bike û keçekê ji vana bineqîne û bi saxî û selametî vegere welatê xwe û êşa mirina xwe bi min nede jîyîn! Welehî te xwe avêtiye nava agirekî mezin û pir xeternak, ku tu kes nikare jê rizgar bibe.

Hesen dîsa serê xwe xist ber xwe û kûrekûr pe ket, girîya.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 918'AN

*Şehrezadê got*:

Piştî girîn û nalîneke dijwar, Hesen careke din ji ser hişê xwe çû. Pîrê dîsa av li ser rûyê wî kir, heta ku careke din bi ser xwe ve hat. Gava bi ser xwe ve hat, pîrê jê re got: Mîrzayê min vegere welatê xwe çêtir e ji te re, bawer bike ez çawa te bibim wir, tu yê werî kuştin. Jixwe çawa keybanûya wir pê bihese ku min tu derbasî welatê wan kiriye -ku hetanî roja îro yek insan derbasî wir nebûye- dê loman li min bike û min bikuje û bêje, çawa te insanek bi xwe re anîye û ev keçên bekar giş nîşanî wî dane, ku destên mêran bi wan nebûye û awirên kesî bi wan neketiye!

Hesen jê re sond xwar, ku bi çavekî xerab li wan nenihêrtiye. Pîrê got: Kurê min, tu vegere welatê xwe û ez ê têra te zêr û zîv û zexîre û gewher û diyarîyên giranbuha bidim te, ku dê wê keçikê bi te bide jibîrkirin. Vêca vê şîreta min bixe serê xwe û ne hewce ye, ku tu herî mirinê!

Hesen dîsa girîya û rûyê xwe di nigên wê da, tika jê kir û got: Xatûna min, ronîya çavê min, ez ê çawa bi şûn de vegerim, piştî ku min xwe gihand hetanî vê derê û hîna ez negihîştme meqseda xwe? Bi taybetî jî piştî ku ew qasî nêzî mala dildara xwe bûme û hevdîtina me ji berê gengaztir bûye? Belkî ez karibim xwe bigihînim wê. Piştre bi helbestî got:

ey keybanûyên spehîbûnê, dilovan bin bi dîlan re
dilovan bin bi dildar û bi wan çavên bêxew re
bi bêhna xwe we misk û ember derbas kiriye
we hemû xweşikbûna gulan li pey xwe hiştiye
sira bayê bihuştê herdem ji cem we tête
ciwanîya destpêkê herdem ji cem we tête

bo Xwedê berdin şîretan û destekê bidine min
nehatime şîretan guhdar bikim binêre li çavê min
dilgirtiyê çavên wê me ez nexweşîya min her ew e
bi kotekî ez kişandime evînê beleya serê min e ew

Gava Hesen ew helbesta xwe qedand û hêsirên çavên wî mîna baranê hatin xwarê, dilê pîrê pê şewitî. Bi dilovanî nêzî wî bû, ber dilê wî girt û jê re got: Aram be û bêhna xwe teng neke, bi navê Xwedê ez ê ruhê xwe bavêjim talûkeyê, ya ez ê te bigihînim meqseda te yan jî ez ê werim kuştin. De êdî dilê xwe xweş bike!

Hesen li kêleka pîrê rûnişt û hetanî êvarê pê re axivî. Gava şev ket erdê, hemû keçik ji hev belav bûn. Hinek çûn qesrên xwe yên li bajêr. Hinek di çadiran, di konan de raketin û hinek jî çûn malên xwe. Pîrê jî Hesen bi xwe re bir bajêr û ew bi tena serê wî di cîyekî de girt, da ku kes wî nebîne û agahî neçe ji keybanûyê re, ew jî neyê wî nekuje û yên ew anîne wir jî ceza neke.

Pîre, him xizmet ji Hesen re dikir, him jî ew bi zilm û ceberûtharîya bavê jina wî, şahê gewre dida tirsandin. Hesen jî, xwe davêt bextê wê, digirîya û jê re digot: Xatûna min, ger ez jin û zarokên xwe nebînim, ez ê mirinê ji xwe re helbijêrim! Ya ez ê xwe bigihînim wê û yan jî ez ê di vê rêyê de bimrim.

Pîrê mecbûr ma, ku micid li ser mijarê raweste û çareyekê bibîne, ji bo ku wî bigihîne jina wî. Lewre hemû hewldanên wê vala derketibûn û nikaribû wî bi şûn de vegerîne mala wî. Belengazo evîndar û aşiq bû û çawa ku bapîr jî dibêjin; mirovê aşiq gotina dostê xwe jî guhdar nake. Îcar wê rêyeke çawa bidîta gelo? Lewre keçik bi xwe, keça şahê gewre ya mezin bû û di heman demê de keybanûya wê girava hanê bi xwe bû, ew a ku Hesen û pîrê lê bûn. Her heft xwîşkên wê yên bekar jî, li cem bavê wê bûn. Navê wê keçikê Şewqa Rastîyê bû. Ew bajarê ku keybanûtîya wî dikir jî, bajarê herî mezin bû di nava her heft giravên Weqwaqê de ku şahê mezin, bavê keçikê ew bi rê ve dibir û li heman bajarî jî rûdinişt.

Piştî ponijîneke kûr û dirêj, pîrê rabû ser xwe û berê xwe da qesra Şewqa Rartîyê. Gîhîşt wir, derbasî cem keybanûyê bû û erda ber nigê wê maçî kir.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 919’AN

*Şehrezadê got*:

Keda pîrê li ser keybanûyê gelek hebû, ji ber ku wê bi xwe ew û xwîşkên wê xwedî kiribûn. Loma gotina wê li ser gişan derbasdar bû. Vêca gava derbasî cem Şewqa Rastîyê bû û erda ber nigê wê maçî kir. Keybanû pê ve rabû, ew himbêz kir, ew li kêleka xwe da rûniştandin û der barê rêwîtîya wê de pirs jê kirin?

Pîrê got: Xatinû min, rêwîtîya min a vê carê pîroz û bimbarek derket. Min bi xwe re diyarîyek ji te re anîye, ez bawer im, tu yê wê biecibînî… Hilmek kişand û axaftina xwe berdewam kir, got: Min tiştekî ecêb bi xwe re anîye. Ez dixwazim wî nîşanî te jî bidim. Belkî tu alîkarîya wî bikî, ji bo ku bigihîje armanca xwe.

Şewqa Rastîyê got: Ew kî ye? Pîrê, di nava tirseke kujer de, ku bedena wê weke tayê genim li ber bayê wê dilerizî û nema dikarîbû xwe li ser nigan bigire de çîroka Hesen jê re got. Di nav lepên wê de ket erdê û jê re got: Xatûna min, gava em gihîştin peravê, kesekî xwe di bin holika min de veşartibû. Xwe avêt bextê min, min jî bext dayê û di nava leşkerên keç de, bi awayekî ku kes wî nas neke, ew bi xwe re anî. Lewre ew jî mîna wan çekdar bû û heman kinc li xwe kiribûn. Piştre jî min ew derbasî bajêr kir. A rast min ew bi mezinbûn û hêzdarîya te pir da tirsandin lê çiqasî min bida tirsandin ji bo ku vegere, ew digirîya, helbest digotin û digot, ez jina xwe nebînim, ez bi şûn de naçim. An ez ê wê û zarokên xwe bibînim an jî ez ê di rêya wan de werim kuştin. Yanî xortekî pir çavsor e, canê xwe avêt nav agir û hat giravên Weqwaqê. Di seranserê vî temenê xwe yê dirêj de, min tu kes mîna wî dilpola û biryardar nedîtiye. Bi temamî xwe daye eşqa xwe…

Gava ku keybanûyê ev gotin ji pîrê bihîstin, têgihîşt ku çîroka Hesen e. Gelekî hêrs bû, bi qasî saetekê serê xwe bera ber xwe da. Piştre li pîrê nêrî û jê re got: Ey pîrejina bêoxir û beyom! Qey xerabîya te gihîşt wê radeyê, ku tu rahêjî mêran û wan bi xwe re bînî giravên Weqwaqê? Piştre jî tu wan derbasî cem min dikî, bêyî ku tu ji min bitirsî? De binêre, bi serê şahê gewre, heger heqê te li ser min tune bûya û te ez mezin nekeribûma, min ê tu û ew herdu jî bi awayekî ecêb bikuştina, da ku tu bibûya îbret ji hemû gunehkaran re. Da ku tu kesî/a din, mîna te karekî wisa xerab nekira. Lê zû rabe û here wî bîne vir!

Pîrê, şaşwaz û qidûmşikestî ji cem wê derket, bêyî ku bizanibe bi ku ve diçe. Bi rê de jî bê navber ji xwe re digot: Xwedê teala ev bobelata hanê giş di rêya Hesen re ji min re şand û dê li ser destê keybanûyê pêk bîne!

Pîrê bêhnçikiyayî ket cem Hesen û jê re got: Ey belengazê ku dawîya temenê wî hatiye, rabe here bi keybanûyê re biaxive!

Hesen rabû ser xwe û da dû pîrê, meşîya. Lê navê Xwedê ji ser zimanê wî nediket û bê navber dua dikirin, digot: Ya Rebî tu min xelas bikî û tu rêyeke çareserîyê bidî pêşîya min! Ya Rebî, tu min ji qeda û beleyan bistirînî! Ya Rebî min bide xatirê qencên xwe û li min were rehmê, min ji xetereyan biparêze û min bigihîne zarok û îyalên min!

Pîrê, Hesen bir ber destê Şewqa Rastîyê. Bi rê de jî, ji bîr nekir, ku şîretan lê bike, bê wê çawa û çilo pê re bipeyive. Gava Hesen derbasî cem wê bû, dît ku rûpoşkirî ye. Erda bin nigên wê maçî kir, silavek dayê û got:

Xwedê şanazîya te berdewam bike bi bextewarî
her tiştê di dilê te de pêk bîne bi şehsiwarî
Xwedê hêz û qudreta te her zêdetir bike
destê te li hember dijminan xurtir bike

Gava Hesen helbesta xwe qedand, keybanûyê îşaret da pîrê, ji bo ku li ber wî biaxive û dengê wî bike. Pîrê bi pêş de çû û ji Hesen re got: Keybanû silava te digire û ji te re dibêje, navê te çi ye, tu ji kîjan welatî hatiyî, navê jina te û zarokên te çi ne?

Bi van pirsan, hinek aramî ket nava Hesen û tirsa ser wî çû. Bi hêdîka got: Ey keybanûya dem û dewranan û yekane dadkar û dadwera van zemanan! Navê min Hesenê pir xemgîn e, ez ji Besrayê me û ji Bexdayê hatime. Ez navê jina xwe nizanim lê navên du kurên min Nasir û Mensûr in.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 920'Î

*Şehrezadê got*:

Gava keybanûyê ew gotin ji devê Hesen bihîstin, jê pirsî: Jina te zarokên xwe ji ku revandin, birin? Hesen got: Ew ji Bexdayê revandin, birin, keybanûya gewre. Ji hundirê qesra xelîfe Harûnê Reşîd ew revandin. Keybanûyê got: Gava ku ji cem we firîya, çû, tiştek ji we re got an na?

Hesen got: Ji diya min re gotibû, heger kurê te hat û pir bêrîya min kir, xwest ku min bibîne, bila were giravên Weqwaqê. Keybanû Şewqa Rastîyê, serê xwe hejand û got: Heger wê jî tu nexwestayî, ew peyam nedida diya te û cihê xwe ji te re eşkere nedikir û tu venedixwendî welatê xwe!

Hesen got: Xatûna hemû şah û qral û hemû desthilatdaran! Min serpêhatîya xwe, çawa ku qewimîye ji te re anî ziman û tiştek ji te veneşart. Îcar ez dexîlê te û Xwedê me, tu yê li min werî rehmê û tu yê zilmê li min nekî. Bila ev jî xêra te û bavê te be. Alîkarîyê bi min re bike û min bigihîne jin û zarokên min, bila hêsrên min bimiçiqin, dilê min jî şa bibe û ken dîsa vegere ser lêvên min.

Şewqa Rastîyê, serê xwe bera ber xwe da, hejand û ponijî, piştre dîsa rakir û jê re got: Dilê min bi te şewitî û min biryar da, ku ez li te werim rehmê û alîkarîya te bikim. Ez ê hemû keç û jinên vê girava xwe derxînim raberî te, li wan binêre. Heger tu wê nas bikî, ez ê wê radestî te bikim û heger te ew nas nekir jî, ez ê te bikujim û li devê derîyê vê pîrê te li çarmixê bidim! Hesen jî got: Ez şertê te qebûl dikim, ey keybanûya dem û dewranan!

Wê gavê Şewqa Rastîyê fermanek da, ku hemû keçên di wê giravê de werin û yeko yeko di ber wî re derbas bibin û ev peywira hanê da pîra Şewahî bi xwe. Jê re got: Here dakeve bajêr û hemû keçan bîne vir! Şewahî bi lez rabû, daket nava bajêr û keçên wê giravê hemû derxistin qesrê. Sed sed ew di ber çavên Hesen re derbas kirin. Lê Hesen jina xwe di nava wan de nedît.

Şewqa Rastîyê jê pirsî û got: Te jina xwe di nav wan de dît? Hesen lê vegerand û got: Na bi Xwedê min ew di nav wan de nedît, şahbûnaya gewre!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 921'AN

*Şehrezadê got*:

Gava Hesen got, min jina xwe di nav wan de nedîtiye, keybanû pir hêrs bû û ji pîra Şewahî re got: Kanî rabe, here çiqas keçên di nava qesra min de jî hene, wan bîne, nîşanî wî bide!

Şewahî rabû, çû, hemû keçên ku di qesrê de bûn, anîn nîşanî wî dan. Lê Hesen jina xwe di nava wan de jî nedît. Keybanû vê carê hîn hêrstir bû, qîrîya û gazî yên derdora xwe kir, got: Wî bigirin bibin, serdevkî bi erdê re

kaş bikin, bixijiqînin û şûrekî li stûyê wî bidin, da ku kesekî din ehmeqîyeke wisa neke, xwe navêjê nav agir û neyê welatê me, pê li axa me neke û razên me eşkere neke.

Celadên wê di cî de Hesen girtin, ew serdevkî kaş kirin, çavên wî girêdan, ew serqûnkî kirin, kirasê wî hildan, bi teşkên wî girtin û man li hêvîya fermana dawîn, ji bo ku şûr li stûyê wî bidin. Wê gavê Şewahî ber bi keybanûyê ve çû, erda ber nigên wê maçî kir, rahişt guhikê kirasê wê, danî ser serê xwe û jê re got: Keybanûya zemanan, tu bi heqê Xwedê û heqê dayiktîya ku min ji te re kiriye, tu eceleyê lê nekî. Lewre ev belengaz xerîb e û mirina xwe daye ber çavên xwe, heta ku gihîştye vir. Di rê de pir zor û zehmetî jî kişandine. Di encamê de jî hatiye welatê me û xwe avêtiye bextê te, ketiye bin berpirsîyarîya te. Vêca heger tu wî bikujî, dê xebera kuştina wî li nav xelkê belav bibe û wê mirov bêjin, keybanû ji xerîban aciz e, wan dikuje. Jixwe ew jî timî li ber destê te ye, şûrê te timî li ser stûyê wî ye. Kengî be tu dikarî wî bikujî. Heger di dema pêş de jî jina xwe nedît û derket holê ku jina wî ne li vir e. Min bi xwe jî, ji ber heqê dayiktîya min a li ser te, min li te mûm kiribû û li şûna te bext dabû wî. Min jê re gotibû, wê keybanûya me daxwaza te pêk bîne û te bigihîne zarokên te. Lewre min baş dizanibû, bê tu çiqasî dadwer û dadhez î, çiqasî dilsoz û dilbirehm î. Heger ne ji vê yekê bûya, min ew derbasî welatê me nedikir. Hîna ji serî de min ji xwe re got: "Wê Şahbanûya me ji xwe re lê temaşe bike û helbest û axaftinên wî yên xweş guhdar bike, ku her helbesteke wî, her risteke wî, mîna cewherekê ye. Vêca madem ket welatê me û nanê me xwar, divê em jî qedr û qîmetê bidin wî.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 922'YAN

*Şehrezadê ji şahînşahê gewre Şehreyar re got:*

Pîra Şewahî bi zimanekî şîrîn li ber keybanûyê gerîya, dirêj dirêj axivî û di dawîyê de jî got: Keybanûya min, tu jî dizanî, ku fîraq pir zor e û ji mirinê jî dijwartir e. Bi taybetî jî fîraqa bav û zarokan. Îcar kes di nava me de nema, ku me xwe nîşanî wî neda, tu tenê mayî, ka tu jî rûyê xwe nîşanî wî bide?

Şewqa Rastîyê kenîya û got: Ew kî ye, ku bibe mêrê min û zarokan ji min çêbike? Lê dîsa ez ê vê daxwaza te pêk bînim. Herin wî bînin vê derê, bila li rûyê min jî binêre!

Pîrê çû Hesen anî, derbasî dîwana wê kir. Keybanûyê jî rûpoşa xwe derxist û rûyê xwe nîşanî wî da, çawa ku Hesen çav lê ket, qîrek da û got rep li erdê ket, ji ser hişê xwe çû. Pîrê pê re mijûl bû, av li ser çavên wî kir, hetanî ku dîsa bi ser xwe ve hat. Çawa ku bi ser xwe ve hat, bi helbestî got:

surra bayekî lêda ji erda Îraqê bi vir de hat
li goşeyekî Weqwaqê vederda rastî min hat
agahê bidin dostan bêjin va Hesen miriye
ji ber bayê evînê ji ber pêla eşqê çûye
ey xelkê evînê dilovan bin dilbirehm bin
dilê min helîyaye ji fîraqê hayedar bin

Piştî ku ev risteyên xwe qedandin, rabû ser xwe, careke din li keybanûyê nêrî û qîreke wisa ecêb da, ku hindik mabû qesr bi ser wan de bihata xwarê, ji ber hewla wî. Bi wê qîrê re jî dîsa got rep û li erdê ket, careke din ji ser hişê xwe çû. Pîra Şewahî pê ve mijûl bû, av li rûyê wî kir, heta ku dîsa bir ser hişê xwe ve hat. Pîrê jê pirsî, Hesen got: Ev keybanûya hanê ya jina min e ya keseke pir nêzî wê ye, ku ev qasî dişibe wê!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 923'YAN

*Şehrezadê got*:

Keybanû bi ser Şewahîyê de çû û jê re got: Baldar be pîrê, ev xerîbê hanê mîna dînan ziq li nav çavên min dinêre! Pîrê got: Li qisûra wî nenêre, keybanûya dem û dewranan, mehne û hincetên wî hene. Lewre derman ji nexweşê eşqê re tune ye û ew û dîn jî her yek in.

Kûrekûr bi Hesen ket, girîya û got:

gava şopa wê dibînim ez dihelim
li pey wê bê navber hêsiran dirijînim
bi pirs û pirsîyar im gelo ew çawa ye
wê vegere li min gelo ew ne xuya ye

Piştre Hesen ji keybanûyê re got: Bi Xwedê şahbanûya min, tu ne jina min î lê ya ku zêde dişibe wê, tu yî!

Şewqa Rastîyê pê kenîya û hîrehîr pê ket, hetanî ku zikopişto bû. Xwe

da ser kêlekê û ji Hesen re got: Delalê min, guhdêr be û bersiva min bide. Dînîtî, şaşwazî û behetîbûna xwe deyne alîyekî, hişê xwe bîne serê xwe û bersivên rast bide, wê derîyê ferecê li te vebibin!

Hesen got: Ey mîrzaya hemû şah û keybanû û serhildêran! Dînbûna min, ji ber dîtina te bû; çi pirsên te hebin, tu dikarî ji min bipirsî?

Keybanûyê got: Jina te ji kîjan hêlan ve dişibe min? Hesen got: Ji hemû hêlan ve û bi hemû spehîyên di te de, dişibe te; qam û bejna te, zimanşîrînîya te, sorhinarkên te, sing û berên te, her tiştê te dişibe wê.

Keybanû li pîra Şewahî ziviri û jê re got: Dayêcan, vî xortî bibe cem xwe, wî li cem xwe ragire û lê miqate be...

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 924'AN

*Şehrezadê got*:

Keybanûyê ji Şewahîyê re got, Hesen li ba xwe bigire û tu bi xwe xizmeta wî bike, hetanî ku ez mijarê zelal bikim, bê ka ev mirov xwedî mirwet e yan na, qîmeta dostanî û hezkirinê dizane yan na? Heger wisa be, divê em alîkarîya wî bikin û wî bigihînin jina wî. Lewre ne nan xwarîye û ne av vexwariye û zehmetîyeke pir mezin kişandiye, heta ku hatiye vir. Em jî bûne berpirsîyarên wî, loma gava te ew bir mala xwe, tembîya wî li xizmetkaran bike û di cî de vegere, were vir! Înşelah wê her tişt bi xêr û xweşî here serî!

Pîrê, Hesen bir, ji qesrê derket, çû mala xwe. Hesen li malê danî. Tembîya wî li xulam û qerwaşan kir, ji wan re got: Hemû pêdivîyên wî pêk bînin û bi lez li keybanûyê vegerîya. Keybanûyê ferman dayê û jê re got: Çekên şer li xwe bike, hezar fêrisên jêhatî bigire gel xwe û were. Pîrê, çû hezar siwar anîn û hat.

Gava pîrê hat hizûra keybanûyê û jê re got, va ye min hezar siwar amade kirine, keybanûyê jê re got: Here warê bavê min, cem xwîşka min Şewqa Birûskê û jê re bibêje, bila herdu cewşenên ku te çêkiribûn, li wan bike û wan bişîne cem min. Min bêrîya wan kiriye. Pir baldar be, devê xwe asê bigire û vê mijarê bi kesî re parve neke. Îcar gava te herdu kurik jê girtin, ji Şewqa Birûskê re bibêje, xwîşka te bêrîya te kiriye, dixwaze ku tu jî werî serdana wê. Lê bila ew eceleyê li xwe neke, bi bêhna fireh were. Tu jî hewl bide, di rêyeke din re were, ne rêya ku ew tê re bê. Şev û roj bimeşe û qet

navberê nede meşa xwe. Dereng nekeve û bila kes jî te nebîne. De kanî here wan herdu zarokan bîne, piştre em ê bibînin. Ez bi hemû pîrozîyan sond dixwim, heger xwîşka min jina wî be û herdu zarokên wê jî ji wî bin, ez qet pêşîya wan nagirim, bila ew û zarokên xwe pê re herin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 925'AN

*Şehrezadê got*:

Keybanûyê li ser hemû pîrozîyên xwe sond xwar, ku alîkarîya Hesen bike, bo ku jin û herdu zarokên xwe bibe welatê xwe. Pîra Şewahî jê bawer kir, bêyî ku bizanibe çi di dilê wê de ye. Keybanûyê ji pîrê re got: Dayê-can heger ez ne şaş bim, xwîşka min Şewqa Birûskê jina vî xortî ye, lewre wesfên ku wî didan, hemû yên xwîşka min bûn. A rast ew wesif li her heft xwîşkên min tên lê herî zêdetir jî li Şewqa Birûskê tên!

Pîra Şewahî rabû ser xwe, destê keybanûyê ramûsa û vegerîya cem Hesen. Tiştê ku keybanûyê jê re gotibû, ji wî re ragihand. Hesen pir kêfxweş bû, hindik mabû, ku ji kêfan hişê xwe bixwe. Bi pîrê ve rabû, serê wê maçî kir. Pîrê jê re got: Kurê min, devê min maçî bike, bila şîranîya mizgînîya vê xebera xweş be, ne serê min. Lewre ez dibim pira ku we digihîne hev. De êdî dilê xwe xweş bike û bila kêfa te li cî be! Piştre pîrê ji cem wî derket, çû, rahişt şûr û mertalê xwe, hezar siwarên xwe dan pey xwe û berê xwe da girava ku Şewqa Birûskê lê bû.

Di navbera girava Şewqa Rastîyê û girava Şewqa Birûskê de meşa sê rojan hebû. Pîra Şewahî û siwarên xwe, piştî meşa sê rojan, xwe gihandin wir. Çû qesra Şewqa Birûskê, derket hizûra wê, silav lê kir û silavên xwîşka wê Şewqa Rastîyê jî lê kirin û got: Xwîşka te lomeyan li te dike, dibêje, çima serdana min nake, min pir bêrîya wê û herdu kurên wê kiriye.

Şewqa Birûskê got: Rastîya Xwedê xwîşka min mafdar e û ez di çûna cem wê de bêxîretîyê dikim. Lê ez ê niha herim serdana wê! Di cî de ferman da xulam û qerwaşan, got: Kon û çadiran li derveyî bajêr vegirin! Piştre rabû ser xwe, diyarîyên xweşik û giranbuha ji xwîşka xwe re amade kirin. Di wê navberê de, bavê wê jî di şibakê re nêrî û dît ku konin li derveyî bajêr vegirtî ne. Li wan pirsî, jê re got: Keybanû Şewqa Birûskê konên xwe di wê rêyê de vegirtine, ji ber ku nêt kiriye, here serdana xwîşka xwe Şewqa Rastîyê!

Gava şah ew xeber bihîst, hezar leşker ji keça xwe re amade kir, ji bo ku wê bibin cem xwîşka wê.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 926'AN

*Şehrezadê got*:

Şahê bavê wan jî hezar leşker şand, ji bo ku keça wî bigihînin cem xwîşka wê. Pê re jî têra wan xwarin û vexwarin û diyarîyên zêr û zîv û gewher, ku xweşikbûna wan nedihat wesifdan. Heft keçên wî şahî hebûn. Şeş jê ji dayikekê bûn, yek jî ji dayikeke din bû û ew jî Şewqa Birûskê bû. Şah jî herî zêde ji wê keça xwe hez dikir. Her şeş keçên wî yên din jî Şewqa Rastîyê, Stêrka Sibehê, Rojîn, Dara Morîkan, Qûta Dilan û Şanazîya Keçan bûn.

Em vegerin ser pîra Şewahî, ew jî çû cem Şewqa Birûskê, erda ber nigê wê maçî kir. Şewqa Biruskê jê re got: Xêr e dayêcan, çi daxwazîya te heye?

Pîrê got: Xwîşka te Şewqa Rastîyê ji te dixwaze, ku tu cewşenên herdu kurên xwe li wan bikî û tu wan bi min re bişînî, da ku berîya te ez wan bigîhînim wir, ji bo ku bibe mizginîya hatina te ji wan re!

Dema Şewqa Birûskê ew gotin ji pîra Şewahî bihîstin, serê xwe bera ber xwe da, li erdê nêrî û rengê wê çû! Pir ponijî, piştre serê xwe rakir û ji pîrê re got: Dayêcan, dilê min lerizî, niqrîsk ketinê gava te behsa herdu zarokên min kir. Lewre ji roja çêbûna wan de kesî rûyê wan nedîtiye, ne ji insan û ne jî ji cinan. Ez pir li ser wan ditirsim. Ji sira bayê jî.

Pîrê got: Ev çi gotin in xatûna min, qey tu ji xwîşka xwe ditirsî? Xwedê hişê te bîne serê te, qey tu dixwazî li hember gotina xwîşka xwe ya keybanû derkevî? Na tu nikarî li hemberî wê derkevî, lewre wê tehbeke mezin bi te re dîtiye. Lê tu jî mafdar î, zarokên te hûrik in û tu li ser wan ditirsî û hezkirina zêde dihêle ku mirov bi guman tevbigere. Lê belê keça min, tu jî min baş nas dikî û tu bi hezkirina min a ji bo we herduyan jî dizanî, lewre min hûn herdu jî mezin kirine. Zarokên xwe radestî min bike, ez ê wan bixim nava dilê xwe û wan mîna çavên xwe biparêzim. Qet hewce nake, ku tu tembîya wan jî li min bikî. Bila dilê te aram be û bêtirs wan bi min re bişîne, ez ê rojekê, duduyan li pêşîya te herim, jixwe tu jî li dû me têyî.

Pîrê hem pir li ber wê gerîya hem jî fişar li ser kirin. Şewqa Birûskê jî tirsîya, ku xwîşka wê jê bixeyide. Daxwaza pîrê erê kir, ku herdu kurên xwe

pê re bişîne. Gazî herduyan kir, ew birin hemamê, kinc û cewşenên wan li wan kirin û ew radestî pîra Şewahî kirin. Pirê jî mîna teyrikekê di rêyeke cuda re bi firê çû. Çawa Şewqa Rastîyê jê xwestibû, pîrê pir li ser herduyan ditirsîya û bi wê tirsê meşa xwe berdewam kir, hetanî ku hat bajarê Şewqa Rastîyê û çû herdu zarok radestî wê kirin.

Şewqa Rastîyê bi kêfxweşîyeke mezin herdu kurên xwîşka xwe hildan himbêza xwe û ew maçî kirin. Yek li ser çoga xwe ya rastê da rûniştandin û yê din jî li ser kaboka çepê. Piştre li pîrê zivirî û jê re got: Kanî îcar here gazî Hesen bike, bila bê, ji bo ku ez bext bidim wî û heqê wî jî bi şûrê xwe bidimê. Piştî ew qas rê û rêçên xeternak derbas kirin û hat li welatê me bi cih bû, bêyî ku mirinê bibîne!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 927'AN

*Şehrezadê got*:

Şahbanû Şewqa Rastîyê sond xwar û got: Bi wî Xwedayê şev û rojê, yê asîman bilind kiriye û erd rast kiriye, heger herdu kurik ne yên wî bin, ez ê wî bikujim û serê wî bi destê xwe jêbikim! Pê re jî bi dengekî ecêb bi ser pîrê de qirîya, got: Zû Hesen bîne vir! Pîrê ji tirsan qidêmên wê şikestin û li erdê ket. Keybanûyê bîst bende pê re şandin û ji wan re got: Bi vê pîrê re herin û zû wî xortê di mala wê de bînin vir!

Pîrê bi bendeyan re derket, çû. Lê derman di çogên wê de nemabû. Mehdê wê zer bûbû, hêz û taqet pê re nemabû. Çû malê, derbasî cem Hesen bû. Hesen pê ve rabû, destên wê maçî kirin û xêrhatin tê da. Lê pîrê bêyî ku silavê lê bike, got: Rabe, bi Keybanûyê re biaxive! Ji bo ku ev bobelat giş neyên serê te, min ji te re got vegere welatê xwe lê te bi ya min nekir! Min ji te re got, ez ê gelek tiştên pir binirx bidim te û bi saxî û selametî te bigihînim mala te, lê te gotina min guhdar nekir. Herdem te bi ya xwe kir û berê xwe da talûkeyê. De êdî rabe û here ser mirina xwe, va êdî mirina te nêzik bûye. Rabe here bi wê qehpikê re biaxive û binêre bê wê çi bi serê te bike!

Hesen, dil bi kovan û baskşikestî rabû ser xwe, di nava tirseke mezinde meşîya û xwe avêt bextê Xwedayê xwe, got: Ya Rebî tu min bisitirinî û xerabîyê dûrî min bixî! Piştî ku bi qedera xwe razî bû, bêhêvî da tengala wan bîst bendeyan û li dû pîrê çû.

Hesen derbasî cem keybanûyê kirin. Wê kêlîyê jî Nasir û Mensûr li ser çogên wê dilîstin. Çawa ku Hesen derbasî hundir bû û li wan nêrî, ew nas kirin. Dengekî bilind û ecêb derxist û ji kêfan got rep û li erdê ket! Hesen ew nas kirin, wan jî Hesen nas kirin û bi qudreta îlahî ji ser çogên xaltîka xwe daketin, çûn li cem Hesen sekinin û gazî wî kirin, gotin, "Bavo can!"

Li hemberî wê dîmenê pîrê û hemû kesên li wir pir hestiyar bûn û girîyan. Dilê wan bi wan şewitî, gişan bi hev re got: Şikir ji Xwedê re ku hûn gihandin hev!

Şahbanû Şewqa Rastîyê têgihîşt, ku herdu zarok ên Hesen in û xwîşka wê jî jina wî ye. Pir hêrs bû û hîn bêtir qehirî. Bi rûyê Hesen de qîrîya, hişt ku ew ji tirsan ji ser hişê xwe here û li erdê dirêj bibe.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 928'AN

*Şehrezadê got*:

Gava ku Hesen bi ser hişê xwe ve hat, bendeyan bi çeplên wê girtin, serdev ew bi erdê ve xijiqandin û ew avêtin derve. Wî jî bawer nedikir, ku ji nav lepên wan zebanîyan rizgar bûye. Şaşomaşo rabû ser xwe, kulkulî û bi zorê bi rê ve çû. Pir li zora pîrê çû lê ji ber hêrsa keybanûyê ya zêde, ya xwe tê re nedît ku ricayê jê bike ango li ber bigere.

Hesen ji qesra keybanû Şewqa Rastîyê derket lê wê bi ku ve biçûya, xwe li kê bigirta, nizanibû. Dinya giş lê teng bûbû û kesekî ku pê re biaxive, pê bişêwire, wensa xwe pê bîne, tune bû. Kesekî ku xwe lê bigire jî tune bû. Êdî bawer kir, ku dawîya wî hatiye, lewre ne rêyeke ku pê de here nas dikir û ne jî bi tena serê xwe dikaribû di rêya hatina xwe re vegerîya. Ne gengaz bû, ku bikaribe newala cinan, erda dirinde û wehşan, girava çûk û teyrikan derbas bike. Jîyan li ber çavê wî reş bû ji nişka ve kûrînî pê ket, girîya hetanî ku ji ser hişê xwe çû. Gava dîsa bi ser hişê xwe ve hat, jina wî û zarokên wî hatin bîra wî. Hatina jina wî ya cem Şewqa Rastîyê hat ber çavên wî û tiştê ku dê li wir bihata serê wê li ber çavên xwe sêwirand. Pir pê êşîya û li hatina xwe ya wir poşman bû.

Di nava wan fikir û xeyalan de Hesen meşa xwe berdewam kir, heta ku derket derveyî bajêr; bêyî ku bizanibe wê bi ku ve here.

Em Hesen li wir bihêlin û em vegerin cem jina wî Şewqa Birûskê ku xwe amade dikir ji bo ku roja ditir bikeve rê, piştî çûna pîra Şewahî. Hîna

ku neketibû rê, berdestîyê şah ket hundir û erda bin nigê wê maçî kir û jê re got: Ey keybanûya zemanan, bavê te, şahê gewre silavan li te dike û te dixwaze cem xwe!

Şewqa Birûske di cî de rabû ser xwe û li gel berdestîyê bavê xwe çû, berî da qesra wî. Derbasî cem bavê xwe bû, bavê wê ew li kêleka xwe, li ser textê şahîtîyê da rûniştandin û jê re got: Keça min, îşev min xewnek dît û ji ber wê jî ez pir ditirsim, ku tiştek bi serê te bê! Ango di vê rêwîtîya te de, belayek bi serê te de bê.

Şewqa Birûskê bi meraq axivî û got: Tu ji çi ditirsî û te çi di xewna xwe de dîtiye, bavocan? Bavê wê got: Min di xewnê de dît ku ez dikevim nava gencîneyekê ku tijî zêr û zîv û gewher bû. Lê ji wan tiştên giranbuha tevan, tenê min heft morîk jê ecibandin. Ji nava wan heft morîkan jî, min a herî biçûk neqand. Lewre di nav wan de ya herî bişewq û cemal, ew bû. Mîna ku spehîbûna wê li gora dilê min be, min danî ser destê xwe û ez ji gencîneyê derketim. Bi kêf û eşq ez ji devê derîyê wê derketim û careke min destê xwe vekir, lê nêrî û morîka xwe maçî kir, ji bo ku ez dilê xwe pê xweş bikim lê di wê kêlikê de teyrekî ku ji welatekî xerîb hatibû, xwe dada min û ew morîk ji destê min revand û çû. Dîsa ew bir cihê ku min ew jê anîbû.

Sibehê çawa ku ez ji xew rabûm, min gazî falbîn û efsûnger û mûfesiran kir û min xewna xwe ji wan re got, şîroveya xewnê ji wan xwest. Wan jî got: Heft keçên te hene, tu yê biçûka wan wenda bikî, ango bêyî daxwaza te, wê ji te were stendin!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 929'AN

*Şehrazadê got*:

Şahê gewre axaftina xwe ji keça xwe re berdewam kir û got: Vêca tu jî keça min î biçûk î û tu li ber dilê min ji gişan bêtir delalî yî û va ye tu derdikevî rêwîtîyeke hetanî cem xwîşka xwe. Ez nizanim wê çi bi serê te were, loma ez ji te dixwazim, ku tu neçî û tu vegerî qesra xwe.

Gava Şewqa Birûskê ev gotin ji bavê xwe bihîstin, gumegum û teperep bi dilê wê ket û herdu kurên wê hatin bîra wê. Serê xwe bera ber xwe da û bi qasî saetekê ponijî. Piştre serê xwe rakir û ji bavê xwe re got: Bavocan, keybanû Şewqa Rastîyê amadekarîya mêvantîya min kiriye û niha li hêvîya

min e. Saet bi saet di nava bêsebirîyê de li hêvîya hatina min e û ev çar sal in min ew nedîtiye. Heger ez neçim serdana wê, dê ji min bixeyide. Jixwe ez zêde li cem wê namînim. Çiqasî dirêj bike, mehekê nakişîne, ez ê li cem bim. Ma kî dikare derbasî welatê me bibe û were giravên Weqwaqê? Kî dikare xwe bigihîne axa spî, çiyayên reş, girava kafûrê û keleha çûk û teyran? Kî dikare newala çûkan derbas bike, di newala dirinde û wehşan re bibihure, dola cinîyan li pey xwe bihêle û were derbasî giravên me bibe? Kîjan xerîb derbasî vî welatî bibe, wê di deryaya xetereyan de tune bibe. Ji bo rêwîtîya min jî bila dilê te di cî de be, tu kes nikare pê li axa me bike.

Keçik li ber bavê xwe gerîya hetanî ku izna çûna wê da. Şah ferman da serleşkeran, ji bo ku hezar siwarî bi keça wî re bişînin hetanî qiraxa çem û li wir bimînin, heta ku keça wî bigihîje bajarê xwîşka xwe û derbasî qesra wê bibe. Li wir jî li cem wê bimînin, heta wextê vegera wê, da ku wê dîsa bînin cem bavê wê. Jixwe bavê wê jê xwestibû, ku du rojan tenê li cem xweha xwe bimîne. Wê ji gotibû: Bila be.

Şewqa Birûskê rabû ser xwe, bavê wê jî rabû, xatir ji hew xwestin. Keçik jî ket ser rê. Lê xewna bavê wê pir bandor li ser kiribû û li ser herdu zarokên xwe gelekî ditirsîya lê qederê her wê mîna xwe bikira.

Piştî sê roj û sê şevan ji meşeke dirêj, xwe gihandin qiraxa çem. Leşkeran konê xwe li ber çem vegirtin. Şewqa Birûskê jî li gel bende, xizmetkar û pasevanên xwe, li çem da û av derbas kir. Piştre jî gihîştin bajarê Şewqa Rastîyê. Şewqa Birûskê derbasî qesra xwîşka xwe bû. Dît ku herdu zarokên wê digirîn, diqîrin û dibêjin, “Bavocan were, bavocan were!” Hêsiran di çavên wê re avêtin û girîya.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 930’Î

*Şehrezadê got*:

Şewqa Birûskê herdu kurên xwe himbêz kirin û ji wan pirsî, got: Qey we bavê xwe dît? Ne xwezîya min bi wê roja ku em jê veqetîyan. Heger min bizanibûya ew hîna li darê dinyayê ye, min ê hûn bigihandina wî! Di pey re jî girîya û nalîya bi ser xwe û mêrê xwe û zarokên xwe de û got: Min ev bobelat bi serê xwe û zarokên xwe de anî!

Gava xwîşka wê Şewqa Rastîyê ew di wî halî de dît, xêr hatina wê nekir. Li şûna silavdayînê, jê re got: Şermûta qehpik, te ev zarok ji ku anîne? Qey bê

agahîya bavê min tu zewicîyî, ango te zîna kiriye? Heger te zîna kiribe, divê tu cezayê xwe bigirî û heger bêyî agahîya me tu zewicîbî jî, çima te dev ji mêrê xwe berdaye û te zarokên xwe ji bavê wan veqetandine, te ew anîne welatê me û ew ji ber me veşartine? Qey ji te werê ku haya me jê tune ye? Xwedê teala zanayê xeybê ye û wî rewşa te ji me re eşkere kir, eybên te diyar kirin!

Piştre ferman da zebanîyên xwe, ji wan re got: Wê dardest bikin! Zebanî û celadan ew girtin, dest û nigên wê xistin qeydên hesinî û ew avêtin ber destên xwîşka wê. Ew jî pê ket, lêda û hey lêda, hetanî ku laşê wê reş û şîn kir. Piştre ew ji porê wê daliqand û ew avêt zîndanê. Dûre nameyek ji bavê xwe yê şah re nivîsî, jê re got: Xortekî xerîb li welatê me hatiye dîtin, xwîşka min Şewqa Birûskê dibêje, ev mêrê min e û du zarokên min ji wî hene. Herdu zarok jî, ji me û te veşartine û ev tişt neda xuyakirin, hetanî ku me ew xortê insî yê ku navê wî Hesen e, neanî raserî wê. Hesen digot, ez pê re zewicîme û demeke dirêj li cem me ye!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 931'Ê

*Şehrezadê got*:

Şewqa Rastîyê ji bavê xwe re nivîsand û got: Hesen dibêje, ez bi vê xwîşka te re zewicîme û demeke dirêj li cem me maye. Piştre jî bêyî agahîya min, herdu kurên min, bi xwe re birine û çûye. Berîya ku bi rê bikeve jî, ji diya wî re gotiye, heger kurê te bêrîya min kir û xwest min bibîne, bila were giravên Weqwaqê. Vêca dema ku min pîra Şewahî şand dû wê û zarokên wê, min Hesen jî li vir girt. Min ji pîrê re gotibû, herdu zarokan zû bîne, berîya hatina xwîşka min. Wê jî ew anîbûn cem min. Gava min Hesen derbasî cem wan kir, di cî de herdu nas kirin, gotinên zilam rast derketin û ez têgihîştim, ku bi rastî jî xwîşka min, jina wî ye, yanî qisûr ne yê zilam bû, yê xwîşka min bû. Ez tirsîyam, ku em di nava xelkên giravê de bihetikin, loma çawa ku hat, min ew qehpik girt, têra wê lêda, ew ji porê wê ve daliqand û avêt zîndanê. Niha jî em li hêvîya fermana te ne, tu bêjî çi em ê wisa bikin. Jixwe ev şerma hanê, xerabîya herî mezin e, di heqê te de hatiye kirin. Berîya ku xelkên giravê bibihîzin û em bibin benîştê nav devê xelkê, te bersiveke lezgîn bida me, wê baş bûya.

Şewqa Rastîyê nameya xwe qedan û ew da destê qasid û jê re got: Zû bigihîne şahê gewre! Qasid name bir, xist destê şah. Şah jî çawa ku name

xwend, gelekî hêrs bû û ji keça xwe Şewqa Birûskê qehirî. Rahişt pênûsê û ji Şewqa Rastîyê re nivîsand, got: Ez emrê wê dispêrim te û li şûna min, tu cezayê wê bidê. Heger tiştên te gotine rast bin, ne hewce ye, ku tu di biryarê de bi min bişêwirî.

Şah nameya xwe pêça û da qasidekî, qasid jî nameya wî di cî de gîhand keça wî. Şewqa Rastîyê piştî ku nameya bavê xwe xwend, celadê xwe şand pey xwîşka xwe. Ew ji zîndanê derxistin û anîn cem wê. Şewqa Birûskê, di nava xwîna xwe de bû. Dest û nigên wê di qeyd û zincîrên giran de bûn û kirasekî ji mû li ser wê bû. Perîşan û sertewandî li hember xwîşka xwe ya keybanû sekinî. Gava xwe di nava wê heqaret û bindestiyê de dît, rojên xweşî, şahî û serbilindîyê hatin bîra wê. Girîya û got:

Xwedêyo ev çi rewş e çi qewimîye
dû min dibên êdî tu çûye tu miriye
ez jî tika dikim dibêjin ka dilovanî?
tekane xelaskarê me gunehkaran tu yî

Pîşt re girîya, hetanî ku ji ser hişê xwe çû. Gava bi ser xwe ve hat, dîsa çend ristên helbestekê xwend û got:

fêr bûme êdî ez evan bobelatan
geh êş geh şadî qet nîn e rawestan
kul û derd û keder hemû tev yek in
spas ji wî re ku kulên min gelek in

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 932’YAN

*Şehrezadê got*:

Keybanû Şewqa Rastîyê, ji celadên xwe xwest, ku nêrdewanekê bînin û Şewqa Birûskê li ser piştê li ser dirêj bikin û pê ve girêdin. Celadan fermana wê pêkanîn, Şewqa Birûskê li ser piştê bi nêrdewanê ve girêdan. Şewqa Rastîyê çû ser, herdu destên wê jî bi şerîtan ve girêdan û porê wê yê dirêj jî bi nêrdewanê ve girêdan.

Gava Şewqa Birûskê xwe di wê rewşa xerab de dît, qîr û hewar kir. Lê tu kes pê ve nehat. Ji keybanûyê re got: Xwîşkê, wisa xuya dike, ku dilê te li hemberî min bûye weke kevîr. Lê qey dilê te bi wan Zarokên hûrik naşewite?

Gava keybanûyê ev gotin bihîstin, hartir û xedartir bû. Bi ser de qîrîya, sixêf jê re dan û got: Evîndara qehpik, kesê/a ku li te were rehmê, Xwedê li wî/ê nayê rehmê. Ma ez ê çawa li te werim rehmê, dêlika ber derîyan!

Şewqa Birûskê lê vegerand û got: Ez Xwedê dikim hakim, di neqeba xwe û te de, madem ku tu van tawanan dispêrî min! Xwedê jî dizane, ku ez ji van gunehan bêrî me û min zîna nekiriye. Ez bi helalî pê re zewicîme û Xwedê baş dizane, bê ez rast dibêjim an na. Tu çawa min bi zînayê tawanbar dikî, bêyî ku delîlên te hebin? Heger ev tawanbarkirina te rast be, jixwe wê Xwedê cezayê min bide mi. Lê te bi vê dilkevirîya xwe dilê min şikand û bi vê êş û azara ku te dayê min te hişt, ku ez ji te biqehirim. Xwedê mezin e û wê Xwedê cezayê te jî bide te.

Keybanû Şewqa Rastîyê, bi vê gotina xwîşka xwe dîn û har bû. Bi ser de qirîya û jê re got: Tu çawa bi vî zimanî bi min re diaxivî? Pê re jî rabû ser xwe û lêda, hetanî ku xwîşka wê ji ser hişê xwe çû. Av li ser çavên wê kirin, hetanî ku bi ser xwe ve hat. Bi ser xwe ve hat lê mehdê wê ji êşkence û lêdanê pir guherîbû. Laşê wê jî sor û şîn bûbû, ji ber şerîtên girêdanê. Şewqa Birûskê, bi hêdika di ber xwe de got:

Heger min xerabîyek kiribe
şaşîtîyek ango gunehek kiribe
bi tobekarî li we vedigerim
Lêborîna xwe ji we dixwazim

Şewqa Rastîyê ev ristên wê bihîstin, pir hêrs bû û jê re got: Dêlika heram, îcar bi helbestî tu dipeyivî û tu lêborîna xwe dixwazî, ji ber wan gunêhên xwe? Jixwe gava min xwest ez te û mêrê te bînim cem hev, armanca min ew bû, ku ez wê qehpîtîya te, di wan çavên te de bibînim û va tu jî li wê xerabîya xwe mikur têyî!

Ji celadên xwe xwest, ku qamçîyekê jê re bînin. Jê re anin. Wê jî rahişt qamçîyê û pê ket, ji serî hetanî nigana lêda. Piştre qamçîyeke bidiran xwest, ku te ew li fîlekî bida, dê ji ber te bazbida. Bi wê qamçîyê li newqa wê, li sing û li kulîmekên wê da, hetanî ku dîsa ji ser hişê xwe çû.

Pîra Şewahî nema xwe li ber wê dîmenê girt. Girîya, nifir lê kirin û ji wir derket, çû. Şewqa Rastîyê gazî xulaman kir, got: Wê ji min re bînin! Hemû li pîrê hatin hev, ew girtin û birin ber destê keybanûyê.

Keybanûyê ji celadan re got: Wê bavêjin erdê û wê serdevkî li dû xwe

bikişînin û wê derxin derve! Celadan fermana wê pêk anîn. Pîrê serdevkî li dû xwe kişandin û ew avêtin derve.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 933'YAN

*Şehrezadê got*:

Em Şewqa Birûskê li wir bihêlin û em vegerin ser rewşa mêrê wê Hesen.

Hesenê ku hêz û taqet pê re nemabû, rabû ser xwe, di nava kul û kederan de li qiraxa wî çemî ber bi jêr ve meşîya. Bêhêvî bû, hişê wî çeliqîbû, tevlihev bûbû. Şev û roj ji hev dernedixist, ji ber dijwarîya bandora wan bobelatên ku bi serê wî de hatibûn. Ber bi şîndareke di devê rê de meşa xwe berdewam kir. Gihîşt cem wê. Dît ku kaxezek pê ve dalîqandî ye û li ser kaxiz weha dinivîse:

hîna gava tu dilopeke xwîn bû
min qedera te baş nivîsandibû
tu xistibû himbêza dayikek spîrû
evîna te di dilê wê de çandibû
tu qet metirse em besî te ne
Şadî û xemgînî giş li ba te ne
rabe ser xwe bi lez here netirse
bi destê xwe bigirî tu qey ne bes e

Gava Hesen ew helbest xwend, qinyata dilê wî rûnişt, bawerîya wî lê vegerîya, his kir, ku wê ji zilm û zorê rizgar bibe û bigihîje zarokên xwe!

Meşa xwe berdewam kir, gihîşt cihekî ripî rût, ku tenahîya wî anî bîra wî û careke din bêçaretî di nava xwe de hîs kir. Hat bîra wî, ku kesekî wensa xwe pê bîne, li wî welatî tune ye. Di nava wê tenêtiyê de dilê wî hat guvaştin û çogên wî ricifîn. Nav di xwe da û du gavên din bi pêş de çû. Dît ku du zarokên hûrik ên efsûnger û kahînan ji xwe re dilîzin û di nav destên wan de darikekî paxirî, ku hemû remz û tilsim li ser hatibûn neqişkirin û kumekî sextiyan î bi sê mertalan ku nav û îmze bi pola li ser wan hatibûn neqişandin. Darik û kumik li erdê bûn û zarok li ser wan pevdiketin, yekî digot darik ê min e û ew ji hev vekirin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 934'AN

*Şehrezadê got*:

Hesen ket navbera herdu kurikan, ew ji hev veqetandin û ji wan re got: Hûn çima pevdikevin? Wan jî got: Apocan Xwedê tu ji me re şandiye, ka tu were navbeynkarîya me bike! Kî ji me neheq be, biryarê li wî bibire.

Hesen got: Kanî çîroka xwe ji min re bibêjin, ez ê hakimtîyê di neqeba we de bikim! Herdu birayan gotin. Em herdu bira û cêwî ne. Bavê me jî efsûngerekî pir mezin bû û li vî çiyayî dima. Bavê me mir û ev darik û ew kum ji me re hişt. Ez dibêm ev darik ji min re, birê min jî dibêje, darik ji min re, kum ji te re. Vêca ka tu hakimtîyê di navbera me de bike û me ji hev xelas bike!

Hesen ji wan pirsî û got: Çi ferq di neqeba kum û darik de heye? Bi qasî ku ji min ve tê xuyakirin, buhaya darik bi qasî şeş cududan e û ya kum jî bi qasî sê cududan e.

Herdu zarokan jê re gotin, tu ferqa wan ji hev dernaxî? Hesen got: Nexwe çi ferqa wan ji hev heye? Zarok got: Di herduyan de jî razên ecêb hene. Buhayê darik bi qasî buhayê hemû giravên Weqwaqê ye. Kum bi xwe jî wisa ye. Hesen ji wan re got: Zarokno, hûn bi xatirê Xwedê kin, raza vî darik û vî kumî ji min re eşkere bikin? Zarokan got: Raza wan pir mezin e. Lewre bavê me sed û sî û pênc salan jîya û hemû temenê xwe li ser wan kir, hetanî ku ew temam kirin û raza ebedî di wan de bi cih kir. Ew di gelek karên erjeng de xebitandin. Ew li gora gerestêrkan neqişandine. Remz û tilsim li ser wan bi cih kirine lê mixabin heta ku ew karê xwe qedand mirina wî hat û mirin li pêşîya her kesî ye. Vêca raza kum ew e, ku gava mirov wî dide serê xwe, tu kes mirov nabîne. Hetanî ku li ser serê mirov be, mirov ji ber awirên her kesî veşartî ye. Raza darik jî ew e, ku kî xwedîyê wî be, di destê kê de be, dikare heft êlên cinan bi hev re bixe bin destê xwe û wan bi rê ve bibe. Lewre hemû di xizmeta wî darikî de ne. Kî vî darikî li erdê bide, dê hemû şah û qral û melikên erdê serê xwe li ber wî bitewînin.

Gava Hesen ev gotin bihîstin, serê xwe beraber xwe da, hizirî û ji xwe re got: "Bi navê Xwedê, ez ê bi vî darikî û bi vî kumî, bi ser kevim! Xwedê teala ev kum û ev darik ji min re şandine, ne ji van zarokan re. Ji wan bêhtir heqê min in. Ez ê fenê li wan bikim û herduyan jî ji wan bistînim û ez ê herim bi wana jin û zarokên xwe xelas bi kim, ji destê wê keybanûya zalim.

Piştre jî em ê ji vî welatê tarî herin welatê xwe. Belkî Xwedê ez şandibim cem van herdu zarokan, ji bo ku ez vî darikî û vî kumî ji wan bistînim!"

Hesen serê xwe rakir û ji herdu zarokan re got: Heger hûn herdu bixwazin, ez dikarim dadgerîyê di neqaba we de bikim?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 935'AN

*Şehrezadê got*:

Gava Hesen wilo got, herdu zarokan gotin: Apocan, me herduyan tu kirî wekîlê xwe, tu me biceribîne û dadwerîyê di neqeba me de bike! Hesen got: Ez çî bibêjim, hûn ê bi ya min bikin gelo? Gotin: Belê. Hesen got: Ez ê rahêjim kevirekî û wî bavêjim dera hanê; hûn jî bikevin pey wî; kê ji we berîya yê din xwe gihand wî kevirî; wê ev darik ê wî be û yê dereng ket jî, wê ev kum ê wî be!

Hesen rahişt kevirekî û bi hemû hêza xwe ew avêt. Kevir pir dûr çû. Herdu zarok jî li pey çûn. Hesen rahişt kum, ew da serê xwe, darik jî xist destê xwe û hebekî xwe bi şûn de da, ma li benda herdu zarokan, ji bo ku rastîya gotina wan biceribîne û dilê xwe bixe cî.

Kurikê hûrik berî yê din xwe gihand kevirê Hesen. Rahiştê û bi şûn de vegerîya cihê ku Hesen lê bû, lê tu kes li wir nedît! Qîrek da birayê xwe û jê re got: Ka ew zilamê ku dê di neqeba me de dadwerî bikira? Wî jî got: Ez wî nabînim û şopeke wî jî ne diyar e; gelo çûye asîmanê heftan an daketiye binî erdê!

Herdu pir lê gerîyan lê Hesen neditin. Li gel ku li ber çavên wan bû. Sixef ji hev re dan û gotin: Darik jî çû, kum jî çû û tiştek ji me re nema. Ew hişyarîya ku bavê me kiribû û me guh nedayê, ev bi xwe bû! Polî poşman bi şûn de vegerîyan û çûn.

Hesen jî kumê xwe da serê xwe, darikê xwe xist destê xwe û ket nava bajêr. Bêyî ku kes wî bibîne, derbasî qesra keybanûyê bû. Çû cihê ku pîra Şewahî lê dima. Derbasî cem wê bû û gava gihîşt ber refikeke ku camên çînî li ser bûn, yek ji wan xist erdê, terqinî pê ket. Pîrê qîrîya, rabû ser xwe, li rûyê xwe da û cama ketî dîsa vegerand cihê wê. Di dilê xwe de ji xwe re got: "Bi navê Xwedê, hebe tune be ev karê xerab ê keybanû Şewqa Rastîyê ye. Wê şeytanekî xwe şandiye cem min, wî ew şerbik xist erdê! Ez hêvî ji Xwedê

dikim, ku min ji nav lepên wê xelas bike û min jê bisitirîne? Heger ev zalima hanê li xwîşka xwe wisa dike, gelo wê çi bi serê min de bîne?”

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 936’AN

*Şehrezadê got*:

Pîra Şewahî, piştî ku ew gotin di dilê xwe de gotin, dengê xwe bilind kir û got: Ey şeytanê Şewqa Rastîyê, tu bi qedrê Henan û Menanê gewre bikî, bi afirindeyê ins û can, bi sultanê sultanan û wê neqşa li ser hungulîska Suleyman Bin Dawid kî, bi min re bipeyive û bersiva min bide!

Hesen Bersiva wê da û got: Ez ne şeytan im, ez Hesen im!

Piştre jî kum ji serê xwe derxist û xwe nîşanî wê da. Pîrê ew nas kir, ew bir kêlekekê, ew xewle kir û jê re got: Qey te aqilê xwe xwariye, ku tu dîsa vegerîyayî vir? Zû here xwe veşêre! Vê qehpika hanê tiştên nebûyî bi xwîşka xwe kirin. Îcar ku tu bi nav destê wê bikevî, Xwedê dizane, bê wê çi bi serê te bike!

Pîra Şewahî, tiştê ku hatibû serê jina wî, hemû jê re gotin û di dawîyê de pê de çû û got: Li berdana te jî pir poşman bû. Gelek kes bi dû te de şandin, ji wan re got: Kî ji we wî bîne, ez ê qentarek zêr bidim wê û wê li cem xwe bikim serbaz. Sond xwar, ku heger dîsa te bigire, dê te bikuje û dê jina te jî bikuje, zarokên te jî.

Pîrê girîya û tiştên ku keybanûyê bi wê jî kiribûn, nîşanî Hesen dan. Hesen jî girîya û jê re got: Xatûna min, mirov çawa dikare ji vî welatî û ji vê keybanûya zalim rizgar bibe? Gelo rê û rêbazek heye, ku ez xwe bigihînim jina xwe, zarokên xwe û careke din vegerim welatê xwe?

Pîrê got: Ev jî dînbûneke din e, hela tu xwe rizgar bike, piştre di yên din de bifikire! Hesen got: Bi zorê be jî, divê ez jina xwe ji nav lepên wê derxînim! Pîrê got: Kurê min, here xwe veşêre, heta ka bê Xwedê çawa dike.

Hesen darikê paxirî nîşanî wê da, kum da ber çavên wê!

Çawa ku çavên pîrê li wan ket, pir kêfa wê hat û got: Subhan ji wî re ku hestîyan vedijîne û wan ji nû ve zindî dike! Bi navê Xwedê tu û jin û zarokên xwe tev de, av û av çûbûn, heger te ev herdu amûr bi dest nexistina! Lê niha, ez dizanim, ku hûn ê xelas bibin, ji ber ku ez vî darikî û xwedîyê wî

nas dikim. Ew şêxê min î ku ez fêrî sihr û efsûnê dikirim bû. Efsûngerekî ku sed û sî û pênc salan jîyabû, heta ku ev darik çêkiribû û ev kum qedandibû le mixabin ku çawa wî ew qedandin, mirina wî jî hat. Min bihîst, gava ku ji herdu kurên xwe re digot, ev herdu jî ne nesîbên we ne, nesîbên şexsekî xerîb in, ku dê bê bi zorê wan ji we bistîne û hûn ê nizanibin çawa ji we stendiye jî. Wan jî digot: Bavocan, gelo tu pê hesîyayî bê wê çawa bê û bibe? Bavê wan digot: Na.

Îcar tu bi Xwedê kî, te çawa xwe gihand wan zarokan?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 937'AN

*Şehrezadê got*:

Gava pîra Şewahî ew pirs jê kir, Hesen mijar jê re vegot. Ew jî pê kêfxweş bû û got: Îcar niha tu yê bikaribî jina xwe û herdu zarokên xwe ji nav lepên wê şermûtê rizgar bikî. Piştî ev qas xerabîya ku bi min kir, ez jî nema li cem wê disekinim. Ez ê herim şikefta efsûngeran û bi wan re bimînim, hetanî mirinê. Îcar tu jî kurê min, kumê xwe bide serê xwe, darikê xwe bixe destê xwe û here cem jina xwe, cem zarokên xwe, darikê xwe li erdê bixe û bêje: Ey xizmetkarên van navan, ji min re derkevin holê! Gava yek ji serkêşên êleke cinan derket rabarî te, tiştê ku tu dixwazî jê bixwaz e.

Hesen xatir ji pîrê xwest, kumê xwe da serê xwe, darikê xwe xist destê xwe û derbasî cihê ku jina wî lê bû, bû. Dît ku jina wî bi nêrdewanê ve girêdayî ye, porê wê lêgerandî ye û çarmixkirî ye, digirî û xemgîn e. Di halekî pir xerab de ye, bêhêvî ye û rêyeke xelasîyê ji xwe re nabîne. Herdu zarokên wê jî, li jêra nêrdewanê, ji xwe re dilîstin.

Wê jî li wan dinêrî û li ser xwe û wan digirîya, bi kazekaz û bi nalîn, ji xwe re digot:

> tiştek nema ji xeynî hilmeke bêdeng
> tiştek nema ji xeynî rûyekî bêreng
> û nêrîna çavên mirovekî pir teng
> evîndar û şeyda ye hinav jî pêt û ar
> bêdeng dişewite di nava agirê har
> şînkêşên wî jî sixêfkarên wî ne
> ne xwezî bi şînkêşên sixêfkaran e

Gava Hesen ew di wî halî de dît, kûrekûr pê ket, girîya, heta ku ji ser hişê xwe çû. Gava bi ser xwe ve hat, dît ku zarokên wî dilîzin û jina wî ji ber êş û jana giran ji ser hişê xwe çûye. Kum ji serê xwe derxist, zarokên wî ew dîtin û herdu bi hev re qîrîyan û gazî kirin, gotin: “Bavocan, bavocan!” Hesen jî di cî de kumê xwe dîsa danî ser serê xwe.

Diya wan, bi qîrîn û gazîna zarokên xwe re, hat ser hişê xwe û dengê zarokên xwe bihîst. Girîya û dilşikestî bû, bi wê banga zarokên xwe. Qirîya û got: Hûn li ku ne, bavê we li ku ye lawo!

Wê gavê rojên wan ên berê hatin bîra wê, gava ku hemû bi hevre bûn û ji hev hez dikirin. Piştre jî veqetîna wan ji hev û ew bobelata ku hat serê wan! Pir hestiyar bû. Hêsir barandin û girîya. Jixwe ji girî û nalînê pê ve tiştek bi destê wê ve nedihat. Hebekî xwe çep û rast liqliqand, bi hêvîya ku tiştekî bibînê, li wî alîyê ku zarokên wê pê de dikirin gazî û digotin, “Bavocan!” Lê tu tiştî ji wê ve xuya nekir. Şaşwaz bû, ku di demeke wisa de, kurên wê gazî bavên xwe dikirin! Şewqa Birûskê, di nava hestiyarîyeke mezin de bi helbestî got:

welat vala bûye ji heyv û roj û stêrkan
comerd be ey çav bê sînor bide hêstiran
ew çû û çû tu jî hîna digirî li pey wan
ne dil bi min re ye êdî ne jî banga hinavan
ey rêwîyê rêya dûr gelo heye veger
wê çi bibe gel ku vegerî tu dîsa heger
ma wê çi bibe ku careke din silav bidim
himbêz bikim ez careke din te ramûsim
ewrê barana çavên min dîsa tê gel te
arê di hinavan de jî pir har û gur dibe
hîna jî temakara mana dilê te me ez
ev fîraq jî her bi cerd e bêçare me ez
bo xatirê Xwedê careke din were careke din
bes e hêsir, bes e kul û êş û der û keser bes e

Gava Hesen ev gotinên wê bihîstin, nema xwe girt û kumê serê xwe derxist! Çawa ku jina wî lê nêrî, ew nas kir û qîrîya. Qîrîna wê ew qasî xurt bû, ku hindik mabû, ew qesir giş bi ser wan de bihata xwarê!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 938'AN

*Şehrezadê got*:

Piştî wê qîrîna ewil, jina Hesen jê re got: Te çawa xwe gihand vir? Tu ji asîmanan hatî an ji binerdê derketî? Çaven wê tijî hêsir bûn. Hesen jî pê re girîya. Jina wî ew şiyar kir û got: Malneketo ma qey ev wextê girî û nalînê ye? Ev ne dema lome û gotinan e, her tişt çû û qedîya, hukmê qederê hat dayîn û bêveger e. Tu bi Xwedê kî, ji min re bibêje, bê ka tu ji ku hatiyî û çawa hatiyî? Zû rabe, here xwe veşêre, ji bo ku kes te nebîne û xwîşka min agahdar neke. Nexwe wê me herduyan jî bikuje.

Hesen got: Keybanûya min, delala ber dilê min, min xwe avêt talûkeyê û ji bo te ez hatim vir. An ez ê bimirim an jî ez ê te ji vê îşkenceya ku tu tê de yî xelas bikim. Ger min tu xelas kirî, ez û tu û zarokên xwe, em ê herin welatê xwe. Bila mineta vê qehpika xwîşka te jî li dera hanê be!

Gava Şewqa Birûskê ev gotina wî bihîst, beşişî û dirêj dirêj serê xwe çep û rast hejand û got: Ax ax, ka ew roja ku yek min rizgar bike ji vê îşkenceyê lê heyhat! Ji Xwedê pê ve tu kes nikare. Tu jî xwe xelas bike, here û ruhê xwe navêje nav agir. Jixwe ji ber ku min bi ya te nekir, ev giş hat serê min. Heger Xwedê teala careke din me bigihîne hev, ez nema ji rêya te derdikevim. Vêca tu bi xatirê Xwedê kî Hesen, li min bibore û gunehê min efû bike. Jin jî hetanî ku mêrê xwe wenda neke, qîmeta wî nizane. Xwezî fersendeke din biketa destê min, vê carê min ê qîmeta te pir bizanîya!

Hesen jê re got: Tu şaşîtîyên te tune ne, yê ku şaşîtî kir, ez bûm, ku ez ji malê derketim û min tu li cem hinan hiştî, ku bi qîmeta te nizanibûn.

Dildara min, delalîya ber dilê min, nûra çavên min, baş bizanibe, ku Xwedê teala hêzek daye min, têra xelaskirina te û zarokên me dike. Gelo tu dixwazî ku ez te bigihînim mala bavê te, ji bo ku deynekî te hebe, tu bidî ango raste rast tê bi min re bêyî welatê me û zû ji xwe re xelas bibî?

Jina wî got: Û kî dikare min ji vir xelas bike ji xeynî Xwedayê gewre? Here welatê xwe û dev ji min berde, tu xetereyên vî welatî baş nizanî. Heger tu bi ya min nekî û neçî, tu yê jî bi min re werî kuştin! Piştre ew û zarokên xwe bi hev re girîyan. Dengê wan çû qerwaşan, ew jî bi ser wan de hatin, dîtin ku Şewqa Birûskê û zarokên xwe digirîn lê Hesen nedîtin, ji ber ku kumê xwe dabû serê xwe. Qerwaş jî bi girîyên wan bandor bûn, ew jî girîyan, dua ji wan re kirin û nifir li keybanûyê kirin.

Hesen xwe li wir ragirt, heta ku şev hat û nobedarên li ber jina wî çûn ser cihê xwe, raketin. Piştre rabû, nava xwe girêda û hat dest û nigên jina xwe vekir, ew himbêz kir, enîya wê maçî kir û jê re got: Me gelekî bêrîya hev kiribû, ku em li welatê xwe hevdu bibînin. Gelo ev hevdîtina me xewn e yan rastî ye?

Hesen rahişt kurê xwe yê mezin, jina wî rahişt ê biçûk û ji qesrê derketin. Xwedê teala perdeyek avêt ser wan, ew sitirandin. Ew jî bi aramî meşîyan, hetanî ku dûrî qesrê ketin û hatin ber derîyê hewşe. Dîtin, ku derî girtî ye û xiliqandî ye! Hesen got: La hewle wela quwete îla bîlah! Hemû hêz, li ba Xwedê ye!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 939'AN

*Şehrezadê got*:

Gava dîtin, ku derîye derve xiliqandî ye, hêvîya wan şikest û bawerîya wan bi xelasîyê nema. Hesen got: Ey xelaskarê bêçare û bêhêzan; hawar hawar! Piştre, herdu destên xwe li hev xistin û berdewam kir, got: Min hesabê her tiştî kiribû, min hesabê vê yekê nekiribû! Gava ku hinek ji wan di derî re werin, dê me bibînin û me dîsa bigirin, îcar xelasî di ku de ye gelo?

Di pey re di nava bêçaretiya xwe de girîya. Jina wî jî pê re girîya û jê re got: Bi Xwedê tu xelasî ji me re tune ye, ji xeynî ku em xwe bikujin û ji vî ezabî û êşa giran xelas bibin.

Hîna ku ew wisa di nav xwe de diaxivîn, dengek ji wî alîyê derî hat, dibêje: Xatûna Min Şewqa Birûskê, welehî ez derî ji te û mêrê te Hesen re venakim, hetanî ku hûn bi ya min nekin?

Gava ew deng hat wan, di cî de sekinîn û xwestin, ku bi şûn de vegerin cihê ku jê hatibûn. Lê heman dengî dîsa ji wan re got: Çima we bersiv neda min û hûn bêdeng bûn? wê çaxê nû tê derxistin, ku ew xwedîya deng pîra Şewahî ye û ew nas kirin. Bersiva wê dan û gotin: Tu çi fermanê didî me, bibêje, da ku em haydar bin! Lê heger tu derî vekî dê hîn çêtir be, lewre ev wext ne wextê axaftinê ye!

Pîrê got: Bi Xwedê ez derî ji we re venakim, heta ku hûn soz nedin min, ku hûn ê min bi xwe re bibin. Çi tê serê we, bila bê serê min jî, ez naxwazim li cem vê dêlikê bimînim. Lewre ev dêlik wê saet bi saet di ber we de min

bişewitîne. Keça min, jixwe tu jî qedrê min baş dizanî, tu dikarî Hesen jî îqna bikî!

Piştî ku pîrê baş nas kirin, herduyan jê re sond xwarin, ku wê bi xwe re bibin û dilê wê xistin cî. Wê gavê, wê jî derî ji wan re vekir, ew jî derketin û bala xwe danê, ku pîrê li şamikek qehfikî siwar bûye, ku rengê wî sor e. Û werîsek di stûyê wî de ye, ji mihîneke seglawî lezgîntir bi rê ve diçe! Pîrê ket pêşîya wan û ji wan re got: Bidin dû min û ji tiştekî netirsin. Lewre ez çil derîyê efsûnê dizanim, ku biçûkê wan dikare vî bajarî bizivirîne deryayeke bi pêl û dûman û hemû keçikên wê jî bizivirîne masîyan. Berîya ku roj derkeve, ez dikarim van gişan bikim. Heger hetanî niha min tiştekî wisa nekiribe jî, ji tirsa bavê Şewqa Birûskê û ji bo xatirê xwîşkên wê, ku gelek alîgir û xulam û bende û hevalbendên wan hene. Lê êdî ji niha û pê de, ez ê efsûnên xwe yên ecêb nîşanî we bidim. De êdî pişta xwe bidin Xwedê û li dû min werin!

Wê gavê, dilê Hesen û jina wî xweş bû û bawerîya wan bi xelasîyê hat.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 940'Î

*Şehrezadê ji şahînşahê gewre û bextewar, Şehreyar re got*:

Pîra Şewahî da pêşîya wan û ew derxistin derveyî bajêr. Li wê derê, Hesen darikê xwe li erdê da, erd qelişî û deh îfrît jê derketin, ku her yek ji wan nigên wan di erdê de bûn û serê wan di nava ewran de bûn. Sê caran erda ber nigê Hesen maçî kirin û hemûçkan bi yek zimanî got: Em li ber destên te amade ne, serdar û mîrzayê me, gelo tu çi ji me dixwazî? Em guhdarê fermanên te ne, ger tu bixwazî em ê deryayan ji te re bipîvin an jî çiyayan ji cihên wan rakin!

Hesen bi gotina wan, bi bersivdana wan a lezgîn a ku hêz da dilê wî û biryara wî xurtir kir, pir kêfxweş bû. Hesen ji wan re got: Navê we çi ye û hûn ji kîjan êlê ne, ji kîjan bavikî ne û bawerîya we çi ye?

Careke din gişan bi hev re erda ber nigên wî maçî kirin û bi yek zimanî gotin: Em heft qral in. Her qralek ji me serwerîya heft êlên cin û şeytan û dêw û rêbir û alîkarên firoke yên avjenîbaz, yên çiyayî, yên çolistanî, deryayî, giravî û hemû cure xulam û bendeyan dikin! Ev darik di destê kê de be, ew xwedîyê me ye û em dikevin bin emrê wî.

Hesen bi gotina wan pir kêfxweş bû. Jina wî jî bi qasî wî şad û bextewar bû, bi gotinên wan. Hesen ji wan re got: Ez dixwazim leşker û çeteyên di bin destên we de bibînim! Wan jî got: Mîrzayê me, em dikarin wan nîşanî te bidin lê em li ser te û yên bi te re ditirsin. Lewre leşker û şerkerên me pir in, cilên wan cuda cuda ne, bedenên wan jî cuda cuda ne; hinek serîyên bêbeden in, hinek bedenên bêserî ne; hinek di dirûvên dirinde û wehşan de ne, hinek jî di dirûvên şêr û pilingan de. Lê dîsa jî heger tu bixwazî, em mecbûr in nîşanî te bidin. Destpêkê yên di şiklê wehşan de, piştre yên mayîn. Lê belê niha tu çi ji me dixwazî mirzayê me?

Hesen ji wan re got: Ez ji we dixwazim, ku hûn min, jina min û vê jina rastgo û salih bigihînin Bexdayê!

Gava her heft îfrîtan ev daxwaza Hesen bihîstin, serê xwe bera ber xwe dan û deng ji wan derneket. Hesen ji wan re got: Çima hûn bersiva min nadin? Her heft eftîtan bi yek zimanî gotin: Mîrzayê me yê serdar, hîna ji dema mîrzayê me Suleyman Bin Dawid (Silavên xwe dê li wî bin.) ve bi me sond dabû xwarin, ku em tu kesî ji insanan li ser pişta xwe nekin. Me jî ji wê çaxê ve kes li ser pişta xwe nekiriye lê em dikarin hespên cinan ji we re amade bikin, da ku te û yên bi te re bigihînin cihê ku hûn dixwazin.

Hesen got: Neqeba me û Bexdayê çiqas rê heye? Wan jî got: Ji bo siwarên jêhatî rêya heft salan e. Hesen şaşwaz bû û ji wan re got: Nexwe çawa di demeke kêmî salekê de ez gihîştim vê derê? Wan got in: Ê te tu ji bendeyên salih bûye û Xwedê ji te hez kiriye nexwe ne gengaz bû, ku tu bigihîjî vî welatî û vê axê bibînî. Lewre şêx Ebdilqidûsê ku tu li fîlekî siwar kirî û piştre jî li hespa meymûn, hişt ku tu rêya sê salan di sê rojan de qut bikî. Şêx Ebûrîş jî Dehaş da te û hişt, ku tu rêya sê salan di şev û rojekê de qut bikî. Ev bereketa hanê ji ba Xwedê bûye, ji ber ku şêx Ebûrîş ji zurîyeta Asif Bin Birexiya ye û ew navê Xwedê dizane. Ji Bexdayê hetanî wê qesra keçikan jî rêya salekê ye, ev bi giştî dibe rêya heft salan.

Hesen şaşwaz û behetî ma li wê gotina wan û di ber xwe de got: Subhan ji wî re ku zorîyan hêsan dike, dûr nêzik dike, qelsan xurt dike û hêzdaran perîşan dike! Ya rebî tu rêya min jî hêsan bikî, min ji vir bigihînî warê min. Van îfrîtan bixe bin xizmeta me û bihêle, ku ez û jin û zarokên xwe, li welatê xwe bigihîjin hev. Lewre ez baş nizanim, ku gelo ez şiyar im an di xewnê de me, li ser hişê xwe me yan serxweş im?

Piştre li îfrîtan vegerîya û ji wan pirsî, got: Heger hûn me li hespên xwe

siwar bikin, hûn ê di çend rojan de, me bigihînin Bexdayê? Îfrîtan gotin: Piştî ku em zor û zehmetîyên mezin, çol û çolistan, gelî û newal, çiya û berî û deştan derbas bikin, em ê di demeke kêmî salekê de we bigihînin wir. Elbet li ser we bawerîya me bi xelkên giravan jî nayê, mîrzayê me.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 941'Ê

*Şehrezadê got*:

Îfrîtên cinî ji Hesen re gotin: Mîrzayê me, em li ser te ditirsin ji xelkên vê derê, ji şahe Weqwaqê, ji efsûnger û falbîn û serkirdeyên wan. Dibe ku zora me bibin û we ji nav lepên me derxînin, bibin û em û wan têkevin ber hev. Lewre mirov ji kê dipirse, dibêjin, hûn neheq in, çawa hûn li hemberî şahê mezin derketine û we hem insî hem jî keça wî ji welatê wî biriye? Ya rast heger me tu tenê bibirayî, wê hêsantir bûya lê dîsa jî yê ku tu anîye hetanî vir, dikare te bigihîne welatê te jî. Înşelah, di demeke nêzik de tu yê bi dost û hogirên xwe re, werî cem hev. Bawerîya xwe qewîn bike, tewekelîya xwe bi Xwedê bîne û netirse, em li ber destên te amade ne!

Hesen spasîya wan kir, got: Xwedê xêra we binivîsîne! Dûre jî pêde çû, got: Zû hespên xwe bajon, bila em dereng nekevin.

Îfrîtan gotin: Ser seran, ser çavan! Nigên xwe li erdê dan, erd qelişî. Wan jî xwe bera wê qelşê dan û bi qasî saetekê nebedî bûn. Dûre bi şûn de hatin, li gel sê hespên zînkirî, ku her yek ji wan xurcikek li ser hebû. Di berîkeke xurcikê de cewdikê avê û di berîka din de jî qût û zad hebû. Hespên wan dan ber wan. Hesen li yê xwe siwar bû û kurekî xwe danî pêşîya xwe. Pîra Şewahî ji li yê xwe siwar bû. Jina Hesen jî li gel kurê xwe yê din li hespa mayîn siwar bû û ketin rê. Şev pê de meşîyan, sibehê rêya xwe guhertin û berê xwe dan çiyê. Navê Xwedê jî her li ser zimanê wan bû. Ro pê de, di binîya çiyê re meşîyan.

Carekê Hesen li çiyayekî raserî xwe nêrî, dît ku mîna stûneke dirêj ber bi asîmanan ve dirêj dibe. Çend ayet ji Qurana pîroz xwendin, îstixfara xwe anî û bîr û bawerîya xwe nû kir. Her ku nêziktirî wî bûn, ew stûna ji mij dûmanê zivirî reşahîyeke ecêb. Lê dawîyê jî bala xwe danê, ku ew reşahî îfrîtek e, serê wî mîna qubeyeke mezin e, diranên wî weke çengel û daran, firnikên pozê wî weke serahîyên avê, guhên wî weke çembilê ceran bûn. Devê wî

weke şikeftê, diranên wî weke beştan, destên wî weke bêjingan, nigên wî weke bavanên keştîyan bûn. Serî li asîman, nig li erdê bûn.

Gava Hesen li îfrît nêrî, îfrît serê xwe jê re danî û got: Hesen, ji min netirse, ez serokê vê derê me û ev der yek ji giravên Weqwaqê ye. Ez jî misilman im, mîna we û bi Xwedê bawer dikim. Gava ku min hatina we bihîst û ez çav li rewşa we ketim, min xwest, ku ez ji welatê efsûngeran ber bi erdeke xalî de herim, ku ne ins lê hebin ne jî cin, da ku ez bi tena serê xwe lê bimînim. Ji xwe re îbadeta Xwedê bikim, hetanî ku ecelê min bê û Xwedê ruhê min bistîne.

Niha jî min xwest, ku ez jî bi we re bêm hetanî dawîya sînorê girava me û rêbertîyê ji we re bikim, heta ku hûn ji van giravan derkevin. Bila dilê we ji alîyê min we aram be, jixwe ez tenê bi şevê xuya dikim.

Gava Hesen gotina wî bihîst, gelekî kêfxweş bû û bawer kir, ku dê xelas bibin. Li îfrît zivirî û jê re got: Xwedê xêra te binivîsîne, tu jî bi me re were, em pev re bimeşin. Îfrît da pêşîya wan, wan jî meşa xwe bi kêf û şahî berdewan kirin. Hesen jî çîroka serpêhatîya xwe ji jina xwe re vegot.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 942'YAN

*Şehrezadê got*:

Şev pê de meşîyan hetanî sibehê û hespên wan di bin wan de mîna birûskê bi lez diçûn. Gava ro derket, her yekî ji wan destê xwe avêt xurcika xwe, hinek xwarin xwarin, hinek av vexwarin û meşa xwe jî berdewam kirin. Efrîtê rêzan jî di pêşîya wan de bû. Rêya wan bi ser deryayê de şikandibû, di qiraxê avê re diçûn. Bi wî hawayî, mehekê sax meşîyan; çol û beyar derbas kirin, çiya û deşt û newal li pey xwe hiştin.

Roja sî û yekê toz û ecacek li wan rabû, erd û asîman girt û her der tarî bû. Hesen baş lê nêrî, zerbûnekê bala wî kişand. Qîjewîj û dengên ecêb jî dihatin, ji derdorê. Pîra Şewahî li Hesen zivirî û jê re got: Kurê min, ev leşkerên Weqwaqê ne, va ye gihîştin me û wê niha me bigirin û derdest bikin. Hesen got: Ez çi bikim dayêcan? Pîrê got: Darikê xwe li erdê bide! Hesen darikê xwe li erdê da, heft qral derketin hemberî wî, erda ber nigên wi maçî kirin, silav lê kirin û gotin: Metirse û xeman nexwe! Bêhna Hesen hat ber. Bi wê gotina wan. Li wan vegerand û got: We qenc û xweş kir, ey serkêşên

îfrît û cinan; roj roja we ye! Wan jî got: Tu û jina xwe, li gel zarokan û hemû kesên bi te re, herin ser çiyê û me û wan bi tenê bihêlin. Lewre em dizanin, ku hûn mafdar in û ew neheq in, li ser rêya şaş in, wê Xwedê me bi ser bixe.

Hesen, jina wî, herdu zarokên wan û pîrê ji hespan peya bûn, xwe dan çiyê û hespên xwe berdan.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 943'YAN

*Şehrezadê got:*

Piştre Şewqa Rastîyê bi herdu arteşên xwe, yên çepê û yên rastê ve hat û sef bi sef dora wan girtin. Di pey re herdu alî ketin pêxêla hev û herdu artêş mîna du çiyayan, mîna du behran li bin guhê hev ketin. Rivînên agir mîna lûtkeyên çiyayan bi asîmanan ketin, bilind bûn. Şêr û cengaweran meydan ji hev re xwendin. Tirsonek revîyan. Şingeşinga şûran, reqereqa rim û mertalan gihîşt asîmanê heftan û agir ji devê cinan pijiqî. Mala hev xera kirin, hetanî ku şev hat û tarî kete erdê. Wê çaxê herdu artêş ji hev qut bûn, navber dan şer û cengê. Ji hespên xwe peya bûn, agir dadan û bêhna xwe berdan.

Her heft qralên cinan hatin cem Hesen, erda ber nigên wî maçî kirin. Hesen jî bi wan ve rabû, hal û rewşa wan pirsî, spasîya wan kir û hêvîyên serkeftinê ji bo wan anî ziman û rewşa leşkerên Şewqa Rastîyê ji wan pirsî? Wan jî got: Zêdeyî sê rojan wê nikaribin xwe li ber me bigirin. Îro, em bi ser ketin, me du hezar leşkerên wan dîl girtin û bi hezaran jî kuştin. Bila dilê te aram be û qet xeman nexwe!

Piştre xatir jê xwestin û çûn cem leşkerên xwe. Bi wan re mijûl bûn. Hetanî sibehê agir dadan. Çawa ku roj derket û dinya ronî bû, ew jî li hespên xwe siwar bûn û ji hev re daketin meydana cengê. Şingeşing bi şûr û mertalan ket. Agir bi ser hev de barandin û mîna pêlên ava deryayê li hev qelibîn, şer û cenga wan zivirî agir û pêtan.

Şer bi wî hawayî berdewam kir, hetanî ku leşkerên Weqwaqê şikestin, ji hev belav bûn û têk çûn. Hinek ji wan revîyan, hinek hatin kuştin, ên mayîn jî tevlî keybanûya xwe Şewqa Rastîyê û hemû serkirdeyên xwe, hatin girtin.

Bi sibehê re her heft qralen cinan hatin cem Hesen û je re textekî ji mermerê neqişandî bi durr û cewheran vegirtin û ew li ser dan rûniştandin. Li kêleka wî jî textek ji jina wî Şewqa Birûskê re vegirtin, ku ji acê zêrkirî

bû. Yekî din jî ji pîra Şewahî re vegirtin. Piştre Şewqa Rastîyê û hemû êsîrên din pêşkêşî Hesen kirin. Şewqa Rastîyê jî mîna êsîrên din destgirêdayî bû û nigên wê di qeyd û zincîran de bûn.

Gava pîrê çav lê ket, pê de qîrîya û jê re got: Dêlika heram û zalim! Cezayê te ew e, ku mirov te bi terîya hespekî ve girêde û wî ber bi behrê ve bibezîne, hetanî çermê te di ser te re bê. Piştre jî laşê te bavêje ber du kûçiken birçî! Te çawa ew qas xerabî bi xwîşka xwe kir, li gel ku te dizanibû, ku ew bi emrê Xwedê zewicîye û tu xerabî nekirine. Lewre keşetî di Îslamê de nîn e û jin û mêr ji bo hev hatine xuliqandin!

Di wê navberê de pîra Şewahî qîr da û got: Hemû êsîran bikujin û kesî ji wan bernedin! Hesen rabû, ferman da û got: Hemû êsîran bikujin! Îcar gava Şewqa Birûske, xwîşka xwe di wî halî de dît, li ser wê girîya. Şewqa Rastîyê jê re got: Xwîşkê, ev kî ye, ku di welatê me de em êsîr girtine?

Ev tiştekî dûrî aqilan e! Ev mirovê ku navê wî Hesen e, em giş xistine destê xwe û bûye serdarê vî welatî gişî. Em û cinî û îfrît hemû têk birin!

Şewqa Birûskê jê re got: Ê ku ew bi ser xist, Xwedê bû û yê ku hûn têk birin û hûn êsîr xistin destê wî jî Xwedê bû û wî ev hemû jî bi xêra vî kumî û vî darikî kir! Di pey vê gotinê re jî, hemû serpêhatîya xwe ji xwîşka xwe re got. Çi bi serê wê û Hesen hatibû, çiqas zor û zehmetî kişandibûn, ji bo ku xwe bigihîne wê. Dûre jî axaftina xwe berdewam kir û got: Wele xwîşkê ne ev kar karên wî bûn û ne ev hêz hêza wî bû lê belê Xwedê pişta wî girt û destê wî xurt kir, heta ku ket welatê me û leşkerên we têk birin, hûn jî êsîr girtin. Bavê te, şahê mezin ê ku serdartîya hemû qralên cinan dikir jî, têk bir. Divê mirov heqê wî nexwe.

Şewqa Rastîyê got: Bi Xwedê tu rast dibêjî xwîşkêcan. Lê gelo vî zilamî ev hemû ji bo te kirin?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 944’AN

*Şehrezade got:*

Piştre Şewqa Birûskê ji xwîşka xwe re behsa bersiva pirsa wê kir, got: Belê xwîşkecan, ev mêranî, ev lehengî hemû ji bo min kirin. Xwezika te bizanîbûya bê mêrekî çiqasî durust û fedekar e! Hetanî sibehê jî herdu xwîşk bi hev re axivîn, kul û derdên xwe ji hev re gotin. Pîra Şewahî jî ew herdu

li hev anîn û bi derketina rojê re xwestin, ku herin. Xatir ji hev xwestin. Şewqa Birûskê jî xatir ji Şewqa Rastîyê xwest û Hesen darikê xwe li erdê xist. Her heft xizmetkarên wî, qralên cinan derketin holê, silav lê kirin û gotin: Spas ji Xwedê re ku hûn sax û selamet in. Gelo hûn çi ji me dixwazin vê gavê; bêjin, da ku di cî de em wî pêk bînin?

Hesen spasîya wan kir, xêr û xweşî ji wan re xwest û got: Ji me re du hespên zînkirî û baş amade bikin! Wan jî di cî de du hespên pir baş li cem wan danîn. Hesen li yekî siwar bû û kurekî xwe danî pêşîya xwe, jina wî jî li yê din siwar bû û kurê dîtirkê danî pêşîya xwe. Keybanû Şewqa Rastîyê û pîra Şewahî jî li hespên xwe siwar bûn û her kesî berê xwe da welatê xwe. Hesen û jina xwe bi hêla rastê ve çûn. Keybanû û pîrê jî bi hêla çepê ve çûn.

Hesen û jina xwe mehekê sax bi rê ve çûn. Piştî mehekê gihîştin serê bajarekî, ku derdora wî tijî darên fêkî û çem û av bûn. Li binîya daran sekinîn û ji hespên xwe peya bûn, li erdê rûniştin, xwestin ku bêhna xwe berdin. Lê hîna ku wisa ji xwe re diaxivîn, bala xwe danê, ku siwarin ber bi wan ve hatin! Hesen rabû ser xwe û li ser nigan. Ew pêşwazî kirin. Dît ku Hesûnê qral e, xwedîye axa kafûr e! Hesen çû destê wî û xêrhatina wî kir. Qral jî ji hespa xwe peya bû û li ser doşekê, li bin sîya wan daran li kêleka Hesen rûnişt û jê re got: Çavên te ronî bin, spas ji Xwedê re ku tu bi saxî û selametî li me vegerand! Qral pir pê kêfxweş bû û jê re got: Hesen, ka hela ji min re bibêje, bê çi bi serê te hat, di seransera vê rêwîtîya te ye dirêj de?

Hesen serpêhatîya xwe giş jê re got. Qral Hesûn matmayî ma li wê serpêhatîya wî û jê re got: Kurê min, hetanî roja îro, tu kes sax neçû û sax ji giravên Weqwaqê venegerîya, ji xeynî te. Rewşa te pir balkêş e û spas ji Xwedê re ku tu xelas kirî! Piştre qral Hesûn rabû ser xwe, li hespê xwe siwar bû û ji Hesen jî xwest ku siwar bibe û berê xwe dan bajêr. Hesen û jina xwe sê rojan li gel qral man. Di odeya mêvanan de têr xwarin, vexwarin û têra xwe jî îstirehet kirin. Piştre Hesen destûra çûnê ji qral xwest. Qral jî destûr dayê. Rabûn li hespên xwe siwar bûn, qral jî bi wan re meşîya û çû. Piştî meşa deh rojan, xatir ji hevdu xwestin. Qral vegerîya bajarê xwe û Hesen û jina xwe jî berî dan welatê xwe, rêya xwe berdewam kirin.

Piştî mehekê ji meşeke dûr û dirêj, xwe gihandin şikefteke pir mezin, ku zemînê wê ji paxir bû. Hesen ji jina xwe re got: Te ev şikeft nas kir? Wê got: Belê, min nas kir. Şêxekî bi navê Ebûrîş di vir de ye. Hesen got: Şêx Ebûrîş qencîyeke mezin bi min kiriye, ku ez qet ji bir nakim. Wî ez bi qral Hesûn dam naskirin. Di pey re bi hurgilî jê re behsa Ebûrîş kir. Hîna ku

wisa behsa wî dikir, bala xwe dayê, ku Ebûrîş ji şikeftê derket û ber bi wan ve hat. Hesen ji hespê xwe daket, destê wî maçî kir. Şêx jî xêrhatina wî kir, got, şikir ji Xwedê re ku tu bi saxî û selametî li min vegerandî. Bi hatina wî pir kêfxweş bû û ew bir, derbasî şikeftê kir. Li gel hev rûniştin. Hesen jê re behsa rêwîtîya xwe û tiştên ku hatibûn serê wî kir. Şêx jî pir pir behetî ma, li wan bûyerên ku li giravên Weqwaqê di serê wî de derbas bûbûn. Ji Hesen re got: Û te çawa jina xwe û herdu zarokên xwe xelas kirin?

Hesen çîroka darik û kumê efsûnî jê re got û nîşanî wî da. Şêx pir behetî ma û ji Hesen re got: Kurê min, nexwe ku ne ji vî kumî û vî darikî bûya, te nikarîbû jin û zarokên xwe xelas bikî?

Hesen got: Belê mîrzayê min, wisa ye.

Hîna ku ew wisa bi hev re diaxivîn, bala xwe danê, ku yek li derî dide! Şêx Ebûrîş çû, derîyê şikeftê vekir. Dît ku Ebdilqidûs li ber derî ye, li ser pişta fîlê xwe ye. Şêx Ebûrîş bi coş û kelecaneke mezin ew himbêz kir û bi xêrhatineke germ û hestiyar kêfxweşîya xwe nîşanî wî da. Ew jî derbasî hundir bû. Çawa ku Hesen çav lê ket, pê ve rabû, destên wî maçî kirin û xêrhatinek tê da. Ebdilqidûs jî bi dîtina wî pir kêfxweş bû û li halê wî pirsî.

Piştre Ebûrîş ji Hesen re got: Ka serpêhatîya xwe ji şêx Ebdilqidûs re bibêje, bi hurgilî û her tiştî jê re bibêje! Hesen, serpêhatîya xwe ji serî heta mijara kum û darik jê re got.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 945'AN

*Şehrezadê got*:

Gava ku Hesen gihîşt meseleya kum û darik, Şêx Ebdilqidûs ji Hesen re got: Kurê min, va ye te jin û zarokên xwe xelas kirin û tu pêdivîya te bi wan nema. Me jî qencî bi te kir, me tu gihandî giravên Weqwaqê, ji bo xatirê keça birayê me. De êdî tu jî qencîyekê bi me bike û vî darikî bide min, vî kumî jî bide şêx Ebûrîş!!

Gava Hesen ev gotin ji devê şêx Ebdilqidûs bihîstin, serê xwe bera ber xwe da û ket ber fedîyê, zimanê wî negerîya ku bêje ez nadin we. Di dilê xwe de jî xwe re got; "Van herdu kalan qencîyeke pir mezin bi min re kirin û ew bûn sebeb, ku min xwe gihand giravên Weqwaqê û min jina xwe û herdu zarokên xwe xelas kirin. Jixwe ne ji wan bûya, min ev darik û ev kum jî bi dest nedixist!"

Hesen serê xwe rakir û got: Belê şêxê min ez ê vî kumî û vî darikî bidim we lê ez ji şahe gewre, bavê jina min ditirsim, ez ditirsim, ku ew bi leşker û artêşa xwe were welatê me û min bikuje. Lewre, ne bi vî darikî be, ez nikarim li ber xwe bidim û xwe ji wan biparêzim.

Şêx Ebdilqidûs ji Hesen re got: Metirse kurê min, di vê mijarê de em ê casûsekî ji bo te peywirdar bikin, da ku te ji hemû êrîşên bavê jina te biparêze. Qet metirse, dilaram be û bila kêfa te li cî be!

Hesen ket ber fedîyê. Kum da şêx Ebûrîş û ji Ebdilqidûs re got: Bi min re were hetanî welatê me, li wir ez ê vî darikî jî bidime te! Herdu şêx gelekî kêfxweş bûn, bi wê pêşketinê. Gelek zêr û zîv û cewher û yaqut, ji bo Hesen amade kirin. Ew sê rojan bi mêvanî li cem xwe girtin û gelekî qedr û qîmeta wî girtin. Piştî sê rojan, Hesen destûra çûna xwe ji wan xwest. Şêx Ebdilqidûs, ji bo rêwîtîyê xwe amade kir. Hesen û jina xwe, li hespên xwe siwar bûn, zarokên xwe danîn pêşîya xwe. Şêx Ebdilqidûs jî fîkand û fîlê wî yê mîna ecêbekî, di cî de hat li ber wê sekinî. Ew jî lê siwar bû, da pêşîya Hesen û jina wî û ketin rê. Ebûrîş jî vegerîya şikefta xwe.

Şêx Ebdilqidûs ji wan re bûbû rêzan. Rê û reçên baş nîşanî wan dida, bi leza ba û birûskê diyar û çiya û deşt û zozan li pey xwe dihiştin û diçûn, bêyî ku biwestin. Gava ku nêzî welatê xwe bûn, Hesen pir dilşad û kêfxweş bû, ku piştî ew qas bobelat, ew û jina xwe, li gel herdu kurên xwe yên biçûk, bi saxî û selametî vegerîyabû malê. Ji bo vê yekê spasîya Xwedayê xwe kir!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 946'AN

*Şehrezadê got*:

Hîna ku Hesen ji xwe re wisa dihizirî, qubeya kesk û fiskiya wê û qesra zeytûnî jê ve xuya kir. Şêx Ebdilqidûs got: Hesen ez mizgînîyê didim te, ku tu yê îşev bibî mêvanê birazîkên min û tu yê xwîşka xwe bibînî! Hesen jî, jina wî jî, pir kêfxweş bûn bi wê mizgînîyê. Li hinda qubeya kesk daketin, bêhna xwe vedan, xwarin, vexwarin û piştre dîsa siwar bûn û rêya xwe berdewam kirin, hetanî ku gihîştin hinda qesrê. Dema gihîştin wir, keçên birayê Ebdilqidûs bi wan ve daketin, bi germahî ew pêşwazî kirin, xêrhatina wan kirin. Wan jî silav li wan kir, hal û wextê wan pirsîn.

Şêx Ebdilqidûs ji keçên birayê xwe re got: Birazîkno, va min daxwaza we pêk anî, Hesen gihand jina wî û ew dîsa li we vegerandin!

Keçik hemû pê ve rabûn, Hesen ramûsan, ew pîroz kirin û ji ber gihîştina jin û zarokên wî kêfxweşîya xwe anîn ziman. Ew roj li cem wan bû mîna roja cejnê, hemû tev de, pir kêfxweş bûn.

Keça biçûk, xwîşka Hesen dîsa çû cem wî, ew himbêz kir û kûrekûr pê ket, girîya ji kêfan. Hesen jî pê re girîya û hesreta bêrîkirina xwe bi himbêzkirineke din şikandin. Dûre xwîşka wî gilî û gazincên xwe jê kirin, êş û jana fîraqê anî ziman û got:

piştî çûna te fîraqê her ez kuştim
bêrî û hesretê jî her ez biriştim
di xewna min de tu bû tim tim
di nava mijangan de tu bû her tim

Hesen jê re got: Xwîşkêcan, di vê mijarê de ji her kesî bêtir, ez spasîya te dikim. Lewre heger ne ji te bûya, ez av û av çûbûm! Piştre Hesen çîroka rêwîtîya xwe bi hurgilî jê re got, ji serî hetanî binî. Gava gihîşt meseleya darik û kum, pê de çû û got: Şêx Ebûrîş û şêx Ebdilqidûs ew ji min xwestin, min jî da wan û bersiva qencîya ku bi min kiribûn, da. Lewre ew layiqî qencîyeke wisan e.

Xwîşka wî jî spasîya xwe jê re anî ziman, ji ber wê helwesta wî û pir pê kêfxweş bû. Hesen got: Bi Xwedê ez tu carî wê qencîya ku te bi min re kiriye, ji bîr nakim! Xwîşka wî, li jina wî Şêwqa Birûske zivirî, ew himbêz kir, zarokên wê maçî kirin û jêre got: Ey keça şahê mezin; qey rehm di dilê te de tune bû, ku te ew û zarokên wî ji hev qut kirin û te hişt, ku dil û cegerên wî li ser wan bişewitin; qey te mirina wî dixwest? Şewqa Birûskê bersiva wê neda. Xwîşka Hesen berdewam kir û got: Kesê/a ku xelkê bixapîne, Xwedê jî wê/î dixapîne!

Hesen deh rojan li cem xwîşkên xwe ma, di nava qedr û qîmeteke mezin de. xwarinên xweş xwarin, şerabên xweş vexwarin, kêf û laqirdî bi hev re kirin û piştî wan deh rojan, careke din xwe ji bo rêwîtîyê amade kir. Xwîşkên wî pê ve rabûn, çi pêdivîyên wî û jina wî hebûn, jê re hazir kirin. Diyarîyên zêr û zîv û cewher dan wan, ew himbêz kirin û xatir ji hev xwestin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 947'AN

*Şehrezadê got*:

Piştî ku xatir ji hev xwestin, Hesen, darikê efsûnê da şêx Ebdilqidûs. Wî jî spasîya wî kir û bi wê diyarîya wî pir kêfxweş bû. Hesen û jina xwe siwar bûn, tevlî herdu zarokên xwe ketin rê. Xwîşkên wî jî hetanî derekê pê re çûn, dûre ew bi rê kirin û ew bi şûn de vegerîyan malê.

Hesen û jina xwe, gelek çol û çolistan, çiya û daristan derbas kirin, piştî rêwîtîya du mehan, xwe gîhandin Bexdayê, mala aştiyê. Hat ber mala xwe û ji alîyê deştê ve li derî da. Diya wî ya ku piştî çûna wî xew lê herimîbû, şev û roj bi girî û fîxan bû, ne nan dixwar ne av vedixwar ne jî kêlîyeke rehetiyê didît, timî di nava êş û jana dil û hinavên xwe de vedigevizî. Nexweş ketibû, bêhêvî bûbû, qet texmîn nedikir, ku kurê wê vegere.

Loma dengê lêdana derî neçûyê û wê jî xwendina helbestên xwe berdewam kir. Hesenê ku li wî alîyê derî bû, dengê diya xwe bihîst û dît ku dibêje:

> hûn bi qedrê Xwedê kin li nexweşê xwe binêrin
> laşê wî hezhizîye dilşikestî ye wî tîmar kin
> heger we xêr û qencîyek pê kir ew jî baş e
> qencîyên hezkirîyan mirov her zindî dikin

Hesen gazî wê kir û ji wî alîyê derî ve got: Dayêcan, va qederê destûr da me, ku em careke din bigihîjin hev! Diya wî dengê wî bihîst û ew nas kir lê dîsa jî bawer nedikir, ku kurê wê be. Di erênayê de berê xwe da derî û çû ew vekir. Çawa derî vekir, dît ku kurê wê, li gel jina xwe û herdu zarokan li ber derî sekinîye! Ji kêfan qîrek da û li erdê ket, ji ser hişê xwe çû. Hesen pê re mijûl bû, heta ku dîsa bi ser xwe ve hat û ew himbêz kir û girîya.

Piştre Hesen gazî xulam û bendeyên xwe kir, ji bo ku barên zêr û zîv û diyarîyên giranbuha derbasî hundir bikin. Wan jî hemû anîn hundir. Jina wî jî hat hundir. Diya wî ji ber rabû, ew himbêz kir, destpêkê serê wê, piştre jî nigên wê maçî kir û jê re got: Ey keça şahê gewre, heger min şaşîtîyek di heqê te de kiribe, di hizûra Xwedayê dilovan de, ez lêborîna xwe dixwazim!

Piştre li kurê xwe zivirî û ji wî re jî got: Kurê min, sebeba vê derengketina te çi bû?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 948'AN

*Şehrezadê got*:

Gava diya wî ew pirs jê kir, Hesen serpêha tîya xwe ji serî heta binî jê re got. Çawa ku diya wî ew çîroka wî bihîst, qîrek da û got rep û li erdê ket, ji ser hişê xwe çû, ji ber wê êşa ku kurê wê kişandibû.

Hesen av li rûyê wê reşand û pê re mijûl bû, heta ku careke din bi ser hişê xwe ve hat. Gava şiyar bû û bi ser xwe ve hat, ji Hesen re got: Kurê min, te şaşîtîyeke mezin kiriye, bi dana wî darik û wî kumî. Heger te ew di destê xwe de bigirtîna, te yê ev erda hanê giş bi dirêjahî û pehnahîya wê bixista destê xwe. Lê dîsa jî şikir ji Xwedê re ku tu û jin û zarokên xwe, bi saxî û selametî li me vegerîyane!

Hesen û jina xwe, li gel dayika xwe û zarokên xwe Nasir û Mensûr şeveke xweş û bextewar derbas kirin. Roja din sibehê, Hesen rabû ser xwe, kincên xwe guhertin, qatek cilên nû û giranbuha li xwe kir û daket sûkê. Ji xwe re bende, qerwaş, caw, ber, xeml, doşek û lihêf, firaxên xwarin û vexwarinê yên giranbuha, ku di mala şah û qralan de jî peyde nedibûn, kirîn. Piştre çû malê, erd, bax û baxçe kirîn û ew û zarokên xwe, ew jin û diya xwe, di nava xweşî û şahîyê de jîyan. Her dem xwarin û vexwarina herî xweş li ber wan bû. Di nava kêf û zewq û sefayê de bûn, hetanî ku xerabkarê zewq û şahîyê bi ser wan de hat û ew ji hev belav kirin. Subhan ji wî re ku hemû tişt di destê wî de ye! Her kes dimire, ew tenê her sax û zindî ye!

*Şehrezad hebekî bêdeng bû, piştre axaftina xwe berdewam kir, got:*

## ÇÎROKA MARÛFÊ KOŞKAR

Şahînşahê min ê gewre û bextewar! Tê gotin, ku li bajarê Misrê mirovekî koşkar hebû. Navê wî Marûf bû. Çaroxên kevn pîne dikirin û debara xwe pê dikir. Jineke wî hebû, navê wê Fatma bû. Lê xelkê jê re digot, "şûmê" ji ber ku jineke no û şerûd bû. Ne sinc pê re hebû ne fedî û serdestî mêrê xwe bû. Her roj, deh caran sixêf jê re didan, bi sed caran jî lanet lê dibarandin. Marûf jî pir ji şerê wê ditirsîya, ji ber ku ew mirovekî hişmend, binamûs û fedîkoyî bû. Lê belê di heman demê de jar û feqîr bû. Çi qezenc bikira, li ser wê xerc dikir. Gava ku tiştek bi dest nexista jî, rehetî jê re nedihişt û jîyana wî lê dikir jehr, çawa ku helbestkar jî dibêje:

min çend şev derbas kirin bi eyşê re
hemû giş di rewşeke pir xerab de
xwezî di şeveke me ya razanê de
min ew jehr bikira û xelas bûma ji wê

Rojekê jina Marûf jêre got: Ez dixwazim ku tu îşev ji min re kunafeya bi hunguvê mêşa bînî! Marûf got: Heger Xwedê bêje erê û kar ji min re derkeve, ez ê ji te re bînim, lewre niha tu dirav di berîka min de tune ne! Fatê got: Ez mehneyan qebûl nakim!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞÊVA 949'AN

*Şehrezadê got*:

Jina Marûf mehneyên wî qebûl nekir û jê re got: Heger tu êvarê bê kunafe werî, ez ê şevê li te bikim dojeh û bihêlim, ku tu li çêbûna xwe poşman bibî!

Marûf got: Xwedê mezin e û ji malê derket.

Marûf berê xwe da dikana xwe lê kul û xem jê dinisilîn. Nimêja sibehê kir, piştre dikana xwe vekir û got: Xwedêyo ez ji te dixwazim û tika dikim, ku tu îro bi qasî heqê kunafeyê rizq ji min re bişînî û tu beleya vê dêlika jina min, ji ser min bidî alî!

Li dikana xwe rûnişt, lavelav ji Xweda kir lê dîsa jî nîvro bi ser de hat û hîna kesî serî li dikana wî nedabû. Tirsa jina wî lê zêde bû, nema xwe girt. Rabû dikana xwe girt. Lê nizanîbû wê ji ber derdê kunafeyê bi ku ve here. Halbûkî nikarîbû gepek nanê tisî bibira malê.

Çû, rêya xwe bi dikana kunafeyê xist, bi şaşwazî li ber sekinî, devê wî ji hev ma û çavên wî tijî hêsir bûn. Rewşa wî bala kunafecî jî kişand, jê re got: Hoste Marûf xêr e, çima tu digirî? Marûf, derdê xwe jê re rave kir û çîroka xwe jê re got û pê de çû: Jina min a zalim kunafe ji min xwestiye. Ez jî ji sibê hetanî nîvroyê di dikanê de mam, kesî serî li min neda û min heqê nanê xwe jî dernexist. Niha jî tirsa wê di dilê min de ye!

Kunafecî kenîya û jê re got: Tişt nabe camêr, tu çend ritilan dixwazî? Marûf got: Pênc ritilan. Kunafecî got: Baş e, rûn jî heye, hunguvê zilan jî heye û ew ji hunguvê mêşan xweştir e! Marûf fedî kir, ku bêje nabe, got: Temam, ka bila bi hunguvê zilan be.

Kunafecî kunafe di rûn de qeland û ew di hunguvê zilan de kir û ew amade kir. Êdî ji bo qralan jî guncan bû. Kunafecî ji Marûf re got: Bêguman pêdivîya te bi nan û pêxwarineke sivik jî heye? Marûf got: Belê. Kunafecî bi buhayê çar nîvan nan û penêr jî dayê û jê re got: Binêre hoste, ev hemû pazdeh nîvan digirin, bila bi deyn li te bin. Here cem jina xwe û hetanî dû rojan, sê rojan bêhna xwe fireh bike, kengî Xwedê rizqek ji te re şand, bide!

Marûf rahişt kunafe, nan û penêrê xwe û bi dilekî xweş ji cem dikandar derket, berê xwe da malê û di ber xwe de got: Xwedêyo tu çiqasî comer dî. Çû, derbasî cem jina xwe bû, kunafe danî ber wê; jinike jê re got: Min ji te re negot bila bi hunguvê mêşan be? Çawa tu li hember min derdikevî û tu ya bi hunguvê zilan tînî?

Marûf lêborîna xwe jê xwest û got: Jixwe incex min ew jî bi deyn anîye. Jina wî hêrs bû: Ev gotineke vala ye û ger ne bi hunguvê mêşan be, ez vê kunafeyê naxwim! Bi ser de çû, li ser çavên wî da û jê re got: Rabe kotîyo, rabe û here ji min re kunafeyeke din bîne!

Ew gotin got û pihînek li çena wî xist, diranekî wî anî xwarê. Xwîn bi ser singê wî de herikand. Marûf jî pir qehirî û xwe negirt, tepikek li serê wê da. Lê pir bi hêdî bû. Fatê bi rîhê wî girt, ew kişkişand û qîrîya, kir hawar û gazî, got: Misilmanino hawar!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 950'YÎ

*Şehrezadê got*:

Bi gazî û hewara Fatê re, cîran bi wan ve hatin û rîhê Marûf ji nav lepên wê xelas kirin. Lome lê kirin û gotin: Em hemû kunafeya bi hunguvê zilan dixwin, çima tu serê xwe li vî feqîrî mezin dikî, ma ne eyb û fedî ye ji te re! Pir li ber wê gerîyan, hetanî ku ew haş kirin û ew bi mêrê wê re li hev anîn.

Lê belê piştî cîranên wan ji malê derketin, çûn, Fatê sond xwar, ku tiştekî ji wê kunafeyê nexwe. Marûf jî ji birçînan kazekaz bi nava wî ketibû. Di dilê xwe de ji xwe re got: "Madem wê sond xwar, ku nexwe, wê çaxê ez ji xwe re bixwim!"

Gava jina wî dît ku Marûf kunafeyê dixwe, jê re got: Înşelah wê bibe jehr û bikeve zikê te!" Marûf lê vegerand û got: Wisa nabe! Piştre kenîya, xwarina xwe berdewam kir û pê de çû, got: Te sond xwariye, ku tu ji vê ku-

nafeyê nexwî, înşelah ez ê sibê êvarê kunafeyeke bi hunguvê mêşan ji te re bînim. Wê çaxê tu jî bi tenê bixwe!

Marûf pir li ber gerîya, ji bo ku dilê wê xweş bike lê jina wî hey nifir lê kirin û sixêf jê re dan, hetanî sibehê. Gava bû sibe jî, Fatê zend û bendên xwe hildan, ji bo ku lêbide. Marûf jê re got: Moletekê bidî min, ez ê kunafeyeke din ji te re bînim! Û rabû di derî re derket, çû mizgeftê. Nimêja xwe ya sibehê kir û berî da dikanê.

Dikana xwe vekir û lê rûnişt, bi hêvîya ku qismetek were ber destê wî. Lê hîna keysa xwe xweş nekiribû, du qasidên qadî hatin cem wî û jê re gotin: Rabe, qadî gazî te dike! Marûf got: Ew çima? Qasidan gotin: Jina te di filan mijarê de gilîyê te li cem wî kiriye. Marûf têgihîşt û got: Xwedê beleya xwe bidê! Piştre rabû, bi wan re çû cem qadî. Derbasî hundir bû. Dît ku jina wî li wir e û bi paçekî ku dilopên xwînê li ser in, destê xwe girêdaye û di ber xwe de digirî, hêsirên xwe paqij dike.

Qadî jê re got: Camêr qey tu ji Xwedê natirsî, ku te li vê jinê daye, te destê wê şikandiye û diranekî wê weşandiye; te ew xistiye vê rewşa xerab? Marûf li qadî vegerand û got: Heger min lê dabe û destekî wê şikandibe, diranekî wê xistibe, tu çi hukmî li min dibirî, bibîre. Çîroka rastîn jî weha weha ye, cîranan em li hev anîn.

Qadî jî mirovekî xwedîxêr bû, ribek dînar ji berîka xwe derxist, dirêjî Marûf kir û jê re got: Vîna bigire û here kunafeyê jê re bikire, bila ji ya bi hunguvê mêşan be û êdî li hev werin!

Marûf got: dirav bide wê! Qadî riba dînarî da Fatê, wê jî girt û herdu li hev hatin. Qadî got: Jinê bi ya mêrê xwe bike! Li Marûf jî zivirî û jê re got: Û pê re dilovan be hebekî!

Herdu lihevhatî ji cem qadî derketin. Her yek ji wan bi rêya xwe de çû. Jinik bi alîyê sûkê de, marûf jî vegerîya dikana xwe. Rûnişt bi hêvîya ku rizqê wî bê ber destê wî lê hîna ku ew wisa dihizirî, bala xwe dayê, ku ew herdu qasidên qadî hatin cem wî û jê re dibêjin: Kanî heqê çûn û hatina me!

Marûf got: Qadî tu ceza li min nebirîye û tiştek ji min nestendiye, heta ku ez destheqê we bidim we. Berevajî wê, qadî bi xwe ribik dînar da min! Qasidan gotin: Qadî tiştek dabe te nedabê te, ji bo me ne girîng e. Heger tu heqê me nedî, em ê bi zorê ji te bistînin!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 951'Ê

*Şehrezadê ji Şehreyarê gewre re got*:

Herdu qasidan koşkar bi dû xwe de circirandin sûkê, ew jî mecbûr ma, ku amûrên xebata xwe bifiroşe û nîvdînarî bide wan, da ku xwe ji nav lepên wan xelas bike.

Marûfê koşkar vegerîya dikana xwe, destê xwe da ber rûkê xwe û xemgîn xemgîn rûnişt. Xebat bihata ber destê wî jî, nema dikaribû bixebite, ji ber ku amûrên xebatê firotibûn.

Hîna ku ew di wî halî de bû, bala xwe dayê, ku du zilamên sik û lefçil derbasî dikana wî bûn û jê re gotin: Ka rabe, were bi qadî re biaxive, jina te gilîyê te li cem wî kiriye! Marûf ji wan re got: Jixwe niha qadî, em li hev anîn! Herdu zilaman got: Em ji qadîyekî din tên; jina te, gilîyê te li cem qadîyê me kiriye!

Marûfê koşkar rabû, bi wan re çû. Texmîn dikir jina wî çi kiriye. Gava li wir lê rast hat, jê re got: Qaşo em li hev hatibûn, keça camêran? Fatimê got: Di neqeba min û te de lihevhatin rabûye. Were cem qadî bersiva xwe bide! Marûf, ber bi qadî ve çû, çîroka xwe jê re dûbare kir û got: Filan qadî, di filan saetê de em li hev anîne.

Qadî li Fatê vegerîya û jê re got: Keça camêran, madem ku hun li hev hatine, çima tu dîsa li cem min gilîyê wî dikî? Fatê got: Piştî wê lihevhatinê, wî dîsa li min xist. Qadî got: Nexwe dîsa li hev werin û tu nema lêbidê, tu jî li hemberî wî ranebî!

Li hev hatin. Qadî ji Marûf re got: Heqê qasidan bide wan!

Marûf heqê wan da wan û berê xwe da dikana xwe. Derî vekir, derbasî hundir bû û mîna serxweşan rûnişt. Tiştê ku ew serxweş, xistibû jî ne mey û hişbir bû, kul û derdên wî bûn.

Hîna ku ew di wî halî de bû, zilamek derbasî cem wî bû û jê re got: Marûf hoste, rabe û were em herin cem walî, jina te gilîyê te kiriye! Marûf rabû ser xwe, dikana xwe girt û ber bi derîyê Ennasr ve revîya, çû. Ji wan diravên ku amûrên xwe pê firotibûn, hîna pênc nîv zîv di berîkê de mabûn. Bi çar nîvan, nan û bi nîvekî jî penêr kirî û ji ber jina xwe revîya, çû. Vêca wê çaxê dinya zivistan bû û hewa sar bû, ber esir bû. Çawa ku ji nav Keymanê derket, baranê lêda, mîna ku kun di asîmanan de vebûbin, av dihat xwarê. Kincên wî hemû şilopilo bûn. Derbasî Adilîyyeyê bû û li wê derê, xwe da

cihekî xerabe û kavil, ku ne derî li ber hebû, ne jî şibake. Ji bo ku xwe ji baranê bisitirîne, xwe da ber wî Kavilî. Dilşikestî û xemgîn bû, hêsir ji çavan dihatin xwarê, pir bêçare bû û nizanibû wê bi ku ve here. Bênavber ji xwe re digot: Ez bi ku ve herim, birevim ku derê, ji bo ku ez ji vê jinikê xelas bibim? Ya Rebî tu bi qedrê qencên xwe kî, rêya welatekî dûr nîşanî min bide, ji bo ku ez ji vê pîrhebokê xelas bibim!

Hîna ku ew wisa bi halê xwe de digirîya, dîwarê raserî wî qelişî û kesekî pir dirêj mîna dêwekî jê derket, ku dirûvekî ecêb li ser wî bû. Ji Marûf re got: Camêro ev çi ye, te îşev ez xistim qelaqê! Ji berîya dused salan ve ez di vir de me, min nedîtiye, ku yekî din mîna te derbasî vir bûbe û weke te tevgerîyabe! Kanî ji min re bibêje, bê derdê te çi ye, daxwaza te çi ye; ez ê ji te re pêk bînim? Dilê min gelekî bi te dişewite.

Marûf jê pirsî û got: Tu kî yî? Wî got: Ez avakarê vê derê me. Marûf, çîroka serpêhatîya xwe ji serî hetanî binî jê re got. Zilam jê pirsî: Û tu dixwazî ez te bibim welatekî ku jina te rêya wî nebîne û bi ser venebe? Marûf got: Belê. Wî jî got: Nexwe li pişta min siwar bibe! Marûf li pişta wî siwar bû. Zilam jî ji wî wextê eşayê hetanî şeveqê firîya, çû, ew li ser serê çiyayekî danî.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 952'YAN

*Şehrezadê got*:

Ê cinî Marûfê Koşkar li serê çiyayekî danî û jê re got: Xwe berjêr berde, tu yê bajarekî bibînî, here wî bajarî, jina te tu car bi ser te venabe!

Ê cinî gotina xwe got û Marûf li wir hişt û çû. Marûf jî di cihê xwe de behetî ma û xwe tevneda, hetanî ku ro derket û dinya ronî bû. Di dilê xwe de ji xwe re got: "A baş ew e, ku ez rabim, dakevim jêrê, tu encam ji rûniştina min a vê derê dernakeve!"

Xwe li serê çiyê, berjêr berda. Gava daket binîya çiyê, bajarekî di nava sûrên bilind de jê ve xuya kir, ku hemû qesr û qonaxên bilind û xemilandî bûn. Weke cihê seyran û temaşegehê bû. Di derîyê bajêr re derbasî hundir bû. Bala xwe dayê, ku bajarekî pir spehî ye û bêhna mirov lê derdikeve. Berê xwe da nav sûka bajêr. Di ku re diçû, bajarîyan bi baldarî lê dinêrîn, ji ber ku kincin cuda lê bûn, ne dişibîyan ên wan. Zilamekî jê pirsî, got: Xuya ye, ku tu xerîbê vê derê yî? Marûf got: Rast e. Zilam got: Tu ji kîjan bajarî yî?

Marûf got: Ez ji bajarê Misra bextewar im. Zilam qîrîya û ji derdora xwe re got: Xelkino werin li vî mirovî binêrin û lê guhdar bikin, bê çi dibêje? Xelkên ku lê kom bûbûn, pirsîn: Çi dibêje? Zilam got: Dibeje ez ji Misrê me û xwedêgiravî ez duh jê derketime?

Xelkên derdorê hemû kenîyan, li Marûf kom bûn û jê re gotin: Camêr, qey tu dîn bûyî, ku tu van gotinan dibêjî? Tu çawa angaşt dikî, ku êvara borî tu ji Misrê derketiyî û niha jî gihayî vir? Qey tu nizanî ku neqeba me û Misrê meşa salekê ye? Marûf got: Ê dîn hûn in, ez ji we re rast dibêjim û va ye nanê Misrê bi min re ye û hîna jî teze ye û nanê xwe nîşanî wan da. Mirovan jî rahiştin nan û lê nêrîn û behetî man, lewre ew nan nedişibîya nanê welatê wan. Hinekên din jî li wan kom bûn lê nêrîn û di nava xwe de gotin: Ev nanê Misrê ye!

Çîroka wî di cî de li nava bajêr belav bû. Hinekan gotin, derewan dike, hinekan jî gotin rast dibêje, hinekan jî tinazên xwe pê kirin. Hîna ku ew di wê rewşê de bûn, tacirekî ku li hespekî siwar bû û du bende li dû wî bûn, hat cem wan. Mirovan xwe ji pêşîya wî dan alî û ji wan re got: Qey hûn fedî nakin, hûn li dora vî xerîbî kom bûne û hûn henekên xwe pê dikin? Çi têkilîya we pê re heye? Bi wan de xeyidî û erza wan şikand, heta ku ew ji wir dan alî. Piştre li Marûf vegerîya û jê re got: Were, birawo were, guh mede van sakûleyan, fedî û eyb bi wan re tune ye!

Tacir Marûf da tengala xwe û ew bir, derbasî maleke xweş û fireh kir û ew li ser textekî mîna yê şahan da rûniştandin. Dûre fermanek da bendeyan, ew jî çûn, sindoqek vekirin, qatek kincên giranbuha jê derxistin û anîn li wî kirin. Marûfê lihevhatî û xwedî bejn û bala lewendî, di nava wan kincan de mîna şahbenderê bazirganan xuya dikir!

Xwedîyê malê, ji xulam û bendeyan xwest ku sifreya xwarinê ji wan re raxin. Xwarin û vexwarinên cur bi cur û pir xweş li ber wan rêz kirin, wan jî têra xwe xwar û vexwar. Piştre mazûbanê Marûf jê re got: Navê te çi ye birawo? Got: Marûf e û ez mirovekî koşkar im, çaroxan pîne dikim. Mazûban got: Tu ji kîjan welatî yî gelo? Marûf got: Ez ji Misrê me. Mazûban got: Ji kîjan taxê? Marûf got: Qey tu Misrê nas dikî? Mazûban got: Ez ji Misrê me! Marûf got: Ez ji Kolana Sor im! Mazûban got: Tu kê ji wir nas dikî?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 953'YAN

*Şehrezadê got*:

Gava mazûbanê wî ew pirs jê kir, Marûf got: Ez filankes û filankes nas dikim û navê gelek kesan jê re hejmart. Mazûban got: Tu Ehmedê etar nas dikî? Marûf got: Cîranê me ye û dîwarê wî bi dîwarê me ve ye. Mazûban got: Gelo ew hîna sax e? Marûf got: Belê. Mazûban got: Çend zarokên wî hene? Marûf got: Sisê ne; Mistefa, Mihemed û Elî. Mazûban got: Gelo çi bi zarokên wî hat?

Marûf got: Mistafa sax e û mamosteyekî zana ye, fêrkarîyê dike. Mihemed jî Etar e, dikanek li kêleka ya bavê xwe vekiriye. Zewicîye û kurekî wî çêbûye, navê wî kirine Hesen. Mazûban got: Xwedê xêrê bide te, ji bo vê mizgînîya xêrê! Marûf berdewam kir: Elî jî hevalê min ê zaroktiyê bû, em timî bi hev re dileyîstin. Me xwe dixist qiliqê zarokên krîstiyanan, em diçûn, diketin dêrê, me pirtûkên filehan didizîn û me ew dibirin, difirotin û diravên wan ji xwe re xerc dikirin. Carekê fileh bi me hesîyan û em tevlî pirtûkên dizîyê girtin û çûn gilîyê me li cem dê û bavên me kirin û ji wan re gotin: Heger hûn pêşîya zarokên xwe negirin, em ê gilîyê we li cem qral bikin. Vêca bavê wî jî ji bo xatirê wan ew girt û ew bir daliqand û lêda. Ew jî ji wê rojê ve revîya çû, qet nema hat. Bîst sal di ser çûna wî re derbas bûne, hîna kesî tu agahî jê negirtiye!

Mazûbanê Marûf, lê nêrî û got: Ew Elîyê kurê şêx Ehmedê etar ez im û tu jî hevalê min ê zaroktiyê Marûf î!

Ji nû ve silaveke germ dan hev û hevdu himbêz kirin. Piştre Elî jê re got: Marûf kanî sebeba hatina te ya vê derê çi ye? Marûf jê re behsa cirnexweşîya jina xwe û şerûdîya wê kir û tiştên ku bi serê wî de anîbûn, hemû jê re gotin. Piştre jî berdewam kir û pê de çû, got: Gava tehdehîya wê li min pir bû, ez di alîyê derîyê Ennasr re revîyam. Bi rê de baranê li min kir. Ez jî derbasî nav kavilên Adilîyyeyê bûm. Min xwe da bin kavilekî xerabe û ez li ser bêşensîya xwe girîyam. Wê gavê cinek ji avakarê wê ji nav dîwarê qelişî derket û li rewşa min pirsî. Min jî jê re got. Wî jî ez li ser pişta xwe kirim û di neqeba erd û asîman de firîya û di nava şevekê de ez li ser vî çiyayê di ser bajêr re danîm û cihê bajêr nişanî min da û çû. Ez jî ji serê çiyê daketim, hatim bajar û mirov li min kom bûn, min ji wan re got: Duh, min ji Misirê da rê û îro ez gihîştim vir lê kesî ji min bawer nekir. Herî dawîyê tu hatî, te bera xelkê da û te ez anîm vê derê. Sebeba derketina min a ji Misrê ew bû lê ya te çi bû gelo?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 954'AN

*Şehrezadê got*:

Gava Marûf ew pirs ji Elî kir, Elî got: Hîna gava ez heft salî bûm, cirnexweşî û mekruhîya min hebû, ji wê çaxê ve jî ez digerîyam û ez ji bajarekî diçûm bajarekî din. Herî dawîyê jî ez hatim vî bajarî, ku jê re dibêjin Îxtiyan Elxiten. Min bala xwe dayê, ku xelkên wê mirovin comerd, dilovan xêrxwaz û alîkarên jar û perîşanan in, deynan didin mirov û ji gotinên mirov bawer dikin, ez jî li vir mam û min ji wan re got: Ez bazirgan im û ez li pêşîya barên xwe hatime. Ez cihekî, embareke ku ez barên xwe lê deynim, dixwazim. Wan jî ji min bawer kirin û cihek ji min re vala kirin. Piştre min ji wan re got: Gelo kesî ku hezar dînarî bi deyn bide min hetanî ku barên min tên, heye? Gava barên min bên ez ê deynê xwe bidim. Niha hinek dirav ji min re lazim in, loma pêdivîya min bi deynekî heye? Wan jî hezar dînar dan min û min berê xwe da sûkê. Min dît ku mal li sûkê heye. Min ew mal kirî û roja dîtirkê jî, min ew firot û min fêdeya pêncî dînarî jê kir. Piştre min malin dîtir kirîn û dîsa firotin. Êdî ez ketim nav wan. Min bi wan re da û stend, qedr û qîmet da wan, wan jî ji min hez kir û kirîn û firotina min zêdetir bû. Malê min jî pirtir bû. Vêca birayê min, çawa ku pêşîyên me jî gotine: "Dinyaya şer û hîleyan e, welatê ku kes tê de te nas neke, tu dikarî her tiştî bikî!" Divê tu jî rastîya xwe ji her kesî re nebêjî. Her yekî ku ji te bipirse û tu jî jê re bibêjî: "Ez koşkar im, ez hejar im, ez ji ber jina xwe revîyame, ez duh ji Misrê derketime." Hetanî ku tu li vir bî, jixwe dê tinazên xwe bi te bikin. Heger tu ji wan re bibêjî: "Cinekî ez li ser pişta xwe kirim, anîm vir." wê gavê jî dê dûrî te bikevin. Ji te nefret bikin, bibêjin ev zilamekî cinî ye. Tu nêzî kê bibî, wê zerarek bigihîje te û wê ev gotegota beyom bi te ve zeliqandî bimîne.

Marûf got: Nexwe ez çawa bikim?

Elî got: Ez ê ji te re bibêjim, bê tu yê çawa bikî. Sibê sibehê ez ê hezar dînarî bidim te. Hespekê jî ji bo ku tu lê siwar bibî û bendeyekî jî, ji bo ku bide pêşîya te, te bibe sûka bazirganan. Here nav wan. Jixwe ez ê jî di nava wan de bim. Ez çawa te bibînim, ez ê bi te ve rabim, xêrhatina te bikim, destê te ramûsim û qedrê te bigirim. Piştre jî ez ê pirsan ji te bikim. Çi gava min ji te re got, te filan cure caw jî anîye? Tu bêje, "Pir pir!" Gava ku wan jî tu ji min pirsîn, ez ê pir pesnê te ji wan re bidim û te li ber çavên wan mezin bikim û ez ê ji wan re bibêjim: Jê re dikanekê û embarekê veqetînin! Û ez ê ji wan re behsa malê te yê pir bikim. Heger feqîrek li te qesidî jî, hinek dirav

bide wî, ji bo ku bawerîya wan bi te bê û mezin bûna te bibînin. Piştre ez ê te û bazirganên mîna te biezimînim cem xwe û te bi wan bidim nasandin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 955'AN

*Şehrezadê got*:

Elî ji Marûfê koşkar re got: Ez te bi bazirganên bajêr re bidim naskirin, da ku tu jî bi wan re bidî û bistînî, bikirî û bifroşî û di demeke kurt de bibî xwedî mal û milk û nav û nîşan.

Roja din sibehê, hezar dînar da Marûf. Kincin nû û giranbuha lê kirin. Ew li hespekê siwar kir. Bendeyek jî dayê û jê re got: Bila ev hemû li te xweş helal bin. Lewre tu hevalê min î û divê ku ez qedr û qîmeta te bigirim. Tu jî aram be, dilê xwe xweş bike, xeman nexwe û wê çîroka jina xwe bi temamî ji bir bike û ji kesî re behsa wê neke.

Marûf got: Zor spas, Xwedê xêra te qebûl bike. Piştre hespê xwe ajot, da dû bendeyê xwe û çû sûka bazirganan. Gava gihîşt wir, dît ku hemû rûnîştî ne û hevalê zaroktîya wî Elî jî di nava wan de ye. Çawa Elî çav lê ket, xwe bi ser de avêt, destê wî maçî kir û jê re got: Rojbaş, bazirganê gewre Marûf, tu bi xêr û ser çavan hatî xêrkirê navdar û comerd! Piştre li bazirganên rûniştî zivirî û axaftina xwe berdewam kir, got: Bazirganên hêja, ev camêrê hêja, Marûfê bazirgan e, ka hûn jî silavekê lê bikin! Wan jî yeko yeko xêrhatina wî kirin. Piştre Elî ji wan re pesnê wî û maldarîya wî ya mezin da, got: Ev gewretirîn bazirganê van welatan û vê heremê ye. Tu kes mîna wi maldar tune ye, ji ber ku malê wî û bav û kalên wî di nav tacirên Misrê de baş tê naskirin, şirîkên wî li Hind û Sind û Yemenê hene. Di comerdîyê de tu kes weke wî nabe, pir destvekirî ye. De êdî qedr û qimeta wî zanibin, wî li ser serê xwe bigirin, xizmeta wî bikin û baş bizanin, ku hatina wî ya vê derê, ne ji bo bazirganîyê ye, tenê dixwaze alîkarîya xelkê bike û bibe derman ji kul û derdên wan re. Lewre tu pêdivîya wî bi qezenca ticaretake wisa biçûk, tune ye û diravên licem wî, agir jî nikare wan biqedîne û ez bi xwe jî xizmetkarekî wî me!

Elî, pesindana Marûf berdewam kir, hetanî ku hemû bazirganan jî ew pesnên wî di navbera xwe de parvekirin û wan jî ji hev û dinê re pesnê wî dan, ew kirin taca serê xwe. Piştre dest pê kirin, çûn li cem wî kom bûn, diyarî û Xelat dan wî. Heta ku şahbenderê bazirganan jî hat ba wî û Elî di

hizûra wî de ji Marûf pirsî û got: Mîrzayê min, gelo te hinek ji filan cawî jî bi xwe re neanîye? Wî jî lê vegerand û got: Belê, belê min ji wî cawî pir anîye!

Vêca wê rojê jî pêşêngeha caw û qumaşan bû. Elî jî ji berê ve ew fêrî hemû cawên buha û erzan kiribû. Bazirganekî jî jê pirsî, got: Mîrzayê min, gelo te cawêkî zer bi xwe re anîye? Marûf got: Pir pir! Bazirgan got: Te cawê sor ê weke xwîna xezalê jî anîye? Got: Pir pir! Êdî kê çi jê bipirsîya, wî digot: “Pir pir!” Wê demê bazirgan li Elî zivirî û jê re got: Ev hemşerîyê te ger bixwaze, dikare hezar barî ji cawên giranbuha rake, dîsa jî tiştek ji malê wî kêm nabe? Elî got: Dikare wisa bike û tiştek ji embarên wî kêm nabe!

Hîna ku wan wisa ji xwe re sohbet dikir, parsekek hat, li ber bazirganan gerîya, her yekî ji wan tiştek dayê; hinekan nîv zîv, hinekan çaryek, hinekan tiştek nedayê. Tenê gava çû destê xwe li ber Marûf vekir, Marûf çengek zêr xist destê wî, tijî kir. Hemû bazirgan lê ecêbmayî man û gotin: Şah û qral incex, zêran bê hejmar didin parsekan! Heger ev camêr ne ji malmezinan bûya û malekî mezin li ba wî tune bûya, wisa tevnedigerîya û çengek zêr nedida vî feqîrî!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 956’AN

*Şehrezadê got*:

Piştre jineke hejar a feqîr jî hat cem Marûfê koşkar û destê xwe li ber wî vekir. Marûf çengek zêr da wê jî. Jinik rabû, çû, jê re dua kirin û di nava feqîran de behsa wî kir. Feqîrên din jî bi ser wî de barîyan. Wî kesek destvala bi şûn de venegerand û kî hat cem wî, çengek zêr xist destê wî/ê, hetanî ku hezar dînarê xwe giş da wan. Dûre herdu destên xwe li hev xistin û got: Şikir ji Xwedê re, ji wekîlê hemû jar û feqîran re!”

Şahbenderê bazirganan jê re got: Çi qewimîye Marûf begê? Marûf got: Wisa xuya dike, ku mirovên vî bajarî bi giştî jar û feqîr in. Heger min wisa bizanibûya, min ê xurcika xwe tijî zêr bikira û ez ê wisa bihatama û min ê li ser wan belav bikira. Vêca ez ditirsim, ku mana min dirêj bike li vê xerîbîyê û zêr jî bi min re nemane. Heger jar û feqîr werin destê xwe li ber min vekin, ez ê çawa bikim? Lewre ne adetê min e, ku ez kesî destvala bi şûn de bişînim. Qaşo min digot, belkî hezar dînar têra min bike, heta ku karwanê malê min bê lê têrê nekir. Îcar ez ê çawa bikim gelo?

Bazirgan jê re got: Kul û xeman nexwe, mîrzayê min, ez ê pirsgirêkê çareser bikim! Di cî de xulamên xwe şandin, hezar dînar jê re anîn. Wî ew hezar dînar da Marûf. Marûf jî, feqîrên ku destê xwe li ber vekirin, destvala bi şûn de neşandin û hetanî nîvroyê bi çengan zêr li wan belav kirin.

Gava wextê nimêja nîvroyê hat, bi hev re çûn mizgeftê, nimêja xwe kirin û pê de, tiştê ku ji wî hezar dînarî pê re mabû, ew jî li ser serên nimêjkiran belav kir û reşand. Bi wê helwesta xwe bala her kesî kişand. Her kesî dua jê re kirin û behetî man li wê comerdî û xêrkiriya wî! Hemû bazirgan jî li wê comerdîya wî ecêbmayî man û bi heyrangorî lê nêrîn.

Marûf xwe bi ser bazirganekî din de tewand, heman tişt jê re got û hezar dînar ji wî jî stend û li ser xelkê belav kir. Elî bi xwe jî li wan helwestên wî dinêrî lê ne dikaribû biaxivîya û ne jî tiştek jê re bigota. Marûf jî wisa berdewam kir, heta ku esrê azan da. Bi azana esrê re, dîsa çû camîyê, nimêja xwe kir û tiştê ji hezar dînarî mabû, li ser xelkê belav kir.

Heta ku derîyê sûka bazirganan girtin, Marûf li ser jar û feqîran pênc hezar dînar belav kir. Her bazirganekî ku dînar bi deyn dabûnê jî, Marûf ji wan re gotibû gava karwanê malê min hat, tu caw bixwazî caw; tu dînar û zêr bixwazî ez ê dînar bidim te.

Êvarkî, bazirganekî ew û bazirganên din ezimandin cem xwe û Marûf di zikê civatê de da rûniştandin, wî jî tenê behsa caw û dînaran dikir. Kê kîjan cureyê caw jê bipirsîya, wî digot: “Li cem min gelek heye!” “Pir pir heye!”

Roja din dîsa çû sûka bazirganan û carê xwe bi ser yekî ji wan de tewand, hezar dînar jê stend û li ser feqîran belav kir, hetanî êvarê. Bîst rojan bi wî hawayî berdewam kir û di wan bîst rojan de şêst hezar dînar ji xelkê deyn kir. Lê ne karwanê wî hat û ne jî ew malê wî yê pir ê ji xelkê re behsa wî kiribû. Mirovên deyndêr tirsîyan, qelaq ket nava wan û ji hev re gotin: Ne karwanê Marûf hat ne jî malê wî. Gelo hetanî kengî wê diravan ji xelkê deyn bike û li ser jaran belav bike?

Yekî ji wan got: A baş ew e, ku em herin bi Elîyê bazirgan re biaxivin! Dan dû hevdu û berê xwe dan cem Elî, hatin jê re gotin: Karwanê Marûfê bazirgan nehat, em ê çawa bikin? Elî ji wan re got: Hebekî din xwe ragirin, wê were!

Dûre Elî çû cem Marûf, ew xewle kir û jê re cot: Marûf ev çi kar e, tu dikî? Min ji te re got, çavan kil bike, tu wan kor dikî! Bazirgan ketine qelaqê li ser diravên xwe. Hatin ji min re gotin, ku şêst hezar dînar deynê wan li

te çêbûye, ku te ji wan stendiye û li ser feqîran belav kiriye. Ka tu yê çawa deynê xelkê bidî wan û tu ne dikirî ne difiroşî?

Marûf got: Şêst hezar dînar çi ye? Qey wê çi bibe? Gava karwanê min ê ticaretê hat, ez ê deynên wan bidim wan! Ê ku zêran bixwaze zêran; ê ku caw bixwaze caw bidim wan! Elî, hem hêrs hem jî şaşwaz bû! Jê re got: La hewle wela quwete; ma qey karwanê te heye?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 957'AN

*Şehrezadê got*:

Gava Elî wisa got, Marûfê koşkar lê vegerand û got: Karwanê min ê ticaretê pir mezin e! Elî got: Ya Rebî tu aqilekî bidî vî hemşerîyê min! Qey min ji te re wisa gotibû, ka tu bi vî hawayî tevdigerî? Heger tu wisa biki, ez ê jî rastîya te ji xelkê re bibêjim û wan serwext bikim! Marûf got: Gotinê dirêj neke û rabe ji vir here! Ma qey ez feqîr im, ku bi min re wisa diaxivî? Karwanê min pir dirêj e û bi sedan barên caw û tiştên qedirgiran tê de ne, gava ku hat, ez ê deynên wan duqat li wan vegerînim, ez muhtacî wan im!

Wê gavê Elî pir pir hers bû û jê re got: Bêedeb û bêsincê heram; misoger divê ez nîşanî te bidim, bê derewkarina li min çi encaman bi xwe re tîne; qey tu fedî ji nakî! Marûf got: Tiştê bi destê te ve tê, texsîr neke: Ew bazirgan jî dê xwe ragirin, hetanî ku karwanê min bê. Gava hat, ez ê deynên wan bidim wan.

Marûf, ew got û dev ji Elî berda, çû. Di dilê xwe de ji xwe re got: "Cara borî min spasîya wî kir, heger niha ez dev bavêjêmê, wê bibe mîna gotina pêşîyan, ku dibêje: "Kî spasîya yekî bike û piştre dev bavêjê, dibe derewînekî duqat!"

Di pey re Bazirgan hatin cem Elî û jê re gotin: Ka tu pê re axivîyî gelo? Elî got: Bazirganino, yê min jî hezar dînarê min li cem wî heye û ez fedî dikim, ku di vê mijarê de pê re biaxivim. Jixwe hûn jî gava we deyn da wî, hûn bi min neşêwirîne û tu gotina we jî li ser min tune ye. Hûn herin deynê xwe jê bixwazin û gava neda we, herin gilîyê wî li cem qralê bajêr bikin. Jê re bibêjin, ev zilam diz û şêlanker e, wê qral we ji wî xelas bike!

Bazirganan berê xwe dan cem qral û jê re gotin: Ey şahê zemanan, em heyirî mane û nizanin çi bikin bi vî bazirganê comerd ê ku bê navber zêran ji

me deyn dike û bi çengan li ser feqîran belav dike. Heger mirovekî ne maldar bûya, li ser xelkê zêr bi çengan belav nedikirin û heger Bazirganekî pir maldar bûya jî -çawa ku ew angaşt dike- wê ew karwanê wî bihata. Ew dibêje, karwanekî min ê ticaretê, bi rê de ye û tê. Lê em tiştekî nabînin. Em jê re behsa kîjan cureyên cawan dikin jî, dibêje ji wî cureyî gelek li cem min heye. Demeke dirêj derbas bû lê hîna jî deng ji karwanê wî nehatiye. Hetanî niha şêst hezar dînarê me li cem wî çêbûye. Wî jî ew hemû li ser jar û xizanan belav kir.

Îcar ew qralê hanê jî, mirovekî çikûs û temah bû. Gava ew comerdîya Marûf bihîst, ji wezîrê xwe re got: Heger malekî pir li cem vî bazirganî tune bûya, ev qas camêrî û xêrdan nedikir. Misoger wê rojekê karwanê wî bê û wê gelek diravan li ser van bazirganan belav bike. Halbûkî ji her kesî bêtir, ez van diravan heq dikim. Loma ez dixwazim xwe nêzikî wî bikim û dostanîyekê pê re deynim. Heta ku karwanê wî were. Ez ê keça xwe pê re bidim zewicandin û wan diravên ku bide xelkê, ji xwe re bigirim. Wezîr got: Ez texmîn dikim, ku ev zilam diz û fenekarekî mezin e, diravên xelkê dişêlîne û vî şêlankerî mala temahkaran xera kiriye!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 958'AN

*Şehrezadê got*:

Qral li wezîrê xwe zivirî û jê re got: Ez ê wî di ezmûnekê re derbas bikim û ez ê bibînim, ka ew şêlankerekî fenek e yan xwedîxêrekî comerd û destvekirî ye! Wezîr got: Tu yê wî di kîjan ezmûnê re derbas bikî? Qral got! Ez ê bişînim dû wî, bînim vir û qedrê wî bigirim. Cewhereke ku min ew bi hezar dînarî kirîbû, li ba min heye. Ez ê wê bidim destê wî û je bipirsim, heger buhaya wê nas bike, dê derkeve holê, ku ew mirovekî comard û xêrkir e, heger têdernexist, wê bê fêmkirin ku ew şêlanker û derewker e, ez ê jî wî bikujim.

Qral şand pey Marûf, ew ezimand cem xwe. Marûf hat, silav lê kir. Qral jî silava wî girt û ew li kêleka xwe da rûniştandin, jê re got: Tu Marûfê bazirgan î ne wisa? Marûf got: Belê. Qral got: Bazirganên dîtirkê dibêjin, ku şêst hezar dînarên wan li ba te ne. Gelo ev rast e? Marûf got: Belê.

Qral got: Tu çima deynên wan nadî wan? Marûf got: Bila xwe ragirin, heta ku karwanê min bê, ez ê deynên wan duqat bidim wan. Heger zêran bixwazin ez ê zêran bidim wan, heger caw an jî tiştin din bixwazin, ez ê wî

bidim wan. Kesê ku hezarê wî li ba min hebe, ez ê du hezarî bidim wî; lewre malê min pir e.

Qral jê re got: Ey bazirganê hêja, ka li vê cewherê binêre û ji min re bibêje, bê çi cins e û çi qîmeta wê heye? Bi vê gotina xwe re, cewhera xwe ya mîna kakilê bindeqekê da destê wî. Di destê qral de ew cewhera hanê bi tenê bû û pir qîmet dida wê, pesnê xwe pê dida. Marûf ew cewher xist destê xwe û ew di neqeba tilîya mezin û ya şehadetê de heciqand, qirçîn pê xist, şikand. Lewre ew cewher pir tenik bû û fişar ranedikir. Qral jê re got: Te çima cewhera min şikand? Marûf kenîya û got: Şahê dem û dewranan, ew madeneke bi hezar dînarî ye û mirov naxwaze navê wê bike cewher jî, tu çawa jê re dibêjî cewher? Ji bo ku mirov bibêje cewher, divê buhayê wê heftê hezar dînar be. Cewhera ku ne bi qasî gûzekê be, tu qîmeta wê tune ye û ez bi xwe guh jî nadim wê. Tu çawa qral î û ji vî perçeyê madenê yê ku buhaya wê hezar dînar e, tu dibêjî cewher? Lê tu jî mafdar î, ji ber ku welatê we jar û feqîr e, madenên giranbuha zêde li cem we tune ne.

Qral jê re got: Gelo cewherên ji wan ên ku tu behsa wan dikî li gel te hene? Marûf got: Pir in. Tamahîyê zora qral bir û jê re got: Gelo tu yê hinekan ji wan cewheran bidî min jî? Marûf got: Gava karwanê min were, tu çiqasî bixwazî, ez ê ew qasî bidim te, hem jî bê dirav.

Qral pir kêfxweş bû û çû ji bazirganên din re got: Herin malên xwe, xwe ragirin, heta ku karwanê camêr were, piştre werin deynên xwe ji min bigirin! Li ser vê gotina qral, bazirgan bi şûn de çûn.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 959'AN

*Şehrezadê got*:

Piştre, qral li wezîrê xwe vegerîya û jê re got: Xwe nêzî Marûf bike, pê re bide û bistine û jê re behsa keça min bike, ji bo ku pê re bizewice û li malê wî bibe xwedî.

Wezîr got: Şahê zemanan, rewşa vî zilamî nakeve serê min û gumanan bi min re çêdike. Ez texmîn dikim, ku ev zilam hîlekar û şêlankerekî mezin û derewîn e. Îcar dev ji vê hewesa xwe berde, ji bo ku keça te jî bi avê de neçe!

Vêca wî wezîrî jî berê keça qral xwestibû, bûbû dergistîyê wê û di pey re

jî dev jê berdabû, ji ber ku keçikê nedixwest bi wî wezîrî re bizewice. Loma çawa ku qral ew gotin ji devê wî bihîstin, jê re got: Bêbexto! Ji ber ku berê keça min nexwest bi te re bizewice, niha tu pêşîya wê digirî, ji bo ku di malê de bimîne û tu wê ji xwe re bibî. Loma tu xêrê ji min re naxwazî. Ne ku zilam şêlanker û derewîn e! Halbûkî camêr buhayê cewherê jî derxist, nas kir û ew şikand, ji ber ku ew ne ecibandibû. Kengî derbasî cem keça min bibe û spehîbûna wê bibîne, dê jê hez bike û cewher û yaqûtên giranbuha bide wê. Armanca te jî ew e, ku tu min û keça min ji wê maldarîyê mehrûm bihêlî.

Wezîr ji hêrs û xezeba qral tirsîya û bêdeng ma. Piştre xwe bi ser Marûf de tewand û jê re got: Qral pir ji te hez kir û keçeke wî ya pir xweşik heye, dixwaze ku wê bi te re bide zewicandin, tu çi dibêjî? Marûf got: Dibe lê bila xwe ragire, hetanî ku karwanê min bê. Lewre qelenê keçên qralan giran e û li gora mezinbûna wan e. Ez jî niha bêdirav im. Bila niha xwe ragire. Gava ku karwanê min hat, ez ê di ber qelen de pênc hezar kîsikê zêr bidim bavê wê. Hezar kîsik jî ji bo xêra ku ez ê di şeva gerdekê de li ser feqîran belav bikim, hezar kîsik jî ji bo kesên ku tevlî şahîya dawetê bibin û hezar kîsik jî ji bo xwarin û vexwarina wan. Ji bo şahbanûya min jî, sed cewher lazim in. Sed jî ji bo qerwaş û xulamên wê. Lewre divê ez her yekê ji wan cewherekê bidim wan. Ji bo xatirê xatûna xwe. Li gel wê, divê ez hezar feqîrî jî bi kinc û sol bikim û gelek sedeqeyan jî li ser xelkê belav bikim û heta ku karwanê min neyê, ez nikarim van gişan pêk bînim. Lê heger karwan hat, ev hemû hêsan in, ji ber ku malê min pir e.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 960'Î

*Şehrezadê got*:

Wezîr li qralê xwe vegerîya û tiştên ku Marûf jê re gotibûn, hemû ji wî re anîn ziman. Qral jê re got: Madem ku armancên wî wisa mezin û paqij in, tu çawa li ser wî dibêjî, fenek û derewîn? Wezîr got: Dîsa jî ez heman tiştî dibêjim. Qral bi zimanekî tund ew şermezar kir û jê re got: Bi serê keça min a bi tenê, heger tu dev ji vî zimanê xwe bernedî, ez ê te bikujim! De zû rabe, here, gazî wî bike, bila were vir, ez ê wî îqna bikim!

Werzîr çû cem Marûf û jê re got: Rabe were bi qral re biaxive!

Marûf got: Ser seran, ser çavan. Va ye ez radibim, têm!

Marûf rabû, hat cem qral, qral jê re got: Qet meraqan neke û hewce nake, ku tu xwe li benda hatina karwan ragirî; va ye xezîneya min tijî zêr û zîv e: Mifteya wê hilde cem xwe û heta ku tu bixwazî, jê xerc bike! Çi didî kê, çiqas feqîr bi kinc û sol dikî, çiqas zêran li ser qerwaş û xulaman belav dikî, tu dizanî. Gava karwanê te hat jî, çi comerdîya hebe bi jina xwe bike. Qelenê wê jî bila bimîne heta ku karwanê te tê. Jixwe êdî em xezûr û zavayê hev in û tu ferq di neqeba me de tune ye.

Piştî ku Marûf jî ew nêrîn erê kir, qral, şand dû şêxulîslam û mehra wan li hev birî. Dawet li dar xistin. Bajar hemû xemilandin. Dengê def û daholê li her derê bilind bû, xwarinên xweş û cur bi cur li ser sifreyan danîn, lîstikvan û qeşmer û sihîrbaz hemû li hev kom bûn û hunerên xwe pêşkêş kirin. Marûf jî raserî wan, li iser kursîyekî rûnişt û li lîstikan temaşe kir. Pê re jî her car gazî xeznedar kir û got: Zêran bîne, zîv û cewheran bîne! Xeznedar jî anî û hey anî. Ew jî li ser xelkê gerîya û bi çengan zêr û zîv li ser wan belav kir, xêr û sedeqe bê pîvan li ser hemû jar û feqîran belav kirin. Kêfa her kesî hat û dilê gişan bi wê comerdîya Marûf a ku di dîroka wî bajarî de nehatibû dîtin, şa bû. Xeznedar jî nema di çûn û hatina xezîneyê û anîna zêran de pê re digihîşt. Li hemberî wê dîmenê, wezîr dihat ku biteqe ji qehran. Pir hêrs bûbû û dilê wî dikir, ku bisekine. Lewre nikaribû gotinek jî bikira.

Elîyê bazirgan jî li hemberî vê xerckirina bêsînor a Marûf şaş û metal mabû û jê re digot: Ji Xwedê bitirse, ew di ser te re ye? Qey malê bazirganan ne besî te bû, ku êdî tu malê qrêl jî xerc dikî?

Marûf lê vegerand û got: Tu îşê te pê neketiye. Gava karwanê min were, ez ê du qatên malê qral lê vegerînim!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 961'Ê

*Şehrezadê got*:

Daweta Marûf û keça qral çil roj û çil şevan berdewam kir. Di şeva çil û yekê de bûk derxistin, birin cem zavê. Emîr û wezîr û gizîran dan pêşîya bûkê û ew derbasî cem Marûf kirin. Di wê derbaskirinê de jî zêr bi ser berbûyan de barîyan û mesrefekî ecêb hat kirin. Bûka keybanû, li ser textekî bilind dan rûniştandin, perde berdan, hemû ji hundir derketin û derî li ser wan girtin. Bûk û zava bi tenê hiştin.

Marûf, destên xwe li hev xistin. Çawa ku kul û derdên wî pir bin, di nava xemgînîyeke kûr de bêdeng ma. Piştre got: Lahewle wela quwete îlabîlah! Keybanûyê jê re got: Xwedê ya xêr bike mîrzayê min, çima tu kedernak î? Marûf got: Ez ê çawa ne kedernak û xemgîn nebim. Bavê te bi lez û bez ev kar bi serê min de anî û zadê ku hîna şîn e, şewitand? Keybanûyê got: Qey bavê min çi xerabî bi te kiriye, ji min re bibêje?

Marûf got: Ez derbasî cem te kirim, berî ku karwanê min bê. Halbûkî di rojeke wisa de min dixwest, ku bi kêmanî sed cewher bi min re hebin, ji bo ku ez wan li qerwaşên te belav bikim. Her yekê ji wan cewherekê bidim wê, da ku kêfa wan bê û bibêjin; şeva ku mîrzayê me derbasî cem xanima me bû, her yekê ji me cewherek da me!

Ev ji bo rûmetkirina te pêwîst bû û min ê di vê xalê de qet texsîr nekira. Lewre cewher li ba min pir in.

Keybanûyê got: Guh mede wê mijarê û ji xwe re neke derd û xem. Tu leza min tune ye, gava karwanê ticareta te hat, jixwe tu yê tiştê pêwîst bikî. Qerwaşan jî, guh mede wan, ez ê ber dilên wan xweş bikim. Divê niha tu îstirehet bikî û li kêfa xwe binêrî, kengî karwan hat Xwedê mezin e.

Marûf li ser nivînê rûnişt, keybanû jî li kêleka wî rûnişt. Piştre bi hev re ketin nava sohbeteke kûr û dirêj. Marûf, bi hûrgilî jê re behsa xwe kir, bê çiqas bazirganekî maldar û xurt e, çiqas bi nav û deng e û hevkarên wî li çarmedorên cîhanê hene. Li Hindistan û Sindê, li Yemen û welatê eceman û li seranserê welatên din. Marûf pê de çû û got: Ez jî li ser şopa bavê xwe çûm û ez li seranserên welatan yek bi yek gerîyam, heta ku ez hatim vî welatê we jî.

Keybanûyê jê re got: Guh medê û nede ber dilê xwe. Kengî karwanê te hat, wê çaxê meznahîya xwe diyar bike, ji hemû kesî re û cewher û zêr û zîv û cawên giranbuha bi ser her kesî de bibarîne.

Pîştre herduyan jî dilên hev xweş kirin, bi ramûsanan ketin ber hev û hetanî sibehê pev şabûn, dê û bavên xwe ji bîr kirin. Loma ew şeva wan, şeva herî watedar bû di emrê wan de.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 962'YAN

*Şehrezadê got*:

Piştî wê şeva dîrokî, Marûfê koşkar rabû, çû hemamê. Qatek kincên

şahan li xwe kir û çû dîwana qral, li kêleka wî rûnişt û got: Kanî xeznedar? Xulaman got: Va li ber destê te ye! Marûf lê zivirî û jê re got: Here kincên şahînşah bîne û li ser hemû wezîr û gizîr û mîr û emîran belav bike! Xeznedar jî, çû jê re hemû daxwazên wî anîn û li ser xelkê belav kirin.

Marûf bi wî hawayî berdewam kir, hetanî bîst roja. Lê dîsa jî karwanê wî yê ticaretê nehat. Xeznedarê qral ji vê rewşa wî pir aciz bû. Çû derbasî cem qralê xwe bû. Wezîr jî li kêleka wî bû. Herdu bi tenê bûn. Erda ber nigê wî maçî kir û jê re got: Ey Şahê dem û dewranan, ez dixwazim te ji mijarekê agahdar bikim, da ku sibê dusibê tu loman li min nekî û nebêjî çima te ez agahdar nekirime. Divê tu bizanibî, ku xezîneya te vala bûye û malekî pir hindik tê de maye. Deh roj bi şûn de, wê vala bibe û em ê wê bigirin.

Qral li wezîrê xwe zivirî û jê re got: Karwanê zavayê min derang ket û tu agahî jî jê nehat!

Wezîr kenîya û got: Xwedê alîkarê te be şahê min ê gewre! Ez bi serê te sond dixwim, ku ev zilam derewîn û şêlankerekî bêsinc e, ne karwanê wî yê ticaretê heye û ne jî tu tiştekî din. Ev zilam tenê hîleyan li te dike, malê te bi avê de berdide û bi heman fen û fîtan jî keça te bi dest xist û hîn jî tu ji fenên wî bêxeber î!

Qral got: Nexwe em çawa bikin, ji bo ku em rastîya wî derxînin holê? Wezîr got: Tenê jinên mirovan, sir û razên wan nas dikin. Bişîn dû keça xwe, bila bê pişt perdeyê, da ku ez der barê rastîya wî de çend pir san jê bikim, da ku me agahdar bike.

Qral got: Baş e. Bi serê te, heger şêlankerek derkeve, ez ê weke kûçikan wî bikujim. Piştre wezîrê xwe xist pişt perdeyê û şand dû keça xwe, ew anî cem xwe, bêyî ku mêrê wê pê bihese. Keça wî got: Xêr e bavocan, tu çi ji min dixwazî? Qral got: Wezîr li pişt perdeyê ye, bi wî re biaxive! Keçikê got: Xêr e mîrza, çi he ye? Wezîr got: Xatûna min, mêrê te, malê bavê te hemû bi avê de berda û bê qelen bi te re jî zewicî û hîn jî behsa karwanê xwe dike, soz dide me û sozê xwe nagire. Di encamê de em dixwazin, ku tu der barê wî de agahîyekê bidî me?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 963'YAN

*Şehrezadê ji Şehreyarê gewre re got*:

Gava wezîr ew pirs jê kir, keça qral got: Wele mêrê min gelek tiştan dibêje û gelek sozan jî dide min; dibêje ez ê cewher û yaqut û l'al û cawên giranbuha ji te re bînim lê hîna jî min tiştek jê nedîtiye.

Wezîr got: Xatûna min, gelo tu dikarî îşev pê re bikevî nava dan û stendineke kûr û tu jê re bibêjî, netirse û kanî rastîya xwe ji min re bibêje; jixwe em jin û mêrê hev in û ez ê herdem te biparêzim. Tu rastîya xwe ji min re bibêjê, da ku ez jî tedbîrên xwe bigirim û tu hîn rehetir bibî. Piştre bi gotin û helwestên xweş, hezkîrina xwe jê re bide diyarkirin, ji bo ku bi te ewle bibe û piştre were ji me re bibêje.

Keçik bi şûn de çû malê. Êvarê gava şev meyilî, mîna her car mêrê wê derbasî cem wê bû. Ew jî pê re rabû, ew ji binçengan girt û himbez kir û bi fen û hîleyên jinan ew dorpêç kir, mîna hemû jinên ku daxwazeke wan li cem mêrê wan hebe û bixwaze wê bidest bixe. Bi gotinên hinguvîn ket pey wî, hetanî ku aqilê wî jê dizî û dilê wî bi temamî xist destê xwe. Wê çaxê jê re got: Delalê min, ronîya çavên min û evîna nava dilê min, Xwedê me qet ji hev qut neke û rojeke xerab neyîne pêşîya me! Eşqa te dil û hinavên min xistiye nava agir û êdî ez nema dikarim saetekê tenê jî dûrî te bimînim. Lê ez dixwazim ku tu rastîya xwe ji min re bibêjî, lewre benê derewê çiqas dirêj be jî, wê dawîya wî were. Ma qey hetanî kengî tu yê karibî derewan li bavê min bikî? Ez ditirsim ku berîya tu tevdîrekê ji xwe re bigirî, ew bi rastîya te bihese û hawayekî bîne serê te. Vêca rastîyê ji min re bibêje, ji bo ku ez bikaribim alîkarîya te bikim. Bila tirsa te ji min tune be. Ji kengî ve ye, tu dibêjî karwanê min û hey karwanê min lê tiştek jî li holê nîn e. Ji ber vê yekê jî, rûyê te herdem xemgîn xuya dike. Lewre tu rastî di wê gotina te de tune ye, ka rastîyê ji min re bibêje û ez ê ji te re rêyeke xelasîyê peyde bikim?

Marûf lê vegerand û got: Temam xatûna min, ez ê rastîya xwe ji te re bibêjim û tu çawa dixwazî, wisa bike! Jina wî got: Rastî çi be, wê bibêje; rastî, keştîya xelasîyê ye. Derew jî, tenê xwedîyê xwe dihetikîne. Marûf got: Xatûna min, ez ne bazirgan im û ne jî karwanên min hene. Li welatê xwe, ez koşkar bûm û bi navê Fatîmeya şerûd jineke min hebû. Malik li min xera kiribû, ez dîn û har kiribûm...

Marûf çîroka xwe ji serî hetanî binî ji keybanûyê re got.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 964’AN

*Şehrezadê ji Şehreyarê gewre re got*:

Marûf, serpêhatîya xwe ji serî heta binî anî ziman. Jina wî jê re got: Di derew û şêlandinê de tu hoste yî! Marûf got: Xatûna min, Xwedê hêz û qewetê bide te, ji bo ku tu eybên min veşêrî û kul û derdên min çareser bikî! Jina wî lê vegerand û got: Te bavê min bi pirbûna malê xwe xapand û te ew tamijkî kir, te hişt, ku min bi te re bizewicîne. Piştre te malê wî jî giş li ser xelkê belav kir û wezîrê wî timî li hember te bû. Her car ji bavê min re digot, ev derewînekî şêlanker e lê bavê min bi ya wî nedikir, ji ber ku ew dergistîyê min ê berê bû û dixwest bi min re bizewice. Lê belê bavê min ez dam te û êdî ez ji te hez dikim û tu mêrê min î, ne gengaz e, ku ez bihêlim kes xerabîyê bi te bike. Niha heger bavê min bi vê rewşa te bihese û gotinên wezîr ên ku li ser te gotibûn, piştrast bibin, li ber çavên wî tu yê bibî diz û şêlankerekî derewçîn, ku hîle li keçên şahan kiriye û malên wan xerc kiriye. Ne gengaz e, ku bavê min li gunehekî wisa bibihure û misoger wê te bikuje. Min jî bide zilamekî din. Ez jî, ez bimrim jî, ez vê yekê qebûl nakim û rê nadimê. Loma ez ji te dixwazim, ku tu niha rabî bedlek kincên qralan li xwe bikî, pêncî hezar dînarî bi xwe re bibî û li hespekî siwar bibî, herî welatekî ku destê bavê min negihîje te. Li wê derê ji xwe re bazirganîyê bike û bi qasidekî re nameyekê bi dizî ji min re bişîne, ji bo ku ez bizanibim, tu li ku yî û ez di bin re ji te re mal bişînim û tu jî malê xwe li wir pir bikî. Gava bavê min mir, ez ê agahîyê bidim te, tu yê jî bi serbilindî û di nava coş û bextewarîyeke mezin de vegerî vir. Heger yek ji me bimire jî, jixwe em ê li wê dinyayê bigihîjin hev. Li gora min a rast ev e! Jixwe hetanî ku ez sax bim jî, ez ê hem nameyan, hem jî mal û diravan ji te re bişînim. De êdî rabe, berî ku roj derkeve û bobelat bi ser te de bibarin!

Marûf got: Xatûna min, ez di bextê te de me, tu yê bihêlî, ku em bi pevşabûnekê xatir ji hev bixwazin!

Keybanûyê ew daxwaza wî red nekir; pev şabûn. Piştre rabû, xwe şûşt. Kincên şahan li xwe kirin û ji seyîsê xwe xwest, ku hespekî jê re girêbide. Xatir ji jina xwe xwest, li hespê xwe siwar bû û di dawîya şevê de, ji bajar derket. Kê lê dinêrî, digot qey leşker an jî karmendeki sultanî ye, bi peywireke fermî, diçe karekî.

Roja dîtirkê, sibehê bavê wê û wezîrê xwe, hatin li diwanê rûniştin û şandin dû wê. Ew jî hat û ket pişt perdeyê. Bavê wê jêre got: Ka biaxive keça

min, tu yê çi ji me re bibêjî? Keça wî got: Ez ê bibêjim; Xwedê rûyê wezîrê te reş û riswa bike, lewre wî dixwest, ku rûyê min li ber çavên mêrê min reş bike! Bave wê got: Ew çawa? Keça wî got: Şeva çûyî, berîya ku ez wan pirsên we jê bikim, çawa ku ew hat, ket hundir, Ferecê xulam hat cem min. Nameyek xist destê min û got: Wa ye deh bende li binîya şibakeya qesrê sekinîne, ev name dan min û ji min re gotin; em ji wan bendeyên ku bi karwan re tên in. Vê nameyê bide mîrzayê me Marûf, bila zanibe bê bi rê de çi bi serê me hatiye û çima em dereng ketine, lewre me bihîstiye, ku ew li vir zewicîye û dirav jê re lazim bûne. Min jî rahişt nameyê û ew vekir, xwend. Min dît ku tê de dibêjin: "Silav û rêzên me pêncsêd xulamî ji mîrzayê me Marûfê bazirgan re! Em dixwazin ji te re bibêjin, ku piştî tu ji me veqetîyayî, ereban pêşîya me girtin û bi me re ketin şer. Em pêncsed bûn, ew jî bi qasî du hezar siwarîyan bûn. Şerekî dijwar di neqeba me de derket. Riya me girtin û ev sî roj in, ku em bi wan re şer dikin, ji bo ku em rêya xwe vekin. Sebeba derengketina me jî ev e. Ereban dused bar caw ji me stendin û bi qasî pencî siwarî ji me kuştin…

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 965'AN

*Şehrezadê got*:

Keça qral axaftina xwe berdewam kir û ji bavê xwe re got: Îcar gava ew jî ji vê rewşê agahdar bû, got; Xwelî li serê wan be! Ji bo dused barî bi ereban re dikevin şer, ma qey dused bar caw çi ye, ku mirov ji bo wî bikeve şer? Gerek ji ber tiştekî wisa bêqîmet dereng neketina. Lewre buhayê dused barî incex heft hezar dînar be. Lê wisa xuya dike, ku divê ez bi wan ve herim, ji bo ku derengtir nekevin. Ew ên ku ereban birine jî, hesêbî ku min sedeqeyek da wan, ma wê çi bibe! Piştre bi rûgeşî ji cem min derket, mîna ku ne malê wî çûbe û ne jî xulamên ku hatibûn kuştin, bandoreke berbiçav li ser wî nekirin. Dema ku çû jî, min di şibakê re lê nêrî, li gel wan deh bendeyên ku name jê re anîbûn bû. Her deh bende jî mîna heyvên şevên reş bûn û her yekî bedlek lê bû, bi hezar dinarî bû. Ez texmîn nakim, ku di nava xulamên bavê min de yên wisa hebin. Li gel wan her deh xulamên xwe çû, ji bo ku karwanê xwe yê ticaretê bîne. Xwedê kir, ku min ew gotinên we jê re negotin. Nexwe wê henekên xwe bi min û te bikira û belkî bi çavekî tewş li min binêrîya û kîna min biketa dilê wî. Lê belê ev eyb û fedîya mezin hemû ji bin serê wezîrê te derket.

Ev wezîrê ku timî gotinên nexweş der barê mêrê min de dike!

Qral li keça xwe vegerand û got: Keça min, malê mêrê te pir e û qet tê de jî nafikire û ji roja derbasî welatê me bûye, sedeqe û xêran li ser jar û xizanan belav dike. Bi izna Xwedê gava karwanê wî yê ticaretê bê, dê gelek xêran bi me jî bike! Piştre bi wezîrê xwe de xeyidî û hewl da, ku ber dilê keça xwe bigire.

Em qral û keça wî li wir bihêlin û em vegerin ser rewşa Marûf. Marûf li ser pişta hespa xwe bû, berê xwe dabû çolê û hişê wî tevlihev bûbû, nizanibû wê bi ku ve here. Dûrketina ji keça qral, êşeke mezin dida wî û zingezing bi dilê wî dixist. Hemû rê li ber wî hatibûn girtin û xwe pir bêhêz û bêçare didît. Êdî mirin jê re ji jîyanê hêsantir dihat.

Di nava wê şaşwazîyê de, mîna serxweşan bi rê ve çû û meşîya, hetanî danê nîvroyê. Gihîşt bajarokekî biçûk û bala xwe dayê, ku hinek cotkarî li nav zevîyên xwe cot dikin. Pir birçî bûbû loma berê xwe da cem yekî, ku bi du gayan cot dikir. Silavek dayê, zilam jî silava wî girt û jê re got: Qey tu ji leşkerên sultan î? Marûf got: Belê. Wî got: Were mêvantîya min! Marûf nas kir, ku zilam camêr e. Li derdora wî nêrî û got: Birawo ez bala xwe didimê, tiştekî ku tu bidî ber min li cem te tune ye û dîsa jî tu min bi mêvantî vedixwînî cem xwe?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 666'AN

*Şehrezadê ji Şehreyarê gewre re got*:

Gava Marûf ew pirs jê kir, cotkar lê vegerand û got: Ez benî xêr û berket heye û bajarok nêzikî me ye, ez ê herim ji te re firavînekê bînim û ji hespê te re rêsîyekî bînim!

Marûf jê re got: Madem ku bajarok pir nêzikî vir e, ez ê jî bi qasî te zû xwe bigihînim wir û xwarinekê li gora dilê xwe ji xwe re bikirim? Cotkar got: Ez benî bajarok, gundekî biçûk e û sûk lê nîn e, ku kirîn û firotin lê hebe! Tu bi qedrê Xwedê kî, were ji hespê xwe dakeve û li cem min bibe mêvan û xatirê min neşikîne. Ez ê pir zû herim û werim.

Marûf ji hespa xwe peya bû, cotkar berê xwe da bajarok ji bo ku xwarinê jê re bîne. Marûf rûnişt û ma li hêvîya vegera wî. Demek bi şûn de, ji xwe re got: "Min ev zilamê jar û xizan ji karê wî girt û ew bi xwe re da mijûlkirin, a baş ew e, ku ez rabim li şûna wî cot bikim, heta ku be!"

Rahişt destika gîsin, misas di ga re kir û cot kir. Demekê bi şûn de, gîsin li tiştekî aliqî û ga ketin erdê. Hewl da ku wan rake û dîsa wan bajo lê herdu gayan jî nikaribûn gîsin li dû xwe bikişandina! Daqûl hat, li gîsin nêrî, dît ku serê wî di xelekekê de aliqîye. Ax ji ser da alî, dît ku xelekeke zêr e û di nava kevirekî mermerî de ye, ku bi qasî kevirekî aşan mezin bû. Li dora wî kevirî çû û hat, ber wî vala kir, heta ku ew ji cihê wî derxist û nêrdewanek di binde xuya kir. Bi wê nêrdewanê ve daket jêrê. Dît ku cihekî mezin e. Mîna hemameke bi çar salonan bû. Salona ewil ji erdê hetanî devê wê tijî zêr bû, ya din tijî zumrud, mercan û lûlû bû; ya sisyan jî tijî yaqût, belexşa, feyrûz û cewher bû; ya çaran jî tijî elmas û madenên giranbuha bû. Di singê wî cihî de jî sindoqeke ji camê hebû, ku tijî cewherên yeko yeko bûn, ku her cewherek bi qasî gûzekê mezin bû û li ser wê sindoqê jî qutîkeke zêrîn, bi qasî leymûnekê hebû.

Marûf li hemberî wê dîmena ecêb şaş û behetî ma! Pir kêfa wî hat! Di dilê xwe de ji xwe re got: "Gelo çi di vê qutîkê de heye?" Marûf ew qutîk vekir, dît ku hungulîskeke zêr tê de ye, ku gelek nav û remz û tilsim li ser neqişandî ne, weke şopa gêrikê. Marûf hungulîsk firikand, bala xwe dayê, ku yek jê re dibêje: "Ez benî ez amade me, li benda fermana te me! Gelo tu dixwazî bajarekî ava bikî yan bajarekî biherifînî, tu dixwazî qralekî bikujî, çemekî bikolî yan jî tiştekî din bikî? Tu çi bixwazî, bi izna Xwedayê gewre dê pêk were!

Marûf got: Ey afirîndeyê Xwedayê min, tu kî yî? Wî got: Ez xizmetkarê vê hungulîskê me û di xizmeta xwedîyê wê de me. Hungulîsk di destê kê de be, ez ji wî re xizmetê dikim û dikevim bin emrê wî. Çi ji min bixwaze, ez wî pêk tînim û ez nikarim li hemberî wî derkevim. Ez serdarîya heftê û du êlên cinan dikim, ku her êlêk ji heftê û du hezaran pêk te û her yek ji wan serdarîya hezar dêwî dike û her dêwek jî serdarîya hezar cinagirî dike û her cinagirek jî serdarîya hezar şeytanî dike û her şeytanek jî serdarîya hezar cinî dike û ev hemû di bin fermana min de ne. Kes ji wan nikare ji rêya min derkeve. Ez jî di bin emrê xwedîyê vê hungulîskê de me û ez nikarin li hemberî wî derkevim. Îcar va ye, tu bûyî xwedîyê vê hungulîskê, ez jî bûme xizmetkarê te. De êdî tu çi dixwazî, ji min re bibêje, ez ê daxwaza te pêk bînim. Li ser bejahîyê be, li ser deryayê be ferq nake, kengî pêdivîya te bi min çêbû, hungulîskê bifirikîne, tu yê min li ber xwe bibînî, ku ez amade me. Lê pir baldar be û du caran li ser hev nefirikînê, nexwe ez ê bi agirê wan navan bişewitim û ez ê tune bibim, tu yê jî li ser wî karê xwe pir poşman bibî. Va ye min xwe bi te da naskirin, de êdî tu dizanî!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 967'AN

*Şehrezadê got*:

Marûf ji xizmetkarê xwe yê cinî re got: Navê te çi ye? Got: Navê min Ebûsadat e. Marûf got: Ey Ebûsadat, ev cihê çi ye û kê tu xistiyî vê qutîka zêr? Ebûsadat got: Mîrzayê min, ev der cihê xezîneya Şedad Bin Ad e, yê ku îrem ava kiriye û bihuşt anîye ser rûyê erdê. Ez jî xizmetkarê wî bûm, di jîyana wî de û ev hungelîsk jî ya wî bû, ew jî xistibû nav xezîneya xwe lê va ye bû nesîbê te.

Marûf jê re got: Gelo tu dikarî hemû malê di vê xezîneyê de derxî ser rûyê erdê? Ebûsadat got: Tiştê herî hêsan ji bo min ev e! Marûf got: Tiştekî, tê de nehêle; hemûçkî derxe ser rûyê erdê!

Ebûsadat bi destê xwe erd îşaret kir, çû, hinekî ji ber çavan wendabû û li gel qefleyek ciwanên spehî û lihevhatî vegerîya, ku her yek ji wan selikek zêrîn di destê wan de bû û selik bi xwe jî tijî zêr bûn. Hemûçkan selîkên xwe vala kirin û çûn hinekên din anîn û bi qasî saetekê her wisa berdewam kirin. Piştre gotin, tiştek tê de nema û Ebûsadat jî pê re derket ser rûyê erdê û got: Ez benî tu jî dibînî, ku me her tiştê di xezîneyê de derxist û tiştek tê de nema.

Marûf got: Ev xortên ciwan ên spehî kî ne? Ebûsadet got: Ev zarokên min in. Karekî sivik bû. Min pêdivî nedît ku ez gazî leşkerên xwe bikim. Min hinek ji zarokên xwe anîn, û ev kar bi wan kir. Îcar çi daxwazên te yên din hene gelo? Marûf got: Tu dikarî ji min re sindoqan bînî û van malan bixî nava sindoqan û têra baran qantiran bînî, van baran jî li qantiran bikî?

Ebûsadat got: Ev karekî pir hêsane. Qîrek da, zarokên wî di cî de hatin wir, ku bi qasî heştsed hebî hebûn. Ebûsadat ji wan re got: Hinek bibin qantir, hinek jî bibin bende û xulamên spehî! Di cî de gotina bavê xwe pêk anîn. Hinek bûn qantir û hinek jî bûn xulamin pir spehî, ku yên mîna wan li cem şah û sultanan jî tune bûn. Hemû ferman pêk anîn û karê xwe temam kirin. Piştre Ebûsadat gazî leşkerên xwe kir û ji wan xwest, ku hinek bibin hespên zînkirî, bi zêr û cewher.

Marûf got: Kanî sindoq li ku ne? Sindoq hemû anîn ber destê wî. Marûf got: Zêr, zîv, yaqût, mercan û hemû rengên cewheran cuda cuda bar bikin! Hemû cuda cuda bar kirin, bi temamî barê sêsed qantirî ji wê xezîneyê derket. Marûf ji Ebûsadat re got: Gelo tu dikarî ji min re çend barên caw ên baş binî? Ebûsadat got: Tu cawê Misrî dixwazî yan ê Şamî, Ecemî, Hindî,

Romî? Marûf got; ji her cureyekî sed barê sed qantiran bîne! Ebûsadat got: Ez benî moletekê bide min, heta ku ez zilamên xwe bi rêkûpêk bikim. Her qefleyekê ji wan bişînim welatekî û sed barî li wir eyar bikim. Hinek ji wan bibin qantir, hinek bibin siwar û bikevin rê, wan bînin vir. Ji bo van karan gişan, hinek dem lazim e.

Lê ne zêdeyî ev çend saetên şevê ne. Çawa ku ro derkeve, wê hemû li ber destên te amade bin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 968'AN

*Şehrezadê ji Şehreyarê gewre re got*:

Piştre Marûf ji wan xwest, ku jê re konekî vegirin. Wan jî di cî de vegirt. Marûf li bin kon rûnişt. Xizmetkaran jê re sifreyek raxistin û xwarinên cur bi cur li ser danîn. Ebûsadat jê re got: Ez benî di bin konê xwe de aram be, va ye zarokên min jî zêrevanî û nobedarîya te dikin. Ez ê jî herim leşkerên xwe kom bikim û wan bişînim peywirên ku te xwestibûn.

Ebûsadat çû. Marûf jî li ser sifreya xwarinê û zarokên Ebûsadat jî li dora wî bûn. Di şiklê xulam û bende û navmalîyan de bûn. Tam di wê kêlîyê de zilamê cotkarî hat û tasek şorbeya nîskan di destê wî de, li gel cehekî di nava sîrikê de. Gava ku cotkarî hat û dît ku kon li wir e û derdora kon tijî bende û nobedar in, behetî sekinî ma. Got belkî ew zilamê bûye mêvanê wi, sultan e. Poşman bû, ku nîsk jê re anîye û di dilê xwe de ji xwe re got: "Xwezîka min du ferxik jê re serjêbikirana û di rûnê çêlekê de sor bikirina. Belkî bêtir layiqî wî bûya!" Xwest ku bi şûn de vegere, ji bo ku here herdu zîxanên xwe ser jê bike û ji sultan re bîne. Lê Marûf ew dît, gazî wî kir û ji xulaman re got: Wî bînin cem min!

Xulaman ew derbasî kon kirin. Cotkar tasa şorbenîskê li ber wî danî û got: Ev xwarina te ye û wa ye ji bo hespê te jî, min rêsî anîye, li qisûra min jî nenêre, wele min qet nizanibû, ku sultan li cihê wilo dibe mêvan. Heger min bizanibûya, min ê du zîxan jê re serjê bikirina û mazûvantîyeke baştir jê re bikira!

Marûf got: Sultan nehatiye vir lê ez zavayê wî me. Ez hinekî jê xeyidîbûm lê wî xulamên xwe bi dû min de şandin û em li hev hatin. Ez niha dixwazim vegerim bajêr. Lê te ez nas nekiribim jî, te qedr û qîmeta min

girtiye û te xwarin ji min re çêkiriye; ez jî xwarina te qebûl dikim, lew ku şorbenîsk be jî. Ez ê tenê şorbeya te bixwim.

Piştre, herdu bi hev re li ser sifreyê rûniştin. Marûf têra xwe şorbenîsk xwar. Cotkarî jî zikê xwe bi wan xwarinên xweş û cur bi cur tijî kir. Marûf destê xwe şûşt û îzin da xulaman, ji bo ku ew jî bixwin. Wan jî xwarina mayîn xwarin û rabûn ser xwe.

Gava tasa şorbenîskê vala bû, Marûf tasa wî jê re tijî zêr kir, da wî û jê re got: Rabe, van zêran bibe mala xwe û dîsa were cem min, li bajêr ez ê xelatekê bidim te! Cotkarî rahişt tasa zêran, herdu gayên xwe dan pêşîya xwe û di nava kêf û şahîyeke bêtimtêl de berê xwe da bajarokê xwe.

Marûf jî wê şevê di nava aramî û şahîyeke xweş de li wir ma. Lewre xulamên wî jê re keçên xezîneyan anîn, wan jî jê re li amûrên muzîkê xistin û li pêşîya wî reqisîn. Bi wî hawayî, şeveke ku dê di temamê emrê xwe de ji bîr nekira, bi wan re derbas kir.

Gava bû sibe û tîrêjên rojê dinya ronî kirin, bala xwe dayê, ku toz û dûmanek bi hewa ketiye, gihîştiye ber perên asîmanan. Qasek bi şûn de jî, qantirên barkirî ji bin wî ewrê tozê derketin, ku hefsed qantir bûn û li dû wan jî xulamên sergirtî, servekirî, qelew û zeîfik. Ebûsadat jî mîna serkêşê karwan di pêşîya wan de li ser pişta qantira xwe bû û texterewaneke ji zêr a ku çar leşkeran rahiştibûyê jî di pêşîya wî de bû. Gava gihîşt ber kon, Ebûsadat ji qantira xwe peya bû û hat erda ber nigê Marûf maçî kir û jê re got: Mîrzayê min, pêdivîyên ku te xwestibûn, hemû bi temamî û bê kêmasî hatin. Li ser vê texterewanê jî qatek kinc heye, ku li ser şah û sultanan jî tune ye. Wan kincan li xwe bike, li texterewanê siwar bibe û daxwaza xwe ya din ji me re bibêje!

Marûf jê re got: Ey Ebûsadat, ez dixwazim nameyekê bidim te û tu wê bibî bajarê Xîyanul Xîten, derbasî cem apê min ê qral bibî, di dirûvê qasidekî de nameya min bidî wî! Ebûsadat got: Ser seran, ser çavan. Marûf nameyek nivîsand, mor kir û da wî. Ebûsadat jî xwe xist qilixê qasidekî û derbasî cem qral bû. Bala xwe dayê, ku ji wezîrê xwe re dibêje: “Ez ditirsim, ku ereb zavayê min bikujin! Xwezîka min bizanîbûya, bê ku ve çûye, ji bo ku bi leşkerên xwe ve ez biçûma alîkarîya wî. Û xwezîka berîya ku biçûya wî ez jî agahdar bikirima!” Wezîrê wî jî le vedigerand û digot: “Xwedê li te were rehmê, hişê te bixe serê te, te ji vê xefletê hişyar bike! Ez bi serê te sond dixwim, zilam têderxist, ku em pê hesîyane, ji hetikandinê tirsîya û revîya çû. Lewre ez bi cî dizanim, ku ew diz û hîlebazekî mezin e.

Tam di wê kêlîkê de qasid derbasî cem wan bû, erda bin nigê qral maçî kir, dua jê re kirin, bi temendirêjî û tenduristiyê. Qral jê re got: Tu kî yî û tu çi dixwazî? Qasid got: Ez qasidek im, zavayê te Marûf ez şandim cem te, ji bo ku vê nameya wî bidim te û te agahdar bikim, ku ew jî tevlî karwanê ticareta xwe, bi rê de tê.

Qral name ji destê wî girt, xwend û têgihîşt.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 969'AN

*Şehrezadê got*:

Qral di nameyê de xwend: "Piştî silav û rêzan ji bo apê min ê qral û gewre, ez we agahdar dikim, ku va ye ez li gel karwanê xwe têm. Ez dixwazim, ku hûn jî bi leşkerên xwe werin pêşwazîya min bikin!" û li wezîrê xwe vegerîya, jê re got: Xwedê rûyê te reş bike, ey wezîr! Tu çawa der barê zavayê min de gotinên çewtomewto dibêjî. Tu wî derewkar û şêlanker nîşan didî. Wa ye karwanê xwe yê ticaretê tîne û tê? Bi navê Xwedê tu xayîn û bêbext î?

Wezîr ji fedîyan serê xwe bera ber xwe da û got: Ey şah û qralê dem û dewranan, ji ber dereng ketina karwan, min gotin gotin, lewre ez di tirsîyam, ku ew malên te yên xerckirî bi avê de herin û venegerin.

Qral lê vegeranda û got: Ey bêbextê xayîn, çi tirsa li ser malê min û çi hal! Jixwe va ye karwan tê û serê yekê wê duduyan li min vegerîne û xezîneya min dîsa dagire!

Qral ferman da û got, bajar gişî bixemilînin û paqij bikin, ji bo pêşwazîya zavayê min! Piştre çû, derbasî cem keça xwe bû, mizgînî da wê û jê re got: Wa ye mêrê te li gel karwanê xwe tê û di demeke kurt de wê bigihîje vir. Nameyek li pêşîya xwe şandiye û va ye ez jî derdikevim, diçim pêşwazîya wî!

Keybanû li hemberî vê agahîyê şaş û metal bû! Di dilê xwe de ji xwe re got: "Ev tiştekî erjeng û balkêş e! Gelo wî bi vê yeke henekên xwe bi min kir an xwest min biceribîne, ku wisa feqîr nîşan da? Lê şikir ji Xwedê re ku min tu kêmanî der heqê wî de nekirine!

Hevalê wî yê zaroktîyê, Elîyê Misrî jî gava dît ku bajar tête xemilandin, sebeba wê pirsî. Jê re gotin, zavayê qral, Marûfê bazirgan bi karwanê xwe ve tê! Elî şaş û metal bû, got: Xwedêyo ji te ve malûm e! Ev çi bûyer e û ev çi hal e? Zilam feqîr û çikûsekî dera hanê bû. Ji ber jina xwe revîya û hat

wir. Îcar ev karwan jê re ji ku hat? Belkî keça qral lîstikek saz kiribe, ji bo ku rastîya mêre wê dernekeve û di nava xelkê de nehetike. Jixwe tiştê ku ji destê qralan neyê, tune ye.

Hemû bazirganên bajêr di nava kêf û şahîyeke mezin de pê ve çûn, bi hêvîya ku zêrên xwe bi şûn de bigirin. Qral jî leşkerên xwe kom kiribûn û hemû karmend û mîr û gizîr û bazirgan dan kêleka xwe û derket pêşwazîya Marûf. Di wê nawberê de Ebûsadat jî bi şûn de vegerîyabû cem Marûf û jê re gotibû, min nameya te gihand qral!

Marûf got: Nexwe em rêya xwe berdewam bikin! Kincên xwe yên giranbuha li xwe kirin, li texterewana zêrîn a bi yaqût û cewheran xemilandî siwar bû, ku êdî ji qralan jî biheybetir xuya dikir. Û ket rê. Di nîvê rê de li leşkerên qral qelibîn. Qral çawa ew li ser wê texterewanê û di nava wê heybetê de dît, xwe bi ser de avêt, ew himbêz kir û got: spas ji Xwedê re ku tu bi selametî li me vegerîyayî!

Hemû mezinên dewletê silav lê kirin û xêrhatina wî kirin. Êdî rastîya wî derketibû holê û kesî nikaribû ew bi fen û derewan tewanbar bikira. Di nava dêlendizeke mezin û biheybet de derbasî bajêr bûn. Bazirgan hemû pê ve hatin û yeko yeko erda bin nigê wî maçî kirin. Elîyê Misrî jî jê re got: Te ev lîstika hanê kir û tu bi ser ketî ey şêxê fenek û şêlankeran! Lê belê ev meznahî li te tê û înşelah wê Xwedê li te zêde bike! Marûf jî kenîya û çû.

Gava hatin qesr û serayê, Marûf li ser kursî rûniştû ji xulaman re got: Kanî barên zêr bînin û wan bibin xezîneya apê min ê qral! Caw û qumaşên giranbuha jî bînin vir. Bar bi bar danîn û vekirin, heta ku her hefsed bar jî xelas kirin. Tiştên herî xwîşk ji nav wan hilbijartin û ji xulaman re got: Vana bibin cem keybanûyê, ji bo ku li qerwaş û xulamên xwe belav bike. Sindoqên cewher û yaqûtan jî bibin, bila wan jî li ser wan belav bike!

Bazirganên ku deyn dabûn wî jî, gişan deynên xwe bi şûn de girtin. Hinekan zêr, hinekan li şûna zêran, caw û cewher girtin, piranîya wan jî serê yekê dudu girtin.

Marûf, gelek mal û cawê xwe li ser feqîr û hejaran jî belav kir. Ji ber ku ew hemû li ber çavên qral dibû, kizîn bi nava wî diket û dilê wî diêşîya li ser ew qas mal, lê nikaribû li hember derkeve.

Marûf li leşkeran zivirî, gelek maden û zumrud, yaqut, lûlû û mercan bi çengan li ser wan jî belav kir, heta ku her hefsed bar bi temamî qedand û tîştek jê nehişt.

Qral jê re got: Bes e kurê min, ev qas dayîn bes e, te tiştek ji xwe re nehişt.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 970'YÎ

*Şehrezadê ji Şehreyarê gewre re got*:

Gava ku qral wisa got, Marûf jê re got: Malê min pir e apocan, qet meraq neke! Bi wî hawayî nav û dengê Marûf pir derket, her kesî camêrîya wî bihîst û jê hez kir. Dijminên wî jî êdî nema dikaribûn der barê wî de gotinên nexweş bigotina. Jixwe bêpîvan û herdem zêr û dirav li ser xelkê belav dikir, ji ber ku xizmetkarê wî yê cinî her tişt jê re dianî û çi bixwesta, di cî de pê ve digihand.

Xeznedar jî hat cem qral û jê re got, xezîne heta bi qirikê hatiye dagirtin û cî tê de nemaye, em nizanin wan zêr û zîv û madenên mayîn têxin ku derê! Qral cihekî din nîşanî wan da, ji bo ku bixin wir.

Jina Marûf jî bi vê rewşa nû pir kêfxweş bûbû û ew giranî, nav û dengê ku mêrê wê di nava gel de bi dest xistibû û di dilê xwe de ji xwe re digot: "Gelo ev qas xêr û bêr ji ku bi ser mêrê min de hat?" Hemû bazirgan û karmend jî pir kêfxweş, bûbûn bi dana Marûf û camêrî û comerdîya wî ya bêsînor û herdem jê re dua kirin. Elîyê Misrî jî hîna tênegihîştibû û di nava şaşwazîyê de bû. Ji xwe re digot: "Gelo vî bi kîjan fen û fîtan ev qas mal bi dest xist û xezîne pê dagirtin? Heger ev mal ji kîsê keça qral bûya, li ser hejaran belav nedikir!"

Qral bi xwe jî hem pir kêfxweş bû û hem jî şaşwaz û ecêbmayî bû, li wê comerdîya Marûf a ku qral û şahên herî mezin nikaribûn pê rabin û ew qas zêr û cewherên bêsînor ên ku di mista wî de bûn.

Marûf, wê şevê derbasî cem jina xwe bû. Wê jî bi coş û rûgeşîyeke kenok ew pêşwazî kir. Destê wî ramûsa û jê re got: Bi wê rola hêjarîyê te dixwest, ku tu henek û tinazên xwe bi min bikî an te dixwest, ku tu min biceribinî, ku te digot, ez ji ber jina xwe revîyame? Lê şikir ji Xwedê re ku min tu saşîtî der heqê te de nekir. Ma min ê çawa bikira û tu ezîzê ber dilê min î her daîm. Tu feqîr bî, zengîn bî, ferq nake ji bo min, dîsa jî ez dixwazim ji min re bibêjî, bê te çima ew gotin ji min re gotin?

Marûf got: Min xwest, ku ez te biceribînim, bê ka tu çiqasî ji min hez

dikî û ev hezkirina te li gora temahîya malê dinyayê ye yan na. Lê di encamê de derket holê, ku evîn û hezkirina te pir paqij û jidil û tu jineke dilsoz î. Êdî min qîmeta te baş nas kir!

Piştre Marûf derbasî cihekî din bû, ku xewle bû û bi tenê bû. Hungulîska xwe firikand, Ebûsadat hat cem wî. Marûf jê re got: Here kincekî giranbuha ji jina min re bîne, ku gerdenîyeke bi çil cewherî pê ve be! Ebûsadat di cî de çû, ew kinc anî, da destê wî û çû. Marûf rahişt kincan û gerdenîyê û çû cem jina xwe, da destê wê û jê re got: Ha ji te re van li xwe bike, nûra çavan!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 971'Ê

*Şehrezadê got*:

Gava jina Marûf li wî kincî û li wê gerdenîya bi çil cewherî nêrî, aqilê wê ji serî çû, hingî ku kêfa wê hat! Tew gava çavên wê li herdu xilxalên zêr ên bi cewheran xemilandî, ku diyar bû, karê kahinan bû û ew guhar û kemera giranbuha ketin, ku buhayê wan nikaribû texmîn jî bikira; şaş û metal bû û devê wê ji hev ma. Ew xeml û xêz li xwe kirin. Û ji mêrê xwe re got: Ez ê vana ji rojên cejnan re hilînim! Marûf got: Wan timî li xwe bike, ji wan gelek li cem min hene.

Gava qerwaşên wê ew di nava wan kincan û di nava wê xeml û xêzê de dîtin, pir kêfxweş bûn û hatin destên wê maçî kirin. Marûf, xwe kişand cihekî, xwe bi tenê kir û hungulîska xwe firikand, xizmetkarê wî hat cem. Marûf jê re got: Here sed qat kincên spehî tevlî xeml û xêzên wan ji min re bîne! Xizmetçî got: Ser seran, ser çavan û di cî de çû, ew kinc anîn, tevlî xemla wan. Marûf ew girtin û gazî qerwaşên jina xwe kir, her yek ji wan qatek cil tevlî xeml û xêza wê dayê.

Qerwaş hemû bi wan kincên nû û bi wê xeml û xêza giranbuha, bûbûn mîna horîyên bihuştê û li derdora keybanûya xwe digerîyan, mîna stêrkên ku li derdora rojê bigerin. Hinek ji qerwaşan çûn, qral jî agahdar kirin, ew jî hat cem keça xwe. Dît ku weke stêrkan xuya dikin û keça wî jî di nava wan de, mîna heyvekê ye! Ecêbmayî û behetî ma li wê spehîbûna wan. Mestbûyî ji wir derket, çû dîwanê û gazî wezîrê xwe kir, ew dîmena ku dîtibû jê re anî ziman û pirsî: Tu çi dibêjî di vê mijarê de?

Wezîr got: Ey şahê dem û dewranan; ev karê hanê ne yê bazirganan ne,

cawek, perçeyekî kitanê bi salan li cem bazirgan dimîne û nafiroş e, heta ku qezencekê jê neke. Ka ew bazirganê ku wisa bi comerdî tevbigire? Ev qas zêr û cewherên ku li cem şah û qralan peyde nabin, çawa ji wan re tên û çawa ew dikarin van cewheran bi çengan li ser xelkê belav bikin? Bêguman divê sebebek vê yekê hebe û heger tu bi ya min bikî, ez ê rastîya meseleye ji te re derxim holê.

Qral got: Ez ê bi ya te bikim, ka bibêje, em çi bikin? Wezîr got: Pê re rûnê, xwe nêzikî wî bike, têkilîyên xwe pê re germ bike û jê re bibêje, zavayê hêja, ji bo xatirê min were ez û tu û wezîrê min bi tenê, em ji xwe re herin nav baxçe, derkevin seyranê. Gava bi me re bê nav baxçe, em ê li wê derê sifreya mey û fêkî deynin û tijî meyê bidê û hey bidê, hetanî ku serxweş bikeve. Wê çaxê em ê rastîya mijarê jê bipirsin, ew ê jî razên xwe ji me re bibêje. Gava ku em rastîya wî fêr bûn û pê de, êdî çi dixwazin, em ê wî pê bikin. Lewre ev rewşa ku niha ew tê de ye, encamên wê yên talûke li ser te hene û ez li ser te ditirsim. Lewre dibe ku rojekê çavên xwe bera postê te bide û bixwaze bibe qral. Bi van zêr û zîvan û bi vê comerdîya xwe, dikare her kesî, hetanî bi leşkeran jî bikişîne alîyê xwe û te ji ser postê şahîtiyê bigire.

Qral got: Tu rast dibêjî. Herduyan tifaqa xwe li ser Marûf kirin yek û gava bû sibe, qral çû dîwana xwe, li ser textê xwe rûnişt. Seyîs, xeznedar û leşker û xulam hemû jî, xêmgîn derbasî dîwana wî bûn. Qral ji wan re got: Çi bi we hatiye, ku hûn wisa xemgîn in? Wan jî got: Qrale dem û dewranan, şeva borî seyîsan hesp û qantirên ku barên zêr û zîvan anîbûn, timar kirin û ew girêdan le gava em sibehê rabûn, me bala xwe dayê, ku ew bende û xulamên bi karwan re hatine, hesp û qantir dizîne û çûne. Me axur hemû di ber çavan re derbas kirin, me şopa wan jî nedît. Em çûn cihê ku xulam û bende lê bûn, me kes ji wan jî nedît, îcar em nizanin çawa revîyane jî!

Qral li wê rewşê ecêbmayî ma. Lewre wî digot qey cin, xizmetkar, bende û xulam in; nizanibû, ku ew cin û şeytan û efrît in. Loma pir hêrs bû û ji wan re got: Laneta Xwedê li ser we be! Çawa hezar hesp û qantir, li gel pêncsed bende û xulamî diçin û hûn bi wan nahesin! Wan jî got: Em nizanin çi bi serê me hat, ku ew revîyan û em bi wan nehesîyan?

Qral got: De herin, ji vir bicehemin, kengî mîrzayê we ji cem jina xwe derket, jê re bibêjin, wî agahdar bikin!

Seyîs û xulam, matmayî rabûn ji dîwanê derketin. Qaseke din Marûf ji kozê derket û xemgînîya wan bala wî kişand. Ji wan re got: Xêr e? Wan jî heman agahîya ku dabûn qral, dan wî jî. Marûf got: Ma çi qîmeta wan hebû,

ku hûn ew qasî li ser wendabûna wan diêşên! Herin, kar û barê xwe bikin, tiştek nabe! Ew jî devliken û di nava bextewarîyeke balkeş de, li ser kursîyê xwe rûnişt, bêyî ku aciz bibe yan jî bêhna xwe teng bike.

Qral li rûyê wezîr nêrî û jê re got: Ev zilamekî çawa ye, ku ne qîmeta mal û milk li cem wî heye û ne jî qîmeta bende û xulamên wî! Misoger, divê sebebeke vê yekê hebe.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 972'YAN

*Şehrezadê got*:

Qral ji Marûf re got: Zavayê delal û hêja! Tu bi xatirê Xwedê û xatirê min kî, were ez û tu û wezîr bi tena serê xwe, em derkevin seyranê. Em ji xwe re herin li nav bax û bexçeyan bigerin? Marûf got: Bila be, fikreke ne xerab e. Her sêyan mil dan hev û berê xwe dan nav bax û baxçeyan, ku tijî daren fêkîyan, av û çem bûn. Hemû cureyên çûk û teyrên tê de dixulxulandin. Li wê derê derbasî koşkekê bûn, ku kul û derd di dilan de nedihişt, li hev rûniştin û ketin nava guftûgoyeke germ. Wezîr jî bê navber, çîrokên xweş û balkeş, mamik û pêkenok û dûrik digotin û Marûf jî guh lê didêra, heta ku nîvro hat û bû wextê firavînê. Xwarinên cur bi cur li gel mey û fêkîyan li ber wan rêz kirin. Têra xwe xwarin. Destên xwe şûştin. Wezîr piyaleyek mey dagirt, da destê qral û yek jî da destê Marûf. Qral a xwe vexwar. Yeke din jî jê re dagirt lê Marûf a xwe venexwar û ji wezîr re got: Ev çi ye? Wezîr got: Ev bakîreya li ber zewacê ye, diyarîdanera kêf û bextewarîyê ye; agirgeşkera koza li ber vemirandinê ye; serhildêrkera dilê milayim e, hişiyarkera hişê xilmaşbûyî ye; roja navrojê heyva şeva tarî ye; germa nava serma û seqemê ye; dermanê hemû nexweşînên dil û hinavê ye!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 973'YAN

*Şehrezadê ji Şehreyarê gewre re got*:

Wezîr bê navber pesnê xweşbûna çêja meyê û marîfetên wê ji Marûf re dan, hetanî ku dilê wî bijandê û hişt, ku piyaleyê bibe ber devê xwe û deyne ser lêvan. Wezîr, bi helbest û gotinên şair û hozanan pesnê meyê berdewam

kir û her ku piyaleya wî vala bû, dîsa jê re dagirt, heta ku Marûf serxweş ket û êdî nema şaş û rast ji hev derxist.

Gava wezîr têderxist, ku serxweşîya Marûf gihîştiye asta ku tê xwestin, jê re got: Bi navê Xwedê ez li te ecêbmayî mame, bê te çawa xwe gihandiye ew qas zêr û zîv û cewheran, ku qral û şahên Îranê jî xwe negihandinê. Di emrê xwe de kesî ji me bazirganekî mîna te maldar, comerd û destvekirî nedîtiye! Karê ku tu dikî, karê qral û şahan e, ne karê bazirganan ne. De êdî tu bi qedrê Xwedê kî, ji min re bibêje, bê tu çawa gihayî vê astê?

Wezîr, bi gotinên xweş û bi zimanê şîrîn li dora wî çû û hat, hetanî ku fena xwe bir serî û Marûf da axaftin. Marûf got: Ez ne bazirgan im û ne jî kurê qralan im... Piştre jî ta bi derzîyê vekir û çîroka xwe ji serî hetanî binî jê re got.

Wezîr, bi zimanekî şîrîntir tora xwe lê anî hev û ji Marûf re got: Tu bi qedrê Xwedê kî mîrzayê min, ka wê hungulîska xwe nîşanî me bide, da ku em bibîn tu çawa vî karî dikî?

Marûf hungulîska xwe ji destê xwe derxist, da destê wezîr û jê re got: A ji we re, ji xwe re binêrin! Wezîr, hungulîsk di nav destê xwe de bir û anî û ji Marûf re got: Ez hungulîskê bifirikînim, wê ew xizmetkar were? Marûf got: Belê belê, wê were. Bifirkîne, bila bê û ji xwe re li wî temaşe bike! Wezîr hungulîsk firkand, di cî de yekî got! Ez amade me ez benî, ez li bendî fermana te me. Gelo tu dixwazî bajarekî xera bikî yan jî ava bikî yan tu dixwazî qralekî bikujî? Tu çi bixwazî, ez ê di cî de pêk bînim!

Wezîr, Marûf jê re destnîşan kir û got: Rahêje vî mîrovê binketî û wî bavêje erda herî xerab, nava dirindayan, da ku ne avê û ne jî xwarinê li wir nebîne û ji tîbûn û birçîbûnan bimre, bêyî ku haya kesî jê çêbibe! Xizmetkarê cinî bi qerpika stûyê Marûf girt û ew bi hewa xist, bir. Marûf têderxist, bê mirineke çawa li pêşîya wî ye. Girîya û ji xizmetkar re got: Ey Ebûsadat, tu min bi ku ve dibî? Wî jî lê vegerand û got: Bêedebê bêmirwet! Ez te dibim çolistanê! Ka kî mîna te ehmeqtîyeke wisa dike û hungulîskeke wisa dide xelkê, ji bo ku lê binêrin? Le te ev heq kiriye û heger tirsa min ji Xwedê tune bûya, min ê tu ji bilindahîya hezar qamî berda erdê, ji bo ku tu li hewa perçe perçe bibûyayî. Marûf nema deng kir. Ebûsadat jî ew li orta çolistanê danî û bi şûn de vegerîya.

Wezîr jî, piştî ku hungulîsk xist tilîya xwe û cerebeya ewil li ser kir, li qral zivirî û jê re got: Te dît bê çawa bû, ne wisa? Min ji te re digot, ev zi-

lam derewînekî şêlanker e lê te ji min bawer nedikir! Qral got: Tu mafdar î wezîrê min. Xwedê hêz û qeweta te zêdetir bike, ka hela wê hungulîske bide min, ez lê temaşe bikim! Wezîr hêrs bû, lê zivirî, tif kir serçavên wî û jê re got: Kêmaqilo, ez ê çawa ve hungulîskê bidim te û bibim xulamê ber destê te, piştî ku êdî ez bûme mîrzayê te? Lê ez vê jî ji te re nahêlim!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 974'AN

*Şehrezadê got*:

Wezîr dîsa hungulîsk firikand. Ebûsadat hat raserî wî. Wezîr jê re got: Rahêje vî bêedebê hanê jî û wî bibe bavêje cem ê din! Ebûsadat rahiştê û bi hewa ket. Qral jê re got: Ey mexlûqê Xwedê, çi gunehê min heye, ku tu wisa bi min dikî? Ebûsadat got: Ez jî nizanim, mîrzayê min ev ferman daye min û ez nikarim li hember derkevim.

Ebûsadat fira xwe berdewam kir, heta ku gihîşt çolistanê. Qral jî danî cem Marûf û bi şûn de vegerîya. Dengê girîyê Marûf çû qral. Qral rabû ser xwe, lê gerîya, ew dît û li cem rûnişt. Tiştê ku wezîr bi serê wî kiribû, jê re got. Piştre, herdu bi hev re li ser wê mûsîbeta ku bi serê wan de hat, girîyan û li wir man, bê nan û bê av.

Wezîr jî, pişt ku Marûf û qral avêtin çolistanê, ji nav bax û baxçe derket û hat qesrê. Hemû leşker û artêş li dîwanê kom kir. Çîroka hungulîskê ji wan re got û ew agahdar kirin, bê wî çi bi serê Marûf û qral kiriye û ji wan re got: Heger hûn min li ser serê xwe nekin qral, ez ê fermanê bidim vî xizmetkarê xwe yê cinî, wê we gişan bavêje çolistanê. Hûn ê ji tîbûn û birçîbûnan li wir bimirin!

Leşkeran gotin: Zirarê nede me, em te li ser serê xwe qral qebûl dikin û em tu carî ji rêya fermanên te dernakevin.

Li ser wî esasî li hev kirin. Bê dilê xwe wezîr kirin qralê xwe. Wî jî hedîye û diyarî li ser wan belav kirin û her ku pêdivîya wî çêdibû, gazî Ebûsadat dikir û xwestekên xwe jê re rêz dikirin. Bûbû qral êdî, li ser text rûnişt û qasidek şand cem keça qral, jê re got: Xwe amade bike, îşev ez mêvanê te me, ji ber ku min pir bêrîya te kiriye!

Keybanû jî hîna li ser Marûf û bavê xwe digirîya, bersiv ji wezîr re şand û jê re got: Xwe ragire hetanî dema ku şerîetê diyar kiriye, biqede. Piştre mehra xwe li min bibire û wisa were cem min, bi helalî.

Wezîr jê re şand û got: Ez ne dema şerîetê nas dikim ne mehr û ne jî helalîyê û misoger ez ê îşev bêm nav nivîna te! Keybanûyê jî lê vegerand û got: Nexwe tiştek nabe, ser seran, ser çavan were!

Wezîr bi wê bersiva keybanûyê pir kêfxweş bû, aram bû û bêhna wî hat ber wî. Lewre aşiqê wê bû û pir bêrîya wê kiribû. Piştre bi lez û bez xwarin li ser xelkê belav kir û ji wan re got: Bixwin, vexwin, hetanî ku hûn karibin, ez ê îşev derbasî nav nivîna keybanûyê bibim! Şêxulîslam got: Ev heram e, tu nikarî derbasî cem wê bibî, hetanî ku dema şerîetê diyar kiriye, neqede û tu mehra xwe lê nebirî!

Wezîr got: Ez dema şerîetê nas nakim û tu jî devê xwe bigirê, zêde neaxive! Şêxulîslam pir tirsîya û bêdeng bû lê ji leşkeran re got: Ev kafirekî bêdîn û bêîman e, ne ola wî heye ne jî mezhebê wî!

Gava êvar hat, şev ket erdê, wezîr derbasî cem keybanûyê bû. Dît ku kincên xwe yên herî xweşik li xwe kirine û xeml û xêza xwe ya herî balkeş danîye ser xwe û li hêvîya wî ye! Keybanûyê bi rûgeşî û devlikenîyeke dilefrûz ew pêşwazî kir û jê re got: Şeva te pîroz be!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 975'AN

*Şehrezadê got*:

Keybanûyê bi rûgeşî wezîr pêşwazî kir û jê re got: Heger te mêrê min û bavê min bikuşta, dê hîn çêtir bûya! Wezîr got: Bêguman ez ê wan bikujim û çû li cem rûnişt, henek pê kirin. Keybanû jî pê re mijûl bû, henek û laqirdî lê kirin û pê re kenîya, aqilê wî ji serê wî bir. Wezîr jî her ku diçû, kelecana wî zêde dibû, hestên wî tîr dibûn û ajoyên wî difûrîyan, nema xwe digirt. Destê xwe avêt newqa wê, keybanûyê xwe bi şûn de da û jê re got: Qey tu wan çavên li ser me nabînî? Tu bi Xwedê kî, min bisitirîne ji wan çavan, çawa tu yê bi min şa bibî, li ber çavên wî?

Wezîr hêrs bû û got: Kanî ew zilamê tu behsa wî dikî, li ku ye? Keybanûyê got: Di kevirê hungulîska te de ye, serê xwe derdixe û li me dinêr e! Wezîr, têderxist, ku behsa xizmetkarê cinî dike, kenîya û jê re got: Ev mirov xizmetkarê hungulîskê ye û di bin emrê min de ye, tu qet jê netirse. Jinikê got: Ez ji efrîtan ditirsim, wî ji destê xwe derxe û dûrî min bavêje!

Wezîr hungulîska xwe derxist û ew danî ser balîfê û çû cem wê. Çawa

ku çû cem, keybanûyê pihînek li ser defa singê wî da, ew paşpaşkî, li ser totika qehfê wî qulipand. Wezîr hişê xwe wenda kir û li ser derzika piştê vezelîya, dirêj bû. Keybanûyê gazî qerwaşên xwe kir û ji wan re got: Wî bigirin! Çil heb qerwaşî xwe bi ser de avêtin, ew girtin. Wê jî xwe dirêjî hungulîskê kir û ew firikand. Ebûsadat di cî de derket raberî wê û jê re got: Ez ji fermanên te re amade me, xatûna min! Wê jî got: Vî kafirî bibe bavêje zîndaneke asê û qeydên wî giran bike! Ebûsadat ew bir zîndana xezebê, di wir de bi cî kir û hat, jê re got: Min ew zîndan kir, xatûna min!

Keybanûyê jê pirsî û got: Bavê min û mêrê min li ku ne? Wî got: Min ew avêtin nava çolistanê. Keybanûyê got: Here, di vê kêlîyê de wan bîne vir! Ebûsadat got: Ser seran, ser çavan û di cî de firîya, bi hewa ket, çû cem wan. Dît ku herdu li hev rûniştine, digirîn û gilî û gazinên xwe li hev dikin. Ji wan re got: Metirsin, fereca xêrê li we vebû! Û tiştê ku qewimîbû ji wan re got û pê de çû, got: Min bi destê xwe wezîr xist zîndanê. Niha ez di bin fermana keybanûyê de me, ji ber ku hungulîsk êdî di destê wê de ye. Wê niha emir daye min, ku ez we bi şûn de bibim, cem wê. Herdu jî bi wê mizgînîyê pir kêfxweş bûn.

Ebûsadat rahişt herduyan û firîya, bi hewa ket, di nava saetekê de ew danîn cem keybanûyê. Ew jî bi kêfxweşî bi wan ve rabû, xêrhatina herduyan kir, ew lî kêleka xwe dan rûnîştandin, xwarin û şîranî da ber wan û şeva xwe bi wan re derbas kir.

Roja dîtirkê, qatek kincên spehî li bavê xwe kir û yekî din jî li mêrê xwe kir. Li bavê xwe vegerîya, jê re got: Tu dîsa vegere, mîna berê li ser textê xwe rûnê. Qraltîya xwe berdewam bike û mêrê min jî bike alîkarê xwe yê destê rastê û leşkerên xwe jî ji tiştên qewimî agahdar bike. Piştre wezîr ji zîndana wî derxe, bîne vir û wî bikuje, bişewitîne. Lewre ew kafir e û xwest, ku bi heramî bikeve nav nivîna min. Jixwe wî bi devê xwe şehdebûn li xwe da, ku ew kafir e û bawerîya wî bi tu olê nayê.

Bavê we got: Gotina te li ser serê min e keça min lê ka wê hungulîskê bide min an jî bide mêrê xwe! Keybanûye got: Ev hungulîsk ne ji te re dibe û ne jî ji wî re. Bila li cem min be û belkî ez ji we herduyan bêhtir wê biparêzim. Çi ji we re lazim bû, ji min bixwazin, ez ê ji ji xizmetkarê xwe Ebûsadat bixwazim. Heta ku ez sax bim, hûn meraqan nexwin. Gava ez mirim jî, ji xwe hungulîsk a we ye.

Bavê wê got: Fikra rast ev e, keça min. Bi destê zavayê xwe girt û derketin dîwanê. Leşker hemû bi meraq û kul derd bûn, nizanibûn bê wezîr çi

bi keça qral kiriye. Lewre weke xwînmijan, bi heramî derbasî cem wê bûbû û ditirsîyan, ku şerîetê binpê bike. Ji ber wê jî li derdora şêxulîslam kom bûbûn, lome lê dikirin û jê re digotin, çima te pêşîya wî negirt! Şêxulîslam jî digot: Zilam kafir e, hungulîsk ketiye destê wî, ez û hûn rebenên Xwedê em ê karibin çi bikin? Helbet wê Xwedê cezayê wî lê bibire. Hûn jî bêdeng bin, bila we nekuje.

Vêca hîna ku leşker û şêxulîslam di nava wê nîqaşê de bûn, qral û zavayê xwe, derbasî cem wan bûn.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 976'AN

*Şehrezadê ji Şehreyarê gewre re got*:

Çawa ku me şeva borî jî got, hîna ku leşker di nava êşeke mezin de behsa bedbextê wezîr dikirin, bê çi bi serê qral û zavayê wî kiriye. Qral û zavayê xwe Marûf derbasî cem wan bûn. Çawa ku çavên leşkeran li wan ketin, pir kêfa wan hat û bi coşeke mezin rabûn ser nigan, destên wî maçî kirin û ew li ser textê wî dan rûniştandin. Qral, rewşa nû ji wan re rave kir, bêhna wan hat ber wan, kul û xem ji ser dilên wan rabûn.

Qral ferman da, ku bajar were emilandin. Piştre wezîr ji zîndana wî derxist, anî, nîşanî gel da, Gava ew di ber leşkeran re derbas dikirin, her kesî tif dikir ser çavên wî, ew şermezar dikirin û lanet lê dibarandin. Qral gazî celadên xwe kir û ji wan xwest, ku wezîr bi awayekî xerab bikujin û piştre jî bişewitînin. Wan jî wisa kir.

Di pey re, qral jî Hesen kir wezîrê xwe yê destê rastê û di nava xweşî û şahîyê de welatê xwe bi rê ve birin. Pênc salan sax wisa berdewam kirin. Di sala şesan de qral mir û çû ber dilovanîya Xwedê. Keça qral jî mêrê xwe Marûf, li şûna bavê xwe kir qral lê hungulîsk nedayê. Di nava wê dema derbasbûyî de kurekî pir spehî û hêja ji wan re çêbûbû, ew dabûn ber destên dadan, wan ew mezin dikirin. Gava temenê wî bû pênc sal, diya wî bi awayekî xerab nexweş ket û mirina wê xuya kir. Gazî mêre xwe Marûf kir, got: Ez nexweş im! Marûf got: Xwedê selametîya te bide, delala ber dilê min! Jina wî got: Dibe, ku ez bimirim û hewce nake, ku ez tembîya kurê me li te bikim lê belê ez tembîya hungulîskê li te dikim. Li wê miqate be, ji bo selametîya te û kurike me.

Marûf got: Tiştek nabe, ez ê lê miqate bim. Jina wî hungulîsk ji tilî ya xwe derxist û da wî. Di roja din de jî çû ser dilovanîya xwe û mir. Êdî Marûf bûbû qral û danûstendin bi qralan re dikir.

Rojekê destmalka xwe hejand, li ba kir. Leşker ji dora wî rabûn, belav bûn. Ew jî derbasî odeya civatê bû. Ma, heta ku êvar hat û şev ket erdê. Piştre derbasî cem hevalên şevbuhêrka xwe bû, ku hemû mirovên qodeman bûn. Şevbuhêrka xwe bi hev re derbas kirin û dilê xwe xweş kirin, hetanî nîvê şevê. Piştre hevalên wî izna rabûnê jê xwestin, wî jî destûr da wan. Hemû rabûn ser xwe, çûn malên xwe.

Piştre qerwaşa ku her şev nivîna wî jê re rast dikir, derbasî cem wî bû. Doşek û lihêfa wî jê re rast kir, kincên wî jê kirin û kincên xewê lêkirin. Piştre wî li ser cihê xwe pal da, qerwaşê jî nigên wî jê re firkandin, heta ku di xew re çû. Gava ew raket, keçik jî rabû, çû ser cihê xwe û ew bi tenê hişt.

Marûf di xew de bû lê ji nişka ve şiyar bû û his kir, ku tiştek di nav nivîna wî de ye. Çavên xwe vekirin, dît ku jineke sik û kefçil di nav cihê wî de ye! Jê re got: Tu kî yî? Wê got: Netirse, ez jina te, Fatima şerûd im. Baş lê nêrî, bi rûçikê wê yê perçiqî û diranên wê yên dirêj ew nas kir. Jê re got: Tu di ku re derbasî cem min bûyî û kê tu ji wî welatê dûr anîyî vir? Jina wî jê re got: Çima qey tu niha li kîjan welatî yî? Marûf got: Ez li welatê Xîtanel Xîten im lê tu kengî ji Misrê hatî vir?

Fatê got: Ez niha hatim. Marûf got: Ew çawa? Fatê got: Gava ez û tu pevketin û şeytan ez ji rê derxistim, hişt, ku ez herim gilîyê te li cem walî bikim, çûn li te gerîyan, pirsa te ji herdu qazîyan jî kirin lê tu nedîtin. Du roj bi şûn de, ez poşman bûm û min nas kir, ku kêmanîya min bû. Lê êdî tu fêdeya poşmanîyê jî nemabû. Çend rojekî ez rûniştî mam û ez li ser çûna te girîyam. Piştre diravên di destê min de jî qedîyan û ez mecbûr mam, ku ez parsê bikim, ji bo ku xwe xwedî bikim û debara xwe bikim. Ez ketibûm rewşeke pir xerab û her şev ez li ser te û fîraqa te digirîyam. Min êş û zor û zehmetîyên giran dikişandin, bêyî te…

Fatê vegotina çîroka serpêhatîya xwe ji Marûf re ber dewam dikir û wî jî behetî ew guhdar dikir, hetanî ku got: Duh jî, bi ro pê de ez li parsê gerîyam, kesî tiştek neda min. Ez diçûm, min destê xwe li ber kê vedikir, têra xwe sixêf ji min re didan û tiştek jî nedidane min. Şev hat û ez jî birçî raketim. Lê xewa min nehat û birçîbûnê agir bi nava min xist. Ez jî rabûm ser xwe rûniştim û girîyam. Carekê min dît ku yek li ber min sekinîye û ji

min re dibêje; jinê tu çima digirî? Min got; mêrekî min hebû, pêdivîyên min dianîn, ez xwedî dikirim lê nebedî bûyê û nema xuya dike, wî jî got: Navê mêrê te çi ye? Min got; Marûf e. Wî got: Ez wî nas dikim û mêrê te niha li ser welatekî sultan e û heger tu bixwazî, ez ê te bigihînim cem wî? Min jî jê re got: Ez di dexîlê te de me min bibe cem wî. Wî jî rahişt min û firîya, ez anîm vê qesra te.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 977'AN

*Şehrezadê got*:

Fatima şerûd axaftina xwe berdewam kir û ji Marûf re got: Wî efrîtî ez anîm vê qesrê û ji min re got: Derbasî vê odeyê bibe, tu yê mêrê xwe tê de bibînî, ku li ser nivînê raketî ye. Ez jî derbasî hundir bûm û min dît ku tu li vir raketî yî. Bi wî hawayî hêvîya min a salan pêk hat û spas ji Xweda re ku ez dîsa gihandim te, piştî ku te ez terikandim!

Marûf got: Min dev ji te berda yan te hişt, ku ez bi çolan bikevim, bi wan gilîyên neheq, ku te li qazîyan kir û herî dawîyê te çû li cem walî jî kir û te hişt, ku zêrevanên walî bikevin pey min û ez jî mecbûr mam, xwe bidim alî û ji ber te birevim... Piştre çîroka reva xwe ji serî ve jê re got, hetanî ku bû sultan û qrale wî bajarî û bi keça qral re zewicî. Helbet ew ji mirina keça qral jî agahdar kir û jê re got: Lê mixabin ew mir û kurêk ji min re hişt, ku temenê wî heft sal in, niha.

Fatê got: Tiştê ku qewimî qedera Xwedê bû. Min tobe kiriye û ez xwe davêjim bextê te, ku tu dev ji min bernedî. Bihêle ku ez nanekî li cem te bixwim û bila ew nan sedeqeya te be.

Fatê pir li ber gerîya, heta ku dilê wî pê şewitî û jê re got: Heger tu tobe bikî û tu dev ji xerabîyê berdî, tu dikarî li cem min bimînî, di nava xêr û xweşîyê de û wê xerabîya tu kesî negihîje te. Heger tu xerabîyê bikî, ez ê te bikujim û ez ji kesî jî natirsim. Bila nekeve bîra te, ku tu herî gilîyê min li cem walî jî bikî. Lewre ez bûme sultan û mirov giş ji min ditirsin. Ji Xwedê pêve, ez ji tu kesî natirsim. Hungulîskeke min heye, kengî ez wê bifirikînim, xizmetkare wê yê bi nave Ebûsadat derdikeve raberî min, ez çi jê bixwazim, ji min re tîne. Heger tu bixwazî herî welatê xwe, ez dikarim malekî ku hetanî mirinê têra te bike, bidime te û di cî de te bişînim wir. Lê

na, heger tu dixwazî li cem min niştecih bibî, ez ê qesrekê ji te re vala bikim. Wê bi hevrîşim û berên ecemî raxim, bîst qerwaşan bidim ber destên te, ji bo xizmeta te bikin û ez ê xwarin û vexwarina herî xweş û kincên herî spehî ji te re pêşkêş bikim, da ku tu bibî keybanûyek û di nava jîyaneke bextewar de bijî, hetanî mirinê. Îcar tu çi dibêjî?

Fatê got: Ez dixwazim li cem te biminim. Pê re jî rabû ser xwe, destê wî maçî kir û tobe kir, ku xerabîyê neke. Marûf jî qesrek jê re veqetand, qerwaş û xulam dan ber xizmeta wê û êdî Fatê jî bû keybanûyek.

Kurê Marûf jî her car diçû û dihat cem wî û Fatê. Lê ji ber ku kurik ne ji wê bû, jê hez nedikir. Ev helwesta wê, hişt, ku li hemberî wê hîlet bi kurik re çêbibe. Marûf jî berê xwe dabû qerwaşên spehî û ciwan û Fatima şerûd ji bîr kiribû. Lewre êdî ew li ber çavên wî pîr bûbû. Rûyê qermiçî bû weke çermên maran û gelekî nexweşik bûbû. Ji ber ku berê jî pir xerabî pê kiribû, rûyê wê li ber çavên wî pir xerab xuya dikir. Gotina ku dibêje, "Çi kiro bi xwe kiro." di vir de ji bo Fatê pir derbasdar e. Jixwe qencîya ku Marûf pê dikir jî, ne ji ber ku mezîyetên baş di Fatê de hebûn, na. Lê belê ji bo rizakirina Xwedê bû.

Dunyazadê ji xwîşka xwe Şehrezadê re got: Ev gotinên te çiqas xweş û watedar in, xwîşkêcan, rasterast di nava dilê mirov de rûdinên!

Şehrezadê lê vegerand û got: Ev tiştên ku îşev min ji we re gotin, ne tu tişt in, li hemberî yên ku ez ê sibê ji we re bibêjim; heger şahînşahê gewre min sax bihêle!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 978'AN

*Gava bû sibe û şewqa tavê da çiya û banîyan, şahînşahê gewre Şehreyar bi dilekî xweş û singekî vekirî di nava meraqa berdewamîya çîroka Şehrezadê de ji xew rabû. Di dilê xwe de ji xwe re got: "Bi navê Xwedê, ez wê nakujim, hetanî ku ez berdewamîya vê çîrokê ji devê wê nebihîzim!"*

*Piştre rabû çû dîwana xwe. Wezîrê wî jî kefenek di bin çengê wî de, mîna her car derbasî hundir bû. Ji sibehê hetanî êvarê peywira xwe ya şahîtîyê kir, pirsgirêkên gelê xwe çareser kirin û bi wan re mijûl bû. Piştre vegerîya hundirê malê û mîna her şev çû derbasî cem jina xwe Şehrezadê bû.*

*Dunyazadê ji xwîşka xwe re got: Kanî çîroka Marûf ji me re bibe serî!*

*Şehrezadê got*: *Ser seran, ser çavan, heger şahînşahê gewre îzin bide? Şehreyar got: Bibêje! Şehrezadê got*: Çawa me şeva borî jî got, Marûf êdî nema diçû nav nivîna Fatimê û berê xwe dabû qerwaşên ciwan û xweşik. Gava Fatê dît ku mêrê wê nema tê cem wê û bi jinin din re mijûl dibe, rik û kîna wê li hemberî wî çêbû. Zikreşî û xîret ket nava wê, tasewas pê re çêbûn û şeytan di guhê wê de jê re got: Hungulîska wî bibe û wî bikuje! Piştre jî li şûna wî xwe bike keybanû!"

Şevekê ji şevan, Fatê ji qesra xwe derket û çû qesra ku mêrê wê lê dima. Qederê wisa jê re li hev anî, ku wê gavê Marûf jî di odeyeke qesrê de bi qerwaşeke xwe ya spehî re raketî bû. Vêca ji ber ku Marûf xwedî bîr û bawerîyeke xurt bû, gava ku dixwest bi qerwaşeke xwe re rakeve, ji ber rêzdarîya li hemberî wan navên pîroz ên ku li ser wê neqişandî bûn, hungulîska xwe ji destê xwe derdixist. Dema ne tahir bûya, ew hungulîsk nedixist tilîya xwe. Fatimayê jî bi vê meziyeta wî dizanibû û jê agahdar bû, ku hungulîska xwe datîne ser balîfê û hetanî xusla xwe negire, wê naxe destê xwe.

Îcar ji adeta Marûf bû, piştî ku pevşabûna wî bi qerwaşê re diqedîya, ew ji odeya xwe derdixist, dişand odeya wê. Ji ber ku bi kesî bawer nedibû û ditirsîya, ku hungulîska wî bibin. Piştî ku qerwaş ji hundirê xwe derdixist, dişand, derîyê odeya xwe digirt û diçû hemamê, xwe dişûşt. Piştre vedigerîya odeya xwe, hungulîska xwe dîsa dixist tilîya xwe. Piştre kî biketa qesrê jî, ne xema wî bû.

Fatê jî bi wan hemûyan dizanibû, loma bi şev hat qesra wî. Di demeke ku Marûf di xeweke giran de bû, bi awayekî ku kes wê nebîne, bi dizî ket qesrê. Lê di wê saetê de bi rasthatinekê kurê Marûf jî ji bo ku avekê birijîne, çûbû daşirê û ji ber tarîya şevê derîyê daşirê vekirî hiştibû û wisa rûniştibû. Gava ku Fatê derbasî qesra bavê wî bû, kurik ew dît û di nava xwe de ji xwe re got: "Gelo ev pîrheboka hanê vê şevê ji bo çi diçe qesra bavê min? Bêguman divê sebebeke wê hebe!" Kurik rabû ser xwe, ji daşirê derket û bi dizî da pey wê, ew şopand. Di ber wî de jî xencerek hebû, ku kalanê wê ji gewher bû. kurik ji wê xencera xwe pir hez dikir, xwe pê paye dikir û timî li ser xwe digirt. Her ku ew bi wê xencera xwe diçû dîwanê, bavê wî jê re digot: Maşela, maşela, ev şûrê hanê çiqasî bi kurê min dikeve! Lê mixabin vî şûrê te hîna serê mirîşkekê jî jênekiriye! Wî jî lê vedigerand û digot: Misoger serîyekî ku heq bike, dê pê were jêkirin! Bavê wî jî bi wê gotina wî dikenîya.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 979'AN

*Şehrezadê got*:

Kurê Marûf xencera xwe ji kalanê wê derxist û ket pey jinbava xwe, ew şopand, heta ku gihîşt qesrê. Fatê derbasî hundir bû, kurik jî li devê derî sekinî. Bi çavan û bi guhan ew şopand. Bala xwe dayê, ku dengê wê tê dibêje: "Gelo wî hungulîska xwe danîye ku?" Têderxist, ku jinik li hungulîskê digere. Qaseke din bi şûn de, dengê wê hat, got: "Va ye li vir e!" Fatê rahişt hungulîskê û hewl da, ku derkeve. Kurik xwe xist pişt derî û ma li hêvîya wê. Hungulîsk di destê wê de, Fatê di derî re derket. Bi kêfeke xweş maçî dikir û hewl dida, ku wê bifirikîne. Tam di wê kêlîkê de kurik xencera xwe li qirika wê da, hişt, ku qîrîn pê keve. Fatê li erdê dirêj bû û di cî de mir.

Marûf bi dengê wê ji xew rabû ser xwe û dît ku cendekê jina wî di nava xwînê de li erdê dirêjkirî ye û kurê wî jî li ber sekinîye, xencera wî di destê wî de. Marûf got: Ev çi ye, kurê min? Kurik got: Bavocan, gelek caran te ji min re got, şûrê te pir xweşik e lê te bi wî şerekî bi tenê jî nekiriye û te stûyê kesekî jê nekiriye... Piştre çîrok ji serî de jê re got, bê çawa ew şopandiye û çawa ew kuştiye û ji bo çi.

Marûf çavên xwe li derdora meytê Fatê gerandin lê hungulîsk nedît. Her dera wê di ber çavan re derbas kir, herî dawîyê dît ku di nava destê wê de ye û destê wê hîna jî lê rapêçayî ye. Hungulîska xwe ji nav lepê wê derxist û li kurê xwe vegerîya û jê re got: Bêguman tu kurê min î û tu pir jêhatî yî. Xwedê te li vê dinyê bistirîne û li wê dinyê jî bi bihuştê şa bike. Destê te derdan nebîne, madem ku te ez ji vê xerabkara hanê xelas kirim.

Piştre gazî xulam û nobedaran kir. Tiştê ku Fatmayê kiribû, ji wan re got û ji wan xwest, ku meytê wê rakin, hetanî sibehê li cihekî deynin. Wan jî fermana wî pêk anîn. Roja dîtir, peywira şûştin û definkirina wê da çend xulam û qerwaşan. Wan jî peywira xwe pêk anîn. Fatê veşartin, gorek jê re çêkirin û kêlek jê re danîn. Di peyre Marûf şand dû wî cotkarîyê ku hungulîsk û xezîne di bin zevîya wî de dîtibû û ew kir wezîrê destê rastê û şêwermendê xwe. Piştre fêr bû, ku keçeke wî ya pir spehî û lihevhatî heye, ku xwendîyê sinc û hişmendîyeke kamilane ye. Marûf bi wê keça wezîrê xwe re zewicî û çend salan bi şûn de kurê xwe jî zewicand û hemûçkan bi hev re di nava aramî û hêminîyê de jîyaneke xweş û bextewar derbas kirin. Jîyana xwe wisa berdewam kirin, heta ku xerabkarê xweşîyan, belavkarê

dost û hevalan bi ser wan de hat! Subhan ji ew ê ku namire û her tişt di destê wî de ye!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 980'YÎ

## ÇÎROKA ÎSKENDERÊ ZULQERNEYN

*Şehrezadê ji şahînşahê gewre Şehreyar re got*:

Tê gotin, ku îskenderê Zulqerneyn di rêwîtîya xwe de li qewmekî jar û hejar rast hat, ku tu tiştekî wan tune bû û gorên miriyên xwe, li ber derîyên xwe çêkiribûn. Salewext dora gorên xwe rêş dikirin, paqij dikirin, serdana wan dikirin û li ser wan tirban xiroş û îbadet ji Xwedayê xwe re dikirin. Ji xeynî gihayê erdê û riwek û nebatan tu xwarin jî di malên wan de tune bûn.

Îskender qasidek şand cem qralê wan, ji bo ku were pê re hevdîtinekê bike, lê qralê wan nehat û ji qasid re got: Tu pêdivîya min pê tune ye. Gava Îskender ev bersiv ji wî girt, ew bi xwe rabû, çû cem wî û jê re got: Gelo rewşa we çawa ye? Bi qasî ku tê xuyakirin, ne zêr û zîvên we hene û ne jî xweşîyeke vê dinyayê?

Qralê wan li Îskender vegerand û got: Xweşîyên vê dinyayê, kes ji wan têr nabe! Îskender got: Çima we gorên xwe li ber derîyên xwe kolane? Qralê feqîran got: Ji bo ku timî li ber çavên me bin, em mirinê ji bîr nekin, bi xweşîyên vê dinyayê mijûl nebin û îbadeta Xwedayê xwe û wê dinyayê ji bir nekin.

Îskender jê pirsî: Çima hûn tenê giha dixwin û ev qas ajal li derdora we ne? Qralê feqîran got: Ji bo ku em zikê xwe nekin gora ajalan û ji ber ku hemû çêj qirikê derbas nakin! Piştre destê xwe dirêj kir buxçikekê û totikê mirovekî jê derxist, xist nav lepên Îskender û axaftina xwe berdewam kir, got: Ey Îskender, gelo tu dizanî bê ev totik ê kê ye? Îskender got: Na. Qralê feqîran got: Xwedîyê vî totikî, qralek bû, zilm û tehde û zordarî li gelê xwe dikir û hemû jarên bêhêz tepeser dikirin, malik li wan xera dikir û şev û ro gemara dinyayê kom dikir. Lê Xwedê ruhê wî stend, ew şand dojehê û ev totikê wî jî li vir hişt. Piştre totikekî din da destê Îskender û jê re got: Tu vî nas dikî? Got: Na. Qralê feqîran got: Ev jî qralek bû, bi dadwerî gelê xwe bi rê ve dibir, bi feqîran re dilovan û dilsoz bû. Xwedê ruhê wî jî stend lê ew şand

bihuşta xwe û cihekî taybet da wî. Dûre destê xwe danî ser serê Îskender û jê pirsî: Gelo tu ji van herduyan kîjan î?

Kûrekûr bi Îskender ket, girîya, ew himbêz kir û jê re got: Heger tu jî bi min re bikevî rê, ez ê te bikim wezîrê xwe û em ê herdu vî welatî bi rê ve bibin? Qrale feqîran got: Heyhat! Tu daxwazeke min î wisa nîn e. Îskender jê pirsî: Çima gelo? Qralê feqîran got: Ji ber ku mirov hemû dijminahîyê bi te re dikin, ji ber vî mal û milkê te û hemû bi min re dostanîyê dikin, ji ber jar û feqîrtiya min. Ji ber ku tu mal û milkê min tune ye û tu daxwazîya min jî tê de tune ye. Lewre tenê qenaeteke min heye, ku ez pê dijîm.

Îskender bi germahî ew himbêz kir û ji enîya wî ew maçî kir û rabû çû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞÊVA 981'Ê

## ÇÎROKA ENÛŞREWANÊ DADMEND

*Şehrezadê ji Şehreyar re got*:

Tê gotin, ku rojekê ji rojan şah Enûşrewanê dadmend nexweş ket. Textor û hekîm hatin ser û jê re gotin: Dermanê nexweşîna te mastekî kevnar e, ku li gundekî xerabe ye. Enûşrewan jî gazî hemû zilamên xwe yên pê bawer kir û ji wan xwest, ku herin li welat belav bibin û li her derê bigerin, bê mastê kevn û ew gundê xerabe li ku derê ye, ji bo ku jê re bînin.

Zilamên wî li seranserê welat belav bûn, li her derê gerîyan û vegerîyan jê re gotin: Li seranserê welat ne gundekî xerabe heye û ne jî mastekî kevn li cem tu kesî heye.

Enûşrewan pir kêfxweş bû bi vê xebera zilamên xwe û got: Şikir ji Xwedê re! Jixwe min jî dixwest, ku ez bizanibim bê hîna cihekî xerabe di vî welatî de maye, ku ez herim wî ava bikim. Lê madem ku cihekî xerabe tê de nemaye, nexwe her der abad û bi rêkûpêk e.

Şehrezad li Şehreyar vegerîya û axaftina xwe berdewam kir, got: Şahîşahê min ê gewre û mehrîban, ev şah û qral û sultanên berê, giş bi avakarîya welatên xwe ve pir mijûl dibûn. Ji ber ku wan ji gotinên zanyar, hekîm û aqilmendan bawer dikirin û dizanibûn, ku rastî di wir de ye. Lewre zana û hekîm dibêjin, ku dinya bi milk peyde dibe, milk jî bi leşkeran, leşker û artêş jî bi mal, mal jî bi avakirina welat, avakirin jî bi dadmendî û dadwerîya

di nava xelkê de pêkan e. Loma zilm û zor qebûl nedekirin û îzin nedidan zilamên xwe, ku tehdahîyê li kesî bikin. Lewre wan dizanibû, ku xelk, li ber zilm û zorê xwe nagire û devera ku zalim tê de serdest bin, wêran dibe, mirovên wî ji hev belav dibin û koçî deverin din dikin. Bi wî hawayî milk kêm dibe, dahat qels dibe, xezîne ji diravan vala dibin û jîyan li xelkê dibe jehr. Lewre tu kes ji zilm û zorê hez nake û her dem nifiran li wan dikin. Di nava bêaramî û nexweşîyê de, ber bi xetere û talûkeyan ve diçin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 982'YAN

## ÇÎROKA MALIK BIN DÎNAR Û BENDEYÊ REŞ

*Şehrezadê got*:

Tê gotin, ku Malik Bin Dînar (Rehma Xwedê lê be.) gotiye: Li cem me li Besrayê, demsala baranan zuha derbas bû, baran qet nebarîya û mirov perîşan bûn. Em jî derketin duaya baranê lê Xwedê teala duaya me qebûl nekir. Rabû, ez, Ata Eselemî, sabîtul Benanî, Necîyul Bûka, Muhemed Bin Wasîh, Eyûbê Sextiyanî, Hebîbê Farisî, Hesan Bin Sînan, Etebe Elxûlam û Salihil Meznî em çûn mizgeftê. Zarok jî ji dibistanan derketin, hatin, tevlî me bûn. Me dîsa duaya baranê kir lê careke din Xwedê teala duaya me qebûl nekir û baran nebarand.

Roj hat nîvroyê, mirov hemû belav bûn. Çûn malên xwe. Ez û Sabîtul Bunyanî tenê li mizgeftê man.

Êvarkî, gava roj çû ava, me dît, reşikekî rûgeş, çîmzirav û zikmezin hat mizgeftê. Kirasekî hirî li ser wî, te hemû bida ser hev, du derhem nedikir. Hinek av ji xwe re anî, pê destnimêj girt. Piştre derbasî mîhrabê bû û bi sivikahî du rekaet nimej kir. Ew qas sivik bû, ku rukû û sicûd û rabûna wî hemû yek bûn. Piştre herdu destên xwe ber bi jor ve vekirin û got: Ya îlahî! Xwedêyo! Hetanî kengî tu yê daxwaza bendeyên xwe bê bersiv bihêle, gelo milkê te kêm bûye, ango embarên te vala bûne? Ji bo xatirê wê hezkirina te ya ji min re, ka niha baranekê ji me re bibarîne!

Hîna ku wî duaya xwe neqedandibû, asîmanan mehdê xwe tal kir, ewrên tarî li hev kom bûn û baraneke xurt lê da. Weke ku bi mezrîban were xwarê. Gava me xwest, ku em ji mizgeftê derkevin, me dît ku av tê kabokê, em neçûn. Lê hîna jî behetîna me derbas nebûbû û em li wî reşikî ecêbmayî mabûn.

Malik axaftina xwe berdewam kir û got: Ez rabûm çûm cem wî û min jê re got: Reşiko qey tu ji ber xwe fedî nakî, ku tu wan gotinan dikî? Li min zivirî û ji min re got: Min çi gotiye, ku ez ji ber fedî bikim? Min jê re got: Te got, ji bo xatirê wê hezkirina te ya ji min re; ma tu ji ku dizanî ku Xwedê ji te hez dike?

Mirovê reşik ji min re got: Dev ji min berde, ey ezezê xwehez! Ma qey ez li ku bûm, gava ku wî ez piştrast kirim, bi yekanî û tenahîya xwe û hişt, ku bi taybetî ez wî nas bikim? Gelo ew piştrastkirina wî ji min re, ne ji ber hezkirina wî ye? Hezkirina wî ji min re, bi qasî hezkirina min ji wî re ye!

Çawa ku ew gotina xwe qedand jî, pişta xwe da min, ku here, min jê re got: Tu bi qedrê Xwedê kî, hinekî bisekine! Wî got: Ez bende me û ez mecbûr im, stûyê xwe li ber xwedîyê xwe yê biçûk jî bitewînim û herim xizmetê jê re bikim!

Ew çû, me jî da dû wî û ew şopand, hetanî ku derbasî maleke koledaran bû. Nîvê şevê bihurîbû û nîvê mayî jî giran derbas dibû. Em çûn û roja din sibehê, em vegerîyan wê mala koledaran û me ji kolefiroş re got: Gelo bendeyekî ji bo xizmetê li cem te heye, ku tu wî bifiroşî me?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 983'YAN

*Şehrezadê ji Şehreyarê gewre re got*:

Kolefiroş ji me re got: Belê, bi qasî sed bendeyî li cem min hene, ez gişan difiroşim. Piştre bendeyên xwe yeko yeko derxistin raberî me û me jî li wan nêrî, heta ku heftê heb temam bûn. Lê me ew reşikê xwe di nav wan de nedît. Kolefiroş got: Ji vana pê ve li cem min tune ne.

Gava em bi şûn de zivirîn, ji bo ku em derkevin, li pişt wî xanîyî, odeyeke xerabe ya mîna koxikekê hebû. Me dît ku ew reşikê me tê de û li ser nigan e. Min got, bi navê Xwedê zilamê ku em lê digerin, ev e! Û em li kolefiroş vegerîyan, min jê re got: Vî bendeyî bifiroşe min!

Kolefiroş got: Bavê Yehya, evê hanê xortekî beyom û bêoxir e. Şev pê de tu tiştî nake, ji girî pê ve û bi ro jî her tim poşman û xemgîn e. Min got: Ez jî ji ber wê yekê wî dixwazim. Kolefiroş gazî wî kir, çavlixew bû. Ji min re got: Wî bibe, min jê xelas bike û tu çiqasî didî, bide. Min bîst dînar danê û jê pirsî: Navê wî çi ye? Kolefiroş got: Meymûn e. Min bi destê wî girt û me berê xwe da malê.

Bi rê de li min zivirî û ji min re got: Xwedanê min ê biçûk, te çima ez kirîm? Bi navê Xwedê tu kar bi min nabe û ez ji xizmeta insanan re nabim! Min jî jê re got: Min tu kirî, ji bo ku ez xizmetê ji te re bikim û te li ser serê xwe deynim. Wî li min vegerand û got: Ew çima? Min got: Ma evê duh li mizgeftê ne tu bûyî? Wî got: Qey te ez dîtim? Min jê re got: Ê ku duh li hemberî te derket, ez bûm!

Me meşa xwe berdewam kir, heta ku em di ber mizgeftekê re çûn. Derbasî mizgeftê bû, du rekaet nimêj kir û got: Xwedêyo, xwedîyê sir û razên min! Di neqeba min û te de razek hebû, te mirov pê hesandin û te ez di nava wan de hetikandim! De êdî ez ê çawa jîyana xwe bi aramî berdewam bikim, piştî ku hinekên din bi raza me hesîyan? Ez hêvîdar û daxwazkar im, ku tu di vê kêlîyê de ruhê min bistînî!

Çawa ku ew duaya xwe qedand, serê xwe danî, ket sicûdê û nema rabû. Bi qasî saetekê ez li hêvîya wî mam lê dîsa ranebû, xwe tevneda. Min destê xwe dayê, min dît ku miriye, çûye ber dilovanîya Xwedê. Min ew li erdê dirêj kir, dest û nigên wî dan ber hev û lê nerî. Min dît ku rûken e û spîya di rûçikê wî de zora reşahîyê biriye û mîna heyvê dibiriqîne. Hîna ku em di nava wê ecêbmayînê de bûn, min dît ku xortek di derî re derbas bû, hat û got: Silav li ser we be, Xwedê xêra me zêde bike, bi birayê me Meymûn re. A ji we re ev kefenê hanê, wî pê bipêçin! Û du heb kefenên spî dan destê min, ku min kefen mîna wan nedîtibûn!

Me ew kefen kir û veşart. Tirba wî niha ziyaret e û ji bo daxwaza baranê, mirov diçin ser, ji Xwedayê xwe re dua dikin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 984'AN

## ÇÎROKA MIROVÊ SAÎDÎ Û JINA WÎ YA FRENGÎ

*Şehrezadê ji Şehreyarê gewre re got*:

Tê gotin ku walîyê Qahîreyê emîr Şûcadîn Mûhemed gotiye: Em li mala mirovekî saîdî bûn mêvan, Camêro qedr û qîmeta me girt û mazûvantîyeke baş ji me re kir. Mirovekî temen mezin û esmer bû. Lê zarokên wî spî bûn û hinarikên rûyê wan sor bûn, di rengê meyê de. Me jê re got: Çima zarokên te spî ne û tu rûesmer î? Got: Diya van zarokên min frengî ye û çîrokeke

min î ecêb pê re heye. Me got: Gelo tu dikarî wê çîrokê ji me re bibêjî? Got: Belê. Wê çaxê li vê derê min kitan çand û çinî û veçirand, bi temamî min pêncsed dînar li ser xerç kir. Lê gava min xwest ez bifiroşim jî, tu dirav tê de nehatin û min tu fêde tê de nedît. Xelkê ji min re got, bibe Akayê, belkî li wir tu fêdeyekê tê de bibînî.

Vêca Aka jî wê çaxê di destê frengan de bû. Ez çûm Akayê û min malê xwe da ber bazarê. Min hinek firot lê ji bo ku ez gişî bifiroşim, divîyabû ez bêhna xwe fireh bikim û bi qasî şeş mehan ez li wir bimînim. Min firotina kitana xwe berdewam kir. Carekê jineke frengî hat ba min. Jixwe jinên frengan rûvekirî, bêrûpoş li kolanan digerîyan. Îcar a ku hatibû kitanê ji min bikire jî, pir spehî bû û çawa ez çav lê ketim, hişê min ji serê min çû. Min kitan bi erzanî firot wê, wê jî rahişt malê xwe û çû. Çend rojên din bi şûn de dîsa hat cem min, kitan xwest. Wê carê min ji cara ewil jî erzantir firotê. Çûnûhatina wê bi wî hawayî berdewam kir û têderxist, ku ez jê hez dikim. Vêca ji adeta wê bû, ku timî bi pîrejinekê re here û were. Carekê min ji pîrejina pê re re got: Ez dil ketime vê jinê, gelo tu ji min re çareyekê, rêyekê nabînî, ku ez pê re werim cem hev? Pîrê got: Ez ê rêyekê ji te re bibînim lê ev tişt divê di navbera me her sêyan de bimîne û divê tu hinek diravan jî bidî min? Min jê re got: Min bigihîne wê, tu ruhê min jî bixwazî ez ê bidim te!

Di encamê de me li ser pêncî dinarî li hev kir. Min pêncî dînar da pîrê, wê jî ji min re got: Di mala xwe de cihekî jê re raxîne, wê îşev were cem te.

Ez çûm malê, min cihek amade kir, xwarin, vexwarin, mûm û şîranî hemû hazir kirin û bir ser banê xanî, lewre xanîyê min li behrê dinêrî û ji ber ku dinya havîn û pir germ bû, min cihê wê jî li wir raxistibû.

Jina frengî hat, min ew bir jora xanî. Me xwar, vexwar, heta ku şev dereng ket. piştre me li ser nivîna xwe palda, di bin şewqa tava heyvê de û stêrkên ku di zikê asîmanan de diçirûsandin. Carekê ji nişka ve min di dilê xwe de ji xwe re got: "Qey tu ji Xwedayê xwe fedî nakî, ku tu li xerîbîyê, di bin banê vî asîmanê sayî de û li kêleka vê behrê, bi vê jina krîstiyan re gunehan dikî û tu agirê dojehê heq dikî! Xwedêyo tu şahidê min î, ku ez îşev nêzikî vê jina krîstiyan nabim, ji ber fedîya ji te û ji tirsa cezayê te!"

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 985'AN

*Şehrezadê got*:

Mîrovê saîdî vegotina serpêhatîya xwe berdewam kir. Min pişta xwe da jinika frengî û ez raketim, hetanî sibehê. Jinik bi hêrs rabû ser xwe û çû mala xwe. Ez jî çûm dikana xwe, li cihê xwe rûniştim, Qasekê bi şûn de, min bala xwe dayê, ku dîsa ew û pîrêjina pê re hatin. Hîn jî qehirî bû lê rûyê wê mîna heyvê bû. Çawa min lê nêrî, agir bi dilê min ket. Rabû min ji xwe re got: Tu kî yî, ku tu berê xwe ji vê keçikê diguherînî! Qey tu Sirê Seqet î, Bişarê Haf î, Cundîyê Bexdadî yan Fadl Bin Ayad î?" Pê re jî ez rabûm, min xwe gihand pîrê û jê re got: Wê dîsa bişîne cem min. Pîrê got: Bi heqê navê Mesîh, ne bi sed dînarî be, nema vedigere cem te! Min got: Ez ê sed dînarî bidim te û di cî de sed dînar da pîrê.

Jinik careke din hat cem min û ew tirs û fedîya ji Xwedê jî dîsa ket bîra min û dîsa min pişta xwe dayê, ez raketim. Ew jî sibehê rabû bi qehir çû. Ez jî çûm dikana xwe, demek bi şûn de dîsa ew û pîrê hatin dikanê, hêrsa wê di çavên wê de xuya dikir lê di heman demê de dilê min kunkinî kir. Min ji pîrê xwest, ku careke din were cem min. Pîrê got: Bi heq navê mesîh pir ji te hêrs bûye û ne bi pêncsed dînarî be, nema te cem te! Laşê min lerizî lê dîsa jî min biryar da, ku ez heqê kitanê gişî û xwe jî li ser bikim, ji bo ku ez xwe bigihînimê.

Lê hîna ku ez wisa pê re diaxivîm, min dengê bangêrekî bihîst, ku qîr dike û dibêje: Misilmanino! Agirbesta di navbera me de bi dawî bûye û moletek daye muselmanên li vir, ku di nava hefteyekê de karên xwe kuta bikin û herin welatên xwe!

Min dev ji jinikê berda û bi lez û bez ez ketim pey deynên xwe. Min heqê kitana xwe ya firotî kom kir û yê ku min ew ser bi ser dabû jî, min heqê wê girt û min rahişt malê xwe yê mayî û ez ji Akayê derketim. Lê eşq û birîna wê jina frengî jî hey di dilê min de bû û nedihat jibîrkirin. Ez hatim Şamê û min malê xwe bi buhayekî zêde firot. Ji ber ku agirbest bi dawî bûbû û hatina mal sekinîbû. Vê jî hişt, ku qezenca min pir mezin bibe.

Piştre min dest bi ticareta cariyeyan kir, ji bo ku êşa wê jina firengî ji bîr bikim. Sê salên min wisa derbas bûn û hîna ez di wî halê xwe de bûm. Piştî sê salan ji şer, Xwedê teala Melik Ennasir Selahedîn bi ser xist û wî hemû melîk û mîr û emîrên wan êsîr girtin, qirax û peravên deryayê hemû xistin

destê xwe. Wê çaxê zilam hat cem min û qerwaşek ji min xwest, ji bo Melîk Ennasir. Qerwaşeke pir xweşik li cem min hebû, min ew nîşanî wî da, wî ew jê re kirî, bi sed dînarî.

Lê tenê not dînar pê re hebû û deh dînarên min lê man. Wê rojê deh dînar jî di xezîneya Melîk Ennasir de tune bûn. Ji ber ku hemû li ser cenga bi frengan re xerc kiribû. Vêca gava jê re gotibûn, Melîk ji wan re gotibû, bila here li şûna wan deh dînarên xwe qerwaşekê ji xwe re bineqîne, ji nava hêsîrên şer.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 986'AN

*Şehrezadê got*:

Zilamê saîdî vegotina çîroka serpêhatîya xwe berdewam kir: Li ser wê gotina Melîk Ennasir, wan jî ez birim cihê ku êsîr lê bûn. Gava ez li nav êsîrên jin gerîyam, min ew jina frengî jî di nava wan de dît. Tu nabêjî ew jina siwarekî frengîyan bûye. Min ji wan re got: Vê jinê bidin min.

Min jinik bir çadira xwe û jê re got: Tu min nas dikî? Wê got: Na. Min got: Ez ew bazirganê kitanê bûm, ew ê ku tu carî hatî cem wî û te dînarên wî girtin û êdî ji bo dîtineke din te pênsed dînar xwest; niha jî bi deh dînaran min tu kirî! Wê jî got: Nexwe raza ola te jî ev e: Eşhedû enlaîlahe îlalah we eşhedû enne Muhemeden resûlûlah!

Bi wî hawayî jinik bû misilman; min jî di dilê xwe de got: "Bi Xwedê ez bi vê re ranakevim, hetanî ku ez wê azad nekim û mehra wê li cem qadî nebirim!" Rabû, ez çûm cem îbin Şedad û min mesele jê re vegot, wî ji mehra me li hev birî. Piştre leşker çûn, em jî vegerîyan Şame. Çend roj derbas bûn, qasidê Melîk Ennasir hat. Esîrên frengan ji me xwestin, gotin, lihevhatinek di navbera qralan de çêbûye û dê li gora wê lihevhatinê êsîr bên guhertin.

Êsîrên jin û mêr hemû bi şûn de şandin. Ew jina li cem in bi tenê ma. Gotin, çima jina filan farisî nehatiye. Lê pirsîn, lê gerîyan û di encamê de tê derxistin, ku li cem min e. Hatin ew ji min xwestin, xwîn di rûyê min de nema, ez şaş û metal mam. Lê belê wê ji min re got: Çima rûyê te wisa zer bûye, çi bi te hatiye? Min got, qasidê melîk hatiye, te ji min dixwaze, ji bo ku pevguhertina êsîran teman bikin. Wê got: Metirse, tiştek nabe. Min bibe cem Melîk, ez dizanim, bê ez ê çi jê re bibêjim! Min ew bir cem Melîk

Sultan Ennasir û qasidê qralê frengan û jê re got: Mîrzayê min, jina li cem min ev e!

Sultan Ennasir û qasid jê re gotin: Tu dixwazî herî welatê xwe yan li cem mêrê xwe bimînî, lewre hemû êsîr hatine berdan? Wê ji sultan re got: Ez bûme misilman, zewicîme û niha jî ez ducanî me. Tu fêda frengan di min de nemaye.

Qasidê qralê frengan got: Kîjan ji te re şîrîntir tê; ev misilmanê hanê yan filan şovalyeyê mêrê te? Wê jî heman gotina ku ji sultan re gotibû, ji wî re jî dubare kir. Qasid li dora xwe zivirî û ji frengên li derdora xwe pirsî, got: We jî bihîst? Gotin: Belê. Wê gavê qasidê qralê frengan ji min re got: Jina xwe bibe û here! Min ew bir lê hîna ku ez dûr neketibûm, dîsa gazî min kir û got: Diya wê emaneteke wê bi min re şandibû, a ji te re wê emaneta wê jî bide wê. Gava ez lê vegerîyam û hatim cem wî, qasid axaftina xwe berdewam kir û got: Diya wê digot keça min tazî ye, vê sindoqê bide wê. De êdî rahêjê û bibe bide wê.

Min rahişt wê sindoqê û çûm mala xwe. Li wê derê min sindoqa wê dayê. Wê jî sindoq vekir, dît ku kincên wê bi xwe ne, bazinên wê yên zêr û ew pêncî dînarê ku min cara ewil dabûyê, li gel sedê ku min cara dudan dabûyê jî di nav de bû, hîna bi wî awayê ku min pêçabû. Weke xwe bû jî. Min spasî Xwedayê xwe kir û pir kêfa min hat.

Vêca ev zarokên min ji wê ne, hîna jî dijî û ew xwarina ku we xwar jî, wê ji we re çêkiribû.

Em li wê serpêhatîya wî ecêbmayî man û me got subhanelah!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 987'AN

## ÇÎROKA MÎROVÊ BEXDAYÎ Û QERWAŞA WÎ

*Şehrezadê ji Şehreyarê gewre re got*:

Tê gotin, ku di zemanên berê de, mirovekî maldar li Bexdayê hebû, ku bavê wî mîrasekî mezin jê re hiştibû û di nava xêr û xweşîyê de dijîya. Qerwaşek jî kirîbû, ku herduyan pir ji hev hez dikirin. Malê xwe hino hino li ser xerc kir, heta ku temtelîkek jî di berîka wî de nema. Çavên xwe li derdora xwe gerand, da ku tiştekî peyde bike, debara xwe pê bike lê tiştek nedît.

Vêca ew xort di dema maldarîya xwe de pir diçû civata dengbêj û muzîkjenan. Bi qasî ku ew bi xwe jî pir fêrî muzîkê bû û hinnek ji birayên wî, jê re gotin: A baş ew e ku tu û qerwaşa xwe li muzîkê bidin, bistirên û bi wî hawayî debara xwe bikin; bixwin, vexwin û li rehetiya xwe binêrin. Lê ne wî ji wî karî hez dikir ne jî jina wî.

Carekê qerwaşa wî jê re got: Min çareyeke din dîtiye! Wî jî got: Ew çi çare ye? Cariyeyê got: Min bifiroşe, ez û tu herdu jî em ê ji vê tengahîyê xelas bibin. Yeke mîna min, incex mirovekî maldar wê bikire. Bi wî hawayî tu yê gelek dînaran bi dest bixî û ez ê jî ji vî derdî xelas bibim.

Xort bi ya wê kir û qerwaşa xwe bir sûkê, ew da ber bazarê. Kesê ku ewil lê nêrî, mirovekî haşimî bû û ji Besrayê bû. Wêjevan, diltenik û pir hestiyar bû. Qerwaşa wî bi hezar û pêncsed dînarî kirî.

Xortê ku qerwaşa xwe firotibû, got: Çawa min heqê wê girt, ez li firotina wê poşman bûm. Ez girîyam, qerwaşa min jî girîya, min xwest, ku ez wê bi şûn de bigirim lê mêrik qebûl nekir.

Min dînarên xwe xistin tûrikekî û ez meşîyam. Lê min nizanibû ez bi ku ve diçim, bi ku ve herim? Lewre mala bêyî wê, li ber çavên min weke goristanekê bû û ne gengaz bû, ku ez herim wir. Kalîn û nalîneke ecêb bi min ket, ez girîyam û meşîyam, hetanî ku ez rastî mizgeftekê hatim. Ez derbasî hundir bûm lê rûniştim û ez girîyam, hetanî ku ez ji ser hişê xwe çûm. Min tûrikê dînaran mîna balîfê xist bin serê xwe û ez di xew re çûm. Bi xwe nehesîyam, hetanî ku yekî tiştek ji bin serê min kişand û bi bazdan ji mizgeftê derket.

Ez ji xew cefilîm, rabûm ser xwe. Min dît ku tûrikê dînaran ne xuya ye. Ez ketim pey wî dizî û hindik mabû, ku ez xwe bigihînim wî. Ji nişka ve min dît ku benek li nigên min hatiye gerandin û ez li erdê dirêj bûme! Ez girîyam, min li rûyê xwe da û ji xwe re got: “Ruhê te çû, malê te jî çû!” Rewşa min pir xerabû û hêvî bi min re nema.

Ez çûm ser Dîcleyê, min kincên xwe di ser xwe re anîn û min xwe avêt nav avê. Lê kesin ku li wir bûn, li min hay bûn û xwe li dû min avêtin nav avê û ez rizgar kirim. Sedem û rewşa min ji min pirsîn, min tiştê bûyî ji wan re ragihand. Pê êşîyan û xemgîn bûn. Kalek ji nav wan hat, ji min re got: Malê te çû, îcar çima tu qesda ruhê xwe dikî û dixwazî herî nav agir? Ka rabe bi min re, ez ê te bibim mala te!

Ez pê re rabûm û çûm.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 988'AN

*Şehrezade got*:

Xorto axaftina xwe berdewam kir û got: Wî kalepîrî ez gihandim malê û bi qasî saetekê li cem min rûnişt, bi min re mijûl bû, ez haş û aram kirim. Min jî spasdarîya wî kir û rabû çû.

Piştî çûna wî, dîsa ez teng bûm, nava min hat guvaştin, mîna ku rovîyên min li hev hatibin badan. Dîsa min xwest, ku ez xwe bikujim û ji wê êşa dijwar xelas bibim. Lê roja axîretê û agirê dojehê hat bîra min, ez ji wê fikra xwe vegerîyam. Piştre ez ji malê derketim û min berê xwe da cem hinik dost û nasan. Yek ji wan bi halê min girîya, pêncî dînar da min û got: Bi ya min bike û rabe di vê kêlîyê de ji Bexdayê derkeve û bi van diravam debara xwe bike, hetanî tu wê qerwaşa xwe ji bîr bikî. Jixwe tu mirovekî wêjevan û nivîskar î, destnivîsa te pir xweşik e û hunera te ya wêjeyî pir li pêş e. Tu diçî ku derê here, tu yê karekî li gora xwe bibînî. Belkî Xwedê careke din te û wê bigihîne hev jî.

Ev gotina wî vîna min xurt kir û hêvîyeke nû bi min re çêkir, kul û derdên min bi min dan ji bîr kirin. Min jî biryar da, ku ez herim Wasitê, ji ber ku merivên min li wir hebûn. Ez çûm kêleka avê, min dît ku keştîyek li benderê sekinîye û xebatkarên wê baran lê bar dikin, ku hemû cawên xweşik bûn. Min ji wan xwest, ku min jî bi xwe re bibin, gotin: Ev keştîya mirovekî haşimî ye, em nikarin te bi vî halê te, bi xwe re bibin! Gava min kirê teklîfî wan kir, gotin: Nexwe van kincên giranbuha ji xwe bike û kincekî keştîvanan ê mîna yê me li xwe bike û wisa li kêleka me siwar bibe, çawa ku tu yekî ji me bî.

Ez vegerîyam, min kincekî keştîvanan ji xwe re kirrî, li xwe kir û ez dîsa çûm cem wan. Wan jî ez li keştîyê kirim û berê xwe dan Besrayê. Li wê derê, ez bi wan re daketim. Hîna ku ez saetekê li wir negerîyabûm, ez li wê qerwaşa xwe qelibîm, ku du qerwaşên din jî pê re bûn, xizmeta wê dikirin. Di cî de êş û hêrsa min çû, min ji xwe re got: "Va ye min careke din jî ew dît û ez ê li Besrayê li dengê wê guhdar bikim!"

Hîna ku ez wisa difikirîm, min bala xwe dayê, ku ew mirovê haşimî li gel çend zilamên din hat û ew qerwaş dan pêşîya xwe û ew birin wê keştîya ku ez ji Bexdayê anîbûm. Ez jî li pey wan çûm. Min dît ku ew mirovê haşimî xwarin ji gişan re danî û ew û wê qerwaşa min û yên din jî, tevan bi hev re

nan xwarin. Piştre yê haşimî ji qerwaşê re got: Tu çima ev qasî xemgîn î û çima tu stranan ji me re nabejî? Qey tu tenê ji hezkirîyên xwe veqetiyayî?

Wê çaxê, min têderxist, bê çiqas ji min hez dike. Mirovê Haşimî qerwaş xist pişt perdeyekê, li kêleka keştîyê û gazî mirovên li alîyê min kir. Hemû çûn li vî alîyê perdeyê rûniştin. Min ji wan pirsî bê ew kî ne, gotin em birayên yê haşimî ne.

Piştre têra wan mey û meywe derxist û careke din fişar li ser qerwaşê kir, heta ku ûdek xwest, ew saz kir û dest bi stranekê kir, got:

tîrejên şev û rojê çawa ji hev vediqetin
xetên spî û reş çawa ji hev cuda dibin
razên min her veşartî ne qey kî pê dizane
Xwedanê min jî civatê digerîne qet pê nizane
rivîna pêtên agirê dil çawa bi guregur e
her dayîm di nava êşan de ew difûre

Piştî vê stranê girîya, ûd avêt erdê û dev ji stranbêjîyê berda. Mirov li ber gerîyan, ji bo ku berdewam bike. Ez jî ji ser hişê xwe çûm, min xwe wenda kir. Wan jî digot, qey ez bi edrê ketime, hinekan ji wan quran li ser min dixwendin, di guhê min de.

Dûre pir isras kirin, ji bo ku qerwaş xwendina stranan berdewam bike. Wê jî rahişt ûdê, ew ji nû ve saz kir û got:

koçberê fîraqê dixwazim ez gelo li ku der e
her di dilê min de ye ew lew ku ew here.
piştre dîsa berdewam kir û got:
li nava siwar û mêrxasan her lê bi pirs im
qesr û qonax li min bûne çol her ez ditirsim

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 989'AN

*Şehrezadê got*:

Xortê sermest, vegotina xwe berdewam kir û pê de çû, got: Careke din ez ji ser hişê xwe çûm, qîrîn û nalîn bi min ket. Ew jî hemû bi min de ketin û gava dîtin, ku mijûlbûna wan encamê nagire û ez baş nabim, hinek ji wan

aciz bûn û gotin: We çawa ev dînê hanê bi xwe re hildaye! Hinekan jî gotin: Gundê ku em ewil bigihîjinê, em wî li wir deynin û jê xelas bibin!

Wê gotina wan tirseke mezin xist dilê min û min ji xwe re got: Heger ez wana bi xwe nehesînim, xelasîya min ji destê van tune ye, wê min bi rê de ji keştîyê deynin! Gava keştî gihîşt hinda gundekî, xwedîyê keştîyê got: Xwe bidin qiraxa avê! Hemû peya bûn, ez mam.

Wê gavê jî roj li ber ava bû, êvar dihat. Ez çûm, min xwe avêt pişt perdeyê û bi lez rahişt ûdê û min sazkirina wê guhert, ew anî ser meqamekî ku min ew fêrî wê kiribû û dîsa ûd li cihê wê danî û ez vegerîyam cihê xwe.

Qasek bi şûn de xwedîyê keştîyê, yanî mirovê haşimî û zilamên xwe vegerîyan û dîsa li keştîyê siwar bûn. Şev ketibû erdê û şewqa heyva li ser rûyê avê dişikest û ber bi jor ve diteyisî. Mirovê haşimî dîsa doza stranan li qerwaşê kir û jê re got: Tu bi xatirê Xwedê kî, kêfxweşîya me li me xera nekî, ji me re stranekê bibêje!

Qerwaşê çawa rahişt ûdê û destê xwe avêt têlên wê, hîqînîyek pê ket. Her kesî got, qey ruhê wê derket. Bi wê hîqînîyê re jî şaşwaz axivî û got: Bi navê Xwedê hostayê min bi me re ye, di vê keştîyê de! Yê haşimî got: Bi Xwedê ku ew jî bi me re bûya, min ê ew jî tevlî me û şahîya me bikira. Belkî ber dilê te hebekî xweş bikira, te dê stranin xweş ji me re bigotina. Lê belê tu dibêtiya ku ew di keştîyê de be, tune ye.

Qerwaşê got: Ez nikarim li ûdê bidim û meqaman biguherînim, gava ku mamosteyê min bi me re be! Haşimî got: Ka em ji keştîvanan bipirsin? Wê got: Bipirse! Wî jî pirsî û got: We kesek bi xwe re rakiriye? Gişan gotin: Na. Ez tirsîyam, ku pirsa xwe berdewam neke; ez kenîyam û min got: Belê, ez hostayê wê me û min ew fêrî ûdê kiriye, gava ku ez xwedîyê wê bûm.

Qerwaşê got: Bi Xwedê ev dengê mamosteyê min e!

Xulam hatin, ez birim cem ê haşimî. Gava zilam çav li min ket, ez nas kirim û got: Ev çi hal e, te çima xwe xistiye vî qilixî? Min çîroka serpêhatîya xwe jê re got û ez girîyam.

Wê çaxê, ji pişt perdeyê qerwaşê jî dest bi girî kir. Dûre mirovê haşimî û birayên xwe jî tevlî me bûn, ew jî girîyan û dilê wan bi min şewetî. Piştre ji min re got: Bi navê Xwedê, ez qet nêzikî vê qerwaşa te nebûme, hetanî roja îro û min dengê wê jî nebihîstiye. Jixwe ez mirovekî destdirêj û xwedî derfet im, pêdivîya min jî bi wan tune ye. Tenê min dixwest, ku ez muzîka

Bexdayê guhdar bikim û hinek daxwazên xwe li cem emîrê bawermendan pêk bînim. Ez ji bo wan herdu meseleyan hatibûm Bexdayê û min herdu daxwazên xwe jî li wir pêk anîn, Piştre gava min xwest, ku ez vegerim welatê xwe Besrayê, min ji xwe re got: “Cariyeyeke stranbêj bikir e û timî muzîka Bexdayê guhdar bike!” Rabû, min ev qerwaş ji te kirî û min qet nizanibû, ku hûn herdu ev qasî ji hev hez dikin. Lê madem ku hûn di vê rewşê de ne, di hizûra Xwedê de ez soz didim te, ku em çawa bigihîjin Besrayê, ez ê vê qerwaşê azad bikim. Wê bi te re bizewicînim û têra we jî mal û milk bidim we lê bi şertê ku gava ez bixwazim muzîka wê guhdar bikim, wê ji pişt perdeyê ji min re bistirê. Tu yê jî bibî birayek ji birayên min û dostekî min ê şevbuhêrkan.

Ez bi vê gotina wî pir kêfxweş bûm û bêhna min hat ber min.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 990’Î

*Şehrezadê ji Şehreyarê gewre re got*:

Mirovê Bexdayî vegotina çîroka xwe berdewam kir: Piştre mirovê haşimî serê xwe xist wî alîyê perdeyê û ji qerwaşê re got: Tu bi vê yekê razî dibî? Wê jî razîbûna xwe anî ziman û dua jê re kirin.

Piştre gazî xortekî kir, ez nîşanî wî dam û jê re got: Here vî xortî bibe, kincên wî biguherîne, hinekên giranbuha lê bike, bêhneke xweş pê de ke û wî bîne cem me! Xort ez birim, kincên min guhert, bêhneke xweş bi ser min de kir û ez bi şûn de vegerandim cem wî. Çawa ku dida destê gişan, qedehek mey da destê min jî û qerwaşê jî bi kêfxweşî dest bi straneke nû kir:

tinazên xwe bi min kirin gava’m hêsir rijandin
dildarî çû fîraqê jî êş bi ser min de barandin
kesê ku êşa fîraqê nedîtibe qet me fêm nake
nizane çima dil xemgîn e çima derî venake
hinav û dil dişewitin esef jî her li min mêvan e
kesê dildar û zanayê dil tenê dizane kî şivan e

Bi vê stranê re her kes coş û mest bû, ez jî pir kêfxweş bûm, coşeke ecêb ez girtim. Hema min dît ku min ûd ji destê qerwaşê girtiye. Min li ûdê da û stirîm, got:

li gora kevneşopan here wisa bixwaze pîgar
maldarê dil incex dizane danana dînar
pirsa ji comerdan şanazîyê bi xwe re tîne
pirsa ji nemerdan jî her fedîkarîyê tîne
ger tu carekê mecbûrî sertewandinekê bibî
li derîyê mezinan bidî bila reqîbê te ew be
pesnê merd û mêrxasan qet nabe stûxwarî
stûxwarîya mezin mezinkirina biçûkan î

Coş û kelecana her kesî zêdetir bû û kêfa hemûçkan pir hat. Min û qerwaşê jî me bi dorê got; saetekê ez, saetekê ew, em stirîn û ûdlêdana xwe berdewam kir, heta ku keştîya me hat, li qiraxeke bejahîyê sekinî. Em giş ji keştîyê peyabûn. Ez jî peya bûm lê ez serxweş bûm û çawa ez rûniştim, di cî de ez di xew re çûm. Piştre rêwî vegerîyan, li keştîyê siwar bûn, bêyî ku hayê wan ji min hebe. Lewre ew jî mîna min serxweş bûn. Jixwe min hemû diravên li ser xwe dabûn qerwaşê û tiştek li ser min nemabû. Wan riya xwe berdewam kirin, çûn Besrayê. Ez jî incex bi germa tavca rojê re bi ser xwe ve hatim û ji xew şiyar bûm. Min li derdora xwe nêrî, min kes nedît. Jixwe min ji bîr kiribû, ku ez navê navnîşana wî mirovê haşimî jê bipirsim, bê ka li ku dera Besrayê rûdinê. Ez şaşwaz û bêçare mam û ew coşa di nava min de bi yek carê re vemirî, mîna ku ew hevdîtina min a bi qerwaşê re, tenê xewnek be!

Ez wisa bêçare û bêmecal li wê derê rûniştî mam, hetanî ku keştîyeke pir mezin di wir re derbas bû û ez lê siwar bûm, min xwe gihand Besraye. Lê min tu kes li wir nas nedikir. Ez çûm cem beqalekî, min hinek kaxez û hibir jê girt û ez rûniştim min ji xwe re nivîsand, bi armanca ku ez destnivîsa xwe xweşiktir bikim. Beqal dît ku kincên min gemarî ne, li rewşa min pirsî. Min jê re got: Ez hejarekî xerîb im. Beqal got: Tu dixwazî li cem min bimînî? Ez ê rojê nîv derhemî bidim te, xwarin, vexwarin, razan û kincên te jî li ser min. Tu yê jî tenê hesabkarîyê ji min re bikî û binivîsînî? Min got: Belê, min qebûl e.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 991'Ê

*Şehrezadê got*:

Xortê Bexdayî vegotina serpêhatîya xwe berdewam kir û got: Min hesabê wî beqalî girt û ez li cem wî mam. Di nava karê nivîsê de, min deyn û dahat û lêçûnên wî hemû sererast kirin, pergal da wan û di defteran de tormar kirin. Di meha duduyan de beqal dît ku dahata wî zêde bûye û lêçûna wî kêmtir bûye. Camêr spasîya min kir û salekê bi şûn de roja min kir bi derhemekî. Beqal ez kirim şirîkê dikana xwe û ji min xwest, ku ez bi keça wî re bizewicim. Min jî bi ya wî kir û ez bi keça wî re zewicîm. Min karê dikanê hilda ser milê xwe. Lê dilê min hîna şikestî bû û ez dayîm xemgîn bûm.

Beqal jî meyxur bû û her car ez vedixwendim ser sifreyê. Lê xemgînîya di dilê min de, rê nedida vê yekê. Bi qasî du salan, ez di wî halî de mam. Rojekê em li dikanê bûn. Min dît, qefleyek ciwanên ku xwarin û vexwarin bi wan re, di ber me re derbas dibin. Min ji beqal pirsî, got: Ev kesên kêf û şahîyê ne, zarokên maldar û qodemanan in, diçin ber behrê, li nav daran rûdinên. Diçin qiraxa Çemê Eble û li wê derê ji xwe re kêf û şahîyê li dar dixin, dilîzin, henek û laqirdîyan dikin.

Di dilê xwe de, min ji xwe re got: “Heger ez jî herim cem vanan, belkî ez li dildara xwe rast werim!” Ez li beqal zivirîm û min jê re got: Ez jî dixwazim bi wan re herim seyranê? Beqal got: Bi wan re here, çima na! Piştre hinek xwarin û vexwarin ji min re amade kir, min rahiştê û ez li pey wan çûm, heta ku ez gihîştim qiraxa Çemê Eble. Ji ber ku ez dereng ketibûm, heta ku ez gihîştim wir, min bala xwe dayê, ku mirov bi şûn de vedigerin. Min nêt kir, ku ez jî bi wan re bir vegerim lê tam di wê kêlîyê de min dît ku qeptanê wî mirovê haşimî bi keştîya xwe ve di çem re tê! Min qîrek da û gazî wan kir. Qeptan û zilamên xwe ez nas kirim. Hatin ez birim, bi bêrîkirineke mezin gişan ez himbêz kirim û ji min re gotin: Nexwe tu hîna sax î? Me jî digot qey serxweşîya te li te giran bûye û tu li ber avê çûyî. Min rewşa qerwaşa xwe ji wan pirsî, gotin: Gava pê hesîya ku tu wenda bûyî, kincên xwe qetandin, ûda xwe şikand, porê xwe kişand, bi lepan li rûyê xwe da û dest bi girîn û nalînê kir. Dema em vegerîyan Besrayê, me jê re got dev ji vê helwesta xwe berde. Wê got: Ez ê reş li xwe bikim û li kêleka malê gorekê çêbikim, li kêlekê bi cih bibim û ez ê dev ji stranbêjî û muzîkê berdim. Em jî li gora biryara wê tevgerîyan û wa ye hetanî niha jî di wî halî de ye. Ez bi xwe re birim wê malê. Min bala xwe dayê, ku li wir e û hîna jî reş girêdayî ye. Çawa ku çav li min ket, hîqînîyeke ecêb pê ket, me got qey hilma wê çikiya. Mirovê haşimî ji min re got: Wê ji xwe re bibe. Min got: Ez ê bibim lê çawa ku te soz bi min re dabû, ewilî wê azad bike, dûre mehra wê li min

bibîre, piştre ez ê wê bibim. Camêr wisa kir. Gelek cil û kinc û alav û raxe û doşek jî dan me, li gel pênsed dînarî û got: Jixwe ev pênsed dînar mûçeya we ye. Her meh ez ê ew qas dînar bidim we, bi şertê ku em şevbuhêrka xwe bi hev re bikin û qerwaş stranan ji me re bibêje.

Dûre malek jî ji me re vala kir, bi ber û tejan raxist. Ez û qerwaşê jî çûn, tê de bi cih bûn. Di pey re, ez çûm cem beqal. Min rewşa xwe ya nû jê re eşkere kir û ragihand û min jê xwest, ku ez keça wî bê guneh berdim û min qelenê wê jî dayê.

Ez li cem zilamê xwe yê haşimî bi cî bûm û pê re xebitîm. Di nava du salan de halê min xweş bû. Maldarîya min zêde bû û ez vegerîyam mîna wê dema ku ez û qerwaşa xwe li Bexdayê bi hev re dijîyan. Xwedê ji me re li hev anî, em ji wan kul û derdan xelas kirin û jîyaneke serkeftî, aram û bextewar kir nesîbê me.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 192'YAN

## ÇÎROKA XORTÊ DILDAR Û BRAHÎMÊ MÛSILÎ

Şehrezadê ji Şehreyarê gewre re got: Tê gotin, ku Bavê Îshaq, Brahîmê Mûsilî gotiye: Mala min li Beramîke bû. Rojekê ji rojan derîyê min lê da. Min ji xulamê xwe re got: Rabe, binêre, bê kî ye! Xulam çû ber derî û hat, got: Xortekî lihevhatî ye, dixwaze derbasî hundir bibe, destûra te dixwaze! Min destûr dayê, min dît, xortekî rûbikeder hat hundir û ji min re got: Ev demek e, ku ez dixwazim xwe bigihînim te, lewre karekî min ketiye cem te. Min got: Karê xwe bibêje? Xortê ciwan sêsed dînar ji berîka xwe derxist, xist destê min û got: Ez dixwazim, ku tu vana ji min qebûl bikî û tu newayekê, meqamekî ji çarînekê ji min re çêkî! Min got: Ka hela wê çarîna xwe ji min re bixwîne? Wî got:

ey awirên kujer û sojînerên vê kezebê
bi hêsirên xwe vedimirînim ez vê xezebê
dem û dewran mişt e bi lomeyên evîndaran
ez ê qet nebînim gelo rûyê te tu caran

Min meqamek ji vê helbesta wî re saz kir, bi newayên xemgîner û min jê re stra. Ciwan ji ser xwe çû û li erdê dirêj bû, min got qey miriye. Piştre

bi ser xwe ve hat û got: Ka dubare bike! Ez li ber gerîyam, min got: Nabe, ez ditirsim, ku vê carê tu bimirî. Got: Xwezîka wisa bibûya!

Pir li ber min gerîya û dilê min bi xwe şewitand, min jî jê re dû bare kir. Qîrîn û carîneke ecêb pê ket, ji ya ewil jî xeraptir û li erdê vezelîya. Min guman kir, ku vê carê miribe. Ez pir pê de ketim, min ava gulan li ser rûyê wî reşand. Bi zor û heft beleyan heta ku bi ser xwe ve hat. Min spasîya xwe ji Xwedê re got, dînarên wî jî xistin nav lepên wî û min jê re got: Malê xwe bigire û rabe here! Wî got: Tu pêdivîya min bi wan diravan tune ye û heger tu stranê ji min re dubare bikî, ez ê sêsed dînarên din jî bidim te.

Dînaran ez tehmîşkî kirim, min jê re got: Ez ê careke din bibêjim lê bi sê şertan: Şertê yekê ew e, ku tu li cem min bimînî û xwarina min bixwî, ji bo ku tu bi ser xwe ve bêyî; şertê duduyan jî ew e, ku meyê vexwî, bi qasî ku dilê te bigire û şertê sisêyan jî ew e, ku tu serpêhatîya xwe ji min re bibêji.

Her sê şertên min pejirandin, pêkanîn û got: Ez jî li vî bajarî rûdinêm. Ez û birayên xwe, em derketin seyranê û em di rêya Eqîq re çûn. Di wê rêyê de em li çend keçên spehî rast hatin, ku yek ji wan, mîna heyveke li çardehan bû û di nêrîna pêşîn de, dilê min dagir kir. Gava êvar hat jî, hemû bi şûn de çûn malên xwe. Min jî xwest, ku ez herim wê rûheyvê ji xwe re bixwazim, lewre wê birîneke kûr di dilê min de vekiribû, ku qemûşk nedigirt. Lê min şopa wê nedît û min der barê wê de tu agahî jî negirtin.

Ji ber kul û kederan ez nexweş ketim.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 993'YAN

*Şehrezadê got*:

Ciwanê dildar vegotina serpêhatîya xwe ji Brahîmê Mûsilî re berdewam kir û got: Min derdê xwe ji merivekî xwe re got, wî jî ji min re got: Tu qet meraq neke, jixwe va ye buhar tê. Wê erd şîn bibe, gul û kulîk vebin, wê çaxê ez û tu em ê bi hev re derkevin û tu yê bigihîjî miradê xwe! Ez haş bûm, bêhna min hat ber min.

Dema wextê wê hat, wî merivê min rêya Eqîq ji min pirsî. Ez û wî û hemû bira û merivên xwe em derketin seyranê û em çûn li heman cihî rûniştin. Qasek bi şûn de, ew refê keçikan jî hat, ku ew dildara min jî di nav wan de bû. Min ji keçeke merivên xwe xwest, ku here peyama min bigihîne

wê û jê re bibêje, ku ez wê dixwazim. Keçik çû pê re axivî, wê jî bersiva xwe ji min re şand û got: Heger li gora van ristên jêrîn bûya gengaz bû:

bes e lomekarî sebirdar be hinekî
belkî nêzik be xelasî ne gelekî

Min devê xwe girt û ez nema peyivîm, ji tirsa hetikînê. Ez rabûm ji wir çûm. Ew jî bi min re rabû, çû. Ez çûm cem bavê xwe, min gilîyê xwe pê kir û jê xwest, ku here wê ji min re bixwaze. Bavê min malbat giş da kêleka xwe û çû ew ji bavê wê xwest. Bavê we got: Berê bûya, min ê qebûl bikira lê piştî ku mijar ketiye ser zimanê xelkê, ez naxwazim gotegotên wan piştrast bikim.

Piştî ku xortê ciwan serpêhatîya xwe jî ji min re got, min careke din stran jê re xwend. Wî jî mala xwe nîşanî min da û rabû çû. Dûre ez jî rabûm çûm cem Cafer Bin Yehya û mîna her car ez jê re stirîm; min ew strana wî ciwanî jê re got: Pir li xweşîya wî çû. Meya xwe vexwar û got: Te ew gotin ji ku anîne? Rabû min meseleya wî ciwanî, jê re got. Wî jî ji min xwest, ku ez li hespa xwe siwar bibim û herim mizgînîyê bidim wî, ku dê miradê wî pêk bê. Ez rabûm çûm mala wî, min mizgînî dayê û min ew anî cem Cafer û min hişt, jê re çîroka xwe jî bibêje. Çîroka xwe dubare kir, got; Cafer jê re got: Êdî mijara te berpirsîyarîya min e, misoger ez ê te bi wê keçikê re bizewicînim.

Ciwanê me aram bû û li cem me ma. Roja din, sibehê, Cafer siwar bû û çû cem Harûn Reşîd, pirsgirêka wî xortî jê re got. Harûn Reşîd, çîroka wî xortî pir balkêş dît û gazî me gişan kir. Em çûn hizûra wî û min ew stran ji wî re xwend. Harûn Reşîd ew stran pir eciband û pê re vexwar jî. Piştre nameyek ji walîyê Hîcazê re nivîsand û jê xwest, ku bavê keçikê û malbata wê gişî bi rêzdarî bîne cem wî.

Di demeke kurt de hemû hatin û derbasî cem Harûn Reşîd bûn. Ji xizmetkaran xwest, ku xortê ciwan jî bînin. Ew jî anîn ber destê wî. Li bavê keçikê zivirî û jê xwest, ku keça xwe bi xortê ciwan re bizewicîne û sed hezar dinar dayê. Ew xortê ciwan û helbestkar jî êdî bû şevbuhêrkvanê Harûnê Reşîd, heta ku çû ser dilovanîya Xwedê. Piştre jî ew û malbata xwe dîsa vegerîyan welatê xwe. Rehma Xwedê li hemûçkan be!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 994'AN

## ÇÎROKA EBÛQÎR Û EBÛSÎR

*Şehrezadê ji Şehreyarê gewre re got*:

Şahinşahê min ê bextewar û mihrîban! Tê gotin, ku li bajarê Îskenderîyê du mirov hebûn; yek ji wan boyaxçî bû û navê wî Ebûqîr bû û yê din jî berber bû, navê wî Ebûsîr bû. Herdu jî li sûkê cîranên hev bûn û dikanên wan li kêleka hev bûn.

Ebûqîrê boyaxker dizekî derewîn, cirnexweş û caris bû. Te digot qey rûyê wî ji çermê ga ye yan jî paçê hewraya cihûyan kişandiye ser. Ne ji ber xwe û ne ji ber wan karên xwe yên kirêt fedî dikir û ne jî pozê wî dişewitî. Ji adeta wî bû, ku çi gava yekî cawek didayê, ji bo ku boyax bike, destheqê xwe pêşîn dixwest, çawa ku dê bi wan diravan tiştinan ji bo boyaxkirinê bikire. Halbûkî wî çawa ew dirav digirtin, diçû xwarin û vexwarin bi wan dikirî. Piştre ew cawê wan jî difirot û heqê wê ji bo kêfê ji xwe re xerc dikir. Lewre wî tenê li kêfa xwe dinêrî, xwarin û vexwarina herî buha dixwar û vedixwar.

Gava ku piştre xwedîyê caw dihat cem jî, jê re digot: Sibê, berîya ku tav şewqa xwe berde ser dinyayê were, tu yê cawê xwe hazir bibînî. Zilam jî di dilê xwe de ji xwe re digot: "Bila bi rojek derengmayînê be, ne bi tiştekî din!" Û diçû malê. Roja din dîsa dihat. Ebûqîr jî jê re digot: Here, sibê were; roja bihurî mêvanên min hatibûn, ez bi wan ve daketim û min fersend nedît ku ez kar bikim! Xwedîyê caw diçe û roja sisyan tê. Ebûqîr jî dibêje: Şeva borî jina min welidî û ro pê de ez bi îhtiyacên wê ve daketim, min qet zeman nedît. Lê belê sibê were, misoger tu yê cawê xwe bibî. Xwedîyê caw, dîsa tê, ew jî dîsa jê re mehneyeke din dibîne, sond dixwe û wî destvala bi şûn de dişîne.

Vêca çi gava ku yekî cawek banîya cem wî, bi heman tewerî tevdigerîya. Mehneyek dida pêş, sond dixwar, sozin nû didan, sozên xwe pêk nedianîn û herî dawîyê, gava ku guman bi wan re çêdibûn û jê re digotin: "Her car tu dibêjî sibê were, sibê were û tu cawê min boyax nakî, kanî cawê min bide min, ez naxwazim boyax bikim." Ebûqîr ji wan re digot: Birawo wele ez fedîkarê te me û ez nizanim çawa ji te re rave bikim. Lê rastî ew e, ku min boyaxeke xweşik li cawê te da û ji bo ziwa bibe raxist lê hat dizîn û ez nizanim kê dizîye! Vêca gava ku xwedîyê caw mirovekî xêrker bûya, digot: Emrê min ji Xwedê re, ma ez ê çawa bikim, bila serê te sax be. Lê ku zilam

cirnexweş bûya, xirecira wan berdewam dikir, hevdû dihetikandin. Lê dîsa jî kesî ji wan tiştek bi dest nedixist. Lew ku biçûya gilîyê wî li cem qadî bikira jî. Ebûqîr ev kar û ev hîlekarîya xwe berdewam kir, heta ku nav û dengê wî di bajêr de belav bû û her kes pê hesîya, rastîya wî nas kirin û êdî hevdu şiyar kirin, da ku kes neçe cem Ebûqîr, cawê xwe boyax neke û ket ser zimanê xelkê. Her kesî mînak li ser wî didan û êdî nema kes diçû cem wî. Ji xeynî hinek nezan û bêaqilên ku jê bêxeber bûn. Lê dîsa jî roj nedibihurî, ku xirecirek li ber derîyê dikana wî derneketa.

Ji ber ku nema zêde kes dihat cem wî, ew jî nema li dikana xwe disekinî û dihat cem cîranê xwe Ebûsîr rûdinişt, çavdêrîya dikana xwe dikir. Gava ku nezanek bihata ber derîyê wî û tiştek di destê wî de bûya, pê ve diçû û jê re digot: Tu çi dixwazî? Wî jî digot: Vî cawî ji min re boyax bike! Ebûqîr digot: Tu çi rengî dixwazî? Mîna ku boyaxkirina hemû rengan ji destê wî bê. Halbûkî dereweke mezin dikir. Piştre caw jê distend û heqdestê xwe jî pêşîn jê distend û jê re digot: Here, sibê were cawê xwe bibe. Gava ku roja din ew zilamê nezan dihat jî, dîsa digot here, sibê were û diçû cawê wî jî ji xwe re difirot, bi heqê wê goşt û sewz û fêkî ji xwe re dikirî.

Gava ku li cem Ebûsîr rûdinişt û didît ku hinek ji xwedîyên cawan hatine ber derîyê dikana wî, xwe nîşanî wan nedida, xwe ji ber wan vedişart. Ebûqîr, bi salan wisa berdewam kir, heta ku rojekê ji rojan zilamekî xurt û zordar cawek danî cem wî, ji bo boyaxkirinê û wî jî ew caw firot, mîna her car. Zilam jî her roj dihat dikana wî, ew nedidît û bi şûn de diçû. Gava zilam bi wê çûn û hatinê betilî, çû gilîyê wî li cem qadî kir. Qadî jî derîyê dikana wî li ber çavên qefleyek misilmanên ku şahidî kirin, bizmar kir û mohr kir. Lewre ji xeynî çend qerqotên alavên şikestî tu tişt di dikanê de tune bû. Piştre qadî mifteya dikanê bir û ji cîranên wî re got: Gava ku hat, jê re bibêjin, bila cawê vî zilamî jê re bîne û were mifteya dikana xwe bibe.

Ebûsîr ji Ebûqîr re got: Çi bi te hatiye, ku hema kî çi tîne ba te, nebedî dibe? Cawê vî zilamî bi ku ve çûye?

Ebûqîr lê vegerand û got: Cîran, cawê wî zilamî ji min hat dizîn! Ebûsîr got: Ev tiştekî eceb ê, her yekî ku tiştekî datîne ba te, dizek ji te didize! Qey tu dijminê hemû dizan î, ku hemû li ser serê te kom dibin? Lê na, ez texmîn dikim, ku tu derewan dikî cîran. Te rastî ji min re bigota baştir bû?

Ebûqîr got; kesî tu tişt ji min nedizîye.

Ebûsîr got: Nexwe tu çi dikî bi malên xelkê?

Ebûqîr got: Kî çi dide min, ez wî difiroşim û ji xwe re xerc dikim. Ebesîr got: Ma Xwedê vî karî li te helal dike?

Ebûsîr got: Ez ji feqîrî vî karî dikim. Kar nîn e û ez hejar im, tiştekî min tune ye, ma ez ê çi bikim? Piştre gelek mehneyên din jî rêz kirin ji Ebûsîr re, ji bo ku mafdarîya xwe bîne ziman. Ebûsîr jê re got: Karê min jî pir hindik e, li gel ku ez hosteyekî bi nav û deng im jî. Tu kes ji ber ku ez feqîr im nayê por û rîhê xwe li cem min kur nake. Jixwe ez jî ji vî karê xwe zivêr bûme, birawo!

Ebûqîrê boyaxker got: Ez jî pir acîz bûme ji vî karê xwe. Li gel vê jî çima em hetanî niha li vî bajarî disekinin, ez nizanim! Ez û tu, em dikarin herin welatin din, ji xwe re bigerin û li her derê bixebitin. Lewre em hosteyên pîşeyên xwe ne û li her derê qîmeta pîşeyên me heye. Ebûqîr, pesnê ger û seyranê ji Ebûsîr re da û çûna ji wî bajarî pê xweş da nîşandan, heta ku pê da erêkirin û herduyan biryar dan, ku ji wî bajarî herin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 995'AN

*Şehrezadê got*:

Gava Ebûsîr jî di biryara çûne de tevlî bû, Ebûqîr pir kêfxweş bû û jê re got: Êdî em bûn birayên hev û tu ferq di neqaba me de nema. Îcar divê em fatîheyekê li ser vê hevpeymana xwe bixwînin, ku êdî em bibin du bira û kî ji me bişixule, yê din jî xwedî bike û diraven zêde bimînin jî, em wan bixin sindoqekê. Gava em vegerîyan Îskenderîyeyê, em ê bi wekhevî wan di navbera xwe de par bikin.

Ebûsîr got: Helbet em ê wisa bikin. Dûre herduyan bi hev re fatîheyek li ser biryara xwe xwendin. Piştre Ebûsîr jî dikana xwe girt û mifteyên wê dan xwediyê wê. Ebûqîr jî mifteyên ya xwe li cem qadî hiştin, malên xwe komî ser hev kirin, xwe ji rêwîtîyê re amade kirin. Dûre çûn li keştîyeke mezin siwar bûn, li gel sed rêwiyên din û ketin rê, ber bi Deryaya Sor ve.

Xwedê ji Ebûsîrê berber re li hev anîbû, ku kesî berber di wê keştîyê de tune bû. Îcar gava Ebûsîr ev yek fêm kir, ji Ebûqîr re got: Birawo em di deryayê de ne û wê pêdivîya me bi xwarin û vexwarinê pir çêbibe û nan û ava bi me re hindek e; divê em bi tevdîr bigerin. Jixwe gava yek ji rêwîyan hat ji min re got, ka rîh û porê min kur bike, ez ê bi nanekî yan jî bi nîv derhemekî kur bikim an jî bi çoçikek avê, da ku ez û tu em debara xwe pê bikin.

Ebûqîrê boyaxkar got: Bila be û serê xwe danî, raket. Berber jî rahişt amûrên xwe yên xebatê, paçek avêt ser milê xwe, da ku li şûna foteyê bi kar bîne û di neqeba rêwîyan re meşîya, li nav wan gerîya. Yekî jê re got: Hoste, ka were min kur bike! Ebûsîr ew kur kir, zilam jî nîv derhem da wî. Ebûsîr got: Tu pêdivîya min bi nîv derhemî tune ye, heger tu nanekî bidî min, dê çêtir be. Lewre hevalekî min jî heye û erzaqa me kêm e. Zilam nanek dayê, perçeyek penêr jî li ser kir û tasek ava şîrîn jî pê re dayê.

Ebûsîr, rahişt gişan, vegerîya cam Ebûqîr û jê re got: A ji te re vî nanî bi vî penêrî re bixwe û vê ava şîrîn bi ser de vexwe! Ebûqîr, hemû ji destê wî girtin. Wî jî dîsa rahişt amûrên kar û dîsa li nav rêwîya gerîya. Yek kur kir bi du nanan, yek bi qetek penêr. Piştre daxwaz li ser serê wî pir bûn û hema kê ew didît, jê re digot: Hoste, were min kur bike. Wî jî heqdestê xwe zêdetir kir, êdî kesê ku du nan û nîv derhem neda rîh û porê wan kur nedikir. Lewre ew di keştîyê de berberekî bi tenê bû û her kes mecbûrî wî bû.

Hetanî ku lê bû êvar, sih nan, sih nîv derhem û gelek penêr û zeytûnên wî çêbûn. Heta çi ji kê bixwesta, xelkê dida wî. Bi wî hawayî gelek erzaq li cem wî kom bû. Gava rûyê qeptan jî kur kir, gazincên kêmbûna qût jê kir. Qeptan jî jê re got: Tu bi xêr hatî, ser seran, ser çavan hatî! Hevalê xwe bi xwe re bîne, her şev werin li cem min şîvê bixwin. Qet xema erzaq nekişî-nin, heta ku hûn bi min re bin.

Ebûsîr vegerîya cem Ebûqîr, bala xwe dayê, ku hîna di xew de ye. Ew ji xew şiyar kir. Çawa ku Ebûqîr li dora xwe nêrî û dît ku derdora serê wî tijî nan û xwarin e, ji Ebûsîr re got: Te ev giş ji ku anîne? Ebûsîr got: Ji bo Xwedê ye. Ebûqîr xwest ku bixwe, Ebûsîr jê re got: Birawo vê xwarinê nexwe, wê piştre ji me re lazim bibe, jixwe qeptan em vexwendine ser şîvê. Lewre min gazinc jê kir, ku xwarin kêm e, wî jî got, tu û hevalê xwe werin ser şîva min. Qasek bi şûn de em ê herin cem wî şîvê bixwin.

Ebûqîr got: Deryayê li serê min daye, ez gêj bûme, ez nikarin xwe li ser nigan bigirim û bi rê ve herim. Bihêle ez xwarina xwe li vir bixwim û tu bi tenê here cem qeptan şîvê bixwe!

Ebûsîr got: Baş e û li kêleka wî rûnişt, ji xwe re ew temaşe kir. Bala xwe dayê, ku birayê wî gepên nan, mîna ku keviran ji tehtan qut bike hildide û weke meymûnan davê zelûma xwe û mîna şêrên birçî dadiqurtîne. Gepên xwe nacû û li pey hev dadiqurtîne. Çavên wî jî bênavber li ser xwarina di destê wî de çawa ku bixwaze gişî bi hev re bixwe. Çavên wî mîna yên xûlan

bûn û fişefişa ku bi pozê wî ket, mîna ya gayan bû.

Di wê kêlîyê de berdestkê qeptan hat cem wî û jê re got: Hoste, qeptan dibêje, bila hevalê xwe bîne û kerem bike ser şîvê! Ebûsîr ji Ebûqîr re got: Tu yê werî? Wî got: Ez nikarim bimeşim, tu bi tenê here.

Ebûsîr bi tenê çû. Dît ku qeptan rûniştiye û sifreyek li ber wî raxistî ye û bi qasî bîst cureyên xwarinên xweş li ser in. Hevalên wî jî li dorawî bûn. Çawa ku qeptan çav le ket, jê re got: Kanî hevalê te? Ebûsîr got: Mîrzayê min ew sergêjokî bûye, behrê ew girtiye. Qeptan got: Baş e, wê sergêjîya wî derbas bibe; ka were ser şîvê, em li hêvîya we bûn.

Qeptan sênîyeke xwarinê veqetand û ji hemû cureyên xwarinê danî ser, tîjî kir, bi qasî ku têra deh zilaman bike. Piştî ku Ebûsîr şîv xwar, qeptan ew sênî da wî û jê rê got: Vê xwarinê jî ji hevalê xwe re bibe!

Ebûsîr rahişt wê sênîya mezin û ew bir cem Êbûqîr. Gava gihîşt cem wî, bala xwe dayê, ku mîna deveyekî kayînê dike, bi lez û bez gepan li ser hev davêje zelûma xwe û çelpeçelpa devê wî ye. Ebûsîr jê re got: Ma min ji te re negot mexwe, xêr û bêra li cem qeptan pirtir e! De binêre bê çi ji te re şand, gava ku min jê re got sergêjîya wî heye?

Ebûqîr got: Ka bide min, ez binêrim! Ebûsîr sênî da destê wî. Ew mîna kûçikan bi helkehelk bû, te digot qey keftarekî birçî ye û saleke wî ye, ku nan nexwariye. Mîna teyrê baz xwe çem kir ser wê xwarinê û bi lepan ket ser. Ebûsîr dev jê berda û çû cem qeptan. Pê re qehweyek vexwar, guftûgo kir û dîsa li Ebûqîr vegerîya. Dît ku ew qas xwarina di sênîyê de hemû qedandiye û sênîya vala avêtiye kêlekekê. Rahişt sênîyê, ew bir da xulamên qeptan û dîsa li Ebûqîr vegerîya û raza hetanî sibehê.

Roja din, dîsa rîh û porên xelkê kur kir û çi ji wan girtibe, radestî Ebûqîr kir. Ebûqîr jî bênavber dixwar û vedixwar, bêyî ku ji cihê xwe rabe. Tenê ji bo destavê ji cihê xwe radibû û hew. Her êvar jî, Ebûsîr jê re sênîyek mişt xwarin ji cem qeptan dianî. Bîst rojan bi wî hawayî berdewam kir, heta ku keştî gihîşt bendera bajarekî û li wir rawestiya. Ebûsîr û Ebûqîr, li wir peya bûn û çûn nava bajêr, di xanekê de ji xwe re odeyek kirê kirin. Ew raxistin û bi diravên Ebûsîr hemû pêdivîyên xwe kirîn.

Dûre Ebûsîr çû daket sûkê, goşt kirî û anî malê. Ew pijand, xwarin amade kir. Ebûqîr jî di xew de bû. Jixwej ji serî ve ew raketibû û hemû karên malê Ebûsîr dikir. Gava Ebûsîr sifreya xwarinê amade kir, ew ji xew rabû û weke hirçekî birçî ket ser xwarinê. Piştî ku qedand jî, ji Ebûsîr re got: Li

qisûra min nenêre, sergêjîya min hîna berdewam dike û di cî de serê xwe danî, raket.

Ebûqîr çil rojan bi wî hawayî berdewam kir. Her roj Ebûsîr radihişt amûrên xwe yên berberîyê û li nava bajêr digerîya, qismetê wî çi bûya dianî û vedigerîya malê. Didît ku Ebûqîr hîna raketî ye. Xwarin amade dikir û ew şiyar dikir, xwarina xwe bi hev re dixwarin. Ebûqîrê ku xwarin weke meymûnan bi îştaheke mezin dixwar, tu carî têr nedibû û herdem jî çawa ku xwarin diqedand, di cî de radiket. Her cara ku Ebûsîr jê re digot; Rabe ser xwe, hebekî li nava bajêr bigere, temaşe bike, lewre ev bajar bajarekî xweş e û kêm bajar mîna wî xweşik hene; Ebûqîr lê vedigerand û digot: Li min negire birawo, wele ez gêj im û serê min diêşê. Ebûsîr jî nedixwest, wî aciz bike û dilê wî bişikîne û gotineke nexweş jê re bibêje.

Di roja çil û yekê de Ebûsîrê berber nexweş ket û nikaribû dakeve sûkê. Rabû dergevanê xanê li şûna xwe şand sûkê, pêdivîyên xwe temîn kirin. Ebûqîr jî weke berê bû, tenê dixwar, vedixwar û radiket. Ebûsîr jî her car, dergevanê xanê dişand sûkê, ji bo ku xwarin û vexwarina wan bîne. Çar rojên din jî wisa berdewam kirin lê di roja pêncan de nexweşîna Ebûsîr lê giran bû. Ebûqîr jî pir birçî bûbû û dîkên zikê wî dikirin qîqeqîq. Rabû ser xwe, li berîkên Ebûsîr gerîya, çend derhem tê de dîtin, rahişt wan, derîyê odeyê li Ebûsîr girt û berê xwe da sûkê, bêyî ku hayê kesî jê hebe. Jixwe dergevan jî wê gavê daketibû sûkê û ew jî bê agah bû.

Ebûqîr daket sûkê, kincin xweşik ji xwe re kirîn, li xwe kirin û ji xwe re li nava bajêr gerîya, temaşe kir. Bala xwe dayê, ku bajarekî pir xweşik e lê hemû kincên insanên wê ji du rengan tenê bûn: Şîn û spî! Çû, derbasî dikana boyaxkerekî bû, dît ku tiştê di dikana wî de jî hemû şîn û spî ne. Destmalkek ji berîka xwe derxist, da yê boyaxker û jê re got: Hoste ka ji kerema xwe vê destmalkê ji min re boyax bike û heqê xwe bistîne! Zilam lê vegerand û got: Heqdestê boyaxkirina ve destmalkê bîst derhem in, bila haya te jê hebe. Ebûqîr got: Li welatê me heqdestê destmalkeke wisa du derhem in? Zilam got: Here wê li welatê xwe boyax bike! Ê min ez bi bîst derheman boyax dikim, temtelîkek jî kêm be, ez qebûl nakim. Ebûqîr got: Tu yê kîjan rengî lê bidî? Zilam got: Rengê şîn. Ebûqîr got: Ez rengê sor dixwazim. Zilam got: Ez nizanim rengê sor lêdim. Ebûqîr got: Nexwe rengê kesk lêxe? Zilam got: Ez nizanim kesk lêdim. Ebûqîr got: Kesk, zer, reş... hemû reng gotin. Zilam got: Ez nizanim yekî ji wan rengan lêdim. Li welatê me, çil hosteyên boyaxê hene, ne kêm dibin ne zêde dibin. Gava yek ji wan dimire, em

ji kurê wî dixwazin, ku şûna wî bigir e û heger kurên wî tune bin, yek ji me kêm dimîne. Gava ku du kurên wî hebin jî, em yekî tenê fêrî boyaxkirinê dikin. Incex gava ew jî bimire, em birayê wî yê din fêr dikin. Ev pîşeya me pir rêxistinkirî û têkûz e û em ji rengê şîn pêve jî tu rengan çênakin.

Ebûqîr jê re got: Ez ji boyaxker im û ez çêkirina hemû rengan dizanim û bi wan boyax dikim. Ez dixwazim, ku tu min li cem xwe bişixulînî bi mûçeyekê, ez ê jî hemû rengan fêrî te bikim, da ku nav û dengê te di nava boyaxkeran de bi serbilindî derkeve! Zilam got: Em kesî xerîb li cem xwe naxebitînin û wî tevlî pîşeya xwe nakin. Ebûqîr got: Lê ku ez bi serê xwe ji xwe re dikaneke boyaxkirinê vekim? Zilam got: Qet tu nikarî tiştekî wisa bikî!

Ebûqîr dev ji wî boyaxkerî berda û çû cem yekî din; wî jî heman gotinên ê pêşîn jê re gotin. Çû cem yekî din û ji cem wî jî çû cem yekî din û wisa berdewam kir, heta ku li ser her çil boyaxkerî gerîya, hemûçkan heman gotin jê re gotin û kesî ew qebûl nekir, ne bi çiraxî ne jî bi hostetî. Rabû çû cem şêxê boyaxkeran û derdê xwe jê re got. Şêxê boyaxkeran got: Em naxwazin xerîb têkevin nav karê me!

Ebûqîr pir hêrs bû û çû gilîyê wan li cem qral kir. Jê re got: Ey qralê dem û dewranan! Ez boyaxkerekî xerîb im, ez li ser hemû boyaxkeran gerîyam, min ji wan re weha weha got, wan jî weha got. Ez dikarim boyaxa sorê gulgulî û sorê tirî çêkim, ji rengê kesk jî keskê gihayî; keskê fisteqî û zeytûnî çêdikim. Rengên cuda cuda yên mîna reş, şirikî, zer, lîmonî, narincî û gelek rengên din çêdikim û cawan pê boyax dikim. Boyaxkarên bajarê we jî tenê rengê şîn li cilan dixin û bi tu rengên din nizanin û nahêlin, ez li cem wan bixebitim, ne bi çiraxî, ne jî bi hostetî.

Qral got: Tu rast dibêjî. Ez ê dikaneke boyaxê ji te re vekim û sermalekî bidim te, tu bi serê xwe bixebite û têkilî wan nebe. Kesê ku têkilî te bibe jî, ez ê wî bi devê derîyê dikana wî ve daliqînim. Piştre qral ferman da karker û xebatkaran, ji wan re got: Bi vî hosteyî re herin, li nava bajêr bigerin, wî ku der eciband; kîjan dikan, xan eciband, wê derê jê re vegerînin dikaneke boyaxê û xwedîyê wê jê derxînin. Dikanê li gora dilê wî çêkin. Ew çawa dixwaze, wisa bikin û qet li hember wî dernekevin.

Di pey re qral, kincekî xweşik lê kir, du bende dan wî, ji bo ku xizmeta wî bikin û hespekî xurcezîn li ser û xemilandî dayê, ji bo ku lê siwarê. Malek jî jê re vala kirin û raxistin, ji bo ku tê de bi cih bibe.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 996'AN

*Şehrezadê ji Şehreyarê gewre re got*:

Ebûqîr, di mala xwe ya nû de bi cî bû û roja din, li hespa xwe siwar bû, karker û endezyar dan dû xwe û li nava bajÊr gerîya, hetanî ku cihekî xweş eciband, ji wan re got: Min ev der eciband. Wan jî xwedîyên avahîyê jê derxistin û ew birin cem qral, ew razî kirin û buhayekî zêdeyî buhayê wê dan wî, ew bi rêya wî de şandin.

Ebûqîr jî êdî ferman didan karkeran û ji wan re digot: Weha bikin, weha bikin; hetanî ku kargeheke boyaxê ya herî mezin û xweşik jê re dan avakirin. Di pey re çû cem qral, ew agahdar kir, ku avahî temam bûye û êdî pêdivî bi heqê boyaxê heye. Qral got: A ji te re vî çar hezar dînarî ji xwe re bike sermaye û berhemên karxaneya xwe nîşanî min bide!

Ebûqîr rahişt wan dînaran û çû daket sûkê, dît ku çîvît pir e û kes wê nakire jî. Bi qasî ku jê re lazim bû, çîvît kirî. Hemû pêdivîyên xwe yên din jî kirîn. Qral jî jê re pêncsed perçe caw şand, ji bo ku boyax bike. Ebûqîr ew caw giş, beş bi beş di boyaxên cuda cuda re derbas kirin û ew li ser benan raxistin, ji bo ku zuha bibin. Gava mirovên bajêr di wir re derbas bûn û ew cawên rengareng daleqandî dîtin, şaş û metal bûn. Lewre tiştekî wisa di emrê xwe de nedîtibûn. Her ku temaşevanên wan cawan pir bûn û mirov li devê dikanê bi awayekî qelebalix kom bûn û jê pirsîn, gotin: Hoste ev çi reng in? Wî jî got: Ev sor e, ev zer e, ev jî kesk e, rengên xwe yeko yeko bi wan da naskirin. Wan jî çûn cawên xwe anîn, dan wî û jê xwestin, ku rengên li gora dilê wan lêde.

Piştî ku Ebûqîr cawên qral boyax kirin û ew amade kirin, ew birin cem qral û derket diwana wî. Gava qral çav li wan cawên rengareng ket, pir kêfa wî hat û gelek dînarên din dan wî.

Piştre leşkeran, karmendan, hemû kesên qodeman jî cawên xwe anîn cem Ebûqîr û jê xwestin, ku rengên li gora dilê wan lêde. Wi jî boyaxên li gora dilê wan lê dida û dînar û derhem, zêr û zîv bi ser de dibarîyan. Nav û dengê wî li her derê belav bû. Wî jî navê dikana xwe kir "Boyaxgeha Sultan" û ji her çar hêlan ve xêr û bêr bi ser de barîyan.

Ji boyaxkerên din tu kesî newêribû têkilî wî bibe. Hemû dihatin cem, destê wî maçî dikirin û leborîna xwe jê dixwestin, ji ber nêzikahîyên wan ên destpêkê û jê dixwestin ku wan bike şagirt li ber destê xwe, lê wî qebûl nedikir.

Ebûqîr malekî pir kom kir, xulam û qerwaşên wî çêbûn û bû zilamekî navdar di wî bajarî de. Em Ebûqîr li wir bihêlin û em vegerin ser rewşa Ebûsîr.

Piştî ku Ebûqîr derhemên di berîka wî de derxistin û derî li ser wî girt û çû, Ebûsîrê ku nexweşîna wî lê giran bûbû, bi tenê di odeyê de ma û nexweşîna wî pê arîya, hêl tê de nehişt. Sê rojan di wî halî de; di wê odeya girtî de ma. Vê rewşa hanê bala dergevanê xanê kişand. Çû li derî nêrî, dît ku derîyê odeyê xiliqandî ye û ew sê roj bûn, kes ji wan nedîtibû. Di dilê xwe de ji xwe re got: "Gelo ev herdu zilam çûne, bêyî ku kiriya xwe bidin an mirine, tiştek bi serê wan de hatiye? "Lê gava çû ber derî û guhê xwe da ber, dengê axîn û nalîna Ebûsîr ê berber hat wî. Mifteya derî li ser dikê bû, derî vekir derbasî hundir bû. Dît ku Ebûsîr dinale, jê re got: Xêr e înşelah, kanî hevalê te? Ebûsîr got: Bi Xwedê ez vê sibehê nû bi ser xwe ve hatime û li xwe hay bûme û min bang kir lê kesî bersiva min neda. Tu bi Xwedê kî birawo, li wî tûrikê di berîka kincê min de binêre pênc derheman jê derxe û here hinek xwarin ji min re bîne, ez pir birçî bûme!

Dergevan çû destê xwe avêt tûrik, dît ku vala ye. Li Ebûsîr zivirî û jê re got: Tûrikê te vala ye, tiştek tê de nîn e. Ebûsîr têderxist ku Ebûqîr diravên wî birine û revîyaye, çûye. Ji dergevan re got: Te hevalê min nedîtiye gelo? Dergevan got: Ev sê roj in, min ew nedîtiye. Tew min digot qey hûn çûne. Ebûsîr got: Ew neçûye, gava ez nexweş dîtime, temahîya diravên min kiriye û rahiştiyê biriye.

Ebûsîr girîya, nalîya û axîn pêket. Dergevan jê re got: Tiştek nabe birawo, ew dê cezayê xwe ji Xwedayê xwe bibîne!

Dergevan çû jê re şerbet û xwarinek çekir û anî da wî. Bi qasî du mehan lê nêrî, xwarin û vexwarina wî dayê û heta ku xweydan da û Xwedê ew ji wê nexweşînê rizgar kir û bi ser xwe ve hat. Rabû ser xwe û ji dergevanê xanê re got: Heger Xwedê teala hêza min dîsa li min vegerine, ez vê qencîya te ji bir nekim. Lê xêra herî mezin û qîmeta herî giran, wê Xwedê bide te.

Dergevan got: Şikir ji Xwedê re ku tenduristîya min di cî de ye û pêdivîya min bi tiştekî din nîn e. Tiştê ku min bi te re kir jî, ji bo rizakirina Xwedê bû, ne tiştekê din. Xwedê ji min razî be, besî min e.

Ebûsîr ji xanê derket, daket sûkê û li nava bajêr gerîya. Bi rasthatinekê di kolana "Boyaxgeha Sultan" re derbas bû û çav li wan cawên raxixtî yên reng û reng ket û bala xwe dayê, ku gelek kes li ber derî kom bûne, lê temaşe

dikin. Ji yekî bajarî pirsî, got: Ev cihê çi ye û çima ev qas kes lê temaşe dikin? Zilam jê re got: Ev kargeha boyaxkirinê ye, navê wê “Boyaxgeha Sultana” e, ku mirovekî bi navê Ebûqîr ew daye avakirin. Her ku ew cawekî bi rengekî cuda boyax dike, em jî tên lê temaşe dikin. Ji ber ku li welatê me tu kesên ku bizanibin van rengan lêdin, tune ne.

Piştre zilam ji Ebûsîr re çîroka tiştê ku di neqeba Ebûqîr û boyaxkerên din de qewimîbû û çûna Ebûqîr a cem qral û gilîkirina wî ya boyaxkerên din hemû jê re go. Çawa qral di avakirina dikanê de alîkarîya wî kir û çawa ew ji boyaxkerên din parast, hemû got.

Kêfa Ebûsîr pir hat û di dilê xwe de got: “Şikir ji Xwedê re ku rêyek jê re vekir û ew kir hosteyek. Nexwe bi kar û barê boyaxê de ketibû, loma ez ji bîr kirime. Di dema bêkarîya wî de, min lê nêrî û min ew xwedî kir, niha jî ew ê qencîya min li min vegerîne û çawa min bibîne, dê bihatina min pir kêfxweş bibe û dê alîkarîya min bike!

Ebûsîr ber bi derîyê dikane ve çû. Dît ku Ebûqîr li ber devê derî, di nava kincên qodemanan de li ser mistebeyekê rûniştiye. Li ber wî jî çar bendeyên reşik û çarên spî ku kincin paqij li wan, rûniştî bûn. Di hundir de jî deh reşikên ku dixebitîn xuya dikirin. Lewre ew jî hatibûn fêrkirin û li şûna Ebûqîr, wan karên berdest dikir. Ebûqîr jî mîna wezîr û qralan di nava balîfan de rûniştî bû, tu tişt nedikir, tenê ferman didan xebatkaran, ji wan re digot, “Wiha bikin, wiha bikin!” û hew.

Ebûsîr çû li ber wî sekinî û jê werê, ku çawa wî bibîne dê ji kêfan baskên wî çêbibin û dê xwe bavêje himbêza wî, wî maç bike û xêrhatina wî bike. Lê çawa ku çavên Ebûqîr le ketin, jê re got: Pîsê heram, ew çend car in ez ji te re dibêjim li ber derî nesekine? Qey tu dixwazî min di nava xelkê de bihetikinî, dizê heram? Ka zû vî dizî bigirin!

Bendeyên wî di cî de lê hatin hev û ew girtin. Ebûqîr jî rabû ser xwe, rahişt şiva xwe û ji bendeyan re got: Wî bavêjin erdê! Bendeyan ew avêtin erdê. Ebûqîr sed şiv li pişta wî da. Piştre ew qulibandin ser piştê, sed şiv jî li zikê wî da û jê re got: Ey dizê pîs û heram û bêbext! Heger careke din ez te li vir bibînim, ez ê te bişînim cem qral, da ku te bispêre celadê xwe û benekî bavêjin stûyê te, te daliqînin. Zû ji ber çavên min wenda bibe, Xwedê stûyê te bişikîne Rebî!

Ebûsîr, dilşikestî û polîpoşma ji dikana wî derket. Kesên li derdora wan, ji Ebûqîr pirsîn û gotin: Vî zilamî çi kiriye, gelo? Ebûqîr ji wan re got:

Dizek e, cawên xelkê didize. Gelek caran caw ji min dizî, min di dilê xwe de got, mirovekî feqîr e, min ew efû kir û min heqê cawê xelkê li wan vegerand. Min nexwest, ku di nav xelkê de bihetike. Her car jî bi zimanekî xweş min şiyar dikir lê wisa xuya dike, ku nêta wî tune ye, ku dev ji xerabîyê berde. Heger careke din were vir, ez ê wî bişînim cem qral, bila wî bikuje û xelkê jê xelas bike.

Gava Ebûqîr wisa got, mirovên li wir dijûn ji Ebûsîr re dan û nifir lê kerin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 997'AN

*Şehrezadê got*:

Îcar em Ebûqîr li wir bihêlin û em vegerin ser Ebûsîrê ku polîpoşman vegerîya odeya xwe ya li xanê, li ser cihê xwe rûnişt û kûr kûr li ser wê helwesta Ebûqîr hizirî, hewl da ku têbigihîje bê çawa wisa lê kiriye? Di wê navberê de êşa şopên lêdana Ebûqîr lê sar bûn û jenînê di laşê wî de vedeng da û ew aciz kir. Rabû ser xwe, derket derve. Li nava bajêr gerîya, da ku êşa canê xwe ji bîr bike. Bi rê de ket bîra wî ku here hemamê, xwe bişo. Ji zilamekî pirsî, got: Birawo kanî hemam li ku hene, tu dikarî rêya yekê ji wan nîşanî min bidî? Zilam got: Hemam çi ye? Ebûsîr got: Cihek e mirov diçê, xwe lê dişo û gemara xwe jê dibe. Cihekî pir xweş e. zilam got: Wa ye behr li ber te ye, here xwe bişo! Ebûsîr got: Ez dixwazim herim hemamê. Zilam got: Wele yê me em hemamê nas nakin, pêdivîya me çêbibe, en giş diçin ser avê, xwe dişon.

Gava Ebûsîr fêm kir, ku hemam di bajar de tune ne û mirovên wir hemamê nas nakin, berê xwe da cem qral. Derbasî dîwana wî bû, erda bin nigên wî maçî kir, dua jê re kirin û jê re got: Ez mirovekî xerîbê vir im û pîşeya min hemamkarî ye, ez serşokan çêdikim. Ez hatim vî bajarê we û min xwest, ku ez herim hemamê lê min tu hemam tê de nedîtin. Bajarekî ev qasî xweşik û spehî çawa bê hemam e? Qralê dem û dewranan, bawer bike heta ku hemam di vî bajarê te de çênebe, ev bajar têkûz nabe. Û pê de çû, gelek meziyet û fêdeyên hemaman jê re dan xuyakirin.

Qral bi vê gotina Ebûsîr kêfxweş bû, xêrhatina wî kir; bedlek cilên pir xweşik lê kirin, hespek û du bende dan wî, çar qerwaş û du xulam jî diyarî

wî kirin û maleke xweş û raxistî jê re veqetand û diravin ji yên Ebûqîr pirtir jî dan wî. Avakar û xebatkar jî dan gel wî û ji wan re got: Pê re herin, devera ku ew biecibîne, li wê derê li gora daxwaza wî jê re hemamekê ava bikin.

Ebûsîr, hemû dan dû xwe û li nava bajar gerîya, heta ku cihekî xweş, hilbijart û ji wan re got, hemama min li vir çêkin! Karker û avakar û endezyar hemû lê hatin hev, bi şev û roj xebitîn, heta ku jê re hemameke pir xweşik ava kirin, ku avahî mîna wê tune bûn. Piştre ji wan xwest, ku hemamê ji hundir ve bineqişînin. Gava ku neqişandin jî qedîya, Ebûsîr got: Tenê raxistin jê kêm maye. Qral deh hezar dînarên din jî da wî. Ebûsîr çû hemama xwe bi awayekî pir spehî raxist û ser têlan tijî fote û pêşgîr kirin, raxistin. Êdî kî diçû devê derî û li wan neqşên hundirê hemamê dinêrî, şaşwaz û heyran dima. Mirov qefil bi qefil bi ser de hatin û ji xwe re li wî tiştê ku di heyata xwe de nedîtibûn, bi heyrangorîyeke mezin temaşe kirin û digotin: Ev çi ye? Ebûsîr jî digot: Ev hemam e!

Ebûsîr, ava wê germ kir, hemam gerand û fiskîyeya di nava wê de şixuland û hişt, ku hemû bajarî lê ecêbmayî bimînin. Piştre deh sîpeyên negihayî û bende ji qral xwestin. Qral deh hebên spehî mîna deh heyvan dan wî. Wî jî her deh sîpe xistin hemamê û ew fêrî usûlên şûştin û lûfikiran, zibûnan kir. Danûstendina bi xelkêre, rabûn û rûniştin û awayên tevgerê hemû bi wan da fêmkirin û ew xistin ser kar. Piştî ku bixûr berdan, bangêr bera nav bajêr da û ji xelkê re got: Bajarîno, xelkino; de êdî werin, werin vê hemama sultanî û tama paqijî û xweşîyê bibînin! Navê vê hemama me "Hemama Sultan" e!

Xelkê bi qefleyan berê xwe da hemamê. Ebûsîr jî ji bendeyên ciwan xwest, ku laşên xelkê bişon. Mirov jî diçûn diketin leganên mermerî û şaytok, piştre derdiketin, diçûn li eywanê rûdiniştin û ciwanên xebatkar ew Iûfik dikirin û laşên wan dişûştin, çawa ku Ebûsîr ji wan re gotibû û ew fêrî wê kiribûn.

Hetanî sê rojan jî, mirov belaş hatin hemamê, xwe şûştin û çûn. Roja çaran qral jî biryar da, ku here hemamê. Ew û mezinên dewleta xwe siwar bûn û çûn hemamê. Kincên xwe ji xwe kirin û derbasî hundir bû. Ebûsîr çû cem qral û laşe wî lûfik kir. Gemara laşê wî fitîl fitîl rakir û rêbaza xweşûştinê nîşanî wî da. Qral pir kêfxweş bû. Êdî gava destê xwe datanî ser laşê xwe, nermbûneke şaytok û xweş his dikir, ku cara ewil bû li tiştekî wisa rast dihat. Piştre ava gulan ji bo wî berdan nava legana mermerî. Qral ket navê, xwe tê de kir û derket. Laşê wî nerm û zindî bû, mîna ku hêzeke cuda ketibe

nav rehên laşê wî. Piştre Ebûsîr qral bir eywana ku bixûr tê de pêxistibûn û bêhnên xweş jê difûrîyan. Qral li Ebûsîr zivirî û jê re got: Hoste ev hemam e ne wisa? Ebûsîr got: Ev e, ezbenî. Qral got: Bi tirba bavê min, ev bajarê min bi vê hemamê dibe bajar! Gelo serê mirovekî tu yê çiqasî ji xelkê bistînî? Ebûsîr got: Tu fermanê bi çi bidî, ez ê ew gasî ji xelkê bixwazim.

Qral got: Kî were xwe di hemamê de bişo, deh hezar dînar jê bistîne! Ebûsîr got: Ey qralê dem û dewranan, mirov hemû ne weke hev in, hinek maldar in, hinek feqîr in û heger em serê yekî hezar dînarî ji wan bistînin, wê hemama me vala bimîne. Lewre feqîr nikarin hezar dînarî bidin. Qral got: Nexwe tu yê çawa bikî? Ebûsîr got: Ez ê li gor hêz û wijdanê ji wan bistînim. Kî, qeweta wî digihêje çi, ez ê ew qasî jê bistînim. Ji feqîran hindikî, ji maldaran gelekî û bi wî hawayî wê gelek mirov werin hemamê. Ew hezar dîinarên ku we behs kir jî, bila dana qrale me tenê be. Lewre tu kes nikare mîna qralê me bike! Hemû mezin û rêvebirên dewletê jî tevlî wê gotina Ebûsîr bûn û gotin: Rêya heq ev e; dadwerîya mezin jî ev e; qralê zemanan, ma tu dibê mirov hemû mîna te hêzdar û maldar in!

Qral got: Ev gotina we raste lê belê ev zilam jî xerîb û feqîr e, divê em qedrê wî bigirin. Lewre hemameke wisa spehî û baş di bajarê me de çêkiriye, ku me di heyata xwe de tiştekî wisa nedîtiye. Wî bi vî karê xwe, rûmeteke mezin da bajarê me, qey gava em piçek dirav zêde bidin wî, wê pir be! Wan jî got: Heger tu yê qedrê wî bigirî, tu zêde bidê, da ku feqîr jî bi xêra te werin û bi diravekî hindik xwe bişon û dua ji te re bikin. Em mezinên dewleta te, em nikarin hezar dînarî bidin. Îcar wê çawa feqîr bidin? Qral got: Nexwe hûn hemû vê carê her yek ji we sed dînarî, bendeyekî, xulamekî û qerwaşekê bidin wî? Karmendan got: Em ê vê carê tenê ew qasî bidin wî lê jê û pê de, kî dikare çiqasî bide wî, dê ewqasî bidê!

Qral got: Bila be, wisa jî dibe!

Her mezin û karmendekî dewletê sed dînar, qerwaşek, bendeyek û xulamek dan Ebûsîr. Wê rojê çarsed karmend û mezinên dewletê bi qral re derbasî hemamê bûbûn, xwe şûştibûn.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 998'AN

*Şehrezadê ji Şehreyarê gewre re got:*

Ji ber ku mezinên dewletê yên ku wê rojê bi qral re çûbûn hemamê çarsed heb bûn û her yekî ji wan sed dînar, qerwaşek, bendeyek û xulamek da Ebûsîr, bi giştî çilhezar dînar, çarsed qerwaş, çarsed bende û çarsed xulamên wî çêbûn.

Ebûsîr ber bi qral ve çû, erda bin nigê wî maçî kir û jê re got: Ey qralê gewre, bextewar û xwedîyê ronahîya rêya rast! Gelo wê kîjan qesr û qonaxên min têra ev qas bende û xulam û qerwaş bikin?

Qral jê re got: Min ew hemû ji te re xwestin, ji bo ku mal û sermayeyeke mezin ji te re bigihîje hev. Lewre, dibe ku mal û malbat û welatê te hatibe bîra te, te bêrîya wan kiribe û tu bixwazî vegerî wir. Heger tiştekî wisa ketibe bîra te, min xwest ku mal û milkekî bi qasî ku li wir têra te bike, ji te re were ser hev.

Ebûsîr got: Qralê zemanan, Xwedê rûmeta te zêdetir bike û cahê te bilindtir bike! Ev qas qerwaş û bende û xulam incex ji qralan re dibin. Heger te ji bo min dirav bixwestina, wê ji vê artêşa hanê çêtir bûya. Lewre ev hemû dixwin, vedixwin, li xwe dikin û çiqas malê min hebe jî, têra xwedîkirina vana nake!

Qral kenîya û got: Bi Xwedê tu rast dibêjî, mîna artêşeke girgir e û tu derfeta ku tu li wan xerc bikî jî di destê te de tune ye. Lê ka nexwe wan bifiroşe min û serê yekî sed dînarî bigire? Ebûsîr got: Min ew firotin.

Qral ferman da xeznedarê xwe, wî çû mal anî û heqê wan qerwaş û xulam û bendeyan giş bi temamî dayê. Piştre jî ew hemû dîsa weke diyarî li xwedîyên wan ên berê vegerandin û ji wan re got: Her kes ên xwe nas dike, wan bibin, bila diyarîya min be ji we re. Her kesî yên xwe birin.

Ebûsîr ji qral re got: Xwedê xêra te binivîsîne ku te ez ji van cengawerên ku ji Xwedê pê ve tu kes nikare wan têr bike xelas kirim!

Qral careke din kenîya. Ebûsîr xelat kir û rabû li gel karmend û wezîrên xwe vegerîya seraya xwe. Ebûsîr jî wê şevê çû mala xwe. Demeke dirêj bi hejmartina zêran ve derbas kir. Bi alîkarîya her bîst bende, her bîst xulam û her çar qerwaşên ku di xizmeta wî de mabûn, hemû xistin tûrikan, mohr kirin û di sindoqan de bi cî kirin.

Roja din bi sibehê re çû hemama xwe vekir. Bangerek şand nav bajêr, da ku bigere û bibêje; her kesê ku were hemamê xwe bişo, çi ji destê wî bê, dê ew qasî bide, ne zêdetir.

Ebûsîr li ber sindoqê rûniştî û mirovên ku dixwestin derbasî hemamê bibin, qefil bi qefil bi ser de hatin. Kî çi ji destê wan dihat, ew dida. Dîsa jî heta ku bû êvar sindoq hat dagirtin, çawa ku berketa Xwedê ketibê.

Roja din keybanûyê xwest, ku here hemamê. Ebûsîr ji bo xatire wê roj kir du dan; ji sibehê hetanî nîvroyê ji zilaman re veqetand û ji nîvroyê hetanî êvarê jî ji jinan re veqetand. Gava ku keybanû hat, Ebûsîr qerwaşeke xwe di şûna xwe de li ber sindoqê da rûniştandin. Di cihê serşok û eywanê de jî çar qerwaş hebûn û her çar jî baş fêrî karê xwe bûbûn. Loma keybanû pir ji wan razî hat û hezar dînar avêt sindoqê, lewre kêfa wê pir ji hemamê re hatibû. Ev mesele jî li nav xelkê belav bû û bandoreke mezin li ser bajarîyan kir. Loma êdî kî dihat, bi comerdî dirav davêt sindoqê. Feqîr bûna, maldar bûna, ferq nedikir. Xêr ji her derê ve bi ser Ebûsîr de dibarîyan. Derdora qral hemû nas kirin û êdî qral jî hefteyê carekê dihat û hezar dînar dida. Rojên dîtirkê jî ji mezin û feqîran re veqetandibûn û bi şêweyeke baş û nazik bi her kesî re mijûl dibû.

Rojekê qeptanê qral hat hemamê, Ebûsîr pêve rabû û bi taybetî pê re mijûl bû, henek û laqirdî pê re kirin û gava ji hemamê derket jî, şerbet û qehwe dayê. Gava ku qeptan tiştekî bavêje sindoqê jî, Ebûsîr sond xwar û nehişt ku tiştekî bide. Qeptan di bin wê qencîya wî de ma û li hemberî wê hezkirin û rêzdarîya wî nema dizanibû wê çi diyarî wî bike.

Em Ebûsîr li wir bihêlin û em vegerin cem Ebûqîr. Wî jî gava dît ku xelk giş bi kelecanî behsa hemamê dikin, dibêjin; tiştê herî xweş di dinyê de bêguman ev hemam e û kî li kê rast tê dibêje; sibê me bibe hemama sultanî. Ebûqîr jî di dilê xwe de ji xwe re got: “Dive misoger ez jî mîna xelkê herim vê hemama ku hiş bi xelkê ve nêhiştiye!” Piştre rabû kincên xwe yên herê xweşik li xwe kirin, li qantira xwe siwar bû, da pêşîya çar bende û çar xulamên xwe û berê xwe da hemamê. Çawa gihîşt ber derîyê hemamê, ji hundirê ku hinek derbas dibûnê, bêhneke xweş li ser çavên wî da. Hinek jê derdiketin û ser kulînên mermerî jî tijî mezin û biçûk bûn. Çawa ku derbasî navbirê bû, Ebûsîr ew dît, bi kêfxweşî pê ve rabû, xêrhatina wî kir. Ebûqîr jê re got: Ma mirov wisa li hev dike camêr? Min ji xwe re boyaxgehek vekir, ez bûm hosteyê bajêr, min qral naskir, ez bûm xwedî mal û xwedî bextewarî û tu nehatî te li min jî nepirsî, te negot, ka hevalê min bi ku ve çûye û ez perîşan bûm di gera pey te de. Min bende û xulam dişandin hemû xan û xwaringehan, ji bo ku li te bigerin lê kes ji wan bi ser te venebû û min agahîyek ji te negirt!

Ebûsîr jê re got: Ma ne ez hatim cem te, te ez kirim diz û te têra min li min da, te ez hetikandim di nav xelkê de! Ebûqîr rûyê xwe mirûz kir, çawa ku xemgîn bûbe got: Ev çi gotin e, qey bi rastî jî ew ê min lexist tu bûyî?

Ebûsîr got: Belê, ez bûm! Ebûqîr, jê re hezar sond xwar, ku wê çaxê wî ew nas nekiriye û ew bi yekî din î ku her roj dihat dizîya wî dikir, şibandiye; yekî ku her roj cawê xelkê didizî û zirar dida wan. Herî dawîyê jî got: Lahewle… Xwezî hîna ji serî de te xwe bi min bida naskirin, te bigota ez filankes im. Lê te negot û kêmasîya te bû. Bi taybetî jî ji ber ku ez di nava karekî giran de bûm wê kêlîkê û ez pir hers bûbûm. Xwedê li te bibihure hevalê min!

Ebûsîr got: Xwedê gunehên te efû bike dosto, wisa xuya dike, ku ev jî di qedera me de nivîsandî bû, de kanî kincên xwe derxe û derbasî hundir bibe, xwe bişo û li rehetiya xwe binêre! Ebûqîr got: Birawo tu bi qedrê Xwedê kî, min efû bike? Ebûsîr got: Qey ew jî qedera min bû, Xwedê li te were rehmê û di te de bibore. Ebûqîr got: Lê ev hebûna te hemû ji ku hatiye? Ebûsîr got: Ê derîyê hebûn û maldarîyê li te vekir, li min jî vekir. Ez jî çûm cem qral û min mijara avakirina hemamekê pê re parve kir, fikra min ket serê wî û wî jî fermana avakirina hemamê da; çawa ku tu nasê qral î, ez jî êdî nasê qral im.

Ebûqîr got; înşelah ez ê bihêlim ku ji te hez bike, qedrê te bigire û alîkarîya te bike. Ew nizane ku tu hevalê min î, ez ê wesîyeta te lê bikim. Ebûsîr got: Pêdivîya min bi wesîyeta te tune ye, jixwe ew min nas dike û hezkirina wî ji min re heye; hemû dost û nasên wî jî ji min hez dikin û gelek dana wî jî ji min re çêbûye. De ka derbas bibe pişt sindoqê, kincên xwe ji xwe bike û derbasî serşokê bibe. Ez ê bi te re bêm, ji bo ku ez pişta te lûfik bikim.

Ebûqîr, kincên xwe derxistin û derbasî hundir bû. Ebûsîr jî pêre çû, pişta wî lûfik kir, ew baş şûşt û pê re mijûl bû, heta ku kincên wî lê kirin û ji hunder derxist. Piştre jê re xwarin û vexwarinên şîrîn anîn, danîn ber wî. Mirovên li derdorê jî bi baldarî û bi xîret lê dinêrîn û dixwestin nas bikin, bê evê ku Ebûsîr ew qasî pê re mijûl dibe û xizmetê jê re dike, kî ye?

Herî dawîyê Ebûqîr xwest, ku tiştekî bidê. Lê Ebûsîr sond xwar, ku tiştekî jê negire û pê de çû, got: Ma ne şerm û fedî ye, ku ez diravekî ji destê te bigirim. Tu hevalê min î? Ebûqîr got: Hevalo, bi Xwedê ev hemama te pir hêja ye lê tiştek jê kêm e. Ebûsîr got: Çi jê kêm e? Ebûqîr got: Dermanekî rakirina mûyên laş heye, ji kokên zernîx û kilsê çêdibe. Heger tu wî dermanî çêbikî û pêşkêşî qral bikî û wî fêrî bikaranîna wî dermanî bikî, dê pir ji te hez bike û gelekî jî qîmeta te bigire!

Ebûsîr got: Bi Xwedê tu rast dibêjî, înşelah ez ê wî dermanî çêkim. Xatir ji hev xwestin. Ebûqîr derket, li qantira xwe siwar bû û berê xwe da cem qral. Derbasî dîwana wî bû û jê re got: Ey qralê gewre, ez dixwazim xêrekê bi te bikim? Qral got: Çi xêr e? Ebûqîr got: Min bihîst, ku te hemamek ava kiriye! Qral got: Belê, zilamekî mîna te xerîb hat, min jê re hemamek çêkir, çawa ku min kargeheke boyaxê ji te re jî çêkir. Hemamek pir xweş çêbûye û bajarê me jî pir xweş kiriye!

Qral, başî û xweşîyên hemamê bi hurgilî û bi dirêjahî jê re vegotin. Ebûqîr got: Û tu jî qet çûyî wê hemamê? Qral got: Belê. Ebûqîr got: Şikir ji Xwedê re ku tu ji nav lepên vî xerab û vî xebîsê dijminê ol û îmanê xelas kiriye! Qral got: Ew çima dijminê olê ye? Ebûqîr got: Qralê gewre, heger ji îro û pê de, tu herî wê hemamê, tu yê werî kuştin! Qral got: Çima û ji bo çi? Ji ber ku xwedîyê hemamê dijminê te û Xwedê ye. Ji xwe wî ev hemam bi te daye çêkirin, ji bo ku tê de te jehrî bike. Wî dermanek ji te re amade kiriye, gava tu vê carê herî hemamê, dê wî dermanî ji te re bîne û bibêje; wî di xwe bide, da ku mûyên te bi hêsanî biweşin. Lê belê ew ne derman e, ew jehrek e kujer e, ku felata mirov jê nîn e. Ev bêbextê hanê, soz daye qralê filehan, gotiye, ez ê wî bikujim û tu jî jin û zarokên min ji êsîrîyê berde. Lewre jin û zarokên wî di destê wî qralî de ne. Ez jî bi wan re êsîr bûm li wî welatî, lê min ji wan re kargehek boyaxkirinê vekir û min cawên rengrengî ji wan re boyax kirin, dilê qralê wan bi min şewitî û ji min re got; tiştekî ji min bixwaze, ez ê bidim te! Min azadkirina xwe jê xwest. Wî jî ez berdam. Piştre ez hatim vê derê. Duh gava ez çûm hemamê, min ew dît û min jê re got, tu û zarokên xwe çawa xelas bûn; wî got, ez û jin û zarokên xwe êsîr bûn, çawa ku tu dizanî. Rojekê qralê wan filehan dîwan li dar xist û gelek kes tevlî dîwanê kirin. Ez jî li wê derê li ser nigan sekinîbûm. Gava mijara axaftinê hat ser qralê vî bajarî, pifepif bi qralê filehan ket û got: Tiştê ku kezeba min reş kiriye, jixwe ew qral e. Kesê ku bikaribe rêyekê bibîne û here wî bikuje, çi ji min bixwaze, ez ê bidim wî! Ez çûm raberî wî û min jê re got; heger ez reyekê bibînim û herim bi fenekê wî bikujim, tu yê min û jina min û zarokên min berdî? Got, belê ez ê we berdim û hûn çi bixwazin jî ez ê bidim we. Rabû min û wî me li hev kir. Wî jî ez bi keştîyekê şandim vir. Ez çûm cem qral, min fikra xwe jê re got. Wî jî ev hemam ji min re ava kir. Êdî hindik maye, ku ez wî bikujim û herim cem qralê filehan, zarokên xwe û jina xwe bidim berdan û bigihîjim armanca xwe. Min jê re got: Tu yê çawa wî bikujî? Wî got, min rêyeke hêsan dîtiye. Ew ê were hemamê, min

jî dermanek jê re çêkiriye û jehr xistiye navê. Ez ê jê re bibêjim, vî dermanî bigire û di laşê xwe bide, ji bo mûyên te biweşîne. Ew jî dê rahêje derman û di nav şeqên xwe bide û jehr bi laşê wî de here û di nava roj û şevekê de, dê xwe bigihîne dilê wî û dawîyê li jîyana wî bîne. Vêca gava min ev gotin ji wî bihîstin, ez li ser te tirsîyam. Lewre te gelek qencî û xêr bi min kirine û divê mirov ne nankor be. Loma di cî de ez hatim û min xwest, ku ez te ji vê yekê agahdar bikim.

Gava qral ev gotin bihîst, pir hers bû û ji Ebûqîr re got: Vê sirê li cem xwe bigire û ji kesî re nebêje! Û xwest, ku here hemamê ji bo ku angaşta Ebûqîr û gumanên ku pê re çê bûne, zelal bike.

Gava çû hemamê, mîna her car Ebûsîr pê ve rabû û xwe ji xizmeta wî re vala kir. Pişta wî lûfik kir, laşê wî baş şûşt û piştre jê re got: Qralê gewre û hêja, min dermanek ji bo paqijkirina mûyên jêrîn peyde kiriye. Tê di xwe de bidî? Qral got: Ka wî dermanî ji min re bine! Ebûsîr derman anî, da ber destê wî, qral dît ku bêhneke nexweş jê tê. Texmîn kir, ku jehr be! Hêrs bû û bi ser zêrevanên xwe de qirîya, got: Wî bigirin! Zêrevanan Ebûsîr girtin. Qral jî bi hêrs ji hemamê derket, bêyî kes bizanibe çima hêrs bûye. Qral pir hêrs bûbû û nedixwest ji kesî re bibêje. Kesî jî newêribû ji wî bipirse.

Qral derket dîwana xwe, zêrevanan jî Ebûsîrê destgîrkirî derxistin raberî wî. Qral gazî kir qeptanê xwe. Ew jî anî wir û jê re got: Vî xerabî bibe bixe kûzekî mezin û du qentar koza agir bavêje bin wî û devê kûz lê bigire û wî bixe kelekekê û bîne raserî qesra min. Li min binêre, tu yê bibînî ku ez li ber şibakeya qesrê me. Îcar kengî min ji te re got wî bavêje behrê, tu wê çaxê wî bavêje, da ku ev bêbext hem bişewite, hem di avê de bifetise.

Qeptan got: Ser seran, ser çavan qralê min! Û Ebûsîr da pêşîya xwe, ew bir giraveke raserî qesra qral û jê re got: Heyra ev çi hal e? Ez carekê hatim hemama te, bi comerdîyeke ji dil te qedr û qîmeta min pir girt. Te xizmeteke pir baş ji min re kir. Ez jî pir pê kêfxweş bûm û min ji te hez kir. Çi tişt di neqeba te û qral de derbas bûye, ku ev qasî ji te qehirîye? Te çi xerabî pê kiriye, ku cezayekî wisa giran li te birîye û emrê kuştineke wiha giran di heqê te de daye?

Ebûsîr got: Bi Xwedê haya min ji tu tiştî tune ye û min tu guneh jî der heqê wî de nekirine!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA 999'AN

*Şehrezadê got*:

Gava ku Ebûsîr wisa bersiv da, qeptan jê re got: Qral pir ji te hez dikir û cihê te li cem wî di ser ê her kesî re bû. Gelekan ji ber vê yekê dexesîya te dikir. Dibe ku zikreşekî dexeskar, derewek li te kiribe û der heqê te de tiştek ji qral re gotibe, loma ev qasî ji te qehirîye lê belê tu qet metirse, tu bi xêr û serçavan hatî cem min. Te çawa qedrê min girtibe, ez ê jî qedrê te ew qasî bigirim. Lê gava ku min tu xelas kirî, tu yê li vê giravê bimînî, hetanî ku rêwî çêbibin û keştîyeke rêwîyan ber bi welatê we ve here. Wê çaxê, ez ê te bi wan re bişînim.

Ebûsîr, spasîya qeptan kir û kêfxweşîya xwe anî ziman, ji ber wê dilsozîya wî. Qeptan rabû çû koz anî, xist kûz, kevirekî bi qasî miroveki jî tê de danî û devê kûz girt, li qeyikê kir. Berîya ku bi rê bikeve, ji Ebûsîr re got: A ji te re tu jî vê torê bavêje behrê, belkî tu hinek masîyan bigirî. Lewre rojane ez masîyan ji bo metbexa qral amade dikim û xulam tên wan dibin. Ez ditirsim, ku niha ez wilo bi vî derdê te d ketime, xulamên metbexê bên û masîyan nebînin. Lê ku hinek masîyan amade bikî, ez ê jî herim raserî qesrê û hîleya xwe bi rehetî bikim.

Ebûsîr got: Ez ê masîyan bigirim, tu jî here. Xwedê alîkarê te be!

Qeptan li qeyikê siwar bû û berê wê da qesra qral. Çû raserî şibakeya wî, dît ku qral di şibakê de rûniştî ye. Qeptan qîrek da û got: Ey qralê gewre, ez wî bavêjêm avê gelo? Qral bi destê xwe îşaret dayê û jê re got: Bavêje! Gava qral bi destê xwe îşaret da, çingînî bi tiştekî ket û ket behrê. Ew tiştê ku ket jî hungulîska qral bi xwe bû. Ew hungulîska hanê jî timî di destê qral de bû û ji kê biqehirîya, tilîya destê xwe yê rastê ya ku hungulîsk tê de bû, ber bi wî ve dikir. Şewqek ji hungulîskê derdiket, li wî zilamê destnîşankirî diket û di cî de serê wî ji nav milên wî difirand. Hemû leşker, artêş û giregirên ku serê xwe li ber wî ditewandin jî, ji ber hêza wê hungulîskê bû. Loma gava ku hungulîska wî ji destê wî ket, mijar veşart û ji kesî re negot, hungulîska min ketiye behrê. Tirsîya, ku leşkerên wî, wî bikujin.

Em qral li wir bihêlin û em vegerin ser Ebûsîr. Ew jî çawa ku qeptan çû, tora xwe avêt behrê û kişand, tijî hat. Ew vala kir û dîsa avêt û dîsa kişand, dîsa tijî hat. Çend carên din jî tora xwe avêt û kişand, gelek masî li wir kom kirin. Piştre di dilê xwe de ji xwe re got: "Ev demeke dirêj e, ku min masî

nexwarine!” Masîyekî mezin ji nava wan neqand û ji xwe re got: “Gava ku qeptan were, ez ê jê re bibêjim, ka vî masîyî ji min re bipijîne, ez ê bixwim!” Kêra xwe derxist û masî serjêkir. Lê kêra wî di hungulîskekê de aliqî! Tu nabêjî wî masîyî hungulîska qral dabelihandibû û hatibû, ketibû, tora Ebûsîr!

Ebûsîr hungulîsk ji qirika masî derxist û xist tilîya xwe, bêyî ku huner û hêza wê bizanibe. Tam di we kelîyê de, du xulamên aşpêjê qral hatin wir, ji bo ku masîyan bibin. Gava li Ebûsîr rast hatin, jê re gotin: Gelo qeptan bi ku ve çûye? Ebûsîr got: Ez nizanim û bi destê xwe yê rastê jî îşareta nezanîyê da. Lê çawa ku wî destê xwe yê rastê ber bi wan ve kir û ew îşaret da, herdu xulam li erdê ketin û serên wan ji nav milên wan veqetîyan! Ebûsîr behetî û ecêbmayî ma, li hemberî vê dîmenê! Ji xwe re got: Gelo kê ew kuştin?” Bi kuştina wan pir êşîya û li ser mijarê hizirî.

Di wê kêlîyê de qeptan jî vegerîya û dît ku komek masî li wir in, du heb cenaze jî li erdê dirêj kirî ne û hungulîsk di destê Ebûsîr de ye! Bi lez axivî û ji Ebûsîr re got: Birawo baldar be û wî destê xwe yê ku hungulîsk tê de ye tevnede, tu yê min bikujî?! Ebûsîr şaşwaz bû, li hember vê gotina wî!

Gava qeptan gihîşt cem Ebûsîr, jê re got: Kê ev herdu xulam kuştine? Ebûsîr got: Bi Xwedê birawo, ez jî nizanim. Qeptan got: Tu rast dibêjî. Lê ka ji min re bibêje, bê te ev hungulîsk ji ku anîyê? Ebûsîr got: Min ew di qirika vî masîyî de dît. Qeptan got: Tu rast dibêjî, min jî ew dît, gava ku ji şibakeya qesra qral ket behrê; dema ku qral bi destê xwe îşaret da min û got: “Wî bavêje behrê!” Min jî kûz avêt behrê, wisa tê fêmkirin, ku wê gavê hungulîsk ketiye avê, masî ew daqurtandiye û Xwedê teala jî ew şandiye cem te, te jî ew xistiye tora xwe, bûye nesîbê te. Lê gelo tu dizanî bê çi huner di vê hungulîskê de hene? Ebûsîr got: Ez tu hunerên wê nizanim.

Qeptan got: Divê tu bizanibî, ku leşker û artêşa qral hemû ji tirsa vê hungulîskê ketine bin emrê wî. Lewre ev hungulîsk efsûna wê heye.

Gava ku qral ji yekî hêrs dibe û dixwaze wî bikuje; tenê bi dest ango nîşankirinekê serê wî ji nav milên wî vediqete. Di wê destnîşankirinê de şewqek ji vê hungulîskê derdikeve û diçe ser kesê destnîşankirî, wî dikuje!

Gava Ebûsîr ev gotin ji qeptan bihîstin, pir kêfa wî hat û ji qeptan re got: Ka min vegerîne bajêr! Qeptan got: Ez ê te vegerînim bajêr, ji ber ku ez nema ji qral ditirsim. Lewre tu kengî bixwazî wî bikujî, tu berê destê xwe bide wî, dê serê wî ji nav milan bigindire erdê. Heta heger tu bixwazî qral û

leşkerên wî gişan bikujî jî, weke vexwarina firteke avê ye li bate, tu zehmetî tê de tune. Qeptan Ebûsîr li qeyikê siwar kir û berê xwe da bajêr.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 1000'Î

*Şehrezadê ji Şehreyarê re gewre re got*:

Gava gihîştin bajêr, Ebûsîr çû qesra qral û derket dîwana wî. Dît ku qral di nava kul û xemên giran de rûniştiye û hemû leşkerên wî jî li dorê ne. Çawa ku qral çav lê ket, jê re got: Qey me tu neavêtibûyî behrê? Ebûsîr got: Ey qralê gewre, gava te ez radestî qeptanê xwe kirim, ji bo ku tu min bavêjî behrê, qeptanê te ez birim giravê û bi rê de ji min pirsî, got: Çima qral ew qasî hêrs bûye û ji te qehirîye; te çi xerabî di heqê wî de kiriye, ku fermana kuştina te daye? Min got wele tu xerabîya min pê re nebûye û ez jî nizanim çima ji min qehirîye. Wî got: Qral pir ji te hez dike û cihê te li cem wî bilind e, dibe ku hinekan zikreşîya te kiribe û bê bextî avêtibin stûyê te, ku qral ew qasî li hemberî te hêrs bûye. Lê belê ji ber ku ez hatime hemama te û te qedrê min baş girtiye, qencî bi min kiriye; ez ê jî vê qencîya te li te vegerînim. Ez ê te ji vê tengasîyê xelas bikim û te bişînim welatê te. Piştre kevirek li şûna min xist kûz û bi wê ferman û îşareta te re ew avêt behrê. Lê bi wê îşareta te re hungulîsk ji destê te ket avê û masîyekî ew hungelîsk dabelihand. Min jî li giravê tor davêt û masî digirtin. Ew masîyê hanê jî ket tora min û gava min ew ji nav ên din neqand û kêr lêda, ji bo ku ez wê bipijînim, hungulîsk tê de derket. Min jî rahiştê, ew xist tilîya xwe. Wê gavê du xulamên metbexê hatin, ku masîyan bibin. Min jî îşaret da wan, bêyî ku ez bi hunerên hungulîskê bizanim. Serê herduyan di cî de firîya û li ber wan ket. Piştre qeptan hat û hungulîsk di destê min de dît. Ew nas kir û efsûna wê ji min re got. Min jî ew ji te re anî û ez hatim vir, ji bo ku ez wê radestî te bikim. Lewre te gelek qencî bi min kiribûn û qencîya te bi avê de neçûye, min ew ji bîr jî nekiriye. A ji te re hungulîska te û heger min xerabîyek bi te kiribe û ji ber wê te fermana mirina min dabe, gunehê min ji min re bibêje û xwîna min li te helal be!

Ebûsîr, hungulîsk ji destê xwe kir û da qral. Gava qral çav li vê qencîya Ebûsîr ket, bi coş rahişt hungulîska xwe û xist tilîya xwe. Pê re jî ruhê wî lê vegerîya û xwîn bi rûyê wî yê zer ve hat. Mehdê wî vebû. Rabû ser xwe, Ebûsîr

himbêz kir û jê re got: Camêr te şîrê helal xwariye, li qisûra min nenêre û li min negire, ji ber wê neheqiya ku min li te kir. Heger kesekî din ev hungulîsk bidîta, nedida min. Ebûsîr got: Qralê gewre, heger tu dixwazî ez li te bibiburim, gunehê min ê ku hişt, tu hêrs bibî û emrê kuştina min bidî, ji min re bibêje? Qral got: Piştî vê qencîya ku te bi min kir, bêgunehîya te li ba min peyitî û êdî ez baş dizanim, ku te tiştekî xerab nekiriye. Lê belê sebeba wê hêrsbûna min ew bû, ku Ebûqîrê boyaxker weha weha ji min we gotibû...

Qral, tiştê ku Ebûqîr jê re gotibû, hemû jê re got. Ebûsîr got: Bi Xwedê qralê gewre, ne min qralê filehan dîtiye ne ez wî nas dikim û ne jî rojekê ji rojan ketiye bîra min, ku ez te bikujim. Ev boyaxker jî hevalê min bû û li Îskenderîyeyê jî cîranê min bû. Debara me nemabû, em jî ji wir derketin, bûn destbirakên hev û me ji hev re sond xwar, ku kî bişixule, wê yê dîtirkê jî xwedî bike. Piştre ta bi derzîyê ve kir û çîroka xwe û wî ji serî hetanî binî jê re got. Çawa di nexweşîya wî de derhemên wî jê dizî û çû, çawa dergevanê xanê lê nêrî û du mehan ew derman kir, çawa bi ser xwe ve hat û derket li nav bajêr gerîya, heta ku li boyaxaneya wî rast hat, çawa derbasî cem Ebûqîr bû; çawa Ebûqîr lêda û ew bi dizîyê ew tawan bar kir. Û herî dawîyê jî got: Vêca piştre gava hat cem min, li hemamê û min ew efû kir, wî ji min re got; hemama te pir xweş e lê kêmanîyek tenê tê de heye û ji min re got, wî dermanî çêbike û pêşkêşî qral bike, dê hemama te temam bibe û dê qral jî pir kêfxweş bibe. Ev dermanê hanê jî tu zirara wî tune ye. Li welatê me jî em wî bi kar tînin û ji pêdivîyên hemamanan e. Gava ew hat cem min û min qîmeta wî girt, wî ew bi bîra min xist, rabû min ew derman çêkir. Heger tu şahidan jî bixwazî, gazî dergevanê xanê bike û xebatkarên boyaxaneyê yên ku li cem me bûn, ew dê rastîya van gotinên min ji te re bibêjin.

Qral gazî gişan kir. Mijar ji wan pirsî, hemûçkan gotinên Ebûsîr piştrast kirin. Qral ji zêrevanên xwe re got: Herin Ebûqîrê boyaxker serserqot, pêxwas û desgîrkirî bînin! Ebûqîr jî di nava kêfê de li mala xwe rûniştî bû. Carekê ji nişka ve dît ku zilamên qral bi ser de girtine! Lê dan, dest û nigên wî girêdan û ew derxistin hizûra qralê ku Ebûsîr jî li kêlekê rûniştî bû. Dergevanê xanê û xebatkarên boyaxaneyê jî li ser nigan bûn.

Destpêkê dergevan axivî û got: Tu bû yî, yê ku derhemên hevalê xwe yê nexweş dizîn û tu çûyî, te ew di nava nexweşîya wî de di hucreyê de hişt û derî li ser girt! Xebatkarên boyaxaneyê jî gotin: Te ji me re got, wî bigirin û te lêda, xerabî û bêbextîya Ebûqîr li ber çavên qral zelal bû û nas kir, ku

cezayê herî giran heq kiriye. Gazî celadan kir û ji wan re got: Wî li nava bajêr bigerînin, bila bibe îbret. Piştre wî bixin kûzekî û wî bavêjin behrê!

Ebûsîr got: Ey qralê gewre, ez ji we tika dikim, tê bibihurin û wî efû bikin! Qral got: Ez dikarim di ber gunehên ku di heqê te de kirine tê bibihurim lê ji ber sûcê giran ê ku di heqê min de kiriye, ez tê nabihurim. Bi dengekî bilind axaftina xwe berdewam kir û ji celadan re got: Wî bibin li nav bajêr bigerînin û piştre wî bixin kûzekî û bavêjin behrê.

Celadan ew birin li nava bajêr gerandin, piştre kozin agir xistin binî kûzekî mezin, ew jî xistin hundirê wî û devê kûz girtin, ew avêtin nava behrê. Bi wî hawayî Ebûqîr, hem şewitî û hem jî binav bû, xeriqî, mir.

Qral ji Ebûsîr re got: Ka bibêje, tu çi ji min bixwazî, ez ê wî bidim te? Ebûsîr got: Ez dixwazim, ku tu min bişînî welatê min, lewre daxwaz bi min re nemaye, ku ez li vir bimînim! Qral jê xwest, ku bibe wezîrê wî lê Ebûsîr qebûl nekir û xwest ku here welatê xwe. Qral jî daxwaza wî qebûl kir. Têra wî zêr û zîv û cewher û mal danê. Keştîyek jî tevlî qeptan û xebatkarên wê ji wî re kir diyarî. Têra wan erzaq û xwarin û wexwarin jî lê bar kirin û piştre xatir ji hev xwestin. Ebûsîr ket rê û berê xwe da welatê xwe. Ba xweş lêdida û li gorî dilê wan. Piştî demekê xwe gihandin bendera Îskenderîyeyê û derketin ser bejahîyê. Tam di wê kêlîyê de bendeyekî wî kûzek li qiraxa avê dît û gazî wî kir, got: Mîrzayê min, kûzekî mezin î giran û devgirtî li qiraxa behrê ye!

Ebûsîr çû lê nêrî û devê wî vekir. Dît ku laşê Ebûqîr tê de ye! Wisa xuya dikir, ku behrê ew ber bi Îskenderîyê ve tehfandibû û anîbû wir. Laşê wî ji kûz derxist û li nêzî Îskenderîyeyê veşart û tirbek jê re çêkir û navê wê derê jî kir, "Ebûqîr û Ebûsîr". Lê belê ew cih bi navê Ebûqîr hat naskirin. Îcar subhan ji wî re ku dolaba dinyayê wisa digerîne!

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA 1001'Ê

*Şehrezadê ji Şehreyarê gewre re got*:

Tê gotin, ku carekê yekî nûciwanekî krîstiyanan diyarî wezîr Ebû Amir Bin Merwan kir, ku kurik mîna wî spehî tune bûn. Îcar gava çavên Melîk Ennasir lê ketin, jê pirsî, got: Ev, ji te re ji ku hat? Ebû Amir got: Ji ba Xwedê. Melîk Ennasir got: Tu dixwazî bi stêrkan me bitirsînî û bi heyvan me hêsîr

bigirî? Wezîr lêborîna xwe ji Melîk Ennasir xwest û jê re diyarîyeke baş amade kir, da wî nûciwanî, jê re got, tu jî di nava vê diyarîyê de yî lê divê tu bizanibî, ku ne ji mecbûrî bûya destê min ji te nedibû û min tu ji melîk re nedişandî. Piştre li gel van çend beytên jêrîn ew ji Melîk re şand:

Xwedanê min va ye heyv ber bi aso ve tê
Aso jî her ewlatir e bi heyvan ji erdê
bila nefsa te pê razî be her dê besî min be
min qet nedîtiye kes bi razî razî dibe

Melîk Ennasir bi vê helwest û diyarîya wezîr Ebû Amir pir kêfxweş bû. Têra wî pere jê re şandin û spasîya wî kir.

Demek bi şûn de hinekan qerwaşeke pir xweşik û spehî diyarî wî wezîrî kirin. Vêca wezîr tirsîya, ku çavên Melîk Ennasir pêkevin û heman tişt bê serê wî. Rabû jê re diyarîyek ji ya berê çêtir amade kir û li gel wê qerwaşê jê re şand, li gel van ristan:

Xwedanê min eva rok ber bi heyvê ve tê
were pêş da ku heyv li heyvê rast neyê
herdu tenê ne sîyemê wan nîn e qet
tu ji tekane şah î duyemê te nîn e qet

Bi vê diyarîya duwem, cihê wezîr li cem melîk xurtir bû û bêtir jê hez kir. Lê demeke din bi şûn de, hinek dijminên wî çûn cem Ennasir gilîyê wî kirin. Gotin hîna jî çavên wî li dû wî nûciwanê ku diyarî te kiriye ye û li fersendekê digere, ku kurik bikişîne ba xwe. Melîk Ennasir ji gilîker re got: Zimanê xwe bigire û vê gotinê ji kesî re nebêje, nexwe ez ê serê te jêkim! Piştre li ser navê wî nûciwanî ji wezîr re nameyek nivîsand û tê de got: “Xwedanê min, tu jî dizanî, ku ez bextewar bûm, bi mana li gel te. Niha jî li gel ku ez li ba melîk im, ez pir bêrîya te dikim û dixwazim xwe bigihînim te. Lê ez ji Melîk ditirsim. Îcar hîleyekê lê bike û mehneyekê ji bo xwestina min bibîne, da ku ez te bibînim!” û ew name da zarokekî biçûk, jê re got: Here ji wezîr re bibêje, min ev name ji filankes ji te re anîye û haya melîk jê tune ye!

Zarok çû, ew name da wezîr Ebû Amir. Wezîr name vekir, xwend, talûkeyek his kir. Li ser pişta heman kaxezî weha nivîsand:

qey piştî ev qase tecrûbey zanînan
mirovê zana diçe ser daf û xefkan?

ne ez im ew ê ku evîn zora hişê wî dibe
ne ez im ew nezanê ku zikreş sola wî dibe
tu ruhê min bî jî ji dil min tu kir diyarî
ma wê çawa ruhê çûyî li laş dîsa vegerî

Û bi heman qasidî re, bi şûn de şand. Gava ev bersiv ket destê Melîk Ennasir, li hiş û zîrekbûna wezîrê xwe matmayî ma û êdî qet nema guh da gotinên zikreş û gelacan. Dûra wezîr dît û jê re got: Te çawa xwe ji dafika gelacan xelas kir? Wezîr got: Ji ber ku hişê min têkilî evînê nabe! Û Xwedê çêtir dizane.

## DÛMAHIYA ÇÎROKA MELÎK ŞEHRIYAR Û BIRÊ WÎ ŞAHZEMAN

*Di maweya van hezar û yek şevên derbasbûyî de sê zarokên Şehreyar ji Şehrezadê çêbûbûn. Vêca gava ev çîroka xwe ya dawîn jî qedand, rabû ser nigan û erda bin nigê şah maçî kir û jê re got: Ey şahînşahê gewre û mihrîban, tekane û gewretirîn şahê dem û dewranan! Ez qerwaşa te me û ev hezar û yek şev e ku ez ji te re çîrok, dûrîk, gotin û şîretên pêşîyan vedibêjim. Gelo êdî mafê min heye ku ez tiştekî ji te bixwazim?*

*Şehreyar got: Tu bixwaze û ez ê jî daxwaza te pêk bînim!*

*Şehrezadê ji dadik û xulaman re got: Ka zarokên min bînin vir! Bi lez zarokên wê jê re birin cem wê. Her sê jî kur bûn. Yek jê dimeşîya, yê din bi çarlepikan bi rê ve diçû û yê mayîn jî di pêçekê de bû. Şehrezadê her sê zarokên xwe jî danîn pêşîya şah. Erda nav lepên wî maçî kir û jê re got: Ey şahînşahê gewre! Ev zarokên te ne û min hêvî dikir, ku tu min azad bikî ji kuştinê, ji bo xatirê van zarokan. Lewre bi kuştina min re dê hersê jî sêwî bimînin û tu jin, nikarin wan baş xwedî û mezin bikin!*

*Wê çaxê şah Şehreyar girîya, zarokên xwe hildan himbêza xwe û got: Ey Şehrezad! Bi Xwedê berîya ku zarok çêbibin jî, min tu efû kiribûyî. Lewre min baş dizanibû ku tu jineke hişmend, paqij, şanaz û serbilind î. Berka Xwedê li te û dê û bavê te be, li esl û feslê te be! Bila Xwedê şahidê me be ku ez te efû dikim û te dûrî hemû rengên xerabîyê digirim.*

*Şehrezadê dest û nigên wî maçî kirin, pir zêde şa bû û got: Xwedê temenê te dirêj bike, hêz û heybeta te xurtir bike, Rebî!*

*Mizgînîya vê xebera xweş li her derê zû belav bû. Kêf û şahîya Şehrezadê li temamê qesrê belav bû, ya qesrê jî li bajar gişî belav bû. Ew şev ji bo her kesî şeveke ne ji rêzê bû. Şeveke rûspî bû, mîna rojê! Ji bo şah jî şeveke tijî xêr û bextewarî bû, tijî kêf û şahî bû. Gazî hemû leşker û karmendên xwe kir. Hemû hatin. Cubeyekî xwe yê giranbuha diyarî wezîrê xwe bavê Şehrezadê kir û jê re got: Xwedê ji te razî be, ku te keça xwe ya hêja bi min re zewicand û te hişt, ku ez dev ji kuştina jinan berdim û ez tobe bikim. Keça te jî pir dilsoz, hişmend û birûmet e û sê kûrên xweşik dane min. Şikir ji Xwedayê dilovan re!*

*Piştre, diyarî li ser hemû wezîr, mîr û emîran belav kirin û ferman da, ku bajar hetanî sî rojan xemilandî bimîne, bêyî ku kes ji bajarîyan, malê xwe xerc bike. Şehreyar xwest, ku hemû lêçûn û xerckirin ji xezîneya dewletê be.*

*Bajar bi awayekî ecêb û balkêş hat xemilandin. Dengê dahol û zirneyê bi ser bajêr ket. Hemû rengên lîstikan hatin gerandin û ewrên şahîyê baraneke dilxweşîyê bi ser hemû bajarîyan de barand. Şah jî xelat û diyarî li ser her kesî belav kirin, jar û feqîr ji dana xwe bêpar nehiştin û comerdîya wî mîna konekî fireh, sîya xwe avêt ser her kesî.*

*Şehreyar û gelê xwe, di nava aramî û hêminîyê de jîyaneke xweş û bextewar derbas kirin, heta ku xerabkarê xweşîyê û belavkarê dost û hezkirîyan bi ser wan de hat!*

*Subhan ji wî re, ew ê ku dem û dewran nikarin pê; ew ê ku tu guhertin pê re çênabin, ew ê ku tu tiştî ji bîr nake û bi her tiştî re mijûl dibe, ew ê ku hemû sîfetên kemalê di xwe de dihewîne!*

DAWÎ

## GOTINEKE DAWÎN Û SPASÎYEK JI WERGÊR

Di 27'ê Mijdara 2009'an de min dest bi wergera vê berhema dirokî kiribû û niha jî piştî yazdeh salan, min ew qedand.

Heger ez derewan li xwe nekim, bi rastî gava min nû dest pê kir, min nizanibû û bawerîya min jî zêde tune bû, ku ez ê wê bigihînim dawîyê. Lew ev xebata yazdeh salan, hemû di şert û mercên zîndanê de çêbû û piranîya kesên kurd jî dizanin, bê ez behsa şert û mercin çiqasî zor dikim. Jixwe gava ku mijar xebatên zimanê Kurdî be, ew zor û zehmetîyên ku ez behsa wan dikim, ji her hawayî ve dibin duqat.

Li Tirkiyeyê qedaxeya li ser kurdî di fermîyetê de rabûbe û li derve wisa be jî, di zîndanê de ev qedexe tu caran ranebûye. Li hinek zîndanan sist be jî, li gelek zîndanên ku ez lê mam, dan û stendin, şandin û girtina nivîsên kurdî pir zor bû. Loma vê rewşê bi xwe giranî û zorîyeke mezin bi xwe re dianî.

Di dema vê xebatê tenê de ez pênc caran hatim sirgûnkirin. Min pênc zîndan guhertin û di her guhertinê de di bin navê kontrol û lêkolînê de destnivîsên min dihatin desteserkirin. Bi mehan dereng didan û du caran jî du cildên netemamkirî bi hinceta ku wenda bûne nedan min û ez mecbûr mam, ku wan ji nû vê wergerînim. Loma ji tirsa sirgûn û nedana destnivîsan, çawa ku min cildek diqedan, min hewl dida, ku ez di cî de derxim derve. Lê gelek caran ew jî ne gengaz bû. Yan bi mehan li cem xwe radigirtin, dereng dixistin an jî bi mehneya "tercûman tune" qet nedişandin û bi şûn de girtina destnivîsê jî dibû meseleyeke din. Ji tirsa wendabûnê, ez mecbûr bûm, ku her destnivîsa xwe, careke din binivîsim û vê yekê hem kedeke mezin, hem jî demeke dirêj dixwar. Heger car ji caran hevalinan alîkarîya min nekiribûya, wê vî karî demeke dirêjtir bixwesta.

Di şert û mercên zîndanê de kêmanîya herî mezin, nebûna ferhengên pêwîst bû. Bi taybetî jî ferhengên Kurdî-Erebî, Erebî-Kurdî di destê min de qet tune bûn. Vê yekê jî di peydekirina biwêj û gotinên pêşîyan ên hevseng de zorîyeke mezin derdixist. Ji ber ku wegera rasterast a biwêj û qalib û gotinên pêşîyan çeja wêjeyî di nivîsê de qels dikir.

Astengeke din jî wergerandina helbestên klasîk bû, ku di gelek cihan de derbas dibûn. Forma klasîk a helbestên erebî çêjeke wêjeyî ya xweş dida

metna erebî û xwendevanê xwe bi hêsanî dikişînin nav atmosfêr û hewaya serdemên navîn. Loma tenê wergerandina wateyî ji wan helbestan re bes xuya nedikir û divîyabû, ku min qalibê helbestê yê klasîk jî biparasta û tiştê herî zor jî ew bû. Lewre helbestên Hezar û Yek Şevê pir in û wergerandina hemû helbestan li gora qalibên wan ên helbestî (pîvan, riste, malik, serwa) temenekî sax dixwaze. Di vê hêlê de ez dudulî bûm, ji alîyekî ve qedandina wergerê di demeke kurt de û ji alîyekî din ve jî parastina qalibên helbestan. Gelek caran ez di navbera herduyan de çûm û hatim.

Bi pêvajoya vê xebata giran, alîkarîya gelek dost û hevalan çêbû. Jixwe ku ne ji alîkarîya wan (madî û manewî) bûya, belkî ev werger qet derneketa holê. Loma spasîyeke ji dil ji bo hemûyan dibêjim; di serî de Weşanxaneya Azad û xwedîya weşanxaneyê birêz Eslîxan Yildirim, ku alîkarîyeke gelekî mezin bi min re kir û kedeke mezin xerc kir, ji bo ku ev berhem bi zimanê me ronahîyê bibîne. Di dema ve xebatê de ez li pênc zîndanan mam û li her zîndanê alîkarîya gelek hevelan ji min re çêbû; hinekan jî ji dûr ve alîkarî dan min lê ez navê hinekan nebêjim çênabe. Lewre kedeke girîng dane: Elmo Begarî, Kadri Alkoç, İrfan Ataş, Sabrî Acar, Faysal Atak, Mücahit Yürek, Rêber İldem û xwarzîkên min Zehra, Stalin û Yunus; ez keda we gişan ji bîr nakim, zor spas ji we re.

05. 08. 2020

**AKHİSAR / MANİSA**

**Menaf Osman**

PÊVEK

# JI KITÊBA 1'EMÎN - HEZAR Û YEK ŞEV
# (CILD 1-2-3-4)

# NAVEROK

PÊŞGOTINA WERGÊR

Wergerên Pirtûkê û Şêweya Wan
Hezar û Yek Şev
Nivîskarê Pirtûkê Kî Ye?
Dema Pirtûkê û Navê Wê
Qalibê Pirtûkê

JI WEŞANXANEYA AZAD

**HEZAR Û YEK ŞEV - CILD 1**

ÇÎROKA MELÎK ŞEHRIYAR Û BIRÊ WÎ ŞAHZEMAN

(ÇÎROKA YÊ TACIR Û CINÎ)

(Çîroka Şêxê Yekemîn û Xezala Wî)
(Çîroka Şêxê Duyemîn û Du Tajiyên Wî)
(Çîroka Şêxê Sêyemîn û Hespa Wî)

(ÇÎROKA MASÎGIR Û EFRÎT)

(Çîroka Melîk Yûnan û Dûbanê Hekîm)
(Çîroka Melîk Sendîbad û Bazê Wî)
(Çîroka Kurê Melîk û Pîrebokê)
(Çîroka Xortê Nîvkevirî û Masiyên Rengo Rengo)

(ÇÎROKA HEMAL Û SÊ KEÇAN)

(Çîroka Sakûleyê Yekemîn)
(Çîroka Sakûleyê Duyemîn)
(Çîroka Sakûleyê Sisyan)
(Çîroka Keçika Ciwan ya Yekemîn)
(Çîroka Keçika Ciwan ya Duyemîn)

(ÇÎROKA KEÇA KUŞTÎ)

(Çîroka Şemseddîn Wezîrê Misrê û Nûreddînê Wezîrê Besrayê)

**HEZAR Û YEK ŞEV - CILD 2**

(ÇÎROKA TERZÎ Û XÛZO Û YÊ CIHÛ Û YÊ FILEH)

(Çîroka Simsarê File)

(Çîroka Seraşpêjê Şah)
(Çîroka Hekîmê Yahûdî)
(Çîroka Terzî)
(Çîroka Xortê Qop)
(Çîroka Berber)
(Çîroka Birayê Berber yê bi navê Beqbûq)
(Çîroka Birayê Berber yê bi Navê Hejar)
(Çîroka Birayê Berber yê bi navê Beqbeq)
(Çîroka Birayê Berber yê bi navê Kûz)
(Çîroka Birayê Berber yê bi navê Neşşar)
(Çîroka Birayê Berber yê bi navê Şeqliq)
(ÇÎROKA HERDU WEZÎRAN Û WENSKARA CIVAKÊ)
(ÇÎROKA EYYÛB Û KURÊ WÎ GANIM Û KEÇA WÎ FITNE)
(Çîroka Reşikê Xesandî yê Yekemîn ji Sûdanê)
(Çîroka Reşikê Xesandî yê Duyemîn ji Sûdanê)

**HEZAR Û YEK ŞEV - CILD 3**

(ÇÎROKA OMER EN-NÛMAN Û HERDU KURÊN WÎ ŞERKER Û ŞEWQA MEKAN)

**HEZAR Û YEK ŞEV - CILD 4**

(Çîroka Taca Mulûkan û Ezîzê Ciwan)
(Çîroka Taca Mulûkan û Dunya Xatûn)
(Çîroka Şewqa Mekan û Dorpêça Qostantînîye)
(Çîroka Hebû Tunebû û Qeza Bû)
(Çîroka Efyonkêş)
(Çîroka Hemmadê Bedewî)
(ÇÎROKA TEYR Û TILÛRAN Bİ İNSANAN RE)
(ÇÎROKA ŞİVAN Û ABID)
(ÇÎROKA TEYRÊ AVÊ Û KÎSO)
(ÇÎROKA ROVÎ Û GUR)
(ÇÎROKA MIŞK Û SÎNCAB)
(ÇÎROKA KITIK Û QIJAKÊ)
(ÇÎROKA ROVÎ Û QIJAKÊ)

# PÊŞGOTINA WERGÊR
# (ya pirtûka 1emîn)

Di dîroka wêjeya cîhanê de heger mirov her sê pirtûkên olî yên pîroz (Qur'an, Încîl û Tewrat) derveyî mijarê bigire, yekemîn pirtûkên ku di cîhanê tevî de belav bûye "Hezar û Yek Şev" e. A herî pir bela bûye, ya ku wergerî hema hema hemû zimanan bûye û ya ku bandora herî mezin li ser civatê kiriye jî ev pirtûk e. Yê ku hiştiye wisa bibe jî, piralîbûna vê pirtûkê ye. Li gorî mijarê, li gorî cûreyên naverokên çîrokên pirtûkê, li gorî tîpên qehreman û lehengên çîrokê û statûya wan î civatî û taybetmendiyên dem û devera wê civatê, mirov lêkolîn bike, mirov dê baş têbigihêje sedema vê bandora wê yî mezin û fireh li ser wêjevan, helbestkar, hunermend, rêvebir, siyasetmedar û hemû avahiyên kesayeta civatî. Belavbûna vê pirtûkê, bi vî şiklê fireh li temamê cîhanê jî, vê yekê piştrast dike.

Her berhemek wêjeyî hewceyî danasînê ye. Bi kêmanî di nav dever û kesên ku ew berhem nexwendibin, ev pêdivî heye. Lê ev berhema "Hezar û Yek Şev" ku bi Erebî jê re dibêjin "Elf Lêyle we Lêyle" qet ne bi hewceyî danasînê ye ji vê hêlê ve. Lew kesên ku navên wê nebihîstine tunene di nav mîrovên xwende de. Heta piraniya mirovê nexwende jî ev nav bihîstine. Bêyî ku reklama wê bê kirin herkesî bihîstiye. Lê belê li ser nivîskarê vê pirtûkê, li ser dema nivîsandina wê, li ser dîroka wê û gihaştina wê ya roja îro mirov dikare gelek tiştan bêje, lew gelek xalên ne diyar di pirtûkê de hene ji vê hêlê ve. Lêkolîn, lêgerîn û lêhûrbûnên ku li ser vê pirtûkê hatine kirin, bê hed û bê hesab in. Her lêkolînerek jî tiştekî cûda dibêje di derheqê dem û dewra wê, di derheqê nivîskar û nivîsa wê de. Lê hemû li gel van cûdatiyên wan jî, di hinek mijaran de dibin yek. Yekemîn, ev pirtûka ku di Serdemên Navîn de hatiye nivîsandin, ne ji qîbel nivîskarekî tenê ve hatiye nivîsandin. Cûdabûna ziman û şêweyê di navbera çîrokan de, ji hev dûrbûna cih û demên ku di mijaran de derbas dibin, vê yekê bi zelalî piştrast dikin.

Duwemîn; mijar, naverok, navên cih û deveran, navên şah û xelîfe û mîr û emîrên ku tê de derbas dibin, xweş diyar dike ku ev berhem hemû ne

di wextekê de hatiye nivîsandin û ne jî li deverekê tenê. Pirtûk mîna mirovekî gerok, li gelek welatan geriyaye mîna seyahekî, li her derê jî hinan tiştin lê zêde kirine. Ne tenê çîrokin din, ‘urf û adetên xwe jî lê zêde kirine. Loma mirov kesên pirrengî tê de dibîne; Ereb, Faris, Çînî, Kurd, Tirk, Musulman, Fileh, Cuhû, Mecûsî û hema ji her rengî însan tê de hene.

## WERGERÊN PIRTÛKÊ Û ŞÊWEYA WAN

Gelek mirovan, bi gelek şêweyan ev pirtûk wergerandine zimanê xwe. Gelekan jê jî pir pê lîstine. Li gora xwe cihin jê derxistine, li gora xwe sererast kirine, cihên beşên wê veguhestine, kêm kirine, zêde kirine. Nivîsa wê ya orîjînal bi Erebî ye û gelek helbestên klasîk yên bi wezîn tê de hene. Wergereke Frensî baş û İngilîzî heye. Piraniya wergerên zimanên din jî ji wan herdu wergerên Frensî û İngilîzî ne, ne ji ya orjînal in. Wergerê Tirkî jî ji ber ya Frensî hatiye çêkirin. Yê min ez ê vê wergera Kurdî ji ber orjînala wê ya Erebî bigirim. Ev nisxeya ku di destê min de, li Qahireyê hatiye çapkirin. Min li wergerên zimanên din meyzand, hema bêje tevan beşên helbestî ji pirtûkê, bê wezîn wergerandine û ji qalibê wê yî klasîkî derxistine. Gelek ji wan helbestan jî bê wate û bê aheng bûne piştî wergerê. Min hewl da ku ez wan qalibên helbesta klasîk ji Erebî derbasî Kurdî bikim, lew helbesta klasîk ya Kurdî jî ne kêmî ya Erebî ye. Çêjeke dîrokî ji çêja Serdemên Navîn dide nivîsê ku bi raya min, divê mirov li wê jî miqate be û wê tenê weke qalibekî şematîk nebîne.

Hinekan sererastkirina pirtûkê û cildên wê li gora mijaran çêkirine. Yê min min ew li gora hejmara şevan daye berhevkirin. Dabeşkirina wê li gorî hejmara şevan çêkiriye, lê belê li gor çîrok û mijaran jî min serenav dane navbera wan.

Em dîsa vegerin ser hêman, nav û danasîna vê pirtûka dîrokî û bi çend gotinan be jî, li gorî nerîna xwe, çend mijaran vebêjin dê baş be.

## HEZAR Û YEK ŞEV

Ya rastî navê wê tenê têra danasîna wê dike. Belavbûna vê berhemê li çar hêlên cîhanê û daxwaza hemû weşanxaneyan di belakirina wê de li hemû paytextên welatan û pirbûna wergeran, bi taybetî jî wergera Frensî û ya İngilîzî vê yekê baş didine xwiyakirin. “Hezar û Yek Şev” Çi Ye? Pirtûkek herî balkêş e ji pirtûkên wêjeyê yên Serdema Navîn di Rojhilata Navîn de

ku di wê demê de paytexta wêjeya cîhanê bû, çi bi zimanê Erebî û Farisî be, çi bi zimanê Kurdî be. Di vê pirtûkê de çîrokên reng bi reng ên ku adet û jiyan û çanda civatî ya di wê demê de hene.

Çîrok û agahiyên di derheqê şah û mîr û mîrekên wan demên kevn de, zarokên melîkan, wezîrên wan, sultanên navdar, mîrovên ji rêzê, ên ins, ên cin, diz û kujer û xaper û bêbextên wê serdemê, abid û mele û şêx, tacir û bijîşk û gerok, jinepîr, kalepîr, xort û keç û zarok û hemû rengên mirovan ya di wê civata wê çaxê de anîne ziman û agahiyên pir hêja di derheqê jiyana civatî û siyasî û ehlaqî ya wê serdemê di komeke çîrok de aniye ziman. Tu rengên civatî jibîr nekiriye. Biaqil, dîn, aşiq û evîndar, hakim û serdestên zalim, ên dadwir, durûtiya mirovan û hezkirina paşgotin û qalûqurtê.

Ji aliyekî din ve di van çîrokan de hemû rengên kesayeta jinan jî hene. Şahbanû, qiralîçe, dayikên dilbirehm, jinên pir biaqil, ên zana, ên fasiq, ên şermût, ên sahir, ên pîr, ên ciwan û dilpak.

Dîsa gelek agahî hene di derheqê ajalan de, jiyana ajalan de, xwedîkirin û fêdeyên wana. Çîrokên welatan ên ecêb, çîrokên bajaran, ên çiyan, ên deriyan, ên deştan, ên newalan, ên daristanan, ên mixaran, ên gundan, serayan û ba jarên efsûnî ku pêçayîne di nava xewn û xeyalên zêrîn de.

Ev avahiya ecêb û balkêş ji rengan, mirovan, ajalan, qesr û qonaxan, ins û cinan tenê tiştekî destnîşan dike, hêz û qeweta wêjeyê û xeyalê mirovahiyê.

## NIVÎSKARÊ PIRTÛKÊ KÎ YE?

Di vî warî de jî pir çîrok û rîwayet hene. Berhemeke evqasî baldar, evqasî tijî efsûn û xeyal û aqil û dînbûn û jiyan û xuluqkarî, ne gengaz e ku ji serê miroveki tenê derketibe. Fikr û xeyalên mirovekî bi tenê nikare bêrhemeke evqasî kûr û fireh û baldar derxîne holê, mirov nikare vê yekê bawer bike, ji xwe lêkolîner û wêjevannas jî vê yekê qebûl dikin. Dibêjin, nivîskarekî vê pirtûkê nîne, yekî bi tenê nîne û nehatîye zanin jî. Ku ew wîlo be, vêca em ê çawa bizanibin ku ew berhem nehatiye guhertin û gelek tiştên qelp neketine nav de? Em ê çawa bikaribin vê yekitiya wê yî wêjeyî a naverok û rista wê yî çîrokî qebûl bikin? Hineke wêjenas; tevlî ku qebûl dikin eslê pirtûkê Farisî ye, dibêjin; nivîskarê “HEZAR Û YEK ŞEV” ê ne yek tenê ye. Lî gorî Muhammed Bîn Îshaq; ev bi Ebû Abdullah Muhammed Îbnû Abdes El Gehşiyarî; xwedîye pirtûka “WEZÎRAN” dest pê kiriye. Vî zilamî gelek dengbêj

û çîrokbêj li xwe kom kirine, yek bi yek li wana guhdar kiriye û çîrokên herî balkêş, pêkenokên herî xweş ji nav hilbijartine û pirtûkeke bi navê "Hezar Henek Şev Ji Henek Şevên Ereb û Ecem û Rûman û yên din de" civandine. Beş bi beş nivîsandiye bêyî ku girêdanekê di nava wan de çêbike. Nivîskar di vê xebata xwe de ji gelek pirtûkên pêkenokan jî (yên wî çaxî) sûd wergirtiye û bi wî hawî çarsed û heyştê henekşev (an jî çawa ku têde gotin şevîn) komî serhev kiriye. Her şevînek ji derdora pêncî rûpelî pêk hatiye. Lê belê nivîskar zû miriye temenê wî têrê nekiriye ku hezar şevînan binivîse.

Hinek lêkolîner û dîroknasên wêjeyê dibêjin; xwedêgiravî eslê pirtûkê Hindî ye, lê belê keda Faris û Ereban jî tê de heye. Lê çawa bibe bela bibe, tu kes nikare bibêje ku "Hezar û Yek Şev" berhema şexsekî bi tenê ye. Bêgûman ev berhem Rojhilatî ye, ji gelek çîrok û dûrikên gelerî hatiye berhevkirin. Her nivîskarekî, her çîrokbêjekî tiştek lê zêde kiriye, çêjek ji çêja civata xwe avêtiye nav û ew dewlemendtir kiriye, hetanî ku gîhaye ev qalibê niha di nav destê me de ye.

DEMA PIRTÛKÊ Û NAVÊ WÊ

Di vê mijarê de jî nerîn û lekolînên cûda cûda hene, lê belê piraniya lêkolîner û lêhûrîneran dibêjin ku "Hezar û Yek Şev" di navbera qirnê sêzdehan û yê çardehan de hatîye nivîsandin. Ev jî li gorî bûyer û der û deverên ku di pirtûkê de derbas dibin hatiye tespîtkirin. Lêkolîner û wêjenas li ser dîroka pexşana pirtûkê û belavbûna wêyî di nav gel de jî li hevdû nakin, ji ber ku di pirtûkê de behsa qehwê û tûtinê qet nayê kirin ku ev herdu jî berî qirnê panzdehan nehatine nasîn, nakokiyekê derdixe di vî warî de. Hinek wêjenas jî dibêjin, ne dûrî aqilane ku di her demekê de tiştekî nuh li vê pirtûkê hatibe zêdekirin û hin bi hin gîhabe vî şiklê niha.

Hinek jî dibêjin, ev pirtûka han di dema KELÎLA Û DUMNA de hatiye nivîsandin. Dibêjin, şêweya nivîsê ya basît û herikbar vî tiştî dide diyarkirin. Şêweyeke dûrî asêbûnên edebî ku herkes baş jê fem dike û jê kêfxweş dibe. Navê pirtûkê qet nehatiye zanîn. Belbî nehatiye bîra kesî ji nivîskaran an jî ew mirovên ku çîrok lê zedê kirine ku li ser nav bisekinin. Lê belê dîsa jî tê gotin ku navê pirtûkê di dema ewil de "Hezar Efsane" bûye ku ev nav di zimanê Farisî de, di yê Kurdî de jî tête xebitandin. Ev jî tê vê wateyê ku nivîskarên pirtûkê ên ewilî Kurd û Faris bûne lê niha ji pirtûkê re dibêjin "HEZAR Û YEK ŞEV". Vêca xelkê çima navê vê pirtûkê ji "HEZAR

EFSANE"yê qulipandin "ELF LÊYLE" (ku ev tê maneya "Hezar Şev"î) û ji wê jî qulipandin "ELF LÊYLE WE LÊYLE" (ku ev tê wateya "Hezar û Yek Şev"ê) em nizanin. Belkî jî evên ku navê pirtûkê bi wî hawî guherandine, xwestine ku pirtûk ji efsaneya Şehrezadê piştrast bikin.

QALIBÊ PIRTÛKÊ

Qalibê pirtûkê çîrokî ye pir xweş e, sivik e, herikbar e û dûrî tevliheviyê ye. Heta ku tê de gotin xwerû û vekirî ye. Zimanê wê jî sivik û gelerî ye. Herkes jê fêm dike û tamê jê distîne, bêyî ku zehmetiye di fêmkirinê de bikişînin û bera dûv wateyên veşartî bidin. Lê di dema xwendinê de mirov di cî de tê derdixe ku ne ji qîbel nivîskarekî tenê ve hatiye nivîsandin; ji ber ku carinan herikbar, xweş û lezgîn e, carnan jî giran û kellê ye. Çîrokek mirov dorpêç dike bi şêweya nivîsa xwe, ya li dûv mirov bêhnteng dike. Yanî ev cûdabûna di navbera çîrokan de zelal e û xweş dide xuyakirin ku bi gelek destan hatiye nivîsandin, her yekî jî şopeke xwe tê de hiştiye. Lê belê uslûbê ku pirtûk pê hatiye nivîsandin gelerî ye û pir xweş û sivik e.

Yê ku hiştiye ev pirtûk bi lez di nav gel de belav bibe jî ev e. Belavbûna wê bi vê firehbûnê rastiya vê şêweya nivîsandina wê diyar dike. Ez hêvîdarim ku em ê karîbin cewherê vê pirtûkê tev li hemû hîmen edebî bi serkeftinî wergerînin Kurdî û bigihînin xwendevanên zimanê Kurdî. Tu xebat bê kêmanî jî nabe, lewra ez baş dizanim ku dê kêmaniyên min jî hebin, tew di xebateke wiha giran de; ji vî alî de jî ez bexşandina xwe dixwazim.

***27'ê Mijdarê 2009***

***Menaf Osman / Girtîgeha Semsûrê***

# JI WEŞANXANEYA AZAD
(ya pirtûka 1emîn)

Kitêba “Hezar û Yek Şev”ê, wek ku wergêr Menaf Osman nivîsîye yek ji kitêbê herî navdar yê dinyayê ye û wergerî gelek zimanan bûye. Cara ewil di serê sedsala 18’an de ji aliyê Antoine Galland ve, di dawiya sedsala 19’an û destpêka sedsala 20’an de jî ji aliyê Joseph Charles Mardrus ve wergerên Frensî bûne. Di heman demê de di sedsala 19’an de wergerên İngilîzî, Rûsî, İspanyolî jî hatine kirin û li Ewrûpa tevî belav bûne. Hin wergêr di çîrokan de guhertin kirine, hin jê jî bêyî ku tu guhertina bikin werger kirine. Hîn jî li her derê dinyayê çapê nuh têne derxistin, axilbe ji bo zarokan bi şêweyên cuda cuda têne amadekirin û bi baldarî têne xwendin.

Çîrokên “Hezar û Yek Şev” ê ji alî fikir û sin’et de gelek tesîr li dinyayê tevî kiriye. Bûye kanî û bingeh ji gelek mijarên roman, tîyatro, muzîk û filmê sînemaya. Gelek nivîskarên navdar, sûd ji vê berhemê girtine. Mirov kare bêje, tu berhem di dinyayê de bi qasî Çîrokên Hezar û Yek Şevê tesîr li sin’et, edebiyat, sînema, tîyatro û hwd. nekiriye. Hîn jî navê lehengê wan li deran tê kirin û dibin navê merqeyan, resmê ku wan temsîl dikin li ser gelek cihan û amûran cih digre. Yanî tesîr li hemû aliyê jiyanê kiriye; li jiyana civakî, li zarokan, li polîtîkayê, li edebiyatê, li tiyatroyê, li sînemayê…

Ev berhema bi Erebî ji aliyê kê ve û kengî hatiye nivîsandin ne zelal e, lê xweş tê zanîn ku xwediyê vê berhemê civata Rojhilata Navîn e, danheva çîrok û destan û efsaneyên vê civatê ne, bi demê re li her herêmekê lêzêdekirin hatine kirin û ji aliyê zanayên mijarê ve fikara herî li pêş ew e ku bingeha vê berhemê kitêba Îraniyan ya bi navê “Hezar Efsane” ye. Berhema Ebu Hasan el Mesudi ya bi navê Muruf el Dehab we Maadin el-Cawahîr ya sedsala 9’an û berhema Muhammed bin İshak en-Nedîm ya bi navê Kîtabul Fîhrîst ya sedsala 10’an vêna piştrast dikin.

Yek ji kaniya vê kitêbê welatê Kurdan e û şopê kultura Kurdan rasterast xwe di çîrokan de dide der. Li gel ku hîn jî hin ji van çîrokan di nav gel de têne gotin û di şevbuhêrkên berê de cihekî girîng digirtin, mixabin

wek nivîskî ev kitêb bi tevahî hîn jî bi Kurdî nahetiye çapkirin. Li gor ku min hebekî lêkola heya niha wergerê Kurdî yê bi tîpên Latînî ya vê kitêbê ev in: Wergera ji Swêdî Serdar Roşan, cild 1, Weşanxaneya Nûdem, Stockholm, 1998. Hesenê Bazirgan (Ji Çîrokên Hezar û Şevekê), Weşanxaneya Nîl, Stenbol, 2012. Hinek ji Çîrokên Hezar û Şevekê, Wergêr Abdulkadir Ulumaskan, Yekîtiya Mamosteyên Kurd li Almanyayê, 2013.

Em jî, wek Weşanxaneya Azad, di vê gava ewil de 4 cilda bi hev re di yek kitêbê de diweşînin. Menaf Osman ev kitêb ji Erebî wergerî Kurdî kiriye û tu guhertin tê de nekiriye. Wek ku tê zanîn wergerên ji zimanê ber hemê bixwe her çêtir e ji yê ku wergera wergerê be. Menaf Osman wergera cilda yekemîn di sala 2009'an de li Girtîgeha Semsûrê qedandiye, bi dû de li gel gelek xebatê xwe yê din, wergera cildê din yê Hezar û Yek Şevê berdewam kiriye. Heya niha wergera 4 cildan xediyaye û hewl dide ku cildên din jî wergerîne. Ji ber ku wergêr li Tirkî di girtîgehê de ye, mixabin îmkana me û hevdîtinê, îmkana me û bi hev re lêhûrbûna li ser xebatê Menaf Osman bi dest me nakeve. Dema redaksiyonê min wergera Kurmancî ya Serdar Roşan û wergerên Tirkî di ber çavan re derbas kirin, min ev xebat û wergerên ku min behs kir li ber hev xistin û bi hin rastkirinên biçûk ev şiklê dawî stend. Bi navê Weşanxaneya Azad, ji bo vê xebata pir hêja, ji bo ev berhema bêhempa wergerandiye Kurmancî ez gelekî spasî Menaf Osman dikim û ez hêvî dikim karibe wergera cildên din jî biqedîne.

***Gerînendeya Weşanxaneya Azad***

***Eslîxan Yildirim***

# JI KITÊBA 2'YEMÎN - HEZAR Û YEK ŞEV
# (CILD 5-6-7-8)

# NAVEROK

PÊŞGOTIN

**HEZAR Û YEK ŞEV - CILD 5**

(ÇÎROKA JOJÎ Û KEVOKÊ)

(ÇÎROKA MEYMÛN Û DIZ)

(ÇÎROKA ŞIYAR Û XEWAR)

(ÇÎROKA HEYVA ZEMAN, KURÊ MELÎK ŞEHRÎMAN)

(Çîroka Bidûr Xan û Jîyan Xanê)

**HEZAR Û YEK ŞEV - CILD 6**

(Çîroka Herdu Kurên Heyva Zeman, Emced û Eshed)

(Çîroka Bexşê û Bexşo)

(ÇÎROKA ELADÎN EBÛ ŞAMAT)

(ÇÎROKA HATIMÊ TAÎ)

(ÇÎROKA MAN BÎN ZAÎDE)

(ÇÎROKA BAJAROKÊ LEPTA)

(ÇÎROKA HÎŞAM BÎN EBDILMELÎK Û KURIKÊ EREBAN)

(ÇÎROKA ÎBRAHÎM ÎBNÎL MEHDÎ Û EL-MAMÛN)

(ÇÎROKA ABDULLAH BÎN EBÎ QULABE)

(ÇÎROKA ÎSHAQE MÛSILÎ)

(ÇÎROKA HEŞAŞ)

(ÇÎROKA HARÛNÊ REŞÎD BI XELÎFEYÊ DÛYEMÎN RE)

(ÇÎROKA ‘ELÎYÊ ECEM)

(ÇÎROKA HARÛNÊ REŞÎD BI ÎMAM EBÛ YÛSIF RE)

**HEZAR Û YEK ŞEV - CILD 7**

(ÇÎROKA XALID BÎN ABDULLAH EL QESRÎ)

(ÇÎROKA HARÛNÊ REŞÎD Û MIHEMEDÊ TIRAL)

(ÇÎROKA ELÎ ŞAR)

(ÇÎROKA HARÛNÊ REŞÎD Û ELIYÊ KURÊ MENSÛRÊ TOLAZ)

(ÇÎROKA XELÎFE EL-MAMÛN Û HER ŞEŞ CARIYEYAN)

(ÇÎROKA WERDANÊ QESAB Û JIN Û HIRÇÊ)

(ÇÎROKA JINÊ Û MEYMÛN Û XORTÊ QESAB)

(ÇÎROKA QRAL Û HERSÊ HEKÎMAN)

(ÇÎROKA MIROVÊ MIFLIS Û KODIKA BER KÛÇIK)

(ÇÎROKA LEŞKER Û DIZ Û WALIYÊ ÎSKENDERIYÊ)

(ÇÎROKA HERSÊ WALIYAN LI BER DESTÊ MELÎK NASIR)

(ÇÎROKA SERAF Û DIZ)

(ÇÎROKA HÎLEBAZ Û WALIYÊ QEWS)

(ÇÎROKA ÎBRAHÎMÊ MEHDÎ Û TACIR)

(ÇÎROKA JINA XÊRXWAZ Û BIRÎNA DESTÊ WÊ)

(ÇÎROKA XWIROŞKAR Û LÛLÛ)

(ÇÎROKA EBÛ HESSAN EL-ZEYYADÎ Û MAMÛN)

ÇÎROKA DEWLEMENDEKÎ KU ÇERXA FELEKÊ DI SER RE ÇÛ EW FEQÎR KIR

(ÇÎROKA ZILAM Û DEFÎNE)

(ÇÎROKA EL MUTEWEKIL Û MEHBÛBE)

**HEZAR Û YEK ŞEV - CILD 8**

(ÇÎROKA INSELWICÛD Û WERDÊ)

(ÇÎROKA HARÛN REŞÎD Û ZUBEYDE XATÛN)

(ÇÎROKA KESRA ENÛŞREWAN Û KEÇIKA GUNDÎ)

(ÇÎROKA AVKÊŞ Û ZÊRKER)

(ÇÎROKA JINA BAŞ A JI BENÎ ÎSRAÎLIYAN)

(ÇÎROKA CAFERÊ BERMEKÎ Û ZILAMÊ KAL)

(ÇÎROKA CIWANÊ KUJER Û OMERÊ XETAB)

(ÇÎROKA EL MUTELEMÎS Û JINA WÎ)

(ÇÎROKA QERAŞ Û JINA WÎ Û CÎRANÊ WÎ)

(ÇÎROKA XAFIL Û KER)

(ÇÎROKA EL HAKÎM BÎ EMRÎLLAH Û TACIR)
(ÇÎROKA QRAL XUSREV Û NÊÇÎRVAN)
(ÇÎROKA CAFER BÎN MÛSA ELHADÎ Û EMÎN)
(ÇÎROKA SEÎDÊ BAHILÎ Û BERMEKIYAN)
(ÇÎROKA ME'MÛN Û PÎRAMÎDÊN MISRÊ)
(ÇÎROKA TOBEKAR Û DIZ)
(ÇÎROKA ÎBNIL FARABÎ Û REŞÎD Û MESRÛR)
(ÇÎROKA KURÊ HARÛN REŞÎD Ê ZAHID)
(ÇÎROKA MAMOSTEYÊ ZAROKAN - 1)
(ÇÎROKA MAMOSTEYÊ ZAROKAN - 2)
(ÇÎROKA MAMOSTEYÊ ZAROKAN - 3)
(ÇÎROKA QRAL Û JINIKÊ Û MÊRÊ WÊ)
(ÇÎROKA ÎSHAK BÎN ÎBRAHÎM EL-MÛSILÎ)
(ÇÎROKA EBÛ BEKIR EL-ENBARÎ Û ABDILMESÎHÊ KEŞÎŞ)
(ÇÎROKA MÎRZAYA MEŞAYIXAN)
(ÇÎROKA MIROVÊ MEXRIBÎ Û TEYRÊ REX)
(ÇÎROKA HIND BINT ENNÛMAN Û ÛDEY BÎN YEZÎD)
(ÇÎROKA EBÎ ÎSA BÎN REŞÎD Û NÛRA ÇAVAN)
(ÇÎROKA ELIYÊ MISRÎ KURÊ HESEN EL-CEWHERÎ)
(ÇÎROKA HECÎ Û PÎREJINA SALIH)
(ÇÎROKA ELÎ BÎN MUHAMED BÎN ABDULLAH BÎN TAHIR Û MÛNISA CARIYE)
(ÇÎROKA EBÛL HESEN Û CARIYEYA WÎ TEWEDÛD BI HARÛN REŞÎD RE)
(ÇÎROKA MELÎKÊ MIRINÊ)
(ÇÎROKA JINA QENC A DI NAV BENÎ ÎSRAÎL DE)
(ÇÎROKA JINA SALIH BI MÎRZAYEKÎ RE LI MEKKEYÊ)
(ÇÎROKA ZILAMÊ CIHÛ YÊ QENC)
(ÇÎROKA ÎBRAHÎM ÎBNIL XEWAS Û KEÇA SILTAN)
(ÇÎROKA CIHÛYÊ DURUST)
(ÇÎROKA KURÊ DANYAL)

**PÊVEK**

JI KITÊBA 1'EMÎN - HEZAR Û YEK ŞEV (CILD 1-2-3-4)

NAVEROK

PÊŞGOTINA WERGÊR

JI WEŞANXANEYA AZAD

# PÊŞGOTIN
# (ya pirtûka 2yemîn)

Kitêbên çîrokên "HEZAR Û YEK ŞEV" ê ji 12 cildan pêk hatiye. Menaf Osman di hepsê de ev xebata bêhempa kiriye û 12 cild ji Erebî wergerî Kurdî kirine, yanî berhem bi tevayî qedandiye. Wek Weşanxaneya Azad, me di 2018'an de 4 cild çîrokên "HEZAR û YEK ŞEV"ê wek yek kitêb çap kiribû. Niha dîsa em çar cildên din di yek kitêbê de diweşînin. Wek ku me di kitêba pêşî de îfade kiriye, çîrokên "HEZAR û YEK ŞEV"ê di dinyayê de kitêba herî naskirî ye û wergerî bi sedan zimanî bûye. Ya herî girîng ev çîrok yê civat û herêma me ne û li tevaya dinyayê bela bûye, ji gelek berhemên edebî, filman re bûye bingeh. Ji bo van agahiyan, hûn dikarin li pêşgotina pirtûka 1'emîn (cild 1-2-3-4) ya wergêr Menaf Osman û nivîsa destpêkê ya weşanxaneyê ya di dawiya vê pirtûkê de binerin. Piraya lêkolîneran jî dibêjin, di dinyayê de di warê zargotin û çîrokan de Kurd û Kurdistan di rêza pêşiyê de ye. Lê ji ber bêdewletbûn û astengiyan ev zêde nayê xuyakirin.

Ji bo ev xebat bigihe ber destê hemû xwendevanan me kitêba 1'emîn (cild 1-2-3-4) li ser înternetê bela kiriye. Di ser malpera weşanxaneya me re, digel hin berhemên din, herkes dikare bêheq xwe bigihîne pdf a wê (https://wesanxaneyaazad.net/index.php/pirtuken-pdf/). Heman demê Reşad Sorgul hin ji wan çîrokan xwendine û vîdeoyên wan di youtubê de bela kirine; yê bixwaze dikare li wan guhdar jî bike. Berî ev kitêba 2emîn bê xwendin, kitêba ewil di ber çavan re bê derbaskirin wê baş be.

Mijara çîrokan, bi serpêhatiyên Melîk Şehriyar û birayê wî Şahzeman dest pê dike ku herdû ji aliye jinên xwe ve hatine xapandin. Gava Melîk Şehriyar bi vê dihise, jina xwe û hevkarên wê dikuje; ji wê rojê bi şûn de, her şev keçekê ji xwe re tîne qesrê, pê şa dibe û dûvre wê dide kuştin. Xelk ji vê zulme perişan bûne, hin ji wan keçên xwe ji bajêr bidûr xistine. Dema keç li bajêr namînin, wezîr dikeve qelaqê, nema zane wê çawa bike. Qîza wezîr Şehrezad rewşê fêm dike û bavê xwe îkna dike ku vê carê wê ji Melîk Şehri-

yar re bibe. Fikarek Şehrezad heye û hêvî dike ku bi vê plana di serê xwe de wê her tişt bê guhertin. Şehrezadê her şev çîrokên sûdewer, balkêş ji Melîk Şehriyar re dibêje û ji bo berdewamiya vegotina çîrokan, ji hêrsa melîk xelas dibe û nayê kuştin… Çîrok 1001 şevê berdewam dikin. Di kitêba ewil de (cild 1, 2, 3, 4) ya ku me di 2018'an de çap kiribû, çîrokên ji şeva 1emîn heya şeva 154'emîn cih digre. Niha dîsa em çar cildên din, yanî cildê 5, 6, 7 û 8'an di yek kitêbê de çap dikin. Ev pirtûka 2yemîn jî bi çîrokên berdewamiya şeva 154'emîn dest pê dike, heya şeva 484'emîn dom dike. 4 cildên din yê mayî, yanî cild 9, 10, 11 û 12 jî karê wan û amadekariya ji bo çapkirinê dom dikin. Ew jî ji çîrokên şeva 485'emîn dest pê dike heya şeva 1001ê.

Li ser vegotin û mijarên van çîrokan hewcedarî bi xebatên cuda cuda û berfireh heye; ev bi serê xwe mijarên kitêbin din in. Lê bi çend hevokan be jî ez dixwazim balê bikşînim ser hin ji wan. Her çiqasî çîrok ne yê herêmeke teng be jî, dema çîrok li herêmekê bê vegotin, ew çîrok li gor wê herêm û demê û li gor serdestê wê herêmê tên guhertin. Ev çîrok di dema serdestiya dewletên ku bi navê îslamiyetê bi rê ve dihatin meşandin hatiye berhevkirin. Loma di hin çîrokan de wesifdana hin xelîfeyan derdikeve pêş, li gelek cihan propaganda îslamê û kêmxistina dînên din xwe dide xuyakirin. Wekî din, di hin cihan de, li gor berjewendiyên desthilatdaran çawa dîn hatiye bikaranîn jî xwe dide der... Ji ber ku wê demê, axaftin û sohbeta di şevbuhêrkan de cihê perwerdehiya herî bi bandor bû, tesîra çîrokan li ser civatê pir zêde bû; şikil dida şeqsiyetê, dida civatan û dan û stendinan… Ji ber van sedeman, dema mirov van çîrokan bixwîne, gerek mirov wan li gor demê û şertan şîrove bike.

Wekî din, werger karekî pir hesas e û xebatên ku bi zanebûn bêne kirin pir hêja ne. Di wergeran de dewlemendiya zimanan xwe dide der, wêje bi pêş de diçe û ji xebatên nû re dibin bingeh. Ev xebat pir bi zehmetî têne meşandin û heger xebatkar di zindanan de bin, bi wan derfetên kêm zehmetî pir zêdetir dibe. Wek ku tê zanîn, xebatên wêjeyî yê di zindanan de heya ku digihe ber destê me, heya derbasî kompîturan dibe gelek wext derbas dibe. Ji ber ku em nikarin bi nivîskar, yan wergêr re rasterast di têkiliyan de bin jî, xebatên wan pir bi zehmetî têne weşandin. Loma piştî demek dirêj û xebatên bi fedekarî ev berhem digihin ber destê we. Di gel ewqas bergirî û kêmderfetiyan Menaf Osman wergerek pir delal kiriye; hem di helbestan de, hem di vegotinan de pir serkeftî ye. Em spasdarê wî ne ku ev berhema bêhempa diyarî Kurdî kiriye. Di vê berhemê de, kesên bûne alîkar jî pir in;

di derbaskirina kompîturê de ya destnivîsan, malbata Menaf Osman kedek mezin dide. Di 2 cildê pêşî de ji Komeleya Nivîskarên Mezra Botan ya li Mêrdînê Omer Akın, Bahaddîn Robar û Eyyûb Guven; di derbaskirina kompîturê de bûne alîkar. Yek bi yek em spasî hemûyan dikin.

Wek ku tê zanîn, bikaranîna Kurdî li gor herêman tê guhertin û hîna standartkirinek tekkûz pêk nehatiye, loma hin gotin cuda hatine bikaranîn û me nexwest em wan biguherin. Wek mînak; geh "siltan" geh jî "sultan" hatiye bikaranîn, geh 'cêrî' geh jî 'cariye' hatiye bikaranîn; ev herdu şekil jî di nav gel de têne axaftin, me jî xwest bi herdu lewna jî tê de cih bigre. Min bixwe redaksiyona cildê 5 û 6'an çêkiriye, redaksiyona cildê 7 û 8'an Serwet Denîz û Azad Zal çêkirine û min dîsa di ber çavan re derbas kirine. Ji ber ku 4 cild bi hev re tên amadekirin, ev pêvajo gelek dem distînin. Wek ku di 4 cildê ewil de jî min diyar kiribû, ji ber ku wergêr Menaf Osman di zindanê de bû û danûstendina me ne hêsan bû; di sererastkirina dokumanan de em zêde diteqinîn û bi destûra Menaf Osman hin caran me insiyatîfa xwe bikar anîye. Piştî vê kitêbê, wê xebata çapkirina cildê 9, 10, 11 û 12 dest pê bike, em hêvî dikin di demeke kin de em bikaribin wan jî bigihînin ber destê we.

***Gerînendeya Weşanxaneya Azad***

***Eslîxan Yildirim***